

•
Di sedsala 21ê de şoreşa kurd; rojava

•
Abdusamet Yîgît

Weşanên Han

Di sedsale 21ê de şoreşa kurd; rojava
Weşanên SORAN e

2013

Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han

email: han-grafik@hotmail.de

Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bûlowstr. 56-57 10783 Berlîn

ISBN 978-3-940997-27-2

DI SADSALÉ 21'Ê DE ŞOREŞA KURD: ROJAVA

PÊŞGOTIN

Di sadsale 21'ê de, şoreşa kurd, pêk tê. Ev şoreş, şoreşek civatî, ahlaqî, dîrokî û têgihîştinî ya. Ku em bahse şoreşa kurd bikin, divê ku em bibêjin ku bi teybetî, wê bandûra wê li ser rojhilat û giştîya wê hebe. Li ser siyaseta cihanê wê bandûra wê hebe. Bêgûman, wê di demên pêş de, li ser wan alî û pêşketinên ku bi wê re rûbidin, wê pirr berhemên girahbûha jî wê werina nivîsandin. Li vir, min, pêşî jî aliyê dîrok û hebûn û pêşketina civate kurd ve şoreşa rojavayê kurdistanê di temenê pêşketina civate û giştîya wê de hilde li dest.

Ev şoreşa ku emê di demên pêş de, pirr zêdetir jî wê bi axivîn jî, wê pêşketinên dîrokî bixwe re bêne. Şoreşên firansa, Emerika û hwd, çi weyn di dem û serdemên xwe de û di demên piştre de leyistin, wê ev şoreş jî, ancamen wê bi heman rengî li rojhilat û kurdistanê û li beşên din ên cihanê wê hebe. Bo vê yekê, giring a ku em fahm bikin ku ev temenê ku li ser wê ev pêşketina şoreşî bûya, çi ya û çawa ya, bo ku were fahm kirin, me di çerçoveya hebûna civate kurd de, dîroka kurd jî dema Sûmerîyan û heta vê demê di xatekê de hilde li dest. Gav bi gav, vê civate kurd, çi pêşketin di dîrokê de jînkirina, fahm kirina wan jî, giringa ku li vir mirov fahm bike. Civatek, bi dîrok û mejûya xwe re heya. Nirxên wê ên civatî ku bi dîrokê re bi hebûna civate wê re pêşketina, rengê wê yê pêşketinê jî radixina li berçav. Bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku bi teybetî, mîretea civate kurd a dîrokî a bi hezar salan, hinekî jî bi têgihîştin û pêşketina wê ya ve serdema wê ya kurdistanê de, di temenê wan pêşketinên wê ên şoreşî de jî hena.

Bi aqil û têgihîştinê, fahm kirina mirov, têkiliyên nava mirovan, rengê têkilîyan, nêzikatîya mirov a li xwezayê û hwd, hinekî jî nêzikatîyên aqilane ku mirov divê ku li wan bihizirê na. Divê ku em weke prensîbêkê li vir werênina ser ziman ku civatek, çendî ku xwe û mejûya xwe ya civatî fahm kir û têgihîşt, wê êdî bêhtirî û zêdetirî karibê pêşketinên mazin bi xwe re bi demê re bide çê kirin. Bo vê yekê, dema ku em vê rewşa şoreşî a rojavayê kurdistanê hildina li dest û fahm bikin, divê ku em bi nêzikatî û têgihîştinê re, jî felsefeyê bigre û heta ku digihijê xwezayê û hemû beş û qadên din ên zanyariyê divê ku mirov di wê çerçoveyê de çavêkî bi nêzikatî û têgihîştinê li wan bixe. Di dema nivîsandina beşa desthilatdarîya şadadîyan di vê pirtûkê de, hizreka giring da min di derbarê pêşketinên roja me jî. Bo vê yekê, di çerçoveyê de, dema şadadîyan, ya Merwanîyan û ya Salahadinê Eyûbî bi hevdu re di çerçoveyê de, min hildane li dest. Hinekî jî, jî aliyekî ve ev hersê dem, weke serdemekê bi hevdu re temenê pêşketina hemdem a civatî jî dihênina li berçav.

Destpêka hizirî, şariştanî ku di temenê pêşketina civatî de ya.

Pirtûka zanîna jîyanê, wê zanîna di derbarê dora me de bide me. Mirov wê bi wê, wê hewirdora xwe nas bike. Wê, fahm bike ku hewirdora wî çawa ya. Em mirov, di nav xwezayê de dijîn. Li dora me, ku bi me re di nav wê xwezayê me de dijîn, pir jîndayên jî me cuda ên cûr bi cûr hene. Em, ku li dora xwe meyzên in. emê wan bibînin. Çûkên ku li dora me di çilwilînen û hene, mirov wê wan bibîne. Ew jî, qatek jî wê xwezayê ku em têde dijîn in. Ew jî, jî wê xwezayê zad û qûtê xwe yê jî bo xwarinê dibînin. Mirov, jîndayê di nav wan jîndayên ku di wê xwezayê dijî ê herî pêşketî ya. Mirov karê bihizirê. Mirov, karê bi hizir bike. Mirov karê bi hizir û bi hizir bi pêşnûme bike û bike meriyetê de.

Xweza, ew hewirdora ku li dora me ye. Ew hewirdora ku em têde di nav de dijîn e. Xweza, têde, ne tenê jînda hene. Têde, mirov tenê najî. Ji xaynî mirov, jîndayên din ên ku em jî wan re dibêjin ajal jî dijîn. Ajal çîna? Ajal, jîndayên ku li dervî me mirovan di nav wê xwezayê de dijîn in. Mirov karê wan wilo bêne ser ziman. Weke mirov û ew jîyane mirov e ku mirov wê dijî, ew jî

jîyaneke wan ye ku mirov wê bi çav dibîne heya.Di vê beşe zanîna jîyanê de, emê mirov û xwezayê wî bi wê re fahm bikin.Emê di derbarê xwezayê de bine xwediyê zanînekê jî. Emê hewirdora xwe nas bikin.Emê, fahm bikin ku em divêt ku çawa nêzî dora xwe bibin. Deme ku me got emê fahm bikin ku emê çawa nêzî hewirdora xwe bibin, emê di wê de pir mazin hewirdora, jîyane mirov û her weha jîyanê dervî mirov e ajalan ji mirov wê fahm bike.

Jîyan, biqasî ku mafê her mirovî ya, wilqasî mafê her jîndî ya.Jîyanê rêzekê ji mirov maf dike.Emê wê jî fêr bibin.Emê fêr bibin ku emê çawa rêzê bidine jîyanê.Hate ku mirov jîyanê û wê û hemû aliyên wê fahm nekê, wê nikaribe wê jî baş bike.Rêz û fahm, du gotinên ku bi rêzgirtine ji jîyanê re bi hev re na.Ev aliyekî jîyan ê ku mirov wê fahm û fêr bike ya.Lê jîyan, di wê de bi mirov re di pêşketinekê de ya.Divêt ku mirov wê ji fahm bike.Bi fahm kirina jîyanê re, wê aliyekî pêşketinê ye di jîyanê de wê bi me re bifahm bibe.Aliyekî wê yê di jî, wê fahmkirina pêşketinên din jîyanê de na. Î ro, di roje me de, pir pêşketinên ku bi teknolojiyê hene.Wan jî divêt ku mirov wan fahm bike. Ku mirov fahm kir, mirov wê çêtir, karibe wan bikar bêne.Bikarhanîn, ji serwerîya mirov dihêt.Hewirdor, naskirina wê, aliyekî wê fahmkirine wê ye jê, wê hebe. Ev, pêşketinên ku bi hizir bûna ya. Ku mirov li dora xwe meyzend, mirov wê wan bibîne.

Emê, beş bi beş bînine li ser ziman.Her beşek, wê ji aliyekê ve me di derbarê jîyanê de bigihêne zanînekê.Lê her beşe ku wê beşa berî xwe ku jê hatiya buhurtin, wê ji xwe re bike temen û bingeh.Ji ber vê yekê, ku em beşek bidawî kir û em buhurtine beşa din, divêt ku beşa ku em jê buhurtin, em ji bîr nekin.Ku em ji bîr bikin, emê di beşên din ên ku em buhurtinê de ji, kêm û netêr bimênin. Ji ber vê yekê, ew beşa ku me bi dawî kir û em jê buhurtin, wê di deme xwandin û rawakirina beşa din ji, wê di sere me de di aliyekî mejiyê me de têgihîştine wê ye jê, wê hebe. Ev, wê bike ku em bêhtirî bi fahm bin. Wê di derbarê jîyanê de, fahmaka me ya baş û bitêgihîştin bi me re bide çêkirin. Her beş, ku wê çendî bi sere xwe weke beşekê ji bin, wê di çerçova hebûna pirtûkê de wê hevdû temem bikin. Ji ber vê yekê, mirov karê bêje ku wê hevdû di dawiyê di aste dawiyê de temem bikin.

Zanîna jîyanê, di temenê hemû beşên din ên fêrkirinê û fêrbûnê de na. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku giringiyeka wê ye pir giring heya.Di zanîna xwe de, ku mirov xwediyê serweriyeka li jîyanê bê, wê mirov hingî karibe ku bêhtirî fahm bike.Mirov, pêşi, weke xale me ye pêşi, ku mirov li hewirdora xwe meyzêne û wê nas bike. Axê, kevir, dar, pelên wê û ku têkiltî jî di nav de û hwd, ku mijarên zanînaxwezê na, mirov bigiştî, di derbarê wan de ji, dibe xwediyê zanînaka xwe ya teybet.Çêkerîya zanînaxwezê, bi bûn û pêşketina zanîna wê re bi demê re dibe û afirîner dibê.Ev çêkerî jî, aliyekî pêşveçûn û pêşketinê ê civak û jîyane wê ya. Lê ev jî, bi têgihîştin û jîrê wê dibe û dihê holê...

.. **Mirov ku li dora** xwe meyzêne, mirov wê bibîne ku gelek tişt li dora wê hene. Ku li dora xwe hinekî li dervî bajêr meyzêne, wê daristanê bibîne. Di daristanê de pir dar hene. Dar, bi wan ve pir çaqil hene. Bi çaqilan ve pel hene. Her pel jî şîn in.

Lê ku mirov li hundurê bajêr bê û li dora xwe meyzêne, mirov wê bi pirranî malan bibîne. Her malek têde malbatek dijî. Her malbatek, têde mirovên ku dijîn hene. Jîn û mêr û zaro hene. An jî, bi awayekî din ê gotinê dê û bav û zaro dijîn. Bi hev re jîyanbûna dê û bav û zaroyan hebûna malbatê dihêne holê. Ji yên ku di malê de dijîn jî malî dihê gotin. Malî, ên ku di malê de dijîn hemû in. Dê û bav û zaro hemû na. Malî, di bin wê de navê dê, bav, keç û kur cih digirê. Ev xwezayî malbatîyê ya. Di jîyanê de malbat, deronîya wê wê malbatî heya Ew deronî, temenê wê malbatîyê diafirîne. Ev hanîna me ye bi malbatê re, wê xwezayê malbatê bêne ser ziman. Hebûna malbatê, di nav xwezê de, bi vê awayê ku me hanî li ser ziman, xwediyê xwezayê xwe ya.

Gotina hewirdorê gotineka pir wateyî ya.Di kurdfî de, deme ku bahse hewirdorê hate kirin, hingî, di rewşê ku mirov têde bê û dere ku mirov lê bê, mirov ji wir re dibêje. Ku mirov di nav daristanekê de bê, di nav wê daristanê de, di wê deme ku em di nav de ne, çî tiştê ku me dît û bi berçavên me ket, jî dûr û nêzîk, wê hewirdorê dihêne ser ziman. Lê ku em di nav bajêr de bin, hingî jî, ew hewirdore ku em di nav de na, der û deverên ku em dibînin û dibê çavên me dikevin, hemû jî, bi wê gotina hewirdorê dihêne ser ziman. Ku mirov li malê bê û ku mirov derketa hewşê

mala xwe û me li dora xwe meyzend, hingî jî, mirov wê gelek mal û der û deveran bibîne. Ew hemû dîtîn, hewirdor e.

Ku mirov, li dora xwe dimeyîzêne, mirov dora xwe karê jevcuda bike. Piştî ku mirov bû û hinekî mazin bû, ku hat û gihiştâ 5 û an jî 6 saliya xwe, wê êdî hin bi hin fahmkirina wî pê re bidest pê bike. Lê hate ku mirov dihê wê deme xwe jî, bi mirov re hinek fahmkirin dibê. Ew demên me yên berî wê deme, ên ku em weke demên fahmkirin ê zarotiya xwe ye biçûk binav bike, demne ku mirov di wan deman de qalibên xwe yên têgihîştinê êdî diafirêne na. Di wan deman de, mirov temenê wê fahmkirina xwe di afirêne. Mirov, ku hê ku pitik e, tişte ku di bîne pêre di mejiyê wê de bicih dibe. Lê hê ne bi têgihîştin e. Ku kengî bi têgihîştin kir, wê êdî bi bîr bike. Ji ber ku hê ne bitêgihîştin in, êdî ew dem çendî ku ew dihildê di sere xwe de ji, pêre ne bi têgihîştin in. Lê pêre hene. Ew nerînen ku dike, hemû jî, di xêve wê deme me ye zarotiyê de heya. Zaro, di wê deme xwe ye berî ku were û bigihê wê deme xwe ye wê êdî bi têgihîştin bibîne û fahmbike, wê hate ku were wê deme xwe ye pêşketî, wê pir demne pêşketinê bi buhurêne. Mirov, hewirdora ku di bîne, ku bi wêne bê û bi jîndî bê, wê bi pê re, wê cih bigirê û wê temenekê ji wê pêşketine wê biafirêne.

Ku zaro, hate wê deme xwe ye gihiştî, êdî wê karibe, bifahm bibîne û fahm bike. Bi wê re, wê êdî pê re têgihîştin pêre bibe. Têgihîştin, wê piştî demên pêşketinê ên bifahm dîtîn û fahmkirinê re wê bibe. Têgihîştin çiya? Têgihîştin, zanîna me fahmkirinê û dîtîne ya. Ku mirov, li dora xwe nerî, wê bi wê nerîne xwe re wê dora ku lê nerî, wê nas bike. Ew naskirin, wê êdî ew wê ji bîr neke. Ku piştî, ji wir here dereke din û were wir, ku piştî wê dîtina xwe re, ku hat û ew dera ku berê dîtîbû ku dît, wê bêje “min evder berî nahaka dîtîbû”. Ev rast e. Wî berê dîtîbû. Ew cara duyemîn e ku dibîne. Bi wê re têgihîştineke wî çêdibe. Ew têgihîştine wî çêdibe. Ev, bûna têgihîştinê e bi dîtîn û nerîne re ya. Têgihîştina bi fahmkirinê re jî, e ku mirov wê bi awayê ku fahmkirinê bêne ser ziman. Ku mirov fahmkir, wê zanînaka bi me re çêbibe. Ew zanîn, têgihîştin e. Mirov, ku karek da ber xwe bo kirinê, mirov ku ew kar kir, mirov wê fahm bike ku mirov ew kar kiriya. Ew zanîna me, têgihîştina me ya fahmkirinê diafirêne. Fahmkirin gava yekemin e. Zanîn, gava duyemîn e. Têgihîştin jî, ji ber ku ji zanîne ya, gava sêyemîn e.

Di derbarê xwezayê de, mirov karê pir tiştan bêne ser ziman û vebêje. Mirov, karê bahse zevî û daristanan bike. Ev awayekî xwezê ya. Mirov, karê bahse hewirdora xwe ye ku mirov têde û di nav dijî bike. Ew jî, xwezayê mirov e dora wê ya. Mirov, karê bahse xweza mirov bixwe ji bike. Xweza mirov jî, bi şaxsiyet û keseyetiya wê dihê hole û diafirê.

DARISTAN, ÇIYA Û ZEVÎ

Daristan, çiya û zevî, awayekî xwezê na. Di vê xwezê de, pir jînda dijîn. Di wan jînda de, her cûrayê jînda ku mirov dibîne di nav de heya. Ji çûkan mirov karê bigrê hate ku mirov digihê bazkûvî û hwd. Ev hemû di nav de dijîn. Lê xosletekî wan jîndayên ku di nav wê xwezayê de dijîn heya. Ew ji, ne ahl û kedîbûna wan e. An jî, bi gotinaka din, barrîbûna wan e. Barrîbûn, ji her ajal û sawalên ku di nav daristanan de dijîn û ne hatina ahlkirin û kedîkirin re dihê gotin. Barrîbûn, ji sawal û ajala ne kedî re dihê gotin. Lê weke ku di kurdî ku her sawalak û an jî ajalak ku di vê qadê de ji wan re navna teybet hatina ser ziman hene. Mînaq; deme ku em bahse bazkûvî dîkin, em dizanîn ku em bahse bizina çoli dîkin. Ku bizin, ne malî bê, jê re colî jî dihê gotin. Kurdên berê, ev gotin pir bikar hanîn e.

Lê ji nave bazkûvîyê mirov fahm dike ku ew ne kedî û barrî ya. Bi ser nave wê de pêveka “kûvî” hatiya kirin. Ew pêvek, wê dike barrî, ku ne ye malî ya. Lê gotina barrî jî, çendî ku di kurdî de gotinaka gelemper bûya, ewçendî ji, aliyekî wê teybet ji hebûya. Mînaq; ne tenê, ji sawal û ajalên colî ên ne ahl û kedî re dihate gotin. Teyrên mazin, ên weke qaz û qulûngan, ji wan re dihate gotin. Teyr jî, weke ku çawa ku ji jî ajalên firek ên weke qazûkulûng, baz, sûsk, kew û hwd re dihate gotin. Lê deme ku teyr, dihate gotin, ji yên hinekî mazin re dihate gotin. Ji yên biçûk ku weke beytik, simbilbil, hacîreşk, tîfî, dîsotk û hwd re jî teyrîk dihate gotin.

Di nav xwezê de ev hemû bi hev re dijîn. Her ajal û sawal, dabara xwe ji dora xwe dike. Ji wê xwezayê ku di nav de dijî dike. Ew xweza, jê re, bi wan şînatî û şîntiyên xwe re wê temenê wê

diafirêne. Xweza, jî her teyr û teyrikan re û her weha her ajal û sawalên din re weke mal e jî. Têde bi hev re di xwezayekê de dijîn. Di wê xwezayê de, weke ku hevdû temem dikin dijîn. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew jî bi wê xwezayê û xwezatiya ku di nav de dijîn re xwediyê xwezê na. Mirov karê, wan weke qatek ji wê xwezê ji bibîne. Daristanek, têde pir ajal û sawal dijîn. Di demên berê de wilo bû. Lê î ro, ev yek, ne zêde wilo ya. Ji ber çi? Ji ber ku bireh hatiya guharandin û derfetê jîyanê ji gelek sawal û ajalan re nema ya ku têde bijîn. Wekî jî, ji, î ro, di roje me de, hin sawal û ajalên ku em tenê navê wan dizanîn hene. Heyîn û hebûna wan nîn e. Ev tuxmê wan ji jîyanê qûtbûya. Ev jî, bi wê guharîna wê xwezê e bi guharîna di birehê de ve girêdayî ya. Li Kurdistanê, em dizanîn ku di demên berê de, di wan daristanên wê yên pir gurr de, pir sawal û ajal dijîn. Di wê demê de şêr û pilingên ku dijîn, î roj tenê navê wan heya. Bi ji holêrabûna daristanan re, ew ji windabûn. Ên ku ji herêmê goçî (barî) çihna din kirin, ji xwe êdf çûn. Ên ku bi goçî ji jîyanê bi tememî kirin, ji xwe, ew ji êdf windabûn û çûn. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku di demê de, di xwezê de pir guharîn bûna. Her guharîn jî, bi xwe re hinek tişt biriya. Em, vê yekê, î ro dizanîn in.

Ajalên malî, ên ku di malê de ji bo mirov ku pê dabara xwe dike na. Di malê de çêlek hene. Mirov ji wan şîr digirê. Meh û baz hena. Ew ji, ji wan ev yek dihê kirin. Meh, bi hirîya xwe ji, ji aliyekî di didabirinê. Mirov, ji wê hirîyê ji xwe re ji mala xwe re tiştên li xwekirinê û têde jînbûnê çêdike. Kulav, ji hirîyê têne çêkirin. Deme ku şivan diçina ber sawêl ji bo ku karibin li bersermê bisekin in li xwe dikin. Ji malê re jî, merş û mahfûrên ku dihêne çêkirin, ta û bênen wan ji wê hirîyê dihêne çêkirin. Bi vê yekê re jîyan, dihê berdeyam kirin. Di demên berê de, ev yek, pir di hate kirin. Bi wê, mirovan jîyane xwe ava kiribû. Mirov, karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman û bêje.

Kurdistan, waletekî ku pirranîyên wê, daristan û zevî ya. Î ro, di roje me de, ji wan daristanên wê, wilo zêde neman na. Lê di demên wê yên berê de, ev yek pir bû. Dora çiyayê araretê û şîpanê û axletê û hwd, hate ku mirov dihê ber çiyayê cudî û gabarê wanderan, mirov rastî, rêzeçiyayan dihê. Rêzeçiyayên Kurdistanê, ji herêmê Dersimê bigirê hate ku dihê araretê û ji wir hate ku dihê çiyayên şîpan û axletê û ji wan jî hate kuu dihê çiyayên cudî û gabar û hwd, mirov rastî wê dihê. Lê ê gelek çiyayên din ên Kurdistanê hene. Ew çiya, hemû xwezayê Kurdistanê dihêne holê û ser ziman. Ku mirov bahse çiyayên Kurdistanê bike û bahse çiyayên Zagrosan neke, wê nebe. Çiyayê Zagrosan, başûr, bakûr û rojhilatê Kurdistanê bi xwe re digihêne hevdû. Ji ber ku çiyayê Zagrosan deştên wê pir avîbûn û bejên wê pir bi parastin bûn ji bo mirov, li wir ji her derên din zûtir jîyanê des pê kiriya. Ji ber vê yekê, dihê gotin ku Zagrosan, cihê herî pêşî ê ku mirov têde bicih bûya û dest pê kirina jîyane xwe daya dest pê kirin. Mirov, karê wê aliyê xweza Kurdistanê, pir baş biderfet ku ji jîyanê re bêne ser ziman.

Kurdistan, welatekî hem avî û hem jî daristanî bû. Bi vê yekê, derfetên jîyanê lê pir bû. Her çemên pir mazin ên herêmê Diclê û firat jî, bi wê heyîn û hebûna xwe re, derfetekek di afirênin. Di demên berê de, çemên diclê û firatê jî pir bilind bûn. Dora wan jî pir mazin daristan bû. Bi teybetî jî, dora Diclê pir mazin bi daristan bû. Daristane pir gurr, mazin û bilind hebûn. Têde, pir sawal û ajalên ku mirovan ji bo jîyane xwe ku diçûna wan û ew neçîr dikirin hebûn.

Bi vê yekê, mirov karê bahse xweza Kurdistanê bike û heyîn û hebûne wê bike. Bi vê xwezayê xwe re wê xwezayê Kurdistanê, ji jîyane re li Kurdistanê, derfeteke mazin ji pêşketine wê re da nişandin. Mirov karê vê yekê bi êmin û bi rehetî bêne ser ziman û bêje. Derfetên jîyanê û jîyandinê, her weha mirov karê bêje ku bi xwezê re hebûn. Ji xwe, xweza, hertimî ji jîyane me re temenekî wê yê pir mazin heya. Mirov divêt ku vê ji bi teybet bêne ser ziman. Kurdistan, bi wê di nav xwe de pêşketiya. Wê xwezê, jîyane Kurdistanê pêşxistiya û pêşve biriya. Li ser xwezayê Kurdistanê ku mirov disekinê, mirov awayekî jîyanê têde, ku ne tenê bi jîyane mirov re dibîne, mirov bi wê bixwe re jî dibîne. Bi jîndayên di nav wê de dibîne. Di jîyanê de, hevgirtineke xwezayî bi wê jîyane xwezê û jîyane mirov e ku pêşketiya re hebû. Temenê wê jîyane mirov, ku mirov wê bêne ser ziman, mirov wê, ji wê heyîn û hebûnê dûr neyêne ser ziman.

Weke mijareka sereke û pir mazin, ku mirov jîyana mirov jî bêne ser ziman, mirov wê heyîn û hebûna xwezê di serî de bêne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov wê, wê êdf hem jîyane mirov û hem jî wê di rûmetiya wê de bênine ser ziman. Jîyane mirov e li Kurdistanê, xwediyê pêşketineke mazin e rûniştî e dîrokî ya. Wê awayê jîyanê bi wê pêşketine xwe re pir demên mazin ên dîrokî buhurandina. Ji ber vê yekê, ku mirov here destpêka wê pêşketinê, divêt ku mirov ji destpêka dîrokê bi dest hanîna li ser ziman bike. Ev yek, weke rastiyeka wê ye ku wê were li ser ziman ji bê. Jîyan, di xwe de dem bi dem pêşketiya. Ku mirov li Kurdistanê wê pêşketin bi jîyanê re bêne ser ziman, divêt ku mirov ji gelek aliyên ve bêne ser ziman. Ji aliyê dîrokê, civaknasiyê, hizirê û dîroke wê û hwd(.) ve, bêne ser ziman. Lê emê di çerçova mijare xwe de tîne bi awayekî sereke, hem bi sînor bi mênin û hem jî bênine li ser zimên.

Xweza, heyîn û hebûne wê, mirov karê wê li berçav bigirê. Xweza, li Kurdistanê, ji ber ku pir li pêş bû, êdf serweriya wê ye li jîyane mirov jî hebû. Ku mirov dice demên berê zayînê, mirov dibîne ku çandinî û nêçirtî, mirov dibîne ku wa li pêş e. Karîna dabara xwe kirin, di jîyane, weke heyîne teybet e ji teybetmendiye mirov dihê hasibandin. Mirov, ji wê demê ve bîdest pêşketine xwe dike. Pêşketine mirov, bi vê yekê, di wê xate li berdiclê û firatê de pir mazin derketiya pêş. Ku mirov bahse pêşketine herêmê bike, nabe ku bahse dîroke wê neke, ku mirov bahse dîroke wê jî bike, nabe ku mirov bahse wê pêşketine wê ye rûniştî neke. Her weha bi hev ve girêdayî dihê hole li berçav. Ji ber vê yekê, deme ku mirov bahse wê bike, divêt ku mirov, ji demên berê hildê dest û bêne ser ziman. Civakaka weke civaka kurd, ku xwediyê dîrokeke ku pir demdirêj û dûvdirêj e, ku ew demên wê hemû, bi pêşketine wê re newine li ser ziman, wê di fahmkirina wê û pêşketine wê de kêmbûn bibe. Wê, bi tememî fahmkirin nebe.

Demên berê ên jîyanê Kurdistanê, demên wê yên pêşketinê ku li dûv hevdû hene. Mirov divêt ku wan ji li berçav bigirê û bêne ser ziman. Civake kurdan, dîroka wê di vir de, mirov divêt ku li ser bisekinê û wê bêne ser ziman. Civake civakatiyê ye kurdan, wê û pêşketine wê hate deme sumeriyên diçêt. Her weha xwediyê dîrokeke ku pir demdirêj û dûvdirêj e. Berî ku mirov dîroke wê fahm bike û bêne ser ziman, bi xoslet û teybetmendiye wê re mirov divêt ku heyîn û hebûne civakê fahm bike û bêne ser ziman. Civake kurdan, civakeke kevneşopî ya. Awayê xwe ye hemdem jî, di wê xate xwe ye pêşketine xwe ye bi kevneşopî de derxistiya holê. Demne pir dirêj û li dûv hevdû bi wê kevneşoptiya xwe re jînkirina. Mirov karê wê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Di wê kevneşoptiya xwe û xate wê ye ku pêşdiket de, demên xwe ye pêşketinê buhurandina. Bi vê yekê re, weke xoslete sereke, mirov karê jib o civake kurd, bahse kevneşopiyê bike. Dîroke wê kevneşopiyê ji heya. Ew ji, divêt ku ser xwe were ser ziman û fahmkirin.

Civak, di awayê xwe pêşketinê de, xwediyê xwezabûneka xwe ye bi xwe re ya. Di xateke xwe ye pêşketinê de, ew pêşketine xwe daya kirin û berdewam kirin. Bi vê yekê re, di vir de, em xosletek duyemin bi kevneşopiyê re ye pêşketinê ye civake kurd kifş dikin. Ew jî, her weha di xwezabûna xwe de bi herîkîna xwe ye di demê de pêşketine xwe ye di nava xwe de ya. Civake kurd, xwediyê hinek teybetmendiye xwe yên ku mirov bi cudatî û cûretiyên pêre bêne ser ziman e. Bi vê yekê re mirov xoslet û teybetmendiya wê ye sêyemin ye sereke kifş dike. Di demên wê yên pêşketinê de, di awayê wê ye jîyanê de bi wê re dudimentî û an jî ku mirov karê bêje ku sê dîmentî pêre, ku bi wê kevneşopîya wê re ku xwe bi rê ve dibê dihê hole û mirov wê kifş dike. Pergala civakî e ku heya, di wê xwezatiya xwe de di rêya xwe de dimeşe. Lê di vir de, deme ku me bahse pergale civakatiyê kir, nabe ku mirov bahsê neke, ku cih û weyne kevneşopîyan çiya di birêvebirinê de. Di nav civake kurd de, weke çîna serwer û bilind û ya banî "Mîr" hebûn. Mîran, civak bi rê ve dibir. Lê ye ku mîr jî bi rê ve dibir jî, kevneşopî bû. Mîr jî, ne dikarî ku derketa dervî wê kevneşopiyê e ku hebû di civakê de. Kevneşopiyên ku weke destûrabingehîne civakê na, di birêvebirinê wê de xwediyê weyneke mazin ye dîrokî bûn. Mirov, bahse heyîn û hebûn û her weha awayê civake kurd e demên berê bike, divêt ku mirov bi teybet bahse vê yekê bike. Bi vê yekê re, heyîne mirov e şaxsî, heyîne wê jî di vê çerçovê de dihê ser ziman. Mirov, di vê çerçove û heyîne û kevneşopî û wê heyîne xwezayî e berdewame wê de xwediyê jîyane xwe ye ku di nav wê de daya avakirin e. Jîyane mirov e di nav civakê de, bi wê kevneşopiyê heya û li ser lîngan e. Mirov, andamê wê koma ku ew di nav de û di nav civake de dijîya.

Di civakeka kevneşopî de, pêwendî û berpirsîyera mirov ye sereke ew e, ku jîyane wî bi wî re li gor wan nirxên civakî bê û ava bê. Di wê de, girêdanbûna wî ye bi kevneşopîyê re, weke nirxekî sereke ê pêşî ya. Di demên berê de, di nav civake kurd de jî, ev yek wilo bû. Di deme Gûtîyan de, ev yek wilo bû. Di deme Gûtîyan de, kom bi kom civak hatibû bi rêxistin kirin. Li ser mirov û koman re kevneşopî û nirxên wê yên ku pêve girêdanbûn hebû, li pêş bû. Gûtîyan, weke ku hate roje me hatiya di nav kurdan de, civatên xwe de li dardixistin û têde biryarên giring didan. Mirov jî, bi tene serê xwe ne dima. Ew ku çi biryar bihate girtin, wê ew jî tabîf wê ba. Wê lê xwedî derketiba. Bi vê yekê re, wê di nav koma xwe de û an jî bi navekî din wê di nav êle xwe de derketiba pêş. Êlbûn, di nav kurdan heya. Lê êlbûn, weke meneke bin wê heyîne kevneşopî en bingihîn bû. Di bin wê de dijî. Têkiliya mirov û komê, wê bi kevneşopîyê û piştre jî wê bi kifşkirina mîr re ba. Di nav komê de mirov, xwediyê malbate xwe bû. Malbat jî, bi kifşkirinên ku wê pêşketine wê didana kifşkirin re hebû. Malbat, heyîne wê, bi kevşopîyên wê yên ku ji destpêkê we hebû. Mirov karê vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Di nav kurdan de malbat, heyîn û hebûne wê, bi nirxekê dihê ser ziman. Giringiya malbatê ye ku ew didinê de, dike ku mirov di vir de, bi xwe malbatê hildê dest û wê bêne ser ziman. Bi wê girngiye ku ew didinê de, ev yek weke pêdivîyekê jî ya. Malbat, giringiya wê, jî wê nirxtiya wê ye ku bi wê dihate ser ziman bû. Kurd, jî ber ku demeke dirêj, di rêveberiya xwe ye giştî de bêpar man, her weha êdî ew valahî, wan di nav xwe de di malbatê de da tişkirin. Bi vê yekê, mirov divêt ku malbatê mazin fahm bike.

Di civakê û pêşketine wê de, rêveberî û rêveberbirin, aliyekî wê ye ku bi teybetî di rênîşana wê ş birêvebirine wê de wî bi awa dike ya. Mirov karê, rêveberîyê weke xalekê teybet bêne ser ziman. Li Kurdistanê, mirov nikarê bêje ku rêveberîyê kurdan nîn e. Ji demên berê ve jî heya. Ji du aliyan ve, ew rêveberîya wan dihê holê û li ser ziman. Awayek, bi kevneşopîyê û nirxên wê yên demî re ya. Awayê din jî, bi wê re bi mîr û rêveberiyên wê ye wisa şênber re dihê holê û berçav. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku zanîna civaka kurd, di wê de kevneşopî û mîrtî, weke ku xaleke ku di demên berê de hevdû temem dikin bûn. Deme ku mîr dibû mîr, wê tiştê ku jê bihate xwestin, baweriya wî ye li kevneşopîyên wî, bi rêvebirinê wan, karînakirina pêşavantiyê ye jî aliyê wî ve û her weha di demê de xwe bi zanebûn û têgihîştine demê re bi awakirî, jê dihate xwestin. Mîr, ev yek dide kirin û nişandin. Di deme ku ew mîr dibû mîr, wê di deme wî ye pêşî de, tenê ew li berçavan bê û wê xûy, tevger û gavavêtinên wê bêne dîtin û parzînanî. Di deme lê nerînê de wê wî, daba nişandin ku ew mirovekî bi zane ya, têgihîştine wî ye mîrê berê ne kêmtira, karê birêve bibe, di deme axiftinê de karê mirovên zanê ên di civate xwe de li xwe bide hisandin. Ev xal, weke xalna ku wê wî, di wê deme de daban kirin bi xwe re. Ku ev pêkhatin, hingî wê ew weke mîr bihate dîtin. Lê di vir de, tiştêkî giring hebû, divîyabû ku mirovên kal û pîr pêşî jî wî gotiba mîr. Ku kengî, wan got, êdî wê jî wî re bihate gotin. Bi vê yekê re, wê êdî ew bihate herêkirin jî aliyê hewirdor û mirovên li dora xwe ve.

Di civaka kurd de, cihê mîr, weke mirovekî, pîr giring bû. Hem jî aliyê şaxsiyeta wî ve ew giring dihate dîtin û hem jî jî aliyê rêvebirbirine wî ve giring dihate dîtin. Çendî ku wî li kevneşopîyên xwe meyîzendiba û rêz û hürmet daba mazinên xwe yên di nav civakê de, wê ewçendî jî ew jî bi hate herêkirin jî aliyê hewirdora wê û civate wî ve û wê rêz û hürmet jê re jî bihate nişandin. Ev xal, her weha xaleka giring bû. Ku bahse, mîr dihê kirin, weke dagariyaka mîrtîyê û mîrê herî mazin, mîrê bota dihate dîtin. Di nav kurdan de, cihê wî giring bû. Ew jî her aliyê ve û jî her derê ve dihat nasîn û naskirin. Vê yekê, mirov divêt ku bi teybet bi wî û navê wî re bêne ser ziman. Civake kurd, jî ber ku civakeka kevneşopîya, wê rêveberiyên wê jî, di wê astê de bihate jînkirin û ser ziman. Mirov, wê rêzeke mazin jî wan bida nişandin. Kurd, ku mirov weke çineka rêveberiyê ya wan bêne ser ziman, mirov wê sê komên giring bêne ser ziman. Komek, mirovên kal û pîr bûn. Koma din ye duyemin mîr û oldar û her weha mirovên weha bûn. Weke komaka din jî, mirov karê navê kevneşopîyê weke ye komek mirov bêne ser ziman û binavkê.

Mirov, jîyane wî ye di nav civakê de, di vir de, mirov divêt ku bêne ser ziman. Mirov, di nav civakê de, weke ku li gor nirx û pêkên civakê bi nirx dijî. Demediketa dervî wê. Mirov, di vir de, dîroka wî ye pêşî ye ku mirov wê bêne ser ziman, bi teybet ku li Kurdistanê bê, mirov divêt ku hinekî bi teybet li ser bisekinê û bêne ser ziman. Mirovê li Kurdistanê, di serê xwe de bi

kevneşopîya. Lê bi wê re jî, di serê xwe de bi zanebûn, xwediyê cihaneka teybet ye xwe ya. Ew cihane wî, ku mirov wê bahse wê neke, mirov wê nikaribe bahse wê dinya civake kurd bike û wê bêne ser ziman. Di vir de, ew tehere di naqabîna van herdûyan dinyeyan de di wî de, wê temenê pêşketine civakê kurd bi teybetmendî û xosletên xwe re bêne ser ziman. Mirovê kurd, cihane wî ye di serê wî de, xwediyê kifşkariyeka wî ya di jîyane wî de ya. Mirov divêt ku vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Ku mirov vê xalê bêne ser ziman, jî aliyê civaknasiyê û deroniyê ve jî, mirov wê bibîne ku wate wê heya. Di vir de, emê hinekî dî ji bi wir de herin û bêjin ku ziman jî, giringiyeka wê di vir de heya. Di afirandina wê(ziman) de, wê kompleksên wê cihanê di awa û avakirina xwe de bike temenê konsantrabûna xwe ya zimên. Bi vê re, wê ziman, heyîna wê were ser ziman. Lê ew cihane mirov e ku heya, ew di vir de divêt ku were ser ziman. Ew beşek jî beşa zanîna civake kurd jî bingihîn diafirîne. Kevneşopî, ku were fahmkirin, wê bê vê newe fahm kirin. Kevneşopî, wê bi wê re, were fahmkirin. Teherê ku mirov jî gelek aliyan ve fahm bike, di naqabîna wê cihane hundurê mirovê kurd û wê kevneşopîya wê de bi jîrî heya. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku kevneşopî, mirovê civake kurd ê herî navdar bû. Divêt ku mirov wê gotinê bêje. Ji ber ku karibin, wan zanist û filozofên kurdan ên wan demên berê ku navên wan di wan civatên wan de maya û derneketiya û li demê û dîrokê bi mohr nebûya, bînina ser ziman. Aliyekî wê teheriya ku me hanî ser ziman, di vir de, xwe radixe li berçav. Di nav civakê de, jîyangerî û pêşketinên ku di hatina li ser ziman de jî di civatan de, weke "hizrên civatê ên civakî" dihatina li ser ziman.

Civak, ku em gotina wê dihênine li ser ziman, weke pêşiyê me kurdan hanîya li ser ziman, "alîyek jî yê wê gotinê hizirî ya û aliyê dîn jî mirovî ya." Her weha ev gotin dihê li ser ziman. Lê di nav civakê de, gotina civakê, jî dêla wê gotina xalkê jî hatiya bikar hanîn. Gotina xalkê, ew tehere wê ye bi herîkîn e di demê de li gotina civakê e bi pêvajoyî, wê temenê wê diafirîne û dike ku were holê. Di nav civakê de, gotina jî komên di nav civakê de dihê gotin "ji nav xalkê" û jî mirovên di nav civakê de bi dana nişandinê re gotina "wî/wê xalkê ha", her weha gotinên vê pêvajoyê ên ku afirîne û derbasî deme me bûna. Têkiliya ziman û kevneşopîyê e bi hev re, mirov divêt wê bêne ser ziman. Dem bi dem gotinên demî hene. Ew gotin, her gotin di çi rewşê demê de afirî, di lêker û kirde xwe de, hinekî jî wê hizre kevneşopî bi awayê wê re di xwe de bi xwe re dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, têkiliyek bi wan re li hevdû heya. Ziman, bigotinên xwe re, wê kevneşopîyê û temenê wê li ser ligan dihêlê. Di aslê xwe de, bi vê yekê re, temenê wê heyîn û hebûna civaktiyê jî diafirîne û wê li ser ligan dihêle û bi pêş dixê.

Di nav civakê de, zanîna wê ye ku heya, bi zimên diafirê û mayinda dibe. Ziman, pêşketine wê, pêşketine civakê ya. Di vir de, mirov karê wê yekê bi teybet bêne ser ziman. Li ser zimên re têkiliya mirov bi hizirkirina wî re bi heyîn û hebûna civakê û pêşketin û pêşxistina wê re heya. Ziman, pergaltîna jî. Lê ew pergaltîna zimên, mirov nikarê jî ya civakê û jî himê wê dîr û bi tenê bêne ser ziman. Di vir de, têkiliya wan bi hev re heya. Ku mirov, wê yekê fahmnekê, mirov wê nikaribe, civakê û wê pêşketine wê bi pêşve bibe. Hizirkirin, ku pêşket, êdî wê civak, jî gelek aliyên xwe yê dîn ve pêşxist. Pergaltîna afirand. Hizir û arîşentî bi hev re ku bû, êdî temenê civakê ê hevgirtina wê bi pêşketin û pêşxistina wê re afirand. Di vir de, ku mirov bahse arîşentiyê bike, di cih de teolojî dihê bîra me. Em wê bi bîr dikin. Di mijarên me meyên piştre de, wê ev mijar bi teybetî bi serê xwe re were ser ziman. Di vir de, têkiliya wê di vir de, bi gotinekê jî bê, mirov karê wê bêne ser ziman. Nirxbûn, wê hem bê him jî bûna gîyanê di û hem jî wê jî aliyekî ve jî wê jî bê. Gîyane civaktiyê, di vir de, wê pêşketine wê bi pergaliya wê re di yekperetiyekê de bi pêşve bibe. Gîyan, aliyekî nirxî ê mirov e. Di jîyanê de, bi komê re, wê bê aliyekî komî ê nirxî jî. Bi xalkîtiyê re, wê bê aliyekî nirxî ê xalkîtiyê. Bi civakê re jî wê bê aliyekî nirxî ê civaktiyê. Hizir, bi têngihîştine xwe ye olî re, wê aliyê bi teybet bi pergaltîna dike. Bi vê re, wê aliyê hem dike ku mirov bi wê bi hevdû re hevdû nas bike û yatiya mirov ye civakî diafirîne. Yatiya mirov, pêşketine wê ye pêşî ye komî ya. Yatiya mirov e dûvre ye xalkîtiyê ya. Yatiya mirov ye dûv wê re jî, ya civaktiyê ya.

Mirov, jîyane wî, wê di nav civakê de, bi van nirxan pêş bikeve. Wê malîti û malbatîtiya xwe li ser wan bide avakirin. Malîti û malbatîtiya deme civaktiyê, malîti û malbatîtiyeka bi nirx e.

Kurdan, demên xwe yên civaktiyê bi vê yekê, bêhtîrî kevneşopîyên xwe xal bi xal bi pêş dixin. Bi vê yekê re, ku mirov bahse kevneşopî bike, mirov karê bêje ku kevneşopîyên wan, pergala wan ye civaktiyê afrandiya. Lê dem bi dem ji, li ser wê pêşketinê welatbûn jî jînkirin. Ji deme Mîtanîyan, hate ku digihê deme Gûtî û û her weha di demên dawiyê de Şadadî û Merwanîyan, welatbûn avakirin a. Welatbûna wan ye di nava wan de, ku mirov li awayê pêşketine wan dimeyîzêne, mirov dibîne ku weke ku ew welatbûn ancama wê pêşketine wan ye demî ye wê kevneşopîya wan e. Wan, hertîştê xwe bi nîrxên xwe re di kevneşopîyên xwe re dana rûnandin û berdeyam kirin. Ku î ro, dihê pîrsîn û tê gotin ku ji ber çî ewqas kevneşopî û adetên wan hene, ku mirov bersive wê persê bide, ku mirov wê dîroka wan nizanibe, mirov wê bersiveka rast û pak nede. Weke ku me li jor hanî ser ziman, çawa ku di serê xwe de ew cihane xwe afirandina û dinya xwe ye derve li wê neqîşandina, herweha bi heman awayê nêzîkî li kevneşopî û nîrxên xwe ji kirina.

CIHÊ MIROV Ê DI NAV CIVAKÊ E

Ku mirov bahse civakê û heyina wê bike, di vê çerçovê de divêt ku cihê mirov ji were ser ziman. Di serî de, heyîn û hebûna mirov were salixkiirn. Mirov, ku xwe û cihê xwe naskir, di nav civakê û koma xwe ye civakê de, wê bêhtîrî were fahm kirin. Di nav civake kurd, de ku mirov bahse wê bike, divêt ku mirov hinekî bi teybet li ser vê yekê mirov bisekinê. Di aslê xwe de, mirov bi teybetî, ji demê berê hildê dest û bêne ser ziman. Ev yek jî her weha giring e, ku divêt ku mirov wê bike.

Di dîrokê de, ku mirov li pêşketinê dimeyîzêne, mirov dibêne ku bi vir ve, xate pêşketinê tê û pêşketin û pêşveçûn dibê. Ji bo kurd û civake wan ji her weha ev yek wilo ya û giring e. Lê ku mirov li dîrokê meyîzêne û civakê kurd dem bi dem bêne ser ziman jî, di vir de mirov hinekî zorê ji dikişêne. Ji ber ku xwediyê dîroka ku pir demdirêj in û di derbarê wê dîroka dirêj e ku divêt ku ji her aliyê ve were ser ziman, em ne wilo zêde xwediyê zanebûnêka tememî na. Di derbarê pêşketine civake kurd e demên berê de, lê em xwediyê heyîne têgihîştine, ku em wê jî bênine li ser ziman, wê di derbarê wê dîroka wan emê bine xwediyê zanebûnêka mazin. Dîrok, di hanîna li ser ziman de bi e bi xalk û civakê re, rêvebertî û serwertiya bi vê hertimî weyn leyistiya ku were ser ziman. Ku mirov di dîroka kurdan meyîzêne, mirov vê yekê jî dibîne. Lê di her xal û dera wê de kevneşopî derdikeve pêşiya, ku em bi wê û wê bênine ser ziman. Di vir de, di aslê xwe de, kevneşopî, jîr û têgihîştina civakê dihêne ser ziman. Di deme xalkîtiyê de ji, jîr û têgihîştina xalkîtiyê dihêne ser ziman.

Bi vê yekê re, mirov karê ji vê peragrafa xwe ye ser vê bide berdeyam kirin û vê peragrafa xwe bêne ser ziman. Em ji kevneşopî di vir de hinekî bahs bikin. Ji wê û wê jîr û têgihîştina wê ye ku ew bîreweriya civakî diafirand, mirov wê bi wê re wê fahm bike. Bi vê yekê re, mirov wê cih û warê mirov ji di vir de baş bi wê re fahm bike. Lê mirov di vir de, bê ku çavêkî ku felsefe civakê e ku pêşketiya bixe, mirov wê baş vê xalê ji fahm neke. Jîr û têgihîştin, aliyê pêşketinê ê bi pergala civakê dihênine li ser ziman. Di vir de, mirov karê ji wê gav biavêje û bêne ser ziman. Mirov wê di vir de, wê xalê pir baş û qanc fahm bike.

Kurdan, kevneşopîyên weke kêvalbarna nivîskî û hatina nivîsandin bi kar hanîn. Mirov karê bi vî awayê gotinaka din jî pêve zêde bike û weha bêne ser ziman û bêje, ku ew kevneşopîyên ku di serê xwe de pir saffikirina û bi rengkirina, ew jî bi awayekî weke rûpel bikarhanîna di serê xwe de û li ser nivîsandina. Bi vê yekê re, awayekî pêşketina wan ye di dîrokê de heya. Ku mirov li wê awayê pêşketina wan dimeyîzêne, mirov awayê wê yê jîrî xweza jî lê hatiya xwarin hatiya afirandin. Destana Gilgameş, çendî ku hê di deme xalkîtiyê de hatibê nivîsandin jî, têde nîşanêkê civaktiyê hena. Wekî din jî, ku mirov hinekî dîjî ku di wê awayê têgihîştin û jîre ku ew desta pê hatiya nivîsandin de, ku hinek peresendin bi ber me ve bûya û bi wê aste ku pêşketî nivîsandina destana Şahmaran heya. Destana Şahmaran, mirov karê bi êmin bêne ser ziman û bêje, ku ew destenaka destpêk û deme civaktiyê ye li ber Diclê ya. Mirov karê wê wilo bi teybet bêne ser ziman. Di deme ku mirov î ro jî, di diçê Nîsêbinê û Cizîrê, mirov hê jî wan nîşanêkê wê baweriya li Destana Şahmaran ku ji ya li oleka yek-yazdantî nekêmtira mirov dibîne û fahm dike.

Di aslê xwe de, ev destan û hê gelek destanên weke van ên ku weyne mirov ye di nav civakê û kevneşopîya wê de bidina kifşkirin in. Mirov karê ji wan vê yekê her weha pir baş û qanc fahm bike û bêne ser ziman. Gilgameş, Li welatê xwe Urukê dijî. Ew, ji dera ku lê dijî, di keve rê de ku were wê Cizîra bota e ku î ro heya û tirba Nebî Nuh ku bi navê wê demê 'Utnapiştîm' e lê ya, dike ku were wir. Ew, dike ku were wir û wî li wir bibîne. Li wir, wê wî bîne û wê jê dermanê nemirtiyê hildê û pê jîyaneka xwe ye sermedî pê de bide berdewam kirin. Bi vê yekê re, mirov fahm dike, ku jîr û têgihîştina ku di derbarê jîyanê de di serê mirov de bi pêşnûma bûya, mirov wê bi wê yekê dihêne holê. Gilgameş bixwe jî, li wê dermanê wê ye jîyane ku dijî ku wê hê zêde bijî lêdigrihê. Navê Gilgameş, ku mirov lê dihizirê, mirov dibîne ku girbûna weke gameşekê dihêne ser ziman. Gilgameş, girgameşiyekê dihêne ser ziman. Girgameştî, bilaş û mazinbûna xwe re û bi hêz û zora xwe re bihêzbûna weke wê gayekî dihêne ser ziman. Ga, di bawerîya li ber diclê de jî, nav e. Di kurdî de, wateyeka hêzî bi wê tê salixkirin. Di vir de di wê vegotinê de, hêzbûna bi wê re dihê salixkirin. Nêrtiyek bi wê re dihê ser ziman. Nêrtî jî, têgihîştinaka ku afirê e mîrtiyê jî di xwe de dihêne ser ziman. Di destana Gilgameş de, bi teybetî, cihê mîrtiyê hatiya li ser ziman. Bi vê yekê re, di wê heyînê de tekoşartiyak bi Gilgameş re jî bo pêşveçûnê heya. Gilgameş, keyek e û keyê Urukê ya. Ku mirov li vegotina destanê dimeyîzêne, mirov dibîne ku gundîfî û bi wê pergaltî pêşketiya û demeke xwe ye pêşketinê ye asteka bilind dijî. Lê ji wê astê buhurînak li civaktiyê û demê wê têde nîşanekên xwe dide nîşandin.

Destan Şahmaran, xwediyê çandaka mîyî ya. Ew çanda mîyî, di deme civaktiyê de ku civaktî pêşketiya û pergala wê avabûya û demeke xwe ye pêşketinê dijî, wê dihêne ser ziman. Şahmaran, bi wê çanda xwe re, nikarê li gor wê çandê civatî di nav awayê wê de bijî. Ji ber vê yekê, ew weke nîmînerê ye çandaka berî wê demê di têgihîştina xwe de di serê xwe de dijî. Deme ku ew mafê jîyanê jî wê ye di serê xwe de ne bînê, êdî ew xwe jî nav mirovan dîr dike û diçê û xwe diveşêrê. Bi vê yekê re, di aslê xwe de, çandaka jinî û an jî bi gotinaka nîrxên jinê dihêne ser ziman û gelemper e mîyîtiyê dijî. Li gor wê dijî. Ev vegotin fahmkirina wê, wê aliyekî wan kevneşopî û çanda kurdî bêne ser ziman û bi me bide fahm kirin. Di fahm kirina wê de ev pir giring e. Di vir de, di aslê xwe de dîroka ku were ser ziman heya. Ew dîroka heyîn û hebûna wê mîtiya jinî ya. Mirov karê wê wilo bêne ser ziman.

Di kevneşopiyê de kurdan, cihê mirov û jinê dana kifşkirin. Weke xal û zagonekê, xal û zagonên wê kevneşopiyê wê dihêne ser ziman. Herkesek di derbarê wê de xwediyê têgihîştina. Di nav wê kevneşopiyê û têgihîştina wê de, sê aliyên ku mirov bi teybet fahmbike hene. Aliyekê bi aliyê jinê ve di dîrokê de diharikê û dihê hate roje me. Aliyê dûyemîn bi aliyê mîr ve diharikê dihê hate roje me. Aliyê sêyemîn jî, bi gelemperî bi heyîna civakê re diharikê dihê hate roje me. Lê herdû aliyên pêşî, wê aliyê sêyemîn ê dawiyê ku di temenê wê de na, ji bin ve wê didina kifşkirin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov pêşî wan fahm bike.

Ji di wê xate di aliyê jinê de, ji dê buhurîna keçê û her weha berdewambûna wê heya. Ew, serweriyeka wê bi wê aliyê wê di nav civakê de heya. Mînaq, ku di nav civaka kurd de pir giring e û weke xaleke ku ne mîr û ne jin jê pêla nakê û ne buhurê, 'kevneşopîya hemawîyê' heya. Ku di nav kurdan de, pevçûnak bûba û an jî bi çî awayê ba ku hatina wan ye li ber hevdu ku ji bo levxistinê bûba, ku jin çûba û li nav wan herdû aliyên ku wê levxistban û ku ew hemawîya serê xwe jî serê xwe kiriba û avêtiba nava wan, wê ew ti carî êdî wan levnexistiba. Wê êdî di wê demê de, di cih de dev ji wê levxistina ye ku wê kiriban berdaban. Ku di lexsitinê de ban, wê dev ji levxistinê qarîya ban û ku hê bîdest levxistinê ne kiriban, wê êdî dest pê ne kiriban. Ew, ev weke xal û zagonaka pîroz e nav kurdan bû. Di her demê de wilo bû. Ahmedê xanê, Di "Mem û Zînê" de dihêne ser ziman, ku deme ku mîr û mem ketine berhevdu de, xatunek jî derve di cih de tê û di nav wan de disekinê û hemawîya xwe diavêjê nava wan û êdî ew dawiyê wê li berhevdu tiya xwe dihênin. Di vir de, hê ku dijberîyak dest pê nekirî dihê bi nawî kirin. Di vê kevneşopiyê de, têgihîştineka ku herkesek dizanê û ti kesek ku navê wî/wê çî bê û jî ku derê û jî kîjan koma civakê bê, heya. Lê herkesek jî, bi rêz û pêk in li ber wê kevneşopiyê. Di nav civake kurd de, di jîyanê de, ye ku jin di asteka wekhevîyê de dihêne ser ziman, ev kevneşopîya. Ku mirov vê kevneşopiyê zanibe, mirov wê nikaribe, bêje ku di nav civake kurd de, weke mîr mafekê wê yê bihêzî nîn e. Di

vê xate kevnêşopî de, weke herdû xatên din, bi serê xwe pergaltûnak, heya.Divirde, divêt ku mirov wan ji bêne ser ziman. Mirov, ku hinekî li ser dihizrê, mirovê ku bû, ji zaroktiya xwe hate ku mazin bû, dem bi dem cihê wê têde do wê kevnêşopîya wê de hatiya ser ziman. Di nav kurdan de di civake wan de, ku keç ji deme xwe ya zaroktiyê buhurî, êdfî jê zanebûnak û girenbûnek di gav avêtinê wê de dihê xwestin. Ew, wê di wê deme jîyane xwe de, êdfî wê girenbûnê bi zanebûna xwe re û di serî de bi girtina xwe re wê bide nîşandin. Di civakê de, zaroyên ku bûn, ew zaro "ku hinekî mazin bûn û hatina deme xwe ye ku karin êdfî fahm bikin =ku ew dem di naqabîna 5 û an jî 6 saliyê de dihê hasibandin=", êdfî wê bidest fêrkirin wan bê kirin. Ew wê êdfî fêr bibin. Wê, mirovên di nav civakê de wê ji wan bi berpîrsîyar bin. Lê deme fêrbûnê û destpêkirina wê, bi xwe re bi mirov re berpîrsîyartiyê ji dihêne. Her weha ev jî, hebû. Berpîrsîyartiya pêşî e fêrbûnê bû. Piştê li gor wê ye gavavêtinê bû. Ev jî, di civatan de dihate holê û lê nerîn.

Ji aliyê jinê ve, mirov karê di vir de hinekî bêne ser ziman.Civake kurd, di xwandina keçikan de, di demên xwe yê berê ên kevn de biheyîn bû. Keçkan di parastgahan de dixwand. Di deme Mediyane de ev yek hebû.Di deme Gûtîyan de jî û herweha ku mirov hinekî df ji biwirde herê, mirov wê bîne ku di deme Mîtanî û Urîyan de jî, ev yek hebû.Ev yek, weke kevnêşopîyekê hebû. Ji ber çî di civake kurdan de her weha ji aliyê mêr ve û ji yê jinê ve ku jev cuda du xatên ku bi xoslet û teybetmendiyên xwe re pêşdiket hebû? Ji ber ku dihate bawer kirin, ku jin jî û mêr jî xwediyê hinekî xosletên ku jevcuda na. Biqasî ku ew divêt ku bi wan xoslet û teybetmendiyên xwe re werine perwerdekirin, divîyabû ku di temenê heyîna civakê de bi perwerdebûnekê ku bitêgihîştinbûna heban. Her weha ev yek hebû. Bi vê yekê re, pergaltûnak hebû. Kevnêşopîyên ku em hasê wan di nav kurdan de, mirov ku li wan dimeyîzêne, mirov dibîne ku ji hin kevnêşopîyana wîrdetir û zêdetir xwediyê hinek awa û pêşketinna na. Mirov divêt ku vê yekê ji her weha bi teybet bêne ser ziman.

Ew kevnêşopî, ji ber vê yekê, deme ku mirov li wan dinerê, mrov dibîne ku weke statûqûya welatbûnekê di xwe de di nav civake ku têde hene de, weke ku bi hebûn bûn. Di vir de, du tiştî pir giring in ji wê bûna wan re. Yek, her weha ji ber ku demne pir demdirêj jîn kirin a. Ya din jî, ji deme sumerîyan mirov karê bigirê û bêne ser ziman û hate ku wê deme wan, dem bi dem demên welatbûnê ên pir demdirêj jînkirin.Mînaq, kevnêşopîyên Uriyan, welatbûna Mîtaniyan, Bûna welat û bi wê re jî derketina ast û rada împaratoriyê e Gûtîyan, Li gor ast û radayaka hemdemîya xwe jînbûna Naîriyan û Mediyane û hwd, ew hemû jî, pêvajoyên ku dem bi dem ku çend pêşketin û pêvajoyên li gor demên xwe cuda jî bin, ne ên ku ne di berdewamiyên hevdu de bûn. Vajî wê, pêvajo û demên ku di berdewamiyên hevdu de na. Her dem, ji deme berî xwe ye ku hatiya jînkirin, sentezbûnak têgihîştin û pêşketinê devrgirtiya û jînkirîya û pê mazin bûya. Mirov karê vê yekê ji her weha bi teybet bêne ser ziman. Demên pêşketinê ên weha ên bûna, fahmkirina wan, wê mirov di wê jîr û têgihîştine wê ye ku dem bi dem bi awayekî peresandinê heyîn û hebûna xwe daya berdewamkirin û bi vir de bi ber me ve hatiya, mirov wê fahm bike.

Ev dem, pêşketine wan û pêvajoyên wê yên ku jînbûna, di serê mirov de û bi teybetî jî di xêve mirov de, bi awayekî teybet xwe bicîh kirîya û heyîna xwe bi me re daya berdewam kirin. Ew pirtûkxaneyên ku î ro hatina avakirin û tiştî pirtûk in, wê kevnêşopîyê bi awayekî teybet e ku mirov divêt ku wê fahmbike, ew xêve me bi wê awayê bikar hanîya.Kevnêşopîyên ku di jîyane de dihatina jînkirin jî, bi tevger, xûy û hunerên ku dijîn re, weke mifteyên wê xêvê yên ku ew zanîn di jîyane û bi mirov re diparastin bûn. Her weha mirov karê wê bi teybet bêne ser ziman. Dibêt ku ev awayê pêşketinê, sedemêke wê ye herî giring e din jî, ew demên pir demdirêj ên ku hatina jînkirin bin. Divêt ku di vir de em careka din bînine ser ziman û bêjin, ku li ber Diclê û firatê, destpêkî pir kevn e. Ji ye ku em dîzanîn gelekî pirtîr û demdirêjtîr kevntîra.Demên pêşketinê ên ku bi kevnêşopî di mirov de û biteybetî ji di jîyane de hate ku bêne rûniştin û êdfî ku bigihîna wê ast û rada ku êdfî karin mirov bi wê heyîna xwe ye jîrî bi rê ve bibin, pir pêvajoyên jînkirinê bi ser ve çûnê dixwezê. Hê, di wan demên Mîtanîyan û Hûrîyan hate ku dihê û digihê demên Gûtî û Naîriyan, mirov karê bi awayê cidî û giren bahse wê heyîne kevnêşopî bike. Ev jî, weke birhanaka vê yekê dihê holê bi gotina me re. Î roje me, ku em li wan roj û pêşketinên wan rojan dimeyîzênin, em dibînin ku di asta xwe de bi hin awayna pêşketinê e jîrî ên xwe ne bin ye roje me

re dihê jînkirin. Di rêxistin û pêşketinê de ev yek wilo ya. Ew awayê welatbûn û îparartortiyayî jî ên roje me, weke hin kopiyên wan roje na. Kurdan, Ji demên piştî sumeriyayî ku hate ku dihê roje me, bi teybetî jî deme sumeriyayî ye duyemîn miro hildê dest û bêne ser ziman, Yek bi yek, deme Uriyan, Mîtanîyan û Hûrîyan, Gûtîyan, Naîriyan, Mediyan, Şadadîyan û her weha Merwanîyan û hwd, di demê de demên welatbûnê ên xwe ne weke hevdû jînkirin. Her demê cerbek û awayekî pêşketinê bi jîrî karîna ku bînin û dênin holê. Î ro jî, di deme Kurdistanê de, ku hê çendî ev yek baş ne hatibe fahmkirin jî, mirov karê heman tiştî jî bo wê jî bêne ser ziman. Ji ber vê yekê, di aslê xwe de, fahmkirina kevneşopîyên wan ên ku van pêvajoyan hemûyan bi jîrî di xwe de diparezên, wê me bigihênine wan pêşketin û awayê wan jî. Kevneşopîyan welatbûnê, bi teybetî xate aliyê mîr jî xwe re kiriya temen. Lê temenê wê li ser jîyanê ya. Û di jîyanê de, pêşketinên ku dibin, li ser wê aliyê kevneşopîyê e jinê heyîna xwe diafirîne û dide berdeyam kirin. Bi vê yekê re, di jîyane de hevdû temen kirin di vir de bi wan herdû alîyan re jî heya. Mirov karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Nahaka, li ser wê aliyê jîyanî sekin, bi serekê jî bê emê bikin. Lê piştî de deme duyemîn ya hanîna ser ziman ya van deman de emê bi dîrokê re dem bi dem divêt ku bînine li ser ziman. Ev yek, wê bibe. Aliyê jîyanê, di fahmkirina awayê pêşketinan de awayekî teybet e. Di aslê xwe de, ku mirov li pêşketinên demên dawiyê dimeyîzêne, mirov pir tiştên ku divêt ku bêne ser ziman dibîne. Bi deronî û civaknasî, jî jîyanê qûtbûna pêşketinê bi awayekî xwe bi kevneşopîya statûqûyî e rêveberiyê ve girêdayî ya. Ji dêla ku ew wê pêşketina li gor ye jîyanê bike, Ya jîyanê ku ser bi qusandinê maqaskirina wê û li gor wê hanîna wê ye li ser ziman, wê di demê de wê kevneşopîya statûqûyê bigihêne deronî û civaknasîyaka teybet ku ew di wê kevneşopîya xwe ye deronî de dihê holê. Ya ku êdî di jîyanê de bi du awayan şerbûn di naqabîna wan de dibe, ev herdû aliyên ku bûna na. Ku her dem, li gor wê pêşketine di jîyanê de xwenûkirin (reformkirin) kiriba, wê temenê wê kevneşopîya xwe ye statûqûyê jî wê bixwe jî holê rakiriba. B vê re jî, wê dem bi dem bi afirîna welatîyîya deme nû re, wê ye kevn li wê demê xwe ye berê maba. Bi vê yekê, wê welat, êdî bûba rêveberiyaka jîyanî e ku mirov têne bi wê rêveberîya wê ye ku rêzkarîyekê di nava sazîyên civakê de diafirîne ba. Wê êdî ne bûba xwediyê hemû tiştî jî. Ya ku di aslê xwe de, wê dike xwediyê hemû tiştî, ew kevneşopîya wê ye rêveberî e ku bi statûqû ku afirîya ya. Welat, bi di her qadê de bicihkirine kevneşopîya xwe ya statûqûfî re weke bîrdozîyekê heyîna xwe da berdeyam kirin. Ku mirov li welatên roje me bi pergalekê wan re gotinekê di vir de di derbarê wan re bi vê xalê ve girêdayî bêne ser ziman, mirov wê bêje ku ew bi bîrdozî dijîn, bê bîrdozî nikarin bijîn. Ew xwe wilo hîs dikin. Wê bîrdozîyê jî, komtiyên xalkî kirina temenê xwe de û dîroka xwe bi bûna wan re dide dest pê kirin û xwe bi wê bi gotin û temen dike.

Di vir de, emê wê vegotina li ser welatbûnê ye di vir de li berçav bigirin û bi kevneşopîya herêmê ew demdirêj re bi wê re li ser wê gotinekê bînine ser ziman. Ew gotin, wê awayê pêşketine wê jî di xwe de bi rastî bêne ser ziman. Ew kevneşopîya herêmê ye Kurdistanê e ku li ber diclê û firatê jîya ya, di demê xwe de digihêne rêveberiyê. Ew awayê rêveberiyê e ku wê xwe gihandiyê de jî, wê heyîna xwe bide berdeyam kirin. Lê wê jî demekê pêde, ew rêveberî, xwe bi tégihîştin bi afirîne. Wê vajî wê awayê wê kevneşopîyê û pêşketina wê, wê ku wê pêşketine wê bicerbjî xwe re bike hîm, wê bi awayekî ku mirov karê bêje ku bi heman awayê, wê hewlbide ku deronî û civaknasîyaka xwe bi afirîne û bi wê re, kevneşopîyeka xwe ye ku weke wê di wê xate dimeşe, lê ku cihê wê kevneşopîya berê ku heya, ku hewldide ku cihê wê bigirê wê biafirê. Bi vê re, weke ku çawa ku wê kevneşopîyê di xate xwe ye pêşketinê de xwe gihanda pêşketinekê bi awayê rêveberîya xwe re, wê rêveberiyê jîr û tégihîştina wê jî, hewlda ku xwe gihanda kevneşopî û xateka bi heman awayê ye weke wê di demê de. Di roje me de, welatîfî, tégihîştin û jîre ku diafirîne, li gor xwe hewldana şekl û awa dana wê, tenê ancama wê awayê pêşketinê ye ku di demê de afirîya ya. Weke ku wê kevneşopîyê xwe bi rêveberî kir, wê rêveberiyê jî xwe bi kevneşopî kir. Bi vê yekê, du awayên ku li ber hevdû sekin di demê de afirîn. Di demên piştî de jî, ye ku serwerî û serdestiya xwe di denezêne û afirîne û bi ser dikeve jî, ye aliyê rêveberî ku kevneşopîya xwe afirandîya. Ji ber ku bi kevneşopîya xwe ya statûqû, xwe gihandiya hêzê. Gihîna hêzê, wê kifşkarîyê wê dide kirin.

Di çerçova kevneşopîyê û heyîna mirov de, bi tşkiliya di naqabîna wan de heyîna wan dihê holê. Kevneşopî, di aslê xwe de, bi heyîna xwe re, ew xwediyê heyîneka hêzî e xwe ye jî. Mirov karê wê wilo bêne ser ziman. Di çerçova kifşkirina jînkirinê e li gor hin xal û zagona û bi wê tîgîhiştina ku bi mirov re diafirê, heyîna wê wê ye hêzî ji hîm ve dihê holê û ser ziman. Kevneşopî, bi xal û zagonên xwe yên ku hene re, tevger û xûyên mirov ên ku bi awayê heyîna xwe ye jîrî ku dide kifşkirin, heyîna û awayê pergala civakê e ku heya diafirêne. Her dem, awayê kevneşopîyeka wê heya. Lê her dem, ew awayê kevneşopîya wê li ser awayê wê berê berê bi awa û awa heya. Mirov karê vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Kevneşopî, di aslê xwe de jîr e. Ew jîre komî û an jî ye xalkî e ku heya. Di wê çerçove de, ku mirov bi vê gotina jîre bi wê re hinekî dî jî kur herê, mirov wê bîne ku demeke ku hatiya jînkirin û ew deme ku hatiya jînkirin, ku awayê wê bi nerîn û dîtina bi mirov re e dîtbar re ku bi wênebûya û hatiya wênekirin re heyîna kevneşopîyê awayê wê yê demî dihêne holê. Di jîyanê de, bi teybetî jî, ku mirov li Kurdistanê li jîyane xalkê dimeyîzêne, mirov pîrdîmetiya ku bûya û afirîya bi kevneşopîyê re mirov dibîne. Ye ku kevneşopîya kurdan hinekî kur kiriya û wê mayîndakirîya di deman de jî, ev yek e. Mirov divêt ku vê yekê her weha bi teybet divêt ku fahm bike. Di aslê xwe de, ye ku herî zêde zor ji ev e. Ya ku herî zor mirov wê fahm bike û bêne ser ziman jî, ev bixwe ya.

Hinekî jî mirov karê wê zorbûnê weha bêne ser ziman. Demdirêjîyê a jîyanê e bi wan re, pîrdîmentî bi wan re di kevneşopîya wan de di jîyanê de afirandîya. Bi vê yekê re, weke pergalka giştî e sereke û ku di bin wê de pergalkên biçûk ên ku di nav jîyane mirov de ên kevneşopî û bixûyan ku safî hene, mirov dibîne. Di vir de, weke ku me di serê vê şîrove û hanîniya xwe ye li ser ziman de, bahse sê beşên aliyê civakî ên kevneşopî kir. Aliyê jinî, mêrî û her weha ê giştî ku di deme xalkîtiyê de xalkî û di deme civaktiyê de civakî ya, me bahs kir. Ev alî hemû jî, bi hev re çendî ku hevdu bi hev re bi rê ve dibin, di xwe de serxwabûntîyeka wan ye bi xwe re heya. Ku mirov careka din, di vir de vegehihê hinekî li jor, û bahse wê aliyê jinê bike, mirov wê ji deme bûna wê ye ji zaroktiyê hate bûna wê keç û jîn û hwd, mirov dem bi dem hatîna wan ye ser ziman û bi xûybûna wan dibîne û kifş dike. Keçik, deme ku hê biçûk in, ji bo pêşketina wan berpîrsîyariya dê û bav, di vir de divêt ku binxatirî em bînine li ser ziman. Ji ber ku ev jî heya. Keçik, ku hinekî mazin bû, bi hewldanên bi wê re ên ku dê û bavê wê alî wê dikin ku ji aliyê mejî ve xwe pêş bixe, wê bidest karîna amedakirina jîyane xwe ye piştîre bike. Wê bi naqş û tiştên wê wilo hem bi fêrbûnê û hem jî bi kirinê, wê bidest amede kirina male xwe bike. Ku mazinbû û hate deme zeweca xwe, êdî wê ew kirinên wê hemû wê temenê male wê bimalî û malbatî wê biafirênin. Di civake kurd de ku î ro weke kevneşopîyeka ku di demên berê de ên kevn de pîr mazin hatiya bicih hanîn, perwerdekirina wê, divêt ku mirov bêne ser ziman. Ev jî, di derbarê wê de hin kevneşopî ên bi xûy û giştî hene. Emê hinekî ji wan ji bînine ser ziman. Ev wê perpektîfêkê ji me re ji roje me re bide çêkirin.

Bi teybet, jî dê û buhurîna keçê kevneşopîyeka bi pergala heya. Dê, di jîyanê de çî dîzanê û fêrkirîya û her weha fahmkirîya, wê bi keçe xwe re bi par bike. Bi wê yekê re, "ew berpîrsîyera dayikê e ku keça xwe ji jîyanê re bide amede kirin" ku kevneşopîya dihê bicih. Ji ber vê yekê ye, ku deme ku keçek di zewicê û an jî diçû deverkê, wê lê bihate nerîn û bihate gotin ku "ka em bibînin ku ka wê çî ji diya xwe fêrkirîya". Ev gotin, bi serê xwe kevneşopîyekê dihêne ser ziman. Ev kirin û xwestekên ku wê ji keçikê û dayika wê bihatan xwestin û kirin, bi nivîskî jî, bi qasî ku em dîzanîn hatina nivîsîn. Em vê yekê jî, fahm dikin. Bi vê yekê re, temenê malbatîtiyê dihê afirandin û parastin. Hate nahaka jî, pîr girîngî dana nîrx û kevneşopîya malîyê û malbatîtiyê ji ber vê yekê ya. Ji ye ku em î ro dîzanîn ji wê pîr û zêde bêhtirî, girîngî dana malîtiyê û malbatîtiyê di demê berê de bûya. Ev yekê, nahaka jî dîzanîn û hê jî, ew girîngî sih û bandûra wê di mal û nav malbatên kurdan de heya. Bi vê yekê re, mirov divêt ku beje ku cihê pîrek û keçê û bav û kur pîr baş û safî hatiya kifşkirin. Kî wê çî bike, hatiya kifşkirin, her kesek ye ku para wî dikeve jî, dîzanê. Her weha me çawa ku ji bo pîrek û keçê hanî ser ziman, wilo jî, ji bo bav û kur jî di buhurê û heya. Ew jî aliyê wê kevneşopîyê ê di ya. Mêr, hêze wî heya. Ew wê malê û malbatê wê ji herîş û xetereyên ku ji jî derve werin wê bi parezê. Wê tiştên ku ji derve werine kirin û bêne hanîn ji bo malê, wê kar û barê wî bê.

Bi vê yekê, mirov dibîne ku bi xal û zagonî, ku weke ku di temenê jîr û têgihîştineka civak de e destûrî de, kifşkirin hatiya kirin û hatiya bicih. Cih û warê mirov, ê di nav kom û civakê de, wesif û xwestên ku hem ji aliyê şaxsî ve bê û hem ji aliyê civakî ve bê jê werina xwestin hatina kifşkirin. Bi vê yekê re, herkesekî jî berpîrsîyariya xwe dizaniya. Zanebûna di vir de jî, weke jîrfiyeka mirov e ku di mirov de dihê dîtina a. Her weha dihê ser ziman jî. Mirovê ku berpîrsîyarên xwe dihêne bicih, rêze li wî jî zêdetira. Qadrê wî jî zêdetir heya. Zanebûn û li gor wê kirin, di vir de rêz û hûrmete li mirov dide kifşkirin.

Civak, ji bo heyîna û pêşketina wê, ziman û nirxtiya wê bi kevneşopîyê re pîr giring e. Di vir de, ziman, sînorê civakê û heyîna wê kifş dike. Ziman, weke laşê mirov ê ku tede pir ra hene û di wan rayan re xwûn hertimî diçê û tê û hwd, e. Têkiliya naqabîna bêjeyan de, wî rayê laşê salix dike. Bi wê re, ku mirov bahse kevneşopîyê dike, mirov bi wê re aliyekî di ê civakê dibînin û kifş dike. Ew ji her weha çand e. Çand, bi vegotin û vebêjinên ku hatinakirin û rewşê civakê ên li jîyanê ên ku hatina wênekirin re heyîna xwe diafirêne û bisalix dike. Bi gotina di jî çand, heyîna civakî e jîriya. Mirov karê wê weha ji bêne ser ziman. Di vir de, emê divêt ku hinekî di jî bînine li ser ziman, bi zimên û mirov û gelemperî bi civakê re. Ji ber ku di vir de, ev yek giringiyeka wê ye bi heyîna mirov re heya di çerçova wê cihê mijarê de.

Ziman, di aslê xwe de, di vir de di çerçova zanîna civakê de xwediyê heyîna û hebûneka pîr giring e bi wê re ye ku mirov wê kifş bike ya. Ziman, pêşnûmekirina awayê civakê e bi jîrî û dîtbarkirina wê ye ku wê bi wê dîtbarîyê biafirê kifş dike. Di vir de, ev giringiya wê heya. Ziman, di vir de, weke amûrekî pêşketinê e ku bi pêşve dibe ê bi tevger e. Peresendina di civaktiyê de ye di nav civakê de jî, di wê de ev heyîna û hebûna zimên giringiyeka wê dîrokî heya. Ji xwe, ev kevneşopîya ku me li jor pir baş hanî li ser ziman û emê hê jî pir bînine ser ziman, aliyekî wê ye pîr giring e heyîna diafirên bi heyîna xwe re. Di nava kurdan de, di wan civat û levcivînen wan yên ku wan di nav xwe de her şev dikir de, ew mirovên wan yên zane di hanîna li ser ziman de, hertimî hewldanaka wan ye ku ti carî bi dawî nebû ye xweşik axiftinê hebû. Ew zanistên civakê ên bê nav bûn. Di nav kurdan de, ji demên Mîtanî û harîyan û hate Gûtî û Naîriyan û ji wan de hate roje me, pir zanistên wan yên bi zanebûna pir mazinbûna hatina û çûna. Zanebûna wan, çend ku li şûn wan mabê jî, navê wan bi wê re nemaya. Ev jî, sedemeke wê ye bi wan civatan ve û bi wê awayê vegotina bi wan re girêdayî heya. Emê, di pêşîya me de bi teybet li ser wê bisekin in. Lê nahaka di vir de, di vê çerçovê de emê bahse hinekî vê aliyê wa bikin. Ji ber ku ev yek giring e. Weke mijareka zimanzanîya ku mirov li ser lêkolîn bike û wê kifş bike û bêne ser ziman, kurdan; ji deme sumerîyan, pir caran demne zimên ên nû di xwe de afirandina. Lê ji Deme Mîtanîyan hinekî bi vir de û deme Gûtîyan û wan de, êdî ew guharandinên bi awa û bigotina êdî nema kirina. Î ro jî kurd, hê awayê deme Gûtîyan ê ku pêşxistina bi hinek guharandinên mazin re dijîn û bi kar dihênin. Gramatika wan ye zimên, bi awayê xwe ye ku î ro heya, bi hinek guharandinan re hê heya. Guharandinên di zimên de, aliyekî wan ye pîr mazin bi yên kevneşopîyê ve girêdayî ya. Ev pêşketina zimên, jevneqût bii teheriyeka xwe ye dîrokî heyîna û hebûna xwe daya berdewam kirin. Herweha mirov karê ji bo kevneşopîyê ji bêne ser ziman. Ziman û kevneşopî, di çerçova civaktiyê de, du xizmên hevdu ên pîr mazin ji hevdu re hîm in. Di aslê xwe de, di vir de, ku mirov wê nêyêne ser ziman nikarê bi buhurê aliyekî di ji ê zimên û bi hev re û wê heyîne pêşketinê e kevneşopîyê kifş dike heya. Ziman, di kifşbûna xuyî ve tevger û her weha hunerên mirov de pîr mazin kifşkar e. Mirov, naskirina mirov e bigotinan re wê saffikirina mirov e bi mirov re e jîrî dihêne holê. Bi wê re, ziman, bi xêve mirov re di mirov de dinyeyeka mirov e ku diafirê diafirêne. Di demên berê de kurdan, pîr mazin karîbûna ku di serê xwe de jiber bigirin. Ew jiberkirin, temenê wê ew saffibûn û naskirina zimên ye xêvî di hîmê wê de ya. Ku xêv, pêşnûme rewşê bi jîr ku çêdike, levkirina bêjeyan ye di rewşê de û levhatina bêjeyan e bi zimên re ku di rewşê de xwe didina der, pevrebûna wan, wê temenê wê rewşê biafirêne. Di vir de, ev rewş, di jiberkirin bi wê re bikevneşopîkirin de jî giringiya wê heya. Xuyên civakê bi kevneşopîyên wê re, heyîna wan, ziman di kifşkariya wan de kifşkar e.

Pêşketine civakiyê e bi kevneşopî, di vir de, deme ku mirov di çerçova civake kurd de bêne ser ziman, bê ku mirov her weha zimên bêne ser ziman, mirov wê baş wê fahm neke. Divêt ku mirov

vê yekê ji her weha bêne ser ziman. Di serî de girtin, weke teybetmendiyekî mirovên gotbêj û vegotinvaên kurd di nav civatên wan de derdikeve pêş. Bi vê yekê re, mirov karê wê bêne ser ziman. Ziman, di vir de ku mirov bahse wê bike, divêt ku mirov têgihîştinaka ku heyîn civak û pêşketine wê ye di dîrokê de ye dem bi dem li berçav bê girtin û bê fahm kirin. Wê hingî baş were fahmkirin. Ziman, nirxîtiya kevneşopîyê, aliyekî wê ye pir mazin diafirîne bi xwe re. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ziman, ew peresendine di kevneşopîyan de bi civakê û pêşveçûne wê re di demê de bûya, her weha bi heman awayê ziman jî pêre bûya xwediyê awayekî pêşketinê. Mirov karê wê yekê di vir de bi teybet bêne ser ziman. Di civakeka kurd de di aslê xwe de ziman, biqasî ku wê heyîna kevneşopîyna bi xwe re li ser lîngan hiştîya, her weha wilqasî jî, kevneşopîyê jî ziman heyîna wê bi xwe re jî demê buhurandîya demê. Di vir de, kevneşopî, deme ku were ser ziman, devok û hevokên zimên ên ku bi deng re diafirin, di wê rewşê kevneşopîyê de xwediyê heyîneka afrîner in. Bi wê re, wênekirineka rewşna di hevokna de heya. Bi wê re rewş li ser lîngan dimêne. Minaq, heyîn û hebûna "gotinên pêşiyên me" ên ku di aqilan de mana û hatina hate roje me, ne tenê bi bêje û hevokîya xwe re ku ew wate ku têde hatiya salixkirin û dihê ser ziman, giringîya wê dihêne ser ziman, ji xaynî wê jî, awayê hevokê jî di vir de giringîyeka wê ye ku mirov bêgotin bêne ser ziman heya. Bi vê yekê re, têkiliya wan bi hev re heya. Mirov, ew gotin, di wî û mejiyê wî de, bi du awayan bikevneşopîyê de hene. Aliyekê bi hevok û lêkerîya wateyê ye ku têde hatiya salixkirin û ye ku wê ew di nerîne de lê dike ya. Bi vê yekê re, ji wê êdf afrînerî jî dihê holê bi wê re. Mirov, di nav civakê de di serê wî de ew gotinên ku hene, wê hin xosletne wî bi xwe re bîne ser ziman.

Di vir de ziman, bi mirov re heyîne wê, kifşkariyaka wê afrînerî heya. Bi wê re dihê holê afrînerî. Ziman, ew heyîna wê ye ku bi heyîna xwe re sînor diafirîne ji civakê re, wê bi pêşketinekê re heyîna pêşketine civakê jî biafirîne. Di vir de ziman, pirtûkxane civakê ya. Mirov karê wê wilo ji bêne ser ziman. Weke xêveke civakî ye giştî ji mirov karê wê were ser ziman. Ku ziman, dem bi dem heyîna wê ye ku hatiya afrîn û jînkirin ku were fahmkirin û dîtin, wê di wê dîtinê de bi dîtbarî ku xêve mirov bi bîra mirov re jê re hîm e, mirov wê bi wê bibîne ku çawa ew pêşketina. Ku mirov di vir de, çiqasî bixwezê kur û dûr herê, mirov wê herê. Hate ku herê genetîkê mirov jî wê çûyin xwediyê rêwaniyekê bê. Di vir de, ku mirov di vir de bi teherêkê re aliyê zimên ê di bin wê re bi mirov re bi pêşnûme bi wê jîndîtiya mirov re têde kur herê, mirov wê bi wan sentezbûnên ji heyîna mirov ên xêvî û bîrî fahm bike ku demên berê jî çendî xwediyê pêşketinekê na. Demên me yên ku hatina jînkirin, di mirov de, sentezbûna wan heya. Ew peresendinên ku dem bi dem bi mirov re dibin, ew e ku di temenê wan de cih û war digirê ya. Kevneşopî, awayê wê ye giştî ê jîyanî ya. Mirov karê wê jî wilo bêne ser ziman. Her kevneşopî awayê wê, pêşnûmebûneka wê ye bi me re di xêv û bîra me de jî heya. Mirov divêt ku vê yekê jî, ti carî jî bîr neke. Bi vê yekê re, di çerçovayeka bi ziman, mirov û kevneşopî û jiyanda wê re ku mirov li jêyanê dimeyîzêne, mirov dibîne ku ew pêşketin xwediyê çi awayê ya. Dîtbarîya kevneşopîyan, bi pêşnûmebûnên tevgerên re heya. Bi vê yekê re, deme ku em wan dinivîsîne jî, em wê bi şênberiyeka têrkerî wê têrkerîya wê ye şênberî dihênine holê li berçav. Kevneşopî, bi mirov re di mejiyê me de têjeke wê ye ku mirov bi wê têr û tîr e, heya. Mirov wê dijî. Êminbûna mirov e jî xwe jî, bi wê heya. Êminbûna mirov, di temen û hîmê wê de kevneşopî, bi dîrokê re heya. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew êminbûn, deroniyeka ku mirov afrîner dike bi wê heya. Êminbûn, bi vê yekê, mirov karê bêje ku temenê wê ye bi kevneşopî bi zanîne re ku bi perralî heya. Tenê kevneşopî, pergaltîna wê ye civakî bi xwe re di mirov de dihêne holê û hwd. Ji vê vegotinê, emê bi civatan de berdeyam bikin. Civat, cihna ku ji bo civake kurdan pir giring in. Di civatan de, ew vegotinên wan yên duvdîrêj ku bi kêlfikan berdeyam dikirin û hebûn, di wê xate kevneşopîyê e civakîyê de dibû. Di vir de, em ku wan vegotinên dirêj bi wê vegotin û awayê vegotinê lê dihizirin û dihênine li ser ziman, mirov vê yekê her weha kifş dike.

Civake kurd, deme ku ew cihane wan ye di wê kevneşopîya wan de bi jîrî hate afrîn û bi çîrokên wan yên weke "Çîrokên keçelok" ku li dûv hevdu dihatina vegotin û destanên wan yên weke yên "Şahmaran" ên pir dirêj ku bi bê navber dihatina vegotin, û her kurdê ku lê dihisand û ku lê dihisand û têde kur û dûr diçû, weke ku di cihaneka bêkêmesî de ku wî afirandîya dijî de lê

dihat, ew awayê wê heyînê, heste wan ye civaktî ye dîrokî bû. Ew, bûna wan ye bûna weke xwe bûn bû. Bi wê re, wan di serê xwe de, xwe li gor xwe û têgihîştina xwe bi jîrekê xwe diafirand di jîyane xwe de. Bi wê re, mirov karê bêje û bêne ser ziman ku kurdan, civaktiya xwe bi wê yekê re di jîyane xwe de di serê xwe de diafirand. Bi vê yekê re, bi awayekî ku têde peresendin heya û ku bi demên dirêj dijîn, xwe diafirênin. Bi vê yekê re, civaktiya kurdan di civatan de diafirê. Hestewarî û nîrxewariya wan di wir de bi hewbeşbûna wan ye jîrî re diafirê. Di vir de, di wê deme vegotin û lê hisandinê de şaxsiyeta wan ye jîr û gelemper diafirî û gelemper dibû. Bi vê yekê re, civaktiya wan diafirê. Civaktî, ji xalkiyê temen û hîmê xwe digirê. Gelemperbûn û bi nîrxbûna hest û jîrîya mirov re, bi nasîna bi hev re û di derbarê hev de bi wê re bi pêş dikeve. Ziman, çand, huner û hizir di wê deme de hewbeş dibin. Ye ku yekî zane re pêş dikeve dibe malê yê din jî. Bi vê yekê re, gihîştineka li hevdû e jîrî jî ya. Ziman û mirov, mirov û kevneşopî, kevneşopî û jîr, jîr û mejî, ku li dîv hevdû bi hev re ku jev ne qût xwediyê teheriyekê na di berdewamiya hev de. Mirov ê jîndî ya. Mirov ê ku ziman bi kar dihêne ya. Ziman, di wê hildana wê ye di serê wê de li gor wê bi kevneşopiyê pêş dikeve. Di vir de, hildana nerînan e ji jîyanê û dîtin û dîtbarî û hwd, bi hev re wê temem dikin. Wê teheriya ku me çar hevok li jor hanî li ser ziman, mirov karê wê bi vê awayê jî bêne ser ziman. Mirov û ziman, ziman û aqil, aqil û jîr, jîr û xêv, xêv û bîr û hwd ku mirov karê pêde herê, mirov karê bêne ser ziman. Lê gelemberbûna wan, temen û heyîna civaktiyê diafirêne. Wekî din jî, ev bi wê benê xwûnê eê bi hev ve girêdayî ya. Di nav xalkê de ew benê xwûnê li pêşbûna wê, di deme civaktiyê de, ne li pêş e. Lê jîre wê benê, temenê civaktiyê ya. Mirov karê wê jî bêne ser ziman. Di civakê de, di awayê pêşketinê ê bi qêrqaşî de firehûnek bûya. Bi dîrokî re bi awayê xwe yê pêşketinê ê emûdî re wê pêşketine xwe ye ku dem bi dem kur dike jî, dike temen û hîmê wê de. Di dîrokê de, di awayê emûdî de, pir rayên civakê ên ku bûna û hene û bi hev ve û bi hev re na hene. Têkiliya wan ye bi hev re, wê bi awayekî cûrî ê pêşketinê lê ku bi hev re di ahang de wê bi wê were ser ziman. Zanebûn, giştî aliyekî wê yê ku bûya ya. Bi zanebûnê re jîr jî bi zanebûnê re têgihîştina wê ye ku bûya ya. Jîr, di aslê xwe de, bi kevneşopiyê re ku mirov bi navê civakê bêne ser ziman, mirov wê hingî bahse xêveka wê jî bike. Bi vê yekê re, wê pêşketina wê hebe.

Ku mirov, her weha bahse wê pêşketinê û awayê dike, mirov dibîne ku di çerçova pergaltînekê de heya. Bi wê re aliyên wê yên din jî hene. Aliyên ku mirov wan bi serê xwe hildê dest hene. Civat, aliyekî wê yê ku were ser ziman e. Bi wê re dengbêjî, di aslê xwe de, ku çendî di nav xalkê de weke awayekî ji rêzê dihê dîtin jî, mirov divêt ku wê jî bêne ser ziman bi serê xwe re. Peresendîneka civakî e kurdan ku mirov wê bi jîre re bêne ser ziman, bi dengbêjan û dîroka wan re heya. Ew di demên berê de, weke zanistvanan bûn. Di aslê xwe de zanistvanên demên berê na. Wan, karibû ku di xêve xwe de jîndî û zîndî bigirta. Ji deme sumeriyana ew kêvalbarên ku mana roje me, wê xêve wan, piştî sumeriyana re, heman kar û erk dîtîya. Mirov karê wê bi teybet bî bêne ser ziman. Di demên berê de, wan peşavaniya civakê bi jîre wê re dikirin. Emê li xwerê hê li ser vê aliyê pêşketinê bisekin in. Ji ber ku ev weke teybetmendiyekê derdikeve pêşîya me ku em wê fahm bikin û bînine ser ziman. Bi hev re ew û civat, bi hev re bûn. Civat, cihna ku zanîn têde ji gelek aliyên xwe ve dihat ser ziman. Yê ku dihanî ser ziman jî yek ji wan jî ew bû. Bi vê yekê re, ew aliyekî pêşketine jîre civaktiyê di afirêne bi hanîna li ser ziman e jîrîya xwe re.

DÎROK,, RÊVEBERÎ Û RÊVEBERBIRIN Û KEVNEŞOPÎYA WÊ.

Di nav kurdan de ku mirov bahse rêvebertiyê bike, mirov divêt ku hinekî kur û dûr bi hizirê û piştre wê bêne ser ziman. Di aslê xwe de, rêvebertî, di nav kurdan de, xwediyê dîrokeka xwe ye teybet e, ku mirov wê bêne ser ziman e. Em tenê di çerçove vê cihê mijare xwe de hinekî bi sereke di berdewamiya mijare me ye li ser de bînine ser ziman. Ev yek, her weha pêdivî pê heya. Lê wê di cihên li pêş de wê weke mijareka teybet jî wê cihê wê di hanîna me ye li ser ziman de hebe, di beşe duyan de. Bi vê yekê re, di vir de, di vê beşa yekemîn de, di çerçova vê cihê de jî, emê hinekî bînine ser ziman. Rêveberî, di nav kurdan de, çend ku ew pê xwediyê dîrokeka pir demdirêj û pêşketî û bi jîr û hate ku mirov karê bêje ku bi kevneşopî û statûqû jî na, lê hate nahaka wilo zêde ev aliyê kurdan wilo zêde ti lêkolîn li ser ne hatina kirin. Em, vê yekê jî her

weha di vir de bi xamgînîyekê di vir de dihênine ser ziman. Di jîyanê de, ew kevneşopîya wan ye demdirêj e rêveberî nahaka wilo zêde li gor xwe û dîroka ne hatiya li ser ziman. An jî ku berî me û deme hatibe ser ziman jî, li holê ne hatiya hiştin. Ev vê wilo bêjin û bi buhurin.

Li kurdistanê rêveberî çawa heya û berê çawa hebû? Ev pirsê her weha bi dualî hanîna wê ye li ser ziman bi hev re, wê ji me re bê bersiveke baş, ku em pê baş fahmkîn. Bi vê yekê re, di serî de, emê çavakî li demên xwe yên berê bixin û werina hate roje me bi hanîna li ser ziman re. Kurd, î ro, di roje me de ev yek jî wan re, giringiyeka wê heya. Di roje me de, divêt ku wan jînbûyînen xwe yên di dîrokê de û di demên berê de bi nîrx, kevneşopî û dîroka wê re sentez bikin û bînine ser ziman. Wê ev yek, her weha wan di deme me de bigihêne pêşketineke mazin. Çendî ku di demê me de, î ro, pêşketineka mazin heya, mirov divêt ku wê jî bibiîne û li gor wê û ast û rada wê mirov divêt ku bêne ser ziman. Di serî de, ev jî fahmkirinaka teybet, ku ne tenê ye di dîrokê e kurdan tene em bizane ne ji me dixwezê, ji wê zêdetir têgihîştinekê di derbarê ye roje me de, ku bi me re heya û em bi wê bi zane ne jî ji me dixwezê. Ku nahaka ew bi me re hebe, emê hê çêtir demên xwe yên berê bi zanîna mazin bînine ser ziman. Lê ku em hatina ye deme me ku em wê bînine ser ziman, emê wê jî hê baştir bînine ser ziman. Her weha, wê ji du aliyan ve bitêgihîştin bi me re. Kurdan, aliyekî wan yê ku mirov di vir de pir baş û rast bêne ser ziman heya. Ew jî, di hanîna li ser ziman e rêvebertiyên xwe yên ku jînkirine de, di civatên xwe de bûna xwediyê vactiyeka pirr rast û girenbûha. Ew nêzikatiya wan ye ku hebû, bi zanebûnekê û têgihîştineka civakî û hizrî hebû. Lê ku dem têve çû û dem bi ber roje me ve hat, çawa ku divîyabû ku ew nêzikatî hê bêhtir pêşketiba û heyîna parastiba, lê wilo ne bûya. Li şûn maya. Ev jî, hinek sedemê wê hene. Di serî de, ew pêvajoyên bindestiyên ên ku jînkirina na. Lê ew demên wan yên ku wan di van qadan de jînkirina, têrtî û tîrtîyeka pir mazin ji di wan de afirandiya. Bi wê, di deme ku dihanîna li ser ziman de jî, ji xwe bi êmin dihanîna li ser ziman. Her weha mirov divêt ku vê yekê jî, bi teybet bêne ser ziman.

Bi vê têgihîştinê, emê hênine ser ziman. Ew aliyê kurdan ên ku pê dihanîna li ser ziman, bi zanebûn û jîyandinê de di wekxwebûnekê de di hanîna li ser ziman de dihê ser ziman. Ev jî, ku demne pêşketine ên ku bi pirr dem dirêj newêne jînkirin û pê re jî di mirov de û xêve mirov de bi wê jînbûnê re bi têgihîştine wê ye ku diafirê re ku du û an jî sê dîmentî bi têgihîştin û xêv û bîra mirov re bi bîrewerî ne afirê, wê nebe. Bi vê yekê re mirov karê bi êmin bêje ku wan demne pir mazin ên pêşketinê jînkirin. Demên jînkirinê ên ku hatina jînkirin, wê di mirov de bi xêvî heyîneka wan hebe. Bi wê re, wê temenê zanebûn û jîreke mazin ye mirov wê di jîyanê de bi afirê. Bi vê yekê re, wê pêşketineka mazin ye di mirov de wê bi afirê û were holê. Zanebûn, ku mirov bi gotinekê jî di vir de bêne ser ziman, pêvajoyên wê yên pêşketinê ên bi mirov re hem bi dembidem bi demê re dihêne jînkirin û hem jî ên bi mirov re û bi xêv û bîra mirov re ku bi awayekî peresendine bi mirov re ku bi wê dihê jînkirin, di wê pêşketinê de bi mirov re xwediyê heyînaka ku mirov divêt ku wê bêne ser ziman e. Mirov, di jîyanê de, çawa dijî, di vir de, bi jîyane mirov re bi pêşnûme dibê. Bi vê yekê re, şekl û awayek di jîyane mirov de bi mirov re dihê holê. Rêvebertî, bi heyîna serwerî û serdestiyê hîs û ajoyeka wê ye ku bi jîr dikê jî heya. Mirov, karê wê jî bêne ser ziman. Rêveberî, ku mirov her weha di dîrokê re lê meyîzend û hanî li ser ziman, mirov wê bîne ku ew pêşketin çawa bûna û pêşketina. Berî ku em bi buhurîna hanîna wê ye di dîrokê de ku bi serekê di vir de em bînine li ser ziman, em pêşî hinekî li ser xoslet û teybetmendiyên jîyanê bisekin in. Ev yek, di vir de giring e. Li gor, bi hanîna li ser ziman e kevneşopîyê e ji aliya xwe ve, bi wê re hinekî hate li ser ziman. Lê ji wê zêdetir di vir de hinekî bi jînkirinê û bi têgihîştine rêveberbirinê emê li ser bisekin in û wê bînine li ser ziman.

Di nav kurdan de, weke ku me li jor hanî li ser ziman, civat; cihna ku mirov wan bi teybet bêne ser ziman in. Ew cihna ku kar û erk parlamenê di roje me de ku hatina afirandin di wan demên berê de dikir. Bi vê yekê re, di wan de, mirovên kal û pîr ên civakê ên ku navserî xwe têde dihatina cem hevdu û li ser rewş û bûyînen ku dibin diaxiftin û hizrên xwe dihanîna li ser ziman û bi wê re wê çî kiriban ji di wir de kirin dikîrn û piştre didana kirin. Civatên civakî, ku mirov bahse wê bike, mirov wê heyîna wan jî, ji serî heya binî ji hiyererşiyekê dûr neyêne ser ziman. Ew jî, li gor rêzbûn û rêzkarîya rastkirina civaktiyê xwediyê heyîneka hiyererşîk bûn. Li jor, ku li

qasên mîr lê dihatina li darxistin ”civatên mîr” hebûn. Ev civat, weke yên herî giring bûn. Di wan de, gotin û vegotinên ku dihatina li ser ziman û vegotin, wê di nav xalkê de cih de bihatan bihîstin. Wê kê axiftîba û hanîba ser ziman jî, navê wan jî bi hate bihîstin. Li wir, mirovên ku li dora mîr, mirovên ku ji zanîn û têgihîştina xwe bi êmin bûn. Mirovên ku gotina wan di buhurî bûn. Ew mirovna, ku karibûn ku bi gotina xwe dinya bidîna avakirin û dinya bidîna xirakirin bûn. Her weha mirov karê heyîn û bandûra wan bêne ser ziman. Mirovên ku li dora mîr di rûniştin, mirovên ku bi zane bûn. Bi vê yekê re, çavê herkesekê li dora wan jî li wan û gotina wan bûn. Bi teybetî jî, mirovna ku kal bûn.

Ku mirov hinekî dijî dihate xwerê, mirov dihat û diketa nava ”civatên xalkê” de. Ev civat jî, civatên ku di nav xalkê de dihatina li darxistin bûn. Ew civat jî, wê di wan de mirovên civatê ên di nav xalkê de ên ku bi zane lê rûniştina. Wan jî wê gotina xwe bigota û bi yên dora xwe bide herêkirin. Di vir de, bi gotinekê jî, emê rewşeke civatî e civakî bênine ser ziman. Hebû ku carna civatên xalkê bi carekê bi hev re rabûban û barî civate mîr kiriban. Ew jî, her weha dibû. Lê di rewşne giring de ev yek dibû. Ku wê biryereka giring li ser rewşna ku diqawimin û pir giring in û jîyane xalkê hemûkî bi bandûr dike, weke herîşna ku dibin in, wê hingî, li civate mîr bi wî awayê barî lê hatiba kirin. Her mirovên ku li civate mîr di rûnişt û weke şewirmendekî mîr jî dihate zanîn, di nav xalkê ku li male wî bû, weke civate wî ye di nav xalkê de hertimî hebû. Ew jî, wilo bû. Bi vê yekê re, wê di nav xalkê de bi heyîn û hebûna xwe re bi gotina xwe re heba. Xalkê li dora wan, rêzeke mazin dide wan. Li gotina wan dihisand û gotina xwe ji wan re digotin. Wan jî gotina xwe bi gotina wan re ji mîr re radigihand. Mîr, li gotina wan dihisand. Rêzeke wî ji gotina wan re hebû. Ew jî bi rêzbûn li ber mîr û dora wî. Mîr, keyê nav xalkê bû. Bi wan civak hatibû rêxistinkirin. Pergaleka civakî bi wan afirî bû. Ew awayê pergala civaktiya ku bi wan re afirîbû, fahmkirina wê, wê di derbarê pêvajoyên pêşketin ên peresendina dîroka wan ku bûya de jî wê hizreka bitêgihîştin bide me. Civak kurd, ji bin ve ku mirov lê dimeyîzêne, weke xalkîtiyeka serdest heya. Bi wê re, kom bi kom li dora mîr bi rêxistin afirîya. Têkiliya koman e bi koman re jî bixweza pir xurt û mazin e. Lê ku mirov derdikeve li jor, mirov wê hingî wê pêşketine wan ye civakî bi awayê wê re kifş bike. Civat, ji bo wê fahmkirinê cihna giring in. Awayê civaktiya kurdî, ji ber demên wê yên dîrokî ên pir demdirêj pir dîmentiyeka wê ye kur heya. Wê têgihîştina xalktiyê e ku berî deme civaktiya hatiya jînkirin, di xwe de jî ne buhurîya. Wê jî di nav wê heyîna xwe ye civakî de bi awayekî dide jînkirin. Rojava, di sadsalên 15 min, de, bi têgihîştina civatiyê bidest afirandina xwe kir. Pêvajoyên xalktiyê, wilo zêde jîn ne kir. Lê rojhilat, ne wilo kir. Wê bi awayekî peresendinê buhurînek li civaktiyê kir. Lê pêşketina civaktiyê di xwe de kur nekir û pêşnexist. Hemdemiya wê ye demî, di deman de pêşnexist û jîn ne kir. Bi wê heyîn ast û rada wê ye ku heya re bi sînor ma. Ku mirov, li Kurdistanê, dimeyîzêne, mirov bi vê yekê, awayekî civaktiyê ê wê yê teybet bi pêvajo û peresendina wê ye ku jînbûya re mirov kifş dike. Li Kurdistanê, pêşketin, awayê ku heya, mirov bi sereke divêt ku ji dîrokê fahm bike û bêne ser ziman. Bi vê yekê, ku mirov bi sere di bin çend xalan de bêne ser ziman, mirov wê weha bêne ser ziman:

1.-Deme berî deme şaristaniyê û hate deme şaristaniyê: Ku mirov bahse Kurdistanê û pêşketine tede bike, divêt ku mirov hinekî herê demên berê. Di vir de, awayekî jîyanê ê ku xwe bi awayekî persendinê daya berdemwan kirin. Berî nahaka me bahse kevneşopîyê kir. kevneşopî, tene awa û deme wê ye pêşketî e deme şaristaniyê ya. Lê ku mirov bahse kevneşopî bike û bêne e deme şaristaniyê ya, di vir de, divêt ku şaş û xelat newê fahmkirin ku kevneşopî bi awaytiya wê ye jîyanê re bi awayekî xwe yê di jîyanê de ji deme şaristaniyê ji di buhurê. Hinekî weke ku têgihîştinek ser şaristaniyê re ji di xwe de digirê û dihêne holê û ser ziman. Ji awayê pêşketinê mirov vê yekê her weha fahm dike. Lê deme ku mirov bahse deme şaristaniyê dike, mirov her weha wê awayê yê ku dihê jînkirin, mirov ji wê fahm dike ku ew êdî bi awayekî jîrî û xal û zagon dijî. Di deme şaristaniyê de, derketina pêş e xal û zagontiyê ye wê, wê weke cudatiyeka wê ye demî ye deme şaristaniyê bê. Ku mirov demên berî şaristaniyê lê dimeyîzêne, mirov wê yekê baş fahm dike. Di vir de, deme ku mirov pêşketinên ku li Kurdistanê dihêne ser ziman, mrov her weha wê pêşketine wê baş fahm dike. Lê ku civaktiya li ber Diclê û firatê ku bûya, ku ji bo ku

were fahmkirin, her weha ji destpêkê hanînyeka li ser ziman pêdivî pê heya. Wê hingî baş were fahmkirin. Kevneşopîya li ber diclê û firatê, têde jînbûnka xweza e ku mirov hine xal û şiroveya dervî şaristaniyê bêne ser ziman di deme şaristaniyê de di xwezatiyeka xwe dijî û diherîkê û di rîya xwe de diçê. Ev yek her weha dike ku mirov her weha şiroveyekê ji deme berî şaristaniyê ye berî deme şaristaniyê e li ber diclê û firatê bike û bêne ser ziman. Di vir de, wê hingî baş were fahmkirin. Ji yane kurdan e î ro jî, ku mirov lê dimeyîzêne, tevî waqas demên xirab ên ku buhurandina jî, hê jî, mirov dibîne ku hin tîrhna wê deme berê ye berî deme şaristaniyê têde hene. Awa û pergaltiya jîyane Koçertiyê vê yekê her weha bi me dide têgihîştin. Emê piştîre dîsa werina vê xalê lê emê nahaka tîne bi gotinekê bênine ser ziman û bi buhur in.

Demên berî şaristaniyê, li vir li ser van axan pir mazin bûna xwediyê pêşketineka pêşketî û mazin. Piştîre şaristanî pêşketiya û êdî ew jîyan, weke ku li ber sekneke şaristaniyê bûya. Ji ber çî ev yek bûya? Divêt ku ev yek were fahmkirin û ser ziman. Di serî de, em bi gotinekê ji bênine li ser ziman û bêjin ku şaristaniyê rêvebertî û têgihîştina wê ji xwe re kiriya û pê meşîya. Pêşketina olî, ew pêşketina wê bi temen kiriya. Olî, di vir de, dervî xwesteka xwe weyneke ku wê bi temen dike leyistiya. Mirov wê jî dibîne. Cihaneke ku deronî û têgihîştinek ji wê hizre rêvebertiyê û têgihîştina wê re dihê holê bi ye olê diafirê. Bi vê yekê re, ji jîyanê qût, pêşketinê di vir de diafirê û pêş dikeve. Ew pêşketin, çend ku mirov têde kur diçê mirov wê dibîne û fahm dike. Bi wê re rêveberî, di deme şaristaniyê de, bi xwe re bi deronî, civaknasî, hizir û hwd, ku cihanek di xwe de afirandîya pêş dikeve û bi rêve diçê. Di aslê xwe de, ku mirov vê rewşê bi awayekî bîrdozî bêne ser ziman wê xelat nebe. Wê rast bê. Lê ne ne temem bê. Divêt ku mirov fahm bike, ku rêveberiyê, di demê bi wê pêşketina xwe re ew cihane dervî wê ye ku bi xalkan re dihê jînkirin, çî têde heya û dijî bi mirov re jî, di xwe de diafirêne û dihêne hate roje me. Dervî wê jî, ew cihane dervî wê, heyîna xwe dide berdeham kirin. Bi vê yekê re weke du cihan diafirin, dihê holê. Ku mirov têgihîştina bihuşt û dojhê bi qalibê jîrîya xwe bêne li berçav û bi wê qalibê lê meyîzêne, mirov wê fahm bike ku çawa du cihan afirina. Olîyê, tenê ew cihan yek bihuştîtiyê û ya din bi dojhîtiyê salixkirin û hanîya ser ziman. Lê bi vê yekê re bi awayê pêşketina xwe re cuda bûya. Dagirtina hundurê wan cihan (qalib) divir de cuda bûya. Mirov, karê wilo bêne ser ziman. Em di deme şaristaniyê de bi jîreka xwe bi pêş dikeve. Ew jîr jî, her weha mirov karê wê bi vê yekê bi salix bike. Di deme berî şaristaniyê de, ew jîyane xweza e ku bi ber xalkîtiyê ve diçû, wê di vir de, ku gihiştîna xalkîdiyê êdî wê di demê de wê pêşketinê di deme bi ber civaktiyê de bijî. Ev jî çûn û gihiştina deme di ye şaristaniyê ya.

Deme berî deme şaristaniyê e li ber diclê, wê pêşî bi bicihbûna jîyanê û bi rêzê wê bi hîs, ajo, hizir û her weha felsefe yê re bi pêvajoyîna peresendinê wê pêş bikeve. Li ber diclê, ji ber ku temen û derfetên jîyandinê pir hene, wê pêşketinek her weha bi afirê û bibe. Bicihbûn, wê bê destpêka xalkîbûnê ye li wir. Wê ew pêşketin, heyîna xwe bide berdeham kirin. Wê qûtnekê. Wê, piştîre hin bi hin di xwezabûnka xwe de di nav jîyanê de herîkîn bibe. Ew pêşketin, wê di deme de bigihê awayekê têgihîştinê ku mirov ji wê karê pergala wan ye ku ji gavavêtinê û kirinê û awayê jîyane wan mirov bêne ser ziman, wê biafirê. Bi wê re, we pêşî çerçoveyeka jîyane wan wê biafirê. Bi wê re êdî wê wê piştîre bi jîyandinê re wê pêşketinê wan bi afirin. Demên jîyanê ên van deman, demne ku mirov karê wan bi gelemperî bi destpêka naskirina hewirdorê ew êdî bi wê pêşketina jîyanê ye wê re ku diafirê, bibîne û bêne ser ziman. Wê awayê baweriyê û jîyandinê di nav hev de wê xatên wan yên ku wê tîre çûyin bibe wê biafirin. Her weha wê jîyanê êdî bi afirê. Awayê olî, wê di wê deme de bi totemên ku dihêne dibin re wê biafirê. Totem, wê bine awayên hizir ên di serî de ên destpêkê ku êdî wê buhurîna li jîyane şaristaniyê bibin. Wê her weha êdî pêşketinê heyîna xwe bide berdeham kirin. Ku dem hate deme şaristaniyê, êdî wê hin bi hin bi jîr afirandinê û ew afirandina ku dibê jî, ku êdî jîyane mirov bi bandûr dike û bi wê bandûrkirinê re ku êdî wê kifş bike, dihê holê. Ev yek, wê bê destpêk. Bi wê destpêkê re, wê êdî jîyan, bicih bibe û pêş bikeve. Di deme şaristaniyê de, ew pêşketine ku bi jîrî diafirê, wê heyîna xwe bi afirêne. Lê wê bi awayekê peresendinê wê ew pêşketina bi ber xalkîtiyê ve ku diçê jî wê bigihê xalkîtiyê û wê tîrtî û tîrtîyekê bi xwe re bide çêkirin. Çend ku dihê gotin ku ku civaktî pêş dikeve, wê xalkî jî holê rabê. Di vir de, li berdiclê û firatê, vajî vê hizre û baweriyê awayekî pêşketinê e ku mirov

dibîne heya. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov civaktiya li ber diclê û firatê bi serê xwe kifş bike û wê bêne ser ziman. Li rojava, destpêk, ne bi heyîna xalkîyê dihê destpêkirin, Ew xalkî wilo zêde nayê jînkirin. Ji ber vê yekê, di hizir û baweriyên ku dihêne li ser ziman de jî, ew aliyê xalkîyê ê ku were ser ziman jî, di hanîna li ser ziman û fahmkirinê re kêm dimêne. Baweriyak xalkîyê e ku dihê afirandin jî, bi têgihîştin û hzireka civaktiyê ya. Ev jî, vê yekê her weha weke nîşanak û birhanaka vê yekê dihê holê. Li ber diclê û firatê, ev yek ne wilo ya. Mirov ku li awayê wê yê pêşketinê dimeyîzêne. Mirov, her weha vê yekê bi teybet dibîne. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov berdicolê û firatê bi serê xwe û bi teybet bînine li ser ziman. Şaristaniya wê ye ku afriya ye demên wê yê berê jî, hê wilo zêde ne hatiya kifşkirin û fahmkirin. Ewayê jîyanê û gîyane wê, di fahmkirina wê ye ku dibe ku xwe da der, hingî, mirov karê ew fahmkirin û têgihîştin bûya û pê hatiya li ser ziman. Bi vê yekê re, mirov wê êdî bahse fahmkirinekê ji bike.

Di deme şaristaniyê e li ber diclê deme ku pêş dikeve di deme xwe ye pêşî de du dîmentiya wê heya. Piştî sêdîmetiyeka wê diafirê û dihê holê. Mirov divêt ku vê yekê jî bibîne. Ew xalkîya ku dihê gotin ku di deme şaristaniyê hin bi hin ji holê di rabe, di aslê xwe de na rabe. Bi hin pêşketinên wê yên ku wê bi xwe re di xwe de jînkirina bi minaqên li Kurdistanê ên weke koçertiyê hate roje me jî heyîna de dide berdeyam kirin. Bi vê yekê re, mirov karê koçertiyê weke pergaleka ku li ser temenê malbatîyê awa e xalkîyê ku ava bûya bi salixbike û bêne ser ziman. Jîyane koçertiyê ku mirov lê dimeyîzêne, ji wan goçtiyên ku di nav arabana de bûna û yên li herêma piştî re bi gelekî re bi goçbetiyê ên tirkmanan bûna, cuda ên ku weke ku ji herêma kurdistanê ên weke Sêrt û Mûşê ku li herêma botanê ji bo baştiyê ye nêçirtiya şawalan û baş bîdest xistina ji wan zad û ancam e. Ên demsalî na. Lê weke ku di sadsalên piştî şarîrên arabana tene herêma başûrê kurdistanê weke Musil û kerkukê û bicihbûna û her weha hin herêma din jî û hatina komên tirkmanan ji bo ku ji cihên xwe yê berê qûtbîbin û li vanderan bicih bibin hene. Bi vê yekê, goçberiyeka wan heya. Di nava kurdan de, weke koçertiyê, ew weke pergaleka ku li ser himê xwzayê avaya, heya. Mirov, divêt ku vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Ku mirov, demên pêşketinên ên demên şaristaniyê fahm bike, mirov wê wê yekê pir baş û hesanî bibîne. Li Kurdistanê, di deme şaristaniyê û pêşketina civaktiyê de, piştî ku civaktî bi civaknasiya xwe re pêş dikeve jî, ew xalkî bi hin awayna xwe dide berdeyam kirin. Bi wê yekê, peresendinekê di xwe de li gor demên şaristaniyê ên civaktiyê jî çêdike. Lê qalibê xwe û hin nîrxên xwe yên ku wê li ser lingan digirin, wan di parezê. Bi vê yekê re, êdî di hundurê jîyanê de ku ew xalkî heyîna xwe dide berdeyam kirin û bigîştî jî ku civaktî pêşdikeve, şaristanî heyîna wê berdeyam dibe. Piştî demên sumeriyana ên pîr dirêj jî, ku di deme Mitaniyan û hûriyan û Gûtfî û Naîriyan de jî, ew kombûna ku awayê xalkîyê ya û bi pergala civakî dijî di nav kurdan de dijî. Heyn û hebûna mîran, hinekî jî bi vê ve jî girêdayî dihê holê û li berçav. Ew wê pergale ku van herdûyan bi kevneşopîna ku hatina afirandin, bi hev re wan dide berdeyamkirin di xateke xwe de. Deme şaristaniyê, her weha divêt ku mirov wê fahm bike û bêne ser ziman. Ji destpêkê, emê her weha wê bînine ser ziman.

Demên pêşketine û ên pêşketinê ên deme xalkîyê, mirov ku li wan dihizirê, mirov, demne bi heyîn ku pêşketine dibîne. Di vir de, mirov fahm dike ku piştî deme Neolotîkê e ku jê hate buhurîn li deme xalkîyê û bi gelemperî ji e şaristaniyê, mirov her weha di wê rûnîstandina di jîyanê de e ku afirîya, mirov bi wê re, wê awayê pergalbûnê dibîne. Xalkîfî, weke dem û pêvajoya û her weha heyîna wê ye ku dihêne ser ziman gûndîfî bi pêş dikeve. Gûndîfî, di aslê xwe de, ku mirov li awayê jîyan û jîyandina wê dimeyîzêne mirov wê awayê pergalbûna wê dibîne. Di aslê xwe de, gûndîfî, ji gelek aliyana ve, ku mirov hewl dide fahm bike û wê fahm dike, mirov dibîne ku pergalbûn gav bi gav û pêvajoya bi pêvajoya tede pêşketiya. Di heyîna jîyane gûndîfîyê de, pergalbûn, ji hîm, ji malbatîyê hate ku jîyane wê ye giştî, mirov dibîne ku bi pîrdîmenî wa pêşketiya. Mirov wê wilo dibîne. Di deme şaristaniyê de, pêşketine wê ye ku bûya, di aslê xwe de gîringiya wê herî giring di wê xwezabûna jîyan û jîyandina wê de xwe dide der. Mirov wê bi hesanî kifş dike. Lê gûndîfî, ji destpêkê ku mirov lê dinerê, mirov dibîne ku wa li ser temenê ahlbûnê awaya. Ên ku di gûnd de dijî, hemû jî yên ku ji hevdû û mirovê(xizmê) hevdû na. Bi vê yekê re, ew jîyane wan pêş dikeve. Li Kurdistanê, gûndîfî, pir mazin bi kevneşopîyeka pêşketî

heya. Wê gûndîtîyê ku heya bi wê kevnêşopîtiya xwe re, tevî ku car bi car li Kurdistanê ji gûnd, hema bêja giştîkên wan hatina ji holê rakirin jîn dîsa wê kevnêşopîyê bi wan mirovên hindik ên mana re heyîna wê nemivirtîya û wê xwe daya berdewam kirin. Di vir de, ye herî giring, nasîn û bîcîhbûna wê ye di mirov de giringiya wê dihê holê. Ew weke aliyekê ewlatiya wê ye ku wê li holê hiştiya û ne hiştiya ku wînda bibe ya. Her weha mirov vê yekê pir hesanî dibîne. Li berdicle û firatê, pêşketina ku bûya e bi şaristanî, divêt ku mirov wê ji pir aliyên ve fahm bike. Heyîna wê ye ku pêşketiya, aliyekî pêşketinê ê mirovê herêmê bi awayekî peresendinê di xwe de dihêne holê. Bi wê re meşîya. Deme şaristaniyê, gûndîtîyê pêşketina wê kur dike. Di deme destpêkê e buhurîna li deme şaristaniyê de, gûndbûn afirîya. Lê şaristanîti, di vir de, wateyeka wê ye ku mirov bi têkilbûna gûnd bi gûnd re ser ziman heya. Ev aliyê wê yê pêşketî ê giştî ji di xwe de wê bide pêşxistin. Pergalbûn e giştî, bûna wê, tê wateya bûna pergala şaristaniyê. Mirov karê wê weha bêne ser ziman. Deme şaristaniyê wê bi du awayên xwe re bi dest pêşketina xwe bike. Jiyanê gûndîtîyê, aliyê wê destpêkê dihêne holê.

Ku mirov li awayê pêşketinê dimeyîzêne, mirov dibîne ku wê awayê jîyanê re pêşketin di wê jîyanê em bi gûndîtîyê re dihênine li ser ziman re, mirov dibîne ku di heyîneka xwe de pêşketina wê heya. Lê ew pêşketina wê, wê wilo menêne. Aqil û jîr jî, êdî bidest pêşketinê dike. Ev, wê êdî demên şaristaniyê bi cerb û pêşketin û pêvajoyên wê re bihiş bike. Bihişbûn, wê nasîna di nav xatên çûnûhatinên bi şaristaniyê re ku bûna de, wê têgihîştinê bide çêkirin. Aqil, aliyekî mazin ê ku mirov di deme şaristaniyê de, ji destpêkê hate demên dawiyê ên ku hatina jînkirin bi awayê pergala şaristaniyê re bêne ser ziman e. Pêvajoyên êqil, wê dîtin û dîtbariyê çêke û bi wê re û li ser wê re wê temenê aqil û jîra çêker wê bi afirêne. Ev, wê demên şaristaniyê, bi pergalbûna wê re, derxe asteka wê ye di ye bilind ku li ser mirov re ya. Mirov wê, di deme şaristaniyê de, li ber vê yekê biçûk bê. Lê wê hewldana mirov e gihîna wê astê jê ji holê ne rabê. Ev jî, wê tekoşintiyeka sermedî ku hate ku demên şaristaniyê hena wê bêne holê. Mirov, ji demên sumriyan ên bûna, vê yekê her weha pir baş fahm dike. Di deme sumerîyan de aqil, heyîna wê, serweriye wê destpê dike li mirov. Ev jî, aliyekê dî ê pêşketinê ê şaristaniyê ya. Bi vê yekê re, wê jîyanê gûndîtî ji holê ranebe, lê wê weke avaka ku di bin axê de rêya xwe çêkirîya û diharikê, wê biharikê û were paşerojê. Ev yek jî, bi pergal dibe. Mirov, vê yekê her weha dibîne.

2. Deme şaristaniyê, aqil û bi pergalbûn wê ye bi bîcîhbûnê re: Civaktî, ji deme şaristaniyê êdî pêde, heyîna wê dest pê dike. Ew dest pê kirina wê, wê demeke nû ye bi aqil ku bi rê ve diçê wê bêne holê. Di aslê xwe de civaktî, bi pirranî li ser êqil re xwediyê meşîneka xwe ya dirokî ya. Mirov ji pergalbûn û avabûna sazî û sazmediyên wê vê yekê her weha pir baş û qanc fahm dike. Gûndîtî, jîyanê wê, wê ji holê ne rabê. Wê di deme pêşketina civaktiyê de jî wê ew xalkîtiya wê hebe. Lê wê ne serwer bê. Lê wê ji bin ve kifşkar bê. Li ber dicle û firatê ev yek wilo ya. Wê civaktî, pergalbûnaka wê ye bi xal û zagon ku bi awa û têgihîştinêka destûrî e demî afirîya wê hebe. Ev jî, ji kevnêşopîyan diafirê. Di serî de, civaktî, wê kifşkirina awayê jîyanê e ku dihê jînkirin e bi mirov û çûn û hatinên wî re, wê pêşnûme têgihîştina civaktiyê bi wê jîyanê re bêne holê. Gelemperbûna wê jî, wê bi nasîna li hevdû û bi hevdû re wê bibe. Ev jî, awayê pêşketina wê ya. Lê gûndîtî, wê xwe bike aliyekî wê pêşketine civakî ji bin ve. Ev jî, wê di demên piştre ên pêşketine wê de hê baştir wê werina dîtin. Pergalbûna giştî civakiyê, wê di pergalbûnaka bi sazî û sazûntiyê de heyîna xwe bide afirandin û berdewam kirin. Wê têgihîştina xwe ye sazîtiyê wê derxe pêş. Saziyeka weke ye olî e zugûratan e sumeran, wê pir herêman lê xwe bîcîh dîne û wê biafirê. Wê li gûnd û mûnd ne hisêne. Wê bi wê re herê. Xalên ku mirov li gor wan bijî jî, wê ew bide afirandin. Şaristanî, ku mirov li gotina wê dihizirê, mirov bi sê awayan û hate bêhtîr jî di kurdî de rastî wate wê ye bigotinî dihê. Yek, bi kifşkirina serdestiyê ya. Ye din jî, jîyanê ku bi jîr bûya û di wê jîre re dihê dîtin e. E dîtin jî, her weha bi ji kevnêşopîyan ku dihê fahmkirin û têgihîştin, li gor wan jînbûnê dihêne ser ziman. Aliyekî dî jî, bi dîtinê re dihê ser ziman. Yanî, bi aqilbûnê re dihê holê û ser ziman. Ku mirov li gotina şaristaniyê e di kurdî de lê dihizirê, mirov bêdemiyekê di wê de û pêşketine wê de bi hizirkirinê kifş dike. Bi vê yekê re, ew xwediyê heyîneka xwe ye ku bi wê dihê ser ziman. Lê Kurdan, ev gotin, ji gotina zanebûna qûtnekirîya û bi hev re ew hanîna li ser ziman. Ji ber vê yekê, em jî di vir de, emê ji wê gavavêtin û hanîna wan

ye berê ku pê hanîna li ser ziman gav biavêjin û bînina ser ziman. Emê dernekevina dervî wê hanîna wan ye li ser ziman. ..

Di awayê pêşketina şaristaniyê de, bi sazî û gelemperîtiya wê re mirov çawa ku giştûna demiyê bi wê re dibîne û her weha dihêne ser ziman, bi gûndbûnê re jî, awayekî wê yê ji binî mirov dibîne. Ji aqil ne lê ji temen avêtin û xwe xweza denezandina şaristaniyê, di aslê xwe de di wê gûndîtîyê û kevneşopîya wê de ya. Di deme şaristaniyê de, ew aqiltiya ku êdî karîna çekertîya xwe bidest xistiye û êdî karê biafirîne û çêke, wê bi awayê pergalya xwe gelemperî re, wê êdî bi rê ve bike ku herê. Lê wê nikaribe ji temen bê hîm jî herê. Bi vê yekê re, jîyane ku dihê jînkirin kevneşopîya wê di aslê xwe de, wê di vir de bi taç dike.

Ku mirov dihê deme şaristaniyê e weke ye deme sumeriyana ku weke deme pêşî ye pêşketinê e deme şaristaniyê jî dihê ser ziman, mirov dibîne ku gelemperbûn heyîna wê dest pê kirîya. Mirov wê kifş dike. Sumeriyana, bi êqil pêşî xal û zagonên ku wê li gor wan bêne jînkirin kifşkirin. Li gor wan jînkirin jî danîna pêşîya mirov û xalkên gûnda. Bi wê re, bi hev re bûn û bi hevdû re bûn êdî diafirê. Bi vê yekê re, hevdû naskirin, weke xalekê sereka ye vê xalê dihê holê. Naskirin û bi teybetî jî bi aqil naskirin, êdî wê her weha bi awayekî geometriki bi afirê. Têgihîştina "xwûdê", wê sumeriyana, hin bi hin bigihêne pergala wan ye gelemperî. Wan, mîtolojîya xwe jî, bi awayekî hizrî ku mirov nikarê ji awayê felsefê ê demên hemdem û nûjen cuda bêne ser ziman afirandina. Navê "xwûdê" û "bawerî", du gotinên ku wê bi hev re temenê wê gelemperbûnê bi afirandin in. Bi vê gelemperbûnê re, wê deme şaristaniyê, di aslê xwe de bi du dîmenîyê bi rê ve herê, êdî. Di aste bin de bigûndî bi kevneşopîbûn û bi rê ve çûyîn-kî ev kevneşopîbûn wê temenê wê pêşketine wan ye gelmerî e pergali bi afirîne û bi li ser lingên xwe bi kevneşopî bide rûandin- weke aliyê dîmenî ê yekemîn û jî binî ya. Di aste duyemîn de û ye banî de, wan bi zugûratan û hwd, bi sazîyên xwe yên wilo wê afirandina xwe ye gelemperî ku wê her kesek li wê meyîzêne diafirênin. Ev dem, deme şaristaniyê e afirîner e. Her bûn û kirinên wê, ên jî dil û afirîner in. Ên pêşî na. Sumerî, aliyekî wan yê pir xurt jî demên erî wan heya. Berî wan, çawa çûnûhatin bi têgihîştinekê jî bê afirîya û di mirov de bicih bûya. Di deme xwe de, ku bi biqasî wê pişte xwe didinê de Navê Xwûdê û bawerîya lê û pîrozkirin dihê holê û diafirê bi hev re. Ya, ku êdî wê pişte wan bide wan, di aslê xwe de ev. Ya ku wan jî demên wan yê berê qût kir jî ev bû. Di jîyanê de, ew cihê vala, bi vê yekê tişî kirin. Demên şaristaniyê ên piştî wan re ên ku wê biafirin jî, wê ne tenê demne ji wan cuda yên piştî wan re bin. Wê di wê têgihîştina wan de, weke demne dîmenkirinê e bi têgihîştin û jîre jî bin. Bi vê yekê re, demên piştî wan re, ên Aqad û Babilîyan û Uriyan, Mitanî û Hûriyan, û her weha ên Gûtî û Nairîyan û yên pişte jî, divêt ku mirov bi vê yekê û têgihîştinê re di vê çerçovê de di berdewame wan de bêne ser ziman.

Li Kurdistanê, ku dem dihê deme sumeriyana û hinekî jî bi vir de, êdî her weha pêşketineka şaristanî heya. Hate deme sumeriyana, mirov karê weke deme şaristaniyê e pêşketinê bêne ser ziman. Li ber diclê û firatê, ew pêşketine ku bi vî awayî dibê, wê pişte bi dîmenbûna xwe re xwe bide berdewam kirin. Deme Babil û Aqadîyan, pişt deme sumeriyana e pêşî re, deme ku mirov li ser wê pêşketine deme sumeriyana re pêşketiya û weke ancama wê pêşketinê ên jîrî ku afirîna, ku li gor wan diafirin û dijîn bêne ser ziman. Ew gelemperbûna deme sumeriyana e bi hizre wan re ku hin bi hin diketa jîyane wan û serwerî wan dibû, wê di deme Babil û Aqadîyan de, wê bigihêne asteka împaratorî ku diafirê. Her weha mirov karê wê bêne ser ziman. Sumeriyana, ku mirov wan bêne ser ziman, di berdewamiya wan de, nabe ku mirov Babilê û Aqadîyan nehêne ser ziman. Divêt ku mirov her weha di berdewamê de bêne ser ziman. Di deme hanîna li ser ziman de jî, mirov divêt ku bi têgihîştin û jîreka ku pêşketî wê û wan bêne ser ziman. Sumeriyana, pergali û têgihîştina pergale e ku afirandin, mirov ku lê dihizirê, mirov dibîne ku di deme Babil û Aqadîyan de, ew pergaliyên û têgihîştina wê ye ku afirîya, di xwe de kur û bi têgihîştin dibe û bi jîr û bawerîyeka bi jîrî dibe. Di vir de, deme ku me bi gotin bahse baweriyê kir, me di temenê jî xwe bawer bûnê de hanî ser ziman. Ji xwe bawerbûnak, bi wan re bi hizir û têgihîştina wan ye pêşdiket re bi pergaliya wan ye ku diafirê re bi wan dibû û diafirî. Ji xwe bi bawerbûn, di aslê xwe de, di temenê wê bûna wê de zanebûnêka bi têgihîştin e bi mirov re ku pêş dikeve heya. Mirov karê wê yekê jî her weha bi teybet bêne ser ziman. Di deme Babil û Aqadîyan de bi pêşketine wan ye bi

wan re, mirov vê yekê bi wan re kifş dike. Ev herdû demên Babil û Aqadîyan, demne împaratorîyê na. Hem jî, weke demne hemdem ên wê deme berî xwe e sumeriya na. Mirov karê wan wilo bêne ser ziman. Têgihîştinbûmn û temenbûna ku afirîya karê împaratorîyekê biafirîne û wê bide berdewam kirin jî. Lê hê têrbûnek û tîrîtyek jî, ji vê yekê re her weha divêt. Deme, Babil û Aqadîyan, demna ku bi temenî wê ew xatên ku hatina xîzandin û xatkirin, wê bêne bi rengkirin û awa kirin. Bi wê re, wê deme li ser kevneşopî û jîrîyê re ku wê xwe derxe ser mirov re û mirov bike bin xwe de wê bidest afirandina xwe bike. Piştî deme Babil û Aqadîyan re, deme duyemin e sumeriyana wê were. Ew dem jî, wê hewl bide ku bi awayekî împaratorî bê afirandin. Weke hewldanake ji binî dihê li berçav. Lê demên sumeriyana ên pêşî ên berî wê demê, çend pêşketineka mazin ji afirandin, mirov nikarê wê awayê pêşketina wan bi awayê împaratorîyê bêne ser ziman. Xwasertî û piştîre konfadaraltî bi wan re di xateka peresendinê de bi wan re dihê berdewam kirin. Têgihîştin û pêşketina Babil û Aqadîyan, weke awayekê wê pêşketinê e cuda ya. Lê ji wê xate dernekeve. Di aslê xwe de, gelek levxistin û pevçûnên di naqabîna nava deme wan de, biqasî wê sedemê herîşên jî derve ku wan ji hêz dixin û didina ardê, wilqasî jî sedemêkê di wê astê û radê de, ew nakokîyên ku her weha bi awayê têgihîştinê e ku bi kevneşopî bûya û yê deme sumeriyana ku ne gihîştîya awayê împaratorîyê ji heya. Mirov vê yekê, her weha deme ku li deme wan dimeyîzêne wê yekê baş û qanc fahm dike. Deme Babiliyan, bi pêşketinên weke yên Hammûrabî re, weke demeke awarta e demê û herêmê ya. Mirov wê yekê ji wilo dibîne. Di deme Babil û Aqadîyan de, awayekî dervî kevneşopî heya. Mirov wê dibîne. Bi çûna wan re û hatina carek din e sumeriyana cara duyemin, weke vegeherîheke li kevneşopîyê jî dihê dîtin. Lê ew dem jî, najî. Ji ber ku demê û herêmê, deme îmaratorî jî ya. Ne êdî wê dervî cerbên wê pêşketinê herêm xwediyê pêşketinekê bê û ne jî, wê pêşketinê deme yekemin e deme sumeriyana jî, ku ne di hîm û bin de bin, wê pêşketineka di rû bide. Ev herdû, xal, wê ne levkirinekê di awayê rêveberiyê de xwe bidina nişandî. Bi vê yekê re, mirov karê bêje, ku xalkan de ku herêm bi herêm û cih bi cih ku xwasertî dihê jînkirin û bi wê re kevneşoptî ji afirîya, wê li ber wê hewdana yekkirinê di bin destekî de weke împaratorîyê bê. Ev alî, wê ji bin ve bi xalkê û kalkîtyê re xwe bi rêxistin bike. Aliyê din e împaratorî jê, wê xwe bi rêveberiyê re bi rêxistin û kevneşopî bike. Wê bi awayê têgihîştina xwe ye ku diafirîne, wilo pêşketinekê bijî ku mirovan ji karê di wê têgihîştina xwe de ew cihane ku tede afirandiya biafirîne.

Deme Urîyan, weke cerbeke ku wê van herdû aliyên têgihîştinî di xwe de bi sentez bike û awayê xanadantîyê bide meşandin e. Bi vê yekê de, dem bi dem demên Urîyan, ên ku carekê weke çireyeka ku fila tê kişandin li xwarê û rohnîya wê pêre kêm dibê û ku demekê ji fila wê tê hildan û pêre rohnîya wê jî, zêde dibê wê wilo ew jî bi wê dem bi dem gihîştî bê û gihîştî ne geş bê, bi wê awayê wê heyîn û hebûna xwe bi deme xwe re bide berdewam kirin. Deme Urîyan, demeke navbar e bixanedanî ya. Mirov divêt ku vê yekê di vir de di serî de kifş bike. Li Kurdistanê, pêşketine wê demê, wê di awayê rêveberiyên piştîre ên ku wê bîna de jî, wê bandûra wê deme Urîyan pîrzêde bê. Ew, di aslê xwe de têgihîştina berdewamiyê û domandinê e di rêveberiyê de bi wê re bi cerb û dem re dihênine holê. Ev pêşketin, wê piştîre jî, bi hin awayna xwe re wê bijî. Sumeriyana, temenê wê bi olitîyê re afirandibû. Lê wan, ev yek bi cerb bi pêk hanî. Dem ku buhurt, deme Mîtanîyan wê ev pêşketin bibe. Di vir de, mirov divêt ku deme Gûtîyan weke du deman mirov hildê dest û bêne ser ziman. Demek, deme destpêkirinê ya. Ew dem, wê piştî deme duyemin e sumeriyana, destpêkirina wê di aslê xwe de bide destpêkirin. Deme Urîyan ku dijî, e w jî bi awayekî dijî. Di deme xwe ye destpêkê de, demeke wê ye zêr dijî. Ev dem, du 2400 û wan de ya. Lê piştîre ku dem dihê deme salên 1600 wan, wê deme xwe ye ku bi awayekî di xwe nû kiriya li gor demê bi têgihîştin wê bijî. Ev dem, deme wê ye duyemin e zêr e. Lê ji deme pêşî hate ku dihê vê demê, wê xate wan ye pêşketinê nebe bîrîn. Wê heyî û hebûna xwe bide berdewam kirin. Di naqabîna salên 1700-1600 û wan de, wê geşbûna Mîtanîyan carek din bibe û wê derkevîne şaneha dîrokê. Berî hingî di naqabîna salên 2200-2100 û wan de jî, demeke wan ye ser nişandinê heya. Li herêmê, di wê demê de, ji du awayan ve şer û pevçûn hene. Ji aliyekî ve hatina komên ji derve ên hov hene. Wekî dîn jî, di nav komên herêmî ên xwaser de jî danberhevdûbûneke wan heya. Lê ew danberhevdûbûna wan wilo zêde bi şer û pevçûnên mazin ên herêmî re bi ancama

nebûya. Lê her herême ku bûya hêz bi hêz çûya ser herêmên din re ku xwe bi wan bide herê kirin. Di deme wê çûnê de bi li ber rabûnê re şer û pevçûnên wan ji di navbera wan de qawimî na. Mirov wê jî her weha kifş dike. Deme Gûtîyan tenê ku mirov lê dinerê, mirov dibîne ku herêm bi herêm bi rêxistina bi mirên ku weke keyên herêmî na re heya. Lê li ber herîş û hêzên mazin bihevrebûna wan jî heya. Mirov wê jî, wilo dibîne. Deme Mîtanîyan, mirov karê, bi aliyekî wê re weke Urîyan û xanadantiya wan bêne ser ziman. Bi vê yekê re, kevneşoptîyeka wan heya. Lê ew, bi hewldan û heyîna xwe ye rêveberî e li herêmê re awayekî împaratorî jî bi xwe re radixina li berçav. Mîtanîyan, aliyê wan yê kevneşopî û xanadantî heya. Lê ji wê zêdetir, li ber çav, ew aliyê wan yê hêzî ku weke ê împaratorî dihê li berçav. Bi vê yekê re, mirov karê bi Mîtanîyan re ji bo wan bêje ku weke sentezîyêkê jî bi vê yekê di xwe de didina nîşandin. Rêveberiya wan, li ser kevneşopî û her weha malîtiya xanadantiyê bi rêve diçe. Bi vê yekê, di awayê kevneşopîyê rêveberiyê de mirov karê pir baş bahse wan bike. Temenê wan jî, ji herêmtiya wan dihê holê. Lê bi wê heyîna wan xanadantiyê re bi kevneşopî levkirineka wan ye bi mîr û keyên herêmên din re jî heya. Bi vê yekê re, bûna wan ye hêzî û mazinbûntiyê heya. Lê Gûtî, wê awayekî wan yê pir pêşketî hebe. Di her deme wan de, wê awayê wan xwe bi dîyarê bide holê li berçav. Teheroka wan ye têgihîştinê e bikevneşopî ku wê berdewambûna wan dide kirin heya. Çendî ku herêmê wan herêm bi herêm bi rêxistin in bi mîr û keyên herêmê re jî, wê ew têgihîştina wan ye giştî wê yekitiyêkê di navbera wan de bide çêkirin. Bi vê yekê re, wê ku ji temen û hîm ku konfadaraltî bi wan re heya wê li asta giştî wê yek bin. Ku mirov, bahse têgihîştina Gûtîyan bike, mirov wê ji du aliyên û awayan we heyî û hebûna wê şênber li berçav bibîne. Yek, bi oltiyê ku weke êzîdîtiyê xwediyê pergaliyeka herêmîya, wê yekbûnê temenê wê diafirîne. Wê ji aliyê dîn we ku di "civat"ên wan de dihê li ser ziman, di têgihkirin û têgihîştinê bixwe de jî, berdewambûnak di levhanîna wan ye li ser ziman de heya. Bi hev re hanîna li ser ziman û bi hev ve girêdan jî, xosletekî awayê hizirkirina wan e. Bi vê yekê re, ew xwediyê pergaliyeka giştî na. Wê ku hê di deme wan de, weke xanadanaka biçûk de Naîrî jî, ku piştê mazin bûn û derketina pêş, wê di wê kevneşopîya wan ye hizirkirinê de bimeşin û herin.

3. Deme şaristanniyê e ji deme Mîtanî û Hûrîyan hate Gûtî û Naîrîyan: Deme Gûtîyan, deme ku mirov mirov li ser bisekinê ya. Wê demê ew(Gûtîyan), hebûneka xwe ye di nav deman de buhurandina û daya berdewam in. Demên berî wan, demne pêşketinê ên şaristaniyê na. Deme wan, demeke ku bi êqil û jîre dihê afirîn a. Mirov karê wê bi teybet bêne ser ziman e. Deme Mîtanîyan, wê dervî wê deme xwe ye herî pêşketî û deme xwe zêr, wê piştê jî, di jîyanê de ji bin ve wê heyîna xwe bide berdewam kirin. Mirov karê wê wilo bêne ser ziman. Wê bi awayekî xanadanî heyîna wan berdewam bê. Weke ku awayekî rêveberiyê ê ku bi peresendin her weha ji rêveberiyê ku hate rêveberiyê heyîna xwe dide berdewam kirin û bê navber heyîna xwe di domêne, heya. Mirov, wê awayê pêşketinê wilo kifş dike. Deme Urîyan, pêşketina û deme wan, kuu mirov li ser dihizirê û hinekî di derbarê wan bi têgihîştin dibê, piştê ku mirov bi dîrok û demê re dihê deme Mîtanîyan û hwd, mirov kifş dike ku berdewamiyeka wan ye di jîr û têgihîştin û awayê pêşketinê de wa heya. Mirov wê yekê, wilo pir hesanê kifş dike. Gûtîyan, di deme xwe ye pêşî de, awayekî wan yê afandinê ê teybet ê bi hizir heya. Ji awayê têgihîştina wan, mirov fahm dike ku ew xwediyê heyîneka felsefik in. Mirov wê bi wan re kifş dike. Di wê deme wan ye destpêkê de, pir pêş dikevin. Kirmana wan ye li Cizîr ku weke navende wan ye di demê de jî ya, ji awayê wê yê ku pê hatiya çêkirin, mirov fahm dike ku ew pêşketî na. Mirov wê yekê her weha kifş dike. Wan, di wê kirmanê de, rêvebertiyeka herême e giştî jî kirina. Cizîre bota ku bi navê wê demê ê deme wan Gerzûbaqarta ya, navendetitiyeka wê ye herêmî heya. Gelek sedemên vê yekê hene. Ew jî emê di demên pêşî de li ser bisekin in û bînine li ser ziman. Lê nahaka di vir de, bi çênd gotinan jî bê, mirov karê bi wê re weha bêne ser ziman û bêja di derbarê wê de.

Cizîre bota, di wê demê de jî pîrozîyeka wê ye ku herêmê bigştî herê dikir hebû. Bûna jîyane Nebî Nuh li wir û piştê ku diçe ser dilovaniya xwe êdî ku ew li wir dihê bicih kirin, sedemek ji wan sedeman diafirîne. Bi vê yekê re, nîrxîtiya Cizîre bota, her weha giringiyê wê û serweriyê wê li herêmê bigiştî heya. Bi vê yekê re, deme ku Gûtî, mazin dibin û dibina bihêz, êdî ev yek jî, wê ji wê mazinbûna wan re bê temenekî mazin bûnê. Cizîre bota, li ber Diclê bûna wê û derfetên aviyê

ên ku ji diclê digirê li dora xwe û bi wê re şînatî û çandinên ku lê dibin, aliyekî wê yê wê ê biderfetbûna wê ya. Cizîrî, ku bi wê demê dihate ser ziman. bi dawikhildana 'bota' re, dibû navê herêmeke giştî. Mirov, ku hingî digot 'botî' êdî ji mirovên wê yê herêmê ên ku dijîn re digot. Bi vê re, ew bi nav dikirin. Di nav kurdan de, ev awayê bi navkirinê, awayekî teybet e. Têde kurdan, teybetmendiyên mirovên herêmê bicih dikirin û herêm bi herêm her weha bi navkirina bi vî awayî re dihanîn li ser ziman. Li dora wê, gelek navên ku ji ku weke ên "Hezexe" û hwd, ên ku dihatina gihandin li Nebî Nuh û navên zaroyên wî û newiyên wî û hwd. Bi vê yekê re, bi navkirin, di herêmê de, di demê de hate ku dihê deme me bûya. Navên herêmên kurdan ên kevn, hemû jî, dîrokeka wan yê ku mirov wan kifş bike û bêne ser ziman ên bi vê awayê û hwd hena. Bi vê yekê re, mirov divêt ku wan navên wan jî, li ser bisekin in. Navkirin, di pêşketin û bûnên di demên dîrokê de, bi hinek pêşketinan re jî bûna. Bi vê yekê re, mirov divêt ku bi teybet li ser navan ji rawastihê. Kurdan, navên herêmên xwe bi hin nixna afirandina. Çend ku piştî navê Gerzûbaqarta re navê 'Cizirê' dihê afirandin jî, piştê kurd, wê bi dawiyê wê re ku gotineka ji wê kevntira 'bota' wê pêve bikin. Bota, ji "batanê" di deme Gûtîyan de ji hebû û piştê hate demê dihê deme Mediyân û ku wê di deme Mediyân de, bê navê navenda wan ye paytaxtî jî, ji wê dihê holê û diafirê di demê de. Gotina Bota, awayekî peresendinê ji têde di vê xate dîrokê de pêre têde heya. Peresendine di navan de, dîrokeka wê ye teybet ji deme xalktiyê û hate ku dihê deme Civaktiyê heya. Mirov, ku li Kêvalbarên wê demê ên ku hatina nivîsandin dimeyîzêne, mirov û ku ji wê demê bi ber vir ve dihê di dîrokê de, mirov wê peresendine dîrokî e navî dii navan de mirov dibîne. Navê koman cih bi cih bûya navê herêman. Navê mirovan ên weke mîran, bûya ê kom û cih û waran. Bi vê yekê re, dîroka herêmê, xwediyê awayekî xwe yê teybet ê bi dîrokê re navan re jî ya. Navên herêmên kurdan, dîroktiyeka wan ye pir kevn heya.

Di deme Gûtîyan de, mirov dibîne ku pêşketine wan ye ku heya e deme wan ye pêşî, weke ye demeke afrîner e. Bi wê re, di demê de pêşketine xwe dijîn. Bi demê re ku dihêne wê deme xwe ye dawiyê, wê êdî, di xwe de, ku bi qasî wê deme wan ye destpêkê giring û bi qasî wan demên sumeriyân ên berê avakar û awakar û her weha afrîner, wê senteztiyeka têgihîştinî di xwe de çêkin. Ev yekê, wê wan di wê deme wan de teybetmendiyeka wan ye teybet bê. Ew, awayê wê pêşketine wan e demê, wê tiştêkî di ji bi xwe re bide rewakirin. Ew jî, her weha peresendine di deme de e bi teherî e bi wan re ya. Ew xwediyê teheriyeka xwe ye teybet in. Gûtîyan, hate dihêne deme xwe ye dawiyê, wê di hizir û têgihîştine xwe de bi jîr, wê tiştêkî pir giring di xwe de kifş bikin. Ew jî, her weha weke ku çawa di jîyanê de dijîn, wilo jî, di hanîna li ser ziman de di serî de bi hizir ku karin bikin in e. Wan, temenê vê yekê, ku cihaneka weke wê cihane ku têde dijîn ku di serê xwe de dana avakirin û têde ku karin êdî bijîn avakirin. Bi vê yekê re, di jîyanê de li ser têgihîştinê de bi jîre re meşîn bi wan re weke teybetmendiyeka deme wan e wan ye hizire wan dihê holê. Ji ber vê yekê ya, ku gotina "zane"tiyê di wan de giringiyeka wê ye ku dihê heta deme me bi kurdan re heya. Car bi car ku li civatên xwe li hevdu dirûnihin, ji hevdu re dibêjin, "bizane ba û bi zane biaxive û peyvên xwe bînine ser ziman". Ev gotin, dîrokeka wê ye bi vê yekê bi wan re heya. Di hanîna li ser ziman de, ew bi teybetmendiyê dihanîn li ser ziman re xwediyê wê dîroka wê ye teybet in.

Kurdan, demeke xwe ye civaktiyê di deme Gûtîyan de jîn kir. Awayê civaktiya wan, teybetmendiyên wê jev cudaya. Di vir de, bi li ser deme Gûtîyan re sekînfî nê re, emê hinekî li ser wê civaktiya wan e bi civakafî bisekin in. Li ser awayê wê pêşketina wan bisekin in. Di dîroka wan de, deme Gûtîyan, demeke weke ku navend e.

Dîroka pêşketinê hizir û di hizirkirinê de pêvajoyên pêşketinê û demên di jîyanê de bi mirov re ku bi awayekî peresendinê bi hev re dibin, jev ne qût û cuda na. Bihevrebûnêka wan ye dîrokî heya. Demên pêşketinê ên li ber diclê û firatê, di aslê xwe de, ji jîyane çandîniyê qût pêş nakevin. Lê di vir de, ku mirov bahse çandîniyê dike, di vir de, divêt ku mirov ji bîr neke ku mirov bahse awayekî jîyanê dike. Di vir de, ev heya. Ew demên berê ên ku hatina jînkirin bi deme xalktiyê û hwd[,] re jî, ji holê ranabin. Ew jî, di wê deme pêşketinê e civaktiyê de bi awayekî peresendî dijîn li gor demê. Bi vê yekê re, di deme civaktî û pêşketine wê de dudîmentî heya. Ku ji deme civaktiyê destpê hatiba kirin, wê weke ku li rojava bû, wê awayekê civaktiyê derketiba holê. Bi wê

yekê re, wê bi têgihîştine wê ye ku ji demekê pêde heya, wê li gor wê bihate ser ziman. Li ber diclê ne wilo ya. Weke seravakê ku ba lê dixê û bi lêxistina ba re pêlên bê ku li avê dixin, weke ku di qalibekî nerm de avê dibê û dihêne xwediyê awayê ne rastûrast ku bi pêlî ya. Civaktî, asteka. Bi wê astê re jî demeke jî. Ku dest pê kir, wê di deme xwe de, êdî bi jîre xwe ye bi pergale ku heyîn û hebûne wê dihêne holê, wê bi wê re were holê. Lê ji bin ve, xalkîtî, pêşketineka wê ye ku bi awayê peresendinê ji têde ya bi demê re û heya, dihê holê û pêş dikeve. Bi wê re, weke ku wê temenê wê civaktiyê, ew deme pêşketinê e wê xalkîtiyê wê bi afirêne. Her deme civaktiyê, wê ji temen, wê di wê pêşveçûn û peresendinê de wê afirandinê bike. Lê li gorhevdûbûnekê wê bihê holê. Di deme Gûtîyan de, mirov wê yekê dibîne. Civaktî, di temenê wê de têgihîştina rêvebertiyê mazin weyn dileyîze. Çand ku awayekî civakê û mirov têde hebe jî, wê bi jîr û têgihîştin û ji wê jîre ew pêşnûme hizrî e ku afirand, wê dernekeve dervî wê di demê de. Li ser wê re pêşketinekê wê bibe. Bi wê re, bi ast û rada xwe de bi jîrekê were holê. Lê civaktî, di xwe de destpêkêka. Lê di aslê xwe de ne destpêkêka pêşî ya dîrokê ya. Destpêkêka demî ye dîrokî ya. Li ber diclê, farqê wê pêşketinekê wê ji ye herêmen din, têgihîştin û zanîna xalkîtiyê bi awayekî bide peresendin û bi deme re, ji hîm ve bi wê re bijî. Xalkîtî, wê bi vê yekê ne tenê demeke pêşî e pêşketinê e pêşîya wê pêşketina civaktiyê ya. Her weha xateka pêşketinê e di hîm wê de bi wê re ya. Bi vê yekê re civaktî, wê ne tenê bi jîrî û têgihîştinê bê jîyan. Li Kurdistanê, jîyane koçertiyê, pergaltiya wê, diçê demên berê wî deme Gûtîyan jî. Pergalbûnaka teybet e jîyanê e di nav sînorê Kurdistanê de ya. Di vir de, divêt ku em hinekî li ser wê jî bisekin in.

Li Kurdistanê, berî ku em di hanîna li ser ziman de biburhina demên piştî Gûtî û mîtanîyan, di vir de emê pêşî hinekî li ser koçertiyê bisekin in. Emê di beşa duyemîn de, bi berfirehî li ser bisekin in. Lê di vir de, emê bi serekê jî bê, li ser wê bisekin in û hinekî wê bînine ser ziman. Ev yek, di vir de, pêdivî pê heya. Jîyane koçertiyê, di aslê xwe de, divêt ku mirov di vir de hinekî li ser bisekine. Bi fahmkirina wê re, wê êdî ew wê têgihîştinekê di derbarê jîyane demên berê de, wê hinekî me bi têgihîştinê bike. Di aslê xwe de jîyane koçertiyê, jîyaneka ku mirov wê bi awayê wê û heyîna wê ye di jîyanê de ku bi pergale, wê awayê jîyane demên berî şaristanîyê, hinek şûnpêyên wê bi me bide fahmkirin û têgihîştin. Di vir de, di aslê xwe de, wê ev yek, her weha pir baş û qanc wre fahm kirin. Li Kurdistanê, jîyane koçertiyê, hate nahaka şîrovevên ku li ser wê hatina kirin û yên ku wê dihênine li ser ziman, wê weke jîyaneka goçberî dihêne ser ziman. Ev yek, ne rast e. Jîyane koçertiyê, di nav jîyane Kurdistanê û wê pergalbûna wê ye giştî de, ew xwediyê pergaltiyeka xwe ye teybet e li Kurdistanê ya. Bi teybetî li Kurdistanê, ku jîyane koçertiyê, cihên ku ew lê tê jînkirin, Ji herême Serhadê hate digihê herême botanê li ber diclê û hwd, di qadekê de dihê jînkirin. Li Kurdistanê, jîyane bi sawaltiyê re ku di buhurê, li van cihan heya. Ev jîyan û awayê, temenê wê jîyane koçertiyê ji aliyekî xwe ve dihêne ser ziman.

Mirovên ku li Herêmen Sarhadê û hwd û wanderan ku jîyane sawaltiyê dikin, li herême pir gelek in. Mirovên ku bi wî karî re diçinûtên jî, mirovên herêmi ên ku li wir bicih in. Mal û baxê wan heya. Li wir, xwediyê cih in û bi war in. Lê di salê de, her demsalek e wan ye ku koçertiyê dikin ji heya. Ew demsal, demsaleka ku di deme ku çêrî pir başa û heya de ya. Di wê demê de, wê di wê demsale ku têde wê koçertiyê bikin. Wê ji xwe re kon û tiştên wilo amede bikin û piştre sawalên xwe bidina pêşîya xwe ji herême xwe herîkî herêmen botanê ên li berdiclê ku biav in bikin. Di wê demê de, berê ku ew herin, di malbatê de, mirovên pîr û kal wê lê bigihina hevdû û wê li pêşîya wan wê herina botanê û li wir wê "kozan" kirê bikin. Kirêkirina kozan, hem ji bo sawalên wan e û hem jî ji bo wan e. Mirovên herdû herêman jî, mirovna ku ji hevdû bifahm in û hevdû nas dikin. Çan û û kevneşopîya wan wekhev e. Hate ku komên mazin ên malbatê werin, ew in pîr û kal ku ji wan û li pêşîya wan çûna, wê cih amede bikin û êdî ku komên malbatê ên mazin hatin, êdî wê têde bicih bibin. Wê li cihên ku weke "koz" kirêkirina wê li wir bicih bibin. Di wan deman de jî tavahev pir geş e. "Jîyane şewînîyê", li herême bi mirovên herêmen ên ku xwedî sawal in re jî dest pê kirîya. Şewînî, di deme ku taavahev pir baş bû di wê deme ku hev bi tememî derketiya û herêmi bi wê rohnîya wê bi rohnîyeka teybet pir mazin birohniya, wê ew jî, sawalên xwe li kozên xwe yên ku ji xwe re amedekirina û an jî, ku kozên wan in û ji bo xwe dana amedekirin de, wê sawalên xwe li derve bihêlin. Bi wê hiştinê re, wê jîyane ku heya e ku heya e

xalkê e şevê jî, wê di demê de li derve bê. Wê mirovên pîr û kal û her weha ên din ên ku bi wan re dirunihin, wê civatên xwe li derve li ser ban û "arzêl"ên ku hatina amedekirin wê li dar bixin. Mirovên ku di wê deme tavaheyvê de bikar û bar in jî, wê bikar û barên xwe ve bi bazin û herin. Bi teybetî, di wê demê de, çendî ku şev e jî, jîyaneka ku hema bêja weke ye rojê geş e heya. Tenê zaro, ên ku di demê de di nav cihên xwe de razahîna. Lê yên din hemû jî, ên ku di wê demê de ên li derve na. Ew deme ku wê demê, deme ku pîr baş e çûn û hatinê ya. Li Kurdistanê, ku heyv bi tememî derketa holê û hate dîtin, ew deme wê ye tememî demeka wê ye ku tavaka wê ye pîr geş heya. Kurd, ji wê tavaheyvê re dibêjin "tavaheyv" û wateyeka pîr giring jî lê dikin. Herweha awayekî jîyanê ê bi pergala dihe holê. Ji ber ku mirovên ku di nav xalkê de ji wan re dihe gotin "Koçer" ji herêmeka din ye Kurdistanê hatibû, ev nav lê hatibû kirin û jê re ev di hate gotin. Lê mirovên ku ji der û berê diqarahan û barî herêmeka din dikin, weke mihaciran jî, ew jî navekî di li wan di hate kirin. Navê wan jî cuda bû li wan di hate kirin.

Jîyane koçertiyê, ji demên berê ve heya. Di deme Gûtî û Mîtanîyan de biqasî ku em dizanîn hê geştir bûya. Ji ber ku di wê demê de diclê bilind bûya û li wir, ji wan re pîr mazin derfetên ku jê fêde bibînin hebûya. Lê ti carî jî cih û warên xwe jî ne diqarahan. Piştî ku demsale koçertiyê buhurt, êdî ew jî wê vegeŕiyaban cih û warên xwe di wê demê de. Vê yekê û awayê, bi wan re di jîyane wan de heyîna xwe pîr mazin dide berdewam kirin. Li ber diclê şîniyên wê yên ku di roje me de gelek cûreyên wê ji holê rabûn, ji sawalan re pîr fêdetir bû. Wan ji, ev yek dizanî. Piştî ku dihatin û demsale buhurandin, êdî ku divegeŕîyan jî, hê bêhtir dewlemendtir û birewştir di vegeŕîyan. Hê bêhtir bi panîr û hirî û hwd di vegeŕîyan. Ku di vegeŕîyan, êdî wê jîyane xwe wilo hê baştir bi buhurandin. Bi vê yekê re, rewşê jîyane mirovên herêmê jî xweş bû û li cih bû. Rewşê herkesekî li cih bû. Ti kesekî di nav xalkê de di jîyane bê suxûr û zad ne dima. Ku sibahan di rabûn jî, wê baş li gor dilê xwe kiriba. Me li vir bahse sibehê kir, bê ku em bahse gotina "xurînîtiyê" bike, emê derbas nebin. Gotina xurînîtiyê, ji birçibûna sibehê re ku hê xwarin ne hatîya xwarin di hate gotin. Navê wê bû.

Jîyane koçertiyê, di aslê xwe de, awayekî jîyanê ê ku bi heyîna xwezê ve girêdayî ya. Ew awayê jîyanê, bi vê yekê re li Kurdistanê bi tam derketina heyvê re dest pê dikir û hate ku ew demsal hebû jî berdewam dikir. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku şewîntî jî awayekî wê ya. Lê awayê wê ye ku mirov di cihê xwe de dima bû.

Heyîna diclê û şîniya wê ye ku wê li dora xwe dide şînkirin û bi wê re, di temenê wê de bû. Diclê, î ro, ku çendî ji wê heyîn û şîyane xwe dîrketibê jî, di wan deman de pîr bi heybet û şîyan bû. Diclê, herêm hemû jî, bi pêş dixist bi xwe re. Bahre herkesekî jê bû û wê dide wan. Ji herkesekî re dest vekirî bû. Temenê wê jîyane koçertiyê jî wê diafirand. Mirov karê wê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman û bêje. Li Kurdistanê, heyîna diclê û firatê, di aslê xwe de, ku mirov wan bi gotinekê jî bê bêne ser ziman, mirov wê bêje ku herdû temenê pergala bûna di jîyanê de e li dora xwe bûn. Heyîna wan, piştî gelek deman jî, ku çendî herîş li herêmê dibûn û xurûxandin û kevilkirin di hate kirin jî, wê piştî wê re, carek din, xwe afirandin bûba. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku afirîtiyeka diclê û firatê ji her aliyê ve hebû. Diclê, ji wê pêşketinê, bi gelek awayan bi destpêkî dest pê kiriya.

Di deme Gûtîyan de û piştî wan re di demên din jî, ev awayê jîyanê ê ku bi koçertiyê hebû, dihe jînkirin û heyîna wê dihe berdewam kirin. Di deme Gûtîyan de, li ber diclê pîroziyek bi Heyîna Nebî Nuh de afirîbû û bicih bûbû. Pîroziya Nebî Nuh, çawa afirî û hizre wî çawa bû? Ev pîrsna ku mirov wan fahm bike û bêne ser ziman in. Di cihên pîroz ku weke parastgahan de, pêşketina wê bû. Nebî Nuh bixwe jî, perwerdeyê pîr mazin ji destpêka xwe di wan deran de hilda bû. Bi vê yekê re, mirov dibîne ku ew bitêgihîştin e. Di demê de, zanîn û têgihîştina karî û şîyane wê, di wan deran de hatibû bicih kirin. Hin bi hin jî, di wan deran de pêş dikeve. Wê piştê bi gelekî re, ji wan deran derkeve. Deme Gûtîyan, di pêşketina çand û keveşopîya wî de, demeka ku pîr giringiya wê heya. Mirov, ji ber vê yekê, divêt ku bi teybetî li ser wê demê bisekinê. Ew dem, wê bi awayekî têgihîştî bijî. Di aqil û heyîna wî de, pîr mazin bi jîr in û xwediyê afirandinekî na. Wan, pergala Nebî Nuh li gor demê afirand û denezand. Bi vê yekê re, êdî pêşketina piştî wî re dest pê kir. Piştî wî re, demên ku dihe jînkirin, dem bi dem, demên ku wî û pergale wî dijî in.

Her demeke ku piştî wî re dihê holê, weke pêvajoyeka demîya xwe ye ku ji wê dest pê dikê ya. Bi vê yekê re, êdî piştî wî re, wê her dem, bi têngihîştina wî re pêş bikeve. Ji wî hate ku dihê deme Birehîm Xelîl, demne bikevneşopî dihêne jîn kirin. Di aslê xwe de, Birehîm Xelîl, mirovê wê çandê û kevneşopiyê ku kariya ku wê li gor demê bêne ser ziman e. Nebî Nuh, têngihîştina ku bi wî re di parastgahan de pêş dikeve, wê pergalbûna di jîyanê de êdî bide berdeham kirin. Bi vê yekê re, deme Gûtîyan, di aslê xwe de, pir mazin jîrîyeka wan ye demî heya. Bi kevneşopî dijîn. Ew kevneşopîya wan jî, wê di temenê wê pêşketinê de cih bigirê. Gûtîyan, di hizir de demek di aslê xwe de bi xwe re û heyîn û serwerîya xwe ye li herêmê re dana dest pê kirin. Demeke ku bi êqil dihê jîn kirin e. Vê yekê her weha mirov karê bi teybetî bêne ser ziman. Di xate li ber diclê re hate ku dem dihê deme Naîriyan û pişt wan re, wê her weha li gor wê serwerî biafirê. Têkbirina Naîriyan e ji aliyê Asûriyan ve, wê li herêmê wê pergale ji holê ne rakê. Ew jî, wê li gor wê nirxtiya xwe pêş bixin. Bi vê yekê re, wê li herêmê demeke xwe bijîn. Sedeme vê yekê jî, her weha heyîna wê pergale û têngihîştine wê ku pir xurt di mirov de bicih bûya ya. Deme Gûtîyan, ku mirov wê bêne ser ziman, mirov karê wê bi teybet ji sê aliyên wê yên giring ve bêne ser ziman. Her weha aliyê wê yê ku pêşketî û bi awayekî hemdemîya deme xwe dijî ya. Aliyê dî ê duyemin jî, her weha li gor wê pêşketinê bi awayekî pêşketî bi rêxistin bûn û kur bûna wê ya. Aliyê wê yê sêyemin jî, her weha aliyê wê yê giringe, ku demên berî xwe de di xwe de bi têngihîştinê sentez kirina na. Demê berî wê, çî pêşketin jîn kirin, ji aliyê êqil ve wê di xwe de bi têngihîştin kiriya. Mirov karê vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Deme Gûtîyan, li Herêmê, bi wê awayê xwe ku xwe pê rêxistin kiriya û pêşketiya hem ji aliyê hizirî ve û hem ji aliyê rêveberiyê ve wê pir mazin bê xwediyê serwerî û serdestiyeka mazin. Di aslê xwe de, ku mirov pêşketina herêmê fahm bike, Divêt ku mirov zanibe ku hertimî ji binî ve xwe birêxistin kirin heya. Ji ber vê yekê, hêzên ku ji derve hatina, êdî nikarîna ku wê ji holê rakina. Deme Gûtîyan, ji aliyê hizire wan û pêşketine wê ye demî ve emê li ser bisekin in. Lê belê nahaka emê di hanîna li ser ziman e demîye wan ye rêveberiyê û serwerbûnê e herêmê ve bînine ser ziman.

Piştî deme Gûtîyan, pêşketinên rêveberî, wê heyîna xwe bi pêş bixin. Bi teybetî deme Naîriyan, wê pişt wan re, bi awayekî li ser pêşketine wan xwe bi rêxistin kiriya wê pêş bikeve. Naîrî, ew jî, weke Gûtîyan, wê bi herêm bi herêm xwe bi rêxistin bikin bi mîr û keyên xwe yên herêmî re. Naîrî, deme wan, Wê ji 1300 û wan dest pê bike, hate ku wê dihê sadsalên 8. min û wan. Lê berî hate ku werina wê deme xwe ye dawiyê, wê di sala 1128 û wan de bi Asûriyan re bikevine şerekî mazin de û wê têk herin. Ev têkçûn, wê wan û rêveberiya wan ye herêmî jî holê ne rakê. Lê wê wan serwer jî neke. Deme wan ye weke demeke zêr, ji sadsalên 13 û bi vir de ku hate ku dihê sadsalên 11 û wan, hate wê têkçûna li ber asûriyan. Bi wê re, wê Asûrî serwerîya wan li herêmê mazin û serdest bibe. Lê wê, ew serdestbûna wan, wê tenê bi serdestiya giştî ve wê bi tixûb bimênin. Piştî têkçûnê, wê Naîrî hate demekê wê bêşan ji bidîna rêveberiya asûriyan. Weke gotineka ku bûya malê dîrokê, ku di deme bûna wî serî de dihê gotin û dihê gotin ku Asûriyan piştî têkçûnê 43 keyên Naîriyan dil digirin û di berdêla bêşan de wan serbest diberdin. Ev gotina 43 key, têngihîştinekê bi me rewa dike. Ew ji her weha ew e, ku naîrî, weke Gûtîyan herêmê bi herêm bi rêveberî bi rêxistin in. Weke ku hate îro di nav kurdan de berdeham kiriya, bi mîrtî bi rêxistin bûna. Di sadsalên dawiyê de ew rewşa wan jî holê dirabê. Naîrî, çend ku têkçûna jî, li herêmên xwe bi rêveberî û kevneşopiyên xwe dijîn. Ew rewşa wan ye weke berê, ji aliyekî di domê. Lê wê têkçûnê, derbeyek jî li wan xistîya. Naîrî, mîrên wan yên demê, wê hertimî werine cem hevdu, ku ka çî dikarin bikin ku dîsa serwerîya xwe ye serdestî bi şûn ve bînin û bidîna ava kirin. Bi vê yekê, herêm bi herêm li gelek cihan jî, serhildanên wan dibin. Lê di gelek serhildanên xwe de têk jî diçin. Lê dev ji ye xwe ne berdin. Sadsalên 8. û ji wir û bi vir pê de, wê bê demeke pir nû ji wan re. Wê serhildanên wan, hate ku biserbikevin wê berdeham bikin. Wê ser sadsalekê re wê serhildanên wan herêm bi herêm berdeham kin. Di destpêkê de, ew navende wan ye ku herêmê botan ku cihê Gûtîyan ji wan re navend bû. Wê di sadsalên wan yên dawiyê de ji ber wan serhildanên wan bi ber herêmên Sarhadê û Zagrosan de bi herikê. Ji ber ku zagrosan, cihna ku di deme serî hildidan, ji wan re malavanî dikir. Bi vê yekê re, di salên wan yên dawiyê de, wê ew herêm ji wan re bina navend. Herêmên weke Sêrt û Mûş û hate ku digihê ber Araretê, wê ew der

ji wan re bina navend. Naîrî, çend ku di wê têkçûnê de têkçin jî, ji ber ku pergalbûnêka wan ye giştî û ku di wan de bi kevneşopî û têgihîştin bûya heya, êdî ew têkçûn wan ji holê ranekê. Piştî wan deman re ku dem wê were deme Nêzî deme Mediyan, Serhildanên ku zêdaganên ku kurd ên bi kawatiyê dihêne bi navkirin ku wê pêşevaniyê dikin, wê bi serkevin û wê dişa wê welatbûna xwe ava bikin. Mediya, di aslê xwe de bi welatbûn û heyîna xwe ye ku bûya re, tenê levxistina hevdu ye bi rêxistin ye li gor wê kevneşopî û têgihîştina pergali e giştî ya. Temenê wê her weha ew e. Ku ew temen neba, wê wilo zêde pêşketinêka mazin bi Mediya re neba. Mediya, jîyandineka di berdewemiya di wê kevneşopiyê de ya. Mediya, ji aliyê kevneşopî û têgihîştina rêveberiyê e bi pergali ve û ji aliyê kevneşopî û jîyandina xalkî e ji binî ve li ser wê temenê berî xwe weke avahiyêka pîrmazin e hatiya rûniştandin e.

4. Ji deme Gûtîyan hate deme Mediya; pêvajoyên yekîtiyê û pergaliya olî e yek xwûdayî e Êzîdiyê û serwerîya wê giştî li herêmê bi giştî: Ku mirov, deme Mediyan, şîrove û dahûr bike. Mirov wê ji aliyên ve pêşketinêka mazin têde bibîne. Mediya, sedeme wê ye pir mazin wilo zêde û zû pêşketina wê ye giştî, di aslê xwe de, bi wê heyîna hîmî e pêşketî e kevneşopî, çandî û hizirî ya. Medî, wê wan deman ji van aliyên ve di xwe de bi têgihîştin û birewerîyêkê bi têgihîştin bikin û bi sentez bikin. Ev yek, wê bi pêşketin û derketinêka mazin e dîrokî xwe bide nîşandin. Medî, wê yekê her weha karin bikin. Li ser wan ardên wan, çi pêşketin hene, heya wan ji wan heya. Di xwe de ew bi têgihîştina wan in.

Medî, wê bi wê pêşketina xwe re, xwe bikina weke rojeke ku dora xwe pir mazin bi rohnî dike. Wê dora wan jî, wê rohnîya wan bibîn in. Di nav wê hewirdorê de Medî, bi awayê pêşketina xwe û bi ast û rada xwe ye ku dihênina holê, pir mazin li pêş in û bi wê heyîna wan re di pêşketina hewirdora wan de jî pêşevaniyêka wan dibê. Medî, xosletê wan yê wê deme yê pêşketîya, her weha ku li gor pêşketina demê hemdemîyêka xwe bi pêş dixin û dijîn in. Ew karin, vê yekê bidina nîşandin jî. Deme Mediyan, bi kevneşopî û hizre wan ye ku heya re, pir mazin heya. Yekîrîyêkê di nava xwe de pir mazin diafirênin. Hizre wan ye olî, bi awa, pêşketin, kevneşopî û hizir re xwediyê yekîtiyê yekkirinêka dîrokî ye bi wan re ya. Ew van xalan bi hizir dijîn. Ji deme Gûtîyan hate ku dem dihê wê demê, bi vê yekê, bi têgihîştin û kevneşopîbûna wan e bi hizir, pir mazin dibê. Bi hizir hizirîn û bi aqil û jîr çêkirin, kevneşopiyêka wê jî bi wan re afirî ya. Kevneşopîya hizirkirinê, berî hertiştî bi wan re afirî ya. Bi vê yekê re, dem bi dem hin awayên pêşketinê dijîn. Hate ku dem dihê deme Mediyan, wê êdî ew heyîna û bûna Mediya, wê weke ancama wê jî bê. Wê, ne tenê weke ancama wê serkevîna wan ye li ber hêzên Asûrî bê. Li ber diclê û firatê, kevneşopîya pir mazin ên ku van pêşketina û afirandinan didina kirin hene. Li ber diclê, kevneşopîya Nebî Nuh û li ber Firatê ku piştî wî re bûya kevneşopîya Birehîm Xelîl jî heya. Ev herdû kevneşopî, di aslê xwe de, rêwanên riyekê na. Di riyekê de dimeşîn. Bi demê re ku dem dihê deme Mediya, wê ev yekbûna ku di kevneşopiyê de bûya, wê temenekî destûrî ji wê pêşketinê re bileyîzê. Yekbûna ku dihê gotin ku di hizre olan de dibê bi teybetî ji di olên yek-xwûdayî de, ku temenekî wê yê bi kevneşopî nebe û ne afirî bê, wê ew hizir û pêşketine ku wê yekbûnê dihêne holê jî, wê nebe. Yekbûn û bi hev ve girêdan, di serî de bi kevneşopiyê dibê. Giringiya kevneşopiyê, di her demê de heya. Di her demên pêşketinê de, ku kevneşopîya demî afirî û bû, wê nîrxbûna wê ye demî jî bi xalkê re bi afirê. Mediyan, ji demên berî xwe û ji mirov û pêşketinê berî xwe ev yek fahmkirina. Ji ber vê yekê ew bi wê yekê û an jî ku mirov bi navekî dî bêje bi kevneşopî, zanin ku wê çawa bijîn. Bi vê yekê re, ku mirov deme Mediyan şîrove dike, mirov fahm dike ku wele demeke wê deme hemdem e ku dihê jînkirin e nûjen e. Bi awayê xwe yê pêşketin û têgihîştin û pêşketina xwe re, her weha ev yekê wê dihê ditin. Deme Mediyan, tişteki dî jî dide berçav, ku mirov lê dihizirê û bi hizirkirinê lê dinerê. Deme Mediyan, weke ku xwediyekî sêdîmenî ya bi awayê pêşketin û ast û rada xwe ye pêşketî re. Mirov, ku lê dimeyîzêne, mirov gîyane demên berê e pêşketî têde dibîne. Bi teybetî, bi awayê hizirkirinê dîtina deme Sûmerîyan û deme Gûtî û mitaniyan, weke gîyanekê xwe di wê pêşketina wê de didina ser rû. Di xat û awayê pêşketinê de, berdewambûnêka bi awayê peresendinê e wê heya. Mirov, wê jî bi wê deme lê nerînê re dibîne. Peresendine jîrî û bîrî e ku bi mirov re, temenê wê bi kevneşopiyêka ku bi olî jî yekbûn û pîroziyêka xwe afirandiya re dibê. Bi Mediyan re, ev yek heya. Li ber diclê,

kevneşopîya Nebî Nuh e ku heya, temenê wê heyîna wan ye dîrokî diafirêne. Kevneşopîya Birehîm Xelîl, tenê demeka wê ye piştre ya û ew deme wê ye piştre jî, wê di wan demên wê yên piştre de ku wê li gor demê afirandîya û her weha dide berdewam kirin a. Deme Birehîm xelîl, wê aliyê wê kevneşopî ê olî wê bi piroziya wê re bi yekkirinekê re bide afirandin li gor demê. Piştre, wê ew têgihîştin, her weha serwerîya wê berdewam bike. Bi wê re, heyîna wê pergale li berdicle ku pir kur dibe dihê li berçav. Ber diclê, di vir de pêşevaniyeka wê ye dîrokî heya. Ew deme Aqilbûnê e ku bi Nebî nuh re dest pê dike, ku mirov wê fahm nekê e li ber diclê, mirov wê pêşketine li wir jî, baş û qanc fahm nekê. Ew pergale û têgihîştina wê ye ku weke gîyanekê heyîna wê bi serwerî bi mirov re dijî ku ew serkevîna ku wê Medîya bide afirandin ku hanîya, ku Medîya afirand, wê temenê wê jî her weha bi wê kevneşopîyê bide afirandin. Zanistên weke Zerdeşt, ên wê xatê na. Hizre Zerdeşt, î ro hemû ne di destê me de ya. Lê ku hemû di destê me de ba, mirov wê pir baş dîtiba ku ew çawa weke mîrîdekî wê kevneşopîya Nuhî e li ber diclê ya. Pêşketinên piştî deme Medîyan dibin jî, ku ne di berdewamiya wê rêvebertî û serwerîyê de jî bin, wê di berdewamiya wê kevneşopîyê e di nav xalkê de ku heyîna xwe bijînî dide berdewam kirin e. Ji nahaka pêde, ku hate ser ziman, wê di temenê pêşketinên piştî wê de ku hatina jînkirin wê were ser ziman.

Ji aliyê civakatiyê pêşketine wê û dîroka wê ye ku dibe ve, bi vê yekê û awayê pêşketine ku dibe, mirov ku lê dimeyîzêne, mirov jê fahm dike ku herêm xwediyê çî awayê ya. Hate deme mediyan, mirov pêşketina ku bûya û awayê wê yê ku derketiya holê, ji gelek aliyên ve mirov karê wê bêne ser ziman. Kurd, di wê demê de jî, bi herêmî bi rêxistinbûn. Ku weke awayekî rêxistinîya wan ye di nav wan de mirov bahse awayê konfadaraliyê bike di vir de, wê baş bibe. Ji ber ku ev awayê rêvebertiyê, ji demên berî Mediyan hate ku dihê deme Mediyan jî, ye ku wê didi kifşîkirin û pêşketine wê kifşîdike herêm bixwe na. Heyîna herêman û tîkiliya wan ye bihevreyî û her weha pêşketine di herêman de e teybet e. Mirov divê ku vê yekê, bi vê awayê li ser bisekinê. Herêm, di xwe de pêş dikevin. Lê hinekî jevdûrbûna wan, wê hem herêmê kê bi serê xwe û hem jî wê kê ku herêm bi herêmên din re bi hevretiyekê re bi pêşbikeve. Bi vê yekê re, Teybetmendiyên herêmî ên herêmên Kurdistanê, hem ji aliyê zimên ve û hem jî ji aliyên din ve derdikevin û dibin.

Di vir de, divê ku em pêşketine civakatiyê di peresendinekê de bi dîrokê re di wê xate wê ye pêşketinê de bêne ser ziman û werêne ta roje me. Wê, ev yek, rastiye awayê pêşketinê e herêmên Kurdistanê bi serê xwe wê hingî baştir werina fahm kirin. Her herêm, bi serê xwe, bi vê yekê hewceyî pê heya ku bi serê xwe jî ku mirov çavekê lêxe û wê bêne ser ziman. Ji ber ku di dîrokê de her weha ev yek wilo bûya bi pêşketina wê re. Wê, ev yek, hingî awayê wê pêşketine wê baştir bi me bide fahm kirin û têgihîştin. Gelemperbûna ku ji deme Sumeriyên ve bûya, di kevneşopîyê de bicih bûya. Di demên pêşketinê de weyneke wê heya. Li herêmê, gelemperbûn, di aslê xwe de, wê ye ku temen û himê wê biafirêne û wê bide pêşxistin, bûn û derketina pergale olî û bihizire. Temenê vê yekê jî, wê bi kevneşopîyê re were ser ziman. Ji ber vê yekê, wê di her mijare ku em di çerçova heyîna wê hebûna civakatiyê de bînine ser ziman, wê di dereka wê de heyîna kevneşopîyê ku vekirî bê û girtî bê, wê were ser ziman. Dem, ku dihê deme Mediyan, wê pêşketineka mazin bi wan re di demeka kin de rû bide. Sedeme vê yekê ji heya. Ji ber ku di demên berê de, jînbûn û cerbbûn bûya. Deme Hûrî û Mîtanîyan, Gûtî û Naîrîyan û hwd, demne cerbî na. Deme Gûtîyan, bi serê xwe nêzî 400 berdewam dike. Ev, tenê deme wê ye destpêkê dihêne ser ziman. Lê demên wê yên piştre hene. Piştî wan re, "qasîtî" jî dijîn. Ew jî, ku î ro, di derbarê pêşketin û awayê pêşketina wan de, wilo zêde, agahîyên me ne bin jî, em dizanînin ku demeka bi êqil û jîrê dijîn. Ew jî, demeka şaristaniyê e deme civakatiyê e di wê xate pêşketinê de bi xwe re dihêne li ser ziman.

Dem, hate ku tê deme Mediyan, mirov êdî wê karibe, bahse wê deme bi teybet bike. Ji ber ku hin xoslet û teybetmendiyên wê demê ên pir teybet bi awayê pêşketine wan re hene. Ew, demeka nû ye ku di hemdemîya xwe de Nûjenîyeka wê xate pêşketinê û civakatiyê dihêne ser ziman e. Mirov, vê yekê her weha bi teybet bi wan re karê bêne ser ziman. Çawa ku deme sumeriyên, çend hezar salan di xwe de demne pêşketin jîya û piştre, ku weke ancama wê pêşketine wê di deme Aqadîyan de vebûna wê ye li hewirdorê bû, her weha mirov karê Mediyan jî piştî, deme wan re wilo bêne ser ziman. Piştî deme sumeriyên di deme Aqadîyan de, cara pêşî yekê Aqadî Sargon

serwerî û serdestiye li herêmê bigiştî bidest xist. Weke ku piştê dihê bi navkirin jî, Ku ji Kurdistanê re hemûkî re dihate gotin ”Mesopotamya”, wî cara pêşî serwerî û serdestiya xwe li ser hemûkî ava kir. Bi vê yekê, wî mohra xwe li dîrokê da. Bi vê yekê re, gotina ku ji bo deme Aqadîyan û wan bixwe jî dihê gotin ku ye ”împaratorîyê” wî bicih û hîm kir. Serwerî û serdestiyê gelemper, piştê wê pir bibin. Serwerî û serdestiya Mediyân jî, bi vê yekê û awayê mirov karê bêne ser ziman. Çawa ku Key Sargon, xwest û kir ku herê û herêmên anatolia jî bike bin destê xwe de, Mediyân jî, her weha piştî ku li herêmên Kurdistanê û li hinek herêmên li dora wê jî serwerî û serdestiya danîn, piştê berê xwe dana herême Anatolia. Seferên di bin serkêşî û fermadariya Harpagos û Madarîn de, nişanakên vê yekê na. Wan li gelek herêman jî, serdestî jî bidest xist. Di dawîya Mediyân de, Kîrosê ku ji aliyê dê ve Pers bû û ji aliyê bav ve Kurd jî bû, piştê xwestek û hewldanaka wê bû. Lê ew jî, piştê ji ber ku di qasrê de şer û pevçûnên serdestiyê hebûn, di şerekî jî wan re dihê kuştin.

Deme Mediyân, di aslê xwe de demeke denezandina deme civaktiyê ye pir pêşketî ya. Pêşketina ku bi civakî bûya, û astûrada ku derketiya holê, di deme de heyîn û hebûna Mediya bi hîm dike. Bi teybetî di deme Gûtî û Nafrîyan de, pêşketin û asta wê ye ku diafirê û dihê holê, Mediya weke ancamaka wê ye bi rêveberî ya. Mediya, li herêmê, awayê rêveberiya nû ye herêmê ya. Bi wê re, demek dihê girtin û demek dihê vekirin. Mediya, deme olî ye yek-xwûdatiyê dijî. Li gor wê jî, pêşketin û pêşveçûnên wê dibin. Zerdestê sêyem, di aslê xwe de zanistê wê deme nû ya ku diafirê ya. Bi yê weke olî re, guharandin, bi awayekî peresendinî di kevneşopîyên di nav xalkê de jî dibin. Hizrên olî ên felsefîk pêş dikevin. Ji î ro ve ku mirov li wê demê û rojê meyzîzêne û bêje ku tevî weqas têkçûn û xuruxandinan kurdan, heyîn û zimanê xwe çawa parast, ku mirov bi vê yekê bi pirsê, mirov wê bersivêka ji wê pêşketine wê demê ye ku bûya dûr nede. Mirov, wê nikaribe jî bide.

Piştî deme Mediyân, pêşketinên ku rûdîdin û dibin jî, yê ku li ser wê asta deme mediya re dibin in. Piştî Mediya re, wê tenê kurd, wê pers jî bahr û tēja mazin ji wê pêşketinê bigirin û wê bijîn. Deme Aqamanîşan û Sasanîyan, demne ku serwerî û serdestiya rêveberiyê ketiya destê persan de ya li herêmê di wê heyemê de. Wê ev dem jî, dernekevina dervî wê awayê pêşketinê û bûnên ku bûna. Wê bi kevneşopî li gor wê bijî. Li herêmê serwerî û serdestiya wê kevneşopîyê, ku kî û çî rêveber were ser serweriyê û desthilatdariyê jî, wê kê ku ew li gor wê û heyîn û hebûna wê bijîn. Nebî Nuh, di bin wê kevneşopîyê de ya. Bi wê re, li herêmê dihê bawer kirin, ku ”deme êqil bi wî re dest pê kiriya”. Ev gotin, ne tenê hizrekê û têngihîştinekê bi dîrokê re dihêne ser ziman, ji xaynî wê jî, baweriyekê jî bi xwe re dihêne ser ziman. Herkesek jî, li wê baweriyê bi bawer e. Gotina ”wê êdî deme êqil dest pê bike”, li herêmê li ser navê Nebî Nuh ji devê wî dihê gotin û vegotin. Bi vê yekê re, hizrên olî jî, deme ku dihêne afirandin, li gor wê, bi aqiltiyekê li wan dihê lê gerin. Ev yek jî, weke pêdivîyeka pîroz dihê dîtin. Bi vê yekê re, kevneşopîyeka olî e pîroz ku têde aqil û zanebûn heya, diafirê li herêmê. Aqil, serweriya wê ye demî, mirov karê bi awayê serdemîyê bêne ser ziman. Piştî Mediyân re, Zerdest, hizre wî bi kevneşopî dihê herêkirin û dihê pîroz kirin. Bi vê yekê re, êdî bandûra wî jî mazin dibê. Ji nû ve nîrxandin û hanîna li ser ziman, wê bi awayekî guharandinî wê pêşketinê di kevneşopîyên hizrî û civakî de bide kirin. Hê di deme Gûtî û Nafrîyan de, bi têngihîştin teherkirin hiziran e bi hev re afriya û dibe. Di wê demê de, ev yek, mazin tir pêş dikeve. Di asta kevneşopîyê de, di aslê xwe de pîrozkirina Zerdest, wê ji têngihîştina vê teheriyê e kevneşopîk ne dîr bibe. Di demên piştî wî de, wê ev yek û rastî bihizir, wê hê rasttir û baştir were dîtin û bikeve li berçav de. Di demên piştî Mediya de, çendî ku rêveberîya kurdan tê herê jî, wê ew bi awayekî ku ji wê deme rêvebetiyê ne kê m wê di serweriyê de bi mênin. Sedeme vê yekê jî, bi wê pêşketine bi têngihîştin e bi kevneşopîyê ve girêdayî ya. Bi awayekî olî e yek-xwûdatiyê jînkirin, bi wan re bûya. Li gor wê parastgah û an jî ku mirov weke ku wan bi nav dikir bi navbikê, ”agirgah”ên wan bi wê têngihîştinê hebûn. Bi vê yekê re, kevneşopîyeka wan heya. Li gor wê, di jîyanê de rêxistinbûn jî heya. Serwerîya kevneşopîyê, serwerîya herî kur û bihîm e civakî ya. Mirov, ku li wê awayê heyîna pêşketina wan jî di meyzîzêne, mirov bi vê yekê wan dibîne û dixwêne. Demên piştî

Mediyan re, ên kurdan ên bi teybetî bi Şadadiyan, Merweriyan, Eyûbiyan û hwd re di wê xatê de bûna, ku li ser wê awayê pêşketinê e deme nû re bûna.

DESTPÊKIRINA DEMEKE NÛ PIŞTÎ XURÎXÎNA MEDÎYA; SERWERÎ PERSAN YE KU ÊDÎ JI AÇAMANÎŞAN Û SASANÎYAN DEST PÊ DIKE

Li Kurdistanê, demên piştî demên Mediyan re, demne ku li gor wê pêşketinê ji hinek aliyan ve dihêne jîn kirin in. Lê bi rêveberiya Aqamanîşan re û piştê bi ye Sasanîyan re, nêzikatiya rêvebertiyê weke nêzikatiyeka serwer hin bi hin dihê holê û hewldide ku jîyanê û pêşveçûnên wê bide kifşkirin. Wê, ev yek, di wê demê de hin bi hin bê temen û hîm ji nexweşiyên ku wê bibin. Ji ber ku di wê kevneşopîya li ber Diçlê de, ew kevneşopîya ku hate wê dem, ji deme Nebî Nuh ve ku bi aqil pêş diket û serwer bû, ahangê di naqabîna rêvebertiyê û pêşketinê di jîyane de dihate çêkirin. Lê bi wan hewldanan re, êdî ew ahang weke ku li leha rêvebertiyê bi hewldanan dihate xwestin ku xirabibe. Bi vê yekê re, rewşeke ku weke ku di nav xalkê de jî ku bi derketina pêş û serwerbûna rêvebertiyê re "ne ji rêzê" dihate holê. Mirovan, di jîyan xwe de jî ev yek her weha wilo di dît û fahm dikir. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku deme Mediyan, ji gelek aliyan ve demeke nû dide dest pê kirin. Deme Mediya, bi rêvebertiyê û wê awayê pêşketina xwe re, wilo zêde li ser lingan namêne. Di wê deme xwe de ew, li gor awayekî pêşketinê ê nû tev digerihe û pêş dikeve. Ew deme wê ye ku pêşket, têrê dike ku di rêveberiyê de wê çawa bê tevgerin ku bide fahm kirin. Lê bi jîyan û pêşketine xwe re ye di demê de têrê nakê ku mirov baş fahm bike ku li gor wê têgihîştine wê ye deme nû baş fahm bike û bijî. Ku mirov deme mediya dihêne ser ziman, mirov karê bi du awayan bêne ser ziman. Yek, ku bi tememî ji hîmî ve bi wê kevneşopîya berî xwe diji ya. Ye din jî, her weha bi awayekî ku di nûjeniya hemdemiya deme xwe de diji û bi pêş dikeve ya. Di vê xalê de, bi wê awayê duyemin, weke ku bi pêşketin û hizirkirina xwe re derdikeve dervî dem û kevneşopîya xwe ya demî. Bi vê yekê mirov karê bêje ku li ser wê pêşketine xwe re, weke ku dixwezê kevneşopîya ku heya bi hizire wê re bi awayê xwe yê ku pê diji bide peresandin ..

Medî, bi vê yekê re, demeke pêşketine xwe ye nû dijin. Lê wan bixwe jî, ew deme xwe bi têrî nejin. Awayê wan ê rêveberiyê pir cuda bû. Çendî ku weke împaratoriyeke pêşket û serwer bû jî, li herêmên ku pêve bûn û dibin destê wê de bûn jî, ku bi wê ve girêdayî, bi konfadaralî dijin. Bi vê yekê, di awayekî împaratoriyeke de konfadaralî afirandin û serwer kirin. Bi vê yekê re, heyîn û hebûna xalkên wan û yên bi wan re ên di bin destên wan de hatina parastin û rêz dana wan. Nixrên xwe bi rêz bi wan re hevpar kirin. Bi vê yekê, pêşketine domandin. Mediya, bi vê yekê, têgihîştina ku ji deme xwe di buhurt jîya. Bi wê jîya. Bi wê jîyandinê, pêşketinek ji jîya. Temenê wê pêşketinê ku wilo bijî, bi hizir û têgihîştin, kevneşopî û xûy û her weha rêveberî û serwertiyê bi wan re hebû. "Di gotina wekhevîyê ê Nebî Nuh ku dihate gotin ku wê bi navkiriya û gotiya li gor wê dihate jîn kirin". Bi vê yekê, li berdiçlê awayekî pêşketinê hebû. Wê awayê pêşketine, bandûra wê li Mediya û navenda wê Akbatanê bêhtir hebû. Cerba Mediya, di aslê xwe de do roje me de jî hê jî baş û qanc ne hatiya fahm kirin û zanîn. Hizir û zanîn ku wê dihênina ser ziman û dikin ku wê bidina fahmkirin, pir mazin ji hanîna wê fahmkirina wê û wê dîr in. Mirov, divêt ku vê yekê jî her weha bi teybet bêne ser ziman. Ku mirov wê demê baş û qanc fahm nekê, bêgûman, mirov wê xelatiyên piştê ku hatina kirin ên dîrokî, mirov wê wan jî nebîne û fahm neke. Ji ber vê yekê, hewceyî pê heya ku mirov baş fahmkirinekê di derbarê wê de di xwe de çê bike.

Deme Mediya, weke demeke ku dîrok jî û bi vir de qirifinekê di xwe de çêdike. Mirov, vê yekê her weha wê kifş dike. Ew qirifin, di aslê xwe de, bi hin bi hin serwerî bûn û serdestî bidest xistina rêveberiyê e li ser jîyanê hemûkî re dihê holê. Ew ahangê ku me li jor bahsê kir, ew xira dibe. Bi wê re, di demên piştê ew ahang xira dibe. Di deme Mediya de, pêşketine ku di civaktiyê de derketiya holê di nav xalkê de, bi aqil û jîrê re heyîna wan dihê ser ziman. Aqil, serdestiyê bidest dixê. Di vê yekê de, awayê pêşketine wê demê ê di nav xalkê de, temenê wê bi xwe re diafirêne. Êdî, pergaltiyeka giştî mirov di jîyanê de dixwezê. Mediya, bûna wê ye demî, di aslê xwe de weke hewldanaka bersivdana wê ya. Wê bi têgihîştine demê û awayê pêşketine ye demê ku xwe afirandiya, wê pergaltiyekê bi wê di wê kevneşopîyê de bûba. Her weha Mediya ev bû. Têgihîştin û hizrên mirovên weke Zerdest jî, levgihandina li hevdu di wê çerçovê de weyneke

wan wê heba. Wê, di wê pêşketine bi Mediya re, wê êdî bi wî re bi awayê peresendinê û di nav xalkê de wê ew pêşketin ji demê buhurandiba demê. Wateyeka Zerdest û derketina wî jî ev bû. Di vê yekê de, wate Zerdest û Mediya û pêşketin û pêşveçûna wan ye bi awayê pêşketine demê ye nû bi hev re dihê holê û hevdû temen dikin.

Ya ku wê di demên piştî Mediya de, nebin û wê li şûn bimêne bê ku pêşbikeve jî ev bixwe ya. Mirov divêt ku bêne ser ziman, ku wê heyîna Zerdest, bi hizre xwe re derketina wî ye bi hizre wî re, bi vê yekê re weke paşeroja xalkên Mediya û pêşketine wan ye di deman de bû. Di deme Mediya de, Ew bixwe rastî pir bertekan tê. Ji ber wê yekê ye, ku ew demekê goçî herême Hîndîstanê û wan deran dike û hizre xwe li wan deran dihêne ser ziman û li wan deran jî, pir alîgirên xwe çêdike. Piştîrê divegirihê. Ew çend ku di serî de, ji aliyê rêveberiyê ve newê herêkirin jî, wê di nav xalkê de ew bi hizre wî re wê bicih bibe. Bi wê re, bi himê wî bi afirê. Piştîrê, di dawîya jîyane wî de, ew wê bi wê pêşketine re pîroziyekê bidest bixe di nav xalkê xwe de. Wê bi kevneşopî bê herêkirin. Ev yek, wateyeka wê ye pir giring heya di nav Kurdan de. Bi teybetî, di civatên ku kurdan her şev di nav xwe de li dar dixistin de wê wan bûn û kirin û hizrên ku derdiketin hemû jî, wê li ser wan werina axiftin. Ku di civatan de li ser axiftin û herêkirin bû, êdî ev yek wê di jîyane de jî bi kevneşopî bibe. Civat, hem destpêk û hem jî cihên ku têde herêkirin bibin in.

Kurd, weke ku di demên berî Mediya bû, di deme Mediya de jî ku li ser wê re bi heyîn û rêxistin bû, xwediyê ole êzîdiyê ku bi awayê yek-xwûdayî bû. Ola êzîdî, ew pergale civaktiya ye li Kurdistanê dabû afirandin. Temenê wê bi xwe re afirandibû. Ji ber vê yekê, bi teybetî, ku bi xwe weke mijarekê divêt ku mirov êzîdîtiyê û pêşketina wê bêne ser ziman. Dîroka êzîdîtiyê, î ro, hê ji aliyê kurdan bixwe ve jî baş û qanc ne hatiya rawekirin. Ku mirov li Dîroka êzîdîtiyê lê bînerê, mirov wê bibîne ku êzîdîti, di aslê xwe de oleka yek-xwûdayî ku di demên berî zayîne de di naqabîna 4 û 3 hezar salan de bûya û bi xwe re temenê pêşketina herême e bi pergale daya afirandin e. Kevneşopiyên kurdan, ên ku î ro di nav kurdên êzîdî, musulman, fileh û cihu û hwd, her weha hemû komên din de jî, ji wê xate bi pergale e êzîdîtiyê dihêne holê. Herêkirina vê yekê ye ji aliyê mirovan ve jî, wê bê rêzek ji pêşketine dîrokê e ku bi rastî bûya re.

Bi wê awayê pêşketinê, demên pêşketinê ên ku mirov wan bi teybet bêne ser ziman, ên ji deme Mîtanî, Gûtî û Nairîyan û bi vir de û hwd, ku hate deme Mediya, mirov dibîne ku Mediya bixwe, weke ancama sêntezî e van deman e. Ev deme sêntez e Mediya bixwe, demeke civaktiyê e ku bi wê pergaliyê pêşketiya û ye civaktiyê ye ast û radayaka nû ye di demê de ya, dihê holê û mirov wê fahm dike. Deme Mediya, weke deme hemdem e civaktiyê ku wê hate roje me heyîn û hebûna xwe bide berdewam kirin, weke destpêka wê ye dîrokê e di demê de ya. Mirov, karê vê yekê her weha bi êmin bêne ser ziman û bêje. Di wê pêşketine civaktiyê de e bi van demên Urî, mîtanî, Hûrî, Gûtî û Nairîyan re bûna, di wê xate pêşketinê de pêşveçûna bi hizir ku bûya, heyîna civaktiyê e jîrî êdî di demê de afirandiya û temenê wê ye kevneşopî û xûy jî afirandiya. Êdî, li ser wê temen û himî, rêveberê ku li gor wê pêşketin û bi wan nixên wê yên demî ku were afirandin, ye ku dihê xwestin ev e. Mediya, ev rêveberiya ku bi vê yekê pêdivî li gor demê pê heya ya. Hate ku dem û pêşketin bi têngiştin dihê vê astê, pîr levxistin jî dibin. Rêveberî jî, kevneşopiyeka wê afirîya. Bi Urîya re xanadantî dest pê kirîya û bi Mîtanî û Hûrîyan re berdewam kirîya Hate ku gihîştîya Gûtî û Nairîyan. Di deme Mediya de, bi vê têngiştinê jî, weke ne levkirinek heya. Li ber hevdû bi sekna xalkê re bi kevneşopîya wan re heya. Di xalê de, di aslê xwe de ji ne levkirinekê zêdetir pevçûnek weke ku heya. Rêveberî bi kevneşopîya xwe re bi statûqû dixwezê serwer û serdest bibe. Lê di wê têngiştinê de, ev yek jî, weke ku cihê wê zor e. Êdî, ew pevçûn di hizir û têngiştinê de dibê. Di dawiyê de, statûqûya rêveberiyê serwer dibe. Hate deme Mediya bi xalkitiyê pêşketina ku bûya û gihîştîya aste civaktiyê, ji wir pêde, wê ji pêşketine xwe bikeve. Ku hate wê demê ketina jinan e parastgahên Mîtra de e bi mîran re di wekhevîyekê de dibê, wê ew jî, piştî têkçûna Mediya wê jî holê rabê. Piştî wê demê re, ji xwe êdî wê bi serdestiya rêveberiyê pêşketin bibin. Xalk, wê weke ku bi keve bin dest de wê lê were. Ev jî, wê weke ku di demên piştîrê de wê were dîtin, wê li dora kevneşopiyên xwe gihîştina li hevdû bi wê re jidandinekê bi wan re li wê bide çêkirin. Bi vê re, qûtbûna ji derve ye wan, wê biafirê.

.. Demên piştî deme Mediya û bi vir de, demne ku mirov wan ji dû aliyan ve karê şîrove bike û bêne ser ziman in. Di serî de, ji aliyê serwerî û serdestiya rêveberiyê ve û her weha ji aliyê pêşketina geltiyê ve ye bi ber civkatiyê ye ku wê êdî demên xwe yê pêşketinê bijî. Her weha mirov karê wê bêne ser ziman. Di kurdî de, gotina xalktiyê bi sê wateyên xwe dihê ser ziman. Di wate xwe ye pêşî de, bi xalktiyê komek xalk ku li herême xwe di rewş û jîyane xwe de bi demê re jîya ya, û bi demê re pê re bi kevneşopî û nirxbûn li ser aste wê heyîn û hebûna wê bi wê re pêşketiya dihêne ser ziman. Di wateya xwe duyemîn de, dibe navê mirovê ku ji wê koma xalkê. Di wate xwe ye sêyemîn de, ku di demên piştî de ev têgihîştin pê re şin dibe, dibe navê komaka ku di nav civakê de dijî. Civak, di aslê xwe de, bi hebûna xwe re, xwediyê heyîn û hebûna xwe ye ku bi pergal e bi jîr ku bi kevneşopî û xûy re bi nirx jî bûya ya. Gel, weke gotinaka ku civakeka ku di ahage xwe de pêş dikeve û her andamê wê bi tûxmtiyê digihina hevdû ya. Lê di aslê xwe de, Gotina geltiyê, gotina civakî e bin gotina giştî e civaktiyê re ya. Xoslet û teybetmendiyên civaktiyê, di wê de jî xwe bi wate dikin û dihênine li ser ziman. Lê di naqabîna gotina civakê û ye gel de cudabûnak heya. Wê cudabûnê ji mirov karê weha bêne ser ziman.

Di serî de ku mirov got civake Kurdistanê, mirov bigiştî bahse wê heyîna giştî e li Kurdistanê dike. Li Kurdistanê, di nav wê civake wê û civate wê civakê de pir komên ku jecuda pêşketina û di demê de bûna xalk û piştî bûna gel hene. Weke Kome suryanîyan û hwd. Ev kom, bi teybetî bi awayê xwe yê olî û vê hebûna xwe dihêne ser ziman. Lê bi demê re di herême wan de ziman wan jî cudabûnaka xwe ye bi xwe re standiya û bi wê pêşketiya. Bi vê yekê re, ew kom bi wê re bûna xwediyê çandekê jî li wir. Lê ew jî temenê wan jî wê civake ku heya ya. Lê di dîrokê de bi demê re bi wê pêşketine xwe ye bi xwe re cudabûnak jî bi xwe re jîn kirina. Kurdên Zaza, bi devkê xwe re awayê devkê wan yê zimanê kurdî yê pîrr kevn e û di roje me de ew devk gihiştîya asta bûna zimaniyekîtîyekê jî. Bi vê yekê re, bi peresendine civakî û ne bi têkilbûna herêman e bihev re, ev rewşê êdî pêş dikeve, weke daraka ku çiqilên wê yek bi yek bi demê re lê zêde dibin û mazin û gurr dibe. ..

Geltî, ew asta pêşketinê e gavekê pişt vê re ya. Mirov karê wê jî wilo bêne ser ziman. Lê Geltî, minaqeka protîpî e civake giştî di xwe de û bi xwe re dihê li berçav. Mirov, divêt ku vê jî her weha bêne ser ziman. Di nav kurdan de civat, weke gotinaka dîn ye ku mirov di vir de bi gotina wê bêne ser ziman. Civat, bi du awayê di vir de dihê ser ziman. Yek, weke civatiya komên ku jecuda e li Kurdistanê dihê ser ziman. Bi wê re, têkildanîn û bihevrebûna wan dihê ser ziman. wekî dîn jî civat, di aslê xwe de, di nav kurdan de, weke cihekî lev rûniştinê ku hertimî têde dihatina li cem hevdû û li hevdû dirûniştin û têde ku lev dirûniştin jî, bi hev re diaxiftin û mesele û pîrgirêkên di nav xwe de têde dihanîn li ser ziman û digihandina çareserîyeka mayînda di nav xwe de. Bi vê yekê re, "civatê mîr" ye weke ye asta bilind e di nav xalkê de dihatê dîtî û lê nerîn. Yê di nav xalkê de ku weke "civatên xalkê" dihatin ser ziman jî, ên ku hertimî di wan de mirovên ku di nav xalkê de bi aqil û zanebûna xwe re li pêşbûn têde li dora levdigihîştina hevdû bi hev re didan û distandin. Bi vê yekê re, jîyane xwe û jîyandinên xwe bi xwe re û bi hev re heypar dikirin. Ji hev re dihanîn li ser ziman. Civat, cihên ji hev re yê heyparkirinê bûn. Di wan de, ji her mesele û meselok û her weha tiştên ku dihatina guh û dihatina bihîştin, dihatina vegotin. Di demên piştî deme Mediya de, ev awa û pêşketina gotina xalk, gel û civaktiyê bêhtirî dihê li pêş. Civat, bêhtirî bi jîreke civakî derdikevine pêş û pêş dikevin. Bi teybetî, civatên mîr, karekê weke yê parlamenê roje me ên civakên pêşketî di dîtî. Her weha xwediyê awayekî pêşketî bûn û karekî pîr mazin di nav civakê de cih bi cih û herêm bi herêm dileyîstin. Zanebûna civakê e ku pêş diket, ku mirov çawa jî bêne ser ziman, di aslê xwe de di wan deran de pêş ket û di nav xalkê de bicih bû. Têgihîştina wê, di nav xalkê de bi wan civatan pêşket û bicih bû. Mirov, divêt ku vê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman. Civat, di civaktiya li Kurdistanê de cihna ku mirov divêt ku wan ji pîrr aliyan ve bêne ser ziman in. Temenê wê yê pêşketinê û pêşxistinê di wan deran de dihê holê û pêş dikeve. Weke ku hate î ro jî, di nav kurdan de dihê gotin "çanda mirov û hevdû naskirinê" di wan deran pêşket û bicih bû. Ev jî, di aslê xwe de himê pêşketine civaktiyê ya di nava civakê de dihêne ser ziman.

Hanîna me ye di temenê wate van gotinên weke yên 'xalk', 'gel', 'civak'îyê û hwd de, di temenê fahmkirina pêvajoyên pêşketine piştî deme Mediya e li Kurdistanê de, wate û giringîya wê heya. Demên piştî Mediya, wê bi kevneşopî, li ser van gotinan re bi jîr û têgihîştin û her weha bi pergale, wê hanîniyeka li ser ziman bi afirêna û wê mirov têde li gor wê bide pêşxistin. Civak, piştî asteka pêşketine e bi demê re dihê holê.

Piştî deme Mediya, hem pêvajoya Aqamanîşan e li herêma û hem jî e Sasanîyan li herêmê, wê awayê pêşketina bi Mediya re fahm nakê. Ne li gor fahmkirina li gor wê ye wê bi wan re daya çêkirin tevdiqirihîn. Li gor, heyîn û awayekî kevneşopîyê ê ku heya dijîn. Bi vê yekê re, êdî ew jî, di deme xwe de, hin bi hin bi ber kêmbûnê ve diçin. Ye ku Sasanîyan ji holê di rakê, ne herîş û şerên ku wê kirina. Ye ku wê ji holê rakirina, ne fahmkirina wê awayê pêşketine û serwerbûn û serdestbûna wê ye li demê ya. . .

Di wê deme de mirovên weke Manî derdikevin. Manî bi hizir û têgihîştina xwe re di roje me de ji hê baş ne hatiya fahm kirin. Mirov vê yekê jê fahm dîke. Ew, di wê farqe wê heyîna têgihîştinî de ya. Hanîniya wê ye li ser ziman, di çerçova kevneşopîyê û têgihîştinê de bi jîrê ya. Pirtûk û nivîsên wî yên ku wî nivîsandina û hanîna li ser ziman, di wan de wî bi wê têgihîştin û kevneşopîya deme Mediya e Zerdest ku bûya ya. Manî, Zerdest pirr xweşik û teze fahm kiriya û derxistiya têgihîştin û zanebûnê. Ew dengê wê deme berî wê demê ya. Ew, di awayê baweriyê de jî, baweriya ku dihê jînkirin, awayekî nûjen ê di hemdemîya demê de dijî. Hate ku cihê ku wê têde berg were kirin jî, ew bi awayekî Nûjen dide têgihîştin. Ew awayê wî yê ku weke cihê bergkirinê ew bawermendên wî jê fahm dikin û pê dijîn wê piştî re jî dêrên filehan re jî bina minaq û ew jî wê dêrên xwe weke wan bidina avakirin. Kevneşopîya Manî, di aslê xwe de ye ku dike ku zanebûna li ber diclê ku wê li gor demê bêne ser ziman e. Bi vê yekê, mirov divêt ku wî cuda neyêne ser ziman. Pergale yek-xwûdayî ye olî ye ole Êzîdîtiyê, bi ole Êzîdîtiyê re li herêmê xwediyê pêşketineka dîrokî ye li herêmê ya. Civake Kurdistanê, ji sê bahrên wê zêdetir di wê demê de an Êzîdî na û an jî nêzi Êzîdîtiyê na. Sasanîyan, tenê beşeke wê ye herêmî ji xwe re kirîya temen û pê pêşketina.

Piştî demên Sasanîyan re, ew hizir û têgihîştin û pêşketine ku heya e li herêmê, wê di destpêka derketina Musulmanetiya de, wê jê re bê hîm û wê kê ku ew derkeve. Hz. Muhammed, bi seferên karwanan re hatina wî ye li ber Diclê û dîtin û naskirin û fahmkirina wî ye van herêman wê hizrên wî yên destpêkê bide afirandin. Qalibê pergale Êzîdîtiyê, ew di serê xwe de digirê û bi wê dihêne ser ziman. Hate wê demê jî, bandûra heyîn û gotinên Birehîm Xelîl jî heya. Nebî Nuh, bi vegotina *tufanê* re dihê zanîn û naskirin. Ew li ber diclê li Cizîre bota ya. Ew jî, pir gotinên li ser navê wî dihêne gotin û vegotinên ku bi wî ve girêdayî dihêne vegotin û ser ziman hena. Aliyekî, wê kevneşopî, çand û hizre li ber diclê ev dihêne li ser ziman. Dii hanîna li ser ziman de ji deme Nebî Nuh hate ku tê deme Birehîm xelîl û ji wî jî hate ku dihê wê deme ku têde dihê jînkirin û hwd, di teherekê de hanîna li ser pir xweşik û sipehî di berdewamiya hev de heya. Derketina musulmanetiya, wê deme Sasanîyan jî, wê bêne berdawiyê. Dem, demeke civaktiyê ya. Bi têgihîştin û hizre xalkîti û yeke ku bersivê nede wê pêşketine demê wê bi sernekeve. Musulmanetî, bi pergalebûnê re bersivê dide wê pêşketine demê. Di demeke kin de, wilo zû pêşketine wê li vê bideyn e. Di ne fahmkirina têkilî û heyîna di nav gelên herêmê de û gelemperbûna ku dibê bi wê re, têkiliyeka ku wê êdî şer bi xwe re bêne di herêmê bi xwe de jî bi wê ole nû re dihêne holê. Çend, ku di hate ser ziman, ku xalk û gelên jêcudana heyîna wan heya û bahse rêzê ji wan re di hate kirin jî, di kirinê de rêveberên herêmê ev yek ne dikirin. Bi vê yekê, hizre hate xistin li beremberî hizre xalkîti û civaktiyê de. Bi vê yekê re, êdî bi vê re tekoşinek li ber hevdu doma. Piştî, hêzên weke Abasîyan û Osmanîyan ku têde li ser aliyê serwerkirin û serdestkirine olê sekin in û bi vê yekê xwestin ku ji xwe re bi kar bênin û bi kar hanîn jî, wê êdî olê kê xaleka ku li pêşîya pêşketina herêmê disekinê ya. Bi vê yekê re, demên piştî deme Mediya, wê ne li gor wê awayê pêşketin û têgihîştina wê bi rê ve herin.

.. Ku mirov dihê demên piştî demên zayînê, mirov di pêşketine pergale civaktiyê de pêşketineka mazin ye bi aqil dibîne. Demên piştî zayînê, ên ku êdî wê bi wê awayê wê civaktî pêşkeve ya. Wê ji xalkîtiyê buhurîna geltiyê wê bibe. Bi wê re, bi sînoran re wê civaktî bi afirê. Civaktî, wê

civaknasîyeka xwe ye ku mirov karê xwe têde bibîne û bêne ser ziman wê bi afirêne. Wê sazîbûn bi afirê. Sazîbûn, di aslê xwe de ancama pêşketine jîre di êqil de ye di nav xalkê de ya. Wê, li ser sazîbûnê re civaktî were holê. Sazîtî, di aslê xwe de wê aliyekî giring ê civaktiyê bêne ser ziman. Wê civaktiyê bi awayê şaristaniyê bêne holê û bide rawekirin. Di rawekirina têgihîştina deme civaktiyê de, nasîn û xwe nasîn, weke xalna ku bi zanebûn û bi bîrbûnê diafirin û dihêne holê na. Mirov wê wilo dibîne, deme ku mirov lê dinerê. Di vir de, demên piştî zayînê, li ber diclê, wê di awayê civaktiyê de bi nixî pêşketineka mazin were holê. Di vir de, em careka din jîn bênina ser ziman û bêjin, ku civaktîya li ber diclê, dîrokeka wê ye pir demdirêj heya. Deme wê ye bi têgihîştinê, deme Urî û Mîtanîyan, mirov karê ji wê bide dest pê kirin. Ev demên bi jîr û bîr in. Deme Gûtî û Naîrîyan hate deme Mediya, demeka bi aqil û bîr, ku li ser wan demên pêşketinê re bi dîmenî û ast dihêne holê û dijîn in. Demên ji deme Mediya û bi vir de, di aslê xwe de, wê weke dîmeniyeka di wê pêşketinê de ye sêyemin ba. Lê ew deme sêyemin, weke ku wê bijîyana û pêşketibana, nebû. Di wê demê de bi berjêrî çuyin dihê holê. Tenê bi kevneşopî û nixên demên berê jînbûn dihê holê. Bi teybetî, di vir de, ku mirov vê yekê ji bo ku fahm bike, divêt ku mirov bi dîrokê re ku dem bi dem dîrokê bi kevneşopî û pergaltîna wê re bêne ser ziman. Ev yek, wê di fahmkirinê de bê destpêkek.

Demên pêşketinê ên li berdiclê, teybetmendîya wan ye herî giring ew e ku bikevneşopî û bi cerbîtiya kevneşopiyê jînbûna dihê jînkirin e. Bi vê yekê re, mirov divêt ku vê yekê baş fahm bike. Rêveberî, li wê kevneşopiyê xwedî derketina wan û ji xalkê dîrkirina wan, wê ji statûqûtîya wê bê hasibandin û ser ziman. Bi wê re, wê ew derkeve pêş. Bi wê re jî, wê êdî di bin de jînbûna xalkê wê bê jînkirin.

1. Piştî xurîxîna Mediya re pêvajoya bi aqamanîşan û sasanîyan re pêvajoya duyemin e derketina musulmanetiyê: Demên piştî zayînê ên destpêkê, wê di wê pêşketine civaktiyê de wê kifşkar bin. Wê, bi serwerîya rêveberiyê re wê bi binbûna xalkê re wê bi berjêrîçûnbûn bibe. Kurdistan, wê di aslê xwe de di wê demê de bi keve demeka xwe ye nû de. Piştî zayînê, di sadsale 6. min de derketin û bûna musulmanetiyê, wê ji Kurdistanê re jî, wê bê domeneka nû. Wê ew dem, bi xwe re, hin pêşketinên nû bêne. Bi teybetî, bûn û derketina musulmanetiyê, wê bi xwe re hin pêşketinên wê li Kurdistanê bêne holê. Piştî deme Mediya re, hate deme berdawiyê ye deme Sasanîyan, wê cudabûn, di aslê xwe de di nav kurdan û persan de ji xwe dîyar bike. Lê ew ew dîyarbûn, wilo zêde dernekeve pêş. Wê piştî ji, hate demekê wê bi hev re jînbûn wê bibe. Hate Musulmanetiyê, wê li gor awayekî nû yê têgihîştinê bê. Wê ole ku ji nû ve dihê holê, wê bigîştî hewldana serwerîya xwe bide avakirin. Li nivgîrîya araba û herêmên wê di demeka kin de serwer bibe. Li Kurdistanê jî, wê di demeka pir kin de wê zû were herêkirin û peşîrandin. Ji ber ku nixên ku esas digirê ji wir in. Lê hewldana serweriyê ye bi pergale gîştî, wê li ber diclê bê sedeme pir pevçûnên mazin ên dîrokî. Ji ber ku ji berê derketina musulmanetiyê ve pergaltîneka li ser axa kurda e olî ku wê valahîya olî ye yek-xwûdayî tişî dikê ji xwe heya. Lê tenê bi nav û awayê olî jev cudabûn heya. Deme ku Ole musulmanetiyê derdikeve û hinekî belav dike û serweriya xwe li herêmê hema bêja bigîştî ava dike, piştî berê xwe dide Kurdistanê. Bi du awayan hatina wê ye li Kurdistanê dibe. Bi li ser mirovên zanist û bi aslê xwe kurdên dêra Sêrtê wan deran in ên weke Weysel qaranî re dihê û di demeka kin de bi wan pir alîgiran ji xwe re çêdike. Lê piştî ku li nivgîrîya araba serwerîya wê bû û piştî hêze wê ye rêveberî û sazî afirî bû, piştî hêze wê ye artîşî jî diafirê û dihê holê. Ev yek, wê di awayekî împaratorî de were holê. Bi wê hêzê re, wê "fetîhkirin" wê were holê. Deme ku bi aliyê din yê hatinê ên bi weke yên weke Xalîd bin Welîd re ku bi artîşî dihê herêmê, êdî rastî li berxwedana kurdan dihê. Kurd, ne bi şer lê bi xwe re herêkirinê hê zûtir dikin. Lê ku bi zora dana li wan ye herêkirinê were holê, hingî jî, ew jî li ber wê herêkirinê bi hêz li ber xwe didin.

Hatîna musulmanetiyê ye bi awayê duyemin, wê li rastî berxwedana kurdan wê were. Lê ew Musulmanetî jî were herêkirin. Ji ber ku berî wê awayê hatinê, bi mirovên weke ên Weysel qaranî re hatîya û hatîya herêkirin ji aliyê gelek herêman ve. Li Kurdistanê, deme ku musulmanetî hat û rastî şer hat e bi awayê artîşî, bi pergaltî ew şer dibe. Ew pergaltîya berê ya ku heya û ya nû dikevine berhevdû de û bi hev re şer dikin. Pergale kurdan ye berê bi ola Êzîdîtiyê re heya. Hate

sadsale 8. min, wê şerekî pir mazin bi vê yekê di Kurdistanê de di naqabîna van pergâlên olî de bibe. Musulmanetî wê bi serbikeve. Wê Êzîdîtî, wînda bike. Wê li ser navê Êzîdîtîyê çê nivîs û nivîsarên wan hebin û wê ji holê bêne rakirin. Weke ola cihuyan û ye filehan ye musulmanetiyê jî, pir nîrxên xwe ji wê ola Êzîdîtîyê digirê. Lê ew ku bûn, êdî bi serwerbûn û kirina xwe re, xwe serwer û serdest dikin û wê ji holê dirakin.

Hate vê demê, wê musulmanetî li Kurdistanê bigihêne nêzî pirranîyê li herêmê. Bi wê re, wê Êzîdîtî ji bi bin keve. Lê wê Êzîdîtî, wê heyîna xwe ku ne wilo weke berê jî bê, wê bide ber dewam kirin, lê bi awayekî veşartî. Wê ew, bi wê awayê heyîna xwe bide domandin.

Musulmanetî, ku li herêmê serwer û serdest bû û bû oleka ji olên herêmê, êdî wê li herêmê demên pêşketinên ên nû bi wê re heyîna xwe bidina berdewam kirin. Kurdistan, di nav civaknasîya wê de ev hersê olên mazin ên piştî Êzîdîtîyê re derketina temenê wan afirandîya. Bi vê yekê re, mirov divêt ku bi rêz û hûrmet navê wê bi bîr bêne.

Çerçova civaknasî û civake kurdan e li Kurdistanê, pîrr-pergalbûnê di xwe de bi vê awayê xwe yê pêşketinê dihêne holê. Hersê olên mazin ên piştî Êzîdîtîyê re derketin ên mazin, pergaliya wan weke hîmê wan pêşketine wan jî li Kurdistanê heya. Di nav jîyane Kurdistanê de bûna wan û pêşketina wan, li ber demeketina kevneşopîya herêmê re divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Yekê ji wan jî, xwe li ser wê kevneşopîyê re ne dîtîya. Bi vê yekê re, ew kevneşopî, bûya maleka ku wan hemûyan di xwe de dihawêne û digihêne hevdû ya. Bi vê yekê re, kevneşopîya w, divêt ku mirov ji vî aliyî ve jî wê fahm bike û bêne ser ziman. Ku mirov wê fahm neke, mirov wê bi hev re pêşketine van ol û pergalbûna wan ye bi hev re ye li wê herêmê jî fahm nekê. Li Kurdistanê, kevneşopî bi vî aliyî ve jî giringiyeka wê ye weke wê demdirêjîya wê di dîrokê de giring heya.

Musulmanetî, piştî ku derket û serwer bû, demeke xwe ye pêşketinê ku jê re dihê gotin "asrî saadetê" dijî. Ev dem, deme pêxemberê wê ya û pêşketineka ku têde temenê musulmanetiyê bi awayekî pêşketî dihê holê dijî. Piştî çûna wê ye ser dilovanîya xwe re, wê êdî rêveberî di musulmanetiyê de derkeve holê. Cihên ku di demên berê de, bi parastgah bûn, wê di deme musulmanetiyê de bi awayekî "dergahî" werina holê û pêş bikevin. Ew jî sazîyên olî ên ku wê temenê wê(olê) li Kurdistanê pêş bixin û wê bi wê bidina berdewam kirin in. Di wan de, wê zanebûn bicih bibe. Perwerdekirin, wê di wan deran de pêş bikeve. Ti mirovê ku di wan dergahan de naxwêne namêne. Bi vê yekê re wê musulmanetî, wê li Kurdistanê di demeka kin de weke wê ola xwe ye berê ye Kurdistanê Êzîdîtîyê wê bibe xwediyê pêşketineka giştî e li wê. Sê tişt, li Kurdistanê bi hev re di ahangekê de dimeşin. Yek, ol a. Ya din jî, kevneşopî ya. Ye sêyemin jî, bi qasr û heyîn û bandûra xwe re mîr û herêmîya Kurdistanê ya. Mîr, aliyê civakê ê bi kevneşopîyê û rêveberiyê re hilda ser milê xwe. Dergah jî, bi perwerdekirina civake re bi olê re dimeşin. Lê herdû jî, bi hev re têkiliya û heyîna wan ye bi hev re heya. Ol, bi rêz û hûrmete mîr ye jî dergah û sêxên wê re bi hev re dibe xwediyê kevneşopîyeka civakî jî. Ketina nava hevdû de e bi kevneşopî, wê bi vê awayê bibe. Di vir de, divêt ku mirov têkiliya mîrê qasrê û sêxê dergahê e bi hev re di çerçoveya heyîna kevneşopîyê de fahm bike. Ev yek, di deme Êzîdîtîyê de ji wilo bû û di musulmanetiyê de ji wilo dibe. Bi vê yekê, bi kevneşopîbûn, wê olê bigihêne asayîbûneka ku xalkê êdî bi xweza di nav de lê xwedî derkeve. Ev yek, dihê holê. Di dergahan de, "qasîdekirin" e bi têgihîştine olî heya. Di qasran de bi bi dengbêjkirin civatî e civakî heya. Qasr jî û dergah jî, sazîna civakî na. Bi serwerbûna olê re, ew serweriya coivakî wê bi pergaliya wê re bi afirê û were holê.

Demên pêşketinê, ên piştî musulmanetiyê re ên li Kurdistanê, ji destpêkê divêt ku mirov wan bêne ser ziman û fahm bike. Ev dem, demne ku pir giring in. Piştî hatina musulmanetiyê re li Kurdistanê pêvajoyeka dîn ye nû dest pê dike. Ew pêvajo, bi musulmanetiyê re ya. Piştî hatina musulmanetiyê re, weke dusadsalekê şerbûna li gor pergale olî ye musulmanetiyê ye bi pergâlên olî ên weke yên Êzîdîtîyê re di buhurê. Piştî, ku ew pergâlên weha di wê şeriyê de bi bin dikevin, êdî piştî serweriya wê li Kurdistanê bi pêşketine di domê. Lê di wê demê de, vê ola nû, li gor kevneşopî û di kevneşopîyê de hanîna wê ye li ser ziman jî, di vê demê de pêk tê. Ev yek, wilo zor nabê. Ji ber ku Musulmanet, di destpêka xwe ye pêşî de, bi nîrxên ku li ber diclê hene pêşketina xwe dijî. Ev yek jî, wê kevneşopîyê tê û hesanîtir dikr ku li gor wê kevneşopî û têde ew

were ser ziman û her weha were herêkirin. Mirovên ku di buhurîna wê ola nû jî, bi vê yekê, zorê nakişênin. Mirov karê vê demê musulmanetiyê ye xwe di kevneşopiyê de hanîna ser ziman, weke deme ku xwe di kevneşopiyê de *mihandinê* jî bêne ser ziman. Piştî ku her weha di vê yekê de hinekî pêşketin jî li Kurdistanê dibe, êdî piştê zû pêşveçûn dibe. Piştî ku di dergahan de musulmanetî bi cih bû, piştê êdî di qasran de jî bicih dibe. Di aslê xwe de di qasr û dergahan de bi hev re bicih dibe. Lê weke ku di dergahan de bicih dibe, wilo di qasran de bicih nabê. Di qasran de, bêhtirî kevneşopîya xalkî û rêveberiyê li pêş e. Mîr jî, nîmînerê wê ya.

2. Pêvajoya hatina musulmanetiyê li Kurdistanê û herêkirina wê û derketina mezhebê Şîitîyê: Piştî bûna musulmanetiyê, êdî pergale giştî ye Kurdistanê jî, rengê xwe di guharêne. Hin bi hin di rêveberiyê de bicih dibe. Rêveberiyê wê deme musulmanetiyê, di qasran de dest pê dike. Piştê hin bi hin wê pêş bikeve. Lê li Kurdistanê, ew deme destpêkê ye buhurîna rêveberiyê ye wê de, demeke ku herî zor e ji bo kurdan. Mirov, vê yekê pir baş dibîne û fahm dike. Mînaqê Bawê mislimê xorasanî, ji vê yekê mînaqeka pir baş e ku mirov wê di vir de bêne ser ziman. Piştî deme Hz. Muhammed re, êdî rêveberiya musulmanetiyê derdikeve pêş. Rêveberî, zanebûna xwe ye ku heya têvdigerihê. Bi vê yekê re, ew jî, di musulmanetiyê de pir guharandînan bi hizrên xwe yên ku bi navê Musulmanetiyê dihênine li ser ziman di musulmanetiyê de dikin. Di nav kurdan de, nêzîkatiya ku heya, ew dixwezî ku bi kevneşopiyên xwe bijîn û bi wê re li gor musulmanetiyê bijîn. Bi vê yekê re, serdestî û serwerîya xwe ye ku naxwezî ku ji dest berdin. Ev yek, wê weke ku di naqabîna Xalîfê Abasîyan û Bawê Mislimê Xorasanî de dibê sedeme şer, wê bê sedeme şer di demê ku werin de. Kurdistan, di aslê xwe de, di destpêka hatina musulmanetiyê de ji du aliyên ve derbeyna dîrokî dixwe. Derbeye pêşî, ye bi têkbirin û têkçûna pergale Êzîdîtiyê re windabûna bandûra kurdan ye ku hin bi hin dibe ya. Derbeye duyemîn jî, wê bi pekrawankirina Hasan-Huseyîn re ku rojhilat û başûrê Kurdistanê xwe aligirê wan di denezênin û bi wê re di naqabîna rojhilat û başûr û aliyên din ên Kurdistanê de, ku êdî wê bi wê re cudabûn di demê de were holê. Ye ku wê qatbûna ku bi şerê kerbeleyê de li Kurdistanê bû, wê kur û bixat bike jî, li herdû aliyên Kurdistanê jevcuda bilindbûna du hêzên ramyarî ya. Yek, wê li gor wê hizrê Hasan-Huseyîn biafirê û biadilê û ye din jî, wê li gor hizre olî ye di wê bi afirê. Tenê, ye ku li pêşîya wê qatbûna astang e jî, çand û kevneşopîya kurdan e dîrokî ya. Kevneşopîya kurdan, di vir de ji jev dîrxistina herdû aliyên Kurdistanê de, dibe astang. Di vir de, kevneşopî weyneke dîrokî bi pêşketine di xwe de re dileyizê. Piştê ne bi gelekî re derketina du navendên xalîfetiye, wê ji aliyê ramyariyê ve zorê bide wê qatbûnê. Wê hinekî bandûra wê hebe, lê wê qatbûn were û li tixûbê kevneşopiyê bisekinê. Di nav rêveberiyên kurdan ên li Kurdistanê de, rêveberiya Şadadîyan, wê di deme xwe de wê nakokîyê pir baş his bike. Lê wê karibe bi ser ve herê. Kevneşopiyê, rêveberên wê pir baş bi kar dihênin. Di vê xalê de, mirov divêt ku mafê wan bide wan, ku tégîhiştineka wan ye kevneşopîye pir xurt û bitégîhiştin hebû, ku karîbû wilqasî bi wan re ji wan re weyn bileyizê. Ew rêveberiya Şadadîyan, ku karê wilqasî xwe li ber weqas rewşan li ser lingan bigirê, wê li ber herîşên selçûqîyan û û hin hêzên xwe li ser lingan negirê. Lê di wê deme ola nû ye musulmanetiyê de deme şadadîyan, dibe cerbeka dîrokî ji pêşketinê welatî ên din ên weke yên Merwenîyan re. Deme Merwenîyan, deme ku ji pir aliyên mirov divêt ku wê bişrove bêne ser ziman e. Berî hingî, ne tenê rewşên xirab, ên ku Şadadîyan jînkirina, rewşên weke yên Babekîyan û hwd jî, wê tekoşîna avakirina Merwenîyan xurttir bike. Di deme çûna bi ser Babekîyan de gotin kelevajî ên ku weke ku rûmeta kurdan dişkênin bi karhanîna wan, wê li ber rêveberiya Abasîyan herseka mazin bi afirêne. Bi leşkerî xalîfê Abasîyan Mûtassîm ne dikarî ku Babekîyan têk bibe. Ji ber vê yekê, wan weke mirovna ku "bav bi keça xwe re dirazihê û dê jî bi kurê xwe re dirazihê" dide nîşandin. Bi hanîna li ser ziman ji bo serketina xwe ye xalîfê, wê hersekê li ber biafirêne. Piştê, deme ku Mirovên weke Badê kurê dostik ku bi dest têkoşîna avakirina welatê kurd Merwenîya dike, di deme kîn de ji her aliyê Kurdistanê wê piştgirîyeka dîrokî bibîne.

A. Piştî Şadadîyan re derketina Merwenîyan: Piştê, ku çend badê kurê dostikê ne bîne jî, wê bireziyê wê Aliyê Merwan bi serkeve û welêt avakê û navê kalkê xwe lê û jê re bêje "Welatê Merwenîyan". Welatê Merwenîyan, wê li ser axa Kurdistanê hema bêja giştî bê xwediyê serwerî û serdestiyeka mazin. Herêmen din ên kurdan weke rojhilat û başûr jî ku çend bi rêveberiya mîrî

weke welatekî dijîn jî, wê bi wan re gav biavêjin. Şadafîyan, welatbûnake herêmi avakirin û bi aliyê qafqasya de vebûna xwe re gelemperbûnekê bi xwe re di rêveberiya xwe de çêdikin û mazin dibin. Lê Merwenîyan, welatitiya Kurdistanî ye ku di deme musulmanetiye de yekbûnka giştî daya avakirin a. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku Merwenîyan, welatitîyeka kurdistanî ku bi sazî û hîm e. Piştî Mediya re, li ser axa kurdistanê welatitîya kurdan ye giştî dibe Merwenîyan. Di nav wê kevneşopîya li kurdistanê de, têgihîştin û hizreka pir mazin ye welatitîyê ye kur heya. Demên ku kurdan welatitiya xwe bi serwerîya xwe re winda dikirin, bi kevneşopîya xwe re û mirtiya wan ye ku di qasran de hebû re bi heman awayê jîyane xwe ye heyînî didana berdewam kirin.

Merwenîyan, Navende wan, Amede bû. Lê ji ber ku Cizîre bota hertimî di dîrokê de navenditîyeka dîrokî di Kurdistanê de kiriya, ew jî, weke navendeka xweza dihê hasibandin. Bandûra Nebî Nuh û kevneşopîya wî ye li wir jî, di vê yekê de heya. Di musulmanetiye de jî, wê Nebî Nuh, weke ku di hizir olên din yên li Kurdistanê ku derketina de xwedî heyîn û hebûn e, wê xwedî heyîn û hebûn bê. Pîrozîya ku heya, bandûra wê her demê xwe daya der. Di wê demê de jî, ew pîrozî xwe dide der. Kurdistan, di vê yekê de, navendeka dîrokî ya.

Deme Merwenîyan, wê nêzî sadsalekê berdewam bike. Ji 985 û wan hate ku digihê salên 1077 û wan wê heyîna wê berdewam bê. Ev deme wê ye zêr e. Lê wê piştî jî, heyîna wê ji holê ne rabê. Piştî bi hatina Salahadîne Eyûbî re, wê ew deme geşbûnê ku hinekî mivirtûbû, wê dîsa bi ber geşbûnê ve herê. Wê Malbate Salahadîne Eyûbî li herême ku ne tenê li Kurdistanê, li gelek deverên din jî, wê serwerî û serdestîya xwe bidana avakirin. Wê amê Salahadîne Eyûbî şerkoh wê hat xateka ku Libnan jî di nav de ya, wê bike bin rêveberiya xwe de. Salahadîne Eyûbî wê rêveberiyê bigihêne hate Şamê û ji wir jî bigihêne hate misrê û hwd. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku Kurdan, ji nîvî bêhtirî rêveberîya cihan ola nû ye musulmanetiye kiriya destê xwe de. Kurd, temenê wê pêşketine di nav wan de bi wê kevneşopîya wan re bi wan re hebû. Di nav kurdan de, ku mirov bahse kevneşopîyê bike, mirov nikarê tenê wilo weke mijareka ji rêzê bêne ser ziman. Mirov, divêt ku wê weke mijareka pir girîng e ku wan li ser lingan hiştiya û pêşxistiya û her weha parastiya wê bêne ser ziman. Kevneşopîya wan, dîroka wan ye hizir û pêşketinê di xwe de diveşêrê. Dem bi dem, pêşketinên ku li Kurdistanê bûna jî, wê temenekî mazin ji wê deme re bi afirênin. Şalahadîne Eyûbî, botanê ji xwe re dike navend û her weha tevdiagerihê. Li aliyekê wê li Cizîrê ku Nebî Nuh heya û li aliyê din jî ku li Rihayê ku Birehîm Xelîl heya, di wir de dijî. Bi wan re dijî. Di aslê xwe de, kevneşopîya di nav kurdan de ku pêşketiya û heya, van herdû mirovan weke nirxeka xwe ye dîrokî dibîne û dihêne ser ziman. Li ser wan, lingên wê yên pêşketinê ava na. Salahadîne Eyûbî, piştî wî bi wan herdûyan ku bi kevneşopîya wî re pir xurt e. Bi vê yekê, wê demeke pêşketinê ye pir mazin li Kurdistanê bê jîyin. Li Kurdistanê, kevneşopîya kurdan di aslê xwe de weke pergaliyeka giştî ku pergale herêmi ên ku bi mîr û pêşketinên wan heya dibe pergaliya giştî. Ew di nave wê de dijîn. Yek jî, derneke we dervî wê. Bi vê yekê re, bi kevneşopîyê bi welatitî dihê jîyin di nav kurdan de. Wê ew pêşketine kurdan e bi sahaladîne Eyûbî re, piştî wî re jî, weke demeke dirêj li Kurdistanê rêveberiyeka giştî bide afirandin. Hizre wî, bi bawerî di kevneşopîya kurdan de dihê ser ziman û êdî kurd ji her herêmen xwe ve bi wê bi yekbûnekê dijîn. Wê ew, weke rêvebervanekî xiyalî hertimî di wan de bi bawerî bijî û wan bi rê ve bibe. Hate derketina Osmanîyan û ku ew serwerî û serdestiya li Kurdistanê di dîna avakirin, wê ew rêveberiya kurdan ye giştî û herêmi ên ku hene wê heyîna wan hebe.

Li Kurdistanê hatina demê ye li deme derketina Osmanîyan û li herême serwerbûna wan, wê di wê deme nû ye ku bi derketina musulmanetiye de destpêkiriya, wê bê pêvajoyeka nû. Ev dem, di aslê xwe de, bi serê divêt ku mirov li ser bisekinê. Wê ev dem, pêvajoyeka nû di jîyan û pêşketina Kurdistanê bide dest pê kirin. Kurd, deme ku Osmanî dibina hêz, bi alikariya wan dibin. Lê piştî ku Osmanî bûna hêz, êdî ew hêzê kurdan ye ku jê sîd girtin û pê mazin bûn, piştî berê xwe dana wê û çûna bi ser wê de. Bi vê yekê re, Dîroka Osmanîyan, aliyekî wê ye ku hertimî bi kurdan re di şer de ya jî heya. Kurd, di wê demê de serwerîya xwe ye giştî e bi rêveberî winda dikin. Lê herême bi herême rêveberiyên wan li herêmen wan hene û serwerî serdest in. Di wê demê de, hin bi hin derketina û mazinbûna xanadana sefevîyan jî heya. Ew jî, bi awayekî dî, ku qat kurdistan di bin serdestîya wê de ya, li herême bi dest pêşketina xwe dike. Li Rojhilatê

Kurdistan û ku hate ku digihê başûrê kurdistanê, wê di qadeka mazin de sefêvî bi hêz bibin. Xanadana sefêvîyan, li ser hîmê mezhebê şîitîyê bidest pêşketina xwe dîke û li wan deran serwer dibe. Osmanî jî, bi sunnîtiyê pêşdikeve. Dii aslê xwe de kurd, di nav xwe de bi zêdeyî ne herdû mezheban jî dijîn. Şafîtî, di nav kurdan ku bi kevneşopîya wan re hevîriya heya. Kurd, di wê nêzikatiya xwe ya olî de li ser herdû aliyan re jî bi têgihîştin û serwer dijîn. Lê herdû alî, ji ber ku dibîna weke bîrdozî jî rêveberîyan re û bi wan pêş dîkevin, êdî serwerîya wan derdikeve pêş.

Di vir de, divêt ku mirov dîroka herême û bi teybetî jî ya kurdan ji du aliyan ve bêne ser ziman. Aliyek ê qata Kurdistanê e dibin serwerî û desthilatdarîya Osmaniya de ya. Aliyê din jî, ê dibin serwerî û desthilatdarîya Sefêvîyan de ya. Di vir de, divêt ku mirov bi teybet bêne ser ziman ku kurd, di pêşketina herdû aliyan de jî bi heyîn xwediyê kifşkarîyekê na di pêşketina wan de. Bi vê yekê re, divêt ku mirov di du xatan de wê bêne ser ziman. Aliyê sefêvîyan, ji deme şerê Kerbela ve ku hate hatîya wê demê, di pêşketineka di xwe de ya. Kurd, bi dergah û şêxên xwe yê ku weke serek û mazinên olî na, serwerîya wan, wê di pêşketina sefêvîyan xwe de xwe diyar bide li berçav. Piştî pekwankirina Hasan-Huseyîn re, dergahên herême ên kurdan ên ku weke sazîna olî na, di cih de xwe weke aligirê wan didîna denezandin. Hate ku dem dihê deme sadsale 12. min û 13. min û hwd jî, serwerîya kurdan e bi van sazîyan re li herême bi olî heya. Ev sazî, sazîna ku civakê bi rê ve dibin. Piştî ku sefêvîyan, xanadana wan derdikeve pêş, kurd jî êdî piştgiriyê didîne de. Lê di nav kurdan û persan de ku sê awayên têkiliyê ku mirov wan weke peymanna di bin wê piştgiriyê de na bêne ser ziman. Ya pêşî, di dîrokê de bi hev re bûna wan ye ku êdî di kevneşopîyê de pir wekhevî di nav wan de bi wan re derketina holê ya. Ya din jî, di deme ku kifşkirin dihê kirin û levkirin dihêne kirin, ku weke çineka serdest û serwer e kurdan bi mîran re levkirina wan heya. Ya din jî, di rêveberîyê de bi hev re bi rê ve birin dihê kirin. Di destpêkê de, ev xale dawiyê pir baş bi rê ve dihê birin. Lê wê di demê de hin bi hin bê guharandin. Piştî deme Aqamanîşan, Sasanîyan ku ku digihê wê demê, ew cara sêyemîn bû ku kurdan û persan bi hev re rêveberîyeka nû ye herêmi dana avakirin. Di deme aqamanîşan de, çend ku hê ne wilo xwedî fêr û cerb in pers, wilo zêde dernakevina li pêş. Lê di deme Sasanîyan de, ne wilo ya. Di deme Sasanîyan de derdikevina pêş û dikin rêveberîyê ji her aliye ve bikina bin destê xwe de. Bi vê yekê re, demên Sasanîyan ku hin bi hin bi vir de dihên, êdî mirov dibîna ku nexweşî û li ber hevdu sekin in ya kurd û persan dihê holê. Hê ku ew li berhevdu nagihê asteka şerkirinê e bi hev re derketina musulmanetiye dibê û bi wê re jî, Sasanî jî, weke ku dihê û li berdawîya xwe disekinê. Di deme Musulmanetiye de, ku xwe bi nîrxên olî ên deme nû afirandin hate ku dihê holê û ibê, piştî li ser wê re avakirina rêveberîyê dibê. Kurdan berî wê afirandinê ku wê tede pers bi sefêvîyan re derkevina pêş, hate wê demê bi Şadadîyan û Merwenîyan demna pir bi fêrî û cerbî dijîn. Li ser wê re jî, deme Salahadîne Eyûbî jî heya. Hê jî, serwerîya xanadana Eyûbîyan li herême li Kurdistanê li ser pirranîya wê di doma.

B. Bi mezhebê Şîitîyê rêveberîya giştî ku li herême derdikeve û serwer dibe; Sefêvîyan: Deme Sefêvîyan, wê bi kurdan û persan pêşbîkeve. Kurd, wê di temenê wê de û di rêveberîya wê de pir mazin weyneke dîrokî bi leyizin. Şahên rêveberîya sefêvîyan ên weke şah Îsmail, ku bi malbatî wê rêveberîyê bi çend bavikan bi rê ve dibin jî, ji hîmê xwe ve kurd in. Ji xaynî wê jî, wê dergah, weyneka mazi bileyizin. Dergahan, ku mirov wan bêne ser ziman, divêt ku mirov bi demê re bi teybet li ser wan bisekinê û wan bêne ser ziman. Ew, sazîna ku ji ya ku dizanîn bêhtirî xwediyê girîngîyekê na. Ji demên berî Sefêvîyan, serwerîya Abasîyan jî, wê fêr û cerbna dîrokî jî wê pêşketinê sefêvîyan re ku weke hîm in wê biafir in. Xalîfeyên weke Xaro raşîd û mirovên ku weke Bahlûl ku navê wan di demekê de kirina xalîfetiye de jî derbas dibe bi aslê xwe de kurd in. Dîroka bi wan re ku bi aqil û ji zanebûnê di nav xalkê de dihê vegotin heya. Rêz û hûrmeteka bê sînor, kurd didîna wan. Ji ber ku ew jî bi qasî ku dihê gotin û vegotin, ji malbatna kurd ên mîr in. Heyîn û hebûna mîrtiye, ti carî di nav kurdan de ne dibû mijare nîqaşekê, ku mirov wê şîrove bike û di vir de bêne ser ziman. Ev mirov, têgihîştin û ew bandûra wan ye ku pişt wan re di nav xalkê de xwe daya berdeyam kirin, di avabûna sefêvîyan de cihê wê dîrokî ya. Di rastiyê de, ku mirov van di vir de neyêne ser ziman, mirov wê heyîn û bandûra wê rêveberîyê ye ku li ser Kurdistanê jî bi serwer û desthilatdarî bûya, mirov wê baş û qanc fahm nekê.

Xanadana sefevîyan, piştî ku hinekî mazin bû û bi hêz bû, êdî xwest ku du tiştan bike. Li ser temenê xanadantîya sefevîtiyê ku pers bû, persîtî hin bi hin dihate ferzkirin. Wekî din jî, li wê mîreteya Abasîyan ye ku li herêmê bi hûmekî dihate li ser ziman, kir ku lê xwedî derkeve. Di wê yekê de, hin bi hin bi dest pêşketina xwe jî kir. Lê bi wê re jî, xwestina ji rêveberiyê dûrkirina kurdan, wê hin bi hin bibe. Hate deme şerê çardiranê ku wê di naqabîna Sefevîyan û Osmanîyan de bê, ku ew têk herîn, wê bandûra kurdan bi tememî bi bin keve. Herêmên kurdan ên weke Şîvanê ku şahên weke Mohammed Xudabendî bi artîşê bi hêzeka mazin diçîna bi ser wan de û komkujiyên mazin bi kurdan didina jînkirin wê bibin. Ev wê, kurdan pir bi hers bike. Bi vê yekê re, wê têgihîştina wan ye li herêmên xwe ku serwerbûna wan wê bi wan re xurttir bike. Li herêmên xwe êdî wê bixwezin ku bi serê xwe û weke welêt bijîn. Lê xanadana Sefevîyan ye ku êdî xurt bûya, wê êdî firsandê nade vê yekê ji wan re. Rêveberiyê, nîrxê olî jî bi xwe ve girêdaya. Ev yek, wê ji aliyekî ve kurdan jî bike zorê de. Lê kurd, bi kevneşopîya xwe ji xwe bi bawer in. Bi wê re, li ser xwe disekin in. Di şerê Çardiranê de, ne tenê bi wînda kirina Sefevîyan re ku serwerîya Osmanîyan li herêmê zêde bû û Kurdistanê jî bi peymana ku hate mohrkirin e ”qasî şerîn” e di nava wan de bû du qat. Di rêveberîya xanadana sefevîyan de heyîna rêveberîya malbate Şah Îsmail jî ji rêveberiyê dikeve.

Aliyê Osmanîyan, ku mirov lê dinerê, mirov dibîne ku wa serwerîya xwe li bakûr û rojavayê Kurdistanê denezandîya û bi serketina xwe re ketîya hin herêmên başûrê Kurdistanê de û di wan de jî rêveberîya danîya. Osmanîyan, çavên wan li bîdestxistina Baxdayê bû.

Bi Osmanîyan re, mazinên Kurdan ên wê demê ên weke Îdrîsê Bedlîsî, wê bi Osmanîyan re li ser temenê wekhevîyekê di rêveberiyê de wê peymenek ji were mohrkirin. Bi wê peymanê re wê kurd, li herêmên xwe bi rêveberî û desthilatdarî xwediyê rêveberîya xwe bin. Siltanê Osmanîyan Yavuz Selîm, bi Îdrîsî Bedlîsî re wê levkîrinê dike. Çend, ku rojhilat û başûrê Kurdistanê di piştî şer de di rewşeka ne baş de jî bin, bakûr û rojava û hin herêmên Başûr jî, bi wê peymanê rêveberîya xwe ye herêmî didênin. Ew ji aliyê osmanîyan ve jî dihê naskirin. Lê wê ew rêveberiyên kurdan wilo zêde demeke dirêj berdewam nekin. Hate hatina Qanûnî suleyman wê berdewam bikin. Qanûnî suleyman ku tê ser rêveberiyê, wê bi fermanekê hemû mafên ku Kurdan bîdest xistina bi levkîrîna di nav Yavuz Selîm û Îdrîsî Bedlîsî de wê ji holê bêne rakirin û herêmên kurdan ên ku li ber wê di rabin jî, wê bi sedeme ku ”li ber rêveberîya îslam rabûna” wê herê bi ser wan de û wê komkujiyên pir mazin li herêmên kurdan pêk bêne. Kurd, wê bi vê yekê re, êdî li her herêmên xwe wê bikevîna rewşeka pir zor û giran de. Êdî, mirov karê bêje ku wê ji wê demê û bi vir de, wê dem û rewşeka nû li hevîya wan bê. Herêm bi herêm, wê şer bi Osmanîyan re bibin. Kurd, ji Osmanîyan pir bi hers in. Ji ber ku li ber wan li ser soz û gotina xwe ne sekin in. Êdî, wê ti carî piştî wê re wê levkîrinê bi wan re nekin. Hin rêveberên ên herêman ku osmanîyan wan dikişênine nig xwe jî, wê di nav kurdan bê sedeme hêrseka pir mazin li wan rêveberên kurd jî.

Ev dem, hatina wê ye li ser ziman, ji gelek alîyan ve dibêt. Ev dem, demeke ku pir giring e. Di nav kurdan de, pêşketin û pêşveçûnên ku hene, wan, pir ji xwe biêmin di jîyane de dike ku ew bi rê ve herin. Lê wê pir rewş jî werine ser serê wan. Kurd, wê ji sadsalên 14. min û 15. min pê ve, wê bi berjêr ve herin. Ew berjêrçûyin, wê piştê di her demê de bi wan re berdewam bê. Di serî de, temenê wê yekê, ji aliyê ramyarî ve ku serwerîya xwe ye giştî ku li ser herêmên xwe wînda dikin diafirêne. Wê piştê, hertimî bi wan re têkoşînak bi wê re berdewam bê. Kurd, bi kevneşopîya ku xwedî na, di demên xwe yê piştê de ên ku berjêr ve na, di wan de wê bi wê kevneşopiyê xwe bi parzên. Bi wê, wê karibin xwe ji demê bi buhurênine demê. Ku mirov, wê deme di serî de bêne ser ziman, mirov wê bi aliyê ramyarîyê e bi rêveberiyê re bêne ser ziman. Li herême, piştî hatina musulmanetiye, rewşeka nû diafirê. Lê ew rewş, wê bi awayê xwe ku li jîyane maba û pêşketiba jî, wê zêde nemêne. Wê, statûqûtiya rêveberîyan, wê xwe li wê serwer bike. Di serî de Abasîyan, bi pêşketine ku bi xwe re di olê de dana çêkîrin, ji aliyê civaknasîyê ve hinekî bi şûn ve xistin. Aliyê rêveberî dextistina pêş. Bawerî, kirina xaleka wilo ku di jîyane de mirov êdî ji jîyane qût bike. Bi vê yekê re, awayekî pêşketinê dana jîn kirin. Awayê pêşketinê, ê rêveberiyê ye ku mirov

wê fahm bike di vê demê de, bi tememî ji jîyane û civaknasîya wê qût e. Mirov, karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman.

Li Kurdistanê, di wê demê de jî, çend ku bandûr û girenîya rêveberên serdest derketibê pêş jî û di bin wê de bûyin hebe jî, wê dişa di kevneşopîyê de awayekî civaknasî ê xalkî wê heyîna wê bê jînkirin û berdeham kirin. Di aslê xwe de, ku mirov di vir de vê xalê baş fahmnekê, mirov nikaribê, pêşketinê demên berê ên li Kurdistanê jî baş û qanc fahm bike. Li Kurdistanê, awayê pêşketinê, herçimê bi rengê kevneşopîyê dibê. Ji ber vê yekê, di her xal û derê de kevneşopî hatin û hanîna wê ye li ser ziman dibê.

C. Şerê çardiranê, qatbûna Kurdistanê, zanistên kurd û hewldanên xwenûkirinê ên li Kurdistanê û bigîştî ji di cihane Îslamê de: Li Kurdistanê, piştî şerê Çaldiranê re, wê demeka nû ji her aliyê ve dest pê bike. Kurd, wê ji gelek aliyên ve windabûnekê di jîyane xwe de bijîn. Kurdistanê di jîyane de ji ber vê bûna wê ye du qat, wê bi wî serî re bigihê fermîyetekê di destê hêzên ku lê serdest in de. Bi vê yekê re, mirov wê dibînê. Kurdistanê, di aslê xwe de, ku mirov di rastiyê de duqatbûna wê bahse wê bike, mirov karê jî şerê Kerbeleyê pêvajoyeka wê bi dirokê re bide dest pê kirin û bêne hate wê rojê. Di nav kurdan de kevneşopî, ji ber zayîne ve pir pêşketî ya. Di wê kevneşopîyê de têgihîştineka xwe naskirinê e ku bi dirokê re pêşketîya heya. Bi pêvajoyên musulmanetiyê re, wê şerekî ku ne hatî denezandin wê li ber vê heyîna têgihîştinê e naskirinê e bi axî ve re jî were kirin. Têgihîştina "Ummet"îtiyê, wê axê û hizir bi hev re bi baweriyê re bikev nave xwe de û bi pêş bikeve. Bi vê yekê re, wê ne xalkî û navîya wan, wê musulmanetî bi Ummetîtiya wê re wê derkeve pêş. Bi vê yekê re, başkirina nirxeke dijî wê kirin, weke "bêolîyê" wê were dîtî û lê nerîn. Kurd, hate wê demê, bi awayekî bi pergali ku hemû nixên xwe bi kevneşopî hanîna li ser ziman li ser axa xwe dijîn. Ew jî, di pergaliya olî ye wan ye berê de hatîya salixkirin. Di demên piştê de, wê çûna ser ola ku wê pergale dihêne holê. Êzîdîti, bi vê yekê re, wê di demên sadsalên 8. min û 9. min hwd, wê çûndineka pir mazin li ser wan bibe. Hate wê demê, Êzîdîyan bi pertûkxaneyan nivîs û nivîsar afirandina. Wê hemû bi carekê re bi pirtûka wan ye pîroz re jî holê bê rakirin. Hate ku navê wan jî qadaxa dibe. Yê ku navê wan bêne ser ziman, weke ku "kufrekê" dike lê dihê nerîn û ew dihê dîtî. Keç û jinên wan, destavêtina li wan "helal" dihê dîtî. Di demê de dihê li ser ziman, ku "haçiyê du êzîdîyan bikujê wê herê bihûştê". Her weha pir hanîna li ser ziman dibin. Ev hemû nêzîkatîyên rêveberîyan ên ji bo serwerîya wan in. Lê di nava olê de dihêne li ser ziman, û bi hewldanên xwe re wan nêzîkatîyê xwe dikina malê olê jî. Bi vê yekê re, olê bikar dihênin. Ti carî nayê ser ziman, ku wê ola êzîdîtiyê weke ku temenê cihuyê û filehiyê çêkiriya ye wê ola mazin ye musulmanetiyê jî afirandîya. Di aslê xwe de divê, bi rêveberîyan re biqasî herêmê Kurdistanê jî dikeve pêvajoya windakirinê de.

Hate ku demê sadsalên 14. min û 15. min hwd, êdî wê her weha bi rêveberî serwerî bidest bê xistin. Musulmanetî, ji van demên ku pê hatîna jîn kirin, di wê demê de, di aslê xwe de, dikeve demeka ku êdî hin bi hin hin xwenûkirin(reform)na di xwe de çêke û li gor demê bidest pêşketinekê di xwe de bike. Zanist û hizirvanên olî ên weke İbnî Haldûn û İbnî Rûşt û hwd, bidest pêşvanîya vê yekê de di gelemperîya herêmê de kirina. Li Kurdistanê jî, ku wê hate ku bigihîna gelemperîya herêmê di wê pêşvanîya xwe de û di musulmanetiyê de pêşketinna mazin bi têgihîştina deme nû bidina kirin, Mirovên weke Êlî Herîrî, Teymîyê Harranî û hwd derdikevin. Ew mirovên weka van, di cihane îslamê de dibina xwedî nav û deng. Pişt wan re, wê mirovên weke Salahadîne Eyûbî bi hizrên xwe re û bi nêzîkatîyên xwe re kê ku hin guharandinên ji bingihîn bide kirin. Hizrên wî yê ku ji devê wî dihêne ser ziman, wê ne tenê li Kurdistanê li ber Diclê û Firatê bi bandûr bin. Wê di cihane îslamê de bi bandûr bin. Di aslê xwe de, hinekî piştî wê demê re derketina mirovên Mele Hisêne Batê, wê di asteka xwenûkirinê de bin. Yê ku Mewludê di nivîsêna û di musulmanetiyê de bicih dike ew e. Hate wê demê, bi xwandina ayatên pîroz re mewlud dihê bi rê ve birin. Lê Mele Hisêne batê, wê yekê di guharêna. Piştî wî re, ên ku Mewlud wî ji xwe re mînaq digirin û ji xwe re bi heman awayê diafirênin û herweha ên ku di nivîsênan û piştê bikar dihênin dibin. Divêt ku mirov Salahadîne Eyûbî jî, di vir de bi heyîn, hebûn û hewldanên wî re di vê çerçova pêvajoya xwenûkirinê de carek din bi bîr bixê. Ew, hewldaneka wî ye ku xatekê di nav jîyane rêveberî û ye olî de bixîzêne heya. Di nav olan de jî, ew di

têgihîştineka wekhevîyê de ya. Piştî şerê li Kudusê, mohrkirina peymanê di nav musulmanan û filehan de ku mafê wan dide wan ye ji aliyê wî ve, birîqîna wê têgihîştina wî ye di serê wî de ya. Bî Nêzikatiya mele Hisêne batê re, ew têgihîştina ku "ayatên pîroz tenê di zimanê ku têde hatina nivîsandin karin werina xwandin" dihê şikandin. Mewludê Mele Hisêne Batê bi Kurdî ya. Weke wî, Nubara Ahmedê xanê û hwd, hene. Wê her weha êdî zêde bibin. Berî hingî, di kurdî de bûn. Lê bi ola êzîdîyê ji ber ku hatibûn ji holê rakirin û an jî şawitandin, êdî nemabûn di kurdî de. Lê bi hewldanên weha ên weke yên Mele Hisêne batê û Ahmedê Xanê û hineki beri wan ên weke Feqîyê teyran û Meleyê Cizirî hwd re, wê êdî bidest afirandina xwe bikin. Cihe Meleyê Cizirî, bêgûman pir mazin û giring e di vê xalê de. Gotina ku di pirtûka pîroz de hatiya li ser ziman û li ser navê xwûdê dihê gotin ku xwûdê gotîya "min win ji jevcuda afirandin bi gelî", êdî bitêgihîştin dikeve jîyanê de. ...

Lê wê ew hewldan û pêşketin, zêde bi pêş ve jî neçin. Wê li astangîya rêveberîyan bisekin in. Di wê demê de, Bilindbûna Osmanîyan, wê li pêşîya wan hewldanên xwenûkirinî ên herêmi bê bend û li ber berbestiyê bike. Rêveberîyên herêmi, ên ku di xateka pêşketinê de na jî, wê li wê bendê biqalibin. Herêm, wê ji wê pêde, bi berjêrbûnê ve di çûnê de wê êdî hê zûtir bibe.

Wê ew dem, hate sadsalên 17. min û 18. min û hwd, wê bi awayekî, bi vî awayî bi heyîn û hebûna xwe berdewam bikin. Di wê navberê de şer û pevçûnên xalkan ji wê bi rêveberan bibin, weke yên kurdan û hwd. Heyîn û hebûna xwe naskirin, wê bi xalkan re derkeve pêş. Wê, têgihîştinek bi vê re pir mazin biafirê. Li ber wê êdî sekinin, wê ji bo rêveberîyan ne biderfet bê. Wê, hêz û karîna wan têrî wî neke. Bi wê yekê re, wê şer û pevçûn zêde bibin. Li nivîgirava araba, qadên Afrîqa û hate ku digihê berêmen dîn ên Asya û ên cihane ên din, wê her weha berdewam bike. Li Kurdistanê jî wê ew rewş hebe. Di sadsale 18. min de, Serhildane Şêx Mirzê ku bi armanca welatbûnekê ava bike dibe. Ji bo welatekî hemdem ku di nûjenîya xwe de bijî, çî pêdivîya wê pê heya, ew kifş dike û li gor wê dike ku welatekî ava bike. Kurdên Zaza, di di heman demê de di salên 1821 an û wan de serhildane wan ye ku deme ku dest dihê avêtin li azadîya wan û ji bo azadîya xwe serî hildidin û radikin dibê. Li Başûr serhildane Mîr Avdîlrehman, li rojhilat piştê ne bi gelekî re Mîr Mihamedê rawadûzî û hwd, çend ji wan serhildanên demê ên ji bo azadî û serbixwebûna xwe na. Kurd, hate wê demê, çend ku di bin siheke bindestiyê e rêveberiyê dijîn jî lê disa li herêmen xwe bi serê xwe de bi kevneşopîyên xwe dijîn. Ku dest dihê avêtin li jîyane wan, êdî berteke wan ye ji bo azadî û jîyane wan, wan dirakê ser pîyan û raperînê. Di nav jîyane xwe de kurd, xwediyê jîyane xwe ye bi serê xwe na. Ev herdemî ji bo wan wilo bûya. Ji bo wan, her timî azadîya wan ye bi serê xwe bûnê, pir girîng bûya. Ku Dest hatîya avêtin li wê, êdî di serî hildanê de ne sekinîne û taqîr nekirina ji can dayînen xwe ve. Di vê derê de jî, emê bahse kevneşopîya wan dîrokî bikin. Ji ber ku ye ku ew nîrxîtiya wan parastîya û wan dikira ser pîyan ew bû. Di kevneşopîya xwe de, weke ku di welatê xwe de dijîn. Kevneşopî, weke warekî wan ye ku bi wan re li ser wê axa wan ye bi warî dijî bû. Ji bo wan, ax û kevneşopî, hevdu temem dikirin.

D. Pêvajoya duqatbûna Kurdistanê û şerê Kerbeleyê û pêvajoya piştê ye hate şerê Çardîranê: Ji van sadsana ve kurd, êdî wê ew demne pir pir zor bi buhurênin. Çend, ku jîyan û kevneşopîyên wan, ku ew karin hê li gor wan bijîn û tevlîbûna li wê jîyandina wan hê wilo zêde nebe jî, mirov nikarê êdî bêje ku bi serê xwe na. Di bindest de na. Ew jî wê yekê bi xwe re hîs dikin. Di nav jîyane xwe de, girîngiyeka mazin ew didina li gor xwe jînbûnê. Bi wê yekê re mirov karê bêje ku ew yek, wek xaleka wan ye sereka ya. Kurd, wê bi şerê Çardîranê re, wê welatê wan bi fermî wê bê qat kirin. Piştî şer, wê peyman qasrî Şêrin were mohrkirin. Wê sînoren di nav hêzên tîkçûyî û yên serketî de bê kifşkirin. Bi wê yekê re kurd, bi welatê xwe re dibina duqat. Cihane wan dibe duqat. Di aslê xwe de, weke ku me li jor jî hanî li ser ziman, ew qatbûn, hê di deme şerê Kerbeleyê de dest pê kiriya. Çend, bahse Kerbeleyê bê kirin û banse bandûra wê bê kirin jî û ku kî jî jê bi bandûr dibe, wê ti carî ti kesek weke kurdan jê bi bandûr nebe. Wê bê demeke nû ji kurdan re. Kurdan, piştî Pekrawan kirina Hasan-Huseyîn re, wê li başûr û rojhilat dergahên wan, wê xwe weke alîgirên wan bidina denezandin û ev jî, wê temenê bûn û derketin û mazinbûna mezhebê şîitîyê boxwe jî. Ku di vir de, bi vê yekê re, mirov bêje ku kurdan, ji bûn, derketin û

pêşketina wê re temen afirandîya, wê ev ne xelat bê. Dergahên kurdan ên wê demê, bandûra wan, ji ya ku em î ro dizanîn bêhtirî jî hebû.

Li van herêmên Kurdistanê, temenê wê pêşketinê bêhtirî maztir derdikeve holê. Di aslê xwe de, ji ber ku rêveberîya rêzanî û kevneşopî pirr xurt bû. Ev herdû aliyê rêveberîyê, di wê kifşkirinê de û her weha kifşkirin û pêşketinên weha de pir mazin bi weyn in. Kurdan, wê ji Kurdistanê ku hate ku digihê berbahre mazin e Hurmûz û hwd de wê serwerîya herêmê bikina des xwe de di deme Mediya de. Pers jî, hingî bi xanadanî bi kurdan re dijîn. Lê wê piştre, êdî hin bi hin bi hêz bibin û derkevina li pêş. Bi awayekî împaratorî, wê konfadaralîyeka herêmi bi Mediya re bê avakirin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew rêveberîya ku hatiya avakirin, dibe xwediyê serwerîya xwe jî. Di vir de, ji ser wê awayê rêveberîyê jî, mirov divêt ku çend gotinna bêne ser ziman. Ev yek, wê di vir de giring bê.

Awayê wê rêveberîyê, ji binî ve bi konfadalî bû. Lê ku bi ber jor ve diçû jî, her weha êdî di xwe de dibû xwediyê yekbûnekê. Di ast û jorîya wê de, hêze wê derdiketa holê. Ji binî ve, li herêman, ku herêm bi herêm xwe bi rêxistin kirin hebû. Kevneşopî û dîrokeka wan ye ye herêmi hebû. Lê gihiştina hevdû di asta jor de dibû. Ziman, yekbû. Ji hevdû fahmkirin û têgihiştin hebû. Ku hêrîşek bûba li herêmekê, wê bi hev re hemû herêman gav biavêta û bi hev re bûba hêzek û wê li ber herêmên hêzên ku dihatina ser wan de wê li ber wan bi sekinîyan. Bi vê yekê re, wê bi hev re ban. Temenê wê bihevrebûnê di asta jor de bi hevneşopîyekê hatibû afirandin û çêkirin. Rêveberî, di aslê xwe de, li jor wê li ser wê kevneşopîyê wê heyîn û hebûna xwe daba avakirin û bitêgihiştin kiriba. Mediya, bi vê yekê, mirov karê bêje ku xwediyê temenekî xurt bû. Civatên li nav xalkê hebûn ku çî bûyar bûba û agahî hatiba guh, wê têde bihate ser ziman. Her herêm û komcivak, xwediyê civate xwe ye di nav xwe de ku li dar dixist bû. Civak, ne tenê cihên bi hev re axiftinê bûn. Cihna agahdarkirina li hevdû jî bû. Têgihiştina mirov, di wan deran de pêş diket. Hevdû naskirin jî, di wan deran de dibû. Hevdû naskirin, temenê bûna civaktiyê yê bi têgihiştinîyê ya. Mediya, rêveberîya wê, di asta bin de, bi wê civatîyê xwediyê heyîneka civakî ye xwe ye ku afirî bû û bi kevneşopî û dîrok bû. Di asta ser de jî, xwediyê rêveberîya wê ye bi kevneşopî bû. Di ahangekê de, ev levkîrin ji bin hate ku dihatê serî hatibû afirandin. Di vir de, mirov karê awayê olî ê wê demê ê wan bêne ser ziman. Ji ber ku ev giring e. Yekîfî û yekbûn, bi têgihiştin di wê de afirî bû. Deme Mediya, demeke ku li gor wê yekbûnê pêş diket bû. Pêşketina Mediya, ew kevneşopîya wê ye asta jorî e rêveberîyê ew yekîfîya biolî kifşkiribû û lê xwedî derketibû. Bi wê, hewl dide ku pêş bikeve. Kevneşopî û bawerî ku bû, bi hevdû re êdî wê statûqûtûyê bide afirandin. Mediya, ew yek jî kifşkiribû. Demên berê, ên ku bi rêveberî hatina jînkirin, fêr û cerba wan hebû. Bi wan hizirkirin, dibû. Bi wan, gav avêtin û levkîrin û bi hev ve kirin hebû. Bi vê yekê re teherîyeka jî, bi têgihiştin hebû. Xate pêşketin û hizirkirinê, bi jîr û bîra xwe ye tişî re hebû. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku temenekî Mediya e xurt hebû. Ji ber vê yekê bû ku di demeka wilo kin de pir mazin bû xwediyê pêşketineka dîrokî e bi xwe re di deme xwe de.

ÊZÎDÎTÎ, PERGALÎ Û PÊVAJOYÊN CIVAKTIYÊ ÊN LI KURDISTANÊ DI VÊ PÊVAJOYÊ DE ...

Ev awayê rêveberîyê, wê piştî Mediya re jî, di nav kurdan de heyîn û hebûna xwe bide ber dewam kirin. Bi awayê herêmi, heyîna wê ye ku dihê ser ziman e vê awayê rêveberîyê, bi herêmtiyê û mîrtiyên wan re dihê ser ziman. Di demên xwe yên berê de ku serekê komekê bû mîr, wê piştre bê serekê herêmekê bi mazinbûn û zêdebûna mirovên xwe yên ku bi ahlî û êlî pêve girêdayîna, bê serekê herêmekê. Mîr, bi vê yekê re, bi qasr û kevneşopîya wî re, xwediyê dîrokeka ku pir mazin demdirêj e. Ku mirov, li dîroka Kurdistanê meyîzêne, mirov wê bi kevneşopî di vir de dîrokeka pir mazin e dem dirêj bibîne. Hate ku dem dihê vê deme Kurdistanê e ku me hanî ser ziman e deme şerê Çardiranê, wê ev heyîna kevneşopî, wê heyîna wê berdeyam bê. Lê bi asta jorî re jî kurd, di nav xwe de xwediyê pergaliyeka rêveberî e bi kevneşopî e giştî na. Di deme Mediya de, awayê olî ê yek-xwûdayî ya. Hê di deme Gûtîyan de, awayê olî ê yek-xwûdayî ya. Êzîdîtî, bi awayê xwe yê wê demê pergaliya rêveberî û civakî diafirêne. Piştren, çend ku rêveberî serwerîyên wan diçin jî, ew rêveberîya bi pergali e olî heyîna xwe bi tehereka xwe ye bi dîrokê re dide

berdewam kirin. Di aslê xwe de kevneşopîya kurdan, di fahmkirina wê de, xwediyê mifteyên dîrokî ên têgihîştinê ya. Ji ber vê yekê, giringiya wê heya. Bi têgihîştinê gihîştina rastiyên dîrokê ên ku hatina jînbûn, wê pê were holê. Di demên berê de jî kurdan, ev awa û nêzîkatîya bi hizrî û têgihîştinî di nav kevneşopîya xwe de bi kar hanîya û pê fahmkirinên demên xwe yên berê xwe gihandina wan.

Ku mirov li dîrokê di meyîzêne, û bi teybetî jî, ku mirov dihê van demên sadsalên 15. min û bi vir de, mirov wê giringiya kevneşopî baştir dibîne. Di nav kurdan de, jîyane civakî ku wan di nav xwe de bi navê "civate mazin jî" jî car bi car bi nav dikir, bi kevneşopîyê û xal û zagonên wê yên ku li jîyanê jîn û zîn bûn bi wan re bi rê ve diçû. Mirov karê wê yekê her weha bi teybet bêne ser ziman.

Pişti vê demê re wê kurd, pergale xwe yê giştî wê serwerîya xwe li ser wê winda bikin. Ola, êzîdîtiyê, di aslê xwe de, têkçûna wê, têkçûneka mazin ye civakî û dîrokî û hate ku mirov karê bêje ku bi têgihîştinî di xwe de bi xwe re dihê ser ziman. Pergale civakî e Êzîdîtiyê, bi hezr salan, bû xwediyê pêşketinekê bi dîrokê re. Di pêşketine wê ye bi dîrokê re teherîyeka bê navber hebû. Qûtûn nebû. Hate ku sadsalên 8. min û 9. min ên piştî zayînê. Wê di vê demê de, ew qûtûn bibe. Kurd, wê asta kevneşopîya xwe ye ku bi rêzanî lê lev digihîştina hevdû, bi wê re wê winda bikin. Wê piştê jî, ew kevneşopî bimêne. Lê êzîdîti, ku bin dikeve, êdî ew pergaliya wê, weke bi navê ji holê di rabê. Piştê jî, wê bê jîn kirin. Lê li herêman hin herêma bûna wan e musulman û hin herêma weke xwe man jî, wê qatbûna pergale bi awayekî di bêne holê. Ew rewş, wê di nêzîkatî û kevneşopîyan de pir mazin bike zorê de jî. Kurdan, piştê gelek herêmên din ên wan, tenê weke ku ew bi wê qatbûnê re jêv dîr nekevin, bi wê nêhtë di buhurina musulmanetiye. Bi vê yekê re, di demeka kin de parranîti wê bidest bê xistin. Lê wê, serwerîtiya kevneşopîyê ji ber ji holê rabûna hin awayên wê, wê ne weke berê bê. Di deme Musulmanetiye de, Deme kurdî û kevneşopîya wê ye serwerîyê, deme Merwerîniyan û Eyûbîyan e. Kurdan, bi wê re serwerî li herêmên xwe bi dest xistin. Lê berî hingî, serwerîya zanebûnê û têgihîştinê jî ji gelek aliyên ve di destê wan de bû. Wê ev jî bêne windakirin. Farqê serwerîya wê demê berî musulmanetiye û ya piştî musulmanetiye, her weha ku ye berî musulmanetiye rengê wê kurd bû. Lê ye piştî musulmanetiye, bi navê musulmanetiye pirr gelemperî pêre têde hebû. Ji xwe, hate wê demê pir nivîs û nivîsarên ku ji demên berî musulmanetiye ên ku di deme êzîdîtiyê de bûn û ji ber ku ew têde dihate ser ziman, ji holê bi şawitandinê hatina rakirin. Bi vê yekê re jî, weke ku têkçûneka bû. Her mîrîên kurdan ên ku ji bo wan dihate vegotin ku "her yekê xwediyê pirtûkxaneyekê bû di qasra xwe de û ew pirtûkxane wî jî bi deh hezaran pirtûk têde bicih bûn. Î ro di roje me de, di destê me de yek jî ji wan pirtûkên ku di nav xalkê de bahs dihê kirin di destê me de nîn e. Ku mirov, di nav kurdan de dirûnihê, mirov ji vegotinên wan yên ku ji dev dihêne vegotin ên di derbarê wê cihane wan ye demê berê de, mirov wan bahskirinên di derbarê weqas pirtûkan ji bo bidil dihê bahskirin his dike. Di qasrekê de pirtûkxaneyak tiştî pirtûk, ji rûmetiyeka mîr û mazinbûna wî dihate pirsîn. Bi vê yekê, bahs dihate kirin. Tenê, di 'Çirokên Keçelok' de ew mîrîên kurdan ên ku qasrên wan ji zanebûnê têrbûn ku bahse wan dihê kirin, di vegotinê de, hertimî li gotinên bizane û têgihîştin dihate lêgerîn. Ew rewş, hemû ji holê hatina rakirin. Kurdên ku male xwe ji rûmeta xwe di dîtin, çawa derfet dana û hiştina ku ev ji holê bêne rakirin? Di rastiyê de, ku mirov li wan xosletên wan yên ku bi kevneşopî û zanebûn û ku pir dihêne vegotin, ku li wan dimeyîzêne, mirov di vê yekê de, hinekî di fahmkirinê de dikeve zorê de. Ji bo fahmkirina wê jî, pêşketinên dîrokî êmn ku bûna li Kurdistanê ên van demên dawiyê, wê hinekî me bi rohnî bikin. Emê hinekî di bi wê awayê jîyanê wê bînina ser ziman û bînina hate roje me.

Ji sadsalên 15. min û pê de, pêşketinên ku derdikevin ên li Kurdistanê ji du aliyên ve di vir de mirov karê wan bêne ser ziman û li ser bisekinê. Aliyê pêşî, bi têkçûna serwerîya wan ye giştî re destpêkirina pêvajoyeka nû e bi wan re ya. Aliyê dîn jî, ew e ku çend ku her weha ew serwerbûn windadibê jî, wê rêveberîtiya wan ye herêmfî e li herêmên wan wê ji destê wan dernekeve û di destê wan de bê. Herêmfî bi herêmfî, bi mîrî û her weha aşîrî, wê ew rêveberîtiya wan heyna xwe berdewam bike. Ew serwerîya giştî e wan ye ku winda bû jî, wê cihê wê bi kevneşopîya wan were tiştkirin. Ew wê, bêhtirî kevneşopîyên xwe derxina li pêş û wê pê wê valahîya ku bi têkçûna wan

e ji aliyê wê serwerîya wan ye giştî ve, wê bi wê levgirtina wan e bi wê kevneşopîyê re wê hewl bê dayîn ku bê tişî kirin. Bi têgihîştin û civatî, ew têgihîştina wan, di nav wan de dimêne. Lê bi şênberî bi rêveberî jî ji holê dirabê. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku kurd, wê êdfî bi wê kevneşopîyê bijîn. Valahîyên wan yên di jîyane wan de, wê bi rêveberîya wan ye kevneşopî ye di nav wan de wê were tişîkirin û bûn.

Ku mirov bahse vê demê bike, mirov çend ku gotinan bi têgihîştinî di derbarê zanebûna wan de jî, ne hêne ser ziman, wê di hanîna li ser ziman kêmbûn bibe. Ji ber vê yekê, emê hinekî li ser wê jî bisekin in. Li jor, me hinekî hanî li ser ziman. Me bahse xwenûkirinê kir e di vê demê de. Mirovên weke Mele hisêne Batê derdikevin. Hizra wan ye ku dihê li ser ziman, wê hem ancama pêşketineka wan ye ku hebe û hem jî wê bê temenê pêşketineka bi wan re e dîrokî. Mirov karê vê yekê ji her weha bi teybet bêne ser ziman. Di wê demê de, Feqiyê Teyran û Meleyê Cizîrî jî derdikevin. Ew jî, hizirna wan ên ku di deme xwe de pir mazin li ser pêşketine demê ye di nav xalkê de bi bandûr in dibin. Bi Teybetî Meleyê Cizîrî, mirovekî ku di roje me de jî jî pir baş ne hatîya fahmkirin. Mirovekî ku hizra wî û bi teybetî jî felsefe wî ne hatîya dahûrkirin û fahmkirin. Meleyê Cizîrî, divêt ku hizrên wî, bi pêşketine demê re bi têgihîştinên di xwe de werîn fahmkirin. Di wê demê de, wî bi hizrên xwe yên ku hanîn li ser ziman, çi xwest ku bêne ser ziman? Di aslê xwe de, ev pirs, di çerçova hizra wî û fahmkirina wê de, hê li bendî bersivdayîna xwe ya.

Meleyê Cizîrî, em, deme ku di nav xalkê de dirûnîhin û li gotin û vegotinên di derbarê wî hizrên wî de ku dihêne vegotin ku li wan dihisêne, mirov fahm dike ku ew çendî li ser heyîna û pêşketina civatîyê sekinîya û xwestiya ku hin têgihîştina di derbarê wê û pêşketina wê ye demê de bide çêkirin. Meleyê Cizîrî, hizrên wî pir hene. Ew bi teybetî, li ser felsefe û Metafizîka wê pir mazin xwediyê têgihîştineka pir kur e. Ew di wê de, bi têgihîştin dayîmî pêde dihê û fahmkirin û zanîna xwe mazin dike. Wî bi teybetê, mirov karê bêje ku deme xwe û pêşketina wê fahmkirîya. Mirov karê, vê yekê bi teybet ji bo wî bêne ser ziman. Di nav xalkê de jî, bawerîyeka pir mazin li wî hizrên wî heya. Li Cizîrê û li dora, gotineka weha ji bo ku bawerîya li wî werfîna li ser ziman dihî vegotin. Ew gotin jî, weha ya. Piştî ku ew diçê ser dilovanîya xwe, êdfî ji bo wî ev gotin dihê vegotin. Dihê vegotin, ku "deme ku jinek hevîrê xwe hevîrt û meyand û piştê ku hevîrê wê meyîf, ku herê û wî hevîrê xwe bi rastkê û bi kevîrên berserê wî ve bi pahê, wê bi birajtinê wê nanê wê çêbibê." Ev gotin, bi awayekî bawerî, ji bo wî dihê vegotin. Lê deme ku dihê vegotin, ji bo ku bizanebûn wî û têgihîştina wî jî bêna li ser ziman û bêjin ku çendî ew bizanebûna jî, dihê vegotin. Di vir de bawerî û bawermendî jî, mirov karê gotinekê li ser bêne ser ziman. "Bawerî, di zanebûnê de kurbûn" dihate hasibandin û her weha dihate ser ziman. Çendî, ku dizanebûnê de kurbûn hebe, bi wê dihate ser ziman. Ev, awayekî teybet, ê ku pê dihate hizirkirin û di zanebûnê de kurbûn pê dihate kirin bû. Li Cizîrê, ku ji bo mirovên oldar, ku weke awayekî ku pê oldarîya xwe xurt bikin û têde kur herin, mezelen ku tenê ji bo hizirkirinê hatibûn afirandin. Di wan de, mirov dirûnişt û bi kêlfikan dihizirî û di serê xwe de diçû. Ev awa û heyîn awayê pêşketinê, tişteki dide mirov bitêgihîştin. Ew jî, her weha êdfî bûna serwerîya têgihîştina hizrî ya weke ku li her qadê pêş dikeve di bawerîyê de jî dihê dîtin.

Di deme Meleyê Cizîrî de, ku hê ew li jîyanê ya, Feqiyê Teyran derdikeve. Ew jî, bizanebûn û aqilê xwe re ne kêmi Meleyê Cizîrî ya. Di rîya wî de dimeşê. Ji aliyê zanebûnê ve, ew jî, weke Meleyê Cizîrî yekî ku deme xwe bi zanebûna ye bi xwe re buhurandîya. Ew zanistê wê, deme aqil û pêşketine têgihîştina wê ye têde ya. Bi wê re, mirov karê wî jî bêne ser ziman. Feqiyê Teyran, wê têgihîştinaka dîrokî bi xwe re çêbike. Têgihîştina civatî, e ku Meleyê Cizîrî hanî li ser ziman û kir û xwest ku mirov wê bibîne û fahm bike, Feqiyê Teyran bû zanistê wê têgihîştine di wê demê de. Wî zanebûneka mazin di xwe de da rûnandin. Mirov, deme ku bahse wî bike, divêt ku mirov, weke mirovekî ku bi têgihîştina xwe re deme xwe buhurandîya wî bêne ser ziman.

Feqiyê Teyran, di aslê xwe de zanistê demeka ku di wê demê de piştî Meleyê Cizîrî re ku ji nû ve dest pê kirîya ya. Mirov, bi vê yekê, karê bi wî re demekê bêne ser ziman. Ew, bi têgihîştina xwe re, di nav civate kurd de, bû xwediyê heyîn û hebûna têgihîştinê e demê e pîrr pêşketî di wê demê de. Li ser himê civatîyê pêşketin, di wê demê de bi awayekî têgihîştinî dest pê dike. Hin bi hin, civat derdikevina holê. Wê piştê ne bi gelekî re, civat bi civaktîyên xalkan re û bi pêşketinên

wan yên di vê qadê de wê werîna holê û li berçav. Di wê demê de, di nav kurdan de jî, mirov dibîne ku li gor demê hizirkirin û afirandinê dest pê kirîya. Hizrên Feqiyê Teyran, wê pêşketine ku bi Meleyê Cizîrî re heyîna wê pîr mazin xwe dabû dest pê kirin, wê hê bêhtir bi pêşve bibin. Ev jî, di aslê xwe de, pêşketineka demî ye pîr mazin dihêne holê. Ahmedê Xanê wê piştê derkeve û were holê. Ahmedê xanê, weke zanistekî kurd ê wê deme pêşketinê ku bi Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran re dest pê kirîya ya. Ew zanistê wê demê ya. Bi têgihîştina wê demê nû re xwe afirandîya. Di hanîna li ser ziman de, ew pîr bi zanebûn tevdiqerihê. Di derbarê dîrok û kevneşopîyên xwe yên ku hene de, ew xwediyê zanebûneka pîr mazin e. Ew, pîr mazin li pêşketina civakî dihizirê. Di nivîsandîna wî ye "Mem û Zînê" û her weha "Nûbara biçûkan" de, mirov wê hizirkirina wî dibîne. Ne tenê hizrên ku di wan de dihêne li ser ziman de, ji xaynî wê, weke "Nûbara biçûkan" temenê ku wî xwestiyê jêre binivîsîne jî, di vir de di wê nivîsandîna wî de li berçav e. Nûbara Biçûkan, wî ji bo biçûkan nivîsandîya. Ji xaynî Mem û Zînê û Nûbara Biçûkan, Aqîda îmanê jî wî nivîsandîya.

Di vê çerçova de, ku mirov li wê demê û hizirkirin û awayê hizirkirinê wê dihizirê, mirov dibîne û kifş dike ku têgihîştin di awayekî civatî û civakî de ya. Bi vê yekê re, li gor afirandin dihê kirin û li holê. Ev dem, demeka ku ji bo kurdan, demeka ku mirov karê bêje ku ne tenê ji vê aliyê ve ye destpêkê ya. Ji aliyê, baxtewerîya Kurdistanê de jî, demeka ku pîr giring û destpêk e. Kurdên ku hate wê demê dîrok bi xwe re hanîna, di wê demê de, ji dîrokê bidest ketinê dikin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku serwerîya wan ye ku ji destê wan çûya, wê êdî ji vê demê pêde, bi pîrsirgîrêkan re wê were ber wan. Piştî Şerê Çaldiranê, Kurdistan ji xwe bi peymanê Qasrî şêrîn'ê dibê duqat. Sînorê wê qatbûnê, berî hingî ji deme şerê Kerbeleyê ve hatîya destpêkirin. Ew dem û ew qatbûna Kurdistanê, li ser wê temenê dihê rûnandin. Mezhebbûna, ku bi şîitîyê re pêşketîya, piştî ku bû hizir û awa ji rêveberîya Sefevîyan re, êdî bi hêz bû û serwerî herêmê bû. Aliyên din jî, ên ku ne şîî bûn, ew jî, bi heyîna xwe re pêş dikevin. Lê di aslê xwe de, ku mirov awayê Musulmanetiyê li Kurdistanê bi gotinekê jî bê bêne ser ziman, mirov wê bibîne ku ji şîitîya û sûnnîtîya li nav arabana zêdetir 'Şafîitî' di nav kurdan de bi awayekî ku bi kevneşopîya wan re hatî afirandin hebû. Di girêdanê de, guharandinên dervî girêdanên gelerî ên kevneşopî ti girêdanên din di nav kurdan de ne bûn. Cil û berkên wan hebûn. Kurdan, ew awayê xwe dabû ola xwe ya ku dijîn jî. Di aslê xwe de, di awayên din ên olî de jî, kifşkirina awayê girêdanê nebûn. Lê piştî van deman re, wê ew bê kifşkirin. Piştî ku dihê kifşkirin, bi rêveberîyan wê li ser herêm xalkê bê ferz kirin. Hate sadsalên 18. min û 19. min jî, wê ew kifşkirin, newê Kurdistanê. Lê piştê, wê hin bi hin bi destê desthilatdariyên serdest re wê pêşî ev kifşkirin di olê de bê bicihkirin û piştê wê li ser mirov wê bê ferzkirin. Lê li Kurdistanê, wê ev zêde cih negirê. Ji ber ku kurd, bi kevneşopîya xwe re xwediyê serwerîyeka xwe ye di vê awayê de na û bawerîya xwe ji dil û zanebûnê dizanîn in.

Li Kurdistanê, ev demên ku hene, pêşketin û pêşveçûnên di wan de, wê demên piştê jî bi hîm bikin. Kurd, di demên piştê hertimî, ku piştî her xuruxandin û têkçûnan rabûna wan ye li ser xwe, ew deynî wê kevneşopîya xwe ya ku di nav xwe de di parastin bûn. Mirov, divêt ku di vir de, bi vê yekê giringîya wê kevneşopîya wan bêne ser ziman. Di deme piştî şerê Çaldiranê de jî, deme ku peyman di naqabîna Îdrîsî bedlîsî û siltanê Osmanîyan de dihê mohrkirin, hingî jî, tiştê ku kurd didina pêş û dixwezî "ku mudahale li awayê jîyane wan û kevneşopîyên wan nebin in". Vê yekê, di wê demê de didina pêş. Ji ber ku wan giringî didina wan kevneşopîyên xwe di her demê de. Ew giringî bû, ku wan ji bo kevneşopîyên wan yên ku wan ji bo xwe weke rûmet dîtîtin, di şanda mirinê jî. Di nav kurdan de, hertimî mijareka ku li ser dihate axiftin û dihate vegotin hebû. Ew jî, her weha her kurdekî ku ji bo mîrê xwe diçû mirinê bi dilxweşî. Ew bidilxweşî, çûna wan ye mirinê, mirov nikarê wê tenê bi girêdaneka wan ye li wan mîrên wan bêne ser ziman. Ji wê zêdetir, bi wê kevneşopîyê ve girêdayî bû. Di wê girêdanê bi mîrî ve, mirov nikarê ji zanebûnekê jî dûr bêne ser ziman. Mirov, nikarê wê girêdanê bê kevneşopî jî bêne ser ziman û her weha fahm jî bike. Di vir de, ye herî giring di vir de ev e, ku mirov wê di vir de baş û qanc fahm bike. Ku mirov wan kevneşopîyên wan yên ku hebûna, têgihîştina wan baş fahm nekê, mirov wê vê rewşê jî her weha baş û qanc fahm nekê. Kevneşopî, di vir de nîrxeka ku mirov wê baş û qanc fahm bike ya.

Kurdan, ku li kevneşopîyên xwe dimeyîzandin, sê tişt bi heyîn û hebûna xwe re têde di dîtin. Yek, rûmetîti û mazinbûn bû. Ye dûyemîn, dîrok û pêşketin û her weha pêşveçûnên ku têde bûbûn bûn. Ye sêyemîn jî, her weha şaxsîyeta wan bû. Di vê çerçovê de, bi wan re bi kevneşopîyên wan re, têgihîştineka wan ye civatî hebû. Ew têgihîştina wan ye civatî têgihîştina wan ye ku civakî bû. Civaktîya wan, di vir de, bi kevneşopî, ku di dîrokê de bi ber roje me ve bi awayekî peresendîni hatinakê di xatekê dihêne berçav bi nîrxî. Dem, ku dihê sadsalên 18. min û 19. min, kurd, ew serwerbûna wan ye ku bi rêzanî û ramyarî ku ji destê wan çûya û windakirina, cihê wê hate demekê jî bi vê kevneşopîtiya xwe re di dagirin. Lê wê, ev yek, wilo zêde berdewam nekê. Rêzanîti ku hate windakirin, sekn di tevger, xûy û hûnerên mirov re de di jîyanê de dihê holê. Bi vê yekê re, li gor wê xweşdiliya di kevneşopîyê de jîn, wê hin bi hin ji holê rabê. Di vir de, mirov divêt ku bêje ku rêzanîti, temenekî wê ye ku bi kevneşopîyan re di kevneşopîyan de ku li gor deme kirina wan û afirandina wan dihê holê. Bi vê yekê re, aliyekî rêveberîyê ye rêzanîyê heya.

Rêveberîya civaktîyê ji du alîyan ve mirov karê wê bêne ser ziman, Aliyê wê ye kevneşopîti û aliyê wê ye rêveberîyê ya. Kurdan, ji sadsalên 15. min pêde, bi awayekî fermî ev aliyê xwe ye rêzanî e giştî winda kirin. Bi wê re, êdî tenê mafek ji wan ma. Ew jî di kevneşopîyên xwe de jînbûn bû. Lê guharandin û her weha xwe li gor demê afirandin jî, ji destê wan ji aliyekî ve ravî bû. Bi vê yekê kurdan, şerekî dem bi dem ku hate ku dihê sadsaên piştê herêm bi herêm didin ji bo azadîya xwe di demê de. Kurd, di her demê, wan girîngiyeka dîrokî daya azadî û serbixwebûna xwe ye bi xwe re. Ji ber vê yekê, hertimî, li jîyane xwe meyîzandina ku ka karîni bi serê xwe gavên xwe bi avêjin û an jî nikarin. Ku ne karîni, astangên ku li ber xwe li pêşîya xwe dîtina bi wê re ketina tekoşinê de. Ev rewş, bi wan re bûya weke kevneşopîyêkê di dîrokê de. Mirov karê wê kevneşopîya wan, bi navê kevneşopîya azadî û biserxwebûnê binavkê jî û bêne ser ziman. Weke nîmînêrê wê kevneşopîyê jî di nav wan de heyîn û serhildane "Kawayê hesinkar" e. Piştî deme Gûtîyan re, demeka ku bi Naîrfîyan re destpêdikê dibê. Lê ew dem, piştê bi hatin û serwerbûna Asûrfîyan e li herêmê û serwerbûna wan re dikeve demeka tekoşinê de. Di şerê di naqabîna Naîrfî û Asûrfîya ê di sala 1128'an de ku naîrfî têde têk diçin û Asûrfî jî têde bi ser dikevin û li ser herêmê dibin, wê piştê li ber wan herêm bi herêm serhildan dest pê bikin. Piştî têkçûnê re jî, naîrfî têkçûnê herê nakin û li ber li berxwe didin. Hate ku dem dihê deme Medîya, wê herêm bi herêm êdî bi ser bikevin. Kawayê hesinkar, di aslê xwe de bi destane xwe ye ku nivîsandîya re dager û rûmeta wê dîrokê ya. Bi serketina wî ye di 21 ê adarê de, "rojeka nû" ji wan re dest pê dike. Ji ber vê yekê, ku di kurdî dihê wate rojeka nû ji wê rojê re "newroz" dihê gotin. Di aslê xwe de, Newroz, rojeka pîroz, ku berî deme Medîya jî hebû û ku hate ku digihîşt Deme Gûtîyan û ku ji wê jî di buhurt bû. Ku mirov dîroka Êzîdîtiyê fahmnekê e van deman, mirov wê pêşketinê pêvajoyên newrozê ên wan deman jî fahm nekê.

Di dîrokê de wê di deman re ev kevneşopî jî, heyîna xwe bi parêzê. Di demên ku hewldanên êzîdîti ji holê bê rakirin, Ew jî dihê qadaxakirin. Lê kurdan, ew kevneşopîya wê, di malên xwe de dana berdewam kirin û gihandina hate wê roje me. Piştê, ew kevneşopîya ku civatîyek li Kurdîstanê afirand û piştê kete malan de ji bi qadaxakirina wê ye li jîyanê re, wê piştê jî malan derkeve û pir mazin wê pêşketina bi xwe re bide berdewam kirin. Sadsalên 15. min û piştê, êdî wê bide derketina wê ye ji malan bike. Di sadsala 19. min û 20 min de, wê bi tememî derkeve derve û serwerîyeka kurdî wê bi wê re were holê. Demên sadsalên 19. min û 20. min, demne ku mirov wan bi teybetî bi serê xwe bêne ser ziman in. Hate ku demên dîrokê ên bi kurdan re dihêne wê demê, wê pir raperîn û serhildanên wan yêni dîrokî wê bibin. Sadsale 17. min, 18. min û 19. min, bitavahî dibina demne raperîn û serhildanê li Kurdîstanê.

Di aslê xwe de, wê di sadsala 20'an de, şer û pevçûnên di nav kurdan û hêzên li wan serdest in, wê diwartir bibe. Di vê demê de, wê Kurdîstanê, di bin serdestiyê de bê qatkirin li çar qatan. Bi vê yekê re, wê demeka nû li Kurdîstanê bide dest pê kirin. Lê wê ti carî kurd jî, vê yekê herê nekin. Wê li ber wê hertimî di şerekî de bin. Hewldanên hêzên ku di xwezîni serdestî û serwerîya xwe li herêmê çêbikin, wê kurd, bi wê tekoşîna xwe ye ku dixwezîni bigihîna azadîya xwe, wê bikevina ber wan de. Ev jî serî hate binî, wê şerekî di jîyanê de bi wan re bêne. Ji deme Sefevîyan ve ku hate ku hafîya wê demê li aliyên Kurdîstanê ên ku ew serdestbûna, wê bi kurdan re bi keve

şertiyekê de. Kurdan, ji herdû aliyan ve rastî bêbaxtiyê hatina. Ew bêbaxîya li wan, wê hate vê demê jî berdewam bike.

Dîroka li rojhilatê Kurdistanê e bi hêze sefevîyan re, wê hin bi hin bê ye şer. Ji xwe, ji deme sadsala 15. min pêde, bûya û dest pê kirîya. Dem bi dem, hate ku dihê vê demê, wê bidina demên şer ên ku kurd û desthilatîya dest bi hev re dikin in. Li aliyê bakûr û aliyê din ên vê dorê jî, bi osmanîyan re, mirov karê bêje ku xwediye pêşketinê dîrokî ên ku mirov ji wê awayê dûr neyêne ser ziman in. Ji heman dema, ku di naqabîna Îdrîsî Bedlîsî û siltanê Osmanîya Yavuz Selîm de peyman hate mohrkirin û piştre bi çar û an jî pênc salan ku ji aliyê Qanûnî siltan Suleyîman ve bi fermanekê peyman ji holê hate rakirin pêde, wê heman pêvajo, bi heman awayê bê jîn kirin. Ew qatbûna pêşî, e ku ji deme Şerê Kerbeleyê ve bûya jî, pirr kur bûya. Ji aliyê olî û rêzanî û ramyarîya wê ve jî awa û şekl standîya. Bi vê yekê re, pîrsgirêka Kurdistanê, êdî hin bi hin kurtir dibê. Di aslê xwe de, şerê li Çaldîranê, li ser dijberîya li ser vê temenê li berhevûbûnê ê olî û hewldane serdestî û serwerîya ye bi desthilatî ku bi hev re digihê hevdu re pêş dikeve û dibê. Di vir de, Aliyê beşa dîroka Kurdistanê ji deme derketin û bûn û berdewambûna musulmanetiye û dîrokê wê, ku hate ku digihê wê deme şerê çardîranê, divêt ku mirov bi serê xwe weke mijareka teybet hildê dest û wê fahm bike û bidahûrkirin û şîrovekirina ku pêşketinên dîroka olê jî jê ne dûr ku di nav werîna ser ziman, divêt ku mirov li ser bi tewihê û lê bînerê û her weha bêne ser ziman. **Ku mirov, tenê bêne ser ziman û bêje ku Kurdistanê ku di şerê li Çardîranê ê di naqabîna hêzên sefevîyan û Osmanîyan de bû, di ancama têkçûna hêzekî û serketina hêzekî de ku peyman di nav wan de hate mohrkirin û ew hate qatkirin, mirov weha bêne ser ziman, mirov wê ne fahmkirina bi dîrokê re ya bi xwe re jî bide ser rû.** Pêşketinên dîroka olî, wê piştî derketina Musulmanetiye, pirr bêhtir wê dîroka Kurdistanê bi xwe re di nav xwe de bidina kifşkirin. Kurdan, ji wê demê pêde, ew pîrozîya ku hate wê demê di destê wan de bû û bi wan pêş diket, wê êdî wê ji dest wînda bikin. Ew jî, wê pêşketinên piştre yê bi wan re bide kifşkirin. Ji binî ve, hêjî serdest in. Lê bi gelemperî, di rêveberîya mazin de, hin bi hin weke ku hatina dûrkirin. Ji sadsalên 12. min û bi vir de pêde, wê li herêmê bi rêveberîyan re persîtî, arabîtî û osmanîni derkeve pêş û wê di bin navê olê de xwe bide berdewam kirin. Bi vê yekê re, wê pîrozîyê bi kar bînin. Kurd jî, wê dîroka wan ye bi xalkîtiyê ye civatîtiyê wê heyîn û hebûna xwe berdewam bike. Ji wê demê pêde, ji aliyê herdû hêzên serdest e sefevîyan û Osmanîyan, ku çendî herdû, li herêmên kurdistanê li cihên ku serdest in ku pişta xwe didina kurdan û kurd pişta wan digirin jî, wê kurd rastî bêbaxtiyê ya ji aliyê wan ve werin.

JI DEMA HÛRÎ Û MÎTANNÎYAN BI BER DEMA ME YA KURDISTANÊ VE..

Di vê beşa zanîna civakê de, bi teybetî, di derbarê dîroka hemdem e Kurdistanê de emê bina xwediyê zanînekî. Bi wê re, em destpêkirina pîrşîrêkên wê yên bi dîrokê re ku bûna jî bibîne û fahm bike. Kurdistan, dîroka wê ye civaktiyê, her demeka wê, hewceyî pê heya ku bi serê xwe were ser ziman. Her demeka wê, di xwe de û bi teybetî jî bi xwe re xwediyê dîrokeka xwe ye teybet e ku bi pêşveçûn û pêşketina bi xwe re jînkirîya ya. Lê dîroka civaktiya ku were ser ziman û bi teybetî jî e Kurdistanê bê, ku li ber Diclê û Firatê pêşketiya, wê xwediyê hanîniyeka xwe ye pir teybet û demdirêj û dâvdirêj bê. Divêt ku mirov vê jî, di berçav de bigirê û bidest hanîniya li ser ziman bike. Dîrok, çawa ku hate jînkirin, hatîna wê ye weke xwe ye li ser ziman û bi teybetî jî fahmkirina wê ye rast û pak, wê têgihîştineka rast ji bo paşerojê bi mirov re bide çêkirin. Ji ber vê yekê, fahmkirina civakê û civaktiyê û civaknasiya wê, bi teybetî hinek giringiyên wê yên ku mirov fahm bike hene. Mirov divêt ku li ser wan jî bisekinê û wan bêne ser ziman. Dîrok, ku hate ser ziman û bi teybetî jî, ku dîroka civaktiyê bû, wê bi awayekî were ser ziman. Civaktî, bi jîndayiyên xwe re dîroka xwe diafirîne. Mirov, li jîndatiyên wê dimeyîzêne, û pêşketinên wê dimeyîzêne û wê dihêne ser ziman. Ev aliyekî wê dihêne ser ziman. Lê aliyê din jî, her weha bi fahmkirin û hewldanên mirov ên di nav civakê de na. Bi wê re jî, hinek pêdiviyên mirov jî, bi fahmkirin û têgihîştina mirov re, mirov bixwe wê kifş dike. Ew jî, weyntîya mirov e di nav civakê de ya.

Li ser weyntîya mirov e di nav civakê de sekinîn, tenê mijareka ku hate nahaka li ser ne hatîya sekinandin e. Li ser pir hatîya sekinandin. Mirov, di nav civakê de, xwediyê heyîn û hebûna xwe ya. Aliyê mirov ê civakî heya. Ew alî jî, bi civaknasîtiyê, deronîtiyê û hwd dihê holê. Temenê wê aliyê me, ev xalên weke van diafirênin. Di aslê xwe de civaktî, bihevrebûna e. Lê ji wê zêdetir, jîreka wê ye ku mirov fahm bike heya. Ew jîr jî, bi aqil û jîra wê xwe dide der û bi me dide têgihîştin û fahm kirin. Di nav dîrokê de meşin û hanîna wê ye li ser ziman, bi teybetî ku ew hanîna li ser ziman civaktî bê, wê hinek teybetmendiyên wê ku bi serê xwe bi teybet hebin, wê hebin. Weke pêşnûmeyerê ku mirov awayekî jîyanê e ku hatîya jînkirin ji ser re lê meyîzêne û bêne berçavên xwe û di demê de ku bi dem bi dem çî pêşketin û pêşveçûnan dijî ku mirov wan bi dîtîne re li berçav bigirê, wê wilo hestekê bide mirov ku mirov di awayekî herkinî e jîyanê de dijî û dihêne li ser ziman. Civaktî, hanîna wê ye li ser ziman, vê hizre dide me. Li Kurdistanê, ev hizir bi me re çêdibe. Ku mirov li Kurdistanê, dikeve nava dîrokê de û têde têra diçê, mirov rastî pir jîndatiyên ku mirov wan bêne ser ziman dihêt. Di demeka wê ye li ser ziman, bi teybetî ku ew zanîna civakê kir, Demeka dirêj, em tenê bi herêm bi herêm bi mirovên zane ên civakê re rûniştin û me hewl da ku em têgihîştina wan ye demê û bi teybetî jî ya demên buhurtî ji wan fahm bikin. Bi teybetî, di temenê zanîna me ye civakîyê de, ev weke jêdarîyeka me ye bingihîna heya, ku divêt ku em wê bi teybet bînin li ser ziman.

Di Derbarê dîrokê û dîroka civaktiyê de, me bi teybetî civatîn kurdan ji xwe re esas girtin û em bi li wan rûniştinan gihîştina zanîneka pîr berfireh e ku ji dîrokê ne qût. Bi wê re me tişteki dî jî kifş kir. Ew jî, her weha zanîstên kurd ên weke Êlî Herîrî ku hate ku dhê Feqiyê Teyran û Ahmedê xanê û hwd, di derbarê hizrên wan yên ku di derbarê civaktiyê de bi gotinî ku dihatina vegotin jî me hiskirin. Ew jî, ji bo me ne tenê di çerçova mijare me de wê ji me re bina jêdar, ji

xaynî wê jî, wê bi serê xwe bina mijara hine lêkolîna dîrokê bi hizrên wan re. Ev yek, ji bo rohnîkirina dîroka vî gelî, pir hewceyî pê heya. Her zanîst, di dîrokê de ku hatîya, di derbarê civake xwe ya ku têde jîya ya, hizrên wî bûna û hanîya li ser ziman. Lê Zanîstên berî yê demê me, ku berî zayînê ên weke Zerdeşt jî, divêt ku mirov bi teybetî li ser wan bisekinê. Hizrên Zerdeşt, di bûn û pêşketin û pêşveçûna civaktîya demê de bûna xwediyê weyneka dîrokî. Divêt ku em vê yekê jî bibînin û rast û rast bînin ser ziman. Ku civaktî, bi zanebûnê pêş dikeve û demeka zanebûnê ya, di vir de, bi vê xalê re, divêt ku em weyna zanîstên demî ên ku hatîna û çûna jî, ji bîr nekin û bînin ser ziman. Civaka kurd, civaktîya wê hanîna wê ye li ser ziman ye hate vê demê me, wê bi awayekî were ser ziman. Bi awayekî ku serwerî û serdestîya xwe ye giştî windakirina û ji bîrî ve ku serdest û serwerên xwe û herêmên xwe na, wê werina ser ziman. Bi vê yekê re, demên piştî sadsalên 15. min, wê weke mijareka teybet werîna ser ziman. Di vir de, emê di vê beşê de, ji vê demê pêde bi teybetî bînin ser ziman. Pêşketin û pêşveçûnên ku bûna, paşdîroka wan jî, bi wê re emê herîna demên berê ên kevî û ji wan dest pê bikin û bînin ser ziman. ...

...**Sadsalên 15.** min, ku mirov ji wan demeka civakê ye nû li Kurdistanê bide dest pê kirin, wê pir rast û di cihê xwe de bê. Li Kurdistanê, demên pêşketinê ên civakîyê, ji demên piir berî vê dest pê dikin. Ji demê Mîtanî û Gûtîyan dest pê dikin û di hêna hate vê demê. Lê piştî van deman re, her demên wê yê jînkirina, demna teybet ên wê hene. Demên wê yê ku jînbûna, teybetmendiyên wan hene. Mîrov karê wê yekê, bi dîrokê re bêne ser ziman. Piştî demê Gûtîyan re demê Naîrîyan û ku hate ku di hê demê Medîya, her dem, demeka teybet e civakîyê ya. Her demek ji van deman, xwediyê awayê xwe yê civakî ê bi pêşketina wê re ku derketîya holê ya. Mîrov karê wê yekê jî, her weha bi teybetî bêne ser ziman. Demê Medîya, wê weke demeka teybet, ku mirov wê weke demeka hemdem e destpêka demê xwe bêne ser ziman e. Demên piştê ên ku li Kurdistanê jînbûna, demên ku mirov weke pêvajoyên bi demê re ku piştê di hêna jînkirin in. Demê Şadadîyan, Merwenîyan û hwd, mirov karê bêne hate vê demê me ye Kurdistanê, her weha mirov karê wîlo bêne ser ziman. Li ser nîrxên wan demên berê jînbûn bûna. Bi vê yekê re, mirov karê bi teybetî dîroka civakîyê bêne ser ziman.

Lê ku mirov bahse civakîyê kir, mirov dizanê ku mirov bahse demeka biaqil dike. Ku êdî aqil afirî ya. Felsefe, awayê hizra demê civakîyê ya. Mîrov karê wê yekê jî, her weha bi teybet di vir de bêne ser ziman. Pêvajoyên hizir ên bi felsefê re, mirov karê di çerçova heyîn û hebûna civakîyê de bi civaknasîya wê re bêne ser ziman. Felsefe, civaknasîyê ji hîmê bûna xwe re ji civakê dixwezê. Lê bi têgihîştin jî, wê yekê dixwezê. Bi vê yekê re, dîroka civakîyê û ye hizir bi felsefê re, bi hev re di meşin. Herdû, hevdu çêdikin û di deman de di buhurînin. Di vir de, divêt ku mirov wê yekê jî bi teybet bêne ser ziman. Berî zayînê, li ber bahre reş li Gîrekê û Anantolîa, felsefê di sadsalên 7. min pêde, pir mazin bidest pêşketina xwe kir. Ev, di aslê xwe de, bûna şaristanîya civakî bû. Şaristanîya civakî e demê civakîyê, ku mirov wê bêne ser ziman, di vir de, wê demê divêt ku mirov weke pêvajoyeka wê ye giring bêne ser ziman. Ev demê gîrekê û Anantolîa, wê bi hizir û têgihîştina demê civakîyê bidest pêşketina xwe bike. Li ber diclê jî. Di aslê xwe de, pêşketina wê heya. Ji wê pêşketinê, sîd û hînikbûna xwe digirê û di hêna holê. Zanîstên weke Zerdeşt, di awayê têgihîştina xwe de, bi hizra olî yek-xwûdayî, bi ye civakê jî demeka nû ye pêşketinê na. Ol, awayê wê yê pêşketinê e yek-xwûdayî, weke awayê hizir felsefê ye demê civakîyê ya. Yekbûn, civaktî wê di demê xwe de bi awayekî hîyererşîk dixwezê. Ol jî, wê bi xwe re bi wê awayê xwe re wê pêdiviyê bicih bêne. Bi vê yekê û hizrê, ku mirov li Zerdeşt dihizirê, mirov wî û hizre wî bi awayekî hê baştir têdigihê û fahmdike. Mîrov, wê awayê têgihîştina wî ye civakî û civakîyê baş fahmdike. Demê civakîyê, ne weke demê xalkîyê ya. Demê xalkîyê, ji nav xalkbûn û bi wê jînbûn û di wê xwe de xwezabûn heya. Ev xal, di demê xalkîyê de li pêştir in. Lê di demê civakîyê de, ev yek, ne wîlo ya. Bêhtirî, bi pergaltîyê re ew hîyererşîya ku diafirê, wê fahmkirin û wê firehkirin û di wê de pêde çûyin heya. Bi vê yekê re, jêvcudabûna heya. Ew awayê jêvcudabûnê, wê bêhtirî, di demê civakîyê de aqil û bi jîra wê re bike xwedî weyn. Jîr, ji ber vê yekê, aqil ji mirov dixwezê. Aqil, bûna wê, bi jîyane mirov re heya. Ku mirov li dora xwe meyzend, mirov wê dora xwe nas bike. Ew naskirin, wê hizirna mirov re çêbike. Ew çêkirin jî, wê di demê meyzendinê de, ew awayê civakê ê ku me dît, wê bi me re bi dîmen û

wêne bike bi hizir û têgihîştina wê re. Ew aqil e. Ew aqil, tède bîrbûn bûna wê jî jîrê wê bêne holê. Bi wê re, bi jîrê pêşketin wê bibe.

. **Ku mirov** bi awayê êqil, li awayê pêşketina civakê û civaktiyê meyîzêne û bi wê bêne ser ziman, di aslê xwe de mirov wê bi rastiyekê rastiyeka dîrokî bêne ser ziman. Emê di vir de, di berdewame hanîfîya xwe ye li ser ziman de, bi awayê hizir re awayê civakê ê ku pêşketîya ji awayê hizrên ku derketina derketina holê hewl bidin ku fahm bikin. Li ber diclê, ku mirov diçê Cîzîra bota, ku li wir Nebî Nuh razahîya, li ser navê wî gotinek dihê ser ziman. Dihê gotin, ku deme ku Nebî Nuh hate ber dawîya jîyane xwe û keta berzikratan de, ji zaroyên xwe yên ku li dora wî rûniştina û li ber serê wî na, ji wan dibêje ku "êdî deme aqil hatîya, xwûdê aqil çêkir û bi êqil, mirov ji jîyane hovtîyê derxist û kira rîyeka aqilîyê de ku tède herê û êdî bi wê jî". Bi vê gotinê re, hin gotinên din jî dihêne ser ziman. Dihê vebêjin ku wî gotîya ku "mirov wê bêqil êdî xwe û dora xwe nas bike". Di berdewame wê de ji dihê gotin ku wî gotîya ku "ji bo ku fêr û sûd ji tûfanê were derxistin, û xîrabîyan êdî mirov nekê aqil, wê pêşavanîyeka wî bike". Her weha êdî di berdewame wê de pir hatînen li ser ziman dibin û dihên ser ziman. Di aslê xwe de, ew vegotinên ku dihêne ser ziman û me ji nav xalkê li wan hisand, di derbarê pêşketina civakê û aqil û deme wê de, hinekî me bi têgihîştin dike. Di vir de, aqil, weke destpêkeka nû ye jîyanê dihê ser ziman. Li ber diclê, ev destpêk jî, Nebî Nuh, weke destpêka wê ye di dîrokê de dihê ser ziman. Bi vê yekê re, dihê vegotin ku Nebî Nuh temenkî pir demdirêj jîya ya. Ev hemû, bi hev re dihêne vegotin. Di wan vebêjînen hizrî de, awayekî hizrî û bi êqil ku dihê ser ziman, mirov dibîne. Mirov divêt ku wê jî bêne ser ziman. Di vir de, fahmkirina wê, wê di têgihîştina demên berê de di derbarê awayê pêşketinê de jî wê hizrîna bide me. Awayê pêşketinê ê li ber diclê, di aslê xwe de bi teybetmendîyên xwe re hinekî cudatîyên wê ji yên herêmên dora xwe heya. Ji ber vê yekê, mirov divêt ku bi teybet li ser vê xalê bisekinê, da qana mirov wê awayê wê yê pêşketinê jî fahm bike û tê bigihê.

Bi serekê, ew awayê vegotinê ê ku bi Nebî Nuh re dihê vegotin, ji wê, awayekî pêşketinê ê civakî ku di çerçova hiyererşiyekê de dihê ser ziman, mirov wê kifş dike û dibîne. Di vir de, ew awayê civakê, ji serî di aste bilind de, navê Xwûdê hatîya bicih kirin. Li bin re, bawermendên ku wê hizir û peyemên wî bigihênine mirovan, ku ji devê Nebî Nuh dihê vegotin ku ew dibêje ku "êdî wê her demeke ku pêdîvî pê hebe, wê pêxember werîna ser rûyê dinyê û wê bi peyemên ku bi wan re na, wê rê şanî mirov bidin." Di bin wan re jî, bawermendên ku wê di rîya wan de bimeşin in. Di bin wan bawermendan de jî, rêveberên mazin ên mîr û key hene. Bin wan re jî, ên ku di nav civakê de ku wê civak di nav xwe de hertimî li gotina wan bihisêne û ewê weke pêşavan û hin serekna jî bin, mirovên kal û pîr wê heyîna wan hebe û li pêş bê. Cihên wan jî, ên ku wê mirov li dora wan rûnihin jî Civat in. Li civatan, ew rûnihin û hizrên xwe bînan li ser ziman. Wê li wan bê hisandin. "Wê gotina wan, ti carî li ardê newê xistin". Wê hertimî bi gotina wan gav bê avêtin û li wan bê hisandin. Di malê de jî, mirovên pîr û kal hene. Ew, wê yên malê ku hertimî di malê de li wan bînan hisandin bin. Bi vê yekê re, bahse wan dihê kirin. Di nav xalkê de jî, mirovên ku wê derkevina pêş wê hebin. Ew jî wê bi zanebûna xwe derkevina pêş. Di nav kurdan de, hate nahaka di derbarê wê derketina mirovan de du bawerî hebûn. Yek, ku mirovên ku wê bi zanebûna derketiban pêş, ew yek ji xwûna wan dihate zanîn bûn. Yê din jî, ew jî, ên ku ne dîrî wan bûn û ên ku "jîr" bûn. Ji ber vê yekê, di nav xalkê de dihate vegotin ku "mirovên jîr di hêka xwe de kifş e". Bi vê yekê re, her weha ew yek dihate ser ziman. Di deme ku ew awa û hayînen mirovan bi teybet dihatina ser ziman, Di çerçova hiyererşiyekê de dihatina ser ziman. Ew hiyererşî, di aslê xwe de bi zanebûn, ji heyîna Xwûdê dihate destpêkirin, hate ku dihat û digihîştina mirov xwe jî. Her weha mirov, ku li awayê hizirkirinê dimeyîzêne mirov vê yekê dibîne. Di aslê xwe de, xûyên kevneşopî û hûnerî, di vir de, divêt ku mirov heyîn û hebûna wan bi bir bixe. Ji ber ku ew jî, di vir de girîngiyek wê bi wan were ser ziman. Di deme hanîna li ser ziman de, di vir de, ew kevneşopîyên xalkî jî, dihatina berçav. Kî karîbû, pir baş li gor wan bizanebûn bijîyane û bi hanîyane ser ziman, wê ew mirov bûba yê bizane ê ku jîr û ew wilo bihate zanîn jî di nav xalkî de. Wê di nav xalkê de bahse wî jî bi zanebûna bihate kirin.

Bi vê yekê, awayê civakê ê pêşketina wê ê ku hebû, di deman de, di awayê pêşketina xwe de pir mazin guharandina bi awayekî pêşveçûnê ê peresendinê dide kirin. Ev yek û pêşketin, deme ku mirov hewl bide ku wê fahm bike, mirov wê li ser xateka jîrî re ku weke ku li ser avê re qavzên xwe biavêje û bimeşê, wê li ser re herê û wê bêne ser ziman. Ew awayê jîrî, deme ku hate deme Birehîm Xelîl, êdî di awayê kevneşopîyê de ku jîrîyeka xwe dide çêkirin, li ser re dimeşê û dihê ser ziman. Wê Birehîm Xelîl, rastûrast, di kevneşopîyê de bimeşê û wê bi têgihîştinekê bêne ser ziman. Wêneyekê jîyanî, di serê wî de heya. Ew li wêne di serê xwe de dimeyîzêne û heyîn û hebûna xwûdê ku bi hizir re li ser wê heyînê re bi heyîn heya, wê dibîne û dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, di bawerîya xwe de safî ya. Wilo dihêne ser ziman. Lê awayê hizirkirinê na wî, ji ye demên berî wî cuda ya. Awayê hizirkirina wî, ku kiresekî hizirê lê hatîya kirin bi kevneşopî xalkî ya. Ew, bi hizir dimeyîzêne. Bi hizir, karê kevîran jî li ber nerîna xwe ye ku bi heyîna xwûdê re dihêne ser ziman bihalên û an jî bide halandin. Hate wê demê, hêkeltî heya. Li pêş e. Lê ew, bi têgihîştina xwe re derdikeve ser wê têgihîştina ku bi hêkelan re dihê ser ziman. Di wê de, ew kur e. Mirov kavê vê yekê ji bi wî bi êmin bêne ser ziman. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku ew li pêşîya deme xwe ya bi têgihîştina di serê xwe de.

Bi hizir û bawerîya Birehîm Xelîl re, pergalbûna civakî e ku afirîya bi kevneşopîyêkê jîre wê dihê holê. Li ser wê jîre wê re, hiyererşîyeka civakî wê were ser ziman. Bi wê hiyererşîyê re, wê heyîna mirov wê were ser ziman. Birehîm Xelîl, wê fêrî mirov bike ku di wê pergaliyê de li gor wê kevneşopî ku çawa divêt ku bijîn bi bawerî û bi teybetî jî bawerîya xwe bi xwûdê bênin. Deme êqil e ku pêşketîya, hizre wê demê ye olî her weha dihê afirandin. Ew, hizre wê ye demê diafirîne. Mirov divêt û vê yekê bêne ser ziman.

Bi vê awayê pêşketinê re, mirov awayekî pêşketinê e çand û hizir û pêşketine li ber diclê û firatê kifş dike- Dem bi dem, bi pêşketine demî re derketina pêşî û ser pêşketina deme berî xwe re, dihê berçav û mirov wê kifş dike. Ev awa, weke awayekî xwenûkirinî ê kevneşopî ya. Mirov wê wilo dibîne û fahm dike. Mirov karê wê awayê pêşketinê, weke awayekî kevneşopîyê ê pêşketinê ku bi awayê xwenûkirinî dihê holê jî, bêne ser ziman. Ji deme Nebî Nuh hate ku dihê deme Birehîm Xelîl, dihê vegotin gotin 12 bavik û an jî bi navekî dîn jî nifş buhurîna. Her demek jî wan deman, pêxemberekî wê heya. Wilo jî, dihê ser ziman. Bi wan pêxemberan xwe buhurandin, dihê ser ziman. Bi vê yekê re, pêxembertî, weke çandeka wê kevneşopîya li ber diclê, piştî Nebî Nuh re dihê holê û ser ziman.

Di awaê pêşketina civakî de, peresendin heya. Ji deme xalkîtiyê buhurîna deme civakîtiyê, wê bi awayekî persendinê bibe. Wê deme xalkîtiyê, pir dirêj û tîra xwe were jîn kirin. Wê ew deme xalkîtiyê, pir baş û kur were jîn kirin. Wê, dem bi dem, bi awayê peresendinê jî wê buhurîn bibe. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku li ber Diclê û firatê, ew dem hemû bi heyînî hatîna jînkirin. Bi wê jînkirinê re, hînbûnek bûya. Ew hînbûn, deme ku mirov hewl bide ku wê fahm bike, mirov wê jî awayê jîyane wê bi kevneşopîyên wê re wê fahm bike û bêne ser ziman. Demên pêşketinê, hate ku dihêne deme Medîya, wê her weha bi kevneşopî bijî. Li vir, emê bi Medîya re hinekî dijî di şîrove û dahûrkirina xwe de kur herîn û bênine ser ziman, ji beşa yekemîn zêdetir. Me di beşa yekemîn de, hanîna ser ziman ku Medîya xwedîya awayekî çawa ê pêşketinê û civaktiyê bû. Lê Medîya, di vir de di çerçova wê xale ku me hanî ser ziman de, bi awayekî xwe ye cuda jî dihê holê li ser berçav. Hate wê, ku bi kevneşopî bi rê ve çûyin bûya, wê ji wê demê pêde, awayekî pêşketinê ê nû were holê û di jîyanê de serwer bibe. Di aslê xwe de, ev awayê ku dihê holê, wê hin nakokîyan di nav Medîyan bi xwe re de jî bide çêkirin. Awayê hizirî derketîya pêş. Lê kevneşopî, hate wê demê hatîya jînkirin û pir nivîsar û dem û her weha pêvajoyên wê yên ku jînbûna û hatîna jînkirin hene. Ew awayê hizrê, wê di rêveberîyê de û her weha di awayê pêşketinê de wê bi kevneşopîyê de weke ku ne levkirinekê bêne holê, wê were berçav. Bi awayê hizir ku di welatîtiya pêşî ya Medîya ya, ye ku hatîya avakirin. Medîya, di aslê xwe de di awayê civakiyê û pêşketinê û pergaliya wê de, hewldaniyeka ku pê xwestina derketina dervî hîn kevneşopîna heya. Bi hizir, li ser lingan e. Dem, pêşketina wê û awayê ye pêşketin, wê ji wê pêşketinê re ku wê li ser lingan bihêle, ma wê tîrê bike? Ew, wê di demeka nêz de were ditin. Medîya, Bi awayê xwe re, bi rêveberîya xwe re demeka pirr dirêj li ser lingan namêne. Wê di

deme Medîya, de bi vê yekê re awayê civakê ê pergali ji nû ve were holê. Wê tîrtî û tîrtîya wê, wê bi pêşketina hizir re wê pişt wê re bê jînkirin. Medîya, bi awayê pêşketina xwe re, ji demên felsefê ên ber bahre reş re jî, hîm e. Mirov, vê yekê dibîne. Ji vê yekê, emê gav biavêjin û awayê civakê bi pergali û pêşveçûnên wê yên bi demê re bînin ser ziman. Emê, hê pêde herin bi vê yekê. ..

Ji deme Birehîm Xelîl hatin û gihîştina deme Medîya, hate wê demê wê tîrtî û tîrtîyekê di hizir de bide çêkirin. Li ser hizir re, wê afirandinê dîdî bî holê. Hate ku dem di hê deme Medîya, li ber diclê û firatê, di piertûkxaneyên mazin de levgihiştin hizir dibê. Pir mazin nivîsandin heya. Di deme Medîya de, bi teybetî, divêt ku mirov bêje ku ji ye herderî zêdetir lê pirtûk û nivîsarên ku hatina nivîsandin hene. Ew nivîs û nivîsaran, aqilê mirov in. Wekî din jî aqilê mirov, ji wê ast û rada wê ye ku heya jî derdixe ast û radayeka dîm ye hê bilindtir. Ev yek jî, her weha mirov karê wê bîne ser ziman.

Deme Medîya, di aslê xwe de di awayê pêşketina xwe de û awayê wê yê pêşketina civakî a bi astî de di ast û radayeka mazin de ya. Medîya, pergale wê ye civakî ya. Ji aliyê olî ve jî, mirov karê wê wilo bîne ser ziman. Bi nivîsandinê, bi tîgihîştin yekbûnek û an jî yekkirinê dibê û di hê kirin. Medî, vê yekê dikin. Ji hizrên Zerdeşt, mirov karê wê yekê pir baş fahm bike û bîne ser ziman. Zerdeşt, deme ku di hêne ser ziman, awayekî olî e yek-.xwûdayî di hêne ser ziman. Awayê olî ê ku Zerdeşt di hêna xwe ye li ser ziman de di hêne ser zimên, mirov ku lê dinerê, mirov bi awayekî pergali wê yekbûna wê dibîne. Di serî de di tîgihîştinê de yekbûn û yekirin afirîya. Di vir de, deme ku me bahse yekbûnê di tîgihîştinê kir, divêt ku mirov hinekî bi zanebûnî ku li ser zmên re bi wate û lêkerkirinên ku lê bêje di hate kirin bi awayê wê re hinekî dahûr bike û wê bi şîrove bîne ser ziman. Di vir de, pêdivî bi vê yekê di vir de heya. Mirov, deme ku dike ku wê tîgihîştinê wê yekbûna di wê de bîne ser ziman, mirov wê pêdivîyê pir zelal û qanc hîs dike.

Ziman, di aslê xwe de, di vir de mirov divêt ku ji du aliyan ve bi gotinekê jî bî, bahsê bike. Ji aliyê tîgihîştinê ve û wê hayîna wê pêşketinî ve bike, ku ji wê awayê civakê bi pergali di hê holê û diafirê. Ziman, temenê wê afirandin û pergaliyê wê ye bi demê re ya. Heyîna ziman, di vir de divêt ku mirov bêje ku ji ye ku em dizanîn bêhtir ji wate û girîngîya wê ye di vir de di vê xalê de heya. Ziman, heyîna wê heyîna şaristanî ya. Ziman, di pêşketina wê de beremberî heyîn û hebûna civakîyê bi rê ve diçêt. Mirov di vir de, vê yekê re dibîne. Di deme Medîya de, ev yek, di hê holê. Ziman, di axiftina wê de, pir li ser sekin in heya. Weke ku hate roje me jî di nav kurdan hatîya gotin û hatîya, ku kurd di civatên xwe de li hevdu dirûniştin ji hev re digotin ” ku bi zanebûn gotinekên xwe bîne ser ziman û bîaqil bêje”. Ev gotin, ji gotin û wate ku di hanîna me ye li ser ziman ku lê hatîya kirin zêdetir, wate û lêkerkirinek lê di hate kirin. Hate î ro jî, ku di civatên xwe de kurd lev dirûnihin, di deme axiftinê de pêşî li gotinên hevdu bi pîr bi bal li hevdu bi bey dibin. Di gotinê de zanebûn û levhanîn, lê tî lêgerîn. Ji vê awayê gotinê û kirin û tevgerên wan yên civatên wan de, mirov fahm dike ku di civatîya xwe ye civakî de di asteka bilind de bûna. Mirov, vê yekê, ji van kirin û hewldanên wan dibîne. Di demên wan yên berê de, di civatên xwe de ku li hevdu dirûniştin, wê jevre pir baş levbînin û bînin ser ziman. Mirovên ku di wan civatên wan de di wê levaniyê de hosta û bihûner bûn hebûn. Ew mirovna ku mirov karê wan weke rewsenber û nivîsvanên wan deman yên civatan ên ”bênav” bîne ser ziman. Bînavbûn, ji ber ku ew wan çî di wan civatan de bihate ser ziman, wê ji wan bi navê civatê di nav xalkê de belav bûna. Wê cih bigirta. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku di deme Medîya de di civatên wan de jî ev yek hebû. Wan, hizrên xwe pir baş levdikirin û dihanîna ser ziman û ji demê di buhurandina demê. Di vir de, ji ser hizir de ku mirov heyîna ciakîyê û pêşketina wê û awayê jê fahm bike, di wê demê de ji du awayan mirov wê wê yekê fahm bike. Ye pêşî, ku weke nivîsareka wê demê î ro hinek jî bî, ku di destê me de ya hizrên Zerdeşt in. Ya din jî, ji wê awayê olî yê ku hatîya jin kirin mirov karê wê bîne ser ziman. Wê jî, bi du awayan mirov karê wê bîne ser ziman. Aliyekî wê, bi wê demê re, bi parastgah û her weh awayê wê demê ê parastgahên êgir in. Ku weke ku li Rojhilatê kurdistanê hene, mînaq weke parastgaha ”Banû” hwd. Her weha ji wê demê, gelek parastgahên wîlo ên ku mana hene. Lê ew, awayê bi parastgahê re bi vê yekê re di hê ser ziman, yê berî wê deme ya. Mirov divêt ku vê yekê jî bîne ser ziman. Di wê demê de, ev awa, li ber guharîna ya. Di deme

Medîya de, pergali olî e Êzîdîtiyê heya. Ew pergal, bi awayê oleka yek-xwûdayî û gelemperî û pir mazin dihê holê û ser ziman. Pergale Medîya, ew diafirêne. Di wê demê de, Derketina Zerdeşt, wê di awayê wê pergalê de, weke hewldaneka guharîne ye ji binî bê. Lê wê ew hewldana wî, ne di deme wî de, wê di demên pişt wî re de wê hin bi hin vê yekê bide nîşandin. Di aslê xwe de, Zerdeşt, wê têgihîştina Xwûdê ya yek-xwûdayî ku heya, wê bi felsefîk, hewl bide ku wê bi felsefe bike. Di aslê xwe de dike jî. Lê ew, heyîneka ku afirîya e di nav xalkê de bi vê yekê bi hizre xwe re dihêne ser ziman. Lê ew dervî rêveberiyê diaxivê. Ji ber vê yekê, ew rastî bertekna jî tê. Ji ber vê yekê, êdî weke demeke bazdî herême Hîndîstanê û wan deran dike û li wan deran hizrên xwe dihêne ser ziman û ji xwe re alîgiran diafirêne.

Ev kirina Zerdeşt, wê tişteki bi têgihîştin bi me bide fahmkirin. Ew jî, her weha heyîn û bûna asteka nû ye civakîyê ye ku pêşketîya. Gelemperbûn, di aslê xwe de, bi wê yekê re Zerdeşt, wê di denezêne. Di deme Sumerîyan de, ew gelemperbûna di têgihîştina olî û bi wê re jî di rêveberî yê de ku piştê wê di deme Aqadîyan de ji keyên weke Key Sargon re bibe hîm ku herême bigiştî bike bin serdestî û serdestîya xwe de bi desthilatdariya xwe û piştê hewl bide ku berê xwe bide anatolfa û wir jî bike bin destê xwe de, wê heman awayê wê carê vêca wê di heyîn û hebûna civakîtiyê de bi têgihîştina wê re were holê. Zerdeşt, weke ku wê zanistîtiya vê yekê jî wê bike. Di têgihîştina wî ye ku hate roje me hatîya û di roje me de hê jî, ew baş û qanc ne hatîya fahmkirin, wê ew awayê pêşketinê were holê û ser ziman. Zerdeşt, di aslê xwe de, bixwe jî, di parastgahekê de mazin bûya û bi zanebûna xwe re wî xwe pir baş bizanebûn kirîya. Ji temen, bi vê yekê, mirov karê bêje ku wî xwe mazin kirîya bi zanebûnê.

Di awayê hizre wî de, awayekî civakî heya. Di deme wî de Medîya, ji xwe hemdemîyeka deme xwe dijî. Ew di wê hemdemîyê de nûjeniyekê dihêne holê û ser ziman. Hizre wî û têgihîştina wî, di vê xalê de bi vê yekê re û bi vê awayê re mirov wê baştir wê fahm bike. Zerdeşt, hizre wî ye civakî, ku mirov lê dihizirê, mirov dibîne ku ew hizre wî, hinekî geliyê di xwe de derdixe pêş. Ew dike û dixwezê ku wê, hizre xwe bi wê awayê di olê de jî bicih bike. Lê kevneşopîya rêveberiyê ye di nav xalkê de ye olî ye ku afirîya, li ber wê ya. Ew divêt ku ji wê bi buhurê. Di deme ku ew ji wê buhurtê de jî, wê hingî, xwenûkirinek ji were holê û bibe di nav xalkê de bi rêveberiyê re di kevneşopîya wê de. Ew jî, di aslê xwe de vê yekê dibîne. Wê jî, dihêne ser ziman. Mirovên zane û aqildanê, wê hizre wî yên ku dibî in jî hene. Lê yên ku li ber dirabin ji hene. Yên ku li ber dirabin, bi teybetî, yên ku di wê kevneşopîyê de pir mazin bi kevneşopî bicih in. Yên ku di wê kevneşopîyê de bi statûqû û ast in. Zerdeşt, bi şaxsiyeta ji wan na buhurê. Lê bi têgihîştina xwe re ji wan di buhurê.

Di civak, di aslê xwe de ew deme wê demê, di wê asta ku gihiştîyê de, bi êqil bi rê ve diçêt. Kevneşopî, jîr û aqilê wê yê herî pêşketî û bi pergal e. Di aslê xwe de, pergaltîya civakîyê jî, li ser wê re dihê holê û diafirê. Di vê yekê de, astek heya. Ew ast, bi aqil heya. Zerdeşt wê, dibîne. Di wê ast û kevneşopîyê de û pergaltîya wê de, wê di deme civakîyê de xwenûkirina wê dem bi dem çawa bibe û were holê, awayekî wê dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, ew di hanîna xwe ye li ser ziman de, pêşî, wê awayê civakê ê ku afirîya û heya dibîne û fahm dike, Piştê, ew li ser wê awayê re ku wê awayê baş li gor wî hizre wî çawa bê, wê bi pêşnûma dike û dihêne ser ziman di hizre xwe de. Bi vê yekê re, ew di hizre xwe de dibê xwedîyê pêşnûmeyeka civakê ye awayê jîyane wê ku wê bi wê re çawa bijî jî. Bi vê yekê, ew bi ser ve diçêt. Bi ser ve çûna wî, di vir de bi aqil dibê. Aqilê ku ew dihêne holê jî, biastî û têgihîştinî, xwedîyê radayeka xwe ye pir mazin ye afirîya. Zerdeşt, tişteki di jî, dide berçav û dihêne holê. Ew, hizir û awayê jîyanê ê ku berî wî hatîya jînkirin, karîna sentezkirina wê dihêne û didêne holê. Bi vê yekê re, ew xwedîyê sîyanekê ya. Bi vê yekê re, mirov divêt ku ew awayê civakê, ê ku wî jê sût û fêr girtîya û yê ku ew didêne holê jî, mirov wan bi hev re bêne ser ziman. Ji vir pêde, em bi serekê wê bînina ser ziman.

Hate ku dem dihê deme Medîya, hinek demne pêşketinê ên ku mirov wan bi teybet bêne ser ziman hene. Berî hingî, bi çend, gotinan ji bê, hate k mirov were vê demê, mirov divêt ku li ser wan deman ji bi çend gotinan bêne ser ziman. Bi teybetî, deme Mîtanîyan û deme Gûtîyan, demne ku piştî demên Sumerîyan re ên ku mirov wan bi teybet bi awayê civakê û pêşketine wê re bêne ser ziman in. Deme Gûtîyan, demeka ku mirov bi teybet li ser bisekinê ya. Deme Gûtîyan,

demeke ku mirov wê ji hinek aliyên pêşketinê ve bêne ser ziman. Di awayê pêşketine wê de awayekî çawa hebbû, ku mirov wê fahm bike û bi wê fahm kirinê re bi vir de bi ber deme me ve were, mirov wê hingî, baştir, wê deme Mediya fahm bike. Mirov wê çekir, wê pêşketine wê ye ku di demeka kin de pir mazin bi awayekî pêşketî xwe da der, mirov wê fahm bike. Bi teybetî, ji awayê hizirkirina wan, emê bi dest hanîna li ser ziman bikin. Bi wê yekê re, emê temenê wê deme Mediya û bi teybetî jî, pêşketine ku Zerdest bi xwe re hanîya ser ziman, mirov wê edî wê baştir fahm bike. Li ser çoi temenî û wî xwest diî nav awayekî pêşketî ê çawa de hizre xwe bêne ser ziman, mirov wê hingî wê baştir fahm bike.

Deme Gûtîyan, ji aliyê hizir ve xwediyê awayekî pêşketî bû. Di deme wan de, awayekî pêşketinê ku ew bi kevneşopî bi pê dijîn hebû. Ew awayê pêşketinê ê ku hebû, xwediyê pergaliyeka giştî ye ku herkesek bi wê ve girêdayî li gor wî dijî bû. Pergale hizrî e Gûtîyan, temenê wê, bi hizir awa bû. Gûtîyan, di hizir de fêrkiribû ku bi hev ve girêbidin. Ev, weke xosletekî pêşketine wan ye bi wan re jî dihê holê ku mirov wê bi teybet bêne ser ziman. Ji xwe piştî ku nivîsandin diafirê û pêş dikeve, edî pêşiya pêşketinê nayê girtin. Dem bi dem, pêşketin bi ast bi ast bi pêş ve diçêt. Awayê hizirkirinê û hizrên ku bi hizirkirinê hatina holê, dihêne qeydkirîn. Li gor wan hizirkirin dihê holê. Li gor hizir hizirîn, wê baweriyê jî, bi hizir bitêgihîştin bike û di jîyanê de bi pergali bide rûnandin. Li gor hizir hizirîn, wê demeke nû bê. Ji deme Sumerîyan ve kêvalbar dihêne nivîsand in. Li ser wan kêvalbaran jîyan û jîyangerîya mirovên serwer ên key û xwedî wesif dihê nivîsandin. Bi wê re, wê ew ji demê bi buhurîna demê. Bi vê re, wê demeke nû bi afirê. Deme nivîsandinê, di aslê xwe de ku bi nivîsandinê re bi qasî wê tevgerîya peresandinê ye di nav wê de wilqasî jî, kevneşopiyeka hizir e ku jê statûqû diafirê dihê holê. Ev jî, bi nivîsandinê di jîyanê de bicih dibê. Piştî deme Sumerîyan ye duyemin re deme Urîyan û hate ku dihê deme Mîtanîyan, mirov wê bi xanadanî wê statûqûtiyê kifş bike. Di hizir de, dubara kirin, çend ku dihê kirin, wê mejî, di xwe de di deme her dubarakirinê de û hanîna li ser ziman de nirxeke nû li gor demê biafirîne. Bi demê re û herîkîna wê re ew dubarabûn, wê bê ne dubarabûn. Bi vê yekê re, awayekî di têgihîştinê de ku diharikê heya. Gotin, weke xwe mayîna wan, wê tenê statûqûperezîyêkê bi wan re bi afirêne û wan bixwe jî, li ber wê pêşketina bi hizirkirinê re ye bi demê re ku bi wê bixwe re jî bûya, wê li pêşiya wê bide afirandin. Bi vê yekê re, bi pergaliya welatîtiyê re şerê gotin û têgihîştinê di demê de dibê û dibuhurê demên piştî jî. Di vir de, konsatrabûna rewşên bi bêjeyan re, dahûrkirina wan, divêt ku mirov bi dahûrîya zimên ye li ser gotinên wê re bike û bêne ser ziman. Wê ev yek, bitêgihîştin me bigihêne rastiyeka têgihîştinî ye hizrî ..

Deme Gûtîyan, ku hate ku dem dihê wê demê, wê cudabûnak di awayê pêşketina wan de hebe. Mirov divêt ku vê yekê kifş bike. Weke ku têgihîştineka gotinan bi wan re hebe, tevdiqerihîn. Mirov wê bi wan re kifş dike. Li ser gotinê re di herikîn bi demê re, lê bi têgihîştinê re tevdiqerihîn. Mirov, vê yekê jî bi wan re kifş dike. Ji xaynî vê jî, mirov heyîneka hizrî e ku wan bi pergali kirîya û bi wê re bi demê re bi kevneşopî kirin û pê dijîn mirov kifş dike. Ew, dageriyên wan yên hizrî pir hene. Ku di deme wan û Mîtanîyan de, weke oleka yek-xwûdayî li dora Nisêbîn û Cîzira roje me dihê jînkirin Şahmaran heya. Şahmaran, ji vegotinekê zêdetir, xwediyê heyîneka dîrokî ye ku pir afirandîya. Mirov, vê yekê jî bi wan re kifş dike. Vegotina Şahmaran, têde hizir, bi kevneşopî hatibû vegotinî kirin. Şahmaran, awayekî hizrî jî ya. Mirov, nikarê tenê wê weke vegotinekê bêne ser ziman. Ew, pergeleka jîyanê jî, ku wê jîyan dixamiland tê hebû. Tevger û xûyên mirov, di wê de bi qancî û başî û nebaşî hatina kifşkirin. Mirov, karê bêje ku Şahmaran, vegotineka ku ji du aliyên ve mirov divêt ku wê werêne ser ziman e. Aliyek, her weha, weke ku me li jor hanî li ser ziman e, ku weke oleka yek-xwûdayî ya. Aliyê din jî, her weha weke awayekî jîyanê ê ku di xwe de dihêne holê û ser ziman, felsefeye civaktiyê ye ku ji deme xalkîtiyê buhurîna wê ye li deme civakîyê dibe dihêne ser ziman. Ev jî, awayekî pêşketinê ê ku bi wê re dihê ser ziman e. Di deme Gûtîyan de, mirov wê awayê pêşketinê bi pergali bi baweriyeka li jîyanê ku bi kevneşopî mirov dibîne. Di awayê civakê ê Deme Gûtîyan de, mirov wê ji wê awayê vegotina Şahmaran fahm dike ku cihê jinê jî çawa ya di nav civake ku bi pêşkeve de. Di aslê xwe de Şahmaran, lêgerîneka dîrokî ya li asil û mafê xwe lêgerînê ye jinê ya. Ku hate roje me jî dihê,

cihê jinê bikeveşopî di nav civakê de di civatên wan de hatîya kifşkirin. Jin, hate sadsale berî sadsale me jî, karîya ku di nav civatê de bi mêran re rûnihê û hizre bêne ser ziman.

Dema Gûtîyan, demek civakî ya ku li ser têgihîştinê re di civatan de bi pêş ve diçê ya. Mirov, divêt ku wê yekê bi teybet bêne ser ziman. Di wê demê de, têgihîştin pir mazin derdikeve pêş. Di civatan de, vegotin û hizrên ku dihêne ser ziman, wê di deme kin de pir zû di nav xalkê de belav bibin. Ew zû belavbûn û bûna malê girseyên mazin ên komî, wê heyîna civakîyê bêne holê. Bi demê re, wê kevneşopîya wê jî bi afirê. Piştê hate ku dem dihê deme Zerdeşt, wê Zerdeşt li ser wan kevneşopîyên ku bi wê re bi wê awayê afirîna li ser wan re, wê hizre xwe bide afirandin û avakirin. Ew, di deme xwe de ast û pêvajoyeka nû ye civakîyê ye ku piştî wê demê (dema Gûtîyan) re, ku li ser pêşketina wê demê re diafirê dihêne ser ziman. Ew bi wê yekê re, di aslê xwe de, bi têgihîştin li pêşîya deme xwe ya. Bi wê re, hizrên ku ew dihêne ser ziman, mirov karê bêje ku di nav xalkê de pejirandina wan heya. Lê ne li gor kevneşopîya rêveberîya demê na. Bi wê yekê re, wê li ber wê sekn ji bibe. Bi wê re, ew wê ji herêmê herê herêmekê dîn û hizra xwe bêne ser ziman. Berî Zerdeşt, zanistên weke wî hene. Lê ew zanist, zanistên civatana û navê wan di civatan de bi zanebûna wan re heya. Ew, pişt xwe re hizrên wan çend ku dimênin jî li holê, lê navê wan bixwe jî na mênê. Bi wê yekê re, mirov karê wan bi rêz bi bîr bêne û bêje ku ew zanistna pir mazin ên bênav bûna di demên pişt xwe re. Zerdeşt, wê asteka pergali ku li ye deme berî xwe re ye, wê bi biafirîne. Bi wê re, wê awayekî pergale ê ku bi hizir hatîya şîştin û ku mirov êdî bi hizir mazin dihizirê dihê holê. Zerdeşt di aslê xwe de zanistê wê demê û astê ye deme xwe ya.

Awayê civakîyê ê di serê wî û hizre wî de, di hemdemîya deme xwe de xwediyê nûjenîyeka demî ya. Wê demên piştî wî re, wê ew hizrên wî çend ku ne li rêveberîyê jî bin bi tememî, wê bêne jîyin. Deme Sasanîyan, wê aqildan kurd bin. An jî, yên ku di parastgihên ku bi hizrên wî mazin bûna bin. Piştî wî re, wê rêveberîya Sasanîyan hizrên wî ji ber ku di nav xalkê kurd de û pers de jî ku pir kur bi kevneşopî bicih bûya û ji wan jî buhurtîya û li herêmê bi giştî bi cih bûya, wê nikaribe li ber bisekinê. Lê wê, ne li hasabê wê jî bê. Bi wê yekê re, di demê de, wê hin guharandina ji, li gor awayê rêveberîyê û rêveberbirinê wê bidina kirin. Lê di nav xalkê de, wê hizrên wî awayên xwe bi parêzên. Piştî Zerdeşt re Manî, di vir de divêt ku mirov bi gotinekê jî bê bahse wî bi rêz bike. Ew, di aslê xwe de wê zanist û bawermendekî safî û xas ê wê hizre wî ye ku wî hanîya li ser ziman bê. Rêveberîya Sasanîyan, çiqasî karîya Manî herê bike û hizrê wî bi qurpênê, wê wilqasî jî karibê Zerdeşt herê bike.

Bi demê re hatin û gihiştina dema Manî û Manî bi kevneşopîyê re.

Manî, wê hizre Zerdeşt wê nûjenîya wê ye tede ji hinek aliya ve kifş bike. Ew wê, bike ku wê di deme de bide fahmkirin. Hizrên Manî, wê ne tenê giring bin ji bo fahmkirina têgihîştina wî, wê her weha giringîyeka wan ye ji bo fahmkirina wê awayê têgihîştina civakî ê ku bikeve jîyanê de jî giring bin. Bi wê re, wê Zerdeşt aliyên nûjenîya têgihîştina Zerdeşt, wê xwe bi wî re û bi wê hanîniya wî ye li ser ziman re bînina holê. Bi wê yekê re wê Manî, ji aliyekî ve awayê civakîya ku bi têgihîştin di hizrên Zerdeşt de dihêne ser ziman de jî, wê bide nîşandin. Bi wê yekê re, giringîyeka wî ye di jî heya. Felsefe Manî, ji aliyê ve ye olî ve dihêne ser ziman. Awayekî olî ê nûjen di deme xwe de jî didina nîşandin. Hate wê demê, parastgahên di nav xalkê de ên ku bi agir in, wê bi Manî re awayekî di bistênin. Ew awayê wan ye bergirinê, wê piştê ji dêr û awayê bergirina filehan re jî bibe minaq, ku ew wê bi awayekî weke wî awayî ku fêr dibin, wê bergên xwe bikin. Mirovên weke Agostînos û Paulus wê herna nav wan, û wê ji wan pirr tiştan fêr bibin. Ew awayê civakîyê ê ku mirov fahm bike ê li gor wê demê pir li pêş e, ew awayê parastgah û cihên bergirinê ên ku bawermendên Manî diafirênin, ê wê deme civakîyê ya.

Li vir, em karin hinekî awayê pêşketin û têgihîştina Manî bînina li ser ziman. Di aslê xwe de divêt ku jî were ser ziman. Ji ber ku Manî, awayekî wê têgihîştina ku Zerdeşt hanî ser ziman e. Heyn û hebûna Manî, di aslê xwe de bi wê têgihîştinê û ketina wê ye bi di jîyanê de re dihê ser ziman. Mirov, wê yekê deme ku li wê pêşketina wî dimeyîzêne, pirr baş û qanc fahm dike. Manî, nêzîkatîya wê ye li kevneşopîyê ne li dervî ya. Lê li dervî demê ya. Ji ye demê di buhuerê. Manî,

Baxtê wî dibê weke yê Zerdeşt bixwe jî. Ew jî, tişte ku dihê ser Zerdeşt dihê serê wî jî. Ew jî, ji ber hanînen bi ser wî de, ji neçarî ji herême xwe diravê û diçê herêmên Hindîstan û Hin deverna Çînê û li wan deran bi salan dimêne. Li wan deran hizrên xwe dihêne ser ziman. Her der û devera ku diçiyê de jî, astengiyê ji xwe re nabîne ku hizra bine ser ziman. Hizre xwe, ew dihêne ser ziman.

Manî, di aslê xwe de, wate wî ye pêşî, ku mirov wê di vir de fahm bike û bêne ser ziman, bi hizir û têngihîştina xwe re awayekî têngihîştinî ê di hemdemîya demê de, ku mirov wî bi hizre wî re di çerçova nûjenîyekê de bêne ser ziman e. Manî, Ji aliyekî dî ve jî, wateyeka wî heya. Ew jî, bi heyîn û hebûna têngihîştina wî re, weke ku dihê berçav weke ku ew hinekî derdikeve dervî kevneşopiyên ku hene û di jîyanê de na. Ew bi xwe jî, di wê baweriyê de ye, ku di çerçova têngihîştina kevneşopiyê de dihêne ser ziman. Lê bi awayê hizre xwe re û têngihîştina xwe re ew heyîna wî û ye hizra wî ye ku weke ku derdikeve dervî kevneşopiyê, bi wî re wê cuda were ser ziman. Ew, di deme wî de, hizrên wî bi fahmkirineka bi wan re awayekî jîyanê ê ku bawermendên wî ku lê bi bawer in, dikin ku bijîn dihê berçav. Mirov, vê yekê, dibîne. Di vê yekê de, weke ku ew derdikeve dervî xwe û kevneşopîya xwe. Lê di aslê xwe de, wê awayê wî û hizra wî bi têngihîştina wê re, mirov karê bi bûn û serwerbûna têngihîştina wan re û bi kevneşopîbûna wî re bêne ser ziman. Bi vê yekê re, ji xwe û ji deme xwe û kevneşopîya wê ye ku heya, buhurîn bi wî re dihê holê. Bi Manî re, di aslê xwe de, ye ku were dîtî ev yek bixwe ya. Di serî de, di aslê xwe de divêt ku ev yek bi awayê têngihîştina wî re were fahm kirin. Ji aliyê hizrî ve, wateyeka wî ye di jî heya. Ew jî, di temenê hizirkirina gotina rastteqînîyê re û bi hizirkirinê wê ye li jîyanê re û bi awadana wê ye bi jîyanê re, afirandina awayekî pergali e hizrî dihê holê, ku mirov wê bi teybet kifş bike û bêne ser ziman. Manî, di vir de, mazinbûna wî, bi têngihîştinê re li ser hîmê rastteqînîyê ya. Bi wê re, ew mazin e. Ew, ji dinyê ne qût lê bi xwe re weke ku di xwe de di serê xwe de dinyeyek avakiribê dijî. Bi wê re, ew ji wê dinya xwe ye bi xwe re, gav diavêje û bidest adilandina dinye xwe ye li derve dikê. Ev yek, wê weke xoslet û teybetmendîyeka wî ye sereke bê, ku mirov wê kifş bike û bêne ser ziman.

Zerdeşt, berî di temenê awayî civakê û jîyane wê de bi pergali temenekî hizrî afirandibû. Piştî wî re, çend sadsal di buhurîn û bi ser hizrên wî re gelek hizrên din jî, wê werina ser ziman. Bi wan re, wê kevneşopîyeka nû ye din ye demî wê bi afirê. Bi wê re, wê bi hizir re bi ber hizir û têngihîştina felsefîk ve wê peresendinek bibe. Ew peresendin, di aslê xwe de divêt ku mirov wê di çerçova kevneşopî û şopên xalkî de werêne ser ziman. Di wê xate dibê. Rêveberî, çendî ku serwerîya wê di wê demê de di jîyanê afirya û bûya, wê bi kevneşopîya xwe ye ku xalk jêre, rêz û hûrmeteka bê sînor dide nîşandin jî, wê dernekeve pêşîya wê û jê ne buhurê. Di vir de, ku mirov wê awayê têngihîştinê fahm bike, mirov wê sebeba vê yekê jî, her weha baştir fahm bike. Lê, dem hate ku dihê wê deme derketina Manî, wê pêşketineka bi têngihîştinê e dîrokî bibe. Ew pêşketin, wê awayê, bi hizrî bê. Hizir, derkeve pêş. Di civatan de hizrên ku hatina ser ziman, nayêna ji bîrkirin û wê civat bi civat û cih bi cih wê werina dubara kirin. Ew yeka, di aslê xwe de ku mirov lê dihizirê, mirov weke awayê afirandina civakê bi nîrxên xwe re dibîne. Di rastiyê de, ev yek wilo jî ya. Civat, di vir de, divêt ku carek din, werina ser ziman. Divêt ku navê wê werê hildan. Ew awayê pêşketinê ê bi hizir ê ku hate wê demê bûya, Zerdeşt di deme xwe de bi gotin kir û hanî ser ziman. Manî, bi têngihîştina wî rabû û mazin bû û hanî ser ziman. Pêşketina ji wî pêde, wê bi wê û ji ser wê re wê heyîn û hebûna xwe bide berdewam kirin. Di vê xalê de, hate vir hatina me ye bi hizir û têngihîştina wê ye hanîna li ser ziman, weke deme Berî Zerdeşt ku çawa dem bi dem awayê civakê bû û bi kevneşopî bû û di deme wî de û di hizra wî de çawa hate ser ziman, bi heman awayê mirov di vir de, weke ku bi gawekê bi şûn ve herê û vê carê bi awayê têngihîştinî awayê hizrî e yê civakîya ku Zerdeşt hanî ser ziman, mirov divêt ku wê bêne ser ziman û ji wir jî, gav biavêje û were ser ye hanîna ser ziman ye Manî ye bi hizra wî ye di deme wî de. Bi vê yekê re, wê baştir, fahmkirin biafirê.

Di deme Manî de, awayê civakê e ku diafirê, ji deme berî wî ye ku ew çend sadsalên ku li ser hizrê re bi pêş dikeve û pêşveçûnan dijî, wî wê di deme wî de bi manî re nûjenîyekê bi xwe re çêke û bi wê re were ser ziman. Lê ku mirov bi vê yekê çavekî ku deme berî wî dixê, mirov dibîne

ku deme berî wî ye hate deme Medîya, mirov dibîne ku çendî pêşketinek bi awayê hizir bi têgihîştinê re kirîya. Medîya, Mîr û keyên wê, qasrên wan bi pirtûkxane bûn û ew pirtûkxane jî tişî pirtûk bûn. Bi wê re, mazin bûn û serbilindbûnêka wan ye ji xwe bi êmin hebû. Bi wê, mazin bûn. Ji deme Gûtîyan ve, awayekî hizirî ê bi awayê felsefê pêşketina wê dibe. Ew pêşketin û awayê wê jî, hate ku dihê deme Medîya, wê pêşketineka pir mazin ye bi hizir çê bike. Xate pêşketin û pêşveçûnê e ji deme Gûtîyan hate ku dihê û digihê deme Medîya, di vir de bi peresendinê bi hizir re wê bi bênavber bi tehereke giştî heyîna xwe bide berdewam kirin. Bi gotinekê re mirov, ku bêje û bêne ser ziman, mirov karê bêje ku ronakbîrîyeka pir mazin di nav civakê de afirîya. Mirov, bi vegotin û vebêjinên xwe re awayê jîyane xwe bi nivîsandinê karin bi wêne bikin. Bawerîyên xwe bi hizir dihênina ser ziman. Gotinên ku bawerîya wan diafirêne û temenê wê ji him ve dihêne holê, gotinê têgihîştinê ên felsefik û ên ku di nav xalkê de bi kevneşopî û têgihîştin bûna na. Mirov, karê wê yekê, her weha bi teybet bêne ser ziman.

Li Kurdistanê bûna Manî, fahmkirina wî û bandûra wî

Manî, li gor pergale giştî e kurdistanê e ku bi kevneşopîyê û olê re li ser lingan e tevdigerihê. Hate ku dem, bi wê yekê were deme derketina Manî, wê pir pêşketin derkevin. Li ber diclê, hate wê demê pergeleka olî ku heyîna wê pergale Êzîdîtiyê diafirand hebû. Berî wê, weke jêbûnekê wê, Cihutî afirîya. Ew jî, hate derekê pêşketîya. Lê ji derekê pêde, êdî ew pêde neçûya. Piştî ne bi gelekî re jî, Filehî derketîya. Filehî jî, di wê deme li berxwedana xwe ye li ber împaratorîya romê de pêşketinekê li ser temenê têgihîştineka bi wijdên re bi xwe re dide jînkirin. Ew jî, wê di wê demê de pir mazin pêş bikeve. Filehî, awayê bawerîya xwe ji ber diclê û firatê diafirêne. Bi wê re, hinekî pêde jî diçê. Li ber diclê jî û li ber firatê jî, mirovên ku wê hizre olî herê dikin jî dibin. Filehî, wê bi hizrên Nebî Îsa re mazin bibe. Hizrên nebî Îsa jî, ku ji deme Sumerîyan ve, ku hate wê demê bi pergal û dem bi dem pêşketineka mazin jînkirîna, wê bi wê awayê têgihîştina ku hate wê demê hatîya wê xwe bi afirêne. Ew ahange pêşketinê e bi kevneşopî ku weke ku di xatekê de bi rêzkarî heyîna xwe hate wê demê li ber diclê daya berdewam kirin û hanîya, wê ji wê awayê hizrên xwe bigirê. Bi vê yekê re, temenê wê jî ji wê ya. Mirov karê wê yekê, pîrr bi êmin bêne ser ziman.

Hate hatina deme Manî, wê filehî jî, li wir pêşketinekê bijî. Manî, heya wî ji waqas pêşketin û dîroke herême ye ku hate wê demê hatîya û pêşketîya heya. Wê, di nav nîrxên xwe de, wan pêşketina bi têgihîştina wan re bi hizrên xwe re bi wate bike û bêne ser ziman. Li wan jî, wê meyzêne. Lê wê, dernekeve dervî wê kevneşopîya. Ew derketina wê ye weke ku bi têgihîştinê dibê, di aslê xwe de derketina bi astî ye li ser wê re ye bi dimênî ye pêşketinê ye bi wî re ya. Bi wê re Manî, di deme xwe de, bi pergal, li gor wê kevneşopîya xwe, mirov wê çawa bijî û çawa bi hev re di tîkiliyê de bê, wê didêne holê. Manî, wê wêneyekî civakê bi têgihîştina xwe re bi kevneşopîyê bi pergal bike li gor demê û wê bêne holê. Piştî wî re, çend ku wilo zêde bawermendên wî serwerîyeka wan ye dîrokî ye mazin nebê jî, wê pêşketinî dîrokî ên ku derdikevin ên weke filehîyê jî, wê bandûra wan hizrên wî yên ku wî hanîna ser ziman û bawermendên wî dihanîna li ser ziman, wê ji him li wê hebe. Manî, bi gotinekê, mirov karê bêje ku ew awayê civakê ji wê kevneşopîyê di têgihîştineka hemdemî de kifş dike di demê de û bi nûjenîyekê dike ku bidê jîn kirin. Awayê rêveberîyê wê çawa bê têde, ew bi nêzîkatîyên xwe re û hin hizrên xwe re jî dihêne di dênê holê. Di têgihîştineka bi hev re jînbûnê û hevdu nskirinê de dike ku mirovan lev bigihêne hevdu. Manî, di aslê xwe de, di vir de mirov karê wê yekê jî bo wî bêne ser ziman û bêje: ew, ronakbîrîyeka têgihîştina Zerdeşt bû di deme pêşketinê de û di deme xwe de. Bi vê ronakbîrîyê, êdî ji nahaka pêde, mirov awayê civakîyê ye deme wî ya ku di nav xalkê de heya mirov divêt ku bêne ser ziman.

Deme Manî, di aslê xwe de, mirov wê karê ji gelek aliyan ve bêne ser ziman. Ew dem, demêke ku nû ya. Manî, hizrên wî, ji nav xalkê şin dibin. Manî, di hizrên wî de, awayê civakê û pergaliya wê ye ku dihê ser ziman, ê ku mirov wê fahm bike heya. Mirov divêt ku wê bi teybet bêne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê aliyê têgihîştina wî ye civaknasîyê wî jî bêne ser ziman.

Di vir de, deme ku mirov awayê civakê bi pergâl ji têgihîştina wî bêne ser ziman, wê ji aliyekî ve, ew jî were dîtin û fahm kirin.

Di deme wî de li Kurdistanê, serwerîyeka kurda e giştî heya. Rêveberîya ku li ser welatê wan serwer e, e weke ye Sasanîyan jî, bê ku piştîgirîya wan ji wan bigirê nikarê xwe bi rê ve bibe. Ji aliyê kevneşopî û têgihîştinê ve kurd, temenê wê pêşketina wê di afirênin. Kurd, xwediye pergaliya xwe ye civakî ye bi xwe re na, Mirov karê vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Di qasrê de kurd, serwer in. Ji derve jî, kurd serwer in. Lê di desthilatdariyê de, ne bi serê xwe na. Hevparîyeka wan ye bi şerîkî bi persan re bi rêveberîya Sasanîyan re heya, Rêveberîya Sasanîyan, bi teybetî nirxên herêmê ji xwe re kirina hîm û bi wan di rê ve dimeşê. Kurd, deme ku wê yekê dibînin, êdî li ser temenê wê hîmê bi wê rêveberîyê re bi kevneşopî û nirxî levkirinekê dikin. Li herêmê, baweriyên ku hene, bi kevneşopî bi pergâl in. Pergaliya ku heya jî, mirov divêt ku wê ji gelek aliyê ve bi teybet bêne ser ziman. Di hundurê wê de, bi nirxên bawerî ên ku hatina têgihîştinkirin re mazinbûnê wê heya. Awayê civakê û wê demê, mirov karê bêje ku li ser temenê xwe bi kevneşopîya. Lê di aslê xwe de di vir de, mirov divêt ku bêne ser ziman, hate wê demê jî, rêveberî weke xaleka ku derdikeve ser wê nirxa xalkê e kevneşopî re nabê. Di nav de ya. Di nav de dihê ser ziman. Rêvebertî, bi wê re weke nirxeke kevneşopî bi mîrtiyê re di nav kurdan de heya. Ew mîrtî, mirov bi gotinekê jî bê bêne ser ziman, mirov karê bêje ku bi kevneşopî serwerîya wê li Kurdistanê hemûkî ya. Hemû pêşketin û pêşveçûnên ku dibin jî, dibin serwerî û desthilatdariya wî de dimeşî. Mirov, vê yekê jî, bi teybet karê bêne ser ziman.

Di vir de, bi awayê civakê û pergalbûna wê ye bi olî re û di nav xalkê de heyîn û hebûna mîr û kevneşopîya wî, bi hev re mirov karê hinekî dahûr û şîrove bike. Ev yek, di wê demê de bi teybetî wî hin rastîna bi me bide fahmkirin. Pergale baweriyê, ku civaknasîyeka xalkî di tede û di binî de serwerîyeka wê ye giştî bi awayê olê heya. Ol, heyîna wê, wê êdî wê pergalbûnê, di asta giştî de bêne ser ziman. Di naqabîna wê pergaliyê di asta wê ye bilind de û heyîna xalkî de ku mirov di vir de bi gotina xalkê re mîr û kevneşopîya wî jî bihasibêne, mirov kevneşopî dibîne. Li ser kevneşopîyê re digihina hevdû û hevdû temen dikin û dikina yek. Manî, di hizirkirina xwe de, wê di vir de, bi bawerîya xwe re û bi têgihîştina xwe re li ser kevneşopîyê re bi awayekî nû ye bi têgihîştina xwe re bi meşê. Kurdistan, ku mirov di vir de bêne ser ziman û bêje, mirov karê bêje ku bi mîrtiyê re herêm bi herêm rêxistinbûna wê ye bi kevneşopîyê re heya. Her herêm bi mîrê xwe re heya. Lê hemû jî, bi kevneşopîyê û nirxekê digihina hevdû û weke yekbûnekê di hizir û kevneşopîya wan de bi wan re heya. Ew kevneşopî, wê di vir de, bi wê awayê jîyane wan re, wê aliyekî wî yê dîn jî were holê li berçav. Wê, wê awayê pergaliya wan, di naqabîna wan de bi nirx wê wan tede bigihêne hevdû. Rêveberîya ramyarî ye herêmê ye mîrtî û rêveberîya olî ye di parastgahan de, wê di kevneşopîyê de bigihina hevdû. Lê di aslê xwe de, jêvcuda rêxistinbûna wan heya. Manî, perwerdeyek demdirêj di parastgahê de dihildê. Bi wê re, hate ku dihê û digihê deme xwe ye ku ew êdî karê hizrên xwe bêne ser ziman, wê di parastgahê de bi mênê. Parastgahên pîroz, wê bi têgihîştinê, pîrozîyê li wî jî bike. Manî, hate wê demê di awayê pêşketinê de çî pêşketin û awa derketiya holê, wê dibna û fahmdike. Hanîna wê ye li ser ziman, wê wî mazin bike. Di nav kevneşopîyê de hanîna li ser ziman jî, wê temenê herêkiirna wî ye ji aliyê dora wî ve biafirîne.

Rêveberîya Sasanîyan, çendî ku karîbûn Zerdest herê bikin, wê ewçendî jî karîban Manî herê bikiran û biqûrtandan. Demên rêveberîyê ên ku hate wê demê bi Sasanîyan re hatina, gihiştina astaka pir mazin. Sasanîyan, hate wê demê bi kurdan re bi rêve birina. Lê di wê demê de jî, weke ku dihê dîtin, ew di qasrê de dixwezin ku bi serwer bibin. Çîna kurd ye serdest jî, di temenê parastina rêveberîya herêmî û destlênedanê de lev dikin. Lê xalk, ji wê yekê hin bi hin ne xweş e. Ji temen serwerbûna xalkê û ji ser ne serwerbûna wan, wê nakokîya wan bêne holê. Ev jî, wê bike ku nexweşî derkevin. Di aslê xwe de Manî, wê weke ku bê dengê wê nexweşîya di nav xalkê de. Bi kevneşopî bi statûqûbûna rêveberîyê û derketina wê ye pêş ye li ser kevneşopîyan û nirxan re, wê di sekna Manî de ye ku li ber bê sekinandin bê. Manî, qadr û qiyemetê dide xwezabûnekê di jîyanê de bi jîyane mirov re jîyandinê. Nexwezê, ku rêveberî li pêşîya wê bê û wê asteng bike. Ew cihê rêveberîyê, ne di kifşkirina wî de, di asta giştî de di parastina wê de dibîne.

Mirov, di jîyanê de bûya xwediyê asteka bilind. Ew ast, wê xwe bijî. Manî, di nêzîkatîya xwe ye ku me weke nêzîkatîyeka ronakbîrî hanî ser ziman de, bi wê re hewl bide ku pêşavanîya wê bike. Jîyan, di deme Manî de bi felsefê bi rê ve diçê. Asta ku mirov bi pêşketin û pêşveçûna xwe jî ghiştiyê de, asteka ku bi felsefê bi rê ve diçê. Zerdest, di têgihîştinê de ew hanîya ser ziman. Lê li gor demê û gotinê demê hatina wê têgihîştinê ye li ser ziman jî, Manî wê weke pêdivîyekê dibîne. Ew, di wê têgihîştinê de ya. Ew, ji xwe û hizrên xwe û kevneşopîya xwe ye pişta didiyê de, jê pir bi bawer e. Bi wê baweriyê dihêne ser ziman. Bi wê re, ku ew di farqiyê de bê û ne di farqiyê de jî bê, asteka civakî kifş dike û bi felsefê dike û dihêne ser ziman. Di wê yekê de, ew weke ku di lêgerînekê de ya. Di vir de, bi vê yekê mirov karê bêne ser ziman û bêje ku ew bi têrbûnekê weke ku li têrbûnekê digerihe. Bi vê re jî, mirov karê bêje ku ew ji du aliyan ve divêt ku were fahm kirin bi hewldanên xwe re. Yek, ji aliyê olî û pergaliya wê ye demî ve ku ew weke nêzîkatîya xwenûkirinî di wê de xwe dide nîşandin e. Ye din jî, her weha bi heman awayê di kevneşopîya di nav xalkê de ku li gor deme û wê aste demê ku were ser ziman. Ji heyîn û hebûna Manî û hizrên wî mirov fahm dike, ku dem li ber jînuvêbûna ronakbîrîyeka demî ya. Lê hewldanên rêveberiyê derketina asteka bilind bi statûqûye xwe re û li pêşîya wê bûna bend. Li pêşîya Manî, sekin in û ji herêmê çûna wî, mirov karê weke nîşaneyeka vê yekê bêne ser ziman. Bi gerînekê diçê û hate wan herêmên Asya ên Çîn û Hindîstanê diçê.

Piştî ku Manî ji herêmê di ravê û piştîre bi çend salan carek din di vegehîrî herêmê, êdî wê weke oldarekî mazin yê bi kevneşopî were pêşwazî kirin. Wê di deme pîr kin de, wê pir mirov bawerîya xwe bi wan hizrên ku ew dihêne ser ziman bînin. Wê, di deme kin de kombûnek li dora wî biafirê. Wê, "civate Manîyan" wê biafirê. Ev civatîti, wê pêş bikeve. Wê, ne girêdayî rêveberiyê bê. Wê, ev yek, weke ku wî di deme hatina şah Şapûrê yekem de ew destûrîya ku standîya ku her derê herêmê ku karê hizrên xwe yê olî bêne ser ziman, wê di deme hatina wî de ku ew hatîya ser text di deme şah Behremê yekem de wê ew destûr jê bê standin û ew ji aliyê wî şahî ve were girtin û piştîre wê serê wî were lêxistin. Wê êdî ev bê destpêkeka nû. Kurd, wê pir mazin ji bo vê yekê, berteke xwe bidina nîşandin. Di aslê xwe de, mirov karê wê qûtbûna û navber vebûna kurd persan ji wî bide dest pê kirin.

Piştî vê demê re, wê demeke nû dest pê bike. Ew, hate derketina musulmanetiyê ew rewş heyîna xwe bide dest pê kirin. Piştî Medîya, hate wê demê jî, li herême pergali ye Êzîdîtiyê serwerîya wî heya. Zerdest jî û Manî, wê li dûv hevdû, wê weke pêvajoyîna wê pêşketina bi pergali ye demên xwe bînin ser ziman. Dem û pêvajoyên wê pergale ên pêşketin û pêşveçûnê di dîrokê de, pir demdirêj diçin. Hate deme Nebî Nuh, mirov karê herê û ji wir, pêvajo û demên wê bide dest pê kirin. Wê, hate derketina musulmanetiyê wê ew pêvajoyên wê heyîn û hebûna xwe bidina berdewam kirin. Pêvajoyên demên xalkîtiyê û piştîre ên civakîtiyê jî, wê pergaliyê b demên xwe re bi buhurîna xwe ye ji demê li demê re jînkirîya û di xwe de afirandîya. Bi vê yekê re, demne pêşketinê û pêşveçûnê jî kirina. Hê ev demên wê pir baş ne hatina fahmkirin û ser ziman. Lê em, karin bi êmin bînin ser ziman û bêjin, ku hate wê deme Manî hatina wê pergale wê, wê kevneşopîyeka pir kur di xwe de bide afirandin. Hate destpêka derketina musulmanetiyê jî, em dizanin ku ji sadî heştîyê wê Kurdistanîyan êzîdî na. Li gor wê dijîn û jîyane xwe berdewam dikin. Lê derketin û hatina musulmanetiyê, çendî ku ji wê çand û wan hizrên li ber diclê sûd girtibê jî, ku dihê Kurdistanê wê bikeve ber wê pergale êzîdîyê ye serwer de. Pergale Êzîdîtiyê xwediyê serwerîyeka jîyanê e giştî li herêmê bû. Serwerîya olî, tenê di nêzîkatîya rêveberiyê û serweriyê de lê ne hate nerîn. Ev awa, awayê ber Diclê û Firatê bû. Lê li niv girava araba jî, ji deme misre kevn ve awayekî serestiyê ku xwestina kirina bin dest de hebû. Di destpêka musulmanetiyê de rêveberên ku dibuhurina musulmanetiyê ji ye berê hê di wê têgihîştinê de na û di musulmanetiyê de bi wê nêzîkatîyê dikin û pêşketinê di musulmanetiyê de dikin. Bi vê yekê re, bi baweriyê re rêveberî û ramyarî û serwerî weke gotinên li dûvhevdû ku hevdû çêdikin, êdî wê bibin û werina holê. Têgihîştin û awayê pergale olî e Êzîdîyê, yek-xwûdatîya. Ev jî, wê bê sedemeka din ku wê bêne berhevdû. Ji ber ku ew têgihîştina yek-xwûdatîyê ya Êzîdîyê serwer a li ber diclê û firatê. Lê ya ku tê jî bi heman awayê tê û daxweza serwerî dike. ..

Şerên ku di destpêka hatina musulmanetiye de, di deme ku Halîd bin Welîd hate kurdistanê de bi artîşî û şerên ku wê li kurdistanê bi kurdên êzîdî re kir, hate roja me jî ji dev ku bahs dihê kirin, bi *îbretêkê* bahs dihê kirin. Her weha jî bo bahse deme hatina Omer bin xattab jî dihê kirin. Ji destpêka wê hate sadsalên 8. min û 9. min û hwd wê şerek ji bo serweriye li Kurdistanê di naqabîna wan pergala de bibe. Di dawîye de, wê pergale êzîdiye bi bin keve. Wê, nivîs û nivîsarên ku li ser navê wê hene û navê wê tede di buhur in, wê werine ji holê rakirin. Wê navê wê jî hildan, wê weke "kûfrefê" weke were dîtin û ser ziman. Êdî, bi vê yekê, li Kurdistanê pêvajoyeka nû dest pê dike. Lê di aslê xwe de, wê bûhrenek jî, bi civakî û giştî wî heyîna wê li Kurdistanê, wê piştre derbikave holê. Divêt ku em wê jî û derketin û sedemên wê jî, ji vir pêde êdî bînina ser ziman.

Ji vê demê pêde, mirov karê êdî dîrokê li Kurdistanê û di temenê pêşketin û pêşveçûnên wê ye xalkî û civakî de bi teybet bêne ser ziman. Ji dîrok, ji vir pêde, wê bi hinek xoslet û teybetmendiyên demî ên teybet re wê were ser ziman. Piştî vê deme Manî re, wê hate sadsale 6. min û 7. min, wê bi vê awayê wê pêşketin heyîna xwe bide berdevam kirin. Di aslê xwe de, mirov, di vir de, dahûrkirinekê bi dîrokê û bi teybetî jî, bi vê demê re bike, mirov karê bi rehetî bêje ku li Kurdistanê dem, demeka ronakbîrî ya. Ew deme ronakbîrî jî, di awa û pêşketina xwe de di wê deme xwe de jî, li ser wê deme ku li rojava ku piştî wê bi gelekî re dest pê kirîya û jêre "jinûvebûn(ronesans)" di hate gotin re bû. Di aslê xwe de rojhilat, li ber dîclê û firatê, hê di wê demê de bi mirovên weke Manî re, ew destpêka xwe dabû dest kirin. Demên ku hate wê demê hatina jî, bi du awayan mirov karê bêne ser ziman. Ji aliyê rêveberî û kevneşopîya wê ye bi statûqûyî û her weha ji aliyê kevneşopîya civakî ya ku di jîyanê de di nav xalkê de diji bû. Ev herdu alî, bi hev re û jêvcuda yek bi yek bi serê xwe re fahmkirina wan, wê teybetmendiyên demê wê bi me bide fahm kirin. Manî di aslê xwe de, ji aliyê heyîn û hebûna xwe ve û bi teybetî jî bi têgihîştina xwe re mizgînanê wê demê ya. Mirov, karê wî bi vê awayê bi teybet di deme wî de fahm bike û bêne ser ziman.

Piştî Manî re, wê demeka pêşketinê li herêmê bi awayê ku wî bi têgihîştin kirîya, wê herêm bijî. Mirovên ku êdî bide baweriye li wî û hizra wî kirina, wê li herêmê li her cihê bigirihîn û hizrên wî bînina ser ziman. Ji Kurdistanê hate ku digihêne ber sînorê Hindistanê, wê di qadeca mazin de ew belavbûn bibe. Manî, bawermendên têgihîştina wî Manîvan, wê awayekî demî ê nû ye wê pergaliya hizrî ku hatîya herîkirin û li gor wê dihê jînkirin ê Êzîdiye û bi teybetî jî, wê awayê wê ye Zerdeşt ku hanîya li ser ziman, wê di dema xwe de bi ast û radayaka nû bînina ser ziman. Di awayê wan de rêveberî, di xizmete xalkê de ya. Ne li ser xalkê re ya. Ew, wê jî dihênina ser ziman. Hinek hêrîşên ku wê di demna de li wan bibin jî, di temenê wan de ev hanînen wan yên li ser ziman hena. Manî, weke serekê wan, weke ye ku li dijî wê kevneşopîye dijî dihê ser ziman. Manî, di aslê xwe de ne kemî Zerdeşt hanîya ser ziman. Zerdeşt, avesta li ser ne bin çerdeh hezar ayaran nivîsand. Ji xaynî van jî, hin axiftinên wî yên ku di aqilan de mana û piştre hatina nivîsandin jî, bahse wan dihê kirin. Lê î ro, di destê me de, ew nivîsên wî hemû nîn in.

Hatina Îskenderê Zûrqerneyn e li Kurdistanê

Bi teybetî, di deme ku Îskenderê mekdonî ê bi seferî hate Kurdistanê û di wê demê de kurdan ji ber kirinên wî xadar ku mohra xwe li dîrokê xistin, paşnavê "zûrqerneyn" tiye pêve kirin û piştre jêre gotin "Îskenderê Zûrqerneyn", di deme hatina xwe de bi pirtûkxaneyên wan yên ku hebûn dana ber êqîr û şawitandin. Hate î ro jî, ku bahse wê dihê kirin, bi dilêşiyekê bahs dihê kirin. Wek dihê zanîn gotina "qern" di wate nifşekê de dihê gotin. Lê deme qern dihê gotin, hingî bi kirineka ku jê acêbmayî dihê kirin. Bi vê yekê re, ev gotin dihê gotin. Ev gotin, wê deme ku dihêne ser ziman, li wate xwe lêkeriyeka ye bi kirinên ku baş û an jî ne baş ew ti carî ku divêt ku newîna ji bîrkirin re dihê ser ziman. Bi vê yekê re, xwediyê wate û lêkeriyeka ku lê dihê lêkirin re xwediyê teybetiyeka kirinî e bi dîrokê re jî ya. Bi paşnavê îskenderê mekdonî ve pêvekirin kirin jî, her weha di hasabê ku ti carî divêt ku ew kirin newîna jibîrkirin de hatîya pêvekirin. Di aslê xwe de li Kurdistanê, dem ku dihê ser ziman, bahs dihê kirin, ku "deme berî hatina Îskenderê zûrqerneyn û

deme pişti wî” dihê kirin. Her weha dem, dihê jev cudakirin. Di wê demê de guharînaka pir mazin li Kurdistanê dibe. Kurd, di deme hatina wî de, bi malbatî tevekên wan xwe dispêrina çiyayên Zagrosan. Îskenderê Zûrqermeyn nikarê di zagrosan de pêde herê. Di deme hatina xwe ye li rojhilat û vebûna wî ya bi ber Asya de li du deran diqalibê. Cihêk ji wan cihê ku lê diqalibê Zagrosan e. Cihê din jî, di deme çûna wê ye li Hindistanê de, li ber wan şerwanên Hindî ên ku li ser Filan ku dikarîn rabina ser piyan û bi kavana tûr biavêjin, nikarê pêde herê. Ev herdû der, derna ku wî didina sekinandin in.

Zerdeşt, zanîna wî jî, lê di deme Îskenderê Zûrqermeyn ve dihê şawitandin. Bi wê re ji holê dihê rakirin. Lê, hizrên wî, di nav xalkê de û di parastgahan de di mejîyan de bicih bûna. Ji ber vê yekê, nivîsarên nivîsandî, çend ku dihêne şawitandin jî, ew nivîsarên di serîyan de ku heyîna wan dimêne û cih bi cih jî dihêne nivîsandin ji di demên piştî wê de, wê valahiya bi ji holê rakirinê re tishi dikin. Bi wê re, hate dem ku dihê deme Manî bixwe jî, ew têngiştina wî, heyîna xwe bi civatî diparezê û dide berdewam kirin. Manî, wê bi hizra xwe re ji vi aliye ve ji wê, vê valabûna ku bûya wê tishi bike. Manî, ji wê têngiştinê bitêngiştin bûya û têngiştina xwe û zanîna xwe ye di serê xwe de afirandiya. Bi wê re Manî, di deme xwe de ne kêmi Zerdeşt dihêne ser ziman. Hizrên Manî ên ku wî bixwe hanîna li ser ziman, bi nivîsarên ku wî bi destê xwe nivîsandina re û bi yê ku ji devê wî hatina hiskirin re û piştê hatina rijandin li ser rûpel jî, ku bi hezaran ayarên ku weke rûpelên pel ku di roje me de dihêne bikarhanîn tişî dikin in. Manî, bi vê yekê, ew Zerdeştê deme xwe ya. Bi vê yekê re, mirov karê wî bi teybet bêne ser ziman. Di çand û kevneşopîya çandî e li ber diclê de, bawerîya ku heya, bi wê dihê bawerkirin ku ”yekî ku bidest xwandina xwe kir li cem yekî ku wê wi dide xwandin, ku bi zanebûna xwe ye ku di xwe de da rûnandin ku gavekê neçê pêşîya wî, wê ew xîyanetê li wê zanebûna xwe ye ku ew jê bizanebûn dibe bike.” Ev Bawerî, weke ku di Manî de bi zanebûna xwe ye ku ji zanebûna wî girtîya û çêkirîya re, bûya. Mirov, wê yekê bi wî re dibînê. Dema Manî û demên piştî wî re, bi zanebûna wî re, li wir mazin dibin. Demeka ronak diafirê. Ew deme ronak, ku mirov wê li gor rastîya wê bêne ser ziman, mirov wê piştî wê re ku bi hezarûdusadsali re ku bûya ji ye ”ronesans”e rojava dihê gotin kêmi neyêne ser ziman. Mirov karê, li ser re jî bêne ser ziman. Di vir de di aslê xwe de di wê demê de, ew ronakbîrîya demî e ku heya, piştê çima weke ku ji holê rabû ya? An jî, mirov karê bi vî awayê bi pirsê, ku çima piştê bi berjêr ve çûbûn bû? Ev herdû pirs, divêt ku mirov bi pêşveçûnên li herêmê ên bi kevneşopîya rêveberîyê re girêdayî bi bersiv bikê. Ew kevneşopîya herême, ye ku bi rêzanîya rêveberîyê re li ser herême bi statûqû bûya, bi serdest û bidesthilatdarî, di aslê xwe de piştê ne bi gelekî re wê derketina bi musulmanetîyê re jî, ku weke ancama wê heyîn û hebûna wê ye ronakbîrî e herêmîyê ya, wê ew wê ji li gor xwe bi awa bike. Derketina Îslamê, wê bi hêncê pergaltîna herêmê ye ku wê pêşketina wê ye mazin ye herêmê ye ku heya re, ku wê bi xwe re bigihêne rêxistîyeka civakî û civatî di herêmê de. Mirov, karê bi vê yekê re wê derkertina musulmanetîyê jî, bi awayekî ji destpêkê bi wê ronakbîrîyê bêne ser ziman. Lê Musulmanetî, dîroka wê ye ku piştê di afirê, mirov ku lê dinerê, mirov dibîne ku wê bi awayê kevneşopîya wê rêveberîyê biafirê û pêşve herê. Bi wê re, ew têngiştin û hizrên ku wê ji wê gav avêtîya û bi wan destpêka xwe kirîya û pêşketîya li şûn dimênin. Bi wê re, wê demeka kevneşopî e statûqî e rêzanî e rêveberî wê bi musulmanetîyê re pêş bikeve. Ew hizir û awayê hizirê e wê, derfetê dide ku li ser serê herêmê rêveberîyeka gelemper e giştî were ava kirin. Rêveberî bi wê re, ji destpêkê hate demên dawiyê, wê serwerî û serdestîyê wê, bi wê re serwer û serdest bibin û desthilatdariyên împaratorî li herêmê ava bikin. Ji rêveberîya Abasîyan û bi vir de hate ku dihê û digihê ya sefêvîyan û Osmanîyan û hwd, bi rêveberîyên halo re bi wê hizre olî re derkevin û mazin bibin. Bi vê yekê re, derdikeve holê, ku mirov ji vê dema Manî û hate derketina Musulmanetîyê, ku mirov wê weke demeka bi serê xwe bêne ser ziman û ji deme derketina musulmanetîyê jî û bi vir de ku mirov weke demeka dîn ye nû ku destpêkirîya mirov bêne ser ziman, wê rast bê. Lê ji deme derketina musulmanetîyê û bi vir de, ku mirov wê bêne ser ziman, divêt ku mirov bi dîrokê re ji nû ve ji demên berî wê ve, ji deme Sumerîyan û Misre kevn hildê dest û bêne ser ziman û bêne hate wê demê. Bi wê re jî, divêt ku mirov, ji aliye kevneşopîya rêveberî û ye xalkî û civatî ve bi du alî û awayan re bêne ser ziman. Bi wê re, mirov wê bi

rêveberiyê û kevneşopîya wê û bi xalkîtiyê û civatîya wê re ronakbîrîya civakî ye dîrokî ye herême kifş bike û bêne ser ziman. Lê nahaka hinekî di jî, em li ser wê dema Manî û ji wê demê jî, hate wê deme derketina musulmanetiyê bi wê pêşketin û pêşveçûnên wê re hinekî bêna ser ziman. Hizrên wê demê yên ku derketina û hene, em divêt ku wan jî fahmbike. Ew hizir, çi dihênina ser ziman û di rewşê, demê û pêşketinê de derketina, mirov wê wê jî bibînê û fahm bike.

Bûna ola Manî, têgihiştin û bawerîya wî û awayê têgihiştina wî ye ku mirov wê weke xwenûkirina bi demê re binavkê û bêne ser ziman di kevneşopîyê de di demê de li gor demê

..

Di deme ku Manî têde dijî de, di pêşketina wê de ronakbîrîyek heya. Bi teybetî jî, li ber diclê û hwd, ev ronakbîrî, bi awayekî teybet heya. Bandûra wê, li ser dora wê heya. Filehî, di wê demê de, hê di deme xwe ye xwe afirandin û di jîyanê de bicihkirinê de ya. Bi vê re jî, mirov karê bêne ser ziman û bêje, ku hê di deme xwe ye ku xwe bi mirovan di jîyanê de bide naskiirne de ya. Filehî, wê di demê de, bawermendên wê, werina ber diclê û wê herême û wê ji wê awayê pêşketina wê, awa bidina pêşketina ye ku dijîn û diafirênin de. Manîvanan, li herême, bi awayekî teybet, ku ji yên demên berê cuda na, cihna bergkirinê dana çêkirin û têde berg û mergên xwe dikin. Di nav xwezayê de, di nav baxçeyên gûlan û gûlfstanan û hwd de, ew cihên wan hene. Li ber avên ku di rewşên xwe diherikin û di cihên ku di harikin de wê hînkûna ku didina çêkirin, wê ji cihên Manîvanan ên bergkirinê re hîm bi xwe re biafirêne. Bi wê re, wê rewşeka nû biafirê. Manî, di deme xwe de, li herêmen Kurdistanê û ji wê jî, hate ku digihê herêmen Îranê û Hindîstan û Çînê û hwd, di qadaka mazin de digerihê û di nav mirovan de hizrên xwe dihêne ser ziman. Ew cihên ku ew çûyê de û tere çûya, wê ji bawermendên wî re bina şop û ew di şûnpêyên wî de tere herin û hizrên wî bêna ser ziman. Bi vê yekê re, wê derkevina dervî sînorê Kurdistanê û bi giştî jî, dervî sînorê rêveberîya Sasanîyan. Manîvan, wê di demeka kin de pir alîgiran ji xwe re bibîn in. Ji ber ku hizrên Manî ji wan re nû na. Ji ber vê yekê jî, ew jî pir zû lê dorê lev digihina hevdu.

Di vir de, mirov karê rêxistinbûna manîvanan e li herême bi teybet bêne ser ziman. Li ber hewlidanên rêveberiyê bi sernakevin û zêde ji bi pêşve naçin û serwer nabin. Lê, mirov karê bêje ku di demê de, ew awayê wan hem yê rêxistinîyê û hem jî ê ku pê xwe dihênina ser ziman û berg dikin, ji yên demên berî wan pir cuda ya. Di wê demê de, hizir û têgihiştin û her vegotinên ku dihêne vegotin, ji çîrok û çivantîyan hatina şîştin. Bi safhizir, dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, Manî jî, di deme xwe de li gor wê hanîbû ser ziman. Nêzikatiya wî, di vê yekê de di hemdemîya deme xwe de nûjenîyeka wê ye pir li berçav hebû. Di hanîna li ser ziman e hizir û civakî de bi pergale, ew li gor demê ya. Ew awayê ku ew wê dihêne ser ziman, ji ye roje me ne kêm pêşketîra. Ji aliyê têgihiştinê ve ji hinek aliyên ve di buhurê jî. Manî, di nêzikatiya wekhev de bi hev re jînbûnê diparezê. Ev nêzikatiya wî, ji bo komên xalkî ya. Ew pêşketina civaktiyê bi pergale dibîna û divêt ku çawa bê û çawa were fahmkirin, bi vê yekê re, bi nêzikatiyê re jî dihêne berçav. Di wê nêzikatiya xwe de nêzikatiya wî ya ji rêveberiyê re, pir bi balkêş e. Mirov, ku lê dinerê, mirov jê fahm dike ku ew dibîna ku di nav xalkê de ku wele nîmînerê pergale xalkîtiyê ya û di deme civaktiyê re jî, bi wê kevneşopîya xwe ya dîrokî di pêşketinê de ya, heyîn û hebûna miran dibîna û di deme nû de bi rêveberîya wan re, wê çawa bin di kirina xwe de û wê çawa tevbigerihihin jî, di nêzikatiyên xwe dihêne ser ziman. Di hizrên xwe de jî, dihêne ser ziman. Manî, di aslê xwe de dibînê ku civaktî pêş dikeve û yekbûn bi awayekî hîyereşîkî diafirê bi wê re. Bi vê yekê re, ew nêzikatiyên kevneşopî ên ku hene û nêzikatiya mirov e li hevdu dihênina ser ziman û başbûneka ku ji mirov ji bo hevdu di wan de heya, bi nêzikatiyên xwe re wan derdixê pêş. Bi wê yekê re, ew di temenê kevneşopîyê de bi pergale olî dihizirê, lê bi rêveberiyê re jî kifşkirina wê ne pejrîne. Ew yek ne li ser ye din re dihêne ser ziman. Ew, di ahanegekê de ku bi hev re di ast û rada hev de ku bi hev re dihêne ser ziman. Ev nêzikatiyên wî, mirovatiyê di xwe dihêne ser ziman. Di nêzikatiya wî ya olî de, mirov, di ast û radeyekê de bi hev re dijî. Ew pergale olî, pîrozîya wê jî, bi têgihiştina bi mirov re dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, ew olê jî, di nêzikatiya xwe de nêzikatiyên wê, bi hizrê dişoyê û dihêne ser ziman. Dema felsefik, her weha heyîna wê bi awayê wê ye pergale re dikeve rîya xwe ye pêşketinê de bi wî û têgihiştina wî re li herême bi bawermendên wî

re. Manî, ne di deme wî de û ne jî piştî wî re, hizrên wî baş û qanc nayêna fahm kirin. Hin awayên bitêgihîştinê en ku bawermendên wî kirina merîyetê de bi kirinên xwe re, ji hin pêşketinên din re dibîna mînaq. Weke cihên bergkirinên en wan, ku ji cihên bergkirinên en filehan re bibîna mînaq û hwd. Manî, heyîn û hebûna wî bi têgihîştin û hizrên wî re, awayekî peresendî ê ku bi wî re pêşketîya ê wê pergale ku bi kevneşopî e ku bi ola êzîdîtiyê pêşketîya û bi hin hizrên Zerdeşt re ji xwe daya berdewam kirin e. Manî bi hizir û têgihîştina xwe re, awayê têgihîştina Êzîdîtî û Zerdeştîtiyê e ku hate wê demê bi demê re afirîya ya. Bi vê yekê re, ew berdewam wê xate pêşketinê ye di wê demê de ya. Di wê demê de, awayekî pir pêşketî û ronakbîrî diafirê û dihê holê. Civaktî, pêşketina wê, awayê wê ye civakê ye demê ya. Ol, bi hizir û felsefe bûn û bi hîs û wijdan pêşketina wê, wê aliyê wê ye wê deme pêşketinê bê. Manî, weke ku dengdariya wê dike û mizgîntiya wê ye bi demê re dike.

Di aslê xwe de Manî, dengdariya awayê pêşketinê ê ku in bi hin afirîya dike. Ew awa, li ber diclê pir mazin pêşketîya. Derketîya pêş. Manî, wê dibîne. Rêveber û pêşketinên rêveberî, êdî bersivê nadina pêşketinê ku dibin. Manî jî, wê dibîne. Di awayekî çawa de bê jîyanê û gor demê bê, ew dixwezê wê bide nişandin. Bi wê yekê re, ronakbîriyeka demî ye ku afirîya bi wî re heya. Mirov, di jîyane xwe de çawa bijî û çawa bê, rêveber çawa bin û di rêveberîya xwe çawa tevbigirihîn, ew dike û dixwezê ku bide nişandin. Awayê têgihîştina Manî, li ser ye demê re ya. Sebir û aramî, qancî û rastî, bawerî û rastteqînî, mirov û mirov û hwd, bi hev re na bi wî re di têgihîştin û hizra wî de. Naskirin, bi wî re bi têgihîştin heya. Ew, di bawerîya xwe pir kur û dûr çûya. Di kevneşopîya di ber diclê de ku hate wê demê hatibû jî, li ber jinê rêzeka wî ya ji hîm heya. Xweşikafî, di hizra wî de xwediyê têgihîştinekê ya. Ew xweşikafîya jinê mînaq dide. Lê ew, di helweste xwe de, dike û dixwezê ku wê xweşikatiyê bi têgihîştin bêne ser ziman di jîyanê de. Bi vê yekê re, ew xwediyê hin teybetmendîyên ku mirov wan ji hîm fahm bike ya. Manî, bi wê awayê bi têgihîştina xwe re xwe ji xwe buhurandîya.

Ew, hizir û têgihîştina wî ku were fahmkirin wê were dîtin ku ew di hizir û têgihîştina xwe de dixwezê ku nixrên berî xwe di xwe de bi têgihîştina xwe re bêne ser ziman û li gor demê wan bêne ser ziman. Awayê hizir, bi wê hanîna li ser ziman, teybetmendîya wî diafirêne. Ew deme ku dihêne ser ziman, vegotin û destan û çirokên ku dihêne ser ziman, bi awayekî teherî ku bi demê re bihev ve girêdayî bi awayê hizirî dike ku bêne ser ziman. Manî, dixwezê demekê bide girtin û li şûn xwe bihêlê û deme nû bi hizir di awayê têgihîştin û pêşketine demê de bêne ser ziman. Di vê yekê de, ew bi hewldan a. Ew, di demê de pergale civakîyê wê çawa bê, formule dike û dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, bi têgihîştin û hizra xwe re derdikeve ser têgihîştina deme xwe re jî. Deme Zerdeşt, weke demeka kevnare hîmê wê demê ya. Deme Manî, li ser wê demê re û kevneşopîya wê demê re diafirê û dibe. Li berdiclê pêşketineka mazin dijî. Ew pêşketina ku dijî û dihê berçav, wê peyxamê ji bûna hizra musulmanetiye re bike. Demên piştre de, derketina musulmanetiye, wê bi awayê hanîna li ser ziman e hizir û têgihîştina xwe re, wê ji wê pergaliyê pir sûd û fêr bigirê. Musulmaneti, wê awayê civakîyê bi têgihîştina wê re, wê di xwe de bide rûnandin. Lê wê ji awayê rêveberiyê e ku pêşketîya di misre kevn de û serwerî li herêmê kirîya, ji ye firewan rizgar nebe. Bi wê re jî, wê ew awayê wê pêşketinê e ku musulmaneti jî, ji wê gav diavêje, wê baş newê fahm kirin. Bi hatina musulmanetiye û ketina tekoşinê e li ber pergale Êzîdîtiyê ku li gelemperîya Kurdistanê serwerîya wê heya de, wê êdî wê awayê pêşketinê jî, pêre bike dervî musulmanetiye, Lê wê ev heretimî bê sedeme tekoşinekê di musulmanetiye bi xwe de jî. Musulmaneti, ku bi awayê têgihîştineka wilo serwerî wê bihizir biafirê li herêmê, wê dibîne. Ahange di nav bawerî û jîyanê de e bi têgihîştina Manî re, temenê hemdemî û nûjenîya hizrên wî yên di herdemî de diafirêne. Wê bi piştî Manî re bi demeka dirêj re, pêşketin li ser hizir û têgihîştinên wî re biafirê. Naskirin, wê di kevneşopî û têgihîştina wê de bi hizrên wî re biafirê. Bi vê yekê re, awayê hizrên wî bitêgihîştina wî re wê kevneşopîya xwe civakî wê biafirêne. Manî, di aslê xwe de, ew heyîn û hebûna bi pergale e li berdiclê, di wê de, hewldanaka giştî e xwenûkirinê ye li herêmê ya. Divêt ku mirov wî û hizrên wî bi têgihîştina wan re di vê çerçova heyîna xwenûkirinê de bêne ser ziman. Bi serketin û ne bi serketin li ber heyîna rêveberîya herêmê, ew tiştêkî li deraha ya. Lê ew, her weha hewldanaka xwenûkirinê ya ye herêmê ye di kevneşopîya wê de ya. Di aslê xwe de, bi

serneketina wê, wê bê temenê têkçûna herêmê ye di demên piştre de. Derketina musulmanetiye jî, wê weke hewldanaka ku di berdewamiya wê xwenûkirinê de bê. Piştre bi rêveberîyan, bi ramyarî û statûqûbûna wê ye bi rêveberîyan re, wê ne bi serketina wê bêne holê. Di deme de çawa ku weke ku Manî baş ne hate fahmkirin, wilo ji Hz. Muhammed jî di deme musulmanetiye baş ne hate fahm kirin. Bi teybetî Manî jî û Hz. Muhammed jî, derketibûbûna wan ye dervî qalibên rêveberîye ên statûqûyê û ên demê ên ku hebûn. Lê musulmanan, wê derketina wî baş naxwênin û fahm nekin wê derketina dervî qalibê rêveberîye e bi statûqû. Bi wê yekê re, ew hewldana xwenûkirinê e bi Hz. Muhammed re jî, bêî ku dest pê bike ditafisê. Bi wê yekê re, di berdewamiya wê deme Manî de wê deme musulmanetiye jî, divêt ku mirov, wê bêne ser ziman di vir de; wê, hingî rast nêzîkatî û ku bibe, fahmkirineka rast wê bibe.

Demeke nû ye zimanê kurdî bi deme civatî û civaktiyê û pêşketin wê re

Ku mirov di hanîna li ser ziman de, dihê deme ber deme derketina musulmanetiye, mirov bi demê re pêşketineka pîrr mazin kifş dîke. Di awayê civaktiyê de, pêşketineka mazin bûya. Pergalbûn afirîya. Nirxbûna wê jî afirîya. Bi wê pergalbûnê, yekbûn û yekkirin, bi têgihîştin û gotinê jî afirîya. Kevneşopîya wê jî afirîya. Li Kurdistanê, ku mirov li awayê pêşketinê di meyzêne, mirov wê gelemperbûna civakî bi pergalfî dibîne. Di dahûrkirina wê de, bi sereke mirov karê weha wê bêne ser ziman. Di asta bilind de bi pergalfî, pergaliya Êzîditiyê afirîya. Bi wê re, ji binî ve, herêm bi herêm bi mîran û xalkên herêmê re bi rêxistinbûn heya. Civakbûn, bi wê yekê heya. Ziman jî, bi qasî ku mirov dibîne û kifş dîke, di wê deme Manî û ku hate derketina musulmanetiye de, bûya xwe ye pêşveçûnna mazin ên demî. Hinek guharandin jî, tede bûna. Di pergalbûna zimên de, pêşketineka demî bûya. Weke ku ji wê demê hate wê demê di nav kurdan de dihê gotin, "bi zimên, naskirinek û têgihîştinek afirîya." Ev, dihê ser ziman. Zimanê kurdî, di jiberkirin û di hiş û bîrê de di hiştinê de xwediyê hinek teybetmendiyên xwe yên bi mirov re ên teybet, ku mirov wan bi teybetî kifş bike û bêne ser ziman in. Di wê demê de, ev yek jî, wilo heya. Di wê demê de, di aqil de girtin (di hiş de girtin) pîrr mazin heya. Di civatan de, hanîna li ser ziman, wê bi wê bibe. Di civatan de, yên ku baş karîba ku di hişê xwe de bigirta, yê ku herî zêde bizanebûn dihate bi birhanîn bû. Navê wî, bi başî û zanebûna bi wî re dihate ser ziman. Bi wê yekê re, bi di hiş de hiştinê re kevneşopîyek bi civatan re hebû. Minaq, "vegotinên civatî ên weke yên şahmaran, ji serî hate binî jiber dihatina vegotin di civatê de". Bi wê yekê re jî, di aslê xwe de bi civatan re gelemperbûnek afirîbû. Ji derekê û an jî civatekê, çûna mirovekî li herêmeka din û an jî li civateka din û li wir hanîna li ser ziman, weke ku di wê civate berê de ku lê rûniştibû û hanîbû ser ziman, wê di hevparîkirin û beşkirinê de gelemperbûnê biafirîne. Bi civatan re, ev yek li Kurdistanê diafirê. Ziman, nîrxeka hevbeş bû. Ziman, pîr baş dihate fahmkirin. Mirovên, ku li herêmê dijîn ku ji aliyê olî û xalkî ve çawa jî ban, wê ji hevdû fahmkirîne de bi hev re neketiban zorê de. Di wê demê de, bi teybetî, ev hinekî di jî pêşketibû. Li hevdû û li civatên hevdû rûniştin û bi hev re hevparîkirin, û bi wê hevparîkirinê re ji hevdû fahmkirin, wê hin bi hin zêdetir bibe û pêşbikeve. Ji deme Medîya ve, bi wê yekê pêşketineka teybet li Kurdistanê bûya. Minaq, herêmên farisan jî, wê pîr nîrxên ji wan herêman wê di wan de jî bicih bibin. Mirovên weke Firdewsî, wê piştre werina dinyê û wê di nab kurdan de di dergahên wan de mazin bibin û wê destan û vegotinên ku di nav kurdan de dihêne vegotin ên weke yên "Rûstemê Zal" û hwd, wê bi nivîsênin û wê di nav xalkê faris de jî bikin bi ew weke nîrxekê bicih bibin. Destana Rûstemê Zal, vegotineka ku ji jînbûyînan afirîya û ji jînbûyînen di demên berî demên musulmanatiyê de bûya. Ev vegotin, di deme Manî û bi vir de, bi yek dengî û awayê wê di nav civatan de werina vegotin. Ev jî, di aslê xwe de wê di afirîna di hiş û mejî de, wê pêşketinna bi mirov re bêne holê. Vegotineka weke vegotina "Şahmaran", "heft şev û heft rojan dihê vegotin û bidawî nabê", ji serî hate binî jiberkirina wê û di hiş û mejî de hiştina wê, ku mirov wê awayê zimên ê ku bi ser ve ku bi dem bi dem gelek pêvajoyên peresendinê bi mirov re buhurandina mirov fahm neke, mirov wê wê rewşê ji baş û qanc fahm neke. Mirov, xêvên xwe weke rûpelên nivîsandî ên pirtûkekê bi kar dihanîn.

Ji deme Manî, hate ku dem dihê deme Derketina musulmanetiye, hin demne oli bi wî re pêş dikevin û serwerî herême dibin. Ew dem jî, wê bi mirov re têgihîştinekê li gor demê bidîna afirandin. Di aslê xwe de ew têgihîştin û dem û pêvajoyên pêşketina, ku mirov wan bi têgihîştina wan re, weke hîmekî ji wê derketina musulmanetiye re ne binê, mirov wê bikeve şaşbûnekê de. Divêt ku mirov, ji wê re û ji derketina wê re, weke ku temen û hîmek bi wê demê re afirî jî, bêne ser ziman. Deme Manî, bi awayê pêşketina xwe re ji deme Medîya û Zerdeşt, ku ji wê demê û wî û hate wî, ku ew bi xwe re bi demê re bi pêşketinê ku bi wê têgihîştine re bûna, ku ew bi xwe re bi gotin dike û li ser wan re têgihîştina deme xwe ye nû diafirîne û deme nû, hizre wê û awayê têgihîştina wê di wê xatê de dihêne ser ziman, mirov divêt ku wî bibîne. Manî, bi vê yekê re, di berdemamiya xate bi Zerdeşt re de, ku demeka nû ya. Mirov karê wî wilo bêne ser ziman.

Manî bi vê yekê û awayê pêşketinê ê bi wî re û wê têgihîştina wî ye di deme wî de, hê ew pîr baş û li gor xwe ne hatîya fahmkirin. Ew, hê wilo ne hatîya derxistin li têgihîştinê. Lê wî, deme berî xwe pîr baş fahm kir. Nêzikatî, wê çawa bin, wî kir ku bi mirov re bide nîşandin. Da nîşandin jî. Wî, di aslê xwe de awayê pêşketinê ye ku hate roje me wê bi pergalfî bêt jînkirin, wî ew hanî ser ziman. Wî, ew xat hanî ser ziman. Bi vê yekê re, wê ji awayê têgihîştina ku di nav de mazin bûya, wî civak bi awayê wê re fahm kir. Wî, nirxbûn, derxista pêş. Li ser wê pîr mazin sekinî. Manî, bi jîyane xwe re hizrên xwe temem dike. Ew jîyane wî jî, weke aliyekî têgihîştina wî ye ku ew bi cerb û fêr dike ya. Di naqabîna jîyane wî û têgihîştina wî de, herikîna di jîyanê de di wê jînbûn heya. Ew, bi wê re dihêne ser ziman. Li gor wê jî, dijî. Bi vê yekê û awayê re, hizreka rastteqînîyê bi wê re bi têgihîştin heya. Di vir de, bi vê awayê, mirov divêt ku awayê rastteqînîya wî û hizre wî divêt ku bibîne û fahm bike. Manî, mirov tiştêkî pîr giring fahm dike, Ew jî, her weha ev e. Wî, di serî xwe de, ew cihane ku wê bi kevesopî û nirx û xalên xwe re were jînkirin, wî safî kirîya. Ew deme ku di hêne ser ziman, li wê dimeyîzêne û dihêne ser ziman. Bi wê vê yekê re, ew di xwe de ne bê temen û hîm e. W di serê xwe de, pîr baş û xweşik daya afirandin û her mirov bi ast û heyîna xwe re ku jin bê û mêt bê, cihê wan û bi qadrê wan re kifşkirîya. Ji ber vê yekê, ew di kirin û gavavêtinên xwe de ji xwe bi bawer e. Di kirinên xwe de bi bêgûman e. Ew jî, der û aste bi xwe re li mirov û civakê dimeyîzêne û dibîne. Bi vê yekê re, ew aste wî dihê ser ziman.

Civak, bi jînbûn û awayê jînbûna xwe re xwediyê heyîn û hebûnêka li berçav e. Manî wê dibîne. Zerdeşt jî, ew hanîya ser ziman. Ew, di nav wê aste de mazin dibe. Bi wê re li têgihîştina Zerdeşt dimeyîzêne. Manî, di wê demê de bi asteka nû li dora xwe bidest nerîne dike. Dere ku ew tere dinerê jî, ew gotin û hizrên Zerdeşt ên ku wî di serê xwe de bitêgihîştin bicihkirina na. Ew, di deme dîn ye nû û asteka dîn ye bilind de, vê carê li Zerdeşt û hizrên wî dimeyîzêne û bi wê re di serê xwe de digihê têgihîştina xwe di serê xwe de. Bi vê yekê re, ew pergalfîya civakî ye bi têgihîştina xwe re diafirîne. Manî, deme ku li dora xwe dinerê, biaqil û jîyanî dinerê. Bi vê yekê re, ew hizrên xwe yên ku wê pergalfîya wî ye civakî dihêna ser ziman, dihêne ser ziman. Manî, bi hem dîtina wî ye demê re û hem jî li gor demê wê çawa bê jînkirin û rastîya demê çiya fahmkirinê wî ya wê, wê aste wî biafirîne. Ew, civakîya ku dibîne, bi wê re olê dihêne ser ziman. Civaknasîyê, bi giringîyekê lê dinerê. Bi vê yekê re, di jîyanê de qûsandina civaknasîyê, ew rast nabîne. Li gor wî oldarî jî, di wê civaknasîyê de di gihîştina rastteqînîyê de wate wê dihê salixkirin. Bi vê yekê û awayê, ew dem bi wî re dihê jînkirin. Manî, di xweza û jîyanê de, naskirinê derdixe pêş. Naskirin, bitêgihîştinî li jîyanê nerîn e. Ew jî, wilo dibîne. Çendî jîyan dîtîn û pêde çûyin, wê di gihandina rastteqînîyê de nêzikîr bike. Wekî din jî, jîyan, bi qasî ku mirov ji wî û têgihîştina wî wê fahm dike, ew weke fêr û cerbîya têgihîştinê dibîne. Bi vê yekê re, ew li jîyanê dinerê. Manî, dem hate ku dihê deme derketina musulmanetiye, ew têgihîştina wî, wî têgihîştineka bizanî di jîyanê de bi mirov re bide afirandin. Bi wê pêşketina bi têgihîştin û deme wî re, wê di jîyanê de li gor demê û pêşketin û têgihîştina wê, wê pêşketinek biafirê. Musulmanetî, di deme derketinê de, wê ji wê têgihîştinê, pîr mazin sûd û fêr bigirê. Bi wê demê re awa û nirxên civaktiyê diafirin. Wê bi musulmanetiye re, demeka wê pêşketinê bi wan nirxan re bi pergale wê re were holê. Bi vê yekê re, em êdf ji nahaka pêde, deme musulmanetiye û hîm û pêşketine wê ye li herême bînina ser ziman. ..

Piştî hatina Îskenderê Zûrqrneyn e hatina wî ye li Kurdistanê, û çûna wî ye li ser kurdan û xwe spartina kurdan e li Zagrosan.

Ji vê demê hate ku dem dihê deme derketina musulmanetiyê, wê li herême, pêşketineka mazin bibe. Wê, pêşveçûnna mazin ên bitêgihîştin bibin. Di warê êqil û zanîne de, pêşketineka ku mirov li berçav dibîne heya. Di vê deme civaktiyê de, her weha pêşketinên bi êqil, êdî demeka êqil bi xwe re dihênin. Bi vê yekê re, êdî bi aqil hanîna li ser ziman di afirê. Musulmanetî, wê di wê demê de, weke pêvajoyeka nû bê. Herême, di wê demê de, bi Manî re pêşketina ku jin kirîya, ji binî ve di xwe de bi têgihîştin daya rûniştandin. Lê, di warê gelemperbûnê de Manî, çend ku li Kurdistanê û li herême persîya pêşketin û pêşveçûnna li berçav dijî jî, wê li herêmên din zeyif û kêmbimêne. Li nivgiraba araba pêşnekeve. Lê li nivgiraba araba jî, pêşketineka mazin ye ku bi mirov bi wê têgihîştina civaktiyê re bêne ser ziman heya. Çend ku ew pêşketin û pêşveçûn di nav xalkê de heya jî, di warê pergaltinê û her weha yekbûnê de, hê ew pêşveçûn nebûna. Lê, piştî wê deme Manî re, bi aqil weke ku lêgerînek heya. Li nivgiraba araba jî, demên berî wê, serwerîya misre kevn hebû. Lê li herême, di wan demên dawiyê de, êdî ew serwerîya wê jî, weke agirkî di tifikê de ku av bi ser de bê rijandin û bi wê re êdî bi bi mivirê lê tê. Li herême, wilo zêde serwerîya wê nemaya. Derketina împaratorîya Roma û hatina wê ye bi seferan li herême, wê demên pir dirêj bi serkirinên bi wê re wê herin. Hatina seferên hêzên romîyan, ne tenê ji bo serwerî û serdestiyê dihêne herême. Ji xaynî wê jî, ji bo gilahan(talan) dihêne herême. Herêmên rojhilat, weke misre kevn, Şam, Riha, Ber diclê û hwd, hê bi gelek der û deverên xwe re xwediyên dewlemendîyeka pir mazin in. Her herêmeke ji bo wan ku ew bi hêzî wê têk bibin, ji wan pir pir gilahana wê hebû. Lê bi wê nerîne li herême dihê meyazendin û nerfîn. Roma, hêzên wê yên ku dihêne herême, wê li herême, ne tenê bi misre kevn re li herême ku hate wê demê hê jî bi kurdan re xwediyê serwerî û serdestiyeka pir mazin e, wê bi Sasanîyan re jî şer û pevçûnna pir mazin bikin. Herêma xalkên wê, bi van şer û pevçûnan re demne pir dirêj di buhurênin. Ji demên berî zayîne ji sadsalên 3. min û pê de, hêrişên li heemê hene. Keyên romîyan, di her demê de ku fersand ji xwe re dîtina, berê xwe dana herême û li ser herême xwestina ku bibina xwedî serwerî û bandûr. Li Rojhilat û Anatolîa, demne wan keyên romîyan ên şer li van herêman ên pir dirêj hene. Ji demên berî zayîne ji deme keyê Romî Theodosius û bi vir de, seferên li herême ên wan yên ku dibin na sekin in. Deme Keyê Romî Sezar de, hate bi misre seferên wan dibin. Çend ku li gelek herêmên ku ew û hêzên wî tere diçin, gelek xurûxandin û kevilkirin jî dihêne kirin bi destê wan, lê disa nikarin li herême bi serdestiyeka xwegirtî bibina serwer. Weke Theodosius Îskenderê Zûrqrneyn jî dihê herême û li herême serwerîyeka wî ye bi hêzê wî diafirê dibe. Lê ew jî, nikarê xwe bigirê. Mirovên herême, zanebûna wan heya û pirr li serbestî û azadîya xwe dihizirin. Çend, ku weke Roma, Îskenderê Zûrqrneyn jî, xwediyê hêzeka mazzin bûya jî, nebûya xwediyê demeka demdirêj li herême xwedî serdestî û serwerî. Deme ku Îskenderê Zûrqrneyn dihê Kurdistanê, ji aliyekî dikeyiyê de û li aliyê di ve derdikeve. Lê disa, ew nabê xwedî serwerî û serdestî li Kurdistanê. Kurd, deme ku hêzên wan yên biadil û sazûman in têk diçin, êdî yên ku sax difilitin jî, digihina hevdu û bi hev re xwe dispêrina çiyayên Zagrosan. Îskenderê Zûrqrneyn, li wir dixwezê ku herê bi ser wan de. Bi hêzên xwe re diçê ku herê Zagrosan. Lê ew, li Zagrosan li ber hêzên kurdan ên ku sax filitîna, tene bertêkçûnê. Kur dikin û nakin, nikarin herina wir û mirovên di Zagrosan de bidest bixin. Li wir, cara pêşî vîna Îskenderê Zûrqrneyn weke ku derbeyê dixwe. Piştê bi wê deroniyê, bê ku ti ancamê li Zagrosan bidest bixê di vegehihê. Kurdan, ji ber wê hîrsa wî ye bidest xistinê û zilmdarîya wî, navê "Zûrqrneyn" lêkirin. Êdî wan jê re got, "Îskenderê Zûrqrneyn". Piştê jî hertimî ku ew hate bi bîr hanîna, bi vî navî di nav kurdan de hate bi bîr hanîna. Van dem û sefer û şer û pevçûnên ku li herême bûn, herêma hanîna ber kevilkirinê. Piştê jî, wê ev rewş berdewam bikin. Ku mirov, i ro jî, li herêma dinerê, mirov hin hêrişna bi heman awayê dibîne. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew ser du hezar salan re ya herêma, bi şer û pevçûnan re ya. Wê, di wê deme Manî de jî, ev hêriş bibin. Ji deme Manî û hate hatina deme derketina musulmanetiyê, wê pir hêriş û şerên mazin wê bibi. Hêzên roma, li herême na û li herême dikeyina şerên gilahî de.

DERKETINA MUSULMANATIYÊ

Di vê demê de derketina musulmanetiye li herême, wê weke hestekte azadîye û serwerîye jî, li ber van rewşan biafirêne. Herême, wê bi wê olê û pergale wê, wê bigihê xwe di deme xwe de. Yekbûnek, wê bi wê pergale olî, wê di nav xalkên herême de wê biafirê. Ev jî, wê hêzeka mazin ye herêmi bi afirêne. Li ber hêrişên ku li herême dibin, wê bi derketina musulmanetiye re, ji wê yekbûnê, wê hêzeka mazin ye artişî jî bê afirandin. Li herême, wê serweriya herême bi wê hêze bikeve destê herême de. Herême, piştî demeka dirêj, bi wê re, weke ku êdî digihê rastiya xwe ye dîrokî û li gor xwe. ..

Li herême, wê bi wê yekê re, di demeke kin de pir zû musulmanetî pêş bikeve û bê hêzek. Wê hêzeka wê ye împaratorî jî, wê biafirê. Li ber hêzên împaratorî ên ku hene, ew jî, digihê asteka wilo weke ye wan. Hate wê demê, Filehî jî, ji aliyê rêveberî û desthilatdariya roma ve hatiya pejirandin û bûya oleka fermî. Bi wê yekê re, xalkîtiya wan ku çibin, hate wê deme derketina musulmanetiye, pir rêveberên fileh derdikevina holê. Di desthilatdariye de ku ne lev jî bin, di hizir û heste oltîye de yek in. Bi vê yekê re, yekbûneka ku ser qadeka pir mazin û fireh afirîya dihê holê. Musulmanetî, ji bi derketina wê re, wê li herêmen rojhilat heman awayê bide afirandin. Musulmanetî, li ber wê rewşa seferên hêzên ji derve ên li herême dibin û li ber kevnepereştiya herême e ku ji rêveberiyên afirîya, weke hêz û têngiştineka demî ye nû û şoraşger dihêholê û diafirê. Bi vê yekê re ew deme civakiye e ku afirîya e berî musulmanetiye e li herême, wê temen û hîmê wê ye derketinê li herême biafirêne. Wê desthilatdariya herême e giştî bi têngiştin û awayekî nû, wê bi wê re biafirê. Bi derketin û bûna hêz e musulmanetiye re, li herême, wê di nav kevnepereştiya civakiye ya ku afirîya ye xalkî û têngiştina holî ya ku bi awayekî dihêholê, wê şer derkeve. Li herême, di deme hatina wê ye li Kurdistanê de di naqabîna musulmanetiye û êzîdîtiye de, pevçûnên ku rû didin, wê weke ancama vê bin.

Di aslê xwe de, musulmanetî, bi têngiştina wê ye ku Hz. Muhammed hanîya li ser ziman, hemû beşên civakên hibêz kirina. Lê ew têngiştina wî, piştî wî re bi peyamên wî re baş ne hatina fahm kirin û piştre bi vê yekê re êdî şer û pevçûn rû dana. Hz. Muhammed, bawer dikir ku 'ti mirov, ne li ser ti mirovî re ya' û 'ti xalk, ne li ser ti xalkî re ya'. Bi vê yekê, wî qadrek da mirov. Hate wê demê, ew koladariya ku hê ji deme Misre kevn li herême maya, wî şermazar kir û koladarî rakir. Bi vê yekê re, li rojava, ew koladariya ku di sadsalên 17. min û 18. min de hate ji holê rakirin, di wê demê de bi musulmanetiye re hate rakirin. Di wê demê de, hê ku ji deme Misre kevn maya, zaroyên keç sax dihatina binaxkirin. Wî, ev jî şermazar kir. Bi vê yekê re jî, wekhevîyak di naqabîna jin û mêr de hanî ser ziman. Lê ev herdu peyamên wî jî, baş ne hatina fahm kirin. Piştre, rêveberan ji xwe re "herem" dana avakirin û tişî keç û jin kirin. Ev rewş, çend ku cihê wê di musulmanetiye de nebû, ne hate şermazar kirin û piştre weke tiştekî ji rêze hate dîtin. Yê ku ew herem avakirin, ji bo ku xwe rast derxin, hewldan ku wê rewşê bi olê re jî bîna ser ziman. Ji ber ku rêveber û serdest jî bûn, ev kirina wan, li ber ne hate sekin in. Bi vê yekê re, pêşketin û pêşveçûnên ku dîroka musulmanetiye jî nivîsandin di demên piştî Hz, Muhammed de, bi rêveberan û hêza wan û bi wê kifşariya hêze wan hate nivîsandin. Dîroka rêveberiyên, bû dîroka olê û derket li herême. Bi vê yekê re, ew dîroka hizir e olî jî, êdî piştre bi van pêşveçûnan re ne hate dîtin û ser ziman. Yê ku piştre hanîna li ser ziman jî, di çerçova û pencere rêveberan de meyzindin û hanî li ser ziman. Lê di aslê xwe de, ew dîroka olê ye paqij, hê weke xwe ya û hê li bendî hatina xwe ya li ser ziman e. Hê ne hatiya li ser ziman. Ew, dîrok, hestên mirov ên di dîrokê de ên ku pêşketina di xwe de dihêne ser ziman. Rêz û hûmretên mirovan e li ber hevdu û li ber bawerîya hevdu, di wê dîrokê de heya û hê jî, li ber hatina wê ye li ser ziman e. Bi vê yekê re, divêt ku ji nû ve were nivîsandin û ser ziman. Rojhilat, ev rastî, ji wê î ro, ji her demê bêhtirî pêdivîya wê pê heya. Di dîrokê de, Salahadinê Eyûbî, çiqasî û çendî hatiya fahmkirin? Ew, dîroka herême ye olî jî, aliyekî wê bi xwe re dihêne ser ziman. Hate ku dem dihê deme wî, demek pir mazin li ser dîroka herême û pêşveçûn û pêşketinên pergale olî ye ku ji nû ve afirîya re jî diçet. ..

Ji destpêkê, hate wê demê, weke demeka nû ya civakiye dibuhurê. Ev dema nû, êdî divêt ku li gor xwe û xoslet û teybetmendiyên xwe were fahmkirin û ser ziman. Demek, bi wê re li berdicle jî dihê girtin û ye dihê vekirin. Bi vê re, ew pêşketinên berî wê deme derketina musulmanetiye bi

kifşkirinên wan re ew dîroka herêmê û wê deme nû dihê holê, êdî divêt ku mirov werêne ser ziman.

Weke demeka nû musulmanetî û destpêka wê û pêşketina wê e li Kurdistanê

Piştî derketina musulmanetiyê re, pêvajoya ku li herêmê bi vê yekê û awayê dest pê kir, piştê hin bi hin pêşve çû. Rêveberiyên herêmê, di wan demên pêşveçûnê de derketina pêş. Hizrên xwe derxistina pêş. Bawerîya olî ya ku afirî bû, li gor wê awayê afirandin û pergaliya civakî li gor wê bi awayekî rêveberîya di herêmên xwe re afirandin. Piştê hin bi hin, ew serwerbûna wan kur bû û mazin bû. Lê bi vê yekê re, ew pêşketin û pêşveçûna ku bi xalkan re di wê demê de were jînkirin jî, li wê awayê rêveberiyê ê desthilatdarîya aliqî û ma sekinî di cihê de û bi pêş ve neçû. Herêm, bi vê yekê re, kete demeka nû de. Di deme Musulmanetiyê de jî aliye hizrî ve li Kurdistanê hin pêşketinên nû rûdan. Li Kurdistanê, di wê demê de hin mirovên bizane ên weke Weysel Qaranî derketin û tégihîştina bi awayê jîyane xwe û hizrên xwe yên hanîn li ser ziman dana afirandin. Weysel qaranî, di aslê xwe de zanistekî kurd ê deme berî deme derketina musulmanetiyê bû. Piştî ku musulmanetî derket, li Kurdistanê jî mirovên zane ên ku pêşî musulmanetî herê kirina, ew yek jî wan bû. Berî wê demê jî, Weysel qaranî hebû. Di deme berî deme musulmanetiyê û derketina wê de, ew mirovekî ku bi serxwe û bi maldinyeyî bû. Ew maldinyeyîya wî, piştê wî dev jê qaraha û wê xwe da jîyanê û tégihîştina wê ye ku ew bêne ser ziman. Di aslê xwe de, mirovên weke Weysel qaranî ên din jî hebûn. Hemû jî, rêzan û rêveberê pergale olî e li Kurdistanê ku bi kevneşopî yê êzîdîyê bûn. Lê piştê li gor wê deme nû guharîn û di nav civakî û pêşketina wê de bi kevneşopîya wê re li gor deme musulmanetiyê bidest hanîna li ser ziman kirin. Bi vê yekê re, pêşavaniya wan, di deme olî ye musulmanetiyê ye de jî bi wan re berdeham kir. Hizrên wan yên ku wan hanîna li ser ziman û di civatên di nav xalkê de hatina bihîstin hene. Ew di aqîlan de dimênin û nayêna jî birkirin û li ser navê wan, piştê di civatên ku dihêne li dar xistin jî, dihêne vegotin jî mirovan re. Bi vê yekê re, jîyane xalkê bi awayê xwe re bi deme nû re berdeham dike. Lê demek bi ser wê deme re diçê hate pêşketinên bi wê re yên ku dibin xwe didina nîşandin. Di buhurtina deme musulmanetiyê de, Kurdistan herême ku herî zoriyê dikişêne ya. Ji ber ku ew berî hatina musulmanetiyê, ew bi pergaliya Êzîdîyê xwediyê pergaliyeka mazin ye bi xwe re ya. Pergaliya wan, di tégihîştin û awayê xwe de nekemî pergale deme nû ye musulmanetiyê ya. Mirov karê vê yekê jî her weha bi teybet bêne ser ziman.

Li Kurdistanê, hate wê demê civatbûn hene. Ew civatbûn, bi sazî na. Ew sazî olî na. Di wan sazîyan de mirovên oldar ê serok li pêş e. Di wan civatbûnan de perwerdehiya mirovan li gor nirxên xalkê û di demê de weke ku pêş dikeve li gor civaktiyê dihê dayîn. Di deme musulmanetiyê de, ew civatbûnên di cihên pîroz de, weke sazîna teybet werina holê û bi afirin û wê deme musulmanetiyê de bi navê "dergahan" wê derkevina pêş. Dergah, temenê wan li ser civatbûnê diafirê. Mirovên oldar ên li pêş, mal û kargahên wan di levcivînen bi wî rengî dibina destpêk. Wê piştê, ew, weke sazîyan biafirin û derkevina pêş. Di Êzîdîyê de, cihên bergkirinê û "şêx" hebûn. Ew şêx, wê di deme di deme musulmanetiyê de heyîn û hebûna xwe bi perezên. Şêx, serokê olî ê "rûhani" bû. Gotinên wî, kifşkirina pêşketinên di olê de dide kirin. Ew serokê olî ê civakê ya. Mirovên jî nav xalkê, hemû jî, bawerîya bi wan re dihênin û bi wan ve xwe girêdidin. Ev girêdan, li Kurdistanê, weke ku berî musulmanetiyê ku di ola Êzîdîyê bi "koçek"tiyê di hate ser ziman, wê di deme musulmanetiyê de jî, ew koçektî hebe. Koçektî, wê bi awayê giradaniya xwe re dergahan bi şêx re biafirênin û derxina li pêş. Her herêmek, weke ku çawa ku di mîrê wê hebû bi kevneşopî bû, wê bi heman awayê şêxê wê jî bi afirê û were holê û bibe serokê civakî ê olî ku herkesek li gotina dihisêne. Bi vê yekê re, wê koçektî, di musulmanetiyê de bicih bibe. Heyîn û hebûna koçektiyê, divêt ku mirov wê baş û qanc fahm bike. Bi wê re, di aslê xwe de, bi kevneşopî hiyererşiyeka ku bi pergale olî afirîya dihêne ser ziman. Bi wê hiyererşiyê re, girêdanbûn ya bi olê û koma xwe ya xalkî ve dihêne ser ziman. Bi vî yekê re, ev gotina koçektiyê di aslê xwe de dem bi dem ku pêşketiya û bi ber roje me ve hatiya hiyererşiyekê bi pêşketin û pergaliya wê re dihêne ser ziman. Li Kurdistanê, temenê wê yekê bêhtirî heya. Ji deme Nebî Nuh ve, her weh bi kevneşopî, hanîna li ser ziman e bi koçektî heya. Piştê wê di demên piştê û bi

mirovên weke weke Birehîm xelîl we berdewam bike. Deme Nebî Nuh deme ku dihê ser ziman, gotina "xalkê wî" di vê çerçovê de dihê ser ziman. Li Kurdistanê li Cizirê ev rewş û têgihîştin bi kevneşopî û hizrên xwe re hate roje me jî hatina.

Di deme musulmanetiye de, wê piştî derketina wê de bi çend serdeman re wê musulmanetî, wê bê olek ji olên li Kurdistanê. Hate deme Musulmanetiye û derketina wê, ku Êzîdîtî, ola kurdan ye giştîkên wan hemûyan bû, wê piştê bi çend serdeman re musulmanetî pirraniyê bi dest bixê û li Kurdistanê pêş bikeve. Dergahên ku me bahse wan kir jî, wê di wê pêşketin û pêşveçûna musulmanetiye ye li Kurdistanê de bina sazîna ji hîm û wê pêş dixin in. Kurdistan, di deme musulmanetiye de wê rêveberîya xwe bi desthildarî ye mazin wê pêşî bi Şadadiyan re biavakirin û piştê wê bi Merwenîyan re bide berdewam kirin. Piştê wê ast û radeya xwe wê bi asta ku Salahadinê Eyûbî gihiştîyê re wê mazin bike. Salahadinê Eyûbî, piştî deme Medîya re deme wî ya ku gihiştîya asta împaratoriye ya duyemin e. Berî deme Medîya re jî, bi Gûtîyan re heya û mirov karê ji wan jî bi wir de bi deme Mîtanî û Urîyan ve herê û bêne ser ziman. Deme Naîrîyan, demeka pir girîng e. Lê di deme musulmanetiye de deme ku Kurdan serdestîya mazin li herêmê bidest xist ye li salahadinê Eyûbî ya. Ji ber vê yekê deme Salahadinê Eyûbî, jî aliye pêşketin û pêşveçûnên wê deme ve girîngiyeka wê pir girîng heya. Di deme civaktiye de pêşketin bi têgihîştinê re diafirê. Dem bi dem ku pêşketin di hizir de derketa asteka mazin ye nû ye bilind li ser ye asta ku heya re, wê hingî, pêşketin bibe. Bi vê yekê re, mirov karê wê demê wilo bêne ser ziman. Di deme Merwenîyan de, wê zanistên kurd ên deme ku li herêmê bigiştî bandûreka wan ye mazin dibe ên weke Êlî Herîrî wê derkevin. Divêt ku em wan bi teybet li gor bandûrkirina wan bînina li ser ziman. ..

Di vê deme nû de zanistê kurd Êlî Herîrî, pêşketina wî ye bi têgihîştina wî re, û têkêçûna pergale giştî e Kurdistanê e Êzîdîtîyê û hewldanên xwegirtinî ser lingan ên giştî ên kurdan bi Merwenîyan re li Kurdistanê

Êlî Herîrî, di vir de, ku mirov bahse wî bike, divêt ku mirov hinekî pir mazin bahse wî bike. Ew, bavê û kalkên wî şêxên dergahê na. Ew jî, di deme xwe de ku mazin dibe û balixdibe bi keseyetî û zanebûna re, êdî wê navê wî zanebûna wî bi nav û dengê re derkeve derwî sinorê Kurdistanê. Merwenîyan, di deme xwe ye zêr de di naqabîna 895-1077 û wan de, wê bandûra wan bigihê hate herêmên weke Şamê wan bixwe jî. Ev herêm, wê bi bandûra wan, wê mazin bibe. Êlî Herîrî bixwe jî, wî xwe gihandîya wir û li wir demekê jê maya. Zanebûna wî, di awayê pêşketine deme wî de bi bandûr bûya. Hizrên wî yên ku wî hanîna li ser ziman û gotinên ku ew dihêne ser ziman, wê têgihîştina civakî ye demê biafirênin. Di hanîna li ser ziman de, awayê Êlî Herîrî, bi awayekî wêjeyî ya. Bi vê yekê re, di reng dayîna gotinê de, ew wê pêşketinekê di deme xwe de bide kirin. Di levhanî û xweşik vegotinê de, wê Êlî Herîrî bê astak di nava xalkê de di nav civake kurd de. Piştî wî re, ev gotina ku yekî dixwest ku xweşik levbêne û bêne û jê re digotin wê hizrekê ji bo têgihîştin û bandûra Êlî Herîrî ye li ser civake kurd bide me. Deme ku yek pir xweşik axift û hanî ser ziman jê re dihate gotin "Te î ro, herîrtîyak da nişandin". Ev gotin, hate roje me jî li dora Cizirê û wan deran dihate gotin. Di deme ku me lêkolînên xwe li ser vê mijare xwe kirin, mirovên ku pîr û kal ên ku bi zane ên ku em bi wan re axiftin, ev gotin bi baldariyekê ku bala me bikişênina li ser ji me re hanîna ser ziman. Vê yekê, hingî pir bala me kişand û deme ku me bi wê balkişandinê bidest lêkolîne kir, me dît ku di çî wateyê dihê vegotin. Hingî me jî gotinê jî, baş û qanc fahm kir ku çendî bandûreka Êlî Herîrî ye mayînda li ser civakê û pêşketina wê ye demê bûya û ew bandûr, piştê hate deme me bi hin awayna gotinî hatîya. Di deme ku dihate gotin ku 'te î ro, herîrtîyak da nişandin', dihate vegotin ku di levhanî û wate kirin de bi zanebûnekê hanîya ser ziman. Di vê gotinê de, di deme ku hate gotin de, me deronîyeka pir bizanebûn jê girt. Em, divêt ku vê jê bi teybet bînina ser ziman. Ji ber ku ew jî, bi serê xwe di xwe de têgihîştineka ku afirîya di nav xalkê de dihêne ser ziman. Bi têgihîştina û zanîna Êlî Herîrî re, demek di buhurê. Bandûra wî, bi zanebûna wî re û wê zimanherîkîniya wê re jî sinorê kurdistanê derbas dibe. Di deme wî de, bi rêveberî li Kurdistanê, rêveberîyeka weke Merwenîyan ku deme xwe ye xurt dijt heya. Li Kurdistanê, ev dem, bi serê xwe û pêşketinê bi xwe re divêt ku werina dahûrkirin û ser

ziman. Ji ber ku ew dem, asteka wê ye demî heya. Wê piştê ew dem, bê temenek ji demên piştê ên ku diafirin ji demên weke yê derketina Salahadîne Eyûbî re. Di wê demê de, herêm bi herêm rêveberî hatina avakirin û di nav wan de yekbûneka herêmê hatîya afirandin. Her herêm, mîr û herême wî heya. Ev mîrî û herêmîya wî ye ku bi wî ve girêdayî heya, wê ew bi herêm bi herêmîyê xwe biafirîne û bêne holê.

Li Kurdistanê, ku mirov wê demê bêne ser ziman, mirov wê ji gelek aliyan ve wê bêne ser ziman. Bi teybetî, ji aliye pêşketin û pêşveçûnê wê yê ku bûn ve mirov wê bêne ser ziman. Pir pêşveçûn di wê demê de li Kurdistanê dibin. Piştî hatina musulmanetiye, pergale olî ye ku heya bi Êzîdiye re bi qalîkê xwe re dimêne, lê rengê xwe di guharêne. Rengê wê ye deme, musulmanetiya. Wê ew pergale, bandûra wê, li herêmên din ên dervî Kurdistanê jî, bandûra wan hebe. Weke ku di nav kurdan de, ew rêxistinbûna wê heya, ji ber ku fars jî bi wan dijîn, di nav wan de jî rêxistinîyeka wê heya. Lê fars, hertimî, di temenê cudabûneka ku ew xwe ji wê nabînin de tevdiagerihîn. Lê bê wê jî gavavetina wan nabê. Bi wê re tevdiagerihîn. Bi nîrxên wê re xwe û demên xwe diafirênin. Bi vê yekê re, mirov karê wan jî bêne ser ziman. Di nav araban de, çend hinekî bandûra pergaliya Êzîdiye heya jî, mirov nikarê wê weke mijareka li berçav bêne ser ziman. Bi teybetî, bandûra Misre kevn li ser nîvgirava araba pir mazin heya. Ji deme Misre kevn ve pergalebûnek heya. Demên Firawûnan, di aslê xwe de bi bandûra wan de ji demên wan ku hate ku dihê wan demên derketina musulmanetiye jî, mirov divêt ku bi dahûr bike û bêne ser ziman. Bandûra wê pergale wan ye ku wan afirandiya û pîrozkirin û pîrozî bi xwe re bi keseyetiya xwe re hanîna ser ziman, mirov wê dibîne. Li Rojhilat, bi vê yekê re ku li ber Diclê û Firatê û li ber Nilê li Misre kevn, ji demên piştî demên Sumeriyan û bi vir ve, mirov dibîne ku bi vê yekê re di du xatên pergale de bi awayekî şaristanî pêşketin dibe. Xatek, wê bi Misre kevn û pêşketina wê re heyîn û hebûna wê bibe û dest pê bike û heyîna xwe bi demê re bide berdewam kirin. Wê, di herêmeka pir mazin de bandûra wan firawûnan û tégihîştin û pergale wan hebe. Li ber diclê û firatê jî, ji ya wir cuda, wê xateka pêşketinê e bi şaristanî û bi pergale wê heyîna wê bi berdewam bê. Ji demên sumerîyan ve wê berdewam bûn hebe. Di aslê xwe de, mirov nikarê pêşketina misre kevn, ji temen ji wê pêşketina li ber diclê ku bûna cuda bêne ser ziman. Piştî demeke pêşketinê re, wê ji aliyekî ve ji berdiclê wê bandûrkirina zanîne li wan herêma bê kirin. Mirovên zane, wê herina wanderan û di nav xalkê de bîna ser ziman, wê di afirandina wê de bîna ser ziman. Di serî de Misre kevn, weke welatiyekê pêş dikeve. Piştê, deme ku ew digihê wê aste xwe ye weke ku ye împaratoriye jî, wê ji wê astê xilas nebe. Sînorê wê, di wê astê de ya. Weke ku di deme sumerîyan de dibûn û di hate ser ziman, key ku xwe xwûda di denezandin û piştî mirina wan re ji wan re parastgah di hate çekirin, wê rewşeka wilo lê ku hê bi awayekî xwe ye teybet ku hatîya pêşxistin wê li wir pêş bikeve û pergalebûna Misre kevn bi afirîne. Li ber diclê, tégihîştina xwûdatiye heya û derketiyan azmana. Pergale olî ye Êzîdiye ku dîroka bûna hate demên berî zayîne ên 3 hezar salan diçê û hê jî jê di buhurê, mirov karê weke awayê pêşketina li berdiclê bêne ser ziman. Di aslê xwe de, Êzîdî, î ro, di derbarê dîrok û pêşketin û pêşveçûnê wê yê wan ve em ne zêde bi agahî na. Hê ew demên wê, demne ku werina rohnîkirin in. Lê ew destpêka wê, weke destpêka olên yek-xwûdayî mirov karê bêne ser ziman. Êzîdiye, mirov karê weke ola yek-xwûdatî ye herî pêşî bêne ser ziman. Berî wê, deme Nebî Nuh heya. Dihê vegotin, ku deme ku Nebî Nuh diçê ser dilovanîya, dibêje ku êdî wê ol û pêxember werina dinyê û rê şanî mirov bidin. Ev, weke peyemake ji wî di nav kurdan de hate î ro jî, bi rêz û pîrozî di hê vegotin. Di vî de, di deme vegotinê de, bahse baxtewerîyê jî di hê kirin. Mirov, wê di demên xwe ye piştê ên jîyanê de wê çî û çawa bijî jî, di hê vegotin ku hatîya kifşkirin. Bi vê re di hê vegotin, "çendî ku mirov di riya qancîyê de bimeşê, wê di wê xate baxtewerîya ye ku ji bo wî hatîya kifşkirin de wê bimeşê". Ev jî, bi wê re di hê vegotin. Piştê hatîna Êzîdiye di hê vegotin. Hatîna wê di hê vegotin. Bahse yek-xwûdatîya wê di hê kirin. Dojeh û bihuşt, bûna wan, di hê ser ziman. Dîroka ola Êzîdiye, wê bi hezar salan berdewam bike. Hate derketina deme musulmanetiye wê heyîna wê berdewam bike. Êzîdî, bi heyîn û hebûna xwe re, wê pergaliya li ber diclê bêne ser ziman. Bi musulmanetiye re, di aslê xwe de li gelemperîya herêmê ku nîvgirava araba jî di nav de, wê

hewldaneka serwerîya wê pergaliya li ber diclê û têgihîştina wê were holê. Çendî bi serket û bi serneket û pêk hat û çendî pêk ne hat jî, ew jî mijareka din e.

Bi hezar salan, wê kevneşopiyên herêmê bi wê pergale re biafirin. Nirxên wê, wê werina holê. Pêşketinên ku bibin, wê bi têgihîştina bi wê re wê bibin. Bi vê yekê re, wê afirandin bibe. Bawerî û aqil, têgihîştin û kevneşopî, wê bi hev re wê pergale bi deman re biafirênin.

Bi vê yekê re, wê hate wê deme derketina musulmanetiye wê mirovên zane ên oldar wê civakê biafirênin û bi rê ve bibin. Di deme musulmanetiye de, weke ku me li jor bi Êlî Herîrî re hanî ser ziman, wê zanistên civakî derkevin û bi hizrên xwe re êdî di demên civakiye de wê birêvebûnê bikin. Di deme musulmanetiye de mirovên weke Weysel qaranî û Êlî herîrî ên zanist, wê têgihîştinekê bidina afirandin. Piştî Wan re jî, wê mirovên weke Teymiye Harranî derkevin û pêşavaniyeka civakî bikin. Wê di perwerdekirina civakê e li gor demê de weyke wan hebe. Teymiye harranî bixwe jî, ji kevneşopîya malbatîtiye şêxê dergahê ya. Li dergaha wî, pir mirovên u perwerde dibin hene. Hizrên wî yên ku ew dihêne ser ziman, wê di wê perwerdebûnê de bibe xwedî weyn. Şêx Teymiye Harranî, zanistekî kurd ê ku nav û dengê wî bi zanebûna wî re ji sinorê Kurdistanê buhurîya ya. Di cihane Îslamê de, ew bûya xwedî nav û deng. Hate ku dem dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran wê li Kurdistanê bi vî awayî wê hê pir mirovên zane di nav civatê de derkevin. Pêşavaniya wan, wê di civatan de di perwerdekirina civakê de xwe bide nişandin. Lê dem, hate ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê pêşketin û pêşveçûna pir mazin bibin. Wê civak, ji gelek aliyên xwe ve li gor demê bi zanebûnê bê.

Demên civakiye ên hate wê demê, wê bi astên têgihîştinê di afirin. Heyîna astên têgihîştin, wê dem bi dem ye dem ye ku diafirê wê li ser ye demên buhurî re bê. Lê wê yên deme buhurî jî, bike temen û hîm ji xwe re. Li Kurdistanê, têgihîştin, bi kevneşopîye aliyekî wê ye ku şênber dibû hebû. Ji ber vê yekê, di vir de, divêt ku mirov pêşî çend gotinan bi têgihîştinê bi kevneşopîye ve girêdayî bînina ser ziman. Li Kurdistanê, civatên ku hertimî di wan de levcivîn dibûn û di wan re bi hev re danûstandin dibû, wê di wan de hertimî hatineka bizane ye li ser ziman bûba. Ew hatina li ser ziman, wê ne hatiba ji bîr kirin. Piştê di civatên din yênkû dihatina li darxistin de, wê weke vegotinên dûvdirêj, wê bihatan vegotin ji mirovên li civatê re. Ev yek, weke kevneşopîyekê bû. Civatên mîr û yên di nav xalkê de, di wan de hatina li ser ziman, ku çî bihate ser ziman, wê ne hatiba ji bîr kirin. Kurd, bi vê yekê re, xwedîyê birkirineka pir xurt in. Di hiş de hiştin, bi wan re pir xurt a. Ev jî, weke kevneşopîyeka civatan di hate ser ziman. Her hizra ku di civatan de di hate ser ziman, wê di nav girseyên gel de di demeka kin de bihatan bihîstin. Bi hatina bihîstinê re, wê ew hizra ku hatibû ser ziman, wê bûba malê girseyên civakî. Bi vê yekê re, wê gelemperbûn jî, bihizîrî wê biafirîyana. Gelemperbûn, awayê civakê dihêne holê bi têgihîştinê re. Hate ku dem dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê bi vê yekê re li gor demê pir mazin gelemperbûnek biafirîyana. Di aslê xwe de, ew gelemperbûn, berî hingî li Kurdistanê bûya. Lê bi wê rengê demê re bûna wê, êdî dibe û pêş dikeve. Wê di vê demê de, bi vê yekê re ew bibe. Hate ku dem dihê deme meleyê Cizîrî, wê piştî rêveberîya Merwerîyan, wê "rêveberîya Eyûbîyan" li Kurdistanê bibe desthilidar û xwedî hukûm. Bi wan re rêveberîya Eyûbîyan û xanadana wan re, wê demeke dirêj biafirê. Bi wan re, wê pêşketinna mazin li gelemperîya herême rojhilat bi hev re bi rê ve herin. Sahaladîne Eyûbî, di cihane Îslamê de yekbûnekê bi desthiladariye diafirêne. Lê di wê demê de, derketin û pêşketin mezhebe şîtiye jî heya. Ew jî, weke aliyekî cihane Îslamê ê din dihê holê. Bi wê re wê du navendên xalîfatiye jî biafirin. Di deme Salahadîne de, ew diçe ser Baxdayê de û li wir rêveberîya ku heya dide ardê û yeke li gor cihane Îslamê ye mazin ye ku heya dide avakirin. Bi vê yekê re, ew dixwezê ku ahangekê bi yekbûnê bide çêkirin di cihane Îslamê de. Hate derekê bi ser jî dikeve. Lê piştî wî re, rêveberiyên herêmê derdikevin pêş. Salahadîne Eyûbî, di aslê xwe de li gor demê hîmekî nû jî dide afirandin. Bi têgihîştina wî re, weke ku awayekî xwenûkirinê di deme wî de di cihane Îslamê de xwe dide der. Li Kurdistanê, ji wê demê hate ku dem dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê pêşketineka civatî ye pir mazin biafirê bi musulmanetiye re. Lê wê, pergale din ên olî ên weke yên Êzîdiye jî wê ji holê ne rabin. Ew jî, wê heyîna xwe bidina berdewam kirin. Lê wê, bi hertimî bi çûndineka bi ser wan ve e ji aliyê rêveberîya ve wê heyîna wan xwe bidina berdewam kirin. Di vê demê de, derketina Osmanîyan û

serwerbûna wan, wê demeke nû ye ku bi ber reşîyê ve dikişêne wê werêne holê. Ji vir pêde, divêt ku em êdî wê bënina ser ziman.

Li Kurdistanê, hate ku dem dihê wê demê, wê hin pêşketin û pêşveçûnên demî ên pir mazin bibin. Li Kurdistanê, ew pêşketinên ku dibin, divêt ku mirov wan jî fahm bike. Ku mirov deme Merwenîyan, wê baş û qanc fahm neke, mirov wê wê demê jî baş fahm neke. Di vir de, em hinekî ji wê demê bi çend gavan bi şûn ve herin û herina deme Merwenîyan û ji wê demê û pêşketinên wê hinekî bënina ser ziman. Ev, wê di fahmkirina wê dema ku êdî bi zanistên weke Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran re bikeve demeka xwe ya nû de, mirov wê êdî baştir û qancdir fahm bike. Hin pêşketinên ku di wê demê de dibin, ji temen ve bi wê ve demê ve girêdayî na. Ji wê jî zêdetir, pêşketinên wê demê ên li Kurdistanê ku dibin, ku mirov hewl bide û wan bêne ser ziman, dem bi dem bi hatina wan ye li ser ziman, wê fahm kirin baş bibe. Lê di vir de, divêt ku ew bi dem bi dem hatina demên pêşketin ên pêşketin û pêşveçûnan li dûvhevdû hatina wan ye li ser ziman, di temenê pêşketina civatê de, bi awayekî peresendinî dibê û divêt ku mirov jî wê wilo bêne ser ziman. Bi wê yekê re, weke ku me di bêşên din ên dahûrkirina xwe de jî hanî ser ziman, kevneşopî fahmkirina wê giringiyeka wê ye dîrokî di vir de heya. Divêt ku mirov wê yekê jî bi teybet bêne ser ziman. Ew kevneşopîya kurdan, bi pergali, xwediyê heyîneka bi xwe re ya. Mirov, wê jî dibîne. Di wê deme ku em bi dahûrkirinê hatinê û gihîştinê de ye dema Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran û hwd, demeka ku êdî bi awayê nûjenî û bi têngiştinî bi pêş dikeve ya. Lê ev awayê têngiştinê jî, mirov wê bi teybet fahm bike. Biastî û radî, mirov divêt ku wê fahm bike. Bi wê yekê re, deme ku mirov bahse ast û radê bike, divêt ku mirov bêne ser ziman, ku ast û rada li ser heyînekê re diafirê. Bi wê yekê re, em bi awayekî xweza dihênina ser ziman, ku astek û radeyak jî heya. Ew jî, di deme Merwenîyan de, bûna wê, digihê asteka xwe ya nû. Di deme Merwenîyan de, kurdan, weke deme Medîya, ku çawa ku piştî deme Gûtîyan têkçûne di deme Naîrîyan de jîn û piştê di deme Medîya de ew têkçûn buhurandin û welatbûnak avakirin, Her weha hin xoslet û teybetmendiyên wê deme dîroka kurdan, yên ku ditîbjihîna wê demê jî hene. Medîya, di deme xwe de ye hemdem debi awayekî nûjenî e deme xwe re pêşketinek û awayê wê jîn kir. Bi wê yekê re, mirov karê wê bêne ser ziman. Pêşketin û pêşveçûnên deme Gûtîyan û Naîrîyan ên civakî û hizrî hate wê deme diperesin (Yanî bi awayekî peresendinî dihêne wê demê.) û dihêne hate wê demê. Wê Medîya bê asta wê peresînê ye biast û rada ye dawiyê.

Şadadî pergaliya wan bi têngiştin û kevneşopîya wan re û piştê wan re Merwenîyan

Di deme Merwenîyan de jî, awayekî bi heman awayê ê pêşketin û pêşveçûnê heya. Piştî derketina ola musulmanetiyê re, demên pêşveçûnê ên li Kurdistanê, bi demên Şadadîyan û Merwenîyan re bikevneşopî û demî dibin. Li gor demê xwe dihênina ser ziman. Ew desthilatdariyên kurdan, wê jî herêmên xwe bi buhurin û serwerî û desthilatdariyên wan, wê pir mazin bibin. Şadadîyan, serdestî û desthilatdarîya xwe, hate qafqasya gihandîya. Merwenîyan jî, ji Şamê buhurandîya. Ev demên pêşveçûnî, demna ku piştî wê guharandina dîrokî e di kevneşopîyê de e bi buhurîna ji ola Êzîdîtiyê li ola musulmanetiyê re ku bûya re, weke demeka rûniştinbûn û danê e di tevger û xûyên xalkê de bêne ser ziman. Bi wê yekê re, mirov ku wê guhrandinê weke şoraşeka ji hîm bisalix bike, wê ne xelat bê. Wê pîrr rast û di dihê xwe de bê. Rêveberî, ku di wê demê de li Kurdistanê ne di destê kurdan bi xwe de ba, wê ew guharandin, wilo weke xwesteka wan û li gor wê kevneşopîya wan nebûba. Li herêmên xwe bi herêmî û giştî rêveberî didestî wan de ya. Ew yek, wê bi desthilatdarî, temenê guharandina wan bi wan û bidestê wan ji wan re bide kirin. Bi wê yekê re, wê pêşketineka mazin bi xwe re bijîn. Deme Merwenîyan, çiqasî em bënina ser ziman ji bo wê, wê dîsa kêmbê. Ji ber ku ew dem, demeka pir giringe di dîroka kurdan de. Kurdan, di wê demê de bi du awayan pêşketin bi hev re jîn kirin. Bi wê yekê re, mirov karê bêje ku bi dîmenî bi dudîmenî pêşketina xwe di wê demê de bi xwe re jîn kirin. Dîmenîya pêşî, ew bû ku li gor demê ew buhurîna li ola musulmanetiyê bû. Li gor ola nû nîrx û kevneşopîyên xwe bi nîrx bikin û şîrove bikin û bënina ser ziman. Ev yek, pir baş û qanc kirin. Dîmenîya din ye duyemîn jî, ew hanîna li ser ziman ye di buhurîniyê de li gor demê biast û rada kirina wê bû. Dem, bi têngiştin û asteka pêşketî ya nû hebû. Di wê demê de li gor hanîna li ser ziman, ne tenê

nirxbûn ji mirov dixwest, bi zanebûnî pêşketineka keseyetî jî ji mirov dixwest. Wan ev jî, di xwe de bi kevneşopîyên xwe re demên xwe yên berê baş xwandin û bicih hanîn. Bi vê yekê re, êdî pêşketineka mazin di demê de bi xwe re pêşî di keseyetîyên xwe de dana çêkirin û piştre bi gelemperî di civat û deme xwe de bi xwe re dana çêkirin. Merwenîyan, wê welatbûna wê ye bi wan re, wê bê asta wê ye ku bi wan re derketibû holê bû. Wê ew wilo were holê.

Ev dem, bizanistan û zanebûnê bitêgihîştin bi rê ve diçû. Ji destpêkê, zanistên weke Weysel Qaranî, Bawê Henîfê Dinwerî, Şabahadinê Şuhrewerdî, Babek, Êlî Herîrî û hwd, wê bi wan re pêşketina xwe ye demî biafirîne û bi pêş bixe. Ev zanist û zanistên weke van zanistan ên demî yên wê demê, fahmkirina wan û têgihîştina wan, wê di ast û rada bilind de, dîmenekî bi heyîn û hebûna civatîya demê re bide me. Têgihîştin, deme ku mirov bahse wê dike û dibêje ku di jîyanê de dibê hingî divêt ku mirov fahm bike, di derbarê civatîyê û pergaltbûna wê de jî fahmkirin dibe. Bi vê yekê re, ew pergaltbûn çawa bi rê ve diçê, di derbarê wê de zanebûna mirov diafirê. Mirov wê, baş û qanc fahm dike. Di nav kurdan de, ew dem, dibê demeka xwe ji nû ve çêkirinê. Bi vê yekê re, weke ku me li jor hanî ser ziman, dibê demeka ku pîr zor jî ji bo wan. Ji ber ku ew di nav xwe de bi pergaltbûn. Bi têgihîştina wê de bûn. Ji wê buhurîn, ji bo wan zor dibe. Di demê de, buhurin û pejirandin, wê ji bo xwe buhurîna çend nîşan bixwezê. Ew jî, dibin.

Ji deme serwerî, serdestî û desthilatdariya merwenîyan hatin û gihîştina serwerî, serdestî û desthilatdariya Salahadinê Eyûbî ye ku ji sînorê kurdistanê derbas dike û li herêmê bigihîştî bi serwerî, serdestî û desthilatdarî dibe

Deme Merwenîyan, wê bi ser wê buhurînê ve demeka xwe gihandina serwerî, serdestî û desthilatdariyê bê. Bi vê yekê re, wateyeka wê ye pîr girîng heya. Di deme musulmanetiyê re bi kevneşopî bûn û bi wê kevneşopîyê re serwerbûn, serdestbûn û bûna desthilatdar, wê biafirê. Bi vê yekê re, êdî weke demên berî demên musulmanetiyê, bi wê yekê re wê hingî êdî serweriyên herêmên xwe bikina destên xwe de. Weke demên berî musulmanetiyê, çend ku li gor herêman, herêm bi herêm bi rêxistin jî bibin, wê di asta kevneşopîyê û nirxbûna wê ye ku heya de, wê bi pergaltî yekbûna wan hebe û bi afirê. Bi vê yekê re, kevneşopî, wê weke pergale wan ye giştî wê di wê demê de jî wê karê xwe bicih bêne. Di kevneşopîyê de bi pergaltbûn, bi cih hanîna pêdiviyên sê gotinan re dibê. Gotina pêşî serwerî ya. Serwerî, bi têgihîştinê û zanebûnê heya. Gotina duyemîn jî, serdestî ya, ew bi bûna rêveberî ya. Weke ku di nav wan de bû û hebû, mîrtî û kevneşopîya wê û hwd; bûna wê, wê bi xwe re heyîna serdestiyê bisalix bike. Di aslê xwe de, ev gotina duyemîn di temenê bûna pergaltiyê de wate xwe distêne û bi salix dibe. Weke ku li Kurdistanê herêm bi herêm bi rêxistinbûna rêveberiyên mîrtî û di asta kevneşopîyê û nirxên wê de gihîştina wan ye li hevdu û bûna wan ye yek, gotina serdestiyê salix dike. Gotina sêyemîn jî, her weha bi gotina desthilatdariyê dihê ser ziman. Ev gotin jî, bi bûna welatbûnîyê re wate xwe distêne û bi salix dibe. Mînaq, weke welatîya Merwenîyan û hwd, ye di demê de. Desthilatdarî, di aslê xwe de, aliyekî wê yê din jî heya. Ew jî, di heyîn kevneşopîya rêveberiyê û rêzanîyê de bijîrbûn û bi têgihîştin bi kevneşopîbûn a. Wê statûqû jî, ji vê yekê biafirê û serwer bibe. Hêze rêveberiyê, aliyekî wê yê din jî statûqûtiya bi têgihîştina wê re ya. Kurd vê yekê, di nav xwe de pîr bifêr û cerb in. Tenê ku mirov demên Mîtanîyan, Hûrîyan, Gûtîyan, Naîrîyan, Medîyan, Şadadîyan û hwd, ku mirov hate deme Merwenîyan ku hildê dest, mirov wê pîr fêr û cerban bibîne. Ji xaynî, aliyên wan fêr û cerbên wan ên ku hene, ew aliyên kevneşopî ê ku hate deme me bi wan re bi têgihîştin heyîna xwe parastîya, î ro, di deme me de jî, gavavêtinên wan dihoynê û pêşketinan bi wan re dide çêkirin. Bi vê yekê re, wan jîrîyên xwe, an î bi gotineka din wan kevneşopîyên xwe yên di nav xwe de di serê xwe de divêt ku wan pîr baş û qanc fahm bikin. Kevneşopîyên wan, bi vê yekê re, di deme ku me ji destpêkê hanî ser ziman hate vê derê, me bi pîrwateyî hanî ser ziman. Ew jî divêt ku werina dîtin û fahmkirin. Wê hingî, baş fahmkirin werê holê bi mirov re. Pîrwatebûn, bi kevneşopîyê re bi demê re bi dembidem bi jînbûnê re bi ji demê buhurîna li demê re diafirê û dibe.

Deme Merwenîyan, wê bi vê yekê re demeka nû bê. Bi kevneşopîya wê ye demê re, ku karîna xwe ji nû ve afirandin hatina wê ye dayîn nîşandin ku hatîya kirin, wê dihêne holê. Bi vê yekê re

deme Merwenîyan, bi awayê pêşketinê re divêt ku were fahmkirin. Bi vê yekê re, deme wê were fahmkirin. Wê awayê pêşketin û pêşveçûna wê, wê di deme Salahadînê Eyûbî de, xwe bi awayekî pîrr mazin û pêşketî bide nîşandin. Deme Merwenîyan, di vir de divêt ku bi deme Salahadînê Eyûbî re di berdwame hevdu de werina ser ziman.

Ji deme Merwenîyan hate hatina deme Eyûbîyan, wê li Kurdistanê hin pêşveçûnna pir mazin ên bi têgihîştinî bibin. Deme Eyûbîyan, di destpêka xwe de bi deme Salahadînê Eyûbî re, wê destpêkê mazin ku tenê Kurdistanê dike nava xwe de, ku herêmê bi giştî dike nava xwe de wê bide kirin. Bi wê re, wê ew deme nû pêş bikeve. Di deme Merwenîyan de, pêşketineka mazin bûya. Ji aliyê rêveberiyê pêşketina wê ve jî, Merwenî pir mazin li pêş in. Rêveberîya wan, rêveberîyeka demî e hemdemî û nûjen e. Bi vê re jî, mirov karê bêje ku rêveberîyeka kevneşopîya. Temenê wê pir xurt bi kevneşopiyê heya. Mirov nikarê rêveberîya Merwenîyan weke rêveberîyeka herêmekê bêne ser ziman. Di deme Rêveberî Merwenîyan de, rêveberîya Merwenîyan bi şahê xwe Aliyê kurê Merwan re wê destpêkê mazin bi xwe re bike. Demeka dirêj wê ew li ser rêveberiyê bi menê. Di wê deme rêveberiyê de, wê ew şahê Merwanî, wê bi rêveberîya re li herêmê dirokê binivîsêne. Pir mazin wê pêşketinekê bide kirin. Li herêmên Kurdistanê, hema bêje li hemûyan wê rêveberîya were herê kirin. Têkiliya wan wê ye bi qasra mîre bota wê re û piştgirîya mîrê bota ye jê re jî, wê wî bi aliyekî zanebûnê wî re jî wê derxe li pêş. Di wê demê de, mîrê bota, li herême pîrr mazin xwediyê serweriyê bû. Tenê herême botanê ku weke herêmê botanê di hate binavkirin, ku ne tenê ji Cizîrê û Nîsêbînê ku hate ku digihîşt ber sînorê Hakarîya û Samzînanê û hwd dikira nava xwe de, hin herêmên başûr rojavayê Kurdistanê jî dikira nava xwe de. Bi vê yekê re, ew herême bi wî navî, herêmeka pir mazin bû. Ev herêm, ne tenê li Kurdistanê, li herêmên li dordorê jî, weke herêmeka pîroz di hate dîtin. Bi vê yekê re, rêzek jî wê herêmê re hebû. Çiyayên wê herêmê ên weke Cudî û Gabarê û hwd, navdengîyeka wan hebû. Ji xaynî wê jî, li Cizîre bota li ber Diclê Nebî Nuh tîrba wî li wir bû û ev yek jî, li herême pir baş di hate zanîn. Navê û prozîya Nebî Nuh, ên ku bê ne hisaha bûn nebûn. Bi vê yekê re jî, rêz û hûrmetek jî wê herêmê re hebû. Salahadînê Eyûbî, çend ku î ro di derbarê wê de wilo zêde ti nîşanak jî nîn in, di hê zanîn ku vebêjin ku ew li botanê demeka xwe ye rêveberiyê buhurandîya. Di deme ku amê wî diçê herêmê Beyrûdê û wan dora wê dike bin serwerîya xwe de û ew lê dibe serdest, hingî, salahadînê Eyûbî, li herême botanê ya. Li wir, serwerîya wî jî heya. Di derbarê wê xala jîyane wî de, di destê me de ti zanînen ku em nahaka bidina nîşandin hê nîn in. ..

Di deme ku amê wî diçê ser beyrûdê de û hêze wî weke ku kêr dimêne û ku ew xabêrê jî Salahadînê Eyûbî re diçê, hingî di deme kin de bi dengdayîneka wî jî herêmê bi hezaran şerwan bi sûwarî li ber wî amede dibin. Ev yek jî, heyîn û hebûna wê bandûra wî ye li herêmê ku jê re rêzek di hate girtin dide nîşandin. Mirov karê vê xalê, di vir de, weke nîşaneka vê xalê jî bêne ser ziman. Wê ji deme rêveberîya Merwenîyan hate hatin û gihiştina deme Eyûbîyan, wê bi rêveberiyê, weke ku di serweriyê re tenê dest were guharandin, wê bibe. Deme Merwenîyan e zêr', wê piştî xwe bi demekê re wê cihê xwe ji 'deme Salahadînê Eyûbî' ye zêr' bihêle û berdê. Bi vê yekê re, wê êdf ew mazin bibe. Li herêmê, cihê ku Salahadînê Eyûbî têde bicihbûya jî, mirov divêt ku bi vir ve girêdayî çend gotinan bêne ser ziman. Ji ber ku di vir de girîngîya wê heya. Herême botanê bi Nîrxên Nebî Nuh li pêş e. Li ber diclê bi wî re nîrxêke ku mirov bêne ser ziman afirîya. Lê li ber herême botanê li ber çemê Firatê li Rehayê jî nîrxê Bîrehîm Xelîl heya. Ev herdu jî, bi kevneşopî û bi nîrx in li Kurdistanê. Di çand û nîrxîya Kurdistanê de cihê wan xwediyê girîngîyeka xwe ya ku mirov nikarê li ser ti gûmanê bêne ser ziman in. Bi vê yekê re, çande di naqabîna Diclê û Firatê de xwediyê hin heyîna ya.

Di navbera diclê û firatê de, wê Salahadînê Eyûbî, weke ku li van herdu aliyên pîroz ên bi kevneşopî ên çandî bizanebûn xwedî derkeve li wir bicihbûneka wî heya. Ji xwe, kalkên wî, berrî wê xwe gihandina Rehayê. Ew jî, li wir, demeka xwe ye rêveberiyê wê bi buhurêne. Di deme balixbûna xwe de ew xwe dide nîşandin. Ew mirovekî ku bi zanebûn a. Bîfahm a. Zû fahm dike. Bi vê yekê re, di xwandin û zanebûna xwe de çendî ku zû bi pêş ve diçê, ewçend jî, bala mirovên li dora xwe bi hey dikişêne li ser xwe. Bi vê yekê re, êdf mirovên li dora wî di rêveberbirinê de bidest hevîyan jê dikin. Mirovên ku bi zanebûna xwe derkete pêş, di civate kurd de hevîyeka

mazin jê diafirê. Bi vê yekê re, ku wî bi wê zanebûna xwe re ew hêvîtiya ji xwe kifş kir û bersivêk bi herênî û zane da jî, wê êdî derketina wî ye li pêş bibe û wê gotina wê biqadr bibe. Bi vê yekê re, êdî ku ew çî gotinê bêje û bêne ser ziman, wê lê bê hisandin. Wî jî, ev yek bi xwe re bi keseyetiya xwe re kir. Bi vê yekê û ji ber vê yekê, êdî ew derketa pêş. Rêzek jêre pêşket. Piştî, li civate herî mazin ye mîran bi gotin dibe. Bi vê yekê re, êdî ew mazin dibe û di nav xalkê de jî dihê naskirin. Wê bi wê naskirinê re êdî hin bi hin mazin bibe. Di kevneşopîya kurdan de zanebûna mirov bi xwe re ji mirov naskirinê dihê li holê. Lê vajî wê, ku kurê mîr jî bê, ku nikaribe gotinên bizane bike, wê derketina wî ya li pêş di civatê de bi girenî nebe. Divêt ku mirov vê yekê jî, her weha bi teybet bêne ser ziman.

Wê ew bi vê yekê re derkeve li pêş. Di demê de, mirovên ku bi zanebûn di civatan de dengê wan derket û hat, wê êdî di mirovên pîr û kal ên ku weke mirovên bizane ên civakê dihêne zanîn de jî navê wê derkeve û bahse wan bê kirin. Di vir de, divêt ku mirov bi teybet bêne ser ziman, ku di kevneşopî û çanda kurdan de çihê mirovên pîr û kal, bi bêgotin xwediyê rêzeke mazin a. Ku gotin ji devê wan derket, ew gotin, weke hin gotinna pîroz wê bêne pêşwazîkirin û rêz û hûmret ji wan re bê girtin. Weke ku hate î ro jî dio nav kurdan de dihê gotin, "gotina wan ti carî li ardê nayê hiştin". Di aslê xwe de, di civake kurdan de weke çineka ku pîr bi bandûr, divêt ku mirov bahse pîr û kalên civatê bike. Bi wî awayî jî, pêşketineka wan ye bi rêzanî di nav xalkê de heya. Ev yek, kevneşopîya wê jî, heya. Wê kevneşopiyê bi wan re, di dîroka kurdan pîr pêşveçûn jî dana kirin û kifşkirin. Di nav civake kurdan de, sê komên ku pîr mazin bi bandûr ên rêveberiyê û rêzanêyê hebûn. Koma pêşî koma Mîran bû. Mîr xwedî qasr bû. Koma duyemîn jî, koma şêxan bû. Ew jî, weke ku di deme musulmanetiye de bi teybetî hatîya bi navkirin, dergahên wan hebûn. Berî deme musulmanetiye, di Êzîdîtiye de jî ew bi bandûr li pêş û kifşkar bûn. Cihê wan bilind bû. Koma sêyemîn jî, koma pîr û kalan bû. Pîr û kal jî, bi civatên xwe yê civakî li pêş bûn. Mîr û şêxan jî, ku cihê wê dihat, li gotina wan dihisand. Ew koma sêyemîn, di rewşna kifşkar ên di nav civatê de, gotina wan derdikete ser ye mîr jî û li ser ya şêxan jî. Bi vê yekê re, divêt ku mirov, vê yekê, her weha bi teybet bêne ser ziman. Mîr bi qasra xwe ve çendî xwediyê kevneşopî û rêzanêyekê bû, ew rêzanîya wî bi kevneşopîya wî, bi bê pîr û kalên civatê bi rê ve nedîçû. Mirovê, ku di nav pîr û kalan de gotina xwe hanî ser ziman, êdî ew mirov, "weke mirovekî ku divêt ku ji gotina wî êminbûn hebe" di hate nasîn. Di mazinbûn û bilindbûna Salahadîne Eyûbî de, mirov nikarê bêje ku ew kevneşopî û çanda pîr û kaltiyê nîn a. Bi teybetî jî, mirov karê bêje ku heya.

Ku mirov hinekî bi demê re bi vir ve werê û gotinekê li ser Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran bêne ser ziman û bêne, mirov wê bi êmin bêje ku ew weke ku di nav xalkê de hate roje me jî ji bo wan di hate gotin "ew mirovna ku di civatiya xwe de bi zanebûn xwe re balixbûbûn û pîr bûbûn." Ew jî, wê bi zanebûna xwe re bi civatên civakê ên di nav xalkê de ku dihêne li darxistin de, wê di wan de zanebûna xwe bînina ser ziman û ew derkevina li pêş. Wê êdî navê wan derkeve û bêne naskirin. Ku di civatê de, yek bi zanebûna xwe re axift û bi wê axiftina xwe re hate pejirandin, êdî wê di nav xalkê de jî bahse wî bê kirin. Ku bahs hate kirin jî, êdî wê bi başiya zanebûna xwe ye di serê xwe de re were naskirin. Di deme Salahadîne Eyûbî de jî, ev yek ji bo wî jî wilo ya. Bi vê yekê, ew jî derdikeve pêş. Di nav zanebûnê de kurbûn û pêşketin ku bû de, wê di civatan de were tesdîk kirin, ku bizanebûn bûya û an jî nebûya. Salahadîne Eyûbî jî, ew bi zanebûna wî re bi vê yekê ji aliyê civate pîr û kalan xwe ve dihê nasîn û ser ziman. Êdî Ew mazin dibe. Li herêmê bi pêde diçê. Di vê demê de, heynî û awayê civaktiyê, bi vê yekê re, weke ku bi zanistên xwe re bi pêş ve herê bi pîr û kalên bizane ên ku ji civatê re pêşvaniyê dikin re bi rêve diçê û pêş dikeve. Wê hate deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê ew awayê pêşketin û pêşveçûnê, wê ji nava xwe zanistên weke wan, wê gelek derxin. Ew zanist jî, her yekê ku hizra dihêne ser ziman, wê piçekî civatê bi zane bike û civakê bi pêş ve bibe.

Ji wê demê hata ku hatine deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê pêşveçûneka pîr mazin bi bibe. Di awayê jîyane û pêşketina wê de, wê pêşketineka mazin bibe. Mirovên weke Teymiyê Harranî, wê hizreka civakî bînina ser ziman. Çendî ku bi gotinên olî û awayê olî dihêne ser ziman jî di awayê vegotin û hizirkirina wî de, civaktî û li gor wê hizirkirin heya. Bi vê yekê re, mirov diqalibê hizirkirine wî de, wê yê pîr baş zelal dibîne û kifş dike. Teymiyê Harranî, hêjaye ku

mirov awayê hizirkirina wî li ser bihizirê û jê deme wî û awayê pergalya wî ye civakî jê fahm bike. Ew bi çî awayê di hizirê? Mirov, ku wê kifş kir, mirov wê bibîne ku ew çendî bi zanebûn a. Hizrên wî, li herêmê bigiştî dihêne bizan in. Li herême di cihane Îslamê de ew dihê nasîn û navê wî derdikeve.

Di wê demê de, di awayê pêşketine civakê de, hizrên olî derketina wan ye li pêş, bi têgihîştina ku bi di serê mirov de bi zanebûnekê bi xwe re zelalbûnekê ku di derbarê xwe de çêdikin re, wê hin bi hin, bikevina bin bandûra felsefe demê de. Mirovên weke Îbnî Haldûn derkevin. Berî wî Ibnî Rûst û Îbnî Sîna derketina. Hizrên wan jî, di demê de deng vedana. Lê dem hate ku dihê wê demê de, wê di awayê hizirkirinê de jî, bi bûna zelalbûnê di serî de wê pêşketinên derkevina holê. Di vir de, berî ku em wê pêşketina di hizir de bînina ser ziman, ew zagonêka pêşketina hizir di vir de binavkin û bînina ser ziman û piştre wê pêşketina hizir bînina ser ziman, wê hingî baştir û qancîr fahmkirin bibe. Awayê hizirkirinê ê ku di wê deme xwe de li jîyanê bi serwer e, wê bi têgihîştina xwe re hertimî hewl bide ku dema xwe bêne ser ziman. Lê wê, pêşketinên demê yên ku derdikevin wê hemûyan jî jî li ser nixîya wan û nêzikatiya li wan, wê bi tememî wan car bi car nehêne ser ziman. Têgihîştin, wê di nêzikatiyê de, farqîbûnên ku bibin û bêne kirin, wê di xwe de bizanebûn bike û ji wê jî têgihîştinekê biafirîne. Ew têgihîştin, êdî wê weke têgihîştinekê ku ji zikê wê têgihîştina serwer ye ku heya ku derketiya wê were holê. Têgihîştina serwer, bi awayê xwe yê serwerî û serdestî ê bi pergali re ku di farqê de bê û ne di farqê de bê, ku bixwesteka wê bê û ne bixwesteka wê bê, wê dayiktîyê ji têgihîştina ye demî ye ku derkeve re wê bike. Ev jî, zagona pêşveçûnê ye bi têgihîştinê ya. Lê di vir de, ku mirov wê xalê di vir de bêne ser ziman, hinekî jî bi hizirî bi awayê felsefik, divêt ku mirov hinekî li ser têgihîştina têgihîştinê bisekinê. Ev yek jî, wê girîng bê. Têgihîştina têgihîştinê, wê têgihîştinê bi perisêne. Wê bi awayekî peresendinê wê bi pêşve bibe. Bi vê yekê re, weke ku hate î ro jî, di nav civatan de dihat ser ziman, "xwe ji xwe buhurandin" wê hingî bibê û derkeve holê. Xwe ji xwe buhurandin, pêpelokeka ku kur dibê û li pêş zêde dibê ya. Bi vê yekê re, wê ew were holê. Weke ku Manî ji zikê Zerdest derkeve û li wî zêde bike, dihê holê.

Weke têgihîştinekê, ku berî nahaka jî, me cih dayê de û emê di vir de jî cih bidinê de û bînina ser ziman, di nav civatên kurdan ji bo mirovên ku dixwandin li cem zane û seydeyên civakê, gotinek dihat gotin. Ku bahse wan dihat kirin, dihat gotin ku "wan ji seydeyê xwe zêde ji zanebûna wî zêde kir". Bi vê gotinê re, kevneşopîyaka ku bi vê gotinekê re dihat ser ziman û di nav civatê de rûniştî bû dihat ser ziman. Hate helo jî dihat gotin, dihat gotin ku "yê ku li cem seyde xwand, divêt ku gavekê ji seydeyê xwe yê ku ew li cem dixwêne ji wî bi buhurê, ku jê ne buhurê, wê çaxê, mirov nikarê bêje ku wî mafê wê tahba ku li ber wê re hatîya daya. Lê ku wî ji seydeyê xwe gavek ne buhurand, wê çaxê weke ku ew xîyanetê ji wê zanebûna ku jê zanebûn hildaye jî kiribê kirîya." Her weha dihat gotin. Ev gotin, gotinna ku pir kevn ên ku bi xwe re hin nixna dihanîn li ser ziman bûn. Mirovên zane jî qadr didana van gotinan. Mirovên zane ên li civatê jî, wê mirovên ku dixwandin, wê zanebûna wan, bi wezinandiban. Wê bi wê re, fahmkiriban ku ka ew çendî û çiqasî bizanebûn e.

Şêx Teymîyê Tarranî, têgihîştina wî û pergale wî ye perwerde e li Kurdistanê li Rehayê

Bi vê yekê re, mirov bitêgihîştin karê li wê demê bînerê. Deme Teymîyê Harranî, bi wî û zanebûna wî re hinekî bi pêş ve diçê. Ew di awayê hizir û pergalya wê de, têgihîştinekê tevdiqirihê. Lê di deme wî de, weke ku mirov ji hizrên Teymîyê Harranî jî fahm dike, felsefêbûnekê hizirî heya. Ew jî, li gor wê dihêne ser ziman. Bitêgihîştin nêzikî lê kirin heya. Bi vê yekê re çûn û hatinek heya. Di vê demê de, wê awayên têgihîştinê bi nêzikatiya xwe ye bi xwe re wê derkevina li pêş. Bi bvê yekê re, batinî û nebatinî dihê û derdikeve holê. Awayê hizrên wan û hizirkirina wan, wê bi têgihîştina xwe ye ku ew têde kurbûna wê bêne berhevdû. Bi wê re, wê di serî de tekoşinek têgihîştinî wê derkeve holê. Di aslê xwe de musulmanetî bixwe jî, weke xaleka ku mirov vê çerçovê de wê bêne ser ziman a. Bi têgihîştina xwe re ye ku esas girtîya, ye deme xwe ye herî li pêş e. Bi vê yekê re, di demeka kin de pir zû pêş dikeve. Lê ew awayên têgihîştinê wilqasî hesanî dernekevina holê û xwe neyênina ser ziman. Wê rêveberî, kevneşopîya wê û

statûqûya wê ya ku afirîya, wê li ber wê li pêşîya wê bisekinê. Bi vê yekê re, bi bûna alî ye rêveberîyê re, wê ew tekoşîna di nav têgihîştînan de e hizrî jî, wê diwartirbûnekê bi xwe re bêne holê di jîyanê de. Serîlêxistîna Xalacê Mansûr, di vir de weke ancama ku di vê xalê de mirov wê bêne ser zîman a. Her weha hê pir mînaqên weke wî hene. Îbnî Haldûn bixwe jî, li vê herêma ku hizrên xwe dihêne ser zîman, ji ber ku piştî hatîna li ser wî dibe, mafê jîyanê ji xwe re nabîne û diravê li Magrîbê. Ew bûyin, wê awayê hizre olî de dibê.

Hizir, wê bi têgihîştîna xwe re, di vir de, wê bi bûn û derketîna awayên têgihîştînan re wê pêşketîneka wê hebe. Teymiyê Harranî, di vir de, mirov wê heyîne bi wî re dibîne. Ew, di hanîna ye li ser zîman de, di li berbûnekê de ya. Têgihîştîna wî, mirov nikarê tenê bi batinîbûnê bêne ser zîman. Awayê pergaliya wî ya hizrî, hîç jî mirov nikarê bi wê bêne ser zîman. Ji wê zêdetir, têgihîştîneka wê ye ku hê di roje me de ji ne hatîya kifşîkirin û fahmkirin heya. Ew, bi dilê an jî bi batinîtiyê, dike ku têgihîştîna olî bi felsefe bike û bi mirov bide fahmkirin. Bi vê yekê re, ew ji deme xwe hinekî di buhurê. Ew, ji ber çî wilqasî li ser "cîhadê" sekîniya û hanîya ser zîman? Bersiva wê pirsê, di wê de bi hizrên wî yên di serî de û bi têgihîştîna wî re û bi pergale wî ye hizrî re, awayekî felsefê ku bi wê dihizirê û hinek hizrên ku di wan de aqil û jîra wê li pêş e ku ew dixwezê bêne ser zîman in hena. Ew awayê hizirkirinê û felsefîk, ê batinî, ew dixwezê demeka nû li wê vekê. Ew dixwezê, di wê de pêvajoyeka nû bide dest pê kirin. Wekî dîn jî, li biaqilîyekê lêgerîn biwî re heya. Ew dike, di wê de pêleka nû bide kirin û pêşketînekê têde bide kirin. Ew, ew cihane wê gotîna batinîtiyê ye di hundurê mirov de, ew dixwezê ku wê cihanê derxe derve. Bi vê yekê re, bi wê re awayekî hizrî ê dana hizirkirinê û hewldanek heya. Ew rîya rast jî, bi pêşveçûnan re di wê de dibîne. Batinîti, di awayê hizirkirinê de buhurîya. Lê bi serwerîya wê ye pergali e ku rêveber bi pergali lê xwedî derdikevin hê ne buhurîya. Bi vê yekê re, di wê bixwe de jî, weke ku ji bo vê yekê şerbûnek heya. Teymiyê Harranî, di aslê xwe de di vê xalê de girîngîya wê ku derdikeve holê heya. Ew, bi hizirkirinê xwe û awayê wê re û hizrên xwe re, di wê xalê de mirovê demeka buhurîne ya. Di naqabîna wê awayê felsefê ê ku têgihîştîna wê bi gotînan re derketîya pêş û buhurîya û pergaliya wê li rêveberîya aliqîya, weke zanistekî Îslamê bi çêtirdîtîna xwe re li cem wê têgihîştîna ku pêşketîya cihê xwe digirê. Bi vê yekê re, ew li pêşbûneka wî heya. Di aslê xwe de, ew rê li bidawîbûna deme batinîtiyê diwekê. Lê ew, pêşketîna ku ew dike ku bêne ser zîman jî, çendî ku ew xurt e jî, ji statûya rêveberîyê na buhurê. Hizrên wî, tenê li Kurdistanê, bi li dergah û medreseyan herêmê xwandîna re û li gor wan perwerdekirina zaro û mirovan re bisînor dimêne. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku pêşketînek bi hizrên wî re li Kurdistanê dihê jînkirin. Lê ew bi wê re bisînor dimênin. Lê hizrên wî, bi pirtûkî derdikevîna dervî sînor. Hate herêmê Hindîstanê jî, hizrên wî digihîna wan deran. Ku mirov awayê pergaliya hizre wî fahm bike, divêt ku mirov wê pêşketîna wî pîrî baş û qanc fahm bike. Bi vê yekê re bi Teymiyê Harranî re mirov dibîne ku di awayê pêşketîne û civaktiyê de, demeka hizrî e ku têde kurbûn dibe, li holê heya. Asteka pêşveçûnê e ku bi hizir û têgihîştîna wê re dihê holê û ser zîman, bi wî re heya. Wê ew awayê pêşketîne li Kurdistanê hate ku were deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê êdî rengê xwe yê pêşketîne wê li jîyanê pir mazin bide nişandin. Deme van herdu zanîstên piştî jî, wê bi awayekî zanebûnê û têgihîştîne e teybet, were holê û pêşketînekê bi xwe re derxe holê. Hem Meleyê Cizîrî û hem jî Feqiyê Teyran, wê heya wan ji hizrên Teymiyê Harranî heya. Heya wan, ji wê pergaliya Teymiyê Harranî e bitêgihîştîna heya. Di vê qadê de di warê têgihîştîne de bi awayekî teherî, awayekî pêşketîne wê ji deme Teymiyê Harranî û wî, wê were û were hate deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran û wan. Ev awayê wê yê bi pergali jî, fahmkirinê wê, wê mirov bigihêne rastîya pêşveçûnê ên dihizir de û bi teybetî jî di têgihîştîne de li herêmê.

Dem, ji wê demê hate ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê pêşveçûnna pir mazin ên li berçav wê bibin. Mirovên weke Teymiyê Harranî, li Kurdistanê bi dergah û medreseyan wê bi hêze xwe ya perwerdekirinê, wê pêşveçûnna mazin di warê civakî û civatî de bidîna kirin. Ew pêşketînen ku bibin, heyîna wan ji wê deme hate ku di deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, mirov di qade têgihîştîne de bi awayekî teherî li dîvhevdu di berdewamiya hevdu de bêne ser zîman. Her demê, wê weke ku ji deme ku têde teymiyê harranî jîya ya, ku hate ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê biastî û radî wê xwediyê dem bi dem pêveçûnekê bê. Ji deme

Teymiyê Harranî hate ku dem dihê wê demê Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê dem bi dem biastbûn û radabûn bilindbûneka bi têgihîştinê wê bibe û wê were holê. Bi vê yekê re, di warê têgihîştinê de teheraka bi kevneşopî mirov dibîne. Bi vê yekê re, ev pirr zelal dihê berçav û mirov wê dibîne û kifş dike.

Dem, ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê di ast û rada pêşveçûnê de ast û radeyek were holê. Wê ew ast û rada jî, wê xwe bi wan re bide berçav. Meleyê Cizîrî, di deme ku dihê ser ziman de, bi hewldanaka pir mazin xeyretê dike ku bi aqil û jîreka pirr mazin bêne ser ziman. Mirov, vê yekê pêre baş û qanc kifş dike. Ew di serê xwe de pirr safî ya. Bi wê saffbûnê dihê ser ziman. Di deme ku dihê ser ziman de jî, bizanebûn dihêne ser ziman. Meleyê Cizîrî, di wê xate pêşveçûnê ye li ber diclê de, wê ast û radeyeka nû bê. Bi wê re jî, bi teybetî, mirov divêt ku di vir de bêne ser ziman, ku ew wê demeka nû bê bi têgihîştina xwe re. Ew, wê di awayekî nûjen de bêne ser ziman. Ew gotinên wî, hemû jî, gotinên bi zane û yên felsefîk in. Ew, pêşvanîyê ji pêveçûneka mazin ye demê re dike. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wê pir baş û qanc fahm bike. Meleyê Cizîrî, bi têgihîştina xwe re, di nav têgihîştina kurdan de ast û radeyeka nû ye bi demê re ku pêşketîya ya. Mirov divêt ku vê yekê baş fahm bike, hate ku mirov wî û pêşketina wî ye bi hizrên wî re bi têgihîştina wî re ku dihê ser ziman fahm bike. Ji deme Şadadîyan hate ku dihê deme Merwenîyan, wê pêşveçûnna mazin bibin. Lê deme Merwenîyan, wê bi pergali, demeka nû bê. Wê di demê de bi têgihîştin, deme nû ye ku afirîya bê. Bi vê yekê re, di hemdemîya demî de deme Merwenîyan xwediyê nûjenîyeka bi xwe re ya. Mirovên weke Êlî Herîrî û pişt wî re ên weke Teymiyê Harranî, wê hewl bidin ku wê bînina ser ziman. Bi vê yekê re, wê bi têgihîştin, ew nûjenîya demî ye bi hizrên Meleyê Cizîrî re weke demeka nû û têgihîştina nû ye ku pêşketîya, temenê wê diafirênin. Bi têgihîştinî, wê pêşveçûnna pir mazin bi mirovên weke Teymiyê Harranî re bibe. Mirovên weke Teymiyê Harranî, taqîrî nakin û dihênina ser ziman. Li ser her mijarê dihênina ser ziman. Lê di her hanînyên li ser ziman de jî, bi aqil û jîrîya wê dihîna li ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku li gor demê hanînyê wan ye li ser ziman heya. Dem, bi aqil hanîna li ser ziman ji mirov dixwezê. Bi wê re jî, di aqil re jîrê bi vac dixwezê. Vac, teybetmendiyeka hanînyê li ser ziman ye demê ye di hizir de ya. Ev yek jî, pir baş û zelal hatîya kifşkirin û di derbarê wê de zanebûnek heya. Mijarên olî jî, bi vê yekê, di çavderîya nêrîfî ye di hanîna li ser ziman de di buhur in. Bi vê yekê re, ji nû ve weke ku afirandin biaqil di demê de dibê dihê holê û li berçav. Mirov wê yekê kifş dike. Bi teybetî jî, bi hizrên ku dihêne ser ziman, ku di çî ast û radeyê û her weha awayê de jî bin, di wan de mirov bi awayekî li gor xwe vacîyê dibîne. Li gor vacê hanîna li ser ziman dibîne. Ev vacîyê ku bi wê û li gor wê dihê ser ziman jî, di aslê xwe de bi asteka demî mirov wê dibîne. Bi têgihîştineka demî ye felsefê mirov wê kifş dike. Di têgihîştinê de, bi li nûjenîyêkê lêgerînê re dihê ser ziman. Ev yek, pirr baş dihê dîtîn.

Deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, di ast û rada xwe ya ku bi wê dihîna li ser ziman de di vir de bi vê re girîngîyeka wan dihê holê li berçav. Ew di vir de, bi zanebûn bûna. Wan xwe bi aqil afirandîya. Bi vê yekê re, hizrên xwe di civatan de dihîna ser ziman û bi mirovan dihênina li ser ziman. Ew gotina ku hertimî di civatên kurdan de dihate ser ziman "bizanebûnekê û aqilekî bêne ser ziman", di vir de bi wan re bi hanîna wan ye li ser ziman re weke ku wate û rastîya xwe dibîne. Di vê demê de, aqilî pir mazin bi pêş dikeve. Bi aqilbûn tevgerîn û li nêzikatiyên ku dihêne nişandin di wan de li wateyeka felsefîk lêgerîn heya. Ev yek, derdikeve pêş. Bi teybiyê Harranî re jî ev yek heya. Bi vê yekê, ew biaqil dihêne ser ziman. Aqilê di serê wî de, wî xwestîya bi wê bêne ser ziman û bi wî aqilê xwe re awayekî nerînê û têgihîştinê bide afirandin di serê mirov de. Li ser vê yekê, pirr jî sekinî ya. Hizrên wî yên ku hatê roje me mana, ku mirov lêkolîneka baş û kur li wan bike, mirov wê bihesanî vê yekê di wan de kifş bike.

Meleyê Cizîrî, devra wî û deme nû ye ku bi hizrên wî re êdî dest pê dike

Dem, ji demê hate ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê bi vê yekê pêşveçûneka bi pêşketinî e bi têgihîştinî wê bibe. Wê ew deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê bi wê têgihîştine ku heya re, wê deme xwe ji nû ve şirove bike û bînina ser ziman. Bi vê yekê, ew di nûjenîyeka deme xwe de na. Bi Meleyê Cizîrî re, wê deme nû biafirê û heyîne wê bikeve

berdewamîyê de. Wê pêşketinek, divir de, wê xwe bide der. Meleyê Cizîrî, bi vê yekê, hate ku mirov ji wê deme Teymîyê Harranî dihê deme wî, mirov bi vê yekê re pêşketinekê dibîne. Wê Meleyê Cizîrî bi têgihîştinî û radî wê xwediyê asteka li ser Teymîyê Harranî re jî bê. Meleyê Cizîrî, hizrên wî ji wan fahmkirina têgihîştina wî, wî vê yekê bi me bide fahmkirin. Ew, têgihîştina zanistên berî xwe di derbarê wan de xwediyê zanebûnê ya. Têgihîştina wan fahmkiriya. Bi vê fahmkirinê re derdikeve ser wan de. Bi vê yekê re, wê di deme xwe de bi têgihîştinaka astbilindî wê li civatê binerê û li ser wê bêne ser ziman. Awayê pêşketin bi têgihîştin jê re bêne ser ziman. Di aslê xwe de Meleyê Cizîrî, peyamnêrê demeka bi hizir e bi têgihîştinê û jîre wê re bi ku bi rê ve diçê ya. Bi vê yekê re wê deme wî çawa bi rê ve herê, wê dihêne ser ziman. Piştî wî re Feqiyê Teyran û Ahmedê Xanê, wî û têgihîştina wî baş fahm dikin. Feqiyê Teyran, çend ku dibê zanistê wê demê, wê wilo Ahmedê xanê jî bi zanistê wê dema nû û bêne ser ziman. Di wê deme nû ye civatiyê de biaqil tevgerîn, wê di nêzikatiya wan de derkeve pêş. Wê hizrên wan, di wê çerçovê de werina ser ziman. Di naqabîna Bawerîyê û aqil de bi jîrê hunandinek, wê weke ku bi Feqiyê Teyran re dihê dîtin wê bê kirin. Bawerî, wê wilo zûwa û bêaqil û jîr, wê newê jînkirin. Bi civatê re û bi jîyane wê re û bi pêşketinên di jîyane wê de re wê bi awayekî civatî, wê were ser ziman. Ku wî deme meleyê Cizîrî jî hinekî dîtiya û di deme ciwanîya Feqiyê Teyran jîya ya, Mele hisêne Batê jî, bi vê yekê re mirov divêt ku wî bêne ser ziman. Di di berhemên wî de û hem jî di awayê berhemên wî de, mirov wê yekê bi wî re kifş dike. Bi vê yekê re, ew demeka nû li gor wê dijîn. Hewl didin ku deme xwe bi dora xwe jî bidina fahmkirin û di derbarê wê de, bi wan re têgihîştinekê jî bidina çêkirin. Bi vê yekê re, ew zanistna bizane ên demeka nûjen an.

Deme Meleyê Cizîrî û feqiyê teyran, her weha divêt ku mirov bi têgihîştina wan re ji nû ve awayê pêşketin û têgihîştin û pêşveçûna civat û pêşketina wê bişiroveyî bêne ser ziman. Bi vê yekê re, emê rastûrast bigihina têgihîştine demê û awayê pêşketine demê ye ku êdî wê bê jîn kirin. Zanebûn, bi di wê de re, di deme ku dihê ser ziman de, wê bi awayekî bi zanebûn were ser ziman. Civatiya Kurdistanê, wê di vê demê de wê bikeve demeka xwe ye nû de. Peresendineka bi têgihîştinê ku bûya, ew dem wê pê bi pêşve herê. Bi vê yekê re, ku mirov wê pêşketine demê bi hizir û nêzikatiya wan re bêne ser ziman, mirov fahmbike. Mirov wê, wê têgihîştinê û peresendibûna wê û deme wê ye nû ku di ancama wê peresendinbûnê de afirîya û ji çî awayê û pêşveçûne têgihîştinîyê peresendin bûya jî, mirov wê pir baş û qanc pêre fahm bike û têbigihê. Bi vê yekê re ew teherîya di têgihîştinê de e ku heya li ber diclê û firatê jî wê pir baş û qanc were dîtin û fahmkirin. Ew teherî, bi kevnepîya wê re heya. Awayê pêşketinê ê demê, bi vê yekê re, mirov wê baş fahm bike. Bi vê fahmkirinê re mirov wê têgihîştina civatiyê ye demê jî baş fahm bike. Di wê demê de bi civatan re têgihîştinaka civatî heya. Divêt ku mirov vê yekê jî bi teybet bi navbike û bêne ser ziman.

Bi teybetî, ku mirov dihê hate wê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, mirov dibîne ku çendî pêşketineka mazin di qada civatiyê de heya. Ji aliyê awayê têgihîştinê ve, mirov dibîne ku aqilbûn û jîriya di wê de derdikeve pêş û serwer dibe. Li gor wê tevgerîn dibe. Di nêzikatî û hewldanan de, li zanebûneka bitêgihîştin lêgerîn dihê holê. Bi vê yekê re, awayekî pêşketinê heya. Di vir de, piştî nêzikatiya Teymîyê Harranî û pergalbûn û civatîtiya di têgihîştina wî de, li vir êdî mirov divêt ku hinekî di çerçova têgihîştina Meleyê Cizîrî de mirov divêt ku bêne ser ziman. Di têgihîştina Meleyê Cizîrî de civatîtiyê, wê ne tenê awayekî nû ê demê ye bi xwe re bê. Wê ji wê zêdetir têgihîştineka bijîrî e ku bi civatê re biawayekî peresendinî heyîna xwe hanîya hate wê demê, wê bi wê re xwe bidîyarî bide berçav. Di vir de, Meleyê Cizîrî, têgihîştina wê ku mirov li berçav bigirê, ji têgihîştina wî, bi du awayan mirov divêt ku bêne ser ziman. Yek her weha bi awayekî demê eê civatîyê ya. E din jî, her weha bi peresendinbûnê re hatina hate wê demê ku gihîştîya çî astê û radê, wê bi xwe re wê jî bêne ser ziman. Bi vê yekê re, divêt ku mirov Meleyê Cizîrî wî û pêşketina bi wî re baş û qanc fahm bike. Ev yek, wê ji bo deme me jî bê rohnî. Pêşketina Meleyê Cizîrî, ji deme civatîtiyê ye Teymîyê Harranî hate ku digihê wê deme wî, di demê û çerçovê de weke demeka duyemîn dihê holê li berçav. Mirov vê yekê bi wî re dibîne. Meleyê Cizîrî, wê bi gotinên xwe yên ku di nav xalkê de dihêne ser ziman re, wê temenê awayê

civatî ê pêşketinê ye ku wê hate deme were, wê bêne ser ziman. Bi vê yekê re, ew weke zanisteki civakî e ku wê awayê pêşketine deme bide dest pê kirin a. Bi vê yekê re, ew dihê holê û berçav.

Di nav civatê de, bi zanebûn pêşketinek afirîya. Di wê demê de, bi teybetî jî medresetî û perwerdebûn derketiya pêş. Qadrekî pirr mazin ji vê re dihê dayîn. Di wê yekê de bi perwerdeya ku hildeya û asta xwe de Meleyê Cizîrî derdikeve pêş. Ew, li Cizîra bota temenê xwe dihilde. Piştê li gelek herêmên Kurdistanê digerihe. Li gelek herêmên Kurdistanê, ew dihê naskirin. Bi vê yekê re, êdî di nav civatên civakê de wê bê xwediyê nasîneka pirr mazin. Wê hizrên wî werina naskirin. Ew, bi gotinên xwe re aqil derdixe pêş. Bi têgihîştinekê û nêzîkatîyekê dihêne ser ziman. Têgihîştina wê di hemdemîya demê de xwediyê nûjenîyeka bi xwe re ya. Bi wê re, nêzîkatîya wî, li gor xalkê ya. Li gor xalkê hizir kirin û civatîya wan hildana li berçav, di nêzîkatîya wî de derdikeve pêş. Bi vê yekê re, li nav xalkê dihizir. Di derbarê hizir û olên cuda de jî, ew xwediyê nêzîkatîyeka di wekhevîyê de ya. Di deme wî de, li Herême Botanê bi êlî hê gelek êlên kurd ên Êzîdî hene û serwer in. Fileh jî hene. Ew, di nêzîkatîya xwe de, di çerçova kevneşopîyê de di wekhevîyê de ya. Ji wir, hate ku digihê herême Sêrtê û Mûşê û hwd jî, ev yek wilo ya. Li herême dersimê, Elevîyên kurd jî heya. Ew, hemûyan jî, dibîne. Di deme wî de, ew kom û aliyên civatan jî derdikevina holê Di civatan de levrûniştin heya. Di civateka musulman de kurdên Êzîdî rûniştina wan û xwe hanîna li ser ziman, pir xweza ya. Hê ew xwezabûn heya. Di Nêzîkatîya Meleyê Cizîrî de ew xwezabûn, wê bi heyîna civatê de di temen û hîmê wekhevîyê de bê berçav. Di têgihîştina olî de ew pir kur çûya. Hin nêzîkatîyên ku li ser navê olî dihêne nişandin jî, ew wan rast nabîne. Li berhevdu sekinandinê û wê bi olê hanîna li ser ziman, ew rast nabîne. Mirov wê yekê bi nêzîkatîyên wi re kifş dike. Rêveberîya Osmanîyan, olê derdixe pêş. Lê ew gotinên ku dihêne ser ziman, ew çend ji olê jî hatibin xwandin û werina ser ziman jî, di kirinên xwe de hatina wan ye li ser gelê musulman ê kurd, wê bi acizîyan re gûmanan jî li ber wan bide çêkirin. Bi vê yekê re, nêzîkatîyên jecuda wê derkevina holê. Kurd, wê hizre xwe ya olî di nav xwe de bînina ser ziman. Di wê hizre xwe ya ku dihênina ser ziman de jî, ne rastî û ne qancîyên Osmanîyan jî, dihênina ser ziman û şermazar dikin. Ew nêzîkatî wê bi serê xwe di nav kurdan bi xwe re jî, hin ne xweşîyan bide çêkirin. Ji ber ku deme ku rexne li rêveberîyeka ku xwe musulman dide nişandin dihê girtin, rast nayê dîtin. Lê kirinên wê yên ku dihêne kirin û hatina bi ser kurdan e ji aliyê wan ve jî, dihê dîtin. Meleyê Cizîrî, bi vê yekê re, hinekî bi têgihîştin tevdiagerihê. Hin hewldanên wî yê dana fahmkirinê hene. Di derbarê dîrokê û fahmkirina olê de ew pir li pêş e. Ew, di derbarê hatina Osmanîyan e ji aliyê Asya ve li herême dihêne ser ziman. Wekî dîn jî, weke gelekî herêmî ku temenê wê pêşketina olî ye li herême jî ya, wê ji dihêne ser ziman. Bi vê yekê re hewldide ku têgihîştinekê bide çêkirin.

Ew dem, wê bi vê yekê, wê pirr kifşbûnan bi xwe re ji bo civate kurd û pêşketina wê bi xwe re bêne. Ew pêşveçûnên bi wî awayê ên k dibin jî, wê li hin qadna dubendîyina di nav kurdan bi xwe re jî bidina çêkirin. Wê ew dubendîtî, ne weke yên piştî bûna şerê Kerbeleyê û derketina Mezhebê Şîî bin. Lê wê, wê pêşîyê li yekbûneka pir xurt jî bigirin. Ev dem, bi vê yekê re, wê tenê bi kevneşopîyê bi meşê. Kurd, wê di civatên xwe de, êdî wê xwe bidina berdewam kirin. Lê rêveberîya herêmî ye ku pêşketiya ye Osmanîyan dijbertîyeka pir xurt li ber kurdan dide nişandin. Li gelek herêman çûna bi ser kurdan de bûya û bi sadan û hezaran xalk hatina kuştin. Ji vê demê pêde, wê demeka bi vî awayî wê were holê. Wê, êdî demne şer û pevçûnan ên pir dijwar wê werina holê. Di vê demê de pêşavanî kirin û û rê nişandin jî, pir pêdivî pê heya. Di vê demê de têgihîştin bi pergali û civatî pê heya. Wê Meleyê Cizîrî, bi vê yekê re bi têgihîştina xwe re derkeve pêş. Ew kirinên ne baş û ên baş dibîne û wan jev dinaqêne. Bi vê yekê re ew dihêne ser ziman. Osmanîyan, wê piştî wê demê re êdî bînavber wê werina bi ser kurdan de. Ji ber ku kurdan, bi kirinên wan re bawerî li wan windakirina û rastî bêbaxîya wan hatina, êdî ji wan bawerî windakirina. Bi vê yekê re, êdî di herêmên xwe de, êdî bi serê xwe re tevdiagerihin. Bi vê yekê re, êdî rêveberîya giştî ye li ser herêmê ku ava bûya e osmanîyan bi awayekî nasnakî. Bi vê yekê re Rêveberîya Osmanîyan ji hewl dide ku xwe bide herêkirin. Wê jî, bi zor bikarhanîne re dike. Bi darêzorê ti kesekî hate wê rojê xwe bi kurdan ne daya herê kirin. Bi vê yekê re, ku kurd wê hatina wan ye bi darezorê dibînin jî, êdî hê bêhtirî li ber wan disekin in. Li wan, xwe diafirênin. Ji wê jî

demê hate gelek salên piştê û sadsalên piştê wê şer û pevçûn wê di nava wan de biqawimin. Di wê demê de, bi vê yekê re kurd jî, êdfî di civatên xwe de, weke ku êdfî ji xewnekî rabin û werina xwe li wan tê. Li xwe êdfî xwedî derdikevin. Di civatên xwe de, li çareserîyan ji xwe re digirihin. Di van deman de Zanistên kurd, ên weke Meleyê Cizîrî, pêşavaniya wan heya. Bi vê yekê re, di nav kurdan de afirandina têgihîştinekê wê bi wan re were holê. Meleyê Cizîrî, wê têgihîştineka mazin bi kevneşopî û dîroka wan re bi olê bide çêkirin. Lê awayê hanîna li ser ziman ê Meleyê Cizîrî ê olî, divêt ku mirov bi teybet bêne ser ziman. Ew awayê wî, bi kifşkirina nîrxên weke Nebî Nuh û Birehîm Xelîl ên li Kurdistanê re dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, ew hewldana wî ye hanîna li ser ziman ye hizre olî li gor rastîya xwe jî, bi wî re wê derkeve pêş. Meleyê Cizîrî, di aqîlbûnê û bi aqîl hanîna li ser ziman di nêzîkatîya xwe de derdixe pêş. Bi wê re jî, ew xwediyê gotineka Rastteqînîyê ya, weke Êlî Herîrî. ..

Naskirin, têgihîştin û mirov bi hev re wê bi wî re werina ser ziman. Wê hizre olê, ew weke nîrxêke civatî wê bêne ser ziman. "Biaqîl tede dîtî" jî, awayê nêzîkatîya wê dihêne ser ziman. Bi vê nêzîkatîyê, bi aqîl ew dihêne ser ziman. Bi aqîlbûnîyê gotin levhanî û hanîna wan ye li ser ziman, wê bi wî re, weke ku bi Êlî Herîrî re jî hebû, wê xwediyê qadrekî pîr mazin bê. Di levhanîna gotinê de, ew rastteqînîyê dibîne. Bi wê re, ew xweşkkirinê dibîne. Meleyê Cizîrî, di nêzîkatîya bi aqîl de, di deme xwe de bi vê yekê re li civatê dinerê. Gotinên ku di civatan de dihêne ser ziman jî, ew girîng dibîne. Di deme ku li civatekê hate rûniştin û bi hev re axiftin bû, hingî, di deme axiftinê de gotinên ku hatina ser ziman ji nav lêvan, çend ku bi hev re na û di ahangeke rêzkarî de na jî, li wê dihê nerîn. Bi wê yekê re, weke ku kevneşopîyeka li berçav hebe mirov dibîne. Di vê demê de, ev pîr mazin û bi nîrx weke ku li pêş e, mirov wê dibîne. Di wê yekê de Meleyê Cizîrî, li pêşbûnêka wê ye li berçav mirov dibîne. Ew, çend ku di hizre de kur diçê, ewçendî jî di jîyanê de dihê naskirin. Bi hemû aliyên wî re ku mirov wî dihêne berçav û lê dinerê, mirov nêzîkatîyeka civakî e ku di wê demê de xwediyê nûjenîyêka ya bi wî re dibîne. Bi vê yekê re ew li pêş e. Awayê hizrê Meleyê Cizîrî, bi safî bi têgihîştina xwe re li ser temenê êqîl e. Li herêmên ku ew dimêne, ew bi wê têgihîştina xwe ye bi vî awayî re ew mirovan bi perwerde dike. Di demên xwe yên dawiyê de ew dihê Cizîra bota û li wir li Medresa sor ew bidest perwerdekirinê dike. Li wir, ew demeka xwe ye pîr dirêj dibuhurêne. Li wir, ew aqîlê xwe bicîh dike. Hem di nav mirovên ku ji wî perwerde digirin û hem jî di nav civatên ku ew lê dirûnîhê de ew hizirna pîr mazin dihêne ser ziman. Têgihîştineka pîr mazin dihêne ser ziman. Rohnîyêk di serê wî de bi aqîl heya û ew, wê di serê mirovên ku bi perwerde dike de bicîh dike. Bi vê yekê re, ew dike ku têgihîştina wî bi pêşketina li Kurdistanê re were pêşarajê ta deme me. ..

Li Kurdistanê, hate vê demê, ji aliyê pêveçûn û pêşketinê wê re, mirov divêt ku bêne ser ziman ku pîr mazin pêşveçûn heya. Ew pêşveçûn jî di warê civatîyê de dihê holê. Bi vê yekê re, berî ku em bidest hanîna wê ye li ser ziman bikin, em di vir de, çend gotinan ji bi awayê pêşketina civatî ye li Kurdistanê ve girêdayî ji bînan ser ziman. Di vir de, ev yek pîr girîng e. Ji vê demê pêde, wê awayê pêşketinê bikeve qade hizir de û di wê de bi pêş ve herî. Lê hate wê demê jî, bi awayekî kevneşopî dem bi dem bi peresendinîyêka pêşveçûn dibin. Bi vê yekê re, awayê pêşketinê di çerçova kevneşopîyê de bi aqîl û jîrî mirov karê bi wê heyîna awayê peresendinê de fahm bike. Ji dema Gûtîyan ve, mirov dibîne ku li Kurdistanê awayekî pêşketinê ê bi têgihîştin, hate ku dihê deme me serwerîya wê bi êqîl heya û dibe. Ew dem, di dîroka Kurdistanê de, weke demeka destpêkîya. Mirov, karê wê yekê bi teyber bêne ser ziman. Lê kevneşopî jî, pîr mazin li pêş in. Ku mirov di nav de wê deme Sumerîyan ye ku piştî hatina Aqadîyan re ku dihê û dibê jî di nav de bihasibînê, mirov karê bi Deme Urîyan, Mîtanîyan û ku hate ku dihê û digihê deme Gûtîyan û Naîrîyan û demên din yên piştê de jî, demên wê kevneşopîyên ên ku bi pêvajoyîna dihîne jînkirin in. Serwerîya kevneşopîyê û di wê de di hundurê wê de di xatekê de bi pêş veçûyîna, wê weke xaleka ku awayê pêşketinê bi xwe re dihêne ser ziman bê. Bi vê yekê re, wê di nav wê de pêşveçûn bi têgihîştinî bibe. Di nav civatê de zanistên civatî pîr hene. Ew zanistên civatî, wê civakê bi hizrên xwe yên ku dihênina ser ziman di civatan de, wê bi wan bi pêşve bibin. Lê ew çend ku bi hizrên xwe di nav civatan de zanebûnekê dihênina ser ziman jî, wê navê wan bi teybetî neyê ser ziman. Ji vê yekê re jî, hin sedemên ku hate roje me jî di nav xalkê de bahse wan

dihê kirin hene. Ew sedem jî, weke ku di nav xalkê de dihate ser ziman, weha bû. Di nav xalkê û civatên wê de, mirovna ku pirr bizane hebûn. Wan, hizrên xwe dihanîn ser ziman di civatan de. Ew, bi zanebûn xwe dihatina zanîn û pêşwazîkirin di civatan de. Civatan de yên ku bi zanebûn, dirûniştin. Ji ber vê yekê jî, wan mirovên di civatan de hevdû nas dikirin. Bi wê re, kî bizanebûn diaxift û kî bizane jî bû, dihate dîtîn. Yên ku bi zanebûn jî bûn, weke ku di nav xalkê de dihate vegotin, "ew kevirê giran ên di cihê xwe de bûn". Wan, zanebûna xwe dihanî ser ziman. Wan bahse xwe û zanîya xwe ne dikir. Yên ku li wan dihisandin, bahs dikirin. Ev, li bahra wan diket. Lê mirovên li dora mirovên bizane ên ku diaxiftin jî, li bahra wan diket ku yên ku li wir rûniştibûn û kî bûn û çawa bizane jî bûn, ku bènina ser ziman û vebêjin. Yên bizane, ku wan bahse wan kiriban û ji xwe bi zanetî bahs kiriban, wê ev yek ji wan weke "quratîyekê" bihate dîtîn û hasibandin. Wê, bi vê yekê re êdf ew kirin, ne nêzikatîyekê bizanebûn ku ji wan bihate hasibandin. Dîvîyabû, ku wan hertimî weke ku di nav xalkê de ji û di civatan de dihate ser ziman, "dîlnizmî" bikiran. Dîlnizmî li bahra wan diket. Wilo dihate zanîn û hasibandin ku ku kê û kî çî wî û wê heba û xwediyê çî û zanebûnê ba, wê bihate ser ziman. Bi vê yekê re, wê mafê wî lê bihate dayin. Lê ku wê ew kiriban, wê baş ne hatiba pêşwazîkirin. Ev yek, weke kevnêşopîyeka bi hezar salan bû. Bi vê yekê re, pir "zaneyên civatan", li civatan wê hizrên xwe bihaniyan ser ziman. Ku hizir ji wan ba, wê ji wan bihate zanîn di civatan de, lê ku ne ji wan ba û ku kê jî hanîba ser ziman, wê bigota ku ji kê hanîya ser ziman, Bi vê yekê re, wê êdf navê wan mirovên zane bizanebûnên wan yên ku di bîran de diman re wê maban û piştre wê bihatan ser ziman. Di vir de, em bi vê gotinê û kevnêşopîyê re, aliyekî civatên civakî ên li Kurdistanê ê dîrokî dihênina ser ziman. Wekî din jî, rêze wê ye ku ji jê re dihate nîşandin ji bi nav dikin. Di nav kevnêşopîya civatê de, ev kirin û nîşandin, wê ji rêzê bihate hasibandin. Hate sadsalên me yên dawiyê jî li Kurdistanê, wê ev kevnêşopî bi rêz û hûrmet, heyîn û hebûna xwe biparezê. Wê, ev kevnêşopî bi mirovên zane re ne tenê ji zanebûnekê bê hasibandin, wê bi wê re ji rêzekê jî bê hasibandin û ser ziman. Wê hertimî bahse wê jî bê kirin. Kurd, di civatên wan yên di qasrên mîran û di nav xalkê de wê bi pirralî heyîna wan berdewam bibe. Hate ku dem dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê ev berdewam bike. Di wan de jî, wê bi heyîn ev kevnêşopî hebe. Ji xaynî, nivîs û hizrên wan yên nivîskî, her weha bi vî awayî re wê heyîna wan bi zanebûna wan re were bi bîrkirin û ti carî newê jîbîrkirin. Deme Meleyê Cizîrî, li jor me bi zanebûna wî re awayê zanebûna wî hanî ser ziman. Wî, ew zanebûna xwe di nav civatan de hanî ser ziman. Bi wê re, kir ku di bîran de bimêne û bê nivîsandin. Ji xaynî hizrên wî yên ku wî nivîsandina, bi vê yekê re, ew hizrên wî yên ku di bîran de mana jî hatina nivîsandin. Ev yek, weke kevnêşopîyekî bûya. Bi Manî re jî, ev yek hebûya ya. Bawermendên wî, ew hizrên wî yên ku wî bi destê xwe nivîsandina, gelek hizrên wî yên ku wî bi xwe jî hanîna ser ziman û di aqil û bîran de mana jî, hatina nivîsandin.

Civat, çihna ku di wan de civakî li Kurdistanê pêş bû. Di wan de, civak, temenê wê bi zanebûna wê re hate avêtin. Ji xaynî wê jî, zanebûna civakî û têgihîştinên ku afirîn jî, di wan deran de pêşî hatina ser ziman û piştre di nav xalkê de belav bûn. Awayê pêşketinê yê ku mirov bêne ser ziman, weha bû. Meleyê Cizîrî, ji hizra wî ye civaktî, xwediyê pêşketineka mazin ye dîrokî ya. Wî awayê civatî ê pêşketinî bi têgihîştin kir. Bi vê yekê re, mirov karê bêne ser ziman û beje ku wî, xateka pêşveçûnê li Kurdistanê ji demekê pêde bi têgihîştin da têgihîştin û kir ku mirov di wê de bi meşîn û bi pêş de herin. Meleyê Cizîrî, awayê pergaliya civatî ê hemdem hanî ser ziman. Ew awayê wî yê ku wî hanî ser ziman, wê piştî wî re bi pêşketina xwe re berdewam bike. Wî, pêşî, awayê pêşketî bi têgihîştina wê re ê civakê kifş kir. Piştre di wê kifşa xwe de, wê çawa pêde herê, bi nêzikatîya xwe re û bi hizrên xwe re da nîşandin. Bi vê yekê re, ew li ser awa û kevnêşopîya civakê û civatê re bi gawekê li pêş dimeşî. Bi wê re wî pêşavanî kir. Meleyê Cizîrî, bi têgihîştin û zanebûna wî re, hê jî, ji gelek aliyên wî ve ew ne hatîya kifşkirin û ser ziman. Feqiyê Teyran û Ahmedê xanê ew pir baş kifşkirin û gihîştina têgihîştina di serê wî de. Bi vê yekê re, di vir de girîngîyeka Feqiyê Teyran ye din jî, ew e ku mirov bi wî û zanebûna wî re ji aliyekî ve digihê Meleyê Cizîrî jî.

Ew deme di naqabîna Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran ye biçûk, ku mirov ji destpêka bûna bûna zanebûna Meleyê Cizîrî û serwerbûna wê hildê dest û bêne hate dawîya Feqiyê Teyran,

mirov wê bi wê re bi têgihîştinê meşeka ku mirov wê kifş bike û di wê de awayekî têgihîştinê kifş bike, mirov wê bibîne. Têgihîştina Meleyê Cizîrî û bi pergaliya wê re û bi têgihîştina wê re civatîyeka demî bi zanebûna xwe re di xwe de dihanî holê. Bi vê yekê re, mirov bi têgihîştinê bigihê serwerîya Meleyê Cizîrî, mirov wê di aslê xwe de bigihê serwerîya civatîya demê ye ku ji demên xwe yê berê hate wê demê bi awayekî peresendinî bi kevneşopî hatibû û bi têgihîştin hebû, mirov wê kifş bike. Bi vê yekê re, mirov wê demê bi pêşketin û pêşveçûnên wê re ji pîrraliyan ve kifş bike. Meleyê Cizîrî bi asta xwe re asta deme xwe û ye têgihîştina wê bû. Ew, bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew ji sîrî hate binî têgihîştin bû. Wî, bi wê gotina xwe ye rastteqînîyê re, xwe bi mirovî kiribû têgihîştinek û hiştibû. Gotina wî ye rastteqînîyê jî, xwediyê hin teybetmendîyana teybet ên ku mirov wan bi teybet bêne ser ziman a. Aqilbûn û aqiltî, awa û serwerîya wê gotina wê dihanî ser ziman. Bi vê yekê re, wî li mirov û têgihîştina wî dinerî. Di çerçova gotina wê ye rastteqînîyê ye ku ji me re hatîya vegotin û em di zanîn de şênberîyeka têgihîştinê e bi aqil me didit. Bi vê yekê re, di wê çerçovê de kifşkirina teybetmendîyên hizra wî, wê rast bê. Di deme ku me li ser hizrên wî û wê gotina wî ya rastteqînîyê hizirîkir, me ev yek pîrr bizalefî kifş kir. Ew gotina wî ya rastteqînîyê, di wê de şênberîyeka têgihîştinî hebû. Wî rastî di wê de bi jîyanê re dihanî ser ziman. Jîyan, bi wî re û gotinên wî re û bi têgihîştina wî re rastîyeka şênber bû. Li gor wî fahmkirina jîyanê, wê mirov bigihê pîrr rastîyên din jî. Ew mirovekî bi bawer bû. Mirovên bi bawer, di hizrên wan de batinitî, pîrr li pêş e. Bi vê yekê re, hin aliyên zanebûnê ên ku li gor wan nayêna ser ziman hene. Lê wî, hemû tişt di zanebûna jîyanê de dihanî ser ziman û bi wê re xwe digihanda rastîyan mazin ên mazin serjîyanî jî. Li gor têgihîştina wî, jîyan, destpêkêka wê heya. Lê zanebûn bizanebûna xwe re heya. Li gor wî, "zanebûn di jîyanê de bîcîh bûya, da qana jîyan, mirov karibê wê fahm bike û wê biaqil bijî." "Bawerî, di sinçê(ahlaqê) mirov ê ku mirov pê diji de ya." Bi vê yekê re nêzîkatîyeka wî ya sinçî ye teybet dihê holê. Sinç û aqil, bi hev re di têgihîştina wî de ku hevdu bi hev re rawakirina hene û dihêne holê.

Piştî ku me hinekî jî bê, deme Meleyê Cizîrî bi têgihîştina wî re û bi girîngîya wî re fahm kir, êdî mirov karê li ser wê hanîna me ye li ser ziman ya bi wî û têgihîştina wî re hinekî di bi vir ve were Feqiyê Teyran jî, hinekî bêne ser ziman. Feqiyê Teyran, di wê xate pêşketina bi wê re de, asteka nû ye pêşketinê ya. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wê asta pêşketinê jî, kifş bike û bêne ser ziman. Feqiyê Teyran, ji destpêkê bi fahmkirina wî ye di derbarê Meleyê Cizîrî de re ew bi pêde diçêt. Bi wê re jî, ew kurbûnekê bi xwe re çêdike. Têgihîştina Meleyê Cizîrî ye ku wî hanîya ser ziman û bi kirinî hinekî bi mirovên dora xwe re jî daya fahmkirin, wê Feqiyê Teyran, bi asteka nû ye demê re bitêgihîştin bike. Meleyê Cizîrî, wê bi Feqiyê Teyran re wê baştir were têgihîştin. Wê ew baştir were fahm kirin.

Feqiyê Teyran, bi nerîneka jî Cizîre bota û têgihîştine wê re dinerê. Bi wê re, xwediyê pêşketinekê ya. Feqiyê Teyran, wate wî, wê ew bi pergali, têgihîştina wê deme nû, wê pêşî ew bi xwe re bîcîh bike û piştê di nav xalkê de bêne ser ziman ku ew wê bi wan bide fahmkirin. Bi vê yekê re, ew wê xwediyê hewldanekê bê. Li Kurdistanê li gelek der û deverên wê ew gerîya ya. Her der û devera ku ew çûyê de jî, wî li wir ew têgihîştina xwe ye ku wê di xwe de çêkirîya, ew dihêne ser ziman. Bi vê yekê re dike ku fahmkirinekê bide çêkirin. Feqiyê Teyran jî, weke Êlf Herîrî, meleyê Cizîrî, mele Hisêne Batê û hwd, van zanistên kurd ên mazin hertimî weke "helbestvanna" hatîna ser ziman. Ev awayê hanînen li ser ziman, du sedemên wê hene. Yek, çend ku ev mirovên zane û yên weke wan ku di wê zanebûna xwe de kur diçên bêhîrtî serwerîyekê bi xwe re di serê xwe de bi zimên re didina çêkirin. Bi vê yekê re, êdî di levhanîne de, ew pîrr dibîna xwediyê huner û tevgereka mazin. Bi vê yekê re, mirov karê gotinek jî bê, li ser zimên bêne ser ziman. Zimanê kurdî, bi pêvajoyên pêşketin û dem bi dem ên peresendinê ên ku di xwe de buhurandina, hê di deme Medîya de bûya zimanekî helbestî. Gotina bûna zimanê helbestî, têgihîştineka ku bi hestîfyê re bi mirov re diafirê û wê mirov dihêne ser ziman bi xwe re dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, ev demên pêşketinê di wê de bûna. Di aslê xwe de, ku mirov rastûrast bi lêkolînî li ser dihîzirê û dinerê, mirov dibîna ku hê di deme Gûtîyan de û di demên berî wan de jî ev yek bi zimanê kurdî re bûya. Dem hate ku dihê deme Mirovên weke Êlf Herîrî, êdî bi awayekî ku mirov jî têgihîştina Estetîkê dûr neyêna ser ziman, zanebûn bi zimên re bi mirov re afirandina

û bi wê re hanîna ser ziman. Êlî Herîrî, ji ber vê yekê, weke destpêkeka mazin ye di zimên de ya. Hem di warê levhanîna gotinan de û hem jî di warê di ahangekê de levkirin û hanîna li ser ziman ye wateyê de pêşketineka mazin bûya. Êlî Herîrî, weke ku di têngiştine ve têngiştina ku me bi gotina Estetîkê re hanî ser ziman de bû. Ev yek, me di deme ku li ser wî lêkolîn kir de, me pir bi zelalî kifş kir û wê kifşkirinê jî, têngiştineka mazin bi vê yekê di vî warî de bi me re çêkir. Dem, hate ku dihê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran û hwd, wê ev pêşketina di zimên kurdî di kurmancî de pir mazin bi awayekî pêş bikeve. Ziman, bi vê yekê re, mirov karê bêje ku deme ku bi têngiştine wê re fahmbûnek bi mirov re bû di derbarê wê de, wê hingî bi wê serwerriya mirov ya bi zimên re wê hêzeke bi gotinan re û bi levhanîna gotinan re wê bi mirov re çê bibe. Ev yek, ji serwerriya mirov ya bi zimên ye bi têngiştin dihê holê. Bi teybetî, bi Êlî Herîrî re jî, bi Meleyê Cizîrî re jî û bi Feqiyê Teyran re jî û hwd, mirov yekê pir bi zelalî dibîne. Di deme ku li civatan li hevdû rûniştin dibê jî, wê "bigotinî" lê bînin ji hevdû re. Ew levhanîna ji hevdû re jî, wê piştrewê jî bir kirin û di wê hişan de bimêne. Bi vê yekê re, êdî ji dev bê gotin. Wê piştrewê, ev yek, bi hiskirinê re wê bê berdewam kirin. Bi vê yekê re, wê têngiştineka bi afirê. Lê bi wê re jî, weke Feqiyê Teyran, Meleyê Cizîrî jî, ku di ketina nava hizran de, wê di wê deme hizirkirina xwe de hizrên xwe bixwe jî bi rijênina ser rûpel. Bi vê yekê re, biqasî ku dihê hate deme me bi vegotinî ye di derbarê wan de ku mirov jê fahm dike, wan nivîsandinna pirr dirêj jî nivîsandina û li şûn xwe hiştina. Lê hate nivîsandina me ye vê mijarê û nivîsê jî, me xwe negihanda wan nivîsên wan yên ku wan bi destê xwe re nivîsandina. Ew zanistna mazin bûn. Ku diaxiftin, bi zanebûn, pir xweşik zanibûn ku lev bînin. Bi vê yekê re, ew aliyê wan ye helbestî jî dihê holê. Ev alî, weke aliyekî xweza ê ku bi wan re di civatan de derdikeve holê em dibînin.

Ji vê yekê gavavêtin û wan tenê weke hin mirovna ku tenê helbestvan in, hanîna wan ye li ser ziman, ne rastiyeke diafirêne. Bi teybetî, mirov karê ji bo wê deme hemdem ku mirov Êlî Herîrî jî bi wan re bihasibêne, mirov karê Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, weke du filozofna mazin ên deme civakê bêne ser ziman. Wan bi hizra xwe re pergaliyek hanî ser ziman. Nêzikatiya wan ye ji civakê û civakîtiyê re û her weha ji civaknasîyê re çibû, divêt ku mirov wê jî bi zane kifş bike. Wê ev yek, hingî, wê deme wan bi têngiştin bi me re li ser lingên wê dênê û rûnêne. Felsefe meleyê Cizîrî, felsefeyekê bizane e deme civakê bû. Wî felsefe xwe bi nêzikatî û hizrên xwe yên hanî ser ziman re li ser hîmê pergaliya civakî e civatê afirand û ava kir. Bi vê yekê re, mirov karê wî i teybet bêne ser ziman.

Derketina Ahmadê Xanê û rewşenbîrî û rohakbîriya wî ye bi demê re ...

Di derbarê têngiştina wî û nêzikatiya wî ye bi hizir e civakî û civatî de me li jor bisereke hanî ser ziman. Di vir de, weke pêşketineke wê hizre wî, deme Feqiyê Teyran jî, mirov karê li ser bisekinê. Mirov karê wê bêne ser ziman. Deme Feqiyê Teyran, wê bi wê re bi têngiştinê re şenberîyek wê biafirê. Bi wê şenberîyê re, wê afirandin û awadan wê bê holê. Di wê demê de, her gotinên ku dihêne ser ziman, bi zanebûnekê û têngiştineka ku bi wan re bi wê dihêne ser ziman. Bi vê re jî, di deme hatina li ser ziman de i têngiştin bin û pêşketinan di nav jiyane mirov de di serê mirov de bi xwe re dihênin. Bi vê re jî, wê êdî bi zanebûn afirandinak bi afirê. Hizre ku Piştrewê Ahmedê Xanê sevkî nivîsandina vegotina 'Mem û Zînê' dike bi wê awayê ku ew di nivîsêne, di temenê wê de ew zanebûna bi vî rengî ye ku diafirê ya. Li ser têngiştinê re şenberîyek bi nêzikatiyan û gotinan re di civatên kurdan de bi zelalî xwe di wê demê de dide der. Di wê têngiştinê û şenberbûna wê de, di hîmê wê de demên pêşketinê ên ku bi zanebûna bi mirovan re heya. Dem, bi awayê xwe ye ku pêş dikeve jî, hate wê demê di xatekê de dihê û tê. Bi wê re, hate ku dihê wê demê jî, wê bi vê yekê re, bi têngiştin pêşketineka mazin bi afirê. Jîr, di wê demê de wê jî wê têngiştinê bi wê awayê ku em bi şenberîyê re dihinina ser ziman wê bi afirê û were holê. Wê bi wê re, jîr, bê naskirin. Naskirina jîrê, di aslê xwe de têngiştina mazin ye di derbarê têngiştinê de ya. Mirov karê jê re bêje têngiştina têngiştinê jî. Bi vê yekê re jîr heya. Afirîna jîrê, wê di wê demê de bi vê yekê re mazin bibe. Bi vê yekê re, di awayê pergale civakîyê ye demê de jî, wê pêşveçûneka mazin li ser têngiştine re bi wê re bibe. Weke ku hate roje me jî di nav kurdan de dihê ser ziman "wê naskirina jîrê bibe". Bûna naskirina jîrê, pêşketina asteka

pêvajoyî e bi têgihîştinê re ya. Bi vê yekê re, di awayê pêşketinê û bi gelemperî jî di asta civakê de wê nûbûnekê bi xwe re bêne holê. Ew nûbûn, wê bi awayê wê yê pergali re xwe bide der. Lê di deme xwe de wê ye ku ew wilo zêde newê fahmkirin jî ev yek bi xwe bê.

Feqiyê Teyran, bi vê yekê re, ew bi têgihîştineka mazin ye bi xwe re heya. Di derbarê deme xwe de û têgihîştine wê re ew bi têgihîştin a. Ew, deme ku li pêşîya xwe dinerê çî pêşketin û pêşveçûn bi astî û radi heya, ew dibîne. Bi wê re jî, ew weke asteka nû ye demê derdikeve holê. Feqiyê Teyran, weke rojeka di nava fezeyê de, di deme xwe de di naqabîna me û demên berî xwe de ya. Di wê xale wî de, têgihîştina demên berî ku bi wî re bi têgihîştin bi wî re heya, di wê de dike ku şekl bide demê. Ew deme ku bi meleyê Cizîrî re Destpêkê, di aslê xwe de, ew têgihîştina wê bi pergali bi xwe re dide rûnandin. Bi wê re, li gor wê, wê êdî çawa were jîn kirin, wê jê bi xwe re dide nîşandin. Di deme wî de, wê ew bike ku êdî hertişt bi zanebûnê û têgihîştine wê re werina ser ziman. Bi vê yekê re bi Feqiyê Teyran re wê aqil bizanebûna xwe re derkeve pêş. Ew, êdî bi vê yekê re, deme nû ye bi asta wê re bi aqil dike. Aqil, ew derdixe pêş. Di bawerî û têgihîştina Feqiyê Teyran de, mirov karê wê aqil xwe bigihêne fahmkirina jîyanê. Bi vê yekê re bi zanebûnê re ew awayê jîyane deme nû dide nîşandin. Feqiyê Teyran, ji hinek aliyên ve, weke ku Meleyê Cizîrî jî temem dike. Di warê bitêgihîştin bicihkirinê de ew weke ku wî temem dike. Ji wê pêşketina bi Meleyê Cizîrî re dibe hîmê û wê dide berdeham kirin bi xwe re. Bi vê yekê re, mirov karê bêne ser ziman û bêje, ku Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, bi demên xwe re di berdehame hevdu de fahmkirina wan e bi tehereka pêşketin û pêşveçûnê e bi demê re, wê rastîya pêşketina wan ye civatî e di berdehame hevdu de e bi hev re wê raxe li berçav.

Feqiyê Teyran û devra wî ye di wê destpêka bi Meleyê Cizîrî re de ..

Di vir de, mirov karê hê jê kur herê û bêne ser ziman. Bi Feqiyê Teyran re, mirov karê bi têgihîştinê kur herê û bêne ser ziman. Ew li ser têgihîştinê bi awayekî şênber di rê de dimeşî. Bi vê yekê re mirov karê bêne ser ziman û bêje, ku ew pir mazin di têgihîştinê kur bû. Feqiyê Teyran, bi têgihîştinkirina wî, di vir de di hanîna wî ye li ser ziman de wê ji me re li gor demê bi zanebûn wêneyê bide me. Ku mirov lê bihizirê û li têgihîştina wî bi hizirê, mirov wê wî wêneyî bi zanebûn bigirê. Ew wêne, li gor wê demê, çawa hizirkirin heya û têgihîştina û bi wê re asta demê çiya û çawa ya, wê dihê holê bi xwe re. Feqiyê Teyran, bi vê yekê re zanistekî civatî ya. Bi vê yekê re, mirov karê wî bêne ser ziman. Zanîna Feqiyê Teyran, wê bi têgihîştina wê re, wê demekê bi xwe re doi jîyanê de bide vekirin.

Ji aliyê kevneşopiyê ve jî, mirov divêt ku mafê wî bidîyê de. Ew di wî warî de jî pir xurt û li pêş bû. Bi zanebûneka civatî li pêş bû. Ew di wê zanebûnê de kur bûbû. Û di kirinê de, wî têgihîştina xwe ya civatî li ser wê dabû avakirin. B vê yekê re, ew zanebûna xwe re bi kevneşopîya xwe re dimeşî. Ya ku wê di nav xalkê de pir mazin dide herêkirin û rêz û hürmetekê jî dihêne, ev yek bixwe ya. Kurd, pir bi kevneşopî û nirxên xwe ve girêdayî na. Deme ku nirx û kevneşopiyên wan bûna mijar di gotinê de, cihê gotinê ji ti kesekî re nahêlin. Bi vê yekê re, di nav kevneşopîya xwe de jî, pêşxistin û mazinkirina zanebûnê jî, bi wan re hertimî bi hewldanekê re li pêş bû. Mirov wê yekê di dît. Di vir de civat, divêt ku carek din bahse wan bê kirin. Civat, ew cihên levrûniştinê, cihna ku mirov wan di vir de bi awayekî pir mazin şirove bike û bêne ser ziman. Civat, temenê pêşketina civatî ye kurd bûn. Têgihîştineka civatan e teybet hebû. Di civatan de kurdan, xwe û nirxên xwe dihanîn ser ziman. Çî bi wan re di serê wan de ba, wê di civatan de bihanîyan ser ziman. Bi vê yekê re, wê daban mayîndakirin. Civat, di aslê xwe de, komcivînen civakî ên ku civate giştî bi rê ve di birin bûn. Feqiyê Teyran, wê bi vê yekê re xwe bigihêne têgihîştina mazin. Bi wê re jî, zanebûnaka xwe ya bi pergali e civatî biafirîne û piştê bi pergali jî, wê di nav xalkê de bêne ser ziman. Di hanîna wî ye li ser ziman, nirxbûn bi naskirina bizanebûnî re li pêş bû. Bi têgihîştin naskirin, pir mazin li pêş bû. Feqiyê Teyran, wê di deme xwe de, bi vê yekê re ji wê deme nû ye ye ku bû re, wê bê temen. Bi têgihîştina xwe re wê bê temen. Bi kevneşopiyê jî xwe afirandin, wê bê temenê nirxbûn û rêzeka mazin ye ji wî re. Hê jî, hate nahaka jî, ku mirov diçê herême botanê, ew vegotinên di derbarê jîyane wî de mirov wan ji xalkê lê dihisêne. Dihêne vegotin. Di her vegotin û awayê wê de, pirr rêz û hürmetek dihê nîşandin.

Di vir de, bi kevneşopîyê re em divêt ku nêzîkatîyeka kurdan bêna ser ziman. Li gor me, wê ev yek pir girîng e. Kurdan, di zanebûnê kurbûn, weke gihîştina pîrozîyekê jî di dît. Çendî ku bizanebûn dibû û bi wê zanebûna xwe re li gor nîrxên xwe û kevneşopîya tevdişerîya jî, hingî, êdî bi rêz bahs jê dihate kirin. Di deme ku me li herême botane ji mirovên ku bahse Feqiyê Teyran bi vegotinê dikirin ku me li wan dihisand, gotinekê pir bala me kişand. Hema bêja di serê her vegotina ku hate vegotin de ew gotin hate gotin. Ew gotin jî, ev bû; "ew bizanebûna xwe firî bû". Bi vê gotinê re, nîrxek ku têde pîrozî dihate nîşandin dihate vegotin. Di deme ku bahse Feqiyê Teyran hate kirin de, ew bi zanebûna wî re pir mazin dihate ser ziman. Di vegotinekê li ser wî de, dihê vegotin ku "ew dihê ber çemê diclê û bi wê ava ku di wê çemê de diharikê, bi wê re dipeyivê." Di vê vegotinê de, deme ku me lê hisand me kifşkir ku weke ku bi zanistên bawermend re dihê ser ziman ku ji batinîbûnekê çûna bi ber êqil ve bi wî re hebû. Di wan vegotinan de me ev kifş kir. Me kifşkir ku ew ji zanebûnê û bi têreçûnekê re bi ber wê ve çûyin heya. Di çûna di hundurê zanebûnê ye ku bi wî re ye ku me kifşkir, her weha ev bû, ku "çûyîneka sermedî" hebû. Çendî ku di zanebûnê de bi pêde çûyin bibe, wê bibe. Me ev bi wî re kifş kir. Bi vê yekê re, me kifşkir ku ew sînorekî ji wê çûyîneka di zanebûnê de ya bi pêde ji wê re nabîne. Ew bêsînoriyeka sermedî dibîne. Bi vê yekê re, ew di zanebûna xwe de xwediyê awayekî zanî bû. Mirovên ku di deme wî de lê hisandibûn, ku çawa jê hisandibûn û piştre weke ku wan lê hisandibû û hanîbû ser ziman, wilo hatîbû vegotin û hatîbû ser ziman. Di awa û şekilê wê vegotinîyê de xirakin nebûbû. Weke qalibekî ew awayê vegotinê bi têgihîştin di serî de hatîbû girtin û dihate vegotin. Me, ev yek di wê heyeme hisandinê re pir zelal û baş kifş kir. Her weha bi heman awayê di deme ku bahse Êlî Herîrî, meleyê Cizîrî, Mele Hisêne Batê, Ahmedê xanê û hwd, dihate kirin jî, dihate vegotin. Ew qalibgirtina di vegotina li ser wan de jî, me di deme lê hisandinê de kifş kir. Di vegotinekê de, ku çend caran li ser hevdu ji mirovên cuda were lê hisandin, wê hingî, ev yek pir zelal û baş û qanc were dîtîn û kifşkirin.

Feqiyê Teyran, weke Meleyê Cizîrî wateyeka wî ye demî ye pir mazin ye girîng hebû. Ji du aliyan ve ev watebûn bi wî re hebû. Ji aliya têgihîştina wî ve û her weha ji aliya hanîniya wî ya li ser ziman ve hebû. Ew zanebûna wî, di deme ku dihate ser ziman, pir bi balî lê dihate hisandin. Her gotina ku li ser wî dihê ser ziman û dihate ser ziman, bi balî lê dihate hisandin û di serîyan de dihate girtin. B zanebûna wî re, deme ku bahse wî dihate kirin, ew vegotina ku bahs dihate kirin û dihate vegotin ku "ew çûya ber çemê diclê û pêre peyivîya", di çerçova pîrozdayînekê de dihate ser ziman. Piştî ku ew vegotin dihate ser ziman, dihate gotin ku "bînerîn ku ew çiqasî di zanebûna xwe de kur çûya û gihîştîya batinîyekî." Ev gotina batîniyê ne li pêşîya zanebûn, di zanebûnê de li cihê ku bi çûna têra ku dihate gihîştin lê, li wir dihate bicihkirin. Lê ew ciha ku i çûnê re lê dihate gihîştin jî, li wir seknek û an jî dawîyek di vegotinê de ne dihate ser ziman. Di awayê têgihîştin û têgihîştinkirinê de, zanîna di vir de mirov pir baş fahmdike ku bi wî re hebûya. Ev yek, bi zanî dihê dîtîn. Bi vê yekê re, mirov kifş dîke ku wî pir girîngî daya awayê hizirkirin û heyîna têgihîştinê. Bi vê yekê re, mirov kifş dîke ku wî di çerçova awayekî têgihîştinê ê ku ew di derbarê wê de pir mazin xwediyê têgihîştîneka di serê xwe de ya. Mirov wê yekê her weha di cih de bi wan vegotinên di derbarî de ji wan fahm dîke û kifş dîke.

Bi vê yekê re, di nav xalkê de hanîna ser ziman û di nav xalkê de bicihkirina wê awayê têgihîştinê, mirov wê fahm dîke ku dem gihîştîya çî astê û pêşketinê. Bi vê yekê re, ew awayê têgihîştinê, di nav xalkê de bicihbûna wê, wê civateka felsefîk bêne holê. Bi vê yekê re, hewldaneka afirandinê heya bi wî re. Ew bi vê yekê re, mirov dibîne ku bizanebûnê têgihîştina xwe ye ku heya re pêşvanîyê ji xalkê re dîke. Civat, bi vê yekê û awayê pêşketinê re awayê wê ye ku diafirê di demê de dihê berçav. Mirov wê bi wê re kifş dîke. Felsefêbûneka bi jîrî heya. Naskirîneka bi têgihîştin diafirê. Bawerî û nîrxên olî, bizanebûneka têgihîştinî dihêne ser ziman. Bi vê yekê re di temenê xwe afirandina civatîyê de ji nû ve awadana civatê û nav xalkê dihê dîtîn. Civate zane û têgihîştinê, di aslê xwe de li Kurdistanê di wê deme wan de pêşketina wê dest pê kirîya. Meleyê Cizîrî, destpêka hanîna têgihîştina wê ye demî bi pergaliya civatî ye xwe afirandinê re kirîya. Bi wê re, wî xal û zagonên awayê pêşketina demê, weke ku dana têgihîştin. Bi vê yekê re, pêşî ew di xwe de bitêgihîştin kirin û piştî wî û wê re li gor wan tevgerîn dihê holê.

Ya ku mirov di serî de bi vê yekê re kifş dike ev yek bixwe ya. Feqiyê Teyran, zanistvaniya wê demê û wê têgihîştinê dike. Ew, bi wî re pîrozîyek li têgihîştinê dihê baxşkirin. Bi vê yekê re, zanebûn jî kurbûna wê bi wê re weke nirxeke dihê dîtin. Qadrek jî, jê re dihê ser ziman. Nirxbûn û kevneşopîya wê jî dihê holê. Ew kevneşopîbûn, ew civatîtiya ku heya, wê civatîtiyê dihildê û di nav xalkê de bi têgihîştin dide rûnandin. Bi vê yekê re giştibûnek bi civatîyê re di nav xalkê de bi civatî bi wê re diafirê. Zanistên weke Feqiyê Teyran û ku berî wî jînbûna Meleyê Cizîrî, di têgihîştina wê de bi zanebûna xwe re dibîna xwediyê weyneke dîrokê ji pêşketina wê re. Ji vî aliyê ve jî, qadr û qiymetê Feqiyê Teyran û Meleyê Cizîrî û hwd, dihê berçav. Mirovên zane, mirovna ku divêt ku di zanebûna xwe de bi kurbûna xwe ye di têgihîştinê de re, divêt ku xwediyê kurbûneka bitêgihîştinî bin. Her gotinên ku ji devê wan derketin, divêt ku ew xwediyê zanebûn û têgihîştina wê bin. Bi vê yekê re, wê hingê, wê navê zaneîtiya ku di nav civatan de ji bo wan dihatê ser ziman, wê bi maf bikin. Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, ew bi mafkiribûn ku ji bo wan ew dihatê ser ziman. Di nav civatan de, her gotina ku ji devê mirov derdiket ji gele alîyan ve dihatê lê nerîn û wezinandin. Bi wê re, dihatê xwestin ku were fahmkirin, ku çendî bi zanebûn ew gotina bi zane wî mirovê ku ew hanîya ser ziman ew di deme axiftina xwe de hanîya ser ziman û çendî û çiqasî jî di têgihîştina wê de ya. Bi wê re jî, mirovên zane ên din ên civatê, wê lê bigihina hevdu û wê ji wê têgihîştina ku wî hanîya ser ziman, wê pirsan bîafirandan û jê bikiran. Ew, yê ku ew gotinên bi zane hanîbûbûna ser ziman, divîya ku ew pirsên ku jê hatina pirsîn, bi zanebûneka tam ew pirs bi bersiv bikiran. Bi vê re, ew ast û rada civatê jî, dihatê mazin kirin û ser ziman. Her mirovê zane, di civatan de herîmî weke ku di azmûna de bin bûn. Feqiyê Teyran jî, wilo bû. Wî, herîmî bi serwestî ew azmûnên xwe buhurandin û ji wan buhurt. Bi vê yekê re, ew di nav xalkê de bi zanebûna xwe re êdî bicih bû. Êdî navê wî bi zanebûna wî re derket. Bi wî re êdî bi awayekî teherî, ji zanistîya wî hate û gihiştî civatê û ji civatê hate û gihiştî nava xalkê û hwd, bizaneyî afirandinek bû. Bi hev re, di ahangekê de bi pêş ve çûyin bi vê yekê re bi wî û xalkê re bi hev re bû.

Di vir de, deme ku mirov bahse Feqiyê Teyran dike, awayekî zanebûnê di serê mirov de şîn dibe û dihê berçavên mirov. Ev yek jî, sedemna wê yên bi pêşketina wî û têgihîştina demê ye ku heya ku wî di xwe de bifahm bitêgihîştin kirîya û rûnandîya re girêdayîna hene. Mirov di vir de, Feqiyê Teyran divêt ku pir baş fahm bike. Wê bi wî re sê tişt pir baş û qanc werina fahm kirin. Yek, zanebûn û têgihîştina wî ya, ku ew wê bi awayekî li gor demê dihêne ser ziman û bi xalkê dide fahmkirin a. Ya din jî, ew awayê têgihîştinê ê Meleyê Cizîrî destpêka wê dabûkirin di jîyanê de û êdî bi wî re bi pergala di jîyanê de bi têgihîştina demî ye civakî û civakînasî bidest pêşketîya xwe ye demê kirîya ya. Ya sêyemîn jî, her weha ast û rada demê ye bi wî re ku xwe dide nîşandin a. Ew bi vê yekê re, mirov karê wî bi teybet bêne ser ziman. Zanebûnê Feqiyê Teyran, ên bi pirtûkî bin û ên ku axiftinê û hwd, ku wî kirina û hanîna holê, î ro, pîrên ji wan di destên me de tûne na. Lê em dizanîn ku wî pir mazin bi awayê hizrî hanîya ser ziman. Bi teybetî ku di qadê hizir û ramanê de dihê ser ziman, wî bi dîrokê û civak û demê û her weha olê re pir mazin hanîya ser ziman. Wî hin pirtûkna mazin ên ku wî nivîsandina hene. Em bi vê yekê, di derbarê wî de bizanebûn bûna. Di deme ku me li ser Feqiyê Teyran bidest lêkolînê kir, me ji gelek mirovên ku zane ên ku di derbarê wî û jîyane wî de pir mazin xwedî zanebûn bûn, hiskir ku wî pir mazin nivîsandîya. Lê mixabin, hate nivîsandina wê nivîsê û mijarê jî, me xwe ne gihandîya wan nivîs û nivîsarên wî yên ku wî bi destê xwe hildana pênûsê û rijandina ser rûpel.

Her mirovekî zane, ku bidest fêrkirina bi perwerdê kir, hinek hizrên xwe jî, dihanîna ser ziman û nivîsandin. Di nav kurdan de ev yek weke kevneşopîyekê ya. Nexasim vêca ku mirovekî ku xwedî dergah û medresa ba. Feqiyê Teyran bi salan di Medresa Sor e li Cizîre Bota ku hate roje me heyîna xwe hanîya, di wê de pir mirov dana perwerde kirin. Ew kevneşopîya nivîsandina hizrên xwe û bi wê perwerdekirin, di dergahan de weke xaleka sereka bû. Mînaq, Teymiyê Harrañî, di vir de navekî wî yê pir mazin ê ku derketibû hebû. Ew hizrên wî yên ku ew dihêne ser ziman, derdikevina dervî dergaha wî û li herêmê li dergah û medreseyên din jî, di nav xwandeavan de belav dibin. Li Cizîra bota li Medresa Sor, ev kevneşopî pîr xurttir hebû. Meleyê Cizîrî jî, em dizanîn ku wî ev yek kirîya. Hizrên wan, civat bi zimanê wê re pîr mazin

daya perwerdekirin û pêşxistin. Bi vê yekê re ji vî aliyê ve jî, divêt ku mirov bi rêz û hürmet bahse wan bike. Ev aliyê kevneşopîyê jî, wan bicih hanîya.

Li Kurdistanê, bi vê yekê re, di nav civate kurd de pergaleka perwerdekirinê hebû. Li vir, em hinekî navbarê bidina hanîna li ser ziman zanistên mazin Feqîyê Teyran û hinekî jî bê, bi çend gotinan jî bê, wê pergale perwerdê ye ku hebû bi awayê wê re bi çend gotinan em bînina ser ziman. Wê, ev yek, di berdewame fahmkirinê û têgihîştinê de jî bê fahmek û têgihîştinek ji bo baş fahmkirinê. Wê hingî, baştir were fahmkirin ku ew kevneşopîyê perwerde ye bi pergale wê re jî li ser çî awayê bû û di çî astê de bû. Li Kurdistanê, pergaleka perwerde ye ku hê ji deme Gûtîyan ve bi civatan re bê û her weha hin levcivînên din ên olî re bê, li gor wê awayê ku em î ro bi kar dihênin hatibû avakirin. Ew awayê wê, di her demê de demna wê yên pêşketinê bi awayekî peresendinê bûya. Mirov, ku di vir de bi wê kevneşopîyê re bidest hanîna ser ziman bikin bi dîrokê re, ku mirov dihê deme Medîya bixwe jî, mirov dibîne ku wa Zerdeşt ji di çerçova wê kevneşopîyê de bûya xwedîyê hanîniyeka li ser ziman. Wî jî, di çerçova wê kevneşopîyê de hanîya ser ziman. Bi wê re, bi zanistên wilo ên ku derketina re, dem bi dem li gor demê xwe afirandin jî bûya. Her dem ku têde hatîna ser ziman bûya, ku mirov wê hatîna wê ye ku hatîya ser ziman lê dinerê, mirov bi awayekî zelal dibîne ku her deme ku hatîya ji ye berî xwe bi gavekê li pêş hanîya ser ziman. Zerdeşt, weke ku dihê gotin jî, li ser bi hezaran ayarên sawalan nivîsên xwe dinivîsêne û di nav xalkê de dide bicih kirin. Bi vê awayê re, awayê afirandinê dibe. Pergale giştfî ye li gor wê ku dihê hizirkirin û dihê ser ziman jî, pergale Êzîdîtiyê ye civatî û olî ya. Bi vê yekê re, mirov ku wê pergale dem bi dem wê fahm bike, û tê bigihê, mirov wê dîroka herêmê û pêşketina wê ye bi dîrokê re têbigihê. Zerdeşt bixwe jî bi serê xwe jî, derneketîya. Ew, di serê wî de ew pergale heya. Li gor hanîya ser ziman û kirîya ku mirov bi wê bigihina têgihîştinekê.

Piştî wî re, dem hate ku digihê û digihê deme derketina musulmanetiye wilo dibe. Di deme Musulmanetiye de jî, wê bi çend guharandinên ku têde re wê ew awayê pergale olî wê heyîna xwe biparezê û di deme nû û awayê de jî bide bicihkirin. Di vê bicihkirinê de dihê kevneşopîya civatiyê pîrr girîng e. Divêt ku mirov kevneşopîya civatiyê ye li Kurdistanê wê pîrr baş û qanc fahm bike. Ew kevneşopî, ji vê aliyê ve mirov ku lê dinerê, mirov dibîne ku bi zanebûnê xwe parastin bi wê re pêşketîya. Di wê bicihkirinê de, ev yek bi wate ya.

Xwe Afirîna ji nû ve e di deme musulmanetiye de e pergale perwerde ye gelemperîya Kurdistanê

Li gor deme nû afirandina pergale perwerde, wê weke demên berê dîsa Cizîra bota, weke ku çawa ku ji deme Gûtîyan ve hate wê demê, ku weke navendekê bû, wê heyîna wê derkeve li pêş. Wê temen û hîm ji wê afirandina perwerdehîyî re biafirîne. Hinek sedemên vê yekê demî û yên dîrokî hene. Sedemên wê yên dîrokî, di serî de, bi pêşketin û pêşveçûnên di demê de e ku bi xwe re jînkirina û di wê de bi wê re hin kevneşopîyên têgihîştinê bi wê re di wê de dana afirandin in. Sedeme demî ye wê demê jî, her weha ew nîrxên Cizîra bota ên ku têde ên weke Nebî Nuh ku hate roje me jî hê jî têde razahîna na. Bi vê yekê re, Cizîra bota derdikeve pêş. Wê ji aliyekî di ve jî, dergahî bi şextîyê re derkeve pêş. Ew jî, wê temenê wê bi afirênin. Mirovên weke Êlî Herîrî, ji wê kevneşopîyê na û ew bi hizrên xwe yên ku dihênina ser ziman weke bav û kalên xwe perwerdekirinê didina kirin û temenê wê ye jî diafirênin. Weke ku me li jor hanî ser ziman mirovên weke Teymîyê Harranî jî, wê bidest nivîsandina pirtûkên ku pê perwerde bê kirin, wê bidest nivîsandina wan bikin. Wê dikin jî li gor demê. Lê piştî derketina musulmanetiye guharandinek dibê. Çawa ku hate wê demê, tenê zimanê perwerde kurdî ya, wê piştê ji ber ku pirtûka pîroz ye olî "Kur'an" bi arabî ya û ku derfet ji wergere wê re hê nîn e, edî zimanê arabî jî, li Kurdistanê hinekî bi wê re bicih dibe. Lê dîsa kurdî di wê de heya. Minaq, weke ku hate roje me jî heya, deme ku pirtûka pîroz ye olê dihê xwandin jî, weke ku dihê ser ziman" ji aliyê *hicir(bi awayê kûtekirinê xwandin)* ve bi kurdî dihê xwandin û ji aliyê *sira(bi awayê rêzkirinê=bêjekirinê= xwandin)* ve bi arabî dihê xwandin. Di awayê perwerde demê ye ku heya de, her weha aafirandinak heya. Berî hingî, pirtûka olî ye pîroz ye Êzîdîtiyê ji ber ku bi kurdî bû, û ji demên berî zayîne ên nêzî 3500 salî û bi vir de ku demna pîr mazin ên perwerdekirinê pê di

buhurin, êdî di bicihbûna ziman û pêşketina wê de, êdî wê temenê ji wê re diafirîne. Bi vê yekê re, awayekî teybet ê perwerdekirinê li Kurdistanê dihê holê û serwer dibe. Di nav civatan de, mirovên olî ên herî zane, ên ku karin bi zimanê xalkê û kurdî bînina ser ziman û zelal bikin in. Bi vê yekê re, ev aliyekî zane ê seyde û alimên deme musulmanetiyê jî dihê hasibandin. Pergale perwerdekirinê, wê hate ku were deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, wê pir mazin pêşketinna demî ên hemdemî di xwe de bide çêkirin. Herêmên ku zanebûna xwe re derdikevin pêş ên weke Cizîra bota, wê malvantiyeka dîrokî jî zanistan re bi kişandina wan ye li xwe û di xwe de bicihkirina wan re ji wan re bike. Cizîr, di aslê xwe de weke ku di nav xalkê de hertimî hatîya ser ziman "mala zanebûn û têgihîştinê ya". Feqiyê Teyran jî, deme ku diçê Cizîra Bota, êdî li cihê ku lê ya, êdî digihê wê têgihîştinê tişta ku wê hildê hildaya û ew bi hatina xwe ya li wir re jî, weke ku ketîya pay zanebûnêka hê mazin û kur de. Armanca wî ye hatina Cizîra bota, tenê mazinkirina zanebûna xwe ya di serê xwe de ya. Mirov, vê yekê j bo wî karê bi teybet û bi êmin bêne ser ziman. Di awayê perwerde demê û pergalfiya wê de jî, ku mirov bi têgihîştina wê ye ku heya re bigotinekê jî bê bêne ser ziman, awayekî hemdem û ku di deme xwe de nûjeniyekê bi têgihîştine xwe re dijt ya. Feqiyê Teyran, bi salan seydatîya civatê dike. Civatê perwerde dike. Bi vê yekê re, awayê perwerdekirina wî jî, ji têgihîştina wî, mirov karê xwe bigihêne hin nîşanakna wê yên demê.

Feqiyê Teyran, di Medresa Sor de, bi salan dimêne û mirovên li wir ên ku xwandevan in, wan perwerde dike. Wan bi hizir dike. Ew, wê zanebûna xwe ya mazin bi mirovên dora xwe re par dike. Bi wê re, ew derdikeve pêş. Di deme ku ew diçê Cizîra bota, hingî ew hê ciwan e. Li wir, ew jî ji bo ku perwerde bibin diçê. Li wir, dihê zanîn ku zanistên pir mazin hene. Wî bixwe jî, ku navê wî bihistîya, Meleyê Cizîrî li wir heya. Ew jî, diçê wir ku xwe bigihêne wî û yên weke wî û ji wan zanebûnê bigirê. Deme ku ew diçê wir, di ew Meleyê Cizîrî dibîne. Çend ku derfet ji wî re namêne ku ew demeke pir dirêj bi Meleyê Cizîrî re jî bi mênê, ew deme kin ye ku ew bi wî re dimêne de jî, di wê deme de jî, ew bi hinek hisandinên ji wî, ew xwe digihêne zanebûnêka mazin ji wî. Feqiyê Teyran, deme ku diçê wir, weke mirovekî ku perwerde xwe ya ji hîm hildabê diçê wir. Piştî ku ew diçê wir, li wir, ew bi wê zanebûna xwe ya ku wî di xwe de hildaya dihêne ser ziman û ew bi wê êdî derdikeve pêş. Bala mirovên dora wî, di deme hanîna wê ye li ser ziman de diçê ser wî. Di wê demê de, ew pir mazin bi wê zanebûna xwe dihê naskirin. Di nav kurdan û pergale wan ye perwerdekirinê e demê de nêzikatîyek hebû. Di perwerdekirinê de, li gor temen mazinbûnê aste perwerde ye ku hafî hildan hebû. Ji 7(heft) salîya xwe zarokan bidest xwandinê dikir. Êdî jî wê deme xwe bi pêde diçûn. Hate ku dihatina deme xwe ya balixbûnê, wê "çend dem û devrên xwandinê wê buhurandi ban." Ku gihîştina deme ciwanîya xwe, êdî li wan weke mirovna ku perwerde temen e hîm hildana li wan dihatê nerîn. Bi wê re, wê ew bihatan pêşwazî kirin. Wê ji wan zanebûn bihate hiskirin. Di civatan de, wê li wan bihate hisandin ku ka çendî û çiqasî bi zanebûn in. Bi wê re, wê êdî wê ew derketiban li pêş.

Li Medresa Sor jî, ev yek wilo bû. Feqiyê Teyran, deme ku diçê wir, êdî ew bi wê zanebûna xwe re derdikeve pêş. Ên ku bi temen û zanebûna xwe re bin wî re na, ew wê li wir bides dana fêran li wan bike. Ew jî, wê bi zanistên mazin ên weke Meleyê Cizîrî re rûnişta û zanebûna xwe mazin bikira. Ku yekî ku xwediyê mejiyê fêrbûnê ba, ku wî carekê jî bi hisanda, wê wî di serê xwe de bigirta. Ev yek, ne tenê weke nîşanaka jîrbûnê û jêhatîbûnê dihatê dîtin, ji wê zêdetir, bi wê re di derbarê mirov de êdî baweriyek jî diafirî. Feqiyê Teyran, di hisana xwe ye pêşî ye ji seyde û zanistê dora xwe, wê di serê xwe de êdî wî xwe bigihanda zanebûnêka mazin. Bi vê yekê re, ew derdikeve pêş. Di aste yê weke wî û di deme wî de, "wê li ser temenê fêrbûna bi têgihîştinê re wê fêrbûn û perwerdebûn wê bûba." Ev yek, wê êdî mirov, di rîya rastteqînîyê de bide perwerde kirin û bi fêr bikira. Zanistî, bi zanistan re li ser hîmê têgihîştinê re, ku bûna şenberîyeka bizanî e bi wan re pêşveçûyin dihê holê bi wan re. Di vir de, mirov divêt ku bêne ser ziman, ku gotina "rastteqînîyê" jî di aliyên ve bi heyîn û hebûna wê re dihatê bitêgihîştinkirin. Aliyê pêşî, bi awayê zanebûna wê re ya. Aliyê dîn ê duyemîn jî, ê ku zanist xwe pê digihanda zanebûnêka bû. Her zanist, di serê xwe de digihîşt hin rastfîyna ku deme ku ew rastî dihatina ser ziman bi wan re navê wan dihatê holê jî bû. Bu vê yekê re, mirov karê bêje ku awayê pêşketinê hebû. Bi wê vê yekê re

bi zanebûn û têtîhiştin û axiftin û hanîna li ser ziman, wê bi xwe re bi hanîna wan ye li ser ziman rastteqînîyek bi hanîyan li ser ziman. Bi vê yekê re, êdî wê gotina zanist, bi têtîhiştina ku wî pê dihanî ser ziman re, wê bi navê "rastteqînîya ku wî hanîya ser ziman" wê bihate ser ziman. Kifşkirinên di têtîhiştinê de û bi wan kifşkirinan re kurbûna di wê de ye ku di hate holê jî, di vir de, mirov divêt ku bi nav bike. Rastî, fahmkirina wê di vir de wê bi hate fahmkirin. Têtîhiştin, di têtîhiştina wê û têtîhiştina wê têtîhiştinê ye ku mirov re diafirî de, wê gotineka rastteqînîyê wê bi afirî ba û bicih bûba di serê mirov de. Di vir de, ew gotina têtîhiştine ye ku bi mirov re bûya, wê bi zanebûna bi wê re ye ku bi mirov re bi demê re diafirî re wê, wê bi pêşketina ku di serê mirov de bi mirov re da çekirin re, wê mirov li ser temenekî bizanî bida rûniştandin. Di vir de, di aslê xwe de zanebûn, hertimî, wê pêşketiba bi mirov re. Feqiyê Teyran, di vir de biqasî ku mirov fahm dike, awayê wî yê fêrkirinê, di vir de bi gotinê ew şenberîya ku bi gotina rastteqînîyê re dide çekirin re dide çekirin. Ew jî, bi hizirkirinê re bi pêşketine mirov re dide çekirin. Di awayê wî yê perwerdekirinê re bi goftûgoyên ku wî bi mirov re dikirin û bi wê re ew tîrîfîya ku wê bi mirov re dide çekirin, bi wê re dikir ku hizir bi mirov re biafirîne. Pirs pirsîn, weke ku hate roje me jî dihê, di wê awayê perwerdekirina li Medresa Sor de hebû. Bi wê re dana hizirkirin û kurkirin dibû. Di derbarê zanistên berî xwe de jî ew pir kur bû. Zanebûna wan wî dizanî. Ew jî, wî dihanî ser ziman. Bi vê yekê re, mazin kirina têtîhiştinê e bi xwandavanan re dide çekirin. Zanebûn, wî pir girîngî di dayê de.

Di wê demê de, wê bi vê yekê bi wî re awayekî pêşketinê wê heyîna xwe bide berdewam kirin. Perwerdeye Kurdistanê e ku têde dibû bi mirovên wê re bi pirralî bû. Aliyê weke Astronomî û matamatikê û hwd, hê ji deme Medîya û bi vir ve, biawayekê kevneşopî rûniştina wan bûya û heya. Di wê demê de jî, ew yek pirr heya. Hizir bi raman û têtîhiştina wê re pêşketîya. Safîbûna bi hizir e di têtîhiştinê û e bi têtîhiştine e di hizir de, di vê demê de gihiştîya zanebûneka pir mazin. Di awayê wê pêşketinê de bi nixî pêşketineka heya. Meleyê Cizîrî, pir li ser zanebûna têtîhiştinê e di hizir de hanî ser ziman. Di wê de kurbûneka wî hebû. Bi wê re, bi têtîhiştineka mazin ew hate naskirin jî. Têtîhiştina wî, piştî wî re bi zanistên weke Feqiyê Teyran re wê bi pirralîbûneka bi xwe re we bibe malê xalkê û dîrokê.

Feqiyê Teyran, bi qasî ku ji vegotinên ku î ro jî di derbarî wî de dihêne vegotin û mirov ji wan fahm dike ku "wî pir girîngî daya awayê hizirkirinê." Li ser wê pirr sekîniya. Di nav kurdan de, gotineka ku bûya weke gotina xalkê û dihat ser ziman û di hate gotin ku "bizanebûn bêne ser ziman ku te hanî ser ziman di deme axiftinê de", ji wê gotinê mirov fahm dike, qiymet dana zanebûn di nav wan de pir mazin hebû ya. Bi vê kevneşopîyê re, di wê demê de nêzî Feqiyê Teyran û yên weke wî yên berî û yên piştî wî jî bi vê hatîya kirin. Mirov, vê yekê kifş dike. Ew, mirovekî ku di zanebûna xwe de bi têtîhiştin bûya ya. Bi vê yekê re, êdî bi wê re rêz û hürmeteka mazin jê re afirî bû. Bi wê re, dem ji nû ve biafirê. Lê di vir de, mirv karê vê bêne ser ziman û bêje, ku piştî wî re, êdî wê demeka nikûnû wê pêş bikeve. Ew deme nikûnû, wê tenê li ser hizir û têtîhiştina wê re bi pêş bikeve. Di wê demê de, bi vê yekê re, êdî demeka pêşketinê dest pê kiribû. Dem, ketibû, demeka xwe ya nû ye hizir de. Wê hizir bi ast û pêşketineka nû biafirîya na. Qasr û dergahên herêmê ên ku hatina tişkirin bi pirtûk û nivisan û nivîsaran re, wê jî wê pêşketinê re temen bi afirînê. Bi vê yekê re Kurdistan, li ber deriyê demeka nû ya. Di aslê xwe de, herêm bigiştî li ber deriyê pêşketineka nû ya. Lê bilindbûna Osmanîyan û li herêmê bûna wan ye desthildar, wê li pêşîya wê bê astang. Bi bilindbûna Osmanîyan re, wê deriyê zanebûn jî herê biravê. Bi ravîna wê zanebûnê re, ev herêma ku hatî ber deriyê pêşketineka dîrokî ya bi xwe re, wê êdî bi wê re barkirina wê ye bi ravîya wê li rojava re, wê li wir demeka êqil ye ku "jinûvebûnê" wê bêne holê. Ew deme jinûvebûnê, wê rojavayî jê re bêjin "ronesans". ..

Li kurdistanê hin bi hin afirîna himê JINÛVEBÛNÊ bi ronakî û rewşenî

Bi vê re, wê rojava bi demeka pêşketinê ye 'jinûve', wê bidest pêşketineka demî ye bi xwe re bike. Rohilat jî, wê bi wê desthilatdarîya ku ji nû ve li ser serê wê bû desthildar re wê bikeve demeka xwe ye nû ye 'reş' de. Ev gotina reşbûnê ye di vir de, bi mivirîna wê ye ji aliyê pêşketina wê ve dihê ser ziman. Êdî, herêm, wê bi wê rewşa xwe ya ku diafirê, wê bi awayekî binketinîyê re

wê di sadsalên piştê de jî wê wilo di wê rewşa ne pêşketina de wê bimêne. Wê ancamen wê ne pêşketina wê li herêm û ji bo herêmê pirr giran bin. Çawa ku hertimî ”roj ji rojhilat ve dihilta”, wê êdî ew roj ne hilde. Wê bikeve demeke xwe ya ku di bin awran de di mênê de. Kengî ku ew awr li ber wê vebûn, wê hingî êdî dîsa wê bihiltê. Wê êdî dîsa weke demên xwe yên berê wê birohî bike. Wê rohnîya wê vede. Rojhilat, bêhna zanebûna wê, ketîya axa wê de. Wê ti carî jî, ew bêhn jê neçê. Divêt ku mirov wê zanibe. Ax û jîyan, bi mirov û nirxîtiya wî ye bi kevneşopîya wî re bi pergali heya li rojhilat. Wê yekê jî gîyane wê ye ku afirandîya, wê bi wê bike ku rabê ser lingên xwe di deme xwe ye pêşketinê de. Bi wê yekê re, mirov karê wê bi teybet bêne ser ziman. Kurdistan, di nava wê pêşketinê de ya. Li wê, li Diclê û Firatê, hertimî, ew pêşvanî bi wê hebû. Bi wê re, ew nixên wê ye ku afirîna, î ro jî, wê pêşketina herêmê û herêmên din jî dihêne holê. Ji wan re hîm a. ..

.. Ev deme ku ew bi navê Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran re bi navbikin û bêhna ser ziman, wê bi wê yekê xwediyê pêşketineka pir mazin e demê bê. Ev dem, wê bi wê awayê xwe re wê di demên piştê de heyn û hebûna xwe bide berdewam kirin. Bi wê yekê re, ku mirov li demên piştî wê demê bi rastîya kurdistanê re lêbînerê û wê bêne berçav û bi wê bike di serê xwe de, wê hingî ew awayê têgihîştina wan mirovên zane ye ku bi demê re pêş dikeve û demê bi xwe re bi pêşxistina bi xwe re ku bi pêş ve dibe (dibir), mirov wê hingî baştir fahm bike. Bi wê yekê re, hinekî divêt ku mirov li demên piştê bi awayên pêşketinê ên wan re li wan bînerê. Ev yek, wê ne tenê di wê hanîna me de di berdewame wê de wê têgihîştine bi deman re û di derbarê deman bi me re bide çêkirin, wê her weha di fahmkirina wê têgihîştina wê deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran û têgihîştina wan jî bi me re bêhtir bigihêne têgihîştinaka mazin. Bi wê yekê re jî, mirov divêt ku lêbiberê.

Di aslê xwe de, deme piştî wî deme Kudistanê û pêşketina wê, wê bi sê aliyan ve were ser ziman. Aliyek, ji wê aliye pêşketinê e bi têgihîştin û aqil e. Aliyê din jî e bi di jîyane kurdistanê de bi kevneşopîya wê de di xwezatiya xwe de berdewambûna wê ye û bi wê re jî, li gor wê pêşketina têgihîştine ew pêşketina ku di wê de dibe û di wê de peresendinekê bi deme pêş de dide çêkirin a. Aliyê sêyemîn jî, bi ji destçûna desthilatdariya giştî e bi kurdan re ya. Hate wê demê, kurdan, wê serwerî û serdestîya wan hem bi herêmî û hem jî bi giştî li ser ard û axa wan hebe. Hate wê demê li her herêmê kurdistanê bi herêmî bi rêxistinbûna kurdan heya. Mîrtî û qarstîya wî, di vir de divêt ku were bi navkirin. Mîr, rêzan û rêveberî li gor kevneşopîyê ya û ew bi wê yekê re xwediyê têgihîştin û kevneşopîya xwe ya bi xwe re jî ya. Li her herêmê, ew bi rêxistin a. Ew rêveberîya kurdan di destê xwe de digîrê. Di demê de dergah jî bi şêx re gihîştîya xwediyê bandûreka pir mazin li ser civatê. Ew jî, bi mîr re rveberîyê hevpar dike û bi rê ve dike. Mîr, rêzanîya wê bi zanebûn û têgihîştina wî re di paratîn û li gor nîrx li ser lingên xwe hiştinê de dihê berçav. Şêx jî, wê bi teybetî, di perwerdekirinê de bi dergaha xwe re derkeve pêş. Lê wê bi kevneşopîyê û têgihîştina civatê re wê hevdu temem bikin. Weke ku ji deme Salahadinê Eyûbî hate ku hatibû wê demê jî, pergaliya giştî hebû li ser serê kurdistanê. Xanadana Eyûbîyan, wê hate sadsalên 15. min û hinekî di jî bi vir de, wê heyn û bandûra xwe li kurdistanê bidomê.

Li kurdistanê ji holê rabûna desthilatî û serwerîya Ayûbîyan û bi berjêr ve çûyina kurdan ..

Lê piştê, ew serwerîya ku wê xanadanê li kurdistanê li ser lingan digirt, wê bi derkertina Osmanîyan û bilindbûna wan re wê dest di rêveberbirinê de wê biguharêne. Lê bi herêmî, wê kurd weke xwe bimênin. Kurd, wê li herêmên xwe sewerîya wan bidomê. Di serî de, awayê rêveberîya Osmanîyan, wê di awayekî hevparîya bi kurdan re wê were holê li berçav. Kurd, wê li herêmên xwe ku bi weke ku li herême botanê û Cizîra bota hebû, bi herêmî wê bi rêxistin û hukumet bikin û an jî, weke ku li hin herêmên din bû, wê êltî derkeve pêş û wê bi wê êltîyê bi rêxistin û rêveber bibin. Lê hemû rêveberî jî, li gor xwabûna kevneşopîya û jîyane wê dihate çêkirin. Weke ku kurdan di wê demê de jî dihanî ser ziman armanca wan ” parastîna awayê jîyane xwe û nixên xwe bûn”. Hate ku ne dihate ser kurdan û dest avêtina li jîyane nebûna, wê wan berteke xwe nedaba nişandin. Lê ku kengî destavêtin li jîyane wan bû, hingî, êdî berteke wan di

aste bilind de xwe dide der. Lê ku serwerîya giştî ye herêmê bi awayekî ji destê kurdan diçê, êdî kurd di parastina herêmên xwe de jî, êdî dikevîna zorê de. Ew di demên piştî vê demê de wê zortî û bûna wê, wxwe bidîyarî bide nişandin. Piştî rûniştina rêveberîya Osmanîyan, wê herêm, êdî bidest hatina li ser wê bê kirin. Levkirina di nav kurdan û osmanîyan de, di temenê wekhevîyekê de ya. Lê piştî, wê Osmanî, ku hêz dikeve destê wan de, wê bêbaxtiyê li wê levkirinê bikin. Minaqê peymanê di naqabîna Mazînê kurd Îdrîsê Bedlîsî û Siltanê Osmanîyan Yavuz Selim de, ji vê yekê re nav xwe de û di civatên xwe de dihanî ser ziman, ku "baxtê romê nîn e".

Pergale civakê, di wê de, temenê wê di asê xwe de li ser awayê jîyane civatê ava ya. Awayê jîyane civakê, awayê wê pergale radixe berçav. Bi wê re jî, bi pêşketin û pêşveçûnên bi wê re jî, pêşketin û pêşveçûnê bi xwe re dide çêkirin. Di vê yekê de kevneşopî jî, bi wan xal û zagonên xwe yê bi serwer û serdest ên li jîyane ku hê kifşkar in jî, awayekî destûrî ê wê pergalbûnê bi xwe re dihênina ser ziman. Kurdan, ev yek bi têgihîştin bû bi wan re. Ji ber vê yekê bû, ku di her firsandê de mafê parastîna jîyane xwe bi weke xwe re derdixistina pêş. Mirov, bi civatî, û heyîna civatî xwediyê keseyetîya xwe ye rast bû. Kurd, di her demê de qadrekî ku li ser navê nîqaşkirin didina wê kevneşopîya xwe. Ji ber vê yekê, hertimî di parastîna wê de dibina xweî isrer.

Wê, pêşveçûnên piştî ku dibin, wê rastûrast bandûra wan bi wê aliyê wan re xwe bide der. Hatina bi ser kurdan de, wê dem bi dem bi pêş bikeve. Kurd, di nav wê kevneşopîya xwe ya ku ji wan re weke nirxeka bêgotina, xwe azad û bi serxwe hîs dikin û dibînin. Ji ber vê yekê, deme ku dest avêtina li wê dibe jî, êdî piştî bidest dana bertekdayînê dikin. Wê, herêm bi herêm li ber xwe bidin. Lê ew herêm bi herêm bûna wan, çendî ku di deme di pargale xwe ye giştî ji Kurdistanê de serwerbûn weke hêzeka wan ye di nav wan de ku bi serê xwe bû û wê rewşê pêşketinek bi wan re dide çêkirin ji aliyê deroniyê û têgihîştinê ve, wê piştî ku ew serwerîya wan ji destê wan diçê, wê ew rewş weke qatbûnê di nav wan de wê xwe bider der. Bi vê yekê re, êdî ji ber ku serwerîya xwe ya pergali ye giştî windakirina, êdî yekbûna wan jî nabê. Rêveberîya Osmanîyan, wê ji sadsalên 16. min de, wê vê yekê farq bike û wê êdî bi kişandina hine herêm û êlên kurdan li cem xwe re û dana şerkirin e wan li ber herêm û êlên din re wê bi dubendîyekê ku dide afirandin re wê temenê wê yekbûnê giştî ye bi pergali di wan de ji holê rakê û hêze xwe mazin bike. Kurd, di wê demê de jî civateka pir mazin e bi hezaran bû. Ku yekbûna wan afirîba, karîbûn ku di hêzeka xwe ya bi deh hezaran a artişî bidina avakirin û bi wê, serwerîya xwe li herêmên xwe carek din bidina avakirin. Lê bi wan dubendîtiyên ku di nav wan de hate afirandin re êdî temen û derfet ji wê re ne hate hiştin. Ku mirov, ji aliyê kurdan ve liwê windakirina wan ye demê jî bînerê, ji vî aliyê ve jî mirov karê bînerê û bêje, ku kurd, bi ne afirandina yekbûnê xwe ya di nava xwe de, sedema herî mazin ye ji wan sedemên ku bûna sedema wê êş û eleme wan ye di dîrokê de ku bi wan re dihêne holê û diafirîne. ...

Kurd, wê ji vê demê pêde, wê windabûnê mazin bijîn. Wê di wê demê de jî, ew pêşketina wan ye di serê wan de jî qût nebe. Lê wê derfete serdestbûnê xwe ye mazin jî nebinê. Ew pêşketina, di wê demê de ku bi hizrên Meleyê Cizîrî re dihêne holê li ser ziman û bi Feqiyê Teyran re bi pêşketineka civatî heyîna xwe di domênin, wê dibin siheka ku pêşketina wan di cemidêne de bin. Piştî wan re, wê ew navê wan tenê jî, bê sedeme bi bîrkirina nirxekî civatî û civakî ku li Kurdistanê. Lê di bin wê cemidandinê de wê pir hizrên wan an ji holê rabin û an jî wê bêne ji bîrkirin. Lê ew awayê têgihîştinê ê ku wan daya afirandin jî, wê weke giyanekê li Kurdistanê heyîna xwe biparezê û bi pêşve herê. Ew giyane têgihîştina Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran, piştî di her firsandê de jî, wê xwe bi bîr bike. Wê hizirna di serê mirov de bi bîr bike. Bi vê yekê re, wê pêşketina bi wan re ku bûya, wê xwe ji demê bi buhurêne demê û bi parezê. Lê

divêt ku mirov bêje ku ew çendî ku kurd, êdî dikevina demeka zor de jî, wê gîyane Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran û yê têgihîştina wan, wê hebe. Her ku mirov serê rakir û li ser xwe re li azmana meyzend, wê ew bi bîra wan bikevin. Weke ku ew gîyane wan bi têgihîştinaka ku di serê wan de dibe re xwe dihêne berçavên wan. Hate roje me jî, ku mirov hê lê dinerê, mirov hîs dike ku gîyane Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran li jîyanê ya. Piştî wan re, çend zanistên kurd û mirovên bi zane hatina û çûna jî, bandûra wê gîyane têgihîştina Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran li ser wan bûya. Van mirovên ku dîrok nivîsandin bi xwe û têgihîştina xwe re, xwe di kurdistanê û kevneşopîya wê de bi zanebûna xwe re xwe kirina rastteqînîyeka dîrokî û hiştin. Bi vê yekê re, em wan bi rêz û hûrmet bi bîr dihînin, carek din. ..

Dema pêşketin û pêşveçûnê ya desthilatdarîya Şadadîyan

Kurd, weke miletekî mazin û xwedî mejû, lê ew dîroka wan ya demdirêj jî, heta roja me bi bi awayekî rêk û pêk ne hatîya nivîsandin. Yên ku Îranî û Tirk bin, li gorî xwe nivîsandina û li gelek deverên hanîna wê ya ser ziman de jî, navê kurdan bixwe jî înkâr kirina û bi wê rengê bi xwe û navê xwe re hanîna ser ziman. Di roja me de jî, weke civate kurd, ku hin bi hin pêşketina xwe dide çê kirin û dike ku dîroka xwe binivîsîne û êdî ji xwe bahs bike, di pirranîyan nivîsandinan jî, mixabin ev nivîsên ku bi nîyet hatina nivîsandin, tê esas girtin û ev jî, dibe temenê rast ne nivîsandinekê jî. Em vê rastiye bi teybetî, di nivîsandina dîroka kurdên şadadî de dibînin. Bi teybetî, weke ku kurdekî ku koka wî digihîjê aşîrên Şadadîyan û pêşîya wan rewadîyan (piştî şadadîyan jî navê aşîrên rewadî heya)rewadî û hwd jî Sahaladinê Eyûbî pêşî kurdîtiya wî hat înkâr kirin. Piştî hat herê kirin. Lê dîrok jî, di temenê wê înarê de hatîya nivîsandin. Çendî ku nav hat herê kirin jî, ew bizanebûn nivîsandina dîrokê jî, piştî hê jî ne hatîya rastkirin.

Di roja me de, di vê temenê de, dema ku em bahse dîrokê dikin, di serî de, ev beşên dîrokê dihên li berçav. Bi teybetî, dema ku em bahse dîroka kurdan ya piştî zayinê bikin, divê ku em cihêkî berfireh ji şadadîyan re vaqatênin. Şadadî, bi teybetî, weke şiqekî wan yê giring di destpêkê de ji kurdên Xorasanî na. Di wê demê de jî, xanadana ku heyî Ya salarîdîyan ku di wê demê de jî hê hebûna xwe diparast û ku ji kurd û farisan ku weke rêveberîyeka wan ya hevbeş bû û ku carna desthilatdarîya wê ketîya destê kurdan û carna Farisan meşandîya û bi hevdu re ji bilî hinek pirsgerêkên ku piçûk ku jînkirna û pêde, zêde ku pirsgerêk jî jîn nekirina di wê demê de dijî. Lê Ev desthilatdarî, weke dû navendên wê hebûn. Yek bi kurdan re û ya din jî bi Farisan re hebû. Piştî jî, bandûra xwe domandîya. - Lê kurd, di salên wê yên dawiyê de lê desthilatdar bûna û bandûra wan jî, pîr mazin bûya. Kurdên hacbanî, kekoyîdî, Eyîrîdî, Daysamî û hwd jî, bi rêveberî û desthilatdarî na û pîr xort in. Di destpêka beşa duyemîn ya sadsale 9' min de, wê jînek bi navê Anazîdîyê ku ji kurdên Eyîrîdî bû, wê kurdên Eyîrîdî jî û yên kekoyîdî jî di bin destê xwe de bike dest û bê serokê wan û ser 50 salî re jî wê hikimdarîyê bike li herêmê. Ev jin û dayika kurd, piştî bûya dayika hemû xalkên din jî, bandûra wê, çend ku di roja me de zêde newê ser ziman jî, di wê demê de pîr zêde bûya.

Teybetmendîya desthilatdarîya Salerîdîyan û kurdên daysamî ku di demên dawiyê de lê serdest dibin, wê piştre pêş bikeve. Lê di wê demê de Aşîra kurd ya rewadî, di wê demê de, dema xwe ya pirr xort dijî. bandûra wê mazin a. BI teybetî li rojhilat kurdistanê û hin herêmên ku weke axa ermenîstana roja me tînan zanîn jî ku di nav de, wê li herêmekê mazin serdest bin. Lê herêma ku î ro, jê re "azerbeycan" tê gotin jî di nava herêmên ku ew lê serwer in. Ku dem tê dema Mihemedê kurê Şadadî, wê ew bi desthilatdarî û tîgihîştinî demekê bide dest pê kirin. Hê ku di dema zarokîya xwe de li cem bavê xwe fêrî karê rêvebirinê û belavkirina dadîtiyê bûya, wê li herêmê ku rojhilatê kurdistanê û xorasanê weke navend digirê wê desthilatdarîyaka xort ava bike. Kurdên Eyîrîdî ku navenda wan Ûmiye bû û kurdên kekoyîdî jî, li kirmaşan, hemedan û heta ku digihîşt Mihabade roja me jî ku lê serdest bûn, wê piştîgirîyeka mazin ji wî re bidina nişandin. Lê di dema wî de, wê dayîka kurd ya hikîmeta ya anazîdê dîtiya û çûya berdestê wê û wê jî destê xwe danîya ser serê wî û ew jî bîpiştgirî kirîya.

Mihemedê kurê Şadadî, wê rêveberîyekê ji nû ve ava nekê. Çend ku î ro, weke avakerê welat û desthilatdarîya şadadîyan jî tê zanîn, em nikarin bi tememî ve yekê bibêjin. Ji ber ku wî, weke kûrmîrekî kurd, kevnepî dewr girtîya ji destê bav û li dewsa wî rûniştîya û piştre jî, li gorî demê ji nû ve bi rêxistinî kirîya û bandûra wê û hêza wê maztir kirîya. Herêmên ku di bin desthilatdarîya bavê wî û kalkên wî de bûn û ku berê wan jî ew herêm dibin destê wan de bûna, herêmên azerbeycana roja me jî, û hinek herêmên dîn ku heta ku digihîşt Osetya roja me jî di nav de bi wê desthilatdarîyê ve girêdayîna. Mihemedê kurê Şadadî, wê cudahîyekê bike û ji bo ku baştir bibe rêveberî, wê li herêma Divînê, wê hêzekê bide afirandin û bicih kirin. Bi wê hêzê jî, armanca wî ew bû ku parastina herêmên xwe horttir bikin. Ji ber ku di wê demê de jî, hin bi hin hinek hêrîşên pirr dijwar bi ser wan de diçûn. Hin komên Şerçûqî, di wê demê de, wê hêrîşên wî yê herêmê û piştî bi Eyîrîdî û kekoyîdîyan re ketina şer de, lê bi ser neketina. Lê ew hêrîş, çend ku bi ser neketibûbin jî, wa fahm kirîya ku wê hêrîşên din jî werina bi ser herêmên wan de ji komên ku hin bi hin diherikin û tînan herêmê ên selçûqîyan û hwd. Di wê demê de, divê ku em bibêjin ku wê pêşî bavê wî ku tê gotin ku Alparslan bûya Melîk Şah wê hêrîşên wî yê mazin wê li wê herêmê bibin. Bi wan hêrîşên wî re wê herêm pirr xwûnê wînda bike. Alparslan, wê bixwe di dema xwe de hêrîşên wî yê mazin bibin, Alparslan, wî gelek dever kevil kirina û ji dîrokê birina. Lê tevî wê jî, nikarîya ku li herêmê xwe bigrin. Piştî wî re kurê wî Melîk Şah, wê hêrîşên wî yê mazin wê li herêmê bibin. Dema ku bahse kirinên Melîk Şah dihê kirin, î ro jî kurd bi îbretê bahsê jê dikin. Melîk Şah, dema ku tê gotin û bahse wî tê kirin gotinaka weke navê wî di nava kurdan de derketîya li pêş ku bi teybetî li herêma botanê tê gotin. Tê gotin ku wî, "herêmên ku wî hêrîşî wan dikir, wê pêşî wan bi hêza wan bişikêna û piştre hemûyî bide beragir. Her wusa, di gelek cihên xwandinê ku em dikarin weke medresa û ankû dibistanan bi nav bikin, tê gotin ku "wî, hemû nivîsar û pirtûk derxistin hûndur û li hewşê dida danîn li hevdu û piştre dide ber agir". Ku bahse wê agirî dihat kirin jî, dihat gotin ku egir li ber arsê xwûdê disekinî."

Kurdên Şadadî jî, di wê demê de, rêveberîyeka mazin ya pirr xort ava dikin ku di nava wê de kurdên eyerîdî, kekoyîdî û hwd, ku pirranîya beşên din ên civata kurd jî di nav de cih digirin, wê desthilatdarîyekê ava bibe. Bi wê re jî, wê li herêmê serdest bibe. Rêveberîya Ku bi vî rengî Mihemedê kurê Şadadî ava kir, wê bi navê bavê wî bê bi nav kirin. Wê serdestîya wê li herêmê pêş bikeve Lê ji dewletê zêdetir, weke desthilatdarîyeka împaratorî pêşket. Piştre jî, herêmên farîsan jî, mazinahîya wê herê kirin û heta ku di cih de, piştîgirî jî kirin. Ji ber ku derdê wan jî, weke yê kurdan mazin hebû ku ji ber hêrîşên ku ji derve dihatin û li herêmê dibûn, weke hêrîşên komên selçûqîyan û hwd ku ji derve dihatin.

Mihemedê kurê Şadadî wê 21 salê wê li desthilatdarîyê bimêna û wê wê desthilatdarîyê birê ve bibe û piştre wê kurê wî Eliyê Leşkerî şadadî, wê were û bidest şah li ser serê wê

desthilatdariya bavê xwe. Bavê wî ji sale 950'ê heta 971'ê li ser desthiatdariyê bimêne. Piştê ew jî yanî Elîyê leşkerî, wê di sale 971'ê de were dewsa bavê xwe. Li gorî ku bi devkî tê gotin, hê ku bavê wî saxbûya û êdî ku nikariya ku desthilatdariyê bi rê ve bibe û karê wê bibe, ew bi wê zanîn huneriya xwe ketiya çavde û di cih de derketiya li pêş û piştê hin bi hin bûya şah. Lê piştê ku ne bi gelekî re ew bavê wî çû ber dilovaniya xwe, wê êdî ew bi tememî bibe desthilatdar.

Li herêmê, di wê demê de jî pêşketin û pêşveçûn zû bi zû pêşve diçin. Elîyê Leşkerî, tevî ku ne zêde pîr jî bû ku hat û bû şah jî, wê desthilatdariya wî zêde nekişêne. Ew, wê desthilatdarî û dema wî ya desthilatdariyê wê dernekeve ser 7 û yan jî 8 salan. Lê wî, gelek pêşketinên ku navê wî li dîrokê didin hiştin dike. Yekî ku bi zanebûya.

Şahên Şadadî, di dema bavê wî Mihemedê şadadî de, hinekî weke demeka arambûnê di buhurê. Lê ji ber hêrişên li herêmê, ev zêde nadomê. Wê piştê jî, komên ku ji herêmên derve tîr û hêrişî herêmê dikin wê zêde bibin. Elîyê leşkerî, birayê wî Merzûban, di wê demê de mirovekî mazin jê derketibû û êdî di civatan de derdiket li pêş. Di dema birayê xwe de, wê gelek karên giring wê hê di dema bavê xwe de bike. Bo vê yekê, navê wî bi teybetî bi huneriya wî derdikeve li pêş. Piştî ku birayê wî Elîyê leşkerî diçê ber dilovaniya xwe, wê êdî ew bi awayekî xweza derkeve li pêş û bibe şah li ser serê desthilatdariyê. Teybetmendîya Merzûban, hinekî jî bi zanebûna wî re derdikeve li pêş di nava civatê de. Mirov, ji aqilê wî bi bawer a. Bi wê baweriyê, ew êdî derdikeve li pêş.

Desthilatdariya Şadadî, ez nikarim bi hesanî tenê wele rêveberiyekê ku hatî û avabûyî bînima ser ziman. Hê ku di dema Eyîrîdî û kekoyîdîyan wereqe û ankû pereyên kîrîn û firotinê di dema wan de di nava wan de hebûna. Bi teybetî, Kekoyîdîyan desthilatdarîyek ava kir ku di welatên roja me de çî têde hebûya, weke wezeret û hwd, têde bicih kirina û bi wate kirina. Pere jî, bi navê xwe pêşî di wê demê derxistibû bûn. Lê ew piştê, serdestîya ku Mihemedê kurê Şadadî ku avakirî herê dikin û bi wê re dijîn. Di pereyên di dema Mihemedê kurê şadadî û kurên wî elîyê leşkerî û Mazrûban jî, hebûna. Lê piştî Mazrûban, kurê Mezrûban ku navê wî fadl bûya. wî tişteki nû kir û desthilatdarî hemû kir yek û ji destekî xwest ku bi rê ve bibe. Wî, wereqe û ankû pere bi navê xwe di dema xwe bo desthilatdariya dan derxistin. Fadl, piştî bavê xwe re di 986'an de tê û dibê şah. Dema wî pîr mazin a. Serdestîya wî jî pîr mazin a. Ez dikarim, mazinahî û desthilatdariya wî bitîjbiheşîma desthilatdariya şahê Merwanî û birazîyê badê kurê dostik elîyê merwanî. Wî jî, di dema xwe de, weke Fadl kir û desthilatdarî ava kir û pere jî bi navê xwe derxist.

De ne, wezirê elîyê Merwan, ku navê wî tê gotin şero bûya, heta ku ti bê bes a bahse bizanebûniya wî tê kirin. Lê yekî ku bi qarekerê xwe weke Beko'ye ku Ahmedê Xanî di destana Mem û Zînê de dihêne ser ziman û di buhurê ya. Lê di dema Fadl ku navê wî yê din ku bi wê tê nasîn jî 'Fazlûn' a de, hêrişên li herêmên wî zêdetir dibin. Di dema wî de, ne tenê wê ji komên salçûqiyên ku tîr herêmê, komên hazarî jî, wê hêrişna wan li wan bibin. Piştê, Fadl, seferê li wan dike. Herêma hazarê, di wê demê de jî di bin destê desthilatdariya Şadadîyan de bû. Lê komên ku lê hêriş dikirin dibû. Bi wê rengê, di temenê hêrişî de, komên ku wê hêriş bikin û piştê bi ravin û herin wê bibin. Bi vî rengî, wê artişa Fadl, wê pîr ziyeneka wê ya mazin wê bibe. Piştî wê re, êdî ew biryare seferêkê dide ku pîrsgirêkê ji binî ve çareser bike. Lê çend ku seferê dikê jî, ji ber ku komên kazakî bin û ên salçûqî û hwd bin, ne bicih in û ev jî, dibê ku nêvî bi nêvî sefera Fadl bêancam bimêne. Lê sefera wî, desthilatdariya wî û reveberîya wî li herêmê xort dike. Herêmên qafqasya ên wê herêmê ku Azerbeycan û Ermenîstana roja me hemû jî di nav de û ku ji wan di buhurt, herêm di wê demê de dibin desthilatdariya Şadadîyan de bû. Lê komên weke aşîrî ku

hatibûn û gotibûn ku em dixwezî di bin desthilatdarîya te bijîn û ku şadadîyan jî destûr dabûbû wan hebûn. Ew jî, hin komên tirkmen jî di nava wan de hebûn.

Fadl, weke şahekî kurd ku navê wî di ansîklopedîya îslemiyetê de jî di buhurê ya, bandûra wî û dema wî, wê di kifşkirina pêşaroja herêmê de wê pirr kifşkar bê. Wî, demeka zêr, tevî hemû hêrişan jî bi desthilatdarîya Şadadîyan daye jîn kirin û li herêmê desthilatdarîya giştî kirîya destê xwe de û parastîya. Weke ku çawa di dema desthilatdarîya Merwanîyan a piştî Şadadîyan re ku hin bi hin pêş dikeve jî, di dema wê de ku piştî amê xwe badê kurê dostik ku eliyê Merwan, mazinatîyeka çawa mazin da nîşandî, em nikarin mazinatîya Fadl ji wê piçûktir bînina ser ziman. Ji hinek aliyan ve, em dikarin mazin jî bînina ser ziman. Di dema xwe de, wî bandûra xwe û desthilatdarîya xwe da pêşketina îslemiyetê jî. Di ansîklopedîya Îslamê de, dema ku bahse wî dihê kirin de, di temenê wê mazinahîya wî û kirinên wî de bahse wî dihê kirin.

Fadl, biqasî ku em ji kirinên wî fahm dikin, em dibînin ku wî giringî daye awadanî û bajarvanîyê. Di dema xwe de Fadl, giringiyê dide ava kirin kirman, qasr, avahî û xaniyên mazin û **pirên kevanî** yên mazin. Di dema xwe de wî ev mazin çê kirina. Herwusa, herêmên ku di bin desthilatdarîya Şadadîyan de, rojhilatê kurdistanê û herêmên farisan ên bi wê re girêdayîna, li wan jî wan çê dike. Her wusa, li herêmên divînê û hwd jî, ku li gelek herêmên li dora wê jî dide çê kirin. Ev, weke aliyekî wî yê giring derdikeve li pêş. Piştî wî re Abu-l-Fa't Musa ku tê ser desthilatdarîyê nava wê dema şahîtiya xwe ya kin de, wê di dewama wî de bide domandin. Piştî Abu-l-Fa't Musa, ku navê kalkê xwe li xwe dike û navê wî Eliyê Leşkerî ya wê di 1034'an de wê were ser taxt û wê şahîtiyê bike. Bandûr wî û zanebûna wî, ku bahse wî dihê kirin, tê gotin ku wî, herêmeka mazin daye berxwe. Teybetmendiya dema Eliyê Leşkerî ku di sale 1034'an de tê ser taxt ew a ku wê rêveberiyê ji rojhilat û başûrê kurdistanê û her wusa ji herêmên qafqasya bi ber bakûrê kurdistanê herêmên ku desthilatdarîya Merwanîyan li ser ava bûya re dide herîkandin. Bi wê re jî, di wê demê de, ew têkiliya wî, bi desthilatdarîya Merwanîyan re pirr xort a û wî bi wan re levkirin bê û peyman bê, ku çi pêwîst bê, wî daye çê kirin û bi wê re yekbûnek bi giştî daye çê kirin. Çavê Eliyê Leşkerî, di dema wî de, hêrişên salçûqîyan jî, zêdebûna li herêmê bi herîkînekê. Bi wê firehkirina bereyê, Eliyê Leşkerî hizra wî ew a ku wê karibê, wan hêrişan bide sekinandin. Piştî ew bi ber bakûrê kurdistanê ve hatina wî, wê rêveberîya Bizansan ku li anatolîa jî bide tirsandin. Li herêmê, bi wan têkilî û peymanên ku li herêmê Elî Leşkerî dide çê kirin, di temenê têgihîstîneka Împaratorî de dike û dixwezê ku hêz û desthilatdarîyaka mazin derxe li holê ku karibê hêrişan bide sekinandin. Bi hêrişên ku bûna, gelek herêmên li hazarê û qafqasya, şadadîyan jî dest windakirina û serwerî û serdestîya wan li wanderan hin bi hin ji dest diçê. Her herêmên ku serdestîya wan ji dest diçûn, wê aşîrên kurd û aşîrên faris jî, wê ji herêmê bar bikin. Hinek ji wan tên bi ber bakûrê kurdistanê de û hin ji wan bi ber rojhilatê kurdistanê û herêmên farisan ên îranê ve diçin. Kurd û faris, di wan rojên giran de, hevdu girtina û bi hev re tevgerîya na.

Ev rewş, wê temenê hatina çengê aşîra şadadî ku Salahadîne Eyûbî ku bavê wî jê ya navê wî têde heya jî, wê di wê dema barkirin û ankû ji herêmekê goçî herêmeka din de, ew jî, wê werina herêma ku lê Merwanî serdest in. Ji xwe, desthilatdarîya merwanî û şadadîyan, weke du desthilatdarîyan, lê xalkekî ku li wan serdestbû bû. Herdu jî kurd bûn û koka wan digihîst heman kokê. Her wusa bi aşîrtî jî, mirov divê ku vê yekê bibêje. Lê divê ku mirov vê jî bibêje ku ev aşîra kurd, pirr-çengî ya û di nava wê bixwe de jî rewşeka ku divê ku mirov di rengê konfadaraliyekê de bînina ser ziman hebû. Çengê aşîra kurd ya şadadîyan û ankû rewadîyan, çengekî mazin bû û herêmên weke qafqasya ên ku di roja me de weke Azerbeycan, Ermenîstan, Gûrcîstan, Osetya û hinek herêmên din jî ku di nav de, di bin sehê serwerî û serdestîya vê çengê aşîra kurd de bûn. Bavê Şalahadîne Eyûbî bixwe ku navê wî Necmedîn a û ew weke mirekî kurd ê ku ew herêm

hemû demekê di bin mîrîfîya wî de mana û bi bûna xwediye artîşaka mazin jî ku herêmên weke Ermenîstan û Azerbeycanê jî wî parastina û li wanderan desthilatdarîya Şadadiyan parastîya. Herwusa, Amê wî şerkoh û kalkê wî Şadî bixwe jî divê ku mirov bi heman rengî bahse navê wan bike. Herêmên bakûrê kurdistanê ên weke botanê û rehaye û hwd, herêmên ku di bin desthilatdarîya kurd de bûn û pîr bi ewlabûn. Piştî ku ew çengê aşîra kurd hat vê herêma ku desthilatdarîya Merwanîyan lê avaya, êdî rewşa desthilatdarîya Merwanîyan jî ji welatîfîyekê buhurt û derket li ser wê re. Malbate Şalahadîn, divê ku mirov herê bike ku bi hêzbûna û di dema ku tînan van herêmên kurdistanê jî, bi aşîrî bi hezaran mirovan tînan û pêşketina xwe êdî li vanderan didin çê kirin. Lê divê ku ez vê jî bibêjim ku koka aşîra kurd ya salahadîn bixwe jî, berî wê demê, jî wê herêmê bûya. Lê barî wan herêman kiribûna û bi salan li rojhilat û başûrê kurdistanê ku weke navend ji xwe re bijartina pêşketina. Ji ber vê yekê, ew hatina wan ya bakûr, ne weke goçeka nû ya. Weke vegefrîneka li cihên bav û kalan a jî. ..

Piştî wî Eliyê leşkerî (bi navê "**aliyê Eskerî**") tê naskirin) re Anûşîrwan, piştî ku bû şah û serdestî hinekî li herêmê mazintir kir û gelek hêrîş vala derxist û li herêmê rêveberî ku ne tenê parast her wusa, stretejîyeka mazin ku seferêkê li herêmên weke windahî ên weke Azerbeycanê û Gûrcîstana roja me jî ku bixwe û wan cardin bike bin desthilatdarîya xwe. Herêmên weke Nahçîwanê ku di wê demê de weke navçeyna desthilatdarîya Şadadiyan bûn û kurd lê dijîn. Ew di dema xwe de wê temenekî baş jî wê bike. Wî xwe bi hemû dordoran da herê kirin wî artîşaka mazin bi nav û deng da ava kirin. Wê artîşa wî, gelek serkevtinên mazin ji wî hanin jî.

Lê piştî wî re, di sale 1049'an de ku bû şahê şadadî **Abu-l-Asvar Şavur I kurê al-Fadl I** ew mohra xwe li hemû serkevtiyên bîdest hatina û ên ku wê di dema xwe de bide kirin jî. Wî, ev herêm hemû cardin, li wan serdestîya xwe damezrand û piştî, wî kurê xwe bi navê Abu-Nasr Iskander şand divînê û li wir kir şahê wir. Û ji wî xwest ku hemû herêmê bike bin sehêta xwe de jî. **Abu-l-Asvar Şavur I kurê al-Fadl I**, Stretejîyeka wusa meşand, wî li hemû herêman di dema xwe de serdestîya xwe damazrad. Heta ku herêmên Îranê bixwe jî, wî li ser hemûyan jî, xwe serwer kir. Gelek herêmên Îranê û ankû ên farisan jî, heta wê demê, weke ku ji dest çûbû bûn. Komên salçûqîyan, di wê demê de wî weke ku hêrîşên wan û ên hazaran û gelek komên din ên weke tataran û hwd jî da sekinandin. Bi wê rengî, wî weke ku di dema Mihemedê kurê Şadadî de, ku çawa desthilatdarî, weke ku ji nû ve ava kir, wî jî, her wusa weke ku ji nû ve desthilatdarî damezrand. Bandûra wê, pêşketina wî û pêşveçûna dema wî weke demeka zêr, wê bandûra wê, bike ku ne tenê li kurdistanê her wusa li hemû herêmên li hewîrdorê û cihanê îslemiyetê jî bike. Piştî wî re di sale 1067'an, wê **Al Fadl II kurê Şavur I**, wê were ser taxtê desthilatdarîya şadadiyan. Lê dema wî, zêde nakişînê. Wê piştî wî re piştî wî, di sale 1073'an de wê Aşodê kurê Şavur I, wê were û li ser taxt rûnihe. Lê dema van herdû şahên Şadadî, wê li ser pêşketina dema **Abu-l-Asvar Şavur I kurê al-Fadl I**. bê û wê demê bidina domandin. Lê di dema wan de, di hêrîşên salçûqîyan zêdetir bûna. Di dema Al Fadl II kurê Şavur I. de, wê şerê malazgirê ku di navbara wan û Romeo diyojênê bizansî de dibê. Di wê demê de, ev herêmên bakûrê kurdistanê, di bin destê desthilatdarîya Merwanîyan de bûna û şahê wê demê û ser serê desthilatdarîya merwanî jî Nizâm al-Dawla Nasr bûya. Di wê demê de, di dema ku artîşa bizansan, ku daye piştî komên tirkmen û ên din ku wan ji anatolia derxe, li Malezgirê rastî artîşa vê desthilatdarîyê tê. Hingî, artîşa merwanîyan jî, wê ku faris jî hêza wan di nav de heya wê hêzeka mazin ya şadadiyan jî were wir û wê alî merwanîyan bike.

Di aslê xwe de, wê **Al-Fadl III kurê al-Fadl II**, di sale 1073'an de were ser taxt. Bi wê re jî, wê dem pêş bikeve. Lê ji dema Al-Fadl III kûrê al-Fadl II. de, wê hin bi hin şadadî, êdî wê cihê mazinatîyê ji desthilatdarîya bakûrê kurdistanê re bihêlin. Çend ku bahse merwanîyan tê kirin ku dawîya wan di salên 1077' an û hwd tê dayin nişandin jî, em nikarin bibêjin ku ev ji bo wan

dawîbûnek a. Lê em dikarin bêjin ku ji bi wan bi dawîbûna demekê û destpêka demeka nû ya. Weke ku çawa ku desthilatdariya Şadadiyan bi desthilatdariya Fadl û ankû fazlûm'ê pêncemin ku di sale 1161' û hwd de ku li ser taxt rûniştîya ku çawa ku weke şahê dawî bahse wî tê kirin û tê gotin ku ew şahê dawî ê şadadiyan jî ya, em nikarin vê yekê bibêjin. Wê Şadadî, heta wê demê û serdema piştî wê re, wê bandûra wan ji wan herêmên qafqasê li cihna ji dest herê û li cihna kê m û bê bandûr bibe. Lê wê dem bi dem ev yek bibe. Ji ber ku demna ku bandûra wan zêde dibe û demna kê m dibe. Ji ber vê yekê, hem ji bo Şadadiyan û hem jî bo Merwanîyan, em dikarin bêjin ku wê piştî jî xwe bide domandin. Di dema Melîk şah de, tê gotin ku hêrişên ku lê dibin, wê desthilatdariya Şadadiyan bêne ber têkçûnê. Melîk Şah, wê bi dehan herêman jî dirokê bibe û kevil bike. Lê wê piştî wî re jî, şadadî desthilatdariya xwe bidina domandin. Herî zêde, wê didema Salahadinê Eyûbî de, xwe di levgirtinekê û xortbûnekê de bibîne. Lê Salahadinê Eyûbî, wê navê 'Eyûbîyan' bi navê xwe re derxe li pêş. Navê Merwanîyan, wê ne bi têkçûnê lê bi pêşketina eyûbîyan re wê di nava navê wan de weke ku wê xawr bibe û wê êdî cihê xwe jî yê wan re bide hiştin.

-- **Ev dema dîroka kurdan**, ku em lê dinerin, em dikarin bitijbihênina dema desthilatdariya kurd a Şadadiyan. Desthilatdariya kurd a Şadadiya, ji salên 950'î û hwd heta 1161'ê ku dema Fadl û ankû Fazlûmê pêncemin bûya. Dem, weke demna zêr ên desthilatdariya Şadadiyan a. Şadadî, di vê demê de, wê di qadaka mazin de bina xwediyê desthilatdarî û serwerî. Kurdistan û pê re herêmên qafqasya ên weke ku î ro bi navê Azerbeycan, Ermenîstan, Gûrcîstan, Osetya û hwd û ku gelek herêmên din jî ên li dora wan di nav de na, wê di bin destê desthilatdariya Şadadiya de bin. Bavê Salahadinê Eyûbî, Mîrekî kurd a ku wî ev herêm, demekê di bin mîrtîya xwe de girtina. Lê piştî ku ew jî ber hêrişan û hwd ku bandûr û serdestîya wan li herêmê kê m dibe, wê êdî malbata Necmedîin, wê bi aşîrî wê beşek ji wan barî li wan herêmên ku wê piştî desthilatdariya Eyûbîyan ku lê ava bikin. Ev herêm, êdî wê êdî herêmên din jî ku bike nava xwe de, wê di bin desthilatdariyeka hê maztir û xorttir de wê pêş bikevin.

Li vir, bi gotinekê jî bê, ku mirov bipirsê ku ka Salahadin, ew têgihîştina desthilatdariya bi xwe re jî kûderê girt, divê ku em navên kalkên wî, Şadî, Aliyê leşkerî, Fadl, Mazrûban, Şavûr û hwd ku her yekê demna dirêj li ser serê desthilatdariya şadadiyan bûna şah, divê ku mirov navê wan bibîr bixe. Ev kevneşopîya wan, wê piştî wan re xwe bi Salahadin re bide domandin.

Li kurdistanê, di wê demê de, şerên ku dibin, hemû jî, ne şerên asayî na. Hemû jî, şerên ku wê bi komên ku ji derve tî ên weke Salçûqî, kazaqî, tatarî û hwd in. Herêma Hazarê ku di wê demê de dibin desthilatdariya Şadadiyan de ya, wê ti carî jî hêrişên ku lê dibin bidestên van koman wê rizgar nebê. Piştî jî, wê hertimî, weke herêmek şer wê hebûna xwe bidomîne. Li herêmê, di dema Şadadiyan de, divê ku mirov, bibêje ku wê hêrişên mazin bi teybetî di dema ku Salçûqî di bin serkêşîya Melîk Şah û berî wî bavê wî de dikin wê bibin. Ev kom, bi komî tî û her herêma ku hêrişê lê dikin, wê kevil bikin û telan bikin û piştî jî herêmê veqatîhin. Bi vî rengî, wê demek dirêj bi buhurê. Ev rengê şer û hêrişan, wê bi demê re desthilatdariya kurdên şadadî, wê ji rewşa wê bike û kal bike.

Lê di wê demê de, cudahiya wê ya ji wê demê ew a ku di wê demê de faris bi kurdan re bûn. Di wê demê de, bi hevdû re tevidgerîyan û hevdû diparastin. Di dema ku serdestîya desthilatdariya şadadiyan ji herêmên qafqasya kê m dikeve, aşîrên kurd û hin aşîrên faris jî, wê alî hevdû bikin û ji wê herêmê dîrkevin û wêrina herêmên xwe yê ku ew lê serdest in. Hêriş, hertimî, ne bi zêdeyî li navendan, hertimî li kevîyan û navçe û bajarên li kevîyan dibûn. Ji ber vê yekî, ev herêmên qafqasya, herêmên weke xorasanê û hwd, herêmên pîr xêde rastî hêrişan hatibûna. Dem bi dem, li van herêman, hêriş bûna û xalkên ku li van herêman dijîn bi komî di şûr

de hatina derbas kirin. Ev rewş, wê bike ku desthilatdarî bikeve rewşek xirab de. Ji ber ku di her şerê de, gelek mirov hatina winda kirin. Bi wê re, gelekî kêmbin. Ya ku bi demê re, ku divê ku weke sedemeka kêmbûna serdestî û serwerîya wan ku bi gelek sedemên din re ku mirov bêne ser ziman ev a.

Şadadî, ku em bi rewşên roja me re bînina ser ziman, wê gelek rewşên ku ditijbihina wê, emê kifş bikin. Rewşa desthilatdarîya Şadadîyan, dema ku em li wê dihizir in, divê ku em vê jî bibêjin ku di wê demê de, reng û awayê desthilatdarîyê di temenê dû-dîmenî de bû. Ji binî ve ku herêman bi herêman xwe bi rêxistin kiriya û bi mîrgeh û ankû xanadanan bê xwedî dewlet û hêz in, weke ku çawa ku bi kurdên Eyerîdî û kekoyîdî û hwd re. Her wusa, di asta bilin de jî, qasra desthilatdarîya giştî heya ku ew jî, weke ku çawa bi Mihemedê kurê Şadadî, Elîyê Leşkerî, Mazrûban, Fadl, Şavûr û hwd ku ji wê re şahîtiyê dikin heya. Ev rewş, wê bi hevdû re di temenê desthilatdarî û rêvebirinê de wê bi hevdû re di ahangeka pîrreş û bihêz de bin.

Qasra şadadîyan, weke ku çawa ku di qasra Merwanîyan û piştê di qasra Eyûbîyan de dihê dîtin, wê ji serî ve bi bandûr bê û hemû herêman bi xwe re bi rêxistin bike û wê bandûra wê bi wê re ne tenê li kurdistan, her wusa li bigiştî jî wê hebe. Wê xwediyê desthilatdarîya giştî ya li kurdistan û herêman bin. Di giştî olê bixwe de jî, weke ku di dema Şadadîyan bi Mihemedê kurê Şadadî, Elîyê Leşkerî û Fadl û hwd de, û di dema Merwanîyan de weke ku di dema Elîyê kurê merwan de û di dema Eyûbîyan de jî bi keseyetîyên weke Salahadinê Eyûbî û hwd re wê xwediyê wê bandûr û kifşkariyê bin. Ji Ansîplopedîya Îslamê ku bahse Şahê Şadadî Fadl dike, ji wê bahskirina wê, mirov wê bandûr û kifşkariyê bi awayekî vekirî dibîne û têdighijê.

Ev demên desthilatdarîyê, çend ku em î ro zêde diderbarê wan de, ne xwediyê lêkolînên mazin jî na, em divê ku bibêjin ku ji bo roja me û pêşketina wê, gelek ancamen giring, ên têgihîştinî û desthilatdarî ên ku divê ku mirov ji wan bigrê û fahm bike hena. Herwusa, divê ku mirov bibêje ku wê bandûra pêşketina Şadadîyan, piştî wan, li ser Sefewîyan û dewleta wan û Eyûbîyan bixwe jî wê hebe. Ez dikarim bêjim ku wê reng û cewherê têgihîştin û desthilatdarîya Şadadîyan, wê reng û cewherê van pêşketinê desthilatdarî ên piştî wan re ji binî ve bide kifşkirin. Refaransên desthilatdarî ên piştê ji wan tînin girtin. Bi vê yekê, em divê ku bibêjin ku fêr û cerbeka şadadîyan ku hê jî sadî not(90)ê wê jî ne hatîya fahm kirin heya.

Îran, heta roja me jî, wan refaransên wan dike ku bikar bîne di desthilatdarîya xwe de û bikardihêne jî. Lê dema ku ez lê dihizirim, ez dikarim bêjim ku gelek cudahî jî, bi demê re di navê de afirîna. Farqek ji wan farqên ku em bi teybetî di nava wê dema şadadîyan û î ro de li Îranê jî wan fêrên ku di nava xwe de bikardihêne ew a ku Îranê, bi demê re nijadperestî li ser farîstiyê re pêşxistîya û ew bi olê re kirîya ku pêşbixwe ya. Têgihîştina Şadadîyan ya desthilatdarî, tede nijadperestî tûna bû. Wan, hertimî temenê têgihîştina xwe ya desthilatdarî li ser hizreka gerdûnî damazrand û hanî ser ziman. Bi vê yekê, êdî bi wan re, hem farîsên demê jî xwe dîtin û xalkên din jî xwe dîtin. cudahîyên ên olî ên weke êzîdîtiyê ku hebûn jî xwe dîtin. Lê bi wê re jî, di ahangekê de karîna ku pîrreş xweşik desthilatdarîyê di vê temenê de bi rê ve bibin.

Ku em vê dema şadadîyan baş fahm bikin, emê êdî bi wê re deriyekê pêşketinaka bi dîrokî û pîrreş mazin li herêman jî bi refaransên wê re bo roja me kifş bikin û bînina ser ziman. Şadadî, heta roja me, li ser pêşketin, têgihîştin û awayê wan ê desthilatdarî re zêde serî ne hatîya wastandin. Bi vê yekê, êdî ew jî bi pêşketina xwe re bêtî ku werîna fahm kirin, wilo weke xwe mana. Şadadî, çerçoveya wan ya hizrî û têgihîştinî ku em li ser wê re reng û awayê desthilatdarîya wan hildina li dest û fahm bikin, di temenê wê de têgihîştinaka ku hertimî xwe pêşdixist bi rengê destûrî û rêgezî hebû. Bi vê yekê, çend ku weke desthilatdarîyeka olî û xort jî bû, divê ku mirov herê bike

ku weke ku çawa ku bi mîrtîyê re rengê desthilatdariyê li kurdistanê hatiya ser ziman û bi dergahtiyê û şêxtiya wê re rengê pêşketina têgihîştinî bi pergali ya olî hatiya ser ziman, bi heman rengî emê pêşketinakê di dema Şadadiyan de jî dibînin. Bi vê yekê, wan kevneşopî, derxistina li pêş. Kevneşopî jî, di temenê jiyane asayî ya civatî de xwediye pêşketinaka mazin a bi wan re. Êdî di vê temenê de wan pêşketina xwe mazin daye kirin.

Kevneşopî, weke aliyekî giring ku divê ku mirov bêne ser ziman, ku bi wê re û di nava wê de, bi mîrtiyê û mîr re rêveberî û bi dergeh û şêx re ahang wê di desthilatdariyê de werê çê kirin. Kevneşopî, weke ku çawa ku ardekî ku tê çandin heya û li ser re têmeşîn û şînbûn lê dibê, her wusa, li ser wê re jî ev bûya. Ew ahange, ku di nava ol û rêveberiyê de hatiya çê kirin li ser destûrên kevneşopiyê re hatina çê kirin. Lê di hunduriyê wê de jî, ol jî û rêveberî jî, bi rengê wan re pîrr bizelalî hatiya fahm kirin û bi têgihîştin kirin. Yanî, yek li şêx meyizêne wê rêveberiyê fahm neke. Wê olê fahm bike. Lê ku li mîr hat nerîn wê rêveberiyê û ankû desthilatdariyê fahm bike. Ev, weke xateka ku bi kevneşopiyê re pîrr baş pêşketî, mirov dibîne. Di roja me de, minaq, li Îranê, bi tememî ol hatiya derxistin li ol û li ser wê re rêveberî û têgihîştina olî tê ser ziman. Li vir, ev jî, weke cudahiyeke ya ku mirov dikarê ji ya wê demê cudatir bêne ser ziman a.

Di roja me de, dema ku şîrove ya olî di nava civate kurd de tê kirin tê gotin ku "ji ber ku di demaka dirêj de ku desthilatdarî pêşneketiya di nava kurdan de, êdî oldariya kurdan weke xwe û bêî şîyeset tevli bibe maya û saf û zelal maya." Ev gotin, weke ku tê gotin ne xelat û şaş a. Lê divê ku ez jî bibêjim ku di her demê de jî di nava kurdan de desthilatdarî hebûya. Tenê ku piştî dema Şadadiyan re ku weke desthilatdariyeka kurd bahse wê bikin desthilatdariya Eyûbiyan, ne bin 400 salî re ya. Ji ber vê yekê, dema ku em li dîrokê biner in, em di fahm kirina wê de kêmbûnekê dibînin. Ya bi bi jiyandinê û desthilatdariyê re ramyarîyê tevli olê dîke ne pêşketina bi demê re ya, nêzikatiya wê ya têgihîştinî û zihniyeta wê ya ku ew li gorî wê xwe bi demê re pêşdixe ya. Bi teybetî, di temenê civatiya ku pêşketî de, ku weke ku çawa ku di desthilatdariya şadadiyan û merwanîyan û piştîre bi ya Eyûbiyan re tê ditin, wan ol û desthilatdarî, hertimî jî hevdû cuda kirina. Li ser mîr û qasra wî re desthilatdarî pêşxistina û hanîna ser ziman û fahm kirina. Lê li ser şêx û dergeha wî re jî ol û bawerî hanîna ser ziman. Xate di nava vê de jî, pîrr zelal kirina di serê xwe de. ..

Ji ber vê yekê, em bi tememî, nikarin, bêjin ku ji ber ku kurdan desthilatdariya wan ev demeka dirêja ku ji destê wan çûya êdî ol wusa bixwe û teza û bêî ku şîyeset were tevli kirin maya. Ji wê zêdetir, ev rengê ku kurd û oldarên kurd bahs dikir, çend ku ji aliyê wan bixwe ve jî bi tememî û başî ne hatibê fahm kirin jî, di temenê têgihîştinekê û pergale civatî ya ku bi sadsalan pêşketiya ev bûya. Ez li vir, divê ku gotinekê bi vî rengî jî bibêjin. Ev rengê pêşketinê ê oldarî, yê ku temenê wê avêtiya desthilatdariya Şadadî û piştîre desthilatdariya Eyûbî ya.

Merwanî, kevneşopîya wan, bi wê re pêşdikeve. Lê xwemalîtiya desthilatdariya Merwanîyan, xwe dispêrê Şadadiyan. Ji vê aliyê ve, divê ku mirov bi vir ve girêdayî, vê jî bibêje ku Şadadiyan kariya ku Fêr û cerbên bitêgihîştinî ên desthilatdarî ku di dema Eyûrîdî, kekoyîdî û hwd, ku hê gelek fêr û cerbên dewletî ên herêmê ên kurdan re bixwênin û ji wan sûdbigrin. Bi vê yekê, divê ku em bitêgihîştinekê û zanîna mazin bahse qasra şadadiyan bikin. Qasra Şadadiyan, wusa tê ditin ku weke ku hertimî li berdestê şah, mirov û zanyarên ku hertimî biaqil ve mijul ûn dixwênin hena. Ew jî, her fêr û cerb û zanîna ku bi xwe re bi têgihîştin kirina li ber şah dihênin ser ziman û bi wê re êdî pêşketinê bi şah re didina çê kirin. Li vir, em wan şewirmend û aqilmendan, divê ku weke saziyeka aqilmendî û şewirmendî ya ku li ser re şahê Şadadî dijî û şahê şadadî weke serokê wê ya û bi wê re welêt û desthilatdariyê bi rê ve dibê.

Dema ku em van rewşên ku em bi desthilatdariya Şadadîyan re bi şah re di qasra wî de kifş dikin, baş fahm nekin, emê nikaribin bi zelalî û başî pêşketina şadadîyan jî bi başî fahm bikin. Şadadî, bi têgihîştineka ku li ser dema xwe re dijîn. Bi vê yekê re jî, divê ku em carek din li vir kifş bikin ku ew bi têgihîştinaka ku di temenê wê de hizratî û têgihîştineka gerdûnî û demî bicihkirina û bi wê re bi rê ve diçin û bi rê ve dibin.

Desthilatdarî, ji mirov dixwezê ku mirov hemû pêşketinên bi demê re û ên di dema xwe de ku dijî bi awa û ast û radeya pêşketin û têgihîştina wê re fahm bike. Li gorî wê, êdî ku divê ku bibe xwediyê pêşketinekê bi xwe re. Ya ku têgihîştina desthilatdarî pêş ji mirov dixwezê jî ev a. Em, dema ku li Şadadîyan û li qasra wan dinerîn, em bi wê re vê rewşê bi vî rengî kifş dikin û dibînin.

Ya rastî, divê ku ez bibêjim ku Wê Şadadî, ew têgihîştin û awayê pêşketina wan, wê piştî bandûra wê li olê jî bibe. Ev awayê pêşketina Şadadîyan, ez dikarim bêjim ku wê di nava olê de heta sadsale 16' min û hwd, wê hem di olê de xwe biparêzê û hem jî lê serdest bê. Lê ji sadsale 16' min û pêde, em dibînin ku bi pêşketina osmanîyan re, weke ku ew bandûra wan çendî ku di hundurê olê de hatiya jîn û ji wê sûd hatiya girtin jî, em êdî dibînin ku bandûra wê, ne weke demên berê ya. Wê pêşketina piştî ya bi osmanîyan re, wê tenê rengê olê wê esas bigrê û bi wê re bixwezê ku desthilatdariyê dest bike. Ez jî, weke vajî wê têgihîştina Şadadîyan a. Ji ber ku Şadadîyan, ol û desthilatdarî, di keseyetîya mîr û şêx de jev cuda kirina û wê didin jîyîn. Lê piştî ew aliyê desthilatdarî ku weke ku bi keseyetîya mîr re dihê jîyîn, dihê ji holê rakirin. ya ku wê, li herêmê bi tememî êdî olê serdest bike û di dema aqil bixwe de jî tenê êdî rêveberiyên olî derve li holê û serdest bike jî wê ev bê.

Li vir, em vê jî bibêjin ku di vê temenê û rengê pêşketin û pêşxistinê de, em bi civate kurd re, hertimî kevneşopîyê dibînin. Ji ber vê yekê, divê ku em car bi car, giringiya kevneşopîyê bi pêşketina civate kurd re kifş bikin û bîna ser ziman. Ji ber ku wan kevneşopî, weke destûr bi karhanîna û dinava wan de rêveberî, ol û oldarî û bawerî, hizratî û ankû aqil û felsefe û hwd, cihê wan bi zelalî bi aqilî dane nîşandin û kifş kirina. Ji ber vê yekê, dema ku em dema Şadadîyan kifş dikin, divê ku em bi teybetî bibêjin ku kevneşopîya civatî, bi wan re serdestî û serwerîya wê pîr xort a û bi wê kevneşopîyê re di ahangekê de, olê jî û rêveberiyê jî ku cihê wan bitêgihîştinî di mejî de kifşkirina dihênin ser ziman. Yanî, bi desthilatdarî, ku em di dema Şadadîyan de li kevneşopîyê dinerin, em ji kevneşopîyê zêdetir, weke pergaleka giştî ya civatî ku di wê de, hemû beşên têgihîştinî ên olî û ên rêveberî û hwd bin, ku di wê de cihê wan cuda bi cuda hatiya zelal kirin û di rex hevdû de ku wê çawa bijîn û hevdû bidina jîyandin, hizratîya wê hatiya kifş kirin. Bi vê re jî, hertimî, dema ku hizirîn bi rêveberîya re bê û ankû bi oldar û ankû şêx û hwd re bê, wê di temenekî zelal de, wê bîna ser ziman ku rastî çî ya. Rêveberî, weke karê mîr a. oldarî û bawerî jî karê şêx a. Divê ku êdî ol jî şêx were pirsîn û rêveberî jî mîr were pirsîn.

Ev hemû jî, wê bi kevneşopîyê û têgihîştina wê ya civatî, wê bigihijina li hevdû. Wê hevdû temem bikin. Wê pêşxistina civatî bidina çê kirin. Piştî, pergale perwerde pêşdikeve. Wê êdî weke yê ku herî bi zanebûn kî na, şêx in, wê di rex dergaha wan de, wê medresa werina ava kirin û li wan zaro û ciwan werina perwerde kirin. ..

Şadadî, pêşketiyên dema xwe na. Wan, bi vê yekê re dîtîya û kişfîriya ku ji bo ku di dema xwe de rol û weynekê bileyîzê, divê ku tu radeya zanebûna xwe derkeve ser ast û radeya ku di dema ku tu di wê de dijî. Êdî li ser wê re binerê û bihizirê û biafirêne û êdî pêşbikeve û bide pêşxistin. Ya rastî ew a ku, divê ku mirov vê rengê û awayê pêşketinê jî bo her demê weke awa û renekî bi zanebûnê ê rast herê bike û bixwêne. Ji ber vê yekê jî, rol û weyna zanebûn û

têgihîştinê êdî hertimî bi giringî derketîya li pêş. Di vê temenê de, divê ku mirov êdî Şadadîyan aqilîyên dema wan bibîne û bêne ser ziman.

-- **Li ser desthilatdarîya Eyûbîyan** nivîsandin, ji her demê zêdetir, ji bo dema wan û pêşketinên piştî wan ku heta dema tîn jîyîn bo fahm kirina wan jî giring a. Gelek pêşketinên desthilatdarî li herêmê ku bi olî bin û rêveberî û hwd bin, Eyûbîyan temenê wan avêt û piştî wan re ew pêşketina ku wan di van waran de çêkirin, weke referans pêşketinên piştê jî da kifşkirin. Tevî ku ev rastî wusa ya jî, ku weke gotinaka vajî vê em bibêjin ku hê jî li gorî rastîya xwe û bi rastî rengê desthilatdarîya Eyûbîyan bi başî û rastî ne hatîya fahm kirin. heçiyê ku li ser hizir hanîna li ser ziman, li gorî nêzîkatîyekê hanîna ser ziman. Lê awayê pêşketinê ê ku eyûbîyan di olê de dayî rûniştandin jî, hin beşna wê hatina dîtî û domandin. Lê wekî din jî, ew awayê wê yê pêşketinê, ne hatîya fahm kirin.

Ku Î ro, li ser axa Sûrî, hem sûnnî, şaffî, Elewî, û ji olên din ên weke êzîdîyê, xiristiyanîyet(di zimanê kurdî de navê xiristiyanîyetê bi navê "filehî" heya.)ê, cihûtîyê û hwd ku hê lê dijîn, hinekî jî, ev bi sayaserê pêşketina desthilatdarîya Eyûbîyan a. Ola Filehiyê, ji dema Nebî Îsa û heta wê demê pêşketibû. Cihûtî jî, bi teybetî, li Kurdistanê temenê xwe dabû avêtî û pêşketibû. Keyaniya kurdistanê, destpêka pêşketina wê ku ji sadsale dawiyê ya herî zayînê û pêde, ku hin bi hin û dem bi dem pêşketina xwe dabû çê kirin ya bi nav "keyaniya Hêzewan" bû. Vê keyaniyê care pêşî, ola Cihûtîyê jî bi awayekî fermî di nava xwe de dabû bû nasîn. Di dîrokê de, navê vê keyaniya kurdîstanê, bi navê "Adîbanê" jî tê nasîn. Serdema wê ya Herî zêde ku weke serdema zêr were dîtî ji sadsale yekemin û heta sadsale duyemin yê piştî zayînê na. Navenda wê keyaniya kurdîstanê jî, herêma başûrê kurdîstanê a hewlêrê bû. Navê "Adîbane", li herêma botanê, heta roja me jî di nava xalkê de tê ser ziman di çîrok û vebêjînen wan ên di bidevkî de. Pêşveçûnên bi vî rengî weke "keyaniyan Hezewa" û li rojhilatê kurdîstanê pêşveçûnên weke "desthilatdarîya Keyûş" ku ji sadsale 2'min û 3'min û pêde di dema Sasanîyan de weke desthilatdarîyeka kurdî ya din ya giring ku mirov dikarê werêne ser ziman in. Ev desthilatdarîyên kurdîstanî, wê temenekî mazin bidina afirandin ji pêşveçûnên piştê jî. ..

Kurdên Keyûşî, Zerdestî na û hizrên Manî, wê herî zêde di qasra wan de xwe bi wate bide kirin. Heta ku dem tê dewletên kurdî ên dewleta Eyîrîdî û dewleta kekoyîdîyan û hwd, wê pêşketineka mazin biafirê. Piştê ku Îslemiyet derket û hat, êdî piştê wê herêm, weke ku ji nû ve êdî were bi rêxistinîkirin bi desthilatdarî. Desthilatdarîyên kurdî ên eyerîdîyan û ên kekoyîdîyan, wê temenekî bidina afirandin. Lê ne tenê kurd, wê desthilatdarîyên weke desthilatdarîya Abasiyan ku pêş dikevin jî, wê ji wan sîdwergerin. Di demên ku wê destpêka desthilatdarîya Şadadîyan têde were destpêkirin, ev desthilatdar li van herêman kurdan serdest in û wê temen ji wê re bi heyîna xwe re biafirênin.Şadadî, xate wan ya desthilatdarî, wê pêşketina desthilatdarîya Merwanîyan bike berde wama xwe de û bi wê re û li ser wê re heta ku ji destpêka wê tê dema desthilatdarîya Eyûbîyan, wê li kurdîstanê, weke ku xateka desthilatê ku bêî ku navberî û qûtbûn û qatbûn ketibê navberê de wê xwe bide domandin. Li ser wê xate re, divê ku mirov bahse desthilatdarîya Eyûbîyan bike. Her wusa, pêvajoya desthilatdarîya Eyûbîyan piştî pêvajoyên desthilatdarîyên ên Şadadîyan û merwanîyan, weke pêvajoyaka sêyemin ya ku li gorî demê xwe êdî daye pêşxistin û afirandin a. Desthilatdarîya Eyûbîyan, weke ancamaka wa ya herî giring jî ku mirov bibîne û herê bike û li vir bêne ser ziman, ew a ku wan kirîya ku cûdahiyên olî û ên mezhebî ku karibin hevdu li herêmê herê bikin a. Mezhebîtî di nêzîkatîya Eyûbîyan û bi teybetî ya Salahadinê Eyûbî de bi heman rengê tûne ya: Komên civate kurdî ên weke Êzîdî û hwd jî, piştê karîna ku xwe bi rengê bawerîya xwe bijîn û bidina **jîyandin**. Li vir, ya ku mirov bi vê nêzîkatîyê re kifş dike, di temenê nêzîkatîyeka desthilatdarî ku hemû reng û bawerîyan û awayên ên mezhebî bin û olî hwd, ku dikê

nava xwe de û weke hevdû nêzî wan dibê, mirov bi wan re kifş dike. Di temenê vê nêzîkatîyê de, divê ku mirov li ser kevneşopîyê rawastîhê û fahm bike. Ji ber ku kevneşopî, weke astaka bilind ku hemû cûreyên bawerî û olî dikirina nava xwe de bû. Di rêveberîyê û nêzîkatîya wê de bi wê kevneşopîyê re mir û qasra wî li pêş bûya. Lê bi olê û bawerîyê re jî şêx û dergeha wî li pêş bûya.

..

Di vê temenê de, Salahadin bixwe jî, di dema xwe de, ji dêla ku di temenê mezhebîfîyekê de bibe xwedîyê nêzîkatîyê, di temenê olê de bûya xwedîyê nêzîkatîyê ku di wê nêzîkatîya wî de, hemû cihêrengîyên olî, mezhebî û hwd, ku xwe têde dîtina û ku karîna ku bijîn. Hinekî jî ya weke pêşketinaka mazin ku weke ancama pêşketina Eyûbîyan li herêmê fahm bikin ev a.

Li Aliyekî din jî, hertimî li ser olê re rastîya Eyûbîyan bi teybetî li ser Salahadinê Eyûbî re hatîya nîşqas kirin û weke ku wî tenê oldarîya xwe derxistibê li pêş û wî guh nedaye pêşketina xwe ya netewî jî bûya. Ya ku li vir, weke bersivê jî vê gotinê re em bibêjin, ew a ku Salahadin Xwestîya ku ahagenekê di nava wan herdû alîyan ve bide çê kirin. Ji ber ku wî, yek di înkara ya din de nedîtîya. Bi wê re, wê çawa bi hevdû re di ahangekê de bijîn û pêşkevin jî, ew jî, wî dîtîya. Lê nêzîkatîya Salahadinê Eyûbî bixwe jî, weke nêzîkatîyaka kevneşopî ku li ser hemûyan re bûya.

Ji bo kurdistanê, giringîya Salahadinê Eyûbî û dema Eyûbîyan çî ya, ku em bi teybetî, pêşketinên di dema şadadîyan û Merwanîyan de baş û qanc fahm nekin, emê vê jî rast fahm nekin û nikaribin bi rastî û di cih de bi bersiv bikin. Ji ber ku, bersiva vê pirsê, di serî de di dema Şadadîyan û Merwanîyan bi hevdû re ya. Li ser wan pêşketinan re pêşketinana Salahadinê Eyûbî û ya Eyûbîyan jî bûya.

Rewş û awayê pêşketina demê, dema ku em li berçav bigirin, weke ku di roja me de tê gotin û bi gotinî û nivîskî xateka stûr di nava şîatîyê û sûnnîtî û ankû şafîfîyê de dihê danîn, ku em vê rewşê bi vî rengî herê bikin, em ê nikaribin rewş û dema Salahadinê Eyûbî dîsa fahm bikin. Rêveberîya Şadadîyan, çendî ku rengê wê di temenê mezhebê şîatîyê de weke ku li pêş a, her wusa di rêveberîya merwanîyan de jî, rengê sûnnîtî û ankû şafîfîyê li pêş a. Lê ev herdû rêveberîyê jî, ji aliyê heman aşîra ku xwedîyê heman kokê ve hatîna ava kirin in. Divê ku em vê rastîyê jî fahm bikin. Salahadinê Eyûbî bixwe, bavê wî Necmedîn, di dema şadadîyan de, ku herêmên di bin kontrola Şadadîyan de ên qafqasya ên weke ku î ro bi navê Azerbeycan, Ermenîstan, Gûrcîstan, Osetya û hwd, dibin mîrtîya bavê Salahadin de mana. Piştî, dema ku hêrişên Salçûqîyan li herêmê Zêde dibin, wê serdestîya şadadîyan ji ber wan hêrişan li van herêman lawaz bibe û bê ber tûnebûnê. Piştî wê lawazbûna serdestîya li van herêman wê malbate Eyûbî, wê barî başûrê kurdistanê li herêmên li berdiclê bike. Di dema ku ew tî û bar dikin jî, weke malbatekê, her wusa weke aşîrekê barî van herêman dikin û li wan heyîna xwe didîna nîşandin.

Piştî re li van deran, wê di dema kin de, kalkê Salahadinê Şadî wê temenê desthilatdarîyeka nû biavêje. Ji ber ku Merwanî û Şadadî yek in û ji kokekê na û heta ku temenê aşîrtîya wan jî yek a, êdî wê merwanî xwe li bayê wê avakirina desthilatdarîya nû berdin û di nav de êdî weke ku wê bihalihin wê li wan were. Di wê demê de, Şadî, wê rol û weyneka weke ya Mihemedê kurê şadadî wê li herêmê êdî bileyizê. **Mihemedê kurê Şadadî**, di dema ku temenê desthilatdarîya mazin ya Şadadîyan avêt, hingî, wê kurdên eyerîdî, kekokyîdî û hwd ku li rojhilatê kurdistanê dewletên xwe avakirina, wê dibin şahîtî û desthilatdarîya xwe de levbigihîjêna li hevdû wê ji wan desthilatdarîya şadadîyan ku li herêmê bigîştî serdest dibê wê bide ava kirin. Şadî jî, wê heman tiştî li ser desthilatdarîya Merwanî û hwd, ku gelek mîrgeh û desthilatdarîyên herêmî ên kurd hebûna wê bi wan re rewşeka bi vî rengî bide pêşxistin. Ev fêr û cerba Şadî, hinekî jî, ji wê zanîna wî ya ku di derbarê demên berê ên Şadadî de ku hê di wê demê de di serê wan de zindî bûn û

herkesekî dizanî, wê ji wan bibe xwediye wê têgihiştina bingihînî ku li ser re wê temenê desthilatdarî bide avêtin.

Hinekî jî, dema ku tê dema Şalahadinê Eyûbî, divê ku mirov bi vê yekê û rengê fahm bike û bêne ser ziman. Heta ku dema Şalahadinê Eyûbî, emê bibînin ku wê temenekî mazin ê rêveberî wê li herêmê bo wî biafirê. Di wê demê de, herêmên weke helebê, homs û hwd jî, weke navçeyna ku bi vê rêveberîya nû ya Eyûbîyan ve girêdayî na. Eyûbî, didina kişfîkirin ku wê li wan deran jî bibina xwedi desthilatdar.

Divê temenê de, Eyûbî, dema wan, di aslê xwe de, weke demeka ku divê ku mirov weke demeka sentezî ya ku sentez demên Şadadî û merwanîyan bi hevdu re ya. Bi wê re, pêşî Eyûbî, li Kurdistanê giştî wê rêveberîyekê mazin êdî ava bikin. Rêveberîya ku Eyûbîyan ava kir, hinekî jî, wê di rengê pêşketina destpêka rêveberîya şadadîyan de jî bê. Lê em dikarin bitijbihênina destpêka Abasîyan jî ku bi Abas re pêşket û piştê Baxda ji xwe re kir navend û êdî li herêmê di temenê împaratoriyekekê de pêşket.

Rêveberîya Abasîyan, dema ku em li destpêka wê diner in, hinekî di rengê wê pêşketina kurdan ya dema Şadadîyan de dibînin. Mînaq, dema Xaro Reşîd û Birayê wî bahlûl, weke demeka teybet a. Bandûra van herdu mirovan, herî zêde di nava kurdan de heya. Herwusa, tê gotin ku ev herdu û ankû malbata wan bixwe jî kurd bûya. Lê piştî wan re, weke ku li qasrê, bi carekê derbeyeke bibe û rêveberî û ankû desthilatdarî dest biguharêne wê keveşopîyan Mûtasîm were û bi afirê. Mûtasîm û berî wî bavê wî hwd, dema ku tîs ser desthilatdariyê, wê pêşî berê xwe bidina bi ser kurdan de. Ne tenê, kurdên êzîdî û hwd, herwusa, kurdên misilman û hwd jî, wê nesibê xwe ji wan hêrîşên wî bigirin.

Di dema wan, weke ku êdî demên Xaro Reşîd û birayê wî ku di çirokan de bijî êdî dimêne. Ji wê êdî nabuhurê. Lê ev dem bi rastî jîya na. Divê ku mirov bahse wan bike. ..

Li Kurdistanê, di dema Mûtasîman de, weke ku kurd êdî piştgirîya xwe ji wê rêveberîya Baxdayê didin kişandin. Êdî bi wê re, ji xwe êdî desthilatdarîya Abasîyan wê kêmbibe û êdî bahse wê newê kirin. Piştê êdî wê ku weke pêwîstîyekê wê temenê desthilatdarîya Şadadîyan were avêtin ji aliyê Mihemedê kurê Şadadî ve. Bi wê re jî, êdî di wê temenê de, wê ev desthilatdarî, di demeka pirr kin de pirr zêde mazin bibe û li herêmê bigiştîki serdest û serwer bibe. Herêmên li Qafqasya ên weke ku î ro bi navê Ermenîstan, Azerbeycan, Gûrcîstan û Osetya û hwd, wê di bin kontrola wan de bin. Heta ku digihijê ber sînorê Hindîstanê, wê bahs ji wan were kirin. Ev desthilatdarîya wusa mazin û êdî wusa bi bandûr, wê li herêmê êdî serdestiya giştî bike destê xwe de û li herêmê serwer bibe.

Bi teybetî, divê ku mirov vê jî bibêje, ku dema ku navê botanê tê gotin, ki î ro, ew herêma rojavayê Kurdistanê pirranîya wê di nav de ku heta ku digihijê ber sînorê helebê û hwd û herêmên ber dîclê ji Cizîra bota û heta ku digihijê ber Fîratê, ji herêma mazin re tê gotin. Mîrê wê demê ê Cizîra bota ku navê wî Mîr Evdûl Elezîzê Îzafedîn jê re gotîya Cizîr. Lê **Navê Mîr Evdûl Elezîzê Îzafedîn**, bi rengê "Mîr Evdûlê kurê Elezîzê kurê Îzafedînê kurê Amer" jî tê zanîn. Lê divê ku em vê jî bibêjin ku di wê demê de, ava dîclê pirr bilind a. Cizîra bota, li ber wê ava mazin û bilind, weke girevekekê dimêne. Lê divê ku ez jî bi teybetî bibêjim ku nav û gotina "botanê" bi rengê "buhtan"ê û hwd, ji dema Gûtî, Hûrî û Mîtannîyan a. Yanê, navê botanê, navekî kevn a ku ne ji wê demê ya, ji dema berî wê de bi gelekî re ya û ji dema gûtîyan ve tê zanîn. Bineterên ku di wan de, heta dema gûtî, hûrî û mîtannîyan jî ku ev nav bo herêmê tê bikarhanîn î ro di destê me de

hena. Lê heta berê wê, çend ku bi devkî tê gotin ku tê bikarhanîn jî, hê me bineter bidest nexistina.

Ev herêma botanê, weke herêmeka ku bi Diclê û Firatê biwate ya û pîroz a jî. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî bibêje û bêne ser ziman.

Dem, heta ku tê û digihjê dema Salahadin û pêşketina dema wî û hinekî berî wî ya Şadadiyan û Merwanîyan, em dibînin ku hê jî, ev herêm hemû bi hevdu re girêdayî, bi wê rengê nav li wan dihê kirin. Yanî, weke herêma ku mirov divê ku wan bi wê rengê bêne ser ziman in.

Li ber ava diclê, divê ku mirov bibêje ku li wir jîyan pirr pêşketiya. Bi wê yekê re, ewder biserê xwe, weke welatekî tê dîtin. Weke "welatekî di nava welêt de" tê dîtin. Dem ku heta û gihîşt dema Eyûbîyan, em dibînin ku Eyûbîyan, bi vî rengî, ev navend, bi teybetî jî xwe re weke navend bihijartina û ji wê bidest vebûna xwe ya li herêmê kirina. Lê tiştekî din jî, dibê. Di aslê xwe de, di dema Salahadinê Eyûbî de, wê şadadî jî, weke ku demeka xwe ya pêşketî û giştî û serkevîtiyê bikin. Li ser wê re jî, wê li herêmên xwe cardin bigiştîki karibin serdestiya xwe ava bikin. Rêveberiya abasîyan, êdî weku dema ku kurdan piştigirîya xwe jê bi şûn ve kişand, êdî weke ku teneê weke mîrgehê ma. Li ser xalifetiye re Li Baxdadê, rêveberiyê dikir ku gotinên xwe bibêje û bandûra xwe bide hîs kirin. Lê di wê demê de, di temenê mezhebî de gotinên dijber, dema ku êdî ji rêveberiya xalife ya baxadê ku bidest gotinê hatina kirin, êdî Salahadin bixwe, wê êdî pêşî, hêzeka xwe li herêmên Şadadiyan bide çê kirin bi destê desthilatdariya wir û piştre ji başûrê kurdistanê jî wê artişaka mazin ya ji herêma Botanê hemûyî ku mirovan li nava wê artişê dide li hevdu, êdî piştre bi wê artişê re wê herê biser baxdadê de. Di wê demê de Mûtazî xalife bûyar. Salahadinê Eyûbî, wê pêşî xalifetiya wê bixê û piştre wê bi tememî rêveberiya baxdadê bide bixê û heta ku xazîneyên wê bixwe jî, wê bişêne herêma botanê ku di wê demê de kalkê Salahadinê Eyûbî ku piştî dabûyê de û bûbû siltan Nûreddîn li ser tax rûnîstî bû. Ew jî di demê de pîr bû. Kalkê Şalahadîn, di wê demê çûbû ber dilovaniya û yanî jî li ber çûyina li ber dilovaniya xwe bû. Lê Siltan Nûreddîn bixwe jî, di heman rewşê de bû.. Ji xwe, di wê demê de, piştî ku Salahadinê bi seferî çûbû bû bi ser baxadê de û hê ku Salahadin li Seferê bû, Seferê bû, Wê Siltan Nûreddîn jî herê ber dilovaniya xwe. Piştre jî, kurê wî yê piçûk ku hê 11 salî bû, ne dikarî rêveberiyê bike, Ji ber vê yekê, Salahadin, Di cih de sefera xwe di nêvî de hişt û vegebiya Herêma botanê û li wir. Siltanî hilde ser milê xwe.

Salahadinê Eyûbî, di wê demê de, Amê wî Şerkoh, piştî sefera Eyûbî ya li ser baxdadê ne bi gelekî re sefer li herêmên Libanê li darxistin û wî siltantîya wan herêman hemûyan kir destê xwe de. Lê di wê dema ku Amê wî, çûwan herêman û ku hemp kirina bi sehêt(kontrol)a xwe de, dît ku wê hêza wî têrê nekê. Di cih de xaber ji Salahadin re şand û jê xwest ku ew bi hêzekê were alî wî.

Salahadin, ev kirina wî ya wî ya pêşî ku wî siltantî hildabû ser milê xwe ku wê bike bû. Lê piştî wê re jî, ku çû alî amê xwe û li wir siltantîya wî da rûnandin, wê piştre herê Misrê û li wir, rêveberiyê hilde li dest. Bi wê re jî, wê li wir, desthilatdariyeka nû ava bike. Piştî ku Şerkoyê Şadî, Libnan hemû kir bidestê xwe de û êdî aramiya wêderê çê kir, piştre Bi heman rengê weke Şerkoyê Şadî ku ji malbate Salahadin a, Adilê kûrê Şadî çû Misrê û ew der kir bin desthilatdariya xwe de. Li Misrê, ev li dora 1190î û wan dibê. Kurê Salahadin ku li ber destê amê xwe Adil mazin bûya Afdal, bi piştigirîya aqilê kurê Şadî bû siltan li şamê. Şalahadin, di wê demê de, piştî ku çûbû bû Misrê, ew zêde li wir nemabû û ew i malbate xwe re buhurî de Îskenderiyê û demekê li wir dimêne. Li wir, di wê dema Salahadin li îskenderiyê dimenê bi malbata xwe re, wê xwe bide karê xwandin û nivîsandinê. Salahadin, di wê demê de, divê ku em bibêjin ku wî hemû kirin û kirinên xwe ku dikirin, wî nivîsandina û weke ku çawa ku ji devê wî tê gotin ku "dema ku mirov

diçê cem xwûdê mirov hesabê hemû kirinên xwe dide", wî jî li dunyê bi wê vacê, nivîsandîya û danîya ber mirovan. Bi wê re jî, divê ku em gotinaka ku em di dawîya nivîsa xwe de bibêjin ku li vir jî bibêjin ku dema ku Salahadin çû ber dilovaniya xwe, wî jî zaroyên xwe xwest ku bi şûrê wî re were vêşartin, da qana şûrê wî li wê dunyê ji kirinên wî şahidiyê bike. ..

Piştî ku Afdal li Şamê bû siltan, li ser xwesteka Afdal li Helebê qasrek hat ava kirin û li wir jî Birayê wî Az-zahir têde bicih bû. Li ser wê rewşê herdû bira, li wir, êdî hem alî hevdu kirin û hem jî alikariyeka wan ji amê wan jî dibû. Afdal birayê mazin bû û li gorî kevneşopiyê, birayê mazin, hertimî, gotina wî serdest a. Bi vê yekê jî, Az-zahir, ji gotina birayê xwe derket. Ji wî re, biratiyeka mazin kir. Di aslê xwe de ya, ku li herêmê, hem rewşa desthilatdariya Eyûbîyan li Libnanê û li Mîsrê xort dikir û ew rewşa ku du birayan di nava xwe de dabûbû çê kirin bû. Ji ber ku herdû birayan, pêşî ew herêm, hemû kirina aramiyekê û bi wê re jî, bi aramiya wan re kirina rewşeka ku di berdewamiya herêmê botanê de ku dikarê bi aramî bijî. Ev jî, di wê demê de, wê bike ku li herêmê, desthilatdariya nû were û ava bibe. Ya ku kir ku Şam, weke navendeka olî mazin pêş bikeve bi Famîtiyan re ev bû. Fatimî, ji wê rewşê sûdginan û desthilatdariya fatimî ava dikin. Li ser wê aramiyê. Yanî, rewşeka wusa afirîbû ku ne tenê rêveberî û desthilatdariya Eyûbîyan tenê dikarî jê sûdbigrê, her wusa, rêveberîya demî ya olî jî wê sûdgirt û pêşket. Bi wê re jî, di aslê xwe de, Êdî, ewder bû herêmeka ku mazin ku weke venda olî.

Di wê demê de li Hamayê Al-Muzafer weke siltan li Hamayê bû. Al-Muzafer, desthilatdariya Eyûbîyan li wir xorttir kir. Her wusa, qasra Al-Muzafer, bû weke piştgiriyeka ewlakariyê ji rêverîya eyûbîyan ya Şamê re jî. Bi wê re jî, rewşeka xort ya desthilatdarî afirî. Salahadinê Eyûbî, ew ne tenê weke bav bû. Her wusa, ew weke seroke civakê ê mazin û ê hizrî ku wê hizrên xwe digotin û hizrên wî pêşketin û birêveçûna desthilatdariya siyasî dide kifşkirin. Piştî ku Am û bavê wî çûna ber dilovaniya xwe, êdî ew derket li pêş. Amê wî bixwe jî, çend ku bi temem ji wî maztir bû û gotina mazin li wî diket, ji ber ku ji aqilê Salahadin pir rbi bawer bû, mafê gotinê dabû bû wî ku ew bide kifş kirin.

Piştî salên 1190'î û hwd, wê li herêmê rewş biguharê. Çend ku rewşek afirî jî bû, hingî hêrişên firankan li herêmê cih bicih dibûn. Li ser vê yekê, Salahadin ji Îskenderîya hat û xwest ku mudahaileyî rewşê bike. Salahadin dema ku ew hat herêmê, Ew hat Şamê û ji wir jî hat Rehayê. Li wir, wî rêveberiyên ku zaro û amê xwe lev dan li hevdû. Piştî wî, Piştî ku ew hat, êdî wê pêvajoya wî ya hewldane sekinandina wan hêrişên firankan bide domandin heta ku digihijê sefera wî ya li Kûdûsê. Sefera wî ya kûdûsê, wê weke pêşwazî kirina sefera xaçîyan ya li wir û li herêmê bê. Salahadin, wê di hemû rêwîtiya xwe ya bi ber kûdûsê de serkevtî bê. Li kûdûsê jî, wê serbikeve. Piştî ku ew serket, wê êdî demekê li wir bimêne û piştî vegehihê Rehayê. Li Rehayê wê demeka dirêj bimêne. Di wê demê de jî kurê wî El-zahir li cem wî ya. Salahadin, bo ku piştî wî re valahî çênebê û kêmesî nekeve rêveberiyê de wê Afdal, hemû kar û barê piştî bike. Ew, ye mazin jî bû. ...

Salahadinê Eyûbî, wê di 4'ê adare sale 1193' de herê ber dilovaniya xwe. Piştî wî re. Wê êdî demekê Afdal, li gorî kevneşopîya civatê ye mazin kîjan a wê ew were û karê piştî li dewsa wî bide domandin û wî da domandin. Lê Afdal, ji ber nexweşîyan wî jî, wê piştî bavê xwe re zêde nejtî û tenê wê 3 salan desthilatdariya Eyûbîyan piştî bavê xwe re bi rê ve bibe. Piştî çûyina wî jî ya li ber dilovaniya xwe wê êdî birayê wî ye jê piçûktir Adil, were û li dewsa rûnihê.

Adil, di wê demê de kar û barê rêveberiyê ê Mîsrê bi rê ve dibir. Lê piştî ku Afdal çû ber dilovaniya xwe, ew ji wir hat û karê wir bi rê ve bir. Li Mîsrê jî li şûna xwe Al-Mansûr danî ser rêveberiyê. Lê Adil zêde namêne, piştî ku hat û demek zêde bi ser nebû. Salahadin, Dema ku ew

çû ber diovanîya xwe li gorî ku tê gotin 16 kurên wî hebûn ku her yekê ji yê dîn bi zanetir bûn. Di dema Afdal de, Afdal, dîsa li Şamê rêveberîya mazin kir. Lê Birayê wî osman piştî bavê wî re çend ku derket li pêş û weke siltanê Eyûbîyan hat nasîn jî karên ku hatin kirin wî bidest xwe kir. Osman xwe dabûbû kar û barê xwandin û olî. Dem ku tê û digihîjê dema Adil, wê adil, rêveberîyê li Rehayê ava bike. Li Şamê jî, li wir, bicihkirina bavê wan jî, sedema wê bû ku Hin xalifeyên Fatimîyan li wir bûn. Li ser wê rewşê li wir bicih kirin. Nexwe, wekî din jî, xwestibûn ku li Rehayê wî bicih bikin. Mazinên wan pirranîyan wan li wir bû.

Rêveberîya Eyûbîyan, dû-dîmenî bû. Her wusa, li binî bajar bi bajar û ankû herêma bi herêma ku siltan û ankû şahê wê hebû, li ser wê re, rêveberîya eyûbîyan hebû. di dema Piştî Al-Muzafer re li Hamayê -Al-munsurê yekem û li Helebê jî Az-zahir desthilatdarîya xwe domandibû. Rêveberîya Az-zahir, teybetmendîya wê ew bû ku wî bi mîrê bota ku ji Cîzîrê welat bi rê ve dibir re di ahangekê de û bi hevdû re birê ve dibirin. Bandûra wan herdûyan li hemû beşên dîn ên rêveberîya Eyûbîyan dibû. Li Hamayê, heta sale 1221´, wê Al-Mansur, rêveberîyê bêne û piştê di vê salê de ku ew çû ber dilovanîya xwe wê Al-nasir li dewsa wî rûnihê ji sale 1221´ê heta 1229´an. Homs jî, di sale 1178-1186´ê de wê Al-Qadir û piştî wî re A-mucahid ji sale 1186´an heta 1240 û hwd rêveberî meşandiya. Lê di dema Al-Mansur de ku ew li hamayê bi rêveber wî ew jî bixwe ve girêdabû. Lê piştî wî re êdî weke wî nemeşî û rêveberîya nû ku Al- Aşraf dike, wê derkeve li holê.

Rêveberîya Eyûbîyan, wê piştî Adil re wê kurê wî Kamil were ser desthoaltdariyê di navbera salên 1218 û 1238´an de. Kamil, Pîr giringî dide perwerde kirinê. Wê di dema xwe de, li doras Reheya û heta ku digişt heskîfê û hê li gelek deverên din wê gelek medresa dan çê kirin. Wî, bi teybetî li herêma botanê, bi dehan Medresa dan çê kirin. Di dema wî de gelek aliman berê xwe dabû wê herêma wî. Kamil, wê karê wî yên ku di temenê çêkirina medresa û avahiyan mazin ên weke kirmanan de, wê kurê wî ku bi navê kalkê xwe tê binavkirin adil wê bide domandin û ew bixwe jî, mirovekî ku li gelek deveran wî perwerde dîtîya. Weke bavê xwe Kamil, Adil jî li Cîzîra bota bi salan maya û perwerde dîtîya. Wî, rêveberîya Eyûbîyan, gihand ast û radayeka din ya bilind. Ku em bahse Aqîlê kurê kamil bikin, divê ku em bi teybetî, bahse pêşveçûnaka mazin bikin. Lê di dema wî de, komên Mogol, Salçûqî û hwd, hêrişên wan hê li herêma dom dikirin. Di dema adilê kurê kamil de, wê gelek hêriş li wê qada li nava Şam û Rahayê jî bibin. Mînaq, ku hinekî piştî dema Adilê kurê Kamilê de dijî, ku piştî Adilê kurê kamil re bûya Siltan li ser serê Eyûbîyan Salih de jîya ye mirovên weke Şêx teymiyê Harranî ku weke alimna mazin tînan bi dehan pirtûk li şûn xwe hiştina, di dema ku di nava karwanan de ji Rehayê dikin ku herina Şamê, di rê de rastî hêrişên komên tataran tînan û Ev alim bixwe jî, bi zarokeyê jîyane wî tê xilas kirin.

Ji dema Adil û heta ku tê dema Salix û piştî Salih re heta ku dema Mesûdê kurê Salih, wê dem bi dem zêdebûnek di van hêrişên ku bidestê wan koman li herêma dibin wê zêdebûnek bibêt. Ev dem, bi vî rengî, weke dema ku êdî hin bi hin bo desthilatdarîya Eyûbîyan jî, ji ber hêrişan ku ên zor in. Di her demê de jî, ti komî wêre ne kirîya hêrişekê bibina bi ser navendan de, hertimî li navçe û bajarokê li kevîya kurdistanê û hinekî ji navendê dîr in, rastî hêrişa wan hatin.

Eyûbî, desthilatdarîya wan, ji dema şadadî û heta ku tê û gihîjê dema Merwanîyan û piştê ya wan, wê di xatekê de li dîv hevdû, di berde wama hevdû de rêveberî û desthilatdarî bi rê ve herê. Dem bi dem, çend ku çend ku destên ku rêve dibe diguharê jî, lê xate xwe dide domandin. Ev yek, weke kevneşopîyekê ya. Ji Destpêka Mihemedê kurê Şadadî heta ya Aliyê kurê Merwan û ji ya Elîyê kurê Merwan, heta digihîjê ya bi Salahadinê Eyûbî û hwd re, wê di dewama hevdû de li kurdistanê bi rêvebirina gelê kurdistanê re wê bi rê ve biçê. Di vê temenê de, dema ku em li dîrokê jî dinerin, em xateka bînavber dibînin ku bûya û afirîya. Ev nêzîkatîya Salahadinê Eyûbî

ku bi van gotinên wî ku ji devê tîr ser ziman, wê nêzîkatîya 'zaroyên wî jî were dîtin û fahm kirin. Dema ku kurê wî melik Al-Zahir li ber serê wî di kêlîka wî ya dawiyê de dirûnihê, ew jî ji kurê xwe re van gotinan dibêje. "Ji rêya Xwûdê dernekev in. Ez, serfiraziya xwe deyndarê Xwûdayê xwe me, ji bo vê yekê, ez bi fermane wî xwûdayî ji we re dibêjim. Xwûnê nerijînênin. Xwûn rijandinê, ji xwe re nekin edet. Xwûn rijandin, xwûn rijandinê bi xwe re têne. Zilmê, li xelkê xwe nek in û ji bo ewlakarîya wan û mal û milkê wan bixebit in. Ne kîndarê kesî bin. Dilê mezinên xwe ji xwe ne hêlin û neşkinen in. Dilê hevdu qizinc bikin. Bila, ti kesekê li ber destê te, dilê wan ji we nemêne. Bizanibin ku win hemû jî, mahkumê mirinê ne. Tu heta ku rizeya gelê xwe qizinc nekê, tê yê ya Xwûdê jî nikaribê qizinc bikê. Têkiliya xwe, hertimê bi gelê xwe re baş çêbikin. Tobedarê Xwedê bin, .. yê mazin û qadîr ew a." ... Piştê weke gotina xwe ya dawî dibêje ku "şûrê min, bi min re bikina tîrba min de da qana şahîdîya kirinên min bike li cem xwûdê." Bi wan gotinan, xwestîya ku balê bikişîne ser qancîya mirov. Yanî ji wan re gotiya ku tu qanciyê bike tê rastî qanciyê jî were. Rêveberiyên Eyûbîyan, piştî wî re, hewldane ku di wê xate wî de bimeş in û meşîna.

Ev gotinên wî ên dawiyê bûn û piştî wî re weke mîrete hem ji zaroyên wî û hem jî ji milete wî re û hem jî ji hemû yên bawermend re bûya. Wî, bi gotinên xwe, hertimî qancî pêşniyar kiriya. Rêya qanciyê pêşniyar kiriya û ji zaroyên xwe jî xwestîya ku hertimî, weke serokê desthilatdara gelê xwe ku tîkiliya wî bi gelê wî re xweş bê û hertimî li gotina wan bihisêne û dernekeve derî wan. Bi vê yekê, wî êdî dîtiya û gotiya ku wê bihijê rêz û hûmetê ya galê xwe û bi ghiştina rêz û hûmeta gelê xwe, wê bigihijê hemû kesekî jî. ..

Di derbarê Îdrîsî Bedlîsî de ..

Di derbarê dîroka Îdrîsî bedlîsî û dema wî de, heta roja me, di nava kurdan de pîrr ne hatîya nivîsandin. Ji ber ku nîfşên me bi wê mazin bûn ku ji wan hat gotin ku "îdrîsî Bedlîsî, xîyanet li kurdan kir." Ev gotin bû weke navê îdrîsî Bedlîsî. Dewletê jî, nivîsandinên ku di derbarê wî de dane nivîsandin, di wan de nivîsandiya ku wî weke "xîzmetkarekî" dewleta osmanî hanîya ser ziman. Li ser van gotinan jî, lêkolîn ne hatina kirin. Her wusa, dem bi dem di dema ku ew tê ser ziman û bahse wî dihê kirin de jî, wî weke yekî "xîzmetkarê osmaniyan" û hwd ew tê ser ziman. Di berhema wî ya bi navê "name" bahse dijberîya li dijî kurdên "sensor" dihê kirin.

Îdrîsî Bedlîsî, di wê demê de, ew dijberîya ku li ser temenê mezhebitîfîyê ku di nava Şîitîyê û mezhebên di de afirîya, di wê temenê de weke ku xwdiyê nêzîkatiyekê ya. Di wê temenê de gotina xwe, weke ku hanîya ser ziman. Di vê temenê de jî, bahse dihê kirin. Di wê dema ku berî ku şerê Çardiranê rû bide, dijberîya mezhebî pêşketîya. Hinek, di dema ku bahse wê demê û wî şerî dikin, dibêjin û weke Sedemekê jî wî dijberîya mezhebî ya li dijî hevdu tînin ser ziman. ...

Di vê temenê de, heta roja me jî, ji wê dema piştî şerê çardiranê û pêde, di nava kurdên Elewî de, navê wî bi îbretî tê ser ziman. Li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku di vê temenê de ew dijberîya ku navê wî tê ser ziman, di wê demê de çiqasî wî weke ku tê gotin daye nîşandin jî, di derbarê wê de gûman di serê mirov de çê dibe. Ji ber du sedeman, gûman çê dibe, Sedemek, ew a ku di wê demê de, di temenê sefawîyê de dijberîya ku afirîya, bayê wê heya. Ya din jî, her wusa, ew propagandayên ku di temenê mezhebî de li dijî hevdu hatina kirin. Ji xwe di wê demê de, li dijî şahê herê Şah Îsmail, Mohammed Xodabendî bi şerên xwe yê li bi kurdan re dijminatîyek di nava rêveberîya sefawî û kurdan de pîrr mazin pêşketibû. Mohammed Xûdabendî weke Şahê Sefawî, di dema xwe de, gelek herêmên kurdan ên rojhilat di şûr de derbas kir û wî ew hanîn ber wê astê ku bêmirov bimênin. Ev rewş û dema wî, bû sedema 'înfalê' di nava kurdan de di wê demê de. Ev dijminatîya ku afirî û bertekên li ser wê re ku afirîn, wê bina temenê vebûna navbera kurd û rêveberîya sefawî. Lê wekî din, rêveberîya sefawî, li ser temenê 'tarîqate sefawî' û ankû îsmailîyan ava ya û ev malbat û ankû kes jî biaslê xwe kurd bûya. Lê piştî wan komkujiyan re, êdî kurd bi tememî ji rêveberiyê qût dibin. Di demên piştî şerê çardiranê de, ew dijberî weke dijberîya li dijî elewîyan ji aliyê rêveberîya osmaniyan û tirkîya piştî jî hat ser ziman. Lê berî wê, çend mirovên weke Mohammed Xudabendî hatina û bikirinên xwe, piştî hertimî bi îbretî navê wan hatîya hildan. Di dema xwe de Mohamed Xodabendî artîşa xwe da ajotin li ser herêma Şîrwanê û li wir bi hezaran kurd di carekê de di şûr de buhurand. ..

Lê li vir, ew tîpolojîya ku di çapamenîya tirk de û ankû rayadarên tirk li ser wî re dihênin ser ziman, hinekî jî, weke ku li wî û wê demê nayê. Ji ber çî ..? Ji ber ku Rayadarên tirk, Îdrîsê bedlîsî, weke mirovekî ku çûya di qasra osmaniyan de kar kirîya û ankû li berdestê şah karkirîya. Ev, li jîyane wî nayê. Ji ber ku Îdrîsê bedlîsî, li herêma bedlîsî, xwedî dergeh bûya û bandûra wî

bixwe jî, ji ya şahekî maztir bûya. Di bin fermane wî de, bi deh hezaran kurd hebûn ku herina mirinê. Yekî bi vî rengî, ne tenê weke alimekî dijî. Her wusa, weke şahekî dijî. Bi vê yekê, ji xwe di wê demê de, wî bi wê bandûra xwe, weke ku Kurdîstan hemû kirîya bin destê xwe de. Di wê demê de, Îdrîsê Bedlîsî, xwestîya ku hemû herêmên kurdan bike yek û bi xwe ve girê bide. Wî, xwe weke serokêkî rûhanî û şahekî ê kurdistanê ê giştî didît. Yekî, ku bi vî rengî xwe dibîne û bandûra wî heya, di tefsîrkirina ku ew li berdestê şah bê û namayên şah binivîsêne, û bi vî rengî ku ew were ser ziman, wê li wê rewşa wî û dema wî newê. Ji xwe, ji wê rewş û kevneşopîya kurdan ya dergehtiyê û mîrtiyê, mirovekî ku piçekî jî bizane bê û jê biagahdar bê, wê bibêje ku ev zanînen ku di derbarê Îdrîsê bedlîsî de ku bi vî rengî tên ser ziman ne rast in.

Îdrîsê bedlîsî, di derbarê kirinên wî de, em li vir, gotinên nabêjin. Bila ew nûha bimêne. Ji ber ku ev rewşa di derbarê kirinên wî de ku bi gotinî jî bê ku li kurdistanê di nava kurdên sînî û şaffî de û ku di nava kurdên elewî de ku tê ser ziman, cuda bide bi dû rengan a û ew jî, ji ber vê yekê, hewceyî lêkolînekê ya ku bi awayekî rast were kirin a.

Bi teybetî, divê ku em vê jî bibêjin ku di derbarê îdrîsê bedlîsî de, ji aliyê olî ve jî, zanîna ku tê gotin divê ku em wê rast bikin. Li kurdistanê, ji Sûnnîtiyê zêdetir, Şaffî li pêş bûya. Di oldarîya Îdrîsê bedlîsî de ev yek wusa bûya.

Îdrîsê bedlîsî, mirovekî ku pirr xwanda bûya. Pirr jî nivîsandîya. Heta dema me, tenê berhemên wî yên ku tê zanîn ser 28 pirtûkan re ya. Di dema wî de, wî her dema xwe daye nivîsandinê. Di wê dema wî de, Ew bixwe, weke şahê kurdistanê bûya û hemû êl û aşîrên kurdan, bi xwe ve girêdana û bi wî ve dane nişandin. Yanî wî, serokatîya mazin ya civatî jî kirîya. Di wê demê de, nakokiyên di nava kurdên elewî û ên ne elewî de jî, di wê demê de bi rengê mezhebî xwe dane li rû. Bi teybetî, divê ku ez bibêjim ku wê mezhebîtiyê, civatîya kurdistanê kir qat. Piştî jî, wê bandûra wê qatbûnê xwe bi dîyarî bide nişandin.

Li kurdistanê, di wê demê de, jîyane ku heyî, ku em bi jîyane kurdan re bînina ser ziman, kurd li herêmên xwe serdest in. bandûra wan, li ser axên wan bi serwerîya wan re heya. Îdrîsê Bedlîsî, serokatîya vê dike. Di demê de jî, di dema ku dem tê şer çardiranê jî, heta ku Siltanê osmanî Yavuz Selim bi kurdan re û ankû bi Îdrîsê bedlîsî re levnekê, wê nikaribê li herêmê weke hêzekê xwe bide dîyar kirin jî. Di wê demê de Îdrîsê Bedlîsî, di dema ku bi armanca levkirinê çûyina û serî li deriyê wî hatîya xistin, wî red nekirîya. Levkirinek bi wan re kirîya. Ji xwe, di wê demê de, osmaniyan jî misilmantî herê kirîya. Dibin navê "biratîya misilmantiyê" de, ew levkirin tê kirin. Lê di wê demê de jî, çend mîrên kurd ên weke mîrê Amedê ê wê demê de bixwe jî, dijberîya xwe li dijî wê levkirina bi osmaniyan re li dijî îdrîsê bedlîsî didîna nişandin. Lê zêde hêz û şansê wan jî li ber hêza Îdrîsê bedlîsî tûna ya. Îdrîsê bedlîsî, weke şah û siltanê kurdistanê û hemû kurdên wê demê, nav û dengê wî derketîya.

Li ser wê, êdî mîrê Amedê dike ku bi Qasra Sefewîyan ya wê demê re bikeve têkiliyê de. Lê heya Îdrîsê bedlîsî bixwe jî ji wê çê dibe. Piştî îdrîsê Bedlîsî, wî bixwe jî ceza dike. Li cihê wî mîrekî din dide nişandin. Yê ku tê dayîn nişandin, li gorî ku bi gotinî tê gotin birayê mîrê berê bûya. Ew jî, piştî di rêya birayê xwe de diçê di temenê dijberîya wê peymanê di nava Îdrîsê bedlîsî osmaniyan de.

Îdrîsî bedlîsî, di wê demê de, hinek telûkeyan jî li ser herêmê û herêmên ku serwerîya wî li ser heya kifş dike. Ji ber vê yekê, ew dixwe û dixwezê ku herêmê û hemû mîr û mîrgehên wê bi xwe ve girêbide û bike bin gotina xwe de. Û bi wê, hêza xwe mazin bike ku dakû karibê li dijî telûkeyan bisekinê. Wê bi pirranî dike jî. Piştî di wê temenê de peymanê bi osmaniyan re çê dike. Di wê demê de îdrîsê bedlîsî, bi şerê Çardiranê re jî, hin hasabên wî ên di vê temenê de jî hebûn. Yek ji wan hasabê wî jî ew bû ku herêmên rojhilat û başûrê kurdistanê jî bike bin dest û gotina xwe de. Mîrov vê ji kuderê fahm dike? Ji wê peymanê ku bi Yavuz Selim re çê dike. .. Di wê dema ku peyman tê çê kirin de, hingî mîrgeha badînanê û ankû ya bi navê î ro "başûrê kurdistanê" bixwe jî dide dîyar kirin. Bi wê re jî, heta ber sînorê Baxdayê, îdrîsê bedlîsî, xwestîya ku herêmên kurdan bike yek di bin gotina xwe de. Bi wê re jî, di wê temenê de di temenê olî de jî, xwestîya ku tenê di temenê oldarîya wî de hebê.

Piştî ku şer Çardiranê dibê, hingî, êdî piştî, weke ku levkirina, herêm tên beşkirin, Li gorî

wê levkirinê herêmên kurdan, wê bi serê xwe û bi mîrgehên kurdan werina bi rê ve birin. Di vê temenê de, ew xwedî gotin a. Lê di dema ku dawî li şerê Çardiranê dibe û hin herêmên ku îdrîsê bedlîsî ku hizir kirîya ku li ser wan jî bibe xwedî qûdret, ku bi peymanê "qaşrî-şêrîn" ku di dawîya şerê çardiranê de tê kirin ku di destê rêveberîya sefewî de tê berdan, êdî weke ku şikeştina pêşî ew û hizra wî ya stretejîkî a di serî wî de dixwê. Li ser wê re jî, êdî herêmên ku mana, li ser wan re, di nava osmaniyan û kurdan de weke ku levkirin dibê. Gotinak, heta roja me jî, tê gotin bi navê îdrîsê bedlîsî. Ew jî, ew a ku tê gotin ku "îdrîsê bedlîsî, di dema ku payman bi Yavuz selim re mohrkir, xale ku wî herî zêde derxist li pêş ew bû ku wê kurd bi kevnaşopîya xwe re bijîn û wê dest avêtina li kevnaşopîya wan newê avêtin." Ev gotin, bi devkî tê gotin.

Îdrîsê Bedlîsî, divê ku mirov bibêje ku wî di dema xwe de, li herêmê bigîştî rolaka mazin leyistîya. Li herêmê, ew ne tenê weke oldarekî û her wusa weke şahekî rol leyistîya. Her wusa, di temenê nêzîkatîya netewî de ku weke serokê netewekî kirîya ku derkeve li pêş û were herê kirin. Wî kirîya ku ne tenê bi êl û herêmêkê û ankû bi mîrgeha kurd xwe bide herê kirin. Wî, weke ku mirov kifş dike, weke ku minaqâ salahadinê Eyûbî kirîya ku ji xwe re minaqî bigrê û bi wî rengî xwe bi hemû herêmên kurdan pêşî bide herê kirin û piştre jî xwe bi herêmên din ên dervî kurdan re bi olî û mazinatîya xwe ya bi olê re bide herê kirin û bi wê re rabê. Di vê temenê de, kiriyara wî mirov kifş dike.

Di dema Salahadinê Eyûbî de jî, dijberîyên olî hebûn. Di dema xwe de salahadinê Eyûbî, sefer bir ser baxdayê û herêm hemû kir bin destê xwe de û yekbûn da çêkir in. Di wê demê de, hê Salahandin, bi tememî ne weke Siltan bû. Lê piştî wê seferê re ew êdî yekbûnekê dide çê kirin û li ser wê re dibe siltan.

Di temenê kirina wê de, li rêveberîya sefewî li herêmê, dijberîyeka wê ya li wê hebû. Çend ku em di wê demê de şahê Sefewî Şah îsmail, weke şahê sefewî jî bînina ser ziman jî, lê divê ku em vê jî bibêjin ku şah îsmail bixwe jî, bi aslê xwe kurd bûya. Malbate wî, bi koka xwe kurd bûya. Şah îsmail bixwe jî, xwestîya ku bi heman rengî, desthilatdarîya xwe li herêm mazin bike û hemû mîr û mîrgehên herêmê bi xwe ve girê bide. Bo vê yekê, yên ku li ber wî jî rabûna, wî jî, ew girtina avêtina Zindanê. Bi vê re, tê gotin ku Şah îsmail bixwe jî, nêzî 20 mîrên kurd ku li dijî wî rabûna, avêtîya zindanê û piştre wan jî ji zindanê derfet ji xwe re afirandîya û ravîna. Piştre, wan jî li cem îdrîsê bedlîsî cih girtîya di dema şerê çardiranê de. Di aslê xwe de, ya ku baxtê şerê çardiranê bi aliyê îdrîsê bedlîsî de daye kifşkirin jî ew bû ku wan mîran li aliyê gotina xwe daye gotin a.

Îdrîsê Bedlîsî, di aslê xwe de, di şerê çardiranê de, ancama ku xwestibû ku bidest bixe ne bi tememî bidest xistibû. Lê dîsa li herêmê bûbû serdest. Piştre jî, rewşa kurdên ku bi wî ve girêdayîna baştir bûbû. Piştre hin bi hin, piştî şerê çardiranê re, rewşa şah îsmail û Malbata wî bixwe jî xira dibe. Piştre Şah îsmail, Malbata wî ji desthilatdariyê tê dûrxistin. Ew bixwe jî, di dawiyê de bi ecelê xwe namirê û tê kuştin.

Ev rewş, wê bike ku li herêmê bigîştî bandûra bandûra kurdên Elewî jî xira bibe. Piştre, di temenê wê dijberîyê, weke ku çawa çûyina bi ser kurdên êzîdî de bûya, wê bi ser kurdên elewî de çûyin û hêriş bibin. Ji wê jî, wê pîr êzîyetê bikişênin. Bandûra olî, di wê demê de, hin bi hin cihê xwe li ya netewbûnê di berda. Lê Piştî îdrîsê Bedlîsî re, rewş, vajî wê hizirkirina wî ya ku wî dixwest ku bi wê pêş bikeve pêşket. Osmanî, serdest bûn. Heta ku îdrîsê Bedîsî Sax bû û li jîyanê bû, Qasra osmaniyan wêra nedikir ku li dijî wî bikeve tevgerîyekê de. Lê qasra Osmaniyan bixwe jî, didît ku rewşa kurdan û serdestî û serwerîya wan maztir bû, piştî şerê çardiranê. Çend ku bi peymanê qasrî şêrîn qatbûnek bû jî, ew qatbûn îdrîsî bedlîsî bi hewldanên hikûmet kirina mîrgeha Bahdînanî ku praniya başûrê kurdistanê e roja me di nav de ya re xwest ku ji holê ra bike. Derfet û temenê wê jî hebû. Di kifşkirina herêmê de di piştî şer çardiranê de, herêmên başûrê kurdistanê hatîna bi 'sancaq' kirin. Ji ber vê yekê, osmaniyan xwe li ber wê mazinbûnê kêmtir dîtin. Piştre hin bi hin, hizrên dijberîyê bi wan re jî çê bûn. Piştî ku îdrîsê Bedlîsî mir û pêde, êdî ew hizrên ku di temenê dijberîyê de hin bi hin ketina pretîkê de. Piştî mirina îdrîsê bedlîsî, bi fermanekê, ew peyame ku di nava îdrîsê Bedlîsî û Yavuz selim de bûya, tê betal kirin û ji holê rakirin ji aliyê qasra osmaniyan ve. Êdî weke ku di dema Qanûnî Siltan Sûleyman de bû, wê êdî sefer li dijî

kurdan û li herêmên wan werina kirin di bin navê 'avakirin û yekkirina desthilatdarîya îslamî' de. Di dema Qanûnî siltan sûleyman bixwe de jî, ferman hatîya weşandin û bi wê fermanê, serdestîya qasra osmaniyan li ser serê mîrgehên kurd hatîya farz kirin. Lê kurdan jî, ew red kirîya û piştre şerê wan yê bi hevdû re dest pê kirîya. Qanûnî Siltan Suleyman, di bin navê Misilmantiyê de vê dike. Di fermane xwe de dibêje ku "yên ku li dijî vê fermanê rabin, wê li dijî îslemiyetê rabin." Ev gotin, wê bandûra wê pirr mazin hebê li ser kurdan. Ji ber ku kurd pirraniya wan misilman bûn. Gelek mîrgehên kurd, dikevina nava dilwaswasîyê de. Lê gelek mîrgeh jî, rastrast li dijî dirabin û serbixwebûna didenezênin û dibêjin ku "em êdî ti têkiliya me bi qasra osmaniyan re tûna ya." Bi vê, êdî têkiliya xwe qût dikin. Weke ku di destana 'dewrêşê Ewdî' de, weke ku bi mîr Temir re tê dîtîn, wê ew serbixwebûn bidomê. Lê wê li ser wê re jî nakokîyên di nava kurdan û qasra osmaniyan de vegeirihina şer jî cih bi cih.

Îdrîsê bedlîsî, heta ku li jîyanê ya, qasra osmaniyan, xwestîya ku bi wî re baş derbas bike. Ji ber ku ti kesek û hêza ku li dijî wî bisekinîya û bi wî re û bi hêza wî re qam bipîva tûna bû. Ji xwe, ji ber wê bû ku dema ku piştî ku îdrîsê Bedlîsî mir û piştre qasra osmaniyan ket dijberê wan de û bi artişa xwe ya ku afirand çû bi ser wan de, êdî kurdan gotin "baxtê romê tûna ya." Ev gotin, di ancama vê de hatîya hatîya gotin.

Ku em ji kîjan aliyê lê biner in, dema îdrîsî bedlîsî, weke demeka ku nivdema Salahadinê Eyûbî ya. Çend ku dema îdrîsê bedlîsî ne gihiştîbê wê asta ya salahadinê eyûbî bixwe jî, di vê ku mirov bibêje ku bandûra wê, ji pirr aliyên ve, weke ya wê dema salahadinê Eyûbî xwe daye li der û gelek ancamenê wê ên weke ya wê demê di wê demê de jî bûna.

Îdrîsê Bedlîsî, mirovekî ku bi zanebûn bûya. Tenê, berhemên wî yên ku em î ro dizanîn ser 28'an re ya. Tê gotin ji wê zêdetir jî ya. Di derbarê dema xwe de nivîsandîya. Di derbarê û mezhebên olî de, nivîsandîya. Hin hizrên wî yên di derbarê dijberîya kurdên sersor de ku tên ser ziman hena di wê berhema wê ya binavê "name" de. Lê çiqasî, em dikarin qînyatê bi wê bînin jî, ew jî weke gûmanekê di serê me de heya. Di dema ku em, guhartin û dewşirmetiya ku li ser berhemên Seîdê kurdî û ankû Bedûzzaman ku hatîya kirin ku em dihênin bibîra xwe, hingî jî, ev gûman bi me re çê dibe. Hin bûyarên ku di vê temenê de gûmana xwe xorttir dikin jî hena. Di sadsale 17' min û piştre weke ku bi serhildane Şêx Bedreddîn û hwd re ku bû, li dijî osmaniyan hertimî rewşeka serhildanî bi elewîyên kurd û yên ne kurd re bû. Hingî, kom bi kom elewî û ankû bi navê wan yên ku di wê demê de li wan dihat kirin "sersor", bi navê tarîqate îsmailîyan bê û ankû bi navekî din jî bê, hatîya kirin. Hewldane "paqjîkirina ji anatolîa sersoran", di bin van navan de jî bûya di dema osmaniyan de. Di ancama vê de, şêx bedreddîn serî hildane ya. Şêx Bedreddîn, ne bi armance ku anatolîa hemûyî bike bin destê xwe de serî hilda. Bo ku ew werina herê kirin, xweserîtiya wan ya ji olîtiya wan bê û ankû heyîn wan bê, ku were herê kirin. Di vê temenê de, dibêjin gûman hena ku guhartin jî hatibin kirin. Ji bo ku rewş ji derketina hin şêx Bedreddînen nû re tûna bin. Piştre jî, hertimî elewîti û ankû bi navê wê yê ku pê dihat nasîn "sersor", hertimî bo osmaniyan weke "belayekê" û ankû "telûkeyekê" hatina dîtîn. Heta roja me jî, bi politikayên xwe, di vê temenê de li dijî wan politika hem li ser olê re û hem jî li ser desthilatdarîyê re hatîya kifşkirin. Piştî ku serhildane şêx bedreddîn bi xwûnê heta perçiqandin, êdî bo ku wê perçiqandinê meşrû bidina nîşandin, gotinên dijber jî zêdetir hatina gotin. ..

Ew "name" ya ku tê gotin ku Îdrîsê Bedlîsî tê gotiya ku " ser 70 hezar sersorî re hat qatil kirin", divê ku mirov bigûman lê binerê ku ji devê wî derketîya. Yekî ku bi deh hezaran mirov bo wî diçina mirinê û weke şah a, naçê û li berdestê ti kesekî na rûnihê û bo wan nameyan nenivîsêne ji deveran re. Ji xwe, li ber destê Îdrîsê bedlîsî bixwe, ser sad mirovî ku karên bi vî rengî dikin hena.

..

Îdrîsê Bedlîsî bixwe jî, berî şerê çardiranê gerên wî yên ku li herêmên ku kurdên Elewî bûna hena. Ew "name" ya ku bi navî tê ser ziman, hem vajî pêşketina kurdistanê ya demê û hem jî awayê pêşketinê ê wî ya hizrî ya jî. Mirov li ser wê "name"yê re digihîjê tégihîştinekê ku weke ku ew rewşa şerê çardiranê, weke ku ji bo rewşa din ku ser bidina vêşartin dihê bikarhanîn. Weke ku komkujiyên dema şêx Bedreddîn û ên piştre ku elewîyan jîn kir jî destê dewletê, weke ku dihê

xwestin ku bi vî rengî biderne din ve bidina girêdan û dîroka dewletê û osmaniyan paqij bidina nîşandin.

Wusa xuya dike, ku hin dijberiyên desthilatdarî bi olî û teolojiya olî hatina şîrove kirin û hewl hatîya dayîn ku ji wan sûd were girtin bo pêşketin û rengê pêşketinê ê ku di roja me de dihê xwestin ku bikin. Temenê domandina nakokiyên civatî û olî, bi dîrokê re hatîya afirandin û hewl dihê dayîn ku li ser wan re ew nakokî, werina bi vê ve birin. Ya ku mirov, li vir, di serî de bi teybetî kifş dike ev a. Bêgûman, Îdrîsê Bedlîsî, kêmesîyên wî yên ku hena, divê ku werina kifşkirin û rexne kirin jî. Lê vî mirovî, serdemeka kurdistanê pêşxistîya û serokatîya wê kirîya. Îdrîsê bedlîsî, pêşketina wî, bi dema wî re baştir tê fahm kirin û divê ku bi dema wî re were fahm kirin.

Îdrîsê Bedlîsî, li gorî wî dihizirî, wî di şerê Çardiranê de wê herêmên kurdan di bin şahiya xwe de bikira yek. Piştî ku şerê çardiranê dibê, piştî ku peymanê qasrî şerîn hat mohr kirin, tevî ku herêma musilê li aliyê din ê peymanê dimêne jî, îdrîsê Bedlîsî wê herê nakê û hêzekê dişene Musilê û wê di bin destê xwe de digrê.

Hinek kirinên Îdrîsê Bedlîsî, ku bi gotinî û devkî ku li herêmê botanê ku tên gotin, di dema ku mirov li wan dihisene û guhdar dike, mirov li ser van vegotinan re di rastîya wan gotinên ku di temenê dijberîya sersor'an de ku li ser wî re bahse wê dihê kirin mirov dikeve gûmanê de. ...

Minaq, di dema ku em pirtûkên ku weke pirtûkên çîrokên di roja me de jî tên xwandin ên "hezar û yek şev î" jî ku di qasrên Abbasîyan bi jîyane xalifeyên weke xaro reşîd û bahlûl re di buhur in, di wê de weke ku çawa ku di pirtûkên Seîdê kurdî de guhartin li ser gotina "kurd" re ku têde bûya, di van behemên 'çîrokên hezar û yek şev î' de jî weke ku heman guhartin bûya. Yê min, di dema ku min 'çîrokên hezar û yek şev î' xwand de, min ev yek bi awayekî vekirî hîs kir.

Tê bawer kirin ku Xaro Reşîd û birayê wî Bahlûl kurd in. Herdû jî, bûna xalîfe. Di dema wan de, awayekî pêşketina pêşketina li baxdadê tê dîtin. Û Piştî wan re jî, weke ku di dema 'mîtasîm' û hwd de jî awayekî cûdatir tê dîtin. Awayê pêşketinê ê bi Xaro Reşîd û birayê wî re, bi carekê weke ku ji holê hatîya kirin. Weke ku li dijî Malbate Xaro reşîd û birayê wî di qasrê de derbe hatibê kirin û dawî li pêşketina wan û ya li ser wan re hatibê hanîn, rewşê tê dîtin. Piştî dema Xaro reşîd, dema Mîtasîm weke ku demeka derbeyê ya, hizran bi mirov re dide çê kirin. Çend ku tê bawer kirin ku Xaro Reşîd û bahlûl kurd in jî, piştî wan re Mîtasîm wê di dema xwe de di cih de berê xwe bide bi ser kurdan de. Herî zêde kurdên dasnî ku navenda wan şengal bû û ku serwerîya wan heta musil û kerkûkê jî hebû, wê cengna mazin ku bi heyvan didom in wê artişa mîtasîm bi wan re bike. Kurdên Dasnî, êzîdî bûn. Lê kurdên misilman jî, ku ji kirinên Mîtasîm nexweş in, wê nexweşîya xwe bi berteka xwe re dane nîşandin û Mîtasîm jî, piştî wê re çûya bi ser wan de jî. Herî dawî, heta ku dema tê dema Salahadîne Eyûbî, wê Salahadîne Eyûbî Seferê li baxdayê li dar bixe û desthilatdarîya li wir bixe.

Ku em ji kîjan aliyê lê dinerin, em nakokiyên olî jî di vê demê de dibînin. Heta ku piştî çûyîna berdilovaniya xwe ya Hz. Mihemed bixwe re, mirov dibîne ku ew dijberî diafirê û dibe temenê mezhebîtiyê. Hersê Xalifeyên pêşî bi ecelê xwe ne çûna berdilovaniya xwe. Heta ku Hz. Alî bixwe jî, bi ecelê xwe neçûya berdilovaniya xwe. Di şerê kerbelayê de, bi qatil kirina Hasan û Huseyin re ku ew 'ahlê beyt' in, wê ew nakokî, kûrtir bibin. Bandûra şerê kerbelayê, li pîrr dever, rewşê di deman bûya. Lê herî zêde, kurdan û kurdistanê bandûr jê girtîya. Ew şer, bû temenê wê ku civate kurd bibe dûqat. Ew şer, bû tûxûbekî mazin di nava civate kurd bixwe de jî. Heta roja me jî, weke ancamekê, em dikarin bahse wê tûxûbê bikin.

Elewîtî jî û mezhebên din jî, weke nîrxna pîroz ên civate kurd in, ku heyîna xwe diparêzên. Lê mixabin, rejimên weke ên tirkîya û hwd jî, î ro, wan nîrxên pîroz ên weke elewîtîyê bixwe jî bikar dihênin bo ku wê qatbûna civatî bidina domandin. Di dema xwe de Sêd Rîza, hinekî jî ev yek farq kir. Ji ber vê yekê, wî di dema xwe de, xwest ku wê nakokiyê, ji temenê dijberîyê derxe û tenê weke cihêrengîyeka olî a pîroz bide domandin. Hizrên Sêd Rîza, di vê temenê de giring in û pîroz in, ku divê ku mirov wan li berçav bigrê. Sedemek jî ji wan sedemên bo bi dervekirina wî bi

kurdîtiya wî re ev bû. Sedema ku ew hat bidervekirin û î ro tirba wî bixwe jî nayê zanîn ev a. Sedemeka tûnakirina tirba wî ya din jî heya. Ew jî, herwusa ew bû ku kurdên elewî ku ti nirxên wan ên bi kurdîtiya wan re tûna bin bû.

Li vir, berî hertiştî em kurd, divê ku carekê jî bê, karibin ku bi awayekî bêalî li dîroka xwe û pêşketina wê ya demên berê binerin. Kêmesiyên wê rexne bikin û başiyên wê derxistina li pêş. Ev yek, bi awayekî baş, bo pêşketina civatî jî pirr giring a. Ev, ji bo ciheregiyên olî divê ku were û bibe. Û ji bo ciheregiyên civatî ên kêmetewî jî divê ku were û bibe. Bi vê rengî, wê rastî başbûnekê were. .. Civatên weke civate kurd, ku bi sadsalan, di bin metinegeriyê de man û dem buhurandin, ya herî zor ji bo wan jî ev a ku bikin. Lê heta ku vê nekirin jî, wê nikaribin ku hizreka azad û bizanistî di serê xwe de jî bidîna çê kirin. ..

- **Di derbarê dema îdrîsî Bedlîsî de**, weke mijareka ku giring ku divê ku bi serê xwe were ser ziman, mijare peymanê ku li Amasya ku di nava Îdrîsî Bedlîsî û siltanê Osmanî Yavuz Selim de ku hatîya mohr kirin a. Mijar û navê Îdrîsî Bedlîsî bixwe jî di nava kurdan de pirr xesas a. Her ku navê îdrîsî Bedlîsî tê bîra yekî kurd, ew dîroka bêbaxiyê ku hafî ser kurdan bi destê osmaniyan û piştre ku bi demê Komare tirk re domîya dikeve bîrê de. ..

Peymana Amasya ku di nava Îdrîsî Bedlîsî û siltanê Osmanî Yavuz Selim de ku tê mohrkirin..

Kurd, divê ku dîroka xwe bi hemû aliyên wî re bizanibin. Qancîya wê jî û xirabiya wê jî divê ku bizanibin. Li ser wê re êdî gotina xwe divê ku bibêjin. Êdî ku rexne jî bikin, divê ku li ser wê zanebûnê re rexne bikin. Yanî, wê êdî temenê gotina wan bi zanistî wê hebe. Pirtûkên Îdrîsî Bedlîsî hatina guharandin. Gelek gotinên di temenê dijberîya "sersor"an de hatina bicih kirin. Minak, ew nameya ku tê gotin ku wî nivîsandîya ji siltanê osmani bayazîd re, wî ne nivîsandîya. Tê gotin ku li berdestê "hasanê dirêj" û ango "uzun hasan" maya, ev gotin jî derew a. Ev gotin, ji wê dijberîya kurdan û rexnekirina kurdan a li idrisê bedlîsî sîd hatîya girtin û hatîya gotin. Lê ti rastîya van gotinan tuna ya. Berê, digotin "salahadinê Eyûbî tirk a." Piştre ku ev derew derket li holê û hat dîtî ku ne rast a, êdî nema hat ser ziman. Ev derewên li ser îdrîsî bedlîsî re jî, weke wan derewan in. Kurd, ji ber ku îdrîsî bedlîsî bi Siltanê Osmanî Yavuz Selim re peymaneka stretejîkî çêkir û piştre ancamen wê bo kurdan bi xwûn bûn, êdî kurdan hem Îdrîsî bedlîsî berpîrsiyar girt û ew rexne kir û jê re gotina "xiyane" bikarhanîn. Îdrîsî bedlîsî, bo wî tê gotin "xizmetkarekî osmani bûya". Ev gotin jî, derew a. Ne rast a. Ji ber ku ev gotin li ser ancamen ku derketina li holê re tê gotin. Lê di dema xwe de, di temenê levkirinê de payman hatîya mohrkirin. Peymane Amasya, di nava îdrîsî Bedlîsî û siltanê osmanî û Yavuz Selim de ya. Yekî ku Xizmetkarê dewletekê bê, li ser navê xalkekî din naçê û peymanê bi de wleta ku tê gotin "xizmetkar"ê wê ya, bi wê re peymanê mohr nakê. Didema ku li Amasya bo peymanê levçivin bû, gelek mîrên kurd jî hatin vaqandin li wê ku lê rûnihin li ser navê kurdan.

Li ser van gotinên weke ku di pirtûkên wî de hatîya bicih kirin, ên weke "70 hezar sersor hatin qatil kirin.", gotinên ku li ser wan re temenê nakokiyên olî bi dîrokê re hatîbûbûna afirandin û li ser wan re di roja me de, ew nakokî tîn meşandin in. Divê ku mirov ji bîr nekê ku weke ku di sale 1996an de dîyaneta tirk di temenê reşkirina ola kurd a êzîdî de gotin ku "êzîdî bergê ji şaytên re dikin." Ev gotin û ew gotinên di temenê dijberîya sersoran de, weke hevdu na. Her wusa, gotina "emê sersora ji anadolya paqij bikin" jî, gotina siltanê osmanî ya. Lê dixwezî ku vvê gotinê jî di pirtûkên wî de bicih kirin û bikina malê Îdrîsî Bedlîsî û li ser wê re şîyeseta olî bikin. Li ser wê re jî, di temenê nakokîya sînnî û elewî de, î ro li ser wê re şîyesetê bikin.

Îdrîsî bedlîsî, di dema xwe de, di temenê şerê çardiranê de, dijberîya di nava rêveberîya sefewî û ya sînnî de jî hebûya. Berî dema Şah îsmail, Mohammed Xudabendî û hinek şahên vê sefer beriyê li ser serê kurdên wê herêmê û bi hezaran di şîr de buhurandina. Di vê temenê de, dijberîyek hebûya. Lê ev dijberî, î ro rêveberîya tirk, bi kirasê olî û teolojiya wê li gorî xwe û politikaya xwe şîrove kiriya û li ser wê re temenê nakokiyên kurdên elewî û sînnî dem bi dem pêş dixê. Ev alî, weke aliyekê giring ê qatbûna civate kurd a jî. Li ser vê re, civate kurd, hatîya qat kirin. Minaq, tê gotin ku "zazakî û kurdî, jevcuda na." Ev gotin, rengêkî dî ê vê temenê ê ku li ser wê re nakokîya civatî tê domandin a. Her wusa, ji ber ku statûya kurdan hertimî hat red kirin, êdî

her rewşên ku wê bi reng û têgihiştina statûyê hatina ser ziman, ji navê kurdan hatina dûrkirin û bi dewletê ve girêdayî hatina şîrove kirin û ji kurdan jî hat xwestin ku tabî wê bin. Îdrîsî bedlîsî bixwe jî, di aslê xwe de, aliyekî wî yê ku di temenê statûya kurdan a demê de heya. Bi gotinên weke "ew xizmetkarê osmanî ya", hinekî li ser vê dihê xwestin ku were girtin.

Her wusa, divê temenê de ku mirov bibêje, gelek kirinên dewletê di dema osmaniyan de bûna. Minaq, di dema Şêx Esadê Erbilî ku şêxekî kurd bû û ji dergeha Naqşibendîyan bû, ji başûrê kurdistanê tê Îstembûlê ku bi rayadarên Osmanî re mafê kurdan gotûbêj bike û ji wan bixwezê. Lê dema ku ew tê wir, di cih de ew tê gotin û tê zindan kirin. Di dema ku ew tê bihîstin, piştî kûrê wî şêx Alî bixwe jî, bi mirîdên wan ên dergehê re dikin ku rabin û berteka xwe bidina nîşandin. Heman tişt, li dijî serhildane Şêx Saîd jî, hat gotin, Ji bo ku serhildane şêx Saîd, du gotin bi teybetî di hat gotin. Yek ew bû ku di hat gotin ku "bidestê îngilîzan, wî serî hilda ya". Ji ber ku mirovekî oldar a, di vê temenê de navê wî were ser ziman, wê bertekê li ser olê re bersiv bista. Gotina din jî, ew bû ku bo ku serhildane şêx Saîd, bi navî wî û kurdîtiya wî newê ser ziman û bo ku newê zanîn û ser ziman ku wî ji bo kurdistanê û mafê kurdan serî hilda ya, dihat gotin ku "wî, xwestibû ku şariatê bêne welat". Û ankû di hat gotin ku "di xwest ku dewletek şariatê ava bike." Di vê temenê de, êdî li ser vê gotinê re dihat gotin ku li dijî "rejima sekuler a tirkiya" a. Bi vî rengî, hertimî propaganda hat kirin.

Bi wê re, li ser vê esasê û temenê, bi vî rengî ku propaganda dihat kirin de, rapor li ser serhildane kurd ji rejima yekîtiya sovyet re jî dihatina nivîsandin. Di raporê de serhildan, weke "serhildaneka olî ku di xwezê şariatê bêne û paşvarû" dihat ser ziman. Bi vî rengî û li ser van gotinan re hertimî propaganga hat kirin.

Piştî dema îdrîsê Bedlîsî, bixwe jî, di vê temenê de, propaganda hatina kirin. Îdrîsê Bedlîsî, ji ber kirinên xwe ên weke hevkarîya stretejîkî ku bi rêveberîya osmaniyan re kir, li ser wê re hat rexne kirin. Kurdan, hingî digotin ku **"osmanî, li me na hizir in, ku xwe girtin wê berê şûrê xwe bidina me."** Lê îdrîsî Bedlîsî li van gotinên jî nava xalkê û mirên li dora xwe weke ku ne hisand. Lê zêde di wê demê de, derfet nebû ku li dijî îdrîsî Bedlîsî, sekin in derfeta wê tûna bû. Ji ber ku weke ku çawa ku di sadsale 20a'yan de, du kutub bi navê yekîtiya sovyet û rojava afir in, di wê demê de jî, di temenê mezhebê şîa û sînnî, şaftî û ku hinek mezhebên din jî de di nav de, bi wan re afirî bû. Li kurdistanê, di wê demê de Îdrîsî Bedlîsî, weke serok û nimînêrê wê kutûba aliyê li dijî aliyê ku bi dewleta sefawî re dihat ser ziman û li pêş bû.

Rêveberîya osmaniyan bixwe jî, di wê temenê de, di dît ku kurd, li herêmê serdest in. Kurdan, di wê demê de bi wê rewşa xwe ya serdest, weke ku di dema salahadinê Eûyûbî û hwd dibû de, ne tenê rewşa siyasî kifş dikin. Her wusa, rewşa olî û pêşketina wê jî kifş kirin. Zaneyên weke Bawê henîfê Dînwerî, Bawê tahirê Ûryanî, Şêx Temiyê Haranî, Şêx Mihemedê Xulûzî, Şêx Welîdê Sertî, Şêx Avdûlkadirê geylanî û hwd, ku bi aslê xwe jî kurd bûna, bandûra wan mazin bûya di wê demê de. Her wusa, berî wan, mirovên weke Weysel Qaranî û hwd jî jîyane. Bandûra van mirovên bi vî rengî, pîrr mazin a. Îmamê Xazalî, Îbnî Rûstî, Îbnî Sîna Û hwd jî ji vî herêmê bûna. Weke van alim û filosofan mirov dikarê gelekên din jî navê wan bêne ser ziman.

Îdrîsî Bedlîsî, bixwe jî, ne tenê weke alimekî bû. Her wusa, li herêmê Dergeha wî hebû û weke şahekî bû. Li herêmê, wî di hîmzemîna kurdistanê de, yekbûneka mazin bi girêdane mîrgeh û herêmên kurdan a bi xwe ve çê kir. Di vê temenê de, bandûra wî hebû. Li herêmê, ew xate desthiladarî û siyasî ku ji Dema Merwanîyan û dema Salahadinê Eyûbî heta wê demê de xwe domandibû, wê li ser wê îdrîsê Bedlîsî derkeve li Pêş. Heta dema îdrîsî Bedlîsî bixwe jî, xanadana Eyûbîyan, xwe domandîya. Serdestîya wan, ji Reha'yê heta ku digihişt ber heskîfê û hwd mazin hebû. Bandûra xanadana Eyûbîyan, li kurdistanê mazin hebû. Ne Tenê li bakûrê kurdistanê, her wusa, li başûr rojavayê kurdistanê ku di wê demê de qada xanadana eyûbîyan ya pêşketinê bû jî, bandûra xanadana eyûbîyan pîrr mazin bû. Li kurdistanê, rewşeka ku siyasî ku di wê demê de ku piştgiyîya mîrgehî botanê ku navenda wê botanê bû û ya xanadana Eyûbîyan jê re tûnaba, wusa zêde derfet û temenê wê yê pêşketinê jî nebana û tûna bû jî. Her wusa, dema ku em herêma ku îdrîsî Bedlîsî lê derketiya li Bedlîsê û li dora wê Mûs, Sêrt û heta ku digihişt herêmên agirî û hwd,

kurdên êzîdî jî bi aşîrî hebûn û bandûra wan mazin bû. Bêlî ku li herêmê bi wan re jî levkîrînek heba, wê pêşketînek li herêmê çênebûba. An jî ku li ber rewşê dengê xwe dernexistiba ..

Ev rewşê hemû, di temenê siyasî û desthilatfardî de, bi têgihîştinî hatina kirin yek. Di wê temenê de, wê rewşa ku hatî kirin de, bi wê piştgiriyê Îdrîsê Bedlîsî derdikeve li pêş. Lê di wê demê de jî û di demên berê de jî, hêrîşên ku bi destê Mogolan bin û ên ku bi komên din ên osmanîyan ku li herêmê ku bûna, ku kurd li wan dihizir in, êdî zêde nikarin baweriyê bi osmanîyan bînin. Îdrîsê Bedlîsî, bi gotina ku "wê kurd, li herêmên xwe serdest bin û bi nîrx û kevneşopîyên xwe bijîn û ti kes tevî jîyane wan nebê", wê kurdan pîrranîyan wan hilde li cem xwe. Piştî Şer Çadîranê, êdî mîrgehên ku di şer de li cem îdrîsî Bedlîsî bûn û mîrên din ên herêmê, li Amasya wê bi osmanîyan re rûnîhin û wê peymanekê çê bikin.

Ev peyman, du xalên wê ên girîng hena. Yek; ew a ku wê kurd, mîrên kurd wê li herêmê xwe li ser axên xwe serbixwe bin û wê rêzanîya xwe li gorî kevneşopî û dîroka xwe bixwe bi rê ve bibin. Xale duyemîn; ew bû ku wê kurd, wê herêmên xwe bixwe û hêza xwe biparêzên û heka hêrîşek ji seferîyan bê û ankû ji devereka din bê ku li herêma kurdistanê bibe, ku pêwîstî pê hebê wê hêza Osmanî wê alîkarî bidina hevdû û wê sînorên xwe biparêzên. Xaleka bi vî rengî ya bi rengê ku pêwîstî bi alîkarîya leşkerî ji hevdû re hebê ku wê bidina hevdû, di rastiye de kurd, ne di wê zayîfîyê de bûn alîkarîyê ji osmanîyan bixwezin. Lê Osmanî, pêwîstîya wan bi wê hebû wê bidina hevdû. Osmanî, ji vî xalê sîd digirin di sefera li Misrê de, alîkarîyê ji kurdan dixwezin. Kurd jî, didin. Lê ew alîkarî, wê kurdan bike dûqat. Ji ber ku beşeka mazin ya mîrgehên kurd, ne di xwestin ku alîkarîyê bidina Omsanîyan ku seferê li Misrê bike. Piştî seferê û mirina îdrîsî Bedlîsî, wê ew weke nakokiyeka civatî wê xwe bide li berçav. Di dema Qanûnî de, wê ew fermanê bi weşêne û jî wê fermanê bixwezê ku hemû herêm û mîrgeh tabî vîna wî bin. Lê kurd wê herê nekin.. Piştê jî, di rewşa olî de, weke destûreka bingihîn hebû, ku dema ku herdû alî misilman bin pêwîsta ku alîkarîyê bidina li hevdû. Ev herdû xal, weke xalên bingihîn ku tên kifş kirin in.

Li gorî ku hatîya kifşkirin, wê li kurdistanê, mîr, mîrgeh û herêmên kurdan bi serê xwe bi serbixwe bijîn. Wê tevî jîyane wan nebin. Di vî temenê de, levkîrîn dihê kirin. Li herêmê, di vî temenê de, levkîrîn, wê pîrranîyan kurdan, bi gotina îdrîsî Bedlîsî, piştgiriyê bidîyê de. Lê di wê demê de, tevî ku kurdan pîrranîyan piştgiriyê didin jî, lê dîsa gûmanên wan hena û tînin ser zîman di derbarê osmanîyan de. Li ser vî yekê jî, êdî hizîrîkirin dibin. Ji ber ku jî rûdaw û bûyarên berê, kurd li osmanîyan ne bibawer in. Gotina "baxtê romê nîn a" di vî demê de hatîya gotin. Ev gotin, weke gotîna nava xalkê, bi nav û deng tê zanîn û ser zîman.

Bîqasî ku mirov fahm dike û ku bi devkî tê gotin, ew mîrgehên kurd ku li başûrê kurdistanê mana, ên weke mîrgeha Bahdînanê û hwd jî, wê bi awayekî werina naskirin. Ev mîrgeh, teybetmendîya wê ya bi teybet û sereka ew a ku li wê herêma wê kurdên şafî û şîî bi hevdû re dijîn. Bi vî rengî, weke ku di rengê herêmeka rojhilatî de ya. Lê hêz û qûdreta wê jî mazin heya. Li bakûrê, herêmên xîzan, mayafarqîn, botanê û hwd jî, bi mîrgehî û hikîmetî xwe ava kirina û serdest in. Bi wê rengê jî, naskirina wan heya. Her wusa, artişên wan ên hem xwe û hem jî sînorên xwe biparêzên hena. Kurd, hertimî, evîndarê azadîya bûna. Hertimî xwestina ku bi azadîya xwe û bi serê xwe bijîn. Di dema ku ti hêrîş li azadî û serbixwebûna wan tûnebê, wan jî, ti şerê wan bi ti kesekî re tûna bû.

Ku em bahse wê demê bikin, divê ku em van rewş û awayê pêşketinî ê herêmî, rêzanî û desthilatî ê kurdan jî li berçav bigrin. Kurdan, di wê demê de, hertimî gûmana wan li osmanîyan hebû. Ji ber vî yekê, di dema ku îdrîsê Bedlîsî ji wan re dibêje û wan qanix dike li ser peymanê bi osmanîyan re, û ku piştê êdî osmanî wê peymanê betal dikin û hêrîşî kurdan, herêm û mîrgehên wan dikin, piştê, êdî weke yê ku ew bi wan daye bawer kirin Îdrîsî Bedlîsî, tê şermazar kirin. Piştê, weke ku çawa bo osmanîyan tê gotin ku "baxtê romê nîn a" her wusa bo îdrîsî Bedlîsî jî gotinên ku tînin gotin di wê rengê de na ku wî "xîyanet" li kurdan kir bi wê dayîna bawer kirinê. Kurd, piştî hêrîşên osmanîyan, weke ku di navê de dimênin. Hem aliyê osmanîyan bêbaxtî li wan kirîya û hêrîşî wan dike û hem jî îdrîsî Bedlîsî Bedlîsî jî weke ku 'xîyanet' li wan kirîya. Êdî, kurd, dikevina rewşeka wusa ku êdî nîzanin wê ji kîjan aliyê bawer bikin.

Ew peymanê ku di nava îdrîsî bedlîsî û Yavuz Selim de bû, wê rewşa kurdan ji rewşekê hilde û bike rewşek din de. Her wusa wê osmanîyan jî li herêmê bike hêzek. Kurd, di wê demê de, ji xwe, li herêmê serdestîya wan hebû. Ku em dema Salahadinê Eyûbî li berçav bigrin, û em bipirsin ku ka ew çawa çû û li Misrê bû siltan di wê dema xwe de, hingî emê piştê wê bandûra wan jî baştir fahm bikin. Siltanên osmanîyan jî, bi teybetî Yavuz Selim bixwe jî, xwest ku herê bi ser Misrê de. Di wê demê de, mîrgehên kurdan jî piştgirî danê de. Lê gelek mîrgehên kurdan jî, ew piştgirî rast ne didîtin. Ji ber ku ew misilman bûn û Misir jî di wê demê de misilman bû. Di aslê xwe de, ew şikeştina pêşî ya ku wê piştî peymanê ku wê di nava kurd û qasra osmanîyan jî wê bixwe bêne. Piştî Yavuz Selim, ew bertek û nexweşiyên di dilên kurdan de, wê bîn guhê siltanê dema nû Qanûnî Siltan sûleyman jî. Ev jî, wê vê rewşê weke qatbûna şîrove bike. Bi wê re jî, êdî wê bi fermanekê ji hemû kurdan bixwezê ku xwe tabîî vîna wî û qasra osmanî bidina nişandin. Lê kurd, vê yekê herê nakin. Li dijî wê derdikevin. Êdî piştê, wê ew sefera Qanûnî siltan sûleyman a pîrr ku bi wê di nava kurdan de hat naskirin, wê ew li dar bixe û wê bi hezaran kurdan û herêmên wan di wê demê de di şûr de derbas bike û herêmên wan bike kavl.

Kurd, wê ji vê rewşê û seferê, ne tenê siltanê Osmanî berpirsîyar bigrin. Wê her wusa, Îdrîsê Bedlîsî jî berpirsîyar bigrin. Ji ber ku wî ew bi osmanîyan dabû bawer kirin. Ev yek, wê êdî wê piştê weke nav û dengê îdrîsî bedlîsî ku bi gotina "xîyanetê" re tê ser ziman, wê bê ser ziman. Piştê jî, wê pîrr sefer li kurdan bibin. Piştê, wê di ti demê de ew hêrîşên li kurdistanîyan ne sekin in.

Osmanî, piştî di şerê xwe yê berî ê şerê çardiranê de ku kirî di aslê xwe de tekçûn xwaribû û êdî wusa zêde jî bahse wê ne dihat kirin. Lê îdrîsî Bedlîsî, wê ji tûnabûnê xilas dike. Vê jî, bi navê 'biratîya misilmantiyê' dike. Hingî, di wê demê de ti hêza osmanîyan tûna bû. Lê Îdrîsî Bedlîsî, wê ji herêmên weke botanê, mayafezqîn, xîzan, û hwd, ku di nav de, wê ji gelek herêmên kurdan, hêzekê ev bide li hevdu û wê bi wê serdestîyê li herêmê ava bike.

Îdrîsî Bedlîsî, di wê demê de bawer dike ku Osmanî, wê li wî "dilsoz(sadik)" bin. Lê piştê, ku Osmanî, xwe bihêz dikin û hêza xwe li herêmê êdî ku afirandin, êdî herêma ku pêşî berê xwe danê de û lê hêrîş kirin, herêmên kurdan û kurdistan bû. Ji ber vê yekê, hertimî kurdan bawer kir rastî xîyanetê hatina. Di sadsale me ya dawiyê ya 20a'an de, ku raydarên dewleta tirk, kirina rojevê de ku kurd "dilsoz" nemana, hinekî jî armanca vê nîqaşê û gotinê ew bû ku ser wê bêbaxîya ku li kurdan hatî kirin ser wê were girtin bû. Di vê temenê de jî, hertimî nivîskarên kurdan bixwe jî, di dema ku li ser van deman û bi teybetî dîroka piştî Îdrîsê Bedlîsî diaxivin, hertimî hewce bê dîbinin ku bibêjin ku "kurdan, bêbaxî nekirîya.". Li vir, rewş û derûniya nivîskarên kurd jî, di ancama van gotinên dewletê de hatîya û afirîya. ..

Piştî Şerê Çardiranê û peymanê ku di nava osmaniyan û kurdan de tê mohrkirin, tiştê ku tê serê kurdan û pêvajoyên bixwûn ku ew dijîn, wê gotina "xîyanetê" ku bo wê levkîrinê û Îdrîsî bedlîsî bikardihênin jî pîrr aliyan ve mafdar derdixe. Ne tenê di dema osmaniyan de, her wusa ew komare ku piştê ku li ser bermehîyên Osmaniyan avabûya komare tirk jî, wê hertimî tîkiliya wê ya bi kurdan re, di temenê fêdegirtinê û bikarhanînê de bê. Di vê temenê de, nîrxên kurdan bi navê wan re jî, di çerçova wê çanda 'dewşîrmetiya' dema osmaniyan ku di dema komarê de hat domandin de hat bişavtin. Navê kurd û kurdistanê hat qadaxa kirin. Rengên kurdan, hê jî qadaxa na. Al û rengên wan, jî ber ku rengekî nasnema wan dihanî ser ziman, qadaxa kir. Her wusa, di berdewam qaxadaya li ser al nîrxên kurdan de zimanê kurdî hat qadaxa kirin.

Ku em bahse dîroka kurdan bikin û bi teybetî bahse serdema dîroka kurd ya sadsale 15'an û hwd bikin jî, divê ku em bibêjin ku em mirovê ku î ro di nava kurdan de bi 'xîyanetî' tê nasîn, di kifşkirina wê serdemê de xwediyê rol û weyneka mazin a. Piştî wê demê de û heta roja me, hemû pêşketin, rûdaw û bûyarên ku bûn û hatina serê kurdan, divê ku em weke ancama wê destpêkê şîrove bikin û bînina ser ziman. Di wê demê de, di dema ku kurdan bi osmaniyan re peyman çê kirin, bawer dikirin ku wan qancîyek kirîya. Lê nizanibûn ku wê piştê bina qûrbane wê qancîya xwe ya ku kirina.

Her Civat, bi al, çand, dîrok û zimanê xwe re heya. Dema ku ev hatina ji holê rakirin, wê rengê wê civatê jî bi heyîn û hebûna wê re werina ji holê rakirin. Hingî, mirov dikarê bahse jenosîda civatê ku li ser serê wê re tê meşandin bike.

Kurd, piştî wê dema Îdrîsî Bedlîsî û pêde, wê heta roja me, hertimî di bin hêrişên li ser wan dibin de bin. Berî komare tirk, wê hêrişên osmaniyan piştî şerê Çardiranê û pêde, heta roja me bidom in. Di dema komarê de, bêî ku navber were xistin di nava wan hêrişan de, ew hêrişên li ser serê kurdan domandin.

Piştî şerê çardiranê, bi teybetî kurdên elewî rastî hêrişên mazin hatin. Lê ev hêriş, tenê bi kurdên elewî re bi sînor nema. Di çerçova hêrişên li civate kurd de, li hemû beşên civate kurd bûn. Kurdên êzîdî û her wusa kurdên misilman ku sūnnî û ankû şafî bixwe jî, dema ku dervî nêzîkatîya dewletê tevgerîyan, weke Bedîrxaniyan, dema Yazdan Şêr, Şêx Ubeydullahê Nehrî, Şêx Saîd û hwd, rastî wan hêrişan hatin.

Ev dîroka bêxêr ku bi peymana Amasya re ku destpêkiriya, hê jî xwûna kurdan dide rijandin. Kurd, piştî wê peymanê, ku mirov gotinekê ji bo wan bi wê bêbaxtiya ku li wan hatî kirin re ku mirov bibêje, divê ku mirov bibêje ku kurd bûna kurbanê qancîya xwe ya ku kirin.

Ew levkirin û tifaqa ku di bin navê 'biratîya misilmantîyê' de ku hat çê kirin, bi wê re çûyina bi ser kurdan de bû. Lê wê levkirinê jî, kir ku tirk li Anatolia habûna xwe biparêzên. Lê bi wê re kurd, pêşi, ew cihê wan yê di wê ola ku bi navê wê levkirin û tifaq hat çê kirin de jî wan hat standin û piştî jî, şerê bi wan re hat kirin. Piştî, gotina "pîrsgirka bi olê re" jî li ser wan û civate wan re, hat derxistin li holê. Bi vê gotinê, kurd weke "pîrsgirêkê" di vî warî de jî bi navê wan re hatina şîrove kirin. Lê di aslê wê de, ku mirov li dîrokê bînerê, divê ku mirov bibêje ku kurd, bi mirovên weke Weysel Qaranî, Salahadinê Eyûbî û hwd, jî destpêka olê û pêde, di pêşketin û temenê wê de cihgirtina. Di sadsale me de jî, jî pirtûkên Saîdê Kurdî, gotinên "kurd" û "kurdistan"ê, derxistina wan û dewşîrmekirina pirtûkên wî li gorî navê tirkîtiyê, hinekî jî bi vê xalê ve girêdayî ya. Li vir, bi vir ve girêdayî ku mirov bibêje, bi peymane û levkirina di dema Îdrîsî Bedlîsî de, di aslê xwe de, kurdan di desthilatdariya olî bixwe de jî, cih da Osmaniyan. Piştî jî, Osmaniyan, bi wê bicih dayinê re bi sînor nemana û bi demê re, ew yên ku cihdane wan jî holê rakirin û cihê wê bixwe jî kirina destê xwe de. Li ser vê esasê pirtûkên Saîdê Kurdî jî hatina guharandin. Lê xwe serdest kirin.

Piştî şerê Çardiranê, bi vî rengî hemû rêveberîya sîyasî û desthilatdarî, bi pêvajoyekê jî destê kurdan hat 'qasp' kirin. Weke ancamaka wê pêvajoya levkirina bi Îdrîsî Bedlîsî ku mirov bêne ser ziman, wê ev bê. Di vê temenê de, êdî li herêmê di dema osmaniyan de jî û piştî di dema komarê de jî, şerê vê serdestîtiyê bi kurdan re hat dayîn. Tiştî ku kurdan bi wan re ku jî xwe parvekir, wan jî xwest ku bibina xwediyê wê hemûyî û aliyê kurdan bi tûnakirinê jî holê rakin.

Weke ancama wê pêvajoya levkirina ku kurdan bi osmaniyan re di bin navê 'biratîya misilman' de ku hat kirin, wê pêvajoyên têkbirina kurdan wê qasra osmanî bide dest pê kirin. Li herêmê, ku em bahse rewşa sîyasî û ya desthilatdarî ya berî dema osmaniyan bikin, divê ku em di serî de, di demê piştî hatina misilmanîtiyê de, bi rêzê desthilatdariyên Şadadî, Kakoyîdî, Ayiridî, Merwanî, Eyûbî û hwd, çend ji wan pêvajoyên desthilatdariyên kurd in ku li herêmê pêş dikevin in. Şadadî, weke dewleta kurd, ku qarekerê wê rengê qarekerê wê, di yê kurdên sersor de ya. Di wê demê û dema dewleta şadadî de, bi vî rengî rengê qarekerê şadadîyan li pêş a. Lê di qarekerê dewleta kurd ya Merwanîyan de, şafîti û sūnnîti li pêş a. Li ser vê temenê jî, wê Salahadinê Eyûbî jî piştî pêş bikeve. Dem heta ku tê dema îdrîsî Bedlîsî, wê êdî ew jî li ser wê temenê pêş bikeve.

Kurd, di dema Îdrîsî Bedlîsî de, jî xwe û hêza xwe û bi teybetî jî pêşketina xwe bi hiş in û bi bawer in. Ji ber vê yekê, ti xema wan tûna ya di serê wan de. Bi wê bawerîya xwe, êdî dikin û dixwezî ku levkirinê bidana çê kirin. Li herêmê, ew serdestîya kurdan a sîyasî, ne tenê bi dewletên kurd ên weke Merwanî û piştî xanadana eyûbîyan ku wê jî sadsale 11 min heta sadsale 16 min ku ne bin 400 salî re ku serdest in, li herêmê wê serdestîya wan hebe. Her wusa, Li rojhilatê kurdistanê jî, ku weke bi Seyfeddînê Erdebîlî û malbate wî re tê dîtin, ku wê navê wî li

dewlet sefewî jî were kirin, wê ew xate sîyasî wê temenê pêşketina li wê herêmê jî bide çê kirin. Lê di temenê şîitîyê û sūnnîtî û ankû şafîtîyê de cûdahî jî di nava wan de heya.

Îdrîsî Bedlîsî, çend ku weke **ku** li ser pirtûkên Saîdê kurdî hatîya leyîstin û guharîn di wan de hatîya kirin, her wusa mirov dibîne ku li ser hizrên wî yên ku wî di berhemên xwe de hanîya ziman jî, di wan de leyîstin û guhartin bi heman rengî hatîya kirin. Lê tevî wê leyistin û guhartinê jî, mirov ji hizrên wî fahm dike ku wî xwestîya ku wê desthilatdarîya sîyasî ya kurdistanê bike yek di bin şahîtiya xwe de. Lê ku em ji kijan aliyê ve jî lê bînerin, divê ku em bibêjin ku têgihîştineka ku di vê temenê de ya kurdistanê ya, bi Îdrîsî Bedlîsî re hebûya. Ji xwe, di ancama wê têgihîştinê re li ser navê kurdistanê bi osmaniyan re rûniştîya ku peyman mohrkiriya. Hin gotinên ku î ro jî rayadarên tirk, ji bo wî dibêjin û dibêjin ku ew "xizmetkarekî osmanî bûya" jî, tenê ku em vê nêzikatiya bi hev re rûniştinê li berçav bigrin, em derewîna wê gotinê dibînin. Yekî ku xizmetarê dewletekê bê, naçê û li ser navê xalkekî din, ku ew xalk kalkê wî jî bê, bi dewleta ku xizmetkarê wê ya re narûnihê û bazariyê pê re nakê. Bi vê têgihîştinê, wî levkirin bi osmaniyan re çê kiriya û peyman çê kiriya. Bi wê re jî, di temenê wê têgihîştinê de di dema ku levkirina bi osmaniyan re hatîya kirin, hatîya xwestin ku kurd li herêmên xwe serdest bin û wê bi rê ve bibin, ew herêmên xwe bi hêzên xwe bi parêzên û ew li herêmên xwe bêt ku li jîyan û kevneşopîya wan ku mudahale were kirin ku karibin bixwe û azadîya xwe û bi serê xwe bijîn. Ya ku di wê demê de, di dema ku mirov lê dihizirê ku mirov kifş dike ev a.

Tiştêkî din, bi awayekî pîrr girîng li vir divê ku mirov bêne ser ziman. Di wê levkirin û peymanê de, li herêmê bi hevdû re parvekirina desthilatdarîyê ku bi hev re bi rê vekirina wê bikin, hatîya mohrkirin. Lê piştîre, Osmanî, bi wê peymanê û bi giyane wê ve girêdayî nemana û xwestîna ku ne bi beşeka parvekirî, her wusa bibîna xwediyê hemûyî. Bi vê yekê, êdî li ser wê beşkirinê re, beşa xwe hildane ewlakarîyê û li ser wê re bi kurdan re li ser beşa wan ya ku ew xwe birê ve bibin li herêmê bi wan re şer û pevçûn hatîna pêşxistin. Di vê temenê de, êdî ji rêveberîya sîyasî, kurd bi navê wan re hin bi hin hatîna dûrxistin. Ev alî jî, jî aliyê kurdan ve hatîya dîtin û di ancama wê dîtinê de raparîn û serhildanên kurdan ên weke serhildanên Bedirxaniyan, Şêx Ubeydullahê Nehrî, Şêx Saîd û hwd, wê pêş bikevin. Di aslê xwe de, ev sehildan, di ancama wê bêbaxti û xîyanete ku kurd rastî wê hatîna de bûna. Weke ancamenê wê levkirina bi osmaniyan re, êdî bi demê re kurd bi tememî jî desthilatdarîya sîyasî ya herêmên xwe û ya xwe bixwe jî ku xwe bi rê ve bibin jî hatîna dûrxistin. Di vê temenê de, li ser serê wan, bi demê re rejîmeka metingerîyê hat ava kirin. Weke ancama wê levkirina bi dema Îdrîsî Bedlîsî re, bi demê re piştîre ku hin bi hin û dem bi dem ku ew rejîma metingerîyê hat ava kirin. Kurd jî, heta roja me li dijî wê tekoşîna azadîya xwe li dijî wê rejîma metinger didin.

Î ro jî, kurd tekoşîna wê mafê xwe yê ku bi wê dixwezî ku xwe bi rêve bibin didin. Ev tekoşîna wan, ne tekoşîna wê ya ku tiştêkî nû bistênin. Ev tekoşîna wan, tekoşîna tiştêkî ku jî wan hatîya standin ku bi şûn de hildin a. Kurdan, ew gotina ku gotin û gotin ku "bêbaxti li me hat kirin", di ancama wê de gotina. Li ser vê bêbaxtiyê re, gotina "baxte romê tûna ya" hatîya gotin. Ev gotin, gotinaka xalkê ya ku di nava xalkê de tê gotin a. Heta roja me jî, ev gotin di vê temenê de û li ser vê esasê tê gotin.

Di vê temenê de ku mirov bi rastî bibêje, kurdan mirovatîyek dan nişandin û di ancama wê mirovatîya wan de, rastî bêbaxtiyeka dîrokî ya pîrr bêahlaq hatin. Di ancama wê bêbaxtiyê de, î ro hemû rawêşên giran ku di roja me de jîn hatîna serê wan. **Di aslê xwe de, wan oparasyonên leşkerî û Sîyasî ku dewleta tirk ku heta roja me li dijî kurdan li dardixin, divê ku mirov bi vir ve girêdayî li ser wan re gotinê bibêje û bibêje ku ew oparasyon leşkerî jî û sîyasî jî, oparasyonên wê bêbaxti û nemerdiya ku di temenê wê bêbaxtiyê de ya. Oparasyonên bêbaxtiyê na. Di vê temenê de, cardin divê ku mirov bibêje ku ev oparasyon, oparasyonên ancama wê levkirina di dema îdrîsî Bedlîsî de na ku heta roja me didom in.**

Li ser dijberîya navê îdrîsî bedlîsî re jî ez dixwezim ku wê gotinê bibêjim ku ew rexneyên civate kurd ku li Îdrîsê Bedlîsî kirinê, hinekî jî dibîna weke alikarîyêkê jî ku bo vê dîroka bêbaxt ya ku pêşî bi destê osmaniyan hatîya pêşxistin û piştîre bi komarê re hatîya

domandin ku ser wê dide girtin. Çend, rexneyên kurdan ên li wê levkirinê û awayê wê rast ji bin, her wusa, wilqasî jî, bi awayekî rast ne hanîna li ser ziman ya vê dîrokê ne rast û xelat bû. Komare tirk, ya ku piştî osmaniyan re ava bû jî, ew bereya dijberiyê ji nava kurdan li dijî tevgerên kurdan ên ku tekoşîna mafê kurdan ku didan ku pêşxist li ser vê hîmê ku baş ne hatî fahm kirin pêş xist. Bi tememî, baş ne fahm kirina wê beş û xate dîrokê ji aliyê kurdan ve, bû temen û hîmê serkevîna rejîma tirk li dijî kurdan. Piştî jî, di dema ku tekoşîna azadîya kurdan ya PKK dest pê kir jî, li ser wê bereyê re di bin navê aşîrtiyê de bê û her wusa di bin navna din ên ku di temenê bikarhanîna olê de bin û hwd de, li dijî wê tekoşîna kurdan ya ji bo azadî û statîya kurdsitanê jî, ew bere hat derxistin. Di vê temenê de, ji nava kurdan, bereyek li dijî kurdan bixwe hat derxistin li holê. Cerdewanî bê, û ankû kurdên li cem dewletê ku dibêjin "divê ku kurd statîyê bo xwe ji dewletê nexwezin" jî, renga din ên ku li ser vê bereyê re ku hatîna pêşxistin in. Gotinên weke ku "em, ev hezar sal a ku bi hev re dijîn", "em birayê hevdû ê hezar salî na", "em birayê hevdû ê misilman in" û hwd jî, gotinên ku weke referans di temenê vê bereyê de ku tên bikarhanîn û îstîsmarkirin in. Dewletê, di dema ku navê kurdan qadaxa kir de jî, di nava wan de xwest ku kurdên wê bereyê xwe bi dewletê nas bikin. Lê hertimî jî, ku li cem dewletê bin û li dijî dewletê bin, di vê bereyê de, li ser wê temenê ol hatîya bikarhanîn. Ol, weke amûrê ku wê bereyê ya ku wê bi rê ve dibe û dixapênê ya bo dewletê

Temenê vê bereyê jî li ser gotina ku "kurd, hertimî bi dewletê re tevgerîya na." ya. Li ser vê gotinê ku weke referans hat girtin, nêzîkatî hat pêşxistin. Bi wê re jî, têkiliya kurdan û ya berî komarê ku bi osmaniyan re bê û piştî re ku bi komarê re bê, di wê temenê de hatîya şîrove kirin. Lê di rastîyê de, ne wan kurdên ku di bin navê vê gotinê de ku li cem dewletê çihgirtina, ev dem û rewşa dewletê ya ku bi vî rengî ku ji dema piştî Îdrîsî Bedlîsî Baş û heta vê demê fahm kiriya û ne jî kurdên ku bi tememî di dijberiyê de na, ew bitememî fahm kirina û dane fahm kirin. Li herdu aliyên jî, bi tememî ne fahm kirinek heya. Ew bi tememî ne fahm kirin jî, hertimî, bûya temenê perçebûna kurdan, ku hinek kurd li rex dewletê cih bigrin û hinek kurd jî li dijî wê bin. Her wusa heman rewşê li ser olê re jî, hatîya pêşxistin. Kurdên ku li cem dewletê, ev weke li gorî dewletê û tirkîtiyê ku bijiyîn fahm kirina. Bi vê yekê, êdî qadaxaya li ser zimanê wan û înkare navê kurd û kurdistanê bo wan nebûya xem û derd. Kurdekî ku elewî ku di nava CHP'ê de ku weke bi kiliclaroglu re tê dîtin ku ji tirkekî bêhtir bibe tirk, Kurdekî ku sûnnî ku di nava AKP'ê de ku bi heman rengî ji tirkekî zêdetir bibe tirk û wusa bi axivê û tevbigirihê û hwd, çend nêzîkatîyên ku li ser vê bereyê re ku dewletê xwestîya ku bide pêşxistin in. Di serê ti kurdên ziman û çanda xwe kirin tûna ya. Yê ku dem bi dem bahs dikin jî, tenê bo xapandinê wê dikin. Bo ku di nava kurdan de rayan bigrin di hilbijartinan de bi navê van partîyan û hwd.

Bi teybetî, di temenê dijberîya kurdên elewî de, pêşxistina wê, hatîya pêşxistin û li ser elewîtiyê re weke bereyekê ku li rex dewletê bi wê hewl hatîya dayîn were pêşxistin. Di dema ku kurdên elewî ketina têkilî û ankû çûna nava tekoşîna azadîya kurdistanê de jî, ji wan re hatîya gotin "win elewî na, çi eleqeya wê bi wê re heya ku win diçîna nava wê.". Di vê temenê vê bereyê de, perçebûna di nava civate kurd de jî hatîya mayîndakirin û domandin. Î ro jî, di dema ku kurdên elewî êdî bi tekoşîna azadîyê re di nava civate kurd de xwe birêxistin dikin, dewlet dibêje wan "ne win elewî na, çima win bi wan re di bin yek". Her wusa, weke rengê vê gotinê gotinak din jî dihê bikarhanîn. Ew jî, her wusa ew a ku "ew, sûnnî na. Û win jî, elewî na." Li ser vê gotinê re, ew xesêsîyetên olî ên komên olî ên li kurdistanê jî li dijî hevdû dihên bikarhanîn ku yekbûn di nava civatê de neafirê. ...

- **Pirsgirêk û ankû meselaya Îdrîsê Bedlîsî**, di nava civate kurd de, weke bîrînaka ku mazin. Lê kurdan, ji ber ku ev bîrîna xwe bi zanistî û başî fahm nekirîya, êdî ew bîrîna wan hê zêdetir mayîna maya û êdî bi wê re bûya temenê pirsgirêkên sîyasî, civaknasî, hizrî û dîrokî jî. Di roja me de, ku bahse navê Îdrîsê Bedlîsî were rojevê, wê her kurdê ku xwe weke rewşenbîr jî dihasibêne, wê tenê karibê çend gotinan bibêje. Wekî din, di derbarê wê mejûyê û dîrokê de, ti zanîn di serê wan de jî tûna ya ku werêna ser ziman. Ev jî, weke aliyekî din ê wê bîrînê ya ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û wê fahm bike.

Heta ku mirov bi teybetî bi awayekî baş rewş û dîroka îdrîsê Bedlîsî û dema wî û demî piştî wî re ku pêşketina baş fahm nekê, mirov wê nikaribê bi başî kirinên wî jî, ku bi qancî bê û bi xirabî bê bi wate bike û fahm bike. Îdrîsê Bedlîsî, bi dîrokê re weke mijareka pîrsgirêkê ya dîrokî, hertimî di serê kurdan de bi çend gotinan heyîna xwe parastîya. Lê divê ku ez vê jî bibêjim ku bi demê re ev pîrsgirêkîya ku bi navê Îdrîsê Bedlîsî re ku em bînina ser ziman, em dibînin ku ji aliyê derûnî ve jî bûya xwediyê bandûrên mazin li ser derûnîya civate kurd bixwe jî.

Ez, berî ku di derbarî wî û dema wî de, bînina ser ziman, ez dixwezim ku vê aliyê jî bi teybetî bînina ser ziman. Îdrîsê Bedlîsî, di nava civatên kurd de, bahse wî pîr hatîya kirin. Lê wê di gotinê de û ankû bi gotinê berê wî bidina bi kûderê ve, hertimî jî ev weke pîrsgirêkekê maya. Ji ber vê yekê, êdî ji ber ku kurdan di wê kifşkirina aliyê de ketina zorê de, êdî ev bûya sedema pîr nakokiyên ku di derbarê wî de bişî jî bi xwe re û di serê xwe de. Bi teybetî, dema ku bahse olê jî bi navê wî re dihê kirin, êdî ew nakokî û ew derûnîya bi êş ku kurdan di civatê wan de dikir zorê de, hê girantir û dijwartir dibû bi wan re. Ji ber vê yekê, pîr mirovên kurd ku bi teybetî mirovên oldar in, nexwestina ku li ser vê mijarê hizrên xwe jî bînina ser ziman. Ev jî, bi vê rengê, êdî weke ku di mejîyan de di bin "nepenî"yekê de maya û gelek aliyê wê yên bi dîrokê re bêî ku werina fahm kirin, weke xwe mana û ne hatina fahm kirin.

Dîrok, ku dîroka civatê bê, êdî ev aliyên ku bi teybetî ne hatina fahm kirin, wê bina temenê pîr pîrsgirêkên bi fahmî û derûnî jî di mejî de. Ji xwe, ya ku piştre bû jî ev bû. Êdî biwê re hertimî navê Îdrîsê Bedlîsê, bûya weke "pîrsgirêkeka têgihîştinî û fahmkirinê ya civatî di nava kurdan de." Civat, dema ku di derbarê dîroka xwe de bi tememî ne xwedî fahm bê, wê êdî nikaribê, darazên xwe jî bi afirêne. An jî, ku darazên xwe afirand in, wê bi şaşî û xelatîyan bi afirênin û bidina nişandin. Di nava civate kurd de jî, dema ku em li demên piştî Îdrîsê Bedlîsî diner in, em ya ku dibînin jî ev a ku bûya.

Li vir, bi sereka weke aliyekî vê pîrsgirêkê û pîrsgirêka têgihîştinî ya darazî ya civatîya kurd ku bûya, li ser navê îdrîsê Bedlîsî bixwe re jî qatbûn di nava civate kurd de bi çend reng û awayan bûya. Awa û rengê pêşî ê qatbûnê rengê dijberîya Îdrîsê Bedlîsî de bûya. Ev alî bi xwe jî di nava xwe de weke du dîmenan bûya dûqat. Aliyê pêşî jî, bi kurdên ku hertimî bi dewletê re tevgerîyana derketîya li holê. Minaq, kurdên li aliyê dewletê jî, bi alîkarîya dewletê, ya ku ji wê dîroka Îdrîsê Bedlîsî fahm kirina, ew a ku di nava sînorê dewleta tirk de bişî û doza ti mafî bo xwe û zimanê xwe û statûya xwe ya kurdistanî nekin fahm kirina. Ev, bûya fahmkirina wan ya sereka. Li ser wê re jî, bûna xwediyê helwest. Kurdekî li rex dewletê, dema ku dibêje ku "divê ku kurd, doza statûya kurdistanê nekin ji dewletê", bi regekî din dixwezê ku bibêje ku divê ku kurd bibina tirk, zimanê xwe bi terikênin, êdî bi rengê xwe û çanda û hunera xwe neyênina ser ziman û dîrokak xwe êdî bi ziman û rengê xwe yê civatî neyênina ser ziman. Dewletê jî, gotinên ku weke ku temenê ve nêzikatiyê û rafaransên wê dane kifşkirin hena. Ew jî, li ser olê re bi rengê gotinên weke "biratîya misilmantiyê" û hwd de ya. Her wusa, ev rengên gotinan, êdî li ser wan re, hem ol hatîya îstismarkirin û civate kurd jî, hatîya bişavtin û hewl hatîya dayin ku were ji holê rakirin. Di wê jî holê rakirina civatîya kurd û jî dîrokê birina kurdan de, pay û keda van kurdên ku li rex dewletê cihgirtina, ji ya dewletê û rayadarên wê zêdetir bûya bo jî dîrokê birina kurdan. Ev jî, weke aliyekî din ê bi pîrsgirêkê ku em li ser vê dîrokê re bînina ser ziman a.

Lê aliyekî duymî jî, ew a ku bi kurdên li dijî dewletê bûna xwedî helwest re ya. Ev kurd jî, weke xatekê, dijberî li wê dîrokê û rewşê dane nişandin. Lê wan bixwe jî, ew rewş dîroka ku dijberî lê dane nişandin bi tememî fahm kirina û hewl ne dane ku biawayekî rast û pak wê fahm bikin. Yanî, ji aliyê wê aliyê ve jî, i tememî ne fahm kirinek bûya. Ev bi tememî ne fahm kirin û ankû bi tememî di temenê dijberîyê de bi redkirinê ku pêwîstî pê ne hatîya dîtin ku ev dîrok were lêkolîn, êdî wusa weke ku ji pîr aliyên vê di reşiyê de maya. Lê her alî û beşa vê ya ku di reşiyê de maya û ne hatîya zelal kirin û fahm kirin di mejîyan de, bûya temenê wê bişavtina dewletê ya kurdan jî. Bi wê re jî, êdî hin bi hin, rewşeka nû afirîya.

Dîroka kurdan, dema ku em bahse vê beşa wê bikin, em ji kîjan aliyê ve bahse wê bikin, divê ku em bînina ser ziman ku di temenê statûya kurdistanê de di wê demê de tekoşin bûya. Ku ji kîjan aliyê ve lê biner in, divê ku em bibêjin ku Îdrîsê Bedlîsî jî bo statûya kurdistanê di dema

xwe de bûya xwedî helwestekê. Ji ber wê jî, xwestîya ku kurdan hemûya bi xwe ve bide girêdan û li ser navê wan weke şêxekî û ankû şahekî rûnihê û statûya wan bi paymanî bide kifşkirin. Di dema ku ew li Amasya bi Yavûz Selîm re dirûhê û peymanî Amasya mohr dike, di wê peymanê de ev armanc heya. Lê Îdrîsê bedlîsî jî, ku bi çî armancê bê ev kiriya. Dibê ku armanca wî ya ku ew xwe bike şahê kurdistanê hebû. Dibê ku wî dikir ku xwe bike salahadinê Eyûbîyekî nû li kurdistanê û cihane îslamê. Ku çî armanc hebê jî, bi wê wî ew kiriya. Lê divê ku mirov mirov bibêje ku îdrîsê bedlîsî, dîroka xwe ya dema xwe nivîsandîya.

Di wê demê de, nakokiyên di nava şîitîyê û şafîtî û ankû sûnnîtiyê û hwd de, tevger û gavavêtinên wî jî dane kifşkirin. Di wê demê de, di şerê Çardiranê de, di cenga bi Sefewîyan re, hinekî jî ev hebûya.

Lê li kurdistanê, divê ku mirov vê jî bibêje. Çend ku pêşketina olê ji destpêkê bû û pirr xort hebû jî, divê ku mirov bibêje ku bi pêşketina civatê û rengê wê yê pêşketinê û pergaliya civatî ku hebû, kevneşopiyên civatî ên dîrokî pirr li pêş bûn. Wan kevneşopîyan, hem pêşketina olî jî dida kifşkirin û hem jî pêşketina desthilatdarî ya kurdistanî jî dide kifşkirin. Mînaq, şêx bi dergaha xwe re oldarî bi rê ve dibir û ew serokê civatê ê olî û rûhanî bû. Mîr jî, li qasra xwe rûniştî bû û wî jî civat bi desthilatdarî bi rê ve dikir. Herdû jî, kar û barê wan yê ku hebû, jev cuda bû. Di vê temenê de, rewşeka ku em dikarin olê û bi desthilatdariyê di pirr rewşan de bi wê jevcuda bînina ser ziman jî hebû. Çih bi cih û dem bi dem jî, kîjan saziyê ji van bandûra xwe li ya din dikir û derdiket li pêş jî, ew bi demê re dibû. Carna, dergah û carna jî qasr derdikeve li pêş.

Bi vî rengî, civate kurdistanê bi rê ve diçê. Lê desthilatdariya osmanîyan, piştî ku li herêmê pêşket, ev ahange ku di nava saziya dergah û şêx û qasr û mîrê de hebû xira bû. Rengê pêşketina rêveberîya osmanî jî ya kurdan cuda tir bû. Berê, ti fêr û cerbên osmanîyan li herêmê tûnabûn. Çend rêveberên wan hatina û çûna jî, hertimî, car bi car, çend kurd ku weke şewirmendîtî kirina li cem wan cihgirtina. Lê wê jî, rewşa li kurdistanê û ya rêveberîya osmanîyan nekiriya weke hevdû. Osmanî kevneşopiyên wan ên civatê di wê demê de jî tûnabûna, ku di nava wan de dergah şêx cuda bi olê bi wate bikin û qasra mîr jî cuda bi desthilatdariyê re bi wate bikin û şîrove bikin. Lê ew kevneşopîya kurdan hebû. Dem bi dem, hewl da ku ji wê sîd vergirê. Di destpêkê de, kurdan ew piştgirî dayê de. Piştê jî, ji ber ku nakokî di nava wan û kurdan de afirî in, êdf tenê li ser olê re çûna bi ser kurdan de. Ji ber vê yekê, kurdan, di her demê de, çendî ku osmanî hatina bi ser wan û komkuji bi wan dane jînkirin jî û welatê wan kurdistan kirina kevil jî, lê dîsa kurdan karîya ku xwe û civate xwe û welatê car bi car ji nû ve ava bikin. Ev jî, di temenê wê de, ne tenê ol her wusa kevneşopîya wan bi giranî hebûya.

Piştî Osmanyan, komare tirk ya ku li ser bermenhiyên wê ava bû jî, çend ku di destûra wê de gotinên "sekûler" hatina ser ziman jî, dîsa nekariya ku di wê temenê de zêde pêşketinekê bi xwe re bide çê kirin. Gotinên weke ku di temenê de dîroka osmanîyan de dihên ser ziman û tîr rengî, hertimî bûya. Di carî, em ne zêde dikarin bahse derketina li ser asta civatê ya dergaha şêx û hem qasra mîr bikin. Herdû jî, di astekê de mana. Ya ku hertimî ew ast û sînor daye kifşkirin jî, kevneşopî û destûrên wê yên ku hena bûna.

Di jîyaneka civatî ya bi kevneşopî de, di aslê xwe de, ti carî desthilatdarî dernekeve ser jîyane civatê re. Asta herî mazin û bilind ya ku ew desthilatdarî derkeviyê de, wê ji sînor û tixûbê asta ku civat û jîyane wê hatiyê de wê ne buhurê. Di rastîya kevneşopîya kurdan de, ev yek, bi vî rengî, hertimî bûya. Di carî, em ne zêde dikarin bahse derketina li ser asta civatê ya dergaha şêx û hem qasra mîr bikin. Herdû jî, di astekê de mana. Ya ku hertimî ew ast û sînor daye kifşkirin jî, kevneşopî û destûrên wê yên ku hena bûna.

Di aslê xwe de, ya ku kurdan hata roja me kirîya ku karibin xwe û kevneşopî û nîrxên xwe pîranya wan biparêzên jî ev bûya. Yanî ew kevneşopî bûya. Dema ku rayadarên osmanî bahse "Biratîya îslamî" dikirin û bi wê gotinê ku dixwestin ku kurdan bi xwe ve girê bidin jî, kurdan jî dêla ku xwe bi wê ve girê bidin, hem ola xwe bi bawerî dijîn û hem jî bi wan kevneşopiyên xwe ve girêdayî diman. Ji ber vê jî, êdf ya ku osmanîyan armanc dikir, ne dikarin bigihijêne de bi kurdan re. Ji ber vê yekê ya, ku ol hertimî weke amûrekî hatîya bikarhanîn. Bi navê wê gelek

sefer jî li kurdan û herêmên wan kirina. Lê di yekê de jî, bi ser neketina.

Li vir, dema ku em vê rewşê baş fahm nekin, emê bi tememî rewşa dema îdrîsê Bedlîsî bi başî fahm bikin. Piştî Îdrîsê bedlîsî re, ya ku bi kurdan da dîtî û kir ku ew rastiyê bibînin û fahm bikin û heta ku tevî ku îdrîsê Bedlîsî Şêx û xwedî dergah jî bû û bi dehan mir û herêmên kurdistanê girêdane xwe bi wî ve dane kirin jî, kurdan gotina "xîyanetê" bo wê bikarhanîya. Ew xate di bin navê "Biratiya îslamî" de ku osmaniyan xwest ku dijî kurdan bi wê bi serkeve jî, ya ku ne hişt ku ew bi serbikevin jî ev bû.

Dibêt ku ji ber vê bû ku di dema Komarê de rayadarên tirk, hinekî dîtîbûn, êdî bi tememî ziman û çanda kurdan qadaxa kirin û piştê li ser wê re çandên kurdan ên ku bi navdarî hebûn jî, xwestin ku bi nav û dîroka xwe re bînin ser ziman û li ser wê re li dijî kurdan ancemê bidest bixin.

Li kurdistanê, bi wê re jî, êdî pêşî xwestin ku hertiştê ku di nava kurdan de ku wan li ser lîngan digrin, kirin ku bi tercûmekirinê bê û ankû i wergerandinê bê, wergerênina li tirkî û bi wê re tenê bi tirkî bidina jîyan kirin.

Dîroka kurdan, bi teybetî, ya van pêncsad saliyên dawiyê, dîroka şer, komkujî pêvajoyên bişavtinê ku li ser serê kurdan hatinan meşandin in. Dema ku em hewl didin ku dîrokê, hinekî bi rengekî baş bînin ser ziman jî, em xwe nagrin ku divê ku em van rastîyan bibînin û bînin ser ziman. Heta roja me, ew şerê Dewleta tirk, ji ber çî li kurdistanê li dijî kurdan didomê? Ji ber ku navê 'kurd' û 'kurdistan' ê ji ber çî qadaxa ya? Ev herdû pîrs, hertimî divê ku li dîv hevdû û bi hevdû re werina pîrsîn û bersivandin bi wê pêncsad salîya dîrokê û komkujî û pêvajoyên bişavtinê û ankû tûnakirina civate kurd re.

Ev pêvajo, piştî ku kurdan li herêmê alî osmaniyan kir ku ew li herêmê bibina xwedî hêz û cihgirin û piştê hatina serê kurdan. Kurdan, alîkarîyek dan, lê di berdêla wê de pêncsad salên xwe yê dawiyê di nava xwûn û komkujiyê de buhurandin. Yanî bi gotinaka din, bûna kurbanê mirovatî û qancîya xwe ya ku kirina.

Li vir, weke yê ku ew alîkarî da osmaniyan û kir ku ew li herêmê xwe bicih bikin, em dikarin Îdrîsê Bedlîsî berpîrsîyar bigrin. Lê em nikarin hemû rewşan jî bi wî bînin ser ziman. Li vir, ku em hemûyî bi wî bînin ser ziman, wê çaxê, emê wê bêbaxîya ku osmaniyan kir û piştê bi heman rengî komara tirk a ku li ser bermehîyên wê ava bû ku da domandin, emê ji nedîtî ve werin. Wê hingê, şîrove û fahm kirina me jî yek alî bibe. Di şîroveyeka rast de, divê ku em rastîya herdû alîyan jî bi teybetî cuda bi cuda fahm bikin û bi hevdû re ku karibin êdî bi rastî rastiyê fahm bikin.

Piştî ku kurdan, dît ku rastî bêbaxîyê hatina, êdî bidest li berxwedanê kirina. Kurdan, minaq, weke ku em çawa di destana 'dewrêşê Ewdî' de dibînin û kifş dikin jî, hê di sadsale 17'min û heta ku berî wê de jî, bidest birrîna tîkiliya xwe ya bi qasra osmaniyan re kirina. Yanî, zêde demek dirêj biser dema îdrîsê Bedlîsî û piştê ku neçûya, êdî dîbendî ketiya nava wan de. Ji ber wê yekê bûya ku kurdan gotiya "baxtê rûmê tûna ya."

Mijare Îdrîsê Bedlîsî, ji ber ku ol jî, weke rengekî dikeve nav de, êdî di şîrovekirinê de, her gotina ku mirov dibêje, giringîyek wê dibê. Di dema osmaniyan de jî û piştê de jî, komare tirk, hertimî ew kirasê olê bi teybetî xwestîya ku bi wê dîtî.

Li Kurdistanê, dewletê, piştê hin bi hin xwe bi rengê olê da nişandin. Di dema osmaniyan de, wusa hat nişandin ku "yê ku li dijî wê rabê, weke ku li dijî olê rabê" hat dayîn nişandin. Piştê jî, di dema Komarê de jî, dewletê xwe bi rengê olê li kurdistanê da berçavên kurdan. Her wusa, çend şêxên kurd ên ku dewletê li cem xwe dan nişandin jî, ji wê dîmenê re bûna alîkar ku kurd êdî hin bi hin pê bawer bikin. Beşekê jî, bawer jî kir. Lê ne wusa zêde. Ew beşa ku bawer kir jî, hertimî di serê xwe de, bi nakok ma. Lê hertimî jî, hem navê osmanî jî hem navê komara tirk jî, bi bûman û bêbaxî û xîyaneta ku li kurdan kirin re di serê kurdan de ma. Êdî di wê çavika bêbaxî û xîyanetê de, kurdan jî nerîna xwe domand. Êdî piştê, kurdên ku li rex dewletê, hatin dîtî jî, ew jî bûna yê ku wê êdî di nava kurdan de bîna temsîlkarê van herdû gotinan. Ev yek, ji êşekê û kuleka dil û mejûyekê afirî bû. Dema ku em vê mejiyê fahm nekin, emê nikaribin, wê rastiyê jî bi başî fahm bikin.

Kurdên ku li cem dewletê man û ankû bi gotinaka din ku di dema komarê de hat ser ziman ya bi rengê "kurdên dewletê" jî, êdf weke mirovna ku wê pergale metingerfîyê ya li ser serê kurdan ku didan domandin man. Di rastîyê de jî, ew kurdên li cem dewletê, her timî, di komkujîyên kurdan de bûna xwediyê rol û weyneka dîrokî jî. Divê ku mirov vê yekê jî, bibîr bixe. Dewletê, her timî ji van kurdên ku li rex wê na, ji wan îlham' girt û bi wê çû bi ser kurdan de. Yanî, ew temenekî herîşên li kurdan di afirênin di mejîyê dewletê ê giştî de.

Di roja me de jî, di van salên me yên dawiyê de jî, dema ku bahse pîrsgirêka kurd dihê kirin, rayadarên dewletê dirabin û dibêjin ku "pîrsgirêka kurd tûna ya, tenê pîrsgirêka kurdan heya". Yanî bi vê gotinê pîrsgirêkê dike tekekasi. Yanî, pîrsgirêkê ji rengê civatî dide derxistin. Temenê vê gotinê, em nikarin tenê bi politikayên dewletê re bînina ser ziman. Hinekî jî, ev kurdên li cem dewletê ku civate kurd wan weke "kurdên dewletê" jî bi nav dike, temenê vê gotinê diafirênin. Rayadarên komare tirk jî, ji xwe li ser van dordoran re ne tenê di nava xwe de, her wusa di qada navnetewî de jî, propaganda'yên xwe dike. Lê divê ku em vê jî bibêjin ku temenê vê gotinê ev kurd diafirênin. Yanî, ew lingekî dewletê ên di nava civate kurd de na ku dewletê li ser wan re tûnakirinê li ser civate kurd farz dike û politika û pêvajoyên bişavtinê û ankû 'asîmlasyonê' li ser kurdan de dide meşandin. Her wusa, bi pêvajoya dawiyê ya bi navê 'pêvajoya çareserkirina pîrsgirêka kurd' de jî, dewletê dîsa li ser vî lingê xwe re li dijî kurdan 'pozîsyona' xwe girtîya. Di pêvajoya dawî de, bahse ava kirina 'komîsyonên meclîsê' û 'komîsyonên rastteqînîyê' hatina kirin. Bi teybetê di rêjeya mirovên ku di van komîsyonan de cih digrin, bi teybetî, aliyekî giştî ji wan kurdan pêktê ku dewlet, di vê pêvajoyê de jî, wan li dijî civate kurdan bo ku xwe serdest bike bikar dihêne.

Li vir, dema ku em van rastîya hin bi hin bi demê re dihênin ser ziman, ku di demên piştî dema Îdrîsî Bedlîsî de jî bin, di derbarê têgihîştina dewletê ya li dijî kurdan de têgihîştinekê dide me.

Ez, divê ku vê jî bi gotinên xwe yên li ser paragrafa li ser vê ve bikim. Di dema ku komkujîya Roboskî hatkirin, bi teybetî, mirovên ku koka wan kurd bû, hatina hilbijartin û bi wan gotinên hikimetê û dewletê ên li ser komkujîyê dan gotin. Bi vê rengê, di aslê xwe de, divê ku em vê rengê û politikayê baş fahm bikin. Ji ber çî giringa ku em wê baş fahm bikin. Giringîya wê ji vir tê ku divê ku mirov wê baş fahm bike ku ji ber ku dewlet hê li ser vê bereyê re li dijî kurdan ku ji nava civate kurd bê, komeka xwe ava kirîya û li ser wan re li dijî civatê politikayên xwe dide meşandin. Ev rengê vê bereyê ê ku me hanîya ser ziman, rengê aliyê bereyê yê ku dewletê ji bo xwe wê bikardihêne ya li dijî kurdan. Li ser wê re, bi maskeya olê, diçe bi ser kurdan de. Ol, li vir, dîsa weke aliyekî ku pîrr mazin dihê bikarhanîn û îstismar kirin a.

Pîsgirêka kurd, heta ku gotinên di temenê 'înkara' wê de, ku rayadarên tirk dibêjin, li ser vê aliyê bereyê ê nexêr de ya. Lingê wê û temenê wê, ev aliyê bereyê diafirêne. Dema ku em vê aliyê û vê aliyê vê dîrokê fahm nekin, emê van gotinan jî temenê wan baş fahm nekin. Li dûv gotina "ku pîrsgirêka kurd tûna ya, ya kurdan heya", gotinên "em birayê hevdu ê misilman in", "em weke goşt û neynokê bi hevdu ve girêdayî na.", "em milletek in", "em, ev hezar sala ku em bi hevdu re dijîn", "bila ti kes cuda bûnê nekê nava me de", û hwd, ku hê gelek gotinên din jî di nav de bi dehan gotin li dûv hevdu tîn rêzêkirin û tîn gotin. Bi van gotinan re, rûyekî dewletê bi nêzikatîyên olî û ên baş hatî şîştin didina nîşandin. Her mirovê ku hinekî jî bi mirovî li van gotinan dihizirê, dibêje ku gotinên "biratîya gelan in". Lê bi van gotinan jî, her timî pêşî li xwestina mafê kurdan û statûya kurdan hatîya girtin. Yanî, ev gotin û gelek gotinên din ên weke van, bûna gotinên weke referans li ser wan re bişavtina civate û ji dîrokê birina civate kurd dihên kirin in.

Ev bereye ku em divê ku dîroka wê bibina heta dema Îdrîsê Bedlîsî, divê ku mirov wê i rastî ji hemû aliyên wê fahm bike. Ev yek, weke pêwîstîyeka zarorî ku nebê nabê ya. Bê şart û merc divê ku bibeê ya. Bo ku rûyê dewletê bi politikayên wê yên di temenê jenosîda kurdan de ku heta roja me dide meşandin werina dîtin û fahm kirin. Civate, ji ber tê xwestin ku ji du tiştan were dîrêkirin? Yek ji wan tiştan Ziman a. Ya din jî, her wusa dîrok a. Bi ziman re rengê civate û nasnema wê tê dîtin. Bi dîrokê re jî, wê heya û bi wê re pêşketinên wê ên weke çandî, hundurî, hizrî û hwd, mirov dikarê werêne ser ziman. Dema ku ev hatina dîrêkirin, êdf civat, ji rastî û

mejûya xwe dûr dikeve.

Bi awayekî rastî, nivîsandina dîroka civatê bi zimanê wê zikmakî, êdî wê bê temenê pêşketina wê. Ya ku wê civatê bide parastin û ji demê bide buhurandin li demê jî tenê û tenê ev a.

Ya rastî, ew a ku serkevtina mirov ya pêşî, wê pêşî bi têgihîştina mirov ya civate mirov û dîroka wê civate mirov re were û bibe. Dema ku mirov dîroka xwe zanî û civate xwe êdî nas kir, êdî wê karibê hem gotinê jî li ser navê wê bibêje û hem jî sîyesetê jî li ser navê wê bike. Lê ku ev nebê, mirov ne xwediyê têgihîştina dîrokê û civatê bê, mirov ew sîyeseta ku bike jî, wê ne xizmeta pêşketina civate mirov bixwe de jî bê. Ji ber vê yekê, divê ku ziman û dîrok, giringîya weke mejî û dil in. Dema ku dilê mirov karnekê, wê nikaribê bijî. Her wusa, dil ziman a. Mejî jî, dîrok a. Dema ku mirovek, xwûn herê ser mejiyê wî, wê di cih mejiyê wî, êdî karnekê û wê êdî ew jî navê li jîyane wî were. Yanî, aliyekî giring, bi heyîna mejî re mirov dikarê bijî. Civat jî, wusa na. Mejî ku sekinî û ankû bi gotinaka din dîroka wan ku ji hiş hat birin û dil karnekir û ankû ziman qadaxa bû, wê hingê, ew civat jî nejt.

Dema Îdrîsê Bedlîsî, bi pêşketinên piştê êdî divê ku mirov wê fahm bike. Her wusa, TIŞta ku hatî serê kurdan re mirov dikarê wê fahm bike. Di wê demê de, kurdan tifaqak çê kir bi Osmaniyan re ku ew karibin bi wê hebûna xwe biparêzên û kurd jî, li herêmên xwe êdî bixwe bijîn. **Lê ew tifaq, nebixêr, bûya temenê tûnakirina civate kurd. Ku kurd, di roja me de, bibêjin ku emê tifaqeka nû bi tirkiya çêbikin, ya ku ezê ji bo vê bi gotinekê bibêjim ew a ku bila li wê dîroka xwe ya pêncsad salî ku buhurî binerin û piştê, bîryara xwe bidin.** Î ro di çî rewşê de na, hemû rewş ku qadaxaya zimanê wan jî di nav de ancama wê dîrokê na. ...

XATA PÊŞKETINÊ: SUMERIYAN, MESOPOTAMYA Û KURDISTAN

Li ser Cizîre botan

Li ser wê dîrok, hizir, bawerî û çanda Cizîre Bota ye ku divê ku mirov têbigihê...

Deme ku mirov bahsa Cizîre bota bike, divêt ku mirov hinekî dirêj û mazin bahs bike. Cizîre bota bi hizir, bawerî û çanda xwe ye ku afirandîya, ne tenê li Kurdistanê, li herêmê bigiştfî xwediyê weyneke mazin û girîng e. Bi vê yekê divêt ku mirov bahsa wê bike. Hata nahaka wilo Zêde Cizîre bota ne hatiya ser ziman. Zêde wilo Lêkolîn li ser ne hatina kirin. Haya nahaka nivîs

û berhemên ku li ser hatina nivîsandin ji, dûr in ku wê û hebûne wê û pêşketine wê bînine ser ziman. Cizîre bota, hewceyê hinekî lêkolînên bizanistî di qada hizir, baweriyê û çandê de li ser bêne kirin. Herêmeke weke Cizîre bota, ku di deme xwe de hertimî weyneke mazin di dîroke xwe de leyistiya, her weha wilo zêde li ser ti lêkolînên mazin ne hatibin kirin, kêmesiyaka mazin ye me kurdan e. Ev nivîs, ne di wê îdfayê de, ku wê bersive vê gotine ku me kir, wê bide. Lê xwesteke wê heya ku bibe destpêkak ji lêkolîn kirinên ku bêne kirin re. Nahaka em bixwe ji li ser Cizîre bota di hizir in û di nivîsênin, Ji ber vê yekê, tişte ku em bi nivîsênin, emê ji bi lêkolînên nivîsênin.

Li kurdistanê, çand û hizir û bawerî, ku Cizîre bota ne wê ser ziman, nayê ser ziman. Bigihê gelek pêşketinên mazin yên olî ji ya. Di olê musulmanetiyê de û olên berî musulmanetiyê, yên weke xiristiyaniyê û cuhutiyê ji, bingih kiriya. Di pêşketina wan de weyneke mazin leyistiya. Cizîre bota bi çanda xwe re, xwediyê hebûneke pir mazin e, di pêşketin û hizir de. Di demên berî zayinê de ji Cizîre bota her weha bûya xwediyê weyneke mazin di pêşketinê de.

Di nava kurdan de, deme ku bahsa Cizîre bota bê kirin, ne mumkun e, ku ti kurd nizani bê û di derbarê we de ne xwedî agahî bê. Herkesek di derbarê wê de xwedî agahî ya. Lê belê, çend ku her weha herkesek xwediyê agahiye ji, haya nahaka wilo zêde li ser wê û hebûne wê, ti lêkolîn û nivîsên mazin ne hatina nivîstin. Cizîre bota çend ku navendeke şaristaniya kurdî ji ya, di herême de û bi vê yekê ve bûya navendeke mazin li herême bi giştî ji, i ro, wilo zêde ti lêkolînên mazin ne hatina kirin. Cizîre bota, çawa weke ku ji bo Riha tê gotin ku warê pêxemberan e, mirov karê weha heman gotinê ji bo wê ji bêne ser ziman. ispata wê yekê ji, haya nahaka mayîna tirba Nebî Nuh û hizre wî ya. Ew bixwe ji li wir jîn bûya û li ser jiyana xwe, haya dawiyê wî jîn kiriya. Ji ber vê yekê, tenê bi wî re ji bê, mirov karê ji bo Cizîre bota bêje ku ewder warê pêxemberan e.

Di roje me de, ev rastiyan dîrokê ku werine kifşkirin û ser ziman, hingî, wê di pêşketinên i ro de ji, wê di pêşketine wê de weyneke mazin û dîrokî bileyizin. Bi vê yekê mirov karê bêne ser ziman. Cizîre bota, deme ku mirov li ser dihizrê, ji gelek aliyan ve, di serê mirov de jîn û zîn dibe. Bi wê jîn û zîn kirina xwe ji, weke ku ji mirov dixweze ku mirov wê bêne ser ziman. Her weha wilo ji mirov dixweze. Ji aliyê wêjeyî, hzirî, û dîrokî ve, divêt ku mazin were ser ziman. Ku kengî mazin weha hata ser ziman, hingî, wê layiqî xwe were ser ziman. Ji ber ku Cizîre bota pir mazin û pir bihizre, Wiloqasî dihizir û pêşketinê de mazina û xwedî weyne, mirov karê bêje ku weke pirtûkeka pîroz di hizir û dîroke pêşketinê de şifrên xwe çekirina. Weke ku dixweze ji mirov, ku mirov wan şifrên wê kifş bike. Ji mirov dixweze ku mirov wê pir mazin bêne ser ziman, Ji ber vê yekê, weke ku ji mirov xayîdî, li mirov dimeyizenê. weke ku ji mirov bixayidê, li mirov li nava çavên mirov dimeyizenê. Ya rast, ku mirov ji wî alî ve li Cizîre bota meyîzenê, mirov wê bibîne ku Cizîre bota, pir ji mirovê xwe bixayd e. Ji ber ku haya nahaka ji aliyê wan ve bê alaqa maya. Ji aliyê wan ve bê alaqa hatiya hiştin. Xayde Cizîre bota ji ber vê yekê ji xwediyê xwe ya. Ji kurdan hemûkan e. Kurd, wê çiqasî û çend vê yekê di cihê xwe de û li layiqî wê bibînin û fahm bikin. Ev yek ji, weke pîrsekê iro di serê mirov de çêdibe.

Cihêkî weke Cizîre bota ku ji gelek aliyan ve xwediyê wateyên girîng û mazin e, haya nahaka ne hatina wê ya ser ziman kêmesîya me mirovan hemûkan e. Ji ber vê yekê li meyîzandin ji, tenê bi serê xwe ji mirov re bes dibe ku mirov rastiye wê pir mazin bibîne û fahm bike. Rastiye wê pir mazin û dîrokî ya. Rastiya wê di xwe de pir mazinbûn û zanebûnê di paraze. Di serê me kurdan de, ku navê wê bixwe ji tê ser ziman, weke ku ji mirov rebahsa pirtûxaneyeka pir mazin bê kirin, di serê mirov de, pir hizir û raman şaq didin. Ji ber ku ew pir mazin û bihizir e.

Di vir de emê rastiya wê bi serek bînine ser ziman û bi buhurin. Ew rasti ji her weha ji aliyê hizir û felsefe ve, weyne Cizîre bota di Dîroke kurdan de çend mazin a. Ji ber vê yekê, em pêve girêdayî bînine ser ziman, ku deme ku mirov rastiya Cizre bota li gor wê û hebûne wê ya dîrokî kifş bike û bêne ser ziman, hingî, mirov wê di vê qadê de hizireke mazin bi dîroka wê re bînine ser ziman. Kurd ji ji herdemî zêdetir, hewceyî wê anîna ser ziman in. Ji ber ku ew çanda wan e, û ew dibêjin, "ku em iro li ber pêvajoyaka bişavtinê li ber xwe didin. Tişte ku wê bişavtinê têk bibe, hizir û çanda kurdan bixwe ya, Ji ber vê yekê, hewceyî pê heya ku mirov wê pir mazin bêne ser ziman û bi mirovan bide revakirin. Ev yeke weke nan û avê ji mirov re pêdîvi pê heya. Kurd, berî

hertîştî divêt ku vê yekê ji xwe û dîroke xwe kifş bikin û bênine ser ziman. Caladet Bedirxan di nivîseke xwe de bahsa weyne Ol û ziman di pêşketin û hevgirtine civakê de dike û têne ser ziman. Zimanê kurdî, hata qazada kirin û hizre wan ya olî ji an li ser navê tirkî hata ser ziman û an ji yên ku li ser navê kurdî hatina ser ziman, ji hole hatina rakirin. Cihên sembol ku ji bo kurdan pir girîng in ji, cihê weke Nebî Nuh û Birehim Xalîl ji, ji rojeve kurdan hata dûr xistin. Ev yek bi zanî hata kirin. Ji ber vê yekê, hewcetî pê heya ku mirov li ser bi sekinê û bêne ser ziman. Di nava kurdan de ev hizir û sembolên ku me anên ser ziman, yên kurdan e, Lê ka kijan ji wan di nav kurdan û li ser navê wan tê ser ziman? Ev pirs bi bersive xwe hinekî rastiye mazin wê raxê berçavan. ya rastî, tenê bi pirs pirsbûnê re ji, gelek rastiyan radixê berçavan. Ew rastiyan ku radixê berçavan ji, hemp ji, rastiyan kurdan in.

Kurd, iro, di pêvajoyaka pir girêng de ne. Divêt ku vê yekê pir baş û qanc fahm bikin, Divêt ku berî hertiştî rastiya xwe baş û qanc fahm bikin û nas bikin. Ser wê yekê, pir mazin rawastih in. Ev yek pêdiviya wan pê heya. Ji ber ku rastiya mirov, hebûne mirov bixwe ya. Rastiya mirov, di rastiye de ne tenê rastiya mirov di afirîne, bi xwe re nixên mirov yên ku afirîne ji, têne ser ziman. Ji ber vê yekê, hewcetî bi naskirina hebûne mirov heya. Di wê naskirinê de Cizîre bota xwediyê hebûneka pir mazin e. Di vir de divêt ku mirov Cizîre bota bi hizirê û fahm bike, Di nava wê hebûne mirov ya ku were fahm kirin de, Cizîre bota, ji bo kurdan, xwediyê cih û weyneke pir mazin e. Bi vê yekê, divêt ku mirov pir li ser rawastih e û bêne ser ziman.

Deme ku ez li ser Cizîre bota di hizir im, ez pir nixên mazin yên kurdî û dîrokî bi hizire xwe re di bînim. Bêguman wê ev der tere neke ku ez wê hemûkî bênim ser ziman. Lê bi sereke ji bê, wê hinekî bêne ser ziman. Ya rastî ji ev yek bi xwe ya. Hewcetî ji bi vê yekê heya. Kurd, deme ku Li ser Cizîre bota dihizirin, digihine rastiya xwe. Ji gelek aliyan ve Cizîre bota xwediyê hizreke mazin e, Bi wê hizirê em hinekî li Dîrokê wê ya kevn, ye berê meyîzênin.

Di Dîrokê de Cizîre bota.

Di dîrokê de cizîre bota, xwediyê weyneke pir mazin e. Deme ku mirov li Dîrokê wê dimeyîzenê, mirov gelek nixên wê yên mazin û pir hizirî dibînin. Em pêşî, li ser demên wê yên pêş rawastih in. Bi vê yekê mirov karê Cizîre bota demên wê yên tenê berî zayîne di şê beşan de bêne ser ziman.

Beş 1. Di deme xwe ye pêşî de Cizîre bota pir pêşketinaka mazin bi hebûne xwe re çedike di bi pêşketina mirovan re. Deme wê ya pêşî, bi pêşketina şaristaniyên demên berê yên ku afirî ne. Berî deme Sumeriyan, deme Neolitikê heya. Ev dem, demeke ku pir li ser were afirin e. Heya nahaka bi vê yekê, li ser Cizîre bota pir ne hatiya hizir kirin. Ji ber ku mejiyê mirovan ji wir hatibû dîrxistin. Lê ya rasti, ku mirov bêje, ne mumkun e, ku mejiyê mirovan ji wir bê dîr xistin, Hizirikirin, ji wir nayê dîr kirin. Ji ber ku ewder despêkaka di hizirikirin û mirovan de. Mirov deme ku bidest hizirikirinê dikan. Li wir, mazin dihizirin. Sert û mercên wê li wir pir mazin hene. Ji ber vê yekê, li wir pir hizirandin heya. Cizîre bota berê deme şaristaniyê, demeke weke deme şaristaniya li ser ava Dicle jîn dike û dide jîn kirin bi mirovan. Di demên berê de Cizîre bota, demên afirîner in. Berî deme şaristaniyê, ta buhurtina deme şaristaniyê, li wir li ber wê avê bicih bûnaka mazin bi mirovan dibe. Bi vê yekê hizirikirinaka mazin çedibe. Bi hizirikirinê re, êdf afirandin dibe. Afirandin, xosletê mirov yê herî mazin e. Ev xoslet li wir bi zanî dibe û bi zanist ji dibe. Bi vê yekê mirov karê bêje ku li wir bi pêş dikeve. Li wir, deme pêşketinê, her weha demeke mazin e. Deme berî deme şaristaniyê, li ber ava dicle, wir, bi mirovan re hin bi hin pêşketinê dide kirin.

Gihîne deme Neolitikê û pûşketine deme Neolitikê li wir mazin bi pêşdikeve. Li wir bi gelek awayan bi pêş dikeve. Li wir, ji bo vê yekê, yanî ji bo bicih bûnê gelek derfetên mazin hene. Bicihbûn, di wê demê de pêk têt. Piştî ku bicih bûn bû, êdf piştê hin bi hin pêşketin li wir dibe û mazin dibe. Di deme neolotike li ber ava dicle de hinek xosletên mirov yên pêşketinê, mirov karê biteybet kifş bike. Ev xoslet ji, deme ku werine kifşkirin, hingî, devêt ku mirov xosletên ardnîgariyê û hewayê ji di ber çavan de bigirê. Lê divêt ku mirov ji bir neke û bêje, hingî, di wê demê de, Dicle bi ava xwe re pir bilind bû. Bi wê bilindbûnê re, derfeteke mazin dide mirov ji bo jiyane û jiyankirinê li wir li ber wê.

Dicle bi vê yekê bi ardnîgariya xwe re dibe weke xosletekî pêşketinê yê hizir. Xweza û mirov li wir di derfetên ku xwezê ji mirov re dayî çêkirin de digihine hevdû û bi hev re jîn dibin. Bi hev re mazin dibin. Bi hev re, hevdû di pêşketinê de bi naskirin û dana naskirinê mazin dikin. Her weha berdicle mazin bi waye ji bo mirov û pêşketine wî. Dicle bi ava xwe ye ku tede ti harikê, weke xosletekî têgihîştine mirov bi wate ya. Vê yekê divêt ku mirov pir baş mazin kifş bike û bêne ser ziman. Dicle, bi ava xwe re di serê mirov de aqil çêdike. Bi wê çêkirina aqil re, mirov di wir de mazin dike. Ew mazinbûn ji, mazinbûna mirov ye bi aqil e. Ev mazin her weha pir mazin û girîng e. Ji ber vê yekê, ev xosletê diclê yê ku ji bo mirov weke xosletekî aqilê derdikeve pêş, divêt ku di şert û mercên xwe de were fahm kirin. Mirov, di wir de li ber diclê hevdû nas dikin. Naskirin, di nav mirovan de, naskirinaka pir mazin û girîng e. Naskirina ber ava dicle, naskirina, ku di mirov de hizir bi têgihîştinê bi pêş dixê ya. Ji ber vê yekê ew naskirin, bi xwe ji di warê hizir de bi wate ya, ku mirov li ser bisekinê û li ser felsefeyekê va bike. Felsefe bi vê yekê re, li ber dicle bi naskirina mirov ya xwezê û xwe re hin bi hin bi mirov re diafirê, Çend ku diafirê ji, mirov bi xwe re diafirê. Her weha hizir mazin di afirê.

Berdicle, pir mazin bi wate ya. Piştî ku bi bich bûn, bi şert û mercên ku dicle bi hebûne xwe re ji mirov re dana çêkirin û afirandine, êdî li berdicle bi mirov re di jiyana mirov de pêşketinê din ji di afirin, weke malatîtiyê û hwd. Malbatîti, li wir li ber wê avê bi mirovan re diafirê. Jiyan, bi wê afirandinê re dikeve pêvajoyaka din de. Êdî hin bi hin mirov di jiyana xwe de mazin bi hizir diafirê. Pêşketin, di jiyana mirov de li ber diclê çawa çêbûn, ku ew pêşketin newine fahm kirin, wê di rastiyê de di pêşketina mirov de, di fahkirina wê de pir kêmasiyaka mazin derkeve pêş. Dicle, xosletê jiyana mirov ye ku piştî bicihbûnê diafirêne bi xwe re ya.

Li ber dicle, pêşketin û pêşveçûn ji, ne tenê bi awayekî dibe. Bi gelek awayen dibêt. Bi gelek aliyan dibêt. Deme ku mirov li herêmê bixwe ji dimeyîzenê, hingî mirov wê yekê di rastiyê de dibîne. Cizîre bota herême wê, çend ku iro di roje me de hinekî hatibe guharandin ji, ji demên berê wilo zêde mazin ti guharandin ne bûya. Tenê guharandina herî mazin ewe, ku ava dicle ye di hinekê kê mûya. Berê, ne weke iro bû. Berê, pir bilind bû. Weke ku di destana Gilgameş de ji tê ser ziman, ji bo ku herine devereke din, diviyabû ku kişt bihatana bikar anîn. Destana Gilgameş, desteneka destana deme pêşketinê ye dem şaristaniyê ya. Destene demeke pir pêşketiya ya. Deme ku mirov lê dimeyîzêne, mirov rastiyên deme, gelek pir baş dibîne û fahmdike.

Di destana gilgameş de, mirov di nûjeniya deme xwe de nûjeniyê weke nûjeniyê iro jîn dike. Iro jê bi hinek awayan û cûrayana cuda ya. Lê di cewherê xwe de nûjeniyê iro, weke aslê wê rojê di karikatureke ku xwe bi pêş dikexe de jîn dike. Her weha mirov karê wê bêne ser ziman. Ev anîna ser ziman ya deme şaristaniyê ya. Me ew anî ser ziman, Ji ber ku ew dem, di hinek hebûn û pêşketinê xwe de xosletên wê demê jîn dike. Xosletên weke bicihbûnê, xalkbûn û di asta bilind de ji civakbûn, dibe. Her weha hinek xosletên wê demê yên ku mirov ji van gotinan fahm bike hene. Ji ber vê yekê anîna wan ya ser ziman ji, pir girîng û di cihê xwe de ya.

Deme nû ye pêşketinê ye li ber dicle, hinek xosletên pêşketinê yên weke xosletên mazin di xwe de diafirêne. Bicihbûn û avabûna malbatîtiyê di vê yekê de hinek xosletan di xwe de di afirêne. Mirov, deme ku li ser wê demê dihizirê, mirov hinekî xosletên pêşketinê, yên werine fahm kirin, yên pir girîng kifş dike. Ew xosletan ji xosletên pêşketinê û di asta herî bilind de ji yên hizir in. Ji ber ku naskirin bi cihbûnê re diafirê. Çend ku bicihbûn afirî ji, di mirov de hizir diafirêne. Di serî de naskirin, bi pirsînê re dest pê dike. Piştî pirsibên re li bersiv gerandinê dest pê dike. Piştî ku xwe gehandina bersiveke çêbû ji, êdî hin bi hin hizirkirin diafirê. Her hizrandin bi xwe re hinek hizirandinê din têne. Bi vê yekê mirov karê bêne ser ziman.

Deme berî deme şaristaniyê li ber ava dicle, demeke ku mirov ne kêmi deme şaristaniyê bêne ser ziman e. Demeke her weha pir giş e. Ji ber vê yekê ya ku serokê gelek kurd, deme ku deme Neolitikê şîrove dike, hinekî mazin şîrove dike. Ev dem, weke deme şaristaniyê bi pergala di afirê. Jiyanaka wê demê e bi pergala heya. Deme ku mirov li ser wê demê dihizirê, mirov vê yekê pir mazin di cih de mazin di kifş dike. Jiyanaka ber ava dicle, jiyana mirov ya destpêkê ya. Ji ber vê yekê, deme ku mirov dest bi şîrove bike, divêt ku mirov mazin şîrove bike. Weke ku tê zanîn, berê zayîne haya 10 hezar sal ji, hê hinek cihên qaşakirî hebûn. Piştê ku ew ji dihalihin, êdî hin bi hin

av ji zêde dibe. Gelek cihê mazin di bin avê de mênin. Weke ber bahra reş, ku di naqabîna 12 û 10 hezar salan hine halandin bûya hin cihên ku ji bo bicihbûne hatina bikar anîn dibin avê de mana. Her weha hinek cih ji di lêkolan de hatina kifş kirin. Li ber dicle, hingî, dinye germ bû. Lê deme ku dibû serma pir dibû ser ma ji. Ev yek her weha dide nîşandin ku hinek rewşên weha li ber dicle ji afirî ne. Divêt ku mirov bêje ku destana Tufanê vala ne hatiya nivîsandin. Lê ji ber çî û bi çî sedemî hatiya nivîsandin, hê hinek xalên ku weke bersivê ji vê pirsê re werine dayîn ne di rahniyê de ne. Ev ji divêt ku werine zelal kirin. Lê zelal kirina wan ji, wê dise li ber ava dicle wê bibe. Divêt ku mirov vê yekê ji zanbê. Ev yekê pir girîng û divêt ku baş were fahm kirin.

Piştî ku li ber dicle bicih bûn bûya, di wê demê de hinek rewşên weha hatina jîn kirin. Deme ku mirov li herêmê ji dimeyînenê, mirov di îklîmê wê de vê yekê baş kifş dike. Mirov karê îklîmê ji di nav de hinek awayên hizirkirin di nav de hizir bike û vê yekê rahmî bike. Lê divêt ku mirov bêje ku her ku çî bûbe û çend tufan rabûbûn ji, ew jiyana li ber dicle li ber xwe ne birine û ji hole ne rakirina. Ev yek pir zelal ji divêt ku mirov kifş bike. Jiyana li ber diclê, bi hinek xosletên mazin tê ber çavên mirov. Di deme sumeriyîyan de ji pêşketineke mazin heya. Ev yek dide nîşandin ku berî hingî pir demên pêşketinê hatina buhurandin. Ev yek, dide nîşandin ku li wir pir pêşketinên mazin hatina jîn kirin. Deme şaristaniyê, deme ku deme şer ji ya. Di deme şaristaniyê de pir şer û şerbûn dibin, lê belê; çend ku ew ser ji dibin, wê pêşketina ku mazin bûyî ji hole ranekin. Ev yek ji, dide nîşandin ku demên mazin hatina jîn kirin. Ew demên ku hatina jîn kirin ji, di aqil de û hziir de pir pêşketinên mazin yên ku mirov awa kirina bûna. Bi vê yekê re, di deme şaristaniyê de çend ku êrîş dibin û xuruxandin dibin ji, ew xuruxandin bi xwe re windahiye mazin nayênin. Mirov bi aqilê xwe yê pêşketî, karê careka din cihê wan xuruxandina dagirê. Ev yek, ji awayê pêşketinan û hebûna pêşketinan, pir baş û qanc tê ber çavan. Ev yek, pir mazin li ber çavên mirov xwe dide nîşandin.

Li ber dicle, jiyana her weha mazin a. Jiyana bi vê yekê pêdikeve û tê deme şaristaniyê. Deme ku hata deme şaristaniyê, bi xwe re, weke ku pergala xwe ji têne. Her weha tê ber çavan. Mirov, jiyana xwe pir mazin bi pergala kiriya. Bi pergala kirin, jiyana bi xwe re dike pêvajoyaka dî de. Ew pêvajo ji, pêvajoya şaristaniyê ya. Pêşketine deme şaristaniyê ya.

Beş 2. Di vê demê de mirov divêt ku cih bi cih demên berî şaristaniyê ji bêne ser ziman. Ji ber ku ev dem li ser pêşketinên wê demê diafirê. Ji demekê her weha buhurina demeke din, ne bi şer dibe. Lê buhurîna deme din, bi xwe re, gelek şeran têne. Ev yek weke xosletê deme düyemin tê ber çavên mirov. Deme dî deme şaristaniyê de ya. Deme şaristaniyê, deme ku xalkêfî pêşketiya û pergala wê pêşketiya û bi ser wê ve hin bi hin civakafî ji bi pêşdikeve ya. Ev yek, her weha xosletê deme pêşketine şaristaniyê ji ya. Ev dem, her weha pir mazin tê ber çavan. Deme şaristaniyê, her weha mazin diafirê. Lê deme şaristaniyê, di serî de haya deme ku di pêşketinê de hizir bi raman dibe û bi têgohiştin dibe û jiyana diafirê, ji deme din ne qut pêş dikeve. Her weha mirov karê bêje ku deme düyemin demeke ku mirov bêje ku deme ramanê ji ya. Lê di wê demê de, her tişt bi awayekî afrînerî diafirê. Bi awayekî mirov xosletên xwe yên afrîrdandinê di wê demê de mazin dikin. Ji xwe bi hizirkirin û hizir re, ev yek bi pêş dikeve. Deme ku bi pêş dikeve ji, êdî di jiyana de mazin

pêşketin

dibe.

Deme şaristaniyê, berî ku navê şaristanan derkeve pêş, deme ku mirov bêje deme pêşketine deme şaristanan di afrîrê. Ev dem, di wê demê de mazin bi nêzikatiyaka afrîner diafirî û tê ser ziman. Nas kirina jiyana û anîna wê ye ser ziman ji hevdu re, her weha vê yekê mazin diafirênê. Anîna ser ziman, xwestine bi navkirin ji, diafirîne. Xwestine bi navkirin, xwestikeke hizirî ya. Ev xoslet, xosetekî hizirî yê pêşketinê ya. Her navkirin, di xwe de kifşeke mazina ya van ardan e. Ji ber vê yekê, bêjeyên ku ji wê demê ji têne ser ziman, pir girîng in. Divêt ku mirov pir girîngiyê mazin bide wan bêjeyan. Her bêje, piştî pergala bûna di serî de diafirê. Ji ber vê yekê bêjekirin, bixwe bipergala û pergala têne ser ziman. Pergalbûn û bi pergala pêşketin, di jiyana de bi xwe re hinekî xosletên din ji têne. Ew xoslet ji her weha xosletên jiyana bi pergala in. Jiyana bi pergala, êdî bêjeyên xwe yên bi pergala ji diafirênê.

Deme buhurîna deme şaristaniyê, deme ku mirov bi awayê pêşketine hizir re li ser bisekinê ya. Bi vê yekê re, mazin divêt ku mirov li ser rawastihî ê. Ji ber ku ev dem, demeke ku pir girîng

e. Hizir diafirê û di jiyânê de tê ser ziman. Ew afirandin û anîna ser ziman, bi xwe re hinek xosletên bipergal diafirêne. Ev awayê afirandinê, ji awayê afirandinê yê deme şaristaniyê yê bi pergal e. Lê deme ku berê wê demê, deme neolotikê ji, di deme xwe de gelek pêşketin, di jiyânê de kirina. Gelek pêşketinê wê, di pêşketina xwe de buhurîne deme din û gelek pêşketine wê di deme jiyana şaristaniyê de xwe di buhurênin. Ji ber vê yekê, destpêka deme şaristaniyê, mirov karê bi xosletên deme neolotikê ji ji gelek aliyên ve bêne ser ziman. Ev yek, weke xosletekî mazin yê demên pêşketinê, demên şaristaniyê yê destpêkê têne berçavan. Weke xosletên girîng ji têne berçavan. Mirov, deme ku wan bêne ser ziman ji, divêt ku mirov pir girîng û mazin bêne ser ziman. Ev deme weke deme navîn ya di deme şaristaniyê de, deme ku mirov pir mazin bêne ser ziman e. Ev dem, bi serê xwe, weke demeke mazin tê ser ziman. Xosletên vê demê yê jiyânê yê ku wekhev in. Xosletên wê demê yê ku mirov bi jiyana xwe ya ku dijî re dihizirê ne. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Lê di vê demê de, di hizir de metafizîke deme neolotikê xwe di pareze. Ji ber vê yekê, mirov karê di vê demê de hizre wê demê bi xosletên xwe bêne ser ziman. Hizre deme berî şaristaniyê, hizreke ku di jiyânê de mayînda ya. Ji ber ku li ser temenê sembolan ava ya û bi sembolan heya. Mirov, deme ku ew sembol afirandin, bi hizrekê afirandina, Lê deme ku ew afirîne ji, piştî, gelek hizir û dem di mirov de pêşxistine. Psikoloji, di vir de dikeve devrê de. Weyne hebûne psikolojiyê, bi hizir û hebûne xwe re pir girîng e. Ew hebûne mirov ye wê demê ye psikolojik ji, di wê demê de afrîner e. Ew hizrên pêşî ne. Lê ew hizrên pêşî ji, di mirov de şoraşan dikin. Mirov, hin bi hin bi wan sembolên ku hatina afirandin, qanc xirab di gihê vînekê ku ew di jiyânê de bi kar têne. Her weha ev yek pir girîng e. Divêt mirov pir li ser bi sekinê. Divêt ku mirov pir mazin bêne ser ziman.

Lê divêt ku mirov hinekî li ser hizrên wê demê ji rawaditîbê. Ji ber ku ew ji pir girîng in. Ew hizrên ku diafirî in, bi sembolên ku hatina afirandin li ser lingan in. Lê ew sembol ji, bi xwe re gelek hizrên ku di seran di afirênin li ser lingan dihêlin. Her weha ev yek pir girîng ku mirov li ser bisekinê. Her mirovekî wê demê, ji aliyê hizir de, ku zêde ne mazin kirin bê, mirov karê bêje ku ji aliyê deroniyê ve mirov karê bêje ku ji Freudê roje me bizanetira. Ev yek, me ji aliyê hizre deroniyê ve got. Lê ji aliyê hizir û felsefê û kifşkirinê ve ji mirov karê bêje ku ji Einsteinê deme me einsteinê deme, einstantir in. Her weha pir mazin in di pêşketin û hizirkirinê de. Mirov hingî, di wê demê ku di serî de digihê naskirinkê, ew naskirin, pêre weke kifşekê xwe dide rû. Ji ber vê yekê, di pêşketinê de ew hizre ku hata afirandin pir afrîner e. Pir mazin di afirêne. Hizre wê demê, weke ku tê gotin metafizîk e. Lê ew metafizîke wê demê, weke bêje zanistê ye roje me afrîner e. Weke bêje zaniste deme me biwate ya. Her weha mirov karê bêne bêne ser ziman.

Sembole, hebûne metafizîkê radixe berçavan. Metafizîk ji, hebûne pêşketine û mayînda bûne wê radixe berçavan. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Lê metafizîk, di wê demê de pir mazin afirî ya. Dicle, di vir de ji bo mirov metafizîke herî mazin e. Divêt ku mirov wê wilo bibîne. Di deme neolotikê de, hizir her weha bi metafizîkê tê ser ziman. Xwediyê vî navî ji ya. Lê ew metafizîk, xwediyê pergala ku di deme şaristaniyê de dibe bingihê pêşketinê pergala wê di deme wê de. Metafizîke wê, di deme buhurîne deme şaristaniyê de, weyneke mazin di aqilê mirov de dileyizê. Ew weyn ji, herweha weyneke pir afrîner e. Lê deme ku mirov di buhurê deme şaristaniyê, di wê demê de, di deme pêşketine şaristaniyê de ew metafizîk û dicle, bi hev re afrîner in. Dicle, wê bi wate dike. Wê mazin dike. Dicle wê metafizîkê di deme şaristaniyê de li ser temenê pergala dide rûnanadin. Her weha ev yek, pir girîng e, ku mirov bi dicle re kifş bike. Dicle, her weha di wê heyemê de ji pêşketine wê metafizîkê re dayikîyê dike. Ew dayikî ji, dibe hîmê pêşketin û derketine hebûne şaristaniyê. Di deme buhurîne deme şaristaniyê de ew metafizîk, dicle û hizre bicîhbûnê, hizre xwûde mazin bi pêş dixin û di nav mirovan de bi pergal bicîh dikin. Her weha divêt ku mirov vê yekê di vir de kifş bike.

Hizir, deme ku kete deme pêşketinê de hingî, bi xwe re avakirinê têne. Di deme ketine deme pêşketine deme şaristaniyê de, hizir, her weha êdî hin bi hin bidest pêşketinê dike û bi pêşdikeve di jiyânê de. Di jiyânê de pêşketine hizir, êdî bi xwe re watekirinê têne. Her weha watekirin ji, êdî jiyânê bitêgihiştin dike. Xosletekî deme şaristaniyê, ku di serê deme buhurtinê de dibe, têgihiştin bixwe ya. Têgihiştin, naskirin û ew naskirin, anîna ser ziman bixwe ji ya. Lê ji wê zêdetir, di wê

demê de, têgihîştin, bi pêşketine xwe de weyneke li ber çavana bûjen û arîşa bi hev re di leyizê. Her weha weyneke mazin dileyîze. Ji bo ku mirov wê weynê ji fahm bike û têbigihê ji, divêt ku mirov li afirandina di jiyane de ye ji bo daberkirinê fahm bike. Ev yek ji, bi serê xwe wê têgihîştineke mazin ye dîrokî di serê mirov de bi hizir û dîrokê re çêke. Wê hizre dîrokê bi me dê fahm kirin. Hizre dîrokê ji vir pêde, wê pir mazin hin bi hin were têgihîştin. Têgihîştine wê demê ji, mirov karê her weha bi hinek xosletên ji yên roje me cude bêne ser ziman. Ew xoslet ji, her weha têgihkirin, lê anîna ser ziman de, rê nedîtin. Mirov, karê bi vê yekê sereke bêne ser ziman. Lê ew têgihê serî, têgihê ku mirov di serê xwe de li riyên anîna ser ziman digerehe bû. Ji ber vê yekê, ew têgih, bi lêgerîne ji bo xwe anîna ser ziman re ji, afrîner bû. Bi vê yekê, her weha afrandin bû û hata ser ziman. Bi vê yekê re, êdî hin bi hin şaristani ji bi pêş diket. Hin bi hin riyên pêşketinê yên mazin di afrandin. Riyên jiyane di afrandin.

Riyên jiyane yên hizir, her weha di deme destpêka deme pêşketine deme şaristaniyê de, mazin bi pêş dikeve., Êdî mazin afrandin dibe. Bi vê yekê, û bi vê awayê gelek, re di deme afrandinê de, êdî hin bi hin ji deme neolotîkê ji qutbûn çêdibe. Şaristani, êdî di xwe de kur dibe. Di xwe de bidest afrandinê dike. Li ber dîclê, her weha mazin afrandin, êdî mazin derdikeve pêş. Dem êdî deme pêşketine deme şaristaniyan li ber dîclê ya. Deme şaristaniyê, mirov bêne ser ziman, êdî wê mazin were ser ziman, Ji vir pêde, wê di destpêka xwe de, pêşî, metafizîke xwe afrîne û piştê li ser wê re wê hizir û demên hizir yên din wê afrîne. Xosletên metafizîke deme şaristaniyê, ji yên deme berê cudatir in. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov ji wê çudatir bêne ser ziman. Deme şaristaniyê, di hizir de demeke nû ya. Di destpêkê de, ew deme şaristaniyê, pir mazin afrîner e û pir mazin xwezeyî ya. Lê piştê hin bi hin ji wê xwezeyî wê dîr bikeve. Wê bixweze xwezebûnaka xwe ava bike. Wê bi vê yekê di tekoşinekê de bê. Lê wê, wê ji ne afrîne û wê ye ku heya ji, wê hin bi hin awayê wê ji hole rake. Ev yekê, êdî wê deme şaristaniyê, bike, deme şer. Wê demên şer di demên şaristaniyê de bi afrîne. Du awa, di mirov û jiyana mirov xwezebûnê di afrîne. Yek li xwezeyê meyîzandin û ew hilme wê ya. Û ya din ji, her weha li gor wê jîn kirina. Lê ku xweze ji hole rabû, êdî wê mirov li çi meyîzenê? Ev ji pirseke ku deme şaristaniyê, dike bingihê şerên di demên xwe de.

pir girîng e, mirov kifş dike. Ew ji her weha "di baweriyê de pîrozî" ya. Di baweriyê de pîrozî, hin bi hin pêşdikeve. Lê bi hizir re bi pêş dikeve. Sumerî, çend ku nivîsandinê dikin, wê yekê mazin û bi nîrx mazin dikin û li ser hinek xosletan didine rûnandin. Ev yek, di wê yekê de ti kifşkirin. Lê di vir de, bi wê yekê re, tişte dî ye ku mirov kifş bike ji, her weha ew ê, ku di baweriyê de bi pîrozîyê de hin bi hin têgihîştin dibe û derdikeve hole. Ev bûn ji, bi xwe re ne tenê bawerîya wan mazin dike. Wan ji mazin dike. Dike ku ew mazin bihizir in. Dike ku ew êdî li dervî xwe, li azmana, li ardê, li bîne ardê ji bi hizir in. Deme ku li wan di hizir in ji, êdî di serê xwe de di wan hizirkirinan de afirandin û avakirina cihan mazin dibe. Bi wê yekê, bawerî, êdî dibe pergala sereke ye herî mazin. Ew pergala ku weha diafirê, êdî hin bi hin wê ji sînore wan ji derbas bike. Ew di vir de ji, dikevine devrê de û aqilê xwe kar tînin. Dixwezî, wê derketine dervî sinor bikine bin sêhete(kontrol) xwe de. Her weha li ser wê yekê, êdî bidest hizirandinê dikin. Di hizirkirinê xwe de, kifş ji dikin ku wê çawa rê û pêkan kifş bikin. Bi wê yekê ve girêdayî, mirov karê bêje ku zanebûna wan, wê derfetê dide wan ku bi hizre xwe sêhete xwe li dervî xwe ji ava bikin. Ava dikin ji..

Sumerî, di vir de, êdî serê wan ji dore wan zêdetir, di hizir de di têgihîştine wan de bi wan re ya. Yanî, serê wan, êdî di serî de ya. Ew êdî karin di serî de, bi aqil di têgihîştinê de şer bidin û bikin. Bi wê yekê, ew mazin li ser lingan dimênin. Sumerîyan, kifşkirîya ku jiyana wan, wê çawa bê. Bi wê yekê re bi bawerîya xwe di hizir in. Di hizirandinê xwe de ji, riyên jiyane di aqil de diafirênin. Lê bi wê yekê ve girêdayî, divêt ku mirov tiştêkî din ji bêne ser ziman. Ew ji her weha êdî aqil bi têgihîştin di deme wan de serî jiyana wan dibe. Ew hertişte ku dibêjin, di têgihîştine wê de ne. Wate wê zan in. Bi wê yekê ve girêdayî, êdî mirov karê bêje ku ew di deme xwe de gehana deme têgihîştinê ye ku hizir bi felsefê bi afirênin. Ev yek, her weha tê kifşkirin. Ev yek, her weha mazin di deme wan de tê kifş kirin. Li jiyana xwe bi hizir dimeyîzênin. Xwe bi zimanekî wêjeyî tînine ser ziman. Qanci û xirabiyê jêv cuda dikin û xirabiyê mehkun dikin. Di bawerîya xwe de têgihîştine Dojeh û bihuşt afirandine. Li gor wê têgihîştinê ji, rastiyê û ne rastiyê tînine ser ziman. "Qanc cihê wan li bihuştê ya". ".Yên xirab cihê wan li dojehê ya". Ev gotin hin rastiyên têgihîştine wan ye di bawerîya wan de dide ber çavan..

Bawerî, bi pîroz e. Pîrozî, lê, pêvajoyaka pêşketine têgihîştine wan ji tîne ser ziman. Divêt ku em wê ji kifş bikin û bînine ser ziman. Sumerî, piştî ku wê pêvajoya têgihîştinê jîn dikin, êdî piştî, bidest kifşkirin di hundurê bawerîya xwe dikin. Weke "Agirê dojehê ti carî ne mirê". Weke "hinek mirov li wir hene, ew ji aliyê xwûdana ve hatina afirandin. Ew ti carî, ku ne xwûdayê ku ew afirandine, giyana wan ji wan bistêne, ew ne mir in û ne şawitîn di êgir de". Weke ku li ser bihuştê tînine ser ziman, "ewder dinyeke wilo ye, ku ti carî ne arami û nexweşîkbûn tîne nî e. Her tiştê wê dayimî ya". Ev hizir û têgihîştinê di hundurê bawerîya wan de, piştî her hizire olî ye ku diafirê di xwe de bi awayekî tîne ser ziman. Ew(sumerî), yê pêşî ne, û ew yê in.

Di hizre bawerîye sumerîyan de, hertişt bi hev ve girêdan, weke têgihîştinekê heya. Bi wan re, ev yek pir mazin e. Çawa ku li dinyê, weke ku dê û bavek ti keve tîkiliyê de, ji wan re zarok çêdibe, piştî ku zaroke wan bû û mazin bû, piştî, êdî ew ji weke dê û bavê xwe dikeve tîkiliyekê de û zarokê wî ji çêdibin û jiyana her weha hebûna xwe berdewam dike, di hizir de ji, ev yek bi wan re bi heman awayî, di hizir de bi wan re bi hev ve hatiya girêdan û têgihîştine wê ji hatiya afirandin û bi mirovan hatiya erêkirin.

Sumerî, di wê yekê de, bi hizir, mirov karê bêje ku mazin dibin. Di hizre xwe de kifşkari in. Mazin di hizir in û diafirênin. Piştî ku her weha gelek têgihîştinê mazin bi pergala di hundurê bawerîya xwe de diafirênin, êdî hin bi hin, ew metafîzîke wan ye ku mirov ji vir pêde bahsa wê bike diafirê. Ew, bi wê yekê re, êdî di têgihîştine xwe de, dikeve pêvajoyaka nû ye di de. Piştî ku hertişt bi pergala di hundurê bawerîyê de hata afirandin, êdî her weha di wê afirandine de, ew dixwezî ku mirov tîne bi cih bikin. Ew cihana ku di serî de di hizir û têgihîştine xwe de afirandina, piştî xwe dikinê de. Ew cihana ku wan afirandiya, cihanaka ku mirov bêje pir mukemel e Her kî bi wê cihana dihisêhe, êdî tîne di dixwezî ku bibine xwediyê wê cihene. Bi wê yekê, em gotinaka ku weke şerê şaristanan yê bi hev re tîne ser ziman, bînine ser ziman..

Di wê cihana wan de, sumeri, hizre xwûda mazin û pîroz dîkin û di dênine cihê heri bilind. Ew cihê herî bilind ji, her weha azman bixwe ya. Mîrov ku hij yekî kir, mîrov dixwezê ku hertimî ew baş bê û di cihekî xwe de bê û kuder jê baş û xweş û bilind e, wê derxine wir. Ew ji xwûdanên xwe, her weha derdixine cihê herî bilind. Ew ji di wê cihana xwe de jîn dîkin. Cihana wan, weke cihê xwûdayê wan ne. Lê cihê xwûdayê wan ji li ser wan re ya. Lê jev ne dûr in. Wan hizir dikir ku wê ew xwûdanên xwe, bi hev re di wê cihana ku wan afirandiya, wê bi hev re pir xweş û baş hatahata jîn bibin..

Sumeri, bi vê kirina xwe, dibêtu ku difarqê de bin, pêvajoyaka nû dihizir, baweri û têtigihîstine de didine dest pê kirin. Piştî van kirinan re, êdî li dore wan jî, ew zanebûn û hizrên wan, bi wê dinye wan re cih digirê û hinek şaristaniyên din jî ava dibin. Ew avabûn hemûk jî, weke zarokên ye sumeriyên in. Sumerî, di her qadê de hizirî ne. Ji bo ku cihê xwûdanên xwe li azmana zanibin jî, li azmana cihane weke stêran, heyvê, rojê û hwd, di derbarê wan de, hewl didin ku bibine xwedî agahî. Astronomî, fizik, geometrî, matematîk û hwd, bi vê yekê, pir mazin diafirin di deme wan de bi wan re. Her afirandinaka wan bi armancakê hatiya afirandin. Her afirandinaka wan, nêhteke wê heya. Her weha mîrov karê, wan afirandinên wan yên weha, bi vê yekê bêne ser ziman. Piştî wan re, ev afirandinên wan, di pêşketinê de pir weyneke mazin dileyîz in. Li Misrê, haya ku digihê gelek deverên asya û anatolia û hwd..

Piştî demên sumeriyên li ber diclê pêşketin û têtigihîstine baweriyê..

Li ber ava diclê baweri, li gor dîroke ku jîn bûyî tê ser ziman û jîn kirin. Hizir û bawer, rastî û jîyan bi hev re di riyekê de dimeşin. Jiyana ber ava diclê, ji aliyê baweriyê di vir de divêtu ku mazin were ser ziman. Bêguman, deme ku mîrov li ser baweriyê, li ber ava diclê bi sekinê, hingî, divêtu ku em pir mazin û dirêj li ser bisekin in. Lê em têne hinek bêjeyan bi sereke bênine ser ziman. Ber ava diclê, jiyana wê, li gor baweriyê wê jîn dibe.

Ber deme sumeriyên, pêşketineke mazin di hizir de bû. Ew pêşketin, bi têtigihîstîna, di baweriyê de, piştî, cihê xwe girt. Li gor pêşketinê çê bû. Ji ber vê yekê, girîng e, ku mîrov li ser baweriyê wê demê bi sekinê. Berî wê demê, bi gotinên nûjen dibêjin, anamizim û totemizim, Yanî, li gor toteman têne ser ziman. Piştî Mîtoloji derdikeve. Divêtu de berî em herine şrove kirina ber ava diclê, li vir em hinekî li ser mîtolojiyê jî bi sekinîn. Ji ber ku ev yek pir girîng e. Di mîtolojiyê kurdan de jî, deme ku mîrov li ser di sekinê, mîrov jî wê demê pir dibîne. Di mîtolojiyê kurdan Ji Îştar e wê demê re, i ro jî, dibêjin "star". Ev bêje, bêjeyêke ku mîrov pir li ser bi sekinî. Weke wê, di mîtolojiyê kurdan, bahsa "Ga" jî tê kirin. Lê ga di wê demê de ji ga bû. Wekî din jî, li ser baweriyê di hundurê mîtolojiyê de, ku mîrov çend gotinan bêne ser ziman, Baweriyê olî ya ku i ro tê jîn kirin, wê demê jî, her weha weke xwe hebû. Yanî, wilo zêde ti cudabûn derneketiya hole. Kurd, di baweriyê xwe de kirasakî civaknasî hertimî li bêja baweriyê dîkin û jîn dîkin. Ev yek, weke xosletekî baweriyê wan ne. Di demên berê de jî, ev yek weha heya. Deme ku mîrov li demên berê dimeyîzenê, mîrov vê yekê, pir zelal û baş dibîne. Li ber diclê, hîmê vê yekê tê jîn kirin. Mîtolojiya kurdan de, pir nîrx û zanebûnên ku i ro nayêne ser ziman û yên ku têne ser ziman ne bi navê wan têne ser ziman, hena. Ev hemû nîrx jî, hevdû jîyan û pêşketine wan de temen dîkin. Deme ku mîrov li demên pêşketine wan dimeyîzenê, mîrov vê yekê pir zelal dibîne.

Xosletekî kurdan, ye ku di zanebûne jî xwe bawer bûne heya. Ev xoslet, cerna di nav wan bixwe de jî hatiya jî wan bixwe ve hatiya rexnekirin. Ew xoslet jî, pir mazin jî jî xwe bawer bûne. Lê deme ku ew bawer bûn, bû jî xwe qayîlbûn, êdî rexne lê dihata girtin. gelek caran, deme ku dihata ser ziman jî, dihata gotin ku "zanebûn ku hebe mîrov hinekî jî xwe qayîl jî dibe". Bi vê yekê, yên ku dixwestin ku vê yekê rast derxin, dianîn ser ziman. Lê axlabe jî, rast û pak ne dihata dîtin. Mîrov çend mazin bibe, divêtu ku mîrov bêhtir, fahm bike. Her weha mazin bûn, di zanebûnê de dihata dîtin. Mîtolojiyê wan, nexşeyêke hizir, têtigihîstîna û pêşketine wan ye mazin di xwe de di pareze. Ji ber vê yekê, li ser mîtolojiyê sekinandin jî, pir girîng e. Divêtu ku mîrov li ser bisekinê. Li gor deman û pêvajoyan pêşketinên wê fahm bike. Mîtolojiyê kurdan, mîtolojiyê jî mîtolojiyê cihanê ye herî demdirêj û xwediyê pêşketineke mazin e. Ji ber vê yekê divêtu ku li gor wê rastiye wê ya dîroke were ser ziman û fahm kirin.

Li ber diclê, jiyana hizir, li ser hinek hîman hatiya ava kirin. Di nav wan hîman de, hîmê herî mazin bi bêja afirandinê re tê ser ziman. Ji ber ku deme ku mirov bahsa wêderê û pêşketinê wê dike, divêt ku mirov pir bêja afirandinê bi bar bêne. Ev yek, ji xosletê wê têt. Ev yek, ji ber ku rastiyaka wê ya, her weha xwe têne ser ziman. Li ber diclê, baweri ji, ji vê yekê, dîr nayê ser ziman. Ew ji bi bêja afirandinê, pir mazin û li wir tê ser ziman. Baweri, li wir, deme ku tê ser ziman, hinekî cuda tê ser ziman. Weke zarokeka li cem dayika were ser ziman dibêt. Her weha wê hîsê dide mirov di deme anîna ser ziman de. Deme ku mirov bahsa baweriyê de, car bi car, deme sumeriyân tê bîre mirov. Afirandinê wan, xwe bi me, bi bîr dixin. Gelek rastiyên wan yên ku jîn bûne, têne ser ziman, di deme anîniya ser ziman de. Hizre baweriyê, hizre dîrokê ya. Ji aliyê pêşketine xwe ve pir dîrokî ya. Ew dîroke wê ji, li wir jîn bûya.

Li ber diclê, deme ku mirov dihizirê, mirov fahm dike, ku baweri çend xwediyê pêşketineke kur û mazin û demdirêj e. Ev yek, li wir, xwe bi me dide hîs kirin. Di deme sumeriyân de pêşketinên ku jîn bûn, li wir dise, xwe di gelek baweri û şaristaniyên ku avabûn de hata ser ziman. Piştî deme sumeriyân, gelek demên şaristaniyê jîn bûn. Aqad, babil, Mîtanî, hûrî, Naîrî, asurî û piştî Med, cend demên şaristaniya wir in. Ev dem, demne ku mirov weke demên şaristaniyê ji herême re bêne ser ziman û weke demên şaristaniyê bi pêşketina wan re ji bêne ser ziman. Her weha ev yek pir girîng e. Piştî demên zayînê, wilo di pêşketinê baweri de zêde pêşketinên mazin nabin. Piştî Nebî Isa re Hz, Muhammed û Manî ji derdikevin, Lê herdu ji, wilo zêde bi wê hizre xwe ye ku anîn ser ziman re, nayêne fahm kirin. Yên ku wan ténine ser ziman ji, wan, li gor nîrx û qalibên ku hene ténine ser ziman. Hz, Muhammed, ku di deme xwe de rast û baş hatibana fahm kirin, dibêt ku ne rojhilata navîn haya iro ewqas ne qancî û ne baş jîn kiriban û ne ji, ew deme weke serdeme navîn(middlelerden) wê jîn kiriban. Wê ji dêla wê serdeme navîn, wê demeke weke deme me, i ro, wê mazin jîn kiriban. Ya rastî, di wê demê de, pir bigihê vê yekê ji mazin û xurt hebû. Lê ew bingîhe wilo baş ne hata bi kar anîn. Zêde ew, bi hizre xwe ye mazin ye ji bo pêşketina civakan ne hata fahmkirin.

Deme ku mirov li herême dimeyzend, di wê demê de, mirov dibîne ku pêşketineke mazin di wê demê de hebû. Ji aliyê aqil û zanebûne ve ji, rasti baş û qanc hatibû fahm kirin. Cuhuti ji, di wê demê de, ji ber ku zêde bersiv neda pêşketinên ku hene, wilo zêde belav nebû. Piştî mesihîti derket. Ew ji haya bi derekê pêşket. Mesihîti ji, ji nîrxên ku ji deme sumeriyân bidest baweriyê kiribû, ne dîr bidest pêşketinê kir. Şivantî, çend ku li ber diclê weke xosletekê herî sereke bû hê, piştî bû xosletekê mesihîyê ji. Ji ber ku hizir, baweri û pergala şivantiyê heya. Nîrxên ku pere têne ser ziman hene. Sumeriyân, Tammuz kiribû şivanakî ku pir mazin ji. Sembola wî ji gîske birih bû. Bi vê yekê mazin bûn bû. Rojhilata navîn, ji ber ku xwediyê şaxsiyaka pir kur û mazin bû û dîrokî bû, wilo zêde, ew pêşketinên ku bûn, têr nedît. Musulmantî weke bersiveke ji vê re bû. Ev yek, wilo zêde ne hata fahm kirin. Ya rastî, ku di serî de baş û qanc hatibana fahm kirin, hingî, wê ew pêşketin û hizre û baweriyaya ku hebû, wê rojhilata navîn, hê di wê de, wê gehanadibana serdemeke weke deme me ye i ro ku em jîn dikin. Lê wilo zêde ev yek ne hata fahm kirin. Li gor hinek, nêzikatiyan hata ser ziman. Hz, Muhammed, ev yek, ti carî, ne xwestibû. Ku i ro ji, saxbana, wê vê yekê, pir mazin rexne kiribana. Mirov barê bêje ku wî rastiya mirov ye li gor jiyânê ye xweza anî ser ziman. Wî mazin û kur anî ser ziman.

Di vir de deme ku me ev yek anî ser ziman, divêt ku ji ber çi weha bû ji, bi çend gotinan bênine ser ziman. Li gor min ev yek pir girîng e. Deme ku mirov wê yekê bidest şirove bike, bawerî weke mijaraka pir mazin derdikeve pêşya me. Di vir de divêt ku em baweriyê baş bi kar bînin. Sumeriyân, di deme xwe de nêzikayak bi pêş xistibû, ew nêzikati ji, her weha bi kar anîna olê di rêveberiyê de. Ev yek, pişt wan re ji hebûna xwe berdewam dike. Ew berdewam kirin, êdî ji wan û bi virde, bi gelek awayên cuda hebûna xwe berdewam dike. Rojhilata navîn, vê yekê pir kur dijî. Rojhilata navîn li gor şaxsiyet û hebûne xwe û pêşketine xwe dijî. Rêveber, li gor wê nêzikatiyê, diviyabû ku ji olê û hizrê ne dîr ban. Li gor olê xwe bi rêxistin ji kiriban. Lê belê, hizrên olê li gor xwe anîna ser ziman, piştî mazin bi pêş dikeve. Ya ku vê nêzikatiyê, her weha dike bingîhê gelek xuruxandinan de ev yeka ya. Ev yek, ji ber vê yekê, pir baş û qanc divêt ku were têgihîştin. Bawerî, ji ber vê yekê, mijaraka pir girîng û sereke ye li rojhilata navîn. Divêt ku

pir mazin û rast û li gor hizre xwe ye rast ye mirovahî were têgihîştin. Divêt ku pir mazin were naskirin. Deme ku hata naskirin û têgihîştin di darbarê wê de çêbû, hingî, wê rastiye wê ji, pir baş û qanc li gor rastiye wê, wê were têgihîştin. Têgihîştin, bixwe ji mijaraka ku di baweriyê de were fahm kirin e. Lê ji aliyê baweriyê ve divêt ku têgihîştin, di nêzikatiyê li wê bixwe de ji baş were fahm kirin. Her weha divêt ku ji du aliyan ve baş û qanc were fahm kirin û têgihîştin.

Sumeriyani, di rêveberiyê de bidest bikaranîna hizre olî kirin. Baweriya xwe, di rêveberiya xwe de, pir mazin baş û bi zane bi kar anîn. Ev yek, di deme wan de bû. Lê piştî wan re, mirov nikarê bêje ku ew bizanebûn bi kar anîn, bû. Ji xaynî wê, divêt ku ev yek baş were têgihîştin. Baweri, ji ber çî, li rojhilat weke "pirsgirêk" hata dîtin û bû. Ev yek, divêt ku mirov ji demên wê yên pêşketinê ji têgihîştine wê û ji bi kar anîna wê dîr neyêne ser ziman. Baweri, i ro ji, nêzikatiyaka rast li xwe dixweze ji mirov. Ev yek, deme ku mirov di têgihîştine wê de kur dibe, hingî, mirov fahm dike û dibîne.

Bêja baweriyê, li gor rastiye xwe, li ber diclê, hebûne berdewam dike. Mirov vê yekê karê bêje. Li ber diclê, baweriya ku heya, ji hîmê xwe ya. Hîmê wê ji, digihê Nebî Nuh. Wî nêzikatiya rastiye baweriye pir baş û mazin daya kifş kirin. Her çend ku bahsa Nebî Nuh tê kirin ji, wilo zêde li ser wî nayê sekinandin. Ne rastiya ji ev yeka ya. Divêt ku mirov bêne ser ziman. Bawerî, deme ku li wir jîn dibe, hingî, li gor rastiya xwe jîn dibe. Rastiya wê û dîrokê wê hebûne pêşketine xwe, li wir mazin dide jîn kirin. Giyana baweriya, li wir, hê ji, li ser xwe ya. Deme ku mirov dicê ber diclê û lê di meyzenê, mirov vê yekê pir baş û qanc fahm dike. Bi vê yekê, em divêt ku roje xwe fahm bikin û têbigihin. Deme ku ev yek bû, hingî, wê rasti ji aliyê mirov ve were têgihîştin.

WEYNE CIZIRE BOTA BI RIHA RE DI DÎROKE HIZIR DE

Pêşketin û afirandina hizir pir girîng e. Dîrokê wê ji wilqasî girîng e, ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman. Têgihîştin û hizrên ku hatina afirandin, di pêşketin û dîroke gelan de cihekî pir mazin di awayê pêşketinê de leyistiya. Deme ku mirov bahsa demên berê bike, hingê, ev yek, bêhtir bi wate dibe. Di demên berê de, hizre ku hata ser ziman, bi têgihîştine de şaristan avakirin. Nexasim vêce ku mirov bahsa ber ava diclê bike. Li ber ava diclê pir hizir hata afirandin. Hertimî û demê hizir hata afirandin. Ew hizirê ku hata afirandin ji, dîrok bi xwe re kifş kir. Dîrok nivîsand. Mirov bi pêş xist. Hizir, bi hebûne xwe re xwediye dîrokekê ya. Ew dîroke wê ji dîroke mirov ye pêşketine wî ya. Deme ku mirov dîroke hizir anî ser ziman, hingî, mirov di wê têgihîştinê de ya, ku mirov dîroke mirov ye pêşketine wî tene ser ziman. Ev yek her weha pir girîng e. Di vir de, emê dîroke hizir pir mazin neyênine ser ziman. Lê bi sereke ji destpêka wê bînine ser ziman. Deme ku me got destpêk, hingî, bêguman; di serê me de naqabîna Diclê û Firatê heya. Ev li vê yekê di hizir in. Em li vanderan di hizir in. Ji ber ku evder, ji destpêka pêşketine mirovahiyê, di hizir de bidest afirandina hizir kiriya, û her afirandine xwe ye ku kiriya ji, pê, mirovahî mazin pêşxistiya. Pêşxistin, bêjeyeke ku ku mirov li ser bisekinê ya. Haya ku newê afirandin, wê pêşxistin nebe. Pêşxistin, pêşketinê di wate xwe de diafirêne. Her weha pêşxistin pir girîng e, ku mirov li ser bisekinê. Ji bo pêşxistinê, hêzek lazim e. Ew hêz ji, hêze mejiya. Ji pêşxistinê re hêze mejî lazim e. Deme ku hêze mejî bû, hingî, pêşxistin wê bibe. Lê pêşxistin, li ser cih awayê bibe, hingî, bi wî awayê ji, wê pergala biafirê. Hizir, bi serê xwe ji, ku mirov bêne ser ziman, mirov karê bêje ku di xwe de xwediye pergala ku were têgihîştin e. Ji vî aliyê ve ji, divêt ku mirov li hizir meyzenê. Hizir, hatina wê ya ser ziman pir girîng e. Em pêşî hinekî li ser hatina wê ya ser ziman bi rawastih in. Ji ber ku ev yek hêja ku pir baş were fahm kirin. Ku têgihîştinek, di vê xalê de bû, hingî, wê afirandi maztir bibe.

Hizir, bi hizirandine mirov re destpê dike. Mirov deme ku bidest hizirandinê dike, pêşî hinek bêjeyan diafirêne. Wan bêjeyên ku di serê xwe de afirandin ji, li dore xwe û jiyane xwe ya ku dijî, lê dimeyzenê û tene ser ziman. Bi vê yekê mirov karê bêje ku di wate û anîna sr ziman de, jiyana heya. Her mirov jiyana û rewşên ku dijî, dike bingihê hizirkirina xwe de. Ev yek bi xwezayî, di jiyana de bi mirov re dibe. Meji, li dore xwe dimeyzenê û diafirêne. Meji, deme ku bidest afirandinê kir, êdî piştê di çerçoveyekê bi pergala de tene ser ziman. Meji, di rastiye de, xwediye ziman û bêşên xwe ye afirandin, fahmkirin û têgihîştinê ya. Mirov, her weha deme ku bidest

afirandinê dike, pêşî dore xwe dibîne. Mirov dore xwe çawa dibîne. Ev bêje her weha hêjaya ku mirov li ser rawastihê û bêne ser ziman. Mirov, deme ku bidest hizirandinê dike, êdî ew dore xwe, ne tenê wilo wilo vala dibîne. Deme hizirkirinê, demeke ku mirov êdî "biaqil dibîne". Gotine biaqil dîtîn, gotinaka ku di nav kurdan de pir bi nav û deng e. Bi zêdeyê ji li herême botanê pir bi nav û deng e. Pir di nav mirovan tê ser ziman. Deme ku li civatên hevdû dûrûniştin, ji hevdû re diaxivin û ténin ser ziman. Piştê ku dibe şev û dirabine ser xwe ku herine mala xwe, êdî piştê, mirovên ku di wê deme rabûne de diaxivin, li ser axftinên ku di deme lev rûniştinê de di nav hev de kirin, diaxivin. Hingî ji, deme ku diaxiftin, ji hevdû re dibêji, "ma tê ne dît ku ku filenkes an ji bêvankes çawa mazin axift". Deme ku wilo hata gotin, hingî, di wê heyemê de ji hevdû re dibêjin ku çawa bi zanebûn ew mirovê ku axiftiya afitin kiriya. Vê yekê ténine ser ziman. Lê divir de û di vê rewşê de, rewşeke bizane ku divêt ku were fahm kirin heya. Ew rewş ji her weha têgihîştinê ku tê ser ziman, wê fahm dikin û li ser wê diaxivin. Ku wan mirovan di deme axiftinê de ji hevdû wilo baş û bi zanebûn fahm ne kiribana, wê wilo mazin ji hevdû re bahsa hevdû ne kiriban.

Ev yek, rastiyaka hizir û radeyaka wê ya ku bûyî têne ser ziman. Ew rade ji, rada ku bûya bixwe ya. Mirov li jiyânê, çawa dibîne û jîn dike, wilo di xwe de wê jiyandinê û dîtîne bi têgihîştin dike. Piştê ku bi têgihîştin kir ji, êdî mejiyê mirov, wê têgihîştinê dike hîm û temenê afirandinê din yên têgihîştine ku bibin di serê mirov de. Di serê mirov de hertimî beşeke ku di afirêne heya. Ew beş ji, deme ku diafirêne, dokumentên wê ji, dîtîn û nerînin ku meji di xwe de qeyd kirine ne. Ew qeydkirin, qeydkirine hevirdor û jiyankirinên ku hatina jiyankirin bixwe ne. Aqil, bixwe, hebûneke mirov ji di xwe de têne ser ziman, deme ku hata ser ziman. Her hizir qarakerê xwediyê xwe ji di xwe de dihawêne. Ev yek, weke rastiyaka gerdûnî ya. Deme ku mirov li hize yekî meyzênd, an ji xwand, mirov piştî xwandinê re, ku mirov bixweze ji û ne xweze ji, mirov ji xwe di pirsê ku ka wê ew rewş an ji bûyarên ku anîne ser ziman jîn kirina. Mejiye mirov dixweze ji mirov ku mirov bi pirsê. Di pirsîne de, mirov di serê xwe de bi hes(hîs) û seh têvdigerihê. Seh, di vir de, hêja ku hinekî were ser ziman. Meji, li ser sehê di xwe de pir di sekinî. Pir wê bi kar têne. Hes ji bi kar têne. Lê sehê pir mazin bi kar têne. Di gelek kifşkirin û têgihîştinan de wê bi kar têne. Li ser sehê, di demên berê de pir nîqaş hatina kirin. Li ser hebûna wê, di qada mengîwerî û pêzewariyê de pir hatiya axiftin. Sehbûn, di xwe de hebûneke têgihîştinê di afirêne. Ew hebûn, di meji de ji lihevkomîbûnên ku bûne pêk têt. Meji, divir de bêguman xwediyê weyneke ku mirov bènîqaş bêne ser ziman e.

Deme ku mirov li ser hizir û hebûne hizir û pêşketinê wê bisekinîn û neçine deme sumeriyân, bêguman wê nebe. Ji ber ku ev di vê yekê de ji xwedî weyn in. Weyne wan pir mazin e. Deme ku mirov di vir de bahsa wan bike, divêt ku mirov birêz û mazin bahsa wan bike. Wan, hizir binirx û têgihîştin kir. Wan pergala hizir pêşî di xwe de piştê di dîroke mirovahiyê de bi afirandinên bi xwe re mayînda kir. Bi vê yekê mirov divêt ku pir mazin bahsa wan bike. Wan, di hizir de deme ku bûna xwedî têgihîştin, êdî bi têgihîştine xwe re, bûne xwediyê kurbûnaka mazin. Ew kurbûn, bi hinek bêjeyan kirin. Ew bêje ji, weke bêjeyên "rasteqîniyê" û hwd. Ev bêjeyên weha, di aslê xwe de di pêşketinê de, bènîqaş xwediyê weyneke mazin in. Di deme sumeriyân de ev yek weha hebû. Wan, hizir mazin afirandin. Lê bi baweriyê, wan, ew pergala xwe ya ku afirandibûn, pê, hize rasteqîniyê ji afirandin û di nav mirovan de dana rûnandin. Bi vê yekê, hem baweriyaya mazin û pîroz kirin û hem ji pergala xwe bi hizir mayînda kirin. Bawerî, di vê yekê de pir mazin xwedî weyn e. Deme ku bahsa wê bike, divêt ku mirov hinekê mazin bahsê bike. Baweriyaya sumeriyân, di xwe de têgihîştineke ku pîrozkirî diafirêne. Ew pîrozî, piştê bi têgihîştin dibe, pişt wê re ji, di afirandinê dibe xwedî weyn. Lê çawa dibe xwedî weyn, ew ji pirseke k nahaka em bersive wê bidin e. Ew hize rasteqîniyê, her weha mazin bi pergala di pergala xwe de afirênin. Bi vê yekê, ew mazin di hizir de bi pêş dikevin. Rasteqîni, deme ku hata afirandin, êdî di têgihîştine pîrozjiyê de ji rewşe nû ye di diafirê. Ew rewş ji, li gor wê jiyân bê afirandin. Li gor têgihîştinê jiyân bê afirandin. Li gor jiyânê wê jiyân çawa bê afirandin. Sumerî di afirênin. Ew biaqil, hize xwe mazin dikin û têgihîştine pîrozjiyê bi pêş dixin û pê ji, hizeke mazin di bin bêjeye rasteqîniyê de diafirênin. Bi vê yekê, jiyana oldarî di nav wan de pêş dikeve. Jiyana oldarî, jiyana sumeriyân bixwe ji, ji astaha û pêvajoyekê têne û dike astak û pêvajoyaka din de. Her weha divêt ku mrov

wê jiyana wan baş fahm bike. Rahibên sumaran pir mazin û pîroz in. Li wan wilo tê meyîzandin. Ew pergalka mazin bi rê ve dibin. Jiyan, çawa dimeşê, wê mirov çawa bijî, di hizir de zagon û riyên wê kifş dikin. Bi vê yekê, weke dewleteke roje me, ye destûrî, dewlete xwe diafirênin sumeri. Ev rewş, di pêşketine wan de, rewşeke nû ya. Di hizir de ji, astaka bilind ye di ya. Wate wê gotinê di hizre sumeriyane de pir mazin e. Divêt ku her weha mirov mazin li ser bisekinê û wê têbigihê.

Ew têgihîştine wan ye ku afirya, di demê de, hê di deme wan de bidest afirandinaka mazin di xwe de dike. Hizre wan êdî di afirê. Sumerî, di deme xwe de di hzire xwe de gehana wê astê ku wêje xwe ji bi afirênin. Jiyan xwe ténine ser ziman. Ev rada, radayaka ku mirov pir li ser bisekinê ya. Ev rada, rada hizir û pêşketine wê û têgihîne wê ya ku heya radixe berçavan. Hizir, di deme wan de mazin pêşketiya. Bi vê yekê re divêt ku em gotineke dinji pêve zêde bikin û bênine ser ziman. Ew ji her weha bi wê pêşketinê re, bi kar anîna hizir, fêrbûne wê, bi wan re mazin heya. Karin, hizir û ramanê xwe bi kar bînin û xwe pê serwer bikin û bidine nîşandin. Bi kar anîna aqil, têgihîştinekê ji ji mirov dixweze. Ev yek, demek bi wan re mazin heya.

Di pergala xwe de, hizre olî mazin di afirênin. Hizre xwe bi pîrozî ténine ser ziman. Bi vê yekê, pişt wan re, mirovên mazin yên ku hizreke pê diafirênin ji, hizre wan ye bi pergala esas digirin û hizre xwe ténine ser ziman. Sumerî, her weha mazin bi hizir in. Ew hizre bi pergala wam mazin e. Pergala wan bi hebûne xwe bixwe ji, di deme afirandinê de hizrekî dide mirovê ku di hizir in. Piştî sumeriyane re hizre wan ji xwe bi wê pergala wan dimêne. Rastî, naskirinê û têgihîştine wê di têgihîştine hizre xwe de dana rûnandin. Felsefe, ku bû xwediyê têgihîştine bêje rastiyê, êdî di pêşketin û têgihîştine xwe de, di astak û radayaka mazin ye jiyânê de ya. Hingî, mirov karê bêje ku têgihîştine jiyânê di xwe de mazin daya rûnandin. Felsefe, mirov nikarê bêje ku bi wan re pêşneketiya. Hizre wê bi wan re bi têgihîştin pêşketiya. Li ber ava diclê û firatê mazin pêşketiya. Afirandina wê ji, mazin çêbû ya. Deme ku mirov li deme sumeriyane dimeyîzenê, mirov dibîne ku astronomî û matematik, geometri pêşketiya. Hijmartina wan pir xurt a. Li gor wê yekê, deme ku di hizir in ji, hizre xwe ji di nivîsênin. Li azmana li gor stêran roj û heyv kifşkirina. Di rêjê de li gor germbûn û ceminadinê, demên rojê ji kifşkirina. Li malên li Rihayê, yên ku weke gilokeke tê gilwer in, ku mirov dimeyîzenê, mirov dibîne ku ew bi çi huner û aqilî çêkirina. Awa û amûrên ku di çêkirinê de bi kar anîna zanîna di wan malan de li berçav e. Li herême **Xirabreşkê, cihê bergkirinê ku berî nahaka bi 12 hezar berê hatiya çêkirina** hata kifşkirin. Mirov ku ne pêşketi bê, wê tapinakaka xwe ye ji bo bergkirinê ava neke. Di wê demê de, ew yek ava kirina û tede berg kirina. Ev yek ji aliyê şaristanîyê ve, di avakirinê pêşketina wan û di têgihîştinê de rada wan dide ber çawan. Di deme olî ye pirxwûdayî de, deme avakirina tapinakan pêvajoyaka nû ye pêşketî ya. Ev pêvajo ji, dide nîşandin ku pêşketine û têgihîştine wan bi ber yek-xwûdabûnê ve dibe û nêzîkî wê demê ji dijîn. Ev yek, weke ancamakê ji vê hizrê derdikeve.

Têgihîştin, di wê deme pir-xwûdayî de, gehaya astaka ku mirov êdî bi têgihîştin e. Li ser xwûdayê xwe bi têgihîştin e Mirovê ku bê bawer ji nema ne. Herkesek bi bawer e. Bi bawerbûna herkesekî, bi hizir û bitêgihîştinê herkesekî bi me dide revakirin. Li ser xwûdayên xwe di nivîsênin û ténine ser ziman, Ev anîna ser ziman, êdî hin bi hin têgihîştine yek-xwûdatiyê bi pêş dixê. Êdî hin bi hin wê ew bi pêş bikeve. Wê êdî pêşketine di têgihîştine, bi ber wir ve herê. Êdî wê yekê herê. Bi vê yekê re, divêt ku em bêjin, ber diclê, di deme sumeriyane de hema bêje wê demê dijî. Piştî sumeriyane re ew dem, êdî bi wan re derdikeve pêş. Deme Nebî Nuh û yek-xwûdati bi hev re diafirê. Nebî Nuh sembolê vê yekê ya. Nebî Nuh, hizre yek-xwûdatiyê tène ser ziman. Piştî wî re, dem ku tê deme Birehim Xelîl, êdî bi tememî mirov karê bêje ku di nav xalkê de pergalka yek-xwûdati afirîya. Birehim Xelîl, tenê dixweze ku wê bi mirovan bide têgihîştin û revakirin. Li ser vê yekê ew dikeve têkoşîna de ji. Deme ku ew dikeve têkoşînê de, hingî, ew xwediyê wê hizrê û baweriyê wê ya. Êdî, pîrozî ji di wê hizrê de bicih bûya. Piştî ku Nebî Musa Ji Mîsrê bazide tê û li diclê weke demeke dirêj dimêne. Li wir, bi birayê xwe harûn re dijî. Ew li wir, wê têgihîştinê bidest dixê. Piştî ku ew wê têgihîştinê bidest dixê, êdî ew diçê û weke wê têgihîştinê dijî. Agir, hingî, ye herî dijwar e. Ji ber vê yekê agir weke sembolê tene nîşandin. Di nava

kurdan de pîrozîya êgir, haya demên nûjen xwe diparezê. Zerdeşt, pêxemberê deme yek-xwûdatiyê ya. Ew ji, hizre, li ser pîrozîya êgir ava dike. Bi Nebî Nûh re deme yek-xwûdatiyê dest pê dike. Bi Birehim Xelîl re ji, deme pir-xwûdati, tê dawîya xwe di wê heyemê de.

Di vir de, divêt ku em ji deme sumerîyan, bahsa êgir, axê û avê û bê bikin. Ev her çar, pir pîroz in. Di bawerîya wan de, mirov ji axê ya. Ew, vê hizre xwe bi temenê dikin di deme xwe de. Li ser pir ténine ser ziman. Li gor wan mirovên ku ne ji axê ji bê ji hene. Weke ku haya i ro ji, di nav kurdan de tê ser ziman, ku mirovên ji bê "acinî" ne. Ew, bi hizre xwe re, dixwezî ku ji herîştê ku di jîyanê de ya û li ber çav e, jê re, vegotinekê bênin. Bi vê yekê, em bêjin, ku wan hewldaya ku jîyanê, ji her aliyê xwe ve bênine ser ziman. Bi vê yekê re, pir serî eşandine. Her rewşê k dibe ji, ji wê re vegotinek an ji sedemek dîtî, weke xosletê wan yê pêşketî ya. "Destana Tufanê" yek ji wan e. Deme ku mirov li ser destana Tufanê di hizirê, mirovê vê yekê kifş dike. Wan ji, li ser bûna tufanê anîna ser ziman û gotina ku "ji ber ku ne başî bû, ev yek xwûdê anî serê mirov. Divêt ku mirov ji vê pir sedeman derxe". Her weha bi vê têgihîştine anîna ser ziman. Bi vê gotinê wan, hewldaya ku rastiyekekê bênine ser ziman. Di serê xwe de ew li rastiye gerahana û ew rastî dîtî e. Ew rast ji, rastiya ku pir mazin e. Di şert û mercên wê demê de, ev rastî kifşkirin, mirov karê weke pêşketineke mazin bêne ser ziman. Her weha ev yek pir girîng e. Di vir de, bi vê yekê re tiştêk ji aliyê têgihîştinê ve, pir mazin û baş tê berçavan. Ew ji her weha hebûne hizir e. Mirov karê wê hizre ku heyê bi ast û rada xwe û hebûne xwe ve weke hebûn û felsefe ku pêşketî bêne ser ziman. Ji ber ku wilo ji ya. Ev bêje rastiya wan her weha têne ser ziman. Di hizir de, ku her weha mazin ne bûban, wê di hizre xwe de di hizirkirine xwe de li rastiye mazin ne gerîya ban. Di vir de, mirov dibêne ku li rastiye gerîn, weke nêzikatiyaka mazin û girîng ye wan tê ber çavan. Ev yek, her weha deme ku mirov dihizrê, mirov kifş dike. Di hizre xwe de, gehana ast radayaka bilind. Di wê ast û radê de xal û pîvanên xwe ji kifşkirina. Li gor wan xal û pîvanan li rastiye digerihih. Xwestine têgihîştin û anîna jîyanê bi hebûne xwe hemikî re weke xwestekeke wan ya hizirî tê berçavan. Di destana Tufanê de ji, xwestine **JI BER ÇI BÛNA Tufanê**, li **RASTIYA WÊ GERÎN** ji, weke xalaka girîng derdikeve pêş. Divêt ku ev yek, her weha were dîtî

û têgihîştin, bi wan re.

Di vir de, bawerî girîng e. bawerî, afrîner e. Di şert û mercên ku wan ji xwe re afirandine û tede dijîn ji, di wê de, bawerîya wan, ji wan re bi wan re diafirîne. Ev yek, deme ku mirov li ser wan di hizirê, mirov kifş dike. Pergala wan, divêt ku mirov weke amcamaka mazin ye pêşketine têgihîştine wan û hizre wan bibîne. her weha ev yek, astaka felsefe wan têne ser ziman. Di şert û mercên xwe de, wêje xwe ji çê dikin. Ev yek, dîde nîşandin ku di hizir de di astaka bilind de ne. Piştî wan re, pêşketinên ku di bin ji, li ser wan pêşketin û têgihîştine wan ye ku heya û ya ku wan nivîsandiya dibe. Wan, jîyana xwe, bi kevneşopî û nîrxên ku xwe yên ku afirne, rijandina nivîsê.

Pişt wan re aqad û babil derdikevin. Ew ji mazin ji derdikevin. Weke ku çawa ku Rêveberîya kurdan bi Medan re têkdiçê û pers têne cihê wan, lê ne bi şer ev yek dibe, her weha mirov karê heman nêzikatiya ji bo wan ji bêne ser ziman ji. Hin şer û pevçûnên ku di wê demê de dibin ji, vê rastiye na guharînen. Ku mirov li ser demên pişt wan re bihizirê, mirov divêt ku demên pişt sumerîyan re di sê bêşan de weke sê pêvajoyan bêne ser ziman, Bêşe pêşî, bi Aqad û Bibiliyan re dibe. Bêşe duyem ji, ji Aqad û Bibiliyan haya(ta) deme Hûrî û Mîtanîyan û ji wan re ji haya deme Naîriyan mirov bi hasibêne. Bêşe sêyem ji, mirov karê dise deme Gûtî û Naîriyan bixe nav de û hata de Medan bêne ser ziman. Her weha ev dem li gor xwe, gelek pêşketinên û afirandinên teybet di xwe de diparezên. Divêt ku mirov baş û qanc kifş bike û bêne ser ziman. Bi vê yekê re, em ji deme yekê dest pê bikin bi sereke haya deme sêyem bênine ser ziman.

Dem 1. Di deme yekê de, pêşketinên ku di deme sumerîyan û berî wan de bûna têne jîn kirin. Aqadî û babilî ji, bi wan nîrx û kevneşopîyan xwe diafirînin û ténine ser ziman. Hizre xwe û rewşê diafirînin. Nivîsandinê di şert û mercên xwe de mazin bi pêş dixin. Metnên(binetar)ên sumerîyan, ew di demên xwe de dibikine bingihê pêşketine xwe de. Ew nivîs û çîrok û dîrokên ku hatîna nivîsandin, di deme wan de bi pîrozî têne pêşwazî kirin. Bi vê yekê re, êdî ew metnên ku hene, weyneke mazin di wan de û demên wan de di leyizin. Aqadî, di deme sumerîyan de, çî hizir bûna di xwe de bicih dikin. Lê aqadî di xwe de hinekî formulasyonên nû di xwe de bi wan

diafirênin. Bi wan afirandinan demên xwe di dine rûniştandin li ser temenê xwe.. Di deme sumeriyana de, hizir pêşketiya. Hizirê, di deme sumeriyana de, gerdûniya di xwe de ji, kifş kiriya. Ew kifş kirin, di hizre wan ye pîroz de cih digirê. Sumeriyana, hê ew hizir, ne kiriya hizreke ku pê di pergala xwe de simset jîn bibin. Lê di têgihîştine wê de ne. Di çerçovê baweriyaya xwe de, ew hizir kifş kirine û di xwe de dana rûniştandin. Sumeriyana, ew hizir, hinekî cuda jîn kirin. di çerçove baweriyê de jîn kirin. Di rêveberiya de ji, di wê çerçovê de hinek anîn ser ziman. Lê ne zêde. Ew anîna wan ye ser ziman ji, tere wan kir ku gelek herêmên ku hene weke bajar-dewletên wan, di bin sihe wê de bidine hevdû. Gelek dana hevdû ji, di wê dana hevdû de, êdf "dewlete sumeriyana" ("Kengîr") ava bû. Sumeriyana bi avakirina, dewlete xwe, her weha mazin dibin. Lê dewlete sumeriyana, ku mirov rastiya wê bêne ser ziman, di pêşketin û awayê xwe ku heye de, ji dewleteke roje me weke ne cudatira. Her weha deme ku mirov lê dimeyizenê, mirov kifş dike.

Ew hizre wan ye gerdûnî, wan di wê cihana ku wan di hundurê baweriyaya xwe de çêkiribû de bû. Ji di demên wan yên dawiyê de, êdf ew gerdûnî, ji wê cihana wan barî cihana wan ye rast dike. Êdf di wir de bidest jîn kirine dike. Lê sumeri, di wê demê wilo zêde jîn nakin. Lê Aqadî wê yê jîn dikin. Wê jînkirinê weke kifşeke xwe ye ku di şertû mercên xwe de kirine jîn dikin. Bi vê jînkirinê, mirov karê bêje ku rewşê Aqadiyana ji ye deme sumeriyana cudatira. Aqadî, bi wê hizrê, weke împaratoriya mazin ye demên piştê hebûne xwe diafirêne û jîn dike. Bi vê jînkirinê, êdf jiyana xwe û hebûne xwe ber dewam dike. Di deme sumeriyana de, baweriyên ku hene ji, li gor wan awa distênin. Li gor wan êdf jîn dibin. Baweri, di deme sumeriyana de bi pergala bûya. Bi vê yekê mirov karê bêje ku aqadî ji û hêzên ku pişt wan re ji li herême de afirin, li ser wê pergale dirûnihin. Bi wê jîn dibin. Wê, ku bi çend gotinên jev cuda heka ténine ser ziman ji, lê wilo zêde mirov nikarê bêje ku cudatî û guharaninên mazin tede dikin û jîn dikin. Di deme sumeriyana de, hizir bicih e. Metafizîke sumeriyana di hizre de pir mazin adilî rûniştîya. Bi wê adilî rûniştinê ji, êdf jînkirin dibe. Ew, metafizîke wan, rastiya wan û hizre wan bi pergala di xwe de anîya ser ziman. Aqadî bi wê jîn dibin. Bi wê hebûne xwe ber dewam dikin. Aqadî bi vê yekê, mirov karê bêje ku weke demeke pêşketi ye sumerana hebûne ber dewam dikin.

Di awayê hizrê de ji, mirov karê hinek tiştan bêne ser ziman û vebêje. Di deme Aqadiyana de, hizir bi hizre ku hati nivîsandin û ye di hata nivîsandin mazin pêşketibû. Di astaka mazin de bû. Deme Aqadiyana mirov karê bêje ku di qada hizir de xwediye felsefeyeke xas û saf bûn. Wan felsefe dikir. Jiyana wan, di felsefe hata ser ziman. Nirx û kevneşopiyên wan hatina ser ziman. Demên ku ew jîn bûn, weke demên sereke bûn, ji bo wan. Wan, deme sumeriyana hem di hizir û hem ji di rêveberiyê de gihandine astaka bilind. Ji ber vê yekê ji dewlete sumeriyana re nayê gotin împaratoriya sumeriyana, lê tê gotin împaratoriya aqadiyana. Her weha ew bêje, bi gotin û anîniya xwe ye li ser ziman re, ast û radayaka ku di pêvajoyê de dem bi dem bûyî tene ser ziman. Aqadî, her weha mazin jîn dibin. Lê weke ku sumeri bêjin ew dem deme me ye. Careka din, piştî Aqadiyana re demeke wan dibe û jîn dikin. Ew dem ji, piştî bûn û pêşketine Aqadiyana re dibe. Li ser wê demê re, weke 2 sadsalf jîn dikin. Piştê demên hûrî û mîtaniyana wê werin û wê êdf demên nû nû di pêşketinê de jîn bibin. Lê di wê demê de, di deme aqadiyana de pişt wan re weke demên devrûdayîm demên babiliyana ji jîn dibin. Babilî, hinekî df ew asta sumeriyana ya ku bi Aqadiyana re hinekî df mazin bûyî mazitir dikin. Wê hinekî df ji mazin jîn dikin. Ew ji, weke Aqadiyana di asta Împaratoriye de jîn dikin. Di deme wan de ji, hizir, di herêmê de hinekî pêş dikeve. Pêşketin mazitir dibe. Jiyana bitêgihîştin dibe. Serweri, weke bêjeyeke mazin ku mirov xwe bigihênîyê de di jiyana de bicih dibe. Ji ber vê yekê mazin bûn hizre wê diafirê. Babilî, di serî de hinek xosletên cuda didine nişandin. Hinek xosletên weke ji herêmên asya yên pergala "qast"îtiyê didine nişandin. Lê di demên xwe yên din yên jiyana de wan di buhurênin û bitememî weke herêmê jîn dibin. Hammurabi, weke ku ji herdu herêman çand û hizreke di nav hevdû de dihûnê û pê zagonên xwe dinivîsêne. Ew, serûbinbûna jev cudabûn, ya di zagonên hammurabi de wilo vekirî û mazin di zagonên ti keyên herêmî yên din de xuya nakin. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku cudabûnaka mazin weke ku xwe dide ber çavan. Hammurabi bi nivîsandina zagonên xwe û ji yazdanê xwe re pêşkeşkirin ji, wan zagonên wî dike bingeh di jiyana de. Lê, ji gelek aliyan ve,

hinek xosletên ku di zagonên wî de hene ji, ne weke kevnepîya herême ye ku heya ne. Ev yek, her weha xwe dide ber çavan.

Lê ji deme sumeriyânû hata deme aqad û Babiliyan, mirov karê bêje ku pir mazin pêşketineke mazin di hizir de dibê. Di hizir de pir mazin pêşketineke mazin heya. Ji deme sumeriyân û haya dawîye demên Aqad û Babiliyan, bi vî awayê ku me bi hammurabî re anî ser ziman, li herêmê du çand û nêzikatiyê diafirin. Ev herdu çand û nêzikati ji, wê di demên piştê weke ku Birehim Xelîl ji, li ber nemrut rabû û şer kir, wê wilo di hin awayên din de ji xwe bide nişandin li berçavan.

Dem 2. Di deme duyemin de, hizir û baweri ji ku di nav de, pêşketinên nû, weke pêvajoyên nû jîn dikin. Jiyan, her weha bi hizir û pêşketine wê dikeve deme nû de. Deme Hûrî û mîtaniyan, mirov şirove bike, divêt ku mirov di serî de bêje ku deme ku deme aqil di xwe de ji dike ya. Her weha mirov karê bi rehetî bêne ser ziman. Hê di deme sumeriyân de, di deme Urukîyan de û wan de, ku hinekî ji wan bi wirde ji, hizre Nebî Nuh derdikeve hole. Bi nebî Nuh re demeke nû ji her aliyê ve dest pê dike. Ya rastî, divêt ku di vir de em kifşeke girîng û bikin. Ew ji her weha ew ê. Bi Nebî Nuh re pêvajoya aqil xwe daya dest pê kirin. Pêşketin û pêvajoyên ku pişt wî re û deme wî re jîn dibin ji, yên ku ji pêşketinên di aqil de ne dîr in. Vê yekê divêt ku mirov di vir de di serî de kifş bike û bi vê yekê pêvajoya duyemin bêne ser ziman. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku êdî mirov deme aqil jîn dikin.

Deme Hûrî û mîtaniyan li ber Cizîre bota ji şaq dike û pêş dikeve. Deme mîtaniyan, ji cizîre bota hata ku digihê Nîsêbîn û Rihayê ji, sînorê xwe mazin û fireh dike. Hata bi Zagrosan ji diçê. Dem, piştî deme sumeriyân re bi Aqad û Babiliyan re bi împaratorî berberdewam kirina, êdî her weha bi mîtani û hûriyan re wilo hebûne xwe berdewam dike. Deme împaratoriyê, demeke aqil e. Aqil, nebe û pêşnekeve, wê ew dem ji pêşnekeve. Divêt ku mirov vê yekê, her weha di vir de kifş bike. Aqil, zanebûnê mazin dike. Têgihîştine mazin dike. Mirov ji, li gor wê zanebûne û têgihîştine xwe tevdigerihê. Di wê demê de ji her weha ev yek wilo ya. Ji deme Aqad û babiliyan haya ku mirovahî tê deme mîtaniyan, ku di naqabîna Nîsêbîn û Rihayê de û car bi car haya bi Amed û aliyê serhadê ve ji sînorê xwe mazin dike û xwe digihêne Cizîre bota ji, demên Xanedanên Ur'an dest pê dikin. Ev demên wan, divêt ku mirov pir mazin bi zanebûn bêne ser ziman. Hizire ku mazin bûyî û têgihîştin mazin çêkiriya, wan di şert û mercên xwe de gihandina astaka 'statuqûtiyê' ji. Ev yek, tişteki dide nişandin. Ev tişte ji her weha demên hizir yên aqil ku afirî ne. Biaqil, ew aqilê xwe li gor şert û mercên xwe diafirênin û li gor wê, rêveberiya xwe ava dikin. Bi vê yekê, di naqabîna baweri û rêvberiyê de, di deme xwe de NÊZİKATIYAKA BI AQIL diafirênin. Ev yek, ew statuqûya wan ye bi rêveberiyê pêdikeve tene ser ziman. Bi vê yekê malbatîti, çawa di rêveberiyê de cih digirê, wan ev yek bi pêşketin û pêvajoyên ku jîn kirina dana nişandin. Sumeriyân destpêka vê yekê kir. Lê sumeriyân piştî deme Aqadan re di deme xwe ye duyemin de ev yek bi têgihîştin jîn kirin. Lê dirêj jîn nebûn. Lê jîn ji bûn. Pişt wan re, di deme Aqad û babibliyan de hinekî wê nêzikatiyê hebûne xwe berdewam kir. Dîse ew jiyankirina wan esas hata girtin. Lê yê ku bi vê yekê bi nav "xanadantiyê" nav dan Ur bûn. Uran, jiyana xanadantiyê pêşxistin. Jiyan xanadantiyê, hebûne rêvebertiyê li ser aqil û vacê xwe dide rûnandin. Di her demên piştê de ev yek bû. Lê deme ku dem tê deme Hûrî û mîtaniyan, ev nêzikatî, ku ji holê ne rabê ji weke ku ne li berçav bê tê xuyakirin. Ew ji di nav xwe û demên xwe de vê yekê jîn dikin. Lê bi awayekê cuda ew jîn dikin.

Di deme Mîtaniyan de hizir û bawerî, ye deme aqil e û li gor wê demê pêşketinên xwe di deme xwe de jîn dikin. Mîtani, cihê wan herême botanê ya. Herêmê botanê bixwe ya. Ew navende wan herême botanê ya. Di deme wan de ku herême botanê, ku mirov weke tê zanîn di nav sînorê Kurdistanê de ku bakûr başûrê rojava ji di nav de dihatê hasibandin. Navend ji, Cizîre bota bû. Cizîre bota, Gûtîyan ji Cizîre bota re, navê "gerzûbaqarta" bikar dianîn. Ji xwe re kiribû bûbana navned ji. An ji, ku mirov bi bêjeyeke roje me bêje kiribûbûna paytaxt ji xwe re. Pirca belek û kelehe wê, ji deme wan maya haya roje me.

Cizîre bota, ji ber ku bibe navend ji gelek aliyên ve girîngiyê wê û xosletên wê hebûn. Li gor her hêzê demê, cihêkî pir girîng bû. Kijên hêz ku serwerî wêderê bûbana, weke ku serwerî herême dore wê ji hemûkî bûban dihatê berçavan. Bi vê yekê, mirov karê karê bêne ser ziman. Wekî di ji li

ber Dicle bû. Yê ku serwerî wêderê bana, serwertî li wir ji dikir. Xosletekî wê yê din ji Nebî Nuh li wir bû û ew li wir jîn bûbû. Hizre Nebî Nuh, pişt wî re, hertimî li dore wî û li wê herême mirov dida hevdû. Hîmê baweriyê li wir dihata avêtin. Ji xwe, berî hingî, hîmê baweriyê wî avêtibû. Pişt wî re kî derketibana, ew esas digirt. Li herême ku navê weke pêxember dihata ser ziman û iro ji di nav kurdan de pir bahsa wan tê kirin û pir têne nasîn, pêxember Salih û lut ji jîn bûbûn. Ew ji li wê herême jîn bûbûn. Ew ji, li wir bi hizre xwe mazin bûbûn. Pişt wan re Birehim Xelil tê. Ew ji li wir e. Ew ji li herême botanê tê hasibandin. Ew ji Rihayê ya. Wê demê jê re di gotin "Kelden-Ur". Her weha mirov karê bêne ser ziman. Her weha anîna meye ser ziman, pêvajoya têgihîştinê bi xwe re têne ser ziman. Lê pêvajoya têgihîştine ye ku bîaqil û bideme aqil bi pêş dikeve tê ser ziman. Mîtanî ji û Hûrî ji dewletên wê demê ne. Asur ji mirov karê weke ye wê demê bêne ser ziman. Weke ye deme aqil bêne ser ziman. Kêvalbar û binetarên ji deme wan, vê yekê pir baş radixine berçavan. Di wan demên de pêşketinên ku dibin hemû ji bi aqil in. Weke ku di nav Mîtanîya de heya di nav Hûrîyan de "Civakîti" pir pêşketî ya. Ew ji, wilo jîn dibin. Ew, di deme xwe de pir mazin jîn dibin. Bi hêzeke mazin jîn dibin. Hizre wan ji pêşketiya. Wan di deme xwe de di qasrên xwe de ji xwe "pirtûkxane" ji ava kirina. Ev yek pêşketina wan pir mazin dide nîşandin û radixe berçavan. Xosletê rêveberîye wan ye împaratorî ji, weke ye Medan bi komfederalî ya. Wilo tê ber çavan. Di nav wan bixwe de ji, ev nêzikati, di şer de ya. Ji deme uran ve, pêvajoyaka xanadanî û statûqûçû pêş dikeve. Ev herdû nêzikati, di deme wan de di şer de ne. Lê ew bîaqil zanîn ku wê çawa bi rê ve bin. Di vir de divêt ku em aqilê wan taqdir bikin. Pêşketine wan taqdir bikin.

Deme hûrî û Mîtanîyan, di dawiya wê de ku hinek şer ji rû didin, lê mirov nikarê bêje ku ew şer di wê astê de ku wê wan dine ardê. Lê di demê de hêze wan kêmkir. Lê ew zanîn ku wê hêze xwe çawa bidine berdewam kirin. Li herême Asurî ji hene û bi hev re zanîn ku jîn bibin. Zanîn ku desthilatdariya bi parêzên, Ev herdû hêz, hêzne jev cuda ne. Lê bi hev re weke ku yek bin di nêzikatiyaka komfederalî de jîn dibin. Ev nêzikatiî haya deme Naîriyan berdewam dikin. Hinek şerên ku rû didin ji, vê nêzikatiyê, xira nakin. Demên Gûtî û Naîriyan demne ku mirov pir li ser bi sekinê ne. Ew dem, wilo zêde haya nahaka nahatiya fahm kirin û pêşketinên wê ne hatina têgihîştin. Ew dem, pir girîng e. Li gor me, ku ew dem baş were fahm kirin, wê di roje me de ji pir nêzikatiî û pêşketinan ronî bike. Her weha pir girîng e. Ew dem, divêt ku were fahm kirin. Ew dem, piştî demên sumerîyan, weke demeke antikî ya herême ya. Gelek hizrên ku di deme wan de diafirîn barî anatolia tê kirin. Bi vê yekê, mirov karê demên Gûtî û Naîriyan weke ji rêze pirtûkeka ku pirtûka dawiya rêzê bê û demên pêşiya xwe di xwe de sentez bike ne. Ew dem, demne sentez in. Ji aliyê hizir ve ev yek wilo ya. Ji deme sumerîyan haya wê demê, metafîzîk mazin li jîyanê serwer e. Lê di wê demê de, hinek hizrên ku dêla metafîzîk bigirin diafirin. Di deme sumerîyan de hatiya kifşkirin ku di jîyanê de hertişt bi hev ve girêdayî ya. Naîrî, vê nêzikatiyê di hizir de di hizre deme aqil de didine rûnandin. Her weha weyneke wan di pêvajoyên pêşketinê de heya. Demên Gûtî û Naîriyan demne ku mirov pir li ser rawastihê ne. Pir ji aliyê hizir û pêşketine wê ve li ser bisekinê ya. Di demên Gûtî û Naîriyan de, hinekî şerê desthilatadiyê pir mazin dibin. Hêzên ku diçine ser wan pir hene. Lê ti hêz nikarina wan, Ji aliyê mîraniya xwe ve temem in. Di deme wan de, pergala wan yek ku ava ye ji, xwediyê hinek xosletên teybet e. Her herême xwediyê keyê xwe ya. Ew, weke ku haya nahaka ji di nav kurdan de tê gotin, ji wan keyan re di gotin "mîr". Mîr, wateyaka xwe ya din ji keyiti ya. Her mîr, xwediyê qasra xwe bû û li ser serê herême xwe bû. Baweriyaka mazin li wir û aqilê wê û mîraniya wî hebû. Lê weke ku me di ji bo deme Hûrî û Mîtanîyan anî ser ziman, dise Cizîre bota ji bo wan re weke navendeke mazin û pîroz bû. Mîrê wir, yanê keyê wir, ser hemû keyan re bû. Hêze wî ji mazin bû. Ku wî ji kê xwestibana ku ji bo wê şerbikin, jê re ne digotin ne. Herkesekî jê re digot erê. Naîrî ji sadsala 13 min haya sadsala 8 min li ser, nêzîki 500 salî deme wan haya li herême. Ew di deme xwe de di 300 salê pêşî pir bi serwerî û mazin û weke demeke xwe zêr jîn dikin. Lê piştê ji demên 1128 pêde, demeke nû ji bo wan ji wan re dest pê dike. Hatina asurîyan li ser wan heya. Di wê hatinê de, weke 50 salakî li gelek herêman şerên herêmi di naqabîna keyên herêmi û asurîyan de şer dibin. Ev şerên ku dibin, hin bi hin we ji hêzê ji dike û kal dike. Piştê di sala 1128an de

şerekeê mazin di nava wan û asuriyan de dibe û ew şer winda dikin. Ew windakirin, ji wan re demne bindestiyê têne. Di wî şerî de tê gotin 43 keyên Naîriyan ji aliyê Asuriyan de dil têne girtin û piştê di berdêla bêşan de diberdin. Ji sala 1128 haya sadsala 8 di bindestiyê de dimeşe. Piştê, ji sadsala 8 min ku demin ji deme 1128an yê piştê ji di nav de bi têkoşîna bi asuriyan re diçe. Di sadsala 7 wan de dise li serê xwe serwer dibin û asuriyan, serweriyan dawiyê lê tînin.

Ev dem, her weha divêt ku mirov ne tenê ji vî alî ve, ji aliyê hizir ve ji mazin fahm bike. Ew dem, deme ku weke demeke pêşketiya li herême. Bandûra wê deme naîriyan, li demên pêşketinê yê herême pir dibe. Zanistanên naîriyan pir hene. Ew ji zanistvanên wan weke yê hûrî û mîtanîyan û berî wan yê sumerîyan, weke helbestvanan bûn. Di civatan de li hevdu dirûniştin û bi hev re ji hev re divegotin. Zanistvanên wan, an ji mirov bi navekî din ji bêje helbestvanên wan, mirovên ku bi bawer bûn. Deme ku hizre dianîne ser ziman ji, bi bawerî û biaqil dianîna ser ziman. Wan aqil di pergala olî de û pêre ji di pergala baweriyê de pir mazin pêşxistin. Li gor demê, wan pêşxistineke mazin têde çêkir. Bi vê yekê, mirov divêt ku bi rêzeke ku ji wan re bide nîşandin

weyne	wan	bêne	ser	ziman...
-------	-----	------	-----	----------

Dem 3. Deme sêyem ji ku mirov lê dimeyîzenê, mirov pir demeke ku pêşketin têde hatina afirandin û weke deme ku pêşketî dibîne. Di deme sêyem de, ji aliyê hizir û baweriyê ve, hizir û hîmê baweriyê, berî hingî hatiya avêtin. Ya rastî mirov karê wî hîmî bibe haya deme Nebî Nuh. Ji ber ku ew, hizre ku wî afirandiya û anîya ser ziman, di nav xalkê de cih girtiya. Bi jiyana wî re, hizre wî di nav xalkan de bicih bûya. Jiyana qancan hertimî di bîran de dimêne. Ev yek ji, weke xosletekî pêşketinê ye van ardan e. Deme ku mirov dimeyîzenê, mirov vê yekê pir baş û qanc dibîne. Ji jiyana wan, her tiştên ku jîn kirina, ji her alî ve tê zanîn û ser ziman. Piştî Nebî Nuh re ji, Birehim Xelîl ji her weha ya. Jiyana wî ji wilo ya. Jiyana wî ji tê zanîn. Ew pêxemberê hizre ku berî wî Nebî Nuh têde nebîti kir û piştê têde nemir bû. Nebîti, bêjeyeke di çand û kevneşopîye kurdan de felsefê ya. Ev jiyana, jiyana ku biaqil bû. Di vir de, em gotinaka ku hertimî tê gotin bêne ser ziman. herkesekê berî me anîya ser ziman. Deme ku bahsa felsefê û aqil û pêşketinê wê tê kirin, demên berê zayîne yê di gotinê naçina haya 1000 salî ji tînine ser ziman. Lê Nebî Nuh ne di ber zayîne di 1000 salî d jîn bûya. Ew haya bi sê an ji çar hezar salan diçe, deme ku ew têde jîn bûya. Bi vê yekê ve mirov girêdayî, em tiştêkî di ji bînine ser ziman. Hizre ku wî mirovê mazin Nebî Nuh anîya ser ziman, di demên Aqil yê haya roje ne de tîne ser ziman. Bi vê yekê, mirov çawa karê bêje ku demên aqil, yanî yê vacê di wan deman de dest pê kirina? Ev ji pirseke ku mirov ji gelek aliyan ve wî bi bersiv bike ya.

Bi vê yekê, em deme wî ya pişt wî re bînine ser ziman. Ji ber ku deme wê bingîhê demên pişt wî re kiriya. Wê deme wê, demên pişt xwe re bi hizre xwe re afirandina. Ji ber vê yekê, hem deme wê û hem ji hizre wî û hem ji ew bixwe ji bi jiyana xwe re pir girîng e. Wî çi û çawa jîn kir? Ew pirseke tîne ya. Lê ev pirse tîne ji, gelek bersivan ji dêla bersivêkê ji mirov di anîna ser ziman ye wê de dixweze. Bi vê yekê, divêt ku em bêjin, deme ku em wî tînine ser ziman, em di wê tîgîhiştinê de ne, ku em çi û kî û çawa tînine ser ziman. Bi vê yekê re, em dise bêjin, em zanîn ku tiştêkî çend girîng û mazin em tînine ser ziman.

Demên pêşketinê yê piştî demên Hûriyan, Mîtanîyan, Gûtîyan û Naîriyan, demên ku mirov di deme aqil de bînine ser ziman in. Bi vê yekê, em deme ku bînine ser ziman, ew deme aqil çawa dest pê kiriya û kî û kîjan aqilî pêşengti jê re kiriya, divêt ku mirov bêne ser ziman. Bi vê yekê û nehtê Nebî Nuh tê ser ziman. Wî ne tenê di deme xwe de di demên pişt xwe re ji bi nêzikatiya aqil ye ku anî ser ziman pêşengti kiriya. Bi vê yekê, deme ku wî tînine ser ziman û hizir û demên pêşketine hizir tînine ser ziman, em zanin ku em wan demên ku hizrê wî bi nêzikatiya xwe di bingeh de ye, tînine ser ziman. Ev yek, her weha girîng e. Nebî Nuh li cihê ku lê jîn bûya hatiya bicih kirin. Piştî ku koçî jiyana din ji kiriya, ji cihê wî nehatiya vaqatandin. Ew hê ji, nahaka ji, li cizîre botan e. Tirbe wî li wir e. Piştî wî re, ewder ji gelek pêşketinên hizirî û rêveberî re dibe weke navenghaka mazin ye demên buhurandî. Piştî wî re, yê weke ku alimên olî tînine ser ziman, pêxember û weke zanîstên deme ne tînine ser ziman filozof in, ku pêxember in, nebî Salih, nebî Lut û Birehim xalîl derdikevin. Ew mirov, di rastiya xwe de, filozofên wê nêzikatiya wê ya hizir in ji. Her weha divêt ku mirov bêne ser ziman. Ev aliyekî anîna ser ziman e. Bi vî aliyê ku em

weha ténine ser ziman, em dixwezin bêjin ku ew hê ji di jyanê de bi hizre xwe û nêzikatiyên xwe hene. Bi vê gotinê re, em her weha tiştêkî din ji bi hizir ténine ser ziman, Ew ji her weha kifşkirina wan ye demên xwe û demên pişt xwere ya. Ew mirovên ku me navên wan anîn ser ziman, wan demên xwe û yên pişt xwe re bi hzire xwe re kifşkirin. Wan hizreke mazin bi aqil anî ser ziman. Gotina "biaqil" ji demên berê ve di nav kurdan de weke gotinaka xalkê ténine ser ziman. Di demên berê de, yanî di demên wan mirovên ku me anî ser ziman de, mirovên ku nêzikatiyaka bêaqilî dabana nişandin, ku di gotinê de "bêaqiliyê neke". Her weha ev gotin, piştêre ji, di devê xalkê de dimêne û hatahata dimêne. Hê ji, ku yek, şaiyekê dike, dibêjine de, "bêaqiliyê nek" an ji "bêaqiliyê neke". Her weha ev gotinaka ku ji wan re diman maya û mirov dixweze ku bikişêne ser rîya rast, ku di riyaka narast de bê.

Piştî Deme Nebî Nuh re, Li herême, Salih û lut û Birehim Xelîl dirabin û derdikevin. Hin mirovên din ji dedikevin, Yên weke Nebî Suleyman. Ew ji pir tê ser ziman û bahsa wî tê kirin. ew ji mirovekî ku mazin bû û piştêre di wê hizrê û baweriyê de pîrozî hilda. Weha, weke wan Yakup û Yusuf ji hene. Ev mirovm mirovên ku di vê qadê û astê de mazin bûna û navê wan derketiya na. Yên ku navê wan heya na. Di nav xalkê de, bi mirovan ve girêdayî kevnêşopîyek bi hizir tê ser ziman. Ew hizre ku bi wan re tê sr ziman ji, di nav xalkê de, ne tenê hizreke ku mirov bêje weke hizre mirovekî an ji mirovekî filozof e. Van mirovan û mirovên weke van hizreke mazin afirandîya. Hizre wan, demên hizir û pêşketine hizir di her awayê de kifşkirîya. Hizre wan bûya Hizre rêveberên mazin. Bi vê yekê ji, mana. Lê ew hertimî di nav xalkê de li ser lingan mana. Çandaka van ardan heya ku mirov biqancî û rastiya xwe re hertimî li ser zimanan e. ew ti carî nayêne ji bir kirin. Bi wan hizir tê afirandin. Di civatan de li ser gotin têne vegotin û kilem têne afirandin. Di vir de, mirov bi wê dengbêjiye ku di nav kurdan haya iro ji hebûna xwe parastîya û hatiya, bi wê, mirov di civatan de nemir bûna.

Di demên aqil de, piştî Birehim xelîl, Nebî Musa ji derdikeve. Ew ji deme ku ji misrê kevn diravê û tê berdiclê û li wir demeke dirêj bicih dibe. Çand û bawerîya wan mirovan dibîne û nas dike. Di nav wan de xwe perwerde ji dike. Di demên xwe yên piştêre de, mirov karê bêje ku dibe yekî weke yek ji wan.. Her weha xwe diafirêne. Di wê demê de li wir, agir pîroz e. herkesek rastiye ji êgir di bihîze û tède dibîne. Her weha rewşek ji heya. Lê li Misrê kevn ne wilo ya. Li misrê Firawun hene. Ew xwe dikine dewse xwûdê de ji. Bi vê yekê firsandê nadina ti rastî û pêşketinî din, ji ya xwe pê ve. Şerê ku li misrê di naqabîna çanda Aton û amon de ji ku mirov li berçav bigirê, mirov karê bêje ku ew çend ku xwe dikine dewse xwûdê de ji, ew bi vê yekê hevdû ji erê nakin. Şerê wan, bi vê yekê ne bi dore wan têne re ya. Bihev re ji heya. Di wê rewşê de Nebî Musa ji li berdiclê mazin dibe û piştêre diçê Misrê kevn. Li wir bi wê çanda frawûnan re ji di keve şer de. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku di şaxsiyeta Nebî Musa de û bi wê nêzikatiya ku ew li ber firawûnan die nişandin, Ne tenê çanda kevn û ye nû bi hev re di şer de ya. Ji xaynî wê ji, çanda berdiclê ye Nebî Nuh û ye wê çanda firawûn ji di kevnê şer de bi hev re di wê demê de. Her weha rewşek heya. Di vê yekê de, rastiya mazin ye ku heya divêt ku mirov kifş bike. Ew ji her weha, deme aqil û şerbûna wê bidemên berî xwe re ya. Ev yek ji, vê nêzikatiyê de tê ser ziman. Piştêre ku Nebî Musa derdikeve, ew dixwezê ku xalkê xwe bi xwe re bêne ji wir. Anîna wan ye ji wir, armanca wê têne ji zilme Firawûn wan xilas bike ya. Lê wî bixwe ji çandaka di dîtiya û pê demeke dirêj mazin bûya. Dixwezê xalkê ne ji wê çanda dîr bide jîn kirim. Ev yek ji, heya. Çanda û hizre berdiclê pir mazin û kur e. Pir tê ser ziman. Ya rastî ku mirov bêje, çanda firawûnan ji, ye wê çandê, lê ye berê wan deman e. Êdî ew çand nayê jîn kirin. Ew çand tê mehkum kirin. Lê ew hê jîn dikin. Bi vê yekê, êdî şerbûna wan bi deme wan re çêdibe. Nebî Musa mirovê ku wê yekê dibîne ya. Ew bi serê xwe mirovekî birahnî ya. Wî piştî wê deme ku wî ji misrê kevn bazdayî, pêve, wî xwe pir mazin perwerde kirîya. Dixwanê û di nivîsêne..

Piştî wê demê re, êdî demên nû dest pê dikin. Piştêre Nebî Musa ji hizre xwe têne ser ziman. Hizre wî tê zanîn. Bi zanîna hizre wî re ji, êdî li herême pêşketinên nû yên bi hizir rû didin. demên hizir ji yên ku xalk weke ji nû ve werine perwerdekirin, bi nêzikatiyaka nû pêş dikevin. Piştî Nebî Musa re herêm hinekî din, ji pêş dikeve. Berî zayînê bi hin bi hin di pêşketine xwe de dengdana rojava ji di sadsalên 7 min û wan de dest pê dike. Piştêre ne bi gelekî re Anatolia pêş dikeve.

anatolia berî zayîne di sadsalên 12 wan pêde êdf hin b hin dengê xwe dide. Gelek mirovên ku têne berdiclê û berfiratê û li wanderan perwerde dibînin derdikevin û piştê ew ji, herêmên xwe bi hizir dikin. Homeros, di wê demê de ne bi gelekî re piştê yê ku her weha xwe mazin kiriya ya. Pişt wî re di qada felsefê de Thales weke wî dike. Thales li Medya demeke dirêj xwe perwerde dike, li cem key.. Di hizire ber diclê agir, av, ax û ba pîroz in û weke hîm û temenê jîyanê têne afirandin. Jîyan û mirov ji van her çar tiştan çêbû ya. Her weha tê bawer kirin. Thales ji, vê baweriyê di xwe de bicih dike û piştê li cihê xwe ji belav dike. Her weha êdf hin bi hin pêşketineke ku mirov leze wê bi awayekî geometrikî bêne ser ziman bidest jîyanê dike. Êdf piştê, hin bi hin rojava bidest pêşketinê dike. Dem bi dem bi pêş dikeve. Lê di wê pêşketinê de, çend ku rojava, rojhilat kifş dike, êdf bidest êrişkirinên mazin yên ku lê dike, dike. Di deme ku Uratû jîn dibûn, ku êriş herêmên dore aqbatanê kiribûn, li hin cihan dest danîbûbûna ser peykel(hêkel)ên xwûdayên wan û ji xwe re biribûn. Heman nêzîkati, di wan êrişên rojava yên li rojhilat de ji cih bi cih pêk tîn. Gelek û war têne xirakirin ji. Gelek pêşketine têne ji dîrokê birin ji. Tenê ji aliyê Theodosius ve di 379an de û pişt wî re di demê Julius Caser ve di 47ande di du caran pirtûkxana îskenderiya hemûkî û çî tède heya hata şawitandin. Her weha bi hewldanên weha êdf hin bi hin rojhilat weke mejîye xwe winda bike lê tê û êdf hin bi hin tê diçe. Winda bûn dest pê dike. Di demên piştê de ji, bêguman pêşketinne mazin jîn dibin. Lê her weha ev rewşên ku dibin, û rewşên weke van rewşan yên dibin, êdf mohra xwe li demên piştê dixê. Bi vê yekê êdf wilo zêde rojhilat xwe nade berçavan. Demne zor û ne baş di buhurêne. Ber diclê, car bi car rastî îşkal û bindestkirina têt. Di wê navberê de, êdf pêşketine di hizir de mazin dernekeve. Hin bi hin pêşketine statûqû parêziya hêzên herême ji, pêşketinên ku wê derkevin û hîmên ku ji pêşketinê re hene ji, ji hole dirake. Ev ji hole rakirin, piştê, wê amcamên xwe dabana nişandin. Hin bi hin wê di ne pêşketine û li şûn mana herême de wê xwe dabana nişandin. Her wehe wê xwe anîbana ser ziman di demên piştê de, di dîroke xwe de..

Herêm, piştî ku her weha van pêşvaniyan jîn dike, êdf hin bi hin, di xwe de li riyaka pêşketine xwe digerihe. Herêm vê yekê weke hîs dike. Weke ku dibîne û fahm dike, tiştên ku dibin û têne kirin. Li herême bixwe ji hewldanak bi zanist û hizirvanên wê re heya. Lê piştî waqas kirinan, êdf ew hewldana wan, êdf bi ser nakeve. Di serî de herêm di şaxsê rêveberên xwe yên herêmî de winda dike. Piştê di dîroke xwe de bi li şûn manê re êdf winda dike. Li berdiclê, pêşketinên ku hene, zû bi zû ji hole naabin. Li ber wan kirin û hewldanan li ber xwe dide. Ew li ber xwe dayîn ji, wê bi ser naxe. Di vir de, divêt ku mirov bêje, ku hêze pêşketine berdiclê di aqilê wê de ya. Wê bi aqilê xwe li ber xwe dide. Bi vê yekê xwest ku bi ser bikeve. Lê bi serneket. Windakirin, çêbû. Têkçûn çêbû. Di wê têkçûnê de, mirov karê tenê hêzên ku j dervê tîn tenê gunahbar bike. Bi wan re hêzên herêmî, yê herême bixwe ji divêt ku mirov gunahbar bike. Kirin û hewldanên wan, ne li gor çand, hizir, kevneşopî û pêşketine dîrokî ye herême ya.

Demên berî zayîne ew her pênc sadsal û ew her pênc sadsalên piştî zayîne divêt ku pir ziman werine ser ziman. Lê divêt ku ew herdû pêncsadsal ji, di nav xwe de weke du beşan werine ser ziman, weke beşa pêncsadsal ye berî û beşa pêncsadsal ye piştî zayîne. Ew dem, demên di têkçûne herêmê de, demê sereke ne. Deme ku mirov di wan de li sedemên têkçûne herême li wan bigerihêne. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Di dawiyê pêncsadsalên piştî zayîne de hizre musulmantiyê derdikeve. Ya rasti, divêt ku mirov wê derketine, weke hewldana herême ji xirabî û têkçûnên ku jîn dibin rizgar bike bêne ser ziman. Lê ev yek, ne li herême û ne ji li dervî herême wilo zêde nayê fahm kirin. Li berdiclê hinek mirovên ku bi hizir û çanda Nebî Nuh û Birehim xalîl derikevin, dixwezî ku vê yekê wilo mazin di cihê xwe de bînine ser ziman. Ew dixwezî ku rastiyê wê, bi mirovan bidine fahm kirin. Ew mirov ji yên weke Salahadîne Eyûbî ne. Ew jîyanaka pir xas û safî jîn dikin. Ew hizre musulmanatiyê li gor hizir û çanda Birehim Xalîl û kevneşopîye Nebî Nuh jîn dikin. Her weha ew jîn dikin. Ew weke mirovên ku xwe didine vê yekê. Ew dixwezî ku wê mazin jîn bikin. Salahadîne Eyûbî, serokê împaratoriya ku herême botanê ku sînorê ji Cizîre bota haya Rihayê dirêj dihata hasibandin di wê demê de, û piştê ku sînorê wê împaratoriya ku ew ava dike, haya bi misrê û iskenderiya û Yemen û Baxdayê ya, mazin dike ya. Lê deme ku ji vê dinye koçî dinye din dike diçe ser dilovaniya xwe, tenê weke

mîreteye wî 17 dînar hene li şûn wî dimênin. Ew mirovekî weha bû. Wilo jîn dike. Hinek mirovên din ji yên weke wî derdikevin, Mirovên zane yên weke Teymîyê haranî ji hene. Pişt wan re, yên weke weke Feqiyê Teyran û Meleyê Cizîrî ji hene. Ew ne tenê mirovne bizane ne. Ew mirovne di kevneşopîye xwe de bi hizir û bawerîya xwe weke ku bawerî wan mirovên mazin çawa jîn bûna, ew ji, wilo û mazin jîn dibin. Van mirovan, li gor rastiyê û qanciyê bi hizre xwe û çanda xwe jîn bûn. Wilo ji, xwestin ku bidine fahm kirin. Feqiyê Teyran, i ro ji di nav civaka ku ew jê ya, tenê weke helbestvanekî tê ser ziman. Hinek wilo ténine ser ziman. Ev gotin ji dide nişandin ku çend ji tégihîştin û hizre dîrokê û rastiyê wê dûrbûn çêbûya. Ew Mirov, û yên weke wî di demê wî de, demeke nû di dîrokê de dana dest pê kirin. Ew her weha mazin jîn. Ku mirov, van mirovên mazin bi hizir û pêşketin û awayê pêşketine ku dixwestin ku bi mirovan re çêkin, ku mirov fahm nekê, mirov çawa karê bêje ku mirov ew fahm kirina û naskirina? Mirov çawa karê bêje ku wan bi me re tégihîştin çekiriya. Wan, raste, xwestin ku tégihîştineke mazin çêkin. Lê kengî, me ew kifşkirin bi rastî û hizre wan re, hingî, mirov karê bêje ku wê tégihîştine ku wan dixwest ku me re çêkin, çêkirina. Ev yek, rastiya xweza ya ku mirov fahm bike ya, ji bo wan û rastiya wan. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku hê cewberê jiyane yê xas û saf dijî. Haya ku navê wan mirovên weha li jîyanê

ji bê, wê jîn bibe.

Di demên piştî demên zayinê de, her weha hizrên ku pêşketinê çêdikin ji derdikevin. Lê wilo zêde, nayêne ser ziman. Hizre wan ji ber çavan tê dûr kirin. Ev ji, awayekî windakirinê yê rojhilata navîn bixwe ya. Di demên piştê ev yek pir hata jîn kirin. Iro ji, her weha tê jîn kirin. Li herême bi vê yekê û nêzikatiyê, bi hewldana rêveberan, gelek çand, hizir û dîrokê ji dîrokê hatina birin. Her deme ku di hizre xwe bi hizirkirinê pirtûkxaneyaka mazin ava dikir, ev herême, iro, çima vê yekê nake? Sedeme vê yekê, divêt ku mirov li herême di rêxistine wê ye rêveberî de bibîne. Ji vê yekê re hinek hizir weke sedem dana nişandin têne henekirinaka bi mirovahiyê bixwe ya. Dîrokê hizir ye herême, tişteki bi me dide fahm kirin. Ew ji her weha ev e. Ji me re dibêje ku deme ku rêveber, deme wê çanda xwe ya statûqûyî ne guharênin, di i ro de, wê wilo zêde ti pêşketin û pêşve çûn wê zêde nebe. Ji aliyê destûrî ve bê û an ji ji aliyê hizirî ve bê, rêxistinkirina vê yekê, wê kevneşopîyên ku hene yên pêşketinê ji, wê jîn û vejîn bike. Wê zîndî bike...

DEMÊN PIŞTÎ ZAYINÊ, KURDISTAN, BER DICLÊ Û ROJHILATA NAVÎN

Ku mirov bidest şîrovekirin û anîna ser ziman ye demên rojhilata navê yên piştî demên zayinê dike, tişte ku pêşî mirov rastê wê tê, hizir û çanda rêveberiyê serwerîye wê bixwe ya. Ji ber vê yekê, yekem, ew hizir û çand, ji mirov dixweze ku mirov wê di serî de bêne ser ziman. Di anîna ser ziman de, mirov çawa bêne ser ziman? Ev pirs bixwe ji, pirseke ku di vir de û di vê xalê de pir girîng dibe. Awayê anîna ser ziman, ku bi kurdî jê re teher tê gotin ku wekî dî ji car bi car bi navê metodê tê ser ziman. Wekî dî ji, car bi car bi navê "yontemê" ji tê ser ziman. Ji zimanê bête, her weha li gor pêşketinan û di pêşketinan de di buhurina zimanên din. Bi vê yekê, mirov karê vê yekê ji, kifş bike. Li rojhilata navên gelek bêteyên sereke yên pêşketinê ku buhurtina zimamên din ji hene. Ew bêje ji, weke bêteyên "rêveber", "bawerî", "ol" û hwd. Ku mirov rastî bêne ser ziman, ev bêje bi tégihîştin û destpêka xwe re yên vê herême ne. Ji ber vê yekê deme ku têne ser ziman, ku li kurderê ji bin, bi xwe re çandaka ku ténine ser ziman hene. Weke navê Miha "adar"ê. Bêja adarê di nav kurdan de pir girîng e. Di çand û dîroke wan de bêteyeye pir girîng e. Ev bêje weke xwe, û bi wate xwe ya ku heyra ji buhurtiya hinek zimanên herêmi yên ne herêmi. Her weha buhurtina ji hevdû li hevdû, di demên pêşketinê de bûna. Deme ku pêşketin bû xosletekî serdemên ku têne jînkirin an ji dijîn, her weha mirov karê bêje ku buhurandin dibe.

Di çanda rojhilata navîn de, hinek bêteyên ku hinek pêşketin û hizirne bi xwe re ténine ser ziman ji hene. Ew ji li herême bi navan têne ser ziman. Weke Navê nebî Nuh û Birehim Xelîl û hwd. Weke van bêteyan, hê gelek bêteyên din yên pîroz hene, ku werine ser ziman. Ev bêje di demên ku diafirin de, pir afirîner in. Xwediye hebûneke ku pir hatiya afirandin in. Ji ber vê yekê, mirov divêt ku bêje ku di demên xwe de, bi pêşketine ku jîn kirine û yên ku dana jîn kirin,

xwedyê hebûnekê ne. Ew afirandin, demên piştre ku were ser ziman ji, nayê jî bîr kirin. Hertimî ew nav ku têne ser ziman, bi xwe re wê pêşketine ku dana jîn kirin û yên ku bi wate di xwe de bihizir di vacê yên xwe de hê veşartine tênine ser ziman. her weha mirov karê bêje û wate wê ji, di şirovekirina pêşketin û hizrê de mazin bêne ser ziman. Deme ku hatina ser ziman ji, wê bi xwe re hizreke mazin bênine ser ziman. Her ku hatina ser ziman, dem bi dem ji bê, wê hizrên nûkunû bênine ser ziman. Wê demên ku têde têne ser ziman ji wê gelek xosletên wê ji de ji di xwe de di wateyên xwe de bênine ser ziman. Di her anîna ser ziman de ji, wê hinekî riyên hizir û afirandinê û pêşketinê yên nû wê bidine berçavan û bi mirov bidine revakirin. Her weha mirov divêt ku li ser vê yekê, bi hizir û bi pêşketinên ku bûna û yên ku dibin bisekinê. Hizir, di xwe de pir afriner e. Li ber diclê, ev afrînerî bêhtir tê ser ziman. Weke ku ava diclê di berê xwe di harikê, wilo, wê harinkandinaka mazin bide çekirin. Diclê, hertimî diharikî. Her ku di harikî, weke ku bi harikê mejiyê mirov û di mejiyê mirov de li hev dûbûnaka mazin bi wê harikandinê di dawiyê xwe de çêke dike. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Her weha mirov karê weke wê herikandina wê, dirokê wê ya bi hizir û têgihîştin ya ku di mirovan de harikî ji bêne ser ziman. Diclê, dayikaka mazin e, ji mirov û dirokê wî re. Diclê, hertimî dayiktiya xwe li gor xwe û layiqî xwe kir. Lê ma ka mirov ji li gor wê, ji dayika xwe re çî kir? Ev pirs, divêt ku her mirov ku jîn dibe û yên ku wê bê û jîn bibê, divêt ku ji xwe bi pirsê. Ev yek, weke deynekî mirov dirokî ji destpêka mirov e. Mirov divêt ku li berdiclê xwe deyndar hîs bike û ew wî deynê xwe bide. Ev yek, ji aliyê ahlaqî, çandî, hizirî û dirokî ve girîng e.

Li ber diclê, pêşketin, hertimî mazin bû. Piştî demên zayinê, deme ku mirov dimeyîzenê û dibîne, mirov gelek pêşketinan dibîne. Lê belê, ew pêşketin, gelek ji wan, têgihîştineke mazin ye mirov di xwe de na parezên. Bindestkirina diclê û an ji xwestina zûwakirina wê, çendî mirov karê bêje rast e? Ev pirs ne ji aliyê ahlaq û hizirî ve û ne ji ji aliyê dirokî û herêmî û ne ji ti aliyên din yên weha ve rast e. Ji ti aliyê ve ne raste. Diclê haya nahaka li ber xwe daya. Wê ji iro pêve ji li ber xwe bide. Lê ka wê çiqasî karîbe li ber xwe bide. Ew hêze wê ya li barxwadanê wê hata kuderê û haya kengî wî li ser lingan wî bihêle. Mirov ku li ber diclê, di sekinê, weke ku li ber baweriya pêxemberê xwe bisekinê, ji ol derketî dibe. Her weha mirov karê bêje ku pir girîng e. Cizîre bota, li ber diclê, haya nahaka li ber diclê, bi hebûna xwe re weke abîdeyeka mazin ye dirokî maya. Bi dirok û hizir û pêşketinên di diroke wê de, serê wê hertimî bilind e. I ro ji, serê wê bilind e. Mirov karê vê yekê pir mazin bêne ser ziman. Ji bo ku mirov yekê kifş bike, ne hewceye ku mirov xwedyê zanebûnaka pir mazin bê. hewceye ku tenê mirov li Cizîre bota bibîne û meyîzenê. Ev yek, her weha girîng e, ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman. Li ber diclê, Di Cizîre bota de hine wateyê pir mazin hene. Hine têgihîştinên pir mazin yên dirokî hene. Mirov divêt ku wan zanibe. Deme ku mirov wan zanibe, hingî, mirov wê Cizîre bota ji, baş û mazin layiqî wê, wê nas bike. Her weha ev yek, li gor me, pir girîng û pêdivî ji pê haya, di roje me de. Ku mirov wê baş û di cihê xwe de nas kir, Hingî, mirov, wê bigiştî ji, rojhilata navîn ji nasbike. Mirov, wê çand, hizir, pêşketin û diroke rojhilata navîn nas bike û fahm bike û wekî din ji, di derbarê wê de wê bibê xwedyê têgihîştineke mazin ji. Ji ber ku hizir û pêşketinên mazin yên ku li Cizîre bota bûna û belav bûna, herêm mazin pêş xistina. Nebî Nuh tenê yek ji van e. Birehim Xelîl tenê yek ji van e. Her weha hê gelek hizir û pêşketin û nixrên wê yên din ji hene. Mirov, bêguman divêt ku wan ji bibîne û li ser wan ji bisekinê û bêne ser ziman. Mirov divêt k wan ji pir mazin li layiqî xwe bêne ser ziman. Ji nû ve kifşkirin ji, wê bê bingihê ronasansaka herêmî. Ma li rojava di sadsala 15 û wan de, ne bi hewldana dise kifşkirina demên antikî yên li anatolia navîn bû?. Ev ji pirseke mazin, di xwe de hin nêzikatiyan di parezê ya. Ew nêzikati ji, her weha li ser têgihîştine têgihîştin, hewldana têgihîştine, demên xwe yên berê yên ku jîn bûna li wan meyîzandin û qanc û xirabiyên wan deman kifşkirin û li gor wê ji di demên xwe yên pêş de nêzikatiyaka rast ye bi hizir dana nîşandin, her weha ya ku divêt ku bibê ya. Bi vê yekê, destpêk demên rojhilata navîn yên piştî demên zayinê, wê baş werine fahm kirin. Lê ev yek ji, w ne bes bê. Ya ku wê têgihîştinê de wê, wê bes bike ji, têgihîştine felsefê dise kifşkirina wê û bikar anîna metoda wê ya şirovekirinê ya. Ev yek her weha wê, wê bes bike. Wê têrbûnaka mazin bide kirin. Wê pêşiyê pêşketinên ku bibin wê ve vekê. Weke ku diclê di berê xwe de bi harikî, wê dise

deman bi pêşketinên mazin di xwe de bi harikîne demên pêş paşarojê. Bi vê nêzikatiyê, divêt ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman.

Ronasansa herême hîmê wê di herêmê de ya. Herêm ku xwe bi xwe kifş neke, wê tiştêkî weha nebê. Divêt ku xwe bi nirx û demên xwe yêñ buhurtî re kifş bike. Ronasas, hinek ji, rexnekirin û xwe ji rexnekirine ji. Ev yek, rojhilat pêdivîya wê pê haya. Divêt ku vê yekê bike. Rexne kirin û xwe rexne kirin, wê di serî de weke pêşketinke herêmi wê herême bide naskirin bi mirov, Piştre wê kifşkirina di têgihîştine de bi felsefe wê, wê bide kirin. Her weha ev yek ji, pir girîng e. Rojhilat, di vir de, divêt ku rastiya xwe rast û baş û zanebûn kifş bike. Ev yek, pêdivî ye wê pê heya. Ku ev yek nebe, wê nikaribe, bêje ku ez pêketineke mazin jîn dikim. Ya rastî, ku em nahaka divir de rastiya mazin bênine ser ziman, wê di cihê xwe de bê. Ew ji her weha ev e. ne tenê her felsefe û hizre ku li rojhilata navîn derketiya, rastiya rojhilata navîn bi pêketine wê di xwe de dibîne. Her pirtûkên pîroz û hizrên pîroz yêñ li herême derketine ji, vê yekê her weha tênine ser ziman. Wê yekê pir mazin tênine ser ziman. Mazinbûn di xwe naskirinê de ya. Ev yek divêt ku pir baş û mazin were têgihîştin. Ev gotin, di felsefe pêşketine de, weke gotinanaka rastteqîniyê ya. Ev gotina ji aliyê civaknasî ve ji û ji aliyê deronî û wekî din ji gelek awayên din ve ji bi weha ya, ku were têgihîştin. Felsefe têgihîştinê, ji mirov hertiştî li gor rastteqîniyê wê fahm kirine û têgihîştinê dixweze. Divêt ku mirov vê yekê pir baş û qanc fahm bike. Rohilat, ku ber diclê bi çanda Nebî Nuhî û Birehim xalilî ji xwe re di demên pêşketine xwe de weke manifestoyeke dîrokî bibîne, wê di hîm û temenê xwe û rastiya xwe pêş bikeve. Ev yek, her weha pir girîng e, ku mirov bike û bêne ser ziman. Rojhilat, ji çanda ber diclê, ku em gav biavêjin û wê şaxsiyeta wê ye ku di dîrokê de afirî bixwezî bînine ser ziman, hingî, mirov wê bibîne ku çend şaxsiyetaka pir mazin û kur e. Çend şaxsiyeteke pir mazin û bi têgihîştin e. Ev şaxsiyet, divêt ku xwe kifş bike. haya nahaka ji, hê ev şaxsiyet ji aliyê xwe ve xwe kifş ne kiriya. Wekî di ji, dev ji wê xwe kifşkirine wê berde, dore wê ji, hê ew kifş ne kiriya. Rastiya wê, di şaxsiyeta wê de ya. Ronasansa wê ji her weha di wê de ya. Divêt ku vê yekê, ew şaxsiyet di xwe de û bi xwe re bibîne û bêne ser ziman.

Di vir de, divêt ku mirov bêja rastiye û rastteqîniyê hildê dest û ji gelek aliyan ve bêne ser ziman. Ji ber ku di têgihîştin, felsefe wê ye têgihîştin, pêşketin, dîrok û çanda wê de pir girîng in. Divêt ku li gor rastiya xw ye demê pir baş werine têgihîştin û ser ziman. Ya rastî, wê ev bêje, hertimî û demî, wê şirovekirina xwe di vê herême ji mirov bixweze, mirov ji wê bike, ev yek ji, di her demê de, pêşketin û pêşveçûna wê û mazinbûna wê bixwe ya. Bêja rastteqîniyê felsefe rohilat bixwe ye demên wê yêñ berê ya. Bi vê yekê, yekem, divêt ku ev felsefe li ser hîm û dîroke xwe di cihê xwe de were kifşkirin û ser ziman. Baweriyê ji, felsefe xwe, di wê felsefê de ava kiriya. Ji ber vê yekê, bi hev re tene ser ziman. Lê, ev yek, ne kêmasiyeke, ev yek; dewlemendiyeke mazin ye wê dide berçavan. Di demên piştre de, pişketin, di hizre xwe de hinek afirandinê mazin kirina. Ew pêşketinên ku di têgihîştine xwe de kirine, pir mazin û yêñ herêmi ne. Mirovên rojhilata navîn divêt ku vê yekê baş û qanc zanibe, ku çend ku çand û hizre ku afirandî jê ji destê wî hatibe hildan ji, yê ku ew çand û hizir afirandiya û di wî de hata ku di genetike wî de senteze wê afirandina wî heya. Di vir de, tişte k pêdivîya wê pê heya nêzikatiyaka rast û felsefeyeke ku li ser hîmê mirov ava ya. Rojhilat, weke tê ser ziman ji, pêşketinên ku jîn dike pir di xwe de kur jîn dike. Ev yek, wê mazin dike. Lê ev yek, deme ku mirov li ser dihizirê, mirov dibîne ku weke ku amcamaka pêşketinên wî yêñ demên berê ji ya. Xosletên şaxsiyetê, di vir de, hêjaya ku werine ser ziman. Divêt ku werine têgihîştin. Xosletên şaxsiyetê, awa û riya tede çûna ye pêşketin û têgihîştinê ji kifş dike. Ev yek, her weha girînge, ku mriov di cih de û rast kifş bike û bêne ser ziman. I ro, ji demên dîn hemûkan zêdetir pêdivî bi vê yekê heya. Ev yek, her weha divêt k uwere têgihîştin. Bi nirx û kevneşopîyan divêt ku were têgihîştin. Deme ku her weha bi nirx û kevneşopîyan hata kifş kirin, hingî, wê civak ji, bi pêşketin û têgihîştine xwe tede were ser ziman. Kevneşopî nirx û zagonên civakê yêñ pêşketinê ne. Bi vê yekê re, ev nirx û zagon wê werine têgihîştin û wê di derbarê wan de, felsefe civakê ji nû ve wê biafirê û ava bibe. Civaknasî ji bi deronîyê re di vê xalê de xwedi weyne. Divêt k ev yek her weha were ser ziman. Psikoloji, di vê yekê de û bi vê yekê, di rojhilata navîn de karê ronasanseka civakî û herêmi bide dest pê kirin.

Rojhilata navîn, deme ku were ser ziman, divêt ku hinekî mazin nirx û dîrokî were ser ziman.

Ji ber ku bi dírok û pêşketinên xwe yên demên buhurî de ji wilo ya. Bi vê yekê, her weha mirov karê bêne ser ziman. Dem, deme ku di rojhilata navîn de tê ber zayîne û hinekî ji pêde diçê, êdî hin bi hin weke labitandinaka mazin dibe Li Mêrdînê, mirovên weke Manî, ku bi hizreke nû derdikevine hole dibin. Lê berî wî, hin pêşketin bûna. divêt ku mirov hinekî wan ji bêne ser ziman. Berî wî, deme zayîne dest pê kiriya. Deme zayîne, bi bûna Nebî Îsa re dest pê dike. Ev roje bûna wî weke mîlad tê hasibandin û êdî ji wê rojê pêde, weke ku dírok ji nû ve were dest pê kirin dibe. Ev pêşketin, pêşketineke ku pir mazin e. Wê dirokê bi tavahî bi guharêne. Wê pêşketinên demên pişt xwe re wê kifş bike. Wê weke ku dírok ji nû ve were dest pê kirin wê bê hasibandin. Wilo ji tê hasibanin. Nebî Îsa li Rojhilata navîn derdikeve. Ew bixwe ji, bi çanda rojhilata navîn mazin dibe. Di nav wê çandê de hizrên xwe pêşdixe. Hizrên herêmê yên ku hene, û yên ku tene ser ziman, yên píroz, heya wî ji wan heya. Dem, haya ku tê wê demê, li rojhilata navîn ji, pir pêşketinên mazin di qada hizir de jîn dike. Li Anatolia û Athane pêşketineke mazin di qada hizir de heya. Di wan demên berî zayîn de, ji sadsala 7 min hata ku dem ji nû destê zayîne, gelek nîrx û kevneşopî, nîrx û hizrên rojhilat, ku ji Medya bê, ji Misrê demê bê, an ji hinekî deverên din yên wê herêmê bin, tene sentez kirin û li anatolia û Athane tene ser ziman. Ev yek, filozofên weke Thales, Aristoteles, Sokrates û platon diafirêne. Ev filozof û hê gelek filozofên weke weke êdî li wir derdikevin. Hizre wan, ye ku ew tene ser ziman, ji ber ku di wê destpêkê de, ji ber ku weke sentezeke rojhilata û ev yek ji weke ku hilme wê ji diçê rojhilat, bandûra wan filozofan li rojhilat ji dibe.

Bi vê yekê re, êdî hin bi hin pêşketin derdikevin. Îskenderê Zûrqrarneyn, ku kurdan ev navê "zûrqrarneyn" lê kiriya, bi hizrên Aristoteles mazin dibe û piştre, ku tê dewse bavê xwe, êdî ye pêşî ku dike, berê xwe dide bi rojhilat ve. Wî di hizre vî filozofî de, ji ber ku hizre wî hîmê wî rojhilata, tede rojhilat ji baş nas dike. Piştre berê dide bi rojhilat ve û tê rojhilat û rojhilat ji, deme ku tê yê de, di cih de ne bi gelekî re ji Misre kevn haya ku digihê Aqbatanê û Medye fetih dike. Ev fetihkirina wî, li rojhilat ji, bi xwe re demeke nû dide dest pê kirin. Ew deme ku tê rojhilat, bixwe ji ji wê pêşketine ku tevî gelek êrişan ji hê pir xweşik û mazin li ser lingan maya, wî pir bi bandûr dike. Piştre, ew dixweze ku weke wê hizrê jîn bibe. keça keyê medî ji ji xwe re dike jîn. Pê re bi deh hezaran keç û kurên kurd û persan dil digirê û dişene walet xwe. Bi vê yekê, ew dixweze ku wê pêşketine ku li wir heya, bike malî waletî xwe. Di waletê xwe de ji pêşketineke wilo xweşik bide çêkirin. Ew bi vê re, li rojhilat û herêmên asya ji, bidest fetih dike. Haya ber Hîndîstanê dike. Li wir, bi mirovên ku li ser filan şerdikin, wan dibîne. Lê deme ku tê Mediya, Kurd ji, pîranîyên wan, xwe di spêrine Zagrosan. Li Zagrosan dimênin. Ew li wir ji, dike ku herê ser wan. Lê çend ku diçê ser wan ji, nikarê xwe bigihêne wan. Îskenderê Zûrqrarneyn, her herême ku diçiyê de fetih dike û lê rêveberiya xwe ava dike. Ew dixweze, bibe xwediyê wê cihanê. Ew û leskerên wî li du deran dialiqin. Di du deran de nikarin ku bi ser bikevin. Yek ji wan deran Zagros a. Li Zagrosê li ber kurdan û xalkên din weke yên bi wan re weke persan têk nabê. Ê li Hîndîstanê wam mirovên zanê û yên ku xwediyê hunereke şer in û ku li ser filan şer dikin, nikarê wan ji têk bibe. Ji **deme împaratoriya Maurya** haya ku gehana **deme împaratoriya Gupta**, hindîstan, pir mazin pêşketinê jîn dike. helbestvanên yên navdar weke **Qalidasa**, **hizreke xwe ye baş bi helbestên xwe anîna ser ziman** û di nav xalkê bicih kiriya. Di wê demê de tîkiliyaka mazin ye hindîstan û Cîne ji heya. zanistên ku herdû deran ji derdikevin, li herdû deveran ji navê wan tê bihîstin û bandûra wan dibe. Bi vê yekê, li wir ji mirov karê bêje ku pêşketineke mazin heya. Bi vê yekê, li van herdû deverên ku îskenderê Zûrqrarneyn tene nikarê herê, mirov karê bêje ku pêşketinên mazin yên demdirêj hene. Pêşketinên van herdû deveran demên pişt xwe re herêmên li dore xwe, hertimî bi bandûr kirina. Bi vê yekê hêjaya ku mirov bahsa wan bike. Afrika bixwe ji, hemû, di wê demê de, di rewşeke pêşketî de ya. Pir dewlemend e. Ew rewşe wê dore wê ji bi bandûr dike. Zagrosan, Hindîstan û qitaya Afriqa bi pêşketin û rewşên xwe, bala her mirovên ku zane ne dikişene ser xwe. Ne bi derfete, ku Îskenderê Zûrqrarneyn ji, vê yekê his neke. Wî ji, béguman his kiriya. Wî ji, navê van herêman bi zane û bi pêşketin û di rewşeke xweş de his kiriya. Asya, wî demê de bi navê Cîne li pêş e. Cîn, pir mazin kevneşopîwar e. Ev rewşe wê, di wê de mirov nikarê bêje ku ne bi tîgihîştin e. Di wê de bi tîgihîştin ji bûya. Pêşketinek her weha

li wir ji heya. Çavê Îskenderê Zûrçarneyn li wê yekê ye ku li ser wê xwe bi pêş bixe.

Anatolia û Grek hin bi hin pêş dikeve, û bêhne serweriye dike. Bi wê bêhnê ji, dixweze ku xwe bigihêne serweriye. hewldana Grekê ya herî mazin bi Îskenderê Zûrçarneyn li rojhilat û asya dibe. Bi ser ji dikeve. Li van herêman hem şerên navxweyî û hem ji rewşên weha weke êrişê ji derve, wê kal dikin. Wê bêhêz dikin. Berî Îskender ji pir êriş hene. Dîvêt ku em bi gotinekî bê, wê ji bîne ser ziman. Di serî de Roma, haya wê demê ew du sadsala ku êrişên wê yên li rojhilat û Afrîqa ne sekîni ne. Wan ji haya ku digihê ber palmîra û hinekî jê wîrdetir ji, bûna xwedî serwerî. Herêmen herî zêde weke ku binav û deng weke Heskîf, ber firatê wanderan û gelek deverên din ji Roma bandûra wan li wanderan heya. Deverên ku kirina bindesên xwe de kirina bindestên xwe de. Yên ku ne kirina bindestên xwe de şerên wan ji li wanderan Weke Îskenderê Zûrçarneyn berdewam dike. Ev kirin, bûyîn û bûyar, hemû ancama pêşketinên di hizir de ji ne. Lê xweşikbûnê rengê xwe derxistiye berçavan û di çîrisêne. Ev yek ji, sedeme mazin e, wan şeran de. Herkesek, weke nêzîkatîyaka xwe dide nîşandin ku bibe xwediyê her xweşîkatîya ku heya. Di wê demê de Medî ji pir xurt in. Ji berî zayîn bi têkçûna kurdan Mediya dikeve. Lê hêze wan ya civakî, civaknasî û hizirî hebûne xwe weke xwe berdewam dike. Rêveberiya wan, bi pirsan re ne bi şer dest di guharêne. Di wê demê de hê pers di asta xanadantîyê de ne. Di deme Kîrus de Xanadana wî serwer dibe û gelek aşîrên kurdan ji dihildê cem xwe û serwer dibe, Bi vê yekê, weke ku ne bi şer serwer dibe. Lê serwer wan wilo zêde berdewam neke. Piştî ku ew têk diçin, êdî piştî weke dusadsalakî rêveberî nêvî bi nêvî li herêmen kurd û persan bi hev re dimeşê. Haya deme aqamanîşan. Di deme aqamanîşan de, êdî rêveberiyak tê ava kirin. Lê ew rêveberê ji bi xanadanî ya. ne xurte. Ne ji kurdan bê wê rojekê ji li ser lingan nemêne. Ew rewş, hebûne xwe haya deme Sasanîyan wê berdewam bike..

Pêşketinên pêvajoyan, di vê demê de pir mazin in. Di van deman de ji gelek alîyan ve pêşketin hene. Hizir û raman bi pêş dikeve. Felsefe, dîrok, derûnî, wêje, helbest û hwd, weke destan hn bi hin sîn dibin. Hîmê wan tê avêtin. Ji aliyê hizir ve pir pêşketineke mazin derdikeve. Di demê de, hêzên weke roma mazin xwediyê hêz û serweriyeke mazin in li herême. Haya ku digihê Misre kevn û Qartaca Afrîqa xwediyê serweriyeke mazin in. Lê Qartacî ji ber wan pir mazin hertimî li berxwe didin. Di wê demê de, gelek şer ji hene. şerên dibin yên wê demê ji, divêt ku mirov bêje ku yên desthilatdariyê ne. Ji bo serwerbûn û bidest xistina ard û herêman şer dibin. Bi vê yekê, gelek der û dever dibin şer de hene û gelek ji di demên şer de di berxwedanê de têne xuruxandin. Her weha mirov karê bêje ku wilo ya. Palmîra bi têkçûna wê ya li ber roma û bi vexwartina jahrê dawî li jiyana xwe anîna Zenûba ji, rastiya ji van rastiya na. Li herême, gelek mînaqên wilo hene. Di deme şeran de, sê nêzîkati derdikevine pêş. Nêzîkatîyak mirov karê bi rêveber û keyan re bêne ser ziman, ku şerên desthilatdariyê didin. Nêzîkatîya din ji ye bi xalkan re ya, ye ku ji bo hebûne xwe serî hildana, Ev yek, bi têngîhiştineke bi azadî bi pêş dikeve. Nêzîkatîya din ji, ye şerkirina ji bo rûmete xwe. Şerkirina ji bo rûmetê, û derketine pêş ye vê nêzîkatîyê dengê demeke nû bi xwe re têne ser ziman. Ev dem ji, ku mirov serdama navîn û deme ku di awayê pergala xwe de faodalî ya. Ev yek, deme ku hin bi hin xalkê di hebûne xwe bi ber gelbûnê ve diçin û pêşketine xwe jîn dikin û ji bo vê yekê şer ji dikin. Ev dem, demeke nû ya. Roma, di wê demê de jîn dibe. Lê roma ji, di nêzîkatîya xwe de, li şûn vê nêzîkatîyê ya. Ev yek, tê ber çavan. Dem, ku tê deme zayînê, êdî bi bûna Nebî Îsa re êdî demeke nû dest pê dike. Ev deme nû ji, wê ji gelek alîyan ve bê. Wê deme nû, wê pergaaka nû ji cihanê re bi xwe re li gor nêzîkatîyaka nû ku hîmê xwe li ser pêşketine hizir ava kiriya wê derkeve hole. Bûna nebî Îsa, di aslê xwe de vê yekê ji, bi wate xwe re di xwe de di pareze. Deme destpêka zayînê, her weha bi wate ya. Piştî Nebî Îsa bû, weke û rojêke nû li cihana vede bû. Wilo bû. Lê bûn û hebûne nebî Îsa, di rastiye de wateyeka wê ya din ye herî girîng heya. Ew ji, divêt ku bi hizir û felsefe wer ser ziman. Nebî Îsa, deme ku mazin dibe û piştî deme ku bidest anîna hizre xwe ye li ser ziman dike, di hizrên xwe de pir mazin wijdan derxe pêş. Ev yek, di aslê xwe de, bi awayê ku tê ser ziman, û heste ku diafirêne ji, nû ya ji bo mirov. Lê hîmê wê li herême li ber diclê berî wî hatiya avêtin.

Ji deme sumerîyan de bi Nebî Nuh re bahsa dil ji hatiya kirina. nebî Îsa vê weke Wijdan dixwanê û têne ser ziman. Her weha diafirê. Di deme sumerîyan de ku weke pergala pîroz ji

dihata pêjirandin, dê, giyan û bav bi awayê bav, kur û giyana pîroz tê ser ziman. Ev yek her weha êdî di demên nû de tê ser ziman. Piştî Nebî Îsa hata dinyê û ku mazin bû û pişte, ku ji aliyê keyê romî Pontius Platus ve hata xaçkirin, êdî piştê ew bi hizrên xwe li jiyane ma û di nav xalkan de mazin bû. Ola masihîyê, herweha êdî derket û dest pê kir. Ev yek ji, weke miladê hata erêkirin û dîrok ji jê hata dest pê kirin. Bi felsefe mesihîyê ye re azizên nebî Îsa li dinyê bidest gerandinê kirin û bidest anîna hizre xwe ye ser ziman kirin. Bidest nav hizre mesihîyê li xalkan kirin. Ev yek, ji bo wan pir zor ji meşî. Gelek ji wan ji ber ku hizre anîna ser ziman, wek li dijî hizrên olî yên fermî hatina û bi vê yek ji li dijî rêvebere roma rabûna hatina girtin û bi xaçê ve katina kirin û anji hatina kuştin. Bi vê yekê, weke tekoşîne mesihîyê 315 salan berdewam kir. Haya ku ola mesihîyê îsewîti ji aliyê keyê Costanipolos Costanus ve weke ola fermî hata erêkirin, ew tekoşîn hata berdewam kirin. Piştî hata erêkirin, êdî Îsewîti bû olaka mazin ye rêveberî ye cihanê. Di wê navberê de li Kurdistanê ji aligirên mesihîyê afiribûn. Li mêrdînan weke navende wan bû. Li wir cihê wan yê mazin hebû. Li wir piştî bûna Nebî Îsa re Manî ji di 216an de tê dinyê û hizreke xwe ye teybet ye pîroz diafirîne. Ew di hizre xwe de weke bixweze sentezeke hizre nebî Îsa ye nû û hizre Zerdeşt ye berê wek hizre xwe çêke. Bi vê yekê ji bi ser ji dikeve. Ew hizre xwe diafirîne. Lê li herême, rêberiya rêzanî ye Sasaniya ne û hizre Zerdeşt ji ji xwe re kiriya weke hizre olî. Bi vê yekê, êdî ne ji aliyê xalkê ve lê ji aliyê rêveberiya Sasanî ve çûna ser wî çêdibe. Ew ji ji ber vê yekê, êdî li Kurdistanê wilo zêde ne mêne û ji herême diçê û diçê Hindîstanê û piştê weke demê ji li Cinê ji dimêne. Ser 12 an ji 13 salan re her weha li derve dimêne. Lê berî ku herê, hinekî hizre xwe hinekî di nav mirovan dide tene ser ziman ji. Şapurê yekem, desturê didiyê de ku li kuderê welat de bixweze karê hizre xwe bide mirovan û di nav wan de bêne ser ziman. Lê di deme Behremê yekem de ev yek tê guharandin. Êdî ji herême diçê. Piştî çûna xwe re, êdî piştê ku divegerihê herême xwe dise û vê carê ji deme ku ew di nav xalkê de diaxivê û hizre tene ser ziman, keyê Sasanî wî dide girtin û dike zindanê de û gelek êşkencan ji lê dike. Keyê Sasanî Behrem yekem, wê di 276an de ku wê bi fermanê hûrî qatan dike û her qatakê wê li derekê dide dalaqandin. Serê wî ji bi devê deriyê bajêr ve tê dalaqandin. Ev yek, ti carî, piştê nayê ji bîr kirin. Piştê xalkên herême vê yekê li ber nix û kevneşopîyê xwe weke bêhurmetiyekê dibînin û piştê wî pîroz dikin û bi weke aligir gelek aligirên wî yên hizre çêdibin. Manî, aligirên wî, hizre wî pir mazin didine jîn kirin. Navende wan ji li mêrdînan dibe. Piştê, di demê kin de gelek aligirên wî çêdibin. Cihê ku ew tede mazin bûya, ew bistan ji weke "Bistana rohiyê" ku bi nav tê kirin, dibê cihê wî yê pîroz û li wir gelek mirov di deman de digihine hevdû û perwerde dikin. Aligirên Manî, weke ku pir girîngiyê didine perwerde kirine mirov. Li ser vê yekê, ew pir di sekinê. Manî, bi aslê xwe ji, ji malbata xizan ku ne dewlemend e ye kurd bû...

Bi vê yekê re, bi derketine nebî Îsa û hizre wî û belavbûna wê û derketina manî û hizre wî û belavbûna wê, demê nû di xwe de di afirîne. Lê li rojhilat, rêveber bi hebûne xwe, pir bi kevneşop û statûqûcû ne. Li ser jiyane, bi van xosletên xwe karin serweriyê bikin. Dikin ji. Li rojhilat ji ber vê yekê wilo Zêde ti bandûra van hizan wilo zêde nabê. Manî, hizrê wî li herêmên kurdan hinekî belav dibe. Ew ji ji ber ku ew ji wan bû û awayê kuştina wî, wan pir eşand bû, her weha lê xwedî derketin bû bû. Ji wê pêve wilo zêde ti zêde pêşketinê din yên hizrî derfet ji wan re nabê ku derbikevin. Lê di wê demê de, ku mirov di serî de Cizîre bota di nav de bi hasibêne li gelek herêman derfet û hîmê pêşketineke mazin heya û afirîya. Lê ew derfet hemû ji, bi her derketine ku serê lê tê perçiqandin ji hole tê rakirin. Piştê ji gelek serî hildan derdikevin. Piştê ne bi gelekî re ji xwe êdî demê nû li herême bi derketine musulmanetiyê re dest pê dike. Musumanetî li ser wê temen û bi wan derfetên ku hene derdikeve. Bi vê yekê ji, di demê pir kin de pir mazin bi pêş dikeve. Mirovên weke Weysel Qaranî û Abû hanîfê Dînwerî ji derdikevin. Ew ji mirovne pir bizane ne. Weysel qaranî ji bakûrê Kurdistanê ya. Lê Abû hanîfê Dînwerî ji ji rojhilatê Kurdistanê ji herême dinwerê ya. Bi derketine musulmanetiyê de bi tememî li herême demê nû bi awa û xosletên xwe re diafirê û li jiyane serwer dibe. Ya rasti, musulmanatî, weke xwestin û hewldane pêşketine herême ya. Bli vê yekê û awayê divêt ku mirov ser ziman. Hz, Muhammed, deme ku hizre xwe tene ser ziman ji, hîmê xwe dixweze li ser Birehim Xelîl û Nebî Ava bike û dike ji. Ev yek, pir girîng e. Musulmanatî hizre herêmî ya, ku

mirov weke berdewama hizrên berê yêñ Nebî Nuh û Birehim xelîl bêne ser ziman e. Bi vê yekê derfet weke hinekî diafirin ku demeke ronansansê ye mazin li herême şîn bide û pêşbikeve.

Deme ku mirov li herême û şert û mercên wê ji û li rewşe wê ye ku heya ji dimeyizenê, mirov vê yekê dibîne. Mirov dibîne ku ji pêşketineke wilo pir derfeteke mazin heya. Ya rasti, ku her weha ew temenê ku heya baş were bi kar anîn, wê ew deme ronansansê ya ku rojava jîn bûyî wê di wê demê de rojhilat jînm bûbana. Bi vê yekê re her weha du caran derfetên pêşketinên ku wê weha mazin bûbana li rojhilat ne nahata bi kar anîn. Yek berî zayîñ di deme Nairiyan de û ya dîn ji di deme derketine musulmanatiyê de. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Deme ku musulmanatî derdikeve, demeke ku mirov karê bêje ku ji aliyê pêşketin û hebûnê ve herêm demeke nûjeniyê jîn dike. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Ola musulmanatiyê ji, bi hizir û hebûne xwe ye ku pê derketî û hizir û hîmê ku anî ser ziman, her weha ye vê yekê bû. Ola musulmanatiyê, bi hizir û hebûne xwe re olaka deme pêşketi ye deme aqil bû. Di vê demê de, pergala civakî ya ku ji deme sumeriyaniyan de pêşketinê de bû û mazin pêşketibû, li ber ketine demeke nû de bû. Êdî ji her alî ve civakbûn, pêşketine wê, deme ji mirov û jiyana wî dixwest. Hz, Mihammed bi hizre wê re pergala civakî ku rojeme jîn dike di wê dem anî ser ziman. Di vê demê de wî xwest ku wilo bê jînkirin û dem ku pêde çû ji, pêşketin li ser wê pêşbikevin û pêde herê. Her weha ev yek, weke nêzîkatiyaka nû bi hizreke nû re di demê de pê re hata ser ziman. Musulmanatiyê, ev hizir weke perga weha anî ser ziman û xwest ku bi mirovan bide erê kirin. Alîyê ku Hz, Muhammed anî ser ziman û wilo zêde ne hata fahm kirin ji ev alî bû. Ev alî weke ku hê ji li bendî têgihîştin û fahm kirine xwe ya ji mirov. Bi vê yekê re mirov karê li ser bi sekinê û bêne ser ziman. Li ber diclê, di wê demê de, ji vê yekê re û nêzîkatiyê û hizrê re weke pêşengtiyeye mazin kir. Hizre Nebî Nuh û Birehim Xelîl hîm afirandibû ji vê yekê re. Hizreke ku pêşketi ji bê, di deme xwe ye ku divêt ku were ser ziman de, ku hata ser ziman, hingî, wê pêşketitiya xwe dide berçavan û bi mirov dide revakirin. Şert û merc û rewş, di pêşketin û anîna ser ziman ye hizir de bi demê re girîngiye xwe têne ser ziman. Di wê demê de ji her weha ev yek hatibû ser ziman. Hz, Muhammed, putên ku hebûn hemû dana şikandin. Ji ber ku nêzîkatiyaka ku di hundurê hizre olê ye gerdûnî bêne ser ziman. Li pêşîye wê gerdûntiyê ev yek astang bû. Ji ber ku jê belavbûn û qatbûn di anî ser ziman. Ji dêla wan hizre "xwûda" bicih kir. Xwûdê, wî, kira cihê waqas putên xwûdayên ku hene de. Bi vê yekê, riye pêşketinê da nîşandin.

Hizrê civakatiyê xosletekî mazin yê deme piştî zayîne ye. Herême rojhilat ji, di vê yekê de li pêş e. Tevî waqas êriş û kirinên ku li herême bûna ji, hê ji, herêm wê rewşe xwe ye mazin di pareze. Hê di hizir û baweriye de û pêşengtiyê dike. Her sê çar sadsalên berî zayîne, pêşketineke mazin ye hizir di anatolia de daya çêkirin. Rojava ji, li ser wê, hin bi hin pêş dikeve. Hizre, olî ye ku bi Nebî Musa re ji pêşketiya, hêdî hêdî dibê hizre olî ye wê pêşketinê. Piştî ku Îsewîti fermî ji haya erêkirin, êdî zû bi zû pêşketin û demên pêşkeînê derketin. Di van deman û demên piştê de, sembolên ku bi hizir hatîna afirandin û hatîna ser ziman, êdî di olê de cih digirin. Ev yek, pêşketine mazin di xwe de têne ser ziman. Wê amcanên vê yekê, piştê pir mazin xwe bînine ser ziman. OL, ji vir pêde, divêt ku hinekî cuda êdî were ser ziman. Bi du awayan divêt ku were ser ziman, Awayak awayê pergala civakbûn e. Awayê dîn ji her weha felsefe û hizirbûn e. Ev herdû awa ji, di rastî ji de jê ne dîr in. Hevdû temem dîkin. Bi hev re jîn dibin. BI hev re ew jîn bûn ji, mazin dide jîn kirin. Berî hertiştî hevdû diafirênin. Ol, di hizre xwe re felsefe xwe afirandiya, Ew felsefe wê bi xal û pîvanên wê re li ser xalkê serwer in. Rêveberiyên ku hene ji, piştê ku olê weke hizreke xwe dibin û ji xwe re dikine hizir, û lê xwedî derdikevin, êdî ew ji ne tenê weke rêveber weke "mirovekî oldar" ji têne ser ziman. BI vê yekê, êdî rêveberî û olî bi hev re di qalibankî bidest jiyane dike. Rojava bi Îsewîtiyê re tēja vê yekê dihildê. Lê rojhilat, ji deme sumeriyaniyan ve bi vê yekê û pergala wilo ku di xwe de afirandiya û pê jîn dibe, jiyane dike. Vê yekê, di hizir de û pêşketinê de wê gihandiya têrbûnaka mazin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku statûqûtî ji li ser vê yekê, yanî li ser vê têrbûnê re êdî xwe têne ser ziman. Bikar anîna hizre olî bi vê yekê her weha mazin e. Bi kar anîna hizre olî, pergala rojhilat, dike pergala statûqûparez. Bi vê yekê re, êdî olî ji, di xwe de statûqûyêkê bi rêveberan re têne ser ziman. Statûqûtîya rêveberan ne wilqasî mazin û girîng eku mirov bêje wê karibe civakê bi xwe re bixişiqene. Lê deme ku ol di vê yekê de

kete nav de hingî, pir zor ibe û pêşketinên ku wê ser temenê xwe bibin ji, di rawastihin. Li rojhilat, ji piştî zayîne ve, ya tê jîn kirin ji ev yeka ya. Lê divêt ku mirov di vir de tiştêkî din ji bêne ser ziman. Ev yek ji her weha ne rastiyaka mazin e. Deme ku ew statûqûcûti tê ser ziman, weke ku di olê de bi cih bê tê ser ziman. Di rastiye de ev yek ne wilo ya. Ya ku wê di xwe de diafirêne û di pareze ji rêvber in û hizre olî ji ji bo vê parastinê bi kar tênin ji ew in. Di vir de xataka pir tenik û zirev heya. Divêt ku ew yek baş û qanc were dftin û ser ziman. Çend ku olî û civak kevneşopîye xwe çêdike, her weha rêveberî ji bi wê statûqûpareziya xwe kevneşopîye xwe çêdike. Çerna kevneşopîye xwe ye ku wê çêkiriya, ew ji tam nabîne û serdestî wê nabê. Ew kevneşopî wê bi rê ve be. Kevneşopî, di xwe de di jîyanê de bi xalk û civakê re xwediye hêzêke weha di xwe de ya.

Li herême rojhilat, piştî zayîne, êdî pêşketineke mazin rû dide û pêşdikeve. Ew hîm û derfetê pêşketinê ye ku heya, di demeke kin de herême di bin musulmanatiyê de di pergalakê de dike yek. Ev yek, her weha pir girîng e ku were têgihiştin e. Ev yek, ji sê alîyan ve divêt ku were têgihiştin, di serî de felsefe, civaknasi û kevneşopî divêt ku bi hev re weke aliyekî werine ser ziman û têgihiştin. Aliyê duyemin ji, her weha civak, pergala û civakbûn û olîti divêt ku bi hev re weke vî aliyê ji werine ser ziman û têgihiştin. Aliyê sêyemin ji, ku xalên van herdû alîyan ji di nav de di piştî pêşketinên deman re felsefe, çand, xalk, bi xwe û rasteqîniyên xwe re hebûne xwe di vê yekê de berdeyam kirine wan e. Xala sêyemin wê di demên piştre de, hertimî û deman wê hebûne xwe bi pareze. Ji ber ku bi pêşketinê wê hertimî bi rê ve çûyin wê hebe û hertimî ji, bi waqas alîyan ve xwe afirandin wê her hebe. Felsefe, di pergala civakê de di kevneşopîyan de pir hêzeke guharandinê di demên aqil de dide nîşandin. Di demên aqil de weyne felsefe ji ye her demên berê maztir, zêdetir û girîngtira. Rojhilata navîn, di vê yekê de bi dîrok û hebûn û pêşketin û demên xwe yên ku jîn bûyî û hîn bûyî re pir bi zanebûn e. Rohilata navîn, her weha demeke mazin di deme nû ye piştî zayîne de jîn kir. Rojhilat, xosletekî wê ye herî mazin, ew ê, ku hertimî her pêşketinê di xwe de ku çêdike pê jîn dibe û mazin dibe. Bi vê yekê, maztir jîn dibe. Ji der anîn û lê bicih kirin, wilo zêde lê nayê. Wilo zêde pêşketineka mazin ji nadê çêkirin. Dibêt ku ev xoslet ji xosletên şaxsiyeta wê yên ku pêşketi bin. Ber diclê, di van deman de, mirov nikarê bêje ku weyne xwe ne leyist. Wê hertimî weyne xwe leyist û weyneke mazin ji leyist. Di hizir û pêşketine hizir de û bicih bûna hizir de weyneke mazin leyist. Piştî zayîne, ku bakûrê kurdistanê û başûr rojavayê kurdistanê ji di nav de weke "herême botanê" dihata ser ziman û naskirin, di wê demê de weyneke mazin leyist. Ev herême, Ne tenê di pêşketinên kurdistanê de, di pêşketinên herêmî de ji weyneke mazin di dîrokê de leyistiya. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku di pêşketine dinyê bigiştf de weyneke mazin leyistiya. Diclê û firat, di wê demê de ji hê li ser xwe bûn. Hê di afirandin. Berî zayîne, wan herêman maztir di afirandin. Lê di wê demê de ji mazin afirandin. Baweriya ku hatibana çêkirin, ku li ber diclê û firatê hatibana ser ziman û bahsa wê hatibana kirin, di nav xalkên din de ji desng di veda. Bi vê yekê re, pêşketine wê mazin dibû. Hz. Muhammed ji hatiya ber diclê û firatê. Di deme karvantiya xwe de hatiya. Di wan demên ku hatiya de haya bi ber kudusê wanderan çûya. Wî ji wanderan hizre mazin girtiya. Wî Nebî Nuh û Birehim Xelîl mazin hiskiriya. Ew hizirinên wî di kuranê de ji tene ser ziman, li ser Nebî Nuh û Birehim Xelîl. Di wê demê de ye ku ew nas dike mirovên weke weysel qaranê ji hene. Di hin anînen ser ziman de dibêjin wan hevdû ne dîtîya. Lê deme ku ew hizrên weysel qaranî, yên ku wî li herême botanê wanderan anîna ser ziman ji xalkê his dike, mirov digihe têgihiştineke wilo ku wan hevdû dîtîya. Li herême botanê, mirovên weke "Êlimê Rim kesk, ku di wê demê de jîn bûna û şex bûn û xwedî dergah ji bûna û di nav xalkê de weke ku mîr ji bûn hebûn û wî Hz, Mihammed di saxitiya xwe de dftibû. Ew ji, li ber Diclê li ber Cizire bota ku hinek bi bakûr de dikeve li wir jîn dibin". Bandûraka wan ye pir mazin û kifşkar heya. di vê demê de, mirov li jîyanê bi têgihiştin e. Li gor wê têgihiştine xwe ji dixweze û diafirêne. Pêşketinên ku dibin û derdikevin ji, ku li gor wê pêşketinê bin û bersiveke têr bibine wî, hingî, ji aliyê wî tê erê kirin. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku pêşketineka mazin hebû.

Li herême, derketine musulmanatiyê, demeke mazin ye nû afirand. Bi vê afirandinê re, herême di serî de heya derekê ji pêş ji ket. Di deme Hz, Muhammed bi xwe de, hin pêşketinên

Bi vê yekê, mirov rastiya mazin ye wê kifş dike. Ew rastî ji, bi têgihîştin û hizir re pêşketine pergala civakî pêşketine wê bû. Mirov bi vê yekê re her weha wê pir baş û qanc kifş dike. Di vê rewşê de, mirov deme ku li ser wê dihizirê mirov vê yekê pir mazin dibîne û kifş dike. Ji ber çî Cizîre bota her weha mazin û pir binirx, çand û kevneşopî bû? Divêt ku mirov bersive wê pirsê ji dîrorek wê ye ku jîn kiriya bide. Ji nirxên ku di xwe de afirandina bide. Ev yek, wê hingî rast bê. Bi vê yekê û nirxê û kevneşopîyên ku dîroke xwe de di xwe de çêkirina, mazin afirî bû. Bi wê nirx û kevneşopîyê, demên pêşketinê de xwe bihizir kir û bi pergal kir. Ew pergal ji, bû pergalaka wir ye herême. Lê çend ku pêşket ji, êdî ji herême buhurtî bû ye gûrdûnî. Bi vê yekê, pergala hizir ye Cizîre bota pergalaka dîrokî û gerdûnî ya ji. Salahadînê Eyûbî, deme ku me hizre wî bi pergal hizre wî ye di serê wî de anî ser ziman, me dît ku ev yek di hizre wî de pir rûniştîya. Bi kevneşopî û nirx pêşketiya. Bi vê kevneşopî û nirxê re, em divêt ku bêja baweriyê di vir de bi vê yekê we girêdayî, çend gotinên din ji bîne ser ziman. Ji ber ku pêdivî bi vê yekê heya. Ji bo ku baş were têgihîştin û fahm kirin ev yek, pêdivî pê heya. Ji ber ku bawerîya Cizîre bixwe gerdûnî ya. Wê Xwe gerdûn kiriya. Ev yek girîng e, ku em di vir de nahaka kifş dikin. Ji Nebî Nuh hata ku dem tê deme Birehimî Xalîl û piştê Nebî Îsa û Hz. Muhammed ji, ev pergal rîya wan ye pêşketinê ya. Ev pergala Cizîre bota ye ku bi Nebî Nuh re pêşketiya, ji wan re bûya rê ku bi vir de di demê de werin û pêşketinê demên xwe bîne ser ziman. Wan, hemûkan, di demên xwe têgihîştine bêje baweriyê ye li Cizîre bota bi Nebî Nuh re pêşketiya anîna ser ziman. Bêja bawerîya ye li Cizîre bota Nebî Nuh re pêşketi ya û birehim Xelîl re hebûne bi vir ve berdeyam kiriya, bi nirxbûn, kevneşopîbûn û hizirbûnê pêş dikeve. Di dîrokê de ji, dîroke xwe di afirîne. Lê têgihîştine Statûqûperezî lê nayê. Ne li gor wê ya. Wê di cihê wê bêja statûqûyê de çand bi kevneşopî û di

deman de li gor deman hertimî pêş dikeve bicih kiriya. Statûperezi, pêwîstiya wê bi têgihîştine baweriya ye di hundurê wê de nîn e. Ew dixweze ku karibe wê têgihîştine wê ye ku di dîrokê de bikar bêne, têgihîştine xwe bi xwe çêke û serwer kê. Bi vê yekê, pêwîstiya wê, tenê bi qalibê baweriyê ye ku heya dibê. Ev yek, jê re girîng e. Kevneşopî ji ku nêzikatiya hizir dîrket, ji statûqûtîyê re hîmekî bixwe diafirêne. Baweriya ku Cizîre bota ye ku me nahaka anî ser ziman, bi hebûne xwe li ber vê yekê ya, ne pejirêne. Bi vê yekê re, li herêmê bi têgihîştine pêşketinê wê û dîroke wê lê bê meyîzandin, mirov wê vê yekê pir xweza bibîne.

Bi vê yekê, mirov karê pergala li Cizîre bota têgihîştine wê bibîne û bêne ser ziman. Têgihîştine wê pir mazin e. Li gor deman xwe afirandin ji, hîm têde heya. Ji ber vê yekê, bi vê yekê re di deman de buhurtiya û gehaya haya roje me. Cizîre bota, pergala wê, hê di deme sumeriyana de, dev ji bi nêzikatiyên mîtolojîkî xwe anîna ser ziman berda. Lê rêveber, bi vê yekê jînbûn û hebûna xwe ber dewam kirin. Bi vê yekê, di şaxsê rêveberan de hertimî şerekî bi vê yekê di nav vê têgihîştin û pergale de bi wan re bû, li herême. Wan, dest ji vê pergale ji berda. Lê li gor wê ji jînbûn, bi wan re wilo zêde bihizir û kevneşopî mazin çênebû. Li gor xwe hertimî anîn ser ziman. Çawa pêşketibûn, bi wê pêşketine xwe anîn ser ziman. Lê ew pergala divêt ku bi têgihîştine xwe were têgihîştin û ser ziman. Ne wê li gor nirx, çand û kevneşopîyê xwe biguharênin, çand, hizir û kevneşopîyên xwe li gor wê bi aliyê pêşketin û têgihîştine hizir ve biguharênin. Bi vê yekê, wê rîya rast were kifş kirin. Hz. Muhammed, hewl da ku vê yekê bide fahmkirin bi mirovan. Lê ye ku ne hata fahm kirin ji ev yeka ya. Piştî Hz. Muhammed re, nêzikatiyaka mazin ku mirov weke ye wî şîrove bike Salahadîne Eyûbî xwest ku bide nîşandin. Wî ji hîm ji Cizîre bota fêr kir. Bi vê yekê, wî nêzikatiya xwe re bi rasteqîni da nîşandin. Hîmê baweriya Salahadîne Eyûbî, bi hîmê xwe re bi civaknasiyaka pir xurt re dihata ser ziman. Mirov di wî de hizir û têgihîştine Cizîre bota ye weha ku me anî ser ziman ye dîrokî dibîne. Wî baweriya, ne bêtêgihîştin û hizir jînkir û anî ser ziman. Bi vê yekê, em di vir de, kifşeke din ji bi hizir bi salahandîne Eyûbî re bikin. Ew ji her weha, wî ne baweriya xalkakî jînkir. Wî, baweriya civakatiyakê jînkir. Wî, baweriya hizre deme civakatiyê jînkir. Li gor wê wê anî ser ziman. Bi vê yekê re em hinekî divêt ku li ser jinê ji bi vê nêzikatiyê re bînine ser ziman. Ev yek ji, her weha di vir de û bi vê yekê ve girîng e. Jin, hebûn û xweşikatiya xwe re weke nirxekî dihata dîtin. Ji ber vê yekê bû, ku deme ku di nav du aşîrên kurdan de levxistin ji derketibana, ku jînekê çûbana û di nav wan de sekinî bana, yek ji ji wan ji wê ne di buhurt û gava xwe diavêt û şer dikir. Jin, di vir de, pir girîng bû. Nêzikatiyak lê pir girîng bû. Di nav kurdan de di wê demê de jinên şêx ji hebûn. Yê ku dibûna mîr ji hebûn. Her weha kevneşopîyê wan hebû. Ku mirov bahsa Şahmaran bike, divêt ku mirov bi vê yekê re weke nirxeke pîroz bêne ser ziman. "Hemû zanebûne deman û ye evrenê ye bûya û ye ku wê bibe ji" pêre di dîtin. Wê, çi bûya û wê piştê bibe ji zanibû. Di nav kurdan de her weha li ser Şahmaran baweriya din ji hebû. Di gotin ku Deme ku xwûdê mirov ji hariyê çêkir, hingî, wê ji dît ku wa xwûdê mirovan ji hariyê çêdike. Bi vê yekê re, êdî dibêjin ku xwûdê êdî zanebûna hemû deman da wê. Bi vê yekê re, pîroziye li wê tê ser ziman.

Jin, di çanda li ber diclê de i Cizîre bota û li dore û bigîştî li Kurdistanê, ji demên berê xwe xwediyê çandaka birêz û kevneşopîyê kur e, di nav civakê de. Li gor wê û hebûne wê, ci nav civakê de nirxne pir civakî yî dîrokî bîkevneşopî hatina afirandin. Deme kuu mirov li çanda ber diclê lê dimeyîzenê, mirov vê yekê pir baş û kur dibîne. Li berdiclê û li berfiratê, her weha bi jîyanê re çanda dîrokî heya. Di nav hizrên pîroz cihgirtin ji bi wê re heya. Bi vê yekê, kevneşopîyê wê heya. Li berdiclê ji û li berfiratê ji, jîyan, ye wê diafirêne ji ew bixwe ya. Divêt ku mirov vê yekê pir baş do di cih de di serî de kifş bike. Piştî demên Neolotîkê ji, di deme şaristaniyê de ew pêşketine ku bi wê hebû hebûne xwe berdewam dike. Di deme Neolotîkê de, jin xwediyê cihêkî ku pir girîng e. Deme ku dem tê deme şaristaniyê de ew girîngbûn bi nirxên ku bi wê re afirîne tene wê demê û di wê demê de wate digirin. Di demên berê şaristaniyê de, ku mirov lê dimeyîzenê mirov dibêne ku dê pir girîng e û xwediyê cihêkî ku pir girîng e. Mirov, di cih de vê yekê kifş dike. Jîyan, ji her alî ve ji wê tê pirsin. Li ber diclê, ew jîyanê wê her weha bêhtir pêşketiya. Lê di vir de, deme ku mirov li ber diclê, li pêşketinê wê û li rewşê mirov ye ku haya nahaka ji dijî, ku mirov lê dimeyîzenê, mirov tiştêkê pir balkeş dibîne. Ev yek, hê ji bi kurdan re

hebûne xwe berdewam dike. Ew rêzdayîna pîran e. Ji mirovên pîr û kal re rêzeke pir mazin heya. Li ser vê yekê di nav civaka kurd de nîqaş ji nayêne kirin. Tenê ew rêze ku heya, bi kevneşopîye û tê bicih. Ji wê pêve wilo ti tiştêkî din ji nîn e. Bi vê yekê, deme ku mirov li pîran dimeyîzenê, di jîyanê de bi vê yekê weyneke pir mazin ji bi wan re heya. Ew çi bêjin, weke wê tê kirin. Bi vê yekê, gelek pêşketin ku dibin ji, mirovên navserî xwe yên pîr û kal, xwedi weyn in. Bi vê yekê ku mirov li jinê dimeyîzenê, mirov heman nêzîkatîyê li wê ji dibîne. Her weha ev yek, weke nirxekê ya. Gotinaka ku gelekî hev n, û hata nahaka ji demên berê ve tê gotin her weha ev ê. "Pîr, nirx û xazîne ne". Ev gotin, weke gotinaka xalkê tê vegotin. Bi vê gotinê, mirov karê kevneşopîye di nav kurdan de ye bi pîran re heya û haya roje me li ser xwe meya û xwe parastîya bînine ser ziman. Pîran, weke nirxan dîtin, di rastîya xwe de di pêşketine civakê de weyne wan ji wê bi xwe re bîne. Bi vê yekê re divêt ku em li ser vê yekê ji bisekin in. Divêt ku em hinekî li ser weyne pîran ye di nav civakê de ji bînine ser ziman. Ev yekji, her weha girîng e.

Mirov, ku pîr bû, êdî ji demeke xwe pêve, di cihê xwe de dirûnihê û bidest aqildana li yên ji xwe biçûktir dike. Bi vê yekê, her weha di nav civakê de bi weyn e. Civatên kurdan, ku mirov di vir de navê wê bîne ser ziman, divêt ku em bi pîran re bi rêz û pak bînine ser ziman. Di civatan de hertimî, weke ku kurd dibêjin "mirovên navserî xwe lê di rûnihin in". Mirovên navserî xwe ji, mirovên ku pîr in. Yên ku bi gotin û hîzre xwe re di nav xalkê de xwediyê rêzeke pir mazin in. Di vîr yekê de farqa jin û mêrê nîn e. Herdû ji karin li civatê rûnihin û hîzre xwe bînine ser ziman. Karin, li ser kirin û bûyarên dibin hîzre bînine ser ziman. Wê li wan ji bê hisandin. Gotina ku ji devê wan derkeve, wê vala neçê. Wê lê bê hisandin. Deme ku lev dirûnihin in, êdî herkesek hîzre xwe tînine ser ziman. Lê di vir de em gotinaka bi kevneşopî û bi nirx ji bînine ser ziman. Di deme axiftinê de di civatan de hertimî mafê gotina pêşî ye mirovên kal e. Pişt wan re bi mazinatiya xwe kî tê, ew mafê axiftinê di hildê û diaxivê. Mîr ji, axlabe, yê ku di civatan de amede ya. Ji xwe, hertimî civata wî li dore wî heya û mirovên ku her weha navserî xwe ne, li dore wî bi wî re rûniştî ne. Ew bi hev re diaxiv in û li ser rewşan hîzre tînine ser ziman. Di nav xalkê de li derve ji, hertimî meraqak heya ku ka mîr an ji mirovên ku pîr in, di civatê de li ser çi axiftin û çi anîn ser ziman. Ji ber ku rêzeke mazin ji wan re di nav xalkê de heya û sedeme wê meraqê ji ye din ji, her weha ku wan çî li ser çi anî ser ziman, wê wilo bê erêkirin. Weke ku mirov di nav xwe de guh bidine xalên destûreka binghîn her weha guh didine wan gotina û awayê hatina wan ye hatina ser ziman. Pişt re ku di civatan de axiftin bûn ji, êdî ji civatê ku derketin çêbû, êdî yê ku hiskirî wê ji yên ku hisnekirine re bîne ser ziman. Wê ji wan re bêje ku ka çi hata axiftin û li ser çî
axiftin bû.

Lê di vir de, divêt ku em tiştêkî din ji yê teybet bi nirx bînine ser ziman. Ew ji hebûn û mazinbûna mîr an e. Li vê yekê re ji bi vê yekê ve girêdayî divêt ku em bînine ser ziman. Ji ber kueb yek ji her weha girîng e. Mîr, ne mirovên ku di civata wî de rûniştî ne, ji hemûkan ne maztir a. Lê rêze hemûkan ji jê re haya. Ev yek, weke ku neyê nîqaşkirin di vir de bînine ser ziman. Mîr, li gor kevneşopîyekê deme ku dibê mîr, dibe mîr û mîrbûna wî tê erêkirin. Lê deme ku bû mîr ji, jê hinek nirx û li gor hinek kevneşopîyne tişt jê tene xwestin. Divêt ku ne bêzanebûn bê. Divêt ku rêze wî pêşî ji wî re hebe. Ev yek ji, ji gotin û axiftinên wê tene kifşkirin. Divêt ku li gor çanda xalkê ye ku heya, di asta herî bilind de bê bizanebûna xwe û bibe weke mînaqakê. Her weha bi vê yekê, lê tê meyîzandin. Mirovê ku wê bibe mîr ji, pêşî li şûn wî tê meyîzandin, ku ka malbata wî çend mazin û bi nirx e. Dê û bavê wî çend biasl in. Kirin û nêzîkatîyên wan ji yên ku wan dana nîşandin li berçav tê girtin û li yê ku wê bibe mîr lê tê meyîzandin. Ku ew bû mîr, divêt ku ew pêşî bi zanebûna xwe bidê nîşandin ku bizanebûna û ji xalkê re bide nîşandin ku xwediyê nirxê wan e. Di civate wî de, ku ew bû mîr, wê çara pêşî ew bi pîr û kalan re rûnihê. Wê ew ji wan re bi wan re biaxivê. Wê li gotinên wî bê meyîzandin ku ka çend bizanebûna û di cih e diaxivê. Lê di wê civata wî ya pêşî de ku şaxbin, wê dê û bavê wî ji hebin. Ew li ber dê û bavê wê karibe bi axivê? di axiftinê de ji rêz û nerêz heya û di ne axiftinê de ji rêz û nerêz bi heman awayî heya. Li cem dê û bavê xwe yê pîr û kal, ku gotina xwe ji ye wan hewlîde ku bibuhurêne, hingî, wê ne birêz bê pêşwazi kirin. Di vir de, ev yek, binirx û bikevneşopî heya. Wê di wê civata wî ya pêşî de jin ji hebin, ew ji wê ye xwe bînine ser ziman. Ev yek ji, her weha wê girîng bê dîtin. Di vê yekê

de, mîr, weke ku di azmûnekê de bê dibe. Lê divêt ku ji mazinên xwe, yanê, ji wan mirovên pîr û kal gotinaka baş ji bo wî û gotinên wî rewş û gavavêtinên wî bê gotin. Ku hata gotin, hingî wê ew bê mîr. Wê ew weke mîr bê pêşwazi kirin. Lê xalk ji wî êdî weke mîrê xwe erê bike. Ku her weha hata erêkirin, êdî ew mîr e. Ev nêzikati, kirin, nirx û kevneşopî, ji deme Nairiyan hata deme Medan û piştê, bi pergal dibin û hebûne xwe berdewam dikin. Nirx, pêşketin û kevneşopîyên deme Nairiyan pir girîng in, ku divêt ku mirov wan bi deme wan û xwe re pir baş û qanc fahm bike. Ji deme wan, her weha hatina deme Salahadinê Eyûbî, pir bi pergal û şop pêşketin bi têgihîştin û felsefê re dibe. Deme Salahadinê Eyûbî, deme ku mirov weke deme wan pêşketin û nirxbûnan de bi kevneşopî û bi pergal pêşketine deme civakatiyê bi hizire re tê ber çavan. Salahadinê Eyûbî, bi vê yekê di deme xwe de demeke nû ji li Kurdistanê û li rojhilat bigiştî diafirîne. Divêt ku mirov wê ji her weha fahm bike û bêne ser ziman. Rojhilat, bi wî re dikeve demeke nû de. Ew deme nû, ji aliyê pêşketinê ve divêt ku mirov weke demeke hemdem ye herême

bêne ser ziman.

Li herême ew dem, demne ku mirov weke demên pêşketî bêne ser ziman in. Lê ji wê zêdetir, ji pêşketinên herême zêdetir, li herême di warê desthilatdariyê derewşên nû diafir in. Li herême, pêşketin, di deme Salahadinê Eyûbî de pir li pêş e. Bi xusisî ji, li herême botanê, her weha mirov karê bêje. Lê li herêmên din ji wilo ya. Herême botanê, di her demê pêşengti kiriya. Di wê demê de pêşengtiyê dike. Bi pêş dikeve. Bi hizir û nirxên di xwe de pêşengtiyê dike. Bi vê yekê mazin û navdar e ji. Her weha divêt ku em li ser bisekin in. Lê di vir de, divêt ku em hinekî li ser rewşê herêmê ye di wê demê de bi Salahadinê Eyûbî re afiriya, hinekî li wê ji meyîzenê. Rewşeke pir mazin û baş afiriya. Salahadinê Eyûbî bi hizre xwe re rewşeke nû afirandi ya. Deme ku car bi car bahsa Salahadinê Eyûbî tê kirin. Tenê weke rêveberêkî tê ser ziman. Salahadinê Eyûbî ji wê zêdetir û mazitira. Divêt ku mirov vê yekê bibîne. Hizre wî di nav xalkê de tê zanîn û ser ziman. Ew ji, di cviatan de rûniştîya û wî ji hizre bi zanebûn di nav wan de anîya ser ziman. Bi vê yekê mazinbûnaka wî heya. Ku mirov li ser xosletên demê dihizirê ji, mirov hinek xosletên demê yên girîng pêre ji dibîne. Lê berî ku em wan xuyakirinên pêre bînine ser ziman, pêşî li ser demê bixwe hinekî bi sekin in. Ji ber ku ev yek, di vir de girîng e. Bi xusisî ji, girîng e, ku mirov wê demê bi xosletên wê bêne ser ziman. Piştî bûna Abasiyan li herême û bûna Merwaniyan li Kurdistanê, êdî rewşeke nû afiribû. Ji deme derketine Musulmanetiye ve haya wê demê, pêşketineke mazin di qada olî de bûya. Ji aliyê rêveberî ve ole musulmanetiye, pir mazin bicih bûya. Ev yek li ser çavan pir mazin tê xuyakirin. Bi abasiyan re ole musulmanetiye ji, di keve deme nû ye dî de. Derketine Hz. Muhammed bi hizre wî, li gor ddemê ku were ser ziman, wê her weha bi hatana ser ziman, wê pergala xalkiye demeke xwe bidawi kiribana û bi deme Civakatiye wê hebûne xwe berdewam kiribana. Bi vê yekê, wê pergala ku bi navê xwûdê hata ser ziman, wê pergalka civakî ye herêmi li gor pêşketinên wê afirandibana. Bi vê yekê, wê nirx û kevneşopîyên demên berê ji, wê hatiban guharandin. Her weha mirov wê pêşketin derketibana. Abasiyan, deme wan, pir girîng e, ku mirov ji gelek aliyan ve li ser bisekinê. Ji ber ku ole musulmanetiye ji deme wan bi hizire Hz. Muhemmed ne buhurê. Ew di deme xwe de, hizre xwe diafirênin û di musulmanetiye de bi navê musulmanetiye tînine ser ziman. Hizre ku di afirênin ji, ji hizre statûqûtiya berê ne cudatira. Bi vê yekê, musulmaneti, bi wan re û di demên pişt wan re tenê bi awayê baweriye li jiyane di mîne. Bêje "baweri"ye û "baxt"awariye pir bi pêş dikeve û li jiyane serwer dibe. Ev herdû bêje, êdî weke cewherê musulmanetiye tenê erêkirin. Her weha ya ku Abasiyan di musulmanetiye de kir ji, ew yeka bû. Bi vê yekê re, her weha êdî pêşketin derdikeve. Li rojhilat, bi vê yekê re êdî di jiyane de rewşeke nû di afirê. Mirov ji jiyane û jiyankirine bitememî dûr dikevin. Mirov, li jiyane weke ku li bendî çûna wê jiyana din(axiretê) dijîn. Her weha rewşek di afirê.

Bi vê yekê, di baweriye de pêşketin û pêşve çûyîn dibe. Lê di hizir û pêşxistina jiyane de pêşxistin wilo zêde nabê. Bi vê yekê, weke ku awayê pergalkê derdikeve hole. Ev awayê pergale ye li rojhilat, di rastiye de weke awayekî nirxên berê tê berçavan. Lê ji wê ji cudatir, weke jiyana tenê bi baweri ku tê jîn kirin tê berçavan. Jiyana bi baweri, li jiyane serwer dibe. Deme Abasiyan bi vê yekê hinekî pêş dikeve. Lê wilo zêde pêşnekeve. Rastî gelek bertekan têt. Li ber

diclê pir mazin pêşketin heya. Ew pêşketin Abasiyan ji bi bandûr dikin. Deme ku mirov li çîrokên ku bi berhev hatina kirin bi navê "çîrokên hezar û yek şevî", di wan de mirov gelek figur û awayên jiyana li ber diclê ku hatina jînkirin, lê li wir bi navê wir hatina ser ziman dibîne. Di wan çîrokan de cihanaka pir bi reng bi xewn û xiyel hatina afirandin. Di wan çîrokan de mirov karê bêje ku bizêdeyî ji, xosletên ku tene ser ziman, yên jiyana berdiclê ne. Ew xoslet û vegotinên ku ji wir birine wir û li wir hatina vegotin û li wir hatina berhevkirin, her whea mirov karê bêne her ziman. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku bi awayê pêşketinê, êdf jiyana herême ye mirovan di nav hev de bidest pêşketinê dike. Lê li gor wê, rêxistin û pergalka civakî û olî divîya bû. Musulmanetî ji wê bûbana ew pergal. Lê hin bi hin ji wê yekê tê dûrkirin. Deme piştî deme Abasiyan ye Merwaniyan ji ber vê yekê girîng e. Deme Merwaniyan, deme ku civak dixweze bi aqil pergala xwe di nav xwe de bi rêxistin bike ya. Her weha bi vê yekê, mirov karê bêje ku ew hizre ku Hz. Muhammed bi rêxistin kirî, li gor cewherê wê hatina ser ziman bixwe ji ya. Navende wê dewlete Kurd, bi nîrxû kevneşopî Cizîre bota ber diclê ya. Nîrxên Nebî Nuh li wir pir tene ser ziman. Deme Merwaniyan, demeke ku li herême mirov weke xwestineke ku ji deme Abasiyan derketinê bêne ser ziman. Her weha bi wate ya. Merwani, bixwe û hizir û pêşketine xwe pir serwer in. Ji aliyê civaknasî û hizir ve pir xurt in. Di rêveberiyê de bi nîrx û kevneşopî ne.

Ku mirov her weha bi vê yekê şrove dike û tê deme Salahadinê eyûbî, mirov hingî, deme wî, weke asta vê demê ye herî bilind ku pêş dikeve û tê jîn kirin bêne ser ziman. Ku mirov her weha bêne ser ziman, wê rast û di cih de bê. Deme wî, demeke nû ya. Di hizir û baweriyê de ji astaka nû ya. Di hizir baweriyê de nêzikatiyaka nû ya. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Di wê demê de Zanistên weke Êlî Herîrî hene. Wan ji, hizreke mazin di nav xalkêde afirandina. Bi awayê hizirkirin û bi teybetî ji bi hizirkirina xwe demeke nû hîmê wê weke di afirênin. Hizre Êlî Herîrî, ku mirov çend gotina di vir de li bêje wê di cihê xwe de bê. Ji ber ku wî û hzire wî, di demê de pir bandûraka mazin li pêşketinên ku hene û yên ku pişt wî re dibin dike. Ji ber vê yekê, her weha girîng e, ku mirov hinekî li ser bisekinî. Êlî Herîrî ji, weke Feqiyê teyran ku pişt wî re hatiya ser ruyê jiyane, tenê weke mirovne "helbestvan" tene ser ziman. Di vir de, em bînine ser ziman, ev gotin û bi navkirin, ti carî rastiya van mirovan nayêne ser ziman. Ji ber ku rastiya van mirovan weke tê şer ziman ji wê pir mazîra. Haya î ro ji di derbarê jiyana wan de gelek xal ne zelal in. Lê em vê yekê zanin ku ew pir mazin in. Wan, bi hizir û û hizirkirina xwe re demek afirandiya. Nahaka emê hinekî di vir de li ser Êlî Herîrî bisekinîn. Di cihên pêş de eme hinek li cihê xwe, cih bidine Feqiyê Teyran. Lê nahaka ye ku di vir de, girîng e, mirov bahsa Êlî Herîrî bike.

Êlî Herîrî bixwe, mirovekî ku xwedî dergah bû. Mazin bû. Li herême Semzînanê tê dinyê û li wir mazin dibe. Di deme biçûkati û ciwantiya xwe de bqasî ku di nav xalkê de tê vegotin, li Cizîre bota ji maya. Li wir di deme ciwaniya xwe de pirtûkaya pêşî Nivîsandiya. Hê ku ciwan bû û feqihê bû, wî pirtûka xwe dide bi pêşî nivîsandiya. Piştî ku ew di nivîsêne, piştî, êdf di nav aliman de tê nas kirin. Navê wî derdikeve. Li herêmên Kurdistanê, yên ku bi nav dibin û navê wan tê bihîstin, ne mumkun e, ku di dergahên din yên herêmên din de newê ser ziman. Navê wî ji her weha tê ser ziman. Piştî ku navê wî tê bihîstin, êdf ew li herêmê bixwe ji, tê naskirin. Ew piştî, li herêmên dervi Kurdistanê li wanderan ji digerihe û dimêne. Bi qasî tê zanin li Şamê ji demekê maya. Wê demê şam, bi Kurdistanê ve bi rêvebere kurdan ve dihata ser ziman. Serweriya wan ji her alî ve lê hebû. Êlî Herîrî ji diçe wir. Lê piştî tê gotin ku tê Cizîre botanê careka din û piştî ku di vegehihê, êdf berê din ji wir digerihe cihê bavûkalan. Li wir ji, ceraka din ku hinekî din dimêne, êdf piştî ceraka din rêdigirê û diçe Cizîre bota. Li wir ji, wê carê ji demeke dirêj dimenê. Di wê demê de pir dibe xwediyê qadrekî pir mazin. Bi aqil xwe derdikeve pêş. Di wê demê de, Rêveberiya

Merwanîyan hê bixwe ya û li ser rêveberîya Kurdistanê ya.Ji aliyê rêveberîyê ve ji pir qadrekî mazin û birêz dibîne.Piştê ku ew di demên xwe yê dawiyê e di vegehîyê Samzînanê, êdî ew li wir dergaha xwe de mazin di nav xwe de têne ser ziman.Biqasî ku em ji gotin û gotinên bi bawer yê ku di nav xalkê de têne ser ziman de dibînin, ku wî di her demên xwe de nivîsandîya.Weke ku tê vegotin, divîyabû ku î ro, di destê me de ser deh pirtûkên wî di destê me de bana.Lê ji hinek hebêstên ku wî nivîsandîna pêve ti tiştêkî nîn e.

Êlî Herîrî, ku mirov deme wî têne ser ziman, mirov pir pêşketîna mazin bi wî re dibîne.Bi vê yekê re, ku mirov demên piştî wî ji têne ser ziman, mirov pêşketînekê têne ser ziman.Piştî xwe re, wî bandûraka mazin li zanîstên ku afirîna û hatina kirîya.Hizre wî, di wan de pir pêşketinên mazin kirîna. Wî, bi vê yekê, demên pişt xwe re bi hizre xwe re pir mazin kifşkirîna mazin kirîya.Di serî de wî demêke bi aqilê ku bivac di olê de pêş xistîya, li gor deme xwe di wê heyemê de.Wî, di aqil bivac de hest ji mazin bi awayê gotinê re bicîh kir.Bi vê yekê re deme ku mirov wî kifş bike, mirov divêt ku pêşî rastiya wî bêne ser ziman, hingî, wê ew kifşkirîna bi wî re rast û pak werîne ser ziman. Ew dem, demne ku aqil êdî dem bi dem di pêşketinê de weyn dileyîzê ya.Aqil, bi weyn di nav xalkê de ji dileyîze. Aqilê mirov, di jîyanê de êdî serwer e. Di demêke ku aqilê mirov li jîyanê serwer e, Êlî Herîrî derdikeve û têne ser ziman û wê deme biaqilê ku serwer li jîyanê bi têgihîştînekê ku vê yekê di xwe de û di demê de kur bike diaxivê û têne ser ziman.Bi vê yekê, ew demêke di aqilê bivac de.Êlî Herîrî, ji ber çî wîlqasî navê wî derket.Ji ber ku Hizre wî ne tenê Li Kurdistanê, li herême rojhilat bigîştî bi bandûr bû.Di hizre musulmanetîyê de wî demêke nû bi xwe re anî. Ev yek, divêt ku were dîtin. Ew bi vê yekê, ne tenê zanîstekî kurd yê Kurdistanî bû, ew zanîstekî herêmî yê ol ji bû.Malbata wî ji, bi kevneşopî bû.Şêx bûn û serwerbûn, li Kurdistanê.Bi vê yekê ji, di mazinbûna wî de hinekî weyn leyist. Êlî Herîrî li Cizîre bota û li dore wê mazin bû.Xwandîna xwe ji li wir li cihê ku lê mazin bû kir. Bi vê yekê, ew biaqilê xwe li wir mazin bû.Wî têgihîştîna xwe li wir mazin kir. Wî, Ew hizre bi pergâl ku hîmê wê bi Nebî Nuh û Bîrehîm xelîl re dihata ser ziman ji, têgihîştîbû û fahmkirîbû. Bi vê yekê, ew deme ku hizre xwe têne ser ziman, li gor wê û wê yekê têne ser ziman.Ne li gor hizrên ku afirî ne û bi pergâl in yê rêveberan têne ser ziman.Bi vê yekê ve girêdayî, mirov karê tiştêkî din ji bêne ser ziman. Ew deme ku hizre xwe ye bi bawer têne ser ziman li Baxdayê, li wir ji ber vê yekê rastî gelek bertekan têt. Gelek rexne ji lê têne girtin. Hêma ji bo zîmanê wî û hem ji ji bo rexnen wî. Lê ew ji yan xwe nayê xwere. Ew di serî de çawa têne ser ziman, piştê ji wîlo têne ser ziman. Bi vê yekê, êdî rewşêke mazin bi wî re li Baxdayê di afirê û wî di wê demê de derxîna pêşîya zanîstan ku wî û hizre wî şîrove bikin û li ser bigihîna hizrekê.Deme ku wî derxîna ber zanîstan ji, çend ku ew pêr dikevîna nîqaşê de, ti kesek bi zanebûna wî nikarê.Êdî ye wî rast dibînin û dev jê dibêrdin. Piştê êdî ew mirovên ku ew derxistîna pêşîya wan ji, têne ber wî û rêzeke mazin jê re didîna nîşandin.Bi vê yekê, êdî ew li wir ji, bi rastî û mazinbûna xwe û ye hizre xwe tê nas kirin di nav xalkê de.

Êlî Herîrî, her weha li wir ji mazin dibe.Hizre wî, li wir ji, êdî tê naskirin û zanîn. Bi vê yekê re, li herême weke zanîstekî mazin yê olî ji êdî tê naskirin.Bandûra hizre wî ye di olê de pir mazin e. Divêt ku mirov wê bandûra wî bi teybet bêne ser ziman.Nêzîkatîya Êlî Herîrî ye hizrî ji, divêt ku em çend gotinan li ser vebêjin.Ji ber ku ew ji her weha pir giring e. Wî, di nêzîkatîya xwe yê hizrî de, hertîmî aqil bivac derxiste pêş û anî ser ziman.Bi vê yekê li ser zanebûna mirov û aqilê mirov sekinî. Li ser jîyana mirov ye ku dijî û çawa divêt ku bijî ji serî wastand.Di jîyanê debikar anîna aqil ji, ku mirov lê dimeyîzenê û rastiya wî fahmdike, mirov dibîne ku serî li ser wastandîya.Di hizre wî de mirov û bawer, jîyan û mirov, kevneşopî û nîrx bi pergâl hatîna ser ziman.Mirov û hizre wî û pêşketîna wî di hizre wî de û di anînyê wî ye li ser ziman de cîhekî teybet digirê.Wî di hizre xwe de pir giringî daya mirovan û pêşketîna wan.Mirov vê yekê, ji jîyana wî ya ku li dergaha wî bi mînaq fêr dibe.Wî di dergaha xwe de hertîmî, mirovên ku perwerde dida wan digirt.Bi vê yekê, weke ku di nav xalkê de tê gotin, "bi sadan feqîhên wî yê li cem dixwandîna hebûn".Bi vê yekê, jîyana wî hebû.Wî, jîyana xwe bi tevahî dabûbû ilm û pêşketinê.Li her herême ku diçiyê de ji, weha bi van xosletên xwe tê naskirin.Li Cizîre bota ji, li cem mîrê bota maya.Li wir ji, di deme ku maya de, bi qasî ku em ji vegotinên ku di nav xalkê de liser wî dibêjin

fêrdibin, wî li wir ji, perwerde kiriya. Li wir, di deme ku maya de, li cem tirba Nebî Nuh maya û li wir bi rojan di rewşeke ku bi perwerde dike re maya. Mirov, vê yekê her weha pir baş fêrdibe ji vegotinên di derbarê wî de.

Deme pişt wî re deme ku mirov pir girîngiyê didine aqil e. Bi vê yekê aqil derdikeve pêş. Bi vê yekê re têgihîştine wî ji bi hzire wî re derdikeve pêş. Di vir de, mirov karê vê yekê bêje. Di asta têgihîştinê de di hizrên ku dihatina ser ziman de, fêrbûn hebû. Bi vê yekê re, axlabe ji, di jiyana li ber diclê de li Cîzîre bota, girîngiyêke pir mazin ji watekirin û bi pê re bitgihîştinê re hebû. Pir li ser wê dihat a sekinandin. Li ser pir dihat axiftin ji. Her hize ku dihat ser ziman, di civatên mîr de hertimî dihatina ser ziman. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku demeke aqil di wê demê heya. Lê ev deme aqil, ne tenê demeke ku mirov têde aqil bivac kifş bike ya. Deme ku di têgihîştin û hzire wê de ya. Di qada hizir de, her nîqaş û nîqaşkirinên ku dibin ji, di hizir de li ser hebûne têgihîştinê ya. Bi vê yekê, li berdiclê, ku bawerî ji tê ser ziman, têde û di nîqaşkirinên wê de hinekî li têgihîştine û asta wê dihat lêgerîn. Bawerî, li berdiclê, ji wê demê pêde, ku lê dihat hizirkirin û li ser hizir dihat ser ziman, têde li têgihîştineke lê dihat lêgerîn. Xosletên bêja bawerîya ye deme piştî Êlî Herîrî de li ser hebûne lêgerîna têgihîştine hizir biaqil e. Di vê yekê de, di hizir kirinê de ji hertimî hize Nebî Nuh û bawerîya wî û awayê bawerîya wî li ser dihat hizirkirin. Êlî Herîrî bixwe ji, ji vê demê û hizirkirin û têgihîştine wê re bi xwe re astakê tene ser ziman. Bi vê yekê, girîngiyê Êlî herîrî mazin derdikeve hiole. Girîngiyê wî bi hizir û her weha bi vê yekê û têgihîştine bi bawerîya wî derdikeve hole û tê zanîn di nav xalkê de. Ku mirov her weha demeke hizir bi vê yekê re û bi Êlî herîrî re kifş dike, di rastiyê de divêt ku em di wê têgihîştinê de bin ku em demeke nû ye ku pêş dike ye hizir û têgihîştinê ji bi xoslet û hebûne xwe re tene ser ziman. Bi vê yekê re, divêt ku em bêjin, kifşkirin û têgihîştine Êlî Herîrî fahm kirin û têgihîştin ji ji bo wê demê pir girîng e. Bi vê yekê, divêt ku em hinekî li ser bisekin in. Bi vê yekê re, demeke nû ku li Kurdistanê di afirê, mirov tene ser ziman. Êlî Herîrî ne tenê bihizir awayê hize xwe re xosletekî wê demê ya. Ji xaynî wê ji, ew xosletên wê demê pir tene ser ziman. Ji yana wî bi vê yekê, her weha divêt ku bi xosletên deme xwe re werine têgihîştin û ser ziman.

Bi deme Êlî Herîrî re û bi rêveberîya Merwanîyan re li Kurdistanê demeke nû bi xosletên xwe re diafirê. Bi vê yekê re, di têgihîştin û bawerî olî de ji demeke nû diafirê. Aqil derdikeve pêş. Hizir û hest hinekî di ji bi aqil tene ser ziman. Bi vê yekê re nêzîkatîyên wêjeyî pir mazin derdikevine pêş. Civat, weke ku di qasra mîr de ji rêveberîyê re bigihîne dîkin, ji vê yekê re ji, bi hizir û çirok û dîrokên ku tene vegotin û ser ziman re, ji vê yekê re bingeh û pêşengîyê dike. civat, di civakê de cihne ku çand û hizir têde tene parastin in. Her weha divêt ku mirov civatan pir mazin û bi rêz bêne ser ziman. Di deme Salahadînê Eyûbî de ev yek her weha bêhtir bi girîngî derdikeve pêş. Di wê de, ku mirov li qasr û jiyana mirovan dimeyîzenê û li axiftin û vegotinên di nav wan de dimeyîzenê, mirov vê yekê pir mazin dibîne. Deme Salahadînê Eyûbî, demeke ku mirov bêje, êdî aqil bi vac di olê de serwer e. Ew ji vê demê re rêveberîyê dike. Nêzîkatîyên xwe yên bi bawerî di wê demê tene ser ziman. Di demeke wilo de mirov wê çawa jîn bibe, ev yek, her weha bi wî re xwe dide ser rû di wê heyemê, de bi wî re. Piştî çûna wî ya li ser Kudusê û bi serketine wî ji, êdî weke ku ew nêzîkatîya wî bi jiyana wî re û bi serketinên wî re tê ser ziman. Bi vê yekê, êdî rewşê nû li herême bi vê yekê diafirê. Ew bizane tene ser zima ji. Ev yek di nav xalkê de tê zanîn. Piştî serketine wî re, ew êdî di vegehihê Kurdistanê li qasra xwe bicih dibe û êdî jiyana xwe ya asayî dide berdeewam kirin. Ew jiyana pîr safî dijî. Lê bi wê serketin û naskirina wî re, êdî ew li Kurdistanê bigiştî weke ku hebûne xwe serwerbûya. Bi vê yekê re mirov karê bêje û weke tê gotin ji "deme Eyûbîyan" dest pê dike li Kurdistanê. Di wê demê de, hizir û bawerî biaqil tê birêxistin kirin. Di bawerî û dilê Salahadînê Eyûbî de Birehim Xelîl xwediyê cihekî teybet bû. Bi vê yekê, ew li wir li dore wir bicih dibe. Kalkê wî ji li wir bicih bûya. Li wir, ew bi Kurdistanê re hata bi nîvgirava arabana ji ew serwer e. Navê wî heya. Ew weke Xalîfê deme xwe ya. Li Kurdistanê ji, piştî deme Nebî Nuh re û Birehim Xelîl re êdî bahsa deme Salhadînê Eyûbî bi bawerî ji tê kirin. Her weha ew pir mazin dibe.

Li Kurdistanê pêşketin di xwe de bihizir diafirê û di asta têgihîştineke mazin de ya. Mirovên zane û zanist yên weke Êlî Herîrî piştê ji derdikevin. Bandûra wan, mazin dibe li ser civaka kurd.

Dergah, di vir de, divêt ku mirov bi çend gotinan ji bê, bahsa wan bike. Ji ber ku di bingeş û hîmê zanistiyê, perwerdekirin û her weha derketina zanistan û mirovên mazin de xwediyê weyneke pir mazin ku mirov bêne ser ziman. Bi vê yekê, divêt ku mirov pir li ser bisekinê. Dergahî, li Kurdistanê, berî derketine musulmanetiye ji hebûn. Lê di deme musulmanetiye de ji biwate dibin û di pêşketine civakê de dibine cihne pir mazin û gîring. Deme ku mirov bahsa dergaha bike, divêt ku mirov ji bir neke û bêje ku gelek nîrx, kevneşopî û hizir di wanderan de heya. Dîrokeke wanderan ji bi vî awayî heya. Pîrozî û bawerî, bi hev re di wanderan de bi pergal li ser lîngan e. Ti kesek ji wê yekê re nabêje na. Herkesek, ku kî ji bê, rêze xwe ji wanderan re dide nişandin. Her weha divêt ku mirov bêne ser ziman. Di nav civaka kurd de li Kurdistanê dergah û qasr, du cihên ku mirov pir li ser bisekinê ya. Du cihe ku bi dîrok û şop in. Wan herdu cihan dervî kurdan di nav xalkê dîn yên herême de ji bandûra xwe kirina û di nav wan de bi heman awayê bicih bûna. Bi vê yekê, divêt ku mirov bêne ser ziman. Lê dergah li Kurdistanê, pir bêhti bi wate ne.

Pîştî deme Salahadîn Eyûbî re li Kurdistanê, demeke nû bi xosletên xwe re diafirê. Deme ku mirov weke deme mazin ye pêşketine hizir bêne ser ziman derdikeve. Li herêmê bigîştî li dorjhilat her weha piştîre demek dest pê dike. Mirovên weke Îbnî Sîna û Îbnî Ruşt ji derdikevin. Mirovên weke Îbnî Haldûn ji piştîre derdikevin. Ew ji bandûraka wan li ser herême wan çêdibe. Di pêşketine herême xwe de dibine xwediyê weyneke ji. Bi vê yekê, êdî emê bahsa derketin zanist û deme aqil bi tîgîhiştin bikin. Di vê demê de, pir nexweşî ji derdikevin. Mirovên ku navê wan weke zanistên herême ne, bi hizre xwe re di nav xalkê de hene ji, yên weke Halacê Mensûr ji derdikevin. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku şereke êdî di qada aqil de li herême dest pê dike. Bi vê yekê, li herême pir pêşketinên mazin dibin. Herêm, êdî di hizir de mazin bîdest pêşketinê dike. Li herême, pergalaka xweza ye civakî bîaqil hin bi hin ji tê ava kirin. Dem, ku tê deme sadsala 11. min û 12. min wan, êdî di pêşketine hizir de ji, hizrên jev cuda derdikevin. Lê her hizre ku tê ser ziman ji, pir kur li ser tê axiftin û hizrên mazin bi kurahî tene ser ziman. Yên ku di olê de di baweriyê de aqil derdixine pêş, weke Îbnî Haldun dikevîne şerekî hizirî de. Zanistên weke Îbnî Haldûn aninberçaviyê di hizre xwe de bîaqil derdixine pêş û li ser dikevîne nîqaşan de ji bi zanist û mirovên deme xwe re di wê heyeme de. Yên ku di ol û baweriyê de li dijî wê hizreke ne aninberçaviyê derdixine pêş û bidil di hizirîn ji, derdikevin û ew ji dibêjin ku "rasti neya ku li berçav e". Bi vê yekê, di qada tîgîhiştinê de nîqaş û dan herdûbûnak ji dibe. Lê hizir, deme ku pêş dikeve. ji mirov dixweze ku mirov jîyanê li gor wê û hebûn û awayê wê yê ku heya tîgîhiştê û fahm bike. Bi vê yekê re, dinyewî di hizir de bi hizir re derdikeve pêş. Lê li ber wê ji ixrewî ji dibe û derdikeve pêş. Di van herdû aliyên hizir de, li ser olê hizirandin tê kirin. Ol, ji ber ku li rojhilata navîn, xwediyê dîrokeke pir dîrêj û kur e, êdî her hizirandin ji, dervî wê nabe. Li rojava, her weha dîrokeke mazin bi hizir kur nîn e, ji ber vê yekê ji, çî awayê hizir di wê demê de bû, li gor wê xwe afirandin ji, rojhilat digîhêne deme ronansansê. Rojhilat, weke ku hê di xewê de bê dibe, li ber vê yekê. Lê rojhilat di serê xwe de pir zanebûnê dihilêne. Bi vê yekê mirov karê bêje ku rojhilat pir mazin bihizir di serê xwe de.

Pîştî deme sadsala 12. min û 13. min ji, êdî deme hizir bi her awayê rengê xwe dide der. Ji gelek aliyên ve di qada hizir de pêşketin derdikevin. Cizîre bota, serê xwe di rakê. Ew ji di wê demê de pir pêşketiya. Di xwe de bi dîrokeke ku jîn kirî û pir bi hizir dijî. Haya wê demê, ewder weke navendeke perwerdeyê ji bi hebûne dijî. Pîştî Êlî Herîrî re, gelek zanistên deme derdikevin. Hemû ji hizre tînine ser ziman. Mirovên weke Şêx Teymîyê haranî derdikevin. Ew pir di nivîsênin û tînin ser ziman. Hizre wan li ser xalkê bandûra wê heya. Şêx Teymîyê Haranî li Haranê li Rihayê derdikevê. Zanbûna wî ji mazin e. Ew ji li gor zanebûne demê jîn dibin. Lê piştî wan re bi hinekî re mirovên weke Meleyê Cizîrî derdikevin. Pîştî wî re yên Weke Feqiyê Teyran derdikevin. Î ro ji, di roje me de ji wan re weke hinek "helbestvan" ne tene binavkirin. Di rastiye de ew ne helbestvan in. Ew zanistne pir mazin yê deme xwe ne. Ji bo gelekî ku li ser serê wî pêvajoyên bişavtinê hebin, zanistên wî weke zanistan bêne ser ziman û wilo bêne erêkirin, wê li gor wan hêzên ku wan pêvajoyên bişavtinê dimêşin in wê ne rast bê. Ji ber vê yekê ji rastiya wan dîr anîna ser ziman, tîgîhiştineke di hîmê pêvajoyên bişavtinê de ya. Deme ku ji wan bê gotin ew zanist in ji û hizre wan ji heya û wan hizre mazin anîya ser ziman, êdî wê bê pîrsîn ku ka wan

çi hizir bi çi awayê û çawa anîya ser ziman. Ev yek, ku di nav xalkê ku li ser bişavtin heya bê zanîn ji, wê di cih de wan pêvajoyên bişavtinê vala derve. Di vê yekê de, ji bo hêzê ku vê yekê dikin û bişavtinê dimêşênin, serketineke mazin ku weke ku ténine ser ziman bi wî xalkê û gelfî bidine erê kirin û pejirandin. Bi kurdan ji her weha ew yek di demê de dana erêkirin. Bi vê yekê, êdfî tê kurd li ser jiyân û hizre wan bidest lêkolîne ne kiriya. Li ser jiyân û hizre Meleyê Cizîrî û Feqiyê teyran, ka kê lêkolîneke bi hizir û felsefe kiriya. Felsefe wî kê hewlêdaya ku bènine ser ziman? Ev rastiyaka ku hatiya erê kirin. Ev gotina me, tenê mînaqaka. Weke van zanistên mazin gelek zanistên din ji yên kurdan hene ku kurd bixwe ji navê wan nizanin. An ji zanin, lê ne weke yên xwe zanin. Ji ber çi deme ku me bidest anîna ser ziman ye meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran kir û me her weha di vir de ev yek anî ser ziman? Ji ber ku rastî, hizir, dem û hebûne van mirovan vê yekê pir mazin û bixweza dide ber çavên me. Bi me, wê bi van zanistên me, wê ev rastî çêtir her weha ku li ser wan bê hizirandin wê bê dîtîn. Ev yek, her weha gîring e, ku em di vir de bi vê yekê bènine ser ziman. Divêt k mirov pir ji li ser bisekinê. Lê li ser sekinandin ji, divêt ku bibe sedeme dîtina rastiyên van mirovên zane û pir bi hizir û mazin.

Di deme sadsala 14. min de, hizrên ku mirov weke têgihîştine felsefê kur dikin diderdikevine hole. Li Kurdistanê Zanistên ku Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran derdikevin. Ev herdu zanist, zanistne ku demekê di hizir û têgihîştine de bi xwe re didine dest pê kirin in. Bi vê yekê divêt ku mirov pir mazin li ser wan bisekinê. Li ser hizre wan û deme wan bisekinê. Deme wan, di qada hizir û têgihîştinê de di kîjan astê de bû? Ev pirs ji, wê bi bersiv bibe, êdfî. Di serî de dem ku tê sadsala 15. min, êdfî Meleyê Cizîrî derdikeve. Deme ku ew derdikeve, pêşketineke mazin heya. Di qada hizir û têgihîştinê de, pir pêşketineke mazin heya. Meleyê Cizîrî li Cizîre bota perwerde xwe dihilde û mazin dibe. Piştre diçe, Heskîfê û Amede û li wanderan ji hinekî dimenê li wanderan gava xwe diavêjê jiyana zanistî yê. Hizir û hest, bitêgihîştin pêşketiya. Li Kurdistanê pergalbûna wê ji heya. Lê demeke wilo, bi navkirin bitêgihîştinê, di deme Meleyê Cizîrî de dibe. Ew deme Nûjên ku weke deme ronansê li rojava dest pê dike, li Kurdistanê bi wî re dest pê dike. Bi têgihîştine wî re demeke hizir û li ser hizir hizirandin dest pê dike. Hizir û hizirkirina bi têgihîştin, hin bi hin bi wî re pêş dikeve. Ew bi axiftin û nîvîsên xwe re pir têne ser ziman. Hizrên wî di nav xalkê de pir li ser tê sekinandin. Pir bahsa wan tê kirin. Meleyê Cizîrî, li Cizîre bota, bi têgihîştine xwe re pergala hizre olî ye ku bi Nebî Nuh re hatiya dest pê kirin ji, fahm kiriya. Wê, weke pergala hizre xwe bikar têne, di serê xwe de. Bi vê yekê, ev nêzikatiyaka din bi xwe re û bi hizirkirina xwe re dide dest pê kirin. Ew, hata wê demê, ew pergala ku bitêgihîştin û bi hizir ji bana, bi bawerî û olî dihata nixrandin û ser ziman, ew di qada hizir de ji biwate dike û têne ser ziman. Berî wî ji ev yek bûya. Lê belê, ew bi têgihîştin û zanebûnê vê yekê dike. Bi vê yekê, ew Li Kurdistanê têgihîştineke nû bi wê pergale bi pêş dixê. Ew, demeke nû ye deme nûjên ye filozofiyê bi wê awayê hizirkirinê bixwe re dide çêkirin. Hizir û felsefe Meleyê Cizîrî, hîm û temenê wê li ser têgihîştine, di jiyânê de ya. Felsefe wî, ne bê bawer e. Felsefe wî bi bawer e. Lê ew baweriyê, bi awayekî bizanebûn, bitêgihîştin, di vê yekê de hewl dide ku bêne ser ziman. Meleyê Cizîrî, di aslê xwe de bi anîniya xwe li ser ziman de, bi nixr têgihîştineke ku di hîmê wê kevnepî ji heya diafirîne. Ew civakê, dike ku bi awayekî nû êdfî bihizirê û hizre xwe bêne ser ziman. Ji deme hizirandin wî, ku mirov tê deme Feqiyê teyran, mirov dibîne, ku feqiyê teyran, weke berdewamiyêke wî û deme wî ya. Bi vê yekê divêt ku mirov Feqiyê Teyran di qada têgihîştinê de weke pêvajoyaka berdewam pêşketin û têgihîştine Meleyê Cizîrî bi nixrê.

Feqiyê Teyran, di derketin û hizre xwe de têgihîştine Meleyê Cizîrî li ku li Cizîre bota bicih bûya esas digirê û pê mazin dibe. Bi vê yekê, di nêzikatiya xwe de Feqiyê Teyran, divêt ku mirov ji Meleyê Cizîrî dûr û qut neyêne ser ziman. Ew deme pêşketinê ye ku bi Meleyê Cizîrî re dest pê kiriya, bi asta û demeke xwe ye nû bi Feqiyê teyran re hebûne xwe berdewam dike. Di deme Merwanîyan de bi Êlî Herîrî re ew pêvajoya têgihîştinê bi Meleyê Cizîrî re dikeve demeke nû û astaka din de. Bi Feqiyê Teyran re, di demeke nû û hizir û têgihîştine de, ku di pêşketine xwe de pergala xwe her weha avakirî hebûne xwe berdewam dike. Asta Meleyê Cizîrî bi Feqiyê Teyran re di astaka hê bilindtir de hebûna xwe berdewam dike. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku deme nûjên ye ku bi Êlî Herîrî re hîmê wê hatiya avêtin û bi melyê Cizîrî re di pêvajoyaka nû de

berdewam kiriya, êdî di dem û Hizre Feqiyê teyran de bi astaka hê bilindtir û têgihîştineke hemdemî hebûne xwe li gor deme xwe û nû, berdewam kiriya. Bi vê yekê, bi pêşketin têgihîştine Meleyê Cizîrî re û hzire û pêşketine Feqiyê teyran re, ew pergala hizrî ye ku bi Nebî Nuh re pêşketiya di demeke nû de bidest pêşketinê dike. Rastiya pêşketina Mele Cizîrî û Feqiyê Teyran, bi pêşketin û têgihîştine wan, her weha pir gîring e, ku mirov wê baş û di cihê xwe de û rast fahm bike. Lê Meleyê Cizîrî, divêt ku em gotinaka din ji ji bo wî bînine ser ziman. Ew ji her weha ew ê, ku wî bi xwe re pergala hizre deme nû, ku haya roje me tê, bi xwe re da dest pê kirina. Feqiyê teyran, ew dem pir mazin û li gor rasti û rastteqînîyê wê li ser temenê wê bi hizir da têgihîştin û rûnand. Bi vê yekê, divêt ku mirov, pir mazin bahsa wan herdûyan bi hev re bike. Rastiya pergala hizir û awayê, ye ku Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran bi têgihîştineke mazin di serê de jîn kirin hê ne hatiya fahm kirin. Hê li bendî fahmkirin û têgihîştine xwe ya. Divêt ku di vir de mejiye wan were fahmkirin. Rastiya wan, bi dem û hzire wan re, bi felsefe wan re bê ser ziman.

Bi deme Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran re, li Kurdistanê rewşê nû afirya. Dem, bi têgihîştin û pêşketinê xwe re bihizir têne ser ziman. Kurd, ji ber ku xwediyê xêveke ku pir xurt in di xwe de, êdî tişte ku di têdigihin, karin bi xwe re bigirin. Bi vê yekê, êdî di serê xwe de mazin bûn wan re çêdibe. Hizre wan mazin tê ser ziman. Cihên ku hizre wan lê tê ser ziman ji, civat û levcinên wan yên bi vî rengî ne. Bi vê yekê, di xwe de kevneşopîyê mazin çêkirina. Kurd, ji ber ku di demên xwe yên pêşketine de pir jîne, êdî bi têgihîştine wan re bi wan re kevneşopîyên ku mirov di vê qadê de weke kevneşopîyên hizir ji bêne ser ziman afirî ne. Deme ku têgihîştinek pêşket, ne hesaniya ku di civatên kurdan bi wan were erêkirin. Dem ji wê re divêt. Ji ber ku di her pêşketin û demên xwe yên pêşketine de, hewceciyê dibînin ku wan kevneşopîyên xwe ji tê hizre xwe de bînine ser ziman. Bi vê yekê, her hatina hzirekî li ser ziman, bi pergala û şop tê ser ziman. Bi vê yekê rast û têgihîştineke mazin anîna ser ziman, hingî, ji aliyê xalkê ve erêkirin dibe. Meleyê Cizîrî, her weha bi kevneşopî têne ser ziman, û her ku têne ser ziman ji, di nîrx û kevneşopîyan de ji guharandina çêdike. Bi vê yekê, aliyekî çandî ji pêdivî pê heya. Bi wê re ev yek pir mazin heya. Feqiyê Teyran ji her weha ew aliyê wî pir mazin heya. Mirov, di nav civakê de di kevneşopîyên wê de guharandinan bide kirin, ne hesaniya. Ji vê yekê re, di kîjen demê ji bê, zanebûnaka mazin pêdivî pê heya. Bi zanebûne xwe re weke mihendîsekî civakê, di vê xalê de zanist derdikeve pêş. Meleyê Cizîrî û feqiyê teyran, her weha mirov karê wan bêne ser ziman. Bi vê yekê re ji, divêt ku mirov têgihîştin û zanebûna wan, wê hizre wan ye ku bi pergala tê ser ziman û civakê ji hîmê xwe bi kevneşopîyên xwe diguherîne ji fahm bike. Divêt ku ev yek pir mazin kifşkirin û were ser ziman. Ya rastî, li Kurdistanê sê demên herî gîring hene, ku divêt ku kurd van hersê deman pir mazin ji binî haya serî fahm bikin. Deme pêşî, deme Nebî Nuh e. Deme duyemîn ji deme Birehim Xelîl e. Û deme sêyemîn ji ji aliyê têgihîştinê ve ye Meleyê Cizîrî û Feqiyê teyran e. Bi meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran re mirov salahadînê Eyûbî û deme wî ji bêne ser ziman. Ji ber ku ew dem, weke demeke destpêkê ya, ji wê deme wan rebi têgihîştin û pêşketinê di xwe de.

Demên pêşketinê yên ku weha bûna, ku mirov wan têne ser ziman, mirov di xaatakê de pir pêşketineke mazin dibîne. Ji demên berê demên şaristaniyê, hata demên şaristaniyê û biteybetî ji deme sumariyan û piştre deme mesopotamya û ji wê virde ji, ta deme Kurdistanê, mirov xaatakê pêşketinê bi dem û pêşketin û demên xwe yên afirandin û afrîner, mirov pir zelal dibîne. Di vê xata pêşketinê de, nîrx û pêşketinê ku bûna ji, di pergala de bûna. Ji deme sumeriyên, ku mirov bidest şirove dike, mirov dibîne ku wa di wê demê de pergala bi têgihîştin û hizre xwe re afirîya. Di heman demê de bi Nebî Nuh re bi deme wî re gihîştîye demeke têgihîştinê di wê demê de hizir pêşketiya û êdî bi têgihîştin bi rê ve çûyî afirîya. Piştre di deme mezopotamya de êdî demên şaristaniyan yên jê cuda afirî ne. Bi vê yekê re, ku mirov deme mesopotamya şirove dike û têne ser ziman, mirov pêşketineke mazin bi rengên gelekên bi têgihîştin dibîne. Ji ber vê yekê ya, ku deme ku bahsa mesopotamya tê kirin pir bizanbûn û nîrx bahs tê kirin. Bêje "gelên mesopotamya", her weha di demeke dîroke de bi demên xwe afirandina bi wate bûya. Ew demên ku afirî ne, piştre buhurîne demne din. Di wan demên din de, yên ku piştre afirî ne, ew nîrx û pakbûnên ku bûna ji, bi awayekê bi şop û nîrx hebûne xwe berdewam kirina. Bêja mesopotamya, bi vê yekê, rêzeke mazin bimaf dike. Divêt ku mirov wê rêze jê re bide nîşandin. Ew rêze ku jê re

bê nişandin, wê bê rêzeke ku ji gelên ku jîn bûna û hebûna wan hata roje me ne hatiya û ji yên ku hata nahaka hebûne berdewam kirina ji wê bê. Bi vê yekê û nêhtë, em ji bi rêzê wê bêje bînine ser ziman. Pir li ser nîrxên di bin demên mesopotamya de hatina afirandin tê sekinandin. Lê haya nahaka li gor me, wilo zêde ti fêr jê ne hatiya derxistin. Fêre herî mazin, ye ku mirov jê derxe, ew ê, ku xalk û gelên herême di bin pergalaka weke pergala ku Nebî Nuh hizre wê afirandin û ji mirovan re anîya ser ziman bibirafî jîn bibine. Bi vê yekê û riyaka ku wê hizrê bi wate bike, her weha ku pêşketine nebî Nuh ji di nav de, pêşketin û têgihîştin di deman de afriya. Lê wilo xuyaya û pêşketinên ku rûdana ji didina nişandin, hê ev yek, bi têgihîştin û hebûne xwe re ne hatiya fahm kirin. Em hevî dikin ku ev yek, were fahm kirin. Armanca wê nivîsa me ji, yek ji ji ev yeka bi xwe ye, ku were fahm kirin.

Ji deme Sumariyan, bi şaristani pêşketin bû û bi têgihîştin bû û hebûne xwe bi ber roje me ve berdewam kir. Bi vê yekê, dem, hata ku tê deme mesopotamya, di wê xata ku bi vê yekê tere hatina roje me dibe û haya deme mesopotamya tê, pir pêşketinên mazin dibin. Li Kurdistanê î ro ji gelek xalk hene. Ji deme mesopotamya hata hatina deme mesopotamya, ew xalk qanc xirab bi hev re jîn bûna. Nîrxên hevdu bi hev re hevpar kirina. Bi vê yekê, bi hev re jîn bûna. Ew jîn bûna wan, bi reng û nîrxên xwe re tê berçavên me. Ez bixwe ji, deme ku li Kurdistanê dimeyîzenin, pir rengan dibînin. Ew rengên xalk û gelan hêjana ku hemû ji li gor nîrx, pêşketin, têgihîştin û berî hertîştî li gor dîroke xwe werine ser ziman. Demên piştî zayîne ji deme ku mirov li wan dimeyîzenê, mirov dibîne ku wa hê gelek xalk û gel wê bi hev re jîn dibin. Asurî, ermenî, kurd, pers û arab hertîmî bi hev re jîn bûna. Piştî zayîne di demên sadsala 8. min wan de tirkmen ji li wan zêde bûna. Piştê ji bi hev re jîn bûna. Pergala ku Nebî Nuh hizre wê afirandî, ev xalk û hê gelek xalk û gelên din bi hev re di nav hevde li gor nîrx û dîroke daya jîn kirin. Xosletekî hizre pergala Nebî Nuh ji ev yeka bixwe ye, ku divêt ku mirov birêz bêne ser ziman. Bi vê yekê, deme ku mirov deme Hz. Muhammed şirove dike û tene ser ziman, ew deme ku nav lê tê kirin û jê re tê gotin ku deme "asra siadate" ji, bi vê yekê jîn bû. Hizre Hz. Muhammed, di vir de em bînine ser ziman, li ber wê hizre statûqûperezî ye ku li rojhilat hebû û bi hebûne xwe re û dîroke xwe re bi hezar salan diçû ji ya. Ev yek, bi hizre Hz. Muhammed kirina hizre rêveberiyê û pêre kirina hizrek statûqûperez, ji wê û rastiya wê û têgihîştine wê dîrketin e. Divêt ku em vê yekê her weha bi binxat bînine ser ziman. Ku mirov tê deme sahaladîne Eyûbî ji mirov vê yekê her weha pir mazin bi heman nêzikatiyê dibîne. Wî ji, weke ku xwest ku hizre olî ji ye wê statûqûtiyê dîr bike. Hewldanaka wî ya wilo heya. Lê ew hewdana wî ji an ne hata fahmkirin û an ji di nav nêzikatiyên rêveberî de hata fatîsandin. Bi vê yekê, êdî weke ku statûqûtiyê hebûne xwe piştê ji berdewam kir. Piştî salahadîne Eyûbî re deme Meleyê Cizirî û Feqiyê teyran ji, weke ku hewldanakê di xwe de tene ser ziman, ku wê rastiya wê û tene ser ziman. Bi vê yekê, ew bi zêdeyî li ser bi hev rebûnê û hizre wî û cihê wê hizre bi hev re bûnê di hundurê hizre musulmanetiya de çiya, dixwezîn ku bînine ser ziman. Li Kurdistanê, hata wê demê ji mirov karê bêje k nêvî bi nêvî ya. Nêvî musulman in û nêvî ji ji olîn din in. Ole Êzîdîtiyê, oleke kurdistanî ya. Berî musulmanetiya, bizêdeyî kurd êzîdî bûn. Piştê ku musulmanetî derket, êdî gelek bûna musulman. Lê hê ji, gelek ne musulman bûn. Ole êzîdîtiyê ji aliya hizre yek-xwûdayîye ve, yek-xwûdayî bû. Bi vê yekê ji pêşketibû. Deme ku musulmanti derdikeve, êdî ji aliya nîrx û kevneşopî ve weke cuhutiya û filehiya, ew ji pir jê bi bandûr dibe. Lê piştê ku musulmanti pêş dikeve û dibe oleke rêveberî, êdî çûna wan ji çêdibe. Di hizre olî de ew çûyîn temen û hîmê wê nîn e. Lê ku ew di destê rêveber de bê, bêguman, temen ji û hîm ji heya. Ji ber ku ne tenê hizre olî, hizrên din ji, di destê rêveber de dibine bîstatûqû. Dibîne bîrdoz.

Di deme sadsala 15. min de, hizreke mazin di afirê. Bi vê hizrê ku têgihîştin hinekî din ji digihanda astaka bilind, hebûna xalkan ji bi naskirina wê re bi pêş dikeve. Demên ku xalk li ser hebûne xwe bidest pêşketinê dikin dibin. Lê mesopotamya, deme ku mirov bahsa wê dike, divêt ku mirov bêje ku ev pêvajoya ku piştî zayîne di sadsala 15. min de jîn dikir, di sadsalên berî zayîne de bitêgihîştin mazin jîn kiribû. Kurdan bi deme Hûrî û nafrîyan re, Asuriyan de sadsala 15. min wa de di berî zayîne de, pers bi aqamanîşan re di berî zayîne de di sadsala 3. min wa de jîn dikin. Her weha hê ji pêşketinên mazin jîn dibin. Di deme Medan de, bi kurdan re ji

demekê pers jîn dikan. Hingî, kîrûsê ku ji aliyê bav ve kurd û ji aliyê dê ve pers ji, tê ser serê Mediya û demeke bi nav û deng jîn dike. Demên piştî zayîne ji, yê demên ku di van pêşketinan de kurbûn bibe ya. Kurd, di deme xwe naskirine bitêgihîştinê de di zimanê wan de ji pir guhartinaka mazin dibe. Hingî, êdî hin bi hin di zimanê wan de "kurmancî" pêş dikeve. Kurmancî, mirov nikarê têne weke ziravayakê zimên bêne ser ziman. Ji wê zêdetir ji bo pêşketin kurdan xwediyê du wateyên din yê dîrokî ji ya. Yek her weha weke ku me anî ser ziman bi xwe naskirinê tê ser ziman. Ya din ji, bi pêşketine hizre civakatiyê ya. Kurd, ku kengî di kevîne deme pêşketine civakatiya xwe de hingî, kurmanci ji, bidest pêşketinê dike. Di deme Mîtanî û hûrîyan de kurmanci, ketiya pêvajoya pêşketinê de. Deme Gûtîyan, demeke pir pêşketî ye wê ya. Zimanê kurdî, yê deme xwe ye berê deme kurmancîyê ji, divêt ku werine zanîn. Ziravayên soranî, dimilî, hewramî û yê din ji, di pêşketin û awayê xwe de weke ziravayên kurdî ji xosletekî wan heya. Deme ku mirov li awa û pêşketin û nîrxandinê dimeyîzenê, mirov digihîjê vê têgihîştinê. Deme Hûrî-mîtaiyan, naîriyan, Medan û deme Merwaniyan, demeke ku mirov weke demên pêşketine kurmanî ji bêne ser ziman in. Zanist û filozofên ku di wan deman de derdikevin ji, yê demê kurmanci ne. Êlî Herîr, di vir de bi zimên ve, divêt ku mirov pir hêja bêne ser ziman. Bi zimanê xwe, ew estetîkeke zimên di kurmanci de afirêne. Bi kar anîna ziman, ji aliyê wî ve pir bizanebûn, têgihîştin û xas e. Zimanê wî, bi awayê xwe, di rastiyê de ku mirov weke gotinaka pir mazin neyêne ser ziman, kurmanci de astaka zimên ji diafirêne. Weke zimanzanekî di pêşketine zimên weyn leyistî ya, bi awaye axiftina xwe û nivisandinên xwe di wê heyeme de. Divêt ku em vê yekê, bi wê re pir mazin bizane kifş bikin.

Kurd, di zimanê xwe de bi kar anîna zimanê xwe de, hê ji, pergala du hezar berê bi kar tênin. Ji berî zayîne ve hata roje me, hê wilo zêde ti guharandinên mazin di zimên jîn ne kirina. Lê berî wê demê, ji pêşketin û têgihîştinên ku hene, mirov fahm dike ku berê wê demê, pir guharandin û pêşketin di zimanê xwe de jîn kirina. Piştî demên Mîtanîyan û hûrîyan ji di zimên de hinek guharandina jîn dikan. Lê belê, ew guharandin piştê wilo hebûne xwe berdewam dikan. Bi vê yekê, em têdigihin ku di demên desthilatdariyê de wan guharandinên di zimanê xwe de dikan. Her demeke desthilatdariyê, hinek guharandin, di zimanê wan de bi xwe re anîna. Mirov ji dîrok û pêşketinên ku bûna vê yekê pir zelal fahm dike û têdigihê. Her demeke desthilatdari û serweriyê, weke demeke guharandinê hatiya bi kar anîn. Lê hinek xosletên zimên, çend ku guharandin ji bûbûn, dimênin. Ew ji her weha di şaxsiyeta zanistên deman xwe didine nîşandin. Di her demê de, di demên berî mîtanî û hûrîyan de ji, zimanakî weke zimanê helbestî hatiya bi kar anîn. Ew awayê vegotin û gotinê, bi xêveke pir xurt re bi wan re bûya weke pirtûkxanayaka pir mazin, ku hata deme me hebûne xwe berdewam kiriya. Di deme sumerîyan de ji ev xoslet bi wan re heya. Piştê ji di demên mîtanî û hûrîyan de ji ev xoslet bi wan re heya. Bi xusîsî, di vir de mirov karê hinek gotinê ji bo deme hûrî û naîriyan bêne ser ziman. Di demên wan de, ziman bi awayekê helbestwarî hatiya bi kar anîn. Ji bo vê yekê ji, civat bûna bingeh. Di civatan de li hevdu rûniştine û bi hev re bi gotin û vegotinan axiftina. Ji mîr û mirovên mazin re jiyana mirovên mazin helbestkirin ji heya. Ev yek ji, di civatan de pir mazin tê ser ziman. Mirov vê xosletê weke xosletekî zimên ji bi wan re di demên wan de dibîne. Di awayê gotinê de pîrozî ji hatiya bi kar anîn. Pîrozîyê kiriya ku ew zimanê xwe pir bi xweş bînine ser ziman. Vê yekê, helbestwarî ji bi pêş xistîya. Ziman, deme ku bi awayekî di civatan de hata bikar anîn û bi awayê ku hata bi kar anîn ne dihata hata jî bîr kirin. Car bi car, weke hevdu, di civatan de dibû. Yekî vegotînan ji gotinê çawa berî wan, ji wan re anîbana ser ziman, wilo di serê mirovan de dima. Bi vê yekê û awayê, hinek guharandin ji bûna, Hinek dev û awayên axiftina kurdî ji weke ku ji ber ku ne hatina bi kar anîn, êdî li şûn mama û êdî ji demên bi kar anînê derketina. Bi vê yekê, hinek dev û awayên ku mirov weke xosletên deme xwe di xwe de afirandina, di deme xwe de mana. Mirov karê ji bo deme Mîtanîyan, hûrîyan, ji bo demên berî wan ji hinekî bi vî awayî bêne ser ziman. Ziman, di demên bi kar anîna xwe de bêjeyên teybet yê demê xwe diafirêne.

Vê yekê, mirov karê ji bo kurmanci ji bêne ser ziman. Kurmanci, pir pêş dikeve. Ji ber çî wilo mazin pêş dikeve û derdikeve pêşîye awayên din gişan? Di demên xwe afirandina kurmanci de kurmanci dibe zimanê rêveberî. Bi vê yekê, êdî pir mazin jîn dike. Ji demên zimên yê din gişan

zêdetir kurmanci bûya zimanê rêveberî. Divêt ku mirov vê yekê pir mazin di cih de kifş bike. Bi vê yekê kurmanci têgihîştine mazin di xwe de diafirêne. Bi vê afirandinê, êdî mazin pêş dikeve. Bi bûna zimanê rêveberî ji, êdî hin bi hin ji destpêka xwe di pêşketine civakatiyê de ji weyn dileyizê. Kurmanci bi bêjeyên têgihîştine di afirê. Ji ber vê yekê, kurmancî hewceyî pê heya, berî xwe kifş bike. Bi kifşkirina berî xwe, wê dîrokeke mazin zelal were ser ziman. Wê hingî, gelek xosletên pêşketinê û demên pêşketinan ji wê werine zanîn. Ziman, di her bêjeye xwe de, têgihîştinekê dihawêne. Xusisî ji, kurmanci, mirov karê vê yekê ji bo wê bêne ser ziman û bêje. Zanista bêjeyên kurdî hê ne hatiya afirandin. Lê ku hatibana afirandin, wê bi têgihîştineke ji rêzê ji, wê van rastiyan kifş bike. Di roje me de ew zanist hê ne hatiya afirandin. Lê ku mirov li demên berê dimeyizenê, mirov di hinek pêşketinan de weke ku wê afirandinê dibîne. Weke ku di demên berê de li ser zimên hatiya bi kar anîn. Deme Êlî herîrî, bi wî bixwe re weke ku minaqak ji vê yekê ya. Ev pergala zimanê kurdî ya ku î ro ji, kurdî hewldidin ku wê û rastiya wê bi tememî kifş bikin, hûrî û naîriyan bi tememî di têgihîştine wê de bûn. Ev awayê ku î ro tê bi kar anîn, berî deme wan hatibû afirandin. Ji ber vê yekê, hata ku tê deme wan ji, hinek pêşketin û têgihîştinên mazin yên dîrokî di kê nava xwe de. Lê deme ku tê deme wan, êdî ew wê têgihîştinê dikin. Kirina wê têgihîştinê ji, ji bo wê hinek sedem hem di awayê zimên de û hem ji di pêşketinên ku dibin de hene. Bi zimanê xwe, hertimî, zanistên wan dixwezî ku bi helbestî bînine ser ziman. Ji ber vê yekê ji, ji bo ku her weha bi helbestwarî were ser ziman, astaka zimên ye ku mirov di xwe de bide rûnandin pêdivî pê heya. Ew ji, ji ber vê yekê, di têgihîştine wê de ne. Kurmacî, nabê zimanekî statûqûpereze di xwe de. Ji ber ku kurmanci berî wê heya û bi afirandina kurmanciyê ji, pir mazin bêjeyên têgihîştine hatina afirandin û di kurmaci de bûna. Ev yek, her weha sedeme wê ya pêşî

ya.

Bi vê yekê, kurmanci di demên piştê de ji mazin weke zimanekî nûjên yê pêşketî hebûna xwe berdewam dike. Piştî demên hûrî û naîriyan, pêşketin û têgihîştin ku di jiyânê de û di qada hizir de dibin, di kurmanci de têne ser ziman. Kurmanci, pir hesanî wan dike nava xwe de. Pir hesanî karê wan bi xwe re bi wate bike. Her weha hinek sedemên wê ji yên pêşketinê di deman de bi têgihîştinê hene. Kurmanci, deme ku bahsa wê tê kirin, di serê mirov de wate têgihîştin û bêje civakatiyê de bi bîr dixê. Vê yekê, bi xweza dike. Ji ber ku kurmanci, zimanê kurdî yê deme têgihîştin û civakatiyê ji ya. Bi vê yekê re, deme ku mirov di zimên de kurmanci têne ser ziman, ne tenê weke zirava tê ser ziman. Weke demekê pêşketinê ji her weha tê ser ziman. Bi vê yekê re, dîroke kurmanci di zimanê kurdî de dîrokeke civakatiyê ji ya. Demên wê ji hene. Hinekî ji berî deme mîtanîyan û bi vir de, deme hûrîyan, naîriyan, Medan, Merwanîyan, her weha demne sereke ne. Ku mirov têde kur dibe, mirov hinek demên din ji kifş dike. Kurmanci, pêşketine zanistên de derketine di wan de di demê de bûya xwedî weyn. Kurmanci, li gor pergala xwe ku bê kifşkirin û ser ziman, hingî, wê pir mazin bide afirandin. Ji ber çî Feqiyê Teyran mazin di dîrokê de cih girtiya. Haya nahaka deme, wilo zêde ti pirtûkên wî ne mana, Hemû hatina windakirin. Lê belê bi wî zimanê xwe yê helbestwerî ku diaxift û dianî ser ziman, dikir ku di serê mirovan de ew hizrên wî bi wê axitine wî re bi mênin. Kurmanci, di vir de weke ku em di Feqiyê teyran de ji kifş dikin, di serî de pir mazin karê xwe bihelê. Ji bîrkin, zû bi zû nabê. Ev ji, ji awayê hevokên wê têt. Zimanê kurdî, ji kêvalbar (teblet)ên sumariyan yên ku mana hata roje me û î ro hewl tê dayîn ku wan bixwênin, ji wan bêhtir pêşketin û têgihîştinên wê deme di xwe de dihawên. Tenê li bendî

kifşkirina

wan

e..

Kurmanci, deme ku mirov wê şrove dike, mirov her weha pêşketineke mazin têde dibîne. Di xwe de, pir pêşketinan di hawêne. Kurmanci, di zimanê kurdî yê deme pêşketî û pêşketinê ji ya. Divêt ku mirov vê yekê di vir de di serî de kifş bike. Ev yek ji, her weha girîng e. Kurmancî, deme ku mirov li awa û bêjeyên wê dinerê, mirov vê yekê her weha pir zelal kifş dike. Kurmanci, bi vê yekê re, mirov karê bêje ku deme zimanê kurdî ye hemdem ji ya. Her weha xwediyê wateyekê ji ya. Di kurmancî de, axiftin, bi bêjeyên têgihîştinê dibe. Deme ku kurmanci afirîya, mirov ji wê afirandina wê fahm dike ku bi bêjeyên têgihîştinê afirîya. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku deme ku mirov li ser zimanzaniyêke bizane bike, hingî, mirov wê hîm û demên wê yên berî yên serî ji jê fêr bike. Ev derfet, têde heya. Bêjeyên têgihîştinê, an ji yên deme têgihîştinê ji, ku

dibin, hinek bêje û rewşên ku bibêjeyan têne ser ziman, dikina hîm û temenê xwe de û dibin. Ev yek, rastiyaka ku mirov pir hesanî kifş bike ya. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku zimanê kurdî xwediyê pir demên pêşketinê yên ku buhurandina ya. Di zimanê kurdî de hebûne pêşketine kurdan bixwe ji veşartiya. Demên ku wan di pêşketine xwe de buhurandina, bi awa û bêjeyên xwe yên demî û hemdemîya xwe re hene. Ji yekê û kifş kirine wê re ji, zanebûnaka dîrokî ye di derbarê zimên lezîm e. Zimanê kurdî, ku were ser ziman, mirov nikarê wê hesanî şîrove bike û bêne ser ziman. Ji wê zêdetir xwediyê wate û hebûnê ya. Ev yek ji, sedeme wê ji bûn û dîroke wê ye bûnê têt. Demên kurdan yên civakatiyê me li jor bi sereke ji bê hinekî anî ser ziman. Me ji dîrokê bi deman hinek mînaq da û anî ser ziman. Deme ku mijar di vir de weke ku dibe, bibe mijara zimên, hingî ji, divêt ku careka din were ser ziman. Divêt ku bi zimên re were ziman. Demên civakatiya kurdan, bi zimanê wan re divêt ku were ser ziman. Ji ber ku gelek xosletên hevdu di hevdu de di parezên. Vê yekê, her weha divêt ku mirov pir zelal kifş bike. Ziman, di vir de girîng e, ji bo fahmkirina kurd û civakatiya wan. Piştî hebûna wan, êdî deme ku dikevine demên xwe yên pêşketin û têgihîştinê de, êdî ew demên wan bi dem bi dem bi hinek pêşketinan hebûne xwe berdewam dike. Ew dem ji, dem bi dem, bi hin bêje an ji dengne hebûnên xwe di demên cuda bi cuda tênine ser ziman. Ziman, di fêrkirin û bûna van de xalaka sereke ya. Ew bêjeyên ku di afirin û dengên dibin û bi bêj dibin ji, di zimên de têne ser ziman. Bi vê yekê, ziman dibe platforma hatina ser ziman ye pêşketine wan di demê de û di demên pêşketine wan de. bi vê yekê re, mirov karê li ser demên civakatiya wan bisekinê, di demên ku jîn kirine de.

Em hinekî li ser demên civakatiyê bisekinîn. Ji bo ku ev yek her weha di vir de pir girîng e. Her xosletên demên civakatiyê û yên civakatiyê bixwe ji, ku me kifş kirin, wê hinek xosletên zimên ji di xwe de bînine ser ziman. Bi vê yekê ve girêdayî, mirov deme ku dîroke wê bêne ser ziman ji, hingî, mirov wê dîroke wê pêşketine herdûkan ye di nav hevdu de bêne ser ziman. Civakatiye kurd, hinek xosletên wê ta deme sumeriyana diçin. Di wê demên de bidest têgihkirinê hatiya kirin. Li ber diclê li Cizîre bota û li ber firatê li Rihayê, demên wê her weha afirîn e. Demên pêşketine civakatiyê, bi bûna pergala xalkiyê re dest pê dike. Bicîhbûn, di serî de ji vê yekê re mijaraka sereke ya. Bicîhbûn, bi xwe re awayê jiyânê yê jiyankirinê ji ku di nav de têne. Her weha ev yek pir girîng e, di deme pêşketine civakatiyê de. Xweza herême ji, di vê demê de pir pêşketî û gurr e. Pir mazin e. Daristanên wê pir hene. Zevî û çiyayên wê pir mazin hene. Li ber wan bicîhbûn dibe. Lî bizêdeyî ji li cihên ku derfetên jiyankirinê lê hene, li wir bicîhbûn dibe. Her weha mirov karê bêje ku deme cihê ku lê derketên xwarin û vexwarinê hene, li wanderan bicîhbûn dibe. Bi bicîhbûnê re jiyana hin bi hin êdî diafirê. Bi bicîhbûnê re êdî hin bi hin bidest naskirin û serwerbûna herêm û deveran tê kirin. Bi vê yekê, hin bi hin êdî pêşketin derdikeve. Lê ev demên ku em ji wan dibêjin demên pêşketinê ne, bi têgihîştinekê her weha mirov pê li wanderan bicîhbûya û bi xwe re têgihîştinekê ji di demê de tînin. Ev yek ji, di demê de, bicîhbûnê di xwe de bi rewş û jiyana ku di awayê xwe de tê jîn kirin re bi pêş dixê. Bi vê yekê, êdî hin bi hin gund û piştîre bajar ji dibin û çêdibin. Bi vê yekê re ber diclê û berfiratê xwediyê weynne pir mazin in. Ewder, cihne pir girîng in. Ji mirov û bûna û pêşketine jiyana mirov re pir derketne mazin diafiri ne, bi hebûne xwe re. Bi vê yekê re, êdî hin bi hin di nav demên pêşketinê de çûyîn dibe. Pêşî bi vê yekê deme neolotîkê tê jînkirin, li wir. Piştîre ji wê buhurine deme şaristaniyê diafirê û dibe. Bi teybeti ji, deme ku mirov bahsa deme şaristaniyê dike awayê sumer weke navê pirtûkeke pîroz dikeve hişê mirov de. Deme sumeriyana, demeke şaristaniyê ya. Lê demeke pir dirêj, ku hatiya jîn kirin e. Hata nahaka dem û bi sereke jînkirina mazin, li ser wan hinek hizir têne meşandin. Kêvalbarên ji deme wan yên ku î ro di navendan de têne xwandin ji hinek hizirne didine mirov. Lê ew ji tere nakin ku mirov bitemenî li ser û demên bi giştî bibine xwedi hizir. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku demne pir mazin jîn bûna. Ne ji wan kêvalbarên ji deme sumeriyana mana. Ji hinek vgotinên kuu ji deme wan mana û hata nahaka ji li dore Başûrê kurdistanê, Cizîre bota, Riha û Nîsêbîne tê vegotina, mirov fahm dike ku weke ku tê gotin ku ew helqas jînbûn, ji wê maztir û dirêjtir jîn bûna. Mirov vê yekê her weha pir zelal û qanc fahm dike. Kêvalbarê sumeriyana, ku li cihê ku lê bûna û hatina nivîsandin, werine xwandin, wê hizreke hê maztir bi têgihîştinekê hê maztir re bidine mirov. Ev yek, xalaka ku li ser nayê nîqaşkirin ji. Bi vê yekê re,

mirov karê bêje ku wê hê bêhtir di derbarê wan de mirov bê xwedi agahî û zanebûn. Zanebûna sumeriyana pir mazin bû. Di demên mazin de buhurt û pêşket. Bi vê yekê re, pir mazin divêt ku li ser bê sekinandin. Bi vê yekê re mirov karê gotinaka weha ji bêje. Demeke weke deme ku roj bi roj pêşketinên mazin di hizir û têgihîştinê de dike, wate û hebûne demê di zanebûna de, bi vê yekê re dikujê. Lê sumeriyana, di wê têgihîştinê de bûn, ku di demê de pêşketin û têgihîştin, hinek pêşketin û têgihîştinên din ji di xwe de diafirênin. Bi vê yekê, wê mazinbûn hê bêhtir bibe. Ev hizre wê yekê de bûn. Bi vê yekê de, di bêja zanebûn û têgihîştinê de, wan pir girîngî dide bêjeyên wate û demê. Li ser bêjeye demê pir di sekin in. Bidest hijmartina dem û rojan kirin ji, wê yekê bi wan re bi nirx dike. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew di zanebûna xwe de bi demê re bûn.

Dem, mijaraka ku mirov pir li ser biskekîne ya. Ji aliyê têgihîştinê ve ji, mijaraka pir girîng e. Dem, çawa biwate dibe, ew ji girîng e? bi kar anîna deme, di pêşketinê de ji pir girîng e. Bi vê yekê re dem, girîng bû. Sumeriyana, li ser dihizir in û bêje "di demê de" û "dervî demê" diafirênin. Li ser wan herdû bêjeyan ji aqil çêdikin. Kî di demê de jîn dibe û kî dervî demê jîn dibe? Ev pirsne wan yê ku wan bi bersiv kirina. Pirsne wan yê ku ew pir li ser Sekinî ne. Hebûne hizre, pêşî bi wan re di demê de bû. Piştê derxistine dervî demê. Bi derxistine dervî demê nemiriya wî hata kifşkirin. Dervî demê, bi xwe re di hizir de memirbûnê ji bi têgihîştinê têne. Herweha di vir de, têgihîştin, dikeve devrê de. Tegihîştin, di hebûne xwe de hizrekê diafirîne. Piştê bi di wê hizrê de kurbûnê re têgihîştinê çêdike. Têgihîştine hebûn û nebûnê, bi vê yekê re mazin di serî de bi têgihîştinê dibe. Bi vê yekê re zanbûna wê dibe. Têgihîştin, bixwe ji, wate û deme wê, ketine deme civakatiyê de têne ser ziman. Civakati, bi vê yekê re mirov karê bêje ku bi sumeriyana re bûya. Bi vê yekê re pir mazin pêşî ketiya. Civakati, bi xwe re bi hebûne xwe re li ser hebûne têgihîştinê bi pêşketinê dibe. Bi vê yekê re di deman de pêşketine xwe dike û berdewam dike. Sumeriyana di têgihîştine wê yekê de bûn. Têgihîştine wan ya mazin ku mirov şaş û matmayî dihêle heya. Wilqasî mazin pêşketin û xwe pêşxistin, çawa bûya? Ev ji, pirsê ku mirov pir li ser biskekîne ya. Ew pêşketine wilqasî mazin, ne di demekê de û di demeke kin de bûya. Mirov, di serî de divêt ku wê yekê kifş bike. Bi vê yekê re, deme ku mirov wê yekê kifş dike, mirov hingî, demeke pir mazin ye pêşketinê kifş dike. Mirov, deme civakatiyê kifş dike. Bi vê yekê re, êdî mirov karê bêje ku demên civakatiyê, bi demên têgihîştinê yê jê cuda û cuda hebûne xwe berdewam dike. Bi vê yekê re, dem bi dem kifş kirin ji, her weha wê rastiya pêşketin, têgihîştin û dîroke wan ji bi me bide fahm kirin. Ev her sê bêje bi hev re ne. Ev hersê bêje, bêjene ku mirov pir bi hev re bi vê yekê re bi demên wan re li ser biskekîne ya. Hizirkirin, bi wan re nivîsandin bikifşkirina tîpan re têne. Bi vê yekê re, demên wan yê têgihîştinê, demên civakatiyê yê deme şaristaniyê ne. Deme şaristaniyê, demeke ku mirov ji gelek aliyên ve li ser biskekîne ya. Divêt ku mirov bêne ser ziman e. Divêt ku mirov rastiyê, mirov rastiye wê fahm bike.

Bi vê yekê re, piştî ve vegotina kurt e sereke, êdî em nahaka hinekî li ser demên civakatiyê bi pêşketin û têgihîştinê di zimên de li ser biskekînê. Demên civakatiyê, deme ku mirov bahsa wan kir, di rastiye de divêt ku mirov di serê de bêje ku mirov bahsa deme şaristaniyê an ji demên şaristaniyê dike. Her weha bi wate û girîng e. Bi vê yekê re, deme ku mirov sîrove xwe bike, divêt ku mirov bi têgihîştine van aliyên ji bi serwaxî bizanebûnê û karibe wê têgihîştinê di cihê xwe de bêne ser ziman. Bi vê yekê re, wê nêzikatiyaka rast bi hizreke rast û têgihîştine wê ya rast re wê were ser ziman. Bi kurtasî, ku mirov li ser demên civakatiyê di sekinî, mirov weke ku me li jor ji anî ser ziman ji, bi bicihbûnê û derketine hizir û pêşketine têgihîştine wê re dibe. Bi vê yekê re hebûne xwe berdewam dike. Jiyan, xwediye pir xosletên ku mirov di cihne de bi hev re bêne ser ziman û di asta herî bilind de ji, ti carî jê cuda neyêne ser ziman e. Her weha pir mazin xwedi hebûn e. Mirov ku tede bahsa weynekê bik, mirov wê bahsa weyne mirov bike. Bi vê yekê re, mirov divêt ku fahm bike, ku jiyan hertimî di xataka pêşketinê de ya. Sumeriyana, ev xat, ji gelek aliyên ve kifşkiribûn. Deme ku mirov li wan û li deme wan dimeyîzenê, mirov wê ji bi wan re dibîne ku weke xwestine ku bi wê têgihîştine xwe ye ku di serê wan de heya, wê xatê ji kifş bikin. Wan, ew vîn û hêz di xwe de dîtine ku bikin ku wê hewldanê ji bo kifşkirinê bikin. Bi vê yekê re, demên wan yê deme şaristaniyê bi hewldanê bi têgihîştinê ne. Ji ber vê yekê me got ku wilqasî

mirov li wan dimeyizenê, mirov vê yekê pir mazin dibîne. Ew dem, bi pêşketinên xwe re, di pirtûkên pîroz de ji cih û war girtine. Weke deme Nebî Lut, Nebî Salih, Yusuf û hwd. Ev dem, mirov yên deme têgihîştinê ne. Mirov karê wan weke filozofê wê ji bêne ser ziman. Lê wan pêxembertiya wê ji kiriya. Wan, pergala baweriyê ji ku di nav de pergala civakatiyê bi têgihîştin di deman de bi vir ve anîna. Têgihîştine wan îro ji, hê baş ne hatiye fahmkirin. Baweriyaya wan û awayê, têgihîştin bi hizir dinyê û axîretê dikira nava xwe de. Bi hev re di pergalakê de diênin ser ziman. Her weha mirov karê bêje ku wan têgihîştine ku jîn kirine, li herême, î ro ji, di asta têgihîştinê de hê ne gihêne rada wê heya. Bawerî, wan di aslê xwe de ku anîna ser ziman, li jiyane meyîzandin û li gor jiyankirinê bi ahlaqê wê re anîna ser ziman.

Demên piştî zayînê her weha mirov karê bi pêşketin, têgihîştin û pergalbûna hizre civakatiyê li ber diclê bêne ser ziman. Demên piştre ji, mirov karê, weke demên pêşketin û di pêşketin û têgihîştine wê de demên kurbûnê bêne ser ziman. Bi vê yekê re mazinbûna li bediclê heya. Civakati, bi nîrx her weha heya. kurmanci ji, yê vê deme bûyî û demên wê yên pêşketin ya. Her weha mirov karê biêne ser ziman. Demên piştî zayînê ji, ku mirov tê wan, mirov di vê pêşketinê demên kurbûnê dibîne. Di vê yekê de ji kurbûnaka mazin heya. Hizreke mazin afiriya. Mirov, pir mazin di jiyana xwe de bi hizir û têgihîştinê wê ya. Demên pêşketin û têgihîştinê, hata ku têne deme Êlî Herîrî û Salahadînê Eyûbî ji, pir mazin pêşketineke mazin di xwe de jîn dikin. Êlî herîrî, bi derketin û hizre xwe re ji wê demê re zanistîtiyê dike. Hizre wî ye wê demê ya. Bi asta têgihîştine wê demê ya. Ew mazinbûna wê jîn dike û di xwe de bi hizre xwe re têne ser ziman. Salahadînê Eyûbî ji weke wî, ji aliyê xwe yê zanistîtiyê ve bi vê yekê pir mazin têne ser ziman. Ew bihizir û bi bawer dijî. Bi vê yekê, weke ku mînaqakê ji dide berçavan, ku di mirov de wê hizir û bawerî çawa bi hev re bi zanebûn bê jînkirin. Zimanê wan ji, pir pêşketiya. Êlî herîrî, di zimanê xwe de weke şoraşaka hemdem dike. Ku dem tê deme Meleyê Cizirî û Feqiyê Teyran ji, mirov wê pêşketin û têgihîştin di demê de bi rengekî din yê pêşketî û mazin dibîne. Wan, bi xwe re têgihîştin, di deme civakatiyê de anî demeke din. Di serî de divêt ku mirov bêje ku Meleyê Cizirî demek bi xwe re da dest pê kirin. Ev deme, ku î ro, em jîn dibin, destpêka pêketine wê ye hemdem ji wî destpê dike. Wan, ziman, pir xweşik bi kar anî. Bi meleyê Cizirî re ji û Feqiyê teyran re ji ziman, pir pêşketî û bi nîrx û kevneşopîya. Bi vê yekê re bi wan re mirov tiştekî din ji kifş dike. Ew ji her weha ew ê, ku ji deme mîtanîyan, hûrîyan, naîriyan û Medan û bi virde hata deme Merwaniya û pêde, zimên, di xwe de dii pêşketine xwe de bi demê re pir mazin kevneşopîyeke mazin ye bi nîrx afirandîya. Ew vê yekê, bi wê kevneşopî û nîrxên wê bi wan re û hizir û têgihîştine xwe re didine berçavan.

Deme Meleyê Cizirî û Feqiyê Teyran, deme nû ya. Wê demê, mirov divêt ku bi hizir û têgihîştine xwe bêne ser ziman. Ew dem, ji ber çî û çawa afirî? Ev ji pîrseke ku mirov bi bersiv bike, ji bo ku mirov wê demê bi hebûne wê re pê hinekî fahm bike. Her weha bi vê yekê girîng e. Ew dem, bi têgihîştin û awayê xwe yê ku hatibû pêşxistin, demeke nû bû. Bi vê yekê re, ji aliyê hizir, awayê hizir, têgihîştin û têgihîştinê bipêşketin di wê têgihîştinê de heya, pergalbûn û ol û civak bi hev re têne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew deme nû, ji bo vaqasan ji demeke nû ya. Ji her aliyê ve mirov karê weha nûyêtiyê bêne se ziman. Ev yek, bi rada û asta hizir ye ku gihaya ve girêdayî ya. Bi vê ast û radê, dem di xweze ku weke ku xwe nû bike diafirê. Hizir, vê yekê têne ser ziman. Hizir, di jiyane de derketiya pêş û êdî di afirandinê cih girtiya. Bi vê yekê re ev ji ji gelek alîyan ve tê berçavan. Meleyê Cizirî û Feqiyê Teyran ji vî aliyê ve bi wate ne. Ew ne weke "helbestvan" divêt ku werine ser ziman. Weke zanist û hizirvanên deme xwe ku afirîner in, divêt u bi vî awayê werine ser ziman. Wan di nav xalkê de ne ku helbest di nivîsandin. Wan hizir di nivîsand û bi wê hizrê re dixwest in pergalaka hizir û têgihîştinê bi mirov bidine têgihîştin. Li ser vê yekê bi hewldan bûn. Bi vê hewldana wan, mirov divêt ku wan fahm bike. Li gor Rastiya meleyê Cizirî û Feqiyê Teyran, ew werine ser ziman, bêguman wê wan hêzên ku î ro li Kurdistanê serdest in û pêvajoyên bişavtinê bi rê ve dibin li ser serê kurdan û xalkên din yên li Kurdistanê, wê ne baş bibe. Ew ji dêla ku ew filozof û zanistên kurd li gor rastiya wilo weke zanistan werine ser ziman, dixwezin ku weke hinek helbestvanne werine ser ziman. Di vê nêzikatiyê de, pir armanc ji bo wan kirinên wan hene. Pêşî wê hizrekî ku wî xalkê ku hebûne wê

têne ser ziman, wê ji hole bê rakirin. Bi vê yekê, wê ji nêzîkatiya pergalbûna wan ye ku heya wê bê dûr xistin. Ji aliyê hizir û felsefe wî ve ji ber vê yekê, ma ka kê li ser van zanistên me lêkolîneke mazin ye bifelsefe wan kiriya? Ji ber ku tiştekî wilo bibe, wê di serî de hizir û pergala wan ye ku wan ji bo civakê afrandî wê bê kifş kirin. Ev ji, ji bo pêvajoyên bişavtinê yên wan mirine. Vê yekê divêt ku mirov di vir de pir baş fahm bike û bêne ser ziman. Ji ber vê yekê, em karin bêjin ku Meleyê Cizîrî ji û Feqiyê Teyran re ji di serî de gelek zanistên wan weke di deme wan de û berî wan û pişt wan jîn bûna, divêt ku li ser wan û felsefe wan lêkolîn bi dem û felsefe wan re bê kirin. Dij-jehra zilm û zore li Kurdistanê ye ku hata î ro hebûne xwe berdewam kirî ji yek jê ev yeka ya, ku mirov bike. Pirabûk ji rohnîyê nexweş in. Zilmkar ji ji kifşkirinê nexweş in li ber xwe di her demê de.

Pergala hizir ye li Kurdistanê, dîrokê wê pir mazin e. di xata pêşketinê de bi rêzê ji deme sumeriyên hata tê deme mesopotamya û ji wê hata ku tê deme Kurdistanê, her weha xwediyê demne pêşketin û têngiştinê ye deme şaristaniyê ya. Ji wê xata pêşketinê de ji Cizîre bota yanî berdiclê û Riha yanî berfiratê, bûna xweiyê weykeke pir mazin. Di dîroke wan ye deme şaristaniyê de, demne pir mazin yên pêşketinê hene. Ew dem, dîrokê vê herême ne û ev herêm ji, divêt ku dîroke xwe zanibe, da qana were xwe û rabe ser xwe û bi pêş bikeve. Ji ber vê yekê her weha pêdivî bi vê yekê heya. Dîrok, ne tenê weke demne jînbûyî tenê demên li şûn me mana. Di wan deman de demên li pêşîye me ji, yên wê bêne jînkirin, rîya di wan deman de çûnê di xwe de di veşêre. Vê yekê, berî hertiştî divêt em bi têngiştin hem di xwe de weke mirov û hem ji bi demên pêşketinê yên civakê re kifş bike. Demên pêşketinê, demne ku ji gelek aliyên ve werine têngiştin in. Bi vê yekê û nêzîkatiyê, divêt ku mirov nêzîkatiyê lê bike. Herêm, bixwe ji, deme ku mirov lê dimeyîzenê, mirov vê yekê dibîne. Deme ku mirov li Cizîre bota dimeyîzenê, weke ku mirov li manifestoyeke têngiştin û pêşketinê meyîzenê li mirov têt. Her wehatê ber çavên mirov, deme ku mirov lê dimeyîzenê. Bi rasti ji, Cizîre bota manifestoyeke pêşketinê ya, bi nirx û dîroke xwe re. Nahaka ji, î ro ji, tenê ku mirov lê dimeyîzenê û wê dixwanê, mirov bi têngiştineke mazin ye dîrokî tişî dibê. Ji ber ku dîrokeke wê ye pir mazin û tişî heya. Hertimî tişî tişî jîn bûya. Cizîre bota bi zanebûn, têngiştin û dîroke wê re rûmete wê ye, ku mirov hemû lê bi hûrmet bin. Bi vê yekê, divêt ku mirov lê nêzîkatiyê bike û lê bînerê.

Di serî de, deme ku em bahsa Nebî Nuh, Nebî Lut û Nebî Salih dîkin, divêt ku em bêjin, bi Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran re wê rûmete Cizîre bota tênine ser ziman. Mirov wê rûmetê bi wan re di xataka pêşketinê de dibîne. Birehim Xelîl ji di nav wan de ya. Lê ew bêhtir li berfiratê ya. Lê ew ji yê vê xatê ya. Wî ji zanetiye vê xatê bi pêxemberî kiriya. Deme ku mirov li ser deme wan bi hev re û cuda cuda di hizirê, mirov dibîne ku wan di xatakê de hevdu temen kirina. Ew hemû yên xatekê ne. ew xat, xata pêşketin û têngiştin ye Berdiclê ya. Bûya xataka pêşketin û têngiştinê ya mirovahiyê bigiştî ji. Bi vê yekê divêt ku mirov wê xata pêşketin û têngiştin fahm bike û bêne ser ziman. Statûqûperezî di wê xatê de nîn e. Hertimî xwe nû kirina. weke navê Nebî Nuh bixwe ji. Navê Nebî Nuh bixwe, Nuh, wate wê di kurmanji de "nû" ya. Wekî dî ji, di wate xwe de demeke nû ji biwate diparezê. Bi vê yekê, mirov karê ji wate navê wî bixwe ji bêje ew demeke nû ya. Ew demeke pêşketinê ya. Deme wî, deme hizir e. Deme ku têngiştin dikeve hizirkirinê de ya. Bi vê yekê re, mirov karê gotinaka ku di nav xalkê de li Cizîre bota berê dihata gotin biolî ji bêne ser ziman. Berê, di gotin ku "deme ku xwûdê nebîtî da Nebî Nuh, bi wî re û bi wê nebîtîya wî re mirov biaqil ji kir". Her weha bi bawerî tê vegotin. Bi vê gotinê ve hê hinek gotinên din ji yên bi vî rengî têne vegotin. Gişan ji, ku mirov li ser wan dihizirê, mirov di wate wan de, wate ku di vê gotina ku me nivîsand de tê ser ziman, têne ser ziman. Bi vê yekê re hizirkirinê ji bi têngiştin bi zanebûn tê kirin. Demên berê, ku yekî nezaniyak ji kiribana, weke ne ji mirovên wî xatê bin nezan dihatina hasibandin û rexne li wan dihatina girtin. Bi vê yekê, ji wan re dihata xwestin ku bizanebin û biaqil gavên xwe di jîyanê de li berhevdû biavêjin.

Demên pêşketinê, yên ji deme meleyê Cizîrî û Feqiyê teyran bi virde ji, divêt ku mirov bi vê yekê û nêzîkatiyê re hinekî li ser wan bisekinê. Ev yek, divir de li gor me pir girîng e. Demên pişt wan re yên hizire bi têngiştin in. Bi vê yekê, nêzîkati ji tê kirin û nîşandin. Êdî jîyan bihizir, bi bawerî tê jîn kirin. Bi vê yekê, weke ku demeke nû ji diafirê. Bi vê demê re, mirov di nêzîkati û

hewldanên xwe de weke ku ji nû ve bidest pêşkertineke nû dikin. Her weha tê xuyakirin. Dem, bi tîgihîştin bi rê ve diçê. Ji rêveber û hêzên herême ji, jiyana, rewş û dem vê yekê dixweze. Her weha deme ku diafirê, ji her aliyê ve dixweze ku xwe jîn bike. Li ser vê nêzîkatîyê, di nav oldaran û zanistên deme de ji nîqaşaka pir mazin heya. Li ser demên xwe ew ji di hizir in. Di nêzîkatîyê hizirî ye ku ji hizre Nebî Nuh tê fahm kirin, "hertimî deme xwe fahm kirin û li gor wê jiyana xwe adilandin heya". Ev gotin, weke gotinaka perspektîf tê ser ziman û li gor wê hewldan tê dayîn ku wilo bê kirin. Bi vê yekê re, aqil ji di demeke nû de pêşketine xwe dijî. Li gor wê ji, nêzîkatîyaka bihizirî di demê de tê kirin. Mirovên ku zanistên ji, hizre xwe li ser awayê nûbûnaka bihizirê tînine ser ziman. Di nêzîkatî, nerîn û hewldanan de, her weha guharandin bi nêzîkatîyaka pêşketî xwe diyar dide nîşandin. Di nav xalkê û mirovan de di tîkiliyên wan de hizir bi tîgihîştin û bizane li pêş e. Mirov deme ku li deme û pêşketin û nêzîkatîyên wê dimeyîzenê, mirov vê yekê dibîne. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ji aliyê ve weke ku şert û mercên pêşketinê nû yên pir mazin li herême afirî ne. Ji binî ve her weha ew şert û merc afirî ne. Lê rêveberên ku hene, di nêzîkatîyaya xwe de ne li gor vê yekê ne. Ew xwediyê statûqûyekê ne. Li gor wê statûqûyaya xwe ji gav ji diavêjin. Li herêmê, ne netenê ji aliyê olî ve her weha rewşek heya. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ne tenê ji aliyê hizre olî yekê ve ji ew rewş heya. Ji hemû aliyan ve heya. Bi vê yekê re, dem ku tê deme sadsala 16. min û wan, êdî ew rewşê pêşketinê ji gelek aliyan ve xwe dide berçavan. Lê di wê demê de êdî hin bi hin weke ku şerek ji rû dide. Dii vê rewşê pêşketinê de bi xalkên herêmê û rewşê wan re rêveberên ku hene, bi statûqûyaya xwe ye rêveberî dikevine dijberîyeka ku wê ji hole rakê de. Li ser vê yekê, çûn û hatinaka mazin di seran de heya. herêm, li ber jidayikbûnaka mazin e. Pir zanist û hizir li herême berhev bûna. Lê ew rewşê şerî ye ku heya bi rêveberan re, bi bidestxistina Stembulê ye ji aliyê osmaniya ve tê guharandin, êdî ew rewş, pêşketin û hizir, weke ku bi carekê re ji herême goç bike rewşê êdî tê guharandin. Bi serketina osmaniyan ye li Costantinopolis re, nêzîkatîyaya herêmê ye ku bi statûqû hebû, weke ku li ber wê pêşketinê şoraşaka xwe bike dibe. Ew nêzîkatîyaya ku Abasiyan ji hizirên misre kevn pêşxistine, weke ku di vir de şoraşê bikin dibe. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku êdî dîroke herême ye windakirinê ji vir pêde, pir bilez biser xwêre ve diçê. Her weha êdî dîroke windakirinê li herême bidest nivîsandina xwe dike. Hizir, bi vê serketinê re, bitemenî ji herême diravê û diçê rojava. Di wê demê de êdî "deme ronansansê" ku dibêjin ronansansa rojava dest pê dike. Mirovên weke Îbnî Rûst ji, li herême êdî hizre xwe nayênine ser ziman. Derfet ji wan re, namêne. Ew ji, hizre wan li rojava tê ser ziman.

Rojava, bi vê yekê re êdî mazin bidest pêşketinê dike. Ji vir pêde, li rojava, demeke pêşketinê ku wê demên wê yên piştre ji kifş bike dest pê dike. Rojava, ji vir pêde, êdî bi hizir bidest pêşketinê dike. Deme ku mirov li wê deme sadsala 15. min, ku jê re dibêjin "deme ronansansê", ku mirov li wê di meyîzenê, mirov bi awayekî weke awayê ku piştî deme sumariyan re, bi hin bi hin çûna hizir li wir ye misrê re û ewder êdî bidest pêşketinê de mirov dibîne. Her weha mirov karê bitijbêne wê dem. Mirov, karê vê deme ronansansê ye ku bi li rojhilat bi bilindbûna hêze Osmaniyan re harikîna wir ye zanistan re pêşketine wê, weke wê deme bûna misre kevn bitijbêne. Her weha hinek xoslet ji ditijbihine hevdû. Piştî deme sumeriyan re êdî hin bi hin, statûqû perezî derdikeve. Aqadiyan re ew yek dibe. Ji ber vê yekê li ber Nîlê li Misre kevn, êdî çûna wir çêdibe. Bi vê yekê, êdî ewder ji mazin bi pêş dikeve. Hin bi hin, ewder mazin pêş dikeve. Bi her çûna wir re ji, hizir û raman û tîgihîn ji diçê wir. Bi vê yekê re, di deme kin de ewder ji, li ber Nîlê, êdî şaristaniyaya ku demên pişt xwe re wê kifş bike diafirê. Berdiclê û berfiratê, di tîgihîştin û pêşketine xwe de, di wê demê de, ji deme mîtolojîyê pir dûrketiya. Bitîgihîştinê xwûdê jîn dibe. Bi vê ji, hin bi hin di demê de mazin dibe. Bi vê yekê re, êdî mazin pêşketin, li wir dibe. Hizre Nebî Nuh, ye bi hebûne xwşdê re tê ser ziman, bi pergala êdî bi hebûn e. Hebûna xwe, di her derê jiyana de bi wate kiriya. Rêveber ji, li gor wê hin bi hin xwe diadilênin. Lê hê bawerî û awayê bawerîyê rêveberan li gor ye berê ya. Bi vê yekê li ber hevdû sekinandin û şerkirin ji derdikevin. Ew şerkirinên ku derdikevin ji, yên ku di qada hizirî dibin in. Weke şerê Birehim Xelîl li ber nemrut. Her weha yên wilo hene. Lê weke ku Birehim xelîl bi ser dikeve, êdî hertimî li herderî ew tîgihîştine Nebî Nuh ye bi xwûdê re biwate ye bi ser dikeve. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku demeke nû diafirê. Deme nû her weha di wan serketinan de xwe pir

zelal dide berçavan. Her serketin li gor şert û mercên xwe û deme xwe dibe. Di deme xwe de, ku têgihîştin gehabe wê astê wê bi ser bike. Lê di vir de, ew têgihîştine mazin û bi hebûne pêşketî, ji aliyê xalkê wê ve erêkirina wê ve ji girîng e, ku mirov bêne ser ziman. Ev ji, di serketine wê de xalata dî ya ku wê bi ser dixê.

Mîsre kevn, aliyê hizrî yê sumeriyân yê mîtolojîkî hildan û bi têgihîştine xwûdê re jîn kirin. Vê awayê jîn kirine ji, ji wan re bingehêkî mazin ji statûqûtiya wan ye demê bingeh çê kir. Bi vê yekê re, di demên xwe de serwer bûn. Li dore xwe serwer bûn. Weke ku di deme Remsesê duyemîn de di şerê di qadaşê de li ber Hîtîfyan de çawa ku bi serketineke wilo ji nakin ji, lê xwe di nêzikatiya xwe biserketi didine nîşandin û wilo ji didine erêkirin. Vê ji, bi wê statûqûtiye ku wan di xwe de afirandi dikin. Bi vê yekê, bi ser dikevin. Wan wilo di deme xwe de hizrek bii firewûnan re afirand, ku ji dêla wan xûdayên wan di şer de bû. Li Namîbya, Remsesê duyemîn, bi hêzeke biçûk û hebûne xwûdayê xwe bi wan dana naskirin re serwer dibe. Tirs bi vê yekê, di dilê wan de tê çandin. Tirs ku di dil de hata çandin, êdî çî ji bê kirin, wê şert û mercên têkçûne bi mirov re biafirîne. Tirs, hêzeke wê heya. Ew hêze wê, di mejî de bi hinek beşên wê xwe biwate dike. Bi vê yekê, êdî serketin nabe. Lê tirs, di xwe de hêzeke afrîner ji dihawêne. Ew ji, hertimî di mejî de bi lêgerînekê ku dibe xwe dide der û dîyar dike li berçavan. Mîsre kevn, ev yek, weke ku kifşkiribûn. Li ser tirsê pergala ku mirov jê re bêje olî ji ya ava kirin û pê li dore serwerî kirin. Pirtûka mirinê' û 'pirtûka jîyanê', hizrên ku di deme sumeriyân de biwate bûn û bi bêjeyên 'dojeh' û 'bihuşt'ê re hebûn bûn. Lê sumeriyân, bi di van bêjeyan de weke du felsefeyan 'baxt' û 'bawerî' ji afirandibûn. Li wir, bi hinek awayên din re ji hebûne wan tê ser ziman. Mîsre kevn, ew pergala xwe ye ku bi wî awayî ava kir, ser du hezar salan re jîn bû. Di vê demê de ji, pir mazin di ser û dilê mirov de bicih bû. Ew pergala wan, bi serê xwe hinek pêvajoyên wê yên ku mirov hem ji aliyê hizrî û hem ji ji aliyê rêveberî ku pêre statûqûperezî ji were ser ziman, divêt ku were ser ziman. Piştî du hezar salan, li wir, musulmanetî derket. Musulmanti, di demeke wilo derket ku pir mazin afrîner bû. Li mîsre kevn, firewûnan xwe dikire cihê xwûdê de. Ev kirin, ji berî zayîne bi du hezar salan pêde ji, pir hizreke xirab di hata dîtin. Hizre mirov "ne xwûda ye", afirbû. Ew hizir, hizreke pîroz re hebû. Herkesekî ji lê bawer dikir. Nêzikatiya firewûnan, di wan demên berê zayîne de ji, weke 'curetkariyek' a li ber xwûdê di hata dîtin. Ev ji, rast ne di hata dîtin. Pişt wan re bi çend sadsalan re Hz. Muhammed re, ev ji wê were ser ziman. Di pirtûka xwe ye pîroz de cihekî fireh dide vê yekê û bahsa têgihîştinê di vê nêzikatiyê de ye li ber xwûdê dike..

Bi vê yekê, tê ser ziman, ku xwûdê li ser mirov hemûkan re ya. Ev hizir, hebûne pergala bitêgihîştin têne ser ziman. Felsefeyêke têgihîştinê ye ku pergala ava dike, têne ser ziman. Bawerî, di vir de, mazin divêt ku were têgihîştin. Awayê baweriyê bi têgihîştin têne ser ziman. Li ser zanebûnakê têne ser ziman. Bi vê yekê, mirov karê di vir de, hinek din ji bahsa wê têgihîştine nebî Nuh bike. Di vir de, hizre wî dikeve devrê de û "rasti" çiya wê li gor hebûne xwûdê têne ser ziman. Di vir de, Nebî Nuh di bêje rastiyê de wate rasteqîniyê bicih dike û di hizre xwe de têne ser ziman. Ew ji her weha ya. Deme ku jîyanê têne ser ziman, weke rastiyaka ji rasteqîniyê têne ser ziman. Bi vê yekê re, li ser wê rastiyê û hebûne wê rastiyê di hizirê û hizre xwe têne ser ziman. Piştre, di wêrastiyê de mirov û ajalên ku hene li ser wan di hizre û cihê wan di jîyanê de têne ser ziman. Piştre ji wê ji, xwe digihêne rasteqîniyê wê jîyanê. Yanî, ye ku ew jîyan afirandiya. Ew ji, bi hebûne xwûdê re tê ser ziman. "Xwûdê, jîyanê li dinyê bicih kiriya". Bi vê yekê re, bahsa mirov li jîyanê tê kirin. Bahsa afirandina wî tê kirin. Li gor wê baweriyê, mirov ji "hariyê" çêbû ya. Ev têgihîştin, têgihîştine jîyana berdicle û berfiratê ya. Bi vê yekê re, li jîyanê naskirin bicih dibe. Lê deme ku mirov, li wê demê di hizirê, mirov dibîne ku li ser xwezê ji û jîyanê bi hev re ji serî hatiya wastandin. Ev ji, her weha tê ser ziman. "Hemû tişt bi hev re di hev re di ahengekê de hatiya afirandin û wê her weha bê afirandin û wê hebûne afirandina xwe li jîyanê berdewam bike". "Hemû tişt bi pergala e". Ev ji, hizre din e, ku tê ser ziman. Lê bi vê re tê ser ziman.

Ev hizir û têgihîştinên ku me anîna ser ziman, pir girîng in. Divêt ku mirov pir li ser wan bi sekinê. Ji ber ku dibine têgihîştinên demên piştre ji. Di demên piştre de, her felsefeyên ku derdikevin bi awayekî wan di xwe de tînine ser ziman. Ji yên olî bigire hata ku digihê yên hizrî

felsefi gişan. Di olên yek-xwûdayî, di êzîdîtîyê, cuhutîyê, filehiyê û musulmanetîyê de, tê ser ziman. Demên piştre de ji, li gor wê hizirkirin û afirandin dibe. Bi vê yekê, weke hizirne mazin ku di jiyânê de pêşketinê di afirênin dibin. Felsefe, bihizir, di serî de, bi van hizran di ol û baweriyê wan de bicih dibe. Bi vê yekê, weke ku tê ser ziman, "baweriyaka qayîm" diafirê. Di pergala baweriyên li rojhilat de, pêxemberî ji ber vê yekê ji hertimî bi "wehî" tê û diafirê. Li Hîndîstanê, têgihîştine pêxembertîyê ji ya rojhilat cuda bicih bûya. Ye wan, mirov, di jiyana xwe de karê pêxembertîyê bidest bixe. Lê li rojhilat ne wilo ya. Bi vê yekê, pergala baweriyê rojhilat li herderî bi bandûr û bicih dibe. Ji ber ku ev pergal û awayê baweriyê, hizre xwûdê hebûne wî di serê mirovan de bêhtir bicih dike. Bi vê yekê, ol êdî mazin bi felsefe xwe mazin dibin û pêş dikevin. Rojhilat, bi vê yekê, dibe cihê pîroz li dinyê hemûkî.

Piştî demên zayînê, li rojhilat, pêşketinên olî, mirov pir bi pêş dixin. Ji ber ku hemûkî bi felsefê û têgihîştinê ne. Lê piştre, ev nêzîkatîyê û rewş di guharê. Hizre olî, ye destpêka piştî zayînê tenê ji, ku mirov li berçav digirê, mirov karê bêje ku ji ya roje me ye zanistê bêhtir bi pêşdixe. Lê piştre ev yek tê guharandin. Ev guharandin ji, sedeme wê, divêt ku mirov ne di olan de di hebûne nêzîkatîya rêveberan dî bibîne. Hizir, ku ne olî ji bê, ku bi statûqû hata kirin, dibe hîmê windabûnê. Hingî, hê hizrê olî di nav xalkê de li ber statûqûyê li ber xwe dide. Piştî zayînê, hizre wê ya olî her weha ya. Lê di piştî zayînê de, statûqûya rêveberan serwerî û serketine xwe li ber vê yekê di denezêne û piştre êdî demên windakirinê bi têkçûnê dest pê dikin. Ji aliyekî ku mirov wê bêje statûqûyê, ku mirov dîrok û hizre wê şîrove bike, divêt ku mirov di aliyê mesre kevn ve herê û xwe bigihêne sumeriyân. Lê deme ku mirov wê hizre bi pergal ku bi hebûne xwûdê re afirîya û destpêka wê bi Nebî Nuh re dibe ji, ku mirov wê ji şîrove bike, divêt ku mirov ji aliyê berdiclê û berfiratê ve herê û xwe bigihêne sumeriyân, Her weha herdû ji, serî û dawîye wan diçê sumeriyân. Lê herdû ji, du pêşketin û têgihîştinê jev cuda ne. Divêt ku mirov her weha herdû aliyan baş nas bike û di derbarê wan de bizane bê. Bi vê yekê, êdî mirov wê karibe, ye rastîyê kifş bike û serwer bike. Dem, ku tê deme sadsala 15. min û wan ji, mirov her weha bi vê yekê, aliyê statûqûperez, serwerî û serketine wê dibîne. Bi vê yekê re, pîrsgirêkên rojhilat yên ku hata roje me tîn ji, êdî mazin diafirin û hebûne xwe berdewam dikin û têne roje me, hata î ro. Lê divêt ku mirov wê hatina roje me ji hinekî em li ser bi sekinîn û fahm bikin. Ev yek, her weha di vir de ji bo pêşketineke rast û pak pir mazin pêdivîya wê heya. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov li ser bisekinê..

SADSALA 15. MIN Û PIŞTRE

Sadsala 15. min, ku mirov wê bêne ser ziman, divêt ku mirov pir mazin bitêgihîştinekê bêne ser ziman. Sadsalên 15. min û piştre, li cihanê bi giştî pir pêşketin derketin û bûn. Her pêşketinê ku bûn ji, pir mazin, hevirdore xwe bi bandûr kir. Hem ji aliyê hizrî ve bê û hem ji hin aliyên din ve bê, her weha wilo bû. Deme ku mirov li rojhilat dimeyîzenê, mirov her pêşketineke pir mazin dibîne. Pêşketinên rojhilat, pir girîng in. Divêt ku mirov ji temen, hîm û dîrokê ne dûr bêne ser ziman. Ev yek ji her weha pir girîng e, ku mirov bike. Têgihîştine sadsala 15. min, ku mirov li ser dihizirê li rojhilat, mirov pir mazin dibîne. Ji aliyê hizir û têgihîştinê ve rojhilat, hata sadsala 15. min li pêşîye cihanê hemûkî bû. Li piştre bi serketine Osmaniyan re hin bi hin ev yek hat guharandin. Di sadsala 15. min de rojhilat, demeke pir pêşketî jîn dikir. Li gor wê pêşketine xwe ji, li ber hin pêşketinê din ji bû ku jîn bike. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku cihana rojhilat, di wê demê de rewşeke pêşketî ku mirov ji ye roje me î ro, cuda neyêne ser ziman û jê kêmtir neyêne ser ziman jîn dikir. Ji her alî ve her weha pêşketî bû. Di sadsala 6 min musulmantî derket. Di destpêka xwe de musulmantîyê, demeke weke ku digotin deme asra siadate jîn kir. Piştre hin bi hin bi rêveberan hinekî statûqûfî kete nav de. Bi vê yekê, musulmantîyê bixwe ji, di hundurê xwe de li ber wê bidest şerêkî hizrî û pêşketinê kir. Wî şerî, ji piştî derketine musulmanetîyê û virde, weke 800 an ji ne 900 salê berdewam kir. Wê şerî, dem ku hata sadsala 17. min, êdî mirov karê bêje ku rewşeke pir pêşketî bi nêzîkatî û têgihîştinê afirî bû. Rêveber ji, li ber rewşeke ku wê pêşketinê erê bikin û bidest demeke din di xwe de ji bikin. Her weha rewşeke pir cuda hebû. Bingihê wan pêşketinê ku bûn, mirov divêt ku wan ji bêne ser ziman. Hinek nêzîkatî bi têgihîştinê xwe diçine ta deme sumeriyân û hinek ji diçine ta dem misre kevn. Yên ku diçine

deme misre kevn, mirov karê mînaqakê bike û bi buhurê ji ber ku piştê emê li ser bisekin in. Di wê demê misre kevn de, keçzarok sax bi sax dikirine bin axê de. Ev rewşeke ku ji deme misre kevn mabû. Hz. Muhammed deme ku derket, pêşî bi rexnekirin û şermazarkirinê vê nêzikatiyê bidest anîna ser ziman ye ole musulmanetiye kir. Lê demên piştê, weke ku di Îrane roje me de dibe, ew nêzikati bi navê "recmê" di musulmanetiye de di nêzikatiyê Hz. Muhammed de hata rûniştandin. Divêt ku ew kirin û hîm û temenê wan û dîroke wan ye ku ji kuderê tîn, werine ser ziman. Ev yek, pir girîng e. Ji bo ku nêzikatiyaka zelal li gor têngiştine rast ku heya, ku hmê xwe dighêne Nebî Nuh mirov baş û qanc fahmbike. Î ro ji, hê nêzikatiyên Hz. Muhammed ji aliyê cihana musulman ve bi tememî ne hatina fahm kirin. Ev ji divêt ku werine fahm kirin. Divêt ku cihana musulmanan fahm bike ku ew nêzikatiya recmê çawa ku Hz. Muhammed mahkum kir û pişt wî re di ole wî de hata bicih kirin. Ev yek, divêt ku pir zelal û baş were ser ziman. Ew hizre olî ye paqîj divêt ku li gor cewherê xwe rast û li gor ku Hz. Muhammed anîya ser ziman, divêt ku were ser ziman. Ev yek, girîngiye wê li gor me pir girîng e, ku were kirin. Di vir de pêşketineke mazin ye rojhilat heya. Ji ber ku ev yek bi nêzikatiya. Nêzikati, li gor hizir û dîroke xwe ye pêşketi ku hata têngiştin, hingî, wê qancî û xirabiyên wê baş û qanc werine têngiştin.

Li rojhilat. ku morov li dîrokê wê dimeyîzenê, mirov her weha bi nêzikatiyên ku weke ku keçzarok sax bi sax dikirin bin axê de, mirov dîroke statûqûtiyê ye ku bi hezar salan hebûne xwe berdewam kiriya, mirov dibîne. Bi vê yekê, divêt ku mirov wê dîrokê bi kirin û hebûne xwe re û berî hertiştî bi dîroke xwe re mirov kifş bike û bêne ser ziman. Bi vê yekê, wê qancî û xirabî baş jev bê vaqatandin. Hizire pêşketinê, hîmê wî li rojhilat e. Divêt ku mirov wê ji bibîne. Dîroke wê ji ji rojhilat dest pê dike. Divêt ku mirov wê ji fahm bike. Pêşketinê wê ji, ji destpêkê bi têngiştin Nebî nuh re li rojhilat, divêt ku mirov wê têngiştinê. Her weha divêt ku mirov dîroke bibîne. Vê gotinê, mirov karê weha ji bêne ser ziman. Divêt ku mirov pêşî xwe nas bike. bi awayekî din ji, mirov karê bêje ku divêt ku rojhilat xwe nas bike. Divêt ku mirovên rojhilat xwe nas bikin. Ev yek wê bê destpêka pêşketina wan. Di deme Nairiyan de nêzikatiyak hebû. Deme ku mirov diçûne devê cihê ku lê berg(dua) dikirin, di dîtin ku wa li ser devê hatiya nivîsandin "xwe nas bike". Ev gotin, piştê li gelek herêmên din ji belav dibe. Hata ku diçê Grekê ji. Li Girekê li devê parastgaha Apollon dihata nivîsandin 'xwe nas bike'. Her weha gelek nîrx hatina hevpar kirin. Ew hevpar kirin, di rastiye de hevpar kirina pêşketin û têngiştinê bixwe bû. Divêt ku mirov vê yekê pir zelal û baş fahm bike û têngiştinê. Ev yek, her weha girîng e. Bi vê yekê re, mirov wê têngiştinê ku weke ku şaristaniyê piştî demên sumeriyana re hatina ava kirin, çawa ku li ser nîrx û pêşketin û têngiştina wan, bi wê hatina ava kirin. Ev yek, her weha wê pir zelal were têngiştin. Sumeriyana, cihanak ava kir, Piştê herkesekî xwest ku bibe xwediyê wê cihanê û an ji tede bijîn. Bi vê yekê, bi hizir û pêşketin wan, bi lê xwedî derketinê re pêşketinên xwe derxistina hole. Misre kevn, pişt Anatolia û Girek, çend mînaq ji vê ne.

Lê deme ku mirov vê yekê her weha tene ser ziman, divêt ku mirov ji bîr neke û bêje ji, ku di têngiştin û fahm kirina wan de, cuda bûn di deme de derketine hole. Her navende pêşketinê yên ku pişt wan re bûn ji, xwestin ku hinekî di demên xwe yên pêşketinê de di xwe de hinek pêşketinan çê kin ku bi wan û navê wan tê ser ziman. Bi vê yekê û nêhtê ji hewldan bûn. Misre kevn, bi vê yekê, ev yek, ye ku pir baş di xwe de pêk anî û xwe gihanda têngiştineke statûqûcûtiyê. Pêşketine sumeriyana wa hizirî, statûqûcûtiya xanedanên Ur û pişt wan re ku hinekî mirov bi vê ve Mîtaniana ji bêne ser ziman, di pêşketine misre kevn de di awayê pêşketine wan de weke ku gihiştinê hevdû. Mirov her weha vê rewşê bi wan re dibîne. Pêşketin, di têngiştine ku heya de nêzikatiyakê dixweze. Divêt ku mirov vê yekê ji bîr neke. Nêzikati, di xwe de awa, pir mazin dipareze. Piştê pêşketinên ku rû didin ji, li gor wê awayê dide der. Her weha ev yek ji, girîng e, ku mirov kifş bike. Sumeriyana, hizreke mazin, bi têngiştin afrandin. Di deme wan de mirov nikarê bêje ku felsefê û wêje ji pêşketibû. Herdû ji pêşketibûn, bi fizik, astronomî, geometrî û hwd. Ew filozof an ji mirov ku bêje nivîskarên wan, yên ku ew kêvalbarên wan di nivîsandin, hebextvanne pir mazin ji bûn. Wan, her hizre ku di nivîsand, karibûn ku wê di serê xwe de bi pergala bikin û lev bînin û piştê binivîsîn. Her weha ev xosletê wan li pêş bû. Ev ji bê têngiştineke mazin nabê. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha pir zelal fahm bike. Ew awayê

filozofên wan, hata nahaka ji bi kurdan re bi dengbêji û di awayê dengbêjiye de lev anîna wan de hatiya roje me. Bi vê yekê re mîreteye wan bikurdan re hata nahaka ji dijî. Ev ji, î ro ji, hê berdewam e. Me li jor ji got, ew zanistên roje me, ku hewldidin wan kêvalberên sumeriyân bixwênin, çima hata nahaka neçûne ew çihê ku ew kêvalbar hatina nivîsandin? Li wir li berdiclê û li berfiratê hê jî awayê wê jiyana ku wi wê demê dihata jîn kirin, bi gelek xoslet û teybetmediyên xwe dijî. Mirov, wê yekê ne bîne, ma gelo wê çiqas, ew xwandinên ku bêne kirin wê bêne fahm kirin? Ev ji pirseke di ya ku mirov pişt wê pirse xwe ye pêşî re bi pirsê ya. Bi vê yekê, em hinekî li ser wê demê bi sekinîn û bînine hata deme ku emê bînine ser ziman, sadsala 15. min û demên piştire yên ku weke demên bi şoraş têne ser ziman..

Deme ku mirov li deme sumeriyân dimeyîzenê, mirov ji ji aliyê hizir û hizirvaniyê ve rewşeke mazin dibîne. Di pêşketine şaristaniya wan de hizir piştî demekê êdî dibe xalaka bingihîn. Bi vê yekê, em hinekî li ser bisekinî in û bînine ser ziman. Bêguman, deme ku mirov li ser demên sadsala 15. min û piştire di hizirê, mirov demne ku pir ji aliyê hizir ve mazin in, dibîne. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku weke ku demeke sumeriyân ji wê demê pêşde ji aliyê hizir ve jîn bibe dibe. Çawa ku ji bo deme ronansansê tê gotin ku weke demeke dubarakirina deme antîkî ye Girekê-romen e, her weha mirov bigiştî ji, ji bo wê demê hata sadsala 20. min ji, ku mirov bixe nav de, mirov karê bêje ku weke demeke sumeriyâ ye pêşketinê ye demên dawîye wan e. Her weha tê ber çavên mirov. Mirov, deme ku li pêşketin û awayê pêşketinan dimeyîzenê, mirov vê yekê pir baş û qanc dibîne. Hizir, di wê deme de, di deme sumeriyân ya dawiyê de pêşketibû, û weke ku demeke xwe ye pêşketî herî mazin ji jîn dikir. Her weha di hata berçavan. Hizir her weha mazin pêşketibû. Bi vê pêşketinê, piştire, piştî deme aqadiyan, demeke sumeriyân de din ji diafirê. Ji ber ku hizre wan pir mazin e. Ew deme duyemîn ye sumeriyân, ku mirov bi derketin, bûn û pêşketinên wê re, mirov karê bêje ku weke deme sadsala 15. min ye deme derketin û pêşketin deme ronansansê ye li rojava ya. Li rojava, deme ronansansê, ku dibe, piştire, berdewame wê bidemên din yên piştire ku jîn dibin re û pêşketinên pişt wê re ku demên pişt wê re jîn dikin re têne û di temenê deme ronansansê çî pêşketin jînbûya kurbûna wan bêne re, pêşketine demên wê yên piştire êdî derdikevine hole. Bi vê yekê re, êdî Ronansans bi demên weke deme Baroqê re pêşketinên deme xwe bi aliyê çandî û avadanîyê berdewam dike. Deme sumeriyân ji, her weha mirov karê ji bo wê bêje. Lê deme ronansansê, hinekî cuda ya. Ew cudatîyên ku hene, ji aliyê hizir, têgihîştin û hebûne hêzan ve cuda ya. Deme sumeriyân, divêt ku mirov hinekî pir mazin bêne ser ziman. Wê deme sumeriyân, weke piştî deme pêşî ye sumeriyân û aqadiyan re, êdî demeke têgihîştinê wê pêşketine ku bûya ji bêne ser ziman. Her weha wilo mazin û bi wate ya. Zêde wilo li ser wê deme duyemîn ye sumeriyân nayê sekinandin. Lê ew dem, ji aliyê têgihîştinê ve divêt ku mirov pir li ser bisekinê. Bêjeyên ku di wê demê de ji diafirin, bêjeyên ku bêjeyên têgihîştine ne, bixwe ne. Bêjeyên deme têgihîştine ne. Her weha mirov divêt ku wan bêjeyên wê ji bêne ser ziman. Bi vê yekê, mirov karê wê deme sumeriyân ye duyemîn bi deman re bitijbêne. Yek deme antîkî ye Grekê û yan din ji deme sadsala 15. min bi têgihîştin pêşketiya ye deme ronansansê. Lê deme ku ew tijbandin dibê ji, her yek ji aliyekî ve dibêt. Divêt ku mirov vevê yekê ji fahm bike. Ji aliyê herême û pêşketine wê re, ew dem ku bê tijbandina deme antîkê, mirov karê bêje ku demeke nûye antîkî ye deme sumeriyân bxwe ya ji. Lê ji aliyê têgihîştinê ve ji, mirov karê bêje ku di wê demê de hertişt bi felsefê tê afirandin. Hizir, bi felsefê tê afirandin. Rêveberî, bi têgihîştin têne afirandin. Rêveber, xwediyan zagon û destûrên xwe yên ku wan nivîsandina û li gor wan jiyân bi mirovan re tê adilandin. Bi vê yekê her weha mirov karê vî aliyê bêne ser ziman.

Lê ji aliyê ku me got û bahsê kir ku tijbêje deme ronansansê ji, ji aliyê têgihîştin û rabûna wê ve ya. Ew dem, demeke rabûnê ya. Ji aliyê hizir, têgihîştin û pêşketinê ve demeke rabûnê ya. Bi vê yekê mirov karê bêje ku pir pêşketi ya. Çawa ku di deme ronansansê de avadanî bi awayê xwe yê ku dihata avakirin, dihata ber çavan, her weha di wê demê de ji, ev yek heya. Avadanî di deme sumeriyân de pir pêşketi heya. Lê di deme duyemîn ye sumeriyân de pir pêşketi û bi nix heya. Divêt ku mirov vê yekê pir mazin û bi têgihîştin ji, bêne ser ziman. Deme piştî deme duyemîn ye sumeriyân, Babiliyan ji, ne ji aliyê rêveberiyê ve lê ji aliyê têgihîştinê ve mirov karê weke deme wê deme duyemîn ye sumeriyân deme Baroqê ji şîrove bike û bêne ser ziman. Ew dem, deme

Babiliyan, deme ku ji aliyê têgihîştinê ve pir têr e. Divêt ku mirov vê yekê her weha bêne ser ziman. Di serî de, sumeriyên çî afirandina, weke ku çawa ku hizir û navê xwûdayan yê deme girêkîyan ku romîyan di xwe de û di deme xwe de û di cihê xwe de têne bi hinek nav guharandinê tênine ser ziman, her weha mirov karê ji bo wê demê ji bo babiliyan ji bêne ser ziman. Ev yek ji, weke ku di wê demê de heya. Ku mirov deme girêkîyan weke deme bi têgihîştine sumeriyên rabûya û pêşketiya ji bêne ser ziman, divêt ku mirov ji vê aliyê ve wê dubarakirinê ve, her weha wê dubarakirina romîyan ye girêkîyan, weke deme sêyemin ku di vê yekê de ku bi dubarakirinê dibe bêne ser ziman. Deme duyemin ji, babiliyan kiribû. Ronasansê ji, mirov karê weke ji aliyê têgihîştinê ve bi hinek aliyan ve bi dubarakiirne bêne ser ziman. Lê divêt ku mirov dubarakirina deme ronansansê ji, weke dubarakirina di têgihîştinê de bêne ser ziman. Her weha mirov karê bi têgihîştinê bêne ser ziman.

Têgihîştin pêşketiya. Di deme sumeriyên ye duyemin de pir pêşketitira. Mirov vê yekê, ku nebûne û fahm nekê, wê demên piştre, yên pêşketinê ji, di fahmkirina wan de, mirov wê zore bikişêne. An ji, wê fahm kirinaka zelal dernekeve hole. Ji ber ku deme sumeriyên ye duyemin, weke demeke sentez e. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Demên piştre ji, weke ku pirtûkeke pîroz bixwanênin wê deme sumeriyên bi demên buhurti yên jînbûna re dixwênin û tênine ser ziman, di xwe de. Bi vê yekê, li hevirdorê ji pir pêşketinên şaristani derdikevine hole. Hammurabi wê deme sumeriyên pir mazin dixwêne. Deme ku Destûra xwe ye bigihîn amede dike û dibe ji xwûdayê xwe re li ber wî didêne, weke ku keyekî sumeriyên, kiribe dike. Her weha mirov karê wê bêne ser ziman. Bi vê yekê, ew ji, dixweze ku di nav wê pîroziyê de cih bigirê. Gelek xwûda, bi hebûne xwe re bitêgihîştin û hizre xwe re û bi bandûra xwe gihîştine wê demê ji. Mirov, divêt ku vê yekê biteybet bêne ser ziman. Sumeriyên, nêzîkatiyên ku wê piştre bibin, awayê wan ji her weha afirandina. Hizre rêveberiyê çawa ya, wê çawa nêzîkî xalkê bibe. Wê çawa xalkê nêzîkî wê bibe, weke destûraka bingihîn kevneşopîye wê çêkirine. Vê yekê her weha mirov karê bêne ser ziman. Ji aliyê hizir ve, piştre li gor vê yekê afirandin dibe. Awayê hizirkirinê ye sumeriyên, bi vê yekê re xwezabûnê diştêne. Bi vê yekê, pêşketin derdikevin hole. Dem ku ji deme sumeriyên digihine hata deme xanadanên Uran, demne bi vê yekê yên ku mirov bêje demên statûqûtîyê ne ji jîn dikin. Piştî ku têkdîçin ji, wan demên ku navê wan nayê ser ziman ji, ew ji aliyê hizir û çandî ve bi kevneşopîyên xwe yên ku afirandina di xwe de hebûne xwe berdewam dikin. Bi vê yekê, têgihîştine sumeriyên hebûne berdewam dike. Têgihîştine sumeriyên, hem bi kevneşopîye xwe bitêgihîştin e, û hem ji bi têgihîştine xwe bûya bi kevneşopî. Her weha mirov karê bêje ku bi vê yekê piştre ji, weke demeke dirêj hebûne xwe berdewam dikin.

Li ser têgihîştine wan ji, di vir de, em hinekî weke çend gotinan bînine ser ziman. Ji ber ku ev yek her weha pir girîng e. Têgihîştine wan, pir mazin bûya. Felsefê di deme wan de bi gelek awayên xwe yên ku dî roje me de heya, di deme wan de ji heya. Mirov divêt ku vê yekê di deme wan de kifş bike. Hizre şifakirinê ji bi pergala di wan de pêşketiya. Bi vê yekê, pir mazin karin xwezayê bi kar bînin. Bi kar tînin ji. Baweri, di vir de bi wan re heya. Lê baweriya wan, di vir de ji pêdiviyên baweriyekê zêdetir, pêdiviyên jiyana pêşketî ku çine bicih têne. Di vir de, di vê kirinê de, bawerî, weyke bi pergalkirinê di leyizê. Divêt ku mirov vê yekê her weha kifş bike. Sumeriyên, bi vê yekê re, mirov karê bêje ku weke demekê dirêj piştî ku demên wan têkdîçin û dibuhurin ji, weke ku kurdan di deme me de jîn kir, ku çend bi serweriya wan re hemû tiştên wan ji destên wan bêne derxistin ji, bi kevneşopîyên xwe yên li gor demên xwe pêşketine bi wan, hebûne xwe berdewam dikin û di parezên û didine berdewam kirin. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bi wan re ji bo wan û bi demên piştre wan re bi wan re kifş bike. Pêşketin, ku têgihîştine wê çêbû, awayekî ku xwe di parezê ji êdî bi wê têgihîştine re di xwe de çêdike. Ev yek, mirov ku li deme wan dimeyizenê, mirov pir zelal kifş dike û dibîne. Têgihîştin, bi vê yekê, weke ku awlakariyaka mazin jî têde heya. Mirov karê wê yekê, weke ancakê ji wê pêşketina ku wan jîn kiriya derxe. Bi vê yekê, hinekî bi têgihîştin, pêşketin dibe.

Demên piştre ji, vê yekê kifşkirî jîn dikin. Di xwe de bi têgihîştineke ku wan di xwe de pê dayînan rûnandin jîn dikin. Bi vê yekê, êdî dem bi dem pêşketin derdikevine hole. Deme sumeriyên, bi vê yekê, mirov karê bêje ku kifşkar e. Demên pişt wê re têgihîştine wê jîn dikin. Pişt wan re ku

gelek der û deveran pêşketinên şarstani rû didin. Hemû ji, bi awayekê ji wan gohn dixwûn û dibin û mazin dibin. Ev demên têgihîştinê ku têne hata deme Mîtanî, Hûrî, Gûtî, Naîri, Med û Grekîyan, dem bi dem, pêşketinê mazin yê bi têgihîştin û mazin jîn dikin. Divêt ku mirov, her weha vê yekê fahm bike û piştî were deme sadsala 15. min ye pêşketine wê. Ev yek, her weha girîng e. Divêt ku ev yek her weha were têgihîştin. Deme ronansansê, demên ku weke demên ronansansê ne, yê berî wê hatina jîn kirin ku mirov wan fahm neke, mirov wê vê deme ronansansê ji kêf fahm bike. Deme sumerîyan ye duyemîn ji, di vir de pêşketinê wê yê bi heman awayê girîng in, ku mirov fahmbike û bêne ser ziman. Berî ku em nahaka deme ronansansê ye sadsala 15. min bi herême re bênine ser ziman, divêt mirov hinekî di ji wê deme sumerîyan ye duyemîn bêne ser ziman. Li gor me, wê hinekî zalaliyê çêdike. Dîroke hizir, ye ku ji wir pêde dest pê dike û tê hata vê demê, pir pêşketinê di de xwe de têne ser ziman. Lê her pêşketine ku dibê ji, ji himê xwe ve ji wê demê dûr nabe û nayê ser ziman. Deme sumerîyan, demeke nû ya. Xosletên wê ji li ser temenê afirandinê ne. Bi vê yekê ji pêş ji dikeve. Hevîdore xwe ji pir mazin bi bandûr dike. Jiyana, mirov ji her aliyê ve tê ser ziman. Kirin bi têgihîştinê dibe. Bi vê yekê re, di vê demê de bi baweriyê hizir ji mazin pêş dikeve. Wê demê, mirov karê xosletê wê yê herî sereke her weha bi pergala hizirî ye olî re hizre felsefê, pêşketin û têgihîştinê wê bêne ser ziman. Bi vê yekê, her weha tê ser ziman. Lê ew dem, pirranî ji, divêt ku mirov bêne ser ziman, ku bi kevneşopîyan ji li ser lingan e. Rêveber, wilo zêde ne li pêş in, di vê demê de. Lê rêveber ji hene. Bandûra wan ji, mirov nikarê bêje ku nîn e. Lê karê ku wê rêveber bike ji, di vê demê de hatiya kifşkirin. Di adilandinê de pir bi wate ya. Lê hin bi hin ji xaynî komekê gelek komên din ji derdikevin. Komên lêşker, rahib û dewlemend ji hene. Ev, li jiyana û li ser jiyana mirov ji, hin bi hin serwer dibin. Lê ew ji bin, kevneşopîye ku afriya, dernekevîne derî wê. Ew ji, kirinê xwe yê ku dikin bi awayekî ku xweza dikin. Bi vê yekê ji, zor ji nabe ku xwe bidine erêkirin li serwerê kom û xalkê. Ev nêzîkatî, mirov ku wê têne ser ziman, weke ku mirov pergala ku afirî û hin bi hin xwe derdixê hola têne ser ziman. Wilo li mirov têt. Mirov wilo di xwe de hîs dike.

Piştî hin bi hin, ku pêşketin di vê demê de mazin dibe, êdî xwe dîyarkirin ji dibe. Deme ku weke deme sumerîyan ye duyemîn tê ser ziman û ser sadsalakî re tê ser ziman, ew dem bixwe ji, deme ku mirov di wê deme xwe ye pêşketin û têgihîştinê de ye zirve wê ya. Berî wê demê ji heya. Aqadiyan, her ku çend bi rêveberî desthilatdar ji bin, jiyana sumerîyan dibin destê wan de berdewam dike. Bi vê yekê, di wan demên xwe de, têne bi kevneşopî û hizir li pêşketine xwe di meyzênin. Hizir, bawerî û pîroziye ku sumerîyan afirandî, nahêle ku aqadî ji, ku çend serwerî wan ji bin, mudahaleyî jiyana wan bikin. Bi vê yekê, sumerîyan, di wê pergala xwe ye olî ku mirov weke ku hizirî ji bêne ser ziman, bi vê yekê awlakariyak ji bo xwe weke ku afirandina. Ew awayê awlakariyê, piştî di deme serweriya aqadiyan de, deme desthilatdariya wan de xwe dide nîşandin û wan diparezê. Bi vê yekê, êdî têne deme xwe ye duyemîn û wê demê jîn dikin û mazin ji jîn dikin. Wê carê ku jîn ji dikin, bi hizir û têgihîştin û awayê pêşketine felsefê jîn dikin. Bi wê demê xwe re sumerî, felsefê ji mirovan re di dîrokê de diafirênin û piştî serweriya bi pêşketinê radestê demên piştî xwe re dikin. Lê ya rastî, ew bi wê têgihîştine xwe re, di demên piştî de ji, bi hizir kifşkar û serwer in. Deme sumerîyan deme duyemîn mirov karê weke deme sentezê ye pir pêşketî li ser bisekinê û bêne ser ziman. Bi wê deme wan ye de yemîn re, mirov karê bêje ku hizir ji bi têgihîştin dikina kifşkar. Bi vê yekê, bi wê deme xwe ji, demeke mazin ye din didine dest pê kirin. Xosletê deme wan ye duyemîn ji her weha êdî bi vê yekê tê ser ziman, êdî. Mirov, wê ji êdî fahm dikin.

Piştî wê gotinê re, êdî mirov karê bi wê demê ve girêdayî demên piştî bêne ser ziman û şîrove bike. Demên xanadanên Uran, wê pêşketina xwe ya ku di demên xwe de mazin jîn dikin, li ser wê pêşketinê ku bûyî jîn dikin. Ew bi têgihîştineke mazin demên xwe bi rê ve dibin. Hizreke mazin di xwe de di serê de di afirênin. Bawerîya wan, di demê wan de ji wan temem e. Her xanadan, deme wê, demeke ku mirov bi serê xwe de bêne ser ziman û wê nas bike û têbigihê, wê hizreke mazin bide mirov ku çawa mazin jîn bûya. Divêt ku mirov vê yekê her weha mazin bêne ser ziman. Demên Uriyan, demne ku mirov bêje ku weke demên piştî demên antîkî ku demên serdeme navîn (mîddelalderen) in. Demên Uriyan, demne ku mirov bi statû ji têne ser ziman in. Bi vê yekê

ji, hebûne wan tê ser ziman. Lê ew statûqûya wan ye ku di deme wan de bi wan re heya ji, ji hinek xosletên xwe ve ji ye wê demê cudatira. Ye wê demê ye Uriyan, pir bi kevneşopîya. Kevneşopîyeke mazin ku sumeriyani li şûn xwe hiştîya, ew di xwe de jîn dikin û li ser wê mazin dibin. Her weha ew bi kevneşopî ne. Kevneşopîye wan, bi hizre herême ya. Mirov nikarê statûqûya wan weke ye misre kevn ji, bêne ser ziman. Ji wê ji cuda ne, bi vê yekê. Ew, bi kevneşopîya xwe deme xwe bi statûqû jîn dikin. Lê ew statûqû, li herêmê, bi xwe re di xwe de hê di nêzikatiyê xwe de kevneşopiyê hizir dike yek. Uriyan, aliyê sumeriyani yê kevneşopî yê bi hizir hilda. Lê misre kevn yê mîtolojî pir zêde hilda. Bi vê yekê, mesre kevn, di nêzikatiyê de wilo zêde, nêzikî hizre wan nebû. Di xwe de hewl da ku hizrekê çêke. Ya ku çêkir ji, bi firewûnan anî ser ziman. Bi vê yekê ji dise ji nêzikatiya mîtolojîyê derneket. Lê Uriyan derket. Cudati, her weha

bi vê yekê, tê ser ziman.

Deme Uriyan, her weha demeke bi hizir ku bûbû xwedi kevneşopî û bi wê kevneşopîyê ji statûqûyaka xwe ava kiribû. Statûqûya wê, di kevneşopîye xwe de, ne bi nêzikatiya mîtolojîk bû. Ji wê zêdetir bi hizir bû. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku hîmê pêşketinê ji di wê statûqûya xwe de diparast. Bi vê yekê ji, hertimî pêş ji diket. Hizir, di deme wan de, mazin pêşketibî bû. Pergala hizir ye ku sumeriyani di deme xwe ye duyemin de bi felsefe ava kiribû bûn, weke ku di deme wan de deme xwe ye duyemin ye pêşketinê di têngiştine xwe de jîn dikir. Bi vê yekê, têngiştineke ku hebû mirov karê bahsa wê bike. Ji aliyê pêşketine têngiştine hizir ve ku mirov bi navê felsefe bêne ser ziman, mirov divêt ku bi deme Uriyan re pir mazin weke demeke pêşketî û mazin bi têngiştinê bêne ser ziman. Hizir bi pêşketine xwe ye felsefî bûbû bi kevneşopî û pergala xwe her weha bi wan re di deme wan ava kiribû. Uriyan, xanadan ava kirin û bi demên dirêj ew demên xanadanên xwe jîn kirin. Lê belê, divêt ku mirov bêje ku her çend ku wan xanadan ji ava kirin, bi nêzikatî û hizir û kevneşopîye wan ye ku bi statûqû bûbû di wan de ji deme pêşketinê ye împaratorîyekê cuda jîn ne bûn. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku pir mazin jîn bûn. Wan, di asta hizre rêveberiyê de ye ku bi nêzikatiyaka gerdûnî were ser ziman, ji deme Aqadiyan û virde, demeke mazin weke berdewama deme wan jîn kirin. Lê deme Uriyan, di rastiya xwe de û bi xoslet û teybetmediyên xwe re, ti carî ku mirov jî bir nekê ku xwedi yê hinek xoslet û teybetmediyên xas bû. Bi vê yekê, her weha mirov karê bêne ser ziman. Her deme xanadantîyê ji, bi serê xwe divêt ku were ser ziman û têngiştineke mazin di derbarê wê de çêbibe. Ev yek ji, girîng e û pêdivî ji pê heya, ji bo têngiştineke rast û pak di demê de bi wan re û bi giştî ji bi dirokê re û bi teybetî ji bi dirokê wê deme ye piştî deme sumeriyani re. Kevneşopî, bêjeyeke ku mirov di vir de bi vê derê ve girêdayî hinekî bi teybet li ser bisekinê. Kevneşopî, piştî wan deman re ku şiroveyeka rast bê kirin, wê pir were ser ziman. Ji aliyê hizir ve kevneşopî, ji aliyê rêveberiyê ve kevneşopî û hwd. Her weha ji gelek aliyan ve tê ser ziman. Lê yer herî girîng ew ê, ku ji aliyê hizir ve tê ser ziman. Divêt ku mirov li ser vê aliyê ji bi teybet bisekinê. Ev yek, ku were ser ziman, wê bi têngiştine ku bi mirov re çêke re, wê pir mazin mirov mazin bike.

Piştî demên demên Uriyan re, demne pêşketinê yên ku bi hizir bin ji kevneşopîyeke ne dîr dibin. Hizir, bi kevneşopî pêş dikeve. Pir mazin ji pêş dikeve. Divêt ku mirov hinekî bi teybet ji li ser vê yekê bi sekinê. Hizir, di deme sumeriyani de ye duemin de bûya felsefe. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Piştî, hizre ku pêşdikeve ji, bi vê yekê pêşdikeve. Demên piştî demên sumeriyani û demên Uriyan, demne ku hizir pêş dikeve. Bi vê yekê re mirov karê çend gotinan li ser awa pêşketinê bêne ser ziman. Ji ber ku ev yek, her weha girîng e. Hizir, bi pergala pêş dikeve. Lê pergala bi awayê olî ya. Ew awayê olî ji, bi têngiştinê û hizire pîrozîyê ye ku di xwe de dayî rûnandin re hebûne xwe di qada pêşketinê de berdewam dike. Awayê ku oldar bihizir in, bi wê hizire di serê xwe de mirovan bi rê ve dibin heya. Bi vê yekê re, nêzikatiyaka ku mirov weke ye demên piştî re ku bi softîyê re tê berçavan, mirov di wan de dibîne. Bi vê yekê, her weha pêşketine wan hebûne xwe berdewam dike. Ew softî hizir, di olê de pêş dixin. Bi wê yekê ji, pêş dixin. Di nav kurdan de, softî pir bicih in. Ji demên berê ve hene. Mirov karê kevneşopî hebûne wan ye bi pêşketinê bibe berî derketine musulmanetiyê. Deme ku di rajihine wê arbana xwe û diçine nav xwe û ji wan re lêdixin û di ber re ji dibêjin, dikin ku mirov di serê xwe de ji xwe herê. Her weha pir xweş dibêjin. Piştî ew awayê wan yê weha, di deme musulmanetiyê de ji hebûne

berdewam dike û wilo pêş ji dikeve. Bi vê yekê, êdî sofî mazin dibin û hebûne xwe berdewam dikin. Di civaka kurdan de, sofî weke çinekê bi hebûn bûn. Pir mazin bi hebûn bûn. Nirxeke mazin ye hizir û ku ji baweriyê ne dûr bi wan re dihata ser ziman. "Weke mirovên ku xwe dana hizir", dihatina naskirin û berçavan. Deme ku bahsa wan ji, dihata kirin, her weha bahsa wan dihata kirin. Sofî, di deme de bi hinek awayên ku dem bi dem dibin û hebûne xwe berdewam dikin û ténine hata wê rojê. Piştî Nebî Nuh re bizêdeyî mirov wan pir mazin dibîne. Mirov hebûne wan di bîne. Li berdiclê û berfiratê, mirov hebûne wan dibîne. Lê sofîti, ji hinek aliyan ve, divêt ku bi teybet werine ser ziman û têgihîştin. Ev yek, her weha girîng e, ku mirov li ser bisekinê. Piştî deme sumeriyana, bi deme Nebî Nuh re ku hinekî deme sumeriyana ji di nav de, deme wan dest pê dike. Di deme sumeriyana de, pergala mîtolojîkî ye pir-xwûdayan hebû û serwer bû. Piştî ev pergala di guharê. Pergalaka bi hebûne xwûdê û hizir diafirê. Nebî Nuh weke destpêka wê pêşketinê ya. Deme ku ev pergala pêş dikeve, êdî hin bi hin di nav xalkê de rêxistinîye xwe li gor demên xwe yê pêşketinê û têgihîştin dike. Têgihîştin bi bêje rastteqînîye re bi pêşketinê re dibe felsefê û pêş dikeve. Felsefê rastteqînîye, ne bi filozofekî bi gelek komên ku mirov her ferdên wê yek bi yek weke filozofekî bêne ser ziman pêş dikeve. Sofî, ew ferdên ku ew pêşketin ji demên piştî demên sumeriyana re dikirin û pêşdixisin û bi hizire xwûdê re hebûne wê pergala didana berdewam kirin bûn. Li ber diclê û li berfiratê, ji ber vê yekê kevneşopîyeke mazin bi sofîyan re heya. Her sofî di derbarê dîroke ole û hizir de û bi teybetî ji di derbarê Nebî Nuh de pir mazin bi têgihîştine û wê têgihîştine xwe ji, hertimî di nav xalkê de têne ser ziman. Ev yek, jê re weke bersiveşîyariyekê ya. Bi vê yekê sofî mazin dibin û pêş dikevin.

Li misre kevn, sofî bi têgihîştin û nêzikatî pêşnekeve. Ji ber ku di avakirina pergala de, weke ku me berî nahaka anî ser ziman, awayê mîtolojîkî bizêdeyê li berçav digirin û li gor wê ji têne hine rahib û mirovên ku weke firewûnan xwe xwûda di denezênin hene. Bi vê yekê hebûne wê pergala li ser lingana e. Bi vê yekê ji, di demên piştî e hebûne xwe berdewam dike û li gor xwe pêş dikeve. Mîtolojî, di nêzikatîyaka rêveberî de, weke hizir hertimî bi wate ya. Wate wê ji, bi serwerîye kifşkirinê hertimî di dest de bê. Mirov, di dinye xwe de hertimî dixwezê ku mafê kifşkirinê yê dinyê di destê wî de bê. Bi vê yekê ji ber vê yekê hertimî şerekî ji dide. Lê ya rastî, şerê di vir de ku çend hizir ji bi têgihîştine bike bingihê xwe de ji, ji nezaniyanaka ku pê xwe bi rê ve dibe xwe xilas nakê. Ev ji, weke baxtekî wê yê dayîmî ya. Mîtolojî, di vê baxtawerîye de hizre herî baş e ji bo rêveber û rêveberbirine wî ye rêveberîye. Bi vê yekê, ew ne bi zêdeyî li hundurê wê pergala mîtolojîyê xwedi derdikeve, bêhtir li wê qalibê wê xwedi derdikeve. Qalibê wê ji, hertimî ji bo wî biwate ya. Ji ber ku qalib, wî li ser serê mirovên ku ew wan bi rê ve dibe, wî dike "xwûda" ji. Weke minaq û hebûna firewûnan û hwd. Bi vê yekê, lê rêveber, di pergala mîtolojîyê de bi wê mîtolojîyê kevneşopîyeka xwe ji çêdike. Çawa ku Uriyan bi hizir, ji xwe re bi pergala hizir kevneşopî çêkir, ew ji her weha li misre kevn kevneşopîyê çêdike. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku du xat û kevneşopî êdî piştî demên sumeriyana bi hebûn diafirin û hebûne xwe berdewam dikin û têne ta deme sadsalên 15. min yê piştî zayînê. Ji ber vê yekê mirov divêt ku pir mazin li ser wan bisekinê. Li di vir de divêt ku mirov li ser awa û pêşketin û têgihîştine wan bisekinê. Ji ber ku ye ku herî girîng ji ev yeka bixwe ya, di vir de. Ji deme Uriyan û virde her weha êdî du xat dibin û piştî êdî ji demekê pêde, bi hev re cih bi cih dikevine şer de ji. Ev şer ji, wekê şerên nêzikatîyê rû didin. Mirovên weke Nemrut, her ku çend li cihê ku Urî lê mazin bûna û pêşketine derdikevin ji, lê di nêzikatîyê de ne bi kevneşopîye wan in. Bi vê yekê, şerê kevneşopî û nêzikatîyan di astaka pergala de hebûne xwe berdewam dike.

Misre kevn, bi kevneşopî, piştî ye ku li ser herême pir bi bandûr e. Mirov, ber vê yekê, deme ku bahsa demên piştî sumeriyana bike, Divêt ku mirov deme Misre kevn, weke demeke teybet û pêşketî ku hevirdore xwe weke deme sumeriyana bi heman nêzikatîyê bi bandûr dike bêne ser ziman. Bi vê yekê re divêt ku mirov li ser ji bisekinê. Ev yek, her weha pir girîng e. Misre kevn, her weha hinek mazin tê berçavan. Bi vê yekê ji bandûraka wê ya mazin heya. Weke ku ew, di xwe de, wê deme sumeriyana ye mîtolojîkî demeke wê ye tîr ye cuda di xwe de jîn dike. Her weha ji tê berçavan. Ji aliyê pêşketine wê ve her weha tê berçavan. Bi vê yekê, kevneşopîye wê ye ku diafirê ji, divêt ku mirov hinekî bi teybet bêne ser ziman. Kevneşopîyeke mîtolojî û tîde heya ya.

Di vir de, mirov karê vê pirsê ji bi persê, di demeke aqil de ku aqil pêşketiya, çawa dibe ku nêzikatiyaka mîtolojiyê her weha di deme aqil de û di deme pêşketine wê de serwer dike? Mirov, karê bersive vê pirsê, hinek ji aliyê aqil ve bide. Lê deme ku mirov berisv da, Bi hizir re hinekî deronî weke tê ser ziman. Divêt ku mirov bi têgihîştine wê ji bê. Mîtoloji, ne tenê li ser temenê demeke pêşketinê divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Bi aqil re, ku kevneşopî jê ne dût, bi hinek aliyên mejiyê mirov yê di wê de ji mirov karê bêne ser ziman. Ew alî ji ji vê yekê re weke bingeh in. Deme Mesre kevn, bi rast ji, demeke ku mirov wê pir baş fahm bike ya. Di sumeriyana de hizreke nemirinê hebû. Piştê weke ku di destana Gilgameş te ser ziman û bi navê Utnapiştîm re tê ser ziman, nemirî, hizre wê tê ser ziman. Misrî bi firewûnan re vê hizrê b awayekî din mazin di xwe de didine rûnandin. Mumia kirin ji, li ser vê hizrê mazin pêş dikeve. Hata hatadayîm jîn kirin, weke hizreke di bingêhê wê de bê, hebûne xwe tene ser ziman. Mirov, dixwezê hertimî li dinyê pir mazin jîn bibe. Jiyanê di xwe de nemir bike. Xwestine jiyanê di xwe de nemir kirin ji, weke hebûne lêgerînekê tê berçavan. Keyê Urukîyan Gilgameş li wê digerihe. Lê bihzire xwûdê re, hizre nemirbûnê ji, bi felsefe bûya. Weke ku hê di deme sumeriyana de di deme Urukîyan de tê ser ziman, ku di destana Gilgameş de tê ser ziman heya. Piştê, bi pergal, ev hizir, bi felsefe li dinyeyek din tê ser ziman. "Mirov, ku mir û çû dinye din, êdî wê li wir hat hata jîn bibe". Yanî wê nemir bê. Uriyan, ev hizir di kevneşopîyê xwe ye hizir de her weha bi temen kir. Vê hizrê, bandûra xwe li misriyan ji kir. Li hizre wan ji kir. Ji ber vê yekê, piştê bi 'pirtûka mirinê' û 'pirtûka jiyanê' hizirne din afirandin. Piştê baweriya nemiriyê hin bi hin kirin û hewldan ku ji dinyê dût bikin. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku şaristaniya misriyan ji, êdî bi vê hizir kirinê re dikeve demeke xwe nû de. Êdî weke ku demeke ku hizir hin bi hin hildê nav xwe, bi wan re bidest pêşketinê dike. Bi vê yekê, êdî hin şerên ku mirov bi vê yekê, weke yên pêşketinê ji bêne ser ser ziman dibin. Weke şerê di naqabîna "amon" û "aton" de. Ev herdu kult, kultên mîtolojîkî in. Di herduyan de ji, baweriya firewüntiyê ye xwe xwûda denezandinê heya. Lê di têgihîştinê de weke hin bi hin guharandin ji dibin. Mirov, bi vê yekê re wê ji kifş dike. Êdî bi vê yekê re mirov karê bêje ku di kevneşopîyê misre kevn de di hundurê kevneşopîyê de kevneşopî derdikevine hole. Her weha pêvajoyak weke ku dibe, tê barçav.

Deme Uriyan, deme ku mirov karê bêje ku di qada têgihîştine li pêşiyê wê ya. Lê di pêşketine xwe de û bandûriya xwe de dernekeve pêşiyê wê ji. Nêzikatiya rêveberiyana derdikeve pêş. Nêzikatiya rêveberiyana ji bi hizir ê. Lê ji yeke mîtolojîk ji ne cuda du hewldanan de ya. Bi vê yekê, di xwe de weke ku di şer de ya. Bi vê yekê re nêzikatiya Uriyan ji di xwe de weke ku di şer de ya. Her weha ew ji tê berçavan. Çawa ku misre kevn, di nêzikatiya ye mîtolojîk ye kevneşopî de bi aliyê hizir ve di şer de ya. Her weha ya Uriyan ji di demeke hizir de weke ku vajî wê di şerekî de bê, tê barçavan. Bi vê yekê, û şerên di nav xwe de Uri, wilo zêde bi bandûr nabin li dore xwe di deme xwe de. Di hundurê xanadanên xwe de ji bi vê yekê dikevine zorê de. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku Uriyan ji di demeke xwe y nû de ne. Dem ku hinekî di tewe diçê, êdî misre kevn, hin bi hin, di nêzikatiya xwe de weke ku guharandinekê dike û firewûnan êdî li jiyanê xwûdê ne denezêne. Bi vê yekê re, awayê ku êdî bi firewûnan re derdikeve pêş, weke yê keyekî ya. Bi vê yekê re her weha mazin dibe. Lê Uriyan, vê berçeriyê nadina nişandin ku di xwe de, ku guharandîna ku wan xilas bike ji tinebûne an ji di hizre xwe de gavaka ku wan ji xilaskirinê xilas bike biavêjine pêş. Demên Uriyan, bitêgihîştin û nêzikati, ji yên misre kevn pêşketîr in. Ew hizir bi kevneşopî bikar tînin. Bi vê yekê, deme sumeriyana ye hizir di xwe de bi rê ve dibin. Lê ji bo ku nêzikati û kevneşopîyê de bi pêş de herin ji, divêt ku hizir di xwe de kifş bikin. Pergala Nebî Nuh ye Hizir, wan bitememî ji hê di xwe de kifş nekirina. Hinekî kifşkirina û li gor wê ji jîn ji dibin. Lê ji wê pêde wilo ti tiştêkî di mirov nikarê ji bo wan bêne ser ziman. Lê Uriyan, tiştêkî ku mirovahî hertimî spasiyêkê lê bike dikin. Ew ji, pêvajoyên pêşketine hizir yên piştî sumeriyana bi têgihîştin bi kevneşopî dikin. Bi vê yekê di xwezabûna jiyanê de hizir zanîn êdî bi kar bênin. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku pêşketin bi wan re ye bi hizir, pişt wan re bi demên din yên şaristaniyê re hebûne xwe berdewam dikin. Deme Mitaniyên û deme Hûriyan têt. Ta deme Gûtiyan ji têt. Hûrî û Gûtî, weke ku berdewamên hevdu ne, di xatekê de. Deme Gûtiyan, demeke pêşketiya ya antîk ye deme Hûriyan ne. Pêşketin û têgihîştinên deme Gûtiyan, ji ye deme hûriyan

ji û mîtaniyan ji zêdetir û maztir in. Deme Gûtfiyan, van deman ji deme Sumeriyan çend pêşketine hatina jînkirin, bi têngihîştin di xwe de bi sentez dike. Ji ber vê yekê deme Gûtfiyan bi ye Naîriyan re weke deme Antikê ye wê xata pêşketine divêt ku mirov werêne ser ziman. Gûtfî, çand û kevneşopîye wan pir mazin pêşketiya. Pir bi nirx û kevneşopî ne. Ev dem, li ser kevneşopîye wan ava dibin. Vê yekê ji divêt ku mirov biteybet kifş bike.

Ji vir pêde, êdî emê di xata di berdiclê û di berfiratê de bi têngihîştin bi kevneşopîye hizir demên şaristaniyê bènine ser ziman. Bi vê yekê, êdî emê deme Mîtaniyan û deme Hûriyan, piştî deme Uriyan re weke demne şaristaniyê yên pêşketa bènine ser ziman û şirove bikin. Ev dem, êdî karin aqil bi vac bi kar kar bènin. Karin hizir di jiyânê de bi kar bènin. Ev ji, her weha weke demeke nû di têngihîştinê de ya. Û ev dem ji, êdî wê bi mîtani û hûriyan re wê jîn bibe. Tişte ku deme Uriyan di wan de dike demeke xanadana ji, ew kevneşopî ya. Pêşketin, pişt wan re ji wê vê nêzikatiyê ne kujê. Lê wê bi hin têngihîştinê din wê bide berdewam kirin. Her weha di vir de, divêt ku mirov êdî weyne hizir û têngihîştinê wê pir bêne ser ziman. Ji ber ku êdî ji vir pêde, ye ku wê weyn di dîroke de di pêşketinê de bileyzê ji ev yeka bi xwe ya. Têngihîştin, êdî di felsefe de ji, demeke nû ya. Ya rastî, demên piştî demên uriyân, di hizir de di felsefê de ji, demne nû ne. Demne ku ast û rada hê bilindtir in. Deme Mîtaniyan, bi hizir mazin dibe. Hizir, dibe hîmê pêşketine wan. Bi hizir, jiyân û hevirdor naskirin, bi wan re heya. Bi vê yekê, bi nirx û kevneşopî ew êdî jîn dibin. Ew awayê xanadanî, di deme mîtaniyan de hinek bitêngihîştin du guharanê û bi awayekî ku mirov bi împaratorî bêne ser ziman hebûna xwe berdewam dike. Bi vê yekê re, di vir de, em gotinakê bi misre kevnê kevn re bènine ser ziman û pişt re bi mîtaniyan re şiroveye xwe berdewam bikin. Misre kevn, di xwe de pêvajoyên demên xwe bi xwe re jîn kirin û dana berdewam kirin. Bi vê yekê re xosletê wan xwe dide berçavan. Li yê Uriyan, bi pişt wa re hatina mîtaniyan re weke berdewamiya wan, ew hatin dibe. Bi vê yekê, weke di nêzikatiyaka weke ye misrê de Uri û mîtani di pêvajoyê de dibine berdewamên hevdu di dîrokê de. Mîtaniyan, ji weke ku ev yek di xwe de fahm kiriya. Nêzikatiyên xwe û hewldanên xwe ji li gor wê didine nîşandin. Mirov, ku li deme wan dimeyîzenê, mirov her weha deme wan dibîne. Di deme wan de nirx bi hizir heya. Kevneşopî bijiyânê tê ser ziman. Çand, hizirê wê êdî afiriya.

Piştî demên Uriyan re, her whea êdî demne nû yên pêşketin bi pirralî diafir in. Di wê pirraliyê de hizir bi çand ji êdî heya. Baweri, êdî bi hizir tê ser ziman. Pergala bihizir ye ku bi Nebî Nuh re pêşketiya, demeke mazin ye pêşketinê ku mirov wê demê mazin bêne ser ziman bi deme duyemin ye sumeriyan û deme Uriyan re jîn dike. Pişt re deme Mîtaniyan û ye Hûriyan ji, li gor wî pêşketinê demên nû ne. deme Mîtaniyan, demeke ku mirov bi hizir bi felsefe re pir li ser bisekinê ya. Ev dem, wê pêşketin û têngihîştinê wê, wê demên pişt re hem pêşketinê hizirî û hem ji yên olî wê bi bandûr bikin. Wê ji gelek aliyên ve bi pêşketinê di xwe de wê kifş ji bike. Divêt ku mirov vê yekê her weha di vir de kifş bike. Baweri, li dinyê pir pîroz e. Lê xwûdê li azmana, li ser mirov re ya. Weke ku Birehim xelil anîn ser ziman û ji bo têngihîştin têkoşîne wê da. Deme mîtaniyan, mirov karê weke demeke ku bitamamî ji deme mîtolojiyê qutbûnê ji bêne ser ziman. Lê li misre kevn, hê ne wilo ya. Hê key, yanê firewûn xwe xwûdê di denezêne. Ev yek, di deme mîtaniyan de ji her weha bi rexne tê pêşwazikirin. Derketine Birehim xelil û Yakub û Yusuf û çûne wan ya misre kevn, ji vê yekê bi xwestina nîşandinê ya. Nêzikatiya mîtoloji, zêde wilo ji guharandinê re ne vekirîya. Di ti demê de ji ne vekirîya. Di her demên aqil de ji ev yek wilo ya. Ji ber vê yekê, di misriyan de ew nêzikati pir li berxwe ji dide. Bi vê yekê, demne pir mazin bi kevneşopî bi demên mîtolojiyê jîn dibin. Deme Mîtaniyan, li berdiclê û berfiratê ji pêşketineke bi hizir daya dest pê kirin. Ev demên pêşketinê yên li berdiclê û berfiratê, ji bi hêzekê û deme wê re, werine ser ziman zêdetir, divêt ku weke pêvajoyên wê xata pêşketinê werine ye ku hebûna xwe dide berdewam, kirin bêne ser ziman. Hêzên ku li gor wê têngihîştinê karin xwe bi rêxistin û nirx bikin, karin serwer bibin û dibin. Deme mîtaniyan, bi vê yekê, mirov karê bêje ku di demên pêşketinê yên hizirê bi felsefe weke demeke sêyemin ye pir mazin bi têngihîştin ji bêne ser ziman. Pişt mîtaniyan re deme Hûriyan ji mirov karê weke demeke pir mazin ye bitêngihîştin ye deme felsefê ye pêşketa bêne ser ziman. Ev herdû dem, demne ku mirov wan pir baş fahm bikin in. Van deman, pêşketinê bihizir yên li berdiclê û berfiratê bi demên xwe de di xwe de dihawêne. Dem, pişt wan

re ku tê deme Naîriyan ji, mirov karê deme Naîriyan weke deme wê pêşketinê ye antîk bêne ser ziman. Deme Naîriyan, demeke ku weke demeke sentez e, ji demên berî xwe hata wê deme wê.

Deme Naîriyan, her weha demeke mazin e, ye pêşketinê ya. Ev dem, di pêşketinê de têgihîştinê bifelsefê dike di demên felsefê de. Deme wan, pir pêşketinên wê hene. Mirov deme ku lê wê deme dimeyîzenê, mirov kifş dike. Xwestine bûna xwediyê pêşketin û hebûnê deme Naîriyan bi Asuran re û hinek hêzên din re dike demeke şer ji. Lê berî wan demên şer ji, ji 1300 û wan deman û bi vir de, nêzîkî 350 salî demeke xwe ye zêr ji deme naîriyan jîn dike. Piştîre êdî pêşketin û şer di nav hevdû de di meşê. Her weha demek tê jîn kirin. Hata ku dem tê deme Medan. Li gelek herêmên din ji pêşketin derketiya û pir ji pêşketin bûna. Li anatolia û Girekê, Hîndîstan, Çîn û roma ji hin bi hin ku serê derdixê ku mirov di da bihasibêne, mirov karê bêje ku li gelek deveran pêşketinên mazin yên bi şarîstanî dibin. Dem, demeke ku mirov pir mazin bêne ser ziman e. Di wê demê de, Med pêşketitir in. Pergala wan yek xwûdayî ya. Xweza û mirov di wan de bi hizir bi têgihîştin tê ser ziman. Bi vê yekê, Medî di deme xwe de per mazin dibin. Serwer dibin. Li anatolia ji bandûraka wan ya mazin heya. Piştîre dixwezîn ku bi wê bandûra xwe, serwerî û serdetiya xwe ye leşkerî çêkin. Bi vê yekê dikevîne gelek şeran de ji. Bi vê yekê, weke ku mirov dibîne, mirov demeke pêşketinê ya mazin dibîne. Medî, pir girîngiyê didine hizir bi felsefê û civaknasiyê. Bi vê yekê ji, dore xwe ji bi bandûr dikin. Lê ew pêşketine wan, hin bi hin, bihizir û aliyê felsefê ve ji, herême anatolia û Grekê ji hin deverên din yên ku karin xwe bigihênine de pir bi bandûr dike. Weke ku wan, weke dayîkaka ku zaroka xwe ji singe xwe şîr bide şîr dide û mazin dike. Demên piştî Medan re, yên wê pêşketinê ne. Demên ku Grek û anatolia mazin pêş dikevin in. Di qada felsefê de Grek, bi vê yekê qavzaka mazin diavêjê pêş. Piştîre, demên pêşketinê yên hata deme zayîne ji bi vê yekê û pêşketinê pêş dikevin.

Dem ku têne deme zayîne, êdî ev pêşketinê bi hinek awayên din ji xwe didine der. Derketine Filehiyê û pêşketine wê, rewşeke nû di afirêne. Li rojava, bi wê re pergala olî bi li olê xwedî derketine Împaratoriya rom re diafirê, Bi vê yekê re, êdî hin bi hin rewşê di ye nû diafirê. Bi vê rewşê re êdî di jiyane de pêşketinê yên din ji diqawimin. Weke ku hizir bi felsefê êdî di jiyane de serwer bibe bawerî ji di felsefê de bi hizir tê rûnandin. Bi vê yekê, di hizir û qada wê de lêgerîneke nû bi demê re dest pê dike. Hizir, bi olê re bi pargal re. Vê yekê, mirov karê weha bêje. Hizir bi pergala hizirê ye olî bi pargal e. Bi vê yekê, êdî di jiyane de bi vê yekê serwer ji dibe. Ev pergala bûn, bi lê xwedî derketine rêveberan û li gor wê xwe afirandina ji nû ve, êdî bi wan re demne nû yên pêşketinê bi temen têne hole. Deme roma ye duyemîn ye piştî zayîne bi Împaratori her weha mirov karê bêne ser ziman. Di berî zayîne de sadsala 5. min wan de roma bi nêzîkatiyaka komarî diafirê û hebûne xwe berdewam dike. Vê yekê ji, bi hizir û têgihîştin dadî dide rûnandin. Lê piştîre, ew nêzîkatiya komarî bi ber Împaratoriye ve diçê. Her weha êdî deme piştî zayîne Împariyêrê wê ye romî diafirê. Demeke pir bi zilm ku bi xaçkirinê bi rê ve dibe. Deme Împariyêrê ye roma, demeke ku bi zor e. Ew zordayîna wê, bi derketine filehiyê re bi ber têkçûne ve diçê. Piştî zayêne ku di di sadsala sêyemîn de roma bi aliyê rojava û rojhilat ve dibe du qat ji, bi vê yekê dibe. Ev yek, sedeme wê ya. Piştîre, ku aliyê rojhilat filehiyê erê dike, êdî piştîre ne bi gelekî re aliyê rojava ji dike ku wê erê bike. Lê ji ber êrişan êdî xwe li ser xwe nagirê. Lê hin bi hin, bi erêkirine filehiyê ye aliyê wê ye rojhilat re filehî hin bi hin ji belav ji dibe. Li rojhilat ji bidest belavbûnê dike. Bi vê yekê, êdî roma dike ku deme xwe ye sêyemîn ye rabûnê jîn bike. Wê piştîre bike ji. Haya deme ronansansê, roma weke ku çareka din di rabê ser xwe. Bi li filehiyê xwedî derketinê re wê deme xwe ye nû ye rabûnê jîn dike. Deme Ronansansê wê, wê hinekî vê yekê ji bi temen bike. Lê pêşketinên berî wê demê jînbûna, bi hebûna wan ji, li rojava temenê ronansansê tê avêtin. Bi vê yekê, êdî demeke nû dest pê dike. Lê berî ku em nahaka werine wê demê û şrove bikin, divêt ku em di vê yekê de li rojhilat ji meyîzenin, ku ka di çi rewşê de ya.

Rojhilat, di vê demê de di qada rêberiyê de ji, hinek pêşketinan jîn dike. Piştî deme Uriyan, Mîtanîyan, hûrîyan, Naîriyan û Mediyan, êdî demeke nû weke ku diafirêne. Mirov divêt ku vê yekê her weha bibîne. Ev pêşketinên rojhilat divêt ku mirov pir li ser bisekinê û bêne ser ziman. Lê divêt ku mirov ji bîr neke ku ji du alîyan ve bi kevneşopî ji mirov wê bêne ser ziman. Ji aliyê pêşketine misre kevn, û ji aliyê xata pêşketinê ye ku bi Deme duyemîn ye Sumerîyan re bûya û bi

Aqad, Babil, Urî, Mîtanî, Hûrî, Naîrî, Asur, Med û her weha hata deme Musulmanetiye, mirov divêt ku bi teybet bêne ser ziman. Herdû alî li herêmê bi pêşketinên xwe bi kevneşopî û bi nirx in. Lê aliyê ku me di berdiclê û berfiratê ve anî wê demê ji, ji aliyê rêveberî ve wilo zêde ne serwer e. Dem bi dem serweriye wê dibe û piştre weke limbayaka ku mifte wê bê kişandin li xwêre û êdî bi vê yekê agir rohiya xwe kêmbike dibe. Lê aliyê Misre kevn, ji aliyê serweriye ve pir xurt e. Li herême hêze wê ji heya. Ew kevneşopîye wê, bûya bi statûqûyaka mazin. Bi vê yekê, ew ji demekê pêde, hebûne xwe berdewam dike û bi rê ve diçe. Bi vê yekê, bêje û hebûne "xwûdê" ji, weke ku di vê qadê de di qada statûqûyê de şerek ji heya. Berdiclê û berfiratê, kevneşopîye wê pir xurte û bi bêje û "navê xwûdê"êdî mazin bi kevneşopî bûya. Demên bi Uriyan, Mîtaniyan, Naîriyan û Mediyan re hatina jîn kirin, vê yekê û têgihîştine wê mazin diafirênin. Şere ku heya û weke ku dibe, di qada çand û kevneşopîye de ya. Mirov vê yekê pir baş êdî dibîne. Misre kevn, êdî ji aliyê wê kevneşopîye xwe ve wilo zêde nikarê bersiveke mazin bide pêşketinên ku dibin. Bi wê kevneşopîye xwe, ku tê deme sadsala 5. min berî zayînê weke ku wastaha bê, tê ber çavan. Bi vê weke ku wastabûne haya deme derketine musulmanetiye hebûna xwe ber dewam dike. Lê di wê navberê de rastî pir êrîş û xuruxandinan ji têt. Lê têvî waqas êrîş û xuruxandina ji hebûne xwe li se lingan hata wê demê di parezê.

Dem ku tê wê deme ber derketine musulmanetiye, êdî ji aliyê çandî û hizrî ve bi kevneşopî çand û hizre ber diclê û berfiratê bi kevneşopîye xwe ku di demên wê yên pêşketinê de afirîne, tê berçavan. Nebî Nuh weke ne tenê destpêka wê çand û hizrê tê dîtîn, êdî weke sembola wê kevneşopîye tê dîtîn. Hz. Muhammed, deme ku tê şamê û berdiclê wanderanbi karwanî, êdî wê çandê û hizre wê ji fahm dike û di erê xwe de dide rûnandin. Bi vê yekê, êdî piştre deme ku hizre xwe ye baweriye tene ser ziman, li gor wê têgihîştine xwe ye ku bidest xistî diaxivê. Li gor Xwûdayê Nebî Nuh û Birehim Xelîl diaxivê û tene ser ziman. Bi vê yekê, deme ku ew tene ser ziman hizre xwe, weke ku du çand, hizir û kevneşopî werine ber hevdû ji rewşek diafirê. li ber wî. Ew herdû çand, hizir û kevneşopî ji, yek jê yeku wî dianî ser ziman ye aliyê berdiclê û berfiratê ya û ye din ji ji wê çand, hizir û kevneşopîye misre kevn pêve ne ti tişteke din e. Lê ji ber ku ye ku pergalye xwe bersive dide pêşketin û têgihîştinê demê ji pergalye hizir û baweriye ye ku Birehim Xelîl anî ser ziman ye berdiclê û berfiratê bixwe ya. Êdî ew, di demê de, di demeke kin de bidest bi serketine xwe dike li ber ye misre kevn. Bi vê yekê, êdî weke ku demeke nû ji diafirê. Mirov ku li demê û pêşketinê wê dimeyîzenê, mirov vê yekê pir zelal û baş dibîne. Pêşketinên ku hene, di qada civakatiye de û hizrî û her weha hizrî de, ye ku li gore wan e, ji pergala olî ye Nebî Nuh bixwe ya. Di demê de ev herdû ji pir lev tèn. Bi vê hatinê, êdî pêşketinên ku wê bibin dibin û zû ji dibin. Bi vê yekê re, musulmanetî derdikeve hole û pêş dikeve. Lê piştî wê derketine wê ji, şerek di nava wan herdû têgihîştin ku kevneşopîyan de heya. Ev yek ji piştî derketine musulmanetiye bi kevneşopîye statûqûya ku afirandî re di qada rêveberiyê de xwe dide berçavan. Êdî ev qad, dibe qadaka ku tede bi armaca ku weke ku tê berçavan ji bi desthilatdariye şer dibin.

Bi vê yekê re herême, hinekî din ji dikeve rewşeke din de. Bi vê yekê re, mirov karê vê yekê bêje. Herdû nêzikatiyan ji xwe di qada hizir de bi têgihîştin kiriya û bi kevneşopî ne. Lê nêzikatiya bi kevneşopîye misre kevn re tê ser ziman, ne di wê asta wê felsefe ku bitêgihîştin û êdî mirov bi wijdanê xwe tede ya. Musulmanetî, di nêzikatiyak xwe de mirov û hizir bi awayekî digihine hevdû. Bi vê yekê hewl dide. Lê ew hewldana wê dide sedeme şerekî navxweyî ku ne bin dusadsalê berdewam dike. Bi vê yekê re, êdî bi Abasiyan re di wî şerî de nêzikatiya Hz. Muhammed weke ku têkdîçê rewşek diafirê. Ev yek, bi rêveberiyê ve tê ser ziman. Lê dem ji, deme hizir û wê têgihîştin ku Hz. Muhammed aniya ser ziman. Bi vê yekê, di demê de şer êdî bi nêzikatiyan diqawimin. Piştî çûna ser dilovaniya ser ye Hz. Muhammed re, piştî wî re şer dest pê dikin. Ev şerên ku dibin ji, demên pêş yên ku tèn yên rojhilata navîn hema bêja hemûkan kifş dikin. Her weha mirov karê bêje ku demeke pir mazin dibe. Lê ew têkoşin di qada hizir de ji heya. Mirovên weke Îbnî Haldun hene û hizre xwe bi awayekê ku nêzikatiya civaknasiye bi hizre dîrokê re tede xurt e, ténine ser ziman. Bi vê yekê, dixwezînan ku pêşketineke bidine çêkirin. Lê ew ji li herême bi ser nekavin. Piştî deme Abasiyan û wan pêşketin û pêvajoyên ku Abasiyan di musulnaetiye de dana jîn kirin, ne mumkun e ku êdî kevneşopîye nebî Nuh bi têgihîştine xwe li

ser herême bi têgihîştine xwe serwer bibe. Êdî piştê demne ku ne li gor kevneşopîye misre kevn e, di nêzîkatiya pergali ye ku Hz. Muhammed bi musulmanetiye re dayî rûnandin, êdî serwer dibe. Ev yek, ne li gor musulmanetiye û pêşketin û têgihîştine herême bigiştî ya. Lê li gor pêşketin û têgihîştin rêveberan ji, rewşeke ku mirov bêjê pir baş û qanc e, diafirêne. Bi vê yekê re cudabûn heya. Cudabûn, her weha di nêzîkatiyan de ya. Lê hebûne pêşketinê ye ku heya, bi hizre Hz. Muhammed ye rast re, tenê di nav xalkê de hebûne xwe dide berdewam dikirin. Ew nêzîkatiya ku misre kevn dabû kirin ku keçzarok sax û sax dikirin bin axê de, piştê bi rêveberan re hebûne xwe berdewam kir. Bi Îranê re, hata sadsala 21. hebûne xwe da berdewam kirin. Di bin navê "Recmê" ev nî'êzîkati, bi hin awayên din ji hata berdewam kirin. Mînaq, nêvî kirina bin axê de û piştê bi komên xalkê bi kevirkirin, berdewam kir. Hz. Muhammed, çend ku guhdide xwandina keçzarokan û ew di nav civakê de bi nêzîkatiya xwe xwest ku derxe pêş, pişt wî re tam vajî wê, rewşek afirî û hebûne xwe berderwam kir. Di deme şerê dawiyê(şerê uhudê=23 adar 625-) yê di destpêka musulmanetiye de bûyî, ku musulmanan winda kir, gelek mêr hatibûbûna kuştin. Piştê ji di heman heyvê de peyman "hudeybiye" tê mohrkirin. Bi vê peymanê, hebûne musulmanetiye bi fermî tê erêkirin. Ji ber têkçûne vî şerî, gelek jin ji bê mêr mabûn. Ji ber ku ew bêxwedî nemênin, hinek ji wan yên ku erêkirin, du an ji sê bi mêrekî mehra wan hata kirin. Lê ew rewş, piştê, dibin zagona "çar jin helal" in, hata berdewam kirin, di olê de. Ev hemû rewş, divêt ku bêne zelal kirin. Divêt ku şaşî û neşaşî jev bêne vaqatandin. Divêt ku xalatî û nexalatî jev bêne vaqatandin. Rastiya musulmanetiye ye paqij weke ku Hz. Muhammed anî ser ziman, divêt ku were zanîn û jîn kirin. Hingî, wê rastî weke ku Hz. Muhammed bixwe digot ku "divêt ku rastî bicih were", hingî, wê bicih were. Ev gotin, di nav xalkê de pir li ser navê wê tê gotin.

Bi vê yekê, her weha divêt ku mirov demên berê yên ku ji piştî zayînê ve bûna hewlbidê û fahm bike. Rastiyan wê, divêt ku baş werine têgihuştin. Ji deme destpêka musulmanetiye hata deme sadsala ku Salahadîne Eyûbî derket ji, divêt ku pir baş li gor nîrxê xwe were têgihuştin. Hz. Muhammed, weke ku di pirtûka pîroz de ji dibêje ku wê himê xwe xwest ku bi Birehim Xelîl û Nebî Nuh bêne ser ziman. Li ser wan ji, pir sekinî. Di pirtûka xwe ye pîroz de ji wan têne ser ziman. Li gor wê, rastî, divêt ku were ser ziman têgihuştin. Bi kevneşopî, Nebî Nuh û Birehim Xelîl li berdiclê û li berfiratê xwediyê kevneşopîyeke pir mazin bihizir in. Ev kevneşopî, divêt ku wre ser ziman. Hata nahaka ji, gelek xalatiyên ku li ser navê musulmanetiye têne kirin, ku cihê wan û bingihê wan di pirtûka pîroz de nayê dîtin, dibêjin "di hadîsê de ev wate heya". Lê ew wate çiya, ew ji nayê ser ziman. Ku li ser wê, xwestina axifitnê çêbibe û axifitnê bibe ji weke "gunahakî" tê dîtin. Divêt ku mirov li ser vê yekê pir bisekinê. Bi zêdeyî ji, hewceyî heya ku zanistên îslamê van rastiyan kifş bikin. Divêt ku rastiya Hz. Muhammed, pir baş were fahm kirin û ew hizre wî ya safî were zanîn têgihuştin. Ji dêla hizre wê hizre rêveberan, divêt ku newê ser ziman. Wê ev yek, di kîjan çerçove de ji bibe, divêt ku li pirtûka wê ya pîroz were meyizandin. Ew bahsa Nebî Nuh û hizre wî dike. Bahsa jiyana wî di pirtûka pîroz de dike. Bahsa Jiyana û hebûne Birehim xelîl dike. Divêt ku ew li wate xwe werine têgihuştin. Bi li gor xwe têgihuştin wan, wê deriyên pêşketinê di musulmanetiye de ji vebike..

Demên piştî derketine musulmanetiye re hata têne deme sadsala 15. min ji, her weha mirov divêt ku wan fahm bike. Divêt ku mirov rastiya wan fahm bike. Di wan deman de rêveberî hertimî û demî serdet bû. Bi serdetbûnên xwe re ji, rê ne dana pêşketinên hizrî yên ku wê bûbana. Rê li pêşîye wan, bi hebûne xwe re girtin. Piştî, Abasiyan re, nêzîkatiyan wan ye ku himê wan digeha deme mesre kevn, osmaniyan bi rewşeke hê ku li şûn mayî dana jînkirin li herême. Deme Osmaniyan, rêyên pêşketinê herême bitememî girtin. Bi vê yekê, êdî li herême pêşketin nebû. Lê rewş û hizre ku hebû ji, ji bo pêşketinê bû. Wê rewş û hizrê, ku li rojhilat bi vê yekê ji xwe re bêhn nedît, êdî li rojava li cihê ku ji xwe re bêhn dît derkete hole. Bi vê yekê, êdî Rojava di sadsala 15. min de deme ronansê jîn kir. Ku rastiya Musulmanetiye û têgihuştinê wê ya demê hatibana fahm kirin, ew ronansê rojava ye di desala 15. min de wê di sadsala 6. min û 7. min de wê li rojhilat dest pê kiribana. Musulmaneti, weke pergala wê pêşketinê ye demê bû. Hizir û kevneşopîye Nebî Nuh û Birehim Xelîl, Hz. Muhammed di bingihê wê de anîbû ser ziman. Bi vê yekê ji, ji wê kevneşopîye ku me li jor bahsê kir ye ku koke wê digiha misre kevn, wê kifşkar ne

bûbana.

Lê nahaka berî ku em deme Meleyê Cizirî û Feqiyê Teyran bînine ser ziman, em hinekî din ji bi şûn ve herin û ji deme Merwaniyan ve dest pê bikin û bînine ser ziman. Ev yek, pêdivî pê heya. Hinekî dî divêt ku em li ser Merwaniyan bisekin in. Divêt ku em rastiya wan bi hêze wan re pir baş û qanc fahm bikin. Ku ew baş newine fahmkirin, wê pêşketinên herêmê ji baş newine fahm kirin. Dîrok, divêt ku weke ku çawa jîn bûya, li gor rastiya xwe were ser ziman. Ev yek, wê hingê, mirov di derbarê pêşketinan de mazin biagahdar bike. Deme Merwaniyan, ku mirov li ser dihzirê, mirov dibîne ku pir mazin xwediyê hêzeke mazin in. Li herême, hata wê demê, hêzeke weke ye kurdan kê mû. Kurdan, hem ji aliyê kevnepî ve, hem ji aliyê nîrx û têgihîştinê de û hem ji ji aliyê hêzbûnê ve pir mazin bûn. Xwediyê hebûneke pir mazin ku mirov wê pir baş fahm bike bûn. Dîroke wan ye wê demê, pir mazin pêşdikeve. Ji sadsala 9. min pêve, êdî demeke bi hêzbûnê pêşketi ya. Hata wê demê, deme ku xwe bi nîrx û kevnepîyê musulmantiyê anîna ser ziman bû. Ji bo wan, ew yek zor ne bûbû. Ji ber ku pir nîrxên musulmantiyê ji çand û têgihîştinê Nebî Nuh û Birehim xelîl û kevnepîyê wan bû. Ji ber vê yekê, çend ku hinek nexweşî ji, bi pevçûnan, weke pevçûnên bi êzîdfîyan de dibin ji, lê dise karin ku xwe biafirênin. Xwe di afirênin. Dewlete Merwaniyan, asta wê afirandinê ye herfîlind bû. Ji ber vê yekê ye ku dewlete Merwaniyan pir girîng e, ku mirov wê pir baş bi nîrx û hebûne xwe re fahm bike û demên ku wê jîn kirina, baş û qanc bêne ser ziman. Piştî ku dewlete Merwaniyan ava bû, piştire, demeke dirêj, weke deme pêşketinê di dewletiyê de dibe. Bi vê yekê re, rêveberên weke Aliyê Merwanî, Hesanê kurê merwan, Saidê kure merwan (Mumehîdê dewlê), Ehmedê kure Merwan (Nesrê dewlê), Nesrîyê kure Ehmed û Mensûrê kure Nesrê (Nesrê dewlê) hebûn. Hinek rêveberên din ji hebûn. Lê yên ku derdiketina pêş bizêdeyî ev bûn. Di wê demê de, dewlete Merwaniyan li ser bakûrê Kurdsitanê ku hata ku digiha başûrê û rojhilat ji xwdiyê bandûrê bû. En dibêjin xwdiyê bandûrê bû. Ev awayê gotinê ji sedemekê wê heya. Divêt ku em wê ji bînine ser ziman. Di wê demê de, her weha bi serê xwe, ku xwdiyê xwe ye, weke dewletekê birûniştî jîn dibû. Ku herêmekê

hebûne herêmekê din erê kiriban, divêt ku pêşî mîrê wê herême yê serek pêşî erê kiribana. Her weha rewşek hebû. Merwaniyan, ev yek, pir mazin çê kiribû. hebûna xwe pir mazin dabûbûn erêkirin. Bêguman, di vê erêkirinê de, divêt ku em bandûra mîrê bota ji ji bîr nekin. Têgihitinê de dewletêbûnê bi wan re hebû. Ji ber vê yekê, Her mîrê ku wê li qasrê bûbana key an ji şah, piştî ku bû bi ser navê xwe de, weke bernavê wê bûnê navê dewletiyê ji li dawiyê navê xwe pêve dihata kirin. Bi vê yekê re, ev yek dihata ser ziman. Piştre, ew bi sûretê xwe re li ser diravên dewletê ji dihatina kolandin, Bi vê yekê re, êdî ew mazin dibûn. Ew dibûna şahî mazin ji dewletê. Biqasî ji keyan re navê şah dihata bikar anîn, wilqasi ji, navê "siltan" ji dihata bikar anîn. Weke li herême sêrtê ku pir bi nav û deng bû, Navê "Siltan Muhsadin", "Siltan Mucahîdîn" û "siltan Salih" û hwd. Li rojhilatê kurdistanê û hata ku digiha başûr ji, her weha pir dihata bikar anîn.

Deme Merwaniyan, demeke ku mirov her weha pir mazin li ser bisekinê bû. Di deme wê ye salên 1070 wan de, hêzekê wê ye pir mazin heya. Ew hêz li ser herême bigiştî ji, xwedî serwer e. Hin bi hin xanadana Sefevîyan ji di wê demê de bidest hêzbûna xwe dikê. Ew xwediyê xanadantiyê bûn. Bi kurdan re hata wê demê yên ku herî baş jîn bûbûn ew bûn. Di naqabîna wan û kurdan de ji hinek nexweşî hebûn. Lê ji ye kurd û arabana baştir bû. Piştî seferên xelîfeyên musulman li Kurdistanê, êdî nexweşî bi kurdan re di demê de pir mazin bûbû. Lê kurdan, hertimî hewl dabû ku wê nexweşiyê di nava xwe û wan de ne gihênine astaka şer û pevçûnan. Li anatolia ji hêze Bizansan hebû. Pir mazin bû. Piştî ku Hinek "Boy" ên tirkmanan li herêmên weke Herême Qonya wan bicihbûna piştre, nexweşî bi wan re ji çêbû bû. Car bi car ji, êrişên wan yên li ser hebû, li ser herêmên hevdû dibûn. Lê di dawiyê de, keyê bizansê yên ku ji bû key, key Romeo diyojên, xwest ku herê bi ser wan de û wan bêbandûr bike. Hata ku karibe wan ji herême ji derve. Wî, çareserîya ku ji bo sekinandina êrişan weha dît. Piştre, ku çawa bû nebû key, êdî piştre berê xwe da wan û çû ser wan de. Di deme êrişan de gelek "Boy"ên wan ji herêmê ji bazdidin. Lê gelek ji wan, bi jin û zarokên xwe ve têne herêmên kurdan û xwe li mîrê wan digirin. Piştî vê yekê re, êdî ku xaber diçê Nasrê kurê Ehmed (di hinek belgeyan de jê re "Abdülqasim Nîzamedin dewlê" ji tê gotin), êdî piştre, ew biryarê dide ku wan bi pareze. Di deme kin de gelek ji wan "boy"ên tirkmanan têne herêmên kurdan. Hêze bizansiyan ji, bin key û serkêşiya romeo diyojên de li pey wan têt. Piştî ku Hêze Romeo diyojên dikeve Kurdistanê de, êdî piştre kurd di rabîna ser xwe û piştre di cih de di nav xwe de hêzekê mazin didine ava kirin û li dişênin pêşîya wî. Weke serokê dewletê ji, Nasrê kurê Ehmed ji li ser serê wê ya bi gelek mîr û aqildanên wan û yên xwe re. Ji başûr û rojhilat ji, hinek herêm hêzne dişênine alikariyê ji Nesrê kurê Ehmed re. Ji ber ku ew mazin bû û serok û herkesêkî wî wilo erê kiribû, êdî çawa ku xaber gîhabû wan ku her weha rewşek heya, êdî di cih de, ew ji hêzne didine amede kirin û tèn û digihine wan ji bo alikariyê. Li herêmê ji hinek "boy"ên Selçûqîyan ji hene. Hinek ji wan ji, li ber bayê hatina Romeo Diyojên çûbûn. Lê Selçûqî bixwe ji di wê demê de, bi hev re meşkûl bûn. Hinek şerên wan yên bi hev re li ser keytiyê hebû. Di nav wan de yê ku wê demê de bûbû key ji, jê digotin "alpaslan". Ew ji zanin ku Romeo diyojên were û biserbikeve wê xwe bigihêne wan ji. Persî ji ji vê yekê ne xweş in. Ew ji, ji ber vê yekê, hêzne xwe dikina navê yên kurdan de. Piştre dibin şerkêşiya "Aspaslan" de, hêzeke wan ji tê û xwe digihêne hêze kurdan û bi hev re dikevîne rê de û bi ber Romeo Diyojên ve diçin. Ew ji ketiya nava axa Kurdistanê de û têt. Li Herême Milazgirê (jê re berê mazgîr ji dihata gotin) digihine hevdû û li wir bi hev re dikevîne şer de. Di şer de, Romeo diyojên têkdiçê û piştre, tirkman ji xilas dibin ku ji wan herêmên Anatolia yên weke Qonya wanderan derkevin û her in. Ew têkçûn, Bizansiyan dike rewşeke pir ne baş de. Piştre, ji xwe êdî hin bi hin bi xwera ve diçin û kêmbûn ji aliyê hêzê ve. Lê hinek ji wan li Kurdistanê ji dimênin.

Piştî vê rewşê re, di dewlete Merwaniyan de, demeke nû dest pê kir. Navê Nesrê kure Ehmed ji pir mazin derket. Ew, bû mirovekî ku bikarîna û mazin bû. Piştre, demne Merwaniyan, yên rêveberiyê li herême mazin bûn. Xelîfe ji, bê wan, êdî tiştek ne dikir. Ji ber kudi xwest ku kurdan li cem xwe bigirê. Kurd, ku li cem bana, ew bihêz bû. Wî ji, ev yek zanibû. Deme Merwaniyan, bi vê yekê, hata deme derketina Salahadînê Eyûbî berdewam dike. Salahadînê Eyûbî ji ku derdikeve, piştre, ew ji rewşeke pir mazin bi xwe re di afirêne. Piştre, ew, wê rewşe Merwaniyan ye ku hebû û pêşketibû û bi dewlet bi kevneşopî bûbû, hata asta împaratoriye ew derdixe. Wî, rewşeke mazin,

ne tenê di Kurdistanê de, li giştî afirand. Wî, xelîfê ji kire destê xwe de. Kurdistan, her weha êdf di rêvebertiya musulmantiyê ye herême de ji xwedî gotin bûn. Piştî ku çîne serdest li Kurdistanê, weke mîran, ku li musulmantiyê xwedî derketin û di qasr û civatên xwe de anîn ser ziman, êdf piştre mazinbûn bû. Çîne sedest ye Kurdistanê, bi xwe re, bi mîrîtiya xwe re rewşeke bi pergala ku herêm bigiştî bi bandûr dikir afirandi bû. Ev rewş wan ji, li Kurdistanê pir mazin bi kevneşopî bû. pergala olê ji li Kurdistanê mirov karê bi wê pergala bêne ser ziman. Ku mirov ji derve, li wê pergala dimeyîzenê, mirov hinek di keve zore de ku jev derxe ku ka olî ya an ji bihizir kevneşopîya. Lê herdû bi hev re di ahengê de dimeşin li Kurdistanê. Lê di kevneşopîye xwe de, yek ji wilo zêde serdest nabe. Ji ber vê yekê, bizêdeyî, ji anîna bi olê zêdetir hewceyî pê heya ku mirov bi kevneşopîye hizrî ye dîrokî ku olî di nav de tê ser ziman bêne ser ziman. Ew kevneşopî, bi Nebî Nuh û Birehim xelîl ji, xwe pîroz dike. Piştre wan ji, xwe wilo berdewam dike. Ku mirov vê awayê pêşketine baş û qanc fahm neke, mirov wê çanda berdicle ye li Cizîr bota û ye li berfiratê ye li Rihayê bihizir, têgihiştin û dîroke xwe re baş û qanc fahm neke. Ev awayê pêşketinê weke ku hinek kodên pêşketinê yên van herêman di xwe de bi hebûn di pareze. Ji deme Merwanîyan hata deme Salahdînê Eyûbî û ji wî ji bi demên Eyûbîyan re hata sadsala 15. min, pêşketine ku li Kurdistanê, her weha bi vê yekê bi şêx û mîran, yanî bi çîne serdest ve hata bi rê ve birin. Çîne serdest, ye ku afirî bû, karibû ku hesanî xwe li gor pêşketinên ku dibin biadilêne.

Ev tepişîya wan bi şîyan hebû.

Weke serdemek teybet serdema Salahdînê Eyûbî

Dîroka kurdan, bi vê yekê re, divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman. Kurdan, di nava wan de hertimî tememê yekebûnekl bûya. Lê ku wan bikarhanîya, karîna ku jê sûd bigir in. Mînaq, di deme ku ew baş bikarnehanîna û guhnedana, hingî jî, nekarîna ku wê yekebûnê çêkin û jê sûd bigir in. Lê di deme ku xwestina ku yekebûnê di nava xwe de çêbikin jî, yekebûn di nava xwe de çêkirina. Î ro, ku car bi car bahse wî dihê kirin û tê gotin ku bi navê misilmantiyê yekebûn çêkir di cihane îslamê de Salahdînê Eyûbî, wî bixwe jî, ew yekebû, bi têgihiştinî fahm kirîya û çêkirîya. Hin gotinên ku tîn gotin ku "wî di nava cihanê îslamê tenê de yekebûn çêkir" jî, mirov nikarê bi tememî piştrast bike. Ku mirov bi teybetî pêşketina wî ya bi dîrokê re lê bînerê, mirov divêt ku fahm bike, ku di temenê wî de kevneşopîyeka bi pergala heya. Salahdînê Eyûbî, piştî ku yekebûnaka pîr mazin û xort li herême di nav kurdan de çêkir, piştre, wê li ser wê re, yekebûnaka cihanî di cihane îslamê de jî bide çêkirin. Ku wî, ew yekebûn di deme xwe de di nava kurdan de çênekiribena, wê nikarîba ku di cihane îslamê de jî, wê yekebûna mazin çêbikira. Ew, ji wî re, dibê temen û ew li ser wê re gavên xwe yên mazin diavêje. Di sefera xwe ya ku diçê ser baxdayê de di deme Mûtazîm de, wê piştre, bike ku hemû herêman kurdan bi wî ve girêdayî bin. Farqa wî, ew bû ku ew ne li ser nêzîkatîyên mezhebî re nêzî dibû.

Ji wê gava xwe diavêje û mazin dibe. Salahadinê Eyûbî, di aslê xwe de, divêt ku mirov bibêje ku hê bi tememî ne hatiya fahm kirin. Deme wî bixwe jî jî ne ji aliyê sîyesî, rêveberî, çandî, kevneşopî û hwd hatiya fahm kirin. Ez nikarim bêjim ku hatiya fahm kirin. Nivîs û pirtûkên ku li ser wî û deme wî hatina nivîsandin, didina nîşandin ku ew û deme wî baş ne hatiya fahm kirin. Ez bixwe jî, di deme ku wan nivîs û pirtûkan bixwe jî dixwênin û li wan dinerim, ez vê yekê bi teybetî karim bêjim.

Di zana min de li ser vê deme Salahadinê Eyûbî, bi teybetî, divêt ku mirov bi sekinê, Ji ber ku ev dem, weke ku hem giringa û hem jî hê ne hatiya fahm kirin. Li ser wê ne fahmkirinê re, hin nivîs tên nivîsandin û vajî wî û deme wî û têgihîştina wê tên nivîsandin. Bi vê yekê re, hewceyî pê heya ku divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman.

Salahadinê Eyûbî, ku wî pêşî di nav x alkê xwe de di nav kurdan de yekbûn çênekiriba û bi wan re xwe nekiriba hêz, wê nikarîba ku li herêmê xwe bi xalkên din jî bide herêkirin û giraniya xwe bide nîşandin. Di serî de, ya ku temenê wê mazinbûna wî diafirîne, weke ku mirov wê kifş dike, di serî de, ew yekebûna ku wî li kurdistanê di deme xwe de çêkiriya ya. Ew yekbûn, wê di temenê mazinbûna wî ya li herêmê bê. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bi teybetî wê bêne ser ziman, ku salahadinê Eyûbî, mazinatiya wî, li ser temenê wî ya. Minaqa herî mazin ya li berçav a, ku deme ku amê wî li Libnanê û hwd ku dike ku wê herêmê hemûyî bike bin destê xwe de, hingî jî di deme ku ew fahm bike ku wê hêza wî tere nekê, hingî, ew xaberê dişene ji salahadinê Eyûbî re û jê hatina wî ya bihêzekê dixwezê. Ew jî, di hundurê çend rojan de hêzaka mazin ku li ser 15 hezar sûwariyan re ya, lev dide hevdû bi wan re dikeve rê de. Di rê de jî, her deverê ku ew digihijiyê de, li wir hêzê li hêza zêde dike, heta ku ew digihijê cem amê xwe Şerkoh. Ew da yina hêzê ya salahadinê Eyûbî, wê ji herême botanê bê. Salahadinê Eyûbî bixwe jî, di wê demê de bi teybetî li vê herêmê dima. Li vê herêmê, ji ber ava diclê heta ku digihijst ber ya firatê di qadaka mazin de giraniyaka wî ya mazin hebû. Ne ji wê giraniya wî ba, wê di cihane îslamê de jî mazin nebûba. Di deme Salahadinê Eyûbî de, li herêmê ku mirov pêşketin û hêziya îslamê jî di nav de bi hasibêne, li ser temenê desthiladarî, hêzî, serwerî û serdestiyê mazinbûn dibêt. Yên ku bihêz in, li herêmê dikarin mazin bibin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku Salahadinê Eyûbî, xwediyê wê mazinatiya bi xalkê xwe re ya. Wî di serî de perwerdehiyaka mazin hilda ya û dikarê hem bi xweşik axiftin û levanînê bê û hem jî bi nivîsandinê bê, hizra xwe bêne ser ziman.

Deme Salahadinê Eyûbî li Kurdistanê, ku mirov lê dihizirê, mirov hin teybetmendiyên wê sereke di serî de kifş dike. Xwenaskirin û bi wê re mazinbûn bi wî re heya. Ew, di nava xalkê de mazin a. Bi wê mazinbûnê re Salahadinê Eyûbî, ji ya ku em î ro, di derbarî wî de dizanin bêhtirî xwediyê pêşketinekê di demê de bi xwe re ya. Bandûra wî li herêmê mazin a. Hêza leşkerî li herêmê, di destê kurdan de ya. Her kurd, girêdayî êl û an jî aşîra xwe ya û bi wê re mazin a. Bi hev re tevdigerihin. Her êl û an jî aşîr, di demê de weke ku xwediyê artişa xwe ya teybet e. Yê ku

li ser serê wê xwedî bîryara jî, serokê êlê û an jî aşîrê ya û bi wî re serokên olî na. Serokatîya olî, di deme Salahadinê eyûbî de, dernekeve pêşîya ya rêveberîya mîrîtîyê. Bi wê re dihê û dikeve ahangê de. Weke yekî xwenda û mazinekî kurd û ê civatê Salahadinê Eyûbî, gotina wî, di nava civata mazinên serok û êl û aşîran de di buhurê.

Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku Salahadinê Eyûbî bixwe jî, î ro di deme ku di derbarê wî de dihê nivîsandin de, aliyê wî yê dihê derxistin li pêş. Ev yek, ne xelata û rast a. Lê kêma a. Ji ber ku Salahadinê Eyûbî, ne tenê b i wê re dijî. Bi teybetî, ew di derbarê dîroka xwe û kevneşopîya xwe de xwediye têgihîştin û zanîna mazin a. Bi wê zanîna wî re, divêt ku mirov wî fahm bike û bêne ser ziman. Bi vê yekê re, weke ku tê gotin ku "ew tenê li ser temenê olî sekinîya û aliyê xwe yê civatî û (yan jî bi gotina hemdem ya 'netewî'yata xwe) li şûn hiştîya", ku mirov li demê dinerê, mirov fahm bike ew li gor demê tevgerîya ya, lê wî ew li şûn nehiştîya. Ahangê di nav de daya çêkirin. ew dizanê ku nikarê bêî kevneşopî û xalkê xwe jî bijî û mazin bibe. Lê bi wê re dizanê ku demê demê hêzîyaka mazin ya ku derketina dervî sînorê xalkîtiya ku di demê de dihat jînkirin a. Salahadinê Eyûbî, derketina dervî wê, bi pergale re dijî. Bi wê re, ew li herêmê, di serî de, wê weke hêzeke mazin bibe. Piştê li ser herêmê, rêveberîya xwe bigiştî bide avakirin. Di aslê xwe de, piştî Salahadinê Eyûbî re, rêveberîya ku wî avakiribû û serwerîya wê, di demê de û di kirinê de weke ku dibê duqat. Ev jî, ji aliyekî ve di ihê li holê. Piştî wî re, ti mirovên ku karin di asta wî de, wê mazinîyê û hêzîyê û aqiliyê bidina nîşandin dernekevin. Yê ku tên jî, herêm bi herêm, wê qatbûnê kûr dikin. Salahadinê Eyûbî, kir ku farq di nava şîtiyê û saffîti û sunnîtiyê de ji holê rakê. Bi vê yekê re, di deme ku di wê demê de du navendên xalîfetiye hebûn yek baxda û yan dîn Şam û jê wirde, û ku wan gotinên ne baş ji hevdû re digotin, wî hêza xwe lev da hevdû û çû bi ser rêveberîya baxda de. Bi vê yekê re, di rêveberîya giştî de, weke ku deng kira yek.

Lê piştî wî re, ew ahangê ku wî çêkir di nava xalkan de û ya di nav rêveberîya herêmê ya olê de jî xira bû. Êdî piştê, ez karim bêjim ku rewşeka dîn ya nûknû derketa li holê. Salahadinê Eyûbî, Di aslê xwe de, hê ku ew li jîyanê bû, wî fahm kiribû, wê dubendî ji holê nerabê. Bi vê yekê re, wî kiribû ku rêveberîya xwe ya ku weke dandik avakirî ya bi navê Eyûbîyan, kir ku bike navik. Pi ştre giranî de pêşxistina wê. Bi vê yekê re, wî, di deme ket berzîkratan de, kurê xwe weke serokekî ku mazin bidest şîretan li wî kir. Bi vê yekê re, Salahadinê Eyûbî, kir û xwest ku temenê wê rêveberîyan pişt xwe re li Kurdistanê xort bide avêtin. Giringiya Reha û hîrdora wê jî, bi bawerîya Birehim xalîl li wir bû û ewder male wî bû re mazin bû. Bi vê yekê re li wê herêmê, êdî wî kir ku li wir, temenekî bi afirêne. Şam, wê di deme Salahadinê Eyûbî de derkeve li pêş, weke devereka girîng. Ji ber ku Salahadinê Eyûbî Di xwest ku ji Rehayê heta ku digihîşt mekke-Medinê ew xateka ku menewîyate wê mazin û li pêş bide çêkirin.

Salahadinê Eyûbî, bi vê yekê re divêt ku mirov bibêje ku wî di deme xwe de li herêmê û bi teybetî li Kurdistanê, yekebûnaka mazin dabû avakirin. Ew yekbûn, li gor demê wê çawa were

jiyin jî, temene wê dabû nîşandin. Li gorî têgihîştina Salahadinê Eyûbî, cihane îslamê, bi rêveberîyaka ku navande wê wê qada di n aqabîna firatê û diclê de bê, wê karibê, serdestiyê li hemû herêmê bike. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku ew di vê yekê de weke ku xwediyê nerîneke sereke ya stratejîkî bû.

Piştî şerê li Kudusê ku bi xacîyan re diohê kirin, wê li herêmê bi teybetî demeke nû were vekirin. Ji her aliyê ve wê demeke nû vebe. Li kurdistanê jî, ev deme nû wê bibe. Bi teybetî, êdî weke hêzeke mazin jiyin, wê karina ku mirov xwe li ser lingan bigirê wê bêne li holê. Bi vê yekê re, ew di aslê xwe de, çendî ku bi felsefe, hizir û têgihîştina olî jî ba, wî awayekî netewî hizirkirîya û li gor wê rêveberîya kirîya ku werene berçav û bide nîşandin. Heta wê demê, kurd, bi aşîrî bi hev re di yekbûnekê de dijîn. Têkiliya wan ya bi hev re bi kevneşopîya wan re jî pirr durust û saxlam bû. Xiranedibû. Lê ji wê demê pêde, ku weke awayekî demê û têgihîştina wê derdikeve li pêş li gor demê, ew gelemperbûna ku ew dihêne li holê ya. Salahadinê Eyûbî, di nêzîkatiyên wî de, mirov fahm dik e ku mirov û jîyane wî pirr li pêş a. wekhevîyên û bi wê nêzîkatî lê kirin, bi wî re di nêzîkatîya wî de weke prensibeke sereke ya ku mirov kifş bike ya. Giringî dana ahang û xwezajîyane mirov, wê di dawîya jîyane wî de jî di gotinên wî yê weke mîrete de, wê werê ser ziman. Bi aqilmendî tevgerîn, bi wê re pirr li pêş a. Di kiirnên xwe de hertimî wî wijdan li pêş girtîya. Piştî kirinaka ku mirov bike re dilrehetiya mirov, wî giringî dayê de. Ew, bi wê dilrehetiyê çû ber dilovaniya xwe. Deme ku çûber dilovaniya xwe ji mirovên li ber serê xwe ji wan xwest ku şûrê wî jî bi wî re bikina hundurê tirba wî de. Di bawerîya kurdan de, di deme ku mirov çû dunya din ber cihê hasab dayînê ku di deme ku mirov bi şûr bê, wê şûrê mirov jî ji kirinên mirov re şahîdiyê bikê. Ew bawerî bi wî re jî hebû.

Ev deme ku î ro em kurd, bi tahahî weke nan û avê ji xwe re pêdivîya wê dibînin yekebûna nava xwe, ku em li dîroka xwe biner in, emê ji wê pirr minaqan jî bi bîn in. Deme Salahadinê Eyûbî, ji ber ku di ast û radaya dem me de û di têgihîştina wê de hatiya çêkirin, mirov karê bahse wê bike û wê fahm bike. Li herêmê Kurd, ereb û fars bi hev re bi komên ên ên xalkî re wê çawa bi hev re bijîn, wî pergale wê ava kir. Î ro, weke pergaliyaka herêmî ku dîsa xalkên herêmê têde bi nixên xwe bi hev re bijîn lêgerîn ji aliyê kurdan ve bi wê heya. Dîsan, dîroka kurdan, ev beşa wê, di vê astê de, wê bi kurdan re ereb û farsan jî bike nava xwe de. Weke mirovekî kurd, Salahadinê Eyûbî, hemû xalkên din ên herêmê bi kurdan re di bin rêveberî û serokatiya xwe de lev da lihevdu. Wî, serokatiya aqilî û felsefîkî bi teybetî bi olî re pirr baş bicih hanî. Têgihîştina, rêveberîya xwe di serê xwe de zelal kiribû û hanîbû ser ziman. Li Kurdistanê, di deme wî de jî hem fileh jî û hem êzîdî û hwd, komên din ên olî ên jevcuda hebûn. Lê mirov nikarê bibêje ku komekê ji ji wan ji bo hizir û baweriyên xwe di deme wî de zor dîtina. Salahadinê Eyûbî, weke ku peymanaka civatî çêkiribû û herkesek kiribû hundurê wê de. Bi nêzîkatiyê bê û bi kirinê bê, wî ev daya nîşandin. Li ser wê re, wî xwestiya ku aramiyê bide parastin. ..

.Ev deme ku em bahse wê dikin deme Salahadinê eyûbî, ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, mirov wê bibîne û fahm bike demeke teybet e. Pêşketina wê demê, pêşketineka civatî ya gelemper e. Lê di temenê pêşketina xalkbûnan de jî, pêşketinên mazin hene. Kurd, heta wê deme ku têde ola îslamê derketîya, bi pergali bi êzîdîtiyê re bi heman awayê û pergaliyê jîya ya. Piştî ku ola îslamê derdikeve, ji ber ku ola îslamê, wan nîrxên ku pêşketina û civat li dora wan gihiştîya hevdû esas digirê, êdî hatina wê ya li kurdistanê û pêşketina wê ji destpêka wê destpêdikê û pêş dikeve. Di wê deme ku ola Îslamê derdikeve û serwer dibe, hingî kurd, bi dewlet in. Di wê deme berî derketina îslamê de Împaratoriya sasanîyan heya û ew weke Împaratoriya he vbeş ya kurd û farsan a. Bi teybetî, nîrxên kurdan bêhtirî di wê de di temenê wê de hene. Minaq, nîrxên zerdeştîyê hwd, wê hebin. Piştî derketina Manî û hanîna wî ya hizrên xwe li ser zimên, wê temenekî li gor demê bide afirandin. ..

Manî, wê aqilekî civatî ê li gor demê wê bike ku bide afirandin û bêne ser ziman. Vê yekê, ew wê jî pêktîne. Ji deme derketina Manî û heta hatina deme derketina îslamê, mirov divêt ku weke demeke teybet bîne ser ziman. Di vê demê de, wê bi teybetî temenê cudabûnên mazin bîn avêtin. Kurd, çendî ku di deme Sasanîyan de bi xwe re û bi hebûna xwe re weke dewlet in û wilo dijîn jî, êdî kurd, wê têr nabînin. Împaratoriya Sasanîyan jî, bêî ku piştgirî û alîkarîya kurdan jê re hebe, wê nikaribê xwe li ser lingan bigrê. Bi vê yekê re, di deme ku kurd, di van deman de dikevina lêgerînekê de, êdî wê Rêveberîya Sasanîyan jî, êdî bikeve ber halînekê de. Wê bandûra wê, kêmbibê. Kurd, wê ne bi gelekî re, bi hatina aşîrên wan yên ku li herême rojhilatê kurdistanê, Xorasan, başûrê kurdistanê û hinek aşîrên ku li herême botanê ya ku bakûrê kurdistanê û başûr rojavayê kurdistanê dike nava xwe de ji wir jî, wê ji wan piştgirî hebe û wê temenê de wletê kurd ya bi navê "Şadadî" were avêtin û were avakirin. Ji xwe, herême Xorasanê, kurdên wê herêmê, bi serê xwe na û weke dewlet dijîn. Reêveberîya wan ya wê herêmê ku heya, mirov ji her aliyê ve bi navê xorasanê weke dewleteke hemdem ku hatî denezandin karê bêne ser ziman.

Ji xwe, piştî kurd, id nava xwe de dikevina nava hewldanên avakirina rêveberîya xwe ya dewletî de, êdî weke ku rêveberîya Sasanîyan ji bîr dikin. Bi wê re, êdî wilo zêde ti bandûra farsan jî, wê li herêmê ne menê. Lê tevî wê jî, divêt ku mirov bibêje ku hertimî li dijî herîşeke ji derve, weke hêrîşên Împaratoriya roma ku li herêmê dibin, wê kurd û fars bi hev re li dijî bisekin in û ne hêlin ku ew li herêmê karibin, zêde pêş de herin. Kurdan, ji sadsale 7 û pê de, wê êdî hin bi hin temenê dewleteka wê karibin bikina cihê Împaratoriya Sasanîyan de li herêmên xwe diavêjin. Demên navbera demên 951 û 1174 jî, weke demne wê yên zêr in. Ev dewlet, dewleta Şadadîyan a. Di vê demê de kurdên Ayarîdî û kakoyîdî li rojhilatê kurdistanê ku heta ku başûrê kurdistanê jî pîrriya wê dike nava xwe de, lê xwediyê serwerî, serdestî û serbixwebûnaka mazin in. Kurdên Kakoyîdî, dewlet ava kirina û beşên wê bi rêxistin kirina û waraqa(p ere)yen kirin û firotinê jî çêkirina û bikar dihênin. Di deme Sasanîyan de Kavosakî hene û bi dewletî ku weke wê deme weke kakyîdîyan bi dewletî û bi qûdretê mazin dijîn hene. Keyê Kavosakî ê bi navê

Kayûş bixwe jî di wê demê de hewl dide ku hemû êl û herêmên kurdan di bin dest û serdestîya gasra xwe lev bide li hevdu. Heta derekê jî, dikê jî. Sasanî, di dema wî de jî, ji bo wê kirina keyê kurd Kayûş (ji 'kayûş' re, kurkey yanî "prens" û ankû prensê kurd(kurkeyê kurd) hatiya gotin), li dijî kurdan dibina xwediyê helwestekê jî. Lê ji ber ku kurd hem li herêmên xwe û hem jî bi ramiyarî xwe xwediyên serweriyê na, di helwesta xwe de êdî zêde pêde naçin. Zanistên ku bi aslê kurd in, di wê demê de di dema Kurdên Kavoşakî de jî dijîn û bandûra wî pirr mazin a. Manî, wê Zerdest, weke ku ji nû ve li gor demê bi aqil şirove bike û bêne ser ziman. Çend kurd heta roja me jî, ji aliyê hin lêlokînvanna ve jî tê gotin ku gotina "kurdistan"ê, siltanê Sa lçûqî pêşî bi karhanîya jî, ku mirov hinekî bi lêkolînî li ser vê gotinê di tawihê û lédikolê, mirov dibîne ku di deme kurdên Kakoyîdî de jî, mirov dibîne ku wa tê bikarhanîn. Hingî, Siltan, Sancar, weke bavê xwe, Şahîşah, li ser hasp hatiya der sînorê kurdistanê û gelek cih û warên ku wargehên jîyanê bûn, ji dîrokê birina, ew jî tê kurdistanê û li rojhilatê kurdistanê li sînorê dewletê kurdên Kakoyîdî diqalibê. Li wir, şerên mazin bi kurdan re dike. Piştî ji çend mirovên li dora dipirsê ku ev xalkê ku ew li ber wan şer dike kîna. Ew mirovên ku ew ji wan dipirsê jî, ew jî dibêjin ku "ew kurdîstanî na". Ew jî, tê gotin ku dibêje ku "ev kurdîstanî, çi şervanna mazin in". Bi vê gotina xwe re, ew gotina ku navê kurdîstane, ew ku dibihîzê, êdî bi wê rengê bi kar dihêne.

Lê di wê demê de, hêrîşên li herêmê jî, pirr hene. Li dijî, hemû hêrîşan, wê Şadadî, bi hêzeke mazin ava bibe û heta ku hinek herêmên qafqasya dike nava xwe de, wê bike bin serwerî, serdestî û desthilatdarîya xwe de. ...

Rêveberîya Şadadîyan, wê heta sadsale 9. min, wê ji wê demê hebûna xwe bide berdewam kirin. Wê hinekî piştî wê demê di sadsale 10. min de, kurd, rêveberîya wan ku êdî weke împaratoriyakê ya, wê rastî hêrîşên komên mogolan ku ji herêmên din ên wir de ên Asya tèn wê were. Rêveberîya kurd ya Şadadîyan, navenda wê, bi teybetî rojhilatê kurdistanê ya û ji wê li dora xwe belav dibe û bi ber başûr û bakûrê kurdistanê de serwerî û desthilatdariya xwe mazin dike. Piştî hêrîşên mogolan re, rêveberîya Şadadîyan, wê êdî ji hêz bikeve. Wê ev hêrîş, ser dusadsalî li kurdistanê bidom in. Herîşên herî mazin yên ku li dewleta kurdan dibin, wê ji aliyê Şahîşah û kurê wî Sancar ve bibin. Ew herîşên wan, wê di ancama wan de rêveberîya kurdan ya Şadadîyan, ji hêz bikeve. Piştî wê weke ku valahîyak di rêveberiyê de li kurdistanê wê derkeve li holê. Êdî li ser wê wê valahiya ku tê xûyakirin, wê li herêmê botanê ku navenda wê herême Mayafarqînê ji xwe re weke paytaxt dihilbijêrê dewleteke nû ya kurd ava dibe. Ev dewleta nû ya ku ava dibe, dewleteka din ya kurdan ya bi navê "Merwanî" ya. Ev dewlet, wê naqabîna diclê û firatê ji xwe re esas bigirê. Piştîgirîya mirê bota ku li herêmê botanê weke dewlet dijî û ti hêz nediwêra herê bi ser wî de jî ji wê dewletê re hebû. Di wê navberê de li herêmê, ola îslamê derketiya û ola Îslamê, ji aliyê rêveberîya kurd ya Şadadî ve deme ku pêxemberê olê nemeyê dişene, di deme ku neme wê digihîjê wê, ew jê herê dike û rêya misilmantiyê dihilbijêrêne.

Merwanî, ji destpêkê, weke rêveberî û dewlet kurd ya di deme îslamê de ya. Bi vê yekê re, di aslê xwe de, serokên wê, weke şah û xalîfê dijîn. Dem heta ku tê wê deme avabûna dewleta kurd a Merwanî, wê rêveberîya giştî ya Şadadîyan, wilo zêde bandûra wê nemêne. Wê bi nav û hebûna dewleta merwanîyan, wê Şadadîyan jî, êdî hinekî di herême xwe de weke ku di aramiyê de bijîn. Lê wê, ew jiyina wan zêde ne domê. Merwanî, bandûra wê, li herêmê mazin dibe. Bi teybetî, Merwanî, weke dewlet, ku ava dibe, wê di demeke kin de sînorê dewleteke derbas bike û ji herêmên kurdistanê ji yên botanê heta ku digihijê Şamê û hwd, wê li wanderan serdestiya xwe bide herêkirin. Ji aliyê din ve jî, wê bandûra rêveberîya Merwanîyan nehêle ku rêveberîya Şadadîyan bandûrê li ser herêmên xwe jî winda bikin. Bi vê yekê re, wê li herêmê bi kurdan re, temenekî mazin ê împaratorî wê biafirê. Piştî Avabûna dewleta Merwanîyan re, hatin û derketina Salahadinê Eyûbî, wê li ser vê temenê mazin bê. Ew, weke mirovekî bizane, wê karibê ji wê temenê û awayê pêşketinê sûd bigirê û wê bikarbêne. Salahadinê, ku tê ser rêveberîyê, wê sîronê rêveberîya bigihijêne heta dewleta Memlûkan û Hebesîstan û Yemenê û hwd. Amê wî Şerkoh, wê Libnanê bike bin destê xwe de û wê desthilatdariya xwe li ser ava bike. Ew jî, wê bi wê re, ji Salahadinê Eyûbî jî, wê ji wê rewşê sûdbigirê û heta misre kevn herê û wêderê bike bin desthilatdariya xwe de. Berî ku ew were û herê û serokfermanderiyê û şerkêşiyê ji şerê Êrşelîmê re bike, wê demeke xwe li bi malbata xwe li Îskenderiya li ber wê bahre wê bi buhurêne. Piştî hatina seferan re, êdî ew pêşî di vegehîrê herême botanê û piştê ji wir bidest avakirina hêze xwe dike û ji wir dikeve rê de û diçê Êrşelîmê.

Salahadinê Eyûbî, demên wî yên piştî serkevîna di vî şerî de, wê li kurdistanê bi teybetî li ber firatê bi buhur in. Malbata wî, li wir bicih a. Ji wir, bandûra wî, li cihanê îslamê pirr heya. Piştî wî re, wê li kurdistanê deme xanadanîya Eyûbîyan, wê dest pê bike û wê ev xanadanîya ku temenê wê Salahadinê Eyûbî avêtîya, ne bin 400 salî re wê li kurdistanê xwediyê rîzanî, rêveberî û desthiladariyê bê. Teybetmendiyên xanadanîya Eyûbîyan, mirov nikarê tenê weke teybetmeniyên xanadanên ji rêzê bêne ser ziman. Teybetmendiyên wê, di asta tîgihîştin û zanîna hemdem ku weke ya deme me ya, li gor tîgihîştina civatî pêş dikevin. Di xwe de û di nava xwe de rêveberî bi tîgihîştin, pirr pêşketîya. Rêveberîya xanadana Eyûbîyan, bi bandûr û desthilatdariya xwe re xwe bi hemû rêveberiyên din ên herêmî ên kurdan xwe daya herê kirin. Rêveberîya xanadanîya Eyûbîyan, ji şerê û awayê rêveberîyaka xanadanî Zêdetir, weke yê dewlete ka hemdem dijîn. Gelek, kirman, mizgeft, medresayên ku li herêmên botanê heskîfê ku hatina çêkirin di wê demê de bi destê wan hatina çêkirin. Rêveberîya xanadana Eyûbîyan, pirr giringî daya perwerdekirinê. Ji ber vê yekê, her mizgefta ku çêkirîya tîde cihê razanê û xwandinê ku mirov weke medresê lê bînerê jî tîde çêkirina.

Deme deme xanadanîya Eyûbîyan li Kurdistanê, weke deme pêşketî û li gor tîgihîştinekê pêşketî divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Di rêveberîyê û rêvebirinê de, salahadin, rêveberîyaka giştî li herêmê ku bi tîgihîştinî wî adiland da ava kirin. Salahadinê Eyûbî, li herêmê û di

îslamiyetê bixwe de jî demeke nû da vekirin. Divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Lê divêt ku ez vê yekê bibêjim ku Salahadinê Eyûbî, ew pêşketina li kurdistanê ya bi demên wê yê berê re jî esas girt di wê pêşxistina bidestê xwe de. Ew di derbarê nirx, dîrok û kevneşopîya xwe de, xwediyê zanîn û têgihîştinaka pêşketî bû. Bi vê yekê re, wî fahmkiribû ku li herêma li gor wê çawa di demê de were jiyin. Hinek aliyên ku salahadin hem bi kirinên xwe re bê ku dabûbûn li berçav û hem jî ku wî bixwe bidev jî hanî bê ser ziman, hê jî li gor min baş û qanc ne hatina fahm kirin. Wî di aslê xwe de, fahmkiribû ku ji deme xalkîtyê buhurina demeke nû ya civaktiyê bûya û bi wê re divêt ku çawa were jiyin. bi vê yekê re, wî weke asta giştî ya li sereke pergala ûmettîyê derxista li pêş. Bi vê yekê re, dadîtî bi kirin û gotinên xwe re pêşniyarkir weke ya rast. Di bin wê asta pergala ya giştî de jî, wê xalkên li herêma wê çawa bi hev re bijîn, wî nêzikatiya xwe dabû li berçav. Li Kurdistanê, di wê demê de jî, hê ez karim bêjim ku kurdên êzîdîtî û ên cihû jî hebûn. Lê li dijî wan, ti nêzikatiyê wî çenebûna. Wî, bi hev re jiyin divêt ku çawa bibe, ew derxistîya li pêş. Di temenê nêzikatiya olî de, wî nêzikatiya xwe daya nîşandin. Bi vê yekê re, hem xalk li gorî komîtîya civatîya xwe û hem jî bi cudahiyan xwe yên olî bin û yên din bin, çawa bijin bi hev re, di temenê wê pergaliya olî de, wî kirîya ku bide nîşandin. Her kirinên xwe li dadiyê û ne li dijî wijdan bin, wî kirîya û daya kirin. Bi vê yekê re, mirov dibîne ku di kirin û gavavêtina wî de dadîtî û wijdan bi hev re bi awayekî vekirî derdikevina li berçav. Bi vê yekê re, ez divêt ku bibêjim ku wijdan bi wî re pi rr mazin li pêş a. Wijdan, bûna wê bixwe jî, li ser zanebûna mazin ava ya. Bi vê yekê re jî, ku mirov li keseyetîya wî bi zanebûna wî re lê dinerê, mirov fahm bike ku ew xwediyê zanebûn û pêşketina mazin ya di keseyetîya xwe de ya.

Ku mirov li pêşketin û pêşveçûna Salahadinê Eyûbî ya li di dema wî de ku lê dinerê, mirov, fahm dike ku wî rêya rastiyê pêşniyar kirîya. Salahadinê Eyûbî, ew dema wî û pêşketina wê, heta roja me jî, li ser tê axiftin û bahse wî, dema wî û keseyetîya wî tê kirin. Lê divê ku ez careka din jî bibêjim ku hemû nivîsandinên di derbarê van hersê xalan ên di derbarê wî de, hê jî, muhtacê fahmkirinê na. Li gorî rastîya wî û têgihîştina wî û ya dema wî de, hê ne ew hatîya fahm kirin û ne jî keseyetîya wî hatîya fahm kirin. Bi teybetî, di dema ku li ser wî tê nivîsandin û bahse wî dihe kirin, weke xala sereke ya ku bi wî re û bi jîyane wî re bahse wê tê kirin, serefe wî ya li Qûdûsê ya. Di dema wî de, sefera xaçîya li Qûdûsê dibê û ew jî diçê û li dijî wî disekinê. Ew serkevîna wî, heta roja me jî, hê bi nav û bandûra xwe re jê tê axivîn.

Ya rastî, ez wilo fahm dikim ku hewceyî pê heya, vê beşa jîyane wî, divê ku mir ov bi teybetî hildê li dest û bêne ser ziman. Li ser wê beşê û şerê wî yê bi xaçîyan re ê li Qûdûsê, divê ku mirov bi teybetî hildê li dest û fahm bike. Ev yek, ji bo ku hem ew bi awayekî rast û pak were fahm kirin pêwistî pê heya û hem jî ji bo ku derfet ji fahmên şaş û xelat re newê dayîn. Ew sefera wî, pêdivî û pêwistî pê heya ku bi serê xwe were fahm kirin. Berî ku em bi buhurîna hanîna xwe ya li ser ziman ya li ser wê dema Salahadinê Eyûbî, hewceyî pê heya ku mirov aliyekî wî yê din jî di vir de bi teybetî bi gotinekê jî bê bifahmî û vekirî bêne ser ziman. Ew jî, ev a, ku Salahadinê Eyûbî,

nêzîkatîya wî ya teybet a. Ku mirov wê nêzîkatîya wî fahm nekê û di wê çerçovê de hewl nedê ku wî fahm bike, mirov wê bi awayekî rast wê fahm nekê. Emê li jêr bi teybetî li ser bisekin in, lê li vir bi gotinekê jî bê, em bibêjim ku Salahadinê Eyûbî, di temenê nêzîkatîya xwe ya ku weke peymanaka di nava gel û xalkan de ku mirov divê ku wê bixwêne, divê ku mirov lê binerê û wî fahm bike. Wê hingê, di destpêkê de ew baş were fahm kirin. ...

Dema Salahadinê Eyûbî, weke demeka teybet a. Ew dema wî, ji aliyê desthilatdarîyê ve kurd, li herêmên xwe xwediyê serdestî, serwerî û desthilatdarîyên xwe yên ku bi deh salan ew didom in a. Bi wê yekê re, mirov karê bibêje ku ew di herêmên xwe xwe xwediyê rêzanîyaka mazin ya bi xwe re na ji xwe re û ji dora xwe re. Lê divê ku mirov hinekî çavekî li demên berî wî jî bixê. Bi teybetî, li Kurdistanê, di wê demê de, du navendên herî giring û bi hêz hene. Yek ku weke mîreteyeka ku hê ji dema Medîya maya rojhilatê kurdistanê ya. Ya din jî bi teybetî herêma botanê ya ku hema bêja başûr rojavayê kurdistanê hemûçkî jî dike nave xwe de ya. Kurd, bi xwe re xwediyê pergaliya xwe giştî ya bi yek-xwûdayî na. Temenê wê bi civat û kevneşopîyên xwe re diafirênin û dayimî wê bi wan re didina domandin. Lê divê ku ez bibêjim ku rojhilatê kurdistanê û herêma botanê ku ez weke bakûrê kurdistanê jî bi nav bikim, bi awayê pêşketina xwe ve j î, xwediyê hin teybetmendî û xosletên ku mirov wan bi teneserê xwe tenê karê bi wan re bêne ser ziman in. Teybetmendî û xosletên herêma botanê, ku hê ji dema Gûtîyan ve di domên bi pêşketina xwe ve diudom hene. Piştî dema medîya, wê li rojhilatê kurdistanê, çend mirovên ku bi aqilê xwe re wê di demên piştê jî, werina ser ziman û wê bi aqilê ku wan hanîya ser ziman re wê pêşavanîya wan bidomê tên û diçin. Piştî Zerdeşt re wê Manî û Mezdek werin û herin. Ev herdû jî kurd bûna û piştî xwe re, di asta pêxemberan de hatîna pêşwazî kirin. Wilo jî, hatîna dîtî. Rengê pêşketina di hizirên wan de, bi teybetî, ez karim bêjim ku wê di demên piştî wan re wê werina fahm kirin. Piştî Manî re wê Mezdek were û hizirên xwe bêne ser ziman û wê li dora xwe civata xwe bi afirêne. Piştî Mezdek re jî, wê Babek were ku ew jî kurdek bûya. Babek jî, hizirên wî, weke yê Mezdek û Manî bûya. Di şop û kevneşopîya wan de dimeşê.

Bi vê rengê, derketin û pêşketin ên ku di bin re, wê rojhilatê kurdistanê şekl û awayê xwe yê pêşketinê bistêne. Li ser van mirovên mazin ên ku hatina û çûna re wê awayê pêşketina xwe dîyar bike. Bi vê yekê re, weke ku di dema Sasanîya de ku ji sadsalên sêyemin û bi vir de, wê xanadanên kurd ên ku wê bi demê re bina dewlet û bigihijina asta împaratoriye ên weke Kavşakîyan(226–380), bi rêzê Xanadana kirmaşan ku navende wê herêma kirmaşanê bû û di sadsala duyemîn, sêyemin û hinekî jî di çaremin de jîyan, Sadaqîyan(770 – 827), Aysanîyan(912–961), Anazîdî(990–1116), Rewandî(Bi navê "rawwadî" jê tên bi navkirin, 955–1071), Kakoyîdî(1008–1051) û hwd hene û tên û diçin. Lê çend ku nav hatibê gûharîn jî, xat û kevneşopî yek a. Bi xatî û kevneşopî, wê rêveberîya kurdan bi vî rengî li herêmê wê hertimî wê hebe. Dem û dewleta Şadadîyan jî, yek ji wan dem û dewlatan a. Şadadî jî, wê di nava salên 951 û 1174 û herin. Ev xanadan û ankû mîrgehên kurdan ku dewlet jî ava kirina, ku mirov di nava wan de hê

karê gelek navên din ên bi vî rengê û dema wan re bêne ser ziman, di xate dîrokî de di rastîyekê de meşîna.

Beremberî wê, li herême botanê yanî li ber dîclê û firatê jî, wê dewlet û desthilatdarîya kurdan bi bînavber wê hebûna xwe bide domandin. Berî zayînê, wê ji dema Gûtîyan û bi vir de ku dem bi dem bi navê "desthilatdarîya kurmanca" n jî were bi navkirin wê hebe. Berî zayînê bi navê "gord" jî hatîya bi navkirin. Ev bi navkirin, di dora salên 1500 heta ku dema Medîya jî dibê. Ji ber dîclê heta ku tê û digihijê ber ber çîyayên Zagrosan, wê xwediyê rêveberîyaka mazin ya bi desthilatdarî bin li herêmê. Piştê jî, wê bi domê. Dem bi dem, tenê nav guharîya, lê nîrx û kevneşopî û xat ne guharîya. Ji wê demê de heta ku dem tene demên piştî zayînê, wan demên ku wê deme Salahadînê Eyûbî, bi vî rengî, dem bi dem, demên pêşketinê bînavber domîya na.

Rojhilatê kurdîstanê, bi xata xwe ya pêşketinê re bi demê de, wê cûdabûnekê ji ya herêmên din ên kurdîstanê bi xwe re bêne. Sedemên vê jî bi dîroka wê ve girêdayî na. Di serî de, ev herêm, berî zayînê jî û piştî zayînê jî, di wan demên derketina Manî û Mezdek de jî, wê li ser wê xata Zerdeştîyê bimeş in. Rojhilat, dema ku bi vî rengî pêşve gîvayên xwe diavêtin, wê bakûrê kurdîstanê ku navenda wê herême botanê û biteybetê ber dîclê ya, wê di awayekî din ên pêşketinê de bi rê ve herin. Piştî dema Medîya, wê Rojhilat, êdî wê navendîtiya xwe bide domandin. Lê navendîtiya herême botanê û bi teybetî jî ber dîclê, wê bi dîrok û mejûya xwe ve diçêt demên berî zayînê ta dema jiyîna dema Nebî Nuh. Bi vê yekê re, wê ne tenê, weke navendeka ji rêzê jî bê, wê weke navendeka olî û wê xata olî jî bê.

Ew xata olî ya ku em bahse wê dikin, vê hertimî wê herêmê weke navendeka pîroz bipolarêzê. Salahadînê Eyûbî, ev xata dîrokî ya olî dizanî û di derbarê wê de xwediyê zanebûnaka mazin jî bû. Li ser wê xatê de bûya xwediyê bandûr û pêşketin. Salahadînê Eyûbî, divê ku mirov wî bi teybetî, weke ne weke rêveberekê bêne ser ziman. Divêt ku mirov wî weke serokekî civatî yê stretejîkî fahm bike û bêne ser ziman. Di wê temenê de, fahmkirina wî ya di derbarê wî de, wê mirov bigihijêne rastîyên demê yê hizrî û kevneşopî ên ku li ser wan re dem pêş dikeve û dîrok tê nivîsandin. Ev hêzîya kurdan ya li herêmên xwe, ku misilmantî derdikeve li holê, wan bike hêzeka mazin ya pirr giring ya di olê de. Bi teybetî, weke ku di navberê de di vir de bibêjim ku Bahlûl û birayê wî xarû Reşîdê ku bûna xalîfe ji li ser serê Abasîyan, bi aslê xwe kurd bûna. Bandûra Bahlûl, ji ya birayê wî Xarû Reşîd, zêdetir di nava kurdan de bûya. Piştî wan re, weke ku di qasra Abasîyan de derba hatibê kirin, rêveberî hatîya û guharîya. Ji rengê awayê pêşketina rêveberîya Abasîyan ya piştê de, mirov vê yekê fahm dike. Vê gotina ku me got ya ku "mirov fahm dike ku weke ku derbeyek li qasrê bûya", awayê pêşketinê ê demên piştê ya desthilatdarîya Abasîyan bi me didina gotin.

Piştî hatina Ola îslamê û piştire, wê êdî piştî deme "asrî-saadêdê" ya dema pêxemberê mazin Hz. Mihemed, êdî piştire wê şerên desthilatdariyê wê di nava rêveberîyê olê bixwe de jî bidom in. Bûna Şerê kerbeleyê û bi wê re derketina mezhebê olê ê bi navê Şîtiyê û piştire duqatbûna di nava rêveberî û cihane îslamê de ku bû, wê bi xwe re, wê rengê rojhilatê kurdistanê ê ku ji dema Medîya maya ê bi farisan û kurdan bi hev re ku pêşketîya, wê ji xwe re bike bingeh û pêş bikeve. Ji xwe, berî hingî, Manî û Mezdek jî, hem di nava kurdan de jî û hem jî di nava farisan de jî, weke du mirovên pîroz ên pêxember jî hatîna pêşwazî kirin û hatina derxistin li pêş û rêz û hûmet ji wan re hatîya girtin. Bi vê yekê re, di aslê xwe de, şîtiya ku di dema pêşî de derket, afirî û bû, bandûra têgihîştina Zerdeştîtiyê û bi wî re ya Manî û Mezdek jî tede bicih bûbû. Bi vê yekê re, rengê wê cûdabû bû. Rojhilatê kurdistanê jî, navende wê pêşketina olî bû. Rojhilatê kurdistanê di dema Medîya de bi Zerdeşt re jî bûbû navend, piştire jî di dema Manî de bû navend û piştire bi Mezdek re jî bûbû navend. Manî jî, hizrên xwe yên ku di xata Zedeştîtiyê de hanîbûn ser ziman, bi teybetî bandûra wan li rojhilat û başûrê kurdistanê pîrr mazin bûn. Bi wê yekê re, êdî ev herêm, bi vê xata pêşketinê û awayê wê re bû navendeka mazin ya giring. Bakûrê kurdistanê jî, çend ku bandûra van Zerdeşt jî, Manî jî û Mezdek jî hebûn jî, lê di demeên piştî zayîne û bi teybetî jî di demên îslemetîyê de yên ku derketina li Pêş, ew xata binirx ya Bi nebî Nûh re û piştî re ku bi Birehim Xelîl re afirîbû derketibû li pêş û awayê xwe dabûbû awayê pêşketinê. Salahadinê Eyûbî, li wê herêmê li Herême botanê mazin dibê. Bi wê re, bi wê têgihîştinê mazin dibê û derdikeve li pêş.

Piştî ku Îslemîyet derket, êdî piştî şerê li kerbeleyê re, di cihane îslamê de du navendên giring ên olî ên ku xalîfetiya xwe ji denezendin afirîn. Yek, bi navendî bi kurdên başûr û rojhilatê kurdistanê farisan re bûbû Baxda. Rêveberîya din jî ku ji Şamê heta ku digihîşt nivîgirava araba û Mekke û Medîne ku lê serdest bû, rêveberîya Sûnnî ava bû. Piştî ku herdu rêveberî ava bûn jî, piştire bi hev re ketina şer de. Seferên ku misilmanên Sûnnî li yên şîî kirin û şerên ku misilmanên şîî ên ku bi misilmanên sûnnê re kirin, wê mohra xwe li dîroka îslamîyetê ya wê demê bide. Bi vê yekê re, ji binî ve duqatbûn afirî bû. Ku mirov vê duqatbûna ku ji binî ve baş û qanc fahm nekê, mirov wê êdî wê hewldana Salahadinê Eyûbî ya ku wî di xwest ku cihane îslamê bike yek û çû bi ser Baxdayê de fahm nekê. Armanca Salahadinê Eyûbî, ne ew bû ku şerekî bike. Armanca wî ya pêş û sereke ew bû ku yekbûn û danûstandina di nava cihane îslamê de ava bike. Wî, denezandibû ku nirxên ku şîtiyê ji avakiribûn ên cihanê îslamê bûn. Bi vê yekê re, wî xwestibû ku vê yekê bide fahm kirin. Ev hewldana wî, di dema wî de, di nava zaneyan de jî tê ser ziman û ser nivîsîn jî dibê. Bi wê yekê re, xalîfetiya Salahadinê Eyûbî jî tê herê kirin. Salahadin, ew mirov bû ku hem ji aliyê misilmanên ti mezhebên olî ên ku heta wê demê afirîbûn, mezhebên weke malîkî, hembelî, Şafîî, Şîî û hwd ku di wê demê de bandûra wan jî mazin hebû, ew red ne kiribûn. Hemû alîyan ew herê kiribûn. Bi wê yekê re, ez karim bibêjim ku wî cihane îslamê kiribû yek. Piştî Pêxemberê mazin Hz. Mihemed re, weke serekekî mazin ên îslamê ên herî mazin ew derketibû.

Salahadinê Eyûbî, serokatîya hişî û aqilî kir. Mirov, nikarê, wî tenê weke serokfermanderekî bêne ser ziman. Ku mirov ji vî aliyê ve wî bêne ser ziman, wê tenê ji aliyekî ve ew were ser ziman. Lê ew ne hemû aliyên xwe ve were ser ziman. Teybetmendîya wî, bi teybetî, ji aliyê aqilê wî ve derdikeve li pêş.

Bi vê yekê, divê ku mirov li nêzîkatîya wî ya li Qûdûsê jî binerê. Ew çû bi ser Qûdûsê de û pêşîya hemû seferên ku hatina bi ser de girt. Piştî wê serkevtina wî re, piştê jî, ku çend hewldanên biçûk bûn jî, lê êdî temenê serkevtinê ji bo wan nemabû. Salahadinê Eyûbî, bi teybetî, wî giringîya Qûdûsê dizanî. Bi vê yekê re, ew dema ku çûbû bû bi ser wir dem, di serî de wî şerê bi hêzên ku hatina bi ser wir de ku wir bikîna bin destê xwe re kiribû. Wekî din jî, li Qûdûsê, di wê demê de jî, ji herçar olên mazin jî, mirov û malbat li wir dijîn. Wî, peymanaka di dema ku ew li wir bû de di nava hemûyan de da çêkirin. Herkesek, wê malên wê were parastin. Wê ti kesek li ti kesekî tûndûtûjîyê neke. Bi vê yekê, di dema ku aramî da çêkirin û peyman da çêkirin, piştê, ew ji Qûdûsê di vegehîyê û tê Rehayê. Li wir êdî dimêne. Piştê jî, di buhurê Şamê.

Salahadinê Eyûbî, ku mirov wê dema wî baş û qanc fahm nekê, mirov wê êdî nikaribê, bi temenî, wî jî û tevgerên wî jî fahm bike û bi wate bike. Wî, nixrên civatî yên komên civatê red û înkâr nekirin. Wê bi nêzîkatîyaka ku hemûyan bi hev re bi rêz himbêz dike pêşwazî dike. Bi vê yekê jî, ew ji nêzîkatîya bi zanebûn biewla bû. Ji ber wê ewlabûna wî bû ku di dema ku ket ber zikratan de şîretên li ser mafî û dadîyê li yên li dora kirin û weke gotina xwe ya dawîyê gota wan ku "di deme ku ez mirim, bi min re şûrê min jî bikîna tîrba min de, da qana şahîdîya min bi min re li cem xwûdê bike." Ev gotina wî ku mirov wê bi nêzîkatîya wî re şîrove dike, mirov dibîne ku ew ji kirinên xwe hertimî bi ewla bûya û ne hiştîya ku xelatîyan di jîyane xwe de bike. Wekî din, ev gotina wî, tiştêkî din jî dide berçav. Ew jî, ew a ku ew di derbarê kirin û nêzîkatîyên xwe de bi zanebûn a û bi zanebûn gav a xwe diavêje.

Salahadinê Eyûbî, di dema ku mirov ew hanî ser ziman, divê ku mirov bi teybetî têgihîştina wî jî bi wî re û bi dema wî re fahm bike. Bi wê re, wê hingê, ew bi rastî û pakî were fahmkirin. Di rastîyê de, divê ku mirov fahm bike ku Salahadinê Eyûbî, mirovekî ku bikevneşop bû. Bi wê yekê, ew yekî ku wî xwe bi di wê kevneşopîya ku ew jê hatibû wî xwe dabûbû herê kirin. Êdî bi vê yekê, navê wî derketibû bû. ew hatibû naskirin. Bi vê yekê, êdî wî karîbû ku li Kurdistanê di hundurê çend rojan de artişên bi deh hezaran ava bike. Salahadinê Eyûbî, bi teybetî ji bo wî mirov divê ku bibêje ku wî hêza xwe ji zanebûna xwe digirt. Ew, di zanebûna xwe de ji xwe jî yekî ku bi ewla bû. Bi wê yekê re, wî xwe dabûbû herê kirin.

Salahadinê Eyûbî, Bixwe jî, divê ku ez bibêjim ku malbate wî ji kurdên aliyê rojhilatê kurdistanê bûn. Lê ew aşîra wan rawwadî, weke aşîraka pirr çengî bû. Di demê de, li gelek herêmên kurdistanê belav bûbûn. Li qasra mîr Zengî jî demeke ma ya. Li wir, li pirtûkxaneya li

qasra Mîr Zengî ku bahse wê dihê têt gotin ku bi deh hezaran pirtûk tède hebûna, ji wê jî sûd digirê. Salahadîn, bi vê yekê, di dema ku mazin dibê û piştire ku di buhurê bakûrê kurdistanê. Kalkê wî Şadî Ber Firatê ji Reheya heta ku digihîşt ber Çemê Amedê û hwd, lê belav bûbûn. Aşîra ku kurd ya ku Dewleta Merwanîyan Avakir ya Merwan bixwe jî, çengek ji wê aşîra wan bûya. Lê di demê de hem zêdebûna û hem jî mazin û bi hêz bûna.

Di vir de, di temenê vê belavbûna vê aşîra kurd de ez divê ku vê jî bibêjim. Ev aşîra kurd, çengên wê yên ku li Başûr û rojhilatê kurdistanê jî bûn. Bi nirxa Şîftiyê jî jîya na. Bi vê yekê, wan hertimî, di nava xwe de têgihîştinên xwe yên olî di nava xwe de nekirina temenê dubendîyan û xûsûmetan û li dijî hevdû ne sekinî na. Hertimî rêzek ji hevdû re girtina. Bi hevdû re karîna bi rêz û hûrmet bijîyîn. Bi teybetî, di vir de, ez divê ku vê yekê jî bibêjim, ku kurd, di nava xwe de, xal û destûrên xwe yên kevneşopî ên ku di serê wan de pîrr zelal bûn û safî bûn, bi wan jîyana û nêzîkatî li hevdû kirina. Bi wan xal û destûran, êdî rêz û hûrmet jî nişanî nirxên di nava xwe ên cûda jî dana. Kurdên herême botanê ên ku ne bi şîftiyê mazinbûna karîna ku herîna nava civatên kurdên ku bi nirxên ku bi nirxên şîftiyê mazinbûna û hizrên xwe ji hevdû re bînina ser ziman. Ev yek, ji wan re di nava wan de nebûya pîrgirêk. Bi vê yekê re, di nava wan de, ti carî h izrên olî nebûna sedema tûndûtûjîtiyê. Gotinaka ku wan di civatên xwe de hertimî pîrr ji hevdû re dihanîn ser ziman hebû. Ew jî, ev bû ku "hertimî bi aqil û zane" axiftin û gavavêtin bûn. Di nav civate wan de gotinên pîr û kalên wan hertimî li pêş bûna. Di wan deman de û di demên piştire jî, di gelek awa û aliyan de ji wê bi awayekî baş sûd ji girtina. Minaq, bi vê rengê ku di nava de bi cudahîyên xwe re jî karîbûn bi hev re têkiliyê deynin û hevdû fahm bikin.

Salahadînê Eyûbî, lê ez karim bêjim ku wê jîyane xwe ya birêzanî li herême botanê buhurand. Li wir, bi teybetî, li wir mazin dibin. Li herêmê, di nava aşîrên ku hene de, levkirinê dikin û bi wê yekê re hêzeka mazin derdixina li holê. Hem di dema Salahadînê Eyûbî de û hem jî piştire jî, wê Reha yanî ber Firatê, wê ji wê malbat û xanadana wî ya ku bi sadsalan wê desthilatdarîtiyê li kurdistanê bike wê ji xwe re bike navend. Di aslê xwe de, Reha, di wê demê de, weke navendeka stretejîkî jî bû. Li wir, yê ku serdest bana, karîbûn ku bi bandûr û serdestîya xwe êdî xwe bigihêjina Şamê û ji wir jî bi buhurênin. Salahadînê Eyûbî, di farqa vê yekê de bû. Di dema wî de, ew herêm ku ji reha û ber Firatê heta ku digihîşt Şamê, weke navendeka giring ya olî jî bû. Rêveberî û desthilatdariya Emewîyan jî li wir pîrr mazin pêşket. Şam, piştire weke navendeka mazin ya şariştanî jî pêşket. Şam, piştî derketina Mezhebê Şîî hê bêhtir biqadirtir bû. Ji ber ku dih at bawer kirin ku wê Mehdî li wir li cihê ku mizgefta Emewîyan hafîya çekirin, wê careka din were ser rûyê ardê. Piştire, wekî din jî, di hat bawer kirin ku wê Nebî îsa bixwe jî, wê piştî ku ji dunyê çû, wê careka din biheta dunyê û wê ew jî li wir careka din bi heta ser rûyê ardê. Bi vê yekê re, êdî piştire, pêşket û navê wê mazin bû.

Piştî Salahadinê Eyûbî re, xanadaniya wî ya ku ku ava bûbû ku Reha ji xwe re kiribû navend, ji wir, bandûra xwe hem li kurdistanê û hem jî li cihane îslamê domand. Reha, cih û warekî ku navê wê hertimî bi pîrozî jî hatibû ser ziman bû. Reha, weke "male Birehim Xalîl" jî di hate nasîn. Di nava kurdan de jî ew bawerî hebû ku Birehim Xalîl bixwe jî ji Zûrîyete Nebî Nûh bûya û kurd bûya. Ev, bi bawerî, hete vê roja me jî tê ziman.

Li ser temenê mazinbûna Salahadinê Eyûbî, ku mirov gotinekê bibêje, mirov wê karibê vê gotinê bibêje. Weke xala pêşî ku mirov bêne ser ziman, Salahadinê Eyûbî kurd bûya û wî xwe di nava kurdan bi têgihîştina olî jî û ya civatî ya kevneşopî jî daya herê kirin. Weke xalaka din jî ku mirov bêne ser ziman, bi zanebûna wî re ya. Ew, di derbarê dîrokê de xwediyê zanebûn bûya û wî têgihîştina olî bi nîrxên di nava kurdan de ku bicih in ên olî şîrove kiriya û revakirîya û hanîya ser ziman. Kurd, hinekî jî, evîndarê kevneşopîyên xwe bûna. Wan kevneşopîyên xwe, dem bi dem weke rûmetê xwe dîtina û ji bo wan çûna mirinê jî. Weke ku heta roja me jî di nava wan de tê gotin, "wan, bi kevneşopîyên xwe di demê de xwe naskirina." Salahadinê Eyûbî, bi vê jî xwe daya herê kirin. Weke gotinaka teybet, divê ku ez bibêjim ku li wê herême botanê ku nave Dicle û firatê digirê nava xwe, yê ku xwe li wir dayî herê kirin bi xalkê, wê êdî karîba ku xwe hemû herêm ên din ên kurdan jî bidina herê kirin. Ew herêkirina li vê herêmê ya ji bo mirov, weke asta bû û xwediyê astekê jî bû ji bo mirov. Salahadinê Eyûbî, wî di nava cihane Îslamê de yekbûneka mazin ya olî di demê de afirand. Bi vê yekê re, wî navê xwe li dîrokê da nivîsandin. Ku mirov ji kîjan aliyê ve nêzîkî temenê mazinbûna Salahadinê Eyûbî bibe, mirov ku ew xalkê ku ew jê hatîya yanî kurda, ew xwe dane herê ya wî ya bi wan, ku mirov wê bi wê neyêne ser ziman. mirov wê nikaribê, wî fahm bike. Di wê demê de jî kurdistan, weke navendeka herêmî bû. Bi nîrxê, gelek nîrxên ku berî ola îslamê ku di ola xîrîstîyanê de di temenê de cih girtina ji vê herêmê bûna. Her weha, heman di îslamê de jî bûya. Ji ber vê yekê, divê ku ez bibêjim ku di pêşketina îslamê bixwe de jî, kurdistanê bi vê yekê û rengê bûya cih û warekî giring ê dîrokî di olê îslamê de jî. Li Ber Diclê li Cizîra bota, ku weke cih û warê nebî Nûh tê zanîn û Reheya ku weke cih û warê Birehim Xelîl tê zanîn, dû nîrxên pîroz ên di îslamê de jî bûna. Ew mazinbûn û pîrozîya kurdistanê bixwe jî, bi Salahadinê Eyûbî re xwe daya li rû.

MEJÛYA SERDEMA CIVATE KURD A DEMÊN AQL Û HEMDEM. ..

Beş yek; rojavayê kurdistanê:

Emê bi demên hûrî û mîtanîyan bidest vê bêşê bikin. Li Rojavayê kurdistanê, pêşketinên dîrokî dibin. Kurd, li wir, nûha di nava hewldanên avakirina rêveberîya xwe kurdistanî na. **Lê hêz û desthilatdarîyên herêmê ku heta nûha li ser 'înkar' û 'tûna hasibandina kurdan' herêm bi rêvebirina, ji vê yekê nexweş in. Bo vê yekê jî, çi ji destê wan tê, bo ku pêşî lê bigirin dikin.**

Hêrîşên ku li rojavayê kurdistanê dibin bi destê komê çete ên ku hatina bi rêxistin kirin jî, vê yekê bi awayekî vekirî dide nîşandin. Ji xwe ev herîş hemû, ji aliyê hêzên ku li dijî statûya kurdan in ve tîn bi rêxistin kirin. Her wusa, Tirkiya, di vê demê de, di temenekî pîrr li berçav de, dijminatîya xwe li kurdan dide nîşan dide. Pêvajoya 'çareserîyê' ku kurdan dabû destpêkirin, hêvîyek bi kurdan re dabûbû çêkirin ku tirkîya dev ji wê dijminatî û çavsorîya xwe dij-kurd berdê. Lê di vê demê de, ew hêvî jî, hatina tûna kirin. Tirkiya, ew hêvî bi dayîna piştgiriyê jî çeteyên komên çekdar ku herina bi ser rojavayê kurdistanê re tûna kir. Ev demeke ku ew kom hêrîşî kurdên rojavayê kurdistanê dikin.

Ev herdu heyvên dawîyê, bûna du heyvên ku di wan de şerê bi kurdan re ê li ser van çeteyan re ku dihat meşandin hat dijwar kirin. Ev dem, bû demeka wusa. Piştî ku bi destê çeteyan hêrîşên mazin li rojavayê kurdistanê kirin, nûha jî, gotinên ku dikevina rojevê de, ew in ku "mudahale kirina li rojavayê kurdistanê" ya. Herî zêde yê ku vê dixwezê jî tirkîya ya. Di vê dema ku mudahaleya li Sûrî pîrr zêde dihê nîqaş kirin de, tirkîya pîrr zêde dixwezê ku di nav wê de bê. Ew xwestina tirkîya ya cih girtina di nava mudahale li Sûrî de, bi kurdan ve girêdayî ya. Ku tirkîya, destûr bigrê ku bikeve nava hêzên ku wê mudahale li Sûrî bikin de, wê herî zêde ew(tirkîya) hêrîşî rojavayê kurdistanê bike. Tirkiya, ji ber ku naxwezê ku kurd, bibina xwediyê ti statûyê. Pêvajoya ku kurdan di bin nav 'çareserîyê' de li bakûrê kurdistanê da destpêkirin jî, tirkîya ew pêvajo hanî ber xilas bûnê. Ji ber ku tirkîya, naxwezê ku pîrsgirêka kurd, bi rêyên aşîtîyane were çareser kirin. Ji ber vê yekê, hemû firsandên ku aliyê kurdan nîşanî wê dan jî, bi armanca ku derbeyekê li kurdan bixe de bikarhanî. Di vê dema ku kurdan şer da sekinandin de, dewleta tirk, amedekariy mazin ya leşkerî di wê de kir. Hêzên xwe ên li bakûrê kurdistanê zêdetir kir.

Pêvajo, di vê demê de, di rewşeka bi vî rengî de ya.. Di nava van rewşan de, rewşa rojavayê kurdistanê pîrr giring dibe Rojavayê kurdistanê, giringîya wê, di vê demê de dibe hem wê û hem jî dibe bo bakûrê kurdistanê û çareserkirina pîrsgirêka kurd bigiştî. Divê temenê de, divê ku mirov bibêje ku pêşketinên li rojavayê giringin dîrokî na bo kurdan giştî.

Di vê demê de, bi dîroka rojavayê kurdistanê re, çavekî bigiştî li Dîroka rojavayê kurdistanê xistin giring dibe. Bo ku mirov bigiştî wê fahm bike, ev yek giring dibe. Di vê çerçoveyê de, ku mirov li dîroka rojavayê kurdistanê dinerê, mirov dibînê ku rojavayê kurdistanê, xwediyê dîrokeka pîrr kevn û demdirêj a. Ev herêma, weke herêmekê berdicle, giingîya wê, ji aliyê sîyesî, çandî û dîrokî ve pîrr mazin a. Ji van hersê aliyan ve bi teybetî, emê hewl bidin ku nêzîkatîyê li rojavayê kurdistanê bikin û wê fahm bikin. Kurdan şoreşek li rojavayê kurdistanê. Pêşketin û pêşîya xwe dîtina wê şoreşê jî, wê bi xwandina dîroka xwe ya giştî ya kevn bê. Ji ber vê yekê, pîrr girînga û jîyanîya ku dîroka rojavayê kurdistanê were zanîn û fahm kirin

Ji dema Sûmer(kîengi)îyan û bi vir de rojavayê kurdistanê, ji ber çîyayê kurda û heta berfiratê pêşketina Şariştanî a hûrî û Mîtannîyan. ..

"Çîyayê kurda", ji Herêma Afrînê destpê dike. Biqasî ku em dibînin, ku di dema mîtannîyan de jî ji çîyayê kurda re dihat gotin 'çîyayê kurda'. Heta roja me, bi navê 'çîyayê kurda' re jêre 'çîyayê kirmanc' hatîya gotin. Li vê herêmê, rol û weyna ku 'çîyayê kurda' leyistîya ne kêmî rol û weyna çîyayên Zagrosan û ankû ên araratê û Cûdî ya. Çîyayê kurda, ji her aliyê ve derfeta çîyanê ji jînyane mirov re diafirand. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku 'ava-firatê' jî, bilind bû. Gelek herêmên ku î ro weke herêma zûwa' na, di wê demê de avî bûn. Bi vê yekê, Di wê sêkika Çîyayê kurda, bajarvaniya ku li ber wê bi Afrîn û kobanê re pêşketina û heta ku dihê ber ava-Firatê û hwd, temenê pêşketinaka şariştanî û bandûra wê li hemû dora wê ya. Ji vê herêmê, têgihîştin û aqil û pêşketina herikîya û pijiqîya herêmên ku î ro em ji wan re dibêjin "anatolia". ..

Li Anatolia, pêşketinên şariştanî ku dibin ên weke bi "hîtîtan", "lovîyan" û hwd re jî, wê bandûra vê herêmê û ankû bandûra wê pêşketina hûrî û mîtannîyan a bi şariştanî li wê bibe. Piştî, Fenîkî, wê karê nivisandinê ji wan bigrin û di nava xwe de pêş bixin. Lîdyayî, Frigiyayî û hwd, wê piştî li ser bermehîyên Hîtîtan pêşkevin. Lê wê sûdaka mazin jî van axên ku navend in ji pêşketina hûrî û mîtannîyan re bigrin. Hemû hêzên ku pêşketina û mazin bûna li herêmê, weke ku di dema babilîyan de, di dema Aqadîyan de, di dema Asûrîyan de, û hwd de, wê hewl bidin ku li wir bibina serdest. Hîtîtan jî, xwestina ku li wir bibina serdest. Lê dema ku dîtina ku wê nikaribin, têkilîya xwe bi navên hûrî û mîtannîyan û hwd re bikin ku dênin û baş bikin. Di dema Misre kevn de jî, wê hewldanên firawûnên Misrî bibin ku li wir serdest bibin. Remsesê dûyemin, wê di dema xwe de hewl bide ku were van herêman û li wan şerdest bibe. Keyê Hîtîtî Hattûşîlê duyem, li ser wî çemê avê herêma Xataya roja me bi ber Xûms'ê û hwd ve dirêj dibû serdest bibe. Ev çemê ku di roja me de bi navê "oront"ê tê bi navkirin, li ser xatekê heta Libnane roja me dirêj dibû. Ava wê, di zivistanan de weke ya Nîl'ê bilind dibû. Bo vê yekê, dihat gotin û bawer kirin ku ji Nîl'ê dirêj dibe. Firewûnê Misrê jî, xwe xwediyê wê didît. Bo vê yekê, dema ku hêrîş li niştecihên li ber çem bûbû bûn, êdî **Remsesê Duyem**, artişa kir ser rê de û li ber çem re tê heta nêzî herêmên weke ku di roja me de ji wê re **Marî û Amka** tê gotin. Herêma **Marî** di nava Sînorê welatê Mîtannîyan de dima. Di wê dema ku ew têna wir, Mîtannî jî, artişa amede didin hiştin bo her rewşên ku rû bidin. Ji xwe, Hîtîtan, ne diwêra ku Mîtannîyan hildina hemberê xwe. Ji ber vê yekê, hîtîtî di wê xate li ber sînorê wan de li ser wî çemê 'Oront'ê re meşin. Wan jî, hizir dikir ku wê rastî ti astengîyê newin. Lê dema ku Agahîya wê, digihîjê Firewûn Remsesê duyem, êdî ya ku wê biqawimê êdî diqawimê. Wê piştî wê re, artişa Remsesê duyem were û wê heta **Qadêşê** were û li wir bi artişa **Hattûşîlê duyem** re rast were û wê şer bikin. Firewûnê Misrî, di wî şerî de, wê serdestîya xwe biparêzê û wê herêmên xwe yên ku serdestîya wan lê heya, wê biparêzê. Di wê demê de, Sînorê, welatê Mîtannîyan û ya desthilatarîya Misre Kevn li ber hevdu diket. Helwesta

Mîtannîyan di dema rûdana şerê qadeşê de, ew a ku ew warê xwe û axa xwe biparêzên a. Di wê demê de, têkiliya qasra Firewûnan û ya Mîtannîyan bi hevdu re jî hebû. ..

Ev têkilîya di nava keyên Mîtannî û firewûnên Misrî de ku di temenekî dîplomatîkî jî pêşketîya, di bineterên ku têkilîya mîtannî û misre kevn dihênina ser ziman de tê ser ziman. Namaya Axanaton ku li Amarna hat ditin, vê agahîyê bi awayekî vekirî dide me. Heta kû, di wê namayê de, tê ser ziman ku 'şahbanîya Axanaton ji welatê Mîtannî çûya û keça keyê Mîtannî Tûsrata bûya. Her wusa, di heman namayê de dibêje ku 'dapîr û bapîrên Axanaton bixwe jî ji Mîtannîyan bûna.'

Di dema Remsesê duyem de, "şerê qadaşê" ku bi heyvan didomê di nava wan Hîtîtan de, wê bi armanca hatina wan ya li herêmê û serdestbûna wan bê. Lê Remsesê duyem, wê têkiliya wî bi rêveberîya demê ya hûrîyan re jî hebû. Herêmên ber diclê û firatê, di wê demê de, ji ya ku em dizanîn pîr zêdetir pêşketî û xwediyê dewlemendîyê na. Derfeta jîyanê pîr zêde lê heya. Ev yek jî, bale herkesekê dikişêne li ser vê herêmê. Kîjan hêzî xwe li vir serdest kiriba, weke ku xwe li cihanê bigiştî serdest kiribê' xwe didît.

Ev herêma kurdistanê, ku em î ro bi navê 'roavayê kurdistanê' bi nav dikin, di dîrokê de, weke herêmekê pîr kevn û kevnê mirov ivê ku bahse wê bike. Di serî de, ku em di çerçoveya serdemên aqil û pêşketina wê de, bahse wê bikin, divê ku em bibêjin ku rojavayê kurdistanê, herêmekê weke navend bûya. Berî zayinê, ku em ji sadsala 20' min û pê de, hildina li dest, em dikarin, wê bînina ser ziman. Lê ev herê, bi serê de, jî aliyê dîrokî ve gelek teybetmendiyên wan ên ku ne hatina kifşkirin jî hena. Ev sînorê ku di çerçoveya avakirina sûrî de ku hatiya xizkirin, ti dîroka wê ne bi çandî, ne bi felsefêkî û ne jî bi dîrokî heya. Em nikarin, bi dîrokî bahse wê bikin. Ev sînor, sînorên sadsala 20'an in. Lê berî wê demê jî, ev herêm bi herêmên bakûrê kurdistanê re yekbûn. Ji Afûrnê heta nivîsêbînê û ji serêkahniyê heta Rihayê û hwd, yek-qat in.

Dema ku em bahse serêkahniyê û Riha bikin, divê ku em vê bi hevdu re hildina li dest. Bi teybetî, tê gotin ku ev herêm berî zayinê ji wî re "kalden-Ur" jî hatiya gotin. Lê ji wê zêdetir, Riha, berî zayinê jî, weke herêma navend bûn. Çemê Firatê bereketa wê, ku em bahse wê bikin, ew herêmên rojavayê kurdistanê ku î ro tenê weke hin herêma ardî û ax mana, di demên berî zayinê de bi sayaserê çemê Firatê de hemû şîna û firazên avî bûn. Herêmên Serêkahniyê, pîrranîya wan, ku heta ku digihîşt, ber Afrîn û Kobanê, herêmên avî bûn. Çemê Firatê, berê bilind û gurr bû. Bo vê yekê, gelek herêmên ku î ro weke ku zûwa na jî, di wê demê de dibin avê de bûn. Mînaq, divê ku ez bahse wê bikim ku Serêkahniyê herêmekê bi vî rengî bû.

Berî Zayinê, her demê, kîjan hêzî ku afirîya û bilind bûya, di serî de berê xwe daya wir, li wir, pêşî xwestîya li wir jî bibe desthilatdar. Hinekî jî, ev, sedema wê ji wê dihat ku ev herêm pîr şîna û bi tevger bûn. Navê Serêkahniyê bixwe jî, ji dema hûrîyan a û di dema hûrîyan de jê re

"**Waşukanî**" dihat gotin. Gotin û navê 'Serêkahniyê' bixwe jî, ji wê ya. Lê heta ku hatiya roja me, ku êdfî jêre 'serêkahniyê' hatiya gotin, ne di temenê guharandinekê de lê di temenê peresendinekê de ew guharîn bûya bi gotinê re. Yanî, peresendin, ji gotina '**Waşukanî**' bi ber gotina 'serêkahniyê' ve bûya. Gotina '**waşûkanî**' hem bi rengê tê nivîsandin wateyeka giring dide me û hem jî dema ku bi rengê 'waş' û 'kanî' em jev vaqatênin, wê hin wateyên giring bide me. Di aslê xwe de, di roja me de, yanî bi kurdîya roja me ya herêma botanê gotina ku beremberî wê tê jî "xweş û kenî" ya. Lê ev gotin, gelek wateyên wan ên din jî, hena. Bi teybetî, gotina "kanî", dema ku em hildina li dest, bi qasî ku beremberê "kenbûnê" tê, wilqasî jî, beremberê "kanîyê" tê. 'Ken', dema ku yek bi dilxweşbû û kenî, jî wê tê. Lê kanî, ku bi rengê "kahniyê" jî tê nivîsandin, wate wê ew a ku "cihê ku hertimî têre av diherikê û pirrxweş a", bahse wê dike.

"Waş" dikarê wateyê gotinên "xweş", "baş", "xwiş", û hwd jî bike hundurê xwe de û bêne ser ser ziman bi xwe re weke hin kirdeyên ku bi wê re. Ku î ro jê re "tîl-Ebyed" tê gotin ku ku di wê demê de navê wê "Girê-sipî" ya jî, dikeve rex serêkahniya roja me de jî. Girê-sipî, li dahma Sûrûc'a roja me disekinê û di demên berê de, ev herêm jî weke herêma ku firatê pirranîya wê dikir avî bûn.

Serêkahniyê, ne weke herêmeka giring bûya. Asûrîyan jî di dema xwe de hatinê de û hingî ewder xweşbûya, keyên wan ên ku hatina wir, ne xweştina ku jê herin û li wir xwestina ku bimênin. Di dema ku serdestîya asûrîyan li herêmê ji nû ve pêş dikeve di sadsale sadsalên 7' min û hwd de, kurdan jê re digot "waşûkar" û ankû "waşûg(h)ar". Bi teybetî, ev herêm, weke herêma ku li wan zanist pêş diket jî bûn. Bi teybetî, ku mirov ji herêma Serêkahniyê xwe bigihîhêne girê-sipî û ji wir jî herê Afîrîn û Kobanê, mirov bi teybetî van herêman cihên kevnara(antik) ên giring bibîne. Li dora afîrînê keleh û kirmanên ku heta roja me jî mana, li wan serê şêran ku pîrr mazin hatina çêkirin, serê tayrên baş ku mazin hatina çê kirin û hwd, weke wan em gelek hêkelên giring ku ji dema hûrî û mîtannîyan mana em dibînin. Ji van kirman û hêkelênku het roja me jî mana, em kifş dikin ku ew herêm lê pîrr qasrên mazin ên ku key di wan de dima hebû. Lê teybetmendiya wan kirmanên dora afîrînê ku em dibînin, mirov nikarê tenê bi rengekî fahm bike. Ji wê zêdetir, divê ku mirov bibêje ku mirov divê ku di temenê dibistanna de jî bibîne û fahm bike. Ji xwe, hinek ji wan kirmanan, çend ku weke qasran mazin û bilind in jî, wê hizrê bi hesanî û rehetî bi mirov re didin çêkirin ku ewder berê weke dibistan jî bûna.

Ev herêm, li wê jîyane, pîrr zû pêşketîya. Ev, herêm, hem avî na, hem şînî li wan pîrr pêşketî ya û hem jî jîyane mirov derfetên wê pîrr li wir hena. Bi teybetî, divê ku li vir ez bibêjim ku li gundê xirabreşkê ku li wir ditina parastgeha bo bergkirinê ku li wir hatî ditin, tê gotin ku ne bin 12 hezar salan re kevn a. Gundê xirabreşkê li heman herêmê ya û aliyê rihaya roja me dikeve. Dema ku em van birhanan dihênin berhevdû û em lê dihizirin, em fahm dikin ku temenekî têgihîştinî ê pîrr kevn li wir heya.

Li herêmê, dema ku ez bahse serdestîya hûrî û mîtannîyan bikim, divê ku ez xatekê ji ber afrîn û helebê bidina destpêkirin û bênima girê-sipî û ji wir jî bênima serêkahniya bakûrê kurdistanê ya roja me û Riha û jii wir jî di ber firatê re heta ku digihijê Nisêbîn û hinek herêmên li dora wê, divê ku weke herêmên wan ên navend bênima ser ziman. Riha, ku hertimî weke navendekê bûya, bi wê re jî, ev herêm pîrr mazin û giring bûna û li wan jîyan pîrr pêşketîya. Gelek herêmên ku î ro li wan jîyane bicih a, herêmên ku dibinê avê firatê de bûn. Ji ber çîyayê kirmanca û afirînê û destên çûmê û hamqa û hwd jî, cihna ku pîrr li wan û li dora wan derfeta jîyanê pêşketî bûn. Ev çîyayên kirmanca ku li dora afirînê ya, bi herêma afrînê re di demên berê de weke 'çîyayê kurda' jî hatina binav kirin. Li herêma Afrînê û hwd, cihên xwandin ên weke dibistan jî di demên wê yên berê de hebûna. Bo vê yekê, di demên berî zayînê ên sadaalên 5'min û hwd de, ji herêmên ber bahre reş ên Afîna û hwd jî, mirov bo ku li wan dibîstanan bibînin û li wan bimênin jî ên ku çûna hena. ..

Li gorî ku tê ditin bi dîrokî re, bi teybetî, ku em serêkahniya jêr û ya jor ku î ro sînor di nava wan de hatîya xizkirin ku em bi hevdu re hildina li dest, em divê ku bi wê bibêjin ku weke ku paytaxtî jî ji Mîtannîyan û dema wan re kirîya. Di vê demê de Mîtannîyan, pêşketinaka mazin ya hizrî, felsefekî, olî û hwd li wir daye çê kirin. Ev herêm, bi pêşketina xwe re, hertimî mirov kişandina li xwe. Bi teybetî, herêmeka ku dîroka wê ya pêşketinê ya bi hizir û civatî û hwd jî, ku pîrr kevn a. Bi vê yekê re, em divê ku bibêjin ku ev herêm weke navendeka giring ya şariştanî ya giring a. Bi teybetî, divê ku li vir em vê yekê bibêjin ku berê bilindahîya ava firatê pîrr bilind bû. Bi wê bilindahîyê re, herêmeka fireh êdî dibin avê de bû. Li dora wê herêmê jî, êdî jîyaneka pêşketî pêş diket. Divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku mirov hertimî bo ku jîyane xwe lê bide jîyandin, herêmên avî dihilbijêrê.

Ji aliyê ardnîgariyê ve, em divê ku em ji herêma afirînê ji ber çîyayê kirmanca bidina destpêkirin û werina herêma serêkahniyê û ji wir jî werina herêma Nisêbînê û van herêman bi hevdu re weke herêma ku bi hevdu re yekparê bûna û jîyane li wan bi hevdu re divê ku mirov hilde li dest û fahm bike. Dema ku em afrînê hildina li dest, di wê xatê de heta Nisêbînê neçin û fahm nekin, emê nikaribin bi tememî fahmkirinaka mazin bidest bixin. Her wusa, emê di derbar jîyane û pêşketina hûrî û mîtannîyan bixwe de jî nikaribin bibina xwediyê zanebûnê mazin. Li vir, ku em divê ku weke rastiyekê jî hiildina li dest, em divê ku rojavayê kurdistanê ê roja me, bi pîrranîya wê re di berdewama herêma botanê de hildina li dest û fahm bikin. Di vê temenê de, wê êdî were fahm kirin.

Xate pêşketinê jî, ku dema ku em hildina li dest, divê ku em bi ardnigariyê re ji afirînê herêm bi herêm werina botanê û ji wir jî herina Êrmîyê û ji wir jî bi ber kirmaşanê ve herin. Di vê temenê de, di temenê rengdêrîya ziman û çand û tégihîştin û dîrokê ve jî wusa ya.

Lê ku em cardin vegekihina serêkahnîyê, em divê ku bêjin ku ev herêm pîrr kevn a. Navê wê jî pîrr kevn a. Navê wê jî dema hûrî û mîtannîyan a Ev herêm weke herêmeka berîavî ku weke cihê xweşî û dilxweşîyê bûya. Bo vê yekê, kî ewder kifşkiriya ku key jî ba, wê dilê wan li wir maba û wê xwestiban ku li wir bijîn û ankû wir bikina bin destê xwe de. Weke bihûşteka li ser rûyê ardê jî bû. Ev herêm, temenê jîyanê jî li wê zû pêşketîya. Dema ku em ji aliyê civatî û pêşketina wê ve wê herêmê hildina li dest, em divê ku pîrr kevn herin. Ji xwe, nîşanak û birhanên ku hin bi hin derdikevina li holê ên weke li xirabreşkê û hwd, didina çendî jîyane li vir kevn. Lêkolînên bi ardkolanê ku li wir bi awayekî rast werina kirin, wê gelek nîşan û birhan jî werina ditin ku wê ne tenê dîroka herêmê ya heta roja me ku hatî nivîsandin wê jî binî ve pîrranîya wê bide guharandî, her wusa wê gelek guharandinan di dîroka cihanê de jî bide kirin. Pêxemberên ku hatina çûna jî, hatina û xwe li vê herêmê girtina. Ji Birahîm Xelîl û heta gelek pêxemberên ku piştî wî hatina, li wir xwe ditin û fahma xwe mazin kirina.

Ev herêm, em wusa fahm dikin ku bi teybetî, ji demên berê zayînê ên sadsale 14' min û pêde, di temenê pêşketina aqil û zanîn û hişmendîyê û hwd de, ev herêm ji herêa afrînê heta digihijê serêkahnîyê û hwd, weke herêmeka perwerdekirinê û xwe pêşxistinê jî hatiya ditin. Nîşanakên ku em rastî wan tên ên dîrokî û civatî û civaknasî û her wusa hizrî û hwd, vê yekê bi me didina fahm kirin û hişkirin.

Dema Mîtannîyan, divê ku em weke demeka ku di wê de zanîn û aqil pîrr kûr pêş dikeve lê binerê. Ev dem, di wê de, aqilê ku pêş dikeve, aqilê ku di wê de hiş heya û hiş di wê de pêşketîya ya. Her wusa, divê ku mirov herê bike ku ev dem, demna teybet ên pêşketinê na. Pêşketina ku di vê demê de pêş dikeve, em dikarin bêjin ku wê pêşketinên demên piştî jî bidina afirandin. Pêşketinên olî, hizrî û civatî û hwd, di vê demê de destpêkeka wan ya teybet û hemdem heya ku em dikarin li gorî dema me û sadale me bînina ser ziman. Kifşên bi Xirabreşkê re dide nîşandin ku pêşketina hizrî li vê herêmê, pîrr kevn diçin. Bi vê re, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku gelek qalibên hizrî ên 'aqadamikî' ku hatina kifşkirin jî, êdî weke ku bi kifşên li serêkahnîyê û afrîn û xirabreşkê re guharînê wê di xwe de bidina çê kirin.

Bi teybetî, divê ku mirov binxatkê û bibêje ku berî zayînê di salên 3 hezaran de jî, xanadanên weke 'xanadana Ur ya sêyemin' û hwd jî, ku hatina, li ber firatê pêşketina û bûna xwedî desthilatdarî. Dema Urîyan berî zayînê diçê ser 3 hezar salan re. Lê ev dem "weke demeka 'ronasansa dema deme sûmerîyan'" jî hatiya ditin û salix kirin. Di wê xate di berfiratê de ku jî bakûrê kurdistanê digihijê heta başûrê kurdistanê û hwd jî, weke xateka ku bi teybetî, divê ku mirov bahse wê bike ya. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov bibêje ku hemû nîşanakên ku em kifş dikin, didina nîşandin ku dîrok jî ya ku tê gotin û ser ziman pîrr kevtira. Di vê çerçoveyê de dema Sûmer(kîengir)îyan jî, weke demeka şariştanî ya pêşketî ku sazî û pergâlên wê ên rêveberînî û tēgihiştinî bi awayekî pêşketî hena dihê û li ber me disekinê. ..

BI teybetî, ku em weke demên aqil û êdî ku hiş û hişmendî ku biserdestîya wê ya li jîyanê ku pêşketî re ku êdî dihê bikarhanîn, ku mirov di vê çerçoveyê de hilde li dest, divê ku mirov bibêje ku demên aqil, wê hê di wê dema Ur'an û ankû dema Sûmerîyan de dest pê bike.

Berfiratê, ji vê xate ku em weke sêkika Afrîn, Serêkahniyê û ji Rihayê heta digihijê Nisêbînê de destpêka dîrokî û jîyanî ya pirr kevn jînkiriya dihêne ser ziman. Ev herêm weke "bihûştê li ser rûyê ardê" jî hatîya ditin û ser ziman. Ew bihûştê ku Adam û hewa têde man û jîyan, dihê gotin û bawerkirin jî ewder a. Ew bihûşt, bi firatê û ave wê bû. Bi demê re, çendî ku firatê û berfiratê hêriş û tarûmarî jînkir, êdî ew bihûştîtiya wê ya ku ji pêxemberan e malavani kirîya jî, hin bi hin bi awayekî ji jiyane dunyê bixayidê ji holê çû û winda bû. Yê ku ew bihûşt ji holê rakir, mirov bûn. Bo vê yekê, divê ku ez bibêjim ku guneh û valahê li ser mirovan ê wê pirr a. Mirovan, destpêkên ku pêşketina wan jê ya ji hlole rakirin û ew jîn kirin. Bi teybetî, ku em bi hêriş û seferên metingerî û îlhakkirinên li berdiclê û firatê binerin, em divê ku bibêjin ku ew destpêka ku ji wê destpêkên şariştanî û têngihîştinî û mirovatî ku ji wê bûna, hatîya ji holê rakirin.

Herêmên rojavayê kurdistanê, herêmên navend in ji dem û pêşketina Hûrî û Mîtannîyan a hemdem re.

Rojavayê kurdistanê, ku em li kîjan dema wê binerin, emê bibînin û kifş bikin weyneka dîrokî leyîstiya. Hertimî, ew herêm bûya weke 'girêka gordion'ê. Kîjan, hêz derketîya û xwestîya ku li herêmê xwe serdest bike, kirîya ku pêşî xwe bigihêne wir. Ku li wir, xwe dikira serdest, êdî li herêmê bigîştî dikir ku xwe bike serdest. **Di vê temenê de, ku em bi teybetî, em ku weke demên hemdem ên herêmê jî em bînin ser ziman ji demên hûrî mîtannîyan û hwd ve ku em dinerin, em wê yekê dibînin. Piştî sadsale 7' min û pêde, ku êdî hin bi hin hêza hûrî û mîtannîyan weke ku hinekî kêma dibe û hêzên nû li herêmê derdikevin, hêzên ku derdikevin em dibînin ku berê xwe rastrast didina li wir.**

Ev herêm, ji aliyê çandî, têngihîştinî û hizrî, û olî û bawerî û hwd giringîya wê mazin hebû. Lê wekî din ji aliyê serdestî ve jî, ev herêm bûna xwediyê giringiyeka dîrokî. Ev herêm, bûya weke weke kemberekê li herêmê ku kê li wê kemberekê serdest bûba, wê êdî li herêmê bigîştî bûba serdest. Di vê temenê de, çûyina li wê herêmê hebû. Bo vê yekê, çend ku ev herêm, di pirtûkên pîroz û hwd de, weke "bihûştê li ser rûyê ardê" jî, dîsa ji aliyekî din ve bi rastî seferan hatina wê re şer ji wê kêma nebûya. Li herêmê, ev herêm di vê temenê de giringiya wê hebûya.

Ji wan demên berê ên dema hûrî û mîtannîyan û heta ku digihijê dema me, em dibînin ku ev herêm hertimî di vê temenê de rastî hêrişan hatîya. Piştî ku Îslemiyat hat, wê jî, cihê ku pêşî berê xwe dayê de ev der bûya. Di ola cihîtiyê de jî, ola filehiyê de jî û li di ola îslemê de de jî, hizrên wan ên bingihîn ku hatina afirandin, ev nîrxên wan herêman hatina esas girtin. Berî van hersê olan ku bi hezaran salan jîya ya û serdest maya ola êzdatiyê bûya. Olên din ên ku hatina û pêşketina, ji

ancamên pêşketî ên vê ola êzdatîyê sûdgirtîyan û xwe û têgihîştina xwe afrandina. Piştê di hersê olên weke cihûtî, filehî û mmisilmantiyê de jî, derketina dervî pergale olî ya ku êzdatîyê afrandîya nebûya. Hemûyan jî, pergale êzdatîyê bi şîroveyên cûda ji xwe re kirina temen û li ser wê re pêşketina xwe dane jîn kirin.

Olda êzîdîtiyê, ji herêma Reheya û heta ku herêmên din ên rojavayê kurdistanê, ji dema hûrî û mîtannîyan û hwd ve, serdestîya wan ya pirr xort hebûya. Berî hûrî û mîtannîyan jî, ew pêşketina wê hebûya. Bi teybetî, divê ku ez bibêjim nixê têgihîştin û hwd, ku bi têgihîştina "şahmaran" û hwd re dihê li holê, ji herêma Nisêbînê û heta digihîjê herêmên qamişlo, koban, afrîn û hwd, li wê qadê herî zêde lê serdest bûya. Bo vê yekê, bandûra wê çand û têgihîştina ku di temenê bawerîyekê de jî dihat ser ziman, wê ji ber çîyayê cûdî heta ku gihîşt ber çîyayê kurda(çîyayê kurda 'weke "çîyayê kurmanca" jî dihê binavkirin) ku li dora afrîn û kobanê û hwd a, wê hebe.

Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku Herêma Nisêbînê, weke herêmeka pirr girîng a ku di roja me de jî, hê ew girîngiya wê bi başî ne hatiya fahm kirin. Bajare kurdan ê Nisêbînê, di dema sûmerîya de jî bi navê "nirbo" bû. Piştê, ji dema sûmerîyan, heta ku dema tê dema Gûtîyan û hwd, wê navê Nisêbînê weke "nîsîbîs"ê were ser ziman. Navê 'Nîsîbîs' wê di dema hûrî û mîtannîyan û hwd de jî, wê were bikarhanîn. Ev herêm, di wê demê de bi çem û herêmên wê ên avî û dewlemend re, wê hertimî weke "navendekê" were ditin. Di nava xalkê de, gelek gotin û vegotin û çîrok jî li ser Nisêbînê hatina vegotin. Di gelek çîrokên kurdan ên ku li dora Nisêbînê û Cizîra botanê de ku dihên gotin de nisêbîn, weke "bajare dilan" dihê ser ziman. Di gelek çîrokan de weke "bajarekî ku biafsûn" hatiya ser ziman. Heta ku dihat gotin ku "çin jî, li nisêbînê dijîn." Ji wê ya ku ji kurdan re hatiya gotin ku "kurd, cin in." Piştê, ku ji van çîrokan hatibê derhanîn, hatibû gotin ku "bajare cinan" jî. Şahmaran jî, dema ku vegotina wê dihat vegotin, hinekî bi afsûnî dihê ser ziman. Ji ber vê yekê, navê wê di gelek çîrokên din de jî bi nisêbînê re hatiya ser ziman. Di wan vegotinan de nisêbîn, weke "welatê şahmaran" jî hatiya ser ziman.

Ev rengên gotin û vegotin û çîrokan hwd, li herêmê heta roja me jî dihên vegotin. Lê li vir, divê ku mirov bibêje ku hemû vegotin, çîrok û hwd ku li dora Nisêbînê dihên vegotin, em bi hinek rengên din ên vegotinan û hwd bê, em li bajar û herêmên din ên rojavayê kurdistanê dibînin. Ji xwe, ev herêmên rojavayê kurdistanê û herêmên botanê ên bakûrê kurdistanê, ti carî jev ne dihatina veqatandin. Ev herêm, di her demê û dîrokê de jî bi hev ve girêdayî bahse wan hatiya kirin û dihat kirin. Jiyanê li van herêman jî, bi civaknasîyaka xort hebû. Her wusa, bi hev ve bû. Yekqat bû. Di dema berê de jî, dema ku dihat gotin "herêma botanê", rojavayê kurdistanê jî bigiştî di nav de dihat ser ziman. Gotina 'botan'ê bixwe jî, bi rengê "buhtan" û hwd, ji dema gûtî, hûrî û mîtannîyan a. BI teybetî, di dema gûtîyan de, mirov dikarê bêje ku dihê bikarhanîn bo vê herêmê bigiştî.

Herêmên weke herêma 'serêkahniyê' hwd, ku di dema mîtannîyan de navê wê "waşûkan" û hwd bû, ev herêm weke herêmekê avî û pêşketî û şîn bû. Jîyane li lê jî, bi wê xaml û xweşikatiya xwe bale herkesekî kişandiya li ser xwe. Bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku jîyane li vê herêma li ber ava-firatê, divê ku mirov bibêje ku jîyane pirr kevn a. Li herêma rehayê, herêmên weke gundê 'xirabreşkê' hwd, ku dihê kifşkirin ku jîyan li wan berî zayînê bi 12 hezar salan jî hebûya, hinekî jî kevneriya jîyane li vê herêmê jî bi xwe re bi nîşanak dikin. Bêgûman, divê ku mirov bibêje ku jîyane li van herêmên li ber ava-firatê û heta ku digihijê berdiclê û heta ku digihijê herêmên rojhilatê kurdistanê ên weke Êrmiyê, kirmaşanê, aqbatanê û hwd, ji ya ku em dizanin kevntira. Ji xwe, bi kolanên 'arkologî' û hwd re, ya ku hin bi hin derdikeve li holê ev a. Di derbarê şariştanên berî zayînê de, zanîn me kêma hena. Bi teybetî, ew demên ku weke "demên sûmerîyan" jî dihên bi navkirin jî, bi hezaran salan dihên ser ziman. Di hundurê wan hezar salan de çî pêşketinên şariştanî bûna û derketina li holê, em hê bi tememî di derbarê wan de ne xwedîyê zanînê na. Lê dem bi dem, hin zanîn piçûk jî, derdikevina li holê, didina nîşandin ku em çendî di derbarê wan deman de bêzanebûn in.

Demên gûfî, hûrî û mîtannîyan, em divê ku weke demna hemdem ên piştî wan demên sûmerîyan û hwd bênina ser ziman. Dema Medîya û avesta û hwd, em divê ku weke pêvajoyên nû ên pêşketî ên van demên hemdem û pêşketî lê binerin û fahm bikin.

Bi teybetî, di wan demên hemdem û ên pêşketî de ku em demên hûrî û mîtannîyan bi teybetî werênina ser ziman, emê li wir bibînin ku rojavayê kurdistanê weke naveneka pêşketî ya dîrokî heya. Pêşketinên dema hûrî û mîtannîyan, di roja me de, bo pêşketinên şariştanî li wan dihê nerîn. Hê jî, di temenê pêşketinên şariştanî û civakî, û olî û bawerî, têgihîştinî û hizrî û hwd de, ev demên hûrî û mîtannîyan kifşkarîya wan bi serdestî heya. Ji dema hûrî û mîtannîyan û heta ku digihijê dema Medîya û avesta û hwd, çend ku desthilatdarîyên van deman bi demê re ji holê rabûn jî, serdestîya pêşketinên wan ên hizrî, olî, civakî û hwd, bi mayîndayî man û xwe domandin. Ev rastî, heta roja me jî, bi heyî nî xwe didina domandin. ..

Rojavayê kurdistanê, bi teybetî, herêmên wê bigîştî navend in ji pêşketina hûrî û mîtannîyan re. Serêkahniyê ku di wê demê de bi navê "waşûkan" bû, paytaxt bû ji Mîtannîyan re. Ev herêm, bi pêşketina xwe ya ku di wan deman re ku jîn kiriya, hê jî, bi tememî ne hatîya fahm kirin. Ya rastî, ew a ku ev herêm bi dîrok û demên wê ên buhurî re baş were fahm kirin, ew fahm kirinên ku bên bidest xistin, wê dîrokê ji gelek alîyan ve bi me ji nû ve bide nivîsandin.

- Li Rojavayê Kurdistanê, bi dîrokê re bi ber demên piştî zayîna Îsa ve. ..

Pêşveçûnên dawî ên li rojavayê kurdistanê bi hêrişên komên çekdar û ên rejimê re ku dibin, pêwîstî pê dide dîtîna ku em dîroka herêmê, dîroka kurdistanê û her wusa pêvajoya ji destpêka mudaheleya li Sûrî ya heta roja me, li berçav bigrin û şîroveyekê bikin û bi wê re hewl bidin ku

rwşê fahm bikin. Rojavayê kurdistanê, hin bi hin dikeve destê kurdan de. Lê ev demên wê yê destpêkê demne pîrr girîng ên dîrokî na ji bo wê kurdistanê bixwe jî. Di serî de, divê ku em balê bikişênina ser avakirina rêveberîya kurd ya li wir. Di vê demê de, divê ku li herêmên ku ketina destê kurdan de rêveberîya kurd, bê pîrsgirêk were ava kirin. Herêmên ku heta nahaka ku kurdan, hê bi tememî ne kirina destê xwe jî, divê ku rêveberîya wan jî were amede kirin. Bi awayekî li wan deran jî divê ku bidest karkirina xwe jî bikin. Ji xwe, li rojavayê kurdistan, kurdan bi awayekî di kirinê de, sazîyên rejîma baasê bêkarkirina. Êdî nikarin li wir kar bikin. Berê jî, ev wîlo bû. Lê di vê demê de, bi awayekî bi sazûman, divê ku ew were kirin. Li kurdistanê, bi wê re ewlakarîya wê jî ji bo ku were kirin, sazîyên wê yên sîvîl û yên leşkerî ên ku karê parastinê bikin werina ava kirin.

Rojavayê kurdistanê, wê bandûra wê wê pîrr mazin bibe. Di serî de, divê ku kurd di serî de, rêveberîya rojavayê kurdistanê bi awayekê rêk û pêk ava bike û têkiliya wê ya bi başûrê kurdistanê were xort kirin. Kar û barê di nava rojava û başûrê kurdistanê de were xort kirin.

Dema ku min li ser serkevtina kurdan ya li rojavayê kurdistanê nerî, dema Medîya û serkevtina wê hata bîra min. Bi teybetî jî dema Dîyaqos, hata bîra min. Di dema Dîyaqos de, Medîyalîyan, di serî de, li herêmên xwe serdestî bidest xistin. Bandûra Împaratorîya Asûr li ser axa xwe şikandin. Di wê demê de Sargonê duyem ku di nava kurdan de û di binaterên Asûrî de jî bi navê "**Sarûkê Duyem**" jî dihat bi nav kirin, hingî di dema Dîyaqos de li ser serê Asûr key bû. Piştî wî re kurê wî Sanherîb tê ser taxt. Ew axa Medîya ya ku Di dema bavê wî de hatibû wîndî kirin ji dest, di wê demê de ew bi hin seferna ku ku dike dixwezê ku careka din wan herêman bike bin destê xwe de û serdestîya Împaratorîya asûr careka din ava bike. Lê êdî ji wê re ti derfet namêne. Hingî, ku Sanherîb û bavê wî dibîne ku êdî axa medîya ji dest çûya, êdî berê xwe didina bi ser Babil de, Lê Keyê Medî bi peymana ku bi Babilîyan re çêkirîya, wê jî bi xwe re ji bin dest rizgar dikan.

Piştî Dîyaqos, welatê Medîya car din ava dike. Berî hingî ji dema Gûtîyan heta ku digihijê wê demê, çend ku bigiştî serdestîya Medîyalîyan nîn na jî, lê dîsan, divê ku mirov bi teybetî bibêje ku Medî li ser axên xwe xwediyê desthilatdar in. Rêveberîyên wan ên êlî bin û an kû ên xanadanî bin hena. Tenê ku mirov li Tewratê bixwe jî binerê, mirov wê bibîne ku têde tê gotin ku deme ku Mûsa ji mizrê diravê tê welatê Medîya û li wir bi salan dijî.

Lê dem heta ku tê dema Medîya û Dîyaqos, ew welatê Medîya digihinê desthilatdarî û serdestîya giştî ya demî. Bi vê yekê re, êdî ew demeke nû li herêmê dide dest pê kirin. teybetmendîya dem û desthilatdarîya Dîyaqos, ew aku ew di dema xwe de weke ku derdikeve dervi têngiştina xanadantîyê. Ew, di temenê têngiştineka hemdem de welatê xwe di wê demê de dide ava kirin û bi wê re jî ew ava kirina wî ya di dema wî de li herêmê bigiştî dibe destpêkeke mazin ya dîrokî. Medî hingî, bi xwe re Xalkê faris jî ji bin dest xilas dike. Piştî Dîyaqos kurê wî

Firortîs, serdestîya Medîya dihijînê heta ber bahre hûrmûz û herêmên farisan û meanene jî dike nava axa Medîya de. Lê pêşî ew yekbûnê ku desthilatdarîya Medîya wê ji xwe re weke mihatab bigirê ava çê dike di nava wan de. Rêveberîya wan ya ku ava dibe, piştî di nava desthilatdarîya Medîya de cih digirê. Hingî jî, weke ku di roja me de faris hê jê re dibêjin "Anşan" bû. Piştî, ev rêveberîya ku Medîya ji wan re ava kir, wê bê temen û bingihê avabûna rêveberîya axamanîşîyan jî.

Ji wê demê û piştî wê kurd, pîr rêveberî û xanadanên wan ên ku werin û ava bibin wê hebin. Di serî de, divê ku ez bibêjim ku piştî dema Medîya jî, wê kurd di dema Axamanîşîyan de jî û di dema Sasanîyan jî, wê xwediyê desthilatdarîyên xwe ava ên ku li ser axên xwe bin. Di dema Sasanîyan de xanadana kurd ya "Keyûş" ku bi navê serdestîya "qasra Keyûş" tê bi navkirin, wê ava bibe. Ji xwe, li ber diclê li herême botanê, ku di wê demê ku dihat gotina "herême botanê" ku herême rojavayê kurdistanê hema bêja hemû jî di nav de dihat hasibandin lê rêveberî û desthilatdarîya kurdan a ku piştî Gûtîya re jê re "kurman" û piştî jî di demên Medîya piştî Medîyan jî ku jê re "gord" dihat gotin ava bû. Piştî Sasanîyan re, wê welatên kurdan ên bi navê Şadadî û Merwanî wî werin û ava bibin. Demeka nû, wê bi wan re dest pê bike. Berî dewleta Merwanîyan û li rojhilatê kurdistanê, dem bi dem dewletên ku ava bûna hene. Minaq, dewleta Kekoyîdîyan heya û ew dewlet di sadsale 9. min, 10. min de jî serdestîya ava ya.

Car bi car ew gotina "kurdistan"ê ya ku tê gotin ku Siltanê Şalçûqî ku bikarhanîya, wî jî ji kekoyîdîyan fêrkirîya. Di dema ku hêrîşên Şalçûqîyan tîn û li ber sînorê kurdistanê disekin in, hingî, tê gotin ku Şerna mazin Şancar bi kurdên Kekoyîdî re dike. Hingî, tê gotin ku kurdan şervanîyaka pîr mazin li ber wî daya nişandin û piştî Şancar ji hin mirovên ku weke şewirmend bûn û li cem wî sekinî bûn, ji wan dipirsê ku ka "ew xalkê ku wusa şervan kî ya." Tê gotin ku hingî, hin mirovna li cem wî ên ji wan mirovan dibêjin ku "ew kurdîstanî na." Li ser wê jî, êdî tê gotin ku wî jî gotîya ku "ev kurdîstanî çî şervanna mazin in". Bi vî rengî êdî ew jî bi gotina kurdistanê pênas dibin. Lê berî hingî jî kurdan di nava xwe de ew gotin bikarhanîya û wan ew gotin ji wan girtîya û gotina. Rêveberîyên kurd, wê piştî Merwanîyan re wê êdî bi "dema Eyûbîyan" re wê xwe bide domandin. Dema Eyûbîyan jî, wê piştî Merwanîyan jî, wê ne bin 400 salî re wê bidomê. Heta ku dem tê derketina Osmanîyan. osmanî, di dema ku têne herêmê, ku kurd bi piştgirîyê nedina wan, wê nikaribin li herêmê bijhîn. Ji xwe, berî şerê li Çardiranê ê di nava osmanîyan û Sefevîyan de, di wî şerê li tebrîzê de Osmanî têkçûna. Êdî ku ti carî nikaribin xwe lev bidîna li hevdu, dikevina rewşaka xirab de. Lê Îdrîsê Bedlîsî ji herêmên Kurdan, ên weke Bedlîs, Mûş, Xîzan, Êlîh. Mayafarqîn û hwd wê artişaka ser deh hazaran re wê bide ava kirin û wê bi wê osmanîyan careka din rakê ser pîyan. Bi wê yekê, ez karim bêjim ku yê ku piştî bi wê yekê ji nû ve weke ku osmanî ava kir bû Idrîsê Bedlîsî. Piştî ew artiş dikeve Şerê Çardiranê de û li wir bi ser dikeve. Piştî şerê Çardiranê, peymanak di nava Îdrîsê Bedlîsî û Yavûz Selim de tê mohrkirin. Li gorî navaroka wê peymanê "wê kurd li herêmên xwe bidesthilatdarî ya xwe bijîn.

Wê dest newê avêtin li awayê jîyane wan û herêmên wan." Ev tê herê kirin. Yavûz Selim, çend ku bi hin hêrîşên wî yên li kurdan re hin caran pêl wê peymanê dike jî, lê dîsan peyman hebûna xwe didomê Heta dema Qanûnî siltan Sûleyman. Ku Qanûnî Siltan Sûleyman hat ser desthilatdarîyê, wê bi fermanakê wê peymanê ji holê rakê û wê artişekê saz bike û bi wê herê bi ser rêveberî, hikimet û sancaqên kurdan ên ku wan dana jî.

Kurd, wê di dema wî de û piştê de jî, wê pîrr komkujiyan bijîn. Lê tevî wanqas komkujiyan jî, wê karibin, hebûna xwe bidina domandin. Ji ber ku li herêmên wan, rêveberîyên wan ava bûn. Rêveberîyên wan, car bi car ku wan komkujiyên mazin jî dîtina, êdî ji ber ku wan hebûna xwe parastina, êdî xwe li ser lingan girtina. Ji ber vê yekê, kurd divê ku herî zêde di vê dema xwe ya giring de li ser avakirina rêveberîyaka xwe zaxm û xort bisekin in. Di demên wan yên berê de, kevneşopîyên wan, ji wan hertimî temenê mazinbûn û bûna desthilatdar afirandina. Ji ber vê yekê jî, hertimî, pîrr mazin êdî piştê çûna bi ser kevneşopîyên wan de bûna. program û pêvajoyên bişavtin(asimlasyon)ê ên komarê jî, hinekî armanca wan ew bû ku wî temenê wan yê bi kevneşopîya wan re li ser lingan bû wê ji destê wan bigirê. Tevî ku di demên berî komarê de herdemî şêxên kurd pêşavani û serokatî weke ku Şêx Êbeydûllah û Şêx Saîd kirina, ji avakirina desthilatdarîyên kurdan re kirina. Lê di dema komarê de ji bo ku şêx jî û mirovên oldar jî li dijî tekoşîna azadîyê ya kurdan bisekin in. Hinekî bi vê yekê ev armanca dewletê hebû.

Di vê demê de, ku kurd bixwezin destkevîyên xwe bi awayekê baş bi parêzên, divê ku rêveberîyaka xwe zaxm û xort ava bikin. rêveberî û desthilatdarî, wê temenê wê bêstatûtîya wan ji holê rakê. Li kurdistanê, heta roja me li başûrê kurdistanê desthilatdarîya kurdan ava ya. Lê ew jî, bi pirsgirêkên weke ên herêmên wê ên weke kerkûk û Şîngalê re rû bi rû hatina hiştin. Armanca vê jî hinekî jî zayif hiştina wê ya. Tekoşîna azadîyê ya kurdan, di hundurê 30 salî de bi tekoşîna ku da, nîrxên kurdan ên civatî û dîrokî derxistina li holê û di nava civate kurd de bi têgihîştin kir û li ser wê re kurd şîyar kir û kir ku kurd êdî li ser wê re bikevina tekoşîna azadîya xwe de. Î ro jî, ew tekoşîna azadîyê, li ser wê re tê dayîn. Kurd, ji ber vê yekê, divê ku giringîya desthilatdarîyê fahm bikin û wê baş ava bikin. Di van rojên ku em têre di buhur in. divê ku di her rojekê de karê ku salekê were kirin têde were kirin. Divê ku her roj beremberê salekê bê. Rojek, biqasî pêşketinên salekê di xwe de pêşketina bide çêkirin.

Rêveberîya kurd ya rojavayê kurdistanê divê ku di demeka kin de pîrr zûr were ava kirin. Divê ku parlamane wê were ava kirin û Hikimeta wê jî, were ava kirin. Sazîyên kurd, li ser navê kurd, bibina mihatabê desthilatdarîyên dewletên derve û dewletên Metinger ên ku li ser serê kurdan hê serdest in. Piştî ku rêveberîya rojavayê kurdistanê jî hat ava kirin û ku parlamane û hikimeta xwe ava kir jî, sazîya konseye bilind a kurd, divê ku hebûna xwe li ser wan re biparêzê û were berfirehkirin û bibe sazîyaka ku navbeynî ya desthilatdarîya rojava û başûrê kurdistanê jî. Bi vê yekê re, ku ev sazî bike ku herdû rêveberîyên kurd di xatekê de di temenê ku berjewendîyên

kurdan li dijî derve bi yekdemî biparêzê divê ku kar bike. Sazîyên kurd ên ku li rojavayê kurdistanê ava na, divê ku karibin li başûrê kurdistanê bibina xwedî bandûr. her wusa, divê ku sazîyên başûrê kurdistanê li rojavayê kurdistanê bibina xwedî bandûr. Piştî herdû jî, bi wê têkiliya xwe ya xort li ser bakûr û rojhilatê kurdistanê jî didvê ku bibina xwediyê bandûrê. Divê ku wan herêmên kurdistanê jî temen û sazîyên xwe yê bandûrkirinê di demek nêz de çê bikin. Bi vê rengê, pirsgirêka kurd li rojhilat temenê çareserkirina wê çê bikin.

Pirsgirêka kurd li her çar welatên rojhilat ku were çareser kirin, wê rojhilat jî bigihijînin aramîyê. Ku em herê bikin jî û nekin jî, î ro, hemû mudaxale û destavêtinên li rojhilat, li ser van pirsgirêkan re tên kirin. Wan pirsgirêkan, weke pirsgirêkên ku li ser wan dihê xwestin ku were dîzaynkirin.

Pirsgirêka kurd, piştî peymana Sikey-picot, bi peymana Lozanê re hat afirandin. Piştî bi peymana Sadabadê re şînorên herêmê hatina kifşkirin û jidandin. Armançek ji wan armançên paxta Sadabadê ew bû ku têkiliya herêmên kurdan ên ku di nava wan de sînor hatîna kişandin werina birrin. Lê hem peymana Lozanê jî û hem jî paxta Sadabadê jî jî du teybetmendîyên wan yê teybet û sereke hene. Bi Peymana Lozanê re ingilistan, axên di bin metingerîya xwe de ku başûrê kurdistanê di nav wê de bû di bin navê îraqê de kira welatek. Bi wê re temenê Sûrî jî hat avêtin. Lê sûrîye, temenê wê û avakirina wê, bi paxta Sadabadê re dibê. Paymana Lozanê temenê vekişîna Ingilistan ji herêmê ya bi wê rengê ku ew axên ku di bin metingerîya wê de na wan biparêzê weke xwe û bi wê rengê ji herêmê vekişîhê. Her wussa paxta Sadabadê jî temenê bi wî rengî ku Firansa jî axên di bin destê xwe de ku rojavayê kurdistanê jî di nav de bû di bin navê Sûrîya de bike welat û vekişîhê, temenê wê afirand. Bi vê rengê, rola ku paymana Lozanê di dema vekişîna ingilistanê de leyîst, paxta Sadabadê jî di dema vekişîna Firansa de leyîst. Li ser van peyman û paxtan re piştî paxta baxdadê di 57' de û paymana Cezayîrê jî di 75' de hatin û bûn. Ev paxt û paymana ku dûv ya Lozanê û Sadabadê re tên, weke paxt û paymanna ku wê rewşa ku di Lozanê de sînorê wê hatina kifşkirin û di paxta sadabadê de hatina safîkirin, werina misogerkirin û domandin bûn. Di aslê xwe de, desthilatdariya kurdan ya li başûrê kurdistanê ku ava ya û bi ya rojavayê kurdistanê ku ji nû ve êdî ava dibe, ne tenê paymana Lozanê, bi wê re paxta Sadabadê, paxta Baxdadê û paymana Cezayîrê jî bêhikûm bûna. Ev paxt û payman jî, jî jî jî aliyê sîyasî û destûrî ve hebûna tê parastin.

Rojavayê kurdistanê, giringîya wê, pîr heya. Di serî de, kurd, divê ku ti kêmesîyan nedina nîşandin. Divê ku pergal(sistem)a xwe ya aborî, sîyasî, perwerdehî û hwd di cihde bêî ku demê bidîna windakirin ava bikin. Divê demê de karekî mazin dikeve ser milê rewşenbîr û zaneyên kurd de jî. Divê ku bi teybetî li ser zimanê xwe yê dayikê bisekin û wê pêş bixin. Berhemên xwe bi zimanê xwe yê dayikê binivîsênin. Yê ku heta nahaka berhemên xwe bi zimanê xwe yê dayikê ne nivîsandina, Divê ku wergerênina li kurdî. Bi vî rengî, di serî de divê ku kurdî pêş

bixin. Zimanê dayikê, ji bo her xalkê û civakê pîrr giring a. Wekî din jî, sînorê wan yê li cihanê jî ya.

Di vir de, di dawîyê deme bi teybetî li ser mijaraka jî din bisekin in. Di zane min de wê di demên pêş de pîrr li ser were sekin in hem ji aliyê kurdan ve û hem jî ji aliyê hêzên serdest ên metinger ve jî. ew jî, mijara statûya kurdan a. Di dema ku desthilatdarî li sûriye ji nû ve ava bû, wê hewl were dayin, weke ku di dema ku li Îraqê bû, ku kurd pîrr kêmbin. An jî ku di sazîyên dewleta Sûriyê yên giring de nebina xwedîyê ti bandûrê. Minaq, weke sazîyên wezerete karê derve, ya wezete karê hundir sazîyên din ên rêvebirinê ên di parlamane sûriyê de. Ji nahaka de divê ku ji wan re amedekarî werina kirin. Bi vê yekê re, divê kurd rewşa xwe li ser axên xwe xort bikin. Minaq, wê di mijara destûra nû ya Sûrî de wê pîrr li ser were sekin in. Di salixkirina navê kurdan û mafê wan ên di destûrê de, wê pîrr leyîstik werina leyîstin. Bi vê yekê divê kurd, ji nahaka de xwe amede bikin. Wê hewl were dayin ku destkevîyên gelê kurd bi bi deh salan tekoşîna wan hatîya dayin, di pênuşekê de werina ji holê rakirin. Bi vê yekê, em di serî de divê ku bibêjin ku ev mijar, weke mijaraka ku têde û li ser pîrr serî were wastandin a. Tekoşîna kurdan ya statûyê a li herêma di qadên destûrî de û de sazîyên destûrî de bi misogerkirina wan re wê werina bidest xistin. Li ser wan re, wê di demên pêş de, wê kurd, êdî di pêşarajê de pêşketina xwe bijîn. Lê divê ku ew kêmesîyên ku di dema Amedekirina destûra nû ya Îraqê de hat kirin, di wê dema ya sûrî de newina dûbara kirin. Di serî de, ew mijara kerkekê ku bi madde 140 di destûrê de hat bicihkirin û piştê ne hat bicih hanîn, weke listikên dewletên herêma ên ku li ser pêvajoya destûrî û destûrê re leyistin bûn. Ji vê re, divê ku şiyarî pîrr bê. Heta ez karim bêjim ku kurd divê ku destûra herêma xwe çêkin û ew destûra kurdan di destûra **sûriyê de were nasîn û misogerkirin.**

--**Rojavayê kurdistanê.** dîroka wê pîrr kevn a. Bi teybetî ji dema Mîtanî Hûrîyan ve, dîrokaka bînavber ya şariştanîyê li ser wê axê domîya ya û hatîya ta roja me. Giringîya rojavayê kurdistanê, bi teybetî, pîrr mazin divê ku mirov aê fahm bike. Rojavayê kurdistanê, di icih û navendaka wilo de disekinê, ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê. Di dîroka wê de, bi teybetî, cihê pêşketina olên yek-xwûdayî pîrr mazin a. Reha ku î ro di nava sînorê bakûrê kurdistanê de maya, berê di wan demên berê yên kevn ên mîtanî û hûrîyan re jê re "kalden-Ur" dihate gotin. Piştê jî, Reha jî hatîya gotin. Reha piştî ku demên Mîtanî û Hûrîyan re, li herêma dikeve bin serdestî û desthilatdarîya hêzên din ên li herêma. Ketîya bin destê Asûrîyan de jî. Bi teybetî, ku mirov ji demên berî zayîne ku zêde bi wir de neçê ku mirov tenê li wê dema Mediya bi nerê, di wê demê çend ku dikeve bin destê Mediya liyan de jî, bandûra Asûrîyan lê heya. Asûrî, piştî serdestîya Mediyan li herêma pêşdikeve, êdî wê herê dîkin. Peymana aramîyê di nava wan û desthilatdarîya Mediya tê mohrkirin. Piştî wê re ku weke kurê keyê Asûrî sanherîb Esarhadon, weke bavê xwe pîrr seferan dike. Lê piştî ku Mediya serdestiya li herêma dibe, êdî ew jî nikarin wê seferê bike. Êdî li gorî wê peymanê aramîyê ya di nava wan de bi aramî dijîn. Kurê Esarhadon

Asûrbanîpal, di wê çerçovê de ji wê aramîyê sîd digirê û tê û dema xwe ya di parastgehê de li Rehayê jî di buhurê.

Lê divê ku ez bibêjim ku hingî, weke roja me sînor di nava herêmekê ne hatibû xîzkirin. Hingî, rojavayê kurdistanê ku û ev herêm yekbû. Bi wê yekê re, weke dewleteka bi serê xwe dijî. bandûra Kurdên Gûtî di wê demê de jî lê zêdedir bû. Piştî Mitanî û Hûrîyan Gûtîyan ew herêm bi yek destî wilo bi rê ve biribû. Gûtîyan, rêveberîya wan ku ber diclê û çiyayê Cûdî dest pê dike û li dora xwe belav dibe. Piştê heta ku digihijê ber Zagrosan jî dibina xwediyê bandûr û serdestiyê. Herême Reha, hingî û piştê jî, yek herêm bû. Piştê weke ku mîrê botan, jê re gotina "herême botanê". Ew herême botanê ku wan bi vî rengî bi nav dikir û jê re digot herême botanê, yek herêm bû. Ew herême botanê ku wan jê re digot herême botanê, bi teybetî başûrrojawayê kurdistanê dikir nava xwe de û bi wê re jî herême botanê ya rojava me jî ku di nav de, weke herêmeke mazin ya yek qat bû. Bi vê rengê, wê di dema Medîya de jî bibe. Di dema welatê Merwanîyan de jî ev yek wusa bû. Di dema desthilatdarîya Salahadinê Eyûbî û xanadana Eyûbîyan de jî ev yek wusa bû.

Car bi car bahs tê kirin ku dema ku amê Saladinê Eyûbî Şerkoh ku diçê bi ser Libnanê de û wir dike bin siltantîya xwe de, hingî, ew dibîn û fahm dike ku hêze wî têrê nakê êdî ew di cih de agahiyê ji Salahadinê Eyûbî re dişêne û jê daxwez dike ku ew di cih de bi hêzekê werê bi wî ve. Salahadinê Eyûbî jî, hingî, êdî hêzekê tenê ji wê herême botanê ava dike û diçê bi amê xwe de. Salahadinê Eyûbî, di hundurê çend rojan de tenê ji wê herême botanê ku rojavayê kurdistanê û herême botanê ya î ro ku di nav sînorê bakûrê kurdistanê de ya, wêderê hêzeke wilo mazin ava dike û bi amê xwe ve diçê.

Ev herêmen kurdan, hingî yek dengî bûn. Ti qat bûn di nava wan de nebûn. Bi wî rengî, bi wê yekê êdî salahadin heta ku Şam jî di nav de, ew li herême hemûyî serdestîya xwe ava dike. Ku were pirsîn ku ma çima tirba serokê kurd Salahadinê Eyûbî li Şamê ya, bersiva wê, hinekî bi wê mazinbûna wê herême kurdistanê û yekbûna wê ve girêdayî ya. Hinekî jî, ew tirba salahadin ya li Şamê, bersiveka bi vî rengî di temenê yekbûna kurdan jî di xwe de dihawêne.

Ew, hingî yekbû û welatê kurdan bû. Di dema osmanîyan de jî ew qatbûn ne hatîya kirin. Osmanîyan bi navê herême botanê û hikimete wê, ew herêm bi şancaq kirîya. Hingî jî yê ku li ser serê wî mîrê bota bûya. Ji xwe mîrê bota, li wê herême û kurdistanê, weke keyê kurdistanê yê herdemê jîya ya û weke dewlet maya. Ji ber vê yekê jî, çend ku dema ku em î ro dibêjin "herême botanê" ku çend herême di nava sînorê bakûrê kurdistanê de herême botanê tê fahm kirin jî, lê disa divê ku ez bibêjim ku mirov li dîrokê binerê, mirov wê fahm bike ku heta ku digihîşt Kûbanê û Qamişlo û hwd, herêmeke mazin bû herême botanê. Bi destketina rojavayê kurdistanê ya li destê kurdan, êdî divê ku mirov van dîrokan jî hilde li rojava û bêne ser ziman. Ya rastî ku ez weke yekî ji wê herême, ku heta roja me jî, bahse wî sînorê di nava wê herême botanê de ku di

ber Nisêbinê de hatîya kişandin ku bahse wê tê kirin, weke ku bahse wî hêtê berlinê ê ku di nava almaya rojava û rojhilat de hatîya kişandin tê kirin. Bi heman rengî bahs tê kirin. Ku bê bahskirin ku çîma gotina "serxat" û "binxat" afîya û ji kuderê afirîya, mirov wê hingî vê dîrokê wê qatbûnê bi lev bike. Di aslê xwe de ev gotinên ku hê jê bi awayekî pirr zêde di nava xalkê de tên ser ziman, bi wan re ew têgihîştina ku tê ser ziman û fahmkirin, ew a ku kurdistan hingî bûya duqat. Heta ku digihîşt salên 1980 û hwd jî, kurdên ji bakûrê kurdistanê bêî ku rastî ti astengîyê werina û diçûna rojava û ku li wir xizmên xwe bibînin hebûn. Her wusa, ji herêmê Reha'yê jî buhurîn dibû. Lê ku piştî salên 1990 û hwd ku êdî sînor bi tememî ji aliyên dewleta tirk û ya sûrî ve hatina jidandin, êdî ew dîmenên ku em her salên di rojên cejnan de li ber telên sînor de li herême Rehayê dibînin êdî rastî wan hatin.

Li aliyekî çend mirov ji malbatekê û li aliyê din jî çend mirovên ji wê malbatê têna ber telên sînor û cejna hevdû pîroz dikin. Di dema ku em di zindanê de ku malbat dihatina zîyere me, hingî ew dibû. Dema ku ez bixwe jî, nahaka li wan dîmenên li ber telan li herdû aliyên sînoran ku dibînim, ew dîmenên di zindanê de ku me dijîn tên di demên hevdiştinan de berçavên min. Ew dîmen, weke dîmên sembolên metingerîya li ser kurdan in. Li kurdistanê, piştî ku tekoşîna azadîyê bi awayekî mazin dest bi tekoşîna kir, êdî sînor, dewletê jidandin. Bi teybetî, divê ku ez vê jî bibêjim. Berî nahaka ez li ser sekinî bûm. Lê jidandina sînoran û ne hiştina ji wan derbaskirin jî, di aslê xwe de di temenê biryaraka dewletê de pêk dihat. Minaq, ji salên 1937'an de ew paxta Sadabadê ku pêkhat, di wê de biryara sereke ew bû ku "sînor werina jidandin û newê hiştin ku derbasbûna kurdan li cem hevdû bibe." Bi gotinekê jî ez dixwezim bahsê bikim ku komkujiya roboskî jî, hinekî jî ew hasabên astangkirina buhurîna ji sînoran têde heya. Bi vê yekê re û di vê çerçove wê komkujiyê de ez karim bibêjim ku gîyan û têgihîştina wê paxta Sadabadê jî ji hin aliyna ve di temenê wê komkujiya roboskî heya.

Bi vê yekê re di serî de divê ku ez bibêjim ku li kurdistanê, pêvajoya herî girîng, ya di vê demê de ya avakirina desthilatdarîya rojavayê kurdistanê ya. Di serî de, divê kue z dîrok werina zanîn û di wê çerçove de ku êdî pêşî li wan komkujiyên ku ji bo ku têkiliya kurdan jev were birrîn ku li ser sînoran dibin were girtin. Kurd, di vê yekê de, ev firsandên dîrokî ên ku ketina destê wan de, divê ku wan pirr baş bi kar bênin. Divê ku di serî de, peymanan ku di nava herdû rêveberîyên kurdan de were çêkirin û mohrkirin ew bê ku buhurîna ji sînoran meşrû bê. Bi wê yekê re, û peymanaka bivî rengî ku weke ku vê "peymanê Hêwlêrê" ku di nava kurdan pêkhat, weke wê, divê ku êdî peyman were mohrkirin. Ew peymanan bi vî rengî, serî de, wê bandûra wê li sînorê rojhilat û yê bakûrê kurdistanê bike. Bi wê rengê çûna kurdan ya cem hevdû û buhurina li cem hevdû ji sînoran, bi vî rengî wê çêkirin.

Bi vê yekê re, di serî de, divê ku ne tenê weke rêveberî û avakirina wê êdî kurd li rêveberîyên kurdistanê were nerîn. Bi vê yekê re, di serî de ew peymanên ku ew di nava hevdû çêkibikin, wê

bandûra wan li beşên din ên kurdistanê jî bibe. Di serî de, wê kurdan nêzîktirî hevdû bike. Li kurdistanê, şikandîna astangîya dewletên serdest ya li ser têkiliyên kurdan, bi vî rengî wê pêk were.

Î ro, em di sadsale 21'ê de dijîn êdî sînorên ku bi telan di nava dewletan de werina xîzkirin tenî sînorna dîtbar in. Êdî zêde ti bandûra wan nîn a. Lê sînorê zimên, û ew herêmên ku ew ziman lê serdest a, êdî wê weke sînorê hemdem bê û wê bandûra wê hebe. Ku mirov hinekî jî di vir de bi gotinekê jî bahse wê qadaxaya li ser zimanê kurdî bahse wê bike, di vir de û bi vir ve girêdayî, mirov karê bahse wê bike. Ziman, di serî de, biqasî ku zanist jî dibêjin di sê bêşan mirov karê bahse wê bike. Beşa pêşî ew a ku sînorê cihane mirov a. beşa duyem ew a ku ziman hebûna mirov a. Di dema ku mirov dibêje ku hebûna mirov a ew jî ji du aliyan ve tê ser ziman, yek keseyetîya û ya din jî, weke ku zanist jî dibêjin ji aliyê genetîkê jî hinek aliyên wê yê pêşketinî hene ku divê ku mirov wan fahm bike. Beşa sêyemîn jî ew a ku ziman, serdestîya wê, hinekî jî serdestîya civakê ya bi desthilatdarî û kevneşopî jî bi xwe re dide kifşkirin.

Li kurdistanê, zimanê kurdî, dîroka wê hê bi tememî ne hatîya kifşkirin. Bi teybetî, zimanê kurdî, bi qasî ku mirov fahm dike ji dîrokê çar û an jî pênc pêvajoyên serdemên mazin ên girin buhurandîna. Serdema zimanê kurdî, ya pêşî ji dema Sumerîyan ("kengîr" ji wan re tê gotin) û heta ku tê û gihijê serdemên Hûrî û Mîtanîyan. Ev pêvajoyên bi teybetî rojavayê kurdistanê jî digirê nava xwe. Serdema duyem, ji dema Hûrî û mîtanîya ta dema Gûtfî, qasî, lolo û Medîya na. Lê dema Medîya serdeme wê bi teybetî jî mirov karê wê bêne ser ziman ta dema derketina desthilatdarîya Sasanîya li herêmê. Ji wê demê û pêde jî, ku ji dema şadadî û merwanîya ta dema me ya Kurdistanê jî, mirov karê weke demeka teybet bêne ser ziman. Rojavayê kurdistanê, di nava wan dem û serdeman de, di dem û serdemên demên pêş de cih digirê. Ji ber vê yekê, di serî de kurdîya wê herêmê jî ku mirov weke kurmancî û ya herême botanî binavke, kurdan li ser wê re bidest jînkirina pêvajoyên xwe yên civaktiyê kirina û jîyîna.

Rojavayê kurdistanê, di serî de divê ku ez bibêjim çanda wê hinekî jî teybetmendiyên wê sereke hene. Li wê herêmê yanî li wê xate ku weke xate berfiratê mirov karê binav bike, pêşketina wê ya ku jînbûya, dîroka hersê olên semewî ên yek-xwûdayî jî daya kifşkirin. Birehim Xalîl Çanda wî li Reha'yê ya. Bi vê yekê re, ew herêm jî dikeve nava wê çandê de. Ew herêm dibê ew herême ku ew çand û dîrok lê hatîya jîn kirin. Di dem û serdemên berî derketina misilmantiyê de, ew herêm, weke herêmeke teybet, bandûra wê li herdû olên din ên semewî ên weke cihûtiyê û xiristîyaniyê (di zaravayê kurdî kurmancî de jê re "fileh" tê gotin) li ser wan heya. di pêşketina wan de bandûra wê heya. Piştî ku Misilmanti derket, hingî, misilmantiyê jî, ew çanda wê xate berfiratê ya li wê herêmê bi navê çanda Birehim xelîl tê ser ziman ji xwe re weke temen esas girt û li ser derket û pêşket. Ji ber vê yekê, di dema rêveberî û desthilatdarîya îslemiyetê de ku Şam jî ji xwe re kiribû navend, ji wê derê û herêmê jî sûd digirt. Bi vê yekê, divê ku ez bibêjim ku ev

herêm bi vê yekê giring a. Ew bajarê ku î ro hê lê pîrr pevçûn hene, Helep, ku di zimanên latinî de weke "aleppo" jî tê ser ziman, bandûra wê bi rojavayê kurdistanê re di çanda mesîhiyê de mazin a. Berî wê, di çanda cihûtiyê de jî.

Ev herêm, bi teybetî, ku rêveberî û desthilatdarîya kurdan lê ava bû, ku karibê vê dîrokê û demên wê yê berê fahm bike û di wê çerçovê de nêzîkatîyeka giring bide nîşandin, wê bike ku di hundurê demeka pîrr kin de ku pîrsgirêkên beêşn din ên kurdistanê ên bakûr û rojhilat bike rêya çareseriyê de. Ji xwe kurdên van herêman jî êdî wê dixwezîn. Êdî wê pîrsgirêkên li van beşan jî zêde newina dirêj kirin. Ji xwe êdî ew derfet jî bi desthilat kurd ya rojavayê kurdistanê re namêne. Ji ber vê yekê, divê ku em careka de balê bikişênina li ser ku wê di dema nivîsandina destûr û metnên bi vî rengî ên destûrî ku statûyê kifş dikin, wê hewl bê dayîn ku kurd bandûr û statûya wan kêm bibe. Ji ber vê yekê, di vê xalê de li ser sekinîn û ji naka bi bal tevgerîn û amedebûn, ji hertiştî ya giringtira.

Rojavayê kurdistanê, bi avabûna statû û rêveberîya wê re, wê ew wê xate sînor ya li ber Nîsêbin û Rehayê re ku hatî kişandin û weke "hêtê berlinê" ê kurdan a jî, wê êdî wê bide şikandin. Bi vê yekê re, ew jî, di wê pêvajoya bichkirina statûya kurdan ya di destûrê de, tirkî wê ji ber vê yekê pîrr li ser bisekinê.

Rojavayê Kurdistanê, dîroka wê ya ji dema Hûrî û Mîtanîya ve ku heta ku tê dema Merwanîyan jî, dîroka civaktiya kurdan a. Bi teybetî, ew herê, weke herêmeke teybet ya stretejîkî ku dewletên kurdan yê Hûrî û Mîtanî lê ava bûn û piştre jî ku dewleta kurd ya Merwanîya ava bû. Weke lûleya bêhnê ya. Bi vî rengî jî, giringîya wê heta roja me tê. Ji vê aliyê ve ku mirov lê binerî, mirov wê giringîya wê fahm bike. Ew rola wê ya ku ji serdema dewleta Merwanîyan re bûya lûlûya bêhnê û berî Merwanîya jî ku di pêşketina Hûrî û mîtanîyan de leyistîya, wê î ro di serdema kurdistanê de jî bileyîze. Lê bi wê re jî, divê ku kurd jî xwediyê têgihîştin, zanîn û bîrewerîyeka mazin ya dîrokî bin bi xwe re di serê xwe de. Li ser wê bîrewerîyê re stretejîya xwe herême biafirênin. Di dema ku Medîyan de jî, heta ku Diyaqos, çend ku hêze Asûrîya şikand jî heta ku bandûra xwe ji rojhilat ne hanî ser van herême din kurdistanê bahse desthilatdarîya ya mazin nekir. Di wê demê de jî ku bi xanadanî jî bin Hûrî û Mîtanî jî şûnpêyên wan dijîn. Wan jî, hingî ji wî re û ji mazinatîya wî re got herê û tevî wî bûn. Bi vê yekê re divê ku em bibêjin ku ew herême rojavayê kurdistanê bi xate firatê û Rehayê re ji herême dibê herêmeke stretejîk jî. Tenê ku ji ber vê jî bê, wê bale îsraîl û rojava û welatên dîn ên cîran jî wê û ji wan li ser bê. --

--**Rojavayê kurdistanê**, piştî ku kurdan li bajarê wê yê Kobanê care pêşî dest danî ser rêveberîya bajêr û piştre ku dûv wê re dest danî ser rêveberîya bajarê Afrîn û bajarên din ên kurdistanê, êdî piştre li ser axiftinên mazin di çapameniyê de dest pê kirin. çapameniya cihanê di rojên pêş de, li ber wê bêdeng ma. Rojnemayên cihanînan ku di nava herêmen ereban de ku telîya

yekî di rabê li hewa, di cih de wê dike nûce bi navê "bahara ereb", ku rêz hat kurdan li ber wan bêdeng ma. Lê divê ku ez bibêjim, li rojhilat, bahare ku heya ya herî mazin bahare kurd a. Ev bi zanebûn, nayê xwestin ku were dîtin. hin sedemên wê bi statûya welatên rojhilat ve girêdayê heya. Piştê jî, êdî ji ber ku kurdan pêşketinên mazin li herêmên xwe bidest xistin, êdî kirina rojava xwe de. Lê ew kirina li rojava xwe de jî, ne wilo zêde bi awayekî zêde mazin. Çend ajansên nûçeyan ên cihanî ew hildan rojava xwe. Lê divê ku ez bibêjim ku ev mijarên ku li kurdistanê bûn ku wê pêşaroja herêmê jî bi xwe re dîyar bikin, ji nedîtî hatina rojnemavanên cihanî, di rastiyê de, nêzîkatîya wan li dijî kurdan radixe li berçav. Bi gelemperî, divê ku ez bibêjim ku ev şerê ku ev 30 salin ku li dijî kurdan tê bi rê ve birin, piştgirîya welatên ku andamên NATO ya ji wê re, bi dîyarî di temenê wê bêdengbûna li ber pêşketina kurdan de ya.

Li Kurdistanê, êdî pêşketinên mazin rû didin. çî bê kirin, êdî ji nedîtî ve nayêna dîtin. Nikarê were ji nedîtî ve dîtin. Êdî pêşketin, bi awayekî vekirî xwe radixina berçav.

Kurd, li herêmê, ev pêşketina wan û pêşveçûna bi wan re, wê hem statûya herêmê ya pêşarojê dîyar bike û hem jî wê pergala herêmê ya gelemperî ji nû ve bide rast kirin. Êdî li herêmê hemû çûn û hatin li ser temenê tekoşîna statûyê dibêt. Kurd jî, êdî ji dema şerê ku hebûna xwe bidina herêkirin buhurtina. Ketina demeka ku êdî tekoşîna statûya xwe li herêmê didin in. Ew şer û tekoşîna kurdan ya li herêmê, politikayên hemû hêzên li herêmê êdî dide dîyarkirin. Piştî serkevtina rojavayê kurdistanê û şoraşa wê, tehdîtên serokwezîrê tirk T. Erdogan ya li kurdên rojavayê kurdistanê, bi awayekî rast û pak dide dîyar kirin ku êdî wê li herêmê, bi kurdan re hêzên serdest jî bikevina şer û tekoşîna parastîna statû û statûqûya xwe jî. Ji salên 1923'an ve, kurd li herêmê û li herêmên xwe bixwe jî bê statû hatina hiştin. Zimanê wan jî hat qadaxa kirin. Em î ro, çend ku di sadsale 21'ê de dijî û di 2012'an de na, hê jî zimanê kurdan qadaxa ya. Di dema ku hevdîtinên serokê gelê kurd birêz Ocalan de didoman, hingî serokê gelê kurd gotinek gotibû, Ew gotin jî ev bû ku "li cihanî ti kesekî ku perwerdehîya xwe bi zimanê xwe yê dayikê nahildê li cihanê nemaya. Li di nav kabilên afrîqa de jî ew nema ya. Lê hê kurd bi zimanê xwe nikarin xwe perwerde bikin.". Ev gotin, bi xwe re rastiyekê radixina li berçav, Ew rastî jî her wusa bi programên bişavtin û jenosîdê re pêvajoyên ku li ser serê kurdan tînin meşandin in.

Di serî de, di roja me ya pêş de ji sê aliyan ve divê ku mirov nêzîkatîyê li rojavayê kurdistanê bike. Nêzîkatîya pêşî ew a ku di temenê gelemperîya kurdistanê de ya. Ku êdî yekbûna kurdistanê di nava hemû qatên wê de werê çêkirin a. Nêzîkatîya dîyem, ew a ku li herêmê kurd, êdî di temenê çand, kevneşopî, ziman û dîroka xwe de ku êdî pergale xwe ava bikin û biherêmê û statûqûya wê bidina herê kirin a. Nêzîkatîya sêyemîn jî, ew a ku kurd êdî li herêmê weke hêzeke sereke ya mazin û stretejîk a. Ya ku wê di demên me yê pêş de herî zêde derkeve li pêş û li berçav were girtin jî nêzîkatîya sêyemîn a. Nêzîkatîya sêyemîn jî, wê herdu nêzîkatîyên din yê pêşî jî bi demê re bi xwe re bide dîyar kirin. Wê pêşketina wan bide dîyarkirin.

Ji ber wê hebûn û temenê kurdistanê ê sereke û stretejîkî, wê ji armanca mudaxelyan wê xilas nebê. Minaqa, ku tirk dibêjin ku "emê mudaxela bikin", ma gelo tenê ji pirsgirêka bakûrê kurdistanê ya di nava sîronê wê de ya? Di zane min de ku ew hebe jî, ne tenê ew heya. Rojavayê kurdistanê jî, weke ku ajansa Rûsî ya nûçeyan di nûçeya xwe ya di derbarê rojavayê kurdistanê de jî dihanî ser ziman, ew herêm ji aliyê niftê û hin dewlemendiyên din ve jî pîrr dewlemend a. Wekî din jî, ew herêm, bandûra wê li ser herêmen ereb jî dibê. Minaqa, yê ku li wir serwer bê, weke ku li ser serê nîvgiraba ereban jî xwediyê serweriyekê bê wê lê were. Bi vê yekê re, kurd, bi carekê di dema ku ew serdestiyê li ser axên xwe bixwe didin çêkirin, ew bixwe êdî dikevina rewşa stretejîkî de li herême bigiştî. Ji ber vê yekê, di demên pêş de li ser rêveberîya baxdayê re wê çûna bi ser kurdan de û hewldanên ku weke leşkeran veguhazênina ser sîronên di navbera başûr û rojavayê kurdistanê de wê werina rojavê. Ev hewldan hemû jî, di nava hewldanên bê bandûrkirina kurdan de na.

Kurdistan, rojavayê wê, dibê weke lûleyeke wê ya bêhnê. Ew lûle, ji bo ku têde baş bêhn newê standin, di aslê xwe de, wê ji naha û pê de, wê lîstik û hewldan bibin. Divê k u kurd vê yekê bizanibin ku li ser axên xwe serdestbûna wan, di roja me de êdî ne mijara herî giring a. Ji xwe, ew êdî ji naha de li ser axên xwe serdest in. Lê ya herî giringtir ku li ser axên xwe karibin wê sîyane mazin ya ku serwerîya xwe bizanebûn bikin, ku bidina nîşandin, ya herî giringtir ew a. Ya ku di serî de were fahm kirin ew a. Di demên pêş de, wê mudaxela li Îranê werina kirin ku bi leşkerî bê û bi awayên dîplomatîkî bê. Ji ber vê yekê, ku rêveberîyeka çawa were êdî li ser serê "Sûrîya nû", wê ji rojava û Emarika ne dûr bê. Di dema Îraqê û mudaxelya wê de jî hat gotin ku "Îraqê nû". Lê ji ber ku tenê rêveberî guharî û zihniyet ne guharî, rêveberîya ku piştî hat li cihê wê rêveberîya baasê ya Saddam jî, î ro di zihniyeta wê de tevdigerihê. Di pêvajoya sûrîye de jî, ku zihniyet newê guharîn, wê tenê ya ku hatibê guharîn rêveberî û kes bin, wê wusa bê. Wekî din jî, ti tişteke nebê. Li ser wê re jî, êdî Emarika wê herê bi ser Îranê de. Di serî de, hebûna Sûrîyê û bi teybetî jî, rojavayê kurdistanê, di wê sêkoşeya wê de ku ew jê re dibê navend rojava, ji Rûsya û Îranê re dibê weke cihekî herî giring. Ji ber vê yekê, sîyesete ku lê wê were kirin, wê bandûra wê li wê sîyesete mudaxaleyê ya rojava û emarika jî hebe. Bi vê yekê, êdî giringya rojavayê kurdistanê, ji ya ku em dizanin bêhtirî derdikeve li holê. Bi vê yekê re, karê rêveberî û desthilatdariyê û parastina wê, li wê herêma kurdan, parastina wê giringtir û zor dibê. Bi vê yekê re, gotinên Serokwezîrê tirk ên ku digot in "emê mudaxela bikin" bi vê yekê re, divê ku mirov wan vala şîrove nekeê. Di temenê van politika û sîyesetên rojava de jî, ku rojava û emarika kurdan li gorî xwe nebîne, heya ku wê derfet û fersande mudaxelya bide çêkirin. Ji ber vê yekê, kurd, divê ku hezar carî bihizirin û gava xwe biavêjin.

Rojava, herême ku biqasî ku bandûra wê êdî wê li nîvgirava ereban hebe, wilqasî jî, wê li sîyesete bahre sipî jî wê hebe. Bi wê re, ez karim bêjim ku wê bandûra wê li sîyeseta îsraîl jî hebe. Kurd, bi serdestîya wan ya li herêmen wan re dibina aktorekî sereke li herême li rojhilat. Ji ber çî

çend ku başûrê kurdistanê desthilatdarîya kurd heya jî, bandûr û giranî herîtmî tê danîn li ser rewşa wê ya sîyasî ku ew bi wê re rabê ser xwe li herême xwe û li rojhilat. Nayê hiştin ku kurd bi wê re li herêmê weke hêzekê derkevina li holê. Bi vê yekê re, di aslê xwe de, bi rojavayê kurdistanê re, wê hinekî di vir de pêşîya başûrê kurdistanê û bi giştî kurdistanê bixwe jî wê vebe. Kurd, êdî weke aktorekî na. Bi çareserkirina pirsgirêka kurd ya li bakûrê kurdistanê re jî, wê kurdistanê bigştî bibe kirdeye sîyasî di sîyasete rojhilat de.

Kurdan, di destpêka derketina misilmantiyê de di nava avabûna rêveberîyên îslamî de bûna xwediyê cihêkî giring. Dewleta Şadadî û Merwanî, û ya Eyûbîyan, çend ji wan mînaqên vê na. Lê hemû jî, ew bûna xwedî weyn û rol jî biserdestîya wan ya li bakûr û rojavayê kurdistanê re bûya. Bi serdestîya wan başûr û rojhilatê kurdistanê re jî di dema Împaratorîya Abasîyan de bûna xwedî hêz û qûdret. Lê di cihanê îslamê de, bûna xwedî hêz di wan deman de, bi serdestîya kurdan ya li van herêmen wan bû. Di serî de, herême botanê ku pirranîya rojavayê kurdistanê jî hingî di nav de dihat hasibandin, weke dewlet dijî. Navenda wê dewletê jî Botanê bû. Merwanîyan çend ku Mayaferqin ji xwe kirina navend û paytaxt jî û Eyûbîyan çend ku Berfiratê Reha ji xwe kirina navend û paytaxt jî, lê dîsa ev rastî bi wan re û bi wan navend û navendkirinên wan re ne guharîya. Di dema dewleta Osmanîyan de, heta ku osmanîyan, serdestîya li herêmê botanê bidest nexistîya, kurd di pêşketina kevneşopîya wan de kêr nekirîya, nekarîya ku bike. Ji ber vê yekê ya ku di dema komarê de, dewleta tirk çand û zimanê kurdan qadaxa kir. Kevneşopî, di nava civakê de destûra herî bingehîn ya pêşketinê ya. Kurdan, ev yek dizanî. Li gorî wê zanebûnê jî dijîn. Î ro, Ingilistan, tê gotin bê destûr a. Kurdan jî berî hingî heman rewş dijî. Kevneşopîyên wan, weke destûrên wan yên nivîskî bûn. Ti kesekî ku ew ne dizanîn jî nebûn. Rojavayê kurdistanê, weke herême botanê, ew kevneşopîya wê ya ku lê xort, hê heya. Hê jî, ez karim bêjim ku ne weke berê jî bê, ew kevneşopîya wê xort a.

Di salên 1990î de, dewleta tirk, bi rêya olê xwest ku bikeve herême botanê de. Hingî, ew mirovên ku di nava kurdan de weke "sofîk" tên naskirin hatin şandin li herêmê. Dewletê bi destê wan bi hezaran mirovên oldar ên kurd ên ku li ser rêya rastîyê û haqiyê dimeşin qatil kirin. Bi wê re, armanc, ew bû ku ew pergale ku bi têngiştinê li ser lingan bû û bi kevneşopî dihat dijîyîn li herêmê wê ji holê rakê. Heta salên 90î jî, li wê herêmê mirovên ku perwerdehîya xwe bi kurdfî dihildan ku bi olê bê li ser temenê têngiştina Meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Mele hisêne batayî û hwd re dihildan. Bi wê rengê, pergale zanîna a doma bû li ser wê xwe bizanebûn dikirin. Dewletê jî, bi van dibistanan xwest ku wê pergale wan ya têngiştinê ji holê rakê. Ji ber vê yekê, êdî ji wê demê û pêde giringî dabûbûna dibistanê ku ji wan re dihat gotin "îmam hatîp" li wê herêmê. Bi wan dibistanên ku weke dibistanên olî na, di hat xwestin ku wî rastîya kurdan ku kurdan bi olê dijî û di temenê kevneşopîya xwe de dijî ji holê rabikin. Yanî, ev dibistanên bi navê "îmam Hatîp", dibistanên ku dewletê weke hin tedbîrîna li dijî kurdan girtibûn bûn. Ew dibistan, weke dibistanna wîç(elternatîf) bûn ji Medreseyên kurdan re ku bi sadsalan li kurdistanê hebûn ku

bi kurdî bûn. Di Medreseyan de, waaz,xwandin hemû bikurdî bû. Kuran, çend ku bi erebî jî bû, bi kurdî ya bi "hicirkî" dihat xwandin. Piştî jî, weke ku alimên kurd digotin, bi "sirakî" yanî bi erebkî dihat xwandin. Lê herdû awayê xwandinê bi hicirkî(bi kurdî) û bi sirakî(bi erebkî) jî di medreseyan de dihat xwandin. Ermanca, dewletê ya bi B dibistanên "îmam Hatîp" re ew ku van herdû awayên xwandinê jî li wir ji holê rakê. Tenê tirkî serdest bike. Lê di wan deman de, ji ber ku tekoşîna azadiyê li dijî wan sekinî û rastîya wan û armanca wan derxist li holê teşîr kir êdî bandûra wan zêde nebû. Nahaka ku di dema hikimete T. Erdogan de, dîsan zêdekirina van dibistanan biteybetî li herêmên kurdan, hinekî î bivê politikaya vê girêdayî ya. Di vê demê de dîsan kirina tirkîyê ya van dibistanên bi navê "Îmam hatîp" li rojevê de, hinekî jî bi politikaya wê ya li dijî kurdan ya bi demên ve girêdayî ya. rojavayê kurdistanê, di nava sînorê sûrfiyê de bû. Sûrfiyê jî, weke welatekî ereb, lê oldarî li pêş bû. bi vê yekê re, hinekî hewl tê dayin ku wê rewşa oldarîtiyê bi rêyên weke ên van dibistanan ku karibin, weke politikayên di demên pêş ku li dijî kurdan bikar bînin. Bi wan dibistanan, masûmetîya olê, bikar bînin û ser wê re politikaya xwe ya li dijî kurdan ji holê rabikin. Bi rêzê filmên olî bin û ankû dibistanên bi vî rengî bin, di demên pêş de, wê weke ku nahaka li ser saziyên Fethulleh Gulen re ku li başûrê kurdistanê dikin, ku temenê wê biafirînin li rojavayê kurdistanê jî wê pêş bixin. Çend ku temenê wê li rojavayê kurdistanê nebê jî, wê êdî wê biciribînin. Hinekî, ku çend ku li bakûrê kurdistanê jî bin, ev dibistanên binavê "Îmam hatîp" bi wanakan, dikin û dixwezînin ku destpêkê li ser wê re ji vir bidina dest pê kirin. Ez wilo zan dikim ku wê di demên pêş de, ev dibistan li ser vê axa kurdan wê weke xwelfiyê bînin zêdekirin. Li dijî wê politikaya ku êdî nikaribin olê bi van rengan li dijî kurdan bikar bînin, divê ku kurd li rojavayê kurdistanê û li bakûr kurdistanê jî tedbîrên xwe hildin.

.Naqşaya herêmê ku êdî rengê statûya kurdan ku têde afirîya lê ku ew statû ne hatîya pejirendin.

Li herêmê, bi serkevtina kurdan ya li rojavayê kurdistanê re, li herêmê ne tenê kurd li herêmên xwe êdî dibîna xwediyê desthilatdarî û rêveber, her wusa bi wê re naqşaya sîyasî ya li herêmê jî di wê de guharîn û herikîn jî di bin. Di serî de, ez wilo zane dikim ku piştî desthilatdariya kurd ya li rojavayê kurdistanê re, wê nêzîkatîya Îranê jî li dijî kurdan bigiştî biguharê. Ya ku tirkîye pîr didêne ser êgir û dike nave tevgerê de. Rewşeya nû ya ku bi sîyasî derkeve li holê, êdî di wê de kurd, weke hêzekê derdikevîna li holê. Wê bi serkevtina kurdistanê rojavayê kurdistanê re, nêzîkatîya Îranê bixwe jî, hem li dijî desthilatdariya kurd ya başûr bi guharê û bêhtîr bi ber başiyê ve herê. Îran, wê li dijî kurdên rojavayê kurdistanê jî ne di nava tevgeriyekê de bê. Ji ber ku Îran, rewşê baş fahm bike û şîrove bike, wê bibîne ku ev li gorî wê jî ya. Wê rewşa wê jî xort bike. Kurd, hertimî gotina ku em li dijî mudexeleyeka leşkerî ya li herêmê na. bi vê yekê re, beşê kurdistanê beşa rojhilatê kurdistanê, di nava sînorê îranê de ya.

Sûrîye, weke dewleteka ku rewşa Îranê ya li herêmi xorttir dike bû. Lê Îran, ji herême diçê. Îran, di rewşeka wilo de nêzîkatîya wê ya bikurdan re wê ji bo wê û rewşa wê baştir bibe. Heta ez karim bêjim ku Îran, pîrsgîrêka xwe ya bi kurdan re çareser bike û rojhilatê kurdistanê jî pîrsgîrêka kurd bi kurdan bi rêyê danûstandinê bike rêya çareserîyê de, wê li herême Îranê xorttir bike.

Îran û kurd, di dîrokê de di deme Medîya de, di deme axamanîşîyan de, di deme Sasanîyan de û di deme Sefevîyan de hertimî bi hev re bûna û bi hev re tevgerîyena. Yanî ku mirov li dîrokê binerê, mirov wê bibîne ku hertimî bi hev re bûna û bi hev re rewşa hevdû xort kirina. Di vê demê de bi hev re çima wê nekin. Li herême, karin tifaqaka demî jî weke wan tifaqên berê di nava xwe de bidina çêkirin. Ev yek, wê îranê, li herême ji rewşekê derxe û bibe û bike rewşeka din de.

Îran, heta roja me, bi politikayên dijî-kurdî tevgerîya ya. Bi vê yekê, hertimî li gorî politikaya tirkîye tevgerîya ya. Tirkîye li herême jî, hertimî ji bo ku wê rewşa xwe biparêze û wê înkara li ser kurdan bide domandin ketîya nava têkilî û hewldanan de. Lê êdî rewş û herêm û dem ne di temenê van têkiliyan de dimeşe û ne jî êdî karê bimeşe. **Li herême, ku mirov ji kîjan alîyê ve lê binerê, mirov karê bibêje ku kurd êdî hêzeke herêmi na. Kurd, hin bi hin û gav bi gav bi ber rewşa xwe ya berî şerê çardiranê ve diçin. Rewşa berî şerê çardiranê çi bû? Kurd, li herême xwediyê desthilatdariyên xwe bûn. Herêm bi herêm bi rêxistin bûn. Tifaqa di nava desthilatdariyên wan yên herêmi de jî hebû. Ez karim bêjim ku minaq desthilatdariya Eyûbîyan, heta wê demê tê û hinekî ji wê demê li herême di buhurê. Piştî wî şerî re kurd ketina rewşeka xirab de li herdû alîyan jî, rastî bêbaxtîyan hatin.** Li rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê ku pîrriya wê di wê demê de bi Sefevîyan re bû, piştî şerê çardiranê bi dîrxistina Şah Îsmâil re û kiryarên piştî kurd êdî bi awayekî vekirî rastî bêbaxtîyê hatin. Tevî ku di şerê Çardiranê de kurdan osmanîyan bi serxist jî, li wê aliyê jî kurd rastî bêbaxtîyê tên ji aliyê Osmanîyan ve.

Ji wê demê û heta vê demê şer û pevçûnên li dijî kurdan bidawî nebûna. ew pêncsad sal in ku kurd bi şer û pevçûnan re rû bi rû ya. Lê êdî kurd, weke ku di van deman de şer û pevçûnên xwe yên dawiyê dikin. Di serî de di wê demê de bi serkevtinên xwe re divê ku rewşa xwe li herêmen xwe xort bikin. Bi wê re jî, divê ku êdî bi girtina biryarên sîyasî ên li herême re kurd bigihijina statûya xwe. Ev yek, wê kurdan û herême jî rehet bike. Heta ku kurd ne gihijina statûya xwe û bi gotinaka din mafê xwe, wê aramî jî newê li herême. Heta ku ev rewş bidomê, wê hertimî dewletên herême jî bo wê înkara li ser kurdan bidina domandin wê şer û pevçûnên wan bi kurdan re bibin. Wekî din jî, çendî ku şer û pevçûn li herême bûn wê bêaramîbûn li herême bibe. Ev jî, hertimî wê bê temenê mudaxeyên li herême.

Ji ber vê yekê kurd, êdfî divê ku bigihijina mafê xwe. Ev yek, wê bê temenê aramîya herêmê jî. Li herêmê, mifte aşîti û aramîyê jî dîsan kurd in.

Îran, nahaka ew jî di nava xwe de şîrove dike ku Bi xûrîxîna rejîma Sûrîye re valahîyek ji aliyê sîyasî ve derdikeve li holê. Ew valahî, ji herkesekî zêdetir wê bandûra wê li Îranê bibe. Îran jî, vê yekê dizanê. Ji ber vê yekê, ez karim bêjim divê ku îran, êdfî bêfî ku demê bide wînda kirin, hin politikayên nû bike dewrê û merîyetê de. Di serî de, divê ku pîrsgirêka kurd ya di nava xwe de çareser bike. Li ser wê çareserkirinê re karê rewşa xwe hem bi têkiliyeka tifaqî ya bi kurdan re xort bike û hem jî karê li herêmê rejîma xwe têde bi ber pêşarojê ve pêşketinan têde bide kirin. Bi wê çareserkirinê re karê reforman di nava xwe de bide çêkirin. Bi wê yekê re hem rewşa xwe xort bike û hem jî li herêmê weke hêzeke mazin karê di sîyesete pêşarojê de rol û weyne xwe bileyizê. Heman tiştî mirov karê ji tirkîye jî bibêje. Lê tirkîye, ji naha de rewşa ku li ser temenê dijminatîya kurdan hîlbijartîya û kurdan tehdît dike. Ev, wê tirkîye li herêmê, wê tenê bandûra wê kêr bike. Wê ne ji herêmê re fêde hebe û ne jî ji tirkîye re.

Lê berî hertiştî, Îran, di wê demê de divê ku pêşketinên ku li herêmê rû didin ji xwe re jî weke fîrsandekê bibîne û li ser wan re bikeve nêzkatîya baş ya bi kurdan re. Bi wê re jî, dikarê gavan bi avêje di çareser kirina pîrsgirêka kurd de. Li ser wê re jî, dikarê li herêmê, hêze xwe mazintir bike.

Li herêmê, bi teybetî, piştî vê mudaxeleya li rojava li ser hin komên çekdar re di bin navê "artişa azad" de ku li ser tirkîye, Qatar û Sûûdî Arabîya re bi rêxistina kirina re, nêvî bi nêvî mudaxele li li Sûrî hat kirin. rejîma Sûrîye nîvmirî hat kirin. Lê wê di vê demê de ew rewş, weke ku hinekî din jî bi vî rengî bê dirêj kirin. Weke mudaxeleya Emerîka ya li Îraqê ya di salên 90'î de ku bû û piştî hat dirêj kirin, wê rewşa bi wî rengî heya ku derkeve li holê. Lê ji bo ku vê gotinê jî bi awayekî êmin bibêje hê dem divê. Lê wê rewş, êdfî pêl bi pêl, mudaxele lê bibin. Bi wan pêlên li ser Sûrîye re wê êdfî dem bi dem hinekî sîyesete rojhilat were rastkirin û dîzaynkirin. Ev rewş, wê tirkîye jî û Îranê jî bi bandûr bike. Lê Divê ku ez bibêjim ku rewş, êdfî ji her aliyê ve dikeve demeke nû de. Awa û şeklê sîyesetê û gotinên sîyesetê ên li rojhilat êdfî wê ne weke ên berê bin. Bi vê yekê re, li ser rewşeka nû re wê sîyeset were kirin. Di vê demê de kîjan hêz dînamîk bê û karîbê rewşê di cih de fahm bike û li gorî wê gavê biavêje, ewê bê yê ku di sîyesete rojhilat de ku bibe hêzeke kifşkar.

Nahaka, li ser Nyê re weke ku di nava Emerîka û Rûsya re ev pêvajoyê buhurt. Lê ji bo demên pêş û sîyesete wê ya ku wê were kirin jî ji naha de herdû hêz jî kar û amedekarîya xwe dikin. **Di vê demê de zîmanê sîyesetê, wê li ser sê nêzkatîyan re bimeşê. Yek, bi hêzî yanî bi artişî hêze xwe nişandin a li herêmê. Ya dûyemîn li ser pêlên sîyesî ên ku bibin re wê sîyeset bibe û dîzaynkirin were pêşxistin. Nêzkatîya sêyemîn jî, ew a ku di vê çerçova wê dîzaynkirinê de li**

herêmê, êdî têkiliyên sîyesî, aborî, dîplomatîkî û hwd ji nû de tîn kirin û rast kirin. Weke ku ji nû de êdî herkesek li ser masayê kartên xwe ji nû ve bi belavkirinê digir in. Têkiliyên aborî ên li ser başûrê kurdistanê ku dibin û hikimeta Malîkî li dijî wan disekinê, weke wan têkiliyên demî ên ku ji nû ve tîn danîn, divê ku mirov şîrove bike û bêne ser ziman. Di wan bertekên Malîkî de, ne tenê bertekên malîkî hene. Rast a, weke bertekên malîkî tîn dîtin û berçav. Lê di piştî wî de tirkîye jî heya.

Bi vê yekê re, li herêmê, êdî hêz û navendên ku têkiliyên bi derketina kurdan weke hêzekê li holê re zêdetir dibin. Wê navendên din jî wê derkevina li holê. Lê Emerîka, dem bi dem pêde diçê. Di vê pêla mudaxele-yê de nahaka nahaka rewşa nû ya ku derket li holê weke ya rojavayê kurdistanê û hwd, pêşî wê ew werina salixkirin û naskirin û ew wê werina naskirin. Piştê li ser wê naskirin û salixkirinê re wê pêlên din ên weke van mudaxeleya ku nahaka li ser "artişa azad" re ku li Sûriyê bû, êdî wê bibin. Lê pêla piştî vê re, wê rewş, ji vê rewşê çûdatir bê. Di vê rewşê de weke ku berdevkê wezete karê derve ya Emerîka Patrick Ventrell got ku "nahaka, em rast nabînin ku rewşê zêde leşkerî bikin û bi wê pêde herîn." Ew gotin, nêzîkatîya stretejîkî û sîyesî ya politik a.

Tirkîye ku di destpêkê de ku bahse mudaxeleya li Sûriye hat kirin, di cih de xwe avêt nav de û di cih de bi herdû dest û lingan ket nav de. Ev nêzîkatîya tirkîye jî, dide nîşandîna ku yên ku politikaya wan ya stretejîk didina kifşkirin, çendî û çiqasî ji pêşîya xwe dîtinê bêpar in. Ku wan pêşîya xwe dîtiba, wê bi wî rengî ne ketiban nava wan gotinan de. Wê bi vî rengî ew kirin ne kiriban. Ku mirov tenê li vê yekê û rewşê binerê, mirov fahm dike ku ka mejîyna çawa vî şerî bi kurdan bi rê ve dibin. Bi tememî, ev mejî, ji dîtina ku bi wê pêşîya xwe bibînin û stretejîyan ava bikin, dûr in.

Kî çî bêje bila bibêje, li herêmê, pêvajoyaka ku weke serokê gelê kurd digot, bi ber wê ve çûyin dibêt. Êdî bi ber konfederasyona rojhilat ve çûyin dibêt. Ewropa, di sale 1949'an de temenê wê hat avêtin û pêvajo bi pêvajo hat ava kirin. Nahaka, ewropa ava bû. Welatên ku wê di nava projeya ewropa de cih bigirtan, cih girtin. Êdî weke ku li gorî Emerîka jî û rojavajî ew temem bûya ji bilî çend kêmesîyên piçûk. Nahaka bi pêvajo û pêlên sîyesetên re ew tê bi rê ve birin û barî pêşaroyê tê kirin. Nahaka rojhilat dîzaynkirina wê di temenekî bi vî rengî de tê kirin. Rojhilat, bi dîzaynkirina wê re, wê ne tenê rojhilat bigihijê aramîyê, wê weke rojava jî bigihijê aramîyê. Weke ku heta nahaka bû û ji nûha û pê de jî, çî ku li rojhilat bû, wê bandûra wê li rojava bibe. Bi vê yekê re, zîrer li herdû aliyan jî dibê. Êdî bi vî rengî ev rewşên bi pirsgirêkî ji bo pêşaroyeka serkevtî û aramiya li herdû herêman, pêdivî bi aramiya li rojhilat heya. Kurd, êdî di nava ahang(balansê) û têkiliyên ku tîn danîn de cihê wan dibêt. Ya ku ji wê re ne amede na, welatê rojhilat in. Yên ku ne amede na, Tirkîye û Îran in. Ji ber vê yekê, î ro di van rewşê xirab de na. Ji ber vê yekê, î ro van tehdîdan dîkin. Lê ku î ro çendî tirkîye kurdistanê tehdît jî bike û heta ku

bikeve rojavayê kurdistanê jî de, wê zirerê nede kurdan. Tenê çend perezgeh xûrûxandina wan û pêde, wê ti tiştekan nebê. Lê wê di wê pêvajoyê de jî tirkîye jî êdî ne weke tirkîye berê bê. Çawa bi nêzîkatî bi vî rengî Piştî xûrîxîna yekîtiya sovyet re, yugoslavya jev belav bû û Sîrbîstan derket û li beşeka li kevîya rojava komkuji pêk hanîn bi wê re nahaka rayadarên wê di dadgeha şer de didarizîn, her wusa, tirkîye jî bi vî nêzîkatîya xwe ya netewperest û dijîtiya xwe ya li dijî kurdan bi ber sîrbîstan tîyê ve diçêt. Ew jî, bi vî rengî, dewam bike, wê bê sîrbîstane rojhilat.

Li herêmê gelê kurd, gelê herî kevn a. Gelê kurd, gelê ku li herêmê xwediyê dîroka herî kevn a. Î ro ser pêncih(50) milyonî re li herêmê dijîn. Lê ne xwediyê ti statûyê na. Li cihanê, î ro, gelên ku hijmara wan bin du milyonan re ya xwedî dewlet in jî. Lê kurd, weke gelekî wilqasî mazin hê ne xwediyê statûyekî jî na. Kurd, wê li herêmê bigihijina statûya xwe. Li herêmê, di temenê bi hev re bûnê de ku bi awayekî konfederelî pergale rojhilat pêş bikeve weke ewropa roja me, wê kurd têde bi statûya xwe bi desthilatdar têde bijîn. Tevî ku dervî vê zêde ti derfetên din jî zêde yên jîyandinê nîn in jî, ku hêzên li herêmê dijî wê xwesteka statûya kurdan derkevin, wê kurd êdî ev pêvajoya ku wan daya dest pê kirin, wê li vir ne sekinê û bi ber dewletbûnê ve herê. Bi vê yekê, dervî vê rêyaka sêyemin nîn a.

Î ro kurd, li rojavayê kurdistanê bidest avakirina rêveberiyên xwe dikin. Wê kurd, vê yekê pêş bixin. ev ya mafê wan jî ya. Kurd, ya ku dikin di vê demê de ya herî rast a. Proje ya wan ya ku wan danî li holê, bi destê serokatîya tekoşîna azadiyê, î ro hin bi hin pêşketinên ku di bin bi ber wê ve herêmê di bin. Îran jî, wê li gorî wê were ser rê. Dervî wê, ji xwe ti derfetên wê ên din jî nîn a. Lê karê di vê demê di nava rewşa bi vî rengî ya ku me bahskir de tîkiliyê bi kurdan re dêne û tifaqaka xort bi kurdan re dênin. Ev demên berê de bûna. Di dema Medîya de kurdan ew tîkiliyê danî û ew tifaq çêkir. Piştî jî di dema Axamanîşîyan û Sasanîyan de Persan ew tîkilî danî û ew tifaq çê kir. Di dema Sefevîyan de jî herdû li cem hevdu bûn. Herdûyan bi hev re danî û ew tifaqa di nava xwe de çê kirin. Î ro jî dikarê wê tîkiliyê ku wan deman ji xwe re mînaq bigirê û deynê û bi wê te tifaqekê herêmî û dîrokî bi kurdan re çê bike. Bi tîkildanîn û çêkirina tifaqaka bi vî rengî wê kurdan û persan li herêmê bike hêzeka mazin ya kifşkar ku ne tenê di sîyesete herêmê û pêşaroja wê de bidina xwedî weyn û rol, ku di ya cihanê de jî wê rol û weynê bileyizin. Bi vê yekê, li herêmê wê ereb, pers û kurd bina hêzeke herî mazin ên ku baxtê herêmê didina kifşkirin.

Tirkîye li herêmê, bi dijîtiya wê ya li dijî kurdan, wê ti carî li herêmê nebe hêzeke mazin ya herêmî. Divê ku ew vê yekê bibîne û kifş bike. Di vê demê de, dîplomasi û tîkildanîn, wê naqşaya sîyesî ya herêmê awa û şeklê wê bide afirandin. Li ser wan tîkiliyan re, wê statûya herêmê rengê wê derkeve li holê. Ne hewldan û astengkirinên tirkîye ên ku ew artîşa xwe dike dewrê de kurdan tehdît dike û ne jî ew leyistîkên ku ew û hin hêzên din ku li ser hikimete baxdadê re dileyizin, wê karibin tişteki bidina kifşkirin. Ji ber vê yekê, ya herî rast ew a ku êdî di temenê danûstandinê de

hebûna hemû xalkên herêmê ên weke kurdan bi cihêrengîya wan re werina herê kirin û bi wê re li herêmê, weke hêzên herêmê dikarin rojhilat statûya wê kifş bikin.

Di vê demê de, tirkîye, hertimî ketiya pey wê de ku tekoşîna azadiyê çekan berdê. di nava vaqas herîşan de tenê tekoşîna azadiya kurd PKK î ro weke hêza ku ewlkarîya kurdan çê dike ya. Dervî wê ti hêzên ku karibin, wan bi parêzên nîn in. Ku PKK neba, wî î ro rojavayê kurdistanê, ew şoşa li wê nebûba. Ev şoşa li rojavayê kurdistan weke ancamaka wê tekoşîna wê ya birûmet ya 30 salî ya. Ew ancam di berdêla bi pekrawanbûna bi hezaran ciwanên kurd bûna. Ne dewleta tirk û ne jî ew kurdên bêrûmet ku li ser navê dewleta tirk ku hêrîşî tekoşîna azadiya kurdan dikin, êdî dema wan jî buhurtîya. Heta nahaka wan bêrûmetên ku ji xwe digotin "em kurd in", hêrîşî tekoşîna azadiyê dikirin. Piştî ku şoşa rojavayê kurdistanê bû, piştî wê re ku PYD derket li pêş weke hêzeke kurdistanî ya rojava, êdî dewletê gota wan hêrîşî wê bikin û êdî nahaka wan jî li ser navê dewleta tirk bidest hêrîşê kirin. Ne hata vê demê kurdan ti xêr ji wan dîtîya û ne jî wê di demên piştî de wê ti xêrê ji wan bibîne. Ya ku em ji wan re bibêjin, tenê bastika vî gelî û tekoşîna wê berdî û herin ku win bi kûve herin.

PYD jî û PKK jî, rûmete gelê kurd in. Ev bisalana ku ew di nava gel de ji bo ku gel bi rêxistin bikin û ji bin vê metingerîya wan dewletên li ser serê wan rizgar bikin têdikoşin. Lê ka evên ku hêrîşên van rêxistinên kurd dikin, wan ji bo kurdan çî kirîya? Wan kevirekî jî danîya ser yekî din? Ji ber ku ti gotîna wan jî nîna ku bibêjin, êdî, li ser gotinên dewletê re li ser navê dewletê hêrîşî rêxistinên kurdan ên weke PYD, BDP, PKK û hwd ku tevgera azad didin dikin. Ku sibe, rêxistinaka azadîxwez ya nû ji nû ve jî were ava kirin, ev dordor wê hêrîşî wê bikin. Ji ber ku ew dordor li ser navê dewletê û bîrdozîya wê bi kurdan re têdikoşin û şer dikin. Lê li ber dîrokê ev rêxistinên kurd, wê dîrok, hertimî navê wan bi rûmet bibîr bêne. Ji xwe gelê kurd î ro wan bi rûmet kirina jî. Her roj, bi hezaran û deh û sad hezaran dadikevîna qadan û bi wan û rûmeta wan dirîşman diqîrin. Gelê kurd, bûya gelekî politikî, Êdî ya rastî li kuderê dizanê. Ji ber vê yekê jî ya, yek jî ji wan nikarin derkevîna nava gel. Heta nahaka yek jî ji wan ketîna nava komeke piçûk ya de jî? Ez wilo zan nakim. Dem li herêmê, êdî dema kurdan a. Sadsal êdî sadsale kurdan a. Ev sadsal, kî çî bêje bila bibêje, wê bê sadsala kurdan. Li herêmê, tekoşîna kurdan û hemû nîrx û pêşketinên wê, wê li herêmê jî xalkên din ên li herêmê re jî bîna rohnî. Bi vê yekê re, ez karîm bêjim ku bi tekoşîna azadiyê û serokatîya wê re kurd, êdî hatîna wê astê ku bi têngîhiştin û zanebûna xwe re ku pêşengîyê ji herêmê hermûyî re bikin. Hêze herî mazin xwe pêşxistin a. ew hêz, jî artîşa herî mazin ya bi tang û top jî ji wê jî mazitira. Zanebûn û rêxistin, hêz û qûdreta herî mazin a. Î ro, kurd, xwediyê wê hêz û qûdretê na. Ji vê demê û pê de jî, divê ku wusa bidomên in. Divê ku hê bêhtir bi rêxistin bibin. Li dora sazîyên xwe bigihijina li hevdu. Li zimanê xwe xwedî derkevin. Dibistan û zankoyên xwe ava bikin. ...

Ev pêvajoyê, bi vî rengî pîrr giring a. Kurd, divê ku rengê statûtiya xwe bi rêxistinîtiya xwe ya bi denezendina xweserîya xwe re û bi parlamenê xwe re û bi hikimetên xwe yê ku damazreênin re bidina nîşandin li berçav. Bi wê re jî, wezeretên xwe yê perwerde, rêvebirinê û parastinê û hwd divê ku avakirin û xort bikin. Li herêmê, ya ku wê tenê statûtiya wan ya kurdistanê bide afirandin û parastinê jî, wê ev bê. Li rojavayê kurdistanê, heva vê kêlîka ku min ev nivîsand, tenê zanîngehek jî bi kurdî tûnaya ku karibê ciwanên kurd bi zimanê wan bide perwerde kirin. Ev alî û hemû aliyên weke van divê ku li wan were hizirin û ew werina avakiirn. Ya ku wê pêşarojê bixwe re bênin jî wê ev bin. ...

Beş du; dîroka başûrê kurdistanê: .

Dema ku em li dîroka kurdan dinêrin, em dibînin ku dîrokaka wan ya pîrr kevn heya. Lê ev dîrok, bi tememî û li gorî rastîya xwe ne hatîya nivîsandin. BI teybetî, em divê ku bibêjin ku dîroka kurdistanê, bigiştî, bi hev ve girêdayî ku mirov lê dinêrê, mirov dibîne ku çendî di pêşketina herêmê bigiştî de weyneka dîrokî leyistîya. Başûrê kurdistanê, bi teybetî, di vê nivîsê de em bi nivîsandina mejûya bi sereka bikina mijare nivîsa xwe. Ev demên dîrokî ku em têre di buhur in, bi teybetî, fahmkirin û xwenaskirin, weyna wê pîrr giring a.

Başûrê kurdistanê, divê ku mirov bibêje ku dîroka wê ya berî zayînê, ku em hildina ki dest, divê ku em herina ta dema Sûmerîyan. Di demên Sûmerîyan de bajarên weke Lagaş, Nûzî, Kîş, Nîppûr, Eşnûna, Şûpar û hwd, çend ji wan bajarên di wan deman de ku hena na. Pêşketina di van herêman de, li ber ava dîclê re pêş dikeve. Ber-dîclê, di xatekê de, em dibînin ev pêşketin dibin. Herêma Nûzî, ku di roja me de li herêma Kerkûk(korek)ê dikeve, di roja me de, kêvilbar(tablet)ên ku bi nivîskî jî wê dihên ditin û ku tînan xwandin, di wan de, rengê pêşketina di wê demê de dihê li berçav. Ev herêm, bi teybetî, herêmeka pêşketî ya. Li herêmê, bi teybetî, di dema dûyemîn ya Sûmer(kiengîr)îyan de, di temenê pêşketina Babil û aqadiyan de, pêşketina ku derdikeve, mirov bi awayekî rast ku wê bixwêne, mirov wê bibîne ku ev herêm, di temenê yekparatîya xwe ya bi herêmên Gûtîyan re ku li ber-dîclê jî ber çîyayê cûdî û heta ku digihijê ber çîyayên Zagrosan û jî dema hûrî û mîtannîyan, ku jî ber firatê, heta ber-dîclê û jî wir jî bi ber çîyayên cûdî û zagrosan pêşketinên ku hatina jînkirin, bi rengê wan re em pêşketinaka dîrokî dibînin.

Rengê pêşketina hûrî û Mîtannîyan, em di demên piştê de, ku derdikeve li holê, em rengê wê pêşketina dema sûmerîyan jî hinekî jî wê dixwênin. Teybetmendiya pêşketina dema Gûtîyan, û piştê ya hûrî û mîtannîyan ew a ku bi sadsalan li wê herêmê jîyane na. Cih ne guharandina. Ya ku wê jî me re weke temenekî giring weke temenê fahmkirinê ku em li ser bisekinê jî wê ev bê. Dema ku em dema hûrî û mîtannîyan, li wan dinêrin, em dibînin ku herêmên başûrê kurdistanê, wê di bin desthilatdariya wan de bê. Di "teksta-marî" de ku hatîya ditin û jî wê "navên hûrîyan" hatîya xwandin de, em navê "dohuk"ê û hwd, bi gelek navên din re dibînin. Herêma dohukê, di

wê demê de, heya. Ji wê, mrov fahm dike ku weke herêmekê ku pirr tê nasîn û navê wê derketiya li pêş a. Bi wê re jî, navê "ûrmîya" Wûrme", navê kirmaşanê "kirma" û hwd, ên herêmên rojhilatê kurdistanê jî, em dibînin ku bi nav û deng hena. Navê Hewlêrê jî, hem bi rengê "erbela" û hem jî, ji nava xalkê jî di nav de bi rengê "hewlêrê" em dibînin ku heya. Ev navên ku dîrokî, hinekî jî di drbarê pêşketina wê herêmê de, têgihîştinekê bi me re didina çê kirin.

Başûrê kurdistanê, ev herêm, bi teybetî, dema ku em wê hildina li dest, bi teybetê, di demên berî zayinê ên demên şariştanî ên dema hûrî û mîtannîyan de, em dibînin ku pirr li pêş a. Berî wan jî, di dema Qasît, loloyan û hwd de, em vê yekê bi teybetî dibînin. Di dema hûrfîyan û hwd de, weke demna hemdem ku em di di dewama wê dîrokê û pêşketina wê de lê binerin, emê di wê temenê de bi wê dîrokê re bi pêşketina wê re weyna ku leyistî jî bibînin. Heta ku dem tê demên berî zayinê ên berî zayina Îsa sadsalên 2´min û hwd jî, desthilatdarîy(keyanî)ên li herêmê ên weke ên "adîbanê" û hwd, ku heta roja me, di nava çîrokên kurdan de xwedî nav û deng a û tê, em dibînin ku herêma Hewlêrê ji wê re navend a. Herêma Hewlêrê, wê weke herêmekê giring bê. Bi wê re jî, ji ber Dohukê û heta ku digihîjê herêma Zaxo ku di nava kurdan de bi navê "ezîyex" jî dihê bi nav kirin, em dibînin ku di temenê yekparatîyekê de bi hev ve ya û di bin desthilatdarîya gûfîyan de, di dema wan de weyn leyistîya. Di wê demê de, navê wan derketîya. Navê "Êzîyex", tê gotin ku navê newîyekî nebî nûh a jî.

Di dema gûfîyan de, em dibînin ku gûfî, wê desthilatdarî û serdestîya wan, heta ber çîyayên zagrosan wê hebe. Di wê temenê de, bandûra wan heya. Ev herêm û keyaniyê ku herêm bi herêm hena, wê di bin desthilatdarîya wan de xwe bijîn. Li herêmê, bi teybetî, heta ku dem tê sadsalên 12´min ên berî zayinê, em dibînin ku wê hin bi hin hêzên nû derkevin. Asûrî, piştî dema Aqad û babilîyan, wê weke demê giring ji sadsalên 17´min û heta 14´min wê bijî. Lê ev dema wan, wê li herêmê wan bikê hêz. Lê piştî demekê û bêdengîyê wê re, wê êdî piştê di dema ku asûr bi Naîrîyan re dihên ber hevdû û cengeke mazin 1128´an de dikin û serdikevin. Wê êdî di wê demê de, li herêmê hewl bidin ku demêka nû bijîn. Lê ew serkevtin, wê çend ku pêşketinekê ji wan re bêne jî, wê ji temenê keyeniyekê ne buhurê. Babilî, qasîtî, Medî û hwd, bi hêz in û xwedî desthilatdar in. Heta demekê wê di temenê levkirinekê de wê bi hevdû re bijîn. Lê piştê, di dema ku Medî û Babilî lev dikin û hêzên xwe bi hevdû re dikina yek û bi hevdû re xwestin ku serdest bibin, wê êdî li herêmê êdî ew serkevtinê bidest bixin û wê serbikevin. Di wê demê de, Desthilatdarîya Hûrî û mîtannîyan ku rojavayê kurdistanê navenda wan a û bi ber başûrê kurdistanê xwe de xwedîyê bandûr û desthilatdar in, êdî wê bi piştgirîya wan jî, êdî wê dem û desthilatdarîya nû bi wan re pêş bikeve. Hûrî û mîtannî, ziman û çanda wan li herêmê bigiştî serdest a. Her wusa, pêşketinên dervî herêma wan jî, ku hin bi hin rû didin û dibin, wê bandûra hûrîyan û mîtannîyan û hwd, wê hebe. Hûrî û mîtannî, demên wan, demna teybet ên kifşkar in. Dîrok, çand, pêşketin û têgihîştin û her wusa ziman jî di nav de, wê pêşketinên hûrî û mîtannîyan

di temenê wê de bin. Serdestîya olî û hwd jî, divê ku mirov di nava van pêşketina de bi hasibênê ku di destê wan de bûya.

Hûrî û mîtannî, weke ku şoreşeka çandî û têgihîştin û hwd, di dema xwe de dikin. Em vê yekê dibînin. Bi wê pêşketina wan re, serdestîya wan bi çand, têgihîştin û hizrên wan re heya. Dem, ku tê dema Mîtra û hwd, em dibînin ku ew pêşketin û serdestîya wê pîrr zêde pêş dikeve. Heta ku ji bahre hûrmûz bixwe jî di buhurê. Li Herêmên hîndistanê hwd jî, ew pêşketina wan, wê bandûra wê hebe. Di van deman de, pergale olî ya "yek-yazdanî" heya û serdest a. Ev pergal, wê piştê jî, pêşketinên olî hemûyan ji temen ve bide kifşkirin. "ola yazdan' û ankû weke ku di roja me de tê gotin "ol êzda", wê ola pêşî ya bawerîya li yek-yazdanî bê ku tê ya. Piştê wê ola cihûtiyê were û wê wê pêşketina wê, bi gelek ancamen wê re ji xwe re bike bingeh û pêş bikeve. Piştê, heta ku dem tê dema derketina filehiyê û hwd jî, wê ev yek wusa bê. Piştê, pêşketinên olî, ên weke Zerdestîti, yarsanîti, Manîti û hwd, mirov ê yekê bi teybetî dibîne. Ev pêvajoyên, piştî Mîtra re dihên û biserdestî dijîn ên weke demên Zerdestîtiyê, ppêşketinên bi yarsanîtiyê re û her wusa ên bi Manî û hwd re, weke pêvajoyên li dûv hevdû ên pêşketinê bin in.

Demên berî zayinê, ku mirov li wan inerê, mirov dibîne ku bi teybetî, ew xate li ber ava-diclê re ku diçê, em dibînin ku hemû pêşveçûn li wir û di wê xalê de dibin. Li herêmê, di wê demê de, hemû pêşketinên ku rûdidin, didina nîşandin ku li herêm hem di nava xwe de tekoşinên bo desthilatdariyan hena û hem jî hêzên ji derve ku tên li herêmê jî li herêmê bo ku bibina xwedî serdestî bi hêzên herêmê ên ku hena re dikevina şer û pevçûnan de. Di demên berî zayinê de hatina Îskenderê zûrqrarneyn bi ber herêmê ve, wê herêmê bike qadaka ku lê şer pîrr zêde dibin. Piştî şerê Îsos'ê re Hêzên Îskender wê werin û bigihijina herêma başûrê kurdistanê herêma Hewlêrê û li wir bi hêzên kurd û faris ên ku bi hevdû re şer dikin re wê bikeve şer de. Di vî şerî de, bo ku hebûna xwe biparêzên, wê hêzên Asûr û babilî jî ku mana, wê bi di nava wê hêzên herêmî ên kurd û farisan de cih bigrin û li ber hatina hêzên Îskender bikevina şer de. Di wê demê de, li herêmê, tevî ne amedekariyaka mazin jî, wê hêzeka mazin li herêma Hewlêrê liv hevdû bicivê ku hêzên Îskender pêşwazî bikin. Lê wê gelek komên hêzan ên ku bihatan wê newin û wê li herêman bimênin bi armanca parastina herêman. Ev jî, wê bike ku hêza ku li Hewlêrê wî pêşwazî bikin, kê mîmê. Ev şerê li herêma hewlêrê tê kirin, jê re "şerê gawgamala" jî dihê gotin. Ev jî, wê bike ku hêzên Medî ên ku ji ên kurd û faris û xalkên din ên herêmê pêk dihat bi sernekeve. Piştî ku hêzên Medî, dibînin ku ew rewş wê bike ku zirreka mazin bide wan, wê stretejiyeka din bikina dewrê de. Hêzên Medî ên kurd û faris, wê piştê ji qada şer bi temamî xwe bi şûn ve vekişênin û wê li dora çiyayên Zagrosan xwe bigrin. Piştî ku hêzên Medîyan xwe zagrosan girt, piştê hêza Îskender kir ku herê bi ser wan re û çû jî. Lê kîjan koma wan ya leşkerî ku çû bi ber çiyayên zagrosan de bi şûn ve nevegerîya. Zagros, bû weke cihêki ku hêza Îskender nekariya wê bdest bixe. Ev rewş, di dilê Îskender de maya. Hêza Îskender li du cihan derba xwarîya. Yek, li ber hêzên Medî ku xwe sipartina çiyayên Zagrosan. Ya din jî, li ber wan

şervanên Hindî ku li ser filan li pîyan ku dikarin şer bikin û tîr û kevan biavêjin a. Li ber van herdûyan bi serneketîya.

Medî, piştî ku di sadsale 550 û hwd de, ku derbeyek xwarin jî, lê dîsa piştîre karîna ku xwe li hevdû bicivênin. Her dema ku ketina zorê de, xwe li çîyayên xwe yên asê girtin. Piştî ku di nava wan çîyayên asê de, xwe girtin û xwe kirina hêz, êdî piştîre hatina û li bejahiyê li hevdû bûna kom. Di wê demê de jî, ev yek wusa bûya. Dema Medîya, wê piştîre, desthilatdariyên herêmî ên ku ava dibin jî, heta ku piştgirîya wan negirin, wê nikaribin xwe li ser lingan bigrin. Ev yek, ji bo desthilatdariya Axamanîşan jî di buhurê. Û piştîre, bo desthilatdariya Sasanîyan jî wê bi buhurê.

Li herêmê, rewşa ku hebû, ji aliyê têgihîştinî ve pirr li pêş bû. Bi teybetî, piştî ku di dema Medîyan de, Zerdeşt pêşket û avestayaya ku nivîsandî, wê piştîre temenê pêşketinên dema nû biafirêne. Dema ku ew pêşketinên li ser xate avesta newîna fahm kirin, em divê ku bibêjin ku wê pêşketina herêmê jî bi temenî û bi başî newê fahm kirin. Avesta, pûrtûka pîroz ya dema olî ya 'yek-yazdanî' ya. Her wusa, avesta, êdî bi temenî li wê herêmê wê cudahiyên olî ji holê ra bike. Bawerîya li 'pîr-yazdan' an, wê bike li 'yek-yazdan'tîyê. Ev jî, wê rewşa avesta, bi awayekî pirr giring werêne li holê. Weyn û rola ku avesta di pêşketina herêmê de leyist, heta roja me jî, bi temenî û li gorî rastîya wê ne hatîya fahm kirin. Piştî ku Zerdeşt, avesta nivîsand û ji dema wî û pê de, heta ku dem tê dema Manî û piştîre, wê demeka ne bin heştasad salî re wê bi buhurê. Ev dem, wê di wê de, "civatên avesta" wê biafirin. Bi vê yekê, serdestîya avesta û pêşketina wê, êdî wê temenê hemû pêşketinên din, biafirêne. Manî, di aslê xwe de, li vir ku em gotinekê bo wî bibêjin, divê ku em bibêjin ku wî, pêşketinên ku li ser pêşketina avesta re ku di nava civatên avesta de bûna, li gorî rastîya avesta xwandîya û ew derxistina têgihîştinê û li ser wan re hizrên xwe yên olî afiandîya. Yanî bi gotinaka din, em dikarin bibêjin ku Manî û pêşketina wî bixwe jî, ancamaka pêşketina avestaka di nava rûpelên dîrokê de. Di wê pêvajoya nû ya pêşketina civate hemdem de Manî, rastîya olê bi pergali ku çawa ku divê ku were ser ziman, wî di serê xwe de kifşkirîya û hanîya ser ziman. MInaq, di nava pêşketina civateka hemdem de, ya giring çîya, bûna perwerdê û kirina wê ya, wî jî giringî daye perwerde kirinê. Mirovê civate hemdem bi keseyetîya xwe re divê ku çawa bê û çawa bijî û jîyane wî çawa bê, li ser wê hizirîya û ew bi rêgezên wê re hanîya ser ziman. Li vir Manî, bi hizir û têgihîştin û pêşketina xwe re, weke astek û radayekê ya.

Di vê temenê de, piştî ku em Manî û pêşketina wî, weke ast û radayekê kifş bikin û piştîre, em divê ku carek din li şûn xe vegehirin û bahse Zerdeştîyê û yarsanîyê bikin. Divê demê de pêşketina wan bi têgihîştinî serdest a. Yarsanî, bawerîya wan li "yazdan" a. Pirtûka wan ya pîroz "serancem" a. Di aslê xwe de, ku em yarsanîyê bi destên wê ên din ên weke Kakayîtyê û hwd re weke ling û şiqna xate olî ya êzdatîyê şîrove bikin wê ne xelat û şaş bê. Wê rast bê. Ji ber ku ev yek wusa ya û rast a. Nirxên ola êzdatîyê û hizrên wê ên pîroz, ên berê di nava yarsanîyan de bicih in. Bawerîya êzdayan ya li Melekê Tawis, bi bandûrî di nava yarsanîyan û kakayî û hwd de

jî heya. Ji ber ku temenê wan yek a û gotina "yazdan" ku navê 'xwûdê' ya. Piştire, dem bi dem pêşketinên din ku diafirin, minaq weke derketin û pêşketin Manî û hwd, wê êdî bi navê wan re werina ser ziman. Manî, bixwe jî, oldarekî 'yazdan'ê mazin a.

Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku Başûrê kurdistanê jî, navend a ji van pêşketinan re. Bi giringî, divê ku ez bibêjim ku pêşketina Manî jî û ya Yarsanan jî, wê qada wan ya pêşketinê rojhilat û başûrê kurdistanê bê. Yarsan, ku weke navendeka wan ya pîroz û ku dihizirin ku wê "roja mahşerê" jî li wir bê, bajarê 'şahê-zor' bo wan di bawerîyan a berê de pîr giring a. Ew li wir, binavendî dijîn. Şerîzor, bajarekî ku di dema Medîya de jî, bi bandûr weke navendekê hebû bû. Keyên Medî, li wir mana. Ewder, giringiya wê ya olî pîr zêde û mazin hebû. Ev herêm, di nava kurdên yarsan de, pîr vegotin li ser wir hatina vegotin. Li ser, gelek 'çîrokên pîroz' hatina vegotin.

Başûrê kurdistanê, ji navenda wê û heta ku digihijê berdiclê û bakûrê kurdistanê, li wê herêmê çanda Îştar jî lê serdest a. Bi teybetî, ji herêma Hewlêrê û heta ku digihijê Dohuk û hwd, weke herêmeka diîrokî ku divê ku mirov bahse wê bike. Her wusa, herêma Kerkûk û heta ku digihijê Musilê û hwd jî, herêmên ku di vê ku mirov di wê çerçoveyê de şirove bike na. Ji Musilê û heta ku digihijê Şengalê. çanda yazdantîyê û ankû 'êzdatîyê lê serdest a. Ev herêm, weke navenda, aşîra kurd ya ku êzîdî bû ya daşnîyan bû. Di dema Îslemiyetê bixwe de jî, ev herêm bûna cihê ku li wan pîr ceng bûna. Piştî ku Îslemiyet hat, bi teybetî, li kurdistanê, ji Şengalê û heta ku digihijê herêma Xorasanê, wê kurdên êzîdî û yarsanî û hwd bijîn. Di van herêman de ew çand û kevneşopîya pîr kevn û kûr, wê di wê demê de rastî hêrîşan werê. Bi teybetî, Ji sadsale 6' min û pêde, ji herêma Şahrîzor û heta ku digihijê Êrmîya, Kirmaşan, Xorasan, Şengal û hwd, çend ji wan navendên ku wê pîr hêrîş li wan bibin in.

Di sadsale 4' min de şerhildane Mezdekiyan, piştire di sadsale 7' min û hwd de, serhildana babekîyan û hwd, ji ber van hêrîşên ku li wan dibin in. Çendî ku em van serhildanan weke serhildan jî bikin, lê divê ku em bînina ser ziman di ancama hêrîşên li wan de di temenê hin berxwedanna de ev serhildan bûna. Di vê temenê de, ku em tînan sadsale 8' min, emê bibînin ku Ji herêma kerkûkê û heta ku digihijê Musil û hwd, ku heta ku digihijê şengalê wê li berxwedan bibin. Lê di wê demê de, wê komkujiyên mazin ji aliyê Xalife Mutasim el bileh ve wê bîn hanî li ser serê kurdên êzîdî ku li van herêman dijîn. Ev rewş, wê bandûra wan, li rewşa sîyesî ya başûrê kurdistanê ya demê bike. Di wan deman de Ev aşîrên êzîdî ku şengal ji wan re weke navend bû, di temenê serbixwebûnekê de dijîn. Têkiliya wan zêde bi dervî wan re nebû. Lê di nava xwe de, ji xwe re jîyanek ava kiribûn û di wê temenê de dijîn. Piştî ku artîşa xalife li ber kurdên daşnî tîk çû û piştire ku komên tirkmen ku dihatina herêmê ku wî di bin destê xwe de lev dane li hevdu û bisazkirin û şandina biser kurdan de, êdî wê rewşeka nû bi afirê. Ev hêrîşên li kurdan ku bi destên komên hatina herêmê ku hatina dayin destpêkirin, êdî wê sekna wan tûna bê.

Piştî ku ew kom hatina şandin bi ser kurdên daşnî de û ku ew hatina şikandin, wê piştî werina şandin bi ser kurdên babekî de. Kurdên babekî piştî wê xyaneta ku hatibû serê bawê mislê xorasanê û pê de, demeka zor ya bixwûn jîyan kiribûn. Piştî jî, wê ew hêriş li ser serê babekîyan bidom in.

Li kurdistanê û bi teybetî di wê demê de li başûrê kurdistanê, rewşa siyêsî di destê kurdan de bû. Kurd, serdest bûn. Ji başûrê kurdistanê heta ku digihîşt herêmên din ên rojhilatê kurdistanê, wê di ahangekê de wê rewş biafirê. Li rojhilatê kurdistanê, dem heta ku tê dema sadsale 8' min û 9' min û hwd, wê kurdên eyerîdî, kakoyîdî û hwd, cuda bi cuda wê bina desthilatdar. Dewleta ku kurdên kakoyîdî, di sadsale 8' min de temenê wê avêt û di sadsale 9' min de bu desthilatdarîyek herêmî, wê bi reng û pêşketina xwe ji awayê dewlet hemdem a roja me ya sadsale 21'ê ne kêmtir bê. Kekoyîdîyan, heta ku pereyên xwe ji derxistina bo kirin û firotinê. Li başûrê kurdistanê, heta ku ji Êrmîya digihîşt, Şahrîzor û hwd, ku gelek herêmên din jî di nav de, li wê desthilatdarîyek ya pîrr mazin û xort ava kirin. Aşîrên Kurdên eyerîdî, weke aşîrên kurdên kekoyîdî, pîrr mazin û pîrr çengî bûn. Di temenê konfederasyonê de di nava aramiyê de dijîn. Piştî kurdên rawadî û celalî û hwd, wê derkevin. Ji herêmên Başûrê kurdistanê ên weke Kerkûk, Musil û heta ku digihîjê ber hewlêrê û hwd, destên aşîrî wê piştî werin û li wan bijîn. Kurdên yarsanî, bi teybetî, herêmên weke kirmaşan, Êrmîya û hwd, ku ji wan re weke navend in, wê gelek çengên wan di wê demê de wê barî başûrê kurdistanê van herêmên wan bikin. Ne dixwestin ku xwe ji herêmên xwe yê weke şahrîzor dûr bikin. Ev herêmên ku bo wan hem bi çandî û hem bi olî û dîrokî ên giring bûn.

Herêma başûrê kurdistanê, piştî ku îslamiyê hat û baxdad jî weke navendekê di wê de pêşket, êdî wê hinek guhartinan di reng û şamala xwe de bike. Lê rojhilatê kurdistanê, wilqasî zêde û zû wan guhartinan bi xwe re nakê. Bi vê yekê, wê hin bi hin cudahî bi rengê pêşketinê û hwd, di nava wan de biafirê. Bi teybetî, şerên seferên araban, ku bûna sedema cengên pîrr mazin li dora herêmên weke kerkûk, musil û hwd, divê ku mirov di vê de ji birnekê û bêne ser ziman.

Li başûrê kurdistanê, pêşketin û pêşveçûna wê, dema ku em hildina li dest, divê ku em bi rojhilatê kurdistanê re wê hildina li dest. Heta ku dem tê sadsale 15' min yanî dema ku 'şerê çardiranê' bû jî, wê ev rewş bi vî rengî xwe bide domandin. Lê berî vê demê, em nikarin vê yekê bibêjin. Bi teybetî, dema ku em bahse pêşketina desthilatdarîya kurdan bikin, emê bi teybetî, di van demên ku îslamiyê di wan de pêşketiya de, emê pêşketî dema desthilatdarîya eyerîdî û dema dema desthilatdarîya kekoyîdîyan hildina li dest û werina ta dema desthilatdara kurd ya Şadadîyan. Desthilatdarîya şadadîyan, wê van herdû desthilatdarîyên eyerîdî û kekoyîdîyan bike yek di bin banê xwe de. Ku em bibêjin wê di dema Şadadîyan de, wê demeka nû li gorî wê dema wê ku em dikarin weke dema desthilatdarîya Medîya ya berî zayînê ya sadsale 6' min û hwd ku em şîrove biikin wê pêş bikeve. Şadadî, wê rojhilatê kurdistanê ku başûrê kurdistanê bi wê ve ya

û di temenekî de pêşketina wan yek e, wê temenê wê desthilatdariyan biafirêne. Kurdan, heta ku desthilatdariya ava kirin û başûr û rojhilatê kurdistanê di temenekî de û bi awayekî yek-qat dikirin temenê wê desthilatdariya xwe, bandûra wan û kifşkarîya wan li ser desthilatdariya olî ya baxdayê jî pîrr mazin bû. Minaq, malbate xaro reşîd û bahlûl û hwd, ku xelifetî kirina û demeka pêşketî û bi aram dan jîn kirin û heta ku navê wan bûya mijar di nava çîrokên ku ji zarokan re jî dihatina gotin di nava kurdan de, kurd bûn.. Bandûra van vê malbata kurd di jîyane xalifetiyê de pîrr mazin bû. Lê piştî, weke ku derbeyek li qasrê bibe, bi carekê wê dawî li pêşketina vê malbatê li qasrê were. Piştî hatina 'mutasîm'an û hwd, wê êdî ew bi teybetî kurdan bidina berxwe û wê werina bi ser kurdan de. Weke ku çawa ku piştî şerê çardiranê wê bi tememî malbate şah îsmail, ji qasrê û rêveberiyê were dûrkerin, bi heman rengî wê berî wan rewşek bi heman rengî di rewşa malbate xaro reşîd û bahlûl de jî were ditin.

Di wê demê de, di sadale 8'min û di sadsale 9'min û hwd de, wê êdî desthilatdariya şadadî pêş bikeve. Ev desthilatdarî, wê baxdadê jî bike bin kontrola xwe de. Her wusa, wê rojhilat û başûr bikeve navend ji xwe re. Heta ku wê herêmên bakûrê kurdistanê ên weke Sarhadê û hwd jî, wê dibin desthilatdariya wê de bin. Piştî, wê pêşbikeve û wê bereya serdestiya xwe mazintir bike û bi ber herêmên qafqasya de vebe. Wê herêmên ku î ro bi navê 'azarbeycan' û Ermenistan tên bi nav kirin, wê ew jî di bin desthilatdarî û kontrola wê de bin. Ev desthilatdariya ku wilqasî pêşket, wê bandûra wê pîrr mazin. Ê ku, wê desthilatdariya şadadîyan, ava bike û wilqasî mazin bike û li şûn ve bihêle wê Mihemedê kurê Şadadî bû. Piştî wî re kûr û newiyên wî Eliyê Eskerî, Mazrûban, Şawûr, Fadilê ku di di 'ansiklopediya îsleme' de bi navê Fazlûm' jî dihê bi nav kirin, wê werin û wê desthilatdariya Şadadîyan mazintir û xorttir bikin. Demên herî xort ên dema desthilatdariya Şadadîyan, wê demên Mihemedê kurê Şadadî, Eliyê Eskerî, Fadil û Şawûr a. Ev demên zêr in bo wê desthilatdariya ku wê demên dirêj ku xwe bide domandin.

-Li kurdistanê rêza çîyayên Qandilê û Zagrosan. ..

Ku em bahse başûrê kurdistanê bikin, divê ku em ji birnekin û bahse rêza çîyayên qandil û zagrosan bikin. Ev rêza çîyayan, giringîya wan, li kurdistanê, di her demê de bûya. Di demên berî zayînê ên li dora 10 hezaran de, li van herêman jîyane bi malbatî û rûniştî hebûya. Ev herêm, ji aliyê xwe dabarkirinê ve jî, weke herêmna giring û bi nav û deng bûn. Ku bahse çîyayên zagrosan dihat kirin, ne tenê bahse çîyayna dihat kirin. Her wusa bahse stergehna jî dihat kirin. Zagros, ji çîyayekî zêdetir, stergehna jî bû. Li gorî lêkolînên ku heta nûha hatina kirin, dihê ditin û kifşkirin li ber zagrosan jîyan û jîyandina li ber zagrosan, bi şariştanî diçe ta demên ku tê gotin demên 'neolîtîk' in. Yanî, li vir û li van herêman jîyan, pîrr zû bûya û bicih bûya. Bi wê yekê re, di demên pêşketinî ên şariştanî û hwd de, ku heta ku dem tê demên sûmerîyan û hwd de jî, em dibînin ku ev herêm, weke herêmna giring ên ku li wan di temenê jîyandinê û hwd pêşketin bûya. Daristanên li çîyayên zagrosan ên ku di wan de pîrr gurr bûn û ku mirov î ro nikarê aqil

bike ku çendî mazin bûn, avên ku li wir cih bi cih diharikîn û hwd, li ber wan mal û stergeh bûna û pêşketina. Lê mal, li qadên bej ku berfireh in pêş dikevin. Herêmên ku dikevena ber zagrosan de, piştê ji wê li ber hebûn zagrosan wê vebûn û berfireh bûn bibêt. Ev jî, wê hin bi hin li bejehîyê û bejê, qadên nû ên jîyanê bide vekirin. Pêşî gundîfî û civatnasiya wî pêş dikeve. Piştê bajarvanî û civaknasiya wê pêş dikeve. Ev pêvajoyên ku li dûv hevdu di temenê pêşketinê de di xateke de dihên in.

Em î ro, ji lêkolîn û birhanên ku di wan lêkolînan de ku hatina bidest xistin, em ji wan fahm dikin ku li vê herêmê jîyan pirr zû pêşketîya. Heta roja me jî, ji bêne ardê sevîl û hêkelên çêkirî û naqşkirî ên ku derdikevin, mirov hayîrmayî û matmayî didina hiştin. Çêkerî, awadanî, naqşkirin û hwd, çend ji wan karên ji dest in ku didina nîşandin ku şariştanî çendî û çîqasî pêşketîya. Her wusa, ev karên dest, hinekî di derbarê aqil û pêşketina aqil de jî, hizrekê di derbarê de di serê mirov de didina çê kirin. Î ro, ji van aliyan ve, dema ku em dinerin, vê yekê pirr vekirî ji wê herêmê dibînin. Di demên şariştanî ên weke demên Sûmerîyan û hwd de, wê êdfî bajarvanî, weke ku êi Nûzî, Sûpar, Nîppûr û hwd pêş dikeve, wê were ditin. Çanda Aşnûna, dide nîşandin ku çendî li başûrê kurdistanê bicih a. Her wusa, bi navê Eşnûna, heta ku bajar jî heya di wan demên şariştanî de. Dem ku di wê xate li ber diclê re bi ber bakûrê kurdistanê ve ku tê, êdfî wê bajarên ku weke "welatan" ku tên ditin ên weke Êrûk, Marî, Ur, Kîş û hwd wê werina ditin. Teybetmedîya van bajar-welatên weke ên Êrûk û hwd, ew in ku em nikarin di temenê bajarekî de wan hildina li dest in. Li wan, weke welatekî pergale afirîya bicih a. Saziyên dewletî bi têgihîştinî pêşketina û afirîna. ev pêşketin, bi rengê pêşketinê re dema ku em destana "gilgamêş" dixwênin em dibînin.

Di van temenan de, em dibînin ku rojhilatê kurdistanê jî di nav de, bandûra çanda weke çandên 'gilgamêş, 'eşnûna', 'îştar' û hwd, em dibînin ku pirr zêde jî heya. Ji herêmên rojhilatê kurdistanê ên weke Êrmîyê, kirmaşanê, aqbatanê û hwd, em dibînin ku ew rewş li berçav a. Di van çandên ku me gotin de, jin bi awayekî ku di roja me de, em minaqê wê jî kêr rastî wê tên di wê demê de serdest a. Têgihîştina dayikîyê li pêş a. Ev çand, li wê herêmê bi kûrahiyekê bicih a.

Li vir, dema ku em başûrê kurdistanê bi teybetî dihildina li dest, em dibînin ku em nikarin ji rojhilatê kurdistanê vaqatênin û bînina ser ziman. Bi hevdu re dihên ser ziman. Awayên wan ên pêşketin û her wusa di wê xate mejûya wan ya ku heta roja me tê de jî, em vê yekê di wê temenê de dibînin. Bi vê yekê, em dema ku tên demên piştî zayina îsa jî, em vê yekê bi vî rengî dibînin. Lê tiştê ku bale mirov pirr zêde dikîşene jî, ew a ku ew çanda jinê ku heta wê demê jî tê, em serdestîya wê dibînin. Minaq, di dema serdestîya desthilatdarîya kurdên eyerîdfî de, em weke şahêkê û siltenekê dayike Anezêdê dibînin. Ser 50 salî wê şahîfî li ser desthilatdarîyeka ku dewletên kekoyîdfîyan û eyerîdfîyan û hwd ku dibin banê wê de hatina gihandin li hevdu de, ew dibê desthilatdar. Di bin fermanê wê jina kurd de, artîşaka bi sad hezaran hebû ku bi dilûcan diçû mirinê ku bê ku sûal bike ku ka ji ber çî diçê mirinê. Yekî ku kevneşopîya kurdan dizanê, wê

wateya vê gotinê baştir bizanibê. Ji ber ku tenê, di temenê kevneşopîyê de û bo wê çûyina mirinê meşrûya. Kevneşopîya jinê û serdestîya wê, divê ku em bi teybetî bahse wê bikin. Mînaq, heta roja me jî ku weke kevneşopîyeka kurdan ya pîroz heya, "kevneşopîya hemewîyê" heya. Ev kevneşopî jî, cewherê wê ew a ku dema ku du mêr û ankû aşîr û hwd ku ketin berhevdu de ku bi hevdu re şer bikin ku jinek çû û di nava wan de sekinî û hemewîya ser serê xwe ku ji ser serê xwe kir û avêta nava wan, êdî ew dev û dest ji wê rewşa xwe ya ku wê bi hevdu re şer bikin wê biqarihin. Ev, weke kevneşopîya kurdan ya pîroz a, ku ti kurd û ankû ti mirov jî ne dikarî wê bînpê bike ya. .. Serdestîya jinekî û bûna desthilatdar, weke kêmesîyekê ne dihat ditin, weke rûmetekê û kevneşopîyekê dihat ditin.

Divê ku em vê jî bibêjin ku Dayika Anezêdê, bixwe jî Ji kurdên eyerîdî ku navenda wan Ûrmîye bû. Bi wê re, ew jî dema ku tê desthilatdarîyê, wêderê ji xwe re dike navend. Piştî wê re, dema ku Mihemedê kurê Şadadî tê û dibe desthilatdar û hemû desthilatdarî û mîrgehan di bin şahîtiya xwe de digihêne li hevdu û dike yek û yekîtiyê di nava wan de çê dike, ew jî li ser wê rewşê û li wê herêmê pêşî xwe dide li der. Mihemedê Kurê Şadadî, wê temenê dewletê şadadî biavêje. Piştî wî re, demeka nû li herêmê bi şadadîyan re destpê dike. Li vir, divê ku mirov bibêje ku wê rewşa jinê kiriya u tevî hemû cihereşîyên xwe yên olî jî, di nava civate kurd de, dijberîyên mazin ne afirî na. Kurdên yarsan, di wê demê de û piştî jî, li rojhilatê ku kirmaşan êdî navenda wan a, wê jîyane xwe diaramiyê de bidina domandin. Piştî jî, kurdên êzîdî jî. Teybetmendîya van herdû komên olî, ew a ku dîroka wan diçe ta demên hûrî û Mîttannîyan û heta ku berî wan dema Gûtîyan jî. Li wê herêmê, Pêşketina Zerdeşt, piştî wî re Mezdek, hûrem, Babek û hwd, wê bibin. Lê berî van hersêyan wê Manî bibe. Manî, wê tişt a ku Zerdeşt dike, wê nekêmi wî bike. Wê pergale olî ya civake hemdem û pêşketî, bi rêxistin bike û bi têgihîştin bike di nava xalkê de. Her wusa, giringîya wî, divê ku mirov bi teybetî hilde li dest. Manî, heta roja me jî, bi rastîya xwe re û bi mazinatiya xwe re, bş ne hatîya fahm kirin. Her wusa, mirov dikarê heman tiştî bo Zerdeşt jî bibêje. Zerdeşt, weke destûreka bingihîn wê bibêje ku "mîrov, pîroz a." Ev destûr, wê di temenê hemû pêşketinên di xate wî de bê. Zerdeşt, gotîya "mîrov, pîroz a." Lê bi wê re jî, jin û mêr, wî weke hevdu ditîya. Bi teybetî, ji gelek aliyên din ve bi wasîfî Zerdeşt li jinê nerîya û ew pîroz kirîya. Di vê temenê de, di çanda Zerdeşt re, jin, weke nirxeka pîroz a. Ev çand, di temenê yarsanîtiyê û êzdatîyê de jî heya.

Ev dema ku em tîne de, dema sadsale 10' min ya piştî zayinê pîrr giring a. Di wê demê de pîrr pêşketin em li herêmê û hem jî di nava civate kurd de bigîştî wê bibin. Lê berî wê, divê ku em çend gotinan li ser hatina îslemiyetê ya li kurdistanê bibêjin. Berî derketin hatina îslemiyetê û hatina wê ya li kurdistanê, bawerya kurdan, dîsa li yek-xwûdayî bû. Lê kurdan, weke ku î ro yarsan û êzîdî dibêjin, ew xwûdayê wan "yazdan" bû. Ew, weke xalkekî ku tenê bawerî li yazdan dikin in. Yanî, weke "zaroyên Yazdan" jî hatina bi nav kirin. Di vê temenê de pergale olî ya yazdanî, bi rêxistin a li kurdistanê. Di vê temenê de ku em bibêjin ku kurd, ji sadî 90'ê wan

êzdayî bûn wê ne xelat bê û wê rast bê. Piştî ku Îslemiyet hat, tenê dema ku misilmanetî pêşket, rengê wê pergale olî ya yazdanî bi reng û navê wê hat wergerandin û hwd. Ji wê û pê de, ti tişteki din ne hat kirin. Nixên ku di wê de hebûn, di îslemiyetê de jî bicih bûn. Lê li vir, pirsgirêka ku derket, ew bû ku dema ku bahse yazdan hat kirin, êdî çûyîna bi ser kurdan de bû. Şerê ku di wê temenê de bi kurdan re bû, di aslê xwe de, em bi tememî nikarin di temenê olî de fahm bikin. Hinekî jî, serdestî û desthilatdarî têde hebû. Hewldane xwe kirina desthilatdarîyaka giştî li ser serê herêmê bigiştî, wê bike ku ew rewş, hemû êdî biafirê û pêş bikeve. Piştre, Oldarîya weke ya Manî, Mezdek û hwd dihê qadaxa kirin. Heta ku navê Manî bixwe jî, dihê kirin weke navê "sêfekê" ku yek ji yê din re dibêje û weke ku tişteki xirab ku jê re gotî. Divê temenê de ku gotina "manîyak" dihê afirandin. Ev kevnşopîya, Medîyayîyan ku kirina navan weke ya sêfan, di wê demê de êdî pêşket di destê desthilatdarîyan de.

Dem ku tê dema sadsale 10' min, wê bê ditin ku wê navê 'yazdan' bigiştî qadaxa kirin. Yazdan, êzîdiyên roja me na. Ew jî, demekê wê oldarîya xwe bidizika bijîn. Lê di dema ku Şêx Adî ku weke mazin û pêxemberekî ol yazdan tê, wê rewşê bibîne û bi tememî bide guharandin. Wê seroketîyeka giştî li herêmê di civate civate de bike. Wê hebûna ola yazdan bi bawerîyên bide herê kirin. Wê bike ku êdî herkesek ji nû ve êzdatiyê kifş bike. Bandûra Şêx Adî, wê li rojhilat bakûrê kurdistanê pîrr hebe. Lê wê li başûrê kurdistanê ji hemûyan zêdetir wê hebe. Laleşa Nûranî' li şengalê ya û şengal li başûrê kurdistanê ya. Êzîdî, li kurdistanê, di wê demê de jî beşeka mazin ya civatê diafirênin. Aşîrên êzîdî ku li başûrê kurdistanê, li rojhilat û bakûrê kurdistanê, bi mazinahîya xwe re bi nav û deng in.

Lê weke pergale serdest û giştî êdî ya îslemê pêşketîya. Di van deman de kurdên elewî û hwd jî, ku pîrranîyan li başûr û rojhilatê kurdistanê na, serdestîya wan heya. Di sadsale 13' min û hwd de, tarîqata gêlanîyan û ankû zahîdîyan, wê bi şêxên kurd ên weke şêx Seyfeddînê Erdebîlî û hwd, wê pêketinên mazin bijîn. Şêx Seyfedînê Erdebîlî, dibe kalkên Şah Îsmail ku di şerê çardiranê de li dijî osmanîyan şer kir. Heta dema Şah Îsmail jî, wê rojhiilat û başûrê kurdistanê di temenekî de yek bê. Lê piştî şer, û heta ku berî şer jî, hêzên ku dxwezin ku li herêmê bibina serdest, ku weke navendeka giring dixwestin ku xwe bigihênina baxdadê. Rêya xwe gihandina baxdadê jî, di başûrê kurdistanê ve diçû. Ji ber vê yekê, êdî hertimî, başûrê kurdistanê wê ji vê demê û pêde, bê navendeka ku ti carî ti hêzên ku hatina herêmê û ankû ên herêmî ku bela xwe ji w ne vekirina na. Demografîya civatî ya herêma başûrê kurdistanê, ji êzîdî, yarsanî, elewî, misilman û hwd, ku hinek komên din ên olî û kêmetewî jî di nav de wê hebin. Hemû jî, di temenê pêşketinên xwe ên dîrokî ên kevn de hena.

Minaq, li herêmê, di demên berî zayînê û hwd de, asûrî, babilî hwd jî, jîyane na. Ku ber musila roja me ve û hwd de, mirov diçê di herêma asûrîyan. Dîroka wan jî, pîrr kevn a. Ew jî, xalkekî herêmê ku weke kurdan, heta roja me, maê jîyanê ji wan re ne hatîya nasîn. Herkesek, dixwezê ku

navê wan jî, weke ê kurdan di nava rûpelên pirtûkên dîrokê de bi awayekî 'agzotîkî' bibîne. Ji wê û pê de, maf ji wan re ne hat hiştin. Lê ev xalkên ku li herêmê dijîn bûn. Xalkên weke kurd, asûr, babil û hwd, dayiktî ji dîrok û mirovatîyê re kirina na.

-Ji dema dewletên kurd ên Eyerîdî û kekoyîdî, bi ber ya Şadadîyan ve ..

Ev dema dîroka kurdan, ku em lê dinerin, em dikarin bitijbihênina dema desthilatdarîya kurd a Şadadîyan. Desthilatdarîya kurd a Şadadîya, ji salên 950'î û hwd heta 1161'ê ku dema Fadl û ankû Fazlûmê pêncemin bûya. Dem, weke demna zêr ên desthilatdarîya Şadadîyan a. Şadadî, di vê demê de, wê di qadaka mazin de bina xwediyê desthilatdarî û serwerî. Kurdistan û pê re herêmên qafqasya ên weke ku î ro bi navê Azerbeycan, Ermenîstan, Gûrcîstan, Osetya û hwd û ku gelek herêmên din jî ên li dora wan di nav de na, wê di bin destê desthilatdarîya Şadadîya de bin. Bavê Salahadinê Eyûbî, Mîrekî kurd a ku wî ev herêm, demekê di bin mîrtîya xwe de girtina. Lê piştî ku ew ji ber hêrişan û hwd ku bandûr û serdestîya wan li herêmê kêmbû, wê êdî malbata Necmedîn, wê bi aşîrî wê beşek ji wan barî li wan herêmên ku wê piştî desthilatdarîya Eyûbîyan ku lê ava bikin. Ev herêm, êdî wê êdî herêmên din jî ku bike nava xwe de, wê di bin desthilatdarîyeka hê maztir û xorttir de wê pêş bikevin.

Li vir, bi gotinekê ji bê, ku mirov bipirsê ku ka Salahadin, ew têgihîştina desthilatdarîya bi xwe re ji kûderê girt, divê ku em navên kalkên wî, Şadî, Aliyê leşkerî, Fadl, Mazrûban, Şavûr û hwd ku her yekê demna dirêj li ser serê desthilatdarîya şadadîyan bûna şah, divê ku mirov navê wan bibîr bixe. Ev kevneşopîya wan, wê piştî wan re xwe bi Salahadin re bide domandin.

Li Kurdistanê, di wê demê de, şerên ku dibin, hemû jî, ne şerên asayî na. Hemû jî, şerên ku wê bi komên ku ji derve tîn ên weke Salçûqî, kazaqî, tatarî û hwd in. Herêma Hazarê ku di wê demê de dibin desthilatdarîya Şadadîyan de ya, wê ti carî ji hêrişên ku lê dibin bidestên van koman wê rizgar nebê. Piştî jî, wê hertimî, weke herêmek şer wê hebûna xwe bidomîne. Li herêmê, di dema Şadadîyan de, divê ku mirov, bibêje ku wê hêrişên mazin bi teybetî di dema ku Salçûqî di bin serkêşîya Melîk Şah û berî wî bavê wî de dikin wê bibin. Ev kom, bi komî tîn û her herêma ku hêrişê lê dikin, wê kevil bikin û telan bikin û piştî jî herêmê veqatîhin. Bi vî rengî, wê demek dirêj bi buhurê. Ev rengê şer û hêrişan, wê bi demê re desthilatdarîya kurdên şadadî, wê ji rewşa wê bike û kal bike.

Lê di wê demê de, cudahiya wê ya ji vê demê ew a ku di wê demê de faris bi kurdan re bûn. Di wê demê de, bi hevdu re tevidgerîyan û hevdu diparastin. Di dema ku serdestîya desthilatdarîya şadadîyan ji herêmên qafqasya kêmbû, aşîrên kurd û hin aşîrên faris jî, wê alî hevdu bikin û ji wê herêmê dûrkevin û wêrîna herêmên xwe yê ku ew lê serdest in. Hêriş, hertimî, ne bi zêdeyî li navendan, hertimî li kevîyan û navçe û bajarên li kevîyan dibûn. Ji ber vê yekî, ev herêmên qafqasya, herêmên weke xorasanê û hwd, herêmên pirr xêde rastî hêrişan hatibûna. Dem bi dem,

li van herêman, hêrîş bûna û xalkên ku li van herêman dijîn bi komî di şûr de hatina derbas kirin. Ev rewş, wê bike ku desthilatdarî bikeve rewşek xirab de. Ji ber ku di her şerê de, gelek mirov hatina winda kirin. Bi wê re, gelekî kêmbin. Ya ku bi demê re, ku divê ku weke sedemeka kêmbûna serdestî û serwerîya wan ku bi gelek sedemên din re ku mirov bêne ser ziman ev a.

Şadadî, ku em bi rewşên roja me re bînina ser ziman, wê gelek rewşên ku ditijbihina wê, emê kifş bikin. Rewşa desthilatdarîya Şadadîyan, dema ku em li wê dihizir in, divê ku em vê jî bibêjin ku di wê demê de, reng û awayê desthilatdarîyê di temenê dû-dîmenî de bû. Ji binî ve ku herêm bi herêm xwe bi rêxistin kiriya û bi mîrgeh û ankû xanadanan bê xwedî dewlet û hêz in, weke ku çawa ku bi kurdên Eyerîdî û kekoyîdî û hwd re. Her wusa, di asta bilin de jî, qasra desthilatdarîya giştî heya ku ew jî, weke ku çawa bi Mihemedê kurê Şadadî, Eliyê Leşkerî, Mazrûban, Fadl, Şavûr û hwd ku ji wê re şahîtiyê dikin heya. Ev rewş, wê bi hevdû re di temenê desthilatdarî û rêvebirinê de wê bi hevdû re di ahangeka pîr baş û bihêz de bin.

Qasra şadadîyan, weke ku çawa ku di qasra Merwanîyan û piştê di qasra Eyûbîyan de dihê dîtin, wê ji serî ve bi bandûr bê û hemû herêman bi xwe re bi rêxistin bike û wê bandûra wê bi wê re ne tenê li kurdistan, her wusa li bigiştî jî wê hebe. Wê xwediyê desthilatdarîya giştî ya li kurdistan û herêmê bin. Di giştî olê bixwe de jî, weke ku di dema Şadadîyan bi Mihemedê kurê Şadadî, Eliyê Leşkerî û Fadl û hwd de, û di dema Merwanîyan de weke ku di dema Eliyê kurê merwan de û di dema Eyûbîyan de jî bi keseyetiyên weke Salahadinê Eyûbî û hwd re wê xwediyê wê bandûr û kifşkariyê bin. Ji Ansîlopedîya Îslamê ku bahse Şahê Şadadî Fadl dike, ji wê bahskirina wê, mirov wê bandûr û kifşkariyê bi awayekî vekirî dibîne û têdigihişê.

Ev demên desthilatdarîyê, çend ku em î ro zêde diderbarê wan de, ne xwediyê lêkolînên mazin jî na, em divê ku bibêjin ku ji bo roja me û pêşketina wê, gelek ancamen giring, ên têgihîştinî û desthilatdarî ên ku divê ku mirov ji wan bigrê û fahm bike hena. Herwusa, divê ku mirov bibêje ku wê bandûra pêşketina Şadadîyan, piştî wan, li ser Sefewîyan û dewleta wan û Eyûbîyan bixwe jî wê hebe. Ez dikarim bêjim ku wê reng û cewherê têgihîştin û desthilatdarîya Şadadîyan, wê reng û cewherê van pêşketinê desthilatdarî ên piştî wan re ji binî ve bide kifşkirin. Refaransên desthilatdarî ên piştê ji wan tên girtin. Bi vê yekê, em divê ku bibêjin ku fêr û cerbeka şadadîyan ku hê ji sadî not(90)ê wê jî ne hatîya fahm kirin heya.

Îran, heta roja me jî, wan refaransên wan dike ku bikar bêne di desthilatdarîya xwe de û bikardihêne jî. Lê dema ku ez lê dihizirim, ez dikarim bêjim ku gelek cudahî jî, bi demê re di navê de afirîna. Farqek ji wan farqên ku em bi teybetî di nava wê dema şadadîyan û î ro de li Îranê ji wan fêrên ku di nava xwe de bikardihêne ew a ku Îranê, bi demê re nijadperestî li ser farîstiyê re pêşxistîya û ew bi olê re kirîya ku pêşbixe ya. Têgihîştina Şadadîyan ya desthilatdarî, têde nijadperestî tûna bû. Wan, hertimî temenê têgihîştina xwe ya desthilatdarî li ser hizreka gerdûnî

damazrand û hanî ser ziman. Bi vê yekê, êdî bi wan re, hem farisên demê jî xwe dîtin û xalkên din jî xwe dîtin. cudahîyên ên olî ên weke êzîdîtiyê ku hebûn jî xwe dîtin. Lê bi wê re jî, di ahangekê de karîna ku pîrr xweşik desthilatdarîyê di vê temenê de bi rê ve bibin.

Ku em vê dema şadadîyan baş fahm bikin, emê êdî bi wê re derîyekê pêşketinaka bi dîrokî û pîrr mazin li herêmê jî bi rafaransên wê re bo roja me kifş bikin û bînina ser ziman. Şadadî, heta roja me, li ser pêşketin, têgihîştin û awayê wan ê desthilatdarî re zêde serî ne hatîya wastandin. Bi vê yekê, êdî ew jî bi pêşketina xwe re bêî ku werina fahm kirin, wilo weke xwe mana. Şadadî, çerçoveya wan ya hizrî û têgihîştinî ku em li ser wê re reng û awayê desthilatdarîya wan hildina li dest û fahm bikin, di temenê wê de têgihîştinaka ku hertimî xwe pêşdixist bi rengê destûrî û rêgezî hebû. Bi vê yekê, çend ku weke desthilatdarîyeka olî û xort jî bû, divê ku mirov herê bike ku weke ku çawa ku bi mîrtîyê re rengê desthilatdarîyê li kurdistanê hatîya ser ziman û bi dergahîyê û şêxtîya wê re rengê pêşketina têgihîştinî bi pergali ya olî hatîya ser ziman, bi heman rengî emê pêşketinakê di dema Şadadîyan de jî dibînin. Bi vê yekê, wan kevneşopî, derxistina li pêş. Kevneşopî jî, di temenê jîyane asayî ya civatî de xwediyê pêşketinaka mazin a bi wan re. Êdî di vê temenê de wan pêşketina xwe mazin daye kirin.

Kevneşopî, weke aliyekî girîng ku divê ku mirov bêne ser ziman, ku bi wê re û di nava wê de, bi mîrtîyê û mîr re rêveberî û bi dergah û şêx re ahang wê di desthilatdarîyê de werê çê kirin. Kevneşopî, weke ku çawa ku ardekî ku tê çandin heya û li ser re têmeşîn û şînbûn lê dibê, her wusa, li ser wê re jî ev bûya. Ew ahange, ku di nava ol û rêveberîyê de hatîya çê kirin li ser destûrên kevneşopîyê re hatina çê kirin. Lê di hunduriyê wê de jî, ol jî û rêveberî jî, bi rengê wan re pîrr bizelalî hatîya fahm kirin û bi têgihîştin kirin. Yanî, yek li şêx meyîzêne wê rêveberîyê fahm nekeê. Wê olê fahm bike. Lê ku li mîr hat nerîn wê rêveberîyê û ankû desthilatdarîyê fahm bike. Ev, weke xateka ku bi kevneşopîyê re pîrr baş pêşketî, mirov dibîne. Di roja me de, minaq, li Îranê, bi tememî ol hatîya derxistin li ol û li ser wê re rêveberî û têgihîştina olî tê ser ziman. Li vir, ev jî, weke cudahîyekê ya ku mirov dikarê jî ya wê demê cudatir bêne ser ziman a.

Di roja me de, dema ku şîrove ya olî di nava civate kurd de tê kirin tê gotin ku "ji ber ku di demaka dirêj de ku desthilatdarî pêşneketiya di nava kurdan de, êdî oldarîya kurdan weke xwe û bêî siyaset tevli bibe maya û saf û zelal maya." Ev gotin, weke ku tê gotin ne xelat û şaş a. Lê divê ku ez jî bibêjim ku di her demê de jî di nava kurdan de desthilatdarî hebûya. Tenê ku piştî dema Şadadîyan re ku weke desthilatdarîyeka kurd bahse wê bikin desthilatdarîya Eyûbîyan, ne bin 400 salî re ya. Ji ber vê yekê, dema ku em li dîrokê biner in, em di fahm kirina wê de kêmbûnekê dibînin. Ya bi bi jîyandinê û desthilatdarîyê re ramyarîyê tevli olê dike ne pêşketina bi demê re ya, nêzîkatîya wê ya têgihîştinî û zihniyeta wê ya ku ew li gorî wê xwe bi demê re pêşdixe ya. Bi teybetî, di temenê civatîya ku pêşketî de, ku weke ku çawa ku di desthilatdarîya şadadîyan û merwanîyan û piştîre bi ya Eyûbîyan re tê dîtin, wan ol û desthilatdarî, hertimî ji hevdu cuda

kirina. Li ser mîr û qasra wî re desthilatdarî pêşxistina û hanîna ser ziman û fahm kirina. Lê li ser şêx û dergeha wî re jî ol û bawerî hanîna ser ziman. Xate di nava vê de jî, pirr zelal kirina di serê xwe de...

Ji ber vê yekê, em bi tememî, nikarin, bêjin ku ji ber ku kurdan desthilatdarîya wan ev demeka dirêja ku ji destê wan çûya êdf ol wusa bixwe û teza û bêf ku sîyeset were tevlf kirin maya. Ji wê zêdetir, ev rengê ku kurd û oldarên kurd bahs dikirn, çend ku ji aliyê wan bixwe ve jî bi tememî û başî ne hatibê fahm kirin jî, di temenê tégihîştinekê û pergale civatî ya ku bi sadsalan pêşketîya ev bûya. Ez li vir, divê ku gotinekê bi vî rengî jî bibêjin. Ev rengê pêşketinê ê oldarî, yê ku temenê wê avêtîya desthilatdarîya Şadadî û piştre desthilatdarîya Eyûbî ya.

Merwanî, kevneşopîya wan, bi wê re pêşdikeve. Lê xwemalîtiya desthilatdarîya Merwanîyan, xwe dispêrê Şadadîyan. Ji vê aliyê ve, divê ku mirov bi vir ve girêdayî, vê jî bibêje ku Şadadîyan kariya ku Fêr û cerbên bitégihîştinî ên desthilatdarî ku di dema Eyîrîdî, kekoyîdî û hwd, ku hê gelek fêr û cerbên dewletî ên herêmê ên kurdan re bixwênin û ji wan sûdbigrin. Bi vê yekê, divê ku em bitégihîştinekê û zanînaka mazin bahse qasra şadadîyan bikin. Qasra Şadadîyan, wusa tê dîtin ku weke ku hertimî li berdestê şah, mirov û zanyarên ku hertimî biaqil ve mijul ûn dixwênin hena. Ew jî, her fêr û cerb û zanîna ku bi xwe re bi tégihîştin kirina li ber şah dihênin ser ziman û bi wê re êdf pêşketinê bi şah re didina çê kirin. Li vir, em wan şewirmend û aqilmendan, divê ku weke saziyeka aqilmendî û şewirmendî ya ku li ser re şahê Şadadî diji û şahê şadadî weke serokê wê ya û bi wê re welêt û desthilatdarîyê bi rê ve dibê.

Dema ku em van rewşên ku em bi desthilatdarîya Şadadîyan re bi şah re di qasra wî de kifş dikin, baş fahm nekin, emê nikaribin bi zelalî û başî pêşketina şadadîyan jî bi başî fahm bikin. Şadadî, bi tégihîştineka ku li ser dema xwe re dijîn. Bi vê yekê re jî, divê ku em carek din li vir kifş bikin ku ew bi tégihîştinaka ku di temenê wê de hizratî û tégihîştineka gerdûnî û demî bicihkirina û bi wê re bi rê ve diçin û bi rê ve dibin.

Desthilatdarî, ji mirov dixwezê ku mirov hemû pêşketinên bi demê re û ên di dema xwe de ku diji bi awa û ast û radeya pêşketin û tégihîştina wê re fahm bike. Li gorî wê, êdf ku divê ku bibe xwediyê pêşketinekê bi xwe re. Ya ku tégihîştina desthilatdarî pêş ji mirov dixwezê jî ev a. Em, dema ku li Şadadîyan û li qasra wan dinerîn, em bi wê re vê rewşê bi vî rengî kifş dikin û dibînin.

Ya rastî, divê ku ez bibêjim ku Wê Şadadî, ew tégihîştin û awayê pêşketina wan, wê piştre bandûra wê li olê jî bibe. Ev awayê pêşketina Şadadîyan, ez dikarim bêjim ku wê di nava olê de heta sadsale 16'min û hwd, wê hem di olê de xwe biparêzê û hem jî lê serdest bê. Lê ji sadsale 16'min û pêde, em dibînin ku bi pêşketina osmanîyan re, weke ku ew bandûra wan çendî ku di hundurê olê de hatîya jîn û ji wê sûd hatîya girtin jî, em êdf dibînin ku bandûra wê, ne weke demên berê ya. Wê pêşketina piştre ya bi osmanîyan re, wê tenê rengê olê wê esas bigrê û bi wê

re bixwezê ku desthilatdariyê dest bike. Ez jî, weke vajî wê têgihîştina Şadadiyan a. Ji ber ku Şadadiyan, ol û desthilatdarî, di keseyetîya mîr û şêx de jev cuda kirina û wê didin jîyîn. Lê piştire ew aliyê desthilatdarî ku weke ku bi keeseyetîya mîr re dihê jîyîn, dihê ji holê rakirin. ya ku wê, li herêmê bi tememî êdî olê serdest bike û di dema aqil bixwe de jî tenê êdî rêveberîyên olî derve li holê û serdest bike jî wê ev bê.

Li vir, em vê jî bibêjin ku di vê temenê û rengê pêşketin û pêşxistinê de, em bi civate kurd re, hertimî kevneşopîyê dibînin. Ji ber vê yekê, divê ku em car bi car, giringiya kevneşopîyê bi pêşketina civate kurd re kifş bikin û bîna ser ziman. Ji ber ku wan kevneşopî, weke destûr bi karhanîna û dinava wan de rêveberî, ol û oldarî û bawerî, hizratî û ankû aqil û felsefe û hwd, cihê wan bi zelalî bi aqilî dane nîşandin û kifş kirina. Ji ber vê yekê, dema ku em dema Şadadiyan kifş dikin, divê ku em bi teybetî bibêjin ku kevneşopîya civatî, bi wan re serdestî û serwerîya wê pîr xort a û bi wê kevneşopîyê re di ahangekê de, olê jî û rêveberîyê jî ku cihê wan bitêgihîştinî di mejî de kifşkirina dihênin ser ziman. Yanî, bi desthilatdarî, ku em di dema Şadadiyan de li kevneşopîyê dinerin, em ji kevneşopîyê zêdetir, weke pergaleka giştî ya civatî ku di wê de, hemû beşên têgihîştinî ên olî û ên rêveberî û hwd bin, ku di wê de cihê wan cuda bi cuda hatiya zelal kirin û di rex hevdû de ku wê çawa bijîn û hevdû bidina jîyandin, hizratiya wê hatiya kifş kirin. Bi vê re jî, hertimî, dema ku hizirîn bi rêveberîya re bê û ankû bi oldar û ankû şêx û hwd re bê, wê di temenekî zelal de, wê bîna ser ziman ku rastî çî ya. Rêveberî, weke karê mîr a. oldarî û bawerî jî karê şêx a. Divê ku êdî ol jî şêx were pirsîn û rêveberî jî mîr were pirsîn.

Ev hemû jî, wê bi kevneşopîyê û têgihîştina wê ya civatî, wê bigihijina li hevdû. Wê hevdû temem bikin. Wê pêşxistina civatî bidina çê kirin. Piştire, pergale perwerde pêşdikeve. Wê êdî weke yê ku herî bi zanebûn kî na, şêx in, wê di rex dergaha wan de, wê medresa werina ava kirin û li wan zaro û ciwan werina perwerde kirin. ..

Şadadî, pêşketîyên dema xwe na. Wan, bi vê yekê re dîtîya û kifşkirîya ku ji bo ku di dema xwe de rol û weynekê bileyizê, divê ku tu radeya zanebûna xwe derkeve ser ast û radeya ku di dema ku tu di wê de dijî. Êdî li ser wê re binerê û bihizirê û biafirêne û êdî pêşbikeve û bide pêşxistin. Ya rastî ew a ku, divê ku mirov vê rengê û awayê pêşketinê jî bo her demê weke awa û renekî bi zanebûnê ê rast herê bike û bixwêne. Ji ber vê yekê jî, rol û weyna zanebûn û têgihîştinê êdî hertimî bi girîngî derketîya li pêş. Di vê temenê de, divê ku mirov êdî Şadadiyan aqilîyên dema wan bibîne û bêne ser ziman.

-Kurd, weke miletekî mazin û xwedî mejû, lê ew dîroka wan ya demdirêj jî, heta roja me bi bi awayekî rêk û pêk ne hatiya nivîsandin. Yê ku Îranî û Tirk bin, li gorî xwe nivîsandina û li gelek deverên hanîna wê ya ser ziman de jî, navê kurdan bixwe jî înkâr kirina û bi wê rengê bi xwe û navê xwe re hanîna ser ziman. Di roja me de jî, weke civate kurd, ku hin bi hin pêşketina xwe

dide çê kirin û dike ku dîroka xwe binivîsêne û êdî ji xwe bahs bike, di pirranîyan nivîsandinan jî, mixabin ev nivîsên ku bi nîyet hatina nivîsandin, tê esas girtin û ev jî, dibe temenê rast ne nivîsandinekê jî. Em vê rastiyê bi teybetî, di nivîsandina dîroka kurdên şedadî de dibînin. Bi teybetî, weke ku kurdekî ku koka wî digihîjê aşîrên Şadadîyan û pêşîya wan rewadîyan (piştî şedadîyan jî navê aşîrên rewadî heya) rewadî û hwd jî Sahaladinê Eyûbî pêşî kurdîtiya wî hat înkâr kirin. Piştî hat herê kirin. Lê dîrok jî, di temenê wê înarê de hatîya nivîsandin. Çendî ku nav hat herê kirin jî, ew bizanebûn nivîsandina dîrokê jî, piştî hê jî ne hatîya rastkirin.

Di roja me de, di vê temenê de, dema ku em bahse dîrokê dikin, di serî de, ev beşên dîrokê dihên li berçav. Bi teybetî, dema ku em bahse dîroka kurdan ya piştî zayinê bikin, divê ku em cihekî berfireh ji şadadîyan re vaqatênin. Şedadî, bi teybetî, weke şîqekî wan yê giring di destpêkê de ji kurdên Xorasanî na. Di wê demê de jî, xanadana ku heyî Ya salarîdîyan ku di wê demê de jî hê hebûna xwe diparast û ku ji kurd û farisan ku weke rêveberîyeka wan ya hevbeş bû û ku carna desthilatdarîya wê ketîya destê kurdan û carna Farisan meşandîya û bi hevdu re ji bilî hinek pirsgirêkên ku piçûk ku jînkîrîna û pêde, zêde ku pirsgirêk jî jîn nekîrîna di wê demê de dijî. Lê Ev desthilatdarî, weke dû navendên wê hebûn. Yek bi kurdan re û ya din jî bi Farisan re hebû. Piştî jî, bandûra xwe domandîya. - Lê kurd, di salên wê yên dawiyê de lê desthilatdar bûna û bandûra wan jî, pîrr mazin bûya. Kurdên hacbanî, kekoyîdî, Eyîrîdî, Daysamî û hwd jî, bi rêveberî û desthilatdarî na û pîrr xort in. Di destpêka beşa duyemîn ya sadsale 9' min de, wê jinek bi navê Anazîdîyê ku ji kurdên Eyîrîdî bû, wê kurdên Eyîrîdî jî û yên kekokîyîdî jî di bin destê xwe de bike dest û bê serokê wan û ser 50 salî re jî wê hikimdarîyê bike li herêmê. Ev jin û dayîka kurd, piştî bûya dayîka hemû xalkên din jî, bandûra wê, çend ku di roja me de zêde newê ser ziman jî, di wê demê de pîrr zêde bûya.

Teybetmendîya desthilatdarîya Salarîdîyan û kurdên daysamî ku di demên dawiyê de lê serdest dibin, wê piştî pêş bikeve. Lê di wê demê de Aşîra kurd ya rewadî, di wê demê de, dema xwe ya pîrr xort dijî. bandûra wê mazin a. BI teybetî li rojhilat kurdîstanê û hin herêmên ku weke axa ermenîstana roja me tînan zanîn jî ku di nav de, wê li herêmeka mazin serdest bin. Lê herêma ku î ro, jê re "azerbeycan" tê gotin jî di nava herêmên ku ew lê serwer in. Ku dem tê dema Mihemedê kurê Şadadî, wê ew bi desthilatdarî û tîgîhiştinî demekê bide dest pê kirin. Hê ku di dema zarokîtiya xwe de li cem bavê xwe fêrî karê rêvebirinê û belavkirina dadîtiyê bûya, wê li herêmê ku rojhilatê kurdîstanê û xorasanê weke navend digirê wê desthilatdarîyaka xort ava bike. Kurdên Eyîrîdî ku navenda wan Êrmîye bû û kurdên kekoyîdî jî, li kirmaşan, hemedan û heta ku digihîşt Mihabade roja me jî ku lê serdest bûn, wê piştîgirîyeka mazin ji wî re bidina nişandin. Lê di dema wî de, wê dayîka kurd ya hikimeta ya anazîdê dîtiya û çûya berdestê wê û wê jî destê xwe danîya ser serê wî û ew jî bipiştîgiri kiriya.

Mihemedê kurê Şadadî, wê rêveberiyekê ji nû ve ava nekê. Çend ku î ro, weke avakerê welat û desthilatdarîya şedadîyan jî tê zanîn, em nikarin bi tememî vê yekê bibêjin. Ji ber ku wî, weke kûrmîrekî kurd, kevneşopî dewr girtiya ji destê bav û li dewsa wî rûniştîya û piştê jî, li gorî demê ji nû ve bi rêxistin kiriya û bandûra wê û hêza wê maztir kiriya. Herêmên ku di bin desthilatdarîya bavê wî û kalkên wî de bûn û ku berê wan jî ew herêm dibin destê wan de bûna, herêmên azerbeycana roja me jî, û hinek herêmên din ku heta ku digihîşt Osetya roja me jî di nav de bi wê desthilatdariyê ve girêdayîna. Mihemedê kurdê Şadadî, wê cudahiyeke bike û ji bo ku baştir bibe rêveberî, wê li herêma Divînê, wê hêzekê bide afirandin û bicih kirin. Bi wê hêzê jî, armanca wî ew bû ku parastina herêmên x we xorttir bikin. Ji ber ku di vê demê de jî, hin bi hin hinek hêrîşên pîr dijwar bi ser wan de diçûn. Hin komên Şerçûqî, di wê demê de, berê xwe dane wê herêmê û piştî bi Eyîrîdî û kekoyîdîyan re ketina şer de, lê bi ser neketina. Lê ew hêrîş, çend ku bi ser neketibûn jî, wa fahm kiriya ku wê hêrîşên din jî werina bi ser herêmên wan de ji komên ku hin bi hin diherikin û tên herêmê ên selçûqîyan û hwd. Di wê demê de, divê ku em bibêjin ku wê pêşî bavê wî ku tê gotin ku Alparslan bûya Melîk Şah wê hêrîşên wî yên mazin wê li wê herêmê bibin. Bi wan hêrîşên wî re wê herêm pîr xwûnê wînda bike. Alparslan, wê bixwe di dema xwe de hêrîşên wî yên mazin bibin, Alparslan, wî gelek dever kevil kirina û ji dîrokê birina. Lê tevî wê jî, nikariya ku li herêmê xwe bigrin. Piştî wî re kurê wî Melîk Şah, wê hêrîşên wî yên mazin wê li herêmê bibin. Dema ku bahse kirinên Melîk Şah dihê kirin, î ro jî kurd bi îbretê bahsê jê dikin. Melîk Şah, dema ku tê gotin û bahse wî tê kirin gotinaka weke navê wî di nava kurdan de derketîya li pêşî ku bi teybetî li herêma botanê tê gotin. Tê gotin ku wî, "herêmên ku wî hêrîşî wan dikir, wê pêşî wan bi hêza wan bişikêna û piştê hemûyî bide beragir. Her wusa, di gelek cihên xwandîna ku em dikarin weke medresa û ankû dibistanan bi nav bikin, tê gotin ku "wî, hemû nivîsar û pirtûk derxistin hûndur û li hewşê dida danîn li hevdu û piştê dide ber agir". Ku bahse wê agirî dihat kirin jî, dihat gotin ku egir li ber arsê xwûdê disekinî."

Kurdên Şadadî jî, di wê demê de, rêveberiyeka mazin ya pîr xort ava dikin ku di nava wê de kurdên eyerîdî, kekoyîdî û hwd, ku pîranîya beşên din ên civata kurd jî di nav de cih digirin, wê desthilatdarîyek ava bibe. Bi wê re jî, wê li herêmê serdest bibe. Rêveberîya Ku bi vî rengî Mihemedê kurê Şadadî ava kir, wê bi navê bavê wî bê bi nav kirin. Wê serdestîya wê li herêmê pêş bikeve Lê ji dewletekê zêdetir, weke desthilatdarîyeka împaratorî pêşket. Piştê jî, herêmên farisan jî, mazinahiya wê herê kirin û heta ku di cih de, piştgirî jî kirin. Ji ber ku derdê wan jî, weke yê kurdan mazin hebû ku ji ber hêrîşên ku ji derve dihatin û li herêmê dibûn, weke hêrîşên komên selçûqîyan û hwd ku ji derve dihatin.

Mihemedê kurê Şadadî wê 21 salê wê li desthilatdarîyê bimêne û wê wê desthilatdarîyê birê ve bibe û piştê wê kurê wî Eliyê Leşkerî şadadî, wê were û bidest şah li ser serê wê desthilatdarîya bavê xwe. Bavê wî ji sale 950'ê heta 971'ê li ser desthilatdarîyê bimêne. Piştê ew jî yanî Eliyê Leşkerî, wê di sale 971'ê de were dewsa bavê xwe. Li gorî ku bi devkî tê gotin, hê ku bavê wî

saxbûya û êdî ku nikarîya ku desthilatdariyê bi rê ve bibe û karê wê bibe, ew bi wê zanîn hunerîya xwe ketîya çavde û di cih de derketiya li pêş û piştre hin bi hin bûya şah. Lê piştre ku ne bi gelekî re ew bavê wî çû ber dilovaniya xwe, wê êdî ew bi tememî bibe desthilatdar.

Li herêmê, di wê demê de jî pêşketin û pêşveçûn zû bi zû pêşve diçin. Elîyê Leşkerî, tevî ku ne zêde pîr jî bû ku hat û bû şah jî, wê desthilatdariya wî zêde nekişêne. Ew, wê desthilatdarî û dema wî ya desthilatdariyê wê dernekeve ser 7 û yan jî 8 salan. Lê wî, gelek pêşketinên ku navê wî li dîrokê didin hiştin dike. Yekî ku bi zanebûya.

Şahên Şadadî, di dema bavê wî Mihemedê şadadî de, hinekî weke demeka arambûnê di buhurê. Lê ji ber hêrişên li herêmê, ev zêde nadomê. Wê piştre jî, komên ku ji herêmên derve tînin û hêrişî herêmê dikin wê zêde bibin. Elîyê leşkerî, birayê wî Merzûban, di wê demê de mirovekî mazin jê derketibû û êdî di civatan de derdiket li pêş. Di dema birayê xwe de, wê gelek karên giring wê hê di dema bavê xwe de bike. Bo wê yekê, navê wî bi teybetî bi hunerîya wî derdikeve li pêş. Piştî ku birayê wî Elîyê leşkerî diçê ber dilovaniya xwe, wê êdî ew bi awayekî xweza derkeve li pêş û bibe şah li ser serê desthilatdariyê. Teybetmendiya Merzûban, hinekî jî bi zanebûna wî re derdikeve li pêş di nava civatê de. Mirov, ji aqilê wî bi bawer a. Bi wê baweriyê, ew êdî derdikeve li pêş.

Desthilatdariya Şadadî, ez nikarim bi hesanî tenê wele rêveberîyekê ku hatî û avabûyî bînima ser ziman. Hê ku di dema Eyîrîdî û kekoyîdîyan wereqe û ankû pereyên kîrîn û firotinê di dema wan de di nava wan de hebûna. Bi teybetî, Kekoyîdîyan desthilatdarîyek ava kir ku di welatên roja me de çî têde hebûya, weke wezeret û hwd, têde bicih kirina û bi wate kirina. Pere jî, bi navê xwe pêşî di wê demê derxistibû bûn. Lê ew piştre, serdestîya ku Mihemedê kurê Şadadî ku avakirî herê dikin û bi wê re dijîn. Di pereyên di dema Mihemedê kurê şadadî û kurên wî elîyê leşkerî û Mazrûban jî, hebûna. Lê piştî Mazrûban, kurê Mezrûban ku navê wî fadl bûya. wî tişteki nû kir û desthilatdarî hemû kir yek û ji destekî xwest ku bi rê ve bibe. Wî, wereqe û ankû pere bi navê xwe di dema xwe bo desthilatdariya dan derxistin. Fadl, piştî bavê xwe re di 986'an de tê û dibê şah. Dema wî pîr mazin a. Serdestîya wî jî pîr mazin a. Ez dikarim, mazinahî û desthilatdariya wî bitîjbihênima desthilatdariya şahê Merwanî û birazîyê badê kurê dostik elîyê merwanî. Wî jî, di dema xwe de, weke Fadl kir û desthilatdarî ava kir û pere jî bi navê xwe derxist.

De ne, wezîrê elîyê Merwan, ku navê wî tê gotin şero bûya, heta ku ti bê bes a bahse bizanebûnîya wî tê kirin. Lê yekî ku bi qarekerê xwe weke Beko'ye ku Ahmedê Xanî di destana Mem û Zînê de dihêne ser ziman û di buhurê ya. Lê di dema Fadl ku navê wî yê din ku bi wê tê nasîn jî 'Fazlûn' a de, hêrişên li herêmên wî zêdetir dibin. Di dema wî de, ne tenê wê ji komên salçûqîyên ku tînin herêmê, komên hazarî jî, wê hêrişna wan li wan bibin. Piştre, Fadl, seferê li wan

dike. Herêma hazarê, di wê demê de jî di bin destê desthilatdariya Şadadiyan de bû. Lê komên ku lê hêriş dikirin dibû. Bi wê rengê, di temenê hêrişî de, komên ku wê hêriş bikin û piştê bi ravin û herin wê bibin. Bi vî rengî, wê artişa Fadl, wê pîrr ziyeneka wê ya mazin wê bibe. Piştî wê re, êdî ew biryare seferekê dide ku pîrsgirêkê ji binî ve çareser bike. Lê çend ku seferê dikê jî, ji ber ku komên kazakî bin û ên salçûqî û hwd bin, ne bicih in û ev jî, dibê ku nêvî bi nêvî sefera Fadl bêancam bimêne. Lê sefera wî, desthilatdariya wî û reveberîya wî li herêmê xort dike. Herêmên qafqasya ên wê herêmê ku Azerbeycan û Ermenîstana roja me hemû jî di nav de û ku ji wan di buhurt, herêm di wê demê de dibin desthilatdariya Şadadiyan de bû. Lê komên weke aşîrî ku hatibûn û gotibûn ku em dixwezîn di bin desthilatdariya te bijin û ku şadadiyan jî destûr dabûbû wan hebûn. Ew jî, hin komên tirkmen jî di nava wan de hebûn.

Fadl, weke şahekî kurd ku navê wî di ansîklopedîya îslemiyetê de jî di buhurê ya, bandûra wî û dema wî, wê di kifşkirina pêşaroja herêmê de wê pîrr kifşkar bê. Wî, demeka zêr, tevî hemû hêrişan jî bi desthilatdariya Şadadiyan daye jîn kirin û li herêmê desthilatdariya giştî kirîya destê xwe de û parastîya. Weke ku çawa di dema desthilatdariya Merwanîyan a piştî Şadadiyan re ku hin bi hin pêş dikeve jî, di dema wê de ku piştî amê xwe badê kurê dostik ku eliyê Merwan, mazinatîyeka çawa mazin da nîşandin, em nikarin mazinatîya Fadl ji wê piçûktir bînina ser ziman. Ji hinek aliyan ve, em dikarin maztir jî bînina ser ziman. Di dema xwe de, wî bandûra xwe û desthilatdariya xwe da pêşketina îslemiyetê jî. Di ansîklopedîya Îslamê de, dema ku bahse wî dihê kirin de, di temenê wê mazinahîya wî û kirinên wî de bahse wî dihê kirin.

Fadl, biqasî ku em ji kirinên wî fahm dikin, em dibînin ku wî giringî daye awadanî û bajarvanîyê. Di dema xwe de Fadl, giringiyê dide ava kirin kirman, qasr, avahî û xaniyên mazin û pîrên kevanî yên mazin. Di dema xwe de wî ev mazin çê kirina. Herwusa, herêmên ku di bin desthilatdariya Şadadiyan de, rojhilatê kurdistanê û herêmên farisan ên bi wê re girêdayîna, li wan jî wan çê dike. Her wusa, li herêmên divînê û hwd jî, ku li gelek herêmên li dora wê jî dide çê kirin. Ev, weke aliyekî wî yê giring derdikeve li pêş. Piştî wî re Abu-l-Fa't Musa ku tê ser desthilatdariyê nava wê dema şahîtiya xwe ya kin de, wê di dewama wî de bide domandin. Piştî Abu-l-Fa't Musa, ku navê kalkê xwe li xwe dike û navê wî Elîyê Leşkerî ya wê di 1034'an de wê were ser taxt û wê şahiye bike. Bandûr wî û zanebûna wî, ku bahse wî dihê kirin, tê gotin ku wî, herêmeka mazin daye berxwe. Teybetmendîya dema Elîyê Leşkerî ku di sale 1034'an de tê ser taxt ew a ku wê rêveberîyê ji rojhilat û başûrê kurdistanê û her wusa ji herêmên qafqasya bi ber bakûrê kurdistanê herêmên ku desthilatdariya Merwanîyan li ser ava bûya re dide herîkandin. Bi wê re jî, di wê demê de, ew têkiliya wî, bi desthilatdariya Merwanîyan re pîrr xort a û wî bi wan re levkirin bê û peyman bê, ku çi pêwîst bê, wî daye çê kirin û bi wê re yekbûnek bi giştî daye çê kirin. Çavê Elîyê Leşkerî, di dema wî de, hêrişên salçûqîyan jî, zêdebûna li herêmê bi herîkînekê. Bi wê firehkirina bereyê, Elîyê Leşkerî hizra wî ew a ku wê karibê, wan hêrişan bide sekinandin. Piştê ew bi ber bakûrê kurdistanê ve hatina wî, wê rêveberîya Bizansan ku li anatolîa

jî bide tirsandin. Li herêmê, bi wan têkilî û peymanên ku li herêmê Elî leşkerî dide çê kirin, di temenê têgihîştineka Împaratorî de dike û dixwezê ku hêz û desthilatdarîyaka mazin derxe li holê ku karibê hêrîşan bide sekinandin. Bi hêrîşên ku bûna, gelek herêmên li hazarê û qafqasya, şadadîyan jî dest windakirina û serwerî û serdestîya wan li wanderan hin bi hin jî dest diçê. Her herêmên ku serdestîya wan jî dest diçûn, wê aşîrên kurd û aşîrên faris jî, wê jî herêmê bar bikin. Hinek jî wan tên bi ber bakûrê kurdistanê de û hin jî wan bi ber rojhilatê kurdistanê û herêmên farisan ên îranê ve diçin. Kurd û faris, di wan rojên giran de, hevdû girtina û bi hev re tevgerîya na.

Ev rewş, wê temenê hatina çengê aşîra şadadî ku Salahadînê Eyûbî ku bavê wî jê ya navê wî têde heya jî, wê di wê dema barkirin û ankû jî herêmekê goçî herêmeka din de, ew jî, wê werina herêma ku lê Merwanî serdest in. Ji xwe, desthilatdarîya merwanî û şadadîyan, weke du desthilatdarîyan, lê xalkêkî ku li wan serdestbû bû. Herdû jî kurd bûn û koka wan digihîşt heman kokê. Her wusa bi aşîrtî jî, mirov divê ku vê yekê bibêje. Lê divê ku mirov vê jî bibêje ku ev aşîra kurd, pîr-çengî ya û di nava wê bixwe de jî rewşeka ku divê ku mirov di rengê konfadaraliyekê de bînina ser ziman hebû. Çengê aşîra kurd ya şadadîyan û ankû rewadîyan, çengêkî mazin bû û herêmên weke qafqasya ên ku di roja me de weke Azerbeycan, Ermenîstan, Gûrcîstan, Osetya û hinek herêmên din jî ku di nav de, di bin sehêr serwerî û serdestîya vê çengê aşîra kurd de bûn. Bavê Şalahadînê Eyûbî bixwe ku navê wî Necmedîn a û ew weke mîrekî kurd ê ku ew herêm hemû demekê di bin mîrîtîya wî de mana û bi bûna xwediye artîşaka mazin jî ku herêmên weke Ermenîstan û Azerbeycanê jî wî parastina û li wanderan desthilatdarîya Şadadîyan parastîya. Herwusa, Amê wî şerkoh û kalkê wî Şadî bixwe jî divê ku mirov bi heman rengî bahse navê wan bike. Herêmên bakûrê kurdistanê ên weke botanê û rehayê û hwd, herêmên ku di bin desthilatdarîya kurd de bûn û pîr bi ewlabûn. Piştî ku ew çengê aşîra kurd hat vê herêma ku desthilatdarîya Merwanîyan lê avaya, êdî rewşa desthilatdarîya Merwanîyan jî ji welatîtiyekê buhurt û derket li ser wê re. Malbate Şalahadîn, divê ku mirov herê bike ku bi hêzbûna û di dema ku tên van herêmên kurdistanê jî, bi aşîrî bi hezaran mirovan tên û pêşketina xwe êdî li vanderan didin çê kirin. Lê divê ku ez vê jî bibêjim ku koka aşîra kurd ya salahadîn bixwe jî, berî wê demê, jî wê herêmê bûya. Lê barî wan herêman kiribûna û bi salan li rojhilat û başûrê kurdistanê ku weke navend jî xwe re bijartina pêşketina. Ji ber vê yekê, ew hatina wan ya bakûr, ne weke goçeka nû ya. Weke vegefirîneka li cihên bav û kalan a jî. ..

Piştî wî Elîyê leşkerî re Anûşîrwan, piştî ku bû şah û serdestî hinekî li herêmê mazintir kir û gelek hêrîş vala derxist û li herêmê rêveberî ku ne tenê parast her wusa, stretejiyeka mazin ku seferekê li herêmên weke windahî ên weke Azerbeycanê û Gûrcîstana roja me jî ku bixe û wan cardin bike bin desthilatdarîya xwe. Herêmên weke Nahçîwanê ku di wê demê de weke navçeyna desthilatdarîya Şadadîyan bûn û kurd lê dijîn. Ew di dema xwe de wê temenekî baş jî wê bike. Wî

xwe bi hemû dordoran da herê kirin wî artişaka mazin bi nav û deng da ava kirin. Wê artşa wî, gelek serkevtinên mazin ji wî hanîn jî.

Lê piştî wî re, di sale 1049'an de ku bû şahê şadadî Abu-l-Asvar Şavur I kurê al-Fadl I wê ew mohra xwe li hemû serkevtiyên bidest hatina û ên ku wê di dema xwe de bide kirin jî. Wî, ev herêm hemû cardin, li wan serdestîya xwe damezrand û piştî, wî kurê xwe bi navê Abu-Nasr Iskander şand divînê û li wir kir şahê wir. Û ji wî xwest ku hemû herêmê bike bin sehêta xwe de jî. Abu-l-Asvar Şavur I kurê al-Fadl I, Stretejiyeka wusa meşand, wî li hemû herêman di dema xwe de serdestîya xwe damazrad. Heta ku herêmên Îranê bixwe jî, wî li ser hemûyan jî, xwe serwer kir. Gelek herêmên Îranê û ankû ên farisan jî, heta wê demê, weke ku ji dest çûbû bûn. Komên salçûqîyan, di wê demê de wî weke ku hêrişên wan û ên hazaran û gelek komên din ên weke tataran û hwd jî da sekinandin. Bi wê rengî, wî weke ku di dema Mihemedê kurê Şadadî de, ku çawa desthilatdarî, weke ku ji nû ve ava kir, wî jî, her wusa weke ku ji nû ve desthilatdarî demezrand. Bandûra wê, pêşketina wî û pêşveçûna dema wî weke demeka zêr, wê bandûra wê, bike ku ne tenê li kurdistanê her wusa li hemû herêmên li hewîrdorê û cihanê îslemiyetê jî bike. Piştî wî re di sale 1067'an, wê Al Fadl II kurê Şavur I, wê were ser taxtê desthilatdariya şadadîyan. Lê dema wî, zêde nakişînê. Wê piştî wî re piştî wî, di sale 1073'an de wê Aşodê kurê Şavur I, wê were û li ser taxt rûnihe. Lê dema van herdu şahên Şadadî, wê li ser pêşketina dema Abu-l-Asvar Şavur I kurê al-Fadl I. bê û wê wê demê bidina domandin. Lê di dema wan de, dîsa hêrişên salçûqîyan zêdetir bûna. Di dema Al Fadl II kurê Şavur I. de, wê şerê malazgirê ku di navbara wan û Romeo dîyojên ê bizansî de dibê. Di wê demê de, ev herêmên bakûrê kurdistanê, di bin destê desthilatdariya Merwanîyan de bûna û şahê wê demê û ser serê desthilatdariya merwanî jî Nizâm al-Dawla Nasr bûya. Di wê demê de, di dema ku artişa bizansan, ku daye piştî komên tirkmen û ên din ku wan ji anatolia derxe, li Malezgirê rastî artişa vê desthilatdariyê tê. Hingî, artişa merwanîyan jî, wê ku faris jî hêza wan di nav de heya wê hêzeka mazin ya şadadîyan jî were wir û wê alî merwanîyan bike.

Di aslê xwe de, wê Al-Fadl III kurê al-Fadl II, di sale 1073'an de were ser taxt. Bi wê re jî, wê dem pêş bikeve. Lê ji dema Al-Fadl III kurê al-Fadl II. de, wê hin bi hin şadadî, êdî wê cihê mazinatiyê ji desthilatdariya bakûrê kurdistanê re bihêlin. Çend ku bahse merwanîyan tê kirin ku dawîya wan di salên 1077' an û hwd tê dayin nişandin jî, em nikarin bibêjin ku ev ji bo wan dawîbûnek a. Lê em dikarin bêjin ku ji bi wan bi dawîbûna demekê û destpêka demeka nû ya. Weke ku çawa ku desthilatdariya Şadadîyan bi desthilatdariya Fadl û ankû fazlûm'ê pîncemîn ku di sale 1161' û hwd de ku li ser taxt rûniştîya ku çawa ku weke şahê dawî bahse wî tê kirin û tê gotin ku ew şahê dawî ê şadadîyan jî ya, em nikarin vê yekê bibêjin. Wê Şadadî, heta wê demê û serdema piştî wê re, wê bandûra wan ji wan herêmên qafqasê li cihna ji dest herê û li cihna kêr û bê bandûr bibe. Lê wê dem bi dem ev yek bibe. Ji ber ku demna ku bandûra wan zêde dibe û demna kêr dibe. Ji ber vê yekê, hem ji bo Şadadîyan û hem jî bo Merwanîyan, em dikarin bêjin

ku wê piştire jî xwe bide domandin. Di dema Melîk şah de, tê gotin ku hêrişên ku lê dibin, wê desthilatdariya Şadadiyan bêne ber têkçûnê. Melîk Şah, wê bi dehan herêman ji dîrokê bibe û kevil bike. Lê wê piştî wî re jî, şadadi desthilatdariya xwe bidina domandin. Herî zêde, wê didema Salahadinê Eyûbî de, xwe di levgirenekê û xortbûnekê de bibîne. Lê Salahadinê Eyûbî, wê navê 'Eyûbîyan' bi navê xwe re derxe li pêş. Navê Merwanîyan, wê ne bi têkçûnê lê bi pêşketina eyûbîyan re wê di nava navê wan de weke ku wê xawr bibe û wê êdî cihê xwe ji yê wan re bide hiştin.

-Ji şerê Çardiranê' û pêde, rewşa başûrê kurdistanê. ..

Başûrê kurdistanê, weke giştîya kurdistanê hemûyî wê piştî şerê çardiranê bikeve rewşeka pîrr xirab de. Di aslê xwe de, ku em bibêjin bandûra herî mazin bi bakûrê kurdistanê re li wir bûya, wê ne xelat bê. Piştî şerê çardiranê, li gorî rewşa siyêsî ku dihê xwestin ku were afirandin, kurd bikevina rewşekê de. Kurd, dema ku li ser rewşê dihizirin, êdî hin bi hin kifş dikin ku rewşa nû li dijî wan azadiya wan a. Mîrgeha Bahdînanê û hwd, wê rewşê ên ku herî zêde ên ku kifş dikin in. Rêveberiyên kurd, ên herêmî, piştire, dema ku êdî hin bi hin kifş dikin ku mudahale li jîyane wan dihê kirin, êdî wê bidest li berxwedanê bikin. Heta ku dem were dema 'şerê çardiranê' jî, wê di temenê giştîya kurdistanê de, serdestiya kurd û kurdistanê wê hebe. Di aslê xwe de, ew rewşa ku bi şadadiyan re afirî bû û bi merwanîyan û eyûbîyan re xwe domandibû, şerê parvekirin û lê bûn desthilatdar dihê dayîn. Yanî, şer parvekirina desthildariya giştî a herêmî dihê dayîn. Rewşa giştî ya serdestî ya desthilatdariya kurd, li herêmê bigiştî serdest a. Yê ku li wê serdest bû, bi teybetî, wê li herêmê jî serdest bû. Kurd û rewşa wan, bi serdestiya wan ya giştî û kurdistanî de, di rewşeka ku pêşketin û rêya bi ber pêşarjê re çuyinê ya herêmê bigiştî dide kifşkirin. Şerê Çardiranê, di rewşeka wusa hat kirin, ku herdû aliyên ku hatina berhevdu ku di herdû aliyên de jî kurd hebûn, ku kîjan aliyê qizinc kiriba jî, wê kurdan winda kiriba. Yanî, kîjan aliyê jî qizinc kiriba, wê heman rewş derketiba li holê.

Piştî ku şerê çardiranê bû, wê bakûrê kurdistanê di temenê bi levkirinek û peymanekê re wê bakûrê kurdistanê li aliyekî bê. Li aliyê din jî, kurd û faris di pêşengiya şah îsmail de hebûn. Heta wê dema şerê çardiranê jî, wê kurd, di temenê xwe domandina rewşa desthilatdariya şadadiyan a herêm bi herêm, wê serdestiya kurdan hebe. Kurd, di wê demê de, serdest in. Lê hêrişê êdî hin bi hin wan û li herêmen wan dibin. Desthilatdariya Sefewîyan a ku afirîya, ku kurdan di temen û destpêkê de piştigirî dayê de, piştî ku ava bû, wê berê xwe bide kurdan. Mînaq, li herêmen weke ên Şivanê, wê hêzên sefewîyan bi fermana Mohemed xodabendî wê herîşî kurdan bikin wê nivê herêma Şivanê di şûr de derbar bikin. Herêm bi herêm, li herêmen bakûr jî û ên başûr jî rewşn bi vî rengî bûna. Lê herêmen mîrgeha bahdînanê, bi herêma botanê ve girêdayî tevdiagerihê û di wê temenê de, weke herêmeka fireh dijî. Bo vê yekê, başûrê kurdistanê wê karibê, rewşa xwe heta demekê biparêzê. Di dema şerê çardiranê de jî û piştire di dema peymanê ku di ancama wê de hafî

mohrkirin a li "qasrî-şêrîn", wê başûrê kurdistanê, weke herêmeka ku herdû alî jî dixwezîn ku lê serdest bibin. Ji ber ku ev herêm weke xwe gihandina baxdadê dihê ditin. Hêza ku li başûrê kurdistanê serdest a, wê karibê, herê bi ser baxdadê de jî. Di vê temenê de, sefewî, naxwezîn ku ew wê herêmê winda bikin. Bo vê yekê, têkiliya wan mirgehên wê herêmê re hena. Her wusa, dewleta osmanî ya ku bi piştgirîya kurdên bakûrê kurdistanê serkevtina bidest xist, dixwezê ku li wê herêmê bi hêz bê. Lê tevî ku serketiya jî, heta ku kurd, nebêjin herê, wê nikaribê li wir serbikeve. Piştî şerê çardîranê, hin hewldanên leşkerî dibin ku osmanî xwe bigihîjênina wir. Lê ew, hewldan jî, heta ku kurd xwe ne labîtenin, newêrê bi pêş bixe. Piştî, yê ku wan hewldanên leşkerî bi ancem dike, wê Îdrîsê bedlîsî bê. Piştî Mohrkirina peymanê "qasrî-şêrîn", herêma başûrê kurdistanê, weke herêmeka ji dest çûya, Êdî aliyê osmanî li wir, en bi hebûn in. Yê ku wê rewşê xira dike, Îdrîsê Bedlîsî ya. Îdrîsê bedlîsî, wê piştî mohrkirina peymanê qasrî-şêrîn, tevî li gorî peymanê başûrê kurdistanê bi desthilatdariya giştî ya sefewî re dimêne jî, Îdrîsê bedlîsî wê di cih de hêzeka mazin ya leşkerî amade bike û bişêne û li Musil û li dora wê bicih bike.

Ev rewş, wê rewşa ku bi peymanî di dema mohrkirina peymanê 'qasrî-şêrîn' de ku afirîya, wê piştî wê rewşê jî bide guharandin. Îdrîsê bedlîsî, hemû mirgehên kurdistanî ên bakûr û hwd, li dora xwe civandina. Heta ku Mîrgeha botanê bixwe jî, ew rewş herê kirîya. Mîrgeha botanê, çawa gavê biavêje, mirgeha bahdînî jî weke wê gav diavêje. Di wê temenê de, êdî li dijî rewşê wê mirgeha bahdînî deng dernexe. Lê Îdrîsê bedlîsî li ser navê wê jî, wê 'sancaq' mafê avakirina hikimeta wê naskirina wê wê biavêje ku ji wê re were nas kirin. Ev rewşeka ku mirgeha bahdînê li dijî wê dernekeve ya. Lê desthilatdariya sefewîyan jî, dizanê ku dema ku ew nikaribê ku kurdên başûrê kurdistanê li cem xwe bigirê, wê nikaribê rojhilatê kurdistanê jî bi kurdên wê re li cem xwe re bigirê. Bi vê yekê, başûrê kurdistanê, dikeve rewşeka 'mifte' de. Başûrê kurdistanê, weke deriyê baxdadê û serdestbûna li wê jî dihê lê nerîn û ditin. Ji xwe, hêzeka ku di wê rewşê de ku li ser başûrê kurdistanê ne xwediyê serdestiyê bê, wê nikaribê bibêje ku li herêmê bihêz a jî. Herêma başûrê kurdistanê, hem rojhilatê kurdistanê bi xwe ve girêdide. Her wusa, weke deriyê çûyina bi ser baxdadê ya jî. Bi wê re jî, kurdên başûrê kurdistanê, rewşa wan rewşa kurdên bakûrê kurdistanê jî bi bandûr dike. Rewş, bi vî rengî ya. Ji aliyê ardnîgarî ve çendî ku bakûrê kurdistanê bi rojavayê kurdistanê re herêmeka stretejîkî bo herêmê giştî, her wusa bo bakûrê kurdistanê jî, bo rojhilatê kurdistanê jî û bo serdesttîtiya li baxdadê jî, başûrê kurdistanê di rewşeka stretejîkî de ya. Yê ku herî baş ew rewş diditîn û fahm dikirin kurd bixwe bûn. Bo vê yekê, ji aliyê aqilmendî ve û her wusa ji aliyê piştgiriyê ve piştgirîya kurdên bakûr ji osmaniyan re, wê bike ku ew hin bi hin bi wê rewşê fahm bikin. Lê heta ku dem tê sadsale 17'mîn jî, wê osmanî nikaribin wê rewşê bi tememî fahm bikin. Piştî, ku hin bi hin çavberdan li xwe gihandina baxdadê dibe, êdî ew rastî bi başî dihê fahmkirin. Ew ditin jî, wê bi sayaserê kurdên weke "melayê Goranî" de ku demekê li qasra Osmanîyan şewirmendî jî kirina, wê fahm bikin. Melayê Goranî, li Kûdûsê jî maya. Bi aslê xwe, kurd û ji başûrê kurdistanê bû.

Rewşa başûrê kurdistanê, wê piştî şerê çardiranê, bibe mijareka pîrr giring û sereka. Kurd, wê herê nekin ku azadiya xwe ji dest bidin. Lê tekoşîna siyêsî û hwd, a li dijî wan, wê bibe. Kurdên başûrê kurdistanê, fêr û cerbeka wan ya dîrokî ya desthilatdarî ya pîrr xort hebû. Qasra mirgehên herêma başûrê kurdistanê tişî pirtûkxaneyên pîrr mazin bûn. Her wusa, piştî desthilatdariya şadadiyan re jî, ew rewşa başûrê kurdistanê pîrr xort a. Yanî, hê dem û hişên dema şadadiya di meşîyan de zindî na. Hê di mejîyan de, li ser demên şadadiyan hizirkirin pîrr mazin hena. Bandûra şahên şadadiyan ên weke Mihemedê kûrê şadadî, "Eliyê Eskerî", mazrûban, Şawûr, û hwd, pîrr hebû. Her wusa, ew rewş jî, dibû temenê têgihîştinekê di serê mîrên kurd ên demê de. Kurdan, bo vê yekê, di temenê wê têgihîştinê de, ew rewşên xwe yê desthilatdarî bi serdestî didomandin. Piştî sadsale 17' min û pê de, dema ku mudahela li jîyane kurdên wê herê dibin, êdî wê hin bi hin wê rabûna ser pîyan bibe. Têgihîştina desthilatdarî ya kurdan, ji wan demên wan ên berê, pîrr mazin û zindî hebû di wê demê de di serê wan de. Ew kevneşopîyên wan ên desthilatdarî, wê bike ku ew hertimî di rewşa xwe de bijîn. Heta van demên sadsale 17' min jî, ne ji aliyê sefewîyan û ne jî ji aliyê osmanîyan, ne di wêran ku kurdan hildina hemberê xwe. Bo vê yekê, hertimî ji serî ve bi mîrên wan ên ku li qasran dirûniştin û şêxên wan ên ku dergehên di rûniştin re diketin têkiliyê de û li ser wan re têkiliya xwe çê dikirin. Ji sadsalên 17' min û pê de, wê êdî mîr jî û şêx jî, li dijî wan desthilatdariya helwesta xwe dênin holê. Ev rewş, wê êdî ji vê demê û pê de, bê temenê serhildan û raperînên kurdan li dijî hem desthilatdariya osmanîyan û hem jî ya sefewîyan. Ji xwe, piştî şerê çardiranê, weke ku malbate şah îsmail bi temenî ji desthilatdariyê hatîya dûr kirin. Di destêka sadsale 18' min de, wê serhildanên kurdan ên girseyî û herêmê di pêşengîyan şêxan û mîran de hin bi hin bibin. Li başûrê kurdistanê di vê destpêka sadsalê de wê serhildane Evdulrahmanê Sorî wê bibe. Wê bi ser jî Keve. Li herêmê bi herêkirina serdestîya wan re, wê êdî wê serkevtina wan bibe û wê serhildan biancam bibe. Lê piştê ne bi gelekî re ku ne osmanî û ne jî sefewî li ser soza xwe disekin in, wê serhildanên kurdan ên weke ku di pêşengîya Mîr mihemedê Rawandûzî û hwd de wê bibin. Ev serhildanên kurdan, wê demekê bi xwe re bidina destpêkîrin. Piştê li herêma botanê, wê "komare botanê" bê demezrandin. Piştê, ku çend salan ev komar dijî û rastî bêbaxî û hêrîşan tê û tê xirakirin, wê piştê temenê serildane şêx Ubeydullahê Nehrî li bakûrê kurdistanê were avêtin. Di vê demê de, li başûrê kurdistanê, tevgerin heya.

Di vê demê de tariqata kurd ya naqşibendîyan, wê bikeve dewrê de. Tariqat, li ser mafê civate xwe ya kurd disekinê. Piştê, osmanî, li rêbazan digerihih ku wê bê bandûr bikin. Hin şêxna kurd ku li dijî wê gotinê bibêjin li wan digerihih. Lê di wê ya xwe de bi sernekevin. Şêxên kurd ên vê tariqatê ên weke şêx esadê Erbilî, li ser van rewşan dixwezê ku were navenda osmanîyan û bixwezê ku mafê kurdan werina nasîn. Lê şêx, piştî ku hat, wê were girtin û piştê bêdadgeh wê were bi derve kirin. Ev rewş, wê bide nîşandin ku li başûrê kurdistanê û li bakûrê kurdistanê jî, bi rewşeka xirab re kurd rû bi rû na. Ev rewş, wê heta destpêka sadsale 19' min wê bidom in. Di vê demê de, wê êdî hêzên rojava ên weke îngilistan wê bikevina dewrê de. Ew, wê bixwezî ku werina herêmê. Tê jî. Piştî ku hatin, êdî wê wê bi teybetî ku başûrê kurdistanê di nav de, wê li

herêmekê mazin bina xwediyê serdestiyê. Serdestiya ingilizan, ku piştgirîya rêveberîya îranê ya demê neba, wê nikariba xwe domandîba. Lê Dema ku bi piştgirîya Îranê ingiliz li başûrê kurdistanê dibin xwedî bandûr, êdî herêmên din ên li dora wê herêmê û heta ku digihijê baxdadê û hwd, lê dibina xwedî bandûr. Başûrê kurdistanê di wê demê de jî, dibe deriyê xwe gihandina serdestiya li baxdadê. Kurd, di wê demê de dikevina rewşeka pirr xirab de. Li di wê dema ku ingiliz li wir in, yanî li başûrê kurdistanê na, şêx Mahmûdê Berzencî ku xwe weke 'keyê kurdistanê' didenezê, wê were ber ingilizan. Di wê demê de, wê weke demekê serdestiya wî were nasîn jî, Heta ku Şêx Mahmûdê Berzencî, wê desthilatdariya xwe ava bike, bo dewletekê çî pêwîsta, wî hizirkirîya û afirandiya. Lê Ingiliz, dema ku dibînin ku kurd bi hêz bibînin, wê nikaribin li herêmê bi hêz bibin û wê nikaribin ji dewlemendiyên herêmê sûd wergerin, êdî hêrîş desthilatdariya ku şêx Mahmûdê berzenî ava kirîya dikin. Di sale 1924'an de, wê balefirên Ingilizan, wê herêmên başûrê kurdistanê bidina ber bombardîmanê û wê desthilatdariya kurd û ankû keyenîya kurd ya şêx mahmûdê berzencî bidina xistin.

Di wê demê de, di sale 1923'an de konfaranse Lozanê hat li darxistin û di wê de Kurdistan hat qatkirin li çaran. Di konfaranse Lozanê de Kurdistan, di nava Îran, rejîma ku di wê konfaranse de biryara avakirina wê hat dayin ya îraqê û tirkîya de hat qatkirin. Beşa rojavayê kurdistanê, di wê demê de di bin kontrola hêzên firansîzî ku li wê herêma ku î ro em jê re dibêjin "Sûrî" de bû. Piştî, wê pişt konfaranse Lozanê, di sale 1937'an de wê paxta sadabadê werê li darxistin. Ev paxt, di berdewama konfaranse Lozanê de hatibû li darxistin. Di dema ku hêzên Îngiliz li herêma ku piştî bi navê "îraqê" hat bi nav kirin de bû, ku di wê demê de konfaranse Lozanê çî rol û weyn leyist, wê paxta sadabadê heman rol bo firansa di wê demê de leyistîya. Ji konfaranse Lozanê, heta ku dem tê dema ku di wê de paxta sadabadê tê li darxistin, wê kurdistanê were qatkirin li çaran û wê sînor di nav wê de werina xîzkirin. Di qatkirina kurdistanê de, rola firansa û Ingilistan bi tirkîya re sereke ya. Ingilistan, wê başûrê kurdistanê bikina nav de û wê welatekî nû bi navê 'îraqê' ava bikin.

Piştî ku desthilatariya şêx Mahmûdê berzencî hat xûrixandin, wê piştî şêx Mahmûdê berzencî, herê başûrê kurdistanê û tekoşîna pêşmergetiyê bide dest pê kirin. Piştî, wê li ser levkîrînekê ew dişa vegehihê başûrê kurdistanê, di wê demê de wê jê were xwestin ku ew desthilatdariya ingilizan nas bike û li gorî wê tevbigirihê. Lê wî ev yek herê nekirîya. Şêx Mahmûdê Berzencî, di vê navberê de divê ku em bibêjin ku ew demekê ji aliyê ingilizan de hatîya dilgirtin û hatîya şandin li sûrgûnê li giravaka hindistanê jî. Lê tevî wê jî, wî ya rastî çîya ew dest jî wê ne berda ya. Ev demên başûrê kurdistanê, demna dîrokî û ên bi êş in. Di wê demê de bi sadan kurd, di ancama bombardîmana ingilizan de hatîna kuştin. Piştî vê dema şêx Mahmûdê Berzencî re, wê ne di demeka zêde dirêj de wê desthilatdariyeka kurd ya din wê li rojhilatê kurdistanê ava bibe. Ew jî, 'komare kurd a Mihabadê' ya. Ev komare kurd, wê temenê wê hinekî ji 11 heyvan zêdetir bê. Di wê demê de, bi ketina hêzên yekîtiya sovyet ya li rojhilatê kurdistanê

de ew komare kurd tê ava kirin. Lê bi heman rengî, dema ku di ancama hin levkirin û peymanna de ku hêzên yekîtiya sovyet xwe bi şûn ve kişandin, êdî wê artişa îranê bikeve komare nû ya ya kurd deû wê bixûrixênin û wê serokkomarê wê Qazî Mihemed jî li qada 'çarçira' were bi derve kirin. Piştî wê re, wê êdî tekoşarên kurd, berê xwe bidina başûrê kurdistanê. Li wir, weke ku çawa ku berê şêx Mahmedê berzencî kirin, wê di pêşengîya serokfarmandarê giştî ê komare kurd a mihabadê ya ku hatî xûrixandin mela Mistefa Berzanî de wê tekoşîna azadî û serbixwebûna kurdistanê were destpêkirin. Bi wê yekê jî, wê ji Îranê, herina başûrê kurdistanê û li wir tekoşîna xwe bidomênin. Di ancama wê tekoşînê de, wê heta ku sal were sale 1970'yî û hwd, wê xweserîya kurdistanê ya başûrê kurdistanê ji aliyê rejima îraqê ku piştî ku Ingilzan hêzên xwe bi şûn ve vekişandin û dan avakirin ve wê were nasîn. Lê ew jî, wê piştî peymane Cezayirê, ku dihê mohrkirin, wê were ji holê rakirin. Wê îran û Iraq di temenê levkirinekê de wê herina bi ser kurdan de. Wê kemberê li kurdan bijidênin. Di van deman de, weke rêxistinekê pêşketina PDK'ê, wê di nava kurdan de, bê temenê wê hêsta netewî. Wê piştê, li hemû beşên kurdistanê rêxistinên wê ava bibin di nava kurdan de.

Ji salên 1950'î û pê de, wê başûrê kurdistanê, bikeve rewşeka tekoşarî de. Heta ku dem tê salên 1970'î û hwd, wê kurd, serkevînekê bi dest bixin. Di ancama wê serkevîna wan de, wê 'xweserîya başûrê kurdistanê' were nasîn. Lê piştî civîna Cezayirê' ku êdî ew rewşa xweserî jî hat ji holê rakirin, wê êdî bi tememî rewşa kurdên başûrê kurdistanê bikeve rewşeka xirab de. Ji aliyekî xwe ve wê Îran were bi ser wan de dorê li wan dorpêç bike. Ji aliyê din ve jî, wê rejima Îraqê ku bi piştgirîya ingilizan hatî ava kirin, wê heman tiştî bike. Kurd, wê êdî di wê demê de bikevîna rewşeka xirab de. Rêberên kurd, ên weke mela Mistefa Berzanî, wê maf û derfetê ji xwe re ne binin û wê biçîna rojava. Wê pêşî herê Yekîtiya sovyet, Ji wir jî, wê piştê herê Emerika. Li herêmê jî, ku rewş tê salên 1980'î û hwd, wê êdî pirsgerîkên ku di civîna Cezayirê de li ser hatina axiftin ên weke li 'çemê şetelerebe' û hwd, wê bidina sedema şerekî dem dirêj di nava rejima îran û ya îraqê de. Ev şerê ku wê bibe, wê ne bin 7 salan re bidomê wê bi hezaran mirov, dem bi dem bîn kuştin. Di wê navber de, kurd jî, weke ku di navê de mabin li wan hatîya. Kurd, naxwezî ku li aliyekî ji bo aliyekî bikevîna şer de. BI vê yekê, di kevîna nava helwestekê de. Di wê demê de, Îran jî û Iraq jî, li dijî kurdan dijberîyê pêş dixin. Ji salên 1981'ê û hwd, û pê ve, wê îran ji devê humeynî wê "fetwa" ya serê kurdan bide. Di ancama wê de, wê li başûrê kurdistanê bi sadan kurd, ji aliyê komên tundrew ên îranî û olî û hêzên wê ên leşkerî ve werina kuştin. Kurd, bi wê re dikevîna rewşeka pirr xirab de. Ew rewşa xirab ya kurdan, wê heta ku ew şer û dema wî didomê, wê bi kurdan re bidomê. Li aliyê Îraqê jî, rejima ku Saddam Huseyin li ser serê wê ya, wê bi heman rengî piştê li ser olê re hewl bide dijberîyê li dijî kurdan bide afirandin. Wê dide afirandin jî.

Ku dem tê salên 1985 ' hinekî piştî van salan re wê êdî ew dijberîya ku rejima Saddam Huseyin li dijî kurdan afirand, wê piştgirîya ji wê fetwa'ya serê kurdan ya humeynî jî bigirê.

Saddam, ji wê fatwa'yê, ancama ku derxistîya, ew a ku wê îran jî, çend ku bi hevdû re di şer de jî bin, wê li dijî kurdan li rex wê be. Wê alî kurdan neke. Ev yek, piştî rast jî derdikeve. Piştî, weke ku çawa ku humeynî, fetwa' serê kurdan a û ol îstismar kir û bi karhanî, her wusa wê li Îraqê jî, Saddam Huseyin, wê oparasyonên qirkirina kurdan bi armanca jenosîda wan bide destpêkirin. Wê navê ku li oparasyonên xwe ên ku li ser serê kurdan bi armanca jenosîde dimeşên ku lê bike wê navê sûreyekî kuran'ê ê bi navê "anfall"ê bê. Bi vê yekê re, ev rewş, wê bê weke fetwa'ya duyemin ya serê kurdan di wê demê de. Di wê demê de, Partîyên kurdan ên weke PDK û YNK'ê û hwd, hebûn ku bi hevdû re tekoşîna kurdan û kurdistanê didan. Lê ew jî, di nava wan de nakokî hebûn û bû bûbûn qat. YNK, piştî ji PDK'ê vaqatîyabû di pêşengîya Celal Talabanî de ku di nava kurdan de bi navê "mam celal" dihê nasîn. PDK jî, piştî Mela Mistefa Berzanî, êdî yê ku bi nav û aqilê xwe derketibû li pêş, Idris Berzanî bû. Lê piştî ku ew jî, hatibû qatil kirin, êdî li şûna wê Mesûd Berzanî weke serokê PDK'ê derdikeve li holê. Êdî wê rêwîti bi wî re bibe li kurdistanê.

Di wê demê de ku ji bakûrê kurdistanê derketîya PKK'ê jî, bi dest tekoşîna azadîya kurdan kiriya. PKK'ê, heta ku sal, tînan van salan wê, bê tevgereka kurdistanî ya bi girseyî ku pirranîya kurdên bakûr, rojava, rojhilat û başûr jî wê piştîgiriyê bidinê de. PKK'ê, di pêşengîya Serokê gelê kurd Birêz Ocalan de ku di nava kurdan de bi nasnavê "rêber Apo" tê nasîn de wê pêşketineka dîrokî bi xwe re li kurdistanê bigiştî bide çê kirin. Têgihîştina wê ya hemdem, wê bê hîmê pêşketina civateka hemdem. Ev yek, pêş jî ket.

Di wan salan de, wê oparasyonên Rejîma Saddam Huseyin ên bi navê "anfalê" ku bi armanca jenosîda qirkirin û jenosîda kurdan dane dest pê kirin, wê êdî hin bi hin di ancama wan de, komkujiyên girseyî ên weke "komkujîya Helepçe" wê bi xwe re bêne. Teybetmendîya van komkujiyên ku rejîma Saddam dike, ew a ku "çêkên kîmyewî" dihên bikarhanîn. Ev çêkên kîmyewî, ji welatên ewropa ên weke Hollanda û almanya hatibûbûna şandin ji rejîma Îraqê re. Wê jî, ew çêk li dijî kurdan bikarhanî bûn. Di ancama wan komkujîyan de, wê bi sad hezaran kurd hatina qatil kirin. Weke ku çawa ku rejîma tirk, di dema komkujiyê dersimê de bi de deh hezaran mirovên sivil ên pîr, kal, jin û hwd qatil kirin, wê heman tişt di komkujiyên weke ên helepçe de jî bibe. Lê tiştêkî jî divê ku em binxat bikin ku di komkujîya Dersimê de, rejîma tirk, bi de hezar kurd kuştin. Lê zaroyên wan kurdên ku hatina qatil kirin, berhevkerin û kirina qamyonên leşkerî de û şandina rojavayê tirkîyê ku wan rdestî malbatên tirk bikin û weke tirk wan mazin bikin. Li başûrê kurdistanê jî, bi hezaran keç zaroyên kurd ên piçûk hatina berhevkerin û hatina şandin li Mîsîr, Qatar, bahreyn û hinek welatên din ên arab. Ev keç zaroyên kurd, tevî cihê wê di ti mirovatîyê de tûna ya hatina firotin li van welatan.

Li kurdistanê, rewş, ku tê salên 1988'î û hwd, wê rewş ev bê. Piştî ku di vê salê de ewqas komkujî ên weke 'komkujîya helepçe' hatina serê kurdan, wê cihan li ber wê bêdeng bê. Piştî

bûyîna komkujiya Helepçe bi sê rojan, wê konfaranse liga araban bibe. Lê tevî ku bi dehan welat tevî wê konfaranse dibin jî, wê ji nedîtî ve werîna kirina van komkujiyan. Ku dem tê salên 1990 î edî wê piştî rewşa sîyêsî ya cihanê bi guharê. Wê yekîtiya sovyet bixurixê. Wê, piştî, Emerika, Mudahelaya leşkerî li rejîma Îraqê bike. Piştî wê mudaheleyê re, wê bi piştgirîya emerika wê rêveberîya kurd li başûrê kurdistanê wê ava bibe. Kurd, wê rêveberîya xwe ava bikin, wê parlamen û hikimeta xwe ava bikin. Lê dem heta ku tê wê demê, bi sad hezaran kurd hatina qatil kirin. Başûrê kurdistanê, weke ku bi komkujiyan hatîya vala kirin. Lê tevî wê jî, ji salên 1990 î û pê de, rêveberîya ya başûrê kurdistanê ava bû. Piştî, başûrê kurdistanê ku bi tememî ne bi serbixwe jî bê, digihîjê desthilatdarîya xwe ya kurdî. Ev rewş, wê bandûra wê li ser kurdan pîr hebe. Kurdên ku di bin derûnîya jenosîdê de weke ku difatsin, wê bi wê desthilatdarîya kurd re, wê weke ku hinekî bêhn bistênin wê li wan were.

Başûrê kurdistanê, weke herêmeka piçûk ya kurdistanê ku xwedî desthilatdarî, heta roja me hebûna xwe hanî. Em î ro di sale 2013'an de dijîn. Lê hê jî, hebûna wê desthilatdarîya kurd, ne hatîya herê kirin. Di vê demê de, rojavayê kurdistanê, hinn bi hin kurd li wê temenê xweserîya xwe ava dikin. Lê weke ku çawa ku humeynî di salên 1981'ê û hwd de, 'fetwa' serê kurdan da, weke ku çawa rejîma Saddam bi navê "anfale" oparasyonên qirkirina kurdan li darxistin, komên ku bi navê olê ku hatina bi rêxistin kirin û piştgirîya tirkîya li rojavayê kurdistanê li dijî kurdan şer dikin, 'fetwa' ya serê kurdan didin û dibêjin ku "kuştina kurdan helal a." "destavêtina, can, mal, û namûsa kurdan helal a" û hwd. Bi vî rengî di rengê wan fetwa'yên serê kurdan ên berê de fetwa' ya serê kurdan dihê dayîn. Di vê dema ku min ev dinivîsand de jî, li başûrê kurdistanê di bin banê wê desthilatdarîya kurd de, kurdan hewlîde ku 'kongira netewî a kurdistanê' li darbixin. Bo wê di nava karûbar de bûn. Biryar jî, hatibû dayîn ku wê kongira netewî a kurdistanê di nava rojên 15. 16 û 17'ê êlonê de were li darxistin.

Beş sê; dîroka rojhilatê kurdistanê:

Rojhilatê Kurdistanê, ku mirov li ser dihezîrê, mirov pêşî, rasti dîrokeke ku pîr kur û mazin têt. Li wir, gelek pêşketinên mazin yê dîrokî bûna. Bêguman deme ku mirov li ser rojhilatê kurdistanê bidest nivîsandinê bike, divêt ku mirov pr mazin xwediyê zanebûnaka mazin bêt, da qana mirov wê pêşketin û têngihîştinê wê ya dîrokî fahm bike. Ku mirov dîroke wê ye demên berê ji fahm neke, mirov wê gelek pêşketinên ku î ro, di roje me de, li ser hevdu dibin jî, baş û qanc fahm neke û têngihê. Ji ber vê yekê, hêjaya ku mirov pîr li ser bisekinê. Divêt ku mirov dîroke wê pîr baş û qanc ji serî fahm bike. Di derbarê wê de xwedî zanebûn bê. Zanebûn, ji du aliyan ve, ji bo fahm kirin û têngihîştinê ji mirov re lazim e. Aliyek, ji aliyê pêşketin û têngihîştine wê vê ya. Û aliyê din jî, her weha ji aliyê ku mirov hinek bizanebûn lê meyîzenê û fahm bike ya. Her wea ev herdû alî ji divêt ku hbin. Divêt ku mirov xwediyê têngihîştineke pîr mazin ê di derbarê wê de. Rojhilatê Kurdistanê, xwediyê dîrokeke ku pîr mazin bi nîrx jîn bûya ya. Î ro jî, hê ew dîroke wê

ji gelek aliyên ku were têgihîştin ve ne hatiya têgihîştin. Ji gelek aliyên ku were fahm kirin ve ne hatiya fahm kirin. Ev yek ji, radixe berçavan ku divêt ku mirov pir mazin bizanebûn li ser bisekinî. Ne tenê rojhilatê Kurdistanê, herême persan ji, her weha mirov karê vê gotinê ji bo wan ji, bêja. Ji rojhilatê Kurdistanê, ji her alî ve kifşkar e. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov pir mazin li ser wê bisekinê. Berî nahaka bi çend rojan, çend ciwanên kurd, ji ber ku kurd bûn û dawa mafê xwe yê mirovahî kirin hatina bidarvekirin. Ev mijar bi serê xwe ji, bi tenê ji, ji bo ku were têgihîştin, divêt ku mirov li dîrokê meyîzenê û têgihîştineke di derbarê wê de bike. Ewqas zanist û dîrokzanên ku li ser dîrokê dinivîsînên û li ser dîrokê wê herêmê ji di nivîsînên, ku mirov li nivîs û hizrên wan dimeyîzenê, mirov dibîne û fahm dike ku hinekî xwedî zanebûn in, di derbarê wê herêmê û dîroke wê de. Dîrokê wê herême ji gelek gelek aliyên ve divêt ku were ser ziman. Berî hertiştî, weke ku me got ji gelek aliyên ve, pêdivî pê heya ku li ser bisekinandin û nivîsandin. Lê divêt ku ew hemûk ji, bi têgihîştin bibe. Her weha hingî, wê baş bibe. Dîroke wê herême, eme tenê, di çerçove herême de li ser bisekin in. Emê mijara xwe bi wê ve bisînor bihêlin. Lê ev yek, nayê wê wate ku aliyên wê yên ku hene, ne hewcene ku newine ser ziman. Ew ji hewceyî pê hene ku werine ser ziman. Lê nahaka ya sereke emê li ser wê bisekin in û bînine ser ziman. Berî hertiştî, ji bo ku mirov di derbarê wê herême de bibe xwedî zanebûnaka mazin, divêt ku mirov dîroke herême ye ku herême bixwe jînkirîya, baş û qanc zanibe û fahm bike. Ev yek, her weha pir girîng e. Berî hertiştî. di vir de, em vê gotinê weke gotinaka sereke bînine ser ziman. Ji bo ku dîroke li rojhilatê Kurdistanê baş û qanc were têgihîştin, divêt ku mirov ji çend aliyên ve bisereke nêzîkî wê bibe. Di serî de, hizir û dîrok, kevneşopî û rêveberî û mirov û bawerî û hwd, divêt ku mirov bisereke li ser bisekinê û bêne ser ziman. Ev yek, her weha girîng e û divêt ku mirov pir mazin ji li ser bisekinê. li rojhilatê Kurdistanê, ku kurd, wê dîroke ya ku ku jînkirîna rast û pak zanibin, wê ti tiştek bi rêveberî û kevneşopiye xwe re li pêşiye wan nebe bend. Her weha divêt ku mirov vê yekê di serî de kifş bike û bêne ser ziman.

Dîrok, berî hertiştî, divêt ku li ser rastiya xwe ye ku jîn bûya were têgihîştine û ser ziman. Wê hingî, pir baş û qanc bibe bingîhe pêşketinê pir mazin. Lê wekî din ji, ku ne weke xwe were ser ziman û nêzîkatî lê newê kirin, wê weke ku di roje me de çawa ku pîrsgirêk rû didin, wê pîrsgirêk rû bidin. Her weha ev yek ji, pir girîng e, kuu mirov kifş bike û bêne ser ziman. Bawerîya li herême pir mazin e. Ji aliyê kevneşopî ve, digihe berdiclê û berfiratê. Ji vî aliyê ve ji, divêt ku bisereke xwe weke mijaraka dîrokî were ser ziman û têgihîştin. Wê hingî, baş were têgihîştin. Ev li ji, aliyekî wê yê din e, ku pir baş û qanc were têgihîştin û fahm kirin. Li rojhilatê Kurdistanê, dîrokeke ku ji gelek aliyên ve were têgihîştin heya. Bi vê yekê, divêt ku mirov pir mazin û bizanebûn li ser bisekinê û bêne ser ziman. Bi vê yekê re, hingî, mirov wê pêşketinên ku di roj me de dibin ji, pir baş û qanc fahm bike. Pêşketinên roje me, ku mirov ji perspektifeke dîrokî bêne ser ziman û şîrove bike, bêguman, wê pir xalat bê. Divêt ku mirov ji dîrokê dîr neyêne ser ziman. Divêt ku mirov ji dîrokê û têgihîştin û pêşketine wê dîr neyêne ser ziman. Her rêveber, xalkê ji nav derketiya ji, ku wê fahmneke û li gor wê û dîrok û hebûn û nîrxên wê tevne gerehê, hingî, wê

bikeve dijî wê de. Weke ku î ro li rojhilatê kurdistanê dibe ya. Î ro li wir, rêveberiya pers serdest e. Ew ji divêt ku pir baş û qanc were têgihîştin. Deme ku mirov li wê rêveberiyê dimeyîzenê, mirov wê rêveberiyê weke rêveberiyaka ku pir bi dîrok û kevneşopî dibîne. Lê ji aliyekî din ve ji, mirov dibîne ku pir dûrî wê kevneşopîyê û ew kevneşopîyên ku ew xalk jîn dikin dijî. Mirov, her weha vê yekê ji, pir baş û qanc û zelal dibîne. Ev yek, her weha pir girîng e, ku mirov kifş bike û li ser bisekinê. Kevneşopî ji, divêt ku weke mijarakê were têgihîştin. Kevneşopî ji, hewceyê pê heya ku were ser ziman û têgihîştin. Ev yek ji, ji bo fahmkirin û têgihîştineke rast, pêdivî pê heya. Divêt ku mirov wê yekê her weha pir zelal bêne ser ziman. Rêveberîya pers, bi kevneşopîya. Lê bikevneşopîya xalkên li herême ya. Î ro, di bin navê Îrantîyê de, lê kevneşopîya xalkên ku li wir dijîn xwedi derdiekve. Lê ne xwediye rast lê xwedi derketineke ya. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha bêne ser ziman. Divêt ku mirov li ser vê yekê bisekinê û bêne ser ziman. Rast lê xwedi derketin çawa ya? Rast lê xwedi derketin, li gor ku jîn bûya, fahmkirin û têgihîştin kirin e. Divêt ku mirov vê yekê weha bêne ser ziman. Bi vê yekê re, hingê, wê nêzîkatîyaka rast ji biafirê. Nêzîkatî, di vir de, divêt ku mirov biçend gotinan ji bê, bêne ser ziman. Nêzîkati, li gor lê xwedi derketinê di rast û pak lê xwedi derketinê de ya. Divêt ku mirov vê yekê, her weha kifş bike. Rast lê xwedi derketin ji, ew kevneşopî, bi nirxên xwe, çawa jîn bûya û wê jînbûya û çawa xwediye dîrkeke ya, divêt ku weke xwe rast û pak were ser ziman e. Bi vê yekê re, nêzîkatîya rast xwe dide berçavan.

Li rojhilatê kurdistanê, dîrok pir mazin afiriya. Tenê ku mirov bi kurdan re ji deme Medan dest pê bike û bêne roje me, hingî ji, mirov wî bibîne ku dîrokeke ku çawa mazin û kifşkar e. Di serî de, ku mirov, mijarên roje me, bêne ser ziman, ji aliyekî ve, divêt ku mirov ji wê demê ji, weke xalaka sereke hildê dest û bêne ta roje me. Wê hingî, pir baş were fahm kirin. Lê ev yek ji, wê ne bes bê. Divêt ku mirov hinekî herê berê wê demê ji, û ji demên berê, pêşketinên ku bûna, wan ji bi sereke fahm bike û bêne ser ziman. Bivê yekê re, mirov wê fahmbike ku deme medan ji di nav de ew demên pêşketinên yên ku hata roje me tên, li ser çî pêşketine bixata xwe hatin e. Hingî, mirov wê pir baş û qanc fahm bike. Bi vê yekê re, mirov divêt ku li ser bisekinê û bêne ser ziman. Ji deme Medan pêve, ku mirov hildê dest û bidest şîrovekirinê bike. Mirov, wê weke demeke hemdem ku ew demên pêşketinê yên ku bûna û hata roj me, hebûna xwe anîna, mirov wê wanakan pir baş û qanc fahm bike. Deme Medan, demeke kurdî ya. Lê demên piştî deme medan re, yên rêveberiyê neyên kurdî ne. Divêt ku mirov vê yekê ji kifş bike. Lê her ku ne yên kurdî ji bin, yên ku bi nirxê û pêk in kurdî pêş dikevin in. divêk ku mirov li ser vê yekê pir baş û qanc bisekinê. Divêt ku mirov van deman pir baş û qanc fahm bike û bêne ser ziman. Dîrok, deme ku hata şîrovekirin û ser ziman, wê ne tenê ji aliyekî ve were şîrovekirin û ser ziman. Ji gelek aliyan ve wê wer şîrovekirin û ser ziman. Berî hertştî, ji aliyê hizir ve divêt ku were têgihîştin û ser ziman. Bi rêveberiyê re, bi kevneşopîyê ji divêt ku were ser ziman. Her weha hatina ser ziman li vê herême, wê mirov bigihîne pir rasti û pêşketinên pir mazin. Bi vê yekê re divêt ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman. Emê bi v yekê re, hewl bidin, dîroke rojhatê Kurdistanê ji hinek aliyan

ve di çerçove rojhilatê kurdistanê bênine ser ziman. Ev yek, pêdivî pê heya. Ji bo ku roje me ji, pir baş û qanc were têgihîştin, pêdivî bi vê yekê heya. Di serî de, em bêjin, ku em hinekî li ser demêpn berê yê Medan ji bi sekin in, lê emê wilo zêde li ser ne sekin in, lê emê ji deme Medan hata demên serdeme navîn û ji wir ji hata roj me, di xataka pêşketinê de, emê bênine ser ziman. Bi vê yekê re, emê hewld bibin ku rastiya pêşketinên wê herême li gor xwe fahmbikin û bênine ser ziman. Her dem ji, wê di xwe de hinek mijarên wê yên teybet ku werine ser ziman, wê hebin. Lê ew ji, wê di nav wê de bin. Bi vê yekê re, emê hewl bidin ku dîroke rojhilatê kurdistanê fahm bikin û pêşketinên ku î ro li wir dibin ji, qancî û xirabiyên wê fahm bikin..

Demên berî dema Medîya. .

Di serî de, divêt ku em bêjin, ku rojhilatê kurdistanê, xwediye dîrokeke xwe ye ku ew bixwe di derbarê wê de bibe xwediye têgihîştineke baş e û ku ev bû ji, êdî wê ti tişt li pêşiyê pêşketine wê ye dîrokî ne sekin e. Dîroke wê ya berî zayîne, dîrokeke pêşketinê ya. Lê mirov karê karê weke dîrokeke têgihîştinê bêne ser ziman. Ji deme pêşketine şaristaniyê pêde, êdî pêşketin, pir mazin di awayê jiyane de xwe dide der. Li ber Diclê û firatê, pêşketineke pir mazin di wê demê de dibê, Bi vê yekê re mirov karê bêje ku pir mazin, êdî têgihîştin ji pêş dikeve. Bi pêşketine têgihîştinê re, êdî mazin pêşketin dibe. Mirov, karê demên şaristaniyê û pêşketinê wê, her weha demne pêşketin yên bitêgihîştinê ji bêne ser ziman. Her weha xwediye wateyeka mazin in ji. Şaristanî bixwe ji, ancama pêşketin û têgihîştine wê bixwe ya. Divêt ku mirov vê yekê her weha bêne ser ziman. Li ber diclê û firatê, pêşketine bişaristanî pir mazin pêş dikeve. Pir mazin diafirêne. Pir mazin nixwe pêşketî bihizir re diafirêne. Her weha divêt ku mirov vê yekê di serî de kifş bike û bêne ser ziman. Şaristanî, deme ku pêşket, êdî hin bi hin pêşketinên ku wê bibin yên yên yên dîrokî ji afirandin. Her weha mirov karê bêje ku deme şaristantiyê, demeke ku mirov pir mazin û ji gelek aliya ve li ser bisekinê ya. Bi vê yekê re, mirov wê pir têgihîştinekê mazin bidest bixe. Deme şaristantiyê, mirov li ser dihizirê mirov her weha pêşketinekê mazin dibîne. Lê berî hertiştî, mirov pêşketine bi pergala dibîne. Pêşketine bi pergala, pêşketineke ku mirov pir li ser bisekinê ya. Pergala bûn, di serî de, divêt ku biserê xwe were têgihîştin. Ev yek, pir girîng e, ku mirov li ser bisekinê ya. pergala bûn, deme ku bû, êdî piştê pêşketinên ku wê bibin ji, di wê çerçove wê de dibin. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji kifş bike. Her weha divêt ku mirov vê yekê mazin di serî de kifş bike.

Di deme sumeriyana de, her weha pêşketin û bi pergala bûn dibe û bi pêşdikeve. Bi vê yekê û pêşketine wê ji, êdî demên piştê diafir in. Deme şaristantiyê, di deme sumeriyana de, pir mazin pêş dikeve. Her pêşketinên wê yên ku dibin ji, di jiyane de mayînda dibin. Berî nivisandinê kifş bikin ji, navê xwûdayên xwe yên ku afirandina, di wê ast û radê de, bikar tên in. Her navek, weke xêveke wan ye pêş dixê ya. Her weha divêt ku mirov vê yekê pir mazin di serî de, kifş bike. Sumerî, di vê yekê de pir hoste ne. Divêt ku mirov pir mazin bahsa wan bike. Divêt ku mirov pir

mazin di vir de navê wan hildê û wan bi bîr bêne. Piştî ku nivîsandin ji hata kifş kirin, êdî wan navên wa yên ku weha bikar dianîn ji, dibîne bingihê pêşketineke wan ya pir mazin. Mirov, deme ku di demên piştî sumeriyana de pêşketiya li ole êzîdîtiyê dimeyîzenê, mirov yek-yazdayîtiyê dibîne. Lê hinek awayên pêşketine wê demê ji di wan û pêşketine wan ye ku bû de ji dibîne. Vê yekê ji, divêt ku mirov kifş bike. Di pêşketine ole êzîdîtiyê de, awayê pêşketinê yê di xwe de ji xwediyê civaknasiyaka wê ye ku heya û bi hizire yek-xwdûdayê ye bi pergal e. Mirov vê yekê her weha di serî de kifş dike. Lê ew civaknasiya wê ye ku heya ku mirov pir li ser bisekinê û bêne ser ziman. Ew ji, biserê xwe, divêt ku weke mijaraka biserê xwe were ser ziman û têgihîştin. Di nêzîkatiya ole êzîdîtiyê de, mirov dibîne ku wa teolojî li wê civaknasiyê ava kirina. Mirov vê yekê her weha kifş dike. Bi vê yekê re, mirov karê wê bêne ser ziman.

Di deme şaristaniyê de, demên piştî demên sumeriyana yên pêşketin û şaristaniyê ji, her weha bi vê yekê ve girêdayî divêt ku mirov bêne ser ziman. Hizre olî, bi vê yekê pêş dikeve. Pergala olî ye ku pêş dikeve, bi Nebî Nuh re, bi têgihîştin û aqil bi pêş dikeve. Bi wê pêşketinê re, mirov karê bêje ku demên pêşketin û demên şaistaniyê ji, dikevîne demeke xwe ye nû de. Hizir, ji wir pêde, ku ji têgihîştineke civaknasî ne dîr û cuda bidest pêşketine xwe ye dîrokî dike. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku êdî pêşketin û demên pêşketinê, bitêgihîştinekê ku dijîn re, di ast û radayaka nû ye din de hebûne xwe didine berdeham kirin. Di destpêka demên piştî demên sumeriyana de deme Nebî Nuh, deme ku mirov pir bihizir û têgihîştin li ser bisekinê ya. Têgihîştin û awayê hizir û aqil yê ku di wê demê de pêşketi ya, hata roje me ji, awayê têgihîştin û pêşketine me kifş dike. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wê pir baş û zelal kifş bike. Lê deme ku mirov li ser deme Nebî Nuh û aqil û têgihîştine wê ye wê demê bisekinê, divêt ku mirov pir baş di derbarê pêşketin û têgihîştine li ber diclê û firatê de xwedî têgihîştin bê. Ev yek ji, weke xalaka pir giring e, tê ber mirov di deme şîrovekirin û anîna ser ziman de. Bi serekê ji bê, ku mirov li ser wê deme bisekinê, divêt ku mirov bê ku wê têgihîştinê wê deme neyêne ser ziman ne buhurê. Ev yek ji, her weha pir girîng e, ku mirov li ser bisekinê. Ji ber ku wê pêşketinê bi têgihîştine di xwe de demên piştî pir mazin kifşkirîya. Nebî Nuh, hizre wî, bi pergal, hebûne di ber diclê û firatê re dide berdeham kirin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov li ser pêşketin û têgihîştin li van herdu deran ji sekin in. Ji ber ku wê di pêşketinên ku bûna de di wê xata pêşketinê ye wî de, wê me bi zanebûn û têgihîştin bike. Bi vê yekê re, her weha ev yek pir girîng e, ku mirov li ser bisekinê. Ji deme sumeriyana û hinekî bi virde, pêşketineke mazin derdikeve hola. Lê ji deme Nebî Nuh pêde, ew pêşketin bitêgihîştin û bi aqil hebûna xwe mazin dide berdeham kirin. Her weha divêt ku mirov vê yekê pir mazin ji kifş bike. Divêt ku mirov pir mazin li ser bisekinê. Ji deme sumeriyana ya pêşî û hata deme Aqadiyana û babilîyan û ji deme wan ji hata deme hûrî û mîtanîyan û piştî ji hata deme Gûfî û Nîriyana, pêşketineke mazin di wê xata pêşketinê de dibe. Ku mirov bahsa xata pêşketinê ye li ber diclê û firatê bike, divêt ku mirov di vê xatê de werêne ser ziman. Ji ber ku xata wê ye pêşketinê her weha ev yekê ya, ku mirov fahm bike. Ji demeke wê xata pêşketinê pêde, êdî derketin û pêşketine şaristaniya misre kevn li ber Nilê dibêt. Piştî derketina wê şaristaniyê re, êdî di demeke kin de pir

mazin pêşketine wê ji dibêt. Nîl, ji vê pêşketinê re dibe hîm û temen. Piştî, ne bi gelekî re, êdî şaristaniyaka pir mazin ku weke zarokaka ku ji singe diya xwe şîr bixwe, ew ji ji pêşketin û têgihîştine li ber diclê û firatê dikişêne nava xwe û pê mazin dibe. Her weha divêt ku mirov vê yekê pir mazin bêne ser ziman. Hata ku dem tê sadsala 20. min(berî zayînê) û hinekî dî ji bi vir de, êdî şaristaniyaka ku bandûrê li dora xwe ji dike diafirê li ber Nîlê bi navê "Misre kevn". Êdî ji vir pêde, mirov karê bêje ku şaristaniyaka di ye bi navê "şaristaniya misre kevn" diafire.

Piştî deme Sumeriyan, demên Aqad û Babiliyan tên. Di demên wan ji li herême bi pêşketinê bi xwe re pêşketineke mazin diafirênin. Demên wan demne, bi pêşketinê bi rê ve çûnê ne. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Piştî deme sumeriyan ye mazin, êdî deme aqad û babiliyan diafirê. Di vê demê de ji, pêşketineke mazin dibe. Bi wê pêşketinê ku dibe re, êdî herême dikeve astaka dî ye pêşketine xwe de. Li herême, pergala hizrî ye ku bi hebûne têgihîştinê olî afirîya ji, êdî bi pêşketine xwe re û pêşketine di xwe de dikeve demeke nû ye xwe de. Hizir, diafirê. Bawerî bitêgihîştin dibe. Nêzikatiyên ku difiri in, yên ku yên bihizir in. Hizir, êdî li jîyanê serwer dibe. Mîrov, li xwe ji, bi bawer e. Bawerî ye ku di olê de pêşketiye, renga xwe dide awayê derketin û pêşketine hizir ji. Bi vê yekê re, pêşketineke hizrî ye ku mirov ji gelek aliyan ve nikarê ji ye olê vaqatêne diafirê. Bi vê yekê re, êdî demeke hizir diafirê. Lê hin bi hin ku pêşketin derdikeve hole û civaknasî ji pêş dikeve, êdî awayê pergala hizir ye ku pêş dikeve derdikeve hole. Civaknasî, di vir de kifşkar dibe. Divêt ku mirov vê yekê jî weke mijaraka hizrî û olî di vir de bi nixêne. Ol ji, li ber diclê di vê demê de di hebûne xwe de civaknasîyaka hizrî diafirêne û bi pêş dixê. Bi wê ji, pir mazin bi pêş dikeve. Bi wê pêşketinê, hebûna xwe têne ser ziman. Civaknasî, divêt ku mirov bêje ku di wê dem de, xwediyê hebûneke ku pir afirîner e. Divêt ku vê yekê pir mazin kifş bike. Weke ku di deme Peleolitikê û neolitikê de çawa ku deronî pir mazin xwedî weyn bû, her weha di deme şaristaniya de bi deronîyê re civaknasî ji derdikeve pêş. Bi vê yekê re, êdî kevneşopî ji diafir in. Mejiyê mirov, di xwe de hinek gotinên ku weke sembol diafirêne. Ew gotin, dibine weke gotinên xalkê ji. Bi vê yekê re, kevneşopî ji, bi civaknasîyê û hizirkirinê binirx bidest pêşketine xwe dike. Hizir, her weha mazin bi pêş dikeve. Mazin bi pêş dikeve. Bi civaknasîyê û deronîyê re hizir di awayê hebûn û pêşketine xwe de pergalaka ku meji wê pir mazin dide jîn kirin diafirêne. Genetike mirov ji wê yekê di xwe de di mirov de bi wate dike. Her weha mazin êdî pêşketineke mazin di mirov de dibe û çêdibe. Hizre dîrokê bi vê yekê re, mazin diafirêne. Bi jîyanê kirinê re diafirê. Hertimî hizir û felsefe dîrokê di xwe de jîn û zînbûnaka jîyanê ye ku hebûne xwe ye hê diafirêne dipareze. Divêt ku mirov vê yekê her weha pir mazin kifş bike. Ev rastî, ne tenê rastiyaka hizir bixwe ya. Rastiyaka mirov bixwe ji ya.

Piştî deme Sumeriyan ye mazin ku ji deme Neolitikê dem teyêde, piştî hin bi hin, ku te deme aqad û babiliyan, êdî pêşketineke mazin ye dîrokî dibe. êdî pêşketineke mazin diafirê. Hata ku dem hatiya deme aqad û babiliyan li ber diclê li cizîre bota Nebî Nuh derketiya û hizireke xwe anîya ser ziman. Wê hizre wê ye ku wî anîya ser ziman, bi pêşketineke mazin di jîyanê de hebûne

Deme ku mirov deme hatina musulmantiyê şîrove bike û bêne ser ziman, divêt ku mirov weke demeke ku nû şîrove bike û bêne ser ziman. Ev yek, wê rast bê. Berî hatina musuêmantiyê, li herêmê, hem bi Sasaniyan re û hem ji bi hinek awayên din re pêşketinek hebû. Serweriya wan hebû. Li nîv girava araba ji, hê serweriyaka ku weke kevneşopî û mîrete ku ji deme misre kevn mabû hebû. Bi wê ji, herêm di astakê de bû. Lê piştî ku Musulmanti hat, êdî li herême bi giştî pergalka olî ye yek-xwûdatiyê ku li ber diclê û firatê bidest pêşketine xwe bi Nebî Nuh û Bîrehim xelîl wan re kiriya serwer dibe. Deme ku mirov her weha lê di meyîzenê, mirov karê bêje ku weke serweriyaka bihizir li herême serwer dibe mirov dibîne. Bi vê yekê re, herême dikeve demeke nû de. Lê tenê herêm dikeve demeke nû de. Dem ji, dikeve demeke nû de. Bi vê yekê re, pêşketinê êdî dibin û diafir in. Li herêmê, hata wê demê, pêşketine ku bûya, ye bi kevneşopî bi Sasaniya re heya. Li herême Xorasanê ji rêveberiya kurdan serdest e. Kurd, ji wir bigire, hata ku digihê herêmên xwe yê din hemûkan, li ser herêmên xwe xwediyê serweriyaka bi kevneşopî û dîrokî ne. Piştî ku musulmanti ji têt, êdî hin bi hin, ku musulmanti di xwe de bahsa hizir û hebûne Nebî Nuh û Bîrehim xelîl û kevneşopîya wan dike, êdî li herême ji tê girtin. Bi vê yekê re, di cih de pêş dikeve. Di nav kurdan de. li başûrê kurdistanê mirovên weke weysel qaranî derdikevin. Ev mirov, mirovekî ku zanist yê ku di deme hz. Muahmmmed bixwe de jîn bûya. Bi mirovên weke wî, musulmanti li kurdistanê ji hin bi hin di kevneşopîyê de cih digirê û piştîre hin bi hin pêş diekve. hata wê demê, li kurdistanê ole ku yek-xwûdayî bû û serwer bû êzîdîti bû. Piştîre gelek mirov di cih de musulman dibin. Bi musulmanbûna wan re, êdî li kurdistanê serweriya musulmantiyê bi pêşketine wê ye li kurdistanê re diafirê. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku musulmanti ji, êdî bûya oleke ku kurdistanî. Her weha mirov karê bêne ser ziman. Li Kurdistanê, pergala olî li ser hîmê

yek-xwûdayî ji berî ve hebû. kevneşopîyeke wê ye pir mazin ji hebû. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bi teybetî cih bide wê kevnbûn û kevneşopîyê wê ye ku hebû ye bi pergala ye ku bi yek-xwûdayî.

Li kurdistanê, dergah hene. Di êzîdîtiyê de dergah hene. Piştî ku musulmanti tê, êdî ew di musulmantiyê de ji cih digir in. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku musulmanti ji gelek aliyan ve, li kurdistanê li ser kevneşopîye êzîdîtiyê di rûnihê. Hata demekê ji xwe pê bi pêş dixê. Li rojhilatê kurdistanê, piştî ku musulmanti tê, hingî, rêveberiya persan hebû. Ew rêveberî êdî piştîku musulmanti tê, êdî wê ji serî bi rêveberiyê erê dike. Ev yek, deme ku dibe, ji gelek aliyan ve, bandûrê li binê wê yanê li xalkê dike. Xalkên ku hene, yên ku pers in, bi erêkirina rêveberiya wan re, ew ji hin bi hin bidest erêkirinê dikin. Kurd ji, wilo dikin û erê dikin. Bi hev re, erê dikin. Lê belê, ji bo ku bi tememî bê erê kirin û musulmanti, bibe oleke ji wir hinek dem bi ser ve çûne divêt. Ji ber ku ev herdû herême (herême kurdan û ye persan) xwediyê hinek kevneşopîyên ku ne dûrî hevdu ne, lê ji aliyê yek xwûdatiyê ve ji, ne dûrî wê hizre ku ji nû ve hatiya ye musulmantiyê ne. Hizre Zerdest û pêşketinê wî, û pêvajoyên ku bi ser pêşketine bi hizre wî re buhurtine di nav kurd û persan de demne weke deme wê deme nû ye ku dihat dabû jîn kirin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku civakên weke civakên kurdan, civakne kevneşopî bûn. Ew kevneşopîye wan, hema wilo di cih de di erêkirine de ji wan re dibû astang. Ji ber vê yekê, ji ber ku di kevneşopîye wan de cih girtina û pê hatina ser ziman, ji bo wê ji wan re dem diviya. Lê her ku bi kevneşopî ban, ji ber ku bi hizir demne pêşketinê yên dîrokî jîn kiribûn, êdî di têgihîştin û fahmkirinê de wilo zêde ku dem bi ser ve ne çûbana wê pêşketineke li gor demê wê di xwe de çêkiriban. Ji xwe, piştî ne bi gelekî ji çê ji kiribûn. Bi vê yekê re, êdî mirov karê bêje ku di cih de êdî di musulmantiyê de cih giri in û mazin dibin tede. Kurd, bixwe û kevneşopîye hertimî bi bawer in. Jê hertimî bi bawer in ku wê zanebûna xwe mazin jîn bikin. Di wê demê de ji ew baweriya wan li wan heya. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku piştî ku musulmantiyê erê dikin êdî piştî ne bi gelekî re, bidest pêşketine xwe ye di musulmantiyê de dikin. Li ser hîmê dergahan kurd bidest pêşketine xwe ye civakî di musulmantiyê de dikin. Piştî ku musulmanti hat û pêşket, li herêmên persan, yên ku pers bûn, pîranyên wan bûna musulman. Lê kurd, wilo ne bûn. Di nav kurdan de, ole êzîdîtiyê ji hebû û ew ji, di hata jîn kirin. Bi vê yekê re, di têgihîştin û hebûna civakê de êdî hin bi hin wê qatbûn derketibana hole. Lê tevî waqasan ji wê pêşketin bûbana û wê bi rê ve çûbûn bûbana. Wê kurdistanê pêşketibana.

Têgihîştinê Kurdistanîyê di wê demê de hebû. Pêşketibû bû. Bi kevneşopî bû. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku êdî ew têgihîştine kurdistanîyê û herêmîyê ye ku li ser hîmê zimên bi pêşketibû, êdî bi hev ve girtin dabû kirin. Bi vê yekê re, kevneşopî bê ku xirabibin li ser lingan mabûbûn. Bi vê yekê, pêşketinê li kurdistanê, wê piştî pêşketineke mazin çê bikin. Bi vê yekê, divêt ku mirov hinekî di vir de, bi kevneşopî û têgihîştine ku bi zimên pêşketiye ji fahm bike. Ev ji, di vir de, wê ji me re bibe deriyekî têgihîştinê li kurdistanê di derbarê pêşketin û pêşveçûnê ku

bûna. Ku mirov di vir de, vê yekê her weh abi kevneşopî fahmnekê, mirov wê di rastiye pêşketinên ku bûn rast û pak fahm neke. Ev yek ji, her weha pir girîng e, ku mirov li ser bisekinê û fahm bike. Bi xosî ji, rojhilatê kurdistanê, di vê demê de, êdî dikeve rewşeke nû de. Rêveberiya Sasaniyan, bi musulmantiyê ve xwe girêdide û wn kevneşopiyên xalkê yê ku hata wê demeê bi deme aqamanîşan û Sasaniyan pêşketibû, dev ji wan dibe û bidest musulmantiyê dike. Lê piştê, ne bi gelekî re, ev yek di wê de ji, dibe sedeme hinek nexweşiyên. Piştê careka din weke ku veqerandina li wan çêdibe. Lê ev yek, bi ji hole rabûna navê Sasaniyê bi ancama dibe. Lê rêveberiyaka herêmf ji dimêne li hole. Kurd ji, li herêmf xwe xwediyê desthiladariya xwe ne. Bi nîrx û kevneşopiyên xwe dijîn. Kevneşopiyên wan ji bo wan pir girîng in. Piştî hatina musulmantiyê re ne bi gelekî re, herêmf rojhilatê kurdistanê ku ne hemû ji bê, dibe musulman. Bi vê yekê re, hin bi hin, rêveberiyekê bi kevneşopî di nav kurdan de ji bi musulmantiyê derdikeve hole û bi pêş dikeve. Mirovên weke Abû muslimê xorasanî, babak û suhrewêrdî derdikevine hole. Ji deme wan bi hinekî re, mirovên ku weke Abû Hanîfê Dînwerî ji derdikevin. Ev mirovne kurd in û bi zanebûna xwe, li gor deme nû hizirne nû yê mazin di afirênin.

Musulmanti, piştî ku hat û pêşket, piştê weke împaratoriya herêmf pêşket. Bi vê yekê, êdî hin bi hin, têngiştine rêveberî di wê de derkete pêş. Bi vê yekê re, di demeke kin de piştî Deme Hz. Muhammed re, Împaratoriya Abasiyan derkete hole û pêşket. Li ser herêmf bi giştî bû xwediyê hêzeke mazin. Li herêmf kurdan ji, bi têtêbetî bakûrê kurdistanê di serî de li ber wê yekê na rabin. Lê li rojhilatê kurdistanê bi Abû muslimê xorasanî re li herêmf wê li ber rabûn dibe. Ebû muslimê xorasanî li herêmf xwe ye xorasanê weke keykê herêmf yê mazin dijî. Weke dewleteke mazin dijî. Bi vê yekê re, ew deme ku çûna ser wî çêdibe, bi hêze xwe re li ber xalîfê abasiyan li berxwedanaka mazin ye dirokî dide nîşandin. Hêzên Abasî, çêdikin û nakin, nikarin ku wî p hêze wê tê bibin. Piştê ne bi gelekî re Xalîfê Abasiyan Musttasîm xabêrê di şêne ji Abû muslimê xorasanî re û jê dibêje ku dixwe de pêre levhatinê bike û aşitiyekê di nava xwe de mohr kin. Abû muslimê xorasanî ji vê yekê erê dike. Li gor aşîriya di navbara wan de, wê serweriya hevdu erêkirin. Lê wê ti kesekî bi zore ye xwe bi yê dî ne dabana erêkirin. ev yek ji weke zagonaka bingihîn bû. Piştî ku her weha xabêr diçê ji Abû muslimê xorasanî re, êdî ew ji bidil erê dike û diçê ku herê dewete xalîfe û lê rûnihê û bi hev re biaxivin. Piştî ku Abû muslimê xorasanî diçê, êdî piştê, ne bi gelekî re, li hevdu dirûnihin û bi hev re diaxivin. Abû muslimê xorasanî, pêre, ji du sê mirovan pêve wilo zêde mirovên wî li hundur nîn in, pêre. Piştî ku bi hev re dirûnihin û şertên hevdu ji ev re dibêjin û weke ku erê dikin ji, piştê xalîfe ji abû muslimê xorasanî re dibêje ku divê ku bi hev re xwarina levhatinê bi hev re bixwûn. Ew ji erê dike. Piştê ku diçine ser xwarinê, êdî piştê, ji piştî perde ku bi hêt ve dalaqadiya ye li pişt abû muslimê xorasanî ve mirov derdikevin û xwe diavêjin ser wan û wan di ser xwarinê de dikujin. Piştî ku xalîfê vê yekê dike, piştê bi hêzeke mazin diçê ser herêmf xorasanê û wanderan û piştê xuruxandinaka mazin dide kirin. Bi vê yekê re, herêmf, êdî têk diçê. Ev rewş li rojhilatê kurdistanê bandûraka mazin dike. Piştê ji ev rewş li wir nayê ji bîr kirin.

Li rojhilatê kurdistanê, ev rewş nêqaşne mazin yê rêveberiyê divekê. Di dergahan de ev nîqaş têne kirin. Piştê ku hinekî di dem tê ve diçê, êdî hin bi hin weke ku li herême bêdengiyek çêdike. Herêma di jiyana xwe de bi kevneşopî û nirxên xwe dijî. Li herêmê, serwerbûnaka mazin ye kurdan heya. Kurd, li ser herêmên xwe bigiştî serwer in. Vê yekê divêt ku mirov bi teybet bêne ser ziman û bêje. Li herêmê Mîr hene. Weke ku di persî de tê gotin "axa" ji hene. Lê kurd, ji wan re ne bêjin axa, ew ji "mîr" in. Herimî mîrîtiye wan heya. Ji bo mîrekî bi deh hezaran mirov karin herine mirinê. Her mîrek, di herême xwe de di nav dore xwe de weke keyekî ya. Her weha jîn dibe. Qasrê wî heya û di qasrê wî de civata wî heya. Bi vê yekê re, her mîrek, mirov karê bêje ku dewletek bi serê xwe ya. Bi vê yekê re, li her derê Kurdistanê rewşeke bi kevneşopî ji bo wan heya. Ji deme Gûtî û naîriyan ve, ew kevneşopîya wan bi têgihîştineke mazin hebûna xwe daya berdewam kirin û pêşketiya. Deme Gûtî û naîriyan, demeke nû ye demên pêşketine mîrîtiyê ne. Pişt wan re, êdî bi nirxne bitêgihîştin ku bi hizir û zimanekî bi têgihîştî têne ser ziman, pêşketin dibêt. Her weha hata wê demê ji, her weha wilo vê yekê berdewam kiriya. Bi vê yekê re, deme ku mirov bahsa mîr bike û bahsa kevneşopîye wê ye dîrokî ku heya nekê wê nebe. Bi teybetî jî deme Medan ve li rojhilatê kurdistanê ew rewş mîrîtiyê ye ku di deme Medan de bi navê "kawa" tiyê ji dihata ser ziman, weke rewşeke pir mazin ye weha hebûna xwe dide berdewam kirin.

Dem, ku tê sadsala 9. min û wan deman, piştê êdî hin bi hin demne nû diafir in. Li gor kevneşopîyê ji nêzikatiye olî ye li gor ole ku ji nû ve afriya diafirê. Bi vê yekê, li herêmê êdî pêşketinên nû rû didin. Rêveberiya persan, di wê demê de hemû dibine musulman, Çend ku kurd bizêdeyî dibine musulman ji, hemû ne musulman in û ev yek, weke qatbûnakê diafirê. Bi vê yekê re, rewşeke nû di nav kurdan de diafirê. Kurd, bi vê yekê re, ne tenê ji aliyê pergala olî ve dikevîne demeke nû de, ji aliyê hebûna xwe ye dîrokî ve ji dikevîne demeke xwe ye nû de. Bi vê yekê re, hinekî nêzikatiyê ku weke kevneşopî û kurdewariyê derxistine pêş biu zimên re, diafir in. Weke riyaka çareseriyê ji vê yekê re, ev yek dibêt. Lê ev yek ji, hata derekê bandûra wê dibêt. Li ber pergala olî ye ku heya, ev yek wilo zêde mazin banûra xwe nadê der. Lê pêş ji dikeve. Di sadsala 9. min de dewleteke kurd ye ku di deme musulmantiyê de ye pêş diafirê. Ew ji dewlete merwaniya. Dewlete merwani, bi vê yekê, ji hinek aliyan ve divêt ku were şîrovekirin. Divêk ku were fahmkirin û têgihîştin. Bi kevneşopî pergala kurdistaniyê derdixê pêş. Bandûra kuştina Abû muslimê xorasanî ji li ser kurdan bûya. Bi vê yekê ji, di nav çîna serek ye kurd de ji, li hinek çareseriyên ji bo lêgerîn derketine hole. Dewlete Merwaniyan, weke dewlete kevneşopî weke ancama wan lêherinên ku di bin derdikeve hole û pêş dikeve. Li kurdistanê bi giştî serwer dibe. Li rojhilat ji, hingî mîrîti heya. Car bi car ji wê mîrîtiyê re, li gor mazin bûn û rêzbûna ji wan re gotina "siltan" ji ji wan re dihata bikar anîn. Bi vê yekê, ew serwer bûn. Li kurdistanê, piştî sadsala 9. min, êdî her weha demeke nû diafirê. Piştî ku dewlete merwaniyan diafirê, êdî ev yek dibe weke ku kurd êdî caraka din vîna xwe hildina dest dibêt. Her weha ji mirov karê bêne ser ziman û şîrove bike. Li rojhilat, ku mirov di wê demê de lê dimeyîzenê, mirov dibîne ku di rewşeke ku pir cuda de ya. Ji deme medan hata wê demê, di rewşeke xwe ye teybet de dijî. Bi vê

yekê hata wê demê ji hebûna dide berdewam kirin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku başûrê kurdistanê ji mirov nikarê ji rojhilat cuda bêne ser ziman. Bi her awayê xwe yê pêşketinê de jê cuda tevnegerihê. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Lê çend ku wilo ji ya, herîme Botanê(herême botan ku başûr rojavayê kurdistanê bi giştî dikira nava xwe de hata dore ber diclê û wanderan ji dikiran nava xwe de, di wê demê de), weke navendeke mazin ye li kurdistanê ya. Di wê demê de li rojhilat ji, herême hekmetenê û kirmaşanê û ku mirov pêre Urmîyê ji binav bike derketibû pêş. Bi vê yekê re, her weha rewşeke pêşketi ji li wanderan ji hebû. Kurd, di rewşe xwe de di jiyana xwe de dijîn. Ku tevî jiyana wan nebûna, ew tevî jiyana ti kesekî ne dibûn. Di wê demê de wilo dijîn. Lê ji sadsala 9. min pêde, êdî pir zêde mudahala li jiyana wan li wan dihatina kirin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku êdî nexweşî rû didan. Piştî sadsala 9. min, jiyana kurdan êdî piştî hatina musulmantiyê ye ku bi pergala olî ye musulmantiyê ye êdîtiyê bûbû du qat, wê qatbûnaka din ji di piştî bûyara hasan-Huseyîn de jîn bike. Ev bûya divêt ku bi serê xwe ser ziman û were têgihîştin.

Bûyara hasan-huseyîn, bi pêşketinên ku piştê bûna re, ku mirov bêne ser ziman, divêt ku mirov bêje ku rastiya herême ye bi kevneşopî di xwe de têne ser ziman. Divêt ku mirov vê bûyarê her weha bi hizir mazin fahm bike. Lê berî ku mirov wê bûyarê bêne ser ziman û şrove bike, divêt ku mirov hinekî li musulmantiyê piştî deme Hz. Muhammed re ku pêşketibû û bi Abasiyan re hebûna xwe da berdewam kirin ji fahm bike. Ev ji wê mirov bigihêne rastîyê herêmê ye ku hene. Ku mirov, li musulmantiyê piştî deme Hz. Muhammed lê dimeyîzenê, mirov ji hîm û temen ve digihê têgihîştine misre kevn ye ku li wê axê bicih bûya. Li ber wê têgihîştinê Hz. Muhammed rabû derket û musulmanti hizre wê afirandin û pê ol da avakirin. Deme Hz. Muhammed dibîne ku wa keçikeye zarok ya ku hê ji nbo bûya wa sax û sax dikina bin axê de, pêş ji wê yekê bi hêr dibe û piştê wê yekê şermazar dike. Li ber wê dirabê. Pêşî wê binaxkirina keçikan şermazar dike. Ew şermazarkirina wî, dibe weke destpêkaka wî ya ku ew pê ole xwe hizrê wê pê diafirêne. Her weha divêt ku mirov bêne ser ziman. Hz. Muhammed, nêzîkatiyaka civakî û wekhev di nav civakê dide nîşandin. Lê piştî wî re, ew nêzîkatiya wî, weke ku ji hole bê rakirin dibêt. Piştê, ew nêzîkatiya ku Hz. Muhammed, ye ku bi binaxkirina keçikan dît û şarmazar kir, birêveberan re bi hebûna "recmê" hata berdewam kirin. Musulmanti, bi vê yekê ji rastiya ku Hz. Muhammed, anîbû ser ziman, weke ku hatibû dîrxistin. Lê ev nêzîkatî, nêzîkatiyaka rêveberî bû. Di deme Hz. Muhammed de, demeke ku jê re mirov bêje "asra siadate" hata jîn kirin. Lê piştî wî re, ew dem bi pevçûnên desthilatdariyê ji hole hata rakirin. Hersê xelîfên pêşî yeên weke Alî û Omar ne bi ecelên xwe çûna ser dilovaniya xwe. Ew hatina kuştin. Bi vê yekê re, mirov divêt ku şerên desthildariyê yên ku piştê rû didin bêne ser ziman.

Piştî kuştina hersê xelîfên mazin yê pêşî re êdî piştê Hasan-Huseyîn ji têne kuştin(şehî). Ev herdû mirov, weke mirovne "ahlê beyt" dihatina ser ziman. Yanî yê ji malbata pêxemberê mazin bixwe bûn. Deme ku ew tên ku herine ser rêveberiya herême Baxdayê, di rê de têne kuştin. Deme

ku ew têne kuştin û ew kuştina tê bihîstin di nav xalkê de, êdî piştê bandûraka wê ya pir mazin li ser xalkê dibêt. Li kurdistanê, bi zêdeyê ji, bandûra wê li rojhilat û başûrê kurdistanê dibêt. Li Kurdistanê, pergala olî bi dergahan bi rê ve diçû. Di dergahan de bi şêxan bi rê ve diçû. Dergah, cihne ku bandûra wan pir mazin bû di nav xalkê de. Şêx ji, divêt ku li vir, mirov çend gotinan li ser bêne ser ziman û bêje. Ew ji mirovekî oldar bû. Mirovekî sereke yê oldar bû. Bandûra wî, pir mazin bû di nav xalkê de. Ew serokê civakê yê olî bû. Mîr ji yê rêveberiya rêzanî bû. Piştî ku xabere kuştina Hasan-Huseyin tê bihîstin, êdî gelek dergah, di cih de xwe weke aligirên wan di denezênin. Bi vê yekê re ew dibine aligirên wan. Êdî li kurdistanê, şitî bidest pêşketine xwe dike. Yên ku pêşentiye wê pêşketinê dikin ji mirovên oldar yên ku li dergahan rûniştine şêxên kurd bixwe bûn. Piştê, ew bi wê pergala mazin ji di afirênin. Hingî, kurd li herêmên xwe serwer bûn. Lê rêveberiya persan ji hebû. Ji deme Sasaniyan rêveberiya wan, hebûna xwe bixanadatiyê dabû berdewam kirin. Hingî, xanadana persana bi navê "sefeviyan" dihata nas in. Piştî ku ev bûyar dibe. Bi dergahên kurd re, ew ji li wê rewş xwedî derdikeve û piştê, ew di nav xwe de wê rewşê bi navê şitîyê pêş dixin. Cihê ku wê hasan-Huseyin çûbanê de baxda ji, ji aliyê wan ve vala ne hata hiştin. Ew der ji, weke navendeka xalifetiye pêşxistin. Kurd, di vir de, diafirandinê de weyneke sereke dileyiz in. Piştê bi banga dergahan, mîr û serokên kurd yên wê herêmê ji, hemû ji, ji aliyê rêzanî ve lê wê rewşê xwedî derdikevin. Bi vê yekê re, êdî mirov karê bêje ku rewşeke nû di afirê. Lê kurd, ji aliyê rêzanî ve nêzîkatiyê wê pêşketine olî ye ku pêşvaniya wê kirin nakin. Piştê, hin bi hin xanadana sefeviyan wê derkeve pêş. Wê weke xanadanaka şîî, wê derkeve pêş. Ev, destpêkê bû û divêt ku mirov vê destpêkê pir rast li gor wê rast fahm bike. Kurd, çend ku di herêmên xwe de xurt in û bi hêz in ji, hêzê mazin ye rêveberiyê ku serweriya herêmê bigiştî dike destê xwe de ava nakin. Lê ji bo avakirinê ji, hertişt bi wan heya. Temenekî wan yê avakirinê pir xurt heya. Mîr û dergahên şêx, wê valatiyê bi hebûna xwe re dikin ku tişî bikin. Kurd, ji xwe bi êmin di warê xwe de jîn dibin. Bi vê yekê, bi mîrîtiyê mirov karê bêje ku pergala konfadaralî li kurdistanê bigiştî avakirina. Herêma başûr û rojhilat ji, çend ku bi hev re ne ji, di hebûne mîrîtiyê xwediyê nêzîkatiyaka konfadaralî ye ku xwediyê kevneşopîyeke dîrokî ye bi hezar salan e, dijîn. Herweha divêt ku mirov êv yekê bi teybet bêne ser ziman. Ku mirov vê yekê her weha fahmnekê, mirov wê wê konfadaraltiya ku Mediyân di deme xwe de di xwe de avakiribûn ji baş fahm nekê.

Li kurdistanê, ku mirov pêşketinê wê demê şîrove bêne ser ziman, divêt ku mirov wê demê bi pêşketinên wê yên rêzanî û olî re baş zanibe. Ev yek, her weha pir girîng e, ku mirov fahm bike. Ji bo ku mirov şîroveyeke rast û pak ji bike, ev yek, pêdivî pê heya. Li kurdistanê, di wê demê de pêşketinê pir mazin hene. Bi zêdeyê ji, deme piştî kuştina Hasan-huseyîn, divêt ku mirov pir baş û qanc fahm bike. Pêşketinên ku piştê diafir in, divêt ku mirov piştê pir baş fahm bike. Ji bo kurdistanê, ev yek, girîngtiye wê, hê maztir a. Kuştina van herdû aliman, wê pêşketinên li kurdistanê piştê bide kifşkirin. Hata ku mirov bêje ku wê di sadsala 16, min de, qatbûna kurdistanê ye di navberê osmaniyan û sefeviyan de ji, hinekî ji aliyekî ve pêve girê bide. Temenê

wê qatbûnê, hê di wê demê de hata avêtin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wê demê bi pêşketinên wê re pir baş û qanc analîz bike û fahm bike û bêne ser ziman. Li kurdistanê, piştî kuştina Hasan-huseyîn re, êdî her weha weke ku me li jor anî ser ziman, di cih de li kurdistanê aligîrên wan dide çê kirin. Bi vê yekê re, di demeke kin de piştî, weke ku oleke nû derkeve li herême dibêt. Her weha mirov karê pêşketinên nû yên wê deme bêne ser ziman. Pêşketinên wê herême yên ku dibin, hemû ji, ji binî ve, aliyên wan yên rêzanî û desthilatdarî pir li pêş e. Bi vê yekê re, weke şerê di nav rêveberan de ji tê berçavan. Lê di aslê xwe de ji wê zêdetir, divêt ku mirov hinekî bi kevneşopîyê û dîrokê herême yê ku pêşketî û nîrxên wê yên ku afirîne re ji şîroveyekê pêve çêke û bêne ser ziman. Ev yek, pêdivî pê heya. Mirov nikarê aliyê desthilatdarî û rêzanî bêje ku nîn e. Ew alî ji heya. Lê belê ne tenê ew alî heya. Aliyên din yên çandî û kevneşopî li pêştir in. Bi vê yekê re divêt ku mirov wan aliyan ji bêne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov wê yekê ji fahm bike, mirov wê fahm bike ku çend ku kurd bi dergah û kevneşopî û pêşketine xwe ye bi têgihîştin pêşengtiyê ji wê pêşketine derketine şîitîyê re dikin û piştî ji aliyê rêzaniya wê ve dernekevîne pêş. Mirov wê wê ji fahm bike. Ev yek, hata nahaka ji xwe ne hatiya ser ziman ji. Li ber çavan ji ne hatiya hiştin. Bi vê yekê re, pêşî, divêt ku em çend gotinan li ser vê yekê bêjin û piştî, gotinê bînine ser wê pêşketine û kevneşopî û têgihîştinê bi kevneşopî ye ku di bingihê pêşketine wê de ya.

Li kurdistanê, piştî ku er weha şîitî ji bicih dibe, êdî piştî hin bi hin pêş dikeve. Rojhilat û başûrê kurdistanê, herêmên ku di cih de şîitî li wan pêş dikeve nîn. Li van herêman, têgihîştineke mazin ye herêmî heya. Berî hingî, ji deme medan ve, pêşketine wê mazin bûya. Di deme Medan de, pêşengtiyê ketibû destê wê herêmê de. herêma Kirmaşanê û Aqbatanê li pêş bûn. Herême nosîcanê ji bi pêşketine xwe pêşengtiyê wê hebû. Haya ku dihata ber zagrosan, ev pêşketin hebû. Li ber zagrosan, ew pêşketin, mazri bû. Li wanderan, ji ber ku temenê jiyandî ji xweza pir mazin bû. Bi vê yekê, li wanderan mazin pêşketin dibû. Di wê herême de ji, ev der li pêş bûn. Piştî ku pergala medan diafirê ji, li wê herême bicih dibe. Piştî Medan re, ji xwe, wê herêmê, êdî weke ku pêşengti ji dest ne berda. Her weha weke ku di pêşengtiyê re di pêşbaziyekê de bê bû. Her weha dihata berçavan. Li herêmê, dem, hata ku tê deme derketina musulmantîyê û ji wê demê ji, hata derketina şîitîyê, pêşketineke kevneşopî ye bi pergala hebû. Li berdîclê û firatê, çî nîrx û kevneşopî pêşketî bûn, li wê herêmê ji, hin bi hin bandûra ya bi têgihîştin dide nîşandin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku pêşketineke mazin ye herêmê hebû. Bi vê yekê re, mirov divêt ku bêje ku piştî ku musulmantî ji tê, ew herêm bi kevneşopîyên xwe dixwezê ku jîn bibe. Bi vê yekê re, hewl danaka ku ole nû ye ku derketiya musulmantîyê li gor wê pêşketine xwe û di nav anîne ser ziman çêdibe. Ev yek, bi ser ji dikeve. Bi vê yekê re, pêşketineke herêmê ye teybet dibêt. Ji ber ku nîrxên ku Hz. Muhammed hizre wan anîna ser ziman weke hizrên musulmantîyê, hîm û temenê wan û pêşketine wan ye dîrokî li wê herêmê û li berdîclê ne. Ji ber vê yekê, fahmkirî, têgihîştin û li gor wê kevneşopîyê xwe ku jîn dikin anîna ser ziman ji zor nabe. Piştî ku demek têve diçê, êdî her weha musulmantîyê herêmê li gor wê nîrxê û kevneşopîyê herême awa istêne û pêş dikeve. Bi

vê yekê re, herê m bi kevneşopîye xwe dîrokî wê pêşketinê jîn dike. Li kurdistanê û herê mên persan, ji ber ku ji deme Medan ve bi hev re jîn bûnak heya, ev bi hev re bûn, dibe hîm ji ji wê pêşketi ku bi hev re jîn bibin. Kurd, hata wê demê, di qasrên xwe yên mîran de mazin in û jîn dikin. Lê weke hêze mazin Piştî deme aqamanîşan û Sasaniyan re, kevneşopîyeke rêzaniyê ye bi statûqû ji bi persan re çêbû ya. Bi vê yekê re, deme ku ew lê xwedî derdikevin, bi wê kevneşopîyê lê xwedî derdikevin. Bi vê yekê re, êdî ew lê xwedî derketina wan, wê têgihîştine olî ye ku bi navê şîftîyê diafirê ji, bi statûqû xwe ye ku afiriya doikina hizre rêveberiya xwe ye dem. Bi vê yekê re, hê di serî de şîftî ji, dibê hizreke rêzanî ye rêveberiyê. Kurd, di dergahên xwe de, bi hizre xwe ye olî dijîn. Ew wilo zêde wî kiresê stqûqûya rêveberiyê li têgihîştine xwe ye rêveberiyê nakin. Bi vê yekê re, ji aliyê têgihîştine felsefî, civaknasî û kevneşopîye dîrokê ve pêşengti di destê wan de dimêne. Lê ji ber ku rêveberî rêzanî desthildariyê wê di destê persan de bû, êdî ji aliyê rêzaniyê(siyasî) wê ji ew pêşengtiyê dihildine destê xwe di demê de. Bi vê yekê re, weke ku hevbeşbûnaka bi xweza di demê de diafirê. Her weha ku mirov li demê û pêşketine wê dimeyîzenê, mirov bi xweza dibîne. Ku mirov di wê demê de têkiliya bi kurdan re yê rêvebera mazin ji lê dimeyîzenê, mirov dibîne ku wa tenê bi dergah şêx û qasr mîr re ya. Her weha tê berçavan. Ji ber ku yên bi nirx, kevneşopî û rêzanî ji kifşkar in ev in.

Bi vê yekê re, deme ku piştî kuştina Hasan- Huseyîn re şîftî tê avakirin, piştî ne bi gelekî re, li ser vê rewşê rêveberî ji bi awa distêne û awa dibe. Li baxda Navende xalifetiye ji awa dibe. Piştî hin bi hin li ser kevneşopîye Sasaniyan xanadana sefeviyan ji pêş dikeve. Li wê statûqûya wê yê demên berî xwedî derdikeve û piştî li gor wê rêveberiya demê ye şîftîyê dixweza awa bike. Bi vê yekê re, weke ku oleke ku tenê li herê me rûdaya şîftîyê li gor demê bi pêş dikexe. Sefevi deme ku derdikevin, bi hêze kurd û persan bi hev re derdikevin. Her rêveberê ku tê ser rêveberiyê soze ji dide ku wê wekhevîyê di nav herdu aliyên de çê ji bike. Bi vê yekê, pêşketineke mazin êdî jîn dike. Piştî ku bi vê yekê re kurd ji piştîgiriyê didinê de, êdî piştî mazin bi pêş dikeve. Kurd, deme ku di serî de sefevî derdikevin, ne li ber wê ne. Ji ber ku kevneşopîye wan ye ku di deme sasaniyan de, sasaniyan esas hildabû bi wek enirxên Zerdest re, êdî piştî piştîgiriyaka mazin didine wan. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku hata derekê, ew rêveberiya ku derdikeve û pêş dikeve weke ye xwe ji dibînin. Li xwedî derdikevin. Lê piştî, ku hin bi hin dem têve diçê, êdî piştî, rêveberên ku tê ser rêveberiyê, dibêjin ku Sasani pers bûn û piştî hin bi hin persîyê bidest pêşxistinê dikin. Bi vê yekê hin bi hin, êdî cudabûn derdikeve holê. Hizrên weke hizrên Zerdest ji, ji ber ku şahîm sasaniyan kiribûn ole xwe ye fermî, êdî piştî, bidest wê ji weke hizreke persîyê tenê anîna ser ziman hata kirin. Zanistên ku bi aslê persbûn yên wek efirdewî ji, destanên ku asil û rengê xwe kurdûn yên weke "rûstemê Zal" ji di nivîsênin. Firdewî ji, deme ku wê destanê di nivîsênin nêzikatiyaka rast dide nişandin û dibêje ku ew destan ye kurdî ya. Dibêje ku rûstem û kurê wî Zal kurd in. vê yekê tînine ser ziman. Lê ev yek ji, piştî piştîguh tê kirin. Ev yek ji, piştî, teneê weke hizreke persîyê tê ser ziman. Bi vê yekê re, deme ku dem tê sadsala 13. min û sadsala 14. min, êdî nexweşiyên ku ji ber nêzikatiyên weha pirtir û zêdetir

dibin. Bi vê yekê re, êdf hin bi hin ew jev cudabûn derdikeve hole. Ji ber ku ji aliyê rêzaniyê desthildariyê ve ew serdest bûn, êdf piştre, hin bi hin wê hêze ku di destê wan de ye desthildariyê bidest bikaranîna li ser kurdan dikin. Ku dem tê sadsala 14 min û wan ji, êdf kurd, pir mazin li ber vê yekê nexweşiya xwe ténine ser ziman û bidest lli ber wê rêveberiyê rabûnê dikin. Li herêmên kurdan yên weke "Şivanê" şahên sefeviyê yên weke Mohammed Hudebendî ji bidest komkujiyên li hevberê kurdan dikin. Bi deh hezaran kurdan dikujin. Li ber vê yekê, piştre ne tenê li herême şivanê, li aqbatanê, kirmanşanê, Hewramanê û hwd raperînen kurdan dest pê dikin li ber desthilatdariya sefeviyan ye ku pêşketibû.

Piştî derketine şitîiyê re, demeke mazin rêveberiya sefeviyan bi şitîiyê re jîn kirinan. Herêma Baxdayê ji bi wan re girêdayî ya. Ya rastî ku mirov bêje temenê pêşketine xanadana sefeviyan wilo mazin biqasî împaratoriyeke nebû. Lê wê rewşê şitîiyê ku afirandibû, piştre wan mazin dikir. Her şahê ku hata serê xanadanê, xwe di asta xelifeyekî olî de anî ser ziman. Bi vê yekê re, bandûra wan, ne tenê li ser persan tenê çêbû, li ser xalkên din ji çêbû, Hingî, li herêmên weke Baû wanderan, aşîrên tirkmenan ji hinek hatîbûn û wan ji musulmanti erêkiribû û pêre ji şitî ji hinek ji wan erêkiribûn, bi vê yekê re, ew ji hem ji ewlkariya xwe û hem ji ji bo ku cih bistênin û xwe bicih bikin, li cem şahê sefevî cih digir in. Bi vê yekê re, hêzeke mazin ye di dest de diafirê. Lê dem ku hata ku sadsala 13. min û 14. min, êdf kurd, ji ber ku ji nêzikatiyên şahên sefeviyan nexweş dibin, êdf gelek ji wan, têkiliya xwe ji qasra mazin ye wan qut dikin. Bi vê yekê re, bi serê xwe bûnaka wan çêbûya. Lê nêzikatiya olî ye ku şahan bi xwe re dianî ser ziman û xwe weke şah ji dianîna ser ziman, di nav xalkê de di serê mirovan hinek dibendi ji didanan çêkirin. Li ber mirovên ku serokên olî bûn rabûn ji, rast ne dihata dîtin. Bi vê yekê re, li cihne di nav dergahên kurdan yên olî bixwe de ji dubendî afîri bû. Bi vê yekê re, rewşeke ku kurd bi xwe ji li ser li hev nekin di nav wan bixwe de diafirê. Li dergahan ev rewş heya. Lê li qasran rewş, weke ku hinekî dî safiya. Qasr bi gotina mîr dikin û mîr, dixwezî ku bi serê xwe bikin. Bi vê yekê re, ji qasra mazin cudabûna wan dibêt. Bi serê xwe dijîn. Rewşên ku weke rewşên li Şivanê bûna hê piştre li gelek deverên yên kurdan dibin. Bi vê yekê re, êdf piştre hin bi hin ne tenê jev qutbûnak dibêt. Dij-hevdûbûnak ji dibêt. Lê bi wê rewşê ku bi şitîiyê re afîriya, rêveberiya sefeviyan ji aliyê rêzanî(siyasî) ve pir baş bikar anî ya. Wê xwe pê mazin kiri ya. Bi vê yekê re, miro vkarê bêje ku dem hata ku tê sadsala 14. min mirov nikarê tenê bêje ku rêveberiyaka şîi afîriya. Mirovkarê bêje ku împaratoriya şîi afîriya. Ev împaratorî ji, diaxwê ku çi hêz û herêm li dore wê hebin bike bindestê xwe de. Piştî sadsala 14. min û wan pêde, ku her weha li ber kurdan ji, sekinandin dibêrt, êdf bi kurdan ketina wan ye şer dibêt. Kurdan, ji deme Medan ve, bi konfadarêlî jîn dibin. Hê hêzekê wan ye mazin ku wilo mazin li ser herêmên wan hemûkan serwer bibe ne afîriya. Li bakûrê kurdistanê bi Merwaniyan re, rewşeke wilo afîriya, Wê ji, deme ku berê xwe daya rojhilat û başûrê kurdistanê, ew nêzikatiya konfadaralî daya nişandin. Bi mîran re levkiriya û serweriya xwe li wan daya erêkirin. Piştre, derketina Salahadîne Eyûbî, hinekî rewşê dike rewşeke kurdistanîyê de. Ew împaratoriya ava dike. Weke Deme merwaniyan, dewleteke mazin ava

bûbû. Ji dewlete hemdem ye roje me, çî hatibana xwestin weke ku di wê de ji hebûn. Hata ku şahên(key) wê diravên xwe ji yên ku di pergala xwe bi kar dianîn çêkiribûn. Bi vê yekê re, rewşeke mazin afiri bû. Lê cudatîyak hebû ku bi temenî kurdên bakûr, rojhilat û başûr hemûkan bike ye. Ew ji, ew qatbûna di musulmantîyê ye mazin ye ku bi şîftîyê re afiribû, bêhtirî bandûra xwe di nav kurdan de di hatina wan ye li cem hevdû de dide nîşandin. Aliyê şî, çend ku pîrsgirêkên wan bi qasra maizn re çêbûban ji, wilo zêde di nêzîkatîya xwe de jev cuda ne dibûn. Bi vê yekê re, aliyê din yê bakûr ji, her weha di nêzîkatîya olî de bû. Lê her çend ku çand, ziman û kevneşopîye wan, ne dihişt ku li ber hevdû bisekin in ji, wê rewşê ji, ne dihişt ku bi tememî pergala xwe ye kurdistanî ji mazin ji xwe re ava bikin.

Rewşê kurdistanê bi vê yekê, hata sadsala 14. min û 15. min têt. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku di vê demê de ji, împaratoriya mazin li rojhilatê kurdistanê ji ava bûya. Xanadaniya sefeviyan mazin bûya. Wê bi wê kevneşopîye xwe ye ku di deme Sasaniyan de jîn kiribû, ew rewş baş bi kar anî bû. Bi vê yekê re, mazin bûbû. Împaratoriya derketibû hole. Hin bi hin çanda wê ji derdikete hole. Bi vê çandê li ser serê herême ji, serdestiya xwe ava dikir. Li aliyê din ji ji deme Împaratoriya Abasiyan ve, rewşeke ku mirov weke xatakê hildê dest û bêne hebû. Ew xat ji, divêt ku bi serê xwe were şîrove kirin. Pêivî bi vê yekê ji heya. Ku mirov li Abasiyan dimeyîzenê, mirov dibîne ku ji aliyê nêzîkatîya xwe ye statûqûtîyê ve ji ya deme misre kevne ne cuda xwediyê nêzîkatîyê ya. Lê belê ji ber ku musulmantîyê çanda berdîclê û berfiratê di xwe de anî ser ziman, êdî wê ji, berê xwe dabûbû wê û ew dianî ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku bi nêzîkatîya misre kevn pêşketin û têgihîştinên deme nû di xwe de hewldide ku bêne ser ziman. Bi vê yekê ji, hinekî pêş ji dikeve. Demeke dirêj ji pêş dikeve. Ji ber vê yekê bû ku bakûrê kurdistanê piştî wilqasî nexweşî û ne başî di navbera wan de rû dabûn ji, hê bi hev re dimeşîn. Di deme Dewlete merwaniyan de, şahên serê dewlete merwaniyan û xelîfên Abasiyan bi hev re di têkiliyeke xurt ye bi hev re de bûn. Pir caran ji, xelîfe şahên dewlete kurd ye merwaniyan dewetî xasre xwe dikir û ew weke xelîfê dide pêşwazîkirin. Vê rewşê ji, ew li cem hevdûbûn di parast. Bi vê yekê re, rewşek hebû. Piştî dewlete merwaniyan ji, piştî ku Salahadînê Eyûbî ji hatibû, wî ji nêzîkatîya xwe bi Abasiyan re parastibû, Lê zêde wilo dernexistibû pêş ji. Salahadînê Eyûbî, hinek xalatiyên wan ji di dîtî. Li ber wan ji, di sekinî Kuştina wezîr Sawar ji, mirov karê bi vê yekê her weha bêne ser ziman. Lê Salahadînê Eyûbî, di nêzîkatîya xwe de bû. Wî nêzîkatîyaka ku bi çanda xwe dabûbû nîşandin. Bi vê yekê re, wî pêşketineke xwe jîn kiribû. Di deme wî de, ew ji nêzîkî qasre abasiyan zêdetir ew bixwe bû. Ji ber vê yekê, mirov nikarê wilo zêde bêje ku Salahadînê Eyûbî ji li vî cih girti an ji li cem yê in cih girti ya. Wî bixwe li cem xwe û nêzîkatîya xwe ye xalkê cih girtibû. Wî musulmantîyaka ku li gor wê çanda li ber dîclê û firatê hebû, jîn dikir. Wî ew çand fahm dikir û jîn dikir. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wî û nêzîkatîya wî hinek bi teybet fahm bike û bêne ser ziman. Bi vê yekê re wê hingê rast û pak ew were têgihîştin û ser ziman.

Salahadinê Eyûbî, ji dêla ku nêzîkatiya abasiyan bi serweriya wan re li herême botanê wanderan derxe pêş, wî ya xwe derxistibû pêş. Bi vê yekê re, ew mazin bû. Ew bi kevneşopî bû. Wî, pêşketin û têgihîştine xwe bi çanda botanê mazin kiribû. Pê mazin bûbû. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wî fahm bike û bêne ser ziman. Wî di deme xwe de pergalka mazin ye herêmfî ava kir. Çanda berdiclê û firatê, her weha ew mazin kir. Di bingihê wê mazinbûna wî bixwe de ji bû. Di deme Merwanîyan de, mirov karê bêje ku pergalka kurdistanî afiribû bû. Piştî, di deme Salahadinê Eyûbî de, ew rewş berdeham bû. Salahadinê Eyûbî, demeke mazin ye nû li kurdistanê dide didest pê kirin. Ya rastî ne tenê li kurdistanê li herême bi giştî her weha dide dest pê kirin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wî mazin bêne ser ziman. Hata ku tê deme wî, li rojhilat û başûrê kurdistanê ji, pêşketineke mazin hin bi hin sefeviyan re dibe. Di deme wî de, hê wilo zêde kurd û pers di deme sefevîyê de ne ketine ber hevdu de. Lê hin bi hin, ku rêveberiyê sefeviyan mazin dibe û bihêz dibe, wê rewşê xwe ye ku heya bi kevneşopî dike û tene ser ziman, êdî hin bi hin, nêzîkatiya xwe dide nişandin. Nêzîkatiya wê ji, persîtiya. Bi vê yekê re, hin bi hin, weke ku ji olîtiyê re ji, derdikeve. Bi vê yekê re, şîitî ji, hin bi hin di herême de bi vê yekê re, dibe weke hizre bîrdozî ye wê rêveberiyê. Lê di wê demê de, hê rêveberiya sefeviyan, nikarê bê kurdan wê pêşketine şîitîyê bide berdeham kirin. Hê ji pêdivîya wê bi wan heya. Kurd, bi dergah û rewşên xwe yê kevneşopî, karin pir hesanî wî pêşketinê bi rêve bibin. Bi vê yekê re, êdî girîngiyê dergah û miran derdikeve pêş. Yê ku wê kevneşopî ji bi rê ve ji bibin ew bixwe ne. Ji wan pêve ti kesekê din nikarê wê bi rê ve bibe. Her weha ew rewş ji heya. Bi vê yekê re ew li pêş in. Rêveberiya sefeviyan, hata wê demê ji, bê ku bi kurdan bi şewirê, ti tiştêkî nake ku nadê kirin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku rewşêke pir baş heya. Rewş wilo tê xuyakirin. Lê dem ku tê sadsala 13. min, êdî hin bi hin, ku rêveberiya sefeviyan bi rewş dibe û êdî ku bawerîya wê lê tê ku wê karibe ku xwe bi rê ve bibe bi wê pêşketinê, êdî bidest avakirina desthialtdariya xwe dike li ser herêman. Yê ku li ber wê di sekin in ji, bi wan re dikeve şeran de. Kurd, di wê demê ji, xurt in. Bi serê xwe dijîn. Wilo zêde çûna ser wan nabe. Ku çûna ser herêmekê bûbana, herêmen din ji di rabûna ser xwe di cih de. Bi vê yekê re, ji hevdu heybûnaka wan ji hebû.

Li ku dem tê sadsala 14. min, êdî mirov karê bêje ku êdî rêveberiyaka sefeviyan ye ku mirov karê bêje ku êdî bi ber împaratoriye ve diçe ava dibe. Bi vê yekê re, her weha tê berçavan. Ev bûn ji, êdî wê hin bi hin, bibe destpêka pîrgirêkan. Wê êdî çûna wan ye li ser kurdan ji bibe. Wê li wê nirxê şîitîyê bi wê rêveberiya ku bi hêz bûya weke deme Sasaniyan ku çawa ku li Zerdestiyê xwedî derketin bû, wê di wê demê de ji wilo bûbana. Heman nêzîkati lê li gor demê ku hatibû afirandin, tê nişandin. Kurd, çaraka din, ji wê nirxê kevneşopîyê ku pêşxistibûn, hatibûn dîrkirin. Ew zorî jîyanaka di bindestiya wê kevneşopîya bi nirxê ya ku wan bixwe pêşxistibû de jînkirinê dikin. Her weha rewşek diafirê. Kurd, li ber wê dirabin. Piştî ku rêveberî pêş dikeve, êdî pêş tiştê ku dike ji, ew ê, ku xelîfetiye baxdayê ye ku hatibû avakirin rewşê wê bikine destê xwe de. Dikine destê xwe de ji. Bi vê yekê re, êdî hin bi hin, kurd, weke ku li navberê bibênin li wan têt. Ew, weke xalkekî kuu di bindest de dijîn tene mahkum kirin. Lê kurd vê yekê erê nakin. Li ber vê

yekê di rabin. Di sadsala 15. min de, êdf hin bi hin herêmê hêzeke df di afirê, Ew ji, hêze osmaniyan e. Hêze osmaniyan, bi alikariya kurdên bakûrê kurdistanê li ser lingan e. Osmaniyan ku di serê tebrîzê de têne ber ji dfrokê windabûnê, bidestê Îdrîsê belîsî tê xilaskirin. Bi vê yekê re, êdf ku ew ji têne xilaskirin. Êf piştre bi alikariyê kurdên balûrê kurdistanê li ser gelek herêmên din yên rojhilat ji serweriya xwe didênin. Bi vê yekê re, hin bi hin mazin bûn dibe. Li başûr rewşek ku mirov ji ya wan çuda bêne ser ziman hebû. Şîftî hebû. Pişti ku osmani, mazin dibin. êdf piştre bi çûna ser baxda û hinek deverên weke li herêmên başûrê kurdistanê weke Musil û kerkûkê ji, êdf dibêt. Bi vê yekê re, êdf li herêmê, rewşeke nû ya desthidatdariyê diafirê. Kurdên bakûr zan dikin ku Osmani bi wan re ne û wê bi hev re bimeşin. Her weha baweriya wan ji heya. Lê wê piştre tenê bi wê baweriya xwe ye bi bi xwe re bi tenê bimênin. Wê piştre osmani ji, ku serweriya xwe li ser serê herêman ava kir, êdf piştre, wê berê xwe bide wan û wê bidest ji hêzkirina wan bike. Di deme Siltanê osmani Yavuz Selim de Bi Îdrîsê Bedlîsî re peymanan li hev kirinê û hevbeşkirinê bi hev re bi rê ve birikine tê mohrkirin. Lê pişti wî re, deme ku qanûnî siltan suleyman tê ser serê dewlete osmanî bi fermanekî wê peymanan ku yavuz selim bi Idrişî Bedlîsî re mohrkiriya ji hole di rakê. Bi rakirinê re ji nemêne. Piştre artişekê ji herêmên ku kirina bindest xwe de ava dike, weke artişa "devşirme" û piştre diçê ser herêmên kurdan û bi hezaran kurdên ku serdestiya wî erênakin di şûr de derbas dike.

Ew rewş, rewşeke nû ya li kurdistanê. Li rojhilatê kurdistanê ji her whea rewşeke ji wê rewşê nû cudatir nîn e. Li wir ji, çûna ser kurdan heya. Ji ber vê yekê, li wir ji rapêrînên kurdan hene. Lê çend ku ev rewş heya, û çend ku bingehê ku kurd di nav xwe de hêzeke mazin ava bikin û li ser axên xwe bi hev re di aştîyê de jîn bikin hebe ji, bi peymanan ku Îdrîsî bedlîsî bi osmaniyan re mohrkiribû re, ev yek ji hole di rabe. Kurd, bi wê peymanê hêzeke wan ye mazin dikeve destê osmaniyan de. Bi wan re gavên xwe diavêjin. Bi vê yekê re, qatbûnak çêdibe. Rojhilat ji, bi serê xwe ye li ber rêveberiya sefeviyan. Ew ji, li wir li ber xwe dide, Li wir ji, hinek herêmên kurdan bi aşîr, bi şahê sefeviyan re gavên xwe diavêjin. Bi vê yekê re, li wir ji, rewşek ku mirov bi heman aawayê bêne ser ziman diafirê. Li wir ji, weke aliyê bakûrê kurdistanê hinek herêm weke herêmên Şivan û Hewraman ku ti demê dev ji li berxwedanê naberdin, di wê demê de ji li ber xwe didin û piştre çêna ser wan ye şahên sefeviyan yên weke Mohammed Xudabendî dibêt. Bi çûna ser wan re, bi hezaran mirov li wir ji di şûr de têne derbas kirin. Bi vê yekê re, kurdistan, mirov karê bêje ku cih bi cih ji aliyê hêzên mazin ve di şûr de tê derbas kirin. Yên ku li cem wan cihê xwe digirin, weke ku ji bo demeke serê xwe ji ber şûr xilas dikin. Lê ew xilaskirin ji, hata ku ew ji bo wan şerkirine xwe berdeham bikin dibêt. Bi derketina osmaniyan û bihêzbûna wan ye li herêma re, êdf rewşeke nû diafirê. Ew, li musulmantiye ku ne şîf ya xwedî derdikevin û dixwezî ku serweriya wê bikine destê xwe de. Yavuz selim, ji ber vê yekê, di keve sefere bidestkirina "şûrê zelifetiyê" de. Bi vê yekê re li herêmê, êdf weke ku du hêz hene û herdû hêz ji musulman in û yek şîf ya û yê din ji sînnî ya. Her weha tê berçavan. Hata demekê, ev hêz bi dev ji bi gotinê dixwezî ku bandûra hevdû bişikênin. Ji ber vê yekê, dev avêtina wan ya hevdû dibêt. Bi wê dev avêtinê re,

êdî ev herdû mezhebên musulman, weke du olên jev cuda dikevine ber hevdu. Bi rêveberiya sefeviyan re statûqûyaka mazin ye herêmfî ye statûqûperez afiriya. Ew çanda ku ji deme Medan ve li herême pêşketiya dixwezîn ku tede bînine ser ziman. Zanistên ku weke Firdewsî ku di nav kurdan de mazin bûna ji, wê çandê di nivîsênin û tînine ser ziman. Bi wê anîna ye ser ziman re ji, weke ku geşbûnak bi kurdan re ji dibêt. Lê piştî, her nivîsandina wan, ku di statûqûtiyê de tê bicih kirin û bi navê rêvebere ku heya ye sefevî tê ser ziman, êdî piştî, tenê navek pê tê ser ziman. Ew ji persitiya. Bi vê yekê re, êdî hin bi hin, aliyê kurd weke ku tê herê dibe û aliyê din yê pers ji, ku kevneşopîya wan ji di nav de xwe pê mazin dike û rewşê xwe diafirêne. Her weha rewşêke nû ye din diafirê.

Şîfî û sûnnîti, her weha hata ku tê sadsala 15. min, êdî piştî dikeve rewşêke nû de. Lê kurdistan pêre ketiya rewşêke nû de. Ew ji weke ku bi xweza bûya du qat. Qatek li aliyê rêveberiya şîfî maya û aliyê din ji yê bakûr ji li aliyê din yê sûnnî maya. Ev rewş, bi hêze hêzên mazin yên weke osmaniyan û sefeviyan ji, bi serdestiya wan ye li ser herêman kur afiriya. Lê ew dijberiya herdû împaratoriyan ya ku tene "şerê çardiranê", ev rewş berdewam dike. Di serê çardiranê yê di navabîna yavuz selim û şah îsmail de, herdû hêzên mazin dikievine şer de û osmani bi piştigiriya kurdên ku bi wan re ne, bi ser dikevin di şer de. Bi serketina wan re, êdî herêmên weke başûrê kurdistanê û hinek herêmên din ji rêveberiya wan dikeve destê osmaniyan de. Lê hinek herêm, hingî ji, di destê sefeviyan de dimênin. Piştî şerê çardiranê, êdî peymanan "qasrê şêrîn" tê mohrkirin. Bi wê peymanê, ew rewşê qatbûnê tê fermî kirin. Bi fermenê re di dîrokê re çara yemeîn kurdistan dibe du qat. di naqabîna rêveberiya sefeviyan û osmaniyan de. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew rewşê ku piştî kuştina Hasan-Huseyin re, ye ku aliyê kurdistanê şîfî ya û aliyê din ne şîfî ya, her weha li kurdsitanê bi wê peymanê û bi wan rêveberiyên dibe sedeme qatbûna kurdistanê di dîrokê de. Di vir de, divêt ku em hinekî li ser vê xalê bisekin in, ji bo ku baş û qanc were fahm kirin. Mirov, divêt ku bêje ku şîfî, bi hizre xwe re, bi awayê ku sefevî wê bi karê tînin, her weha ew qatbûn dibe. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ew, wê rewşê baş bi têngiştineke herêmfî bi kar tînin. Hasan-Huseyin bixwe ji, deme ku tene herêmê, berî ku werine kuştin(şehitkirin), dixwezîn ku bi dergêhên herêmê yên kurdan re têngiliyaka xurt dênin. Bi hinekan re têngiliyên wan hene ji. Berî ku werin, xaberê ji rêveberne kurd re disênin û piştigiriyê dixwezîn, Kurd ji wê yekê erê dikin. Ew, hinek manayan ji derhên kurd re dişênin. Ew namanyên wan û rastiya wan namayan, ku ne hatibina windakirin, hê ji divêt ku veşartî di destê rêveberiya herêmê ye ku hata î ro ji serdest in de ne.

Kurdistan, piştî wê peymanê êdî dikeve rewşêke nû de. Li aliyekî wê (aliyê yê şîfî), hertiştê êdî bi navê şîfîyê tê ser ziman. Dîrok ji wilo tê ser ziman. Hizir û raman yên ku hene wilo tene sr ziman. Bi vê yekê re, rewşê persitiyê bi ye şîfîyê re weke ku bikine yek dibêt. Her weha, dibêt. Li ber şahê pers rabûn, weke ku li ber "rêveberiya olî ye şîfî" rabûn bibe tê hesabandin. Bi vê yekê re, di nav xalkê de ji, rewşêk hatiya afirandin. Bi vê rewşê re, êdî mirov karê bêje ku pêşketinên ku

dibin, ji wê demê pêde cuda dibin. Li herêmê, piştî peymanê qasrê şêrîn re, êdî ku kurd ji fahm bikin ku rewşê wan hatiya xirakirin, êdî bidest li ber rêveberiya sefeviyan rabûna xwe dikin û bidest şer dikin. Lê şerên ku bûna, ji wan zêdetir bandûra xwe li kurdan û herêmên wan kirina. Herêmên hêzên mazin ji li herêmên wan bûna. Şerê çardiranê ji, li kurdistanê li herême çardiranê dibêt. Her weha divêt ku mirov bêne ser ziman. Weke ku şerê malazgîrê yên ku di naqabîna hêzên romeo dîyojên û tê gotin ku di naqabîna "Alpaslan" de dibê ji, ne ji rêveberiya kurdan ye herêmê ye Merwaniyan bana, wê ti çari qizînc ne kiriban. Hingî şahê dewlet Merwaniyan Abdilqasim Nizamedin Dewlê, ku ne bi saya serê wê bana, wê ew şer bi serneketibana. Deme ku Romeo dîyojên dikeve pey tirkan de ku wan ji anatolia derxe û wan hata bi kurdistanê tenê ku ku romeo dîyojên bi hêze xwe dikeve nava axa dewlete merwaniyan de, êdî merwani ji, ku xelîfê Abasiyan ji pişgiriye dide wan, pêre dikevine şer de û wî li malazgîrê tê dibin û Romeo dîyojên ji dil(esîr) digirin. Selçûqî berî hingî ji, hinek êrişên wan li kurdistanê bûbûn. Êrişê herî mazin ye wan ye Siltanê Selçûqîyan yê kurê Melik şah Sancar bû. Siltan Sancar, deme ku tê û li ber kurdan bi kurdan re dikeve şer de, hingî, dibêje ku "ev kurdistanî çî şervanne mazin in". Ev gotina wê di dîrokê de ji cih girtiya.

Piştî vê demê û peymanê re, rewşeke nû ye din li kurdistanê diafirê. Kurdistan ,êdî wilo ne bixwe ya û ev rewş ji kurdan pir diêşene. Ji ber vê yekê, şerên wan yên ku ji bo rewşê xwe bînine sêberê dibin. Lê şerên wan yên ku dibin ji, êdî wilo zêde bandûrê li rewşê nakin. Ji bilî wê, ew şerên ku dikin, bêhtir hêze wan kêmtir dike. Bêhtir rewşê wan nexweş dike. Li kurdistanê, li rojhilat, êdî piştî, rewşê nû diafirê. Piştî ku rêveberiya sefeviyan tê diçê, Êdî ku başûrê kurdistanê ji dinav de gelek herêm dikevine bin desthilatdariya osmaniyan de. Osmani, piştî wî şerî re, li herêmê dibine hêzeke mazin ye herêmî. Her çend u ne ji herêmê ji bin, piştî wî şerî û alikariya kurdan re dibine herêmî. Rêveberiya sefeviyan, piştî kêmtir dibêt. Piştî tenê weke rêveberiyaka herêmî dimêne. Lê bi kurdan re, pers xwediyê kevneşopîyêke pir mazin ye dîrokî ne. Bi vê yekê re, çend ku tê diçin ji, diçe bi wê kevneşopîyê rabûna xwe û xwe parastin ji dibêt. Bi vê yekê, êdî hebûna xwe prastin dibêt. Li kurdistanê ji, ku bi vê yekê ve girêdayî mirov gotinê bêje, mirov karê weha bêne ser ziman û bêje. Kurd ji, xwediyê kevneşopîyêke xwe ye dîrokî ne. Piştî waqasê êriş û çûnên li ser wan ji, hê ji karin xwe rakina ser pîyan û bi rê ve herên. Hinek sedemên vê yên dîrok yên ku bi wan re hene, divêt ku mirov bibîne û bêne ser ziman. Ziman û kevneşopîyê wan ku di wan de bi civaknasiyaka xurt bi têgihîştin û felsefê bûya ji, wan di parêzê. Li aliyê sefeviyan ji, her weha mirov karê vê yekê bêne ser ziman Sefevî, weke persan, dî dîrokê de hertimî weke zarokê ku ji singe dayîka xwe şîr bixwe ji çand û kevneşopîyê kurdan hildana. Zimanê fers bixwe ji, weke zaravayakê kurdî ya.

Li herême, piştî sadsala 14, min û bi vir de, êdî piştî demeke nû diafirê. Ew dem, bi şerê ku li çardiranê di nava hêzên osmaniyan û yê sefeviyan bûyîye re ji, dikeve demeke xwe ye nû de. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku demeke nû ye ku kurd êdî dijîn. Kurd, ku mirov demên wan yên

piştî vê demê re bêne ser ziman, êdî mirov wê bibîne ku bi wan rêveberên ku statûyên ku di xwe de afirandin re, kurd, li ber kurdan diskin in. Kurd, piştê ji, hebûna xwe bi rêzaniya xwe ye herêmi di dine berdewam kirin. Hê ji, hêze wan li herêmên wan dibê. Hê ji mîr û şêxên wan yên ku di qasr û dergehên xwe de pir xurt bihêzên hene. Ew ji, bi wê yekê kevneşopîye de didine meşandin. Lê weke berê êdî wilo zêde li herêmên xwe ne serwer in. Li her herêmê ji, hêzeke mazin ye ku ser serê wan serwer e û serdestiya wê heya, li hole ya. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Piştî, şerê çardiranê ji, rewşe kurdên rojhilat, dikeve rewşeke ne baş de. Tişte ku şah mohammed xudebendî anî serê Şivaniyan, piştê hata serê herêmên yên kurdan yên din ji. vê yekê ji, mirov divêt ku bi teybetî bêne ser ziman û bêje. Piştê, kurd, li ber wê rewşê di nav xwe de li çareseriyên digerihi. Di deme destpêka derketine xanadana sefeviyan biderketinê de, bi kurdan re levkirinaka wan heya. Bi kurdan re levdikin. Ku bi kurdan re lev ne kiriban, bê guman, mirov karê bêje ku wê mazin pêşketineke mazin ye împaratorî ne bana. Ji aliyê çand, kevneşopî û felsefê ve, kurd bingihê wê diafirênin. Çawa ku li aliyê osmaniyan, her weha biginehekî çandî, kevneşopî û hizrî kurd ji wan re diafirênin, her weha li aliyê sefeviyan ji wilo ya. Kurd, bi vê yekê, ji binî ve kifşkar in. Divêt ku mirov vê yekê bi teybet ji bo wan bêne ser ziman. Lê navê wan nîn e. Lê herkirina ku dikin ji û her afirandina ku diafirênin ji, bi navê wan di dîrokê de cih nagirê. Bi navê yên ku li ser serê wan serdest in û xwedi desthilatdar in, cih digire. Her weha divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Divêt ku mirov vê yekê ji, weke mijaraka bi serê xwe hildê dest û şiroveyekê li ser bike. Kurd, ji bo xwe, divêt ku vê yekê bikin. Ji bo ku fêrekê ji dîroke xwe derxin, divêt ku vê yekê bikin. Ev yek ji, weke deynekî wan yê li wan bi xwe bi xwe ya.

Piştî şerê çardiranê, piştî ku peyman qasrê şêrîn hata mohrkin, êdî piştê, şînorê dewlete sefvî ji hatina kifşkirin. Di nav wan şînoran de, hherême kurdan ye rojhilatê kurdistanê hebû. Rêveberiya osmaniyan, herême başûrê kurdistanê di peymanê de, weke "wileyeteke" xwe dabû kifşkirin. Ji ber ku wê baxda dixwest. baxda, weke demekê weke herême xelifê hatibû kifşkirin. Wê dixwest ku bibe xwediyê wê ji. Dewlete Osmaniyan, bûna xwediyê cihên "pîroz", weke temenekî ji rêvebertiya xwe re di dît. Ji ber vê yekê bû ku Yavuz Selim ketibû pey "şûrê xelife"tiyê de. Serefên di deme wê de hata bi ber misre û wê bixwe ji, ji ber vê yekê bixwe bûn. Herême Îskenderiye bixwe ji bi rewşeke weha nêzikati lê dihata kirin, çûna ser wê bûbû. Bûna xwediyê cih i tiştên weha, bixwe re bawerimediyeke li yê ku bûna xwedi dianî. Bi vê yekê re, êdî bi wê baweriyê, yê ku bûna xwedi, karibûn ku mirovan ji bo xwe û serdestiye xwe û desthilatdartiye bidine şerkirin. Li kurdistanê, ne li rojhilat û ne ji li başûr û bakûr, rêveberan bi dergah û qasrên mîran re di têkiliyên de bûn. Ev mirovne ku bi kevneşopî bûn. Li cem wan cih girtina wan, wê wan li herêmê mazin bi hêzkiribana. "Herêmê bahdînanê" ku başûrê kurdistanê ku hema bêja hemûk dikire nava xwe de, mirê wê weke dewlet dijî. Piştî serê Çardiranê ji, ji xwe, serdestiya mazin ye osmaniyan erê dikin û ew weke "hikumet" têne erêkirin û ew ji wilo rewşe xwe didine berdewam kiirn. Li herêmên bakûr ji herême botanê pir mazin û girîng bû ji bo kurdan.

Piştî wê demê re wê kurd, pergale xwe yê giştî wê serwerîya xwe li ser wê winda bikin. Ola, êzîdîtîyê, di aslê xwe de, têkçûna wê, têkçûneka mazin ye civakî û dîrokî û hate ku mirov karê bêje ku bi têgihîştinî di xwe de bi xwe re dihê ser ziman. Pergale civakî e Êzîdîtîyê, bi hezr salan, bû xwediyê pêşketinekê bi dîrokê re. Di pêşketine wê ye bi dîrokê re teherîyeka bê navber hebû. Qûtbûn nebû. Hate ku sadsalên 8. min û 9. min ên piştî zayînê. Wê di wê demê de, ew qûtbûn bibe. Kurd, wê asta kevneşopîya xwe ye ku bi rêzanî lê lev digihîştina hevdû, bi wê re wê winda bikin. Wê piştîrê jî, ew kevneşopî bimêne. Lê êzîdîtî, ku bin dikeve, êdî ew pergaliya wê, weke bi navê ji holê di rabê. Piştîrê jî, wê bê jîn kirin. Lê li herêman hin herêma bûna wan e musulman û hin herêma weke xwe man jî, wê qatbûna pergaliê bi awayekî di bêne holê. Ew rewş, wê di nêzîkatî û kevneşopîyan de pir mazin bike zorê de jî. Kurdan, piştîrê gelek herêmen din ên wan, tenê weke ku ew bi wê qatbûnê re jêv dîr nekevin, bi wê nêhtê di buhurina musulmanetiye. Bi vê yekê re, di demeka kin de parranîti wê bidest bê xistin. Lê wê, serwerîtiya kevneşopîyê ji ber ji holê rabûna hin awayên wê, wê ne weke berê bê. Di deme Musulmanetiye de, Deme kurdî û kevneşopîya wê ye serwerîyê, demên Şadadîyan, Merwerîniyan û Eyûbîyan e. Kurdan, bi wê re serwerî li herêmen xwe bi dest xistin. Lê berê hingî, serwerîya zanebûnê û têgihîştinê jî ji gelek aliyan ve di destê wan de bû. Wê ev jî bêne windakirin. Farqê serwerîya wê demê berî musulmanetiye û ya piştî musulmanetiye, her weha ku ye berî musulmanetiye rengê wê kurd bû. Lê ye piştî musulmanetiye, bi navê musulmanetiye pîrr gelemperî pêre tede hebû. Ji xwe, hate wê demê pir nivîs û nivîsarên ku ji demên berî musulmanetiye ên ku di deme êzîdîtîyê de bûn û ji ber ku ew tede dihate ser ziman, ji holê bi şawitandinê hatina rakirin. Bi vê yekê re jî, weke ku têkçûneka bû. Her mîriên kurdan ên ku ji bo wan dihate vegotin ku "her yekê xwediyê pirtûkxaneyekê bû di qasra xwe de û ew pertûkxane wî jî bi deh hezaran pirtûk tede bicih bûn. Î ro di roje me de, di destê me de yek jî ji wan pirtûkên ku di nav xalkê de bahs dihê kirin di destê me de nîn e. Ku mirov, di nav kurdan de dirûnihê, mirov ji vegotinên wan yên ku ji dev dihêne vegotin ên di derbarê wê cihane wan ye demê berê de, mirov wan bahskirinên di derbarê weqas pirtûkan ji ku bidil dihê bahskirin his dike. Di qasrekê de pirtûkxaneyak tişî pirtûk, ji rûmetiyeka

mîr û mazinbûna wî dihate pirsîn. Bi vê yekê, bahs dihate kirin. Tenê, di ‘Çîrokên Keçelok’ de ew mîrên kurdan ên ku qasrên wan ji zanebûnê têrbûn ku bahse wan dihê kirin, di vegotinê de, hertimî li gotinên bizane û têgihîştin dihate lêgerîn. Ew rewş, hemû ji holê hatina rakirin? Di rastiyê de, ku mirov li wan xosletên wan yên ku bi kevnepîşî û zanebûn û ku pir dihêne vegotin, ku li wan dimeyîzêne, mirov di vê yekê de, hinekî di fahmkirinê de dikeve zorê de. Ji bo fahmkirina wê jî, pêşketinên dirokî êmn ku bûna li Kurdistanê ên van demên dawiyê, wê hinekî me bi rohnî bikin. Emê hinekî dî bi wê awayê jîyanê wê bînina ser ziman û bînina hate roje me.

Ji sadsalên 15. min û pê de, pêşketinên ku derdikevin ên li Kurdistanê ji du aliyên ve di vir de mirov karê wan bêne ser ziman û li ser bisekinê. Aliyê pêşî, bi tîkçûna serwerîya wan ye giştî re destpêkirina pêvajoyeka nû e bi wan re ya. Aliyê dîn jî, ew e ku çend ku her weha ew serwerbûn windadibê jî, wê rêveberîya wan ye herêmfî e li herêmên wan wê ji destê wan dernekeve û di destê wan de bê. Herêmfî bi herêmfî, bi mîrî û her weha aşîrî, wê ew rêveberîya wan heyîna xwe berdewam bike. Ew serwerîya giştî e wan ye ku wînda bû jî, wê cihê wê bi kevnepîşîya wan were tiştkirin. Ew wê, bêhtîrî kevnepîşîyên xwe derxina li pêş û wê pê wê valahîya ku bi tîkçûna wan e ji aliyê wê serwerîya wan ye giştî ve, wê bi wê levgirtina wan e bi wê kevnepîşîyê re wê hewl bê dayîn ku bê tişî kirin. Bi têgihîştin û civatî, ew têgihîştina wan, di nav wan de dimêne. Lê bi şênberî bi rêveberî jî ji holê dirabê. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku kurd, wê êdî bi wê kevnepîşîyê bijîn. Valahîyên wan yên di jiyane wan de, wê bi rêveberîya wan ye kevnepîşî ye di nav wan de wê were tiştkirin û bûn.

Ku mirov bahse vê demê bike, mirov çend ku gotinan bi têgihîştinî di derbarê zanebûna wan de jî, ne hêne ser ziman, wê di hanîna li ser ziman kêmbûn bibe. Ji ber vê yekê, emê hinekî li ser wê jî bisekin in. Li jor, me hinekî hanî li ser ziman. Me bahse xwenûkirinê kir e di vê demê de. Mirovên weke Mele hisêne Batê derdikevin. Hizra wan ye ku dihê li ser ziman, wê hem ancama pêşketineka wan ye ku hebe û hem jî wê bê temenê pêşketineka bi wan re e dirokî. Mirov karê vê yekê ji her weha bi teybet bêne ser ziman. Di wê demê de, Feqiyê Teyran û Meleyê Cizîrî jî derdikevin. Ew jî, hizirna wan ên ku di deme xwe de pir mazin li ser pêşketine demê ye di nav xalkê de bi bandûr in dibin. Bi Teybetî Meleyê Cizîrî, mirovekî ku di roje me de jî jî pir baş ne hatîya fahmkirin. Mirovekî ku hizra wî û bi teybetî jî felsefe wî ne hatîya dahûrkirin û fahmkirin. Meleyê Cizîrî, divêt ku hizrên wî, bi pêşketine demê re bi têgihîştinên di xwe de werin fahmkirin. Di wê demê de, wî bi hizrên xwe yên ku hanîn li ser ziman, çî xwest ku bêne ser ziman? Di aslê xwe de, ev pirs, di çerçova hizra wî û fahmkirina wê de, hê li bendî bersivdayîna xwe ya.

Meleyê Cizîrî, em, deme ku di nav xalkê de dirûnîhin û li gotin û vegotinên di derbarê wî hizrên wî de ku dihêne vegotin ku li wan dihisêne, mirov fahm dike ku ew çendî li ser heyîna û pêşketina civatîyê sekinîya û xwestiya ku hin têgihîştinna di derbarê wê û pêşketina wê ye demê de bide çêkirin. Meleyê Cizîrî, hizrên wî pir hene. Ew bi teybetî, li ser felsefe û Metafizîka wê pir mazin xwediyê têgihîştineka pir kur e. Ew di wê de, bi têgihîştin dayîmî pêde dihê û fahmkirin û zanîna xwe mazin dike. Wî bi teybetê, mirov karê bêje ku deme xwe û pêşketina wê fahmkirîya. Mirov karê, vê yekê bi teybet ji bo wî bêne ser ziman. Di nav xalkê de jî, bawerîyeka pir mazin li wî hizrên wî heya. Li Cizîrê û li dora, gotineka weha ji bo ku bawerîya li wî werfîna li ser ziman dihê vegotin. Ew gotin jî, weha ya. Piştî ku ew diçê ser dilovanîya xwe, êdî ji bo wî ev gotin dihê vegotin. Dihê vegotin, ku ”deme ku jinek hevîrê xwe hevîrt û meyand û piştê ku hevîrê wê meyît, ku herê û wî hevîrê xwe bi rastkê û bi kevîrên berserê wî ve bi pahê, wê bi birajîtinê wê nanê wê çêbibê.” Ev gotin, bi awayekî bawerî, ji bo wî dihê vegotin. Lê deme ku dihê vegotin, ji bo ku bizanebûn wî û têgihîştina wî jî bînina li ser ziman û bêjin ku çendî ew bizanebûna jî, dihê vegotin. Di vir de bawerî û bawermendî jî, mirov karê gotinekê li ser bêne ser ziman. ”Bawerî, di

zanebûnê de kurbûn” dihate hasibandin û her weha dihate ser ziman. Çendî, ku dizanebûnê de kurbûn hebe, bi wê dihate ser ziman. Ev, awayekî teybet, ê ku pê dihate hizirkirin û di zanebûnê de kurbûn pê dihate kirin bû. Li Cizîrê, ku ji bo mirovên oldar, ku weke awayekî ku pê oldarîya xwe xurt bikin û têde kur herin, mezêlên ku tenê ji bo hizirkirinê hatibûn afirandin. Di wan de, mirov dirûnişt û bi kêlikan dihizirî û di serê xwe de diçû. Ev awa û heyîn awayê pêşketinê, tişteki dide mirov bitêgihîştin. Ew jî, her weha êdî bûna serwerîya têgihîştina hizirî ya weke ku li her qadê pêş dikeve di bawerîyê de jî dihê dîtin.

Di deme Meleyê Cizîrî de, ku hê ew li jîyanê ya, Feqiyê Teyran derdikeve. Ew jî, bizanebûn û aqilê xwe re ne kêmi Meleyê Cizîrî ya. Di rîya wî de dimeşe. Ji aliyê zanebûnê ve, ew jî, weke Meleyê Cizîrî yekî ku deme xwe bi zanebûna ye bi xwe re buhurandîya. Ew zanistê wê, deme aqil û pêşketine têgihîştina wê ye têde ya. Bi wê re, mirov karê wî jî bêne ser ziman. Feqiyê Teyran, wê têgihîştina dîrokî bi xwe re çêbike. Têgihîştina civatî, e ku Meleyê Cizîrî hanî li ser ziman û kir û xwest ku mirov wê bibîne û fahm bike, Feqiyê Teyran bû zanistê wê têgihîştine di wê demê de. Wî zanebûneka mazin di xwe de da rûnandin. Mirov, deme ku bahse wî bike, divê ku mirov, weke mirovekî ku bi têgihîştina xwe re deme xwe buhurandîya wî bêne ser ziman.

Feqiyê Teyran, di aslê xwe de zanistê demeka ku di wê demê de piştî Meleyê Cizîrî re ku ji nû ve dest pê kirîya ya. Mirov, bi vê yekê, karê bi wî re demekê bêne ser ziman. Ew, bi têgihîştina xwe re, di nav civate kurd de, bû xwediyê heyîn û hebûna têgihîştinê e demê e pirr pêşketî di wê demê de. Li ser hîmê civatîyê pêşketin, di wê demê de bi awayekî têgihîştinî dest pê dike. Hin bi hin, civat derdikevina holê. Wê piştê ne bi gelekî re, civat bi civaktiyên xalkan re û bi pêşketinên wan yê di vê qadê de wê werfina holê û li berçav. Di wê demê de, di nav kurdan de jî, mirov dibîne ku li gor demê hizirkirin û afirandinê dest pê kirîya. Hizirên Feqiyê Teyran, wê pêşketine ku bi Meleyê Cizîrî re heyîna wê pirr mazin xwe dabû dest pê kirin, wê hê bêhtir bi pêşve bibin. Ev jî, di aslê xwe de, pêşketineka demî ye pir mazin dihêne holê. Ahmedê Xanê wê piştê derkeve û were holê. Ahmedê xanê, weke zanistekî kurd ê wê deme pêşketinê ku bi Meleyê Cizîrî û Feqiyê Teyran re dest pê kirîya ya. Ew zanistê wê demê ya. Bi têgihîştina wê demê nû re xwe afirandîya. Di hanîna li ser ziman de, ew pir bi zanebûn tevdiagerihê. Di derbarê dîrok û kevneşopiyên xwe yê ku hene de, ew xwediyê zanebûneka pir mazin e. Ew, pir mazin li pêşketina civakî dihizirê. Di nivîsandîna wî ye ”Mem û Zînê” û her weha ”Nûbara biçûkan” de, mirov wê hizirkirina wî dibîne. Ne tenê hizirên ku di wan de dihêne li ser ziman de, ji xaynî wê, weke ”Nûbara biçûkan” temenê ku wî xwestiyê jêre binivîsîne jî, di vir de di wê nivîsandîna wî de li berçav e. Nûbara Biçûkan, wî ji bo biçûkan nivîsandîya. Ji xaynî Mem û Zînê û Nûbara Biçûkan, Aqîda îmanê jî wî nivîsandîya.

Di vê çerçova de, ku mirov li wê demê û hizirkirin û awayê hizirkirinê wê dihizirê, mirov dibîne û kifş dike ku têgihîştin di awayekî civatî û civakî de ya. Bi vê yekê re, li gor afirandin dihê kirin û li holê. Ev dem, demeka ku ji bo kurdan, demeka ku mirov karê bêje ku ne tenê ji vê aliyê ve ye destpêkê ya. Ji aliyê, baxtewerîya Kurdistanê de jî, demeka ku pir giring û destpêk e. Kurdên ku hate wê demê dîrok bi xwe re hanîna, di wê demê de, ji dîrokê bidest ketinê dikin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku serwerîya wan ye ku ji destê wan çûya, wê êdî jî vê demê pêde, bi pirsgerêkan re wê were ber wan. Piştî Şerê Çaldiranê, Kurdistan ji xwe bi peymanê Qasrî şêrîna dibê duqat. Sînorê wê qatbûnê, berî hingî jî deme şerê Kerbeleyê ve hatîya destpêkirin. Ew dem û ew qatbûna Kurdistanê, li ser wê temenê dihê rûnandin. Mezhebbûna, ku bi şîitîyê re pêşketîya, piştî ku bû hizir û awa ji rêveberîya Sefevîyan re, êdî bi hêz bû û serwerî herêmê bû. Aliyên din jî, ên ku ne şîî bûn, ew jî, bi heyîna xwe re pêş dikevin. Lê di aslê xwe de, ku mirov awayê Musulmanetiye li Kurdistanê bi gotinekê jî bê bêne ser ziman, mirov wê bibîne ku ji şîitîya û sînnîtiya li nav araban zêdetir ’Şafîitî’ di nav kurdan de bi awayekî ku bi kevneşopîya wan re hati

afirandin hebû. Di girêdanê de, guharandinên dervî girêdanên geleri ên kevneşopî ti girêdanên din di nav kurdan de ne bûn. Cil û berkên wan hebûn. Kurdan, ew awayê xwe dabû ola xwe ya ku dijîn jî. Di aslê xwe de, di awayên din ên olî de jî, kifşkirina awayê girêdanê nebûn. Lê piştî van deman re, wê ew bê kifşkirin. Piştî ku dihê kifşkirin, bi rêveberîyan wê li ser herêm xalkê bê ferz kirin. Hate sadsalên 18. min û 19. min jî, wê ew kifşkirin, newê Kurdistanê. Lê piştî, wê hin bi hin bi destê desthilatdariyên serdest re wê pêşî ev kifşkirin di olê de bê bicihkirin û piştî wê li ser mirov wê bê ferz kirin. Lê li Kurdistanê, wê ev zêde cih negirê. Ji ber ku kurd, bi kevneşopîya xwe re xwediyê serwerîyeka xwe ye di vê awayê de na û bawerîya xwe ji dil û zanebûnê dizanîn in.

Li Kurdistanê, ev demên ku hene, pêşketin û pêşveçûnên di wan de, wê demên piştî jî bi hîm bikin. Kurd, di demên piştî hertimî, ku piştî her xuruxandin û têkçûnan rabûna wan ye li ser xwe, ew deynî wê kevneşopîya xwe ya ku di nav xwe de di parastin bûn. Mirov, divêt ku di vir de, bi vê yekê giringîya wê kevneşopîya wan bêne ser ziman. Di deme piştî şerê Çardiranê de jî, deme ku peyman di naqabîna Îdrîsî bedlîsî û siltanê Osmanîyan de dihê mohrkirin, hingî jî, tiştî ku kurd didina pêş û dixwezî "ku mudahale li awayê jîyane wan û kevneşopîyên wan nebin in". Vê yekê, di wê demê de didina pêş. Ji ber ku wan giringî didina wan kevneşopîyên xwe di her demê de. Ew giringî bû, ku wan ji bo kevneşopîyên wan yên ku wan ji bo xwe weke rûmet diditin, di şanda mirinê jî. Di nav kurdan de, hertimî mijareka ku li ser dihate axiftin û dihate vegotin hebû. Ew jî, her weha her kurdekî ku ji bo mîrê xwe diçû mirinê bi dilxweşî. Ew bidilxweşî, çûna wan ye mirinê, mirov nikarê wê tenê bi girêdaneka wan ye li wan mîrên wan bêne ser ziman. Ji wê zêdetir, bi wê kevneşopîyê ve girêdayî bû. Di wê girêdane bi mîrî ve, mirov nikarê ji zanebûnekê jî dîr bêne ser ziman. Mirov, nikarê wê girêdanê bê kevneşopî jî bêne ser ziman û her weha fahm jî bike. Di vir de, ye herî giring di vir de ev e, ku mirov wê di vir de baş û qanc fahm bike. Ku mirov wan kevneşopîyên wan yên ku hebûna, têgihîştina wan baş fahm nekê, mirov wê vê rewşê jî her weha baş û qanc fahm nekê. Kevneşopî, di vir de nirxeka ku mirov wê baş û qanc fahm bike ya.

Kurdan, ku li kevneşopîyên xwe dimeyîzandin, sê tişt bi heyîn û hebûna xwe re têde di dîtin. Yek, rûmetî û mazinbûn bû. Ye düyemîn, dîrok û pêşketin û her weha pêşveçûnên ku têde bûbûn bûn. Ye sêyemîn jî, her weha şaxsîyeta wan bû. Di vê çerçovê de, bi wan re bi kevneşopîyên wan re, têgihîştineka wan ye civatî hebû. Ew têgihîştina wan ye civatî têgihîştina wan ye ku civakî bû. Civaktîya wan, di vir de, bi kevneşopî, ku di dîrokê de bi ber roje me ve bi awayekî peresendîf hatinakê di xatekê dihêne berçav bi nirxî. Dem, ku dihê sadsalên 18. min û 19. min, kurd, ew serwerbûna wan ye ku bi rêzanî û ramyarî ku ji destê wan çûya û windakirina, cihê wê hate demekê jî bi vê kevneşopîtiya xwe re di dagirin. Lê wê, ev yek, wilo zêde berdeyam nekê. Rêzanîti ku hate windakirin, sekn di tevger, xûy û hûnerên mirov re de di jîyanê de dihê holê. Bi vê yekê re, li gor wê xweşdîliya di kevneşopîyê de jîn, wê hin bi hin ji holê rabê. Di vir de, mirov divêt ku bêje ku rêzanîti, temenekî wê ye ku bi kevneşopîyan re di kevneşopîyan de ku li gor deme kirina wan û afirandina wan dihê holê. Bi vê yekê re, aliyekî rêveberîyê ye rêzanîyê heya.

Di dîrokê de wê di deman re ev kevneşopî jî, heyîna xwe bi parezê. Di demên ku hewldanên êzîdîti ji holê bê rakirin, Ew jî dihê qadaxakirin. Lê kurdan, ew kevneşopîya wê, di malên xwe de dana berdeyam kirin û gihandina hate vê roje me. Piştî, ew kevneşopîya ku civatîyek li Kurdistanê afirand û piştî kete malan de ji bi qadaxakirina wê ye li jîyanê re, wê piştî jî malan derkeve û pir mazin wê pêşketina bi xwe re bide berdeyam kirin. Sadsalên 15. min û piştî, êdf wê bidest derketina wê ye ji malan bike. Di sadsala 19. min û 20 min de, wê bi tememî derkeve derve û serwerîyeka kurdî wê bi wê re were holê. Demên sadsalên 19. min û 20. min, demne ku mirov wan bi teybetî bi serê xwe bêne ser ziman in. Hate ku demên dîrokê ên bi kurdan re dihêne

vê demê, wê pir raperîn û serhildanên wan yê nê dîrokî wê bibin. Sadsale 17. min, 18. min û 19. min, bitavahî dibina demne raperîn û serhildanê li Kurdistanê.

Di aslê xwe de, wê di sadsala 20'an de, şer û pevçûnên di nav kurdan û hêzên li wan serdest in, wê dijwartir bibe. Di vê demê de, wê Kurdistanê, di bin serdestiyê de bê qatkirin li çar qatan. Bi vê yekê re, wê demeka nû li Kurdistanê bide dest pê kirin. Lê wê ti carî kurd jî, vê yekê herê nekin. Wê li ber wê hertimî di şerekî de bin. Hewldanên hêzên ku di xwezî serdestî û serwerîya xwe li herê mê çêbikin, wê kurd, bi wê tekoşîna xwe ye ku dixwezî bigihîna azadîya xwe, wê bikevina ber wan de. Ev jî serî hate binî, wê şerekî di jîyanê de bi wan re bêne. Ji deme Sefevîyan ve ku hate ku hatîya wê demê li aliyên Kurdistanê ên ku ew serdestbûna, wê bi kurdan re bi keve şertiyekê de. Kurdan, jî herdû aliyan ve rastî bêbaxîyê hatina. Ew bêbaxîya li wan, wê hate vê demê jî berdewam bike.

Dîroka li rojhilatê Kurdistanê e bi hêze sefevîyan re, wê hin bi hin bê ye şer. Ji xwe, ji deme sadsala 15. min pêde, bûya û dest pê kirîya. Dem bi dem, hate ku dihê vê demê, wê bidîna demên şer ên ku kurd û desthilatîya dest bi hev re dikin in. Li aliyê bakûr û aliyê din ên vê dorê jî, bi osmanîyan re, mirov karê bêje ku xwediye pêşketinê dîrokî ên ku mirov ji wê awayê dîr neyêne ser ziman in. Ji heman dema, ku di naqabîna Îdrîsî Bedlîsî û siltanê Osmanîya Yavuz Selîm de peyman hate mohrkirin û piştre bi çar û an jî pênc salan ku jî aliyê Qanûnî siltan Suleymân ve bi fermanekê peyman jî holê hate rakirin pêde, wê heman pêvajoyê, bi heman awayê bê jîn kirin. Ew qatbûna pêşî, e ku jî deme Şerê Kerbeleyê ve bûya jî, pirr kur bûya. Ji aliyê olî û rêzanî û ramyarîya wê ve jî awa û şekl standîya. Bi vê yekê re, pîrsgirêka Kurdistanê, êdî hin bi hin kurtir dibê. Di aslê xwe de, şerê li Çaldîranê, li ser dijberîya li ser vê temenê li berhevduhîyê e olî û hewldane serdestî û serwerîya ye bi desthilatî ku bi hev re digihê hevdu re pêş dikeve û dibê. Di vir de, Aliyê beşa dîroka Kurdistanê ji deme derketin û bûn û berdewambûna Muselmanetiyê û dîrokê wê, ku hate ku digihê wê deme şerê çardîranê, divêt ku mirov bi serê xwe weke mijareka teybet hildê dest û wê fahm bike û bidahûrkirin û şîrovekirina ku pêşketinên dîroka olê jî ne dîr ku di nav werîna ser ziman, divêt ku mirov li ser bi tewihê û lê binerê û her weha bêne ser ziman. Ku mirov, tenê bêne ser ziman û bêje ku Kurdistanê ku di şerê li Çardîranê e di naqabîna hêzên sefevîyan û Osmanîyan de bû, di ancama têkçûna hêzekî û serketina hêzekî de ku peyman di nav wan de hate mohrkirin û ew hate qatkirin, mirov weha bêne ser ziman, mirov wê ne fahmkirina bi dîrokê re ya bi xwe re jî bide ser rû. Pêşketinên dîroka olî, wê piştî derketina Muselmanetiyê, pirr bêhtir wê dîroka Kurdistanê bi xwe re di nav xwe de bidîna kifşkirin. Kurdan, jî wê demê pêde, ew pîrozîya ku hate wê demê di destê wan de bû û bi wan pêş diket, wê êdî wê jî dest wînda bikin. Ew jî, wê pêşketinên piştre yê nê bi wan re bide kifşkirin. Ji binî ve, hêjî serdest in. Lê bi gelemperî, di rêveberîya mazin de, hin bi hin weke ku hatina dîrkirin. Ji sadsalên 12. min û bi vir de pêde, wê li herê mê bi rêveberîyan re persîfî, arabîfî û osmanîfî derkeve pêş û wê di bin navê olê de xwe bide berdewam kirin. Bi vê yekê re, wê pîrozîyê bi kar bînin. Kurd jî, wê dîroka wan ye bi xalkîfîyê ye civatîfîyê wê heyîn û hebûna xwe berdewam bike. Ji wê demê pêde, ji aliyê herdû hêzên serdest e sefevîyan û Osmanîyan, ku çendî herdû, li herê mên kurdistanê li cihên ku serdest in ku pişta xwe didîna kurdan û kurd pişta wan digirin jî, wê kurd rastî bêbaxîyê ya jî aliyê wan ve werin.

Divê ku em jî şerê çardîranê û pê de, êdî hin bi hin gotina "pîrsgirêka kurd" bilêv bikin û werênina ser ziman. Pîrsgirêka kurd, ku mirov jî kîjan aliyê ve lê binerê, xwediye dîrokekê ya. Lê bi teybetî, ku di cihane me ya hemdem de, û di çerçova zihniyeta wê de em hewl bidin ku pîrsgirêka kurd hildîna li dest, divê ku em 'şerê çardîranê' weke destpêkeka dirîng hildîna li dest. Bi vê yekê re, divê ku mirov bibêje ku ew ser 500 salî re ya pîrsgirêka kurd boya bîrîneka ku

hertimî di wê birînê de xwûna kurdan dirjijê û ankû dihê rijandin.

Temenê wê destpêka wê gotina 'pirsgirêka kurd', ku ji dema 'şerê çardiranê' ku em didina destpêke kirin jî, hinekî din jî bi şûn ve diçê. Lê weke destpêkaka giring, hertimî ku miorv ji kîjan aliyê lê dinerê, destpêka şerê çardiranê dihê ber me û berbîra me. Berî şerê çardiranê, di nava ola îslamiyetê de jî şerên navxweyî ên desthilatdariyê rû didin. Minaq, şerê kerbelayê ya ji wan şeran a ku temenê dûqatbûna kurdistanê di dema şerê çardiranê de bi peymanê "qasrî-şêrîn" dide kirin. Şerê kerbelayê, bandûra herî zêde li vê herêmê û ankû li kurdistanê û li jîyane kurdan dibêt. Hasan û huseyîn, du mirovên "ahlî-beyt" bûn. Berî ku werina herêmê, têkiliyên wan bi dergêhên kurdan ên olî re hena. Dergêhên kurdan jî, di nava civatê de bandûra wan ya ku em î ro dizanên bêhtira. Ji aliyê civaknasî, hizrî û perwerdekirina civatê ve ew dergah xwediyê weyn û rolaka giring in. Lê piştî Hasan û huseyîn hatina li herêmê û li herêmê ku hatina qatil kirin, piştê wan dergêhên kurdan pêşî li wan xwedî derketin. Di aslê xwe de, yekî ku hinekî jî dîrokê bizanibê û piçekî jî dîroka olê bizanibê, wê fahm bike û bizanibê ku ew xwedîderketina dergêhên kurdan bûya temenê afirîna mezhebê "şîî" bixwe jî. Piştî ku Mezhebê 'şîî' derket û pêşket, piştê bi teybetî li herêmê û bi teybetî di nava kurdan û persan de bicih bû. Bi wê yekê re, di aslê xwe de, bi wê mezhebîtyê re di serî de jîyana kurdan di nava mezhebê 'şîî' û 'yê 'sûnnî' de bû duqat. Mezhebê 'sûnnî', 'şafîî' û hwd, nêzî hevdu bûn. Di wê demê de, wusa bi awayekî vekirî ku nakokî heban jî, ew nakokî jî, ne hatibûbûna wê astê ku bi hev re tevnegerihin.

Kurd, bixwe jî, di nava wan de herî zêde 'şafîîtî' pêşketiya. Herî zêde bandûra 'şafîîtîyê' herî zêde di nava kurdan de xwe da dîyar kirin. Awayê 'şafîîtîyê' ê ku kurd dijîn jî, di temenê çand û ramanê de û baweriyê de bû. Bi hev re jîyîn û dijberî li hevdu nekirin, bi wê re hebû. Jîyane kurdan jî, dema ku mirov lê dihizirê, di nava wê de ji Êzîdîtyê bigira, heta ku digihijê hersanîtî, manîtî, mezdekîtî û hwd pêşketina. Berî wan jî Mîtratî û Zerdûstîtyê pêşketiya û temenê van pêşketinan jî ji gelek avayan ve afirandiya.

Dema heta ku dihê dema şerê çardiranê, wê li ser afirîna mezhebê şîîtyê re wê du cihan wê biafirin. Bi teybetî, beşeka giring ji başûrê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê, wê aligirên şîîtyê bin. Lê beşên din jî, wê bi şafîîtîyê re sûnnîtî wê li pêş bê. Lê dîsa, ew ev di nava wan nebê temenê jêvcûdabûnê. Lê piştî ku bi desthilatdarî pêşketin bû, piştê jî, wê hin bi hin ew pêşketin bibe. Yê ku wê şîîtyê jî barî desthilatdariyê bikin û bikina hizreka olî ya desthilatdariyê bê, wê malbatên kurd ên weke malbata Şah Îsmail û hwd bin. Piştî ku ew desthilatdarîbûn bû, piştê li ser wê desthilatdariyê şer û pevçûn wê bibin. Kurd, wê piştê ji desthilatdariya şîîtyê wê bi şerê çardiranê re werina derxistin. Wê piştî vî şerê çardiranê, wê bandûra malbat û keyesetên kurd di desthilatdariyê de wê mazin hebe. Lê ji ber ku ew mezheb jî nikarê bê kurdan hebûna xwe bide domandin û bijî, êdî nikarê bê wan jî bijî. Bi wê yekê, piştê, kurd, çend ji serî ve desthilatdariyê ji dest diravênin û winda dikin jî, wê ji binî ve xwediyê wê bandûr û kifşkarîya mazin bin. Ew rewş, wê piştê bikeve rengê kevneşopîyekê de. Êdî kurd, piştî şerê çardiranê ku bandûra wan hin bi hin kêr dibêe, wê êdî ji binî ve bandûra xwe bidina domandin.

Heta wê dema şerê çardiranê jî, kurd, ne tenê li welatê li kurdistanê, her wusa li cihanê

îslamiyetê jî bandûr û kifşkarîya wan pîrr li pêş a. Mirovên weke Salahadinê Eyûbî û hwd, bandûra wan pîrr mazin a. Piştî Salahadin re, wê mirovên weke Salahadin ku bi aslê xwe kurd in, ên weke Şah Îsmail û hwd wê derkevin. Bandûra wan mazin a jî. Malbate Îsmail, ji ber ku malbateka ku di nava kurdan de weke malbate "şêx" tê nasîn, bandûra wê mazin a.

Heta dema Şerê Çardiranê jî, ew bandûra kurdan didomê. Lê di şerê çardiranê de xelatîya kurdan ya dîrokî ew a ku di nava wan de bûyîna wan ya dûqat û di temenê wê dûqatîyê de aliyek bi osmaniyan re ya û aliyê din jî bi Sefewîyan re ya. Bi vê rewşê, di aslê xwe de, di wî şerî de ku kîjan alî serkevtin bidest xistiba û kîjan aliyî winda kiriba jî, wê dîsa li herdû aliyan kurdan winda kiriba. Ji xwe, piştê jî ya ku hat dîtîn ev bû. Piştî şerê çardiranê, ku Aliyê osmaniyan ku di pêşengîya Îdrîsê Bedlîsî de bi rêxistin bûya, bi ser dikeve. Piştî şerkevtinê, Îdrîsê bedlîsî, kurdên başûr jî li berçav digirê û li ser ardnigariyekê bi rêveberîya osmaniyan re peymanakê mohr dike. Li gorî wê peymanê wê kurd li herêmê xwe bi hikîmet û mîrgehên xwe wê hebin. Wê "şancaq" wê werina dayîn li wan û wê mudahale li jîyan û kevneşopîya kurdistanîyan newê kirin. Ev peymanê ku piştî Peymanê 'qasrî-şêrîn' dihê mohrkirin, ya di nava Îdrîsê Bedlîsî û Yavuz Selim de ya. Peymanê "qasrî-şêrîn" di nava osmaniyan û Sefewîyan de dibê. Lê peymanê piştê jî, di nava kurd û osmaniyan de dibê. Ew peymanê di nava Îdrîsê Bedlîsî de jî, heta 5 salan jî hebûna xwe didomê. Piştê ne bi gelekî re ku Yavuz Selim jî mir û ne bi gelekî re ku 'Qanûnî siltan Sûleyman' hat ser taxt, piştê wî, bi fermanekê ew peymanê ku di navbera îdrîsî bedlîsî de hafî mohrkirin bêhikim kir û ji holê rakir. Piştê bi fermana ku weşand re xwest ku her kesek 'tabîî' wî bê. Lê kurdan ev yek herê nekir. Piştê, Qanûnî siltan Sûleyman, sefera xwe ya mazin li kurdistanê dike. Di wê sefera xwe de gelek cihûwaran jî naqşeyê dibe.

Li herêmê, piştî vê re jî, hertimî şerê qasra Osmaniyan ê bi kurdan re didomê. Hertimî, çû bi ser serê wan de. Piştî wê peymanê di navbera Îdrîsî bedlîsî û Yavuz selim de ku bû, ku di nava wan de hatibû mohrkirin, piştî wê re çûyîna bi ser kurdan de ew hêsta wan ya ku ew 'rastî xîyanetê hatina' û 'bêbaxtî li wan hatîya kirin' bi wan re çê kiribû û bi wan da gotin ku "baxtê romê nîn a." Ev gotin, weke gotinaka xalkê û ankû nava gel, êdî bû guhar û diguhan de ma.

Li kurdistanê, piştî vê demê û pêde, wê êdî şerê kurd û osmaniyan wê bidomê. Ji wê demê û heta ku tê sadsale me, ser 500 salî re wê şerê osmaniyan û kurdan wê bidomê. Piştî Osmaniyan jî, ku komare tirk ava bû, êdî komare tirk, ew mîrete dewrgirt û şerê osmaniyan ê bi kurdan re weke şerê komarê ê bi kurdan re da domandin. Piştê jî, di vê temenê de şerê êdî domîya. Di vê temenê de, hertimî jî şerê du nava herdû aliyan de bînavber domîya.

Lê şêrên piştî şerê çardiranê ku di nava kurdan û osmaniyan de dibin, wê di sadsale 18'min û sadsale 19'min û hwd de wê zêdetir û gurtir bibe. Serhildane Mîr Mahmûdê Rawandûzî, Serhildane Berdixaniyan, Serhildane Şêx ubeydûllah û hwd, çend ji wan serhildanên ku wê di wê sadsalê de bibin. Di sadsale 19'min de jî, weke serhildane şêx Mahmûdê Berzencî, Serhildane Şêx Saîd û hwd, çend serhildanên wê sadsalê na. Her serhildane ku bi xwûnê bidawî bû, piştê kurdan, dîsa çawa ku xwe lev didane li hevdu, dîsa dirabûna serhildan û rapêrnê. Dewletê jî, hertimî bi komkuji û tevkujiyên weke komkujiya Dersimê û hwd bersiv dide. Komkujiyên kurdan, di xatekê

bêl ku navberî werê dayîn li lê, hatina domandin. Bi vê yekê û awayê pirsgirêka kurd, heta vê roja me ya ku em têde dijîn hat. Î ro jî, pirsgirêka kurd, bi heman rengî hebûna xwe didomêne. Li dijî kurdan, di wî şerê bi kurdan re de weke ku "koalîsyonek" hebe, ew şer bi kurdan re bi wê dihê domandin.

Pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadîyê ya. Di serî de, dema ku mirov di çerçova gotina "pirsgirêka kurd" de bêne ser ziman, pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadîyê ya.

Di roja me de jî, pirsgirêk, hatîya û li vê astê sekinî ya. Ji ber çî di roja me de pirsgirêk nayê çareser kirin? Ji ber ku ew maf û azadîya kurdan ên ji wan hatina standin û girtin nayên radest kirin li wan. Hinekî jî, pirsgirêk, hatîya û li vir sekinî ya û xitimiya. Wekî din jî, di roja me de, dema ku kurd bahse pirsgirêka kurd û çareser kirina wê dikin, bahse maf û azadîyê xwe dikin. Di wate û têgihîştina maf û azadîya xwe de dihênin ser ziman. Lê dewlet jî, dema ku heman gotinê dihêne ser ziman, di wate tekoşîna kurdan ya biçek de dihildê li dest. Î ro jî, nîqaşên ku tên kirin, di temenê wê de na ku wê çawa kurdan bêçek bikin û di nava sînorê tirkîyê de pirsgirêk li gorî xwe "çareser" bikin û kurdan di nava tirkîtiya tirkîyê de wê çawa werina halandin. Hinekî jî, ya ku dewlet, ji gotina pirsgirêka kurd fahm dike bi gotina "çareseriyê" ya di serê wê de tenê ev a. Ji ber vê ne ne levkirinê jî, êdî pirsgirêk nayê çareser kirin.

Bi demên Konfaranse Lozanê, paxta sadabadê û peymanê Cezayîrê qatkiirna kurdistanê

Konfaranse Lozanê ku di sale 1923'an de bû, di wê de kurdistan hat qat(perçe)kirin. Ev dema nû ya ku tekoşîna azadîya kurdistanê PKK'ê daye destpêkirin, ji bo statûya kurdistanê pîr giring a. Lê divê ku em pêvajoyên dîroka kurdistanê bi wê zihniyeta ku ew di nava Îran, Îraq, Sûrî û Tirkîya de kirî qat jî divê ku mirov fahm bike. BI vê yekê, me jî, xwest ku ji destpêka konfaranse Lozanê, û heta pêvajoya ku Paxta sadabadê li derdikeve û ji wê jî heta paxta baxdadê û Cezayîrê ku di wan re baxtê kurd û kurdistanê didina kifşkirin, me xwest ku bînina ser ziman. Civatek, heta ku xwe nasnekê wê nekeve lêpîrsîna serpêhatîyên xwe de jî. Lê ku xwe naskir û ket pay serpêhatîyên xwe de, êdî bidest fêra dîroka xwe dike. Wê dîroka xwe dixwêne û jê fêran derdixe. Di Serî de, me ev zihniyeta ku ji sale ku konfaranse Lozanê di wê de hatî ji sale 1923'an heta sale me ya ku em di wê de na ya 2013'an, bi sereke me bi wê zihniyetê re lê bînerin û fahm bikin.

Dema ku me bi wê zihniyetê re dît, êdî emê bibînin û fahm bikin ku ka ji ber çî û li ser çî esasê kurdistanê, ji sale 1923'an heta 2013'an, bûya qadaka ku lê şer bi kurdan re di wê de hatîya kirin. Ji serhildane Şêx Saîd û Sêd Rîza û heta komkujiya dersimê û komkujiya Helepçê û ji wê jî heta komkujiya Roboskî û komkujiya kurdan a li Parîs'ê û hwd, emê bibînin ku hemû şer û komkuji di temenê wan de ev zihniyet heya. Bêgûman, ev dîroka ku me bahsê kir ji dema 1923'an û heta 2013'an, bi sadan cildan ansîkopedî jî werina nivîsandin, wê nikarîbin bi tememî wê dîroka bi êş bi tememî bêne ser ziman. Lê emê tenê bi vî nivîsê re, dem bi dem bi teybetî pêvajoyên wê yên

giring hildina li berçav û bêna ser ziman. Em hevî dikin ku wê rojekê ew ansîklopedîya wê jî were nivîsandin. ...

Weke destpêkê Konfaranse Lozanê û bêstatû hiştina kurdistanê

Di aslê wê de, divê ku em vê pêvajoyê ji konfaranse Sîykes-picot bidina dest pê kirin. Ji ber ku li wir, levbeşkirina herêmê jî aliyê hêzên serdest bûya. Konfaranse Lozanê, li gorî gîyane wê tê li darxistin bi armanca parastina wê rewşê ya serdestîya wan hêzan a.

Ku mirov, di van rojên ku li ser çareserkirina pirsgirêka kurd tê axiftin, ku çawa ew pirsgirêk hate afirandin û bi çi awayê hate afirandin ku mirov wê fahmnelê, mirov wê di çareserkirina wê de jî baş bi ser nekeve. Berî hertiştî baş û qanc fahmkirina şert û mercên deme û yên herêmê, wê jî me re jî bo fahmkirina bûna wê pirsgirêkê, wê têgihîştinekê bi me re çê bike. Di van rojan de kurd bi carekê hemû li ser lingan a û doza çareserkirina pirsgirêka kurd dikin. Ji ber vê yekê, di van rojan de kurdan bigiştî bidest çalakîya neîtaatîyê kir. Bi wê re jî "konên çareserîya demokratîk" jî bo çareserkirina pirsgirêka kurd, li ber qad û bajar û bajerkên kurdan li kurdistanê hatina vedan. Bi sadhezaran kurd, jî bo çareserkiirna pirsgirêka kurd li ser lingan a. Lê dewlet, li ber wan ti tevgerîyaka ku wê çawa wî şerê ku ev 30 salin ku li ber kurdan daya meşandin de ya. Ji bo wê domandina wî şerê qirêj jî, li rê û rêbazan digerihe. Ji bo ve yekê bi Îran, Sûrî û Iraqê, welatên ku muhatabê pirsgirêka kurd in, bi wan re roj bi roj li ser hevdu civîna li dar dixê. Bi hev re, li çareserîyekê digerihi. Ji wî şerê ku li Libya hatî destpêkirin jî, Tirkî di hewldana ku ancama jî bo berdewam kirina wî şerê li ber kurdan ku dide digerihe. Di deme ku şerê li ber Libya, hate destpêkirin, bê ku heya ti kesekî jê hebê, tirkî kiştên şer yên mazin şandina ber Libya. Bi wê re jî, bi Nato û Amarika û welatên rojava jî, di hin tîkiliyên ku ew piştgirîya xwe jî bo wî şerê ku li Kurdistanê dide meşandin de ya. Ev li vê yekê, digerihe. Lê şert û mercên demê jî, pîr guharîna. Êdî, nêzîkatîya ku pirsgirêkên civatî û civakî, bi tîkildanên re bêne çareserkirin derdikeve pêş. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku êdî demeka nû bi vê yekê di rê û rêbazên çareserkirina pirsgirêkan de dest pê dike.

Li Kurdistanê, peirsgîek, di sadsale 20an de dest pê dike. Ji ber vê yekê divê ku mirov jî wê sadsalê jî destpêka wê hildê dest û bidest hanîna li ser ziman bike. Di wê sadsalê de çi pêşketin û pêşveçûn bûn, hemû jî, bi hev re li herêmê di afirandina pirsgirêka kurd de xwedî weyn in. Dem, di destpêka sadsale 20an de, wê êdî bi awayekî nû heyîn û hebûna xwe bide berdewam kirin. Demeka ku hate wê demê bi împaratoriyan hatîya wê bê girtin û wê demeka nû ya bi welatî û netewîyê dest pê bike. Di wê destpêka demê de, wê li her derê cihanê wê despêkaka şoraşî bi vê yekê wê destpê bike. Li ber rêveberîyên împaratorî, wê xalk serî hildin û wê bigihina serxwebûn û azadîya xwe. Ev yek, wê bê xoslet û teybetmendîyê demekê. Deme nû ya ku bi vê yekê û awayê tê, wê bi xwe re nîrx û baheyê xwe yê demî yê nîrxî jî, jî nû ve bi awa bike. Azadî û serxwebûn,

weke du gotinên wê ew wan nirxan bënina ser ziman bin. Bi wê yekê re, pêşketina mirov ya bîaqil û pêşketina zanist û rewşenbîrîyê, wê bibe. Ev pêşketin û awayê wan, û pêşketin û têgihîştina ku bi wan rte dihê holê. wê demê ji nû ve ji temen ve bidest afirandinê bike. Awayê pergale yê demokrasiyê, wê di vê demê de êdî hin bi hin derkeve pêş û wê bê awayê rêveberîya şarristanîya sadsale 20 an. Lê wê bi wê re, pir şer û pevçûn jî wê biqawimin. Di wê demê de cihekî cihanê yê ku şer û pevçûn têde nîn a mirov nabîne.

Xoslet û teybetmendîya wan şer û pevçûna ji du aliyan ve tê li berçav. Aliyê pêşî, ku yê bi xalkan re ya û ku xalk ji bo azadî û serbixwebûna xwe êdî têdikoşin a. Aliyê din yê wê jî, bi şer û pevçûnên pergale yên serdestiyê re ya. Ev herdû, awayên şer û pevçûnan wê di nav hev de di wê demê de bibin. Wê xoslet û teybetmendiyê demê bi afirênin. Di qada pêşî de xalk, deme ku ji bo azadîya xwe tekoşîne didin ku digihina azadîya xwe, êdî pergaliya xwe ava dikin. Lê ew awayê pergale wê çî bê û çawa bê, wê êdî ew jî ji aliyekî ve bi gelemperî li cihanê bê mijara şer û pevçûnan. Ew şer û pevçûnên vê aliyê dawiyê, wê hiç ne sekin in berdewam bikin. Xalkê ku guhişt azadî û serbixwebûna xwe jî, wê piştî wê gihîştina serbixwebûna xwe re, wê di nav xwe de êdî ji nû ve bikeve şer û pevçûnaka din ya din de. Ew jî, şer û pevçûna awayê pergale ya. Şer û pevçûna komên civakê yê berjewendîya wan a. Bi vê yekê re, wê dem, êdî bi wê re ku bi xalkekî re jî, ku ji şerekî xilas bû wê êdî bidest şerê di yê ku li pêşîya wê bû bikira. Bi vê yekê re, wê dem êdî bûna demeka şer. Sadsale 20an, wê bi vê yekê re, ji bilî şer û pevçûnên herêm û netewan yên ji bo azadî û serbixwebûna xwe, wê du şerên cihanî jî bike. Şerê cihanê yê pêşî(1914), wê hema di destpêka sadsalê de bê. Yê di(1943) wê di nivê sadsalê de bê. Ev şer û pevçûn, wê rojhilat jî bi bandûr bikin. Rojhilat, hate wê demê wê bi gelek pirsgirêkên pêşketinê yên ku bi nêzîkatîya rêveberîyan re xwe didina berdewam kîrn wê bijî. Piştî ku dem tê vê demê, wê rojhilat, êdî bê qadak ji wan qadên ku ew şer têde dibin a.

Rojhilat, wê bi Dewlete Osmanîyan re were wê demê. Dewlete Osmanîyan, weke şûbabaka li pêşîya pêşketina herêmê ya. Tenê, di nêzîkatîyaka serdestiyê de israr dike. Ji pêşketina herêmê re ti perspektif û planên wê nîn in. Bi wê re, xalkên herêmê yên ku xwediyê plan û projana ji bo pêşketinê xwe jî, ew li pêşîya wan astang a. Bi vê yekê re, rewşaka herêmê ya bi wê re afirîya. Lê di wê demê de herêm jî, ji gelek aliyên wê ve tekoşînen serbixwebûnê bûna. Li gelek herêmên araban ji xwe êdî ew têkçûya. Herêma persan, ne di bin serwerîya wê de ya. Lê kurdistan, di bin destê wê de ya. Lê ew jî, êdî wê bindestbûnê naxwezê. Lê Başûr û başûrojawayê kurdistanê jî, ji bindestê wê derketina. Piştî şerê cihanê yê yekemin, hêzên îngiliz, wê werina wir û li wir bicîh bibin. Piştî şerê cihanê yê yekemin, wê giraniya wan ya metingeriyê wê bê hîskirin. Ji ber vê yekê, êdî wê raperînen geê kurd yên weke yên Şêx Mahmudê Berzencî wê bibin. Lê wê ne digihina serketina xwe. Li başûrojawayê kurdistanê jî, ku hate ku digihijê herêma Şamê û hwd, serdestî û metingerîya Firansîzan heya. Ew jî, ji deme Napolîyon ve hin seferna wan yên li rojhilat hene. Hêzên Firansîzî û yên Inglîzî, çend ku di herêmên cuda jî bin, lê disa bi hev re di

aхангеke de na û t kiliyan wan bi hev re me n  j  heya. Herd , li pey serweriya xwe na. Bi w  re j , her m n nift  y n ku hatina kif kirin j , hene. Kerkuk, li ba ur  kurdistan , h  di deme  ngilizan de hatiya kif kirin ku t de nift heya. Ji ber v  yek , ew li wir dihizirin. Firansiz , weke wan bi baxt nabin. Li ba urrojaway  kurdistan  û her m n din y n di bin dest wan de na, ten  bi wan re bi ramiyaya r zan  re û bi hinek dewlemendiy n li ber av ku dest d nina li ser re bi s nor dim nin.

Pi t   er  cihan  y  yekemin, h z n ku di w  dem  re dikevina  er de bi hev re, aliy  ku t k di in y n weke Osmaniy n, w  bidina qad n bidestxistin . T kiliya Almanan ya bi osmaniy n re ku ew(osman ) bawer dikin ku hevalbend  hevd  na, bi r ni an n Almanan re h  z tir t k di  . Almanya, di w  dem  de  end ku weke ku li aliy  ku winda dike cih digir  j  b , weke yeke bi serket  w  pi tre bidest p  ketina xwe bikeve. L  rojhilat, w  di w  dem  de b  qada i kalkirin  re. Her m n n vgiraba araba û y n anatoliya, w  bina qad n  er. Pi t   er  cihan  y  yekemin re, her h z cih  ku ketiy  de weke qada xwe dib n  û li wir dike ku serwer  û serdestiya xwe di dem  de bide afirandin û berdewam kirin.  ngiliz j , û firansiz j , bi v  yek  li her me rojhilat w  derkevina p  . Ev serwer  û serdestiy n ku diafirin, ten  y n bidestxistina talan  na. Ji w  p de, ne ti teki d  na. Rojhilat, w  pi t   er  cihan  y  yekemin re, w  b  qada  er ji du aliy n ve. Aliy  p   , aliy  ku xalk n her m  serbixweb na xwe dixwezin û ji bo w  ketina  er û pev unan de ya. Aliy  din j , y  h z n serdest ku bi metinger  hatina her m  û dixwezin ku li her m  bicih bibin û bigihijna serdestiyaka metinger . Pi t   er  cihan  re her m dikeve rew aka n  de. L  Firansiz j  û ingiliz j ,  d  fahm dikin ku w  nikaribin ku bi serdestiya le ker  ku li her m  xwe bigirin.

Bi v  yek  re,  d  li r  û  arey n din l gerina wan dib .Pi tre bi dem  re, weke h zne ku pi t giriy  didina serbixweb na h z n her m   d  derdikevina hol .Her her m n ku ku hene, w  ji navenda Ingiliztan  ji London  û ji navenda Firansa ji Pars  û hwd, w  mirov n ku weke "misyonar" w  werina her m  û bikevina awayek  ku pi t giriy  didina r veberiy n xalk  ku biafirin. L  k jan r veber  ji aliy  k jan navend  ve hate avakirin, w  ji aliyek  ve weke ku destek  wan y n li her m  j  b . Bi v  yek  re, hewldanaka r veberiy n ku bi xwe gir day  biafir nin didina n  andin. Bi v  yek  re,  d  weke ku awayek  d  y  hewldana bidest xistin  dih  hol . Ev hewldan, w  li gelek cihan bigihij  armaca xwe j . Xalk n her m , deme ku ji bo serbixweb n  tediko  n û digihijina serbixweb na xwe pi tre r veberiya ku t  ser kar, w  weke r veberiyaka metinger ya ji wan ya li ser ser  wan b . Away  metingeriy  û metoda w , li her m  bi v  away  û metod  re diguhar .

Pi t   er  cihan , bi v  yek  re w  r veberiy n her m  biafirin. Her m, di d tin û dimen de weke ku gihij  r veberiy n xwe. L  ew r veber , w  r veberiy n seh tkirina xalk n her m  bin di hin  er ovayan de. Di w   er ov  de ku mirov weke konfaransaka giring ya ku  ekil û awa daya her m , mirov kar  bahse konfaranse Lozan  bike. Di w  dema ku ev konfarans t  li darxistin,

hingî, hê hêzên Ingiliz û firansizan li herêmê ya. Firanszi, ku başûroavayê kurdistanê jî di nav de ya, herême ku î ro bigîştî jê re "Sûrî" tê gotin, wê li ser wê serdest û serwer bin. Ingliz jî, wê ku başûrê kurdistanê di nav de ew herême ku jê re "Îraq" tê gotin, wê li ser wê serwer bin. Wê demê de ev herdû welat jî in in. Lê ev herdû nav, wê piştîre bina navê du welatên ku ji nû ve têne avakirin. Konfaranse Lozanê, di wê deme ku êdî bi vê yekê re ew tekoşîna serbixwebûnê bûya û bi wê re, êdî li herêmê hewldana rêveberiyên ku karibin xalkê bisehêt bikin û li gor polîtîkayên van hêzan tevbigerihiyên wan avakirina wan tê dayin. Ev konfarans, wê ji vê yekê re temenekî dîrokî jî biafirîne. Wê temenê wan polîtîkayên ku wê hate roje me ku ji aliyê wan ve bînxistin li meriyetê, wê bê afirandin. Rêveberiyên wê polîtîkayê û bi teybetî jî, yên van hêzan tîne afirandin. Di konfaransê de, wê pîr nîqaşna mazin yên li ser herêmê wê bibin. Wê nîqaşên levparkirinê wê bêne kirin. Kîjan herêm, wê dibin destê kîjan hêzê û bi teybetî kîjan rêveberiyê de bê, ew tê nîqaşkirin. Herêm, bi ne bi tememî jî bê, hin teybetmendiyên wan yên dewlemendiyên wan yên serard û binard tîne zanîn. Ev jî, di wê demê de têna li berçav girtin.

Li herêmê, wê bi vê yekê re awayek lê bê dayin. Wê li ser masê wê naqşayên wê bêne şekilkirin û awa kirin. Bi wê yekê re wê rêveberiyên ku wê bêne avakirin, êdî wê bêne avakirin. **Herêm, bi vê yekê re, wê ne li gor heyî û hebûna xalkan û gelên herêmê û heyî û hebûna wan ya dîrokî ya li herêmê wê bêne bicihkirin. Wê naqşa ne li gor wê bêne kifşkirin, wê li gor wê serweriya wan hêzan ya ku di wê demê de hatiya afirandin, wê ew bê esas girtin û li gor wê bêne afirandin.** Bi vê yekê re wê herêm, êdî bê biawakirin. Li bakûrê kurdistanê, bi tirkên re kurd bûna yek û ew herêm tekoşîna wê dan û bi serketin. Di wê konfaranse de, bi wê serketinê re ew rêveberiya ku afirî jî amede bû. Wê rêveberiyê di wir de got ku " ew li ser navê herdû gelan hatiya wir." Lê herêma başûrê kurdistanê, di wê demê de ne bi wê re bû. Başûrojavayê kurdistanê ne bi wê re bû. Rojhilatê kurdistanê bi Îrane ku hate wê demê ji Ingiliztan û Amarîka re weke hevalbendekî(mutteffikekê) ya, di destê wê de ya. Bi vê yekê û wê hevalbendîya wan re, wê Îran, di wê demê de bi wê şerdestîya xwe ya ku heya re wê ti pîrsgirêkên mazin yên herêmî di herêmên xwe de nejî. Vajî wê, wê piştgirîyaka wê ji wan re hebe. Di afirandina Îraqê de, Piştgirîya Îranê û wê hevalbendîya wê ya ji wan re ku hebû, pîr mazin bû. Beşeka mazin Ya Şîî di wê demê de di nav wî sînorê Îraqê ku wê di piştî wê konfaransê de were avakirin de heya. Îran, bandûra wê, nahêlê ku ew di nav hevdu de ti pîrsgirêkan bijîn. Lê kurd û arabên herêmê jî, ji wê rewşê nexweş in.

Kurd, di wê demê de bi şêx Mahmudê Berzençî re li ber xwe bidin. Lê wê tîk herin. Ew tîkçûn, wê bê sedeme ku ew êdî di wê demê de û avakirina rêveberîya deme nû de bi navê xwe cih negirin. Ji bo ku dilê arabên herêmê jî bê xweşkirin. Yekî arab yê bi navê Melîk Faysal, wê Ingiliz pêre levbikin û levkirnê bi wî û şîî'yan re jî bidina kirin û wê li ser rêveberîya herêmê dênin. Nîqaş û levkirina di konfaranse di Lozanê de ku bûn, ku di wê de îranê xwe parast, êdî piştîre deng jê dermeket. Ingilizan, Ew herême ku di bin serdestîya wan de hemû kirina welatek

navê "Îraq"ê lê kirin. Kurd, wê rewşê de di herêmên xwe de jî, mafê wan yê rêveberbirinê bi vê yekê ne hatibû naskirin. Başûrê kurdistanê, piştî wê afirandina Îraqê re, êdî piştî wê têkçûna ku jînkirin re ku êdî xwe hinek levdana hevdû, êdî bidest tekoşîna kirina rêveberiyên xwe yên kirina destê xwe de kirin. Kurên Bakûrê kurdistanê, hate wê konfaransê jî, di hewldanaka gihiştina rêveberîya xwe ya herêmên xwe de bûn. Ji xwe di konfaransê de Firansîz, nahêlin ku li ser başûrrojawayê kurdistanê wilo zêde bahs jî bê kirin. Gotinên ku li ser wê tîna ser ziman jî, gotinna gelemper in. Firansa, li ser rêveberîya xwe pîrr disekinê. Li ser herêma xwe pîrr disekinê. Di wê demê de kurdên başûrrojawayê kurdistanê, ji rêveberîya Firansîzan doza rêveberîya dikin. Lê bi teybetî, ya ku wê baxtê wê qat kurdistanê ya başûrrojawayê kurdistanê bide kifşîkirin jî, heyîn û tekoşîna bakûrê kurdistanê ya. Kurd, hate ku hatina wê demê, li ber Osmanîyan pîrr raperîn li darxistina. Lê hemû jî, bi hin awayna hatina şikandin. Ji raparîna Şêx Mahmudê rawandûzî ya ku wê rojhilat û başûrê kurdistanê jî bike nava xwe de hate ku tê serhildana şêx Ubeydullah, ku navenda wê bakûrê kurdistanê ya, wê pîrr serhildan û raperîn werina li darxistin.

Ev raperîn û serhildanên ku dibin û têkdiçin, wê kurdan jî kêmhêz bike. Wê wan ji kal bike. bandûra wê yekê pîr mazin a. Bakûrê kurdistanê, bi teybetî, di wê demê de pîrr raperîn û serhildan dana kirin. Lê mixabin, hemû jî hatina tîk birin. Gelek ji wan bi bêbaxtîyan hatina tîkbiriin. Minaq, Şêx Rîza(1918), hê ku raperîn li dar jî ne xistîya, ku tê hizirin ku ew xwediyê wê hêz û zanebûnê ku karê xalkê rakê ser pîyan û serhildanê bike, di deme ku ew dozê li rêveberîya Osmanî dîke ku mafê kurdan nas bike û ji herêmên kurdan hêzên leşkerî bikişîne, lê hê ku serî ne hildayê, xaberê jê re bi peyamnêr dişênin û wê dewetî levcivîna çareserkirina pîrsgirêka kurd dikin de wî digirin û piştê dadgah dikin û bidarve dikin. Bi vê yekê re, serhildanaka ku hê bebûyî serokê wê tê ji holê rakirin. Piştî wê re çend serokên aşîran yên ku bertekên xwe didina nişandin jî, hêzên Osmanîyan bi artişên mazin diçîna bi ser wan de. Piştê wê çûnên bi ser wê herêmê de wê berdewam bikin hate ku dem tê salên 1937 û wan. Bi vê yekê re, êdî bêdengbûnaka dibê. Xalkên din yên li herêmê ên weke Ermenîyan, bi komî "ferman" wan tê derxistin û tîne kuştin. Rêveberîya Osmanîyan fermana wan derdixe. Ew ferman, heya her mirovê herêmê jê heya. Hate roja me jî, ku bahs tê kirin tê gotin "haa fermana Ermenîyan ya ku rêveberîya osmanîyan derxistibû". Kurd jî pîrr di wê demê de û di demên berî wê de û di demên piştî wê de tîne kuştin. Lê kurd, ji ber ku bi hijmarî zêde na, êdî nikarin wilo zêde wan bi tememî ji holê rakin. Rewşa kurd ya bi aşîrî jî, di wê bi tememî ji holê ne rakirina wan de bi bandûr a.

Dem, ji demên berî konfaranse Lozanê hate ku tê deme wê, wê bi vê yekê û awayê bi kurdan re bi buhurê. Di konfaransê de, Firansîzî, ji ber ku di xwezî heyîn û hebûna xwe ya li herêmê biparezên, êdî ew hemû tiştî dikina destê xwe de. Li herêmê, arab zêdetir in. Lê komên din yên xalkên din yên weke Dûrziyan jî, dixwezî ku bigihîna azadî û serbixwebûna xwe di herêmên xwe de. Di wê demê de li ber Firansîzan, cih bi cih li berxwedanên wan jî hene. Li hin cihna jî wan dikina rewşna pîrr zor de. Li herêmê firansîzî, bi gotina ku ji kurdan re dibêjin ku "winê li

herêmê xwe xwediyê rêveberî û hukumete xwe bin" re kurdan bêdeng dikin. Bi wê yekê re ti bertekên wan dernekevin. Bi araban re jî têkiliyên wan pirr xurt hene. Ji bo ku ti bertekan ji araban ne stênin, bi bal tevdigerihin û hertimî di hewldanaka ku dilê wna xweşkirinê de na. Arab, bi raperînên xwe yên weke yên li Misre û herêmên din re ghiştina hin rêveberiyên xwe yên ku ew bi wan li ser herêmên xwe serdest in. Lê rêveberêyan wan, bi derve girêdayî na. Bi Ingliz û Firansizan ve girêdayînaka wan heya. Piştê ku firansa di sale 1937an û wan de ku di pişt paxte Sadabdê de ku hêzên xwe bi şûn ve kişand, wê rêveberîyaka arab ku bi wê ve girêdayî bê û di demên piştê de jî bi wê ve girêdayî bimêne diafirêne. Minaqa rêveberîya ku Îngilizan li Îraqê avakirîya, ew jî dihildin û li wir bicih dikin.

Di konfaranse Lozanê de li gor heyîn û hebûna hêzan û herêmên dibin destê wan de peymanaka ku jê re "peyman Lozanê" tê gotin wê bê mohrkirin. Bi wê peymanê re sînorê serdestîya hêzên ku li herêmê serdestin tê nîşan kirin. Ew konfaranse û peymanê ku têde tê çekirin jî, yên parastina hêz û serwerîya hêzên ku li herêmê bicihbûna yên weke Firansiz û Ingliz û hwd, sînorê wan kifş dike. Li ser esas û temenê sehêtkirinê re nêzîkatî û peymankirin dibê. Kurdistan, bi têkçûnên ku bi raperîn û serhildanên xwe jîya ya, ji hemd ketîya. Weke ku êdî nedikarî li berxwe bide. Kurdistan, di wê demê de qate wê ya ku di bin serdestîya Firansizan de ya, ew wilo di bin destê wan de dimêne. Qate ku di bin destê Îngilizan de ya jî, di nav sînorê îraqê ku diava dikin de dihê hiştin. Îran jî, bi rêveberîya şah Riza Pahlawî re û girêdayîna wê ya bi Îngilizan ve wê xwe weke xwe bihêle. Rojhilatê kurdistanê jî di nav sînorê wê de ya. Bi wê yekê re, wê sînorê herêmê wê bêne xîzkirin. Peymana Lozanê, di aslê xwe de weke peyman levkirina Firansiz û Îngilizan ya li ser beşkirin û serwerbûna herêmê ya. Di xîzkirina naqşayên herêmê de, ne li gor xalk û gelên ku ew esas hatina girtina. Peyman Lozanê, ku kê karîbûya hate ku derê bikira bin destê xwe de û ku karîya ku wê di bin destê xwe de bigirê, peyman fermîkirina wê rewşa hêzî ya.

Li gor wê peymanê ku di konfaranse di Lozanê de ku hatîya li darxistin de êdî piştê rewşa dadî ya herêmê ya rêzan û ramyarî(siyasî) bi pergali tê afirandin. Li ser wê peymanê re wê peymanên awlakariyê û yên din yên ku wê werina mohrkirin tene mohrkirin. Minaq, piştê, ku bidest salan de di deme berêê ku êdî Firansa wê hêzên xwe ji herêmê vekişêne, paxta Sadabadê ya ku tê li darxistin, wê weke ya safîkirina sînorên ku di konfaranse Lozanê de hatina xîzkirin û mayindakiirna wê bê. Di deme konfaranse Lozanê de Firansizan herêmên ku di bin destê xwe de girtibûn, weke sînor hatina nîşandin. Piştê, wê di paxta Sadabadê de ew nîşandan wê bê fermîkirin. Bi vê yekê re, wê sînorên ku bi serwerîya hêzê hatina afirandin, wilo li herêmê tenê fermîkirin. Rêveberiyên ku wê li gor wê naqşaya wan herêmên ku hatina kirin li nav hevdu de ku wê werina avakirin jî, wê tekoşîna wan êdî bi gelê herêmê re ya dana herêkirina wan sînoran bibe. Wê serdemek êdî bi wî têgihîştinê re bi şerê ku bi gelên herêmê re tê dayin re wê bi buhurê. Tirkî, li gor wê hêze di destê xwe de ku kurdan piştgirî dabûyê de, wê hate ku derê kiribê destê xwe de, wê li ser wê welatîtiyekê ava bike û gelên din yên weke kurdan yên ku piştgirî jî danê de wê

heyîn û hebûna wan înkâr bike û li ser esasê nîjadperestîyeka ku derhanîn(îthal) hatîya kirin li herêmê wê hewldana pêşketinekê bi xwe re bike. Heman awa û tişt, wê li Îran, Sûrî û Îraqê jî bibe. Peymana Lozanê, di serî de bûya, wê bê peymanaka hêzên herêmê ku ew li gor wê xwe ava bikin û li ber gelên herêmê bikevina şer de ya. Weke ancama wê peymanê, ji wê demê hate ku dem tê vê deme me, ji hijmara kuştinên ku bidestê Nazîyan bûna, ne kêmtir wê mirov bêne kuştin li herêmê. ..

Piştî ku Lozan hat mohrkirin û kurdan dîtin ku bêstatû hatina hiştin, êdî bi dest serhildanê kirin. ..

Ku mirov dîroka herêmê ya sadsale ku buhurî nizanibê, mirov wê baş û qanc nikaribê, vê demê jî baş û qanc şîrove bike û bêne ser ziman. Hemû dahûriyên vê demê yên ku bibin, wê wê demê û statûya wê ya ku hatî afirandin û ku hate roja li ser lingan hatîya hiştî wê, wê bi demê re wê bike temenê xwe de. Ku mirov deme ku Konfaranse Lozanê tê de bû fahm nekê, mirov wê êdî vê demê jî baş û qanc fahm nekê. Kurd, di sadsale 20'an de, ku statû û statûya herêmê hat afirandin, dervî wê hatina hiştin. Hemû mafê wan yên ku ji heyîn û hebûna tîn, ji wan hatina standin. Ev dem, divêt ku baş were fahm kirin. Ew dem, bi hemû pêvajo û pêşketin û têngiştinên xwe re di temenê hemû şer û pevçûnên ku di roja me de li rojhilat bi kurdan re dibin, di temenê wê de ya. Kurdan, di wê demê de di salê 1923'an de, deme ku konfaranse Lozanê bû û statû hatina kifşkirin, dervî wî pêvajoyê hatina hiştin. Piştî ku konfarans bû û bidawî bû, êdî kurdan jî ku dît ku wa êdî ew dervî wê statûya herêmê ya ku hatîya afirandin hatina hiştin, êdî wan jî bidest li berxwedanê kirin. Piştî konfaranse Lozanê, bidest amedekariyên raperîn û serhildana Şêx Seîdê pîranî kirin jî, wê di ancama wê yekê de bê. Kurdan, statûya xwe ya li herêmên xwe xwest. Li ber wê kirin ku li ber xwe bidin. Piştî konfaranse Lozanê, kurdan êdî fahm kiribû ku çî hatîya serê wan. Lê ti carî jî ew ancamen wê konfaranse ji aliyê wan ve jî ne hate pejîrendin. Hertimî li ber wê şer kirin. Piştî Serhildana Şêx Seîdê pîranî re, li herême Dersim û botanê, wê li gelek der û deveran wê raperînen herêmî pêk verin. Lê li ber kurdan, weke ku kurdan dizanî, jî wê zêdetir hêzeka mazin li ber wan sekinî bû.

Di wê demê de, ku başûrê kurdistanê jî nav de bû. Ew herême ku î ro "Îraq" jê re tê gotin, di bin destê Hêzên Ingilistanê de bû. Wekî din jî, ku başûr rojavayê kurdistanê jî di nav de, ew herême ku î ro jê re "sûriye" tê gotin, bi Libnanê re di bin destê hêzên Firanse de bû. Îrane wê demê jî, bi Îngiliztanê re tevdiogerîya. Îranê, piştîgirîyek dide Îngiliztan ku karibê li wê herêmê rojhilat ku ew karibê xwe û metingerîya xwe bide domandin. Konfaranse Lozanê di bin sih û sihwane van herdû hêzên ku li herêmê metinhgerîyeka wan hebû de pêkhat. Di serî de, herêm ku wan metinger kirina jî, di wê konfaranse de weke prensîba pêşîya ku bê parastin. Ingiliztan dixwezê ku bi şûn vekîşîhî. Bi konfaranse Lozanê re wê temenê wê bê çêkirin. Piştî Konfaranse

Lozanê re, wê Îngiliztan, wilo zêde êdî li herêmê nemêne. Lê wê rêveberîya ku ji wê re "şadik" bê wê bide ava kirin. ..

Bi vê yekê re, bi awayekî leşkerî dawî li metingerîya xwe ya li herêmê têne. Lê bi ramyarî(sîyesî) wê bi wê rêveberîya ku daya ava kirin, wê bide berdewam kirin. Heman tiştî, wê Firanse jî wê bike. Firanse, wê hinekî ji Îngilistanê derengtir ji herêmê vekîşîhê. Wê bimêne hate salê 1938 û hwd. Çawa ku Îngilistan bi konfaranse Lozanê temenê vekîşîna xwe ya bi leşkerî afirand û metingerîya xwe ya ramyarî da berdewam kirin, wê Firanse jî, bi Paxta Sadabadê re, wê rewşê ji xwe re biafirîne. Ew jî, wê temenê vekîşîna xwe ya bileşerî biafirîne û wê temenê domana metingerîya xwe ya ramyarî biafirîne. Weke ku Îngilistan kir, wê Firanse jî, rêveberîyaka ku bi xwe ve girêdayî wê biafirîne û wê vekîşîhê. Weke ku Îngilistan kir, wê jî, hemû herêmên ku di bin metingerî û serdestîya wê de bûn, wê bigîştî, wê wan bi navê sûrî di bin destê rêveberîyeka arab de bike welatek. Welatîtiya Îraq û Sûrî, bi vî rengî, derkete ser rûyê ardê û kete dîroka cihanê de. Wekî din jî, bi navê sûrî û Îraq, di dîrokê de ti pêşketin û sazîyên ku hatina avakirin jî nîn in. Divêt ku mirov vê yekê jî bi teybet bêne ser ziman.

Dîroka herêmê, bi vî rengî wê bi konfaranse Lozanê re temenê pirsgirêkên wê yênu hate roja me tên, wê biafirîne. Rojhilat, ji deme ku konfaranse Lozanê bû û bi vir de, ti demê bê şer û pevçûn ne buhurandîya. Ti deme xwe bê kuştin ne buhurandîya. Hemû şer, pevçûn û kuştinên ku bûn jî, di temenê wan de ew statûya herêmê ya ku di konfaranse Lozanê de hatiya kifşkirin heya. Rêveberîyên ku di wê konfaranse de temenê wan hat avêtin, ji bo ku wê statûya ku li wir hatiya kifşkirin bi gelên herêmê bidina herêmê kirin r û rêbazek nema ku ne caribandin. Herêmek, nema ku lê komkuji neman. Ma mirov karê bibêje ku di temenê jenosîde dersimî û Helepeçê de, zihnîyeta statûya ku di konfaranse Lozanê di bingîhê bûna nîn a? Kî karê vê yekê bibêje? Ne ti kesek. Ti kesek nikarê vê yekê bibêje. Heman zihnîyet heya. Û heman zihnîyet, î ro, li kurdistanê, tirkîyê Îranê, Sûrî bi kurdan re dide şer kirin. Divêt ku mirov vê yekê jî bi teybet bibêje û bêne ser ziman.

Konfaranse Lozanê, di aslê xwe re mesopotamîtiya herêmê bi wê peymanê xwe ya ku denezand û bi wê re statûya herêmê bi statûqûtiyê afirand, ji holê rakir, kuşt. Di wê demê kurdan li ber wê li berxwe dan. Kurdan, deme ku dîtîna ku ew dervî statûya herêmê hatina hiştin êdî li ber xwe dan. Serhildana Şêx Seîd, di ancama wê dîtîna ku kurdan dît ku dervî statûqûtiya herêmê hatina hiştin de bû. Kurdan, kurdan, di wê demê de serî hildan. Ku di wê demê de bi serhildana xwe re ku bi serketiban, wê herêmê, î ro di rêya xwe ya pêşketina xwe de ba. Wê pir pêvajoyê demdîrêjî jî, wê li ser wê pêşketina xwe re buhurand ba. Lê ev yek nebû. Kurdan, ku ew serhildana xwe bi serketina tacîdar kiriban, wê ew statûya ku di konfaranse Lozanê de hat kifşkirin, wê ji holê rabûba. Wê demeka nû derst pê kirba. Bi wê re, wê temenê ramyarîya

Îngilistan û Firanse ya metingerîyê ya li herêmê jî wê ji holê rabûba. Wê herêm, bi vê yekê re bi serê xwe û azadîya xwe êdfî wê bijîyana.

Bi wê yekê re, ew serhildana kurdan ya ku di pêşengîya Şêx Seîd de bû, Bi vê yekê re, di aslê xwe de ku ew di farqê de jî ba û ne di farqê de jî ba, bi statûyê ketibû şer de. Li ser statûya herêmê û awayê wê yê ku biafirê ketibûbû şer de. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku di têgihîştina serhildana şêx Seîd de, têgihîştinaka bi statûyî ya ji bo herêmê jî hebû. Divêt ku mirov vê yekê kifş bike. Hêzên ku li herêmê xwedî serdestî û metingerî bûn, ku ne bi tememî jî bê, weke ku ev yek kifş kiribûn. Bi vê yekê re, di deme ku Şêx Seîd serî hilda, bi tirkî re firanse û Ingiliztan jî li ber xwe dît. Ji ber ku ew statûya ku Şêx Seîd, ji bo wê ketibû şer de, di aslê xwe de diji wê statûya ku wan ji bo herêmê di konfaranse Lozanê kifşkiribûn bû. Wan jî, ev yek di dît. Lê tiştêkî din jî di dîtin. Ew jî, ev bû, ku kurd bi wê serhildana xwe re bi serketiban, wê bê şart û merc, wê Îngiliztan jî û firanse jî, nekarîba ku li herêmê êdfî xwe bigrta û rêveberîyeka metinger li ser lingen bigirta. Bi vê yekê re, ew jî, êdfî wî ji herêmê biçûyan. Bi serketina Şêx Seîd re, wê bi demê re weke ku şoraşa herêmê bi giştî wê bûba. Rewşê ev dihanî li berçav.

Kurd, têkçûn û êdfî ew statû jî bi statûqûya herêmê û hat hate roja me. Lê li herêmê di ancama wê statûqûyê de hate î ro jî şer û pevçûn bi dawî nebûna. Ew statûya ku di konfaranse Lozanê de hatibû kifşkirin, êdfî carek din, weke ku hatîya û ketîya wê rewşa xwe ya destêpêkê ku kurdan li ber wê ji bo statûya xwe şer kiribûn. Ji wê demê hate vê demê şûrê kurdan yê ji bo azadîya xwe li herêmê bidawî nebû. Kurdan, piştî wê têkçûnê carek din xwe bi rêxistin kirin û dîsa li dika dîrokê na.

Di wê demê de, statûya herêmê ya ku di wê demê hatîya afirandin, di aslê xwe de, î ro şerê wê tê dayin. Li herêmê, rêveberîyên herêmê, weke yê ku bi keve nava avê de û di nav avê li mar xwe bipêçê, li wê statûya ku di konfaranse Lozanê de hatîya kifşkirin lê xwedî derdikevin û lê xwe pêçan a. Di jîyanê de, di aslê xwe de, ew statûya Konfaranse Lozanê ji holê ra bûya. êdfî ne meşrû ya. Herkesek jî wê wilo dihasibêne. Lê ji aliyê ramiyê serdestî ve hê şerê wê bi gelên herêmê re tê dayin. Ya ku î ro dibê, di ancama wê de dibin in. Îran, bi aqilê tirkî, şer dike. Bi wê şerî re du tişt tê xwestin ku were kirin. Yek bi wî şerî tê xwestin ku kurd, werina şikandin. Ya din jî, ew bû ku Îran, bi bîrdozîya xwe re "weke bîrdozya bindestan" dihat şirove kirin. Wê ev alî jî, bi wî şerê ku wê daya dest pê kirin re wê ji holê rabê. Di asta dawî de ku kurdan têk nebe jî, wê ev ancama ji bo tirkî û Emerîkaya ku li ber wê ya, wê derkeve li holê.

Di nav artişa Îranê ya ku bi kurdan re şer dike de mirina leşkerên tirkî, mirov karê bi vê polîtîyaka ramiyê ya serdestîyê ve girêbide. Li herêmê, weke pêvajoya sale 1923'an ya konfaranse Lozanê, çawa ku kurd dervî statûyê hatin hiştin, di wê pêvajoyê de jî dihê xwestin ku kurd dervî wê bîn hiştin. Şerê vê tê dayin. Şerê ku tê dayin, êdfî bi ast û rada xwe de derketîya ast

û radaya herî bilind. Êdî bûya şerê statûyê. Ev hem ji bo kurdan wilo ya ku ew dixwezî ku bi heyîn û hebûna xwe re li ser herêmên xwe bi statû bibin û hem jî yê ku hêzên herêmê yên ku li ber kurdan şer dikin weke Îran, tirkî û Sûrî ku kurdan dervî w statûyê bihêlin a. Şer şerê vê ya. Di temenê şerê desthildarî û serdestiyê de nêzîkatî lê tê kirin. Bi vê yekê re, weke ku bi wê statûqûya ku di konfaranse Lozanê hatiya kifşkirin re xalk û gelên herêmê bi destên rêveberiyên herêmê tê xwestin ku bèn metingerkirin.

Piştî konfaranse Lozanê ya ku di sale 1923'an de ku bû, ev deme me, weke deme wê ya nû ya. Gelên li herêmê, dixwezî ku bi pêşketina xwe re bi pêşarjê ve herin. Lê yên ku li pêşiya wan astang in jî, rêveberiyên herêmê yên weke tirkîyê û Îranê na. Di aslê xwe de, divêt ku mirov di vir de gotinekê li ser tirkî û pergale wê bibêje. Weke pergaleka "model" navê wê tê hildan. Di serî de, divêt ku mirov bibêje ku awayekî ûnîterî, ne li gor pêşketina herêmê ya. Bi vê yekê re, bi awaye wê yê netewî jî, ku di asta bilind de weke ku jî destêpêka xwe hatiya û hatiya roja me û gihiştîya astaka netewperestî û êdî bi wê netewperestiyê bi xalk û gelên herêmê re şer dike ya. Bi vê modelê û modelên weke wê re wê ti carî herêm ji şer û pevçûnan rizgar nebe. Ji bo diktatorekê ku li herêmê derkeve û bixwezê bi netewperestî netewekê ava bike, ev modele tirkî, modelek a. Lê ji wê wîrdetir, ne modeleka pêşketinê ya. Di serî de, serok wezirê tirkî, deme ku diaxiftê li gor destûra wê modelê diafirê û dibêje "yek millet, yek ol, yek ziman, yek netew, yek, al, .." û hwd , û pêde diçêt. Ji vê gotinê û vaca(locîka wê) wê mirov karê bibêje ku ne li gor herêmê ya. Model pergale tirkî, ku ji vî reng û awayê wê yê ku ew bi wê heya, wê ew bixwe jî, ji vê demê jî êdî wilo zêde nikaribe bi pêş de herê. Ew jî, divêt ku wê awayê xwe biguharênê û bigihêne awayekî ku rêz û hûrmete wê ji mirov re hebe. Pergale tirkî, dike yek reng. Kirina yek reng, li dijî jîyane û xwezayê bixwe jî ya. ..

Bi vê yekê re, kurd, di vê demê de bi modelekê jî tîne holê. Di serî de, bi dahûrîya dîroka herêmê re ku gelên herêmê bi hev re bijîn, modelekê didêne li holê. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku di modela kurdan de hemû reng û cudatîyên civakî yên ku hene karin xwe bînin li ser ziman. BI wê re, bi têgihîştina xwe re temenê derketina reng û cudatîyên ku derkevin ku mafê jîyanê ji xwe re bibînin jî di xwe de û bi xwe re diafirêne. Jîyan, hertimî ku dijî, reng û cudatîyên cuda di xwe de û bi xwe re diafirêne. Parastina wan jî, wê ne tenê paratîna wan bê, wê afirandin û nivîsandîna dîrokê bê. Gelên herêmê, li ser baxtên xwe ne xwedî gotinê na. Kurd, ne xwediyê gotinê na. Dihê xwestin ku kurdan bi nav û dîrok û civatîya xwe re ji dîrokê herin. Î ro, tekoşîna dewletên serdest yên weke yên Îran û tirkî, ya vê ya. Ew vê yekê dixwezî. Ji xwe, ma ne ji ber vê yekê ya ku zimanê kurdî hê hate roja me qadaxa ya? Rastî statûya herêmê ya ku di konfaranse Lozanê de hat kifşkirin, mirov karê bi wê tekoşîna dewletên herêmê ya bi armanca ji dîrokê birinê û qadaxakirina zimanê kurdi re fahm bike. ..

Kurd, î ro, weke sale 1923'an, li ber statûqûya herêmê ya ku di Lozanê de hatiya kifşkirin, di şer de na. Bi serketina kurdan, wê bi teybetî, mirov karê bibêje ku wê ne tenê kurdan, wê herêmê bigiştî ji riyekê derxe û bike riyeka din de. Di deme Şêx Seîd de, ku ew bi serketiba, wê herêm, di wê demê de bigihiştta statûya xwe ku ew bi xalk û gelên xwe re têde bijî. Lê di wê demê de ev yek nebû. Lê di deme me de, birastî jî, weke ku mirov di heman rewşê de ya. Kurd, di vê demê de bi serbikevin, wê temenê ramiyarîyên ku temenê bi armancan metingerî û serdestiyê li herêmê tên meşandin, wê ji holê rabê. Vê yekê, ne tenê hêzên herêmê, hêzên dervî herêmê û hatiina herêmê û ramiyarîyên wan serdest û metingerî hene, wê wan jî bi bandûr bike. Di aslê xwe de, ancama tekoşîn şoraşa kurdan, ya sereka û ya pêşî, wê ew bê ku temenê ramiyarîyên li ser berjewendiyên yên li herêmê tên meşandin wê ji holê rakê ya. Ti hêz, ku ev hêz ji herêmê bin û ne ji herêmê bin, ku xalk û gelên herêmê esas ne girin, wê êdî nikaribin li herêmê ramiyarîyê(Sîyesetê) bikin. Bi vê yekê re bi tekoşîn û şoraşa kurdan re temenê wê ji holê dirabê. Ancama din jî ya ku wê şoraşa kurdan derxe li holê ew e ku wê têkiliyên ku hene, wê ji nû ve bide rastkirin û ava kirin a. Bi vê yekê re, wê mirov karê bibêje ku di aslê xwe de weke şoraşa herêmê ya. Wê herêm, ji nû ve wê bibe.

Bi pêşketina ku bi tekoşîna kurdan re ku tenê bi kurdan jî derketî li holê, bi wê tenê jî bê, wê êdî statûqûya herêmê, nikaribê weke berê bi wî rengê wê yê ku heya karibê bimeşê. Temen, ji wê re li herêmê bi vî rengî nemaya. Li herêmê, ji nû ve adilandina herêmê ya ku Emerîka bahse wê dike, di aslê xwe de divêt ku mirov wê jî rast û baş bixwêne. Ew jî, di xwezê jî wê pêşketina ku kurdan derxistî sûd bigirê û li ser wê li herêmê bi hin rastkirinên ku ji nû ve bîn kirin bi rêveberîyan re xwe bide berdewam kirin. Bi vê yekê re, weke hewldana di bin kontrolê de girtina şoraşa kurd hewldana Emerîka. Bi vê yekê re, di aslê xwe de divêt ku mirov w bixwêne. Bi vê yekê re, di şerê ku î ro hem bi leşkerî bin û hem jî bi ramiyarî(Sîyesî) bin bi kurdan re, bi hêzên herêmê yên ku li ber kurdan şer dikin re Emerîka jî heya. Emerîka weyn û rola salên 1923'an ya ku Îngiliztan bi Firansa re li herêmê leyist. î ro Emerîka dixwezê ku bike. Rîya wê jî, bi xwestina ew statûya ya ku di wê demê de hatiya kifşkirin, bi hinek guharandinên biçûk re dixwezîn ku bidina berdewam kirin. Bi vê yekê re, aliyekî din yê statûqûya ku di konfaranse Lozanê de hatiya kifşkirin jî, ew e ku wê metingerîya ku li herêmê ya ku wan hêzan di wê demê de dabû ava kirin dide berdewam kirin a. Konfaranse Lozanê bi statûqûya ku li herêmê afirandîya, bi vê yekê re ne tenê ji bo hêzên herêmê girîng a, her weha ji bo van hêzên ku ji derve tên herêmê jî, ji bo politikayên wan jî, girîng a. Di serî de ew statûya ku di konfaranse de hatiya afirandin, temenê wan yê li herêmê diafirêne. Temenê ramiyarîya wan jî diafirêne. Bi vê yekê re, divêt ku mirov pîr bi şaşî pêşwazî nekê ku Emerîka û Îran di şerê li dijî kurdan de li aliyekî na, bi hev re na.

Kî çi bêje bila bibêje, lê em bi êmin bibêjin ku wê tekoşîna kurdan û şoraşa wan, wê herêmê jî nû ve bistatûqû bike. Bi vê yekê re, weke artarnatîfeka herêmî, divêt ku mirov pêşketina kurdan bi

statûya wan re li ber wê statûya herêmê, wê hebe. Kurd, wê vê yekê, bi xalk û gelên herêmê re di demên pêş de hê baştir bibînin.

Ev şerê Îranê, di aslê xwe de, di ancama wê statûya wê konfaranse Lozanê ya metinger de bûya. Bi vê yekê re, ew Îrane ku digot "ez li dijî metingeriyê me", bi vê şerê wê yê bi kurdan re tevlî wê metingeriyê bûya. Îran, Şerê xwe yê şerê Çardiranê yê duyemin dimeşêne. Bi vê yekê re, divêt ku ew jî bizanibê ku wê ancama wê, ya şerê çardiranê ku bû, wê ne cudatir bê ji bo wê. Îran, heka li gor xalkên herêmê û yên li nava tevgerîya ba, divîyabû ku bi tirkî re û ku weke wê bike, li ber kurdan ketina wê ya şer nebû. Divîya bû ne ev ba. Dîroka wê ya bi kurdan re ku ji deme Medîya hate roja me tê, divîyabû ku rêz û hûrmet, wê ji wê dîrokê re bigirta. Dev jê berde ku ew tevlî wî şerî bûba, divîyabû ku wê li ber wî şerî bertek daba nîşandin. Şerê bi kurdan re wê rast ne dîtiba. Ya rast û bi rûmet ev bû. Lê Îranê, vajî vê kir. Bi kurdan re ew ket şer de. Li gor gîyane statûya Konfaranse Lozanê tevdigerihê. Li tirkî Î ro, zimanê kurdan qadaxa ya. Li Îranê jê, bi heman rengî ew qadaxa kirin heya. Îran, zimanê Bawê tahirê Ûryanî, bawê Hanifê Dînwerî û Şah Îsmâil qadaxa kirîya. Zimanê wan kurdî bû. Îran bixwe jî, vê yekê dizanê. Ne Şah Îsmâil, Bi tarîqate xwe re, wî temenê dewleta sefewîyan avêt. Ma Îranê ew ji bîr kir? ..

Ez deme ku li vê pêvajoyê û Pêşketinên ku têde bin li wan dinerin, pêvajoya 1923'an û piştê tê berçavên. Ew pêvajoya ku Şêx Seîd li ber şerî hilda tê berçavên. Tiştê ku wî xwest ku di wê de bike û nekir, di vê demê de kurd wê dikinbi tekoşîna azadiyê re. Ev şoraşa kurdan, ku di wê demê de jî bûba, wê heman ancama bi xwe re bihanîya. Di vê demê de bûna wê jî, wê heman ancama bi xwe re bêne. Divêt ku mirov wê yekê di serî de bibîne. Lê bi demê re hinekî derengtir dibe. Farq û cudatî, tenê ev a. Lê divêt ku mirov di serî bibêje ku ancama wê, wê jev ne cuda bin. Di wê demê de jî ku Şêx Seîd bi serketiba, wê serketina wî li herêmê wê pêşketinên giştî yên ku ji yên ku î ro şoraşa kurdan bi xwe re dihêne, wê ne cudatir ban. Î ro, weke ku şoraşa kurdan, wan pêşketinên ku di wê demê de wê bûban, dide kirin. Bi vê yekê re, herêmê li gor dîroka wê û rastiya wê bi têgihîştina wê re dide rast kirin. Lozan, ne li gor têgihîştin û dîroka herêmê ya. Vajî wê ya. Bi vê yekê re, wê xelatîyên ku bi peymanê Lozanê û konfaranse wê hatina kirin jî li herêmê, wê ew bîr rastkirin. Bi vê yekê re, dem di temenê rastkirinê re hêzeka bi aqil ji hemû kurdan dixwezê ku bi wê gavên xwe biavêjin û tevbigerihin.

Kurd, divêt ku vê demê pîrr baş fahm bikin û pêdivîyên wê bînin li cih. Ev dem, xûy û qarakerê wê, ji ye deme berî wê cudatira. Xûy û qarakerê wê demê yê statûya herêmê ya. Şerê ku tê meşandin jî, ji herdû aliyên ve jî li ser statûyê ya. Kurd, şerê statûya xwe didin. Hêzên ku li ber wan şer dikin jî, şerê bêstatû hiştina kurdan bi kurdan dikin. Bi vê yekê re, şerê ku dibe, xûy û qarakerê wê guharî ya. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku ev şerê ku di vê deme dawiyê de dibin, wê bandûra wan, ji her aliyê ve hem li ser kurdan û hem ji li ser hêzên ku li ber kurdan şer dikin wê hebe. îran jî û Tirkiye jî vê yekê dibînim. Ji ber ku dibînim êdî şer gurr dikin. Wê statûya

herêmê êdî bi guharê û wê kurd jî ku bi çi awayê jî bê, wê bigihina statûyekê. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku bi van şeran de ev dewletên ku şer dikin weke tirkîye û Îranê, ne tenê ji bo bêstatûtiya kurdan şer dikin. Her weha bi wî şerî re nexweşiya xwe ya dilê xwe jî dihênina li ser ziman. Ev şer, bi qasî ku şerê statûyê ya, wilqasî jî bi vê yekê yê sanciyê guharînê na jî. Kurd, bi pêşketin û pêşveçûna wan re, wê ne tenê î ro, wê di pêşarojê de jî, bandûra wan li ser welatên li dora wan wê hebe. Li ser îranê jî û li ser tirkîye jî wê hebe. Bi vê yekê re, mirov divêt ku bibêje ku kurd di navendê de na. Hem di dîrokê de, hem di demê de hem di pêşketin de û hem jî di herêmê de di cihekî giring de na. ..

Li kurdistanê bûna şoraşê, ji kîja aliyê ve ku mirov lê binerê, wê bê dîtîna ku şoraşa kurdistanê bigiştî ya herêmê ya. Wê pîrr mazin bandûrên wê li herêmê hebin. Di pêşketina herêmê de wê bandûra wê hebe. Şoraşa kurd, ku di wê deme Şêx Seîd de jî bûba, wê li herêmê, bigiştî ancamen ku î ro bi bûna şoraşa kurd re ku werina li holê, wê ji wan ne kêmtir û cudatir ban. Bi vê yekê re, divêt ku mirov vê yekê bibîne. Wê ji tîkiliyan bigira hate ku bigihê hemû aliyên din yê pêşketin yê li rojhilat wê bide guharandin. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku kurd, pêşketina û bistatûbûna wan li herêmê, wê herêmê ji nû ve biadilêne û rast bike. Di kirinê de ji xwe ev yek bûya jî. Lê tenê aliyê ramiyarî hê maya. Ew alî jî, divêt ku êdî pêşketina kurdan herê bike. Di roja ku ew her kir de wê guharandina pêşî di xwe de bide çêkirin. Bi vê yekê re, dewletên ku hate nahaka li herêmê avabûna û bê felsefe na, wê di serî de ji herême ku ew lê na, wê felsefeyekê bidest bixin. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku rojhilat, li ber guharandinaka dîrokî ya. Di aslê xwe de, hewldanên Emerîka di temenê pêşî li wê pêşketina wê girtinê de xwe didina li der. Divêt ku mirov vê yekê di serî de fahm bike. Di tafisandina pêşketina herêmê de hewldanên wê xwe didina der. Ya ku newê kirin ev a. Piştgirîya wê ya ji Îranê û Tirkîye re di şerê bi kurdan re, tenê nîşanayaka vê yekê ya û ji wê pêde ne tişteki din a. ..

Serhildan Şêx Saîd, serhildan û berteka kurdan ya piştî peymanê Lozanê re ku tê mohrkirin ya pêşîya piştî ku fahm kirin ku bêstatû hatina hiştin. ..

Serhildana şêx Seîd, hê ji gelek aliyên xwe yê din ve divêt ku werina ser ziman. Lê divêt ku mirov şert û mercên demê jî baş û qanc bizanibe ku bêne ser ziman. Wê hingî rastî were ser ziman. Di deme serhildana şêx seîd, di kîjan şert û mercan bi çi hizrê dest pê kir? Divêt ku ev jî werina zanîn. Ji wan aliyên ve hê li bendî hatina xwe ya li ser ziman a. Demên piştî yê piştî wê serhildanê, hertimî di çapamanîya tirkî hate ser ziman ku "Ingiliz, li piştî wî hebûn". Ev gotin jî, di wê demê de divêt ku mirov wê çareka din bêne ser ziman û rastîya wê ji demê û rewşa ramiyarî(siyasî) ya demê rastîya wê fahm bike. Di wê demê de Ingiliz, li herêmê bûn. Lê berî ku serhildana Şêx Seîd dest pê bike, wan hêzên bidest vekişandina ji herêmê kirina. Di deme ku vekişîyana jî, welatê bi navê "Îraqê" ava kirina. Ev welat, deme ku tê ava kirin, hingî ew beşa kurdistanê ya ku di bin destê wê û metingerîya wê de bû, di nav wê welatê ku tê ava kirin de tê

hiştin. Bi vê yekê re, rewşa kurdistanî ya herêmê hewl hate dayin ku ji holê bê rakiirn. Kurdên weke Şêx Mahmudê berzencî, inglîzian bi hêzên xwe bixwe re li ber wî ketina şer de û ew têk birin. Piştî wê serhildana şex Mahmudê berzencî û têkçûna wê re, êdî herêma kurdan jî weke ku ji mafê xwe yê xweza hate dûr kirin. Piştî ku Inglîzian xwe bi şûn ve kişand, êdî melîk Faysal hanîna û danîna ser rêveberîya wir. Di wê rêveberîya wî de çend ku Di parlamana ku piştîre tê ava kirin de ji 88 û an jî 89 parlamana ji şîyan re tê vaqatandin. Lê kurd, bi ti awayê nayêna Nîmînêr(temsîl) kirin. Mafê wan nîn a. Kurd, ku li ber xwe didin jî, hewldana li ber wan sekinîn ya bi artişê dihê holê. Li Îraqê wê demê ya ku nû hatîya avakirin de ev yek dihê holê. Îran, di wê demê de di wê rewşê de bandûra wê, mirov nikarê bêje ku nîn a.

Inglîzian, çend ku hêzên xwe bi şûn ve vekişandina jî, hewldana wan ya wê herêma ku di bin destê wan de bû di deme ku li herêmê bûn de piştîre jî, bi rêveberîya ku li ser wê herêmê bigiştî avakiirna dixwezîn ku bi wan ve girêdayî bê. Tirkî jî, piştî Osmanîyan re bi piştgirîya aşîrên kurd yên ku du kongira Erzûrûmê de hanîna li cem hevdu de hatîya avakiirn. Bi wê re, êdî piştîre tekoşînek tê dayin û bi serketin dibe. Di wê demê ku navende wê Şam e jî, di qadaka mazin de ku hate ku herêma Libnanê jî di nav de ya, di bin serdestî û serwerîya firansîyan ya ramyarî de ya. Rêveberîyên arabî yên ku hê ji nûkava ve rêveberîya Osmanîya li herêmên xwe têkbirina, têkilîya wan bi firansîyan re heya. Fileh û hin komên din yên civatî yên herêmê firansîyan dîke ku piştî xwe bide wan û bi wan li herêmê hebûna xwe bi parêze. Lê wilo zêde bandûra wan nîn a. Rêveberîyan arabî yên ku hê jinûkava osmanî li herêmên xwe têkbirina, bandûra wan bi wê hewayê serhildanê û serketinê ya wan re heya. Îran, di wê demê de ne di wê hewayê de ya. Nêzikatîya wê ya bi İngîlîzian û amarîka re pîr xurt a. Piştgirîya wan jî ji rêveberîya wê re heya.

Firanse, hêzên wê li herêmê, di qadaka mazin de dîke ku xwe li ser lingan bigirê. Tirkî deme ku tê avakirin, bandûra wê heyîna Firanse li ser wê pîr mazin heya. Bi wê bandûrê ku komarîya firanse ew dîke ku ji xwe re bike minaq. Bi wê bandûrê re firanse, dîke ku piştgirîya wê jî ji xwe re jî wê rewşa xwe ya li herêmê re bigirê. Wê piştgirîyê jî digirê. Têkilîyên rêveberîya tirkî ya ku ji nû ve ava dibe, ji deme ku hatî ava avakirin pêde bi firansîyan re heya. Di wê deme ku yekîtiya sovyet tê avadibe jî, êdî ew têkilîya ku heya hê jî tê xurtkiirn. Li herêmê İngîlîzian û Amarîka, naxwezê ku welatekî dî tevî yekîtiya sovyet bibe. Bi vê yekê re, di kordîneyekê de ew têkilî dihê berdewam kirin. Di wê demê de, deme ku konfaranse Lozanê tê li darxistin û peymanê Lozanê piştîre di ancama wê konfaransê de tê mohrkirin, wê wê rewşê jî li berçav bigirê bi rewşa metingerî ya firansa û İngîlîzianê ya ku li herêmê hebû. Firanse, çendî ku î ro wilo zêde newê ser ziman jî, di wê konfaransê de pîr mazin nîqaşna wê yê ku hate roje me hê ne hatina vekiriin ji çapameniyê re dîke û bi wê re dîke ku temenê xwe yê li wir dîke ku bide berdewam kirin.

Tirkî, di berdêla ku li gor wan bê, sînorê wê yên nû yên piştî têkçûna osmanîyan re tene xîzkirin. Çendî ku di demên piştîre de tê gotin ku "pirsgirêka Musil û kerkukê" jî ku li ser hatîya

axiftin jî, ku çendî ku ev rastî ji bê, ew axiftin tenê li ser wê nifta wê ya ku di wê demê de hatîya kifşkirina. Ne ku li ser ast û heyîna dî ya. Ingiliztan, di wê demê de van herdû bajarên kurdistanê, di nav sînorê başûrê kurdistanê de di welatê ku ji nû ve avakirîya di Îraqê de dihêlê. Firanse jî ya ku dixwezê di wê demê de bidest dixê. Ya ku wê dixwest, ew bû ku herême di bin serdestîya wê hêze wê de ya, wilo weke xwe bê parastin. Ev xwesteka wê jî tê li cih. Bi wê konfaransê re, bi teybetî ingliz û firansa dixwezin ku rewşa xwe ya li herêmê bi parêzên. Di parêzên jî. Piştî konfaranse Lozanê re peymanê ku tê mohrkiirn, peymanê ku wê rewşa wan bi parêzê ya. Ji wê pêde ne tiştêkî dî ya. Peymanê fermîkirina metingerîya firansa û Ingiliztan ya li herêmê ya.

Piştî peymanê re di serî de ingliz, firansîz û îran û Tirkî jî, weke ku ya ku dixwezin zêdetir bidest dikin. Lê yê ku di wê peymanê de li berçav nayê girtin û mafê wê ji hemû aliyan ve ji destê wê tê girtin jî kurd in. Kurd, piştî mohrkiirina peymanê re êdî kurd weke werina xwe li wan tê. Fahm dikin ku êdî rêveberîya wan ji destê wan hatîya girtin. Bi wê yekê re, êdî li herêmên kurdan wê tevgerîyaka mazin biafirê. Serhildana Agirê, çend ku weke ku tê zanîn di deme piştî serhildana agirî de destpêkirîya jî, di deme berî serhildana şêx seîd de di naqabîna salên 1923-24an de hin tevgerîna mazin hene. Deme ku temenê serhildana şêx Seîd ji aliyê kurdan ve tê avêtin, wê êminbûnak li wê tevgerîyê jî hebe ku deme ku serhildanê dest pê kir, wê kurd wê herêmê êdî di cih de bikina destê xwe de bi herêma ku wê serhildan jê dest pê bikin û piştê bi ber herême botanê de çûyin bibe. Li herême botanê jî, tevgerîyaka mazin di wê demê de di deme berî serhildanê de hebû. Ne tenê hêzên rêveberîya tirkî ew tevgerîya li wir dişopand rêveberîya ya li herêmê ya firansîz jî ew tevgerî dişopand. Ji xwe, berî wê demê raperîna aşîrî ya Haco bûbû.

Di wê demê de gelek qaracol û cihê ku di destê hêzên tirkî de bûn di rojekê de kiirbûbûna destê xwe de. Bi teybetî, di wê deme wê raperînê de li berçîyayê Gabarê tevgerîyaka mazin hebû. Kurdên herêmê hingî hemû jî bi aşîrî hevgerîna wan ya xurt hebû. Ji wan aşîrên din jî, wê tevgerîyê û raperînê piştgirî standibû. Firansîzîyan dişopand, ji ber ku di bindestê wan de jî, beşeka herême kurdan jî hebû. Bi wê yekê re, deme ku kurdan li wan deveran serî hilda û bi serketin, wê hizir dikir ku wê êdî kurd berê xwe bidina wê. Wê êdî bi wê li herêmê nikaribe xwe bigirê. Ji ber vê yekê bû ku êdî tîkiliya wê ya ji rêveberîya tirkî ya bi piştgirî xurtbûbû. Dem ku bi ber bûna serhildana şêx Seîd ve diçê, êdî hin bi hin li herêmê tevgerî zêdetir dibe. Di wê demê jî sîxorên Ingilîzîyan ji bo ku rewşê bişopênin, yê Ingilîzîyan ku ji bo wan kar dikirin zêdetir bûn. Wan jî rewş dişopand. Kurd, di wê demê de li ser lîngan bûn. Piştî ku peymanê Lozanê hatibû mohrkiirn û denezêne ku di hatina weşandin re kurdan wilo xwe hîs dikirin ku "xîyenet" li wan hatibû kirin.

Kurd, bi wê yekê re êdî ji xwe biêmin dikin ku serî hildin û bi serbikevin. Kurdan, di wê demê de ku bi amekariyaka ne wilo mazin jî ku ketina şer de bi rêveberîya tirkî re wê bi serketiban. Ji ber ku wilo zêde li ber kurdan ti 'sihûda' wan nebû. Lê deme ku rewşa ku ji bo serhildanê di nav

kurdan dihê dîtin û fahmkiirn, ji rêveberîya tirkî zêdetir rêveberîya Ingliz û ya firansizan bo wûcanîya xwe yên li ser herêmê dikevina nava tirsekê de. Ku kurd, ketina serhildanê de û li herêmê xwe ya ku di nav sînorê tirkî hatîya de hiştin ku bi serketin, wê êdî rêz hatiba qatên din yên kurdistanê yên ku di bin serwerî û serdestîya Ingiliz û firansa de. Wan jî, ev yek hizir dikir. Ji ber vê yekê, êdî bala wan pîrr mazin çûbû bû bi ser wê beşa kurdistanê de. Di wê demê de amekarîyên serhildanê hatina astaka berdawîbûnê. Lê ji bo serhildanê bi tememî amedbûnî nebûya. Kurd, dikin ku wê amedekarîya xwe ya dawiyê jî bi dawî bikin û êdî li ser herêmên xwe bi serwerî û serdestîya xwe re desthildarîya xwe ava bikin. Kurdan, wilo xwe amede dikir ku êdî di demeka kin de bi serbikevin û nehêlin ku wilo zêde şer bibe û wilo zêde windahî bibin. Lê di wê deme amedekarîya dawiyê de serokê serhildanê yên amedekar yên weke doktor Fuad û hwd, berî ku ew amedekarî bidawî bibe, têne girtin û têne bi darve kirin. ..

Serokên li pêş yên serhildanê yên ku asil hemû têne girtin û bi darve kirin. Tenê yê ku dimêne ku di deme serhildanê de ne di nav mirovên di pêş de jî bû şêx Seîd sax dimêne. Ew, êdî di hizirê ku karê ku waqas rêveberîyên "komala azadîyê" yên ku dikirin, hemû weke ku li ser milê wî dimêne û dikeve ser piştî wî de. Piştî wan girtin û bi dervekiirn rêveberên serhildanê, êdî şêx Seîd jî, di hizirê ku ka serhildanê amedekarîyên wê bide berdeham kirin û bike û na jî nekê. Di wê yekê de weke ku di serî de waswasbûnak di dilê wî de diafirê. Lê piştî serhildana wî dest pê dike. Lê bêî ku wan amedekarîyên xwe yên dawiyê bide kirin û tamam bike. Di wê demê de li Pîranê kuştina du leşkerên tirk wê bê destpêkirina serhildanê hê ku ew amedekarîyên wê dawiyê ne hatina tamam kirin. Lê çend ku bêî ku wan amedekarîyên xwe yên dawiyê bidawî bike jî, deme ku hêzên kurd bi artişî dikeve tevgerê de, di tevgere pêşî de li gelek herêmên xwe serketina xwe di denezênin. Herêma Pîranê û hwd jî, weke herêmeka navendî ya wan dibe. Piştî di cih de ji navenda komalê şêx Seîd, peyamê ji herêmên din û serokên aşîran dişêne ku ketina serhildanê de ku êdî ew jî tevî wan bibin û rêveberîya herêma bikina destê xwe de.

Tevî ku di deme piştî girtina Şêd Riza re Dersim, hêzên rêveberîya tirkî hin sefern li wir kiribûn û bi nêzî 9 û an jî 10 hezar kurd di carekê de kuştibûn jî jî, dersim wê dîsa karibe herêma xwe di wê de rêveberîya bêne wê astê ku bike destê xwe de. Herêmên Mûş, wan, Agirî û botanê jî tevgerîya wan, piştî şandina peymanê Şêx Seîd re zêdetir dibe. Hêzên rêveberîya tirk ku ketina ber raperîna serhildên kurd de hatina têkbirin. Êdî di demeka kin de bi hezaran leşkerên tirk dil jî têne girtin. Kurd, êdî li herêmên xwe yên ku kirina destê xwe de li ber denezendina rêveberîya xwe ya herêmî na ku êdî were naskirin. Êdî di wê demê de bi tememî di hate bawer kirin ku hêzên tirkî têkçûna. Li ber wan li pêşîya wan ti hêz nema bûn. Di wê demê de firansîzî dikevina dewrê de û destûrê didina rêveberîya tirkî ku bi hezan leşkerên xwe ku bi çekên giran veguhazina l herêmên kurdan bikin ku ji paş ve bihêzekê giran herina bi ser wan hêzên kurd de û wan têk bibin. Ji ber barkiirna wan leşkeran li cihên ku li pişt serhildên kurd dimênin firansîzî bi tîrenê

alîkarîyê jî wan re dike. Bi trenê leşkerên wan bar dike li cihên ku wê bidest çûna bi ser hêzên kurdan de bikin.

Rêveberîya tirkî ya ku têkçûya, wê bi wê piştgirî û alîkarîya firanse, wê êdî ku hêzên dişene wan herêmên ku li şûn serhildên kurd dimên in, êdî wê bi hêzên kurd re bikevîne şer de û wê bidest têkbirina wan bikin. Ev alîkarî, wê rewşa hêzên tirk ya têkçûyî wê biserbixe. Piştî jî xwe ne bi gelekî re wê kurd, li gelek herêmên xwe êdî bidest têkçûnê bikin. Şêx Seîd, deme ku agahî digihîjê wî ku rewş bi alîkarîya firansîza ya leşkeran re li pişt serhildên kurd re, êdî wê rewşê baş û qanc fahm bike ku rewş ketîya rewşaka xirab de. Êdî ew jî, li wir zêde di cihê xwe de namêne û dike ku jî herêmê herê û serokatîya serhildanê hildê awlahîyê. Lê di deme ku ew diçê di rê de tê girtin. hewlingê wî ku wê demê di nav artişa osmanîyan de jî demekê leşkertî kirîya û bi navê "bînbaşı Qasim" tê nasîn, wê bi alîkarîya wî şêx Seîd û 49 heval û rêhevalên wê yên ku bi pê re rêveberên serhildanê bûn û bi wî re bûn, wê dil bêne girtin û di cih de di deme pîr kin de wê ew hemû bêne bi darvekirin. Ew girtin û bi darvekiirn, êdî wê domeneke nû wê di dîroka kurd û kurdistanê veke.

Piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd û girtina wî û bi darvekirina wî re, êdî weke ku jî bo serwerî û serdestîya Îngiliz û firansîzan ku hin herêmên kurdan yên ku di bin metîngerîya wan de jî bûn, xateratî weke jî holê rabûbû. Şêx Seîd, di deme xwe de û di deme serhildane xwe de hêzeka herêmî bi vê yekê ku wî jî zan ne dikir li ber xwe dîtibû. Hêze Îngilîzên ku tirk hertimî propaganda dikirin û digotin ku "ingilîzan ew rakirina serhildanê", bi tirkî re li ber wî tekoşîya bûn. Firansa jî bi wan piştgirî û alîkarîyên xwe re alîkarîyaka mazin dabû tirkî bo ku serhildana şêx Seîd têkherê. Ku ew alîkarîya di wê demê de ku Firansan nedaba rêveberîya tirkî, wê ti carî kurd li ber wan têk neçûbûna û wê bi serketiban. Deme ku Firansa alîkarî bidest dayîne kir li rêveberîya tirkî, hingî, kurdan li bakûrê kurdistanê ku mirov bêje ku nêvî bi nêvî kiribûbûna destê de wê ne gotinaka xelat û şaş bê. Îngiliz û Firansîyan, pîr li ser peymanê Lozanê sekinî bûn.

Bi vê yekê re wê bi rêveberîya tirk re di levkirinekê de li ber kurdan sekinî ban. Ku mirov wê demê bi hevkarîyaka van hêzan têkbirina şêx Seîd baş û qanc fahm nekê, mirov wê baş û qanc fahm nekê ku di roje me de ku ew 22 sal in ku rêveberîya başûrê kurdistanê ava ya lê ku hê destûra xwe ya bingihîn ne nivîsandîya û astengên li pêşîya wê nivîsandina wê jî baş û qanc fahm nekê. Hingî serketina kurd ya bihiştina azadîya xwe, wê serwerî û serdestîya Îngiliz û firansîzan ya li ser herêmê ya bi metîngerî wê jî holê hatiba rakirin. Bi têkbirina kurdan û Ingilîzan herêmên ku li rojhilat kiribûbûna bindestê xwe de dibin navê welatîfîya "Îraqê" de û firansîzan jî di bin navê Sûrî de parastin.

Ku Şêx Seîd biserketiba wê ew peyman jî di kirinê de jî holê rabû ba. Bi wê yekê re wê êdî temenê Firansa jî û yê Ingilîzan jî yê ku wê rewşa xwe ya li herêmê nikarîban bidina

berdewam kirin wê afirîba, wê holê rabûba ew temenê wan yê li herême. Ku hêzên kurd, ew veguhaztina hêz ya li pişt wan di deme xwe de farqkiriban û ew bê bandûrkiriba, wê êdfî firansa weke hêzên inglîzan yên ku berî wê vekîşiyabûn wê ew jî herême bidest vekîşîna hêzên xwe jî herême bikira. Wê Îraqê ku li gor peymanê Lozanê ku wê herême ku serwerîya Ingilîzan li ser bû, weke xwe bi parastina wê jî holê rakiriba. Wê ew herême ku ew beşa başûroavayê kurdistanê jî di nav de ya û ku piştê bi Paxte Sadabadê re li ser wê axê Welatîtiya "Sûrî" hate pêşxistin, wê holê rabûba. Lê berî wê, wê temenê firansa yê li herême ku êdfî kariba bima, wê jî bin şamitî ba. Wê ew statûqûya li herême ku di wê demê de li ser serê wê hatibû afirandin bi peymanê Lozanê re, wê jî binî ve hatiba xirakirin û wê rewşaka herême ya nû biafirî ba. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku wê ancemê wê serketina şêx Seîd li herême rewşaka serketinê ne tenê jî kurdan re bihanîya. Wê herêmen araba jî û yên kurdan yên din jî, wê bi jî holê rakirina temenê peymanê Lozanê re wê jî herême ew hatiban derxistin û êdfî herêm, wê bi serê xwe bigihiştê pêşketina xwe ya bi serê xwe di wê demê de. Bi vê yekê re, pêşketina herême wê êdfî bixwe bûba.

Piştî Lozanê ku serhildanên kurdan zêdebûn, êdfî welatên kurdistan di nava wan de hatibû qatkirin, bo pêşîlêgirtina serhildanên kurd, Paxta SADABADÊ li darxistin û di wê biryara jidandina sînoran û kûrkirina zihniyeta Lozanê dan....

Ji kîjan aliyê ve ku mirov kîjan pêşveçûna ku li rojhilat bûya bêne ser ziman, divêt ku mirov wê sadsalê jî destpêka wê hildê dest û bidest hanîna wê ya li ser ziman bike. Ji bo ku baş were fahmkirin jî, ev yek pêdivî pê heya. Bi demê re ku dem tê salên 1900 û wan, êdfî demeka nû li wê jî dest pê dike. Rojava ji deme jinûvebûnê(ronasansê) ve ketina xateka pêşketinê ya di xwe de. Bi wê xatê de bi aqil û zanînê re xwe jî nû ve li gor demê afirandin, wê weke xoslet û teybetmendiyê demê bê. Dem bi dem, wê aqil pêş bikeve. Bi wê re, wê di nav civak û civatan de jî pêşketin bibê. Rojhilat, ji ber rêveberiyên weke yên Osmanîyan, jî wê pêşketinê û awayê wê yê biaqil dût dikeve. Lê rojava dem bi dem jî wê demê pêve bidest pêşketina mazin ya di demê de ya bi xwe re dike. Rojava, piştî deme jinûvebûnê re, êdfî hin bi hin, wê pêşveçûna xwe ya bihi zir, wê hin bi hin fêkîyê wê bidest bike. Şoraşa Ingilistanê(1640), şoraşa Amarika(1776 û şoraşa firansa(1789), şoraşên ku mirov bigirîngîyekê bêne ser ziman in û şoraşên ku wê jî pêşarojê jî bina manîfesto û perspektîf in. Bi teybetî, Şoraşa Firansa, pîr girîng a. Bi rewistîya wê ya zorî re wê demekê bi xwe re bide destpêkirin. bandûra wê, wê li her gelên demê bibê. Piştî wê re, wê "demeka şoraşê" wê dest pê bike. Rewiste ku bi wê derdikeve pêşa jî, rewista şoraşa netewî ya. Bi wê yekê re pêşî tégîhiştin diafirê û piştê li dinyê li her devera wê, mirov karê bêje ku hema bêja her gel wê şoraşaka netewî bike. Sadsale 18. min, demeka ku piştî wî demê re di qada civatî û civakî de tégîhiştina xwe bixwe diafirê. Bi wê re êdfî rabûna ser xwe diafirê.

Rojava, wê di wê demê de, bigîşt wê şoraşaka netewî bike. Li her qitaya dinyê wê şoraş pêşkevin. Rewiste wê demê dualî ya. Ew dualîya wê, wê bi awayê civakîtiya wê û komalgarîya wê re ku di bin navê "Sosyalizm"ê de wê pêşketina wê bibe. aliyê din jî, ku aliyê netewî ya û bi navê wê demê "şoraşa burzîwa" dibe. Pêşketina pêşasazîyê, di temenê wê şoraşa burzîwa de ya. Aliyê yekemin ku bi navê sosyalizmê jî tê ser ziman, wê bi astakê xwe li ser wê bêne ser ziman û wê piştîre bûna xwe denezana wê bike. Gotina Lenîn, ya ku digot ku "pêşî şoraşaka burzîwa li welêt, piştîre ji wê buhurîna li sosyalizmê", wê temenê wê têgihîştinê biafirê û wê rastîya wê bêne ser ziman. Rojhilat, di pêşketina xwe de, di bin statûqûya rêveberîyan de dimêne û wê pêşketina xwe ya civatî û civakî najî. Ji ber vê yekê, êdî li şûn demê dimêne. Li Îranê û Tirkî jî, pêşketinên ku di wê qadê de têne ser ziman, mirov ku ji destpêka wê hilde dest, mirov nikarê ne weke şoraşna netewî bêne ser ziman û ne jî, weke şoraşna pêşasazî bêne ser ziman. Ji ber ku di temenê wê de, temen nebû. Îran, temenekî wê yê pêşketinê i herêmê baş hebû, Ew jî bikar ne hanî. Tirkî, weke qalibekî hate afirandin û piştîre bi programên bişavtinê hate xwestin ku wê qalibî dagirin. Bi wê yekê re bi dehan xalk, ziman û çanda wan re ji holê hatina rakirin. Lê ew jî, di wê deme xwe de ne di wê astê de bûn ku wan pêşketinên li herêmên xwe bidina kifşkirin. Rojava bi pêşketina ku di xwe de jînkirîya û bi wê pêşketinê re rêveberîya xwe ya ku afirandîya, bi wê ve girêdayî, pêşveçûnên rojhilat dide kişkirin.

Rojava, di deme sedeme du şerên cihanê. Şerê pêşî yê cihanê, wê bi tememî, ahang(denge)a herêmê jî, wê li ser bike xwedî gotin. Piştî re rojava, bi harikîn berî xwe dide rojhilat û bindestiyê pêş dixê. Dewlemendiyên wê, têne harikîn li rojava. Rojava, piştî şerê cihanê yê yekemin, êdî rojhilat, bi tememî bi rêveberîyên xwe re ketinedestbûnekê dijî. Tirkî hate avakirin, lê di avakirina wê de Ingiliztan, xwedî weyn a. Îran jî ji navinaka xwe ve hatîya girêdan. Piştî şerê cihanê yê yekemin, derketina li holê ya yekîtiya sovyet jî dibe. Ew jî, wê ahangên dinyê yên ramyarî û herêmî hemûyan tevî hev bike. Bi derketina wê re, wê qutup biafirin. Piştî şûrê cihanê yê yekemin re, wê di konfaranse Lozanê de wê sînorên herêmê bê ku gelên herêmê li berçav bêne girtin, wê bi cetwelan wê werina xîzkirin. Kurdistan, welatekî ku di wê peymanê de bi cetwel xizkirin li ser naqşa wê bûya û ew hatin qatkirin li çar qatan. Mafê kurdan yê desthilatdarîyê ji her aliyê ve hate ji holê rakirin û ji wan standin. Di demeka ku şoraşên gelan hemûyan bûn de kurdistanê ev rewş jîya.

Peymane Lozanê, peymaneka ku weke pyemanên ku piştî wê re di berdewama wê de hatina mohrkirin yên weke paxta Sadabadê, Paxta Baxdadê û peymanê Cezayîrê û hwd, paxt û peymanên dudîmenî na. Dîmenîya wan ye pêşî, bi herêmê re û pergaliya ku li herêmê bistaûqû û statû ku hatina afirandin re dihê ser ziman. Dîmenîya din jî, bi welatên rojava yên weke Ingiliztanê û amarika re ku li herêmê serdestîya wan dihê afirandin re dihê ser ziman. Herdû alî bi hev re di ahangekê de hatina afirandin. Pergalên ku li herêmê bi dîmene pêşî re hatina avakirin, bi awayekî wilo hatina afirandin ku dîmenî duyemin bi hebûna xwe re li ser lingan bigirin. Bi vê

yekê re, mirov karê bêje ku herdû alî bi hev ve bi awayekî hoyandinî hatina afirandin. Herdû alî hevdû li ser lingan dihêlin. Bi wê yekê re, aliyek çend ku bê ku aliyê dî hebe, çawa ku nikare xwe li ser lingan bigirê, aliyê ku xwe li sr lingan digirê jî, ku piştê wê ne li rojava bê, nikarê xwe li ser lingan bigirê. Bi vê yekê re, xwediyê xoslet û teybetmendiyên xwe ya. Kurdistan, deme ku di konfaransa Lozanê de hate qatkirin, di nav wê rewşa hoyandinî de hate qatkirin û hate bicihkirin. Bi vê yekê re deme ku kurd ji bo welat û jîyane xwe bikevina tekoşînê de weke ku ne tenê li ber welatên herêmê yên ku ser serê wan serdestin dikevina tekoşînê de, weke ku li ber pergâlên ku ew pergâlên herêmê bi wan ve girêdayîna re jî bikevina tekoşînê de na. Bi vê yekê re, divêt ku mirov rewşê baş û qanc fahm bike. Rêveberên rojhilat, bi vê yekê re di vê rewşê de di aslê xwe de ne bi vîna xwe na jî. Ew, ne bi serê xwe pêşketinên di nav xwe de jî kifş dikin.

Peymane Lozanê, weke destpêka wê hoyandinê ya. Şert û mercên demê yên ku di demê de bi derketina li holê ya yekitiya sovyetê ku afirîna jî li berçav têne girtin. Bi wê peymanê re, bi vê yekê re, bi hev ve hoyandin dihê afirandin. Ew peyman, di aslê xwe de, peymaneka ku piştî şerê cihanê yê yekemin bûya yê wê şert û mercê ya. Bi wê peymanê re, di deme ku yekitiya sovyet tê avakirin û piştê bi artişa sipî rojava li ber wê dikeve şer de û têk diçe, êdî valahiya ku bi wê têkçûnê bi wê re afirîya bi wê peymanê re bidest dagirtina wê dihê kirin. Piştî wê peymanê re wê peymanên din jî, wê li dûv wê werina çêkirin. Peymane piştî peymanê Lozanê re ku dihê mohrkiirîn paxta Sadabadê ya. Ji gelek aliyan ve divêt ku mirov li ser wê paxtê jî bisekinê Ev paxt jî, weke peymanê Lozanê ku hatiya mihrkirin, wê pêvajoyaka afirandina pirsgirêka kurd biafirîne. Peymane Lozanê piştî ku hate mohrkirin, piştê hate salê 1935an, wê deme dana herêkirina wê bê. Hêzên herêmê wê hemû wê herê bikin. Piştî mohrkirina peymanê Lozanê re wê Ingiliztan wê ji rojhilat hêzên xwe bidest vekirînin bike. Aliyê qate kurdistanê başûrê kurdistanê qate ku ew lê bicih jî bû, wê ewder di nav welatê ku navê wê bi avakirina wê re êdî piştî peymanê Lozanê re tê rojavê de wê bê hiştin. Lê wê kurdistanî, ti carî wê rewşê herê nekin. Ingiliztan, nifte wê derê jî, li berçav digirê û wê rewşê diafirîne.

Bi peymanê Lozanê re wê sînorê tirkî werina kifşkirin. Lê di aslê xwe de, wê sînorê Îranê jî werina kifşkirin. Sînorê Sûrî û Îraqê jî werina kifşkirin. Kurdistanî, di wê konfaransa ku ew peymanê tede hate mohrkiirîn, hatina bê statû hiştin. Lê statûyên hêzên herêmê yên din hatina kifşkirin. Piştî wê peymanê re, wê li başûr jî û bakûr jî û rojhilat jî, û li başûr rojava jî, wê raperîn û serhildanên kurdan wê bibin. Lê, her raperîn û serhildanên wan wê bi xwûnê werina tafirandin. Li Bakûrê kurdistanê Serhildana Şêx Seîd û agirî, serhildanên herî mazin yên ku herêmî bûn. Li başûrê kurdistanê bi Şêx Mahmudê Berzencî re raperîna kurdan dest pê dike û piştê di domê. Şêx Mahmudê berzencî, li ber Ingiliztan jî dikeve şer de. Lê ew wê têk herê. Piştî re wê rewşa kurdan ya serhildanê wê berdeham bike. Her serhildanên wan têna tafirandin. Piştî ku serhildanên mazin yên herêmî yên kurdan yên weke yên Şêx Seîd, agirî, Şêx Mahmudê berzencî û hwd, têne tafisandin, êdî demeka rastkirina kurdistanê li gor peymanê bi hêzên herêmê re dest pê dike.

Herême Kurdistanê ya Dersimê piştî bidarvekirina Şêd Riza re jî, wê bi herêm bi herêm wê li ber xwe bide.

Hate salên 1936 û hwd, wê berxwedana wê herêmê wê berdewam bike. Lê hêzên dewletê jî pîrr mazin bi ser ve diçê. Hate wê demê, weke ku tê ser ziman, 97 seferên leşkerî lê tê kirin û bi wê rastkirin lê tê kirin. Bi jenosîda Dersimê, hate wê demê weke ku tê dawiyê. Bi kuştin û girtinan û bi darvekirinan re herêm, êdî bêdeng dibe. Ji wê bêdengîyê, êdî tirkî jî û Îran jî û firansa jî bawer dike ku êdî wê deng dernekeve ji kurdan. Piştî wê re êdî bidest amdekirina paxte Sadabadê tê kirin. Paxte Sadabadê, wê li ser wê bêdengîyê re ku hatîya çêkirin re bi komkuji û kuştin û bi dervekirinan li ser wê re wê bidest amedekariya wê bê kirin. Hêzên Herêmê, Îran, tirkî, Sûrî û Îraq, wê di wê demê de bi paxta Sadabadê re wê sînorê wan werina kifşkirin. Sûrî, bi teybetî, sînorê û çêkirina wê, wê bi biryarî, wê di wê paxta Sadabadê de bibe.

Di wê paxta Sadabadê de, wê sînor bêne hilda li dest. Wê li ser sînoran nîqaş bêne kirin. Wê sînor di wê paxtê de di nav Îranê, Sûrî, Sûrî(hîngî hîngî hê ew aliyê kurdistanê û Surî dibin destê firansa de bû. Biryara avakirina Sûrî jî di wê paxtê de dikeve merîyetê de. Wê çawa nêzîkatî li wê qata kurdistanê ya ku wê di nav wê sînorê wê de jî bimêne, di wir de ji aliyê welatên ku tevî paxtê dibin tê kifşkirin.) **û Îraqê de bêne safîkirin. Rêveberî û pergale ramyarî(sîyasî) di wê de sînorê wê têna kifşkirin. Qatên kurdistanê yên ku di nav sînoran de mana, li ser wan jî di wê paxta Sadabadê de li ser pîrr mazin hate axiftin. Di wê paxta Sadabadê de hate kifşkirin ku wê ne kurdên rojhilat, karibin ji sînor bi buhurin û herina başûr, başûrrojawa û bakûrê kurdistanê, kurdên bakûr, wê nikaribin herina rojhilat, başûr rojava û başûrê kurdistanê, Kurdên başûr rojava, wê nikaribin harina bakûr, başûr û rojhilatê kurdistanê.** Di paxta Sadabadê de hate kifşkirin ku wê sînor bêne jidandin û wê derfet ji çûn û hatina kurdan a li cem hev re nebe. Ev yek, di paxta Sadabadê de weke biryarekê hate kifşkirin. Bî teybetî di paxta Sadabadê de li ser Sînorên ku di kurdistanê de bi qatkirinê re hatina afirandin re hate sekin in. Li ser parastina wan sînorên hundurê kurdistanê yên ku bi qat hatina afirandin, hate sekin in.

Paxta Sadabadê, weke paxtaka kifşkirin û parastina sînoran ya bi vî rengî bû. Xalake din jî ya ku di wê paxta Sadabadê de hatibû nîqaşkirin jî, ew bû, ku kurdên ku li ber welatekî ku di paxta Sadabadê de serî hildana, wê welatê din, wan ne pazarê. Wê vajî wê, wê alî hevdû bikin û bikin ku wan bêbandûr bikin ji bo hevdû. Ev xal, weke xaleka ji parastina aramîya hevdû hate dîtin. Bi ji holê ra rakirina nîrx û ziman jî, hewldanên ku wê bêne kirin, di wir de axiftin li ser wan bûya. Bi navê kurdî û kurdan, wê nîrx li jîyanê newina hiştin. Wê Îran li kurdên ku li aliyê wê mana bide bawerkirin ku ew fars in, wê tirkî bi wan bide bawerkirin ku ew tirk in. Wê sîrî û Îraq bi wan bide bawerkirin ku ew arab in. Ev jî, weke aliyekî parastina aramîya pargalîya serdest di wir de hate dîtin. **Ev rewş û paxt, ku hate roja me jî ji aliyê dadî û ramyarî ve di merîyetê de**

dibuhurê, di wê de rewşa ku di peymanê Lozanê de hate kifşkirin, dana berdeham kirina.

Piştî mohrkiirna wê peymanê ketina rêveberîya desthildatdarî bi dest guharandinê re û hatina desthildatdarîya komara Îranê ya Îslam jî, wê di deme xwe de ew paxt weke ku çawa hatibû mohrkiirn û afirandin, hate berdeham kirin. Ti guharandin û nîqaş jî, di wê de neda jînkirin.

Paxta Sadabadê, weke girtina demekê û vekirina demekê bû li herê mê. Hêzên ku ew li darxistin jî, wilo di dîtin. **Piştî wê paxtê re, êdf bahse kurdan jî ji xwe ne dihate kirin. Navê wan jî hatibû ji holê rakirin. Li aliyê tirkî jî, li aliyê Îranê jî, li aliyê Îraqê û li Aliyê komara ku di wê demê de hê nû hatibû avakirin ya Sûrî jî, sazîyê welêt, li her derê herê mê, çî berhem, pirtûk, nivîs û hwd, bi kurdî hatina dîtin, hatina lewkirin(berhevkirin) û ji holê rakirin.** Ev jî, di paxtê mijarên ku li ser hatibûbûna axiftin û piştê di kirinê de hatibûbûna kirin. Li aliyê tirkî, ku ji pirtûka Ahmdê xanê ku mirovekê Firansî ravanda Libnanê û li wir da çapê pêve, ji salên 1968 pêde, ti kurd nikarin bahse ti berhem pirtûk, nivîs û hwd bikin. Yê ku bi gotinî di aqilan de hatina hiştin parastin, weke qasîdeyên Feqiyê Teyran, Meleyê Cizîrî, Ahmadê Xanê û hwd, pêde bi nivîskî ti pirtûk mirov nikarê bahs bike. Weke gotinekê mirov karê bêje ku meleyê Cizîrî di sadsale 15 min de jîya ya û 43(çilûsê) pirtûk li şûn xwe hiştina. Lê hemû jî holê rakirina weke berhemên zanistên kurd yê din hemûyan. Ev rewş hemû, wê di demê de dibin. Paxta sadabadê, weke paxteka ku hertimî pêşîya ramiyîya kurd û pêşketina wê digirê ya. Hate roja me jî, ew astangbûna wê heya. Piştî Paxta Sadabadê re Paxte Badadê hat mohrkiirn, lê li gor gîyan û kifşkirinên ku di peymanê Lozanê de hatibûbûna kifşkirin û di paxte Sadabadê de dabûbûna berdeham kirin, tevgerîn û kifşkirin bû. Piştî wê paxta Sadabdê re ketina yekitiya Sovyet ya li rojhilatê kurdistanê û li wir komaraka kurd ya bi navê "komara kurd ya Mihabadê" hate avakirin re qûlbûna Paxta Sadabadê bû. Lê piştê bi Paxte Baxdadê, hewl hate dayin ku ew qûl bê girtin. Piştî wê paxtê baxdadê re jî, peymanê Cezayîrê jî, deme ku tê mohrkiirin, wê li gor wê paxtê Sadabadê were mohrkiirin. ..

Paxte Sadabadê, bi gîyane wê re demên piştî wê re hatina rastkirin û adilandin. Herê m, ji nû ve hate rastkirin û adilandin. Lê dîrok, weke ku êdf ji nû ve were nivîsandin lê hat. Hêzên weke Firansa ku li herê mê hate wê demê xwedî serdestî û serwerî na jî, bi têgihîştina wê paxtê nêzîkatîyê li kurdan dîkin. Piştî wê paxtê re, wê li ser navê kurd û kurdistanê çî li jîyanê hebe, wê bê jî holê rakirin. Wê bi vê yekê re hewldanaka mazin bi Îran, Sûrî û Tirkî re bibe. Zimanê kurdî li van welatan bi vê yekê tê qadaxakirin. Demên piştê û paxt û peymanên ku piştê hatina mohrkiirin û çekirin jî, di wan re di yekê de jî navê kurdan nîn a. Herê ma başûrê kurdistanê, piştî wê paxtê bi 50 salî re Amarîka mudahala lê kir û ketîyê de. Lê Amarîka jî, derneka dervî wê gîyane wê paxtê ku weke kirasekî dîna li herê me hatîya lê kirin. Herê ma başûrê kurdistanê çend ku piştî wê mudahaleyê re gihişt hin mafên xwe û parlamene xwe avakir û hukumete xwe jî ava kir, lê dişa çend ku bi ser ve 22 sal buhurtin jî, hê jî destûra xwe ya bingihîn ne nivîsandîya. Ji ber çî herê me kurdistanê hate roja me destûra ya bingihîn ne nivîsandîya? Ji ber ku di çerçova wê

gîyane wê paxtê de destûr jê re nayê dayîn. **Girtina Serokê gelê kurd Biraz Ocalan ya di zindanê îmralfiyê de û bi bê destûrî hiştina rêveberîya başûrê kurdistanê ya kurd, di çerçova pirsgirêka kurd ya herêmê û gîyane vê paxtê de bi hev ve girêdayîna.** Ji aliyê wê yê dadî ya vê paxtê ya ku hê di meriyetê de ya destûr ji rêveberîya başûrê kurdistanê re nayê dayîn û hiştin ku ew destûra xwe ya bingihîn çêke. Hate ku di wê çerçova çareserkirina wê de biryar newê dayin ji aliyê hêzên serdest ve, wê herêmê kurdistanê jî, ne gihijihê destûra xwe ya bigihîn. Ku mirov wê pêvajoya ku ji Peymane Lozanê hate ku Paxta Sadabadê hatîya û ku ji paxta Sadabadê ku hate paxte Baxdadê hatîya û ji wir jî hatîya û gihîştîya peymanê Cezayîre, baş û qanc li dûvhevdu û bi hevdu re bi demê re û dîrokê re fahmnekê, mirov wê fahm nekê ku çima ew 22 salin ku çendî ku rêveberîya başûrê kurdistanê ku bûya û ew bûya xwediyê parlamenê û hukumetê jî û hê jî, nabê xwediyê destûra ya xwe bingihîn. ..

Biryara "parastina sînoran" a PAXTA SADABADÊ Û KOMKUJIYA ROBOSKÎ

Pirsgirêka kurd, di dema me de bi teybetî, piştî mohrkirina peymanê Lozanê û berî wê ya Sîkeys-picot hat afirandin. Bi van peymanan re cihan, wek ku hat parvekirin. Di wê parvekirinê de kurd, ji destpêka sadsalê ve bêstatû hatina hiştin û çûna bi ser wan de. Di destpêka sadsalê de, Ingiliztan, ku başûrê kurdistanê di nav de ew herême ku î ro jê re "îraq" tê gotin li ser wê serdest bû. Firanse jî, ku rojavayê kurdistanê jî di navde li ser wê herême ku î ro jê re "sûrîye" tê gotin lê serdest bû. Ew herêmên wan ên ku lê serdest bûn. Firanse, di demên ku wê vekîşîya ba, soza ku dabûbû kurdan û pêk ne hanî jî ew bû ku "wê kurd li ser herêmên xwe azad bibin û wê hikimete wan hebe û wê were nas in." Lê piştê çî bû, ew soz jê hatina ji bîr kirin. Di aslê xwe de rojhilat bi peymanê Sîkeys-picot re hat parvekirin. Peymane Lozanê, bi teybetî, kûrkirina wê peymanê bû. Çawa ku wê piştî peymanê Lozanê ku Firanse temenê vekîşîna xwe ji herêmê bi 'paxta Sadabadê' li herêmê bide afirandin, her wusa berî wê dema ku Ingilistan de kir ku vekîşihê, ew temenê wê bi peyman û konfaranse Lozanê re bû. Her wusa, Ingiliztan temenê xwe bi Lozanê re afirand û Firanse jî bi Paxta Sadabadê re afirand.

Peymane Lozanê(1923) û Paxta Sadabadê(1937), du pêvajoyên giring li herêmê û bi teybetî jî li kurdistanê bi van peymanan û paxtan re dest pê dikin. Piştî Sîkeys-picot re li herêmê Bi peymanê Lozanê re rastkirin û parvekirin, weke ku temem bûbû. Lê hê temem nebûbû. Wê bi ûaxta sadabadê re temem bûba. Ew temem bûn jî, ew bû ku ew parvekirina ku hatî kirin di qada sîyesî de were bi temen kirina. Bi vê yekê û rengê, temenek dihê afirand in. Bi teybetî, çawa ku Lozan bû di wê de parvekirin bû û kurdistan ew perçekirina wê temem bû. Lê bi tememî hê nebû bû. Ew ew temem bûn, di paxta Sadabadê de bûba. Piştî ku kurdan, dît ku bi Lozanê re parvekirin bû û welatê wan hat kirin, Hingî Serhildane Şêx Seîd, temenê wê hat avêtin. Lê dewletên li herêmê li dijî kurdan li dijî wê Serhildana kurdan bûna yek û tevgerîyan. hewta salên 1980î û hwd jî, tirkîye digot ku "Îngiliztan, alî kurdan kirîya û serhildan bûya." Lê di aslê xwe de vajî wê rastbû.

Di dema serhildanê de bi alîkarîya Ingilistanê, herê serokên serhildanê ê pêşî ku wê pêşengî û serkêşî ji serhildanê re bikiran bi alîkarîya ingilîzan hatin girtin û hatina Îdam kirin. Şêx Seîd, çend ku mirovê çaremin û ankû pêncemîn jî bû, ew bi carekê bi wan îdamên ku bûn re bû mirovê pêşî di serokatîya serhildanê de.

Bi wê re jî, hingî, bi wê provakasyona li Xîzan'ê re bikeşkeran re bi awayekî serhildanê bêî ku amedekariyên xwe bi dawî bike dest pê dîke. Piştî, tevî wê tam ne amedebûnê jî hêzên kurd, li gelek herêman bi legengîya xwe bi ser dikevin û serdestîya xwe li welatê xwe bidest dixin. Ingilîz, hingî di tirsihîn ku serhildan li wir bi serbikeve wê rewşa nû weke ya şêx Mahmudê berzencî ji wê re rû bidê. Ji ber vê yekê, ew alî tirkîyê dîke. Ingilîz, naxwezin ku rastî bûyarakî din weke ya şêx Mahmudê berzencî werin. Ji ber vê yekê, di têkbiirna serhildanê de bi tirkan re di aliyekî de disekin in. Serhildan, heta ku şêx Seîd bi rêya hevlingê wî yê bi navê Qasim ku xîyanetê lê dîke û ew tê girtin li gelek herêman bi ser dikeve. Lê Şêx Seîd rastîyê dibîne. Dibîne ku Ingilîz bi tirkan re tevdigerihin. Ji ber vê yekê, ew ji bo week serokên pêşî ên serhildanê, tiştî ku hatî serê wan, naxwezê ku were serê wan. Ji ber vê jî dîke ku ji herêmê derkeve û serokatîya serhildanê hilde ewlakarîyê û serhildanê bi çend mirovên li dora xwe re bi rê ve bibe. Lê ew di dema ku di de di rê de tê girtin. Hêza Şêx Seîd, di aslê xwe de, li herêmê bi teybetî herêma botanê, bi piştgirî û alîkarîya aşîrên botî û hemikî re pirranîya wê kirîya bin kontrolê de û rêveberî jî li wanderan daya ava kirin. Ev rêveberîya ku hatî avakirin jî, li ber sînorê herême ku dîn serdestîya firansîyan de ya li sînorê wê disekinê. Firansî jî, weke ingilîzîyan, dema ku wê rewşê û serkevtinê dibînin, êdî li herêmê, bi ingilîzan re û rêveberîya tirk ya li dijî kurdan ku di şer de bi wê re dikeve şer de.

Di wê dema ku firansî bi Rêveberîya tirkan re dikevina tîkiliyê de, hingî tirk bi tememî li ber herêkirina serkevtina kurdan in. Biqasî ku bi gotinê jî dev li herêmê tê gotin ku Firansîzan gotiya tirkan "ji paş ve, hêza kurdan dorpêç bikin." Dema ku Firansîzan gotiya çawa hingî, " ew herêmên ku firansîzan ji bo ku li herêmê serdestîya xwe biparêzên ku kifşkirina û naskirina ji wan re dibêjin û piştî ew xate tirêne ya ku dihê heta Nisêbîne, firansîz, bi wê tirêne alîkarî tirkan dîkin. Bi tirêne re hêzeka mazin ya tirk dihê birin li herêmên li piştî hêzên kurd vala hatîya hiştin. Kurd, hêzên wan ji ber ku li herêmê bi serdikevin û ji serkevtina bi bawer in, êdî wê tedbîrê nagrin. Ew valahî, bi piştgirîya firansîzan re ji aliyê hêzên tirk ve dihê tişî kirin. Êdî ku hêzên bi wê rêya tirêne dihênin li herêmê, ji dû alîyan ve bi kurdan re dikeve şer de. Hêza kurdan ya ku dibêê di qat di wê hêrişîa dûalî de, êdî li ber wê artîşa tirk ya ku bi çekên pîr mazin hatî xamilandin bidest têkçûnê diçin. Piştî ku serhildan têkçû, êdî pêvajoya xwe serdestkirina hêzên tirk li herêmê dibê.

Di aslê xwe de çend ku kurdan, ji wê aliyê ve têkçûn xwariya jî ku li ber xwe bidan, wê bi ser ketiban. Lê bi alîkarîya ingilîz û firansîzan, ji serî yanî bi serê aşîran re dikevina tîkiliyê de û ji wan dixwezin ku li berxwe nedin. Dibêjina wan "ku li ber xwe nedin wê herîş newina ser wan."

Kurd, ji wê bawer dikin. Piştî, şartekî din jî, rêveberîya tirk didêne ber kurdan. Ew jî, ew a ku her aşîrên li herêmê çî çek û tîfîng û sîlehên ku didestê wan de hena radestî hêza tirk bikin. Gelek, aşîrên mazin, di berdêla ku neçîna bi ser wan de, wê herê dikin. Ew rewşa radestkirina çekan, wê li kurdistanê di nava kurdan de bê rewşeka teybet. Mînaq, heta salên 80'î yê jî, hertimî rêveberîya tirk li herêmê li ser serê kurdan oparasyon li gund û navçeyên wê dikirin ku doza çekên ku di destê wan de hene dikir in. Ku gûman heba ku di destê hin kurdan de çek hene, wê bi rêya hineka gotinê bidina derxistin ku di destê "filankes çek hena" û piştî wê li herêmê oparasyon bikiran û ew çek bixwestan. Ku wan gotiban nîn in jî, wê bi rojan li wan êşkence bikiran li qaracolên leşkerî ln li herêmê. Mînaq, qarakola "tilêbel" heta vê demê navê wê bi vî rengî derketibû di nava xalkê de, weke cihekî ku hertimî lê êşkenceyên pîr xadar dihatina kirin.

Ev rewş, li hemû herêman hebû. Piştî serhildane şêx Seîd jî, rewşeka bi vî rengî dabûbûn dest pê kirin. Li herêmê jî, ji bo ku nebêjin ku şêx seîd ji bo kurdistanê û kurdan û mafê wan serî hildaya, di gotin ku " wî dixwest ku şerîatê bêne." Bi vî rengî, ew hatibû nasîn. Ji xwe di dema serhildanê de bi vî rengî gotin ji rêveberîya yekitiya sovyet re hatibû gotin û piştî bi wê yekê pêşî lê girtibûn ku rêveberîya yekitiya sovyet piştgiriye bide kurdan di dema xwe de.

Em vegerihina ser paxta Sadabadê, ev paxt ji ber ku hinekî giring a û weke donemeke nûya li herêmê ji bo kurdan. Li herêmê bi Siykes-picot û peymanê Lozanê re perçekirin hatibû kirin. Lê ew perçekirin, bi awayekî, heta wê demê jî, çend ku kurd bi wan serhildanên xwe têkçûbûbûn jî, li ser rûpel û ankû qaxizê mabû bû. Mînaq, ji sînorê bakûrê kurdistanê, kurd, hertimî gawekek didane xwe û diçûna herême rojavayê kurdistanê. her wusa li rojhilat û başûrê kurdistanê dibû. Ji wan perçeyên kurdistanê li bakûrê kurdistanê hatin û çûyin pîr dibû. Paxta Sadabadê, di aslê xwe de, armancaka wê ya sereka ew bû ku pêşî li wê çûyina kurdan ya li cem hevdû girta bû. Bi vê yekê, biryara "jidandina sînoran" di paxtê de hat girtin. Bi wê re jî, fîranse jî biryare wê ya vekîşînê hebû. Wê jî, hingî li wir, xwest ku biryara avakirina Sûrîyê bikeve meriyetê de. Bi vê yekê, çend biryar hatina girtin. Biryara pêşî ya vê paxtê ew bû ku sînorên ku di nava kurdan hatina xizkirin, werina jidandin. newê hiştin ku ji ser sînoran bi buhur in û tîkiliyê bi hevdû re dênin. Bi vê yekê û rengê, hat xwestin ku bi tememî şînor werina jindandin. Ji tirkîyê, wê tenê mirovek jî ne buhurû ba li beşa kurdistanê ya rojavayê kurdistanê, başûr û rojhilatê kurdistanê. Her wusa, ji wan perçeyan jî, ne buhurîna li hevdû û ne jî buhurîna li bakûrê kurdistanê bûba. Bi vê yekê û rengî, wê hewl bihata dayin ku wan hevdû ji bîr bikira. Bi wê re, mirov divêt ku bibêje ku biryara, ku di dema ku kurd serî hildin li dijî wê alîkariyê bidina li hevdû, li ser hatibû nîqaşkirin. Mînaq, biryara bi vî rengî hatibû girtin ku "dema ku li ber rejimekê serhildan bû, wê di tafisandina wê serhildanê de alîkarî bidina li hevdû. Bi vê rengê, hem ne alîkarî û hem jî li dijî serhildanê bi hev re tevgerîn, li ser hatibû nîqaşkirin û weke prensibekê hatibû herê kirin. Her wusa, dema ku kurdek, ji ber sedemna sîyesî ravî ba ji beşeka kurdistanê li beşeka din, wê li wî beşê kurdî ku ew ravîyê de, ew rejima ku li wir serdest bû, wê ew girtiba û radestî rejima ku ew jê ravîya jî. Ev

mijar jî, bi nîqaşên di bin navê "xale parastina sînoran" de hatibû nîqaşkirin. Piştî vê paxtê, êdî mayînkirina sînoran û di sînoran kuştuna mirovan li sînoran pêk hat. Paxta Sadabadê, dem bi dem weke "paxta parastina sînoran" jî hatîya bi navkirin.

Pişt paxta Sadabadê re bûyîna bûyarên weke bûyara **'komkujiya qelqeliyê(1943'an)'** û ankû weke ku î ro di nava gel bi navê "sihûsê gûlê" tê nasin, wê ev biryarên dewletê wê temenê wan biafirîne. Her wusa, heta ku tê roja me jî, buhurîna ji sînor, weke "kaçakçi" hanîna wê ya li ser ziman, hinekî bi van biryarên ku di vê paxtê de hatina girtin ve girêdayî ya. her wusa divê ku mirov ji hin aliyna ve komkujiya roboskî jî ji hin aliyna û temenne wê ve bi wê paxtê ve girê bide. Çend ku nayê ser ziman jî, tê zanîn û car bi car tê ser ziman ku di vê paxtê de bahse qadaxakirina ziman jî hatîya kirin. Bi vê yekê, wê temenê serhildanên pişt re ku bibin wê bihata girtin. Ji van deman û pê de, jidandina sînoran, û bi awayekî hişt qadaxakirina zimanê kurdî, ji vê demê û pê de bi awayekî vekirî pîr zêde dikeve meriyetê de. heta salên 1937'an kurd li herêmên weke dersimê û Botan û agirî li ber xwe didin. Lê bi komkujiyan, ew serhildan û li berxwedanên wan tîna tafisandin. Piştî serhildane dersimê û tafisandina wê re, êdî dewlet bi tememî serdestîya xwe di denezêne. Ji dersimê çend mirovên weke "bermehî" ku dewletê bi nav diikirin û mabûn û pê de, ti tikesek nemabû. Di komkujiyê de dê û bavên kurd ên ku hatibûbûna qatilkirin jî, hemû zaroyên wan hatina berhevkirin û kirina kamyonên leşkerî de û birina rojavayê tirkîyê û ew yan radestê hin malbatên leşkerî ên tirkîyan û yan jî weke wan mablatan hin malbatên tirkîyan û ew zaro radestî wan kirin ku wan weke tirkîyan mazin bikin. Ji ew zaroyên ku tîna gotin ku bi vê rengî hatina birin ji herêmê û radestî malbatan hatina kirin, tê gotin ku ser deh hezaran re na.

Piştî ku ew tafisandina li dersimê bi komkujiyan bû, êdî dewletê programên bişavtinê û ankû 'asîmlasyonê' dan çêkirin û li ser serê kurdan dane meşandin. Navê 'kurd' û 'kurdistan'ê hatina qadaxakirin û ev nav, hata roja me jî qadaxa na.

Bi programên komarê tirkîyan ên bişavtinê re dewletê hewl da ku li ser navê kurd û kurdistanê û bi kurdî çî hebê, ji holê rabike. Çîrok û çîvanokên kurdî ên bi navê "keçelok" bi navê "keloglan" hatina wergerandin û tenê ew wergerandina wan ya bi tirkî li jîyanê hat hiştin. Ên din hemû jî, ji holê hatina rakirin. Çî bi nivîskî û tomar kirî hebû ji holê hat rakirin û ankû hat şawitandin. Mînaq, heta roja me jî tê gotin ku "Meleyê Cizîrî 43 berhemên hizirî nivîsandina". Her wusa tê gotin ku Feqiyê Teyran ne kêmirî wan hatîya nivîsandin. Weke van zaneyên kurd, gelek zaneyên din jî berhemên wan ên hizirî hebûn. Lê î ro jî çend helbestên wan û pê ve, ti destê me de ti tişte nema ya. Bi kurdî û navê kurdî çî hebû li ser wê re tûfanek buhurî. Hemû tişt jî holê hat rakirin. 'Medreseya Sor', ku weke zankoyeka kurdî û bi zimanê kurdî a pîr kevn a. dihat gotin ku gelek beşên wê ên ku hebûn tiştî pirtûk û nivîs bûn. Lê hemû jî holê hat rakirin. Medreseya Sor, zankoya kurdî ya. Ez hêvî dikim ku ew zanko, carek din bi rengê xwe yê berê ê ku tîna zanîna dihat afirandin û pêşxistin û nivîsandin, were pêşxistin.

Komkujiyên weke ên komkujiya Qelqeliyê, komkujiya Roboskî û hwd jî, hinekî li gorî gîyane wê paxtê pêk tên û dibin. Ku mirov li temenê wê komkujiya roboskî binerê û hinekî bi lêkolînî lê bikolê, mirov wê bibîne ku rêya ku ew komkuji têde bûna diçin ta gîyane wê paxta Sadabadê. Piştî paxta Sadabadê re, paxtên weke paxta Baxdadê û paymane Cezayirê hatina çêkirin. Ev jî, bi teybetî, li gorî gîyane paxta Sadabadê û û peymanê Lozanê ku berî wê hatibû mohrkirin pêk tên. **Ku** mirov li rewşa sîyesî û dadî lê binerê, mirov wê bibîne ku ji hin aliyna ve paxtên weke sadabadê gîyane wan dijî. Li herêmê, çend ku pêşketin rûdidin, hertimî di nava wan pêşketinan de hewl hatîya dayin ku ew gîyane van paxtan were parastin. Minaq, dema "şoraşa komara Îslamê" li Îranê û piştê jî, heman tişt bû. Di serî de, ev paxt û gîyane wê, hat parastin. Î ro jî, dema ku mirov li pêşketinê li Sûriyê dinerê, di serî de heman hewdana ku di dema Şoraşa Îranê de bû û hat parastin, dihê xwestin ku di rewşa Sûriyê de jî were parastin. bi vî rengî, rewş dihê dîtin.

Paxta Sadabadê, bi teybetî, giringîya wê ew a ku meseleya sînoran ku hê bi tememî di konfaranse Lozanê re ne hatî çareserkerin di wir de bi tememî nûqta dawîyê lê hat xistin û hat çareserkerin. Li ser Nîqaşên "misul û kerkukê" re çend ku bahse safîkirin û kifşkirina bi tememî di konfaranse Lozanê dihê kirin jî, di wir de hin mijarên ku ne hatibûbûna çareserkerin hebûn. Di serî de, mijare Îraqê û bi wê ya başûrê kurdistanê û ya sûriyê û bi wê ya rojavayê kurdistanê bi tememî ne hatibû çareserkerin. Piştî konfaranse Lozanê re, avakirina "keyanîya kurdistanê" li başûrê kurdistanê di bin serokatîya şêx mahmudê berzencî de jî, weke rewş û mijaraka ne asayî hat dîtin. Piştê jî xwe weke ku di roja me de di 2012'an de dibê ku dikin ku berê kurdan bidina baxdadê de, di wê demê de di dema şêx Mahmudê berzencî de jî ev hat kirin. Ku Şêx Mahmudê Berzencî ev red kir, êdî piştê di serî de firokên şer ên Ingilizan bidest bombardimana herêmên kurdan kirin di salê 1924'an de û kurdistanê hingî bi wê bombardimanê hat kevilkirin. ...

Piştê, Di serî de **Şêx Mahmudê Berzencî** gelek kurd buhurîna rojhilatê kurdistanê û li wir hin bi hin xwe bi rêxistin kirin û bi dest tekoşîna pêşmergeftîyê kirin. Di wê demê de li agirî yanî li bakûrê kurdistanê, kurdan "komara agirî denezendibû û bidest tekoşîna wê kiribû. Piştê serhildana Şêx Seîd dest pê kir. Piştî ku Tirkiya bi alîkarîya Ingiliztanê û Firanse di van rewşan de bi serket êdî serkevtina xwe denezend. Li Dersimê, ne aramî û şerê dewletê ê bi kurdan re ta salên 1937' û hwd diçê û didomê. Ji xwe de, piştî ku li vir jî, bi komkujiyên ku dikin re serkevtin bidest dixin, êdî piştê paxta Sadabadê dihê li derxistin. Paxta Sadabadê, di aslê xwe de, weke paxtaka ku dewletên ku kurdistan di nava xwe de beşkirina, ku li hevdû bicivin û "tedbîrên xwe hildin ku êdî piştê rastî ti serhildan û ankû raperînên kurdan newin." Ji bo vê yekê, wê ji bo vê yekê di serî de ewlakarî li herêmê bide çêkirin di nava xwe de û ji bo xwe. Tirkiya, piştê li herêmên başûrê kurdistanê bidest "oparasyonên paqijkirina çekan ji destê kurdan" kir. Ti herême kurdan ya ku ev oparasyon lê nebûn neman. ...

Di vê demê de, weke ku di paxtê de hatibû nîqaşkirin, rejimên serdest ên Îran, Îraq, Tirkiyê û hwd û wê tîkiliya wan wê bi hev re hebe. Di wê demê de û di wê paxtê de ji aliyê van rejiman ve komisyonên Îstihbarî, sîyesî û rêveberî û hwd ên "mayinda" ku tenê wê bi vê pîrsgirêkê û bi kurdan ve mijul bibin tîna ava kirin. Di her rewşê û aloziyê de tîkiliya van komisyonan wê bi hev re hebe û wê bi hev re di tîkiliya danûstandinê ya zanebûnê de bin. Çend ku piştî hewl hat dayin ku vê paxtê bidina ji bîrkerin jî, ev rewşê û biryarên ku di wê de hatina girtin bi mayindayî man. Di hin deman de hat gotin ku "hikme vê paxtê ê dadî û ankû hûqûqî hatîya sekinandin û nîn a" jî, lê dîsan piştî bi kirinan ev vajî wê hat piştrastkirin. **Pirsgirêka kurd**, di van rojên ku herî zêde di rojevê de ya, ku mirov van aliyê dîrokî û ku bûna ku nebûnê fahm nekê, mirov wê bi tememî wê jî fahm nekê. Hê jî, ev peymanên weke ên 'peymanê Lozanê' û paxtên weke 'paxta Sadabadê û hwd jî, hê jî ji aliyê dadî û sîyesî ve li ser serê kurdan bi destê rejimên weke Îran û Tirkiyê xwediye hikim dadî û ankû hûqûqî na û hena. Hê jî di fermiyetê de bi "hebûna wan sînoran" û "jîdandina wan sînoran" re ku hê dibina sedema komkujiyên weke 'komkujiya Roboskî' û hwd, di fermiyetê bi aliyê hûqûqî û sîyesî hena. Weke komkujiya qelqeliyê, bûna komkujiya Roboskî carek din gîyane paxta sadabadê dihêne bîra me.

Piştî paxta Sadabadê, divê ku mirov paxta baxdadê û peymanê Cezayîrê, weke du pêvajoyên giring hilde li dest û li berçav bigrê.

Dem heta ku tê dema ku di wê de PEYMANA CEZAYÎRÊ dibe, wê serhildane wê bibin weke serhildane Mela Mistefa Berzanî.

Li herêmê, di salên dawiyê de ku weke peymanaka girîng hatîya mohrkiirîn û hê jî ji aliyê dadî ve weke ku gîyane wê li jîyane serdest e peymanê Cezayîrê, divê ku mirov hinekî li ser bisekinê. Di vê demê de ew peyman fahmkirina wê girîng a. Weke Paxta Sadabadê, peymanê Cezayîrê jî, peymanê ku temenê pîrsgirêka kurd ya ku hate roja me hatîya berdewam kirin a. Li ser kurdan û welatê wan, demên piştî şerê cihanê yê duyemîn, demna ku wê bina demên nexweşiyên. Temenê wan nexweşiyên ku bi pîrsgirêka kurd re tîna holê, bi van peymanan tîna afirandin. Hêzên ku li ser kurdistanê serdest in, wê li ser serdestîya wê di gelek qadan de di nav xwe bixwe de jî wê levnekin. Ji wan welatên ku levnakî û di wê demê de hene û li ser kurdistanê serdest in û xwediye metingerîyê na, du ji wan Îran û Îraq a. Îran û Îraq, li ser herêmên sînor û bi teybetî jî, herême Şetelerebê levnakî. Di paxta Sadabadê de di nav navbarê van hêzan de pîr mazin nîqaşên jî di wê de dibin. Lê levkirin nabê. Pîrsgirêk, wê hate wê deme çêkirina peymanê Cezayîrê, wê wilo zêde nebe temenê ti levxistin. Lê wê bê temenê ne levkirin û li ber hevdû sekinînan. Tirkî jî, ji ber gata kurdistanê ya ku wê kirîya nav sînorê xwe de hertimî di nav wan de ya.

Aliyê vê civînê yê ku kurdan girêdide pîr in. Ne tenê ji bo rewşa demê ku li ber tekoşîna kurdan wê rewşê ne baş bi levkirina bi li ser xatên sînoran re wê biafirêne. Wê xweserîya

kurdistanê başûr ku di jîyane de heya wê ji holê rakê. Wekî din jî, wê levkirinaka wan ya ku bi hev re li ber kurdan bisekin in wê di wê civînê de bibe. Serokkomarê demê yê Cezayîrê, weke yê ku malvanîyê dike, temenê wê peymanê bi dana berdewam kirina wê re û levkirina wan di berdewam kirina wê de dibe xwedî wesif. Wezirê karê derve yê wê demê yê Cezayîrê, wê di nav welatan de têkilîya wan hebe û wê hertimî bike ku wê têkiliyê biafirê. Serokkomarê Îranê yê deme Saddam Huseyin û serokkomarê demê yê Îranê Sah Riza Pahlawî, li wir bi rayadarên Amarika yê weke Henri Kesinger û hwd re di rûnihin û li wir wê levkirinê dikin. Li wir, di demê de, şert û mercê demê şert û mercên deme yê ku hene duqutubî na. Yektîya sovyet û rojava di nav wan de 'deme şerê sar' dest pê kirîya. Herdû jî, li berhevûdîxin ku yek biser yê di bikeve di dîplomasi û sîyaseta de xwe de. Li Îraqê Saddam weke andamakê Partîya Baasê bi derbetîyekê tê ser rêveberîyê û rêveberîyê dike destê xwe de.

Di ti demê de ku di kîjan demê de rêveberî hatibibina guhartin jî, wê di ti welatê ku li Kurdistanê metinger in de, wê nêzîkatîya wan ya li kurdan wê neguharê. Rêveberî ku herê û were jî, wê ji bo kurdan yek bê. Ku rêveberî jî, were guharandin, wê nêzîkatîya ji kurdan re wê newê guhartin. Weke ku Li Tirkî û Îranê ev wilo bû, wê li Îraqê jî wilo bê. Piştî Paxta Sadabadê, wê di wê xatê de pêşketin berdewam bike. Xale "jîdandina sînoran" yê ku di Kurdistanê de hatibûbûn xizkirin yê ku di Paxta Sadabadê de hatibû girtin, di wê civînê de hate rojevê û biryare xurtkirina wê hate dayin. Nêzîkatîya ji kurdan re, wê newê guhartin. Îran, ku ji kurdan re çawa bê, wê Îraq jî wilo bê. Nakokîyên di nav wan de jî, wê nebina sedem ku hin guhartin di nav wan de bibin. Civîna li Cezayîrê ya ku peymanê Cezayîrê wê têde were mohrkirin, wê civînaka di berdewama civîna paxta Sadabadê de bê. Pirsgirêkên ku di paxta Sadabadê de hatina rojevê û ne hatina çareserkirin yê sînor û Şetelerebê, wê di wir de werina rojevê û ser ziman ku werina çareserkirin. Bi vê yekê re Civîna li Cezayîrê wê pêşî, sê tiştan di nav wan bide çêkirin. Pêşî, wê navbara wan xweş bike. Piştê wê têkilîya wan ya bi hev re pêş bixe û wê xurttir bike. Wê bike ku êdî herina bi serhevdu de û li hevdu bibina mêhwan û hwd. Hinek armacên wê civînê jî ev bûn dervî biryarên wê yê ku wê têde bihatan girtin.

Biryarên ku wê di civîna li Cezayîrê de bihatan girtin, ku bi hev re awlakarî û parastina sînoran bikiran, çavdarîyan dênina ser sînor deynan û ku ev jî, di bin çavdarî û navbeynkarîya Cezayîrê de bi alîkarîya Amarîka di wê demê de bi rê ve bimeşa. Amarika, ji bo ku li ber sovyetê karibê serketina xwe bi parezê, ahangên(dengeyên) herêmê yê sîyasî, ew naxwezê ku bê guharatin. Tirkî jî û Sûrî jî, nîqaşên civîne yê sînoran dişopênin. Di wê demê de, Tirkî jî û Sûrî jî, ji ber pirsgirêkên wan yê kurd û hwd, li ser ahangên(denge) ramiyarî(polîtîk) dileyizin û nêzîkatîya xwe ya ramiyarî diafirênin. Hafiz Ezad, dem bi dem weke mirovekî ku karê li ser ahangê bileyizê û welêt bi wê bi rê ve bibe, dihê holê û nasin. Nîqaşên di civîna li Cezayîrê de ku sînor dibina mijar, êdî bixweza bi tirkî, îran û Sûrî re kurdistanê tê rojevê. Sûrî, ku ramiyarî xwe diafirêne û

pergale wê ya polîtîk diafirê û rengê wê tê holê, êdf ew jî pîrsgirêka kurd bi giranîya wê bidest hîskirinê dike.

Di paxta Sadabadê de Sûrî, bi navê xwe û ramiyarîya xwe nebû. Lê di wê civînê de biçavderîyên xwe heya. Ji sê aliyên ve pîrsgirêk têne rojevê. Pêşî, ji aliyê pîrsgirêkên weke yê Şetelerebê ve tê holê. Piştê di temenê parastîna sînoran û saffikirin û parastîna wan de tê rojevê û li ser wê jî levkirin dibê. Aliyê dî yê levkirinê jî, li ser têkildanînê û "pêkerên ku parastîna sînoran lawaz dikin û ji holê dirakin" weke kurdan jî, li ser wan levkirin dihê kirin. Bi hev re û yek bi yek di nav xwe de di ahagekê de wê levkirinê û saffikirina wê dike. Lê pîrsgirêka herêma şetelerebê(çemê setelerebê), li wir dîsa ji ber xwestina wê ya herdû alîyan li holê dimêne. Ev pîrsgirêka ku wê piştê bi pênc salan bê temenê şerê îran û îraqê yê haftsalan ku di nav wan de piştê dibê. Ji ber ku ew herêm, hem ji aliyê dewlemendîya xwe ve û hem jî ji aliyê sehête herêmên dikin, derfetê ji hêzên li wê serdest re diafirêne. Bi vê yekê re, êdf herdû alî wê dixwezî. Amarîka, ji bo ku di herêmê de li ber yekîtîya sovyet kêmbûn nebe, levkirinekê di nav wan de dide kirin. Hingî, Henrî Kesinger yê ku herî zêde di wê levkirinê de xwedî weyna jî, ew e.

Îran, di wê demê de rêveberîya wê, li ber Îraqê ji ber ku destê xwe xurt bike, çav li serhildêrên kurdan digirt. Ew herême kurdistanê, piştî komara Mihabadê ya kurd re jî, têkilîyina wê yê bikarhnaînê hebûn. Kurdên herêmê, gelekên ji wan jî, ji wê têkilîyê bawerkirina û weke ku Îranê dixwezê çareserîyekê ji pîrsgirêka kurd re hem li derve û hem jî li hundur bêne, dihate dîtin. Lê ev têgihîştin nerast bû. Derew bû. Di deme Civîna Cezayîrê de biqasî ku Îraqê rewşa kurdan ji holê rakir, îranê jî wê li ber kurdan bikeve rewşekê de, wilo hate herêkirin. Bi vê yekê re, kurd, weke 'yên ku di nav avê de li mar xwe dipêçe lê hat'. Piştê serhildêrên kurd, pîr ji herêmê an xwe vekişandina bi ser çîyan de û an jî ku derfet dîtin, yê weke Qasimlo ji herêmê bi ber rojava ve biravî çûn. Di wê levkirinê de wê herkesek di nav sînorê xwe de di aşîtywê de bê, wê di parastîna de bi hev re bin û wê têkilîya xwe ya bi hev re ya awlakariyê xurttir bikin. Ev jî, weke gotinna(xalna) ku ketibûbûna bin fermiyetê de bûn. Di merîyetê de jî, wê li wan bihate nerîn.

Weki dîn ji, ya ku kete bin bîyarê de ew bû ku wê Îran û Îraq, wê werina cem hevdû û wê komîsyonekê bi hev re ava bikin(weke ku di civînê de hate kifşkirin, "wê wezaretên karê dervê yê Îran û Îraqê vê yekê bi hev re bikin".) ji bo ku van xalên ku hatina girtin di civînê de ku bêne li cih û li wan çavdariyê bike. Piştî civîna, wê bidorveger, wê hem li Baxdadê û hem jî li Tehranê wê dem bi dem ku demeka dirêj nekeve navbarê de wê levciwîn wê werina li darxistin û bêne dayîmîkirin. Ew komîsyon, wê vî bikar û barî jî bi rê ve biriba û wê bîyarên civînê yê ku bikevîna merîyetê, wê bikira merîyetê û wê di kirinê de wan bişopanda. Bivê yekê re, wê têkilîya ji bo çareserkirina pîrsgirêkan wê rastûrast wê êdf di nav wan de wê bûba. Ji xwe xwestekeke wê civînê jî ev bû. Peyman û biryarên ku hatina girtin, derneketine dervî gîyane paxta Sadabadê.

Komkujiya Dersimê, avabûn û xûrixandina Komare kurd a Mihabadê û komkujiyên ku piştî w re hatina serê civate kurd. ..

Beş yek: jenosîda dersimê:.

Komkujiya geliyê Zilanê, ku êşa wê, weke ya komkujiya dersimê mazin a, berî komkujiya dersimê hatîya serê kurdan. Dîroka kurdan, dema ku em ji kîjan aliyê ve lê dinerin, em ratî komkujiyakê têde tên. Komkujiya geliyê zilanê ku weke 'komkujiya geliyê zîla' jî tê bi nav kirin, piştî têkçûna serhilane şêx Seîd pêk tê. Li herêma agirî û bi teybetî li ber çiyayê agirî, ji destpêka avakirina komarê ve tevgerî, raperînên aşîrî û hwd bûna. Dewleta tirk jî, hertimî, çendî hêza wê hebûya, li wan herêman bicih kirîya û li dijî kurdan bo oprasyonên leşkerî ên weke 'oparasyona li herêma tendûrekê', 'oparasyona li li stawrê' û hwd bikarhanîya.

Mîrovekî ku demografî û civaknasîya herêmê bizanibê, wê bi hesanî bizanibê ku gelê herêmê ê kurd û komnetewên din ku bi wan re dijîn bi serê xwe dijîn. Weke dewlet dijîn. Kengî ku kurd li herêmên xwe bidest serhildanan kirin? Dema ku bi ser wê jîyane wan de çûyîn bû jî, êdî rabûna ser xwe û serî hildane. Li vir, bi vir ve girêdayî ez bi teybetî binxat kim û vê yekê divê ku bibêjim. Heta roja me, weke rexneyekê jî ku hatîya kirin li serhildanên kurdan ku hatîya gotin ku "ji ber ku bi aşîrî hildane têkçûna" û ankû hatîya gotin ku "ji ber ku herêmî ma na, êdî têkçûna." Ev gotin, çendî ku rast jî bin, lê dema ku em li sedem û temenê wê ne nerin, emê nikaribin wê fahm jî nekin. Li her herêmê, jîyane kurdîstanîyan di aslê xwe de bi rêxistin bûya. Heta wê dema ku bi ser wan de çûyîn nebûya jî, zêde mudahele li jîyane wan nebûya. Ankû, çendî mudahele bûna jî, wan ew mudahele ji holê rakirina. Bi wê re jî, êdî ew jîyane xwe ya biserê xwe û Azad parastina. Pergale aşîrtîyê, em divê ku divê temenê de, di temenê pergale parastinê re jî lê binerandin ku bi hêzî xwe û herêmên xwe diparastin.

Piştî serhildane şêx Seîd, wê êdî ew serhildanên kurdan ên herêmî û ankû aşîrî wê zêdetir bibin. Di aslê xwe de, em nikarin tenê wê serhildanên kurdan ên aşîrî, tenê bi serê xwe weke serhildana hildana li dest. Ew serhildanên aşîrî, weke ku çawa ku bi plan û xafka li Pîranê ku çend leşkerên tirk diçin ku çend kurdan dixwezî ku wan bigirin û xalkê herêmê wan mmirovan nadin û piştre serhildane şêx Seîd dest pê kir, di temenê listikna bi vî rengî de divê ku mirov li wan serhildanan jî bînerê. Li kîjan herêmê hêzên kurdan hebûna, wê bi wî rengî, pêşî bi çûyîna bi ser wan de êdî wê wan acîz bikin û piştre ku wan jî serî hilda wê bi hêzeka mazin herina bi ser wan de û wan têkbibin bi komkujiyan. Di rewşa serhildane Agirî bixwe de jî, di dema ku serhildanê dest pê kir, bi oparasyona leşkerî a li tendûrekê re, ew hêze şêx Avdûlqadîr ku wê bi hêzeka mazin tevî serhildêrên serhildana agirî bûba û wê bikira ku ew biserketan, pêşîya wê girt. Bi vî rengî, di aslê xwe de, gelek serhildanên aşîrî û herêmî ên kurdan ku bûn, destê çûyîna bi ser wan de û engizandî(tahrîk) kirina wan re da kirin. BI wê yekê re, armanc ew bû ku hêzeka kurdan qat bi qat li herêmê were şikandin derfet newê hiştin ku hêzeka mazin ya kurdistanî ku karibin ji nava xwe derxin bo kurdistanê.

Hinekî jî, di vê temenê de weke ku dewletê bi xwe plan û programaka mazin pêşxistibû. Bi teybetî, piştî têkçûna serhildane şêx Seîd bi alîkarîya firansîzan û Îngilîzan ya ji tirkîya re, êdî dewletê giranî dabû bû tahrîk kirina aşîran li herêmên xwe serî hildin û ew herê bi ser wan de û hêzên wan bide şikandin. Di aslê xwe de, gelek herêmên kurdan bi vî rengî weke ku bêparastin jî hat hiştin. Aşîr bi aşîr serî hildan jî, wê bike ku ew li dijî hêrîşên artişa tirk bişikihin. Di vê temenê de, herêmên ku bê parastin man, êdî piştre di wan de wê mirovên sivil wê rastî hêrîşan werin. Di wê demê de, piştî hin bi hin şikeştina serhildane agirî, wê hemû gundên li dora geliyê Zilanê û agirî, pîranîya wan wê werina şawitandin. Bi dehan gundên ku li wê herêmê hatina şawitandin. Ew gundên ku hatina şawitandin, li wan ti hêzên kurd tûna na. Hemû gund jî, ji ber ku mêrên wan bi aşîrî û biryara aşîrê tevî serhildane agirî bûna û piştî şikeştinê pîranîya wan jîyane xwe ji dest dane jî, êdî ew gund, tenê jin û zaro û pîr û kal mana. Ji wan pêve, wê zêde ti mirov nebin. di wê dema ku komkujiya zilanê bû ji hefteya dawî ya hezîrenê heta tîrmehê, wê bi hezaran jin û zaro ji

aliyê leşkerên tirk ve werina kuştin. Gund, bê mirov man. Ji çend gundan jî, çend mirov û ankû malbatên ku sax filîtî na, ew jî barî Erdîşê dikin. Ji ber ku di gundên wan de êdî mirov nemana û jîyane êdî mirîya, ew jî xwe li cihên ku mirov lê dijîn digrin û tevî wan dibin.

Di wê demê de, tenê di komkujiya li gelyê Zilanê de, ku di 12 tirmehê de ku rojnemeya tirk ya bi navê "cumhuriyet" jî ku bahse wê dike, ser 16 hezaran re mirov, tenê li ber wî çemê gelyê zilanê tê kuştin. Lê gelek mirovên ku piştê ji komkujiyê filîtî na, divê ku "hijmara kuştîyan ya li wir, ji ya ku bahs tê kirin sê û çar qat jî zêdetir a." Ev gotin, tenê bo kuştîyên ku li ber çemê gelyê Zilanê

tê gotin.

Piştî ku dewletê, di sale 1925'an de li dijî serildane şê Seîd, bi piştgirîya ku ji wê re ji ingilizan û firansizan hebû ku biserket, êdî piştê, hemû hêza xwe veguhazt li herêmên kurdan. Herêm bi herêm, bi leşkerî tîkiliya wan ji hevdû tê birrîn. Piştê jî, li wê herêma ku bi birrîna tîkiliyên wê ya bi herêmên din re, êdî wê çûyîna bi ser aşîr û herêmê de bibe. Bi wê yekê, êdî bi hezaran komkujî bibin. Ev rêbaza tahrîkkirin û piştê çûyîna bi ser aşîran de wê bi teybetî piştî serhildane şêx Seîd û tîkçûna wê re zêdetir bibe. Êdî bi wê rengê, wê ew şikeştina ku bi serhildane şêx Seîd re ku kurdan xwar, wê bê kirina malê hemû kurdan û kurdistanê. Sale piştî tîkçûna serhildane şêx Seîd ya sale 1926'an û pê de, wê êdî hin bi hin ev raperînên aşîrî pirr zêde bibin. Ne tenê li herêma dersimê agirî û ankû bi navê wê yê giştî sarhadê, botanê û hwd wê bibin. Lê li beşên din ên kurdistanê jî wê bibin. Kurdên rojhilatê kurdistanê, di wê demê de tîkiliya wan ya xort ya bi kurdên bakûrê kurdistanê re, wê cih bi cih bike ku bi aşîrî ew jî piştgiriyên xwe bidina serhildanên kurdên bakûrê kurdistanê. Wê hêzên leşkerî jî ji kurdan re bişênin. Heta ku em dikarin bibêjin ku wê di destpêka de wê aşîrên kurd ên rojhilatê kurdistanê wê hêzên leşkerî jî ji nava xwe bifirênin û bi sûwarî bişênina alikariya serhildane agirî de. Di dema ku kurdên bakûrê kurdistanê komara kurd ya agirî denezendin, wê kurdên rojhilatê kurdistanê, wê hêzeka mazin pêşî ku ne bin du hezar suwarîyan re bûya wê bişênin ku alî wan bikin. Piştê jî, ji aşîrên weke ên Şêx Avdûlqadir û hwd, wê hin bi hin hêzên mazin werina afirandin ku werina şandin li alikariya wan. Di wê demê de, dewleta tirk jî wê yekê kifş dike û dibîne. Mînaq, di wê demê de hin deverên tendûrekê ku dikarî xwe li wê bigirê wê bi deh hezaran hêzeka artişî svkî wir bike. Armanca wê ew bû ku pêşîya alikariyê ji rojhilatê Kurdistan li bakûrê kurdistanê bide girtin. Hinekî jî, bi ser jî ket. Mînaq, di wê demê de gelek alikariyên leşkerî ku wê bûban pêşîya wan hat girtin. Pêşîya mifrezeya leşkerî ku bi hezaran leşkeran ku şêx Avdûlqadir amede kiribû û bi wê dihat alî serhildane agirî hat girtin.

Bi vî rengî, di aslê xwe de, herêmên kurdan hatina bêhêzkirin. Aşîrên kurdan, di destpêkê de, ew yek kifş nekirin. Bo vê yekê, çendî ku tîkiliya wan bi hevdû re hebû jî, tîkiliya wan hatibû birrîn. Di wê demê de, gelek mirovên ku agahîyan ji aşîrê bibina ji serokên aşîra duyemin re di rêyan de dihatina kifşîin û girtin û kuştin. Yanî, di aslê xwe de, dewletê li ser rêyan jî bi vî rengî ewlakarîyak dabû bû girtin.

Herêmên kurdan, wê bi raperînên aşîrî, heta ku sal tê sale 1929'an û hwd, wê bi tememî pirraniya hêza wan bi wî rengî were şikandin. Piştî ku dewletê jî dît ku êdî derfeta kurdan nemaya ku hêzeka mazin li dijî wê êdî ava bikin, êdî bi teybetî, dewletê berê hêzên xwe da bi ser gund û navçeyên kurdan de. Êdî bidest komkujiyên mazin kir. Ku di wan demên ku dewletê hêzên mazin di ajotina bi ser gund û navçeyên kurdan de ku hingî, tenê hêzeka piçûk jî ku ya kurdan li wan deveran heban, wê karên mazin kiriban bi pêşî lê girtina komkujiyên mazin re. Lê ew nema bû. Mînaq, komkujiya gelyê Zilanê, ku di bi hezaran jin û zaro û kal ku destê wan çek negirt ku xe biparêzên hatina qatîl kirin. Herêm, bi vî rengî, hatîya bê mirov kirin.

Di wê demê de, wê ne tenê artişek were bi ser kurdan de. Dewletê, ji sê çengan ve artiş amedekirina û şandina bi ser kurdan de. Bi teybetî, artişa dibin serokfermandariya Salih Omurtak, ku ji gelekên herêmên agirî bigra heta ku digihijê herêmên botanê ên weke stawrê, Cizîrê, Nisîbinê û hwd, wê li herêma mazin bi hezaran mirovan bikujê. Heta ku vî artişê, bi hêzên mazin ku li wê hatina destek dayînê (**taqwîya**) kirin wê xwe gihandîya herêmên weke hezê û mîdyadê bixwe jî. Li gelek gund û navçeyên van herêman jî komkujiyên mazin kirina. Artişa di bin serokfermandariya wî mirovî de, teybetmendîya wê ew bû ku piştî serhildanê, hemû herêmên

kurdan bêne wê rewşê ku êdî nikaribin serhildan li wan bibin. Bi vê yekê, vê artişê, bi teybetî, berê xwe da sivîl û zaro û kalan bi deh hezaran kurd kuştina. Piştî oparasyonên leşkerî ên ku bi destê vê artiş dewleta tirk ku li ser serê kurdan hatina kirin, wê di dawiyê de wê herêm bibe kaviil. Gelek mirovên ku ew dem jîyan kirina, piştê ev gotin gotina û ev gotin di nava xalkê de li herêmen kurdan bûya weke gotinaka xalkê jî, ku hatîy gotin ku "wê vê artişê, mirov weke haywanan dikuşt." Di gotin ku "dema ku çawa ku êşek dikevê nava sawalan de û bi carekê hemû bi hevdu re dimirin, wilo li me mirovan jî kirin."

Gelîyê zîlanê, dema ku bahse wê dihê kirin, weke komkujiyaka ku di wê demê de ku hafî kirin, ku tê gotin ku "laş li ser laş bû". Bi wê re jî dihat gotin ku "ava ku di wir de diharikî xwûn bû." Heta ku dihat gotin ku "gelek mirovan, xwe di bin laşên mirî, weke ku mirî daye nişandin û bi wî re xilas bûna." Ev gotin jî, di nava xalkê de bo komkujîya Zîlanê di nava xalkê de li herêmedî dihê gotin. Komkujîya Zîlanê, rûyê dewletê ê rast pirr baş dabû bû fahm kirin. Dewletê, bi teybetî, piştî sehildane şêx seîd û ya agirî û pê de, berê xwe daye bi ser mirovên sivîl de. Wê piştî wan re jî, wê oparasyonên çavtirsandinê û kontrolkirinê wê ne sekî in û wê bidom in. Ku piştî komkujîya dersimê re tê li darxistin di 'paxte sadabadê' de wê ev rewş jî werina ser ziman. Bi teybetî, biryara "jidandina sînoran" wê di ancama wan nîqaşan de wê were girtin. Hêzên ku tevî paxtê bûna, hinekî jî bê kurdan nas dikin û dizanin ku kurd wê wusa bêdeng nesekin in. Êdî piştê, wê çawa bergir (tedbîr)an bigrin, li wê dihizirin. Heta ku di dema serhildaneka kurdan de wê çawa piştgirîyê bidîna hevdu jî di nava de wê pirr biryara di nava xwe de bigrin û wê piştê jî bikina fermîyetê de. Bi komkujîyên weke komkujîya gelîyê zîlanê ku li herême agirî û ankû serhadê, bi komkujîyên weke komkujîya dersimê ku dersimê hat kirin û hwd, dewletê piştê bawer kir ku êdî bi tememî Kurdistan û kurd bêdeng kirîya. Lê ew hasabê ku wê kiribû weke yê wê derneket. Kurd, piştê jî, wê bertekên xwe bidin kirin. Ji dema komkujîya gelîyê zîlanê û komkujîya dersimê û hwd, heta ku dema tê salên 1980'î û hwd, wê oparasyonên çavtirsandinê wê bênavber bidom in. Di wan oparasyonan de jî, hertimî hewl dide ku herêm were bêçekkirin. Minaq, gelek aşîr û ankû mirovên ku dewletê gûman dikir ku çek di destê wan de hebûna, wê bi derewîn pêşî çend mirovan biafirîne bi devê wan gotinê bide gotin ku 'di destê wan de çek heya' û piştê wê oparasyonan li ser serê wan bide kirin. Ev jî, weke metodeka dewletê ya sereka ku piştê bikardihañî bû. Ev metod, bi metodên weke girtin û êşkence li wan kirinê û hwd re dihat bikarhanîn. Di wê demê de, ji bilî çend mirovên li rex dewletê, ti mirovên ji herêmen nikarin bibêjin ku wan êşkence ji dewletê hêzên wê ne dîtîya.

Komkujîya zîlanê, weke ya dersimê ku dewleta tirk kir, hinek armancên wê bi wê hebûn. Dewletê, bi komkujîyên weke komkujîya gelîyê zîlanê û komkujîya dersimê û hwd re, xwestibû ku temenê rabûna serpiyan ya kurdan ji holê ra bike û temenê doza maf û azadîya xwe kirina wan ji holê rakirin kiribû. .. Armanca van komkujîyên ku piştî tafirandina serhildanên kurdan re ku kiribû ev bû. teybetmendîyeka din ya van komkujîyan ew a ku ne di dema rapêrîn û ankû serhildanên kurdan de na. Hemû di demên kurd bêdeng de bûna. Bo ku temenê serhildanan were jî holê rakirin. Yanî, di temenê politikayaka ku hatî kifşkirin de ew komkujî dihatin kirin. Dema ku em vê politikaya dewletê jî bi başî fahm nekin, emê bi tememî kirin û bûyîna wan komkujîyan jî fahm nekin. Di serî de, zihniyeta di temenê kirina wan komkujîyan de bi wê politikayê divê ku were ditin û kifşkirin û fahm kirin. ..

.. Komkujîya dersimê, em dizanin ku di sale 1937'an de bûya. Lê gele jî me nizanin ku ew komkujî jî ber çî bûya. Di wan demên dawiyê de, hin radayarên dewletê, ji bo wê jî manipûla bikin, kirina rojava xwe de. Her kesekê ku bahse komkujîya Dersimê kir, bi êşa kurdan ya bo komkujîya dersimê re got. Rayadarên dewletê, ji bo ku dewletê jê paqij derxin, di nava hin nîqaşna de na. Bi teybetî, Hikimeta T. Ardogan û wî ew bixwe, bi vî armancê ew komkujî hilda li rojava xwe. Lê tenê ji bo ku manipûla bikin, ew kirina rojevê de.

Ew dem, ku têde ev komkujî bû, di wê demê de li gorî hin agahîna ser 15 hezarî mirov hatina qatil kirin. Hinek jî, ku li gorî nêzî dewletê diaxivin, li dora 50 û an jî kû 60 hezarî dibêjin. Lê rastî hertimî jî wê maztira. Di wê demê de, heremeke mazin ku ji ber çiyayê agirî heta ku digihîşt berçiyayê Munzir û herême Zîlanê û hwd bû. Divê ku mirov, dema komkujîya Dersimê, weke

pêvajoyekê hildê li dest. Bi teybetî bi serekeyî ji salên 1930'î û hwd, divê ku mirov hilde li destê, bêgûman berî vê demê û dîrokê jî komkujiyên bi komî ên ku mirov dikarê wan bêne ser ziman hena. Bi teybetî weke minaq ku mirov bide hêrîşên di salên 1919 û ankû 1920'ê hwd di van hêrîşên ku genalarê demê "Nurettin paşa" ku kirina, di wan de tê gotin ku bi deh hezaran mirov hatina qatil kirin. Gotinaka Nurettin paşa, a pirr ku hatî bihîstî li herêma dihê ser ziman. Ew jî ew bûş ku Nurettin paşa gotibû ku "me yên ku gotin 'zo' xilas kirin, nûha jî yên ku dibêjin 'lo' emê wan xilas bikin." Bi qasta yên ku g' digot in 'zo', qasta ermeniyên dihat kirin. Biqasta yên ku digotin 'lo' jî qasta kurdan dihat kirin. Piştê, di salên 1923'an û pê de, ku komara tirkîyê ava bû jî, ev hêrîş û komkujiyên komara tirk ên bi komî û tomarî dewam kirin.

Piştî ku komara tirk hat ava kirin, êdî bi tememî navê 'kurd' û 'kurdistan' hatina qadaxa kirin. Bi wê re jî, êdî hatina bi ser kurdan. di nava kurdan de hê ku navdar de, ku weke "pilota yekemin" tê zanîn "Sabiha Gökçe", firoka xwe tişî bomba dikir û dibir û li Dersimê li ser serê kurdan vala dikir û piştê divegeriya û carek din firoka xwe tişî bomba dikir û dibir û vala dikir li ser serê kurdan." Ev gotin bixwe jî, bi navê Sabiha Gökçe bixwe re di nava kurdan de, bûya weke gotinaka xalkê û pirr dihê nasîn.

Di dema komarê de, kurdên ku dewletê li dijî wan şer dikir û bi artîşa xwe diçû bi ser wan de, hingî ew kurd, weke "şakî" dihatina bi nav kirin. Hingî, di salê 1930'î de, dema ku artîşa tirk çû bi ser kurdan de li dora çiyayê agirî, rojenama komarê ya bi navê "cûmhûriyet"ê di hijmara xwe ya 13 tirmeha sale 1930'î de di nivîsêna ku "artîşa tirk, çûya bi ser 'şakî'yan de û yek ji wî wan ne filîtîya." Ev komkujiya ku rojnema bahsê diikir, hingî li gelyê Zilanê bûya dû wê komkujiya ku rojava di derbarê wê de dinivîsê û dibêje ku "ti kesek ne filîtîya" de, tevî jin û zarokan, herî kêm ser 15 hezaran re mirov dihê gotin ku hatina qatil kirin. Ev komkuji, weke "komkujiya gelyê Zilanê" û ankû "komkujiya gelyê Zilê" hat nasîn û bi vî navî bû malê dîrokê.

Di vê demê de, pergale pirr partîtîfîyê nebû. Pergale yekpartîtîfîyê hebû û hingî jî, CHP, weke "partîya dewletê ya ku ji aliyê "M. kemal" vê hatibû ava kirin, serdest bû û rayadarên dewletê ên ku biryara komkujiyê didan jî, di wê de bûn. Lê kar, weke karê partîyêkê zêdetir, weke karekî dewletî bû. Hingî jî, dewletê bi vî rengî li rewşê dinerî. Ji xwe, hingî artîşa tirk jî, weke partîyêkê li jîyanê û li qada siyasetê serdest bû. Hemû biryarên siyasetî ên dewletî jî, di kifşkirina wê de jî ew kifşkar bûn. Projeya avakirina komarê û rastkirina herêmana jî, artîşê bi rê ve dibir. Minaq, dema ku komkujiya dersimê dest pê kir, hingî mirovên mazên ên weke dê û bav dihatina qatil kirin û zaroyên wan ên piçûk jî, ji aliyê rayadarên dewletê ên leşkerî ve dihatina berhevkirin û dikirina kamyênên leşkerî de û ew dibirina rojavayê tirkîyê û radestî malbatê leşker û an jî malbatên tirk ên di wê astê de ku dikarin wan weke tirk mazin bikin dikirin. Bi wî rengî, êdî ew zaro, weke mirovna tirk dihatina mazin kirin. Bi vî rengî, zaroyên hemû dê û bavê wan hatina qatil kirin, tê gotin ku bi deh hezaran zaro ji aliyê rayadarên dewletê û ên artîşê ve hatina berhevkirin û şandina rojavayê tirkîyê ku wan weke tirk mazin bikin.

Di vê çerçovê û nêzikatiya rayadarên dewletê de ku mirov li komkujiya dersimê binerê, mirov wê demên wê ên piştê jî baştir fahm bike. Ji salên 1930'î û heta ku dihê û gihijê salên 1937'an û hwd jî, bi teybetî, wê pêvajoyeka pirr bixwûn bi rê ve herê. Bi deh hezaran kurd wê werina qatil kirin. Sal, ku tê sale 1937'an, hingî êdî zêde mirov li herêma namênin. Ji ber ku pirranîya wan hatina qatil kirin. Ên ku mana jî, bi wan re tê gotin "bermehiyên ku ji ber komkujiyê mana û filîtî na." Rayadarên dewletê bixwe jî, ev gotin dem bi dem, li ber kurdan bi lêv kirina. Weke "bermehî"yan li mirovên ku mabûn dihat nerîn. Sale 1937'an, bi teybetî, weke sale ku êdî dewletê bi komkujiyê êdî kurdistan û bi teybetî jî Dersim bédeng kiribû bû. Heta wê demê, mirov kom bi kom dihatina berhevkirin di kirina şikevtan de û gaz dîberdana hundurê şikevtê û ew tede dikuştin. Radayarên dewletê, wê piştê ji vê rewşê re bêjin ku "me weke haşaratan ew bi vî rengî dikira şikevtan û gaz dîberda ser wan û ew dikuştin." Dewletê, ji li xwe mikûrhatinakê zêdetir weke "rastîyêkê" ev dihanîn ser ziman. Yanî, bi wê gotinê, kiryarên xwe dihanîn ser ziman. Di dema ku ev gotin dihanîn ser ziman, bi rengê ku kurdan bidina tirsandin ji dewletê dihanîn ser ziman.

Komkujiya Dersimê, piştî ku dem û pêvajoya wê tê sale 1937'an, êdî weke ku li gorî xwe ancama ku wê bidest xistiba bidest xistibû. Piştê li herêmê kurdên ku weke "bermehî" mabûbûn jî, bi pêvajoyî programên bişavtinê û ankû 'asîmlasyonê' li ser wan hat meşandin. Pêvajoyaka pîrr bi şitt li wê herêmê hat meşandin. Î ro, ku mirov bipirsê ku ka ji ber çî navê "kemal" herî zêde li wê herêmê bicih bûya û hatîya bikarhanîn, divê ku mirov vê pêvajoya bişavtinê ya piştî komkujiyê ku dewletê li wê herêmê da meşandin bi bîr bixe. Ew bixwe jî, weke ancama wê wê pêvajoya bişavtinê ya.

Li herêmê, di wê demê de, di dema komkujiyê de zagon(kanun) weke ên "**iskan û "tekrîrî sukun"** hwd jî, zagonên ku dewletê bi armanca guharandina demografiya herêmê ê ku hatibûbûna derxistin. Zagonên bi vî rengî ên ku hatina derxistin, di ancama wan de bi aşîrî, pîrr aşîr jî jî herêmê hatina dayîn goçkirin li herêmên din ên tirkîyê. Li herêmên tirkîyê ên ên li dora Ankara, Konya û Ayndînê û hwd, gelek aşîrên kurd, hatina goçkirin li van herêman. Aşîrên ku hatina li vanderan goçkirin jî, di hundurê demê de hewlê hatîya dayin ku ew ji zimanê wan werina dûrkerin. Mînaq, kurdên ku di van dema de li van herêman hatina goç kirin, pîrranîya wan ji ziman û çanda wan hatina dûrkerin.

Li vir, divê ku mirov bipirsê ku bi çî armancê ew komkuji pêk hatin? Bi teybetî, ji ber ku ew kurd bûn û bi kurdî diaxiftin, ew komkuji pêk hatin. Ji ber ku di temenê van sedeman de ev komkuji pêk hatin, piştê jî, di temenê qadaxaya li ser zimanê kurdî û hwd de, ev sedem hatina mayinda kirin û di ancama wan de komkujiyên nû jî pêk hatin. Mînaq, komkujiya Qalqelîyê û ankû weke ku di çapameniyê bi navê ku tê nasîn komkujiya "Ozalp"ê ku bidestê Mustafa Muglalî hat kirin bûn. Bi vî rengî, di wê xatê de jî komkujiyên weke ên ku di dawîya sale 2011'an de ku sê roj mana ku sal bi dawî bibe komkujiya ku pêkhat ên weke komkujiya roboskî û hwd jî di wê xatê de hatina û bûna. Bi vî rengî, li ser xatekê, têgihîştinek, dewletê ev komkuji hemû bi plan û program kirina. Di arşîvên dewletê de jî, planên wan komkujiyan bi awayekî rast werina derxistin li holê, wê were dîtin ku hena,

Lê dewlet, wê ti carî, di temenê mahkumkirina xwe de ti belgeyan dernexina li holê. Hin kurd, car bi car bang dikin û dibêjin ku "divê ku dewlet arşîvên xwe yên wê demê ve bike." Yên ku van banga dikin jî, di serî de yên ku bi temenî dewlet nasnekirina na. Her kesek jî, dizanê wê dewletê wê yekê nekê. Ku bikê jî, wê di temenê afirandin û çêkirina hin belgeyên nû de ku xwe paqij derxe de, wê vebike. Di sadsale me de, gelek dewletan, ev "vekirina arşîvan" bi armanca paqijkirina navê xwe ji kirin û kiryarên xwe yên qirêt bikarhanîna. Hin dewletna jî, ev yek kirina weke politikayekê jî ji xwe re. Tirkîya jî, ev politika, hem di komkujiyên li dijî kurdan de û hem jî di komkujiya Ermenîyan de kira merîyetê de. Dem bi dem, gotinên rayadarên dewletê ên ku dibêjin ku "di arşîvên me de, ti belgeyên bi armanca ku wê komkujiyê piştrast dikin nîn in", û ankû dibêjin ku "arşîvên me yên wê demê jî herkesekî re vekirîna", û An jî kû, "bila nivîsandina dîrokê jî dîrokvanan re bê hiştin" û hwd, bikardihênin. Di pîrsgirêka kurd jî, li ser van politikayên "arşîvên dewletê re jî, ev rêbaz hatîya bikarhanîn. Divê ku mirov bipirsê ku kî mirovê bawer bike ku dewleta tirk wê belgeyêkê bi nivîsêna û tede binivîsêna û beje ku "me ji sale 1923'an û heta 2012'an, zimanê kurdan qadaxa kirîya û me ne hiştîya ku ti kurd bi zimanê xwe yê dayikê perwerde bibînin?

Di nava nîqaşan de û bi teybetî di mijarên dadî ên komkujiyê de, rêbazaka dewletana ku hertimî politikaya xwe ya li ser arşîvan re derdixin li pêş in. Bi vî rengî, hertimî, rê û aliyê ku dixwezî di tê de bidina meşandin didina kifşkirin. Divê ku mirov bipirsê di çerçova van xwestinê ku hin mirov di nava nîqaşên sîyêsî dikin û dibêjin ku "divê ku arşîvên dewletê ên demê werina vekirin" jî bibêje ku ti carî dewlet, wê van kirinên xwe yên ku weke jenosîdî wê ji wan re belgeyan li holê nede hiştin. Ev nîqaş jî, tenê manipûla kirin a. Komkujiya dersimê jî, weke ku car bi car serokwezîrê T. Erdogan, li ser çapameniyê re wê manipûla dike û dibêje ku " di dema CHP'ê de komkujiya dersimê bû" jî, tenê bi armanca manipûlakirinê ya. Di serî de divê ku mirov bibêje ku hertimî partî amûrna ku ji bo armancê dewletê ên bi rê ve birinê ku dihên afirandin in. Di wê demê de CHP bû û bi destê wê komkujiya dersimê dewletê kir, Î ro jî AKP heya û dewlet bi destê wê şerê li dijî kurdan di temenê înkara kurdan û qadaxaya li ser zimanê kurdan de bi rê ve

dibê.

Heta ku qadaxa li ser zimanê Kurdî hebe, heta ku kurd li ser axa xwe bi zimanê xwe yê dayikê û çanda xwe nikaribin xwe çanda xwe bi rêxistin bikin, mirov nikarê beje ku pêvajoya 'dersim 37' dawî lê hatîya. Ji ber ku ev sedemê wê bûn. M. Kemal, di dema komkujiyê de diçê dersimê û tê gotin ku dibêje ku "ev kî na? Ne tirk in, divê ku bibina tirk". Piştî vê re jî, çûyina bi ser kurdan de û bi teybetî bi ser kurdên dersimê de bişitt bûya. Kurdan, di wê demê de jî bi dewletê re têkilî danîna û xwestina ku pirsgirêk bi rêyên danûstandinê were çareser kirin. Di dema ku Sêd Rîza ku weke "pîrê dersimê" jî tê bi navkirin, rûsîpiyekî bi rûmet û ê kurd bû. Wî xwest ku bi rayadarên dewletê re hevdiîtinê bike. Dema ku rayadarên dewletê ji wan re dibêje "temam û emê bi hev re bikin" û piştê bi wê armancê Sêd Rîza û çend hevalên xwe dikevina rê de û diçîna Erzinganê. Li wir, ji dêla ku wan re rûnihin û pirsgirêkan bi axivin û pirsgirêkê çareser bikin, li wir Sêd Rîza digir in û sefera Leşkerî ya li dersimê ya piştî wî re ku destpê dike êdî piştê dest pê dike. Sêd Rîza, ji xwe qarakerê dewleta tirk û rayadarên dizanî. Ji ber vê yekê, pêşî bi serekên aşîran re hevdiîtinê dike û heya wan dikîşîne ser seferêka ku dewlata tirk li Dersimê bike. Piştê di 5'ê Êlonê de sêd Rîza bi çend hevalên xwe re dikeve ser rê de ku Erzinganê û bi rayadarên dewletê re li ser mafê kurdan hevdiîtinê bike. Hingî di hevdiîtinê de, di destpêkê de ji dêla dest bixafîtinê bikin û pirsgirêkan nîqaş bikin, dora wan tê girtin û ew tîna girtin û wan dibina Elezîze û li wir, "darazaka formalîte" ku cezayê ku têde bihata dayin ku berî wê darazê hatibû kifşkirin de, tê ceza kirin û bi cezayê "bidervakirinê" tê bi derve kirin. Bi derva kirina Sêx û rûsîpiyê kurd, li gorî dîrokê di 15 mijardê di sale 1937'an de tê kirin.

Bi dervekirina Şêd Rîza, di aslê xwe de ji bi dewletê, weke derbeyaz mazin ya di jenosîde dersimê de ku li kurdan hatibû xistin bû. Êdî, ew bidervekirina wî, weke xelesa dawiyê ya sefera li dersimê ya li ser serê kurdan bû. Dewletê, piştî bidervekirina Sêd Rîza bixwe jî, li ser dersimê ew sefera Leşkerî ku Sêd Rîza gûman dikir ku wê bibe jî bû û di ancama wê de di serî de mirovên ku dikarin li ser navê kurdan gotinê bibêjin ên serokaşîr û ên aqilmend û rûsîpiyên kurd hatina berhevkin. Gelek ji wan şandina zindanan û gelek ji wan jî hatina qatil kirin. Ji xwe, hewcen ne hat dîtin ku wê piştî bi dervekirina Sêd Rîza re, wê wan pêşeng kurd ên ku dewletê ew kifş kiribûn girtin ku wan bi darezêne jî. Bi vî rengî ku li Dersimê hat kirin û êdî tîkesekê ku gotinê li wir li ser navê xalkê bibêje nema û ên mabûn jî, an ji tîrsa deng dernexistin û an jî li cem dewletê cihgirtin, piştê pêvajoya bişavtinê ya bişitt a li ser dersimê hat dest pê kirin ji aliyê komara tirk ve. Bi vî rengî, weke ku hat xwestin ku êdî "dersim were tirk kirin." Dersim, êdî hin bi hin hat tirk kirin. Ji tirkî û pêve ne hatin ku ti zimanê din li wê herêmê were bikarhanîn. Ev herêm, heremek ji wan herêmên ku qadaxaya zimanê kurdî lê pîrr bi şitt hatibû meşandin bû.

Ev qadaxaya li ser zimanê kurdî li herêmên kurdan ku bi komkujiyên li ser serê wan re bû yek, êdî bû temenê "sendromeka" mazin a dîrokî ku dersimî û kurd bijîn. Ji wê rojê heta roja me, ku ez lê dînerin, ew sendroma ku dihê jîn kirin, roj bi roj ku çend dîrok bi ber me û dema me ve hat, zêdetir û maztir bû. Ji ber vê yekê, gelek kurdên dersimî bi dilûcan goç kirin ji herêmê li welatên ewropî ên weke Almanya û Firansa û hwd. Bi xwezayî, wan xwe kir pênaber. Lê di temenê wê xwe goç kirin û pênaber jî, di temenê wê de ev sendroma komkujiyê ku hê weke nexweşiyeka deronî di keseyetiyê dijî heya. Ev nexweşî, ne tenê bi mirovên xweza û ji rêzê ên dersimî re heya. Her wusa herî zêde bi mirovên ku weke "rewşênbîr" ku ji wê herêmê derketin de jî heya. Ez karim bêjim ku di wan de zêdetir heya. Nezanîna çî kirin û di kifşkirina rêya xwe de ne zelalbûn di mejî de û hwd, ne nêzîkatîyên pirsgirêkî ên ji aliyê aqil ve ku xwe bi dîyarî didina dîyar kirin. **Bi vê rewşê de, di aslê xwe de, keseyetîya wan, herî zêde bi vê rewşa xwe êdî xwe bi "rehewetekê" re li bayê wê pêvajoya bişavtinê berda. Ku mirov bipirsê, gelo ew kurdên ji wê herêmê ên ku ji xwe re dibêjin rewşênbîr" çend ji wan zimanê xwe yê dayikî bikarhanîn û pêşxistin. Ev pirsgirêka rewşênbîrên kurd ku ev ne bikarhanîna zimanê civake xwe û ji wê dîrkotinê, di yê wê herêmê de zêdetir xwe bi dîyarî da nîşandin. Mirovekî ku bi çavê psîkolojîkî ku li vê rewşa mirovên dersimî bi nerîya, wê bi rehetî kifş bikira ku ew nexweşîya ku di keseyetîya wan de ku ew bixwe jî, dikin ku wê biveşêrên ji jî berçav, wê ji wê re doza tedevîyê bikira. Keseyetîya ku weke bermehî ji komkujiyê maya, di serî de ji nû**

ve bo ku bijî, berî hertiştî tedeviya wê ya deronî bi civatî pêwîst pê hebû. Lê ev nebû. Ji ber vê yekê, hê jî, ew pirsgirêk bi awayekî li berçav bi 'reaksiyon' û ankû hewldanên dûrketina ji wê herêmê hem di serê xwe de û hem di jiyane xwe de, tenê vê dihêne ser ziman.

.. **Dema ku bahse dersimê dihê guhê min,** ji du aliyên ve dihê berbîra min. Aliyê pêşî, ew komkujiyên li wir bidestê dewleta tirk hatina kirin û ku ta roja me jî, bi çêkirina bendavan û hwd di temenê jenosîda çandî, hizrî û dîrokî de dimomê dihê berbîra min. Aliyê din jî, Elewîtiya wê ya. Lê divê ku ez bibêjim ku û di cih de bixweza ku dihê bîra min, aliyekî wê din jî heya. ew jî, ew a ku piştî ku komkujî û pêvajoya 'paçijkirinê' li wir hat dayin dest pê kirin, kurdên zaza, ji dêla ku hê bêhtirî bi ser wê komkujiyê de herin û wê safî bikin û bandûra wê bi vî rengî ji ser xwe biavêjin, bi rastîya xwe re ji herêmên xwe ravîn. Î ro, ku em bibêjin bi teybetî ji du û an jî sê hereman bi vî rengî goç kirinên ku divê ku ez wan ji aliyê deronî û ankû psikolîjîya jenosîdê ve bînina ser ziman hena. Ya ji wan dersim a. Cihên din jî, kurdên ku di sadsale pêşîya me de, ji ber komkujîyan ku ravîna û çûna dora Anqara û Konya û hwd jî, di deronîyaka bi vî rengî de hem ji rastîya xwe diravîn û hem jî ji herêmên xwe. Î ro, dema ku ez li welatên ewropî ên ku penebarîya kurdan li wan pîr zêde bûya, ku mirov li demografîya wan binerê, mirov wê bi awayekî vekirî rastî mirovên ku ji van herêman hatina were.

Zazakî û ankû 'kurmanckî', zarawayekî kurdî ê herî kevn a. divê ku ez bibêjim ku herî zêde temenê vî zarawayê kurdî î kurmanckî û soranî zêdetir bi ser hawramkî ve diçêt. Kurdên hawram, zimanê wan jî, weke yê kurdên zaza û ankû kurmanckan di nava xwe de maya. Li ser vê, dema ku ew komkujî û zor û şidet dîtin jî, êdî bêhtirî ketina nava xwe de. Bi wê re jî ji dora xwe re û ji beşên din kurdî de girtî man. Lê divê ku ez bibêjim ku heta sadsale 15 û hwd jî, kurmanckî pîr pêşketî bûya. Bandûra wê pîr mazin bûya. Heta ku ez karim bêjin kukurmanckî zimanê desthilatdariyê bûya. Minaq, di dergahên şêxan de bikok bûya. Bi vê rengê, bi olî jî pîr pêşketîya. Şêxên wê herêma kurdistanê jî, bandûra wan pîr mazin bûya. Weke ku çawa ku di destpêka sadsale 20'an de pîrê kurd şêd Rîza hebûya, di sadsale 12'min de şêxê çemişgezêkê heya û bandûra wî pîr mazin a. Heta ku hin belgeyên dîrokî dibêjin ku di dema ku destpêka Osmanîyan de di nava Bayazîd û birayê wî Yildirim han de ku pevçûn bûya û ti kesekî nikarîya ku wê berberî û pevçûna wan ya bi hev re bide sekinandin û tê gotin ku şêxê çemişgezêkê çûya û nava wan çê kirîya û ew lev hanîna û piştî rêveberî û desthiladariya wan jî bi wan daye ava kirin. Bi vê yekê, tê gotin ku "ji herêmê Bursaya ya wê demê, hatina pey şêxê çemişgezêkê û ew çûya û nava wan çê kirîya."

Bi vê re jî, divê ku em bêjin ku piştî şerê kerbeleyê, şîitî pêş dikeve. Weke destekê wî ji elewîti pêş dikeve. Lê elewîti, hin kokên wê ên ku ew di nava pergale xwe ya hizir û têgihîştinê esas digirê ji wê pîr kevntir in. Ji ber ku heta roja me jî, di vegotin û hanîna wan ya li ser ziman de ev alî kêm maya, êdî zêde ne hatîya pêşketin. Lê bi teybetî, li rojhilatê kurdistanê, ku bi teybetî temenê tariqata sefewîyan jî wan avêtîya Îsmailî pêşketina û dergaha wan dergaha şêx bûya û şêxê kurd bûya. Şah Îsmail bixwe jî ji wê ya û ew bixwe jî biaslê xwe kurd bûya. Elewîti û ankû şîitî, piştî ku di şerê kerbeleyê de Hasan- Huseyin hatina pekrawan kirin, êdî pêşketin dergahên kurd ên li berêmê bandûraka mazin ya vê çê bû û di cih de xwe aligirê wan denezend in û temenê wê avêtin. Bi vê re, ku em bibêjin ku wan dergahên kurd, temenê wê avêtîya jî, wê ev gotin ne xelat bê. Ji dema şerê kerbeleyê ta ku dema şerê Çardîranê, wê di wê navberê de ku ser 9 sadsalî re dem di buhurê. Di di hundurê vê demê de, di cihane kurdan ya oolî de jî du cihan û du telolojî derdikevîna li holê. Î ro, ku em li wê teolojîya, şîitîyê binerê, divê ku mirov bibêje ku rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê temenê wê avêtîya. Malbata xalîfeyên Abasî ên weke Haro Raşîd û Bahlûl bixwe jî kurd bûna. Lê piştî, weke ku di qasrê de hin derbe dihên kirin û di desthilatdariyê de dest dihê guharandin dibê. Piştî jî, malbata mûtasîm û hwd dihên ser desthilatdariyê û bi teybetî berê xwe didina bi ser kurdên rojhilat û xorasanê de. Kurdên xorasanê, bi teybetî, divê ku ez bibêjim ku hin teybetmendiyên wan ên pîr teybet hena ku divê ku em wan bi teybetî bînina ser ziman. Babekê ku î ro bi mîranîya wî re dihê kirin jî, bi aslê xwe kurd bûya. Di wê dema ku hêriş li kurdên 'sersor' dibin, ew li berxwe didin û babek, weke serokekî wan bûya. Koka pêşketina babekê diçê û digihîjê Mezdek û hûrem. Koka Mezdek û Hûrem jî diçê

û digihijê Manî. Koka têgihîştina Manî bixwe jî diçê û digihijê ya Zerdeşt û koka têgihîştina Zerdeşt bixwe jî diçê û digihijê ya Mîtra. Bi vê rengê, divê ku em di temenê berdewamîya wan de wan bênina ser ziman.

Ji xwe, dema Abasîyan, ta ku tê dema Salahadinê Eyûbî, wê pêşketina xwe bide domandin. Lê ji ber nakokiyên ku piştî şerê Kerbeleyê di nava wan de afirîn jî, piştire, êdî gotinên ne baş li diji hevdu bidedest karhanîne kirin. Li baxda, xalifetîya şîtîyê û jî Şamê ta ku digihîşt Medîne li wir jî xalifetîya Sûnnî pêşket. Van nakokiyên ku derketin û piştire bûna temen û sedema 'ihtilafên' di nava wan de, ji wan zêdetir bandûra wê li kurdan û pêşketina kurdan bû. Di serî de, kurd di cihane xwe de bûbûn du qat. Piştire jî, waletê wan bû bû duqat. Ew duqatbûna welatê wan, wê piştî şerê çardiranê bi peymanê 'Qasrî Şêrin' wê bê fermî kirin. Bi vê yekê, di serî de divê ku mirov bibêje ku êdî bi tememî cihane kurdan û kurdistanê ku ew teoloji di bingihê wê de ya, bûya qat û cuda pêşketina xwe dide jîn kirin. Piştî vê re, kurdan, bi olê re du nîrxên xwe yê din derxistin li pêş. Yek kevneşoppî bû û ya din jî nîrx, çand û zimanê wan bû. Bi wê re jî, dem bi dem kirin ku wê duqatbûnê bi bandûra wê bidina şikandin. Çend ku bi wê, ew duqatbûn nedan şikandin jî, lê bandûra wê dan şikandin. Bi wî re, êdî demeka nû bi teybetî jî bo kurdan dest pê kiribû. Kurdên ne şî û ankû elewî, bi şerê çardiranê re hinekî weke ku derfetek ji wan re derket li holê ku hebûna xwe bidina domandin bi serdestî. Lê ew jî piştire nebû. Piştire, bînpêkirina peymanê di nava kurdan û osmanîyan de ji aliyê rêveberfeyên osmanîyan ve êdî ku ew jî bi rê ve neçû, kurdan rêyeka sêyemin dîsa hilbijartin. Ew rê jî, ew bû ku êdî li herêmê xwe bi serê xwe bûn. Ev jî, bi demê re bi sedeme şerên bi wan re ku Osmanîyan dabû bû dest pê kirin. Kurdên, şî û ankû Elewî jî, piştî şerê çardiranê, ketibûbûna rewşeka pirr xirab de. Osmanîyan de dergehên ku bike ku wan bêne ser xate xwe ên di asta "bektaşî"tiyê de vekirin. Bi wê re jî, piştire, ew jî ketina rewşake pirr xirab de. Piştire jî, ku ser wê xate Elewîtiyê bertekên xwe didina nişandin Şêx Bedreddin û berkrûce raperîna wan ji ber wê tûndûtûjîya li ser wan dewam dike. Piştire jî, wê raperînen 'celalîyan' wê dest pê bikin. Ku mirov ji kîjan alîyan ve bêne ser ziman jî, ev raperîn hemû jî, wê bertekna dîrokî bin. Lê bi serneketina wan re jî, rewşa kurdên şî û Elewî dikeve rewşeka pirr xirab û telûke de. Bertekên pîr siltan Abdal û hwd jî, wê têrê nekin ku ew tûndûtûjîya li ser wan bê kêma kirin.

Dergehên wan, piştire, yek bi jî holê hatina rakirin. Yê ku herêkirin û di rêya wan de meşin jî, ji xwe êdî ew wele şî û ankû elewî ne hatina bi nav kirin. Lê piştire yê ku man, çend komên xalkê ên xizan ku rewşa wan jî pirr ne baş bû. Dewleta osmanî, ji serî ve yanî mirovên weke pêşeng û ankû ên ku dikarin pêşengtiyê bikin jî, hinek ji wan hildabûn cem xwe. Lê yê ku ew herê ne kiribûn û li cem xalkê xwe cih girtibûn, bahre wan bûbû zilm û tûndûtûjî.

Di aslê xwe de, di vir de, divê ku mirov bibêje ku komkujiyên ku di van demên dawiyê de ên di sadsale 20'an de ku li dersimê bûna, dewletê, xwestîya ku dîmenekî bi vî rengî ê olî û weke "raparîna olî" bide wan û bi wê re jî, xwe ji barê wê komkujiyê xilas bike. Bi wê re jî, bike ku bertekên ku ji wê re werin nişandin bide kêma kirin. Ji ber vê yekê, gotina "sersor" pirr hatîya bikarhanî û li ser vê gotinê re weke ku çawa rayadarên dewletê ji kurdan digotin ku "kurdên bidûv", her wusa, xwestibûn ku dîmenekî li ser vê gotina 'sersor' re jî bide afirandin û wê piçûk bide nişandin. Bi wê re jî, heta ku xwestibû ku bide nişandin ku weke "sersorî, komînîstî ya." Bi vî rengî, xwestibû ku li ser çapameniyê re, ew dijminatîya ku bi gotina 'komînîzmê' ku dabûbû afirandin, bi gotina 'sersor' re bike ku kurdên Elewî jî para xwe ji wê bigrin. Bi vê yekê û rengê, hertimî li ser çapameniyê re dîmenek di mejî de hatîya xwestin ku were afirandin ku 'sersorî, komînîstî ya.' Bi vê temenê re jî, êdî wan bi tememî bê bandûra bike û piştire jî wan mahkûm bike. Ji ber vê yekê, hertimî, bi politikayên bi vî rengî, hertimî olîtiya Elewîtiyê di bîmn kontrolê de hatîya hiştin. Di roja me de, nîqaşên li ser 'malên cem' ku weke maln bergê ên vê oldarîya binîrx a, ji devê rayadarên dewletê weke "malên cûmbûş"ê bi navkirin jî, tenê dewama ve politikayê

ya. Şerê Çardiranê, di aslê xwe de, hat xwestin ku weke xatekê di nava olê de jî bê. Bi vê yekê, hertimî, heta roja me jî, li ser wê temenê şiroveya olê hatîya kirin di temenê 'sûnnîtiyê' de. Bi wê re jî, bandûra desthilatdarîya osmanîya xort bike. Di roja me de jî, heman politika, li ser olê re dihê kirin. Minaq, ji devê fethullah gulân û sazîyên wî re, bi teybetî, xatek hatîya xwestin ku

"xatek di nava kurdên Elewî û tirkên kubûna Elewî de were xîzkirin." Bi vê yekê re, minaq, ji devê mirovên bi vî rengî dihê gotin ku "Elewîyên tirk bi koka xwe re 'yuruk in." Fethulah Gulan bixwe jî di axiftinên xwe de pîrr caran gotiya ku "meseleya me bi van(elewîyên ku ew weke yuruk bi nav dike) re tûna ya, lê bi yên Tuncelî(dersim) re heya." Bi vê yekê, di vê temenê de jî, di aslê xwe de, xatek hatîya afirand in, û ez wusa zan dikim ku wê di demên pêş de ji bo wê bêbandûrkirina Elewîyan bidin domandin, wê vê politikayê xorttir bikin û bidina domandin. Her wusa, heya ku di bin navê "nasîna malên cemê" de di demên pêş de jî ku van politikayan bidin domandin. Ji xwe ti nîyeta rayadarên dewletê wusa xuya nakê ku malên cemê nas bikin. Lê ku êdf ti çare ji wan re nemêne û nas bikin jî, wê di vê temenê de bikar bênin.

Li vir, divê ku mirov bibêje ku dewlet bixwe jî, di vê temenê de di nava kurdan û tirkan de jî, li dijî Elewîyên kurd û tirk, politikaya cuda dimeşîne. Bi vê yekê re, di vê temenê de politikaya perçekirinê bi rê ve dibe û dixwezê ku ancemê bidest bixe. Her wusa, bi wê politikayê, pêşî kurdên Elewî, bi herême wan re dihên kifşkirin û di çapameniyê de ew nasîn dihê kirin û piştre kurdên Elewî dihên "îzole kirin" û piştre jî, diçina bi ser wan de. Di temenê vê politikayê û "îzole kirinê" re divê ku mirov wan bendavên ku li herême dersimê dihên çê kirin bibîr bike. Bi teybetî, herêmên ku cihên pîroz ên Elewîyên di bin de dimênin, li wan deran, bendav û ankû bi tirkî "baraj" dihên çê kirin. Li vir, ya ku hê bi teybetî ne hatî kifş kirin jî ev a. Jî ber vê yekê û vê politikaya dewletê, biqasî ku ew cih ji bo kurdên Elewî giring in, her wusa ji bo ku ew cih bin avê de bimênin çê kirina wan bendavan jî ji bo dewletê pîrr giring a.

Elewîti, di sadsale 15 û piştre bi teybetî, bi navê 'tariqatên ismailîyan ên li herêmên anatoliya jî demeka xwe ya teybet jîyan kir. Lê piştî serê çardiranê, ew dergehtîya bi vî navî jî li gelek deverên herêmê hebûn jî ji holê rabûn û hebûna li jîyanê nema. Piştre jî, li herêmê, dema ku dem hat dema komarê, bi teybetî, ew bi teybetî jî holê hatina rakirin. Di dema komarê de, di bin navê "layîk"tiyê û ankû 'sekûlertiyê' de çûna bi ser dergahên kurdan hemûyan de. Vê carê, ne tenê kurdên Elewî nesîbê xwe ji wê girtin. Her wusa, kurdên sûnnî jî nesîbê xwe ji wê girtin. Bi teybetî, divê ku ez bibêjim ku Medreseya Sor, ku li Cîzira bota bû û pîrr navdar bû, ji berku bi kurdî perwerde dikir, di wê de hatibû qadaxa kirin. Hin alim û ankû mirovên pîrr pîr û kal ku ew dem dîtibûn, digotin ku "di wê demê de li medreşê bi hezaran nivîsên pîroz û pirtûk hebûn. Hemû jî, leşkerin tirk bi ser wan de digirt û li hewşa medreşê lev didane li hevdu didane ber êgir." Piştre bi ser gotina xwe ve dikirin û digotin ku "wan, gelek ji wan nivîs û pirtûkan bi xwe re jî birin." Bi vê temenê, demeka dirêj, giranî dan li herêmê ku bi teybetî tenê awayekî bidina afirandin. Lê ji ber ku zimanê kurdî pîrr bi kok bû, êdf nikarin ku ji holê rakin. Lê çend ku medresa Sor, hat qadaxa kirin jî, li dergah û malên şexan ku weke dergah dihat bikarhanîn ew kevneşopî domîya. Heta ku dem heta salên 80 î yî, êdf dîtin ku hê ew bi tememî di wê politikaya xwe de ne gihîştina armancê, êdf weke artarnatîfeka wan medreseyên kurd, "îmam Hatîp" hatin vekirin. Îmam hatîp ên dewletê ku vekirin, tenê armancaka wan hebû, ew jî ew bû ku zimanê kurdî ji olê dûr bikin. Bi wê re jî, zimanê tirkî li cihê wê bicih bikin û bandûra Medreseyan bi tememî jî holê ra bikin.

Li Herême Dersimê, weke wê politikayê, politikayê navê 'kemaîlîzmê' li wir pîrr hat pêşxistin. Ew jî, aliye wê ê olî bvi tememî ji holê hat rakirin. Piştre dimenekî bi vî rengî hat afirandin, "ne win Elewîna wan, ma çima win diçina cem kurdên sûnnî." heta demekê jî ev jê hat kirin. Ev jî di van demên dawiyê de ku hat dîtin ku hin bi hin bahse Dersimê û navê wê dihê kirin, ev kiryar hatin kirin û pêşxistin. Lê bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku nasnema dersimîyan ya "kurd"tiya wan û ya "Elewîtiya" wan arnanc hat girtin. Ji bo ku ew herdu nasnemayên wan werin ji holê rakirin, pîrr hewldan hat dayîn. Piştî ku salên 90 î, êdf dema ku hin bi hin bahse dîroka dersimê, komkujiyên li lê ku hatina kirin û kurdîtiya wê hat kirin, êdf li ser navê wê re politikaya "zazatiyê" hat afirandin. Bi wê re jî hat gotin ku "zaza û kurd jev cuda na." Bi vê yekê re, hat xwestin ku pêşî li wê pêşketina nasnema wan ya kurd were girtin. Bi vê politikayê, hat gotin ku "zaza û kurd jev cuda na", ji ber vê yekê, divê ku win bi partyên kurd û bi sazîyên kurd re tevnegerihin." Mixabin, gelek kurdên zaza ên ku dîroka xwe ne dizanîn, hatina wê lîstikê jî. Lê piştre ku rastî fahm kirin, êdf berteka xwe dan nîşandin jî, lê nekarin ku pêşîya serkevîna dewletê

ya di hilbijartinan de ya li ser vê temenê bigrin. Î ro, dewlet, vê politikaya xwe ya "zaza û kurd jevcuda na" li ser CHP'ê re dide domandin. Mînaq, serokê CHP'ê kiliclaroglu dibêje "ez Elewî ma." Lê bi devê wî didina gotin ku ew bêje "ez ne kurd im" Bi wê re jî ji wî dixwezîn ku bêje "ez tirkmen im", Bi vê re jî, di berdewamîya vê de, dem bi dem bi awayekî bi sazûman, li ser sazîyên dewletê ên perwerde jî, gotin ji devê rayadarên dewletê dihên ku û di wan de, hertimî, bahse "cuda bûna kurd û zaza" dihê kirin. Bi teybetî, wezeretên weke ên çandê û hwd dihên bikarhanîn. Ev jî, di temenê wê poliitkaya dewletê ya li ser fethullhaçîyan re ku dide meşandin, weke berdewama wê ya. Ji xwe fethullahçî dibêjin ku "Elewîyên tirk, 'yuruk' in û ti pirsgirêk me bi wan re nîn a." Bi tememî li gorî vê temenê û politikayê poliitkaya CHP'ê dihê kifşkirin ji aliyê dewletê ve. Elewîyîya kilaclaroglu, derxistina wê li pêş û bi dayîna gotin "ez ne kurd im" jî, di vê temenê de, ji bo temenê wê poliitkaya dewletê ya bi navê 'zaza û kurd jev cuda na' ku bide domandin dike. Li vir, politikaya dewletê ya li ser CHP'ê re bi vî rengî ku dihê meşandin, ji ya AKP'ê ku olî li dijî kurdan bikarhanî 'sînsî' tîra.

Ev poliitkaya dewletê, di temenê poliitkaya dewletê ku di wê de digot ku "kurd tûna na" de dihê gotin. Piştî ku êdî ev gotinên wê bêwate bûn û êdî derket li holê ku derew in, êdî li ser temenê perçekirinê, li ser zaravayan de, bi armanca perçekirinê û bi rê ve birinê ket nava listikên bi heman rengî de.

Kurdên wê herême, hertimî rastî hin politikayên dewletê ên bi vî rengî hatina. Di dema Osmaniyan de jî, kurdên zaza rastî wan politikayên dewletê hatina. Kurdên zaza, di sale 1821'ê de di wê serhildane li dijî Osmaniyan de, komkujiyên weke ên di sadsale 20'na de ku di dema komkujîya dersimê de jîyan, hingî jîyan. Lê piştê kurdên wê herême dîsa rabûna ser xwe. Heta ku divê ku mirov bibêje ku di wê demê de bi dewletî, kurdên zaza, desthilatdarî jî di wê demê de ku navenda wê dersim bû ava kirin. Ji ber wê yekê, hingî hêzên osmaniyan çûn bi ser wan de. Di heman salê de, di sale 1821'ê de kurdên Êzîdî jî, li dora Mûş, Sêrt û heta ku digihîşt ber agirî û hwd, di bin serkêşîya Şêx Mîrzeyê Êzîdî de serî hildan. Hingî, şêx Mîrzeyê Êzîdî, dewletek ava kir. Ala wê jî kifş kir. Heta ku ji bilî artişa xwe ya mazin ya ku ji hatina aşîrên mazin ên li cem hevdû ku avabûbû jî wê artişa mazin cuda, weke artişaka teybet jî ya ji mêrên naqandî ku ava kiribû û ew artişa wî ne bin 5 hezar mirovî re bû bû. Ev sale yanî sale 1821'ê, saleka ku tê de pîrr komkujiyên mazin li kurdistanê li ser serê kurdên Êzîdî û ên zaza hatîna jîn kirin in. Di vê demê de li kurdistanê, sê û ankû çar herêmên bi rêveberîya kurdistanî ku derdiketina li hebûn. Yek ji wan Botan û mîrgehîya botanê bû., Ya din jî li rojhilatê kurdistanê ji mîhabatê ta ku digihîşt kirmaşan û Ûrmiyê û berava vê bû. Ya sêyemîn jî ku li başûrê kurdistanê û ankû herêma 'sorani' û an jî kû herêma 'badînan' hwd, bû ku derketibû li pêş bi rêveberîya kurdistanî bû. Her wusa, di wê demê de herêma dersimê jî bi heman rengî bi desthildarî û rêveberî bû. hevkarî û peymanaka ku em bi teybetî li ser kevnêşopîyan re bînin di nava wan de hebû. Ku hêriş li wan dibûn di cih de lev digihîştina hevdû û bi hev re tevdişerîyan. Ji destpêka sadsalê û pêde, rêveberîya osmaniyan berê xwe da kurdan. Li îranê rêveberîya sefawî berê xwe da desthilatdariya Ardalanîyan. Piştî ku ew ew berê xwe dan çêbû û ku çûna bi ser herêma 'sorani' û ankû başûrê kurdistanê de bû, êdî di sale 1806' den serhildane şêx Abdullrahmanê Sorî li dijî wan ji bo parastina başûrê kurdistanê dibê. Ew, serhildan, bi hin levkirinna û hin mirovên oldar ku navbeynkariyê din re zêde pêde naçê. Lê piştî ku li wir bédengî bû, Osmaniyan, hingî, berê xwe da kurdên zaza. Sal ta ku tê sale 1821'ê wê li herêma dersimê jî heta ku digihîşt ber agirî, wê komkujiyên mazin werina kirin. Mîrê bota, mîr Abdal Han, ji ber vê yekê, di pêşengîya wî û bavê wî de komara kurd ya botanê ava dikin. Mîr Mîrzeyê Êzîdî, hem dînya dixwand û hem jî pêşketinên weke şoraşa firanse bi wan hisîya bû. Lê piştî ku mîrê bota 'komara kurd ya botanê di denezêne û weke navenda wê cizîrê di hilbijêrê, piştê ew jî ji wê feyz digirê û serdestî û dewleta xwe didenezêne. Di vê demê de Osmanî, rastrast naçîna bi ser herêma botanê û komara wê de, Lê tîkiliyan bi Yazdan Şêr re didênin û dixwezîn ku wî hildana cem xwe, di wê navberê de hêzeka mazin ji du alîyan ve dişênina ser Mîr Mîrzeyê Êzîdî û kurdên zaza û herêma wan de. Mîr Mîrze, di cih de vê kifş dîke û di cih de ya ku dihê aqilê wî ew a ku nameyekê ji 'çarê rûsî' re binivîsê bişêne. Ew wê dîke û namenê bi ciwanekî re dişêne ji çarê rûsî re ji bo alikariyê. Lê ew bersivê ji wê nameya xwe na

hildê. Lê hêza Osmanêyan jî, bi çekên giran dihêna bi ser wan de. Di wê demê de biqasî ku heta roja me jî di nava xalkê de li herême botanê dihê gotin ku "di hêrîşê de osmanîyan, kevir li ser kevir nehişt." Piştî wan komkujiyên li dersimê li herêmên Serhadê, piştê li kurdistanê bigiştî demeka nû dest pê dike. Bi komkujiyan ku kurdên zaza û Êzîdî hatina tafirandin, piştê hêza osmanîyan berê xwe da bi ser botanê de. Di wê demê ku hêza osmanîyan berê xwe dabû botanê de bi yazdan şêr re jî lev kirin kiribû ku ew û artişa wî wê li dijî wan şêr nekê. Bi wê levkirina Osmaniyan ya bi Yazdan şêr re, hêta botanê û ankû hêza komara kurd û an jî ku hêza bedirxaniyan hatibû perçe kirin. Piştê li ber hêrîşan ew jî têk diçin û komkujiyên mazin li botanê pêk tên. Mîrê botî, ji bo ku serokatîya komarê hilde ewlakariyê ew diravê û diçê xwe li Mîr Mihemedê Soran digirê. Di wê demê de, Mîr Mihemedê Sorî ku herême rawandûzê jî di nav de li herêmeke mazin ya başûrê kurdistanê xwediyê desthilatdari û rêveberiyê bû. Kurdên zaza, piştî ku di sale 1821'ê de hêrîşa Osmanîyan çû ser wan û ew jî rabûna ser xwe û li berxwedan, di berdêla komkujiyên mazin de karîn ku xwe li ser lingan bigrin. Di wê demê de, çawa ku bi şikandina mîrê bota re komara botanê ya ku wî denezendibû ji holê hat rakirin û piştê çawa ku bi têkçûna Mîr Mîrzeyê Êzîdî re kurdistanê têkçûnaka mazin xwar, her wusa, divê ku mirov wê komkujiya di sale 1821'ê ya li dersimê ya kurdên zaza jîn kirin, weke lingê wê têkçûnê ê li kurdistanê ê sêyemin bihasibêne. ...

Li vir, di temenê zimên de jî divê ku ez li ser zaravayê zazakî û ankû kirmançkî gotinê bibêjim. Zaravayê zazakî, weke hawramî, gotinên wê pirr kevn a. Minaq, gotinên weke navê ziman bixwe jî ku di zimanê kirmançkî de bi rengê "ziwan" dihê nivîsandin. Di zaravayê din ên weke hawramî, kalhûrî û hwd de jî, ev gotin weke navê ziman çû digirê. Bi teybetî, di hin devikên soranî de jî cih digirê. Koka gotina "ziwan" diçê ta dema Hûrîyan. Ji dema hûrîyan, çend ku em weke navê 'ziman' gotina "zaman" ku di nivîsên bizmarî de bi rengê "za-am-ma-an" û ankû "za-am-ma-an-ti" dihê kifşkirin, her wusa, bi rengê "zû-wa-i-ni" jî hebûya. Her wusa, bi vî rengê nivîsandina navê zimên bi rengê 'ziwan' û ankû 'zuwan', weke zazakî di zaravayên din ên kurdî ên weke hawramî, kalhûrî, lorî û goranî û soranî de jî heya. Ev gotinên ku weke navê zimên in, ji dema hûrî û mîtannîyan ji nivîsên mix û ankû nivîsên ku li ser keviran hatina nivîsandin ji wan dihê xwandin. Her wusa bi heman rengê, mirov di dema Medîya de jî kifş dikê. Lê belê, hertimî jî, zazakî, di temenê înkara kurdî de, di temenê perçekirinê de nêzî bûya. Divê ku mirov bibêje ku zimanê kurdî bixwe jî, heman mirovên ku dibêjin ku zazakî cuda ya, li ser zimanê kurdî dibêjin ku "kurdî, zimanekî ku hatîya berhevkirin a." Çendî ku ev ne rast jî bê, di vê temenê de, di bin navê zanistiyê de dibêjin. Zimanê kurdî, bi koka xwe ve hertimî bi dîrokê re weke yek zimanê hatîya. Lê bi demê re gelek zaravayên wê jî afirî na. Zaravayên weke zazakî, hawramî, soranî, goranî, kalhûrî, lorî, kurmancî, Îlamî, lekî û hwd afirîna, di bin van zaravayan de jî bi dehan devikên herêmkî jî afirîna û derketina li holê. Ji devikan ber zaravayan û ziman ve ew diyeleka ziman ya kurdî, ji ber ku têkiliyên herêman bi hev re kêm û zayîf mana, êdî zêde pêşketiya. Her wusa, her yekê biserê xwe pêşketiya. Çend ku di van demên dawiyê de, ew têkilî dihên danîn jî, lê dîsan kêm dimênin. Dewlet, **ji ber çî serî li vê rê û vê rêbaza perçekirinê didê?** Ji ber ku dixwezê ku hem perçekirinê bide çê kirin û hem jî pêşî li xwesteka mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê bide girtin. Di vê temenê de, vê rêbazê, weke awayekî hêrîşê ê li zimanê kurdî bikardihêne. Bi wê re divê ku ez bibêjim ku nezan û mirovên weke Burhan Kuzu û ku ti nesibê xwe ji mirovatiyê ne girtina, derdikvina berçapameniyê û dibêjin ku "perwerdehiya bi kurdî, karê şaytên a." Bi vê rengî jî aliyekî din ve jî, bi terminolojiya olî jî dixwezê ku pêşîya xwesteka wê xwesteka kurdan bigirê. Ev herdu rêbaz jî, rêbazna jev cuda ên bi armanca pêşî li perwerdehiya zimanê dayikê girtinê na ku dihên pêşxistin. Rêbaza li ser sazîyên çandê re dide gotin zazakî cuda ya jî, terminolojiyaka din bikardihêne. Bi heman awayê, di çî û kîjan temenê terminolojiyên ku dihên bi karhanîn ên olî û ên zanistê û hwd bin, bikardihênin li gorî xwe ku ji bo ku pêşîya xwestina perwerdehiya bi zimanê dayikê ê bi kurdî bidin girtin. Li ser vê aqilê re mirov divê ku vê jî bipirsê. Dema ku cuda jî bê, ma ne mafê wan a ku zaza jî bi zaravayên xwe perwerde bibînin? Belê mafê wan a. Lê dewlet, hemû plana xwe û bikarhanîna van terminolojiyên cuda ên olî û beşên din ên zanîne û hwd, ji bo ku pêşîya xwestina mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê

bide girtin. Komkujiya dersimê, bixwe jî, bi vê armançê pêk hat. Ji bo zimanê wan ne tirkî bû û kurdî û zaravayê zazakî kurdî bû, ew komkuji hat serê wan.

Beş du, avabûn, xûrîxîna komare kurd a Mihabadê û komkujiyên ku piştire hatina serê kurdan.

Ev pêvajoya ku têre diçin bo kurdan dîrokî ya. Kurd, divê ku ji her aliyê ve divê ku li dîroka xwe biner in. Bi teybetî, fêr û cerbên weke ên komare kurd a Mihabadê û hwd, divê ku mirov li wan binerê û bo roja me jî, em ancamna giring û mazin jê derxin. Gelekî ku dîroka xwe nexwendî û nizanibê, wê nikaribê, ne pêşveçûnên xwe bi destê xwe bi rê ve bibe û ne jî wê karibê xwe li bayê çûyina pêşveçûnan xilas bike. Ji ber vê yekê, em ka li fêr û cerba komare Mihabadê binerin ka emê çê ji bo roja me jê fêr bibin;

Kurdistan, ku mirov li dîroka wê dinerê, mirov pirr pêşketin û pêşveçûnên dîrokî dibîne. Yek ji wan pêşketin û pêşketina dîrokî di dîroka kurd û kurdistanê de avabûna komara kurd ya Mehabad a. Komare kurd a Mehabad, ku mirov lê dihizirê, mirov fahm dike ku ew bi wê dîroka xwe ya pirr kort jî bûya xwediyê cerbne ku em î ro li ser wan bihizir in û wan bikin. Ji aliyê saziîtîya kurdan bê û rêxisîniya wan ve û hwd, ji gelek aliyên ve mirov karê lê bihizirê. Lê di serî de, di nav cerbên cihanî de, weke cerbeke kurdistanî, emê lê bihizir in û wê bînina ser ziman.

Dîroka kurdan, ku mirov ji aliyê dewletbûnîya wê ya bidesthilatî ve lê bihizirê û wê bêne ser ziman, divê ku em dîrokeka pirr demdirêj ku ji deme Gûtî û Hûrî û Mîtanîyan were dayin dest pêkirin bi hanîniya wê li ser ziman re, divê ku mirov bêne ser ziman. Bêgûman, divê ku ew jî, werina ser ziman. Ji ber ku mifte û kodên pêşketina gelekî û civatekê di dîroka wê de veşartî na. Bi wê fahmkirinê re, mirov wê wê dîroka bi fahmkirina wê re, emê hizirne ji bo pêşketina dem û roja xwe jî di wê de kifş bikin û bînina ser ziman. Ji ber vê yekê, hewceyî bi wê heya. Di serî de, li vir, em hizreke ku tê ser ziman û pirr bahse wê dihê kirin em bi gotinekê jê bê, wê bînina ser ziman fahm bikin. Car bi car tê gotin ku kurdan di dîroka xwe yekitiyek di nava xwe de çenekiriya. Ev hizir û gotin, ku mirov li dîroka kurdan dinerê, mirov bi pêşketinên wê yên ku bûna re fahm dike ku nerast a. Minaq, Çend demên ku em bidin ev in weke minaq. Deme pêşî, deme Gûtî, hûrî, mûtanî yan a. Ji wê bi vir te û mirov rastî çend demên din ên weke yên qasîtan, Lorîyan û hate ku tê deme Naîrî û Medîyalîyan jî, mirov wê dîrokê karê weke nişanak bide nişandin ku kurdan di nava xwe re bi hev re yekbûnên pirr mazin ên dîrokî ava kirin. Tenê yekbûna Gûtîyan, ser 400 salî re li ser lingan maya. Navende Cizîrî û dora diclê bûya. Mîtanîyan, ji Nisêbinê heta ku digihîjê ber Firatê û başor rojavayê kurdistanê kiriya nava xwe û ji vê derê jî êdî bi pêde çûya bi nava herêmên kurdistanê de bûya xwediyê yekbûneka dîrokî. Ku mirov tê demên piştî zayinê, mirov dibîne ku çend demên sereke ên ku pirr derketina pêş û li ser kurdistanê pirranîya wê bûna xwedî yekbûn desthilatdarî ev in. Deme şadadîya û ye Merwenîya heya. Berî wê demê jî demne mazin ên ku ava bûna hene. Piştire Deme Eyûbîyan ku destpêka wê ji deme jîyane Salahadinê Eyûbî ya, dest pê dike û ne bin 300 salî re wê li kurdistanê serwer û serdest bibe û bibe desthilatdar.

Tenê ku mirov li van demên ku me bi serekê jî bê hanîn ser ziman ku mirov li wan dinerê, mirov dibîne ku kurdan yekbûnaka mazin di nava xwe de çekiriya. temenê pirr xort û mazin, ku kurd li dîroka xwe biner in, wê bibîn in û fahm bikin. Dîroka kurdan, ji vê deme ku em nahaka tê de na, em weke demeke kurdistanê (di demên berê de, navên cuda hatina bi karhanîn, minaq, deme gûtîyan, deme mîtanîyan, deme hûrîyan, deme merwenîyan û hwd. ..) jî tînina ser ziman. Çend ku di demên berê de weke demên gûtî û mîtanî û piştire şadadî û merwenî hwd bûn aû pirranîya kurdistanê di deme xwe de kirina bin destê xwe de jî, bi navê wan hatîya ser ziman. Bi vê yekê re, gotina kurdistanê ku em î ro bikar dihênin, êdî ne tenê weke ji bo aşîr, êl û an jî herêmekê tînina ser ziman. Navekî ku êdî kirdatiya wê di zimên de hatîya kirin û dihê ser ziman a. Bi vê yekê re, êdî ew nav bûya navekî giştî ê sereke. Li gor xoslet û teybetmendiyên demê ên aqil û pêşketina

wê, ev pêşketin bi zimên re jî bûya û dihê li holê. Di vir de, **me bahse zimên kir. Ev gotinaka tenê ya giring bibêjin. Divêt ku em bibêjin ku ziman ji bo yekbûna civatekê weke raya di laş ya ku xwûn têde diçê û tê ya. Wilqasî giring e. Giringîya ziman, di zana min de, bi demê re û bi pêşketinên weke ên bi zanîstê û hwd re, wê hê bêhtîr ji aliyên din ve jî xwe di demên pêşde** bide berçav.

Ziman, weke xala sereke ya di temen û binê yekbûnê û bûna wê de ya. Divêt ku em vê yekê jî, her weha di serî de bi giringîya wê re bînina ser ziman. Di awayê bi karhanîna ser ziman de û parvakirina nîrxên herêmê di nava civatê bigîştî û hwd de, bi wê re dibin. Ev jî, bi xwe re hevbeşbûnekê dihêne li holê. Li ser wê hevbeşbûnê re êdî ziman weke temenekî giring ên di binê yekbûne civakî de derdikeve li holê. Mehabadiyan, di deme komarê de, pîrr giringî dana ziman. Li ser wê sekinî na. Bi wê re giringî dana xwandîna mirovên ciwan. Di wê deme wê ya kin de, bi sadan ciwan hatina şandn li yekitiya sovyet ku bixwênin û bibina rayadarên dewlete kurd di demên pêş de. Bi vê re, êdî hin bi hin li ser zimên hatîya sekin in. Saziyên zimên hatîna ava kirin. Li ser wan re têkilî di nava xalkê de bi xalkê re hatîya danîn. Bi wê re, dewletê xwestîya ku hemû nîrxên kurdistanê di yekbûnê de pêş bixe. Li ser wê re pêşketin bûya.

Ji ber çî di deme ku hêzên NATO ketina Îraqê de û başûrê kurdistanê yekbûna wê ket rojêve de û bahse bikarhanîna "elfebeyeteke latînî" hat kirin û di wê deme ku bahs hat kirin de dewlete ku di kêlîke pêşî de bertek û reaksiyon da nîşandin Tirkîya bû? Ji ber ku wê ne di xwest ku yekbûnek di nava kurdan de çê bibe. Ji ber vê yekê, êdî di serî de, wê bertek dan nîşandin jî li dijî bi karhanîna elfebete latînî li başûrê kurdistanê derket. Hê di wê demê de, rayadarên kurd yên başûrê kurdistanê biryarna bi vî rengî girtibûn, ew ne hat ser ziman. Lê di cih de tirkî li dijî wê bi karhanîna elfebetê derket. Hingî, di wê demê de, bi kar hanîna elfebete latînî, wê kurdên bakûrê kurdistanê û yên başûrê kurdistanê di yekbûnekê de bigihanda li hevdû. Piştî, êdî herêmên din ên kurdan jî, wê ne bi awayekî zor wê bi wê re pêşketinaka mazin bi xwe re daban çêkirin. Lê li dijî wê derket. Ev minaq, tenê jî, bi serê xwe giringîya yekbûna kurdan ku kodên wê di kuderê de na, radixe li berçav. Ji ber vê yekê, bi teybetî li ser wê xalê sekinin jî di demên pêş de, weke giringîyeka ku di pêşketina civate kurd de ya. Bi vê yekê, di serî de, divêt ku em bibêjin ku divêt ku giringî were dayin li ziman û pêşxistin û pêşketina wê ku were kirin. Ev yek, weke xalaka pîrr giring a.

Bi ziman re, hin xalên ku hevbeşîyê çê dikin ên giring hene. Di serî de çand û kevneşopîya herêmî ku were giştî kirin a. Di serî de, divêt ku em bibêjin ku başûrê kurdistanê bi başûr re bi sînor nemêne. rojhilatê kurdistanê bi rojhilat re bi sînor nemêne. Bakûrê kurdistanê bi bakûr re bi sînor nemêne. Başûr rojavayê kurdistanê bi başûr rojava re bi sînor nemêne. Divêt ku bi hev re di xalakeê hevbeşîya xwe çê bikin. Di vê yekê de, êdî wê gavaka giring biavêjin. **Bi vê yekê re divêt ku em bibêjin ku divêt ku zimanê hemû sazî, partî û keseyetên wê yên ku cidiya wan heya, bi hev re di têkiliyê de bin û zimanekî ku hevbeş bikar bînin. Ziman û gotinên ku tên bi kar hanîn, giring in û pêşaroja civatê bi xwe jî didina kifşkirin. Divêt ku di serî de ev yek were dîtîn û kifş kirin. Ji ber vê yekê, êdî divêt ku ziman, di gotinên xwe yên ku tên bi karhanîn de, dijbertî di wê de nebe. Hêstên civatî, aliyekî wan yê ku ava ya, li ser ziman re ya û aliyê din jî li ser gotinên ku di zimên de tên bi kar hanîn de jî ya. Ji ber vê yekê, divêt ku ev yek, were dîtîn û kifş kiirin. Di serî de, rayadarên kurd yên her çar qatên kurdistanê jî, bi partî, keseyetê û rewşênbirên wê re divêt ku bi ziman, yekbûnê di nava xwe de çê bikin. Wê yekbûnê derxina astaka têgihîştinî û bikina malê civatê bi gotin û nêzîkatîyên xwe re. Ev yek, her weha, weke xalaka giring ku êdî derdikeve li pêş a.**

Di vê xalê de, komare Mehabad, di serî de, hewldanaka wê ya di vê xalê de hebû. Weke ku bi yek zêdeyî û yek kêmeyî di farq û têgihîştina vê yekê de bûn. Mirov, vê yekê her weha kifş dike. Bi vê yekê re, weke xalaka giring, divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Bi vê yekê re, karên rewşênbirî, bi sazûman û sazî kirina wan, weke xalaka giring a. Bi sazûman û sazî kirina rewşênbirîyê, wê bike ku civat bêhtîr ji wê sîd bigirê û jê bigihê têgihîştinekê. Sazîyaka rewşênbirî ku karê xwe baş bike, karê weke dewletekê bikar û bar bê. Ji vê yekê, weke karekî giring, mirov karê vê xalê, weke xalaka giring bêne ser ziman.

Li kurdistanê, deme komare Mehabad, weke demeke xwe ya giring ku mirov li ser bisekinê ya. Bi teybetî, cerbên wê yên bi sazî û sazûmanî û îdarî û rêveberî, hemû, divêt ku werina ser ziman û li pêşîya hemû rêveberiyên kurdistanî bin. Bi vê yekê re, wê hem rêveber û hem jî rayadarên wê, bi wê re bina xwediyê şûnpêyeka xwe ya dîrokî ya ku êdî lê binerin û gavên xwe biavêjin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku êdî **weke karekê rewşenbîrî ku ansîklopedîya komare mehabad divêt ku were ava kirin û sazîya wê îdarî li kurdistanê were ava kirin, weke sazûmanaka ku ya cerb û pêşxistinê û hwd.** Ev kar, di serî de karekî rewşenbîrî û îdarî ya. Ev karê rewşenbîrî, ku rêveberîya kurdistanê bi îdarî pêvaniyê bi sazî û sazûmanî jê re neke, wê lingekekî wê ye ku hebe wê kêmbê. Ji ber vê yekê, divêt ku ev yek, weke xalaka giring ya ku mirov di ancama hizirkirina li ser komare mehabad de li ser bisekinê û bêne ser ziman.

Li kurdistanê, cerba komare mehabad, weke cerbeka dîrokî ya ku wê ji pêşketin û sazûmana kurdistanê ya î ro jî bike ya. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û wê fahm bike. Li Kurdistanê, di vê yekê de, êdî weke xalaka giring, êdî divêt ku têgihîştina qatbûnê ji holê were rakirin. Ev têgihîştin, bi teybetî dewletên herêmê, ên weke Tirkiye û Îran, dikin û dixwezên ku mayînî bimêne û mayinda bibe. Ji wê jî wîrdetir, hertimî, weke xalaka giring ya ku ev rewşa kurdistanê ya aloz ku î ro têde ya, li ser wê re dixwezin ku were domandin. Çendî ku hêzên kurdî yên herêmî bi wê têgihîştina herêmî tevgerîyan, wê êdî li gor wê rastiyê tevbigerihih. Divêt ku ev rastî di serî de were dîtin. Li Kurdistanê, cerbar komare mehabad, di qada rêveberiyê û rêvebirinê de teybetmendiyê wê çibûn divêt ku ew di serî de bi teybetî werê dîtin. Di serî de, bi gotinekê jî bê, mirov kare di vê xalê de vê yekê bibêje, ku komare mehabad, weke komarekê tevgerîya ya û bi wê re karê bi sazî ya têgihîştineke bi sazî hatiya kiirn. Her sazî, bi bermana û tuzuka xwe tevgerîya ya. Hin metnên wê yên ku mirov karê weke metinne destûrî e bigihîn bêne ser ziman hena. Bi vê yekê re, ji ber vê yekê mirov kareê bi rehetî bibêje ku komare mehabad xwediyê destûra xwe ya bingihê ya welêt bû.

Bi teybetî, başûrê kurdistanê, îro, weke ku nêvidewlet a. Lê diaslê xwe de dewlet a. Tenê, ya kêmbê ew a ku serbixwebûna wê were denezandin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku divêt ku weke dewleteke serbixwebûyî lê ku hê serbixwebûna xwe ne denezandî tevbigerihihê ûdi nava kurdan de kar û barê ku dikeve ser milê wê de di vê deme giring de bicih bêne. Di vê demê de her karê ku werê kirin, dîrokî ya. Her gava ku were avêtin dîrokî ya. Her gotina ku were gotin jî dîrokî ya. Divêt ku bi vê yekê êdî tevwergerîn. Li Kurdistanê, î ro, şerek heya. Ev şerê ku î ro li kurdistanê heya, bêgûman, sedeme wê dewletên ku kurdistan di nava wan de hatiya qatkirin in. Lê di serî de, weke aliyekî wê jî, divêt ku mirov ne yekbûna kurdan bêne ser ziman. Di gotin û kirinê de divêt ku yek bin. Êdî di vê demê de ya ku ji bo kurdan herî giring ev a. Bi vê têgihîştina komarek Mehabad, ku mirov li pêşketina bakûrê kurdistanê binerê, mirov wê çî ancamê ji wê derxe. Di serî de, divêt ku mirov li ser vê bihizirê. Heman tişt ji bo başûr rojava û bi teybetî rojhilatî kurdistanê ya. Herême ku komare mehabadê lê ava bû, ji rojhilatê kurdistanê ya. Ji ber vê yekê, êdî divêt ku ji vê herêmê nerîn weke nerîneke teybet hebe. Êdî karekî sazî û ku bi rewşenbîrî tev digerihê divêt ku hebe. Bi vê yekê, divêt ku mirov bibêje ku ya ku herî zêde pêdivîya kurdan bi wê heya jî ev a.

Komare Mehabad, di serî de, renegekê wê yê kurdî û ku bi kevneşopîya kurdî re bi sazî bûya heya. Ji wê dike temenê xwe de û ji wê sîd digirê û ji wê tene ser ziman. Rewşenbîriya çanda kurd, di wê de hewl tê dayin were pêşxistin û were ser ziman. Di serî de, weke xalaka giring, ku mirov kifş bike, çend ku demeke wê ya avabûnê ya dirêj nebû jî, bi rayadarên wê re têgihîştina perçetîfîya(qatbûn) kurdistanê nebû. Ku mirov li gavavêtinên rayadarên komare kurd lê dihizirê, mirov dibîne ku ew têgihîştina perçebûna kurdistanê bi wan re nîn a. Weke mirovekê ku ez ji herême botanê me. Heta deme me jî, ku civat lev digihîştina li hevdu, di nava hev de di serî de pîrr bahse wê demê dihê kiirn. Li ser nêzikatiyên kurd dihat kirin. Ew radio komare kurd ku ji paytaxa wê weşan dikir, di destpêka xwe de bi navê "radioya komare kurdistanê e mehabad" bahs dihat û dibû û gotinê ji wê berdeewam dikir. Bi vê yekê re, êdî bahse wê pêşketina wê dihat kirin.

Mîn bixwe jî, pîrr hisandibû li wan vegotinên ku di derbarê komare kurd a Mehabad de. Lê ez bêjim ku di yekê de jî bahs û gotina qatbûna kurdistanê têde bi têgihîştinî bi min re çênebûya. Ji

hemû vegotinên ku li ser wê dibûn de, ku ez î ro jî, wan di serê xwe de bibîr dikin û dibim û dihênim, ez têgihîştineke kurdistanî ya giştî dibînim. Bi min re, ew têgihîştina perçeyî ya kurdistanê bi min re çênedibû. Ji xwe, heta ku demên piştre jî, ku min navê Lozanê ne bihist, ew perçebûna kurdistanê bi têgihîştinî bi min re çênebû. Lê ez vê jî di serî de bibêjim. Kurdan ji salên 1923'an û bi vir de, ser 60 salî re ew têgihîştina perçebûna kurdistanê di nava wan de çênebû. heta salên 1980 û hwd jî, ji bakûrê kurdistanê derbarî rojhilat û başûr rojavayê kurdistanê dibûn û li hevdu dibûna mêhvan. Î ro, ew têgihîştina perçeyî ya kurdistanî, ku ez lê dihizirim, bi dîrokê wê ya ku afirî re, ez karim bêjim ku ji salên 1980 û hwd û ê de, êdî çêbû û di nava kurdan de bicih bû. Lê dîsa kurdan ew herê nekir û ne pejiyend. Li dijî wê derketin û tevgerîyan. Lê îro, ku hin partî û sazîyên ku mirov dibîne ku bi wê têgihîştinê tevdigerihin, bi rastî jî, êşeke mazin ji wan dikeve dilê mirov de.

Li vê cihane ku êdî bahse rabûna sînoran dihê kiirn ku kurd êdî rabin û ji nahaka û pê de, sînorekî di welatê xwe de di serê xwe de çê bikin û li gor wê tevbigeriin, ya ku mirov bibêje herê xirab û biêş ew a. Komare Mehabad, fahmkirina dem û cerba wê ya demê û derxistina têgihîştinê ya wê pêşketina wê, ji vê yekê û demê jî giringîyake wê jî heya. Kurd, di vê demê de ku êdî bahse çareserkiirna pîrsgirêka kurd li herêmedî dikin û bahse êdî gihîştina mafê statûya xwe ya li herêmen xwe dikin, ji bo wê yekê tenê jî bê, ev cerb û têgihîştina komare mehabad, ji bo wan, weke cerbeke dîrokî ya ku wê fahm bikin a. Divêt ku li ser wê bisekin in û wê fahm bikin.

Di vê demê de cerb û têgihîştina herî giring ya ku ji komare mehabad were hildan û girtin çi ya? Bi teybetî ku mirov xoslet û teybetmedniyên demê û pêşketinên di nava kurdan de hilde li dest, mirov wê bibînine ku bi teybetî ji bo têgihîştina yekbûna nava kurdan giringiya wê derdikeve li pêş. Di vê demê de, li rojhilat bi xwe jî, pîr pêşketinên dîrokî hene û wê di demên pêşde jî bibin. Di serî de, mudahaêleye li Sûrî ketiya rojevê de. Ku bi awayekî dîplomatîk bê û bi leşkerî bê, wê mudahale lê bibe. Lê ev herdû awa û şeklên mudahaleyê jî bi xwe re dibina xwediyê nêzîkati pêşketinên ku cuda. Bi vê yekê re, ji aliyê têgihîştina kurdistanê, sazî û sazûmanî ve ku bi dîplomatîkî bê, û mudahale bibe, wê hingî pêdivî bi sazûmanaka kurdistanî ya navxweyî heya. Lê ku bi leşkerî bê, êdî cerbên komare Mehabad, ku mirov wan fahm bike ew têgihîştin û awayê avakiirna hêzên xwe yên artîşî ya û parastina xwe ya. Komare mehabad, di deme ku hêze Îranê kete herême kurdistanê de ku neketibê şer de û şer nekiirbê, divêt ku ev jî bêhêzbûna wê newê hasibandin. Ji bo ku hêze xwe ya qawmî û civatî bi parezê, şernekirina di demê de bûya. Bi vê yekê û têgihîştinê divêt ku mirov wê fahm bike.

Di vê demê de, bi teybetî hewceyê bi yekitiya navxweyî ya kurdan heya. Cerbên komare mehabad jî, ji vê yekê re divêt ku were fahm kirin. Bi teybetî pêşketina başûrê kurdistanê, li bakûrê kurdistan cerb û rêxistîya kurdan, li rojhilat û başûr rojavayê kurdistanê cerb û têgihîştên ku hene, bi hev re divêt ku werina li rijandin li hawûzaekî de û bi hev re were yekiirn li gor kurdistanê û pêşketina wê di deme nû de jê sîd were girtin. Bi teybetî, î ro, her dewlet, ku vekirî bin û nevekirî bin, sazîyên wê yên pîvan û dîrok û cerban ku dikin ku bi demê re sîd were girtin ji pêşketinên ku bûna hene. Li kurdistanê, sazîyaka bi vî rengî ya rewşenbirî û civatî ku karibê hemû beşên kurdistanê bi cerb û têgihîştin û pêşketina wan re bike nava xwe de divêt ku were ava kirin. Bi vê yekê re, êdî divêt ku bi hev re li gor wê tewvere lêgerin. Dîrok, ku baş hata xwandin, wê hingî, ew sîdên têgihîştina wê ya ku mirov baş û qanc jê sîd bigirê wê derkeve ber me. Ku derkete ber me, hing jî, mirov wê karibê li gor wê tevbigerihe. Cerbe dîrokê ya kurdan pîr zêde heya. Lê mixabin, ew bixwe jê sîd nagrin. Welatên weke tirkî û îran, pîr jê sîd digirin bi navê xwe. Hin welatên din ên ku dixwênin jî, jê sîd digirin. Lê kurdan, ew rêxistîniya rewşenbirî ku karibê û bike ku sîd were girtin hê di nav xwe de çênekirina. Têgihîştina perçebûn jî, ji ber vê yekê, di van salên dawiyê de di nava kurdan kûr bû û derkete li pêş.

-- Kurdistan, di wê deme ku komare Mehabad ava bû de, pîr tevgerêyeka mazin lê hebû. Lê di aslê xwe de, piştî têkçûna serhildana Şêx Saîd, baxtê hemû tevger û serhildanên kurd kifşbû bû. Çawa ku deme ku Şêx Mahmud berzencî li Başûrê kurdistanê rêveberî û desthilatdariya denezand û piştre çûna bi ser wî de bû û ew têk hate birin, êdî wê bandûraka mazin li ser kurdan

çêkiribû, her weha serhildana şêx saîd jê bandûraka mazin li kurdan kiribû. **Di aslê xwe de, ku mirov li wê demê û ji destpêka sadsalê hilde li dest û lê bînerê, mirov wê bîne ku sê rewş û pêkhatin û feletekên ku hatina serê kurdan bi navkê, wê bandûra wan li ser kurdan hebe. Yek, ew serhildana şêx Mahmudê berzencî bû, ye duyemin serhildan şêx saîd tafisandina wê bû û ya sêyemin jî komkuji û tevkujiya li dersimê bû. Ev hersê rewş, rewşne ku ji her aliyê ve bandûra wan li ser kurdan hebûn. Piştî jî, bgûman, divê ku mirov bahse jenosîda helebçê û komkujiyên ku rejîma tirk, Îran, Sûrî û Îraqê ku li ser serê kurdan dane kirin in. Komkujiya Roboskî, ku hezar sal jî bi ser ve herê, weke ya helepçe wê ti carî newê jîbîrkirin.** Heta ku dem tê wê avabûna komare kurd ya Mehabad, wê ev hersê rewş, rûh û giyenekê têkçûnê li ser kurdan bi afirênin. Lê avabûna komara Mehabad, wê bandûra wê li her çar perçeyên kurdistanê bibe û wê kurdistanê, êdî wê ax û xweliya têkçûnê wê ji aliyekî ve bi komare mehabad û avabûna wê re wê ji ser xwe bi avêje.

Di deme wê nivîsê de gelek alim û zaneyê demê ku min li cem wan bahse komare mehabadê kir û min xwest ku ji wan tiştekî di derbarê demê de ji wan his bikin, gotina pêşî ya ku wan ji min re dihanî ser ziman ev bû, "Mirovê ku wê şert û mercê demê zanibê, wê çêtir wê rastî û bandûra komare Mehabad fahm bike. Di wê demê de, li bakûrê kurdistanê bandûrê têkçûna serhildana şêx saîd û komkujiya dersim hebû. Li başûrê kurdistanê bandûra têkçûna şêx mahmudê berzencî hebû. Çend ku kurd hê li ser xwe bûn û li berxwedidan jî, ew bandûr di wê demê de li ser wan hebû. Hemû serokên aşîr û êlên kurdan di wê bawerî û têgihîştinê de bûn, wê her tevgerî êdî bixwûne were tafisandin. Ti sansê wan nîn a". Bi wan gotinan dihat ser ziman. Lê piştî weha bi ser gotina xwe ve jî dikiirin; "Komare mehabad, avabûna wê, rewşaka nikûnû afirand. Êdî fikrên di serê herkesekê de guharîn. Kurdan, bi wê, êdî weke ku rûh û gîyane xwe nû di xwe de girtibûn. Ji ber vê yekê êdî demeke nû dest pê kiribû" Piştî weha bi gotinên xwe ve dihanîn ser ziman: "Çend ku temen û emrê komarê mehabad, wilo zêde dirêj nebû jî,, piştî ku ew hat xuruxandin jî, wê xuruxandinê rûh û gîyaneka têkçûnê di nav û dilê kurdan de neçand. Vajî wê, kurd, êdî weke ku di dilê xwe de gihîştibûbûna têgihîştineka din ya bi xwe re. Ji wê, êdî bi bawer bûn. Komar, piştî wê re jî, tenê bi navê xwe re jî, ew rûh û gîyane di dil de parast û da domandin" Bi wan gotinan ew bandûra komare mehabad li ser kurdan pîrr baş dihat ser ziman.

Li kurdistanê, ji salên 1922'an û pêde, demeke nû dest pê kiribû. Di aslê xwe de, ji salên 1922'an û de pê de li kurdan hêrişê tirkî zêdetir bûbûn. Lê destpêka hêrişan jî bi deme komkujiya li Ermeniyên ku li Kurdistanê dest pê kiribû re dest pê kiribû. Ji wê demê, kurdên ku li dewletê bi hêrs jî bûn, dewletê ew jî dabûbûn ber xwe û diçû bi ser wan de. Bi teybetî, herême Dersimê, di wan demena de, weke herêmeke pîrr bi tevger bû. Serhildanên kurdên elêwî di wê demê car bi car bi yê kurdên ne elêwî re bûna yek. Ev yek di demê de jî bûya. Mînaq, di sale 1820'an de serhildanaka mazin ya kurdên elêwî li ber dewlete alî osmanî bûbû. Di heman salê de di sala 1820'an de, kurdên Êzîdî jî di pêşengîya şêx Merxê de ku Sêrt, mûs û hwd dikina navanede xwe, êdî dikevina serhildanê de. Şêx Mirzê, ji bo dewleteke hemdem çî pêdivî pê hebû, ew hizirî bû û bi cih hanî bû. Berî ku bi keve serhildanê de, saziyên xwe yê dewletî avakiirna û rêveberiyên wê jî kifşkirina. Ji destpêkê hêzeka ku ji 5 hezar sûwarî ku pê dihat û hemû jî ji mirovên naqandî pêk dihat, artîşek ava kiribû. Ale dewleta xwe jî kifş kiribû. Berî hingî, çend caran osmaniyên kiribû ku herne bi ser wî de. Hin hêz şandibûn jî bi ser wî de. Lê her cara ku çûbû bûn, êdî derbeyeke mazin xwaribûn û vegefyabûn. Lê bi alikariya hin aşîrên ku ne êzîdî na û li cem dewletê cih girtin ên kurd, şêx mîrze jî tê têkbirin. Di wê demê de, berî ku şêx mîrze, hêzên osmanîyan herîna bi ser de, ew du nemeyan di nivîsêne yek ji mîrê bota re ya û ya din jî çarê Rûs re ya: Lê di deme hatina hêz ya bi ser wî de, deng ji yekî ji wan dernekeve. Mîrê boota neme pîrr dereng digihîyê de. Ku digihîyê de, di cih de hêzêek amede dike û dike ku bişêne. Lê hêze wî ya ku wî şandî diçê biser xirbeyên ku li şûn tafisandina serhildana wî mana de diçin.

Piştî ne bi gelekî re tevgerîya Berdirxaniyan ku navende wê botan a, êdî dest pê dike. Ew jî, bi aligirên dewletên ên weke di deme serhildanê de ku sozê jî dewlete osmanî digirin ku wê wî weke mîrê bota nas bikin, mirovên weke Yazdan Şêr jî, ku refên xwe di guharin, bi sayaserê wê

ref guharandinê, êdî ew jî tê diçê. Serhildanê dewlete Botanê êdî li ber hêrîşên osmaniyan têk diçê. Di wê demê de, ku navende wê botan bû, dewletek, Mîrê bota, mîr Bedirxan ava kiribû. wî jî, saziyên wê damazrendibûn. Hata ku karim bêjim, bedirxan, febrîqayaka çek û sîlehan jî ji bo ku artîşa xwe mazin û xort saz bike damazrandibû. Topxane wî jî hebû. Lê ew jî, bi ref guharandina Yazdewn şêr re êdî têk diçin. Piştê Yazdan şêr jî, ji ber ku êdî dilê wî ne rehet a û ku êdî osmanî bi dest hatina bi ser wî de dikin, êdî serî hildide. Lê êdî ew jî, hêza wî têk birin. Êdî, hêza kurdan hatibû şikandin. Ji wê demê hata ku dem tê deme Şêx Ubeydullah û piştê hê jî bi vir de ku tê deme Şêx Saîd, êdî mirov karê bêje ku kurd, êdî ketina rewşaka pirr girab de. Di aslê xwe de, hata ku mîrê botan, li botanê, wê têkçûna mazin navê, êdî kurdistan bi giştî na kevê rewşeke xirab de. Lê ku kengî ew têkçûn wî xwaribû, êdî kurdistanê bi giştî weke ku ew têkçûn xwaribû. Piştê jî, ji wan têkçûnan, rûh û gîyaneka têkçûnê afirî bû. Ew rûh û gîyane têkçûnê, wê bi serhildana şêx saîd re hinekî bi şikihê. Lê bi ne serkevîna Şêx Saîd re, êdî wê kurd, wê rûhî û gîyanê jîyandina wê di xwe de bijîn. Komkujiya dersimê, di aslê xwe de, li ser wê rûh û gîyanê re dibe û armanca bi komkujiyê re ew a ku ew dilopa rûh û gîyanê ku bi navê kurdîti maya, tê hedef kirin ku bi timî jî holê were rakirin. Bi vê armançê, weke kelehe dawiyê dersim tê dîtin. Herêmen din ên kurdan, ji wan deng û merem nîn a. Tenê li rojhîlarê kurdistanê serhildana Simko axa, wê ew jî ti ancamê bidest nexê. ev rewş, hemû, wê bi hev re li kurdistanê, êdî rewşeke nû ya bi timî jî holê rabûnê wê bi afirêne. Rûh û gîyane demî ya kurdî êdî weke ku jî wê ti bêhn û gîyan nemeya.

Di vê navengê de wê de komare Mehabad, wê ava bibe. Komare Mehabad, wê di aslê xwe de, derbeyek ne tenê li wê zora rejîme Pahlawî ya li ser kurdan ba. Wê li Tirkî jî, weke derbeyekê ba. Ewqas komkuji tirkê li kurdistanê kirin û bi wê xwest ku êdî deng ji kurdan dernekeve. Bi we yekê, wê êdî kurd bi navê xwe nema ban. Lê komare Mehabad, bi vê yekê, di aslê xwe de di deme xwe de jî wê programa tirkî ya bişavtina li ser kurdan jî re weke derbeyeke mazin ya dîrokî bû. Li Sûrî, di wê demê de, hê nû ku ku Firansîzan hêzên xwe bi şûn ve kişandibûn. Li wir jê valatî hê hebû û ne dihat tişî kirin. Li wir jî, kurdan êdî hin bi hin navê komare kurd bihîstibû. Piştî ku komar ava bû û xûrihî jî, wê bandûra wê li rojavayê kurdistanê bidomê. Li herême kurdan, wê bandûra ereban nema ba. Piştê jî xwew êdî ne bi gelekî re bi derbeyekê hatina Hafîz esad ya li ser serê rejîmê û guharandina wî ya rejîmê jî, wê wê bandûrê jî holê ne rakê. Bav Esad, wê bike ku bi kurdan re ne bi zorê bi dostana bi rê ve bibe. Weke tirkî û Îranê, wî darê zorê ne hilbijart. Lê vajî wan, politikayak hilbijart, û bi wê kir ku kurdan di kontrola xwe de bi rê ve bibe.

Li Başûrê kurdistanê jî, hewldanên gihiştina rêveberîya hene. Lê seroktî kêm e. Piştî ku komare Mehabad, ava bû û xûrihî, êdî tevgerê kurdistanê bi navê hanîna careka din rêveberîya komare mehabad dest pê kir. Rêveberîyên ku di wê demê de di rêveberî û avakirina komerê de cih girtibûn Ên mele Mistefe berzanî, wê tevgerê kurdistanî bidina dest pê kirin. Ew tevger, bi bandûra wê hebûn û avabûn û navê komare Mehabadê, wê li hemû der û deverê kurdistanê bê bihîstin. Ji ber ku ew rêveberîyên kurdistanê yên nasîn bûn û dixwestin ku rêveberîya kurdistanê careka din bînina li kurdistanê, êdî jî hemû kurdên perçeyên kurdistanê, wê dilxwezi û dilsoziyek jî ji wan re bi afirê. Ji wê zêdetir, gelek mirov wê jî beşên din ên kurdistanê bi teybetî wê tevî wan bixwe jî bibin. Piştî ku partîya Mistefe berzanî ava bû, wê gelek mirov bi teybetî jî herême botanê bixwe jî wê tevî bibin. Li wan herêman malên wan yên veşartî yên rêxistinê wê ava bibin. Ew wê bi mirovên civatê yên li berçav in re jî, bi kevîna têkiliyê de. Ev rêxistinî û têkiliyê, wê bê temenê rêxistinîyaka kurdistanê ku di wê demê de ava dibe. ...

Piştê wê tevgerîyaka çekdarî ku ji bo kurdistanê şer dike bi navê peşmergeyan wê dest pê bike ku ji bo kurdistanê şer dike. Ev tevgerîya ku pêşî jî li şûn vegeyendin û hanîna komare ku dest pê kiribû, wê bi awayekî dî, êdî bi aşîrî hê mazintir bibe û başûrê kurdistanê bike navende xwe û tekoşînê bidomêne. Wê tevgerîyê, ku mirov ji Kîjan aliyê ve lê bînerê, mirov wê bibîne ku li kurdistanê bi navê kurdistanê rûh û gîyanê ku ne tirkî û ne jî îran û Sûrî û ne jî Îraq ku avabûyî jê hij dikir afirandibû. Bi wê rûh û gîyanê, wê li başûrê bi gihiştina xweserîyaka kurdistanê di salên 1970 û wan de bi ancam bibe. Piştîgirîya Emarîka jî wê re hebû. Ji bo di xwest ku ew li cem wê bê û car bi car ku karibê li dijî sovyetê bide şuxûlandin. Lê jî ber ku dît ku wê ev xwesteke wê dê newê li cih, êdî bi peymanî Li cezayîrê ku weke derbeyekê li tevger û herekete

kurd ji bû wê kurdan bi tenê bihêle. Lê kurdan, tekoşîna xwe didoma. Di wê navberê de ku nekete demeke zêde dirêj de, şerê di navbarê îran û îraqê de dest pê kir. Di wî şerî de jî, ji ber ku herêmenê kurdistan, li ber sînorên welatan bûn, êdî weke ku di nava şer û êgir bûn. Sadam, di deme ku di dawîya şer de, wê ji wê hewayê demê bike ku sûd bigirê û wê çekên kimyewî li dijî kurdistanîyan li wê beşa kurdistanê ya başûr bikar bîne. Ji destpêka avabûna komare Mehabad û hata ku dem tê wê deme ku rejîma baasê ya di deme Sadam de ku çekên kimyewî li dijî kurdan bi kar dihêne, weke demeke teybetî ya dîroka kurdistanê, divêt ku mirov hilde li dest û wê bêne ser ziman. Ev dem, wê şerê ku li dijî kurdan zêdetir dibin a. Li bakûrê kurdistanê ku weke beşa kurdistanê herî mazin jî tê bi nav kirin, wê ji wan salên ku tevgeriya kurd bi peymanê Cazayirê re derbe xwar û piştê êdî wê derbikeve. Ew tevger jî, tevgerê PKK ku ya. Tevgerê PKK ê, wê wî rûh û gîyane serkevtinê ya ku afirîbû û di afirandina wê de di destpêkê de komare Mehabad rol û weyn leyistibû, wê ji wê dest pê bike û bi rûh û gîyaneka nû wê bidest tekoşînê bike. Ew tekoşîna wê ya ku bû jî, wê bi demê re mazin bibe û ku ne tenê beşeka kurdistanê dikeve nava xwe de hemû beşên kurdistanê dike nava xwe de weke tevgerê bigiştî ya kurdistanî derdikeve. Êdî ji wê demê û pêde, wê du tevgerên kurdistanî ku li her çar perçeyên kurdistanê sampatîzanên wî hene, wê hebin. Yek PKK bû û ya din jî her weha PDK bû. Lê PDK, çend ku li beşên din jên kurdistanê rêxistinîyên wê yên veşartî bê û vekirbê ku hebûn jî, ne wî astê de bûn tekoşînekê bikin bûn. PDK, tekoşîna xwe ya kurdistanê di başûrê kurdistanê de bi sînor hişt. Lê PKK, tekoşîna kurdistanîyê li her çar perçeyan jî bi tevger kir û barî tekişînê kir. Ku ez ji aliyekî ve bibêjim ku PKK jî, bi aliyekî ve weke mireteye wê gîyane kurdistanî ya ku ji gîyane komare Mehabad jî bû wê ne xalet bê. PKK, ew têngiştîna komare mehabad jî, di nava xwe de derxista têngiştîna bi zanebûn kir. Di nava kurdan de ew jî bi têngiştîna kir. Mireteye komare Mehabad, ne hişt ku tenê di nav rûpelên dîrokê de bimêne. Ji wê derbas kir û di jîyane kurdistanê de bi vejîn kir. Bi vê yekê re, êdî dilê kurdistanîyan bi kurdî mazin hat û lê ket.

Dîroka kurdistanê, ji gelek aliyên wê ve pirr mazin xwediyê cerbên mazin a. Lê cerba Komare Mehabadê, di nava kurdan de, ew pêşketinê çêkir ku destpêka rabûna kurdan bi xwe re da dest pê kirin. Kurdên ku êdî hatibûbûna ber ji dîrokê çûnê, ku axa miirîne li ser wan hatibû rişandin, ew ax jî wan hat silikandin û piştê ew rabûna ser xwe. Di serî de, kurdan bi wê têngiştîna re xwe nas kir. Hinekî jî bidest xwandina dîroka xwe kirin. Hemû nivîs û pirtûkên bi kurdî jî holê hatibûbûna rakiirn. Bi navê kurdî û kurdistanê, tenê tiştê jî ne hatibû hiştin. Êdî hin bi hin, ji nû ve kurdan bi dest kifşkirin û nivîsandina dîroka xwe kir. Komare Mehabad, ev dem û serdem di nava kurdan de bi awayekî bi têngiştîna û bi rûhekî kurdistanî dabûbû derst pê kirin. Ew rûh û gîyan, piştê li di jîyanê de ma û mayinda bû.

Komare Mehabad, bi vê yekê, ne tenê demeke kin ya di dîroka kurdistanê de bû. Ji wê zêdetir rûhek û gîyanek afirandibû. Ji wê re bûbû bingehe. Li ser wê bingehe. ez karim bêjim êdî bandûra hemû komkuji û têngiştîna ku bi serhildanên kurdan re bi wan re çêbûna, dem bi dem ji ser wan çû û êdî hin bi hin ku di serê de azad kurdek bi gîyan û rûh afirî. Ew kurd, ji bo azadiya xwe tédikoşê. Mafê azadiyê xwe dixwezê. Bi vê yekê re, tekoşîna çekdarî, diplomatîkî û hwd û ku hê ji gelek aliyên din ve da. Lê tekoşîna herî mazin ya ku hat dayin bi nivîsandina dîrokê re bû. Kurdan bi wê nivîsandina xwe re, weke ku xwe ji nû ve salix kirin û hanîn ser ziman. Ku mirov, rûh û gîyane ku di demên piştî komare Mehabad re ku afirî bû ku mirov wê fahmnekê, mirov wê rast û baş wê bixwe jî fahm nekê. Ji ber vê yekê, aslê hebûna komare Mehabad, bi tekoşîna kurdistanê ya piştî wê re ji bo kurdistanaka azad tê dayin de dijî. Bi vê yekê re êdî kurdistan, têngiştîna wê afirî û derket têngiştîna. Ev dem, di aslê xwe de, ku mirov wan bêne ser ziman, bi tekoşîna wan ya ku hatî dayin re wê werina ser ziman. Kurdistan, bi wê re êdî weke demeke dîrokî ku bi xwe re dijî, dihê ser ziman. Kurdistan, heya. navê wê heya. Êdî bi deng navê tê ser ziman.

Bi vê yekê re weke xalak dawiyê ku mirov li roja me û pêşketin û pêşveçûnên wê yên tède dibin hem di nava kurdan de bê û hem jî li herêma li rojhilatê, mirov wê rûhê êdî bi wan re baştir dibîne û fahm dike. Di aslê xwe de, wî rûhî û gîyanê, kurdistanê jî miirîne filitand. Rakira

serpîyan, bi wê re barî tekoşînê kir û î ro ew tekoşîna wê tê dayin. Ew hemû, çend ku weke pîrr dem û pêvejoyên bi hev re ku li dûv hevdû tèn berçav û ser ziman jî na, di aslê xwe de bigştî weke pêvajoyaka giştî ya kurdistanî ku mirov hildê li dest a. Destpêka wê pêvajoyê, mirov karê bi komare Mehabadê re bide dest pê kirin. Deme Komare Mehabad, deme piştê ya bi mele mistefe berzenî re û deme piştî wî re ya bi PKK re ku dest pê kir, weke sê demên giring û bi wate ên dîroka kurdistanê na. Ev dem û serdem, bi vê yekê, mirov karê bêje ku serdemeke kurdistanê ya. Lê di nav de pir demên ku hene bûna. Ev dem, ku mirov drîoka kurdan baş nexwêne, mirov wê baş û qanc fahm jî nekê. **Dîrok ji nû ve hat nivîsandin. Ev gotinê di berdema wvê de bêjim kurd, bi nivîsandina dîroka xwe bê û xwe ji nû ve çêkiirnê bêû hwd ji nû ve derketina ser rûyê dîrokê.**

Bi vê yekê re, ez di vir de lis er roja me jî gotinekê bibêjim. Ev roja me jî, weke rojaka giring î ro ku kurdistan derketiya li holê û deme mehabade dîyemin û sêyemin jî ku bi hev re di nava hev de tèn jiyîn na. Ev karim wilo jî bêjim. Başûrê kurdistanê, weke mehabade duyemin a. Bi giştî pêşketina li kurdistanê bakûr û başûr û rojava û rojhilatê kurdistanê xwediyê wê rûmetê ya ku komare mehabad lê ava bûya, êdî bi pêşketin û pêşveçûnên nû re komare mehabadî ya sêyemin bi me didine jiyin. Lê di vir de, ez vê ji di berwama wê de bêjim ku **rûh û gîyane mehabadê, ji hjemû kurdan û sazî û paretiyên wan dixwezê ku êdî yekbûnê di nava xwe de çê bikin. BI yekiti tevbigerihiin. Ev, xwesteka rûh û gîyane komare Mehabad e, ku ji bo ku êdî ti êş û elemin din newin jiyin û êdî xwûna ti mirovan keve ardê.** Fêr û cerbên komare mehabad, bi me didina têgihîştin ku kurd, yekbûnekê di nava xwe de di vê demê de çenekin, wê têkçûnaka mazin êdî jîn bikin û ku êdî bi tememî ji dîrokê herin. Di roja me de, kurd, ji bo ku yekitiya di nava xwe de çêkin, ev demeke ku bahse konfaranse netewi ya kurdistanî tê kirin. Ji bo vê yekê jî, kurd, di nava xwe de di tevgeriyekê de na. Ev yekbûna ku were çêkirin, wê kurdan ji komkujiyan xilas bike. Wê şerên li dijî wan dawiyê li wan bêne. Wê wan, weke vîneke herêmî ya kurdistanî û bi navê kurdistanê derxe li holê û bide berçav. Bi vê yekê re, kurd, êdî wê demeke xwe ya nû bijîn. Kurd, bi lidarxistina konfaranse netewi ya kurdistanî re, wê demekê bi dîroka xwe re bigirin û wê demeke nû bi dîroka xwe re bidina dest pê kirin. Bi vê deme nû re, wê bi vîna xwe re wê hebin. Bi navê xwe re wê hebin. Bi dîroka xwe re êdî wê bi pêşde biçin. Li kurdistanê, çendî êş û elem jiyina, di bingihê wan de, sedemek jî perçebûna kurdan ya navxweyî ya. Divêt ku mirov vê yekê jî, her weha bi teybetî bibêje. Kurd, bi nava xwe de yekbin, wê dîroka wan bi wan re bi êş û elemin ku ew dijîn re dûbara nekê.

-- Li kurdistanê, ji sale ku têde komare mehabad hatî ava kirin û bi vir de, ji wê û pê de, dem bi dem, demne pêşketin û pêşveçûnê mirov dibîne. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov hinekî li ser wan pêşveçûnan jî di çerçovê de li ser bisekinê. Dema avakirina komare mehabad, ji aliyekî ve divêt ku mirov pîrr li ser bisekinê. Ew têkçûnên ku kurdan jînkirin di demên serhildanan de, û ew deronîya têkçûnê ya ku afirbû dimejî de, bi avabûna komare mehabad re li kurdistanê di nava kurdan de ew deronî şikeşt. Weke ancama wê ya sereke mirov karê vê bêne ser ziman. Bi wê re, komare mehabad, weke dewletbûna kurdan ya demê û li gor demê ya. Awayê wê yê li gor demê de ji vê aliyê ve jî divêt ku mirov kê binerê. Bi vê yekê re, weke cerbeke giring bi awayê dewletî ya li gor demê û têgihîştina wê ya. Li herêmê, dewletbûnên ku avabûn, hemû jî, hin bi hin bi ber têgihîştineke metingerî de çûn. Komare mehabad, di deme ku avabû de, weke rêveberîya ku bi wê re ava bû û bi wê re peymanên bi hev re jînbûnê mohrkirin Azarbeycan hebû. Têkiliyê wê ya ku bi azarbeycanê re, hê jî, divêt ku mirov li ser bisekinê. Ne di temenê hewldana bindestkirin û serwerbûnê lê di temenê bi hev re di rex hev de bijînê nêzikatî lê dihat kirin. Bi vê yekê û têgihîştinê peyman hatina mohrkirin. Wekî din jî, bi xalkên din ên îranî re jîn û bi wan re di tîkiliyê baş de bûyîn, weke prensîb derketiya li pêş. Bi vê yekê re, di rastiye de, di aslê xwe de, dewleteke ku çend ku demne dirêj wilo zêde jîn nekirina jî, di wê deme xwe ya kin ya bi wî jînbûya û li ser lingan meya jî, ji wê mirov fahm dike ku xwediyê têgihîştinaka bi zanarî ya.

Bi vê yekê re, kurdistan, di wê demê de, di aslê xwe de, digihîjê cerbeke dîrokî ku mirov wê fahm bike ya. Ew cer û hebûn. Di roja me de jî, weke rohnîyekê li pêşîya me ya ku mirov ji wê sîd bigirê. Bigiştî li kurdistanê, di wê demê de, şert û mercên ku hebûn, ne pîrr baş bûn. Şer û

pevçûn hebûn. Serhildan hebûn. Lê heta wê demê jî, pirranîya serhildanên ku bûna bêî ku ancamaka netewî bidest bixin têkçûna. Li beşe bakûrê kurdistanê ku tirkî li ser serdestî û metingerîya xwe ava kirîya, heta wê demê, pîr ser hildan bûna. Ji serhildana agirî bigirê heta ya Şêx Saîd û hwd, mirov karê navê pîr serhildanên ku bûna bêne ser ziman. Lê hemû jî, têkçûna. Kurdan bi wan têkçûnan derbeyne mazin ên dîrokî xwarina. Êdî bawerîya wan li wan û li hêza wan neme ya. Hê herême kurdistanê ên ku li ser xwe na û bi tevger in hene. Herêmên weke dersimê û hwd hene. Ew jî, dewlet tirk, wê bi qanûnên weke "qanûnên hersimê" ku bi nav dike wê derxê û bi wan qanûnan re bike ku wê herêmê jî ji hêz bike. Heta wê demê ku komare mehabad ava bûya, " 97 sefer li dersimê bûna". Lê yek ji wan bi serneketin û encam bi dest ne xistina. Aşîr û êlên kurdan bi serê xwe na û hevdû digirin û piştgirîya wan ji hevdû re heya. Ku yek û an jî du ji wan li cem dewletê jî bin, wilo zêde navê wan nîn aû bandûra wan jî li herêmê û tevgerîya kurdan li herêmê nîn a. Lê dewletê jî di zanî ku li herêmê hêzeke xalkî ku aşîr jî weke dewletîtiya wê tevdigerihin hebû. Bi vê yekê re, bala dewletê çûbû bû ser wê û wê herêmê. Ji ber vê yekê, êdî bidest çûna bi ser herêmê de kir.

Li dersimê, heta ku wê dem were deme avakirina komare mehabadê, li gor ku dihat gotin, bi deh hezaran mirov bi komî wê bîn qatil kirin. Bi vê yekê re, **Geliyê Zilanê**, ku weke **tepeye Zilan** jî tê zanîn, tenê li wir wê di rojekê de di 13'ê tirmehê sale 1930'î de, wê bi hezaran mirov bi jin, zaro, pîr û mêran ve werîna qatil kirin. **Di çapemeniyê tirkî de jî ew kurdên ku bi komî dihatina qatil kirin li wir, di derbarê wan de di nivîsand û digot "hemû hatina îmhakirin". Rojnemaya rojanî ya komarê tirk ya bi navê "cumhuriyet"ê di vê rojê de weha di nivîsand di nivîsa xwe ya komkujîya Zilanê de; "Qirrkirin destpêkir, xelkê geliyê Zilanê bi giştî hatin qirrkirin" di roja 13'ê tirmehê sale 1930'î de di rojnemeya rojevane ya bi navê cumhuriyetê de. Di deme xaberê rojnemê de di hat nivîsandin ku "ji wê qirrkirinê mirovekî tenê xilas nebûya".** Ev pêvajoya qirrkirinê, weke ku di heman xabere wê rojnemê de ku dnivîsî bû, ji wê herêmê dersimê hatibû çiqşandî li agirî û ber çiyayê sûphan ve. Li wan deran jî bi heman awayê wê komkujiyên qirrkirinê pêk werin. Lê wê ti kesek, piştî navê wan mirovên ku hatina qatilkirin jî ne bihizê. Bi teybetî, li bakûrê kurdistanê di wê xata ku ji dersimê dihat û digihişt ber agirî û ji wir di buhurî heta herême botanê, wê weke herême "îmhakirin" û "paqijkirinê" bê. Ji xwe di rojnemeyên tirkî de di nivîsand ku "paqijkirinê dibê". Bi vê yekê re û rengê, dem li wê herêmê di buhurê û tê wê heta wê deme ku têde komare mehabad ava dibeê. Lê evqas komkujiyên ku kurdan li van herêman jin kirin, ku î ro bi awayekî rastî û dûrîst kronolojiya wan were derxistin wê herî kêr ne bin sêsad hezar mirovî re bê. Ti carî, heta î ro, bi awayekî rast û pak, tesbiteke rast li

li vê herêmê ne hatiya kirin.

Dersim, di wê demê de ji mirovan weke ku tê "paqijkirin". Mirovên mazin tîn kuştin û zaroyên wan yên biçûk ku hê heya wan ji دنیا û bûyarên ku di qawimin, wan bi qamyonan dihidin û dibina rojava û weke mirovna tirk mazin dikin. Bi vê yekê re, dersim, êdî bê tevger dibe. Herêmên din ên kurdan jî, yên ku li wan serê xwe hildana li serê wan hatîya xistin û an hatîna kuştin û an jî tiştên xirab ku nayêna aqilê ti kesekî hatîna serê wan. Serokên aşîrên ku ne li cem dewletê bûn û ne di gotina wê de bûn, hemû hatîna girtin û an jî kuştin. Bi wê demê û wan kiirin û kiryarê bi vî rengî ku dewletê ku li kurdistanê kirin re tirseke mazin li kurdistanê di dilan de jî afirî bû. Êdî weke ku ewkariya jîyane ti kesekî nebû. Di nav wê rewşê de, wê navê komare mehabadê were bihîstin. Ew bihîstin, weke gotîna ku êdî mirov ji xwe re bêjin "ne ez hê ne mirima" ji devê derdikeve. Bi wê re, êdî weke di dil de zîndîbûn û jîndîbûn di afirê. Bi wê re, ew tîrsa ku hatîbû çêkirin û dixwest ku were çêkirin, wê bi carekê re, weke ku ji holê ji dilê kurdan wê rabê. Komare kurd, bi vê yekê re, mirov divêt ku bibêje ku bandûraka wê ya dîrokî bûbû li kurdistanîyan. Di wê navenga ku ti kesekî ne dikarê êdî serê xwe rakin, wê kurd di nava xwe de êdî hin bi hin şaneyên veşartî bi afirênin. Di wan de, bi rêxistinî wê lev bicivin û bi hev re li ser kurdistanê rêxistinîyekê ava bikin. Piştî ku komare mehabad xûrîhî, wê êdî li bakûrê kurdistanê bi wê partiya ku temenê wê Mistefe berzanî avêt re wê li bakûrê kurdistanê jî bi vî rengî rêxistinbûnekê êdî bi afirê. Di nav ciwanên kurd de wê êdî bahse kurd û kurdistanê were kirin. Ew bahskirin, di aslê xwe de, wê bina sedeme wan dozên bi navê "dozên 47'an" û hwd ku

piştî xûrîxîna komarê re bi salekê re li ciwanên kurd hatibûbûna vekirin, wê dewlete tirk hewl bide ku pêşîyê li wê pêşketinê bigirê. Lê êdî ew rûh û gîyan afirî bû. Êdî di cih de hatibû çandin.

Bi wê bandûrê, di aslê xwe de, ew ancama ku dewlete tirk di xwest ku bidest bixista bi wan komkujiyên weke ên li Zilanê, dersimê, agirî, botanê û hwd jî, êdî bidest ne xistibû. Tenê bi kuştinên ku kiribû re mabû. Bandûra wan qatilkirinan bi komarê re êdî weke ku şikeştibû. Kurd, êdî careka din rabûbûna ser xwe. Lê wê carê, ne bi aşîrî û malbatî, vê carê bi rêxistinî û partiyîti ew rabûn çêbûbû. Ji xwe, êdî temenê malbatîyaka ku bi aşîrtî êdî rabûba û serî hildaba ji nema bû. Ji ber ku hemû aşîrên ku serî hildabûn hatibûbûna tafisandin. Êdî, bi wê re ji hêzketineke wan bûbû. Ew dem û serburînên kurdan, bi hev re ji bo kurdan bi hev re xwediyê ders û fêrna mazin ên dîrokî na li wan binerin û rastiyê fahm bikin. Her mirov di nav civate xwe de ku rastî dît û fahm kir, wê êdî karibê gava çêtir û baştir bi pêşde biavêje. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov bibêje ku wê êdî ew demên piştîre jî, wê baştir werina xwandin û fahm kirin. Divêt ku mirov bibêje ku komare mehabad, ne bi têgihîştineka perçeyî bû. Ji ber vê yekê jî, bandûr û tesîra wê jî bi gelemperî li kurdistanê û hemûyî bû. Ji wan demên ku kurdan ewqas komkujî jîn kiribûn û ji wan wastahî derketibûn û piştîre, êdî bûn û avabûna komare k urd, wê bê ilhamaka mazin ji kurdan hemûyan re di demên piştîre de. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku kurdistan êdî ji nû ve rabû ser pîyan.

Bi sereke, ku mirov ancamên komare mehabad yêni kurdistanîyan bêne ser ziman, mirov wê weha bêne ser ziman. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku rûhê kurdîyê buhurandina li demên piştîre ku li ser re were meşin. Bi vê yekê re, weke temenekê mazin a ji bûna welatperezîya kurdan ya piştîre re. Hêst û ramana welatperezîyê, wê bi wê re di aslê xwe de li gor demê û têgihîştina demê li ser lingan bimêne. Bi wê re, wê kurd, êdî bi wê re hin bi hin li ser wê re pêşketinê bijîn. Piştîre weke du tevgerên rêxistinî yêni ku mirov bahse wan di gelemperîya kurdistanê de bike, wê PKK û PDK derkevin û hebin. Ev herdû rêxistin jî, heta roja me jî dijîn. Di serî de, bi wan hê tekoşîna kurdistanîyê tê meşin. Hê ji bo mafê kurdan yê ku ji hebûna wan tê tekoşin tê dayin. Li herêmê, ew têgihîştina ku komare mehabad xurûxand û piştîre weke statûqûya herêmê doma, li ber kurdan hê jî, hem li îranê jî, hem li tirkî jî û hem li Sûrî jî li ser kar a. Hê kurd, li van welatên ku axa wan di nava wan de hatiya beşkirin, ne xwediyê ti mafî na. Zimanê wan bixwe jî hê qadaxa ya. Hê kurdek, nikarê zaroyeke xwe bi nav û zimanê xwe perwerde bike. Ev qadaxaya li ser ziman, di aslê wê de, divêt ku mirov bi wê statûqûya ku bi wê û têgihîştina wê re komare mehabad hat xurûxandin re fahm bike. Jev ne dûr in. Bi hev re tên ser ziman.

Komare kurd a mehabad, di aslê wê de, çend ku di deme ku hate avakirin û piştîre ne bi gelekî re hate xuruxandin jî, ew rûh û gîyane wê ne xurûxî û nevemirt. Hin bi hin bi demê re geştir û gûrtir bû. Bû temenê welatperezîya kurdistanê. Bi wê re, êdî demeka nû afirî. Mirov karê, piştî komkujiyên weke ên Agirî û Zilan, Dersim û hwd ku kurdan jînikirin, pişt wan re, bi komarê weke demeka nû mirov karê bide dest pê kirin û bêne heta roja me. Ji wê rojê heta vê rojê jî, hem rêxistinên kurd ên kurdistan PDK û PKK jî, ku weke pêvajoyana wê rûpela dîroka kurdistanê piştîre jîyîna bi navkê û bêne ser ziman. Ev pêvajo, hê dijîn wê hê jî bijîn. Bi wê pêvajoya komare mehabad re kurd, carek din derketina destpêka xwe kirin û derketina ser rûyê dîrokê. Î ro, ew derketin, êdî li herêmê bûya û mazin bûya. Bi vê yekê re, komare kurd, bi rûh û gîyane xwe re bû temenek ji wan temenê ku vejîna kurd li ser bû û vejîya. Dîrok ji nû ve hat nivîsand in. Bi vê yekê re, ez karim bêjim ku rûh û gîyane komare Mehabadê hê dijî. Di PDK'ê mistefe berzanî de dijî, di PKK'ê de dijî, lê ew dijî. Ez nikarim tenê bahse komare Mehabad, tenê weke birhanînekê bikim. Wê ne rast jî bê. Mehabad, bû rûh û gîyanek ku piştî xwe re afirand û hanî û heta roja me. Bi vê yekê û têgihîştinê divêt ku mirov lê binerê. Î ro jî, li ser esasê wê gîyanê yekbûn, pêşketin û bi nirxbûn, ya ku ji kurdên roja me tê xwestin a. Komare mehabad, hê dijî. Wê hê jî, bijî. Bi silev û rêz komare mehabad. ..

Piştî van demên komkujîya dersimê û xûrîxîna komare kurd a Mehabadê, rewşa kurdan:

Ku mirov li dîroka Kurdistanê di hizirê, mirov bi awayê pêşketinê pêşve çûnê dibîne. Her demeke wê ye ku hatiya jîn kirin, deme xwe ye ku jê buhurtiya an ji buhurandiya, bi têgihîştin û

pêşketine derketiya pêşiya wê û jîn bûya. Mirov karê vê yekê weke xosletekî pêşketine kurdan ye her demî ji bêne ser ziman. Di deme Numeyîşên li Kurdistanê de ji li Kurdistanê, mirov vê yekê weha dibîne. Kurd, piştî waqas xuruxandin û têkçûnên mazin yê ji salên 1925 û bi vir de û komkujiyên weke yê Dersimê, piştî karin xwe rakina ser piyan. Bi vê yekê mirov divêt ku bi nerînekê li Numeyîşên li Kurdistanê meyîzêne û fahm bêne ser ziman. Xoslet û teybetmediyên numeyîşên li Kurdistanê yê li Kurdistanê, ye serî her weha ji aliyê civaknasî ve û hizrî ve xwe dide berçav. Ji ber vê yekê divêt ku mirov wan numeyîşan pir baş fahm bike. Di rastiyê de mirov li wan dihizirê, mirov dibîne ku weke şoreşeke çandî ye ku bi kevneşopî xosletên ku bi hiizir pêş diketin di temenê wê de bin bû. Her weha tê ber çavên mirov.

Ji aliyê civaknasî ve, her weha divêt ku mirov wan numeyîşên deme lêkolîn bike û analîza li ser bike. Ev yek, li gor min di vê demê de bêhtirî girîng û pêdivî pê heya. Di deme ku ew numeyîş bûn, cihan rewşê wê û pêşketine têde ku dibû û hebû çawa bû? Di çerçove ve pirsê e divêt ku mirov li ser bisekinê û wê fahm bike. Berî her tiştî ji ber ku kurd ew numeyîş bi hebûn û ancamnên wê re jîn kirine, divêt ku ew bêhtirî wan bînine ser ziman. Di vir de hanîna ser ziman ye ji aliyê wan ve, wê mirov bigihêne hinek rastiyên din yê hizrî, çandî û bi têgihîştine deme dîrokî re felsefe. Her weha divêt ku mirov wan pir baş û qanc fahm bike.

Ku mirov demên berî wan numeyîşan ne bîne û kirin û bûyînên ku di wan deman de bûna ji ne bîne û şiroveyekê bike, ew şirove wê bê gûman, wilo zêde ti giraniya wê nebe. Divêt ku ew dem pir baş û qanc werine dîtî û fahm kirin. Divêt ku kirin û bûyînên ku hatina jîn kirin werine fahm kirin. Divêt ku ji wan deman hate ku hatina wê demê, çi pêşketin rûdana, ew ji bêne fahm kirin. Her weha ev yek pir girîng e ku mirov wan fahm bike û bêne ser ziman. Di numeyîşên li Kurdistanê yê di 1967-8an de, xosletne pêşketinê yê bi çandê re ku bi têgihîştin û pêşketinê hizrê re xwe didina berçav hene. Ev yek, her weha divêt ku baş were dîtî û fahm kirin. Di serî de, berî em hanîna xwe ye li ser ziman berdewam bikin, em gotinekê ku em girng dibînin di vir de bînine ser ziman. Ew ji her weha ev e. Kurd, ji despêka komara tirk ve çi jîn kirin û çendî xuruxandin jîn kirin, bi awayekî ku wan fahm bikin û di xwe de derxina têgihîştin û bi ser ve ji wan numeyîşan bidina kirin, hatina wê rewşê. Yanî, çendî her weha rewşên ne baş û xirab jîn kirin, û çendî têkçûn ji jîn kirine, ew têkçûn nebûna sedem ji wan re ku xwe berdî û ji dîrokê herin. Bi vê yekê, ew numeyîş her weha pir girîng in ku mirov wan fahm bike.

Şert û mercên cihanê yê wê deme, bi awayekî ku bi bayê çapê bûn. Tekoşîneke di naqabîna rojava û sovyetê de di çerçove hebûne çap û rast bûnê de hebû. Wê tekoşîne, hema bêja pêşketinên demê yê ku li her pênc qitayên cihanê dibûn dida kifş kirin. Li rojhilat, wilo bû. Li rojhilat, ji ber ku sovyet wilo zêde bi pêşve neçe û pêşketinekê jîn neke û berî hertiştî ji bandûra wê bi bîrdozîya wê re li rojhilat nebe, "kembere kesk" ye ku dewletên arab û bi teybetî ji yê ku olî kira nava xwe de. Bi vê yekê, rojhilat, qalibe ku î ro ji, dibin barê wê de ya yê ku li pergalan hatiya kirin yê olî hate afirandin. Bi vê yekê, êdî li gor wê pêşketineke mazin bû. Afganîstan, Îran, Tirkiya û waletên din yê rojhilat, pergala wan di wê demê de hatina bişekil kirin.

Di nav van rewşê û pêşketinan de Kurdistan ji heya. Kurdistan ji, weke waletekî rojhilat, her weha hebûna xwe diafirîne. Têgihîştine Kurdistanê, di demê de weke ku li Îran û li Tirkiyê bû, ye olî hate derxistin li pêş û ew hate bi şûn xistin. Bi vê yekê, êdî rewşê wê mazin afirî. Bi vê yekê, re zimanê kurdan ji yê kurdî ji li wan bixwe ji hate qadaxa kirin. Li herêmê ji arabî, fersî û tirkî bigirê, ti kîjan zimanî fêr bibe, fer biba. Lê kurdî na. Her weha nêzikatiyak di bîrdozîya dewletan de hate rûnandin. Pê ji, pêşketineke mazin dana kirin. Ji bo ku kurd wê herê bikin, bi deh hezaran mirov hatina kuştin. Şer û pevçûn hiç li Kurdistanê li ti qadê kêmbû. Şerên ku bûn ji yê ku wê hebûnê bidina herê kirin bûn. Li tirkî, zaro ji temenê zarotiya xwe ve ji dê û bavên dihatina standî û di birin û dikirina dibistanên şev borîn de û têde dihatina mazin kirin, weke yekî tirk. Ev yek, wilo berdewam kir. Piştî salên 1925 û wan û bi vir de, her weha ye ku bû ev bû. Li Dersimê ji, mirov ji jîn û mîr bigirê yekî wilo zêde ji kumkujiyên ku li wan hatina kirin ne filitîn. Lê hinek zarok filitîn û ew ji ji aliyê dewletê ve bi birina rojava tirkî û li wir radestî malbatên tirk dihatina kirin ku wan weke tirkan bi zimanê tirkan mazin bikin. Î ro ji, çend ku em di 2010an de dijîn ku ew zarokên ku wilo hatina mazin kirin ku bêne kifşkirin û derxina holê, wê ne bin sedhezaran re

bin.

Piştî serhildan û komkujiyên wê demê re, bêdengiyêke mazin ku weke rayadarên dewletê ji digotin ku "axa mirine bi ser wan de hate raşandin, êdî wê deng nebe. Wê bi navê kurd û kurditiyê êdî ti tişteke nebe û dernekeve holê". Her weha ji di hate bawer kirin. Piştî waqasan re bûna Numeyîşên li kurdistanê, her weha girîng e û gelek wateyên wan hene, hem ji bo kurdan û hem ji bo dewletê.

Kurd, di wê demê de, ji navê wan û dengê wan ti tişteke li holê ne hatibû hiştin. Her tişt bi navê tirkî di hate ser ziman. Hinek mirovên ku ji komkujiyan xilas bûbûn ji, weke yên "bermayiyên ku li şûn mana" di hatina binav kirin. Dewlet ji wan ji ne ditirsaha. Ew ji, wê dengê xwe dernexistiban. Wê ew ji weke tirk mazin bûban. Wê wilo maban. Hemû hesab û kîtaba wan wilo bû. Kurdên ku hê zaro bûn ji, yên ku ji dê û bavên xwe hatibûn dîrkerin û di dibistanên şev borîn de di hatina mazin kirin ji, ew ji êdî zimanê tirkî bi kar dihanîn. Ku ne weke tirkekî ji ban, wilo li xwe dihanîn. Ji xwe berî hingî, hatibû gotin ku "kurd, tirkên ku pê berfê kirin û deme ku pê berfê kirina ji, berfê dibin lingên wan de gotiya 'kart-kurt' û êdî jê kurd hatiya afirandin". Her weha di hate ser ziman. Wekî din ji, yên ku digotina xwe kurd ji, ji wan re digotin "kurdên biduv" an ji " yên çiyayî". Her weha di hatina binavkirin û ser ziman. Bi vê yekê re, hemû tiştê bi navê tirkî "rast û meşrû" di hate nişandin. Bi vê yekê, êdî mazin bûn dibû.

Ji demên perçiqandina serhildanên kurd re her weha rewşek afirî bû. Li ser navê kurdî ti tişteke en di hate ser ziman. Numeyîşên li Kurdistanê, bi hebûn û bûyînên xwe re weke destpêkekê di vê rewşê de da dest pê kirin. Ew rewş hemû, da mahkumkirin. Bi vê yekê re ev yek girîng e. Numeyîşên li Kurdistanê, rengê kurditiyê di nav waqasan kirin û "dezenifermasyona" li ser kurdî de derket û ew bi destpêka xwe re li ber kurdî "reş" da nişandin. Her weha êdî piştî vê re rewşeke nû li Kurdistanê dest pê kir. Wekî din ji, mirov karê bêje ku ew axa mirinê ye ku li ser serê kurdan hatibû raşandin, ji holê hatibû rakirin. Mirov bi vê yekê re, vê karê bêne ser ziman. Têgihîştin û cerbên Numeyîşên li kurdistanê yên wê demê, hemû ji di qada têgihîştine civakî û felsefe dîrokê de têne ser ziman. Hemû ji, hewldanên ku ji nav xalkê yên ku xalkê bixwe kirina bûn. Bi vê yekê, êdî demeke nû dest pê kiribû. Bi vê yekê, ev girîng bû. Yên ku di wan numeyîşan hebûn û yên ku nebûn ji, xwe ji ancamên têgihîştina wê, piştîre xilas ne kirin. Bi vê yekê re, êdî herkesekî bidest ji xwe

pîrsînê kir ku ka kî ya.

Bi teybetî ji ji aliyê têgihîştine felsefe civakî û pê re ji bi civaknasiyê hanîna wê ye li ser ziman wê rast bêt. Di vir de, cerbên ku derketina holê, piştîre bûna temenê pêşketinên ku wê bibin ji. Di wê demê de bi wan numeyîşan re, mirovên ku hinekî êdî zanebûn bi xwe re da çê kirin û kir ku derkeve pêş û pêşengtiyê bike ji, rastî bertekên dewletê hat. Ew numeyîş, bi vî awayî êdî weke ku dibûna temen ji tevgereke kurdî ya ku aliyê wê civaknasî li pêş bû. Bi vê yekê re, ew bêdengiya li Kurdistanê xira bûbû. Dewletê, êdî li çarayan gerahak ku wê bide sekinandin û careka

din bêne ser sêraberê.

Di wê demê de bajarên herême botanê û hate ku di hat ber Amede ji, şiyarbûnak ji xwe dibû. Berî hertiştî rabûnaka ku mirov bi awayê şiyarbûnê ser ziman weke ku dibû. Ji bin barê wê awayê ku bi tirkî hatibû afirandin û berî hertiştî ji tîkçûnên ku bûbûn ji, weke ku derketin dibû. Êdî neslên nû bi kêmesî û hebûnên bixwe re xwe ji nû re radikirina ser pîyan. Ev yek di hate dîtin. Mirov ev yek di dît. Di wê demê de bidest nivîsandina bi kurdî û çend ku qadaxa ji bû, bi kar hanîna navê 'Kurdistan'ê û li ser jîyan, serpêhatî û kirinên li Kurdistanê nivîsandina wan, weke cerb û ancamên wê derdiketina holê. Her weha mirov karê vê yekê wilo bi teybet ji bêne ser ziman.

Piştîre hin bi hin, êdî têgihîştineke kurdistanî derdikeve holê. Dewlete tirk, ku dem tê salên 1970 yî, êdî derbeyekê dike. Di rastiye de, derbe li vê pêşketinê bû. Wilo hatibû hizirkirin. Lê wilo zêde bi ser ne ket. Gelek mirov yên ku derketina pêş hatina girtin. Lê ew derbe ji, bi planaka ku dewletê di serê xwe de dabû afirandin pê hatibû. Ew ji her weha, 'wê di nav kurdan bi destê hinek kurdên li cem wê, wê rêxistonekê bide ava kirin û wê yên ku pêşengtiyê dikin, wê ew rêxistin xwe bigihêne wan û wê wan bike nava xwe de û wê bi xwe re wan di bin navê parastinê wan bikişîne rojava(ewropa). Piştîre, wê derfet ji wan re neyê dayîn ku ew werine Kurdistanê. Wê

li wan deran bêne tesfîyekirin. Ji aliyekî ve çend ku ev weke ku bi hinekî ji bê bi serket ji, lê weke ancamenê wê demê bixwe ji ku bi têgihîştine demên berî xwe diafirî ji, komên kurd yên ku di wê demê de xwe bi rêxistin dikirin derdiketin.

Di vir de, divêt ku mirov weke destpêka van pêşketinan numeyîşên li kurdistanê ku di wê demê de bûna bibîne û bêne ser ziman. Her herêmên kurdan piştê rabûnaka wan yeli pîyan dibêt. Piştê ku dirok ji di wê navberê de tê lêkolîn kirin û xwandin ji, êdî hin bi hin pêşketin bi awayekî geometriki dibin û derdikevina holê. Bi vê yekê re, êdî pêşketinê nû û nû bi nû derdikevina holê.

Li ber wan sekinîn ji, her weha ji aliyê dewletê ve dibêt. Kurdistanê di wê demê de, ji aliyê dewletê ve ji weke ancama wan numeyîşan, di bala xwe didiyê de û rewşeke awarta li Kurdistanê giştî dide afirandin. Ancam û cerbên numeyîşên ku dibin, her weha hem di kurdistanîyan de û hem ji bi dewletê xwe didina nîşandin.

Pêşketinên deme, yên ku bi numeyîşan re destpê kirina, divêt ku mirov wan bi awayekî bi serê xwe bêne ser ziman. Têgihîştinaka kurdî ye ku di demê de afirîya têde heya. Ev yek di serî de divêt ku were dîtin. Ev dem, bi fahm kirin û têgihîştine xwe re, wê ji roje me re ji, hinek hizirna bide afirandin bi mirov re. Wê têgihîştineke pak û rast bide çê kirin. Wê berî hertiştî têgihîştine ku bide çê kirin, wê ew têgihîştine ku piştî waqas kuştin û têkçûnên bi serhilanan re careka din wilo mazin bi hebûn û têgihîştine xwe ye civakî rabûna ser xwe bêt. Bi vê yekê re, wê têgihîştine ku di dirokê re pêşketiya ye kurdî dirokê wê, wê bi mirov bide têgihîştin. Ji ber ku ew numeyîş, ti carî ne bê têgihîştin û dirok in. Di temenê wan de, têgihîştineke mazin hebû. Wê têgihîştinê, weke ancama xwe ew pêşketin derxistina holê. Ew têgihîştin ji holê ne rabû. Rastî, ji dirokê û têgihîştina dirokê, mirov karê wê fahm bike. Rabûna kurdan ye î ro ye li ser lingan, çawa têgihîştineka mazin ye dirokê di xwe de di demenê xwe de diparezê, her weha mirov karê ji boi wê demê ji bêne ser ziman.

Mirov ku li numeyîşên li kurdistanê li wan dimeyizenê, mirov ti carî nikarê wan tenê weke hinek xwepêşandîna bêne ser ziman. Hertimî ji wê zêdetir bi têgihîştineka demî divêt ku mirov wan fahm bike. Lê xosletên wan yên wê deme, bi teybetî ji aliyê hizirî û civaknasî li pêşbûna wan bû. Pê re ji, çend ku mazin bûn dibû pêşketinên têde mazin dibûn, êdî ancamenê wê yên sîyasî ji şin dibûn û derdiketina holê.

Salên 1968-9an, demne ku mirov weha wê bêne ser ziman in. Ev dem, demne ku weke ku ji nû ve demê rabûna ser xwe na. Li herêmê, ne tenê li tirkî konsesûseke ku kurdan tine di hasibenê hatibû avakirin û afirandin. Li aliyê Îranê ji, kurdan nikaribûn ku xwe bînine ser ziman. Li aliyê sîrî ji û aliyê îranê ji wilo bû. Lê rewşên qatên kurdistanên yên ku li aliyê Îranî û Îranqê, hinekî cudabûn. Ew pêşvajoya ku piştî têkçûna serhildanên kurdan yên deme nû yên ku ji 1925 ve dest pê kiribû. bi têkçûneke mazin ye kurdan jîn kiribû re bidawî bûbû. Bi ser wê têkçûnê re li herêmê, ku weke peymeke herêmî ji, ku demên piştî wan têkçûnan li herêmê bi hêzên herêmê wê bê rastkirin "paxta sadabatê" ye 1937an de ku weke ku naqabîna dewletê Îranî û tirkî de hatibû mohrkirin lê di aslê xwe de dewletên ku qatên Kurdistanê di nav hebûn hemû ji têde amedebûn re, rewş hatibû rast kirin. Herêm, bi wê yekê ketibû rewşekê nû de. Paxta sadabadê, hate ku tirkan derbe dawiyê li Dersimî li kurdan ne xist ne hate mohrkirin. Çend, ku di naqabîna dewletan de li ser levkirina wilo axiftin ji hebûn, lê li dawîya wî mabûbû bûna sekinî. Piştê ku pir baş hate fahm kirin ku li wir derbe li wir li kurdan hate xistin û artîş li wir bicih bû û piştê bidest yên ku mabûn ji tafisandina wan ji ki, piştê êdî ew paxt tê li dar xistin. Ew paxt, weke paxteka ku êdî denezandina tine kurd û Kurdistanê di dirokê de bû. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Divêt ku mirov wê yekê ji pir baş fahm bike. Herêmên kurdan, di nav dewletan de bi teybetî bi paxtê hatina rastkirin. êdî li aliyê îranê hemû tişt bi pirsitiyê tê ser ziman. Li Sîrî û Îraqê hemû tişt bi arabîtiyê ti ser ziman û li Tirkîyê ji hemû tişt bi tirkîtiyê tê ser ziman. Li Kurdistanê, navê kurdî û Kurdistanê ji hanîna ser ziman, êdî piştê, hinekî wêretî divîya. Mînaq, li aliyê kurdistanê ku di nav sînorê tirkî de hatibû hiştin de ji xwe gotin "kurd" û gotina "zimanê min kurdî ya" ji, bi kuştin an ji cezana pir mazin dihate pêşwazî kirin. Lê di deme numeyîşên li kurdistanê de, êdî hin bi hin mirovên ku ev dihanîna ser ziman derdiketin. Lê wan ji di hanîna ser ziman de, ev yek weke mêreniyeke dirokî û pir mazin ku di xwe de di dîtin. Piştî Numeyîşên li

Kurdistanê re, êdî hin bi hin bi teybetî ji di nav xwandevevanan de deng derdiketina holê. Ew ji rastî pir cezayan dihatin. Lê dewletê, piştî ku demek bi ser ve çû û êdî fahm kir ku êdî bêjeyên ku kurd û kurdistanîyê hatina kifşkirin, êdî bidest gotina ku "yên ku wilo dibêjin di aslê xwe de tirkên ku ji çiyê ne". Ev gotinên weha, bidest hanîna ser ziman wan ji devê pirofesoran bû. Li ser vê yekê tezên ku dihatina amedekirin ji hebûn. Hemû, armanca wan ew bû ku wî bayê ku bi naskirina xwe ye bi kurditiya xwe re ji holê rakin bû. Her weha ev yek wilo bû.

Kurdistan, êdî di seran de hatibû kifşkirin. Êdî heya mirovan jê hebû. Navê di hate ser ziman. Kurdî weke zimanekî navê wê di hate ser ziman. Yê digotin ku "ez kurd im û zimanê min kurdî ya" êdî derdiketin. Bi vê yekê, êdî piştî ew naskirina bi vê yekê ku derketa holê êdî hin bi hin bi rêxistin dibû. Xwendevevanên kurd, êdî bi vê yekê bidest xwe bi rêxistin dikin di zanîngah û dibistanan de. Rêxistinên weke DDKO, weke ancamen wê pêşketin û di pêşketinê de xwe naskirinê ne. Her weha divêt ku mirovî vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Kurdistan, êdî hin bi hin li ser lêkolînên tene ser ziman û bahse wê tê kirin. Navê tê ser ziman. Li kursiyên zanîngahan de bahse wê tê kirin. Ji kursiyên zanîngahan navê Kurdistanê tê ser ziman. Bi vê yekê re, êdî di rastiyê de bi demê re li zanîngahan xwepêşandin û serî hildan derdikevina holê. Êdî li ber wî û desthilatiye dewletê serî hildan bi kurditiyê çêdibe. Bi vê yekê re êdî deme nû ku êdî jê vegerandin bi pêşketinên ku dibin nîn e derdikeve holê. ..

Berî ku em di hanîna xwe ye li ser ziman de wilo zêde herîn, divêt ku bi paxta sadabadê ve girêdayê mirov çend gotinên din ji bêne ser ziman. Ew paxt, çend ku êdî nayê ser ziman ji, ku çendî rastiyê wê derkeve holê. Wê bê zanîn ku li Kurdistanê, wê çawa û bi çi awayê rastkirin daya kirin. Di wê paxtê de peymênê weke ku bi hev re hevbeş di nêzikatiyê de bin li ber pirsgerêka kurd bi dewletên ku qatên Kurdistanê kirina nav sîrorê xwe de derdikeve holê. Ew peymên ku li wir hatina mohrkirin û xalên ku hatina kifşkirin hate roje me ji nêzikatiyên dewletên herêmê yê li ser kurdan dide kifşkirin. Paxta Sadabadê, di aslê xwe de derbeye mazin piştî mohrkirina xwe bi 6 an ji 7 salan re bi ketina artîşa sovyet ye li herêma Kurdistanê ye nav sinorê îranê re xwar. Piştî jî, çend ku hewldanên wê paxtê li ser lingan bê girtin di nav van dewletan de bûn ji, lê wê derbeyek xwaribû, êdî.

Bi ketina artîşa sovyet ye li rojhilatê Kurdistan re, demeke nû êdî li wir divebe. Lê ancamen wê, wê pir mazin di tekoşîna kurdan ya ku êdî başûrê Kurdistanê ji xwe re weke navend di bîne û di bin serkêşîya Mistafa berzanî de ya, wê pêre xwe raxe berçav. Lê Rojhilatê Kurdistanê, di bin rewşeke awarta ye ku artîşa îranê daya afirandin de dimêne. Dem, hate ku tê salên despêka şoreşa komara îranê ya îslam ji wê bi nexweşiyên ku ji wê awarta bûnê yê ku ji rêveberîya îranê yê ku xwe didina berçav, wê êdî hin bi hin rabûnaka li ser xwe wê çêbibe. ..

Herêmên Kurdistanê yê bakûr, êdî di nav tevgereke ku êdî wê ne sekinê de ya. Ew xwepêşandinên di nav kurdan de di deme numeyîşên li Kurdistanê de li Êlihê, Siwanê, Erxanî, Amed, û hate ku tê herêmên botanê û pêre ji digihê herêmên herêma Kurdistanê yê aliyê Serhadê ji wê berdewam bikin. Kurd, êdî di wê demê de, bi wan numeyîşan re, mirov karê bêje ku bandûra têkçûn û komkujiyên ku jîna, êdî ji pêşîya rabûna xwe rakirina. Êdî dirabina ser xwe di wê heyemê de. Mirov wê yekê, her weha pir baş û qanc dibîne. Bi teybetî ji, herêmê min ye Cizirê û Nisêbîne, di wê demê de di bayekî pêşengtiyê de bû. Amed her weha wilo bû. Êlih û Silwan û ku hate ku digihîşt Rihayê, mirov ew bayê ku dihat û tede mirovan bi dana naskirinê li ber xwe dibir dihat.

Kurdistan, di wê deme numeyîşên lê de, di keve demeke xwe yê nû de. Êdî ji her aliyê ve demeke nû tede dest pê dike. Her weha divêt ku mirov vê yekê ji bi teybet bêne ser ziman. Ew deme nû ji, bi bayê li ku cihanê bi giştî bi hebûna çapê û têgihîştine wê re dihat re di rê de dimeşî. Piştî hin bi hin ku di vî warî de di serîyan de zanebûn dibe, êdî rastîya Kurdistanê tê dîtin. Gotinên "Kurdistan, mêtîngêh e!" û "Kurdistan, di bin mêtîngeriye de ya" di wê demê de tene gotin. Ew gotin, weke ancama wê pêşketin û têgihîştine wê ya. Bi vê re êdî tê ser ziman. Bi vê yekê re, êdî hewldanên naskirin û hanîna ser ziman re rastîya Kurdistanê û kurdan û yê ku weke hêzên mêtîngêr li ser serê wan serdestin ji cuda û cuda li rastîya wan lê gerîn dibêt. Bi vê yekê re, êdî lêgerîna Kurdistanê hindik ji bê, êdî dest pê dike.

Lêgerîn, di nav xalkê de dest pê dike. Pêşî, rastiya Kurdistanê ye ku lê tê gefrîn re berdewam dike. Di wê demê de, di nav xalkê de, êdî piştî numeyîşên li Kurdistanê re navên kurdi têne ser ziman. Hate wê demê navên herêmên kurdan ji, rêveberiya tirk guhartiya. Navên kurdi ji têne kifşkirin û bi kar hanîn. Her weha bi vê yekê û rewşê re ew pêşketin hebûna xwe dide berdewam kirin. Li ser kifşkirina navên herêmî re di serî xwe de xwegihandina hinek rastiya, di wê demê de dibêt. Piştê li ser têgihîştina wan navan re xwe gihandina dîrokêû pê re ji derxistina holê ya rastiya dîrokî êdî hin bi hin dest pê dike. Pirtûkên ku ne bi zimanê kurdi ji bin û dîrok û navên kurdi têde têne ser ziman, di wê demê de êdî têne nivîsandin. Hê kurdi, di nav xalkê de wilo zêde nebûya zimanê nivîsê. Piştê hin bi hin ew kurdên ku hinekî dixwênin û di bin destarê bişavtina komarê de ji serî ve hatina hêrtin, êdî hinekî kurdi fêr dibin û êdî hin bi hin bidest hanîna ser ziman dikin, ku çend ku pir pîrgirêkên wê ji hebin. De ne, divêt ku di vir de, bi gotinekê ji mirov bêne ser ziman ku hate destpêka komarê çend pirtûkên kurdi hebûn, hemû ya vegerehdîna tirkî û weke nirxekî tirkîtiyê têne ser ziman û yên ku nikarin wilo werênine ser ziman ji, holê hatina rakirin. Hate wê demê, ti pirtûkên ku kurdi bi nav kurdi û Kurdistanê têde hene nîn in. .. Numeyîşên li Kurdistanê yên 67-8 wan, ji vê yekê re ji dibe destpêkek. Ev dem, êdî dibe destpêkeke ku nivîsandina xwe ye bi zimanê dayikê bi pêşxin. Bi vê yekê girîngiya wê hene. Ku mirov ji nahaka ji deme me ji roje me ji li wê rojê û demê meyîzenê, an ji ji wê demê bi vir ve di demê dimeyîzêne. mirov pirtûk nivîsên ku bi kurdi nivîsîna û di kurdi de hatina nivîsandin ji, hemû yên demên piştî wê demê ne. Ji ber ku yên berî wê deme hemû hatina şawitandin û windakirin, êdî di destê me de ji wê demê û wirde wilo ti pirtûkên hene nîn in. Wilo zêde ti pirtûk û an ji nivîs na filitin. Pirtûkên weke yên Ahmedê Xanê ji Kurdistanê biravandîna hatina xilaskirin. Berhemên Meleyê Cizirî û Feqiyê Teyran ji, di mejiyan de hatina hiştin û bi wî awayê hatina parastin. De ne, divêt ku mirov bêje ku zimanê kurdi, di jiber kirin û di meji de hiştinê de pir mazin derfetne mazin dide mirov. Di meji de, dibe weke xêveke ku têde mirov tişte weke xwe veşêrê

ji mirov re. ..

Numeyîşên li Kurdistanê, di qada hizrî û civaknasîyê de xwediyê têgihîştina mazin ye ku di temenê de na. Kurdi, di jiyana xwe û kurdan de demne pir mazin yên pêşketine bi civanaskî, hizrî û dîrokî buhurandina. Bi vê yekê, di nav xalkê de xêveke mazin ye civakî ku mirov wê bi teybet bêne ser ziman bi kevneşopî û nirxên wilo afirîya. Ev ji, divêt ku mirov wan bi têgihîştin û awayên wan yên jiyânî, yanî yê civaknasî fahm bike di vir de. Banekî an ji Xûyên kurdan divir de dibîna temenek ji wan û parastina wan re. Kevneşopî û xû, ku mirov bi nêzikatiyak hizrî û civaknasî hildê dest û lêkolîn bike û hewl bide ku fahm bike, mirov wê hingê fahm bike ku ji mirovên xwediyê xwe re weke pirtûkeke ku ne nivîsandî lê di wî de bi têgihîştin heya ya. Mirov vê yekê ji, weke ancamakê ji wê demê û ji pêşketinê wê derdixe holê. Kevneşopî, ku pir dirêj hatina jîn kirin, di rewşê de heya ku weke ku çawa di nêzikatiya olî û kevneşopîyê wê ye pêşketinê de dibêt, hinek pîrozîyên xwe yên ku mirov di farqê de be û an ji ne difarqê de bê di jiyana mirov de diafirêne û mirov wê ji ku dise di farqê de bê û ne di farqê de bê ji, wê pir mazin wilo di wê astê û nêzikatiyê de jîn dike. Mirov wê wilo kifş dike. Li Kurdistanê, jiyana ku ji têgihîştina kurdan re dibe bingeş û pir demdirêj e, di vê xalê de dibe temen ji parastina wan ye hebûn û zimanê wan û rastiya wan re.

Li Kurdistanê, di demên 68-9 wan de yên demên piştî avakirina komarê, demne ku kurdi, êdî xwe dibînin in. Numeyîşên ku têne li darxistin ji weke ancama wan yên ku kurdi êdî xwe bidest naskirinê dikin in. Bi vê yekê mazin dibin. Kurd, di wê demê de, bi vê yekê, mirov karê bêje ku pêşketine mazin dijîn. Piştî waqas komkuji û serhildanan û ancamên wan yên têkçûyî û bi wan têkçûyînan re xuruxandinên ku hatina kirin re, êdî mirov karê her weha pir mazin bêne ser ziman. Xwe naskirin, mijaraka sereke ye numeyîşên ku di wê demê de li Kurdistanê dibin a. Her weha divêt mirov vê yekê ji bi teybetî di vir de bêne ser ziman. Lê ji destpêka komarê û hate wê demê ji, pir mazin têkçûnaka mazin jîn bûya û bi ser wê de ji hinek pêvajoyên komarê yên li ser kurdan yên bişavtinê yên pir giran hatina meşandin. Bi vê yekê re, hebûna şaxsiyetê hatina qatkirin. Li ser navê şaxsiyetê, wilo zêde tişteket nemaya ku mirov bahse bike û bêne ser ziman. Di wê ketinê de rabûna ser xwe, her weha bi vê yekê mirov karê weke serketinekê bene ser ziman.

Di wê demê de, hê di nav herêman de ku hê bi aşîran de dijî hinekî axiftina kurdî maya. Lê bi teybetî ji, ku kurdên ku li wir dixwênin di tirkî û tîzên tirkolojiyê bi wan bidina çêkirin û an ji ti beşên tirkolojiyê de xwandina wan ji, weke nîşanayaka hate bi derekê bi ser ketina hebûna bişavtinê ye li ser serê kurdan a. Di wê demê de, çend mirovên tirk, di beşên tirkolojiyê de xwandin? Û çend mirovên kurd di bêşên tirkolojiyê de xwandin? Bi rastî, ku mirov bersiveke bi ratteqînî bide van pirsan, mirov wê bibîne ku yên kurd zêdetir in. Ji dereke weke Nîsêbêne ji bo ku di beşên tirkolojiyê de bixwênin çend mirov çûna Anqarê? Ev pirs, teybetmediyeka wê heya. Ji aliyê têkçûna civakê ve wate û teybetmendiye wê heya. Ji aliyê civaknasiye civakê ve teybetmendiye wê hene. Pirseke ku mirov gelek ancamen civaknasiyê derxe ya. Bi Cizîre bota re weke herême bota, ku mirov wê bihasibinê, mirov wê weke navendeke nîrxên pîroz biqadr yên ku di kurdî hatina ser ziman in. Wê derê, hert timî hebûna xwe bi nîrxên xwe re parast. Ji ber vê yekê, ku ji van deran ji wilo derketin bû, êdî divêt ku mirov ast û rada wê şidet û girani û mazinbûna pêvajoya bişavtinê bêne ser ziman. Divêt ku mirov vê yekê her weha têgihîştin û hizre civaknasî bêne ser ziman. Ji vî awayî ve pêdivî pê heya ku were têgihîştin. Civaknasî, weke awayê çimentoya civakê bixwe ya. ..

